

DÎROK
HERODOTOS

Ji Soranî Wergera Kurmancî
ZÎYA AVCI

Liberhevxistina Îngilîzî, Tirkî, Kurmancî
ESLÎXAN YILDIRIM

AZAD

DÎROK

HERODOTOS

DÎROK
HERODOTOS

Weşanxaneya Azad

Dîrok: 06/23

Gerînendeya Weşanê:
Eslîxan YILDIRIM

Ji Soranî Wergera Kurmancî:
Zîya AVCI

Liberhevxistina Îngîlîzî, Tirkî, Kurmancî û Sererastkirin:
Eslîxan YILDIRIM

Berg & Rûpelsazî:
Aysel KAZICI OZALP

Çapa Yekemîn:
Weşanen Azad, 2024

ISBN: 978-625-99331-2-2

Çapxane:
Berdan Matbaacılık
Maltepe Mah. Davutpaşa Cad. Güven İş Merkezi C Blok No: 215
Topkapı-Zeytinburnu/İstanbul
Sertifika No: 45750

Navnîşan
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah. 34330 Skk. No:15 A/4
Mezitli/Mersin
Sertifika No: 40407

WEB: www.wesanxaneyaazad.net

© ***Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.***

DÎROK

HERODOTOS

Ji Soranî Wergera Kurmancî
Zîya AVCI

Liberhevxistina Îngîlîzî, Tirkî, Kurmancî
Eslîxan YILDIRIM

HERODOTOS

Dîroknas û nivîskar Herodotos ku wek Herodot jî tê binavkirin, li welatê Karya li bajarê Halîkarnasosê, ku îro bi navê Bodrum tê zanîn hatiye dinyê. Herodotos Karyayî ye, ne Grek e, Karyayî xelkê nişteçîh yê Anatolyayê yê kevn in û zimanê wan jî Hindûewrûpî ye. Payîtexta welatê Karya pêşî Mîlasa, dûra Halîkarnasos e. Di dema jidayikbûna Herodotos de Karya di bin desthilatdarîya Persan de bû. Bi pirtûka xwe ya bi navê "Historia (Dîrok)" tê naskirin, bi qasî tê zanîn Herodotos dîroknasê herî pêşî ye, loma wek "Bavê Dîrokê" hatiye binavkirin. Di derbarê jiyana Herodotos de gelek çavkanî tunene, di kitêba xwe de behsa xwe dike bê ji ku ye û tê de xuyaye ku çûye gelek herêman, lê zêde behsa jiyana xwe nekirîye.

Di Ansiklopedîya Suîdas de (Ya ku di sedsala 10emîn de hatiye amadekirin) wiha behsa Herodotos tê kirin: "Herodotos lavê Lyxes û Rhoîo (yan jî Dryo) ye, di malbatek naskirî ya Halîkarnasosê de hatîye dinyayê. Bi navê Theodoras birayekî wî hebû(ev nav Karyayî ne). Malbata Herodotos di serhildana li hemberî hikumdarê herêmê Lygdamîsê torinê cengawera Karyayî Keybanû Artemîsya de cih girtine, bi ser neketine û apê wî Panyasîs mirîye; loma Herodotos ji Halîkarnasosê revîyaye, çûye li girava Samosê bi cih bûye û li wir têkiliyên xwe berfireh kirîye. Îro Samos bi Yûnanîstan ve girêdayî ye, lê pir nêzîkî peravên Aydinê ya Tirkiyê ye. Dema bi derbeyekê Lygdamîs ji hikum ket, derdora sala 455 ya B. Z. (Berî Zayînê) vegerîya Halîkarnasosê, lê ji ber tevlihevîya polîtîkayê dîsa derket çû Thûrîûma(Îtalya) ya ku Atînayîyan ava dikirin. Hîn dibêjin li wir mirîye û mezelê wî li wir li Agora ye. Hin jî dibêjin li Pella wefat kirîye.

Tê texmînkirin ku di perwerdeya Herodotos de bandora apê wî helbestvan Panyasîsê Halîkarnassosî yê ku destan li ser Herakles nivîsîye zêde ye. Ji bilî vê, li gor ku Herodotos bixwe dibêje, li Misir, Babîl, Behra Reş, Trakya, Makedonya, Îtalya û li gelek cihan geryaye, di derbarê tiştê dîtine agahî nivîsîye, li xelkê guhdarî kirîye û bi tomarkirina van agahîyan tevdan ev pirtûka bi navê Historia ya 9 cild derketîye holê. Xuyaye wê heyamê nivîsa bi Îyonî bêhtir dihat bikaranîn, loma ne bi zimanê xwe Karyayî, bi zimanê cîranê xwe yê Îyonî nivîsîye.

Tarîxa çêbûn û mirina wî ne zelal in. Li gor pisporên mijarê di navbera salên 484- 490î yê B. Z. de hatiye dinyayê û di navbera salên 430-420an de jiyana xwe ji dest daye, lê li ku jiyana xwe ji dest daye tam nayê zanîn. Bûyera herî dawî ya di dîroka wî de derbas dibe di derbarê salên berî 430î ya B. Z. de ye. Loma mirov difikirin ku gerek piştî vê salê miribe, lê dibe ku piştî dev ji nivîsê berdaye çend salên din jî jîyabe…

NAVEROK

Pêşgotin 13

PIRTÛKA YEKEM | KLIO

Lîdya - Kroîsos 31
Solon 41
Hippokrates - Peîsîstratos 51
Şerê Sardesê 62
Ketina Sardesê 64
Zanyarîyên li Ser Lîdya û Lîdyayîyan 69
Medî û Persî - Kîros 71
Hozên Medî 73
Îskîtî 74
Hatina Dinyê ya Kîros 76
Kîros Derdikeve Ser Text 81
Ûrf û Adetên Persîyan 86
Îonî, Dorî, Aîolî 89
Îonîa 90
Bajarên Aîolîyan 92
Berxwedana Bajarên Îon û Aîol li Hemberî Kîros 93
Penaberîya Paktyas 95
Koçberîya ji Phokaîayê 97
Karya – Kaûnîa – Lîkya 100
Babîl 103
Şahbanûya Babîlê Nîtokrîs 106
Kîros li Babîlê 107
Asûrya 110
Massagetî 113
Tomrîs 114

PIRTÛKA DUYEM | EUTERPE

Misir û Nîl....123
Nîl û Devên Wê....129
Ûrf û Adetên Misrîyan....137
Merasimên Qurbanan....138
Xudayên Misrê û Merasimên Wan Yên Ayînî....140
Cejnên Misrîyan....146
Misrî û Ajel....148
Ûrf û Adetên Misrîyan Yên Din....153
Veşartina Mirîyan û Mûmyakirin....154
Lotos û Papîrûs....156
Hikumdarên Misrê û Berhemên Hiştine – Menes....159
Hikumdara Jin Nîtokrîs....160
Moîrîs....160
Sesostrîs....160
Pheron....164
Çîroka Proteûs û Helene....164
Hikumdar Rhampsînîtos....168
Kheops –Piramîd....172
Khephren....173
Mykerînos....174
Hikumdar Askyhîs....177
Hikumdarê Kor Anysîs....177
Hikumdarê Kahîn Sethos....179
Di Derheqê Xudayan de....181
Labyrînthos....182
Gola Moîrîsê....183
Psammetîkos....184
Orakla Letoyê....185
Nekos....186
Psammîs....187
Aprîes....188
Amasîs....191

PIRTÛKA SÊYEM | THALIA

Misir Dikeve Destê Persîyan....199
Şerê Pers û Misrê....202
Sifreya Rojê....206
Dîktatorê Samosê, Polykrates....214
Sefera Samosê û Perîandros....218
Serhildana Magîyan/Maxan/Moxan....223
Amadekarîyên Xistina Mag....226
Mirina Mag Smerdîs....230
Minaqeşeye Demokrasîyê di Seraya Persan de....231
Daryûs – Birêvebirin – Ereb û Hindî....235
Hindistan....238
Erebîstan....241
Mirina Întaphernes....244
Dawîya Polykrates....245
Çîroka Demokedes....249
Çîroka Syloson....253
Sefera Babîlê ya Daryûs....257

PIRTÛKA ÇARAN | MELPOMENE

Îskîtî - Welatê Wan - Taybetmendîyên Wan....265
Arîsteas....269
Zivistanên Îskîtîyan....274
Hyperboreyî....275
Zanetîyên Cografyayê....277
Libya....278
Asya....280
Ewrûpa....280
Îstros û Rûbarên Din....281
Rûbarê Borysthenesê (Dinyeper)....283
Ûrf û Adetên Îskîtîyan....284
Gorên Hikumdarên Îskîtîyan....288
Girêdana Îskîtîyan bi Ûrf û Adetên Xwe ve....290
Daryûs, Derdikeve Sefera Îskîtê....294
Pira Bosphorosê/Tengavê....295

Îskîtîa û Miletên li Vir Dijîn 299
Amazonî 302
Teqtîkên Şer Yên Îskîtîyan 305
Siwarîyên Xeyalet 307
Daryûs Paşve Dikêşe 310
Bûyera Libyayê –Avabûna Kîreneyê 312
Battos 317
Miletên Libyayê 322

PIRTÛKA PÊNCAN | TERPSIKHORE

Hellespontos û Trakya Serî li Ber Persîyan Ditewînin 337
Çîroka Paîonîayîyan 340
Hîstîaîos û Arîstagoras li Îonîayê Leptên Destpêkî 344
Sparta û Atîna – Hewildanên Arîstagoras 351
Rêya Hikumdar 356
Rizgarîya Atînayê Ji Hikumranan – Nivîsa Yûnanê 357
Şerê di Navbera Atîna û Thebaî û Aîgînayê de 366
Ketina Sardesê û Şewata Wê 376
Hîstîaîos Tevlî Îş Dibe 378
Şerê Qibrisê 379
Serhildana Karyayê 382

PIRTÛKA ŞEŞAN | ERATO

Paşîya Tevlihevîyê - Şerê Deryayî yê Mîletosê- Şerên Din 387
Têkçûna Girava Ladeyê 388
Netîceyên Şerê Ladeyê 392
Dawîya Hîstîaîos 394
Rojên Wêranî Yên Îonîayê 396
Mîltîades 397
Sefera Mardonîosê 400
Thasos û Kanîyên Zêran 401
Şerê Atîna-Aîgînayê 402
Îmtîyazên Hikumdarên Spartayê 404
Qayîşa Kleomenes-Demaratos 406
Dawîya Kleomenes 411

Marathon....419
Alkmaîonîdî....428
Dawîya Mîltîades....432

PIRTÛKA HEFTAN | POLYMNÎA

Mirina Daryûs – Şerê Hikumranîyê....439
Xerxes, Amadekarîya Yûnanistanê Dike....441
Amadekarî, Çiyayê Athosê, Hijmartina Artêşê....450
Xerxes – Axaftina Artabanos....459
Artêşa Persan di Erdê Ewrûpayê de....461
Hijmartina Artêşa Xerxes....462
Yekîneyên Siwarî....469
Hêza Deryayî....470
Axaftina Xerxes-Demaratos....473
Artêşa Xerxes li Trakyayê....475
Yûnanistana li Hemberî Xerxes....483
Themîstokles....488
Hêza Deryayî ya Yûnanê li Artemîsîonê - Thermopylî....502
Yekûna Hejmara Artêşa Persê....505
Firtone....506
Leonîdas....511
Li Thermopylê Şerên Yekem....513
Artêşa Yûnanê ji Pişt ve Tê Dorpêçkirin....515
Şerê Thermopylê....517

PIRTÛKA HEYŞTAN | URANIA

Şerên Artemîsîonê....527
Barbar Dimeşin Delphoîyê....534
Berî Şerê Salamîsê....538
Xerxes Akropola Atînayê Dişewitîne....542
Şerê Deryayî yê Salamîsê....548
Serkeftinên Artemîsîayê....554
Netîceyên Şerên Deryayî Yên Salamîsê....558
Hêza Deryayê ya Persê Paşve Dikêşe....562
Xerxes Paşve Vedigere....565

Bûyera Potîdaîayê....569
Hêza Deryayê ya Persê li Samosê Berhev Dibin....570
Mardonîos bi Îlahan Dişêwire....572
Mesaja Mardonîos ji Atînayîyan re....573

PIRTÛKA NEHAN | KALLIOPE

Artêşa Persê Cara Duduyan Dikeve Atînayê....581
Sparta Baz Dide Alîkarîya Atînayê....584
Baregeha Yûnanê li Plataîayê....592
Baregeha Barbaran li Plataîayê....593
Şerê Plataîayê....599
Piştî Plataîayê....613
Şerê Mykaleyê....614
Entrîkayên di Seraya Persan de....621
Bûyera Sestosê....623

DI DÎROKA HERODOTOS DE PÎVAN....627

P Ê Ş G O T I N

Ev berhem berî salên 430î yê Berî Zayînê ji alîyê Herodotosê Karyayî ve hatîye nivîsandin û cara ewil e wergera wê ya Kurdî-Kurmancî tê çapkirin. Ev pirtûk herî zêde behsa pêşîyên me Kurdan, welatê me û derdorê dike. Wek Weşanxaneya Azad, em bi pirayî li ser berhemên kevn yê di derbarê Kurdan de disekinin. Esas dema min Weşanxaneya Azad di 2012'an de damezirand, yek ji pirtûkên ku em difikirîn di merheleya ewil de wergera wê bikin û çap bikin ev pirtûk bû, lê derfet îro rê dan me. Di gel ku pir bi derengî jî ket, va em gihiştin armanca xwe û ev berhema bêhempa li pirtûkxaneya Kurdî zêde bû.

Pêşî li Başûr li Herêma Federe ya Kurdistan wergera ji Yûnanî bo Soranî ya Elî Fethî hatibû çapkirin. Min ji Zîya Avci rice kir û wî jî ji Soranî wergerî Kurmancî kir, em gelekî spasî Ziya Avci dikin. Di wergerê de ji ya Tirkî jî sûd wergirtîye ya ji alîyê Muntekîm Okmen ve hatîye wergerandin û piştî liberhevxistina bi ya Yûnanî re ji alîyê Azra Erhat ve, bi navê 'Herodot Tarihi' di sala 1973yan de hatîye çapkirin. Danheva Îyonî ya ji alîyê Dietsch di sala 1850yî de, ji alîyê Henri Berguin ve wergerî Frensizî bûye, ya bi Tirkî jî ji ve hatîye wergerandin. Piraya têbinîyan ji wergera Tirkî hatîye wergirtin, hin jê jî min lê zêde kirine. Hin jêrenot, li gor dema wan û pêşketinên lêkolînên salên dawî, li gor fikara ku dibe qels yan ne rast bin, me hinek ji wan dananî. Di hundirê pirtûkan bixwe de ya wergerên din sernav tunene, tenê navên pirtûka hene; lê di ya Tirkî de di navberan de hin sernav hebûn, me jî ew danîn, ji ber ku bi çavgerandinekê jî hebekî ronîyê dide mijaran.

Piştî Zîya Avci werger ji min re şand min di ber çavan re derbas kir, min biryar da ku ez wextekî fireh jê re veqetînim û heya ji me bê em wê baş çap bikin. Min wergera Kurmancî ya ku Zîya Avci şand, ya Îngîlîzî ku George Rawlinson wergerandîye û bi navê "The Histories" di sala 2013an de hatîye

çapkirin û ya Tirkî dane ber hev. Dema ez di cihnan de dialiqîm min hin werger û berhemên din yê pêwendîdar jî di ber çavan re derbas dikirin. Di ber re min hin bernameyên li ser mijarê jî guhdarî kirin û dawî pirtûk gihişt vê merheleyê. Jixwe bêhijmar berhem, fîlm û gotar li ser vê berhem û mijarên wê hene, helbet min tenê li yên ku min ji zimanê wan fêm dikirin yê ber destan nerî. Ji ber ku pirtûkek pir kevn e û tê de gelek nav, bûyer û mijar hene, ewqas derfetên teknîkî li ber destan tunebûya, belkî min ceger nekira ez vê xebatê bikin; lê ji ber ku di derbarê her nav, erdnîgarî, berhem û mijarên pêwendîdar de min dikarîbû lêpirsînê di ser înternetê re bikira, xwe bigihanda gelek çavkanîya, min karîbû vê xebatê biqedînim. Hema hema çi nav û bûyerên derbas dibûn, bi serê xwe min lêpirsîn li ser wan dikirin. Di vê derbarê de bi dehan dosya û nivîs berhev bûn. Wekî din, ji bo herikbarîya vegotina Kurdî jî ez bi baldarî pê daketim û bi vî awayî zêdeyî salekê ez li ser xebitîm.

Wergerên bi vî awayî û ji bo mirov hakimî mijarê be bingehên xurt jê re divê, ji ber ku ev pirtûk derdora du hezar û pêncsed sal berî niha hatîye nivîsandin. Hem ji ber kevnbûna nivîsê, hem ji ber mijarên wê yê berfireh, hem bi pirsgirêkên wergerên ku berê hatine kirin, gerek mirov bi salan li ser bixebitîya, di derbarê de lêkolînên berfireh bikira û çend berhemên wan heyaman yê nivîskarên cuda bi baldarî bixwenda. Helbet ya herî rast ku mirov zimanê wê yê orjînal (ku Îyonî ye tê gotin) hebekî jî be zanibe û ji ya Yûnanî bixwe wergera wê bike. Lê ji ber valahîya xebatên Kurdî yê di vî warî de, me jî bi qasî taqeta xwe gaveke biçûk avêt û bi vî awayî çapa ewil derxist. Di vê werger û vegotinên me de bêguman wê kêmanî û xelitî hebin, kesê pêwendîdar li vê xebatê weke wergera ewil ya Kurmancî û xebateke bi derfetên qels pêk hatîye binerin wê baş be.

Hin rexneyên biçûk hebin jî, ev berhemeke bêhempa ye. Herodotos li gelek welat û bajarên cîhanê geryaye, gelek tişt, cih û war dîtine, li gelek kesan guhdar kirîye û tevde li ber me raxistine. Ew ji Anatolyayê heta Rojhilata Nêzîk, ji Misirê heta Hîndîstanê, ji Bakurê Afrîkayê heta Efxenistanê, ji serî heta dawîyê li welatê Med û Farisan hemû agahiyên kevn û nû berhev dike û kevneşopî, bazirganî, siyaset, erdnîgarî û çanda wê tomar dike. Li gor şertê wê heyamê ev serkeftinên mezin in. Heke ev xebat di dest me de tuneba, di fêmkirina dîrok û sosyolojîya wan deman de em ê gelekî qels bimana.

Yên di derbarê dîrokê de lêkolînan dikin, dibînin ku heya ji dagirkerên Kurdistan tê navê weke Mîtannî, Med, Medîa, Kurd û Kurdistan derbas nakin, geh dibêjin Anatolya, geh dibêjin Mezopotamya, yan Sûrî… Ji ber vê di wergerên pirtûkên kevin de gelek pirsgirêk hene. Di serî de Rojavayî û yê Kurdistan di nav xwe de payê kirine, wek welatê wan nirxên Kurdan jî li hev payê kirine, dîroka wan çewt kirine û dinya tevde xapandine, ne li rastîyê û ne li zanistîyê sekinîne; bi milyonan berhem li ser vê xelitîyê hatine afirandin. Loma bêyî ku mirov hay ji xwe hebe, carna em nivîskarên Kurdan bixwe dikevin vê çerxa ku demeke dirêj e digere. Ji bo em hebekî xwe ji vê pergalê bi dûr bixin, li ser bingeha ku ev bist û çar sal in ez lêkolînê li ser dîroka Kurdistan û derdora wê dikim, ez dixwazim balê bikşînim ser çend mijaran.

Xebata Herodotos ji neh pirtûkan pêk tê, di hin çavkanîyan de derbas dibe ku di sedsala 2yemîn ya B. Z. de, zanayên Îskenderîye xebat kirine neh pirtûk û navê neh perîyên îlhamê li wan kirine. Pirsa, gelo çi guhertin û lêzêdekirin an kemkirin yên din tê de hatine kirin tê hişê mirov. Îhtîmal e, li gora demê û rewşa ku heye pêlîstin tê de çêbûbe. Sedsala 2yemîn ya B. Z. yanî dema ev pirtûk li Îskenderîyeyê hatîye danhev û tesnîfkirin, dema piştî Îskenderê Makedonî ye, herêm bi pirayî di destê fermandarê wî de ne; ew wesifdana zêde ya Yûnanîyan û xwestina kêmxistina Med û Persan, dibe ku bi pêlîstinên wê demê zêde bûbe. Lê piştre jî wê guhertin tê de hatibin kirin, ev vegotina ber bi tekûzîyê ve ya metna ku niha di destê me de ye, li gora dema xwe zehmet e. Gelo di kopîkirin û wergerên pêşî de çiqasî sadiqî orjînalê mane? Min di notekê de dît, nivîsîbû ku 46 destnivîsê wê hebûn û ji nav wan tenê 3 heb hatin hilbijartin û li gora wan hate nivîsandin. Nivîs û zimanek pir kevn, materyalên ku bi dest ketine çiqasî tehrîb bûne, ev tev ji hin pêlîstinan re zemînê hazir dikin. Wek ku tê zanîn carna herfek, yan işaretek wateya gotin yan hevokê dikare biguherîne; ji ber van gerek em pir bi baldarî nêzîkî xebatên bi vî rengî bibin.

Ji bilî destnivîsan, cara ewil di sala 1570yî de di metbeeyê de hatîye çapkirin, yek ji vê çapê li Tirkîyê di Pirtûkxaneya Berhemên Kêmpeyde ya Fakulteya Ziman, Dîrok û Erdnîgariyê ya Zanîngeha Enqereyê ye. Yanî kêm-zêde berî metbee bê Dewleta Osmanî bi dused salî hatîye çapkirin. Hewce ye mirov ew çap û yê din li ber hev bixe.

Di gel gelek pirsê di serê me de, bêguman ev pirtûk bêemsal e. Axilbe ji bo Kurdan jî berhemeke pir hêja ye, em karin bêjin ku pirtûka herî kevn ya dîroka bapîrên Kurdan ev pirtûk e. Di hin pirtûkên berî wê de hebek vegotin hebin jî ne bi qasî vê bi kitekit in. Dibe ku hin berhem veşirtî mabin, em nizanin. Ji ber ku ji sedsalên 18 û 19an ve Rojavayî dest bi danheva berhemên li herêmê kirine, çi bermayîyên arkeolojîk û çi destnivîs bin. Helbet yê di êrîşên hovane yên ji alîyê yê weke Îskender û Mongolan de hatin şewitandin û tunekirin, windahîyên pir mezin in, ne tenê ji bo Kurdan, ji bo tevaya insanetîyê. Di ber re jî yên bi zor ji dest hev birine jî hene, wek pirtûkxaneya dewlemend ya Mîr Evdal Xanê Bedlîsî ku Dewleta Osmanî berteref kirîye. Îro jî axilbe ji bo berhemên kevin yê pir hêja yê di derbarê Kurdan de xuya nekin di pirtûkxaneyên fermî de yan veşirtî dimînin, yan jî bi navên cuda têne xuyakirin. Loma hêvî heye ku em rojekê bi ser hin berhemên din vebin. Ji ber ku di berhemên sedsalên dawî de gelek çewtkirin hene, xebatên kevin ji me re pir girîng in.

Di vê berhemê de mijar bi pirayî li ser şerên Med-Pers û bajardewletên rojavayê Anatolyayê û Helenan in. Ji alîyekî ve jî ev pirtûk bûye yek ji binhega îdeolojîyên Rojavayîyan, em ê li jêr hebekî behs bikin. Di serî de em li ser navan bisekinin. Em ji bo Helenan navê Yûnan bi kar tînin, bi gelemperî li dinyayê ji wan re Helen û ji welatê wan re Hellas tê gotin, yan jî Grek(Greece) tê bikaranîn. Wek ku tê zanîn, bi demê re wateya hin gotinan tê guhertin. Yûnan ji gotina Îon-Îyon derketîye, Îyon herêmeke rojavayê Anatolyayê ye, xelkê wê Îyonî bi pirayî xelkên Anatolya yê qiraxên Behra Egeyê ne; Helenî xelkên alîyê din yanî rojavayê Behra Egeyê ne. Îro jî navê ku em dibêjin Dewleta Yûnanistan, di fermîyetê de Cûmhûrîyeta Helen e. Loma ji wan re bikaranîna Yûnan û Yûnanistan çiqasî rast e, cihê nîqaşê ye. Ev navdan kîjan demê derketine û ji bo xelkên kîjan herêman hatîne bikaranîn, mijarek bi serê xwe ye; bêyî em têkevin nav vê gelşê, bi pirayî ji bo xelkê li erdê ku îro weke Cûmhûrîyeta Helen tê binavkirin em Yûnanîstan û ji bo xelkê wê jî navê Yûnanî bi kar tînin. Di vegotinên dîrokê de ev cure pirsgirêk ji bo gelek millet û welatan heye, gerek em hay ji van jî hebin.

Di pirtûkê de gelek navên cuda hene, hema hema hemû werger hin ji wan li gora zimanê xwe û çanda xwe guhertine, hin jê jî weke hev mane. Ji bo mînak, di wergera Îngîlîzî de Jupîter, di ya Tirkî de bûye Zeûs. Cihên di ya

Tirkî de Yûnanî derbas dibûn, hin jê di ya Îngilîzî de wek Greece(Grek) derbas dibe. Di ya Tirkî de li şûna Persan carna Îran derbas dibe, gelo ev çiqas rast e, yê bixwînin gelo wê ne Îrana îro bê hişê wan? Esas navê berê Aryan e û herêmeke berfirehtir e. Di vî warî de jî gelek pirsgirêk hene. Bi gelemperî di lîteratura dinyayê de gelek navên di vê pirtûkê de bi şiklê nivîsandina bi Îngilîzî rûniştîye. Me dest neda gelek ji wan, lê hin nav û cihên bapîrên Kurdan ku hîn jî hin ji wan di nav civata Kurdan de hene, me li gora Kurdî nivîsîn.

Di pirtûkê de beşên bi serê xwe yê di derbarê Medan de hene, Med bav û kalen Kurdan in, em li ser heman welatî dijîn, çand û dîrokek ku bi berdewamî tê jiyandin pir zelal li ber çavan e. Navê miletan bi demê re têne guhertin, lê piraya xelkê heman xelk e; ew xelk li welatê xwe û bi heman zimanî jiyana xwe berdewam dikin. Helbet bi demê re hemû ziman xwe nû dikin, têne guhertin û ber bi pêş ve diçin. Weke mînak heya sedsala 11-12an carna navê zimanê Med, Kurdî û Pehlewî di şûna hev de dihat bikaranîn, ev tevde bingehên zimanê Kurdî ya îro ne. Jixwe gelek dîrokzanên navdar bi gelek tespîtan anîne ziman ku Med bapîrên Kurdan in. Wek ku Herodotos jî îfade kirîye, Medî wek xelkê Arî-Esîl hatine binavkirin; Arî, Arîanayî, asalet li gor dûrbûna ji xeleka Medan şikil distend, yanî xeleka nêzîk ji ya dûr esîltir bû. Navê Medan û welatê wan li gor zimanê cuda bi awayê cuda têne bikaranîn, weke Mada, Medaî, Med, Medya, Medîan, Medes. Bingeha gotinên bajarvanîyê, weke Medîan(bi Erebî Medîne) ji navê wan tê. Di Îngilîzî de ji dermanan re Medicine tê gotin, ew jî ji navê Medîya tê. Şiklê birêvebirina dewleta wan bûye mînak ji yê bi dû wan re. Bi kinayî Med bi gelek awayî bandor li pêşketina insanetîyê kirine.

Hûn ê di pirtûkê de bibînin, Herodotos behsa revandina keça hikumdarê Kolhîsê Medeîa (Medîya) dike, dibêje, tê gotin ku Helen ya şerê Troya li ser derket, di ber revandina Medîya de hatîye revandin. Di warê rehetkirina nexweşa û dermanan de Medîya xwedî naveke taybet e, di derbarê de gelek efsane, mîtolojî hene. Mîrekîya Kolhîsê li qiraxên rojhilatê Behra Reş e. Yanî erdnîgarîya bapîrên Kurdan heya Behra Reş bû. (Jixwe bi sedan sal dûra jî Kurdan li bakur û rojhilatê wir, li Kafkasyayê gelek dewlet ava kirine.) Bi vî awayî xuyaye navê Medan hîn di sedsala 12an ya B. Z. de heye; di belgeyên Asûrîyan de jî di sedsala 9an yê B. Z. de behsa wan derbas dibe.

Di dîroka Kurdan de Dewleta Medan xwedî cihekî taybet e. Di vê pirtûkê de, behsa dema avakirina Dewleta Medan heye, di gelek cihan de hikumdarên Persî jî weke hikumdarên Medan derbas dibin û dide xuyakirin ku di împaratorîyê de gelek payebilind ji Medan hene. Weke mînak bi berfirehî behsa serfermandarê artêşê Arpagosê Medî dike, dema bi Lîdyayîyan re şer kirin çawa herêma heya bi behra Egeyê xistîye bin hukmê împaratorîye…

Berî her tiştî, dema ev berhem bê xwendin hewce ye mirov ji sînor û dinyaya îro dûr bikeve, hebekî mirov bala xwe bide wê demê û kêm-zêde li gor rewşa ku hebû nirxandinan bike. Di gelek cihan de dema Dewleta Pers, eskerên Persan derbas dibe helbet tevde ne Pers in, di hundirê Împaratorîya Med û Persan de gelek millet hene, divê ev di bîra mirov de bin. Mirov rabe li gor netewdewletîya ku dused salê dawî derketîye holê li bûyer û xelkê wê demê binêre, wê ne rast be. Ji ber ku sedsala dawî hin qalibên çewt rûniştine û gelek mijar bi çavê netewdewletîyê tên nirxandin, pir xelitî çêbûne. Berê dewlet ne bi navê neteweyekî dihatin damezirandin, heyamên berê bapîrên Kurdan li erdek berfirehtir bela bûne, carna Kurdan di heman demê de gelek dewlet ava kirine û bi pirayî ev dewlet bi navê bavik yan eşîrê serdest dihatin binavkirin. Vê heyama ku Herodotos behs dike Med ji Pakistan, Afganîstan û Xorasanê heya bi Yûnanîstanê belav bûne. Di pirtûka Kurdgalnamekê ya Axwend Mihemed Salih Zengene Beluç de jî tê dîyarkirin(me di sala 2019an de çap kirîye) ku Med Kurd in, Belûcî jî beşek ji Kurdan in û Medan weke pêşîyê xwe dibînin; îro di sînorên Pakîstan, Efganîstan û Îranê de dijîn. Împaratorîya Medan di dema rêveberîya Persan de wê di dinyayê de bibe împaratorîya ku yekemîn car bûye xwedî ewqas erdê berfireh û hikum li sê parzemînan kirîye.

Herodotos di pirtûka 1emîn de ji beşa 96, heya 103yan behsa avakirina Dewleta Medan û hikumdarên wan dike, dibêje; 6 hozên Medan gihiştine hev û wan bixwe hikumdarê xwe hilbijartine, ne bi darê zorê, ne bi şer. Hevoka di vê derbarê de wiha derbas dibe: "Dema ku em ê kê hilbijêrin derket holê, herkesî Dîyako pêşnîyaz kir, wesfê wî dan û derxistin asîmanan, hemûyan li hev kirin ku ew bibe hukumdarê wan..." Wekî din behsa adaleta Dîyako dike û dibêje; hakimtî dikir, xelk ji heq û hiqûqa wî dilxweş bûn, navê wî li her derê bela bû, piştî Dewleta Medan hate avekirin bajarek bi navê Ekbatan(Hemedan) ji nû ve ava kirin û bi heft sûran rapêçan. Di

cihekî de jî derbas dibe ku Dîyako gotîye; gilîyên xwe bi nivîskî dîyar bikin, loma xelk pirsgirêkên xwe bi nivîskî didan serayê û piştî wî hikum dida li wan vedigerand. Bi vî awayî em fêm dikin ku di civatê de nivîs di karê rojane de jî tê bikaranîn. Ji van çend hevokan bixwe, mirov kare di derheqê rewşa wê civatê de gelek tiştan fêm bike. Heq û edalet, bihevrebûn û yekîtîyeke bi dilxwazî û nivîs; ev tevde di wê demê de nirxên giranbuha ne, nîşaneyên şaristaniyê ne. Loma Dewleta Medan pir berfireh bûye û karîbû Dewleta Asûrîyan ya hov têk bibe. Hikumdarên Medî dewlet veguherandine îmaratorîyê, lê di sala 549an de, bi xayîntîya hin rêveberên Medan, di xanedanîyê de guhertinek çêdibe û împaratorî dikeve destê Kîrosê Persî, torinê hikumdarê Medan Astîyag yê ji keça wî Banû Mandane. Piştî hin pirsgirêkan, ji bo destpêka dema Daryûsê 1emîn, Herodotos behsa niqaşa rêberên xuyayî ya li ser şiklê hikûmetê dike, li ser monarşî, olîgarşî û demokrasîyê fikarên xwe dibêjin. Îro gelek zanyar vêna weke destpêka hebûna demokrasîyê dinirxînin.

Di gel ku di rêveberîyê de gelek Medî hebûn û gelek salan weke împaratorîya Med û Persan dihat naskirin, bi demê re di împaratorîyê de Pers xwe wek xelkê sereke dan pêş. Helbûkî Medan ew li gora xwe kêm didîtin. Pers li rojhilatê qiraxa Kendava Besrayê li herêmek biçûk dijîyan mirov kare bêje bi qasî yek ji wan hozên Medan bûn, yanî Persî pir hindik in li gorî Medan, lê îca li ser mîrasa Medan rûniştin, weke wan li xwe kirin û tevgerîyan û li erdek ewqas berfireh ku nikarîbûn xeyal bikin hikum kirin. Med û Pers xal û xwarzê ne, gelekî di nav hev de ne, di dîroka heya sedsala 20an de gelek caran navê dewletê û desthilatî di nav hin malbat û şeqsan de hatibe guhertin jî her xelk bihevre, di nav hev de bûn; loma dîroka wan jî pir di nav hev de ye. Lê axilbe sedsala dawî li Îranê jî nasnameya Persîtîyê derxistine pêş û her qirkirina Kurdan berdewam dike; loma Dewleta Îranê jî, weke dewletên din yê Kurdistan di nav xwe de payê kirine, îro xwedî gelek pirsgirêk e.

Di gelek çavkanîyan de derbas dibe, Persî hem di pergala dewletê de, hem di lixwekirin û rabûn û rûniştinê de weke Medan tev digerin. Herodotos jî gelek caran di Împaratorîya Persan de cihê Medan ya taybet îfade kirîye. Di kitêba 7an xala 116an de jî dibêje ku dema Xerxes derbasî Yunanistanê dibe, cubeyên Medan wek dîyarî dane mezinên ku pê re bûne alîkar, ev jî tê wê wateyê ku çanda serdest hîn jî ya Medan e.

Ji bo dîroka Kurdan mifteyên girîng di vê pirtûkê de hene. Çavkanîya ewil ya ji bo Bexçeyên Hilawistî yên Babîlê ye, yê ji bo Keça Keyayê Medan Keyxusrew û Keybanûya Babîlîyan Amîtîs hatibû çêkirin, heman demê ji bo Yekîneyên Nemiran yê ji deh hezar kesên Med û Persan pêk dihatin yê zilamên herî jêhatî ku li dora hikumdarê Persan bûn û tu carî kêm nedibûn(ji ber ku dema tiştek bi yekî ji wan dihat kesek din dikete şuna wan). Behsa jinên şerker yê bi navê Amazonan dike, li gor agahîyên ku di derbarê welatê wan de didin, ew û keça hikumdarê Kolhîsê ya bi navê Medeîa(Medîya) ya ku li jor behsa revandina wê derbas bû pir nêzîkî hev in, dibe ku di hundirê têkilîyê de bin. Hewce ye em li ser banû Medîya lêkolîneke baş bikin, hin agahîyên di derbarê de û film hene; bi çavê hemwelatîyên wê gelo tu xebat hene ez nizanim.

Ji alîyekî ve jî, dema mirov vê pirtûkê bixwîne, sebebê wê çi dibe bela bibe, gerek em ji bîr nekin ku ev ne berhemeke bêteref e; hûn ê bibînin ku hertim ji alîyê Pers û Medan re barbar tê gotin, lê dema behsa Grekî, Helenî û hin xelkên din yê li dij Med-Persan derdikevin tê kirin, bi pirayî bi coş behsa mêranî û wesifdana tebîetê wan dike. Çawa îro ji bo milletekî hin kes weke leheng û pir hêja têne dîtin lê ew ji alîyê dijmin ve weke eşqîya, terorîst tên îfadekirin, di gelek xebatên pêwendîdar yê hin din de jî heman rewş tên dîtin. Wek ku li jor me behs kir, dibe ku dema piştî bi çend sed salan di dema Helenan de li Îskenderîyê destê ku ewil li ser vê pirtûkê xebitîne, li gor hewa demê hin guhertin tê de kiribin. Wekî din, li gor hin zanayên mijarê, tê gotin ku gotina barbar ne bi wateya îro dihat bikaranîn, ji bo xelkê xerîb yê ne bi zimanê wan diaxivîn ev dihat gotin. Xaleke din jî mumkun e; tê gotin ku Herodotos ji ber hin pirsgirêkan ji welatê xwe çûye, wê demê welatê wî Karya û derdor tevde di bin hukmê Persan de bû, dibe ku acizîya wî ji wan çêbûbe; li Atîna jî pir maye, belkî ji bo nav xwe û wan xera neke bi başî behsa wan kirîye, yan jî nikarîbû li dij wan tiştekî bêje. Em mînakên van rewşa, heya roja me jî bi insanan re dibînin. Ev tenê çend îhtîmal in.

Di vê pirtûkê de bûyerek li ser Hikumdarê Medan Astîyages heye ya ku hineka gotîye, lawê Harpagos kuştîye û goştê wî daye bavê wî. Dîrokzan, nivîskar Fêrgîn Melîk Aykoç dibêje, ev mesele derew e, çend nivîskarên din yê behsa Astîyag bi qencî dikin dide xuyakirin û dibêje ew qet behsa vê mijarê nakin.

Helbet pirtûk tevde ne bi vî şiklî ye, di hin cihan de wesfê Med, Pers, Misrî û hin xelkê din jî hene. Dibêje Yûnanî ji Fenîkeyîyan fêrî nivîsê bûne. Çanda Misrîyan jî xwedî bingeheke kûr û xurt dide xuyakirin û dibêje gelek bandor li Yûnanîyan kirine, dibêje Yûnanîyan îlahên Misrîyan ji xwe re birine, hin orf û adetên wan stendine. Yanî Herodotos dibêje, medenîyet ji van deran û bakurê Efrîqayê çûye Yûnanîstanê. Îonîyan, Helenîyan gelek îlahên Hurrî - Mîtannî, Hîtîtî û xelkê din yê Anatolyayê jî girtine, li gora xwe navên nû li hin ji wan kirine. Piştre wê ev rewş derbasî Romayîyan jî bibe; weke mînak, wê ji Zeûs re Jupîter, ji Hereyê re Jûno bêjin û bi vî awayî temamê îlahên Yûnanistanê, yanî yê Anatolîyê û Misrê qebûl bikin.

Wek ku Herodotos bixwe dibêje, tiştê bihîstine nivîsîye û nirxandinên li gora xwe jî kirine; dibe ku yên Herodotos bi wan re axivîye hin xelitî kiribin, yan kêmkirin û zêdekirin tê de hebin. Wek ku tê zanîn bîranînên insanan bi demê re û li gor rewşa ku heye têne guhertin, şiklên nû distînin, yan hin tişt tên jibîrkirin. Loma şik ji mirov re çêdibe û em pirsan ji xwe dikin; gelo çiqas jê rast in, çiqas na? Ji bo tiştên nivîsîne, gelo hin çavkanî di dest de hebûn, yan na?

Gelek berhem di derbarê Herodotos û Dîroka wî de hatine nivîsandin, yê rexne kirine hene. Hin lêkolînvan bi berhemin din hin dîrok û bûyer li ber hev xistine, vegotinên ji bo erdnîgarîyan vekolane û bi peydabûna hin belgeyên nû re hin xelitî derxistine holê. Weke mînak di jêrenotekê de wiha hatibû nivîsandin: Zanyarîyên Herodotos dide, çiqas nêzîkî dema wî dibin hê zêdetir bawerîyê didin, lîsteya hikumdarên Misrê ji Psammetîkos şûnve rast in… Ev jî li gor derfetên demê normal in. Hin caran jî behsa efsaneyan, mîtolojîyan kirîye. Hin bûyer hene ku zehmet e mirov ji wan yeqîn bike. Vegotina vê pirtûkê pir dewlemend e, ji vê pirtûkê dikare bi dehan, bi sedan film û roman, tezên lêkolînan derkevin. Jixwe di dinyaya Rojava de xebatên bi vî awayî zêde ne, lê di piraya wan de jî terefgirî ji ya vê berhemê zêdetir e, pêdivî bi vekolînên nuh yê bi nerînek bêteref û zanistî heye.

Hin mubalexe jî hene, herkes dikare tê derxîne ku ne rast in, weke mînak; hijmara eskerên Med û Persan yê digrin ser Yûnanistanê zêdeyî pênc milyon insan dide xuyakirin, îmkana ku ev hijmar rast be tune ye. Dema mirov bi nifûsa heyamê re li ber hev dixe, rêya ewqas dûr dide ber çavan û xwedîkirina ewqas insan difikire, kêm zêde reqemek maqûl mirov kare bêje, lê ya

muhîm ku ev reqema hatîye dan pir pir zêde ye. Li ser sebeba wê hin fikar hene, ya herî li pêş ew e ku, ji bo bê gotin; "Qeweta li hemberî Helenîyan ewqas zêde bû, loma têk çûn."

Gotina barbar ji bo Med-Persan çiqasî di cih de ye gelo, em li ser hin mijarên din jî bisekinin belkî xelitî cihê xwe ji rastîyê re bihêlin. Sedsalên dawî hin Rojavayî jî gelek nirxên pêşketî dikin malê nifûseke biçûk yê ji alîyê Yûnanistanê ve hatine Anatolyayê. Bingeha medenîyeta Ewrûpayê jî bi Yûnanistanê ve girê didin. Ji ber ku bi dehan salan ev li dibistan û zanîngehan jî hatin xwendin û bi hezaran pirtûk bi vî awayî hatîne nivîsandin, ev mijar bûye pirsgirêkek mezin. Heke em bi çavekî zanistî li dîrokê binerin, wê nerastîya hin şîroveyên li ser dîroka Anatolyayê û Kurdistan baştir bê fêmkirin.

Hîn tu pêjna pêşketinekê li Yûnanistanê nedihat, berî Medan li vê erdnîgarîyê, Hattî-Hîtîtî, Hurrî-Mîtannî weke dewletên bi qewet li herêmê desthilatdar in. Piştî Mîtannîyan, li herêmê em dîsa medenîyetek bi pêşketî ya Ûrartûyîyan dibînin. Hîn berî niha bi 4200 salî heykelkên ji tûncê yê Hattîyan çêkirine, hunereke behempa radixe ber çavan. Ew û Hurrî di nav hev de ne. Li rojava û navenda Anatolyayê, cîranê herêmên di bin hukmê Medan de, dîsa xelkên Hîndûewrûpî weke Lûvîyan(Li gor ku Îbrahîm Xelîl Baran nivîsîye, hîn jî di nav Kurdan de eşîretên bi navê Lûvîyan hene), Arzavayîyan, Lîdyayîyan û gelek xelken din yê bi hezaran salan li wir jiyane û xwedî medenîyeteke li pêş in hene û ev xelkê Anatolyayê bixwe ne; xwedî û nasê hev in, zimanê wan pir nêzîkî hev in. Di arşîva Hîtîtîyan de di derbarê wan û zimanê wan de nivîs hene, di wan de tê xuyakirin bê ev çand tevde çawa di hundirê hev de ne û bandor li hev dikirin. Jeoarkeologê Swîsreyî Eberhard Zangger, li rojavayê Anatolyayê 340 cih û warên xelkê Lûvî tespît kirîye yê aîdî demên B. Z. hezar sala 2yemîn. Lûvî, heya Sûrî û heya bi nav Babîlîyan çûne, xwedî çandeke bi qewet in. Yanî ne bi hatina çend kesên jiderve Anatolya bûye xwedîyê vê çand û medenîyetê, heta piraya caran yên jiderve hatine hov û êrîşkar in, çav berdane dewlemendîya vî erdî û gelek berhemên medenîyetê ku insanên vê herêmê bi ser hev de anîne tarûmar kirine. Mesela Îskenderê Mekadonî tehrîbateke gelekî mezin daye herêmê, Avesta di êrîşê wî de hatine tunekirin, şahbajarê Persepolîsê wî xera kirîye. Persepolîsa ku di dawîya sedsala 6an de di heyama Daryûsê 1emîn de hate avakirin û di dema xwe de mînaka wê tune ye, îro jî mirov li xirbeyên wê di miqabilî hunerên wê de

heyran dimîne. Heman demê çêkirina Rêya Keya ji serîkî împaratorîyê heya alîyê din, danûstendin û bazirganî pir bi pêş xistîye. Lê wek ku Îskender medeniyet anîye herêmê dane naskirin. Bajarê Antîk Efesos ku navê wê yê Lûvî Apasas e, li rojavayê Anatolyayê ye, bi kêmanî B. Z. 1400 salî hatîye avakirin. Lê wek ku di heyama Helenan de ew û gelek bajarên rojavayê Anatolyayê hatîne avakirin agahî hatine belakirin. Pisporên mijarê dibêjin ku navên di dawîya wan de os-as hebin, ew bi pirayî Lûvî ne, yan zimanê din yê nêzîkî wê ye. Navên bi vî awayî li rojavayê Anatolyayê pir in.

Elî Şerîetî jî di pirtûka xwe ya bi navê "Medeniyet û Modernizm"ê de dibêje: "Şaristanîya Yûnanîyan ji aliyê Kurdên koçkirine wê derê hatiye avakirin, bi çûna Kurdan a Yûnanîstanê dest pê kirîye." Berhem û bermayîyên li herêmê ji kolanên arkeolojîk derdikevin jî vêna piştrast dikin. Dîroka Girê Mirazan, Girê Keçel û derdora wê digihe berî niha bi duwazde hezar sal. Dehsalên dawî de baş hatîye fêmkirin ku piştî insan cara ewil li Kurdistan (jê re Heyvika Zêrîn tê gotin) bicîh bû û xwedîbûna bi awayekî baş derket holê nufûs li vir zêde bû, pêşketin çêbûn û pêşî li dora xwe belav bûn, dûra her bi her rêya dûr dane ber xwe û dera çûnê çandinî li wir jî dest pê kir. Li gor vê, hebûna gund û bajarên li herêma Egeyê berî yê li Yûnanistanê ne, ev dide xuyakirin ku cotkarên Anatolya çûne Yûnanistan jî ava kirine. Ji ber ku pir nêzîkî hev in, danûstendina herdu alîyên behra Egeyê her berdewam kirîye, geh bi xweşî geh bi şer. Heyama Herodotos jî jixwe çanda serdest ya alîyê Anatolyayê ye.

Dema ku Dewleta Med berfireh bûye, heya Çemê Sor (Halys-Halîs) di bin hukmê Medan de ye. Avahîyên Medîyan heya herêma bajarê li Tirkîyê jê re Yozgat dibêjin hatine dîtin, bêgûman têkilîya wan heya bi qiraxên Behra Egeyê jî hebûn. Di belgeyên Nabûqednezarê 2yemîn de, dema behsa xelkê ku li Babîlê dixebitin rêz dikin, çend navên Lûvî dihejmêrin û dibêjin ev Îyonî ne. Pisporên mijarê, zimanê weke Karyayî, Lîkyayî, Îyonî pir nêzîkî hev dibînin; ev tevde di bin navê Lûvî de tên xuyakirin ku zimanê wan Hîndûewrûpî ne, piraya wan weke zaravayên yek zimanî xuya dikin. Med-Kurd û Yûnanî(Îyonî) jî xwedî û nasê hev in, cîranê hev in, bi xweşî û nexweşî bi hezaran salan di nav hev de jiyane, têkilîya bazirganîyê pir e.

Dûra Persî împaratorî gihandine heya bi Yûnanistanê. Li gor ku Herodotos nivîsîye, hema hema berî hemû êrîşên Med-Persan de pêşî ji rojava gavên xetere hatine avêtin, weke şerê bi Lîdyayîyan re, weke şewitandina Sardesê,

weke kuştina şandeyan... Di dema Med û Persan de ji bo dînê xwe bi wan bidin qebûlkirin jî zorî nedane xelkê ku ketine bin hukmê wan de, ew serbest hiştine. hikumkirina wan jî ne bi şiklekî hişk meşandine, mirov li Gundorê Kîrosê Mezin yê ku nivîsê wê wek yekemîn danezana mafên mirovan tê dîtin bi bîr bîne, wê mijar hebekî din ronî bibe. Di wextê wan de li rojavayê Anatolyayê jî gelek pêşketin çêbûne, felsefevanên navdar yê weke Tales, Anaxîmandros, Anaxîmenes, Herakleîtos, Anaxagoras li Rojavayê Anatolyayê û giravên nêzîkî wê di van deman de gihiştine. Derketina van fîlozofan di vê demê de ne tesaduf e. Rojavayî ew weke Yûnanî dane naskirin û bi pirayî behsa bandora çanda ku bûye bingeh ji wan re nekirine. Li gorî agahiyên ku Dîogenes Laertîos di berhema xwe ya bi navê "Jiyan û Hînkirinên Feylesofên Navdar" de daye, ya ku di sedsala 3yêmîn de nivîsîye, hema bêje tu fîlozofê ku vê heyamê derketine, yê neçûbe Misir û Mezopotamyayê(gelek caran nifşek ji erdnîgarîya Kurdistan bi vî navî tê derbaskirin) tune. Di derbarê Tales yê navdar de tê gotin ku bi gera Mezopotamya û Misrê jiyana wî hate guhertin. Hebûna têkilîyê û bandor lihevkirin ya xwedî û cîranên hev ne tiştekî dûrî aqilan e. Tiştê ecêb ew e ku yê du-sê qat dûrî van deran û tu girêdana zimanê wan bi Hindûewrûpîyê tune, tên xwe dikin xwedîyê van nirxan û xwedî bixwe dikin xerîb. Lê zêde wext bistîne jî ev tevde wê derkevin holê û rastî bibe serdest.

Belê, gelek kesên bi navê zana yê Rojavayî(hin îstîsna hene helbet) li dinyayê bela kirine ku bingeha felsefeyê ev fîlozofên Yûnanî(!) yê ku navê hin ji wan li jor derbas bûye avêtine. Lê berî wan Zerdeştî û felsefeya wê heye. Di dema Medan de Zerdeştî bi pêş ketîye. Di Avesta de Zerdeşt di derbarê dinya, gerdûn, insan, ba, robar, dar û her tiştî de ji Xwedayê ku hemû tişt efirandîye, ji Ahûra Mazda pirsa dike. Yanî di mejî de gelek pirs peyda bûne û gera li bersivan bi awayekî bi qewet wî radipêçe. Jixwe felsefe lêgerînek e ku xwe wek pirs û vekolîn nîşan dide. Mirov van pirs û lêgerîna li cem fîlozofên li rojavayê Anatolyayê jî dibîne.

Avesta ji berhema Herodotos pir kevintir e, tê gotin ku bi ava zêr li ser 12 hezar çermê ga hatîye nivîsandin. Ji bilî perçeyên nivîsên mîxî, em karin wan wek pirtûkên herî kevn yê pir girîng yê pêşîyê Kurdan bihesibînin. Wek ku tê zanîn felsefeya Zerdeştîyê bi nerîna "başîyê bifikire, bi başî biaxive û başîyê bike." meşîyaye. Wekî din, qedirdayîna heywanan û xwezayê pir li pêş e. Ev berhem sosyolojîya Medan-Kurdan jî didin xuyakirin. Zerdeştî gelek guher-

tin bi xwe re anîne, bûye bingeh ji dînên bi dû xwe re ku bi milyaran insan îro wan dişopînin, vegotin û rîtuelê wê derbasî wan bûne. Cara ewil fikara yekxwedayî bi pêş ket… Li gor ku pisporên mijarê dibêjin; di yeqînîyên berî Zerdeştîyê de ne serî û ne dawîya zemên hebû. Cara ewil bi Zerdeştîyê ji tunebûnê hebûn û dawîlêhatina dinyayê (zemanê lîneer) kete rojevê…

Di vê pirtûkê de rola jinê jî zêde xuya nake ji çend mînakan pê ve, di gel bi sedan navê zilaman û tevgera wan, tenê çend navê jinan derbas dibin. Di civata Helenîyan de cihê jine ne di rewşeke baş de ye, halbûkî di welatê bapîrên Kurdan û rojavayê Anatolyayê de, cihê xwedawendê pir mezin e, gelek jinên navdar û xwedî cihên girîng hene ku ev rola jinê ya li pêş hişkere dikin. Banûyên Hurrî-Mîtannî, yên Medan dibûn hevserê hikumdarên dewletên dora xwe û bi qasî hikumdar dibûn xwedî ray. Weke Keça keyayê Mîttanî û Keybanûya Misrê Nefertîtî, Keça rêvebirê dînî yê Hurrîyan û Keybanûya Hîtîtîyan Pûdûhepa, Keça Keyayê Medan Keyxusrew û Keybanûya Babîlîyan Amîtîs ya ku yek ji heft nuwazeyên cîhanê Bexçeyên Hilawistî yên Babîlê ji bo wê hatibû çêkirin, keça keyayê Medan û dîya Kîrosê Mezin Mandane em karin gelek mînakan bi bîr bînin. Jixwe di welatê Karya de ku Herodotos ji wir e û li Lîkya ya cîran, hukmê jinê li pêş e. Bêguman yên derî qeydîyên ber destê me jî pir in. Di gel vê rewşê, mirov di vê pirtûkê de vê hîs nake.

Mijarek din heye hewce ye balkişandinê ye; di gel ku li rojavayê Anatolyayê gelek navên antîk yê bi bapîrên Kurdan ve girêdayî hene, kesek naxwaze vana bîne ziman û di derbarê wan de agahîyên ne rast tên dan. Mînakek jê, Gordîos û lawê wî Mîdas e, hikumdarên efsanewî yê Frîgyayê. Asûrî û Ûrartûyî, Mîdas weke Mîtayê Mûşkî bi nav dikin, ji bo Frîgya jî welatê Mûşkî dibêjin. Mîdas, di navbera salên 738 û 696an yê B. Z. de jiyaye, yanî di dema ku Med bi hêz dibin. Payîtexta wan Gordîon e, ev nav ji bo herêmê derdorê jî tê bikaranîn. Gordîon yek ji navê welatê Kurdan yê demê berê ye, carna li gora zimanê ku hatîye nivîsandin çend herf têne guhertin, weke Corduene, Gordyene. Ev nav li du cihan tê xuyakirin, yek jê herêma Mêrdîn, Botan û derdorê ye, ya din ev cihê Frîgîyan e ya li dora Enqereyê ye. Navê Medan jî carna weke Mîdî tê bikaranîn, xuyaye Gordîon û Mîdas (Mîdaî) bi Medan ve eleqedar in. Herodotos dibêje ku Frîgî xelkê Traqî ne, li wir bi navê Brîgî dihatin nasîn; dibe ku beşek ji xelkê Traqî jî hatibin wir, lê piraya çanda Frîgîyan ya xelkê weke Lûvîyan, Hîtîtîyan, Ûrartûyîyan û Medan e, yanî çanda Anatolyayê ye; Prof. Fahrî Işik

vê mijarê tîne ziman, bi bermayîyên ji kolanên arkeolojîk hatine peydekirin rewşê zelal dike. Gelek nivîsên wan bi dest ketine û hatîye fêmkirin ku Frîgî zimanekî xwecîhî ye û ne Yûnanî ye.

Li Manîsayê jî navçeyek heye, navê wê di Grekî de Kurdes derbas dibe, Tirkîye navê wê kiriye Gordes. Nîkomedîa, Îzmîta li qiraxa behra ku li Tirkîyê jê re Behra Marmara tê gotin, di dawîya sedsala heyştan ya B. Z. hatîye avakirin, ev jî tê dewra avakirina dewleta Medan; lê xuyaye di navberê de hatîye xerakirin û di serê sedsala 3yemîn de dîsa hatîye avakirin, damezrînerê wê jî weke Nîkomedes tê gotin. Wek ku li jor me behs kir, ji Medan re Medes jî tê gotin. Îca ev pirs di serê mirov de çêdibe, gelo girêdana van bi Medan re çawa ye?

Jixwe demeke dirêj li Kurdistan gelek bajarên antîk, bermayîyên kevin yê ku didîtin, dikirin malê Asûrîyan; heta bi ew heykelên bêhempa yê li serê Çiyayê Nemrûdê (Çiyayê Bêlî) ku wek yek ji heft nuwazeyên dinyayê hatîye qebûlkirin, dabûn diyarkirin ku Asûrîyan çêkirine; piştî xebatên dûdirêj hat zelalkirin ku wir mîrekîya Komagene ye, yê ku beşek ji bapîrên Kurda ne. Ji bo hin bermayîyên Ûrartûyîyan jî heman rewş hebû. Kolanên arkeolojîk yên li Kurdistan û dorûberê wê yên demê dawî, kirîye ku herkes bêje gerek dîrok ji nû ve bê nivîsandin. Di van kolandinan de bermayîyên bêmînak derdikevin, lê ji ber ku dewleta Kurdan tune nikarin xwedî li wan derkevin, geh têne windakirin, geh têne veşartin û hwd. Ji alîyê din ve hîn jî serdest piraya materyalên ku derdikevin bi armanca polîtîkaya xwe bi kar tînin, hîn jî dîrokê li gora berjewendîyên xwe li hev tînin. Gerek Kurd di derbarê dîrok, çand û welatê xwe de gelekî hişyar bin, li berhemên ku ji kolanên arkeolojîk derdikevin xwedî derkevin û helbet xwe bigihînin asta zanistîyekê ku karibin rastîyê îfade bikin.

Gelek berhem û çîrok hene ku kodên dîrokê di wan de hene, ya muhîm ku mirov bi meraq bi dû wan de here, bipirse, lê bikole. Tenê di vê pirtûkê de gelek şax û per hene ku bi serê xwe hewce ye li ser xebat bêne kirin. Herodotos şeqsek bû û bi îmkanên pir qels yê dema xwe evqas agahî ji me re hişt; herî zêde gerek em wê meraqa wî û hewldana wî ji xwe re bikin mînak û ji bo fêrbûna gelek mijaran bêsekin bixebitin.

Gerînendeya Weşanxaneya Azad
Eslîxan YILDIRIM

PIRTÛKA YEKEM

KLIO

Ev, lêkolîna Herodotosê Halîkarnassosî ye ya ku pêşkêşî raya giştî kirîye. Armanca wî ya sereke ew e ku, insanan çi kirine, bi demê re neyên jibîrkirin û ew çalakî û bûyerên mezin û hêja hem ên Yûnanîyan[1] û hem jî yê barbaran[2] raxistine meydanê, bênav nemînin; armanca din jî, ji bo bê zanîn ka wan ji bo çi bihevre şer dikirin, bela kes di meraqan de nemîne.

[1] Vebêjin Aryayî dibêjin ku, Fenîkeyîyan şer derxistin, ew ji deryayeke jê re Erythreîya (Behra Sor) tê gotin, derketin û hatin qiraxên deryaya me/Deryaya Spî[3], îro jî li ser wê axa rûdinin bi cih bûn û bêsekin vebûn deryayan û dest bi rêwîtîyên dirêj kirin; ji Misrê û Asûryayê mal berhev kirin, ew birin hemû herêman, herî zêde jî birin welatê Argosê (îro di welatê Yûnanîstan de ye). Tê behskirin ku, bi wî awayî Fenîkeyîyên hatin Argosê, malên xwe raxistin ber çavan. Roja pêncan yan şeşan piraya malên xwe ji destê xwe derxistibûn ku, komek jin derketine qiraxê deryayê, keça hikumdar jî di nav wan de bûye. Navê wê, wekî Yûnanî (Yewnanî) jî dibêjin Îo bû û keça Înakhos bû. Ew jin pir nêzikî keştîyê sekinîne û dest bi kirîna tiştên ku diecibandin kirine, di vê navê re Fenîkî hemû bi hev re êrîşî wan kirine, piranîya wan baz dane rizgar bûne, lê Îo di nav yên hatine girtin de bûye. Piştre li keştîyên xwe siwar bûne û ji ber çavan wenda bûne û berê xwe dane Misrê.

[2] Îca li gor Persîyan û bi eksê gotinên Yûnanîyan, Îo bi vî awayî hatîye Misrê û rêzedijberî û pevçûnan bi vî awayî dest pê kirîye; ji ber ku nikare bê gotin

1 Di dîrokê de Yûnanî bi navê Grekî derbas dibin, lê îro em ji wan re Yûnanî/Yewnanî dibêjin. (Heta navê ku em dibêjin Dewleta Yûnanistan di fermîyetê de Cûmhûrîyeta Helen e.) Di gel ku wateya Yûnanî û Grekî ne yek e, di wergera Îngîlîzî de cihê ku weke Greece/Greek derbas dibe me weke Yûnanistan/Yûnanî bikar anîn. Ji bo agahîyên berfirehtir li pêşgotinê binêrin.

2 Di piraya vegotinan de wê bê dîtin ku Herodotos alîgiriya Yûnaniyan dike û xelkên Anatolyayê, Med û Persan wek barbaran bi nav dike.

3 Deryaya Erythreîayê ne tenê Deryaya Sor e, Kendava Persê û Okyanusa Hindê jî dide nîşan. Cihê ku vebêjerê Aryen gotîye "Deryaya Me" behsa Deryaya Spî dike.

illeh Yûnanî ne, li gor min belkî jî Girîtî bûn, piştre xwe nêzîkî Tyraya(Sur, Şur, Sour/ku îro dikeve başûrê Lubnanê) bajarê li Fenîkeyê kirine û keça hikumdar, Eûropeyê revandine. Bi wî awayî herdu teref bûne wek hev; lê êrîşa duyem a piştre, yên me dibêjin pêwist e li Yûnanîyan bê barkirin. Ew li keştîyeke dirêj ya şer siwar bûne û çûne bajarê Aîayê yê li Kolkhîsê[4] û xwe gihandine heta bi Phasîsê; piştî xwestekên ku ew anîbûn wir hemû bi dest xistin, di vegerê de keça hikumdar, Medeîa[5] jî revandine. Hikumdarê Kolkhîsê mirov kirine pey wan, li pey mafê xwe geryaye, gotîye ku keça min paşve bidin, lê wan jî di bersivê de gotine ku "We jî Îoya Argosî revand û di miqabilî wê de ji bo razîbûnekê jî we tiştek nedabû, em ê jî ji wê zêdetir nedin we."

[3] Di ser van bûyeran re du nifş derbas bûye, cardin li gor Persan, Alexandrosê kurê Prîamos ku van mesela dizanîbû, xwestîye ji Yûnanîstanê (Greece) jinekê birevîne; jê pişrast bûye ku, çawa yên cara ewil ji revandinê ceza nexwarine, dê ew jî di vî warî de cezayekê nexwe û Heleneyê revandîye. Yûnanî pêşî mirov şandine, Heleneyê paşde xwestine, gotine lêborîna xwe bixwazin. Di miqabilî vê de revandina Medeîayê nîşan dane û gotine: "Yên niha hûn ji me dixwazin, wî wextî jî me xwestibû û we nedabû."

[4] Yên heta wî wextî qewimîn, tenê ji dualî revandina keçan pêk dihatin. Lê vê carê Yûnanî, li gor Persîyan, bi awakî zelal tawanbar bûn, ji ber ku ew seferên wan li hemberî Asyayê vekirin, berîya seferên Persîyan bû yê li hemberî Ewrûpayê. Hem Persî jî jinrevandinê baş nabînin, lê meşandina wergirtina toleya ji bo tiştên wiha, li gor wan ne karê aqila bû û kesên hişê wan li serê wan lazim e guhê xwe nedin tiştên wiha. Ji ber ku tiştekî vekirîye, heke

4 Welatekî başûrêrojhilatê Behra Reş e.

5 Li gor çavkanîyan Medeîa yek ji dîya Medan yê heyamên ewil e. Ji bo mirov heyama wê fêm bike, em karin li vegotinên di berhemên ku wan deman vedibêjin binerin. Li gor Herodot dibêje, li hember revandina Medeîa, neslek dûra, Parîsê Troyayî jî Helen revandîye û dûra şerê navdar yê Troya derdikeve. Tê qebûlkirin ku ev şer Berî Zayînê (B. Z.) di sedsala 11an yan jî 12an de çêbûye. Yanî neslek berî şerê Troyayê Med û navê wan hene. Ev jî diçe heya sedsala 12emîn. Bi vegotina Herodotos şerê Troya ji bo heyfa jineke Medî hatîye hilanîn derketîye. Lê vegotinên cuda jî hene. Di derbarê Medeîa de gelek nivîs hene û di gelek berheman de behsa wê tê kirin û fîlm jî hatine kişandin. Helbet yê ku jê aciz in, xwestine wê nebaş nîşan bidin. Lêkolînerên Kurd karibin di vî warî de xebata bikin, bêguman wê nerînek cuda derkeve holê.

ev jinên han bi xwe jî razî nebûna nedikarîn bi zorê bên revandin. Ew, Asyayî, zêde guhê xwe nedane revandina jinên ji wan, lê Yûnanîyan ji bo jineke Spartayî fîloyeke deryayî ya mezin berhev kirine, meşîyane bi ser Asyayê ve, welatê Prîamosê[6] ser û binî hev kirine; ji wî wextî şûn ve êdî Yûnanî ji bo wan dijmin in. -Em dizanin ku Persî, Asyayê û ew barbarên li wir rûdinin, yên xwe hesêb dikin. Ewrûpa, bi taybetî cîhana Yûnanê, ji bo wan biyanî ye.[7]

[5] Persî, bi vî awayî behsa bûyeran dikin û hêrsa wan li hemberî Yûnanîyan bi ketina Îlyonê dest pê dike. Di warê Îoyê de gotinên Persîyan û Fenîkîyan hevdû nagrin, Fenîkeyî dibêjin ku, Îo ne bi zorê birine Misrê. Li Argosê bi xwedîyê keştîyê re peywendîyên wê çêbûne, wextê fêm kirîye bi heml e nikarîbû derkeve rûyê dê û bavê xwe, ji bo qisûra xwe nede xuyakirin, bi daxwaza xwe li pey Fenîkeyîyan çûye. Gotinên Persî û Fenîkeyîyan bi vî awayî ye. Heke hûn ji min bipirsin, ez nikarim bêjim wiha yan bi awayekî din qewimîye, lê piştî nîşandana ew neheqîya pêşîn ya li hemberî Yûnanîyan kirin ev e. Niha ez ê çîroka xwe bidomînim û ez ê gelek zêde behsa bajarên biçûk û yên mezin jî bikim. Ji ber ku ew bajarên wî wextî mezin bûn, niha hema bêje hemû biçûk bûne û yên min mezin dîtin wî wextî biçûk bûn. Bi vî awayî ez ê li ber çav bigrim ku mirovahî di hêla mal û milkê de di eynî sevîyê de namîne û ez ê behsa herdu alîyan wekî hev bikim.

LÎDYA - KROÎSOS

[6] Kroîsos ji çêbûna xwe Lîdyayî[8] bû, kurê Alyattes, hikumranê neteweyên li rojavayê Rûbarê Hallysê bû. Ev rûbar ya ku Sûrîyê û Paphlagoniayê ji hev

6 Mîrê bajarê Troya ye.

7 Dema ku Herodotos behsa lejandên Îoyê, Eûropeyê, Medîayê û Heleneyê dike, wan ji taybetmendîyên wan ên sersiruştîyê paqij dike. Dema ku behsa Îoya keça Înakhos ya îlaha rûbarê dike, behs nake ku ji ber hesûdîya Here dibe çêlekeke ciwan û ji ber mêşeke hêrsbûyî çaralîyê dinyê digere. Eûropeyê, ne Zeûsê dikeve şiklê gayekî, deryavanên Girîtî direvînin. Navê Medeîayê girêdayî çîroka deryavanên Argoyê ye, lê Herodotos behsa vê jî nake. Li ser Helene û şerê Troyayê jî ji alîyê milê mîtolojîk ve tiştekî nabêje.

8 Lîdya weke Lydîa jî tê nivîsandin. Dewleta Lîdya Berî Zayînê (B.Z.) di navbera sedsala 13emîn heya 6emîn li ser axa rojavayê Anatolîayê cih girtiye. Xelkê wê Arî û zimanê wan ji malbata HindûEwrûpî ye.

vediqetand ji başûr ber bi bakur diherike û li herêma bayê Boreas derbasî Deryaya Reş dibe. Tiştê em zanin, yekemîn barbarê ku hinek Yûnanî bi xeracê girê dabû û bi hinekan re jî bûbû dost, ev Kroîsos e. Îonîyan, Aîolîyan[9] û Dorîyên[10] Asyayê bi xeracê girê dabû û bi Lakedaîmonîyan re bûbû dost. Berîya hikumranîya Kroîsos temamê Yûnanîyan azad bûn, ji ber ku sefera Kîmmerîyan[11] dan destpêkirin, ya li ser Îonayê hê kevintir e, lê wan nikarîbûn bajaran bigrin bin desthilata xwe û ji êrîşa çîpilrûtan pê ve nebûye tiştek.

[7] Serwerîya Lîdya ya di destê Heraklîdesîyan de, bi demê re ketîye destê Mermnadaîyan ku Kroîsos jî ji wê malbatê ye; ev çawa çêbûye ez ê niha vebêjim: Hikumdarekî navê wî Kandaûles hebû ku Yûnanîyan jê re Myrsîlos[12] digotin. Ew hukumdarê Sardesê bû û ji dûnda Alkaîûsê[13] kurê Herkules bû; ji ber ku hukumdarê vir yê ewil Argon lawê Nînûs bû; Nînûs lawê Belûs bû, ew jî lawê Alkaîûs bû. Kandaûlesê kurê Myrsos jî dibû yê dawîyê. Yên li van deran berîya Argon hukum meşandine, ji nesla Lydosê kurê Atys zêde bûne yê navê xwe li xelkê Lîdyayê kirîye ku berê ji wan re digotin Maîonîayî.[14] Serdestîya neslê ji Herkules û koleya Jardanos[15] zêde bûne, heta Kandaûlesê kurê Myrsos, ji bav derbasî kur bûye û 22 nifşan û 505 salan dom kirîye.

[8] Belê, ev Kandaûles gelekî evîndarê jina xwe bû; ne tenê li ser aqil berdaye, jina xwe afirandîya herî sipehî ya cîhanê hesêb kirîye. Ev fikar encamên ecêb derxistine holê. Di nav rawêjkarên wî de yek bi navê Gîgesê[16] kurê

9 Navê antîk yê beşa bakur yê rojavayê Anatolyayê yê qiraxa behrê

10 Dorî jî Hînt Ewrûpî ne.

11 Welatê Kîmmerîyan rojhilatê Behra Reş yê Kafkasê ye û ew jî qewmekî HindûEwrûpî ne, dûra ber bi rojhilatê Anatoliyê ve çûne.

12 Myrsîlos/Mîrsîlos

13 Alkaîûs, di wergera Ingilîzî de Alcaeus û di ya Tirkî de Alkaîos derbas dibe. "u" di Ingilîzî de carna wek "yû" tê xwendin... Loma dibe ku hin herf ne bersiva navên orjînal bin. Jixwe dema nivîskar bixwe nivîsîye jî li gor ziman û tîpên bikar aniye dibe ku hin guhertin di navên orjînal de çêbûbin. Gerek mirov di hemû vegotinan de van tevda li ber çav bigire.

14 Di wergera Ingilîzî de Meonîans hatiye nivîsandin. Maîonîayî di Kurdî de dikare wek Mayonayî jî bê xwendin.

15 "Jardanos" di wergera Tirkî de "Îardanos" derbas dibe.

16 Gîges/Gyges: Sayce, Archîbald-Henry (1846-1933), ji bo derketina Gîges ser textê Lîdyayê sala 687 nivîsandîye. Ew Gîgesê ku felsefeyê ew kirîye mijara lêkolîna exlaqî, ev Gîges e. Hingulîskeke wî hebû, dema morîka wê ber bi nava destê

Daskylos hebû, gelek jê hez dikir. Bawerîya Kandaûles gelek bi Gîges hebûye û karûbarên xwe yên girîng dispart wî; her wesfê jina xwe jî jê re dida. Demek kurt şûn de, Kandaûles xwestîye rawêjkarê wî sipehîtîya jina wî bibîne. Kandaûles -ji ber ku li ser enîya wî hatibû nivîsandin ku wê beleyek bê serê wî- rojekê ji Gîges re got: "Gîges! Dema ku ez ji te re dibêjim jina min sipehîyeke bêemsal e, ez hîs dikim ku tu bawerî bi gotinên min nakî, lê zilam ji bihîstinê zêdetir bi dîtinê bawer dikin, naxwe jina min tazî bibîne, ka tu çi dibêjî." Gîges ecêbmayî dimîne û bersiva Kandaûles dide, dibêje: "Mezinê min! Ev çi xwestekek ne di cîh de tu ji min dixwaze. Ez ê çawa jina mezinê xwe tazî bibînim. Dema ku jin kincên xwe ji xwe dike, heya wê jî diçe. Zanayên qedîm ji kevin ve qanûnên kirdar û reftaran destnîşan kirine û dibêjin; gerek tenê tu li yê ku yê te ne binêre. Pêwist e em exlaqên baş ji wan hîn bibin. Bawerîya min bi gotinên te heye û ez dizanim jina te ji hemû jinên dinyayê sipehîtir e, ji ber vê ez ji te lava dikim min tevlî karê nemaqûl neke, ji min nexwaze ku ez tawaneke evqas giran bikim."

[9] Dixwest bi van gotinan xwe ji vê meseleyê xelas bike, ji ber ku ditirsîya piştre tiştek bê serî. Lê Kandaûles bi vî awayî bersiv dayê: "Netirse Gîges, min ev gotin ne ji bo ku ez te biceribînim, yan jî ji bo xerabîya jina min bigihe te got; em ê wisan bikin, dê ew pê nehese ku te ew dîtîye. Ez ê te li pişt derîyê odeya em radikevin veşêrim, piştî min ew jî ji bo raketinê tê. Li pişt derî palkursîyek heye, ew çekên li ser xwe yek bi yek derdixe û datîne ser wê, tê bi rehetî wê bibînî. Dema ku ew ji wê palkursîyê ber bi nivînê ve tê, dê pişta wê bikeve te, ji wir şûn ve dimîne li ser te. Lê miqate be, wextê tu ji derî derdikevî bila te nebîne."

[10] Wî lê nerî ku xelasî tune. Got: "Baş e." Dema ku wextê xewê hat, Kandaûles rawêjkarê xwe li pişt derîyê odeya raketinê danî. Vêca Keybanû hat û çû odeyê. Keybanû kincên xwe yek bi yek ji xwe kirin û danî ser palkursîyê. Gîges heyran heyran lê dinêrî. Dema ku pişta xwe dayê û ket nav nivînan, ew ji cihê xwe yê veşartî derket û bi hêdîka derket jiderve. Lê dema ku derket jinikê ew dît. Ji ber ku tê derxist ev kar ji bin serê mêrê wê derketîye qet

---

wî ve dizivirî, Gîges dibû têşkê pisîkê û hikumdarê Lîdyayê jî wiha kuştîye. Felsefe bûyerê bi vî hawî neqil dike(Platon, Dewlet 359-62).

dengê xwe nekir, ji şerman haya ew birîna lê vebû nebû, lê xist serê xwe ku dê hesabê vê ji Kandaûles bipirse. Ji ber ku li ba Lîdyayîyan, wekî li ba temamê barbaran heye, eybek e mezin e mirov tazî bê dîtin, heta ji bo mêran jî eynî tişt heye.

[11] Tiştek kifş nekir û dengê xwe dernexist. Lê dema ku bû sibe, mirovên xwe yên herî zêde bawerî bi wan dikir veqetand, wezîfe da wan û yek şand bangî Gîges kir. Wî jî qet hesêb nekir ku Keybanû bi tiştekî dizane, emir qebûl kir û çû. Ev ne cara yekem bû, Keybanû her wext ew bangî ba xwe dikir. Dema ku derket pêşberê wê, şahjinê ev yek jê re got: "Gîges, ji bo te du rê hene, tu dikarî yekê jê hilbijêrî, tu kîjanê dixwazî wê bike. Yan Kandalûes bikuje, min jî hikumdarîya Lîdyayê jî bistîne, yan jî ji bo tu ji Kandaûles re xweşmerdîyê bikî û careke din çavê te li tiştê ne pêwist e tu bibînî nekeve, a niha ji mirinê re hazir be. Belê, dê yek ji we herduyan bişeqite; yan yê te mecbûrê vî karî kirîye, yan jî tu yê ez tazî dîtime û derketîye derveyî edebê." Gîges ma şaş, pêşî ji tiştê guhdar dikir bawer nekir, piştre ji bo wî mecbûrî bijartineke wiha neke dest bi hêvî û lavayan kir. Lê nekarî wê razî bike; lê nêrî ku rewş xerab e, ya wê efendîyê xwe bikuje yan jî wê ew bi destê kesên din bimre; xelaskirina canê xwe baştir dît. Wî wextî wiha got: "Madem bêyî ez bixwazim tu min mecbûrê kuştina efendîyê min dikî, bila wisan be. Lê destûrê bide ka ez ê vî karî çawa bikim, wê jî hîn bibim." Keybanûyê bersiv da û got: "Tê li wî cihê ku te ez tazî dîtim êrîş bikî, wê xew wî di bin dest te de rabigire."

[12] Biryar hat dayîn û dema ku şev bi ser de hat (Gîges bernedabû, tu çareya xwevedizînê tunebû, yan dê ew ji canê xwe bûbûya yan jî Kandaûles), heta odeya wê ket pey jinikê. Jinikê xencerek kir destan, wî jî xwe li pişt eynî derîyî veşart û dema ku Kandaûles raket, bê deng xencer derxist, nêzîk bû û lê xist. Jin û hikumdarî ji Gîges re man. Arkhilokhosê Parosî yê ku kêm-zêde wî wextî jiyaye, navê wî di sêbendîyeke xwe de nivîsandîye.

[13] Hikumdarî derbasê destê Gîges bû û kahînê[17] mabeda Delphoîyê jî ev pesend kir. Di nav Lîdyayîyan de kesin hebûne ku kuştina Kandaûles hovîtî

17 Gotina kahîn, di Latînî de wek "ûracûlûm" derbas dibe, di wergera Tirkî de orakli daye, di wergera Ingilîzî de oracle derbas dibe; gotina oracle hem bi manaya cihê kehanet tê dayîn, hem kahîn û hem jî kehaneta ku kahîn dide. Me li gora maneya di hevokê de wergerandiye.

hesêb kirine, wan dest avêtin çekan, di dawîyê de bi yên Gîges diparêzin re peymanek çêkirin. Li gor wê heke kahîn hikumdarîya Lîdyayê bide wî, dê ew bibe hikumdar, lê heke nede, hikumdarîyê dê paşve bidana kurên Herkules. Kahîn hikumdarî da wî û bi vî awayî Gîges derket ser text. Di eslê xwe de bersiva Pythîa wiha bû, wê kurên Herkules heyfa xwe hilînin û wê nevîyê Gîges yê ji nifşê pêncan bikujin. Lîdyayî jî û hikumdarê wan jî, heta roja pêk nehat, guhê xwe nedan vê pêşbînîyê.

[14] Dewlet, bi vî awayî ji destê kurên Herkules derketîye, derbasî Mermnadîyan bûye. Dema ku Gîges derket ser text, gelek pêşkêşî û diyarî ji kahînê Delphoîyê re şandin: Ji bilî zîvên Delphoîyê, zêrên bêhesab, micewher û di vê navê re hêjaye navê wê bê bibîranîn, şeş heb dist (krateros)ên zêrînî yên duqulpî hebûn ku ew danîbûn hundirê perestgehê. Niha ew di nav xezîneya Korînthosê (Korîntîyanê) de tên dîtin û giranîya wan 30 talent[18] in. Ez dibêjim xezîneya Korînthos, lê di eslê xwe de ev xezîne ne malê dewletê ye, ya Kîpselosê[19] kurê Eetîon e. Piştî Mîdasê[20] kurê Gordîasê hikumdarê Frîgyayê[21], ya em dizanin, yekem barbar ê pêşkêş şandine Delphoîyê, ev Gîges e. Mîdas jî, textê xwe yê hikumdarîyê ya li ser rûdinişt û hişkere edalet belav dikir, ku tiştekî hêjayî dîtine ye, wekî pêşkêşî dabû, ew jî tam li cem kraterosên Gîges e. Pêşkêşîyên Gîges ev perçeyên zîv û zêr hemû yên ku li Delphoîyê ne, li gor binavkirina kesê ew pêşkêş kirine, jê re "Gîgesî" tê gotin. Piştî Gîges derket ser text, artêşek şand ser Mîletos û Smyrnayê, heta bajarê Kolophonê jî sitend. Lê di midetê 38 sal desthilatdarîya wî de, tiştek din ku di bîra mirov de bimîne çênebû û em ê jî dev ji wî berdin û bên ser yê ku bi dû de hat.

---

18 Talent pîvanek giraniyê bû, li gor dem û welatan ev pîvan tê guhertin, di navbera 20 û 60 kîloyan e.

19 Kîpselos/ Kypselos

20 Mîdas, di navbera salên B. Z. 738-696an de mîrê welatê Frîgyayê bû ku li erdnîgariya rojavayê Enqereya payîtexta Tirkîyê ya niha dikeve. Navê bavê wî Gordîos, ji herêmê re û ji payîtexta wan re jî Gordîon(Gordyene/ Corduenî) tê gotin. Bi vî navî du welatê nifşek pêşîyên Kurdan hene, yek ev û ya din li alîyê herêma Botan û Hekkarî ye. Navê Mîdas li ser abîdeyek Frîgîyan yê berê weke 'Mîdaî' yanî 'ji Medya' derbas dibe, jixwe di çavkanîyên Asûrîyan de navê wî weke Mîtayê Mûşkî derbas dibe, ji bo Frîgya jî welatê Mûşkî dibêjin.

21 Frîgya/Phrygîa

[15] Ez ê yek tiştî ji bo Ardysê kurê Gîges yê li cihê Gîges rûnişt bibêjim. Prîeneyê[22] girt û esker şand ser Mîletosê.[23] Wextê ku Kîmmerên ji alîyê koçerên Îskîtîyan[24] ve ji welatê xwe hatin raqewirandin, hatin Asyayê û ji derveyî Akropolê bajarê Sardesê girtin, hikumdarîya wir di destê wî de bû.

[16] Ardys 49 sal li ser text ma, kurê wî Sadyattes ku li cihê wî rûnişt, 12 sal li ser text ma û piştî wî jî Alyattes hat. Wî, li hemberî Keyxusrewê[25] ji nesla Dîyako[26] yê Medî şer îlan kir. Kîmmerî ji Asyayê raqewirand; Symîrnayê(Sîmîrna/Îzmîr) ku, Kolophon kolonîyek şandibû wir, zevt kir. Leşker şand ser Klazomenaîyan.[27] Lê rastî têkçûneke giran hat û ji wan bîranîneke nexweş jê re ma. Dîsa jî, di dewra serdestîya wî de, kirinên din yê hêjane em balê bikşînin ser wan hene, ez ê niha behsa wan bikim.

[17] Şerê li hemberî Mîletosîyan hat îlankirin, ev ji bavê wî jê re mîrate mabû. Ji ber vê derdiket seferê û ji bo bajar dorpêç bike wiha kir: Dema ku çandinî gihişt û kemilî, derket rê. Artêşa xwe bi dengê lûle(syrinx) û çeng û bilûrên nêr û mê ve birin Mîletosê. Dema ku gihiştin erdê wan yên mêrg û zevîyan, destlêdan û şewitandina wan deynin milekî, destê xwe nedan derîyê wan jî, her tişt di cihê xwe de hiştin; tenê dar jê dikirin, zad didan hev û paşde vedigerîyan. Mîletosî hakimê deryayan bûn, dorpêçkirina bajêr nedihat melhezekirin, lê Lîdyayî avahî û çiftlikên wan jî xera nedikirin; ew jî ji bo vê yekê bû ku, bila careke din Mîletosî bixebitin, erda biçînin û baş biwestin, ji bo di êrîşa bê de tiştekî bikaribe talan bikin çêbibe.

[18] Vî şerî bi vî awayî yanzdeh salan dom kir, Mîletosî dûçarê du mexlûbîyetên giran bûn; yek jê li Limeneionê, wextê li ser erdê xwe şer dikirin, ya din

22 Prîene, bajarekî dîrokî ye ku niha dikeve rojavayê Tirkiyê, nav sînorê bajarê Aydin-Soke

23 Mîletos, bajarekî dîrokî ye ku niha dikeve rojavayê Tirkiyê, li nêzîkî devê çemê Menderes(Maiandros) li ber qiraxa behrê bû. Bi Latînî jê re Mîletûs, bi Hîtîtî jî Mîllawanda dihat gotin.

24 Îskîtî/Skythî/Sakayî

25 Keyxusrew lawê Ferhat/Phraortes û torinê Dîyako ye, di salên B.Z. 625-585'an de hikumdarê Dewleta Medan bû. Di hin çavkanîyan de weke Kyaxares yan jî Kiyaksar û navê bavê wî Ferhat jî weke Phraortes jî derbas dibin.

26 Dîyako/Deîokes/Dîyakî: Weke damezrînerê Dewleta Medan tê zanîn.

27 Klazomenaî, li rojavayê Îzmîrê dikeve, yek ji 12 bajarên Îyonîyan e.

li Deşta Maîandrosê. Di destpêka şeş mehên ewil yê van 11 salan de, cardin Sadyattesê kurê Ardys li ser Lîdyayê hikum dimeşand, jixwe yê esker ajotibû ser erdê Mîletosê jî ew bû, yê şer derxist jî ew bû, di pênc salên piştî wê de, yê hereketê eskerî dimeşand Alyattesê kurê Sadyattes bû. Ev kar ji bavê wî jê re mabû, min li jorê jî dabû xuyakirin, wî jî duvê wê bernedabû. Mîletosî di midetê van şeran de, ji Îoniayan ji bilî Khîosê alîkerîyek nedîtibûn. Khîos, bi piştgirîya Mîletosîyan berdêla xizmeteke wekî wê didan. Ji ber ku dema ew bi Erythraîyan re şer kiribûn Mîletosî jî piştgirîya wan kiribûn.

[19] Sala 12an, dema ku artêş agir berda çandinîyê, tiştek bû: Piştî agir bi çandinîyê ket, pêta li ber bayekî gurr ket, heta perestgeha Atheneyê ya jê re Assesia Athene tê gotin dirêj bû, perestgeh li ber pêtê ket û şewitî. Wî wextî kesekî guhê xwe neda vê, lê piştî artêş vegerîya Sardesê, Alyattes nexweş ket. Bi tu awayî jî rehet nedibû; belkî guhê xwe da kesekî nêzîkî xwe û belkî jî ji ber xwe ve, qasid şand Delphoîyê, ji bo nexweşîya xwe bişêwirîya li ba kahînên îlahî, li hêvîya xêbereke xêrê bû. Dema ku qasid gihiştin ba Pythîa, wê ji wan re got ku, pêşî perestgeha Atheneyê ya li bajarê Assesiayê ya li ser erdê Mîletosê ji nû ve ava bikin, berîya wê ez tiştekî nabêjim.

[20] Delphoîyan ev bi vî awayî ji min re gotin. Lê Mîletosîyan çend hûrgilî danîn ser: Periandrosê kurê Kîpselos û dostê Thrasybulosê hikumdarê zorker yê wî wextî yê Mîletoseyê mêvanê wî bûye. Dema ku serîlêdana Alyattes li kahînan li ber guhê wî ketîye, bi lez Tharasbulos jê agahdar kirîye û jê xwestîye ku ji vê rewşê sûd werbigire.

[21] Dema ku Alyattes ji rewşê agahdar bûye, di cih de qasidek şandîye Mîletosê û pêşnîyaza agirbestê li Thrasybulosê kir, ku heta dema mabeda Atheneyê ava bike, şer bisekine. Thrasybulos xeber gihiştê ku nûnerê Alyattes ber bi bajarê Mîletosê di rê de ye. Her wiha wî mebesta Alyattesê fêhm kiribû, ji ber wê bi lez dest hilda. Her çi xwarin û zexîreyên wî û yên rûnîştîyên navçeyê hebûn, berhev kirin û anî navenda bajarê Mîletosê û piştre ji xelkê re got ku, dema wî ferman da, hemî bi hev re şahîyê bikin.

[22] Thrasbulos ev kar ji ber wê kir ku dixwest bi wî qasidê Alyattesê bide zanîn ku qiyaseke gelek zêde xwarin li bajarê Mîletosê heye û ji ber wê rûnîştîyên wê cejnê dikin û piştre ew bi xwe behsa wê ji Alyettes re bike. Ev

eynî wiha jî çêbû. Qasid şahî dît û dema ku gotinên Lîdyayan ji Thrasybulos re gotin, vegerîya Sardesê. Ya ji min re hat gotin, sebebê yekem yê aşitî pêk anîye ev bûye. Alyattes, li hêvîya xebera ku 'li Mîletosê xelake giran heye û halê berxwedana xelkê nemaye' bû. Qasid, di vegera xwe ya Mîletosê de, tam eksê vê xeber anî. Ev, peymaneke ku du dijminan bîne ba hev bi dû xwe de anî. Ji bilî vê Alyattes, di cihê Assesîa Atheneyê de du perestgehên din ava kirin û tendurustîya wî jî baş bû. Belê dawîya şerê Alyattes yê li hemberî Mîletosê û Thrasybûlosê vekiribû bi vî awayî çêbû.

[23] Periandros, kurê Kîpselos bû (cardin têm ser vî Periandrosî, yê ji Thrasybulosê re kahîn pêşnîyaz kirîye). Ew hikumranê Korînthosê bû. Li Korînthosê -Wekî Lesbosîyan jî teyîd kirin- tê gotin ku, jiyana wî tevlî mucîzeke nedîtî bûye, Arîonê Methymnayî, wextekî li ser pişta masîyê yunisê hatîye Taînaronê. Arîon li kîtarayê dixist û nedixwest kesek gavekê bikeve pêşîya wî[28] û hewayê ayînî yê dithyrambosê, ya em dizanin, cara pêşî yê rêkxistîye û li Korînthos daye lêxistin ew e, ev nav jî wî bi xwe li kirîye.

[24] Yên me dibêjin ku ev Arîon, piştî temenê xwe yê herî zêde li ba Perianrnos derbas kirîye, rojekê ketîye serî, ber bi Italya û Sicilyayê ve vebûye deryayê, bi saya pîşeya xwe li wan deran dewlemend dibe û xwestîye êdî vegere Korînthosê. Li Tarantonê li keştîyê siwar bû û keştîvanên Korînthosê girtin ba xwe. Ji ber ku ji kesekî bi qasî Korînthosîyan bawerî nedikir, lê çi heye wan plan kiribûn di deryaya vekirî de Arîon bavêjin deryayê û dest deynin ser hemî hebûnên wî. Dema ku ew bi niyeta wan hesîya, hêvî û lava kir, xwest ku her tiştên xwe bide wan û xwe rizgar bike. Keştîvanan guh nedan hêvî û lavayên wî, jê re gotin; heke tu dixwaze di axê de bê veşartin vaye mirin, yan jî bi rêya kurt xwe bavêje deryayê, ji van herduyan yekê hilbijêre. Madem biryara wan wiha ye, Arîon gotineke bêje nedît, li ber wan gerîya ku izna wî bidin, kincên xwe yên herî sipehî li xwe bike û di pişta keştîyê de kilaman bêje, dê piştî wê xwe bikuje. Ew stranbêjekî herî baş yê sedsalê bû, wan xwestin tahma zewqa guhdarîkirina wî bikin. Pişta keştîye jê re hiştin û

28 "Arîon kîtara lê dixist." Arîon kesekî nîv çîrokî ye. Ya Herodotos jê re dithyrambosa gotîye ya wî ye, hewayeke ayînî ye ku ji alîyê koroyê ve hatîye xwendin. Di eslê xwe de çavkanîya wan xelk e. Belkî jî Arîon ew bi rêkûpêk kirîye. Tê zanîn ku trajedî jî piştre ji vê derketîye.

ew li navenda keştîyê berhev bûn. Wî kincên xwe yên herî dilkêş/şeng li xwe kir, kîtaraya xwe girt û li ser pêyan, temamê Orthîosê got[29], dema ku temam kir, bi wî awayî bi wan kircên xwe yên dilkêş ve xwe avêt deryayê. Keştîyê ber bi Korînthosê ve rêya xwe dewam kir û ew Masîyê Yunis yê min behs kir, tê gotin Arîon girt ser pişta xwe û heta Taînaronê bir. Dema derket qiraxan, bi wan kincan ve rast çû Korînthosê û çi qewimîbû gotin. Perîandros zêde bawer nekir, ew qenc girt bin çavan û ma li hêvîya keştîvanan. Nuh keştîvan hatin benderê tevde da anîn û bi Arîon re rûbirû kirin. Tam digotin "me ew li Îtalyayê, ya hê rast li Tarantonê sipî saxlem li ser karê wî hişt", Arîon bi kincên ku xwe avêtibû nav pêlan derket ortê. Nema zanîbûn wê çi bikin, taqeta wan a înkarkirinê tunebû. Yên Korînthosî û Lesbosî dibêjin ev e, bi rastî li Taînaronê, nezirgeheke li ser navê Arîon ya ji bronzê û ne gelek mezin hatîye danîn heye, ew mirovekî li pişta masîyê yunisê siwar bûye teswîr dike.

[25] Alyatesê Lîdyayî, piştî gelek wext ku dawî bi şerê Mîletosê anî û 57 salan hikumdarî meşand, mir. Dema ku gihiştibû siheta xwe wî jî diyarî pêşkêşî mabedên Delphoîyê kiribûn. Wek di binemala wî de duyem kes e ku tê zanîn, ji Delphoîyê re krateroseke zîvî ya mezin û perçeyên wê yên bi hev ve lihîmkirî, ya ji destê Glaukosê Khîosî yê ku bi ser lihîmkirina hesin vebûye, tepsîyeke krateroseê hesînî ku di nav hemî pêşkêşên Delphoîyê de ya herî sipehîyê wan ev e, pêşkêş kirîye.

[26] Piştî Alyattes mir, hikumdarî ket destê kurê wî Kroîsos yê 35 salî. Bi serdegirtina Ephesosîyan êrîşkirinên ser Yûnanîyan dest pê kir. Ephesosîyên ku dora wan hat pêçan, benek heta perestgeha Artemisê dirêj kirin û perestgeh bi bedena kelehê ve girê dan, bi vî awayî bajarê wan ji perestgehê re hatîye nezirkirin û bûye perçek ji wê ji wî wextî ve. Bifikirin ku navbera bajarê kevin ku yê hatibû dorpêçkirin ew bû û perestgehê heft stadion[30] dikêşa. Belê, yê pêşîn Kroîsos êrîşê wan kir ev bûn, piştre dor hat xelkên Îonê û Aîolê, li her yek ji wan tawanek dihat barkirin; dema ku ya ciddî bidîta ciddî, ya ciddî nedîtiba bi mahneyên ne girîng êrîş dikir.

29 Orthîos, bi dengekî tîz û hewayeke ayînî ya bi lez tê gotin.

30 1 stadîon pîvanek bi qasî 180-200 metre nîşan dida.

[27] Piştî Yûnanîyên Asyayê bi xeracê girê da, niha jî ji bo li giravan bide, dest bi çavgerandina çareyên çêkirina keştîyan dikir. Her tişt ji bo vê armancê amade bû, dema ku Biasê Priêné (an, wekî ku hin dibêjin Pittacusê Mîtilî) kir ku ev tevger raweste. Kroîsos ji vî kesê ku nû hatibû Sardîsê pirsîbû, ka li Yûnanîstanê çi heye û çi tune, wî jî ev bersiv dayê: "Belê hikumdar, hemû giravî ji xwe re hespan tedarik dikin, kirine serê xwe ku bên li Sardesê bidin." û hesabê xweçekdarkirinê serûbinî kir. Ket serê Kroîsos ku ew gotin rast e û got, "Bi rastî min jî gelekî dixwest îlahan ev fikir têxista serê kesên li giravan rûdinin ku bi siwarî bên li zarokên Lîdyayîyan bidin." Yê din dest pê kir: "Hikumdar, ez wisan fêhim dikim ku, bi rastî hûn dixwazin giravî derkevin bejahîyê û hespan bajon, ji ber ku ev li hesabê te tê. Lê ger giravî, seh bikin tu li hemberî wan keştîyan çêdikî dê çi bêjin, dê nebêjin, xwezî Lîdyayî vebin deryayê û xwe bavêjin tehlîkeyê? Dê plana tolhildana Yûnanîyên bejahîyê, yên te ew kirine kole nekin?" Kêfa wî ji van gotinên rasterast re hat, bawerîya wî bi yê Yûnanî hat û gotinên wî şiyanê têgihiştinê dîtin; dest ji xweçekdarkirinê berda û bi Îoînayên li giravan rûdinên re peywendîyên baş pêk anîn.

[28] Bi demê re gelên nîştecihên vî milê Çemê Hallysê, ji bilî rûniştîyên Kilîkya û Lîkyayê, temamên wan serî tewandin û desthilata Kroîsos nas kirin. Ew xelk ji van pêk dihatin: Lîdyayî, Frîgyayî, Mysîayî, Marîandynî, Khalybî, Paflagonyayî, Thrakî, Thynî, Bîthynîayî, Karî, Îonî, Aîolîyî û Pamphylîayî bûn.

[29] Van miletan serî tewandibûn û ew daxilî Împaratorîya Lîdyayê ya Kroîsos bûbûn, wî wextî Sardes gihiştibû dewlemendîya xwe ya herî bilind û li Yûnanistanê çiqas kesên bi kêrî tiştekî dihatin yê şareza, baz didan wir, Solon jî di vê navê re di nav Athenîayên hatibûn Sardesê de bû. Athenîayan jê xwestibûn ku ji bo ev qanûnan çêke, wî jî van qanûnan weşandibû, piştre gotibû ku ez ê dinyê bibînim û ji bo seyaheteke deh salan vebûbû deryayê. Di eslê xwe de, ji bo zor nedin wî û yek ji wan qanûnên ku danîne raneke, çûbû. Ji ber ku xelkê Athenîayê nedikarî vê ji ber xwe ve çêke, ji bo deh salan qanûnên Solon tetbîq bikin, sondên mezin xwaribûn.

[30] Belê, daxwaza dîtinên cihên din jî ketibû ser vê sebebê mezin. Solon ji welatê xwe veqetîyabû, çûbû Misrê ba Amasîs û herî dawîyê hatîye Sardesê ba Kroîsos. Li wir di serayê de bû mêvanê hikumdar, roja sisiyan yan çaran, mirovên wî li ser emrê Kroîsos, Solon li xezîneyan gerandin. Kroîsos vê ji wî pirsî û got: "Athenîayî, mêvanê min, me jî gelek caran wekî fîlozofekî, ew tebîetê te ya mereqê ya te li ewqas welat gerandîye û navûdengîya zanetîya te seh kirîye; ji ber vê bi min re daxwaza vê pirsê ji te çêbû, gelo tu rastî kesekî hatîye ku di bextewarîyê de herkesî li paş xwe bihêle?" Bi vî awayî dipirsî, ji ber ku wî di nav hemî insanan de wekî ku kesekî wiha ye pesnê xwe dida. Lê Solon, qet neanî hişê xwe ku xwe pê şêrîn bike, tenê di rastîyê de fikirî û got "Min Tellosê Athenîayî dît." Kroîsosê bi vê bersivê ecêbmayî ma, pirseke din jê kir: "Tu ji bo çi Tellos evqas bextewer hesêb dikî?" Solon got "Tellos li welatekî dewlemend dijîya, zarokên wî yên sipehî û bi rûmet hebûn û di jiyana xwe de dît ku hinek zarokên wan jî hatin dinyê û tev jî jiyan; bi ser de li ba me yên ji bo bextewarîyê pêwist in, derfetên wî yên berfireh û dewlemendî jî hebûn, lê ya esil ev e ku, temenê wî bi taceke rûmetê temam bû. Di şerekî Athenaîyan li hemberî bajarekî cîran de, li Eleûsisê dema ku welatê xwe diparast û dijmin dabûn ber xwe radiqewirandin bi mêrxasî û bi rûmet mir; Athenaîyan, di cihê ku ketibû ji bo wî merasîmeke millî çêkirin, ew pîroz dîtin."

[31] Kroîsos, bi guhdarîkirina Solon ya li ser bextewarîya Tellos westîya,[31] jê pirsî û got: "Li gor te piştî wî kî tê? Ji ber ku şika wî tunebû ku qet nebe ew di rêza duyemîn de ye. Athenaîyî got: "Ew Kleobîs û Bîton in. Ew ji nesla Argos in, qasî bi namûsa xwe bijîn dewlemend bûn, destê wan jî bi hêz bû, belê lê binêre, ji bilî xelatên di pêşbirkîyên mezin de qezenc kirine, ji bo wan ev jî tê gotin: Argosîyan ji bo rûmeta Xuda Here cejnek pîroz dikirin; lazim bû dêya xwe bi erebekê bibirna perestgehekê, lê ga di saeta ku xwestine ji zevîyê venegerîyabûn; xort ji derengmayînê tirsîyan, bi xwe ketin bin nîrê û erebe kêşandin; li ser erebeyê dêya wan hebû û bê lam û cîm ew 45 stadîon kêşan, anîn perestgehê. Hemî ew kesên xwedî bawerî yên li wir, ev bi çavê

31 Yên ji metnê manaya "Kroîsos bextewerîya Tellos qebûl kirîye..." derdixin jî hene.

xwe dîtin, ji bilî vê şêla wan ew bi mirina herî şêrîn hatin tacîdarkirin. Xuda cihek nîşanî wan da ku ji insanan re mirin ji jiyanê baştir e. Argosî li dora wan berhev bûbûn û dilê xwe dibijandin hêza van ya maddî û manewî; bi vî awayî dêya xwedîyê zarokên esîl pîroz dikirin. Dayîk di nav bextewarîyê de bû, bi serkeftina zarokên xwe serbilind, li hemberî peykera îlahe li ser pêyan sekinîbû, ji Wê re, ji bo kurên xwe Kleobîs û Bîtona, yên ewqas rûmet danê, ji bo bexişandina tiştên herî baş yên ji insanetîyê bikaribe bi dest bixe, dua dikir. Piştî vê duayê qurban hatin serjêkirin, şahîyên pîroz hatin kirin; piştre xort di nav perestgehê de raketin û êdî hişyar nebûn, di wê xewa dawîyê de man. Argosîyan peykerên wan çêkirin, wekî kesên bilind û hikumran pêşkêşî Delphoîyê kirin."

[**32**] Solon, bi vî awayî dora duduyan jî dide van xortan. Kroîsos hêrs bû û got: "Biyanîyê Athenayî, gelo tu me û bextewerîya me tiştekî hesêb nakî ku tu van insanên besît dikî rêza duduyan?" Solon got; "Kroîsos tu kesekî ku dizane Xuda li hemberî insanan çiqas hesûd e û tu wextê bawerî pê nayê dikişîne lêpirsînê. Insan di seranserê temenê xwe de, gelek tiştên ku naxwaze bibîne, dibîne; dikare gelek ezîyetan bikêşe. Ez kêm û zêde temenê insên heftê sal hesêb dikim. Ev heftê sal, heke em mehên zêde hesêb nekin, 25 hezar û 200 roj dike, lê ji bo meh û demsal deng bikevin, li ser salê, du sal carekê, mehek zêde dikin, ji bilî heftê salan, ev mehên zêde 35 mehê din dike û hejmara rojên van mehan 1050 ne. Di van hemû rojan de, ku hemû 26 hezar 250 roj e û dike 70 sal, tu bûyer tune ku, ya îro wek ya sibe be.[32] Bi vî awayî, ey Kroîsos, ji bo insên tenê talih û bêtalihî heye. Belê ez dibînim, tu gelek dewlemend î, tu li gelek insanan hikum dikî, lê cardin ez ji bo tiştê tu ji min dixwazî, nikarim bersivê bidim. Ji ber ku pêwist e ez rewşa dawîbûna temenê te zanibim. Ji ber ku gelek insanên dewlemend hene ku, ji kesên qit-qeneet dijîn ne bextewartir in, heke siûda wan heta dawîya temenê wan ji wan re ne yar be. Insanên wisan hene ku, bi qasî kesên di çîrokan de dewlemend in, lê ne bextewar in; gelek jî hene, qinetkar in, lê bi siûd in. Yên gelek dewlemend, heke ne bextewar bin, ji yên bitalih du

32 Teqwîma Yûnanîyan bikar tanîn, sal li gor mehan hatibû rêkxistin, sal 12 meh, yek jê 29, yek jî 30 dikêşan. Bi vî awayî sal dibû 354 roj ku, ji sala rojê 11 roj kurt e. Ji du salan carekê meha 13an, meha zêde dikirin ser. Bi vî awayî dengekirina demsalan û mehan pêk dianîn.

imtîyazên wî yê zêde hene; yek jê her tiştê bixwaze kare bike û pêrgîbûna wendakirina perekî mezin rehet e; lê ka em li imtîyazên yên din binêrin: bêguman wendayîyek mezin û daxwazên ji sinor der qasî yê din nikare pêk bîne; lê talihê wî ew ji vê diparêze; bi ser de xwedîyê tendurustîyeke baş e, nexweşî nizane, xem nizane, di nav zarokên layîqê dîtinê ne bextewar e. Heger ji bilî van hemûyan temenê xwe yê dawî bextewar biqedîne, bi rastî ew mirovê ku tu lê digerî, mirovê ku heq dikî jê re bextewar bê gotin ew e. Lê berîya mirinê, zimanê xwe bigre, ji bo bê gotin bextewer e ecele neke, tenê bêje bitalih e, ewqas. Helbet ji bo kesekî fanî bidestxistina her imtîyazê ne karekî pêkan e; tu welat têra xwe bi xwe nake û hemî beran nade; vî berî dide, lê yê din lê hêşîn nabe, ji yê din distîne; yê xwedîyê hilberînê zêde yê herî baş e. Ji bo insanan jî wisan e. Tu kesek bi serê xwe her tiştî bi dest naxe. Filanê bi dest dixe, lê ji filana din mehrûm dimîne. Yê ku di seranserê hemî temenê xwe de digihe her tiştî û di dawîyê de ji dinyê xweşbîn vediqete, erê ew, li gor min, ey hikumdar, navê kesê bextewar heq dike. Lazim e dawîya her tiştî bê nêrîn, xuda bextewarîyê wekî êm pêşkêşî gelek insanan dike û piştre wan dixe wêranîyê."

[33] Li gor min, ev gotinên han zêde xweşa Kroîsosê ku qîmet bi Athenaî nedida neçûn û wî, vî kesê ku tiştên di destan de heyî sivik didîtin û her tim şîreta nêrîna rewşa dawîyê dikir û xwedîyê mejîyekî teng bû, raqewirand û avêt jiderve.

[34] Solon çû, lê hesûdîya îlahan bi xezeb bi ser Kroîsos de hat, bêguman ji bo ku xwe bextewertirîn insan hesêb dikir. Çawa Solon çû, di xewa xwe de xewnek dît, tiştên dê bên serê kurê wî nîşanî wî dan. Du kurên wî hebûn: yek jê ketibû ber xedra afirîner, ker û lal bû; yê din di her warî de ji hevtemenê xwe pêşdetir bû; navê wî Atys bû. Ya xewnê nîşanê Kroîsos dida ev bû: ew bi rimeke serê wê hesin dihat kuştin. Piştî hişyar bû li ser dîtina vê xewnê ket nav melhezeyên kûr, tirsîyabû, karê wî yê pêşîn ew bû ku kurê xwe bi dergîstî kir; wezîfeya vî xortî ku timî serfermandarîya leşkerê Lîdyayê bû, jê wergirt; rim û sîlehên wekî wê yên kurt û dirêj, hemî cûreyên wan, li ku dibin bila bibin berhev kirin; çi dibe û çi nabe, ji bo ku nekevin xwarê û li serê kurê wî nekevin, ji cihê hatine daliqandin anîn xwarê û tevde kirin depoyan.

[35] Di esnayê ku kurê wî bi merasimên zewacê ve mijûl dibû, mirovek hat Sardesê, bûbû qurbana qederê, destê wî bibû bi xwîn. Bi eslê xwe ji Frîgyayî bû, ji nesla hikumdar bû. Hat seraya Kroîsos û li gor adetên wir daxwaza paqijîya xwe kir (ev adet kêm-zêde li ba Lîdyayîyan jî wekî ya Yûnanîyan e). Piştî merasimê Kroîsos ji wî mirovî pirsî, ji ku tê û kî ye, got: "Tu kî ye, tu ji kîjan cihê Frîgyayê tê binê serbanê min? Ew mêr yan jî jina te ew kuştîye kî bû?" Frîgyayî got: "Ey hikumdarê min, navê min Adrastos e, ez kurê Gordîasê lawê Mîdas im; bi nezanî min birayekî xwe kuşt û bavê min her tiştên min ji min stendin û ez raqewirandim." Kroîsos ji wî re got: "Kurê kesên ez qedrê wan dizanim, tu hatî nav dostan; heke tu li ba me bimînî tu kêmasîyên te çênabin. Tehemila felaketa tu dûçarî bûyî bike, sebir bike, ji bo te ya herî baş ew e."

[36] Ev mirov bi vî awayî di seraya Kroîsos de bi cih bû. Adrastos wekî mêvan li baregeha Kroîsos ma. Tam di wê navê re berazekî dirinde yê gelek mezin, li Çiyayê Olymposê ya herêma Mysîanê derketibû. Ji çiyan dadigerîya xwarê û zevî û çandinîya xelkê wêran dikir. Rûniştvanên navçeyê ji bo ku bikujin gelek caran bi pey diketin, lê tiştek bi ser nedixistin û ew dibûn qurban, ji destê pirsgirêk û belayê wî berazî hawara wan bû. Komek qasidên Mysîan hatin bal Kroîsos û jê re gotin: "Hikumdar, berazekî hêzdar yê gelek mezin li welatê me peyda bûye û temamê ziraeta me ji nav birîye. Em pê nikarin. Em hatine ku tu kurê xwe bi hinek xortên bi xîret û camêr re bişeynî ku deverê ji destê wî berazî rizgar bikin." Ev daxwaza qasidên Mysîayê bû. Di cih de xewna Kroîsos hat bîrê û ji wan re got: "Li ser şandina kurê min, rica ye qet gotin nekin. Imkan tune ez wî ji we re bişeynim, taze zewicîye û kar û erkekî din li ser milan e. Lê ez ê hejmarek xortên bijarte yên Lîdyayê bidim we. Ew hemû nêçîrvanên min in û bi kuçikan dikarin alîkarîya we bikin, ku hûn navçeyê ji wî berazî xelas bikin."

[37] Kroîsos bi vî awayî bersiva qasidan da û Mysîayî jî gelek kêfxwêş bûn. Tam di dema derketina qasidan de ji baregehê, kurê Kroîsos ket hindur. Wê xebera Mysîayîyan ya ji bo çi hatine seh kiribû. Ji bo ku bavê wî nexwestibû ew bi wan re here, ji bavê xwe re got: "Bavo, du karên min ê herî mezin şer û nêçîr e, ev kar in yên ku min bi qedir dikin. Niha te herdu li min qedexe kirine. Lê te ne nehêjayî û ne jî sistî bi min re dîtîye. Ji vir şûn ve dema ez li

virde wirde yê bajêr gerîyam dê çawa çavê min bi çavê xelkê nav bazarê bikeve? Rûniştîyên welat wê ji min re çi bêjin? Jina min ku bûka nû ye, dê nebêje ez bi mêrekî çawa re zewicîm? Niha ez ricayê ji te dikim yan dev ji min berde ez ji bo wê nêçîrê biçim, yan jî min îkna bike ka ji bo çi hewce dike ez nerim."

[38] Kroîsos bi vî awayî bersiv dayê: "Kurê min, bi te re rêça nehêjatîyê tune û te tiştekî ku bêhna min teng bike jî nekirîye. Sebebê tevgerîna min ev e, di xewnê de yek li ber çavê min ket, ji min re got, rojên te hindik mane; dê tu bi rima hesinî bimrî. Min ji bo wê te bi lez zewicand û ez ji bo wê nahêlim tu biçî ev sefera em hatine bangkirin. Qet nebe, heya ez sax bim, ji bo ez te ji nivîsa li enîya te hatîye nivîsandin biparêzim, ez serî li hemû çareyan didim. Ji ber ku ji bilî te kurên min tune; yê din seqet e, ez wî hesab nakim."

[39] Mirovê xort di cih de got: "Heqê te heye bavo, ku piştî xewneke wiha tu min biparêzî; lê xalek heye yê te şaş dike û dixe nav xelitîyan, lêbinêre ez ê ji te re bêjim: Ev xewna tu dibêjî, xebera ku ez ê bi rimeke hesinî bimrim dide, baş e ma destê beraz yê rimê hilde heye? Belê, xewnê heke ji te re bigota diranê beraz yan tiştekî wekî wê bigota, dê heqê te hebûya tu tiştekî wiha bikî; lê tu dibêjî rim. Madem em ê bi insanan re şer nekin, bihêle ez biçim."

[40] Kroîsos got: "Kurê min, yên ji bo xewnê te gotin rast in. Ji ber vê ez ji biryara xwe poşman bûm û ez destûrê didim ji bo tu beşdarî vê nêçîrê bibî."

[41] Piştî van gotinan, bangî Adrastosê Frîgyayî kir û dema ku anîn hizura wî, got: "Adrastos, tiştekî xerab hatibû serê te, min tu ji wê paqij kir, min tu girt bal xwe, îdareya te pêk anî; baş e, te çawa pêşîyê serî li min da, loma serîlêdana min ya pêşî li te tu xerab hesêb nakî. Kurê min diçe nêçîrê, di rê de hûn dikarin rastî kesên xerab bên, dikarin bixwazin êrîşî we bikin, wî wextî soz ji min re bide ku dê tu li kurê min xwedî derkevî. Jixwe tu bi xwe jî, dê bixwazî firseteke ku tu xwe bidî nîşan bi destê te bikeve; ev di xwîna te de heye, bi ser de tu bi hêz e jî."

[42] Adrastos bersiv da got: "Hikumdar, di eslê xwe de ez beşdarî partîyên nêçîrê yên wiha nabim. Kesekî felaketeke wekî ya min bê serî, beşdarê nav hevrêyên serê wan rehet, ne kêrhatî ye; jixwe dilekî wilo li wir nabe û ji bo ji

vê paşve bimînim çi ji destê min bihata min ê bikira. Lê madem tu dixwazî û ez jî mecbûr im te neşkînim (ji ber ku min qencîya te dît) ez amade me: kurê te yê te emanetî min kir, çiqas ji destê parêzvanê wî bê, wê bê qeza û bê bela li te vegerîne û bê, tu dikarî bawerîyê bi min bikî."

[43] Bi vî awayî soz da Kroîsos, piştre bi hevalên xwe yên mêrxas û kuçikan re ketin rê. Dema ku hatin Çiyayê Olymposê, bi dû heywan ketin ew ji cihê wî leqandin; nêçîrvanan dora wî girtin û dest bi avêtina rimên xwe yên kurt kirin. Di wê navê re wî biyanîyî jî, yê destê wî ji kuştina ku kiribû hatibû paqijkirin, Adrastosê li ber xişmê felekê ketî, rima xwe ya kurt avêt, derb ne li beraz, bê hemdî wî çû li kurê Kroîsos ket; serê rimê daçikîya û bi vî awayî xewn rast derket. Yekî ji bo xeber bigehîne Kroîsos baz da; gihişt Sardesê, behsa şer û yên hatine serê kurê wî kirin.

[44] Vê mirinê serê Kroîsos serûbinî hev kir; lê ya herî zêde ew şaş kir, ev kuştina ji alîyê wî kesî bû ku destê wî ji kuştinê paqij kiribû. Tesadufeke wiha serê wî nedikişand, dilmanî pê re çêbibû, bangî Zeûsê paqijker dikir, ew dikir şahid ji kirinên mêvanê xwe re; bangî îlahê Ocaxê, bangî îlahê Dostîyê dikir (yanî cardin Zeûs bi navên wî yên din), ji ber ku yê qebûl kiribû seraya xwe û ew biyanîyê ku zikê wî têr kiribû, bûbû qatilê kurê wî; ji îlahê Dostîyê re, ji ber ku mirovê ji bo parêzerîyê dabû kurê xwe, bûbû dijminê wî yê xwînî.

[45] Lîdyayîyan mirî anîn, qatil li dû wan dihat. Li ber mirî sekinî û teslîmî Kroîsos bû, destê xwe dirêj kir û dest bi bergerê kir, dixwest wî li ser vî mirîyî bike qurban, felaketa ewil hat serî, îro wekî celadê rizgarkerê xwe lê hîn girantir bûbû, vê bibîr anî, got ku êdî nikare bijî. Kroîsos, bi ser vê felaketa ocaxa wî tefandî re jî, li hemberî van gotinên bi êş, dilê wî bi Adrastos şewitî û jê re got: "Mêvanê min, daxwazkirina te ya mirinê ji bo toleya min bes e. Naxêr, ez ji bo vê mirinê te tawanbar nakim; qet nebe ev ne bi îradeya te bû, yê ez tawarbar bikim îlahek e; ew xuda ku, berî wê dê çi biqewime ji min re gotibû." Kroîsos kurê xwe li gor ûrf û adetan da veşartin. Kurê Gordîas û nevîyê Mîdas, Adrastos, yê ku pêşî birayê xwe, piştre jî kurê yê lekeya destê wî paqij kiribû kuşt, piştî dora tirbê vala bû û kesek nema, ji ber ku xwe di dinyê de insanê herî bêbext hesêb kiribû, li ser gorê li xwe xist, xwe kuşt.

[**46**] Kroîsos du salan şîn girê da û destê wî nediçû tu karekî. Piştre bi bihîstina mexlûbkirina fermanrewa Astîyagoyê[33] kurê Keyxusrew bi destê Kîrosê[34] kurê Kambîses[35] û firehbûna hêz û desthilata Persan êşa wî ji bîra wî çû. Kroîsos ket nav fikarên bê ka çawa wê rê li ber zêdebûna desthilata Persîyan bigire. Ji bo vê Kroîsos biryar da ku pêşî bi navendê kahînên Yûnanê û Lîbyayê bişêwire. Komek qasid şandin Delphoîyê, Abaîya herêma Phokîsê û Dodonayê. Çend kesan ji wan qasidan jî ber bi navenda kahînên Amphîaraos yên li navçeya Trophonîosê ve şandin. Her wiha hin qasid heta Brankhîadeya devera Mîlesîayê çûn.[36] Ew çend navendên stêrnasî û kahînên Yûnanî bûn yên ku Kroîsos bi wan dişêwirî. Heyetek jî ber bi perestgeha Ammon ya li Lîbyayê bi rê ketin. Kroîsos pêşî ji bo wan navendên kahînan biceribîne, bizanibe ka zanîn û pêşbînên wan di çi sevîyê de ne, qasidên xwe şandin. Heke ji wan yeqîn bike, dûra wê ji bo êrîşa li ser Persîyan ji wan pirsa bike.

[**47**] Talîmata ku dabû Lîdyayîyên ji bo ceribandina kahînan şandibûn wiha bû: Ji roja ji Sardesê derketine pê ve wê rojan bihejmêrên, dema sed roj qedîyan wê biçin ba kahînan û bipirsin, niha kurê Alyattes Kroîsos ê hikumdarê Lîdyayîyan çi dike. Dê bersiva her kahînekî bi nivîskî jê re bianîna. Ji derveyî yê Delphoîyê, ji temamê van şahidîyên pîroz tiştek nemaye, kes nizane navendên din çi bersiv dane. Dema ku li Delphoîyê, Lîdyayî ji bo bi îlah bişêwirin ketin perestgehê û dest bi pirsê kirin, Pythîa ev şeşbend (hexametron) got:

---

33 Astîyago di wergerên din de weke Astyages derbas dibe, me weke gotina bi Kurdî Astîyago bikar anî. Astîyagoyê kurê Keyxusrew di salên B. Z. 593-549 de hikumdarîya Împaratorîya Medan kirîye, dawî nevîyê wî, layê qîza wî Mandane ya Medyayê wî ji hikumranîyê dixe û ew împaratorîyê digre destê xwe. Piştre bi dehan salan jî, wek ku hûn ê di vegotinan de gelek caran bibînin, hikumdarên Persî wê weke hikumdarên Medan bên binavkirin û ji bo artêşê jî wê weke artêşa Medan bê behskirin. Jixwe Persîyên xwedî herêmeke biçûk li ser Împaratorîya Medan rûniştibûn, örf û adetên wan dimeşandin, weke wan li xwe dikirin, heya demeke dirêj serdarîya gelek beşên artêşê jî ji Medan bûn.

34 Kîros, weke Kyros yan Kûroş jî tê bikaranîn.

35 Kambîses weke Kambyses yan Kambîs jî tê bikaranîn.

36 Herodotos behsa kahînên bi nav û deng yên qirnên berê dike.

"Ez libên qûmên qiraxê deryayê dihejmêrim, deryayê dipîvim
Gotinên lalan fêhm dikim; guhê xwe didim bêdengan
Bêhnek tê pozê min; kûsî
Di bronzê de hatîye pêhtin; bi berxê re û hatîye pêçan
Bi çermeke stûr; bi bronzê ser hatîye nuxumandin
Û bronz raxistine di bin de."

[48] Lîdyayîyan kehanetên Pythîayê nivîsandin û ji nû ve ketin ser rêya Sardesê. Piştî qasidên ku vir de wir de çûbûn û bersiv wergirtin û hatin, Kroîsos ew di ber çav re derbas kirin. Qîmet neda tu bersivan heya ya ji Delphoîyê hatibû; lê dema ew xwend, di cih de xwe li ber tewand û ew li ser destan girt. Êdî yeqîn kir ku zanîna kahînîya li Delphoîyê ya herî baş e. Ji ber ku yê zanîbû wî wextê xwe çawa derbas kirîye ew bû. Bi rastî jî, piştî qasidên xwe ber bi perestgehan ve derxistibûn rê, mabû li hêvîya roja kifşkirî; piştre fikirîbû ka tiştê qet neyê aqlê kesekî çiye û rabibû kûsî û berxek perçe perçe kiribû, di distek bronz de ya ji jor ve bi qulp ew bi hev re pehtibû, bi destê xwe bi qapaxeke bronz ser girtibû.

[49] Belê ew bersiva ku Delphoîyê daye Kroîsos e. Em bên ser kahînê Amphîaraosê, ez ji bo wî tiştekî nikarim bêjim; ji ber ku vebêjer di vî warî de tiştek negotin. Wextê ku Lîdyayan merasima ayînî ya adet bû li dora perestgehê li dar xistin temam bû çi gotin, ez nizanim, lê ez vê dizanim ku, Kroîsos ew jî kehaneteke heqîqî hesêb kirîye.

[50] Kroîsos, ji bo xwe bi îlahê Delphoîyê xweş bike, li ser hev qurbanên mezin serjê kirin. Ji gelek cûre heywanên qurbanî sê hezar lib; piştre textên raketinê yên ji zêr û zîvan, kupayên zêrînî, qumaşên erguvanî û gomlek berhev kirin, komeke gelek mezin çêkir, bi van pêşkêşan dixwest hê zêdetir xwe li ba xuda şêrîn bike. Ji bilî vê emir da ku her Lîdyayî li gor taqeta xwe tiştekî pêşkêş bike. Piştre koma zêran a ji pêşkêşan hatibûn heland, dirêjahîya wê şeş palme, firehîya wê sê palme û pehnîya wê qasî palmeyek kûlçe rêtin.[37] Ew bû 117 kûlçe, çar libên wê zêrê eslî bûn û her yekê du ta-

37 Dema ku em li pîvanên îro bidin dirêjahî 45 santêmetro, firehî 22,5 santêmetro û bilindahî 7,5 sentêmetro dike.

lant û nîv dihat, yên din zêr û zîv tevlihev bûn û libek wê du talant dihat. Cardin peykera şêr ya ji zêrê eslî û giranîya wê deh talant da çêkirin. Dema ku perestgeha Delphoîyê şewitî, ev şêr ji ser lingên ji kulçeyan ku jê re bûbû bingeh ketibû û niha ew li xezîneya Korînthosê hatîye danîn, lê şeş talant û nîv giranahîya wê heye, ji ber ku sê talant û nîvê wê helîyaye.

[51] Kroîsos piştî ev temam bûn, hinek pêşkêşên din jî kirin ser tevan û bi hev re şandin Delphoîyê. Di nav pêşkêşîyan da du kraterosên mezin; yek jê zêr, yek jê zîv; ya zêr dema mirov dikeve perestgehê li milê rastê disekinî, ya din li milê çepê. Wan jî qasek piştî şewatê birin cihên din, ya yekê niha di xezîneya Klazomenaîyê de ye; giranîya wê heyşt talant û nîv û duwazdeh manayan derbas dike; ya duduyan jî di goşeya hewşê de disekine; mezinahîya wê bi qasî şeşsed amphorayê ye, Delphoîyan dema ku li Theophanîayê şerab û av tevlihev kirine dîtine.[38] Li Delphoîyê tê gotin ku ev karekî ku ji destê Theodorosê Samosî derketîye û bi rastî ez jî bi vê bawer dikim, ji ber ku ne karekî wisan e ku herkes bikaribe çêke. Kroîsos ji derveyî van, çar fiçîyên zîv, ji bo ava pîroz yek zêr û yek jî zîv du gumgum şandin; li ser gumgumka zêr nivîseke pêşkêşî ya ev ji alîyê Lakedaîmonîyan hatîye şandin heye; ev nivîs sexte ye; ev gumgumk jî wekî yên din pêşkêşeke Kroîsos e û nivîs ya Delphoîyekî ye yê ku xwestîye xwe bi Spartîyan şêrîn bike. Ez navê wî mirovî dizanim, lê ez eşkere nakim; ya rast ev e ku, diyarîya Lakedaîmonîyan daye, zarokek ê ku dilopê avê ji destê wî dikeve; lê van herdu gumgumkan ne wan dane. Kroîsos, di nav wan pêşkêşan de, ku li ser yek ji wan nivîsa pêşkêşîyê tune, legenên zivîn jî şandine, ji bo şerabreşînê û peykera jinekê ya ji xwe re nan distire ya ji zêr e ya ku bejna wê sê enîşk e. Delphoîyî wiha dibêjin. Piştre gerdenî û kemerên jina xwe jî şandine.

[52] Belê tiştên ji Delphoîyê re hatine pêşkêşkirin ev bûn. Ji perestgeha Amphîaraos re, ku ew bi mêrxasî û bextreşîya wî zanîbû, mertaleke ji zêrê safî û cardin rimeke ji zêrê safî şandin; ew serê zirav yê bi serê qulpê zêrîn ve hatîye vekirin jî ji eynî madenê hatîye çêkirin; ev herdu jî, dema ku ez ji Thebaîyê derbas dibûm, di perestgeha Ismenîos Apollonê de bûn.

38 Apollon zivistanan diçû welatê Hyperboreyiyan. Cejnên Theophanîa yên biharan vegera wî pîroz dikirin. Cejnên ronahî û şahîyê ne. Di kraterosan de şerab û av telihev dikirin, bi aheng û hewayên îlahî ve dihat pîrozkirin.

[53] Kroîsos, talîmat da qasidên Lîdyayî yê ku wê ev xezîne pêşkêşî perestgehan bikirana, ku ji kahînan vê bipirsîn: "Bila Kroîsos bi Persan re şer bike; heke şer bike, ma bela ji milletên dost çend yekîneyan werbigire?" Lîdyayî çûn bal wan kahînan, diyarî pêşkêş kirin û pirsên xwe bi vî awayî kirin: "Kroîsosê hikumdarê Lîdyayê û yên cihên din, we kahînê bibawer yê ser rûyê dinê hesêb dike; layîqî zanebûna we ev diyarî şandin û vê carê dipirse; ma em bi Persîyan re şer bikin û heke em şer bikin, gelo em ji mileteki dost alîkarî werbigirin?" Daxwazên wî ev bûn. Nêrînên herdu kahînan li hev dikirin; wan ji Kroîsos re ev agahî şandin: Heke bi Persan re bikeve şer, dê împaratorîyeke mezin hilweşîne; ji bilî vê tifaqê bi Yûnanîyên herî bi hêz re çêkin û pêwist e hûn dostanîya xwe bi wan re xurt bikin.

[54] Dema Kroîsos kehaneta jê re anîn hîn bû, kahîn pîroz kirin, şika wî nemabû ku dê hikumdarîya Kîros hilweşîne. Mirovên xwe ji nû ve şand Delphoîyê. Berî wê nifûsa Delphoîyê hîn bûbû, ji temamê xelkê re serê mirovekî du stater zêr da belavkirin. Di miqabilê vê merdîyê de Delphoîyan jî hinek imtîyaz dan Lîdyayîyan. Kroîsos û Lîdyayî bêyî ku li bende dorê bisekinin wê biçûna ba kahîn, wê ji wan xercê rûniştinê nehata sitandin, wê di misabeqeyên lîstikan yên mezin de li serê pêşî rûniştina, hemû Lîdyayê çi wextê bixwestina karîbûn bibûna hemwelatîyên Delphoîyê.

[55] Kroîsos, piştî çavê Delphoîyan tam têr kir, cara sisîyan bi kahîn şêwirî, piştî yeqîn kiribû ku ew rastîyê dizane bawerîya wî pê zêde bûbû. Vê carê jî "Ma wê saltanata wî dirêj bikêşe?" da pirsîn. Pythîa, ji wî re ev hişyarî şand:

> Dê rojek hêstir bibe hikumdarê Medîayîyan,
> Wî wextî, ey Lîdyayîyê pê wî nerm, baz de,
> Li seranserê Hermosa bi kevirên xîç, binê lingên xwe bi dohn bike
> Şerm neke, bila tu li ber xwe nekeve ji bo tu baz didî

[56] Bi van gotinên şandin, Kroîsos ji berê zêdetir şa kir, ji ber ku xwe tesellî dikir ku hêstirek di cihê hikumdarekî Medaîyayî de nikare derkeve ser text û yeka din jî dê ne ew û ne jî zarokên wî ji ser text neyên xwarê. Li ser vê, dest bi lêkolînê kir, ka di nav Yûnanîyan de yê herî bi hêz kî ye. Li gor xeberên wergirtin, ev Lakedaîmonî û Athenîayî bûn, yek ji serkêşên Doran dihat, ya din ji Îoniayîyan. Ev ji nijadê Yûnanî yê herî baş bûn, Îonîayî ji

Pelasgîyan dihatin, Dorî jî ji Hellenîyan. Pelasgî qet ji erdê xwe veneqetîyabûn, Hellenî jî her tim koçî ha li vir û ha li wir kiribûn. Di wextê hikumdar Deûkalîon de li Phtîosê dijîyan. Di zemanê Dorosê kurê Hellen de li ber pêşkên Ossa û Olymposê, herêmeke navê wê Hîstîaîayê bûn. Kadmosî hatin wan ji Hîstîaîayê raqewirandine, ew jî mecbûr mane çûne Pîndosê, ku navê wir Makedonî bû. Vê carê jî ji wir koçî Dryoîsê kirine û piştî van hemû koçan hatine Peloponezê navê Dorî wergirtine.

[57] Em bên ser ziman, Pelasgîyan çi zimanî diaxiftin, ez nikarim tiştekî tam bêjim. Heke îro li zimanê Pelasgîyên ku dijîn binêrin û bi wî awayî fikirîn rast be, ku ev ji Tyrsenîyan hê wêdetir, li bajarê jê re Krestîn tê gotin rûdinîştin, wî wextî bi van Dorîyan re cînar bûn -yek jî gelek berê yên bi Athenîayan re cîran bûn hene. Ev jî li Plakîa û Skylake yên li qiraxê Hellespontosê bi cih bûbûn -û yek jî hemû sîteyên din ku her çend navê wan hatine guhertin, lê ew sîteyên Pelasgî ne- ez dibêjim heke, em li van miletan binêrin û bigehin netîceyekê, Plasgî zimanekî biyanî diaxivîn. Bi vî awayî heke hemû Plasgî eynî zimanî nediaxiftin, xelkê Attîkayê yê ji vê nijadê, dema ku koçî Yûnanê kirine zimanê xwe terk kirine, zimanekî din girtine. Bi rastî yên li Kreston û Plaîkayê rûdinin, zimanê cîranên xwe yê niha naaxivin, zimanekî wan yê taybetî heye; ev jî dide nîşan ku, dema koçî vê herêmê kirin kîjan zimanî diaxiftin îro jî eynî zimanî diaxivin.

HİPPOKRATES - PEÎSÎSTRATOS

[58] Em bên ser Hellenan, li gor min wan ji destpêkê ve eynî zimanî diaxivîn; di eslê xwe de dema ku ji Pelasgîyan veqetîyan xurt nebûn, zemanên destpêkê di kêmanîyê de bûn, lê di serî de Pelasgî, bi alîkarîya aktîf yên miletên barbar gelek milet girtin nav xwe. Di miqabilî vê de Pelasgî ku barbar in, berê miqtareke mezin zêde bûne, ez digehim vê netîceyê.

[59] Ev herdu milet, Lakedaîmonî û Athenîayî yên dawî ne, wekî Kroîsos jî hîn bûye, di van salan de di bin desthilata Peîsîstratosê[39] kurê Hîppokrates de

39 Peîsîstratos, di salên 561-560an de li Atînayê hukum kiriye. Di sala 556-55an de ji hukumdarî ketiye. (Hatzfeld, rûp: 109-112) Helbestên Homeros yên edebîyat parastine, cara ewil wî belav kirine.

bûne û desthilata wî ewqas baş nedimeşîya. Ev Hîppokrates hevwelatîyekî di rêzê de bûye, rojekê di esnayê leyistikên Olympîayê de rastî mucîzeke mezin tê: Wî qurban serjê kiribû; li rexê wî av û sênîyên tijî goştê qurbanê hebûn; di binî de agir vênediket, lê avê dest bi kelînê kir û bi ser de çû. Khîlonê Lakedaîmonî jî li wir bû, rewş dît û şîret li Hîppokrates kir, got: "Jina zarok çêke nexe mala xwe, heke tu zewicîbe jina xwe berde, heke kurê te heye raqewirîne." Bi vî awayî nesîhet lê kirin. Kêfa Hippokrates ji van gotinên Khîlon re nehat û piştre tê gotin ev Peîsîstratosê me hat dinê. Di navbera Athenaîyên li qiraxên deryayê de dijîyan û Athenaîyên di hindur de yên li gundan dijîyan, şerê navxweyî derket. Serekê yê yekem Megaklesê kurê Alkmaîon, serekê gundîyan jî Lykurgosê kurê Arîstolaîdes bû- Di vê navê re Peîsîstratos xwest desthilatê bigre destê xwe û grubeke sêyem damezirand; mirov li dora xwe berhev kirin, wekî parêzgerên çiyayîyan derket holê û tiştekî wiha kir: Di bedena xwe de birîn vekir û hêstirên xwe jî birîndar kirin; piştre hêstir ajotin agorayê, her wekî senaryoyekê xwest bide nîşandan ku di esnayê vegere welatê xwe de, bi dijmin re şer kirîye û xwestine wî bikujin. Ji xelkê xwest ku parêzvanan bidênê. Mêrxasîyên xwe yê di şerê li dijî Magerayê de dihejmartin, digot min Nîsaîayê stendîye û min ev heq kirîye. Xelkê Athenîayê pê xapîyan û ji nav xelkê bajêr yekîne berhev kirin, ez nikarim ji van re kesên bi rim bêjim, zêdetir mirov dikare ji wan re bêje yên topiz di destê wan de, ji ber ku li pey Peîsîstratos topizên dar di destê wan de û dimeşîyan. Wan, guhê xwe dan wî, serî hildan, akropol stendin. Bi vî awayî Peîssîstratos Athenîayê girt, lê destê xwe neda birêvebirîya dewletê, qanûn neguhertin; bajar li gor qanûnên heyî birêve dibir û van bi zanetî û bi ziravrêsî tetbîq dikir.

[60] Midetek şûn de terefdarên Megakles û Lykurgos li hev kirin û Peîsîstratos xistin. Ev behsa Peîsîstratos bû ku yekem car desthilat girt destê xwe û bêyî hêj bi cih kiribe, hikumranîya wî hilweşîya. Yên ew xistin piştre bi hev ketin. Bi xwe jî midetek şûn ve tûşî pirsgirêkên navxweyî bûn, terefdarên wî pişta xwe danê Megakles. Ew jî ji tekoşînê westîya û ji neçarî berê xwe da bal Peîsîstratos. Loma zilamek xwe şand bal Peîsîstratos û xwest vê pêşnîyazê bigihînê: "Heke vegere ser desthilatê, dê keça xwe lê mehr bike û pişta wî bigre. Ka çi dibêje?" Peîsîstratos bi kêfxweşî pêşnîyaz qebûl kir û li hev kirin. Peîsîstratos ji bo dîsa desthilatdarî têkeve destê wî, fêlbazîyek ecêb bikar anîn, lê ez vê plane wek ya zarokan dibînim; - ku mirov ji heyaman

ve zêdetir bihizirbûn û hişyarîya Yûnanîyan ya wan ji barbaran vediqetîne bigre ber çav- û wê çawa bi planeke wilo derketina pêşîya Athenîayên ku xwe di nav Yûnanan de yê herî hişyar dibînin.

Bi vî awayî behsa wê hîleyê hatîye kirin: Li navçeya Paîanîanê jinek dijîya û navê wê Phya bû. Jineke girs bû, bejna wê sê tilî ji çar zendan kêm bû û gelekî sipehî bû. Megakles û Peîsîstratos kincên bedew li wê jinê kirin, ew li erebakê siwar kirin û piştre şîret lê kirin ka wê çawa tev bigere ji bo bi heybeta xwe têkeve çav xelkê. Piştre ew ber bi bajarê Athenîayê ve şandin. Dema ketin bajêr, zilamên ku li pêşîya wan baz didan, li gor fermana ku dabûn wan, bang dikirin û digotin: "Ey xelkê Atheniayê! Werin pêşwazîya Peîsîstratos, îlaha Athena bixwe wî tîne keleha xwe, ji ber ku ji herkesî zêdetir rêz û hurmetê jê re digre." Bangdêran bi wî awayî bang dikirin û bi lez ew deng û behs li navçeyên dora bajarê Athenîayê belav bû ku îlaha Athene Peîsîstratos birîye kelha bajêr. Rûniştîyên bajêr bêyî ku gûman ji wan re çêbibe bawer kirin ku ew jina li ser erebeyê xwedawenda Athene ye. Athenîayan li hemberî Athene (jina ser erebeyê) serî tewandin û pêşwazî li hatina Peîsîstratos kirin.

[61] Belê Peîsîstratos bi vî awayî hukumranî bi dest xist û li gor peymana di navbera wan de bi keça Megakles re zewicî. Lê kurên wî yên têrgihiştî hebûn, jixwe kurên Alkmaîyan dûçarî laneta xuda hatibûn, ji ber wê nedixwest ji jina nû re zarok çêbibin; ji ber vê jina xwe bi paş ve bikar anî. Jina ciwan pêşî ji kesekî re tiştek negot; piştre belkî bi zora dayîka wê, ji dayîka xwe re got, wê jî xeber da bavê wê. Ev rewş gelek zora Megakles çû. Peîsîstratos bi destavêtina namûsa xwe tawanbar kir; bi vê hêrsê xwe nêzîkî dijminên xwe yên polîtîk kir. Peîsîstratos ku hîn bû li hemberî wî dolab tê gerandin, ji welatê xwe derket û çû Eretrîayê, li wir bi kurên xwe re li ser rewşê fikirîn. Yek ji kesên ku bi wî re hatibû Hîppîsas, dixwest ku dîsa hukumranîyê bi dest bixin. Li Eretrîayê, ji temamê wilayetên ku berê minnetdarê wan bûn, pere berhev kirin. Xelkê perekî gelekî mezin dan wan, yên gelek mert hereket kirin jî Thebaîyî bûn. Lê heta dest bi kar kirin gelek sal derbas bûn û dest bi hazirîya vegerê kirin. Ji Peloponezê eskerên bi pera hatibûn girtin anîn, yekî Naxosî jî bi dilxwaz hat, navê wî Lygdamîs bû. Gelekî bi hêrs xuya dikir, pere û esker jî anîbûn.

[62] Belê piştî yanzdeh salan, ji Eretrîayê derketin rê. Pêşî li Attîkayê Marathon girtin. Li wan deveran qonax vedan, di vê navê re hevalbendên wî yên

li wir jî dest bi hatinê kiribûn; ji bo bazdana ba wî mirovî yê dîktatorîya wî ji azadîyê xweştir didîtin, cih û warên xwe terk dikirin. Belê bi vî awayî xurt dibûn; lê Athenaîyên bajarî, zêde guhê xwe nedidan bihêzbûna Peîsîstratos û heta stendina Marathonê jî; çi wextê hîn bûn ku ji Marathonê dimeşin ser Athenaîyê, wî wextî ew jî ji bo şer derketin rê. Li hemberî êrîşkeran hemû hêzên xwe seferber kiribûn. Li milê din, artêşa Peîsîstratos, ji Marathonê derketibûn û ber bi bajêr ve dihatin; li ba perestgeha Palenne ew û Atheneyê rastî hevdû hatin û li hemberî hev baregah vedan. Li wir Amphîlytosê şîretkar yê Akarnanîayî, guhê xwe da îlhama îlahî û hat, Peîsîstratos dît, ber bi wî ve meşîya, bi rêzên hexameter ev kehanet got:

Tor hatin avêtin di ronahîya tavaheyvê de
Wê masî bikevin torên şidyayî de

[63] Zaneyê îlahî wiha axift. Peîsîstratos, manaya kehanetê fêhim kir û li gor wê hereket kir, leşkerê xwe meşand. Athenaîyên li bajêr xwarina xwe xwaribûn, yên xwarina xwe xelas kiribûn hinek li ser zarê rûniştibûn, hinek raketibûn. Hevalbendên Peîsîstratos avêtin ser wan û ew revandin. Dema ku Peîsîstratos dît ku baz didin, ji bo firset nede berhevbûna wan, hê tiştekî din yê bi hosteyî fikirî. Kurên xwe siwar kirin û di pêşîyê de şandin. Ew digihiştin yê direvîyan û "tiştekî tirsê tune, pêwist e herkes vegere ser karûbarên xwe, emrê Peîsîstratos wiha ye" digotin.

[64] Athenaîyan bawer kirin û belê, Peîsîstratos bi vî awayî û cara sisiyan hukumranîya Athenaîyê bi dest xist. Qederek eskerên bi pera berhev kirin û hem bi hatinên ji welatê xwe, hem bi qezencên ji madenên Strymonê, hikumranîya xwe qewîn kir; di cihê ku bêpayîn bireve, zarokên Athenaîyên li hemberî wî şer kiribûn wekî rehîn berhev kirin. Ew li Naxosê bi cih kirin (ev girav bi dest xistibû û kiribû bin rêvebirîya Lygdamîs). Herî dawîyê jî guhê xwe dabû gotinên kahînan, girava Delosê paqij kir, gorên di nav rûberê dîtina perestgehê de diman dan vekirin, kir ku mirîyan derxînin û li cihên din ên giravê veşêrin. Peîsîstratos êdî hikumranê Athenaîyê bû; ji Athenîyan[40] hinek di şer de miribûn, hinek jî ketibûn pey kurên Alkmaînoyan û koç kiribûn, ji welatê xwe dûr wekî koçber dijîyan.

40 Ji Atînayîyan… Metin tiştekî din nabêje, lê ev, "Ji Atînayîyên partîyên dijber" e.

[65] Dema ku Kroîsos di derbarê wan de lêpirsîn dikir, ev hatibûn serê Athenaîyan û Kroîsos jî bi vî awayî hîn bûbû. Em bên ser yên di derheqê Lakedaîmonîyan de hîn bibûn, ew jî bi vî awayî bû: Wan dewreke gelek zor li pey xwe hiştibûn û Tegeayî mexlûb kiribûn. Li Spartayê di dema hukum ji alîyê Leon û Hegesîkles dihat meşandin, yên Lakedaîmonên serkeftin li ser serkeftinê bi dest dixistin bidin sekinandin tenê ev bûn. Hê jî mirov paşve biçe, di temamê Yûnanê de Lakedaîmonî, di medenîyetê de xelkê herî paşvemayî bûn; ji bo derve girtî bûn, di nav xwe de jiyaneke wan a civatî tunebû. Lêbinêrin, wan çawa qanûnên xerab rakirin û yên baş danîn cihê wan. Hemwelatîyê Spartayî yê xatirşînaz Lykurgos, çûbû Delphoîyê, wê bi kahîn bişêwirîya; çawa lingê xwe avêt perestgehê li salona mezin, Pythîa bi van gotinan pêşwazîya wî kir:

> Lykurgos, di perestgeha min ya dewlemend de tu hatî dîtina min,
> Zeûs û îlahên li Olymposê rûdinin
> Tu mêvanekî ezîzê wan e ey Lykurgos
> Tu fanîyek î yan Îlah î? Ez nizanim
> Lê ev Lykurgosê li ber çavê min, zêdetir îlahek e

Hinek dibêjin, ew qanûnên îro li Spartayê derbasdar in, Pythîa dane wî. Lê li gor Lakedaîmonîyan, Lykurgos ev qanûn, wextê birazîyê wî wek walîyê hikumdarê Spartayê Leobotes li Girîtê bû, ji wir anîye. Ev wezîfe girt û bi rastî hemû qanûn guhertin û bi baldarî şopand ji bo ev qanûn neyên rawestandin. Piştî vê yekê, wî her tiştê ku bi şer ve têkildar e, saz kir; enomîtayî, trîekadî û syssîtîayî û herî dawîyê ephorosî û Meclisa Pîran damezirand.[41]

[66] Lakedaîmonîyan qanûnên xwe yên xerab bi vî awayî guhertin û piştî Lykurgos mir, bi navê wî abîdeyek çêkirine û rûmeteke mezin dane wî. Ax bi bereket û xelk boş bû, di demeke kurt de geş bûn. Dewlemend bûn. Êdî di nav aştîyê de jiyan têra wan nedikir; pesnê xwe didan ku ji Arkadîayîyan bi hêztir in; bi kahînan şêwirîbûn "ka gelo em dikarin hemû Arkadîayê bi dest bixin?" Pythîa ev kehaneta xwarê ji wan re got:

41 Ev saziyên artêşê, dadweriyê û aboriyê bûn.

Daxwaza Arkadîayê gavavêtina zêde ye, nabe
Li wir xelkekî bi mazîyên berûyê dijîn yê bi hêz heye
Dê hewildanên we vala derxînin. Lê ez ne xesîs im.
Ez ê bidim te Tegea bi govenda lingê dengbilind
Ya li ser erda bi bereket ya bi benên pîvanê hatîye pîvan

Lakedaîmonên guhê xwe dan vê kahînê, dest ji şerê bi Arkadîayan berdan, tenê li hemberî Tegeayîyan derketin seferê. Zincîr bi xwe re biribûn, bawerî bi van gotinên bi xemil dikirin û bawer dikirin ku wê wan hêsîr bigrin. Di yekem şerî de zorîya wan çû; yên sax ketin dest, bi zincîrên bi xwe re biribûn hatin girêdan û ajotin deştên Tegeayê û Tegeayîyan bi benê pîvanê axa wan dan pîvan. Ew zincîrên ku pê hatibûn girêdan, di dewra min de jî li Tegeayê, li temamê dora perestgeha Athenaîyê daliqandî sekinî bûn.

[**67**] Belê, di şerê yekem de li hemberî Tegeayîyan paşve kêşabûn; lê di zemanê Kroîsos de û dema li Lakedaîmoyê Anaxandrîdas û Arîsto hikum dimeşandin, Spartayî di hêla eskerî de bi ser ketin; lêbinêrin ev çawa çêbû: Di netîceya neserketina wan a timî li hemberî Tegeayîyan, mirov şandin Delphoîyê û pirs kirin ku "Ji bo em dijmin mexlûb bikin pêwist e em dilê kîjan îlahî xweş bikin." Pythîa ji wan re emir kir ku hestîyê Orestesê kurê Agamemnon bînin Spartayê. Lê wan gor nedîtin û careke din mirov şandin bal îlahe, jê pirs kirin ka gora wî li ku ye. Pythîa ev bersiv da vê pirsê:

Li Arkadîayê Tegea. Deştek. Du ba dihejin li wir:
Ev qanûneke bêixûr û neguherbar e. Li hemberî
Gurmistê gurmist; ezîyet li ser ezîyetê. Orestes
Li wir e, ew bi axa tijî tovên jîndar hatîye pêçan
Wî bîne, dê bajar yê te be.

Li ser van gotinan Lakedaîmonî cih û quncikeke ku lê negerîyan nehiştin, lê nedîtin, heta yê bi nave Lîkhas yê ji kesên ku Spartayî ji wan re dibêjin Agathoergosî tirba wî peyde kir. Ev Agathoergosî ji Spartayîyan in ên li bajar dijîn, ev li gor 'emrê xwe her sal pênc ji wan ji yekîneyên siwarî derdiketin û sala derdiketin hema bi carekê xanenişîn nedibûn, li ser hesaba dewletê her yekî di karekî de wezîfeyek hildida.

[68] Ev Lîkhas ku kesek ji wan bû, ji tesadufekê sûd wergirt û hinekî jî mejîyê xwe xebitant, gora li Tegeayê ye derxistîye meydanê. Di wê navê re peywendîyên bi Tegeayîyan re ji nû ve dest pê kiribûn. Ew li wir çûye dikana hesinkarekî, çawa li ser hesin xebat tê kirin bi heyranî temaşe kirîye. Hesinkarê ku vî halê wî dibîne, dest ji karê xwe berdide û ji wî re wiha dibêje: "Ey biyanîyê Lakonîayî, tu li xebata li ser vî hesinî dinêrî û ecêbmayî dimînî, lê heke te yên min dîtîye bibînî, te yê çi bigotîya! Min dixwest ez bîrek li vê hewşê vekim, dema ku min ax kola, tabûteke dirêjahîya wê heft enîşk derket. Ji ber ku min bawer nedikir kesek ji insanên niha dirêjtir be, min tabût vekir û mirî dît. Tabût, li gor bejna mirî bû, min ew pîva û cardin ax kir ser û veşart." Mêrik yên dîtibûn saf saf digot; lê gotinan bala yê din kêşabû, li gor îşaretên kahîn dabûn, digihişt wê netîceyê ku ev dikare Orestes be û ev lihevanîn dikir: Herdu kûreyên hesinker, herdu ba ne, çakûç û sindan, şerê li hemberî hevdû bûn; hesinê tê kutan, ezîyeta ji ezîyetê çêdibe, ev jî kitekitek wek bêsi'ûdîya insên bi îcada hesin şirove dikir. Lîkhasê ku ev tevde di mejîyê xwe de anîn ba hev, di cih de vegerîya Sparta. Mesele ji Lakedaîmonîyan re got. Lakedaîmonî tawanek li hev anîn û dan dadgehê, ew ji welat derxistin. Ew jî cardin hat Tegeayê, çû bal hesinker û gazin ji tiştên hatine serî kir, bêyî ku lê guhdar bike wî mirovî gotîye na, xwest wê hewşê kirê bike. Piştre gihişt armanca xwe, li wir bi cih bû, tabut vekir û hestî berhev kirin û bir Spartayê. Ji wê rojê heta niha, çi wextê herdu xelk bixwazin hevdu biteqilînin, di şer de her tim Lakedaîmonî bi ser ketin. Û ji niha ve beşeke mezin a Peloponezê di destê wan de ye.

[69] Niha em cardin bên ser Kroîsos; dema ku ew bi vê rewşê hesîyaye, mirov şandine Spartayê, wan bi diyarîyan re pêşnîyaza Kroîsos jî dibirin ku digot "em bibin hevalbendê hev" û ew zimanê wê bikar bianîna jî baş bi wan dabûn fêmkirin. Lê binêrin wextê gihiştin Spartayê çawa axivîne: "Kroîsosê hikumdarê Lîdyayê û yên cihên din, em şandine vir ku em ji we re vê bibêjin: Ey Lakedaîmonî, kahînê îlahî ji min re emir kir ku di welatê Yûnanê de li pey hevalbendîyekê bigerim; wekî xelkê sereke yê Yûnanîstanê hûn ji min re hatin nîşankirin; belê niha min jî guhê xwe da kahîn û ez dixwazim bi we re bê hîle û derew em bibim dost û yekîtîyê pêk bînim." Peyama Kroîsos bi mirovên xwe re şandibû wiha bû. Ji pêşî de xebera Lakedaîmonî ji wê kehaneta ku ji Kroîsos re hatibû şandin çêbûbû; bi hatina Lîdyayî şa bûbûn û biryara

îmzakirina peymaneke dostanîyê û yekîtîyê ya bi sondan hatîye perçînkirin dan. Jixwe danûstendina Kroîsos berîya niha jî li hemberî wan baş bû, ji ber vê bi wî ve hatibûn girêdan: Ji bo çêkirina peykerê Apollon li girê serê Çiyayê Thormaxê yê li Lakonîayê, mirov şandibûn Sardesê û xwestibûn zêr bikirin û Kroîsos jî teqsîr nekiribû û ew zêrê xwestibûn bikirin dabû wan.

[70] Ev bîranîn jixwe ew ber bi lihevkirinê ve dikêşa. Ji ber ku Kroîsos ji nav hemû Yûnanîyan ji bo bibin dost ew hilbijartibûn, Lakedaîmonî pê serbilind bibûn. Tenê bi qebûlkirina daxwazê neman, krateroseke ji bronzê, derveyî wê neqişkirî, dora devê wê bi wêneyên heywanan xemilandî, krateroseke 300 amforî jî dan çêkirin; wan bi xwe jî ji bo bi diyarîyê bên rûmetdarkirin ev şandin. Lê ev krateros negihişt Sardesê, bi du awayan sebebê wê tê gotin: Li gor Lakedaîmonîyan, Samosî pê hisîyane dema ku krateros bi rê ketîye ku bibin Sardesê, li herêma Samosê, Samosî li keştîyên xwe yên dirêj siwar dibin û êrîşî qefileyê dikin wê talan dikin; lê li milê din Samosî dibêjin: Lakedaîmonîyên di birina krateroseê de dereng mabûn û hîn bûn ku Sardîs ketîye û Kroîsos hatîye girtin, loma krateros li Samosê firotine û kesên taybet ew kirîn, pêşkêşî perestgeha Here kirin. Bi îhtîmaleke mezin dema firoşkar vegerîyan Spartayê gotibin ku ew ji alîyê Samosîyan ve hatine talankirin.

[71] Yên hatin serê krateroseê ev bûn. Di vê navê re Kroîsosê ku kehanetê şaş şirove kiribû, li hemberî Kappadokîayê dest bi seferê kiribû, bi hêvî bû ku Kîros bixe û dewleta Persê hilweşîne. Dema wê bi Persan re dest bi şer bikira, Lîdyayîyekî ku di nav hemwelatîyan de bi aqil û zanetîya xwe dihat naskirin, fikrên xwe jê re bi van gotinan da xuyakirin: (Navê vî Lîdyayî Sandanîs bû.) "Hikumdar, bifikire ew insanên tu hazirî dikî bi wan re şer bikî di çi halî de ne; li ser wan pantolên fireh yên çermînî heye, jixwe hemû cil û bergên wan ji çerm in; ne bi qasî dixwazin, bi qasî heyî dixwin, ji ber ku erdê wan bi kevir e. Nizanin şerabê vexwin, vexwarina wan av e; ji bo devê xwe şêrîn bikin hejîr yan tiştekî wan yê din tune. Madem di destê wan de tiştek tune, heke tu zorîya wan bibî jî dê çi bikeve destê te? Lê heke tu mexlûb bibî, lê binêre ka dê tu çi wenda bikî. Carekê dema tiştên li ba me tahm kirin, wê pê ve bên grêdan û careke din bernadin. Heke bi min bimîne, ez şikur ji xudayan re dikim ku fikra ajotina ser Lîdyayê naxe serê Per-

sîyan." Kroîsos guhê xwe neda van nêrînan. -Bi rastî jî berîya Persî Lîdyayî mexlûb bikin yek tiştê wan yê luks û baş tunebû.

[72] Yûnanî ji Kappadokîyan re Sûrîyî dibêjin. Ev Sûrîyî, berî bikevin bin hakimîyeta Persîyan, girêdayî Medîyan bûn. Sinorê di navbera erdê Medîyan û Lîdyayîyan de, di eslê xwe de Çemê Halysê[42] bû, ku ev rûbar ji çiyayên Ermenîstanê derdikeve. Ew Kîlîkyayê derbas dike, Matîenîyê[43] digre rexê xwe yê rastê û Frîgyayê jî digre rexê xwe yê çepê, di navbera van herdu welatan de diherike; piştî ji van welatan derbas bû, ber bi bakur ve difitile, di navbera Sûrîyên Kappadokî û Paflagonyaya qiraxê çepê de sinor çêdike. Belê, tê wê manayê ku Rûbarê Halysê hema bêje Asyayê ji serîkî heta serê din dibire, li milekî qiraxê dikeve hemberî girava Qibris(Cyprus)ê, li milê din qiraxên Deryaya Reş. Vir wekî nuqteya stûyekê ye û kesekî pêsivik dikare vê rêyê di pênc rojan de biqedîne.

[73] Du mebest hebûn ku Kroîsos êrîşî Kapadokyayê bike: Yek; daxwaza ku erd li împaratorîya xwe zêde bike; ya duduyan û sedema sereke ew bû ku dixwest tola Astîyago ji Kîros hilîne û jixwe kahîn jî hêvîya serkeftinê dabûyê. Kîrosê kurê Kambîses, wê serdemê hukumdarîya Medîyan hilweşandibû. Astîyagoê kurê Keyxusrew wî wextî hukumdarê Medyayê û zavayê Kroîsos bû û bi destê Kîros hatibû mexlûbkirin. Kîros, Astîyago hêsîr girtibû. Astyag çawa bûbû zavayê Kroîsos? Wiha bû: Hozeke Îskîtî piştî serhildanekê, bi dizî baz dane Medîa. Wê serdemê Keyxusrewê kurê Ferhat û nevîyê Dîyako hikumdarê Medîyan bû. Keyxusrew di destpêkê de ew baş pêşwazî kirine, qedir daye Îskîtîyên mihacir. Ewqas rêz li wan girtin heta çend zarokên Medî danîbû ba wan ku hînî zimanê Îskîtî û hunera tîravêtinê bibin. Îskîtî bi berdewamî diçûn nêçîrê û her carê nêçîrek dianîn. Midetek derbas bû û carekê dema çûn nêçîrê, tu nêçîr bi destê wan neket. Keyxusrew kesekî gelekî bêcir bû. Dema Îskîtî destvala bi ser de hatin, Keyxusrew ew êşandin û biçûk xistin. Îskîtîyan hereketê Keyxusrew ji xwe re şayanê bêhurmetî qebûl kirin û ji ber wê biryar dan toleyê jê werbigirin. Wan bêsekin yek ji wan zarokên şandibûn ba wan, hûr kirin[44] û di cihê goştê nêçîrê de

42 Tirkan navê Kizilirmak(Çemê Sor) li Çemê Halîsê kirine.

43 Matîenî mîrekîyek bapîrên Kurda ya li binya gola Ûrmîyê bû.

44 Di beşa 119an de wek ku Astîyago anîye serê Harpagos. Herdu jî çîrok in.

danîn ber hikumdar. Biryar jî dabûn ku piştî vî karî xwe bidin hev, wir terk bikin û di riya herî nêzîk de xwe bigihînin bajarê Sardesê penayê bal Alyattesê kurê Sadyates bibin. Îskîtîyan ev plan pêk anîn. Keyxusrew û mirovên wî li dora sifreyê rûniştin û dest bi xwarina goştê zarok kirin û Îskîtî jî piştî vê m'erîfetê xwe avêtin bal Alyattes, hêvî û lava kirin.

[74] Keyxusrew ew paşve xwestin, lê Alyattes neda. Ji ber vê meselê di navbera Lîdyayê û Medan de şerekî pênc sal bidome derket, gelek caran Medan li Lîdyayîyan xistin, gelek caran ew jî li wan dixistin. Carekê dest bi şerekî ecêb yê şevê kirin; şer di nav şertên wekhevîyê de didomîya ku, di sala şeşan de, di esnayê lihevdûketinê û dema tevlihevbûna herî zêde ya derûdorê de, roj cihê xwe ji şevê re hişt. Thalesê Mîletosî, berê behsa vê rojgirtinê ji Îonîayîyan re kiribû; heta sal û roja wê jî gotibû. Lê dema ku Lîdyayî û Medîyan dîtin di nîvê rojê de bûye şev, şer sekinandin û bêsekin lihevhatinek, peymaneke aşîtîyê çêkirin. Syennesîsê Kîlîkyayî û Labynetosê Babîllî ji bo navbeykarîyê hilbijartin. Van, di cihê birinûanîna sondên aştîyê de, dezgeheke zewacê ya herdu hikumdaran bînin ba hev saz kirin; gotin ku bila Alyattes, keça xwe Aryenîsê bide Astîyagoyê kurê Keyxusrew; ji ber ku heke benik saxlem nebe lihevhatin li ber xwe nade. -Di nav van miletan de sûndxwarin wekî di nav Yûnanîyan de ye, bi ser de çermê zendê xwe jê dikin û xwîna hevdû dimijin.

[75] Belê Kîros, di eslê xwe de Astîyago ku dibe bavê dêya wî, ji ber sebebê ku ez ê piştre behs bikim, mexlûb kiribû û xwestina Kroîsos ya êrîşkirina ser Kîros ji vê bû, loma bi kahîn şêwirîbû û pirs kiribû "gelo pêwist e li hemberî Persan şer bike" û bersiva dualî li gora bi kêrî wî bê şirove kiribû û li hemberî wan şer dabû destpêkirin. -Dema ku Kroîsos hat qiraxê Halysê, eskerên xwe ji pirên heyî derbas kirîye, ez wisan texmîn dikim; heke mirov li gotegotên li Yûnanîstanê belav bûne binêre, Thalesê Mîletosî çareyên derbasbûna ji rûbarê nîşanî wî daye. Tê gotin, bêhna Kroîsos gelekî teng bûye, ji ber ku li gor wan, ew pirên berîya niha min behs kirin, wî wextî nehatibûn avakirin. Wî wextî Thales li cihê baregehê bû, rûbarî li milê çepê yê leşker ve dihat dîtin, wê li milê rastê re jî da herikandin. Wî ev kar wiha kir: Li cihê baregehê ber bi jor ve û wekî nîvheyvekê xendeqeke kûr da kolan, bi awayekî wisan ku rûbar ji coka xwe yê kevin derkeve, li îstîqameta vajî ya cihê baregehê dadiket û piştî li dora wê dizivirî cardin diket rêya xwe ya

berê. Bi vî awayî derbasbûna ji rûbarê dibû du beş û rehettir dibû. Hinek dibêjin, "riya rûbarê ya kevin bi carekê hat zûhakirin." Lê ez nikarim vê qebûl bikim, heke wisan bûya, wê di vegerê de çawa rûbar derbas kiribana?

[76] Kroîsos, piştî bi leşkerê xwe ve ji rûbarê derbas bû, gihişt cihekî li Kappadokyayê ku jê re Pterîa tê gotin. Pterîa li vê herêmê cihê herî saxlem e; kêm-zêde dikeve herêma Sînopeyê bajarê naskirî yê Eûxîne(Derya Reş). Li wir baregeh veda û welatê Sûrîyan talan kir; serekbajarê welat girt û xelkê wê kir kole; li derdoran çiqas gund û navçeyên hebûn hemi girtin û ew Sûrîyên ku tu zerarek nedabûn wî mecbûr kirin ku koç bikin. Kîros leşkerê xwe berhev kiribû, ji temamê miletên ku di nav wan re derbas dibûn jî beşdar dibûn, hêzên xwe bi wan xurt dikir û ber bi Kroîsos ve dest bi meşê kiribû. Berîya wî ji erdê xwe derêxe, ji Îonîayîyan re qasid şandibû û xwestibû li hemberî Kroîsos rabin. Îonîayîyan guh nedanê. Di dawîyê de Kîros, gihişt Kroîsos û hat li Pterîayê li hemberî wî baregeha xwe veda, dest bi kar kirin û hevdû teqilandin. Şer mezin û xwînî bû û ji herdu alîyan jî hejmara kuştîyan pir bû; di dawîyê de şevê wan ji hevdû veqetand, yê serketî û mexlûb kifş nebû.

(77) Ev şerê yekem wiha xelas bû. -Kroîsos xwe bi xwe hêrs dibû, ji ber ku hejmara leşkerên wî hindik bû. Hejmara ajotibû nav şer ji ya Kîros gelek hindiktir bû. Ji ber ku xwe neserketî didît û roja din dît ku Kîros ji nû ve êrîşî wî nekir, rêya Sardesê girt; li hêvî bû ku ji Misrîyan alîkarîyê bixwaze, ew bi sondan bi hev ve girêdayî bûn, ji ber ku berîya hevalbendîya bi Lakedaîmonîyan re, bi hikumdarê Misrê Amasîs re peymaneke hevgirêdanê çêkiribû; dê ji Babîlê jî esker bixwesta, ji ber ku li Labynetosê hevalbendekî wî yê desthilatdar hebû. Yek jî dê ji Lakedaîmonîyan re xeber bişanda, bigota di dema ku bê kifşkirin de amade bin; dê hemî hêza xwe berhev bikira û leşkerê xwe jî amade bikira, piştre wê li hêvîya xelasbûna zivistanê bimaya û di destpêka biharê de li hemberî Persîyan dest bi meşê bikira, bi vî awayî plan dikir. Bi vê fikrê hat Sardesê û bêsekin ji hevalbendên xwe re qasid şandin, tembî li wan kirin ku çar meh şûn de li Sardesê amade bin. Ji artêşa di destan de yê ku bi Persan re şer kiribû, rê da eskerên bi pera û hejmara wan kêm kir, qet nediket bîra wî ku Kîros dê têke serê xwe û piştî şerekî netîceya wê nekifş, pey ve heta Sardesê bê.

[78] Dema Kroîsos hîn di nav van planan de bû, dora Sardesê tijî mar bûn û piştî ev heywanên diherikîn derdorê derketin holê, hespên di mêrgan de diçêrîyan dev ji çêrînê berdan û dest bi xwarina wan kirin. Kroîsosê ku bû şahidê vê dîmena ecêb, ev wekî mûcîzeyekê dît. Bêpayîn ji bo şêwrê serî li kahînên Telmessosê[45] da. Qasidên wî hatin Telmessosê û manaya mûcîzeyê jî hîn bûn, lê nikarîbûn bigihînin Kroîsos, ji ber ku dema keştî ew dibirin Sardesê, Kroîsos li milê din hêsîr ketibû. Lê em cardin şiroveya Telmessosîyan bêjin; gotibûn: "Kroîsos, bila li bende be, artêşa miletekî biyanî wê têkeve welatê wî; dê ev li welat belav bibin û xwecihan bikin bin desthilata xwe; ji ber ku mar kurê axê ye, hesp jî heywanekî şerker û koçber e." Dema ku Telmesssosî ev bersiv dan, jixwe Kroîsos hatibû girtin, lê haya wan ji tiştên li Sardesê qewimîbûn û felaketa hatibû serê Kroîsos tunebû.

[79] Kîros, piştî şerê Pterîayê, dema ku Kroîsos derket rê, tê derxistibû ku Kroîsos difikire di vegerê de eskerê xwe terhîs bike; dilê wî jê re digot, bêyî li hêvîya ku Lîdyayî hêzên xwe berhev bikin bimîne, bi hemî hêza xwe bimeşe ser Sardesê. Wextê biryar da, bêrî ku wext derbas bike dest bi tetbîqa wê kir. Artêşa xwe kir Lîdyayê; heta ew li hemberî xwe nedît, haya Kroîsos jê çênebû. Her çend bêpayîn li ber êrîşê ket, ji ber ku yên qewimîn, ji yên li hêvî bûn cûda derketin, Lîdyayî ajotin şer. Wî wextî di Asyayê de tu milet, di mêrxasî û bihêzîyê de nedikarî zendê Lîdyayîyan bitewîne; li ser hespan şer dikirin, rimên wan yên mezin hebûn û siwarên hoste bûn.

ŞERÊ SARDESÊ

[80] Herdu artêş, di deşta li pêşîya Sardesê ya bê serûbinî dirêj dibe ketin pêşberî hev. Rûbarê Hyllosê[46] û hinek rûbarên din di vir re diherikin, hemû jî ji Çiyayê Pîroz yê Dayîka Dindymenîyan derdikevin û tevlî Rûbarê Hermosê dibin yê li nêzî bajarê Phokaîayê[47] diherike deryayê. -Kîros, dema dît ku Lîdyayî ji bo şer xwe li deştê rêz kirine, xofa siwarîyên wan pê re çêbû û bi gotina Harpagosê Medîayî kir, ev tedbîr wergirtin: Temamê deveyên ku

45 Telmesos/Niha bi navê Fethîye ye

46 Hyllosê di erdê navçeya Demîrcî ya bajarê Manîsa ve girêdayî ye.

47 Phokaîa bajarekî antîk e, niha li Tirkîyê di navbera bajarê Îzmîr û navçeya Foça de ye. Ji Rûbarê Hermos re jî dibêjin Rûbarê Gedîz

xwarin û tiştên din li wan bar kiribûn û di pey artêşê de dihatin berhev kirin, barên wan anîn xwarê; eskerên siwarî li wan siwar kirin, dema ev hazirî temam bûn, emir da wan û ajotin ser siwarîyê Kroîsos. Qismê leşker yên din li pey wan bûn; li gor emrê hatibû dayîn, dê peyade li pey van deveyan bimeşîyana, li pey wan jî hemî yekîneyên siwarî rêz bûbûn. Piştî herkesî cihê xwe girt, emir hat dayîn ku temamê Lîdyayîyên li hember rabin, bêeman bikujin, lê tenê Kroîsos, heta heke dora wî bê pêçan û xwe biparêze jî neyê kuştin. Emir wiha bû. Derxistina deveyan li hemberî hespan ji ber vê bû: Hesp ji deveyan ditirsin, tehemula wan ne ji dîtin û ne jî ji bêhna wan re heye. Belê Kîros, bi wê hosteyîyê siwarîyên Lîdyayî yên li hêvîya wan û mûcîzeyan bûn bêtesîr kirin. Dema ku şer dest pê kir û hespan bêhna deveyan stendin û ew dîtin, hemî hêvîyên Kroîsos şikandin û ew serûbin kirin. Lîdyayîyên ku ev hal dîtin qet neketin nav tirsê, ji hespên xwe peya bûn û bi peyatî meşîyan ser Persîyan. Ji herdu milan jî wendayîyên mezin çêbûn. Di dawîyê de Lîdyayî ji meydana şer paşve kêşîyan û xwe avêtin pişt dîwarên kelehê. Persîyan jî bajar dorpêç kirin.

[81] Lîdyayî hatibûn dorpêçkirin. Kroîsos lê nêrî ku dê dorpêçî dirêj bikêşe, ji hevalbendên xwe re qasidên nû şandin; yên pêşîyê çûbûn, xebera çar meh şûn de li pêşîya Sardesê amade bin biribûn; yên nû dê xebera dorpêçê bibirina û ji wan bixwestina di demeke gelek kurt de alîkarî bigihandana wan.

[82] Kroîsos, wekî hemî hevalbendên xwe yên din, ji Lakedaîmonîyan re jî qasid şandibû. Lê tam di wê navê re, Spartayî, li ser wî cihî ku ew bi xwe jî jê re Thyrea dibêjin, bi Argosîyan re serê wan ketibû belayê; vir di nav erdê Argosîyan de bû û Lakedaîmonîyan dest danîbûn ser. Welatê ber bi rojavayê ve dirêj dibû, heta Pozê Maleayê her tim ya Argosîyan bû û bi Kytherayê re giravên din jî daxilî vî erdê bejahîyê dibû. Argos, hat hawara bajarê ku erdê wê jê hatibû qutkirin. Danûstendin dest pê kirin; li ser ku ji herdu alîyan tenê 300 leşker şer bikin li hev kirin; kê qezenc bikira wê Thyrea ji wan re bimaya. Herdu artêş dê heta sinorên xwe paşve bikêşîyan, ji bo dema di şer de zorîya hemwelatîyên wan biçûya bi hewara wan de neçûna. Dema biryar hat dayîn yekîne dûr ketin û ji herdu milan şerkerên bijarte dest bi şer kirin. Şer wekhevîya wan derxist holê, ji 600 mêrxasan sê kes li ser pîyan man, dudu Argosî: Alkenor û Khromîos û Othryadesê Lakedaîmonî; yên

herî dawîyê ev mabûn dema şev şer rawestand. Wî wextî herdu Argosî, xwe qezenckirî hesêb kirin û baz dan çûn Argosê; lê Othryadesê Lakedaîmonî, çekên Argosîyên kuştî berhev kirin û birin cihê baregeha xwe, piştre hat cihê xwe yê şer girt. Roja din herdu artêş, ji bo ku netîceya şer bizanibin hatin. Pêşî herdu terefan jî digotin em serkeftine; alîyekî, ji me zêde mirov paşde man digot, yê din jî digotin, yên mayî baz dane, lê şervanê me di cihê xwe de maye û çekê mirîyên dijmin berhev kirine; di dawîyê de ev xirecir rê da ku tevlihevîyek çêbibe; ji herdu milan jî gelek kes telef bûn û Lakedaîmonî bi ser ketin. Li ser vê yekê, Argosîyên ku li gor adetê xwe porê xwe dirêj dikirin êdî pore xwe jêkirine û lanet dibarandin, heta Thyrea neyê stendin tu Argosî wê porê xwe dirêj nekira û jinên wan jî xişrên zêr wê bi xwe venekirina. Lakedaîmonî jî biryareke bi eksê wê wergirtibûn: porên wan yê ku heta wî wextî kurt bû, êdî wê dirêj bikirina. Em bên ser Othryadesê ku ji 300 şervanî ew tenê sax mabû, ji bo wî dibêjin; ji ber ku hemû hevalên wî yên şervan hatibûn kuştin û ew tenê maye, pir li ber ketîye û di cihê paşve vegere, di eynî cihî de, li ser erdê Thyreayê xwe kuştîye.

[83] Belê, tam di hîna van bûyeran de qasidê Sardesê hatîye; ji Spartayîyan hatina hawara Kroîsosê di bin dorpêçîyê de alîkarî dixwest. Spartayîyên guhê xwe dan qasid, bi ser ew belayê hatîye serê wan, ji bo biçin alîkarîyê dest bi amadekarîyê kirin. Amadekarî temam bûbûn û tam dê keştî biketa rê, xebereke din hat û gotin bajar ketîye, Kroîsos sax ketîye dest. Di gel ku ev wek felaketeke mezin hesêb kirin, amadekarî dan sekinandin.

KETINA SARDESÊ

[84] Sardes bi vî awayî hatibû stendin: Di roja çardehan a dorpêçê de, Kîros ji hin siwarîya xwest ku di nav artêşê de bigerin û ragihînin; ew ê xelatê bide yekem kesê ku çeperan derbas bike. Herkesî ceriband, lê kesek nikarîbû derbas bibe û tevan jî dest ji vê berdan, tenê kesekî Mardîanî yê bi navê Hyroîades, biryar da ku xwe nêzî kelê bike û li cîhekî ku qet nobedar lê nehatibû danîn xwe biceribîne. Alîyek ew qas berz bû li wir nobedar tunebû, ji ber ku tirsa ji wir êrîşek bê tunebû, tûj dadiket, ne cihek bû ku êrîş jê bê. Melesê hikumdarê kevin yê Sardesê, şêrê hevalê xwe yê odeyê tenê di vir re derbas nekiribû. Zaneyên Telmessosê gotibûn "Heke ev şêr li seranserê dora sen-

geran tam bizîvire, Sardes nikare bê stendin." Meles heywan di hemî cihên derdiketin akropolê re derbas kiribû, tenê guhê xwe nedabû wî milî, gotibû ku "vir gelek tûj e, ji vir êrîşek nayê". Li vir li milê bajêr yê li Tmolosê dinêre. Eskerekî Lîdyayî, li pey mîxfera xwe ya ketibû daketibû vê palê, rahiştibû mîxfera xwe û cardin hilkişîyabû jorê. Hyroîadesê me yê Mardîayî, ew dîtibû û hişê wî ketibû ser wê û di serê xwe de biribû û anîbû. Wê rojê ew bi xwe jî karîbû hilbikêşe, Persîyên din jî wekî wî hilkişîyabûn; dema ku miqtarekî zêde kes ji bedenê kelehê derbas bûn, Sardes ket û hat talankirin.

[85] Em bên ser Kroîsos, tiştên hatin serê wî ev in: Kurekî wî hebû, berîya niha jî min got, kesekî xort, xwedîyê hemî rewiştçakîyan, lê lal bû. Di rojên bextewarîya xwe yê berê de Kroîsos ji bo wî baş bike çi ji destê wî hat kiribû, bi hezaran çare ceribandibû, di vê navê re serî li kahînê Delphoîyê jî dabû. Pythîa ev bersiv dabû wî:

> Hikumdarê bi hêz yê Lîdyayê, tu qet ne bi îhtîyat e
> Di seraya xwe de sehkirinê nexwaze
> Ew dengê zarokê te yê te ewqas bêrîyê kirîye.
> Bêdengîya wî ya ku niha tu dorpêç kirîye hê xêrtir e
> Ji ber ku dê ew, di rojeke biêş de biaxive.

Roja ketina bajêr, Persîyên ew nas nedikirin, ji bo wî bikujin diçûn bi ser de. Kroîsos ew dîtin, lê felaketeke wisan hatibû serî ku nema xwe hêjayî parastinê didît; êdî mirin ji bo wî ne tiştek bû; lê kurê wî yê lal, hatina Persîyan dît, ew tirs û êşa ketibû dil, ew benên zimanê wî girê dabûn qetand û qêrîya, got "Kroîsos nekuje!". Cara ewil bû diaxivî û êdî di seranserê temenê wî de zimanê wî vebûbû.

[86] Belê, Persîyan, Sardesê û Kroîsos bi vî awayî bi dest xistin, piştî çardeh sal seltenetê, di dawîya dorpêça çardeh rojan de, bi saxî ket destê wan. Bi vî awayî împaratorîyek kavil û wêran kir, wekî kahîn gotîbû, yanî ya xwe. Persîyan ew hêsîr girtin û birin ba Kîros. Kîros dar dan komkirin, Kroîsosê zincîrkirî derxist ser; li herdu alîyên wî du car heft zarokên Lîdyayî cih girtibûn. Gelo Kîros dixwest van wekî pêşkêşa xenîmetê qurbanî xudayan bike? Gelo nezrek wî hebû dixwest wê pêk bîne? Yan jî hîn bûbû ku Kroîsos

çiqas girêdayî dînê xwe ye, ew danîbû ser koma daran û digot, bila xudayên wî bên wî ji şewitandina bi saxî rizgar bikin? Ji ber çi be bila bibe, dibêjin wî wiha kir. Û li ser zêde dikin: Kroîsos, li ser koma daran li ser pîyan sekinî bû; bi vî awayî tam di orteya felaketekê de, fêhm kiribû ku di gotinên Solon de yên ji wî re hatibûn gotin, hişyarîyek Xwedê hebû: "Tu jîndar ne bextewer e"; melhezeya vê kiribû, ji singa wî nalîneke kûr derketibû û ji tarîtîya bêdengîya xwe derketîye, sê caran, "Solon!" gotîye û qêrîyaye. Dema Kîros vê seh dike, emir dide mirovên xwe, "ji Kroîsos bipirsin ev kesê bangî wî dike kî ye?" Wan xwe nêzîkî koma daran kirin û pirsîn. Kroîsos demek dirêj bêdeng ma, bersiv neda pirsa wan, piştre li ser emrekî mutlaq, ev gotin: "Mirovek e ku, heke yên dinyê birêve dibin bikarîbûna bi wî re biaxivin, ev ji bo min ji xezîneyên mezin zêdetir bi qîmet bû." Ji van gotinan tu mane dernexistin û xwestin wateya van gotinan pê bidin gotin. Di miqabilî pirsên bihêrs yên ku pêsîrê xwe jê xelas nekir, behs kir bê çawa berî demeke dirêj Solonê Athenayî hat, li hemberî tiştên dîtin çawa heyirî ma, ew bi gotinan çawa kêm kir û bûyer çawa bûn, di 'eslê xwe de gotinê wî ne tenê ji bo Kroîsos bûn, bi pirayî ji hemî insanetîyê re bûn û bi taybetî heq daye gotinên ku berê xwe dane kesên bawer dikin ku bextewer in; bi nîyeteke dostane yek bi yek ev gotin. Dema ku Kroîsos ev digotin, agir berdabûn koma daran, ji serî heta binî pêtê ew dorpêç kiribû. Lê dilê Kîros yê ji devê wergêran ev gotin guhdar kiribûn êşîyabû û melheze dikir ku bi xwe jî insanek e û mirovê ku ji bo bi saxî bişewitîne kiribû nav agir, ji hêla dewlemendîyê ve tiştekî wî yê jê hesûdî bike tunebû û tirs ketibû dilê wî ku dibe rojekê tiştekî wiha bê serê wî jî, ji ber ku di dinyê de tiştekî ku ewlehîyê bide insên tune ye. Di cih de emir da ku agir bê vemirandin û Kroîsos û hevalên wî ji ser daran bînin xwarê.

[87] Lê di gel hemî hewildanan agir nedihat tefandin. Çîrokên Lîdyayê dibêjin, wî wextî, dema ku Kroîsos vê helwêsta Kîros ya hatîye guhertin ferq kirîye û hewlê herkesî yê ji bo tefandina agir dibîne, lê nekarîn vemirînin, bi dengekî bilind ji bo bê hawara wî bangî Apollon dike, bi hêvî û lavayan, ji bo xatirê wan diyarîyên sipehî yên pêşkêş kirine, îro alîkarîya wî bike û wî ji vê tehlîkeyê rizgar bike. Dema bi vî awayî çavên wî tijî rûndik lava ji Xuda dikir, ji asoyeke vekirî û hewayeke bêlebt sekinî 'ewrek berhev bû û vereşîya, wekî lehîyê baran barîya û agir tefand. Kîros bi vê fikirî ku Kroîsos li ba îlahan kesekî bi rûmet yê ku qîmeta wî tê zanîn e; ew anî xwarê û jê

pirsî: “Kroîsos, kê ji te re got ku tu êrîşê erdê min bikî û ji bedêla tu bi min re bibe dost tu bi dijminayî derkeve miqabil min?” Kroîsos got “Hikumdar, yê ev kir talihê te yê baş û yê min yê xerab e. Qebehet ya îlahên Yûnanistanê ne, yên ku kirin ez bi pozbilindî bimeşim bi ser te de. Ji ber ku kesek ewqas ne dîn e ku di cihê haştîyê de daxwaza şer bike; di aştîyê de kur bavan vedişêrin, lê di şeran de bav lawên xwe berdidin binê gorê. Lê bêguman kêfa xudayan dihat ku wiha be.”

[88] Axaftina wî wiha çêbû. Kîros benên wî da vekirin, li rexê xwe da rûniştandin û gelek baş û xweş pê re da û stend; ew bi xwe û yên dora wî bi heyranî lê dinêrîn. Kroîsos ketibû kurahîya ramanan de, dengê wî dernediket. Piştre Persîyên ku bajarên Lîdyayîyan talan dikirin bala wî kêşa: Got: “Hikumdar, di derheqê tiştên ez dibînim ez dikarim fikrên xwe bêjim; yan ez bêdeng bim?” Kîros jê re got, çi tiştên tu dixwazî tu çawa dixwazî tu dikarî bêjî. Kroîsos jê pirsî: “Ev qelebalixa han çi dike, wilo bi dil û can?” Kîros got “Bajarê te talan dikin, hebûn û tunebûna te parve dikin.” Kroîsos bersiv da: “Yên talan dikin ne bajarê min û hebûnên min in; yek ji van ne yên min in êdî; yên tên talankirin, yên ji xwe re dibin hemî malên te ne.”

[89] Kîros li hemberî van gotinan ket gûmanan. Yên li ba xwe raqewirandin û jê pirsî; li hemberî vê rewşê rêya ji bo wî ya herî bi feyde kîjan e? Kroîsos got: “Madem xudayan ez wekî kole dam te, pêwist e yên ez dibînim û tu nabînî ji te re bêjim. Persî li gor xulyaqetên xwe yên pergalnenas feqîr in, heke tu li van ên xezîneyan ji xwe re didin hev tenê temaşe bikî, ya wê bê serê te ev in: Di nav wan de yê herî zêde pere bi dest bixe, bizane ku dê li hemberî te bisekine. Niha, heke tu guhê xwe bidî min, wiha bike: Hin nobedaran ji mirovên xwe hilbijare deyne ber derîyan; bila xezîneyên ku derdixin derve bistînin û ji wan re bêjin ku, lazim e ji dehan yekê wê ji Zeûs re bê veqetandin. Bi vî awayî dema ku tu xezîneyê ji destê wan digrî li hemberî te tu bertekî çênabî û dê esker bawerî bi rastîya niyeta te bînin, wê bi dilxwazî yên di destê xwe de bidin.”

[90] Ev gotin gelek kêfa Kîros anîn, ji ber ku li hesabê wî dihat; ji Kroîsos re gotinên şêrîn gotin û wî çi got, ji mirovên xwe re emir kir ku wê bikin. Piştre ji wî re wiha got: “Madem tu bi dilovanîya minasib ya li gorî hikumdarekî hereket dikî û wisan diaxive, niha tu jî çi daxwazên te ji min hene

bêje." Kroîsos got: "Ya mîrê min, eger tu bihêlî ku ez van zencîran bişînim ji xwedayê Yûnanan re, yê ku min berê ew di ser hemû xwedayên din re digirt û qedir didayê û jê bipirsim, gelo hikmeteke kesî heye ku xêrxwazên xwe bixapîne an na; qencîya herî mezin a ku tu dikarî bi min bikî ev e." Kîros jê re got; wî wextî vê sebebê gazinda xwe ya tu dixwazî bigehînî îlah bêje. Kroîsos, dest bi vegotina bûyerên kevin kir yên qewimîne, bersivên kahîn, bi taybetî diyarîyên pêşkêş kirine û gotinên îlahî çawa ji bo êrîşî Persan bike cesaret dane wî, yek bi yek hejmartin û gotinên xwe bi hêvî û berger girê da ku destûrê bidêyê ji wî xudayî re xebera bide û rexne bike. Kîros bi bişirîn bersiva wî da: "Kroîsos, ev daxwaza te û yên din ku tê firseta daxwazê bibînî, dê bên bicihkirin." Dema ev destûr stend, Kroîsos Lîdyayî şandin Delphoîyê; emir da wan ku wan zincîran deynin ber derîyê perestgehê û ji îlah bipirsin: Te qet şerm nekir, dema bi kehanetê te cesaret û bawerîya hilweşandina împaratorîya Kîros da û ji bo şerê bi Persîyan re te Kroîsos han da? Belê, ji talana wê împaratorîyê xenîmeta bikeve destê te tenê ev zincîrên han in -wextê ev bigotina wê zincîr nîşanî wî bidana; ji bilî vê, îlahên Yûnanî nankor in tê gotin, gelo tiştek wiha heye? dê ev jî bipirsîyana.

[91] Lîdyayî gihiştin perestgehê û wezîfeya xwe pêk anîn. Dibêjin Pyhtîa bi vî awayî bersiv da: "Xudayek jî nikare nivîsa enîyê biguhere. Kroîsos, ji ber gunehê bav û kalê xwe yê çaremîn hat cezakirin, ku dema ew yek ji parêzvanên kurên Herkulesîyan bû, bû wasiteya xiyaneta jinekê û mîrê xwe kuşt, bi neheqî dest danî ser text; loma nivîsa enîyê bi cih kirîye. Loxîab, xwestibû xerabûna Sardesê, bi paş bixe têxe dema zarokên wî û Kroîsos xelas bike, lê nikarîbû wî ji destê qederê rizgar bike. Nivîsa enîya wî çi jê re minasib dît ew kir, lê xizmetên xwe jî ji Kroîsos re texsîrî nekirin; ji ber ku sê salan ketina Sardesê paşve da û bila Kroîsos vê jî baş bizane, ew bixwe jî sê sal piştî roja kifşkirî hatîye girtin. Ji bilî vê, dema wê bihata şewitandin yê hat hawara wî cardin Loxîas bû. Em bên ser gotinên kahîn. Mafê Kroîsos tune ji wê jî gazindan bike. Loxîas jê re xeber şandîye, gotîye; heke êrîşî Persîyan bike wê împaratorîyeke mezin hilweşîne. Ger baş bifikirya, dê careke din mirov bişanda û bipirsya, gelo ev împaratorîya dê hilweşe ya min e yan ya Kîros e. Gotinên xuda fêhim nekir, yên piştî wê jî nepirsî, wî wextî bila xwe tawanbar bihesibîne. Ji xeynî vê, di bersiva pirsa wî ya dawîyê de, ma Loxîas jê re behsa qantirekê nekir? Belê, guhê wî ev jî seh nekir, ew qantir Kîros bû;

ji ber ku dê û bavê wî ji nîjadên cuda bûn; dê banûya Medîayî qîza hikumdarê Medîayê Astîyago bû; bavê wî Pers bû, kesekî ji rêzê bû, her çendî di her warî de kêmî wê bû jî, bi xanima xwe ya banû re zewicîbû." Cewaba Pythîa ji Lîdyayîyan re wiha bû û wan jî ew birin Sardesê û gihandin Kroîsos. Dema ku ev seh kirin, mukur hat ku qisur ne yên îlahan e, yên wî ne. Belê, derketina ji dest ya cara yekê ya împaratorîya Kroîsos û Îonîayê bi vî awayî bû.

[92] Ji Kroîsos li Yûnanê, ji yên berê hatin hejmartin pêve diyarîyên din jî mane: Sêpêyeke zêrînî ya ji Apollonê Ismenîos ya li Thebaîyê li Boîatîayê re nezir kirîye, nogînên zêrînî yên Ephesosê û piranîya kolonan; ji bilî vê mertala mezin a zêrînî ya ji Athenesa Pronaosê ya ji Delphoîyê re pêşkêş kirîye. Ev pêşkêş, wextê ez derbas bûm li wir bûn û yên din wenda bûbûn. Li ba kurên Brankhosê Mîletosî jî, li gor riwayetekê, di eyar û giranîya yên Delphoîyê de hîbe hebûne ku, ew jî Kroîsos dane. Yên li Delphoîyê û di perestgeha Amphîaraosê de jî malên wî ne, perçeke ji hatinîyên wî bûn; yên din, malê kesekî dijmin ê ku hê ew nebûbû hikumdar, li hemberî wî derketibû û ji bo Pantaleon bike desthilatdarê Lîdyayîyan şelafî dikirin. Ev Pantaleon kurekî din yê Alyattes bû, birayê Kroîsos yê dayîka wan cihê bû; Kroîsos ji jineke Karyayî[48] çêbûbû, Pantaleon ji jineke Îonîayî. Piştî li ser daxwaza bavê xwe Kroîsos derket ser text, ew mirovê li hemberî wî dolab digerandin, li ser çerxeke şehê wê tûj rakêşand û kuşt û hemû mal û milkên vî mirovî ku di pêşî de weke pêşkêşî hatibûn îfadekirin, wekî qasek berê jî min got, ji bo wan pêşkêşên li jorê hatin hejmartin hatibûn xerckirin. Ez ê êdî li ser pêşkêşên Kroîsos tiştekî nebêjim.

ZANYARÎYÊN LI SER LÎDYA Û LÎDYAYÎYAN

[93] Erdê Lîdyayê wekî yên din, ne xwedîyê tiştên awarte ye yên mirov behs bike, tenê qûma wê ya zêrînî ya ji Tmolosê diherike tê heye. Mabedên Misrê û Babîlê ne tê de, mabedeke wisan heye ku yê din hemîyan derbas dike. Ev, gora Alyattesê bavê Kroîsos e, dora wê bi kevirên mezin hatîye lêkirin û timikek ji axê ye. Ev mabed bi pereyên esnafên biçûk, bi keda karkeran

48 Karya/Karîa

û pereyên keçikên biçûk yên firoşkerên evînê hatîye bilindkirin. Di cihê wê yê herî bilind de, dema ez tê re derbas bûm jî pênc heb blokên kevirîn hebûn, di nivîsên li ser wan hatibûn kolan de, her şaxeke pîşeyî ya beşdarê vê bûbû, çiqas dabûn li ser hatibû nivîsandin. Li gor wan reqeman, yê herî zêde dabû, ev keçên biçûk bûn. Ez vê jî bidim xuyakirin; keçên xelkê yên Lîdyayî, hemî jî heta mêr bikin xwe difroşin, çeyîzên xwe bi vê zeneetê çêdikin, jixwe mêrên wan heke keç bixwazin dikarin wan li ba xwe ragirin. Ev gor, çaralî çar stad û du plethron e; firehîya wê sêzdeh plethron e. Li rexê wê goleke mezin heye ku, Lîdyayî dibêjin qet zûha nabe; navê wê Gola Gygaea ye. Belê, di vî warî de jî gotinên min evqas in.

[94] Ûrf û adetên Lîdyayîyan hema hema wek yên Yûnanîyan in, ferqa wan yê heye ev in, Lîdyayê dihêlin keçên wan xwe bifroşin. Di nav yên em dizanin de, cara ewil yên pereyên zêr û zîv lêdane û bikar anîne û cara ewil yên dest bi karê ticareta biçûk kirine, ev in. Ew bixwe dibêjin ku, îro hem di welatê wan de, hem jî li Yûnanistanê lîstikên tên lîstin hemû dahênanê wan in û ev rastî zemanê ku Tyrhenîa[49] kirin kolonî tê; lêbinêrin di vî warî de çi dibêjin: Di dema Atysê kurê Manes de feqîrîyeke kuştarî daketîye ser Lîdyayê. Lîdyayîyan ku midetekê xwe li ber ragirtin, lê dema dîtin ev rewş berdewam dike, li çareyan gerîyan, her yekî li gor xwe çarek pêşkêş kir. Ev lîstikên han, zar, kab, lîstikên gogê, ji bilî tavla, hemî wî wextî derketine; ji ber ku Lîdyayî nabêjin me lîstika tavla dîtîye. Piştî ev lîstik dîtin, ji bo birçîtîya xwe ji bîr bikin lêbinêrin çi dikirin: Ji bo birçîbûna xwe jibîr bikin, ji du rojan rojekê xwe didan lîstikê, roja din lîstik berdidan dest bi xwarinê dikirin. Hejdeh salan wiha jiyan. Lê di cihê feqîrtî kêm be, qirbûn gelekî zêde kir; hikumdar Lîdyayî kirin du beş, got "bila pişk bê avêtin ka wê kî biçe û kî bimîne", yên qedera wan ew li wir hişt wê di bin hukmê wî de bin, kurê xwe yê navê wî Tyrsenos jî wek keyayê wan da ser yên wê koçber bibin. Bi vî awayî yên ji bo ji welat derkevin veqetîyabûn daketin Smyrnayê, li wir bûn xwedîyê keştîyan, tiştên bi kêrî wan bê bar kirin, ji bo welatekî û li pey çareya jiyanê qirax bi qirax pê de diçûn, di dawîyê de heta roja xwe dan ber qiraxa Ûmbrîayê,[50] di deryayê de gerîyan; li wan deran bajar ava kirin û nevîyên wan îro jî li wan

49 Tyrhenîa(rojavayê Îtalya)

50 Ûmbrîa, herêma di nîvê Îtalyayê de ye.

deran rûdinin. Navê Lîdyayê guhertin, navê kurê hikumdar yê ew derxistin rê, li xwe kirin; navê wan yê nû yê Tyrseneyê, ji vî navî vergirtin.

[95] Lîdyayî êdî ketibûn bin desthilata Persan; em ê niha vê ji xwe bipirsin, ev Kîrosê ku selteneta Kroîsos hilweşand kî bû û Asya çawa ket destê Persîyan? Em vê ji cur be cûr vegotinên Persîyan hîn dibin. Ez ê ji nav van, di cihê yên ku ji Kîros re xweş dikin û pesnê wî didin, ez ê behsa yên ku çi qewimîne wekî eslê wan neqil dikin, bikim; her çend ew jî çîroka Kîros bi sê awayên cuda didin, lê ez ê cardin wan bişopînim.

MEDÎ Û PERSÎ - KÎROS

[96] Asûrîyan, ew 520 sal bûn Jora Asyayê xistibûn bin hukmê xwe; pêşî Medî ji wan veqetîyan, ji bo serxwebûna xwe li hemberî Asûrîyan şer kirin, mêrxasî qezenc kirin; ji koletîyê rizgar bûn û azadî bi dest xistin. Piştî wan miletên din jî eynî tişt kirin. Bi awayê ku niha ez ê behs bikim, dema ku ji nû ve vegerîyan ser hukumranîyê, seranser hemî azad bûn: Di nav Medan de kesekî navê wî Dîyako[51] kurê Ferhat[52] yê pir biaqil hebû. Çavê wî li mezinahîyê bû û bi vî awayî dikir: Ji ber ku wê demê Med li gundên belawela û bê desthilatdarîya navendî rûdiniştin, di encamê de bêqanûnî li seranserê welêt serdest bû, Dîyako, ku ji berê ve li gundê xwe mirovekî qedirbilind bû; bi baldarî û bêsekin dadgerî dikir, pirsgirêkên gundîyên xwe çareser dikir û ji berê zêdetir qedr û qîmetê wî çêdibû. Di wê bawerîyê de bû ku hertim heqqî û neheqî bi hev re di nava şer de ne. Ji ber vê yekê wî dest bi tevgera xwe kiribû û gundîyên wî, ji ber adaleta wî, ew hilbijart ku bibe hakimê

51 Diyako di wergerên din de weke Deîokes derbas dibe, me li gora Kurdî li vir Diyako bikar anî, îro jî gelek Kurd yê bi vî navî hene. Diyako li dora salên 715an yê B. Z. dest bi tevgera avakirina Dewleta Medan kirîye ku bi navê Mada, Medaî, Medes jî tê ne zanîn.

52 Ferhat/Phraortes: 3 kes yê bi vî navî tê ne naskirin hene. Wek li jor tê xuyakirin yek jê bavê Dîyako ye. Yê din keyayê Medyayê ye ji 675 heta 653 B.Z. ku lawê Dîyako ye; di heyama wî de Dewleta Medan bihêz û berfireh bû. Yê din jî yê di sala 522yan de li hember Daryûsê 1emîn serî hildaye û demekê Medya birêve birîye, navê wî di nivîstekên Behistûn yê li Kîrmanşanê de jî derbas dibe. Ev kesê ku navê wî weke Fravartiş derbas dibe, ew bixwe dibêje ez ji malbata Kyaksares, ez Haştîrîtû me.

hemû nakokîyên wan. Ji bo nakokîyên nav xwe hertim serî li wî didan, ew jî tu carî ji edaletê venediqetîya û xelkê wesfê wî dida. Nav û dengê heqî û dadwerîya wî li derdorê jî bela bû, loma gundîyên din jî yên tûşî neheqîyê dibûn xwe lê digirtin û di dawîyê de nema bawerîya xwe bi kesekî din anîn.

[97] Rastîya biryarên wî li ser zimanan bûbû destan, her ku xelk hîn zêdetir rastîya dadwerîyên wî hîn dibûn, hejmara gilîyên ku dihatin ber destê wî jî zêde dibûn. Dîyako didît ku êdî her tişt bi wî ve girêdayî ye, rojekê neçû cihê ku hertim diçû û vekirî biryar didan û got ku êdî wê careke din neçe wir, ji ber ku, digot, seranserê rojê bi nêrîna karên cînaran derbas dibe, ji bo karê wî wext jê re namîne. Li gundan tevlihevî û talankirin ji berê xerabtir bû. Wî wextî Medî, ji bo li ser tiştên diqewimin biaxifin û bi hev bişêwirin kom bûn. Ez qet şikê nakim ku mirovên Dîyako zimanekî wiha bikar anîne: "Madem pergala me ya îro têra birêvebirina welat nake, gerek em ji bo birêvebirîya xwe hikumdarekî hilbijêrin; wî wextî dê qanûnên baş bên welatê me, em ê jî li kar û barên xwe binêrin, ji ber tevlihevîyan ji cih û warên xwe nabin." Bi van nêrînan, herhalde ji bo bikevin bin hukmê hikumdarekî, xwe dixapandin.

[98] Dema ku em ê kê hilbijêrin derket holê, herkesî Dîyako pêşnîyaz kir, wesfê wî dan û derxistin asîmanan, gotin ku "Em wî hilbijêrin". Loma hemûyan li hev kir ku ew bibe hukumdarê wan. Dîyako got "Naxwe ez qesrekî layîqî hukumdarîyê dixwazim." û ji bo meşandina hukum parêzvan jî dixwest. Medîyan gotin baş e; li cihê ku şanî wan kir keleheke gelek mezin ava kirin, ji nav Medîyan çi kesê xwest hibijart û ji bo wî biparêzin li cem xwe hişt. Çawa birêvebirî girt destê xwe, zor da Medîyan ku bajarekî mezin yê bi sûran hatîye dorpêçkirin ava bikin, tenê ji bo wê bixebitin û zêde guh nedin navçeyên din yê berê, yekemîn bala xwe bidin payîtexta nû. Çi dixwest Medî dikirin, vê carê bedenên mezin û saxlem yên kelehan da çêkirin, ev, çend sûrên ku yek bi dû yekê de rêz dibûn, bi vî awayî bajarê ku îro jê re Akbatana tê gotin ava kirin. Sûr wisan hatine melhezekirin ku, her yekê ji ya din bi qasî hola şerekî bi jortir e. Bêguman ji bo avakarîyeke wiha cihê hatibû hilbijartin jî musaît bû ji ber ku timik bû, lê payê hunerê jî mezin e. Hemî li ser hev heft sûr in; di ya dawîyê de seraya hukumdar û xezîne hene. Sûra herî mezin, kêm-zêde bi qasî derûdora Athenayê ye. Mazgalên

dîwara yekem spî ne; ya duduyan reş, ya sisiyan sorê biriqî, ya çaran hêşînê asmanî û ya pêncan pirteqalî ye. Bi vî awayî mazgalên sûran bi boyaxê hatine rengkirin. Em bên ser herduyên dawîyê, tehkîmata ya yekê zîv, ya din jî di rengê zêr de ye.

[99] Avahîyên ku dora seraya Dîyako rapêçane, avahîyên ji bo xwe dane çêkirin bi vî awayî ne; ji bo bicihbûnê dora kelehê nîşanî xelkê da. Dema bajar qedîya, Dîyako hinek qaîdeyên bi vî awayî jî danîye: Wî destûr neda ku kesek rasterast xwe bigihîne şexsê hukumdar, hemî danûstendin bi riya navbeynkaran hat meşandin û kesek nikarîbû rûyê hukumdar bibîne; ji bilî vê li ber wî ken, tifkirin, kî dibe bila bibe, bêterbîyeke mezin hatîye hesêbkirin. Dora xwe bi van şertan rapêça, ji bo yên bi wî re mezin bûne û ne bi ʻemir û ne jî di hêla taybetmendîyên mêranîyê de ji wî ne kêmtir bûn jê nec'emisin û xerabîyekê pê nekin; ji alîyekî ve jî ku çavê wan lê neketa, tesîreke baştir wê li wan bikira.

HOZÊN MEDÎ

[100] Piştî ev protokol danîn û bi xurtî desthilatî girt dest jî ji dadwerîyê veneqetîya, lê giranî dayê û rêk û pêkî lê zêde kir; îca dozxwazan gilîyên xwe bi nivîskî ji serayê re dişandin; dozen ku ji dîwana wî derbas dibû dihat ber dest, wî jî biryarê ku hewce dikir dida û paşde dişand; li dozan bi vî awayî dihat nêrîn. Ji bilî vê ev tedbîrên han jî hatibûn wergirtin: Eger tiştekî zulmê bibihîsta, wî dişand pey sûcdaran, li gor tawanê wan ew ceze dikirin û di temamê welatê di bin birêvebirîya wî de zilamên wî, çav û guhên wî hebûn.

[101] Yên di bin hukmê Dîyako de berhev bûbûn tenê xelkê Medî bûn. Medî ji hozên cuda cuda pêk hatibû, hozên Medî ev in: Bûsayî, Paretakenî, Strûkhatî, Arîzantî, Bûdîyî û Magîyî.

[102]Ferhatê kurê Dîyako; dema ku bavê wî piştî pêncî û sê sal keyatîyê mir, ket cihê bavê xwe û karûbar girt destê xwe, tenê bi Medan nema, pêşî êrîşî ser Persîyan kir û xistina miletên din ya bin desthilata xwe bi van dest pê kir. Piştî vê serkeftinê, niha serekê du miletên ku her du jî hêzdar bûn, dest bi dagirkirina Asyayê kir û parêzgeh bi parêzgeh bi dest xist, heta Asûrîyan,

a rastî heta roja êrîşî ser Asûrîyên Nineveyê kir; berê yê li Asyayê tevdî hukum dikir ev bûn. Di dema Ferhat de ji ber ku hevalbendên wî jê veqetîyabûn bi tena serê xwe mabû, lê cardin çavkanîyên wan yên alîkarîyê hebûn. Ferhat meşîya ser wan, lê bi beşeke herî mezin ya artêşa xwe re, ew bi xwe jî mir; piştî selteneta bîst û du salan.

[103] Bi vî awayî piştî rabûna Ferhat ji orteyê, Keyxusrew(Kyaxares) ket cihê wî, ev kurê Ferhat û nevîyê Dîyako bû. Tê ragihandin ku ew ji bav û kalên xwe bi hêztir bû û Keyxusrew yekem kes bû yê di Asyayê de li gor çend desteyên cihê artêşek bi rêxistinî saz kir; ferman da ku eskerên artêşa wî di nav pergalekê de, li gor çekên xwe li ser yekîneyên rimdar, tîrdar û siwarî bên parvekirin. Heta wê serdemê wan tevlihev şer dikirin. Di orteya şerê herî mezin de, dema ku roj bû şev, yê zorîya Lîdyayî birin ev e; yê temamê Asyaya Jorê wekî yekîneyan berhev kirîye û heta Rûbarê Halysê kirîye bin hukmê xwe ev e. Ev mîr, hemû miletên ku di bin desthilatdarîya wî de bûn li hev kom kir, meşîya ser Nînewayê, biryar dabû ku tola bavê xwe hilîne û hêvî kir ku ew di girtina bajêr de biserkeve. Bi Asûrîyan re rûbirû bû, ew têk birin, Nînewa dorpêç kir, lê di wê hînê de bihîst ku artêşeke Îskîtî yê mezin yê di bin fermandarîya hukumdar Madyesê kurê Protothyes de li Asyayê ketine pey Kîmmerîyan, ew ji Ewrûpa qewirandibûn û bi dû wan de ketibûn nav xaka Medîayê.

Î S K Î T Î

[104] Kesekî barê wî sivik, dikare sih rojan ji Gola Maîotîsê bimeşe Phasîs û Kolkhîsê; ji Kolkhîsê heta Medîayê rêya mirov jê derbas be ne ewqas zêde ye. Ji ber ku di navbera van herdu herêman de tenê miletek heye, ew jî Saspeîrî ne û piştî ew li paş man êdî Medîa ye. Lê belavbûna Îskîtîyan ne ji vir e; ew ji rêya bakur ya hê gelek dirêjtir, Çiyayê Kafqasyayê girtine milê xwe yê rastê û dagerîyane. Medîyan bi Îskîtîyan re dest bi şer kirin, mexlûb bûn, hêzên xwe wenda kirin. Îskîtî belavî seranserî Asyayê bûn.

[105] Ji wir ber bi Misrê ve ketin rê; dema ku ji Filistînê ketin Sûrîyê, Psammetîkosê hikumdarê Misrê derket pêşîya wan, diyarî pêşkêş kirin, hêvî û lava kirin û rê li wan birîn ku pêş ve neçin. Îskîtî paşve vedigerîyan, hatin

Sûrîyê, ketin bajarê Askalonê û heta qismeke zêde yê vî bajarî bêyî destê xwe lêdin derbas bûbûn ku, qismekî kêm Îskîtî yê li paş mayî, perestgeha Afrodîteyê[53] talan kirin. Ev perestgeh li gor netîceya lêkolînên min, perestgeha herî kevin ya li ser nave vê xwedawendê hatîye çêkirin; perestgeha Qibrisê jî ji vê nimûne hatîye wergirtin û çêkirin. Qibrisî bi xwe vê dibêjin û ya li Kythere jî cardin ji destê Fenîkeyîyên ji vê herêma Surîyê hatine derketîye. Ji Îskîtîyên ku perestgeha Askalonê talan kirine xwedawend bi wan vedaye, ji rê derketine û ji kur bigir heta bavê hemû bûne jin; ew bi xwe li xwe mikur tên ku ji ber vê sedemê bi vê nexweşîyê ketine û rêwîyên ku diçin Îskîtîayê dikarin bi çavê xwe bibînin ku ew nexweşîyek çawa ye. Ji kesên ku bi vê nexweşîyê ketine re dibêjin Enarees.

[106] Asya, bîst û heyşt salan di bin desthilata Îskîtîyan de ma, bi bacên giran û bêeleqeyî temamê welat wêran kirin. Xeraca ji xelkê berhev dikirin hindik dihat dîtin, êrîş dikirin û çi tişt destê kê de hebûya lê dixistin û dibirin. Lê di dawîyê de piranîya wan bûne mêvanê Keyxusrew û Medîyan, ew serxweş kirin û kuştin; Medîyan ji nû ve hêz bi dest xistine û cardin bûne efendîyê miletên berê di bin hukmê wan de bûne; Ninewayê stendine (çawa girtine ez ê piştre behs bikim), temamê Asûrîyên ku ji derveyî Babîlê mane bi xwe ve girê dane. Piştre Keyxusrew mir, heke midetê desthilatdarîya Îskîtîyan jî bê hesêbkirin, çil salan hikum kiribû. Dora Astîyagoyê kurê Keyxusrew hatibû, wî hukumdarî dewr girt.

[107] Keçeke wî çêbû, navê wê kirin Mandane; di xewna xwe de dît keçikê mîz dikir, mîza wê ewqas zêde bû ku, temamê bajêr, piştre ji serî heta binî Asya di bin lehîyê de ma. Magîyên di şiroveyên xewnan de hoste, ketin nav şaşîyan û ev xewn bi hemî hûrgilîyên wê ve şirove kirin bi qasî ku tirs têke dilê wî. Dema Mandane ket salên xwe yên êdî ku mêran nas bike, wê bi kesekî layiqê wê yê Medî re nezewicand, da ku xewna wî pêk neyê. Ew da yekî Persî yê navê wî Kambîses, ew hem ji nesleke pak bû û hem jî kesekî xwedîyê exlaqê nerim bû û ew ji yekî Medî yê ku di nav tebeqeya navîn de jî kêmtir xuya dikir.

53 Afrodîte/Aphrodîte

[108] Mandane, di bin banê Kambîses de dijîya. Di sala yekem a vê zewacê de, Astîyago xewneke din dît; di malzaroka keçikê de lemê mêwekê şîn dihat, çiqên mêwê digirt ser temamê Asyayê. Piştî vê xewnê, guhê xwe da şirovekarên xewnan, dema ku keçika wî dê hemla xwe deyne, ew ji bal Persan anî bal xwe û bi awakî hişk di bin çavan de girt. Dixwest zaroka çêbibe bikuje; ji ber ku magîyên di şiroveya xewnan de bûbûn hoste, ji vê xewnê gihiştibûn wê netîceyê ku ew kurê ji vê keçê re çêbibe, dê cihê wî bigre. Astîyago ji bo vê tehlîkeyê di ser xwe re bavêje, çawa Kîros çêbû, bangî Harpagos kir û ew jî xwedîyê wî bû, di nav Medan de kesê herî girêdayî wî û yê bawerîya wî pê dihat ew bû. Jê re got: "Harpagos, baş guhê xwe bide yên ku ez ê niha ji te re bêjim, van gotinan sivik negre û min neavêje xetereyê, terefdarîya hinekan jî neke ku piştre lingê te pê bilikume. Ew zarokê Mandane anîye bigre û bibe mala xwe û bikuje; paşê wî wekî ku tu dixwazî veşêre." Harpages bersiv da û got: "Ey hukumdar, te heta niha bêhurmetîyek li dor mirovê pêşberê xwe nedîtîye; yeqîn bike ji vir şûn ve jî tiştekî ku pê dilê te ji min bimîne nakim. Ji ber vê yekê madem tu dixwaze ev tişt bê kirin, ya dikeve alîyê min ew e ku karê te daye min ez wê tam pêk bînim."

[109] Piştî Harpagos bi van gotinan bersiv da, zaroka di nav qûndaxa ku wê jê re bibe kefen dane destê wî, Harpagos rahiştê û bi girî çû mala xwe. Dema gihişt mal, bi Astîyago re çi xeber dane, ji serî heta binî hemî ji jina xwe re gotin. Jinikê jê re got: "Ê îca, ya dilê te çi ye, tu yê niha çi bikî?" Wî bersiv da: "Ne tenê ji bo ku ew şaş û maş bûye, niha ji halê heyî hê zêdetir dîn û har jî bibe, bi temametî tiştên Astîyago gotine ez nakim, naxêr, ez nikarim bikim. Ez ê nebim aletê kuştinek bi vî rengî. Ji bilî vê, ji bo ez destê xwe nexim nav xwîna vî zarokî gelek sebebên min jî hene. Yek jê, lawik xizmên min bi xwe ye; ji bilî wê Astîyago kal e, zarokên wî yên kur jî tune; heke bimre û hukumranî bikeve destê keça wî ya ku ew niha dixwaze zarokê wê bi destê min bê kuştin, wî wextî wê çi bîne serê min, ji wê xerabtir mirov dikare çi bifikire? Niha ji bo silametîya min, lazim e ev zarok ji holê bê rakirin; lê ew qatilê ku vî karî bike pêwist e ji nav mirovên Astîyago bê hilbijartin, ne yên min."

[110] Wiha xeber da û bêpayîn qasidek şand bal yek ji şivanên Astîyago; ew, li cihekî bû ku mêrgên lê ji bo mebesta wî herî guncav bû; di navenda

çiyayan de, li cihê ku heywanên hov yên serberedayî digerîyan şivan bû û kerîyên xwe diçêrandin; navê vî şivanî Mîtradates bû. Bi cêrîyeke hukumdar re dijîya; navê wê Kyno bû, bi Yûnanî tê maneya dêlikê, di zimanê Medî de jî Spako ye. Ji ber ku di zimanê Medî de ji dêleseyê re Spako tê gotin. Ew cihê vî şivanî pezên xwe lê diçêrandin dikete bakurê Akbatanê, ber pêşkên çiyayên ber bi Euxîneyê(Deryaya Reş) dirêj dibûn; ev milê welatê Medyayê yê dikeve hemberî Saspeîrîyan çiyayî ye, bi gelîyên kûr û daristanan dagirtî ne, milê wê yên din deşteke bilind e. Piştî xeber gihişt şivan, bi lez û bez hat; Harpagos jê re got: "Ev emrê Astîyago ye: vî zarokî bigre, deyne cihekî herî dûr yê çiyê, bila zû bimre! Ji bilî vê emir kir ku ez vê jî ji te re bêjim, heke tu vî nekûjî û yan jî ji mirinê xelas bikî, tê bi kuştina herî xerab bimrî. Min jî emir wergirtîye, divê ez piştrast bim ku zarok li cihê wê bimre hatîye danîn."

[111] Şivan guhê xwe da van gotinan, zarok girt, paşde vegerîya hat gova xwe. Jina wî jî ya li ser rojan bû, di dema nebûna mêrê xwe de, zarokek jê anîbû. Herdu jî ji bo hev bêsebir û di xeman hev de bûn, yek ji bo hemildanîna jina xwe di mereqê de bû, ya din jî ditirsîya ji bo Harpagos di demeke wiha bêpayîn de û bi lez bangî mêrê wê kiribû. Wextê vegerîya hat balê, jina wî ku ew di halekî qet texmîn nedikir de dît, pêşî pirsî; gelo çima Harpagos wiha bi lez tu xwest. Wî jî got: "Jinê, wextê ez çûm bajêr, tiştên ku gerek qet min nedîta û di qatê efendîyê me de qet nabe biqewimin, seh kirin û dîtin. Dengê girî ji mala Harpagos bilind dibû û wextê ez ketim hundur ez hebitîm. Ez nuh ketim hundur, min zarokekî di nav libasên qundaxeka rengîn de ya bi micewheran xemilandî, zarokekî biçûk dît, danîbûn nîvê hundur, qajwaja wî bû. Harpagos çawa ez dîtim, got; bêsekin zarokê bibe û li çiyayên me cihê heywanên hov li ku bin, deyne wir. Ev emrê Astîyago ye." û ez tirsandim, got, heke ez vî emrî bi cih nekim, kî zane ka bi çi halî ez ê bêm kuştin. Ez fikirîm ku ew zarok yê yek ji wan xizmetkaran be; min zarok hilgirt û ez derketim; wê qet şik ji min re çênebûya bê ka ew ji ku tê. Dema min qundax û zêrê li ser dîtin û şêlebêla ji mala Harpagos bilind dibû bêyî ku veşêrin seh kir, ez şaş mabûm. Piştre di rê de, xizmetkarê ku heta derveyî bajêr bi min re hat û zarok da dest min her tişt ji min re got; ez hîn bûm ku, ev kurê Mandaneya keça Astîyago û Kambîsesê kurê Kîros e û Astîyago emir kirîye bê kuştin. Lê binêre, lawik ev e." Ev gotin û rûyê zarokê vekir, pêş jina xwe kir.

[112] Zarok girs û sipehî bû; dema jinikê ew dît dest bi girî kir, xwe avêt ser çokê mêrik û li ber gerîya, got: "Çi dibe bila bibe zarokê bernede!" Lê wî bersiv da û got: "Ez nikarim bi awayekî din bikim." Ji ber ku bê gûman Harpagos wê mirovan bişîne da ku bibînin bê çi bûye û jê re ragihînin, heke emir bi cih neyne dê mirinek pir hovane bê serê wî. Jinik dît ku mêrê wê nayê rayê, vê carê wiha got: "Baş e, madem tu ji ya xwe venagerî û illeh lazim e zarokek li serê çiya bê danîn, ka em wiha bikin; min jî hemla xwe danî, min zarokekî mirî anî. Vaye, wî bibe, deyne wir û em kurê keça Astîyago wekî yê me ye mezin bikin. Bi vî haweyî hem tu li hemberî emrê efendîyê xwe dernakevî, hem jî em tevlî karekî xerab nabin; zarokê me yê mirî wê di gora hukumdaran de rakeve, yê sax jî canê wî rizgar dibe."

[113] Şivan lê nêrî ku şîreta jina wî li gor rewşê ya herî baş e, loma bêyî windakirina demê wekî wê got kir. Ew zarokê ji bo kuştinê anîbû da jina xwe û bi tiştên pê re anîbû kurê xwe yê mirî pêça û xist selika yê anîbû, bir danî cihekî çiyê yê herî xirûxalî. Şivan, piştî zarok danîbû bi sê rojan, şivanek wek nobedar li ber danî û çû bajêr, got ku hazir e mirîyê zarokê nîşan bide. Harpagos mirovên xwe yên herî pêbawer şandin, bawerî bi wan kir ku wan bi çavê xwe dîtîye û piştre zarok veşartine. Ew hat veşartin, yê din, di pêş de yê wê jêre Kîros bê gotin, li ba jina şivan ma û wê ew bi navekî din xwedî kir, ne bi navê Kîros.

[114] Zarok ketibû salên xwe yên dehan, tiştek hat serî wî, ew îfşa kir. Ew gundê ku kerîyên pez dikirin govan, ew bi zarokên hevtemenên xwe re di kolanê de dileyîstin. Zarokan li gor leyistikê, wekî hukumdar yê jê re kurê şivan digotin hilbijartibûn, Wî jî zarok veqetandibûn, wezîfeya çêkirina serayê dabû yekî, hinek wekî esker girtibûn bal xwe û yek jî wekî çavê hikumdar[54] hilbijartibû; wezîfeya berhevkirina xeberan jî dabû yekî; bi gotina kurt, her yekî karek dabû wan. Yek ji zarokan, kurê Artembares yê ku giregirekî Medan bû, guhê xwe neda emrê Kîros, wî wextî Kîros ji yên din re got "wî bigrin"; zarokan bi ya wî kirin, Kîros jî bi qamçîyê lê xist û cezayê giran dayê. Ew lawik çawa ji destê wan filitî, bi êşandineke wiha nelirê jî êşa wî zêdetir dibû, rast berê xwe da bajêr û çû bal bavê xwe. Bi dilêşî behsa

54 Çavê hikumdar: Çavdêrên hikumdarê mezin yê şandine wilayetan.

biçûkxistina xwe ya ji alî Kîros ve kir; nedigot Kîros (ji ber ku hîn navê wî ne ew bû), digot kurê şivanê Astîyago. Artembares hêrs bû çû bal Astîyago, kurê xwe jî bi xwe re bir, got ku bi rewşeke hetikber re rûbirû bûne: Got: "Ey hikumdar, va bêrêzîya kurê şivên yê koleyê te ya li hemberî me kirîye!" û milê kurê xwe nîşan da.

[115] Astîyago ku ev dîtin û guhê xwe da çîrokê, îtîbara Artembares li ber çavan girt û xwest toleya zarokê hilde; mirov şandin pey şivan û kurê wî. Piştî herdu anîn pêşberê wî, Astîyago li Kîros nêrî û got: "Te çawa cesaret kir ku tu bi kurê mîrzayekî re, yê ku qedrê wî li bal min pir e, bi hovîtî tevbigerî, digel ku tu zane bê kî ne?" Kîros bersiv da û got: "Efendîyê min, ez ji rêya edaletê derneketim. Zarokên gund ku ev jî di nav de bû, dema ku dileyistin min ji xwe re hikumdar hilbijartin; wan di nav xwe de ez, yê herî layîqê vê wezîfeyê dîtin. Zarokên din emrê min bi cih dikirin, lê ev serberedayî derket û ewqas pêşve çû ku, di dawîyê de min ew ceza kir. Heke ji bo vê pêwist e ez bêm cezakirin, ez li ber emrê te me."

[116] Gotinên wî zarokî hinek tişt dikirin serê Astîyago; wek ku rûyê wî zarokî dişiband yê xwe û difikirî ku ev bersiv ne ya ji devê kurê kolekî derkeve; bi ser de temenê nevîyê wî û yê zarok jî li hev dikir; li hemberî van tevan wekî ku gurzek lê bidî lê hat û bêdeng ma. Piştre berîya şivan bikêşe îfadeyê, xwest Artembares derkeve ji derve, jê re got: "Ez soz didim te Artembares ez ê wisan bikim ku ne gotineke te ne jî ya kurê te nemîne." Artembares şand, Kîros da xizmetkaran û şand hindurê serayê. Bi şivan re tenê mabû, Astîyago jê pirsî, te ev zarok li ku dîtîye û kê ew emanetê te kirîye. Şivan bersiv da û got: "Ez im bavê zarok, dêya wî jî li malê ye." Astîyago got; heke tu dixwazî tiştek neyê serê te, ew rêya te daye ber xwe şaş e. Bi van gotinan re îşareta girtinê dabû xizmetkarên xwe. Piştî şivan fêhm kir ku wê êşkencê bidinê, razî bû û dest bi gotina rastîyê kir; ji serî dest pê kir û çawa qewimîye hemî çîrok neqil kir û gotinên xwe bi hêvî û lavayên ku dixwest wî bibexşîne temam kir.

[117] Piştî şivan rastî got, Astîyago êdî bi wî ve mijûl nebû, hindurê wî tijî hêrs bûbû; ji nobedaran hat xwestin ku gazî Harpagos bikin. Dema Harpagos hat, Astîyago jê pirsî: "Bi çi hawayî, te zaroka keça min yê min dabû destên te kuşt?" Harpagos dîtibû ku şivan li wir e, ketibû tengîyê, halê wî

yê xwe bilivîne tunebû, serî li derewan neda: “Hikumdar, wextê min rahişt kurikê biçûk ez fikirîm, ez çawa emrê te bi cih bînim, min dixwest hem li hemberî te qisûrekê nekim, hem jî li hemberî te û keça te webalê kuştinekê nekim stûyê xwe. Ji ber wê min wiha kir: Min bang li vî şivanî kir û zarok dayê; min jê re got emrê kuştinê ji te hatîye. Ne derew bû, ji ber ku te bi xwe ev emir dabû. Min zarok dayê û jê re got, wî deyne cihekî xalî yê çîyê û heta nemre jê veneqete. Min bi bîrê xist, ku heke vî emrî tam bi cih neke, dê bê îşkencekirin. Piştî emir hat bicihkirin û zarok nefesa xwe ya dawîyê da, min kesek yê herî zêde ez pê bawer şand, wan bi çavê xwe dîtin û min mirî da veşartin. Belê yên qewimîn ev in, ey hikumdar, aqûbeta zarok wiha bû.”

[118] Ji ber vê yekê Harpagos tevahîya çîrokê bi awayek zelal û rast vegot; Astîyago bêyî ku hêrsa hemberî wî kifş bike, yên ji şivan seh kiribûn yek bi yek gotin; piştre dema ev çîroka nû temam bû, got “zarok sax e û baş bû ku wiha bû” û axaftina xwe bi van gotinan temam kir: “Tiştên min bi vî zarokî kirin di dilê min de bibûn derd, xerabûna navbera min û keça min jî ez diêşandim. Madem ev mesele gihişt netîceke bextewer, tu jî kurê xwe bişîne, bila bi zarokê me yê vegerîyaye mal hevdû nas bikin; ez dixwazim ji bo canê zarokî bexişandin ji xudayan re qurbanan pêşkêş bikim, wan ev heq kirin, tu jî were, em bi hev re xwarinekê bixwin.”

[119] Harpagos li ser van gotinan, rêz û hurmeteke mezin da nîşan. Di nav bextewerîyeke mezin de bû, baş bûbû ku emir bi cih nekiribû, bi ser de jî li şûna ku were cezakirin, ew hate vexwendin ji bo ziyafetek ku ji bo pîrozkirina vê şadîyê wê bê dayîn. Çû mala xwe, bi lez ket hundur. Tenê kurekî wî hebû, hê sêzdeh salî bû; ew ji Astîyago re şand, jê re got û tembîh kir, hikumdar çi emir dike wisan bike; paşê çû ba jina xwe û bi dilxweşî hemû tiştên ku qewimîn jê re got. Dema ku kurê Harpagos hat, Astîyago ew da kuştin, perçe perçe kirin, hinek perçeyên wî biraştin û hinek pehtin. Wextê xwarinê mêvan hatin, Harpagos jî di nav de; li ber Astîyago û yên din goştê berxan hat danîn; lê ji Harpagos re kurê wî hat dayîn, ya bi Harpagos dan xwarin tenê gewde bû, serê zarok, dest û pêyên wî li rexê din di nav selikeke sergirtî de bû. Piştî Harpagos zikê xwe têr kir, Astîyago jê pirsî û got “Goşt baş bû?” Harpagos got “Gelek baş bû”. Wî wextî xizmetkarên ji pêşî de tembîhkirî, di destê wan de selika ku serê kurik, dest û pêyên wî tê de

û bi paçekî sergirtî hatin, li rexê Harpagos li ser pêyan sekinîn, jê re gotin, perdeyê rake û tu çi jê dixwazî hilbijêre û bibe. Harpagos got, baş e; perde rakir û tiştên ji kurê wî mayî dîtin. Qet şaş nebû, hisên xwe kifş nekir. Astîyago, jê pirs kir gelo fêhm kirîye ew goştê xwar yê kîjan heywanî ye. Bersiva fêhm kirîye dayê, got ku: "Hikumdar çi bike, baş dike." Piştî ev gotin, ji goşt çi mabû, tev berhev kirin û vegeriya mala xwe û ez wisan texmîn dikim ku ew perçe bi tevayî kirin gorekê.

KÎROS DERDIKEVE SER TEXT

[120] Cezayê ku Astîyago da Harpagos ev bûn. Em bên ser Kîros; Astîyago pêşî fikirî bê wê di derbarê nevîyê xwe Kîros de çi bike, şand pey Magîyan, yên ku berê xewna wî bi wî awayî şirove kirin ku ew pir xemgîn bibû. Wextê hatin, Astîyago ji wan pirsî, xewna wî çawa şîrove kiribûn. Wan heman tiştên ku berê gotibûn dubare kirin: "Heke zarok bijî û berîya wî nemre, zû yan dereng wê derkeve ser text." Hikumdar bi van gotinan bersiv da: "Ev zarok heye û hê sax e; li mêrgan dijîya û zarokên gund ew ji xwe re hikumdar hilbijartibûn. Hikumdarekî rastîn çi bike, wî jî ew kiribûn; yekîneyên parastinê, qasid û yên din, hemû hilbijartîne veqetandîne û kirine bin desthilata xwe. Niha hûn ji vê çi manayê derdixin?" Magîyan bersiv dan û gotin: "Heke zarok dijî û xwe bi xwe hikum dimeşîne, tê wê manayê êdî tiştekî ku mirov xemgîn bike tune, bila serê te rehet be; ji ber ku dê careke din seltenetê nemeşîne. Tê fêhimkirin ku kehanetên me, hinek caran bi bûyerên biçûk jî pêk tên; tiştê di xewnê de tê dîtin, wekî bûyerên biçûk jî be zû yan dereng pêk tên." Astîyago careke din got: "Magan, ez jî gelekî dixwazim bawer bikim, madem lawik di nav zarokan de hikumdar hatîye hilbijartin, tê wê manayê ku xewn hatîye cihê xwe û êdî tirsa ji vî lawikî nemaye. Lê cardin hûn çi dibêjin, gelo piştî rewş bi hûrî û kûrî bê şîrovekirin ji bo nesla min û di eynî wextî de ji bo we rêya herî baş ya em bidin ber xwe çiye?" Magan bersiv dan û gotin: "Ey hikumdar, ji bo me jî ya herî baş ew e ku hêza te berdewam bike. Ji ber ku heke bi awayekî din be, desthilat bi rêya vî zarokî bikeve destê biyanîyan û em ku Medîayî ne, heke bibin koleyê Persîyan, em ê di çav wan de bibin kesên kole yên gotinên wan derbas nabin; lê heta tu, yê hemwelatîyê me li ser text bî, ev ji me re şeref e, dê yarmetîya me jî ji desthilatê re hebe û em ê ji te hurmeteke mezin bibînin. Loma ji bo me ya ji

sedî sed pêwist e, berîya her tiştî parastina te û xurtkirina hêza te ye. Heke em îro ji bo te tehlîkekê bibînin, em ê rasterast ji te re bêjin. Ji bo ku ev xewn gihişt netîceke wiha ne girîng, em li ser hesaba xwe şa bûn û em ji te re jî dibêjin ku vî zarokî ji ber çav rake, wî bişîne ji malbata wî re."

[121] Bi van gotinan gelekî kêfa Astîyago hat, bangî Kîros kir û jê re wiha got: "Lawê min, ji ber xewna ku min dîtibû, min gelek neheqî li te kirin; lê te xwe ji nivîsa li enîya te hatîye nivîsandin rizgar kir. Niha emanetî Xuda be, here bal Persan; ez ê mirovan bi te re rêkim, ew dê te bibin wir. Tê li wir dê û bavekî ku qet naşibin Mîtradatesê şivan û jina wî bibînî."

[122] Wî ev jê re gotin û Kîros şand. Kîros, dema ku hat mala Kambîses, ji alîyê dê û bavê xwe ve hat pêşwazîkirin, dema wan fêm kir bê mêvanê wan kî ye, gelek şa bûn û ew bi dil û can himbêz kirin -wan bawer kiribûn ku roja hatîye dinyê mirîye- û jê pirsîn, çawa bû ku te canê xwe xelas kir. Wî ji wan re got ku heta vê dawîyê wî qet tiştek li ser vê mijarê nizanibû û di nav çewtîyekê de jiyaye, her tişt dema di rê de hatîye hêj hay lê bûye; gotinên xwe domand û got ku, ji ber ku heta wê rojê xwe kurê şivanekî Astîyago dizanî, lê wextê ji wir hat vir, ji wan mirovên ku pê re hatibûn her tişt hîn bûbû. Got ku jina şivên ew xwedî kirîye; gelek pesnê jinikê da, behsa navê Kynoyê kir û temam kir gotinê xwe. Dê û bavê wî ev nav ji devê wî girtin û ji bo ku xelasîya wî li bal Persîyan wek alîkarîya îlahî bê dîtin, ev gotegotek belav kirin: Li ew cihê hatîye danîn, dêlikekê Kîros şîr daye. Heslê çîroka qedera wî ev e.

[123] Kîros êdî bûbû xort, di nav hevtemenên xwe de yê herî xweşik û mêrxas bû. Harpagos xwe nêzîkî wî dikir û dixwest xwe pê xweş bike; jê re diyarî dişandin, ji ber ku di hinavê wî de kerb û kînek li hemberî Astîyago hebû. Dizanîbû ku bêyî alîkarîyek biyanî taqeta kesekî wekî wî têr nedikir ku heyfa xwe ji Astîyago hilîne; lê didît Kîros mezin dibe, di qedera wan de êşek wan ya hevpar hebû, ew derdixist pêş û xwe nêzîkî Kîros dikir. Berî dest bi van bike ev jî kiribû: Astîyago li hemberî Medîayîyan hişk bû, Harpagos bi giregirên Medîayî re peywendî danîn û pêwistîya cihgirtina li rexê Kîros û dawîlêanîna desthilata Astîyago kiribû serê wan. Piştî ev pêk anî, xwest Kîros bi plana ku çêkirîye bihesîne; lê rê di bin çavan de bûn û ji ber ku tiştekî din yê karibe bike tunebû, serî li hîleyeke wiha da: Kêrvoşkek çê-

kirî dît, bêyî ku pûrtên wê xera bike û ji derve tiştek bê dîtin, zikê wê qelaşt, nameyek di zikê wê de bi cih kir, di nameyê de tiştên ku plan kiribûn hatibû nivîsandin. Kêrvoşk ji nû ve dirût û torek da kesekî bawerpêkirîyê xwe û şand bal Persîyan; pir tembîh kir, got; dema te kêrvoşk da Kîros, bila ew bi destê xwe veke û kesek jî li balê tune be.

[124] Wekî wî got çêbû. Kîros kêrvoşk girt û vekir; nameya tê de dît û xwend; di nameyê de wiha dihat gotin: "Kurê Kambîses, xuda te diparêzin; an na nivîsa enîya te destûra evqas roj nedidan te - niha dem hatîye ku tu tola xwe ji qatilê xwe Astîyago hilînî. Wî mirina te xwest, bîne bîra xwe; heke tu îro dijî, bi saya min û îlahan e. Ez dibê qey, tiştê wî bi te kir û tiştê ku min ji destê wî kişand, ji ber ku min tu spartîye gavan û tu nekujtîye, tu van tevan zane. Heke tu guh bide min û ji min bawer bike hemû împaratorîya Astîyago wê bibe ya te. Persîyan rake ser pêyan, bi artêşekê bajo ser Medîayan. Astîyago, dixwaze bila min yan jî kesekî ji giregirê Medîayan bike fermandar, ji bo biserketina te ferq nake; dê ew di yekem gavê de Astîyago terk bike û bê alîyê te, yê hikumdar hilweşîne ew e. Em amade ne, tu jî çi dibêjim wê bike, lê wext derbas neke."

[125] Kîros, dema mizgînîya ku di vê nameyê de heye, stend, di xwe fikirî ka ew çawa dikare Persîyan razî bike ku serhildanê bikin. Piştî gelek hizir û ramanê, wî ev yek wek rêça herî guncav dît û tetbîq kir. Tiştên dixwest li ser gilolikekê nivîsandin, dû re gazî Persîyan kir û gilolik li ber wan vekir û xwend; di wê fermanê de hatibû nivîsandin ku Astîyago fermandarîya Persîyan daye wî û gotinên xwe bi vî awayî girê da û got: "Niha, ey Persî, ez ji bo we radigihînim, her yek ji we rahêjin dasekê û werin vir." Emrê Kîros wiha bû. Persî ji cûre cûre hozan pêk hatine; Kîros ji nav wan hinek anîne bal hev û li hemberî Medîayan bi wan serî hildabûn; ev ew hoz in ku hemî Persîyên din jî girêdayî wan in, ya ez dixwazim bêjim, Pasargadî, Maraphî û Masapîayî ne; Pasargadî yên herî esîl in, hikumdarên Persîyan, ji Axamenîşîyên ji şaxên vê hozê derketine. Persîyên din Panthîayî, Derûsîayî û Germanîayî hemî gundî ne. Daoyî, Mardîayî, Dropîcayî û Sagartî şivan in.

[126] Gava Persî bi guhdana fermanên ku standibûn, tev dasê xwe hatin, Kîros ew birin ser erdekî çargoşe ya bi qasî hîjdeh an bîst stadan ya ji serî

heta binî stirî û dirî bû û ferman da wan ku wir di rojekê de paqij bikin. Wan erka xwe pêk anîn; li ser vê yekê wî fermana duduyan da wan, got ku roja din serê xwe bişon û dîsa werin ba wî. Di vê navberê de wî hemû pezên, bizin û hemû dewarên bavê xwe berhev kir, serjê kir û amade kir ku şahîyekê bide tevahîya artêşa Farisan. Ji bo şahîyê şerab û nanên herî bijarte jî hatin amadekirin. Roja din Persî hatin, di wê mêrgê de şahîyeke têr û tijî hat çêkirin. Piştî şahî temam bû, Kîros ji wan pirsî, wan ji wî karê doh hez kirine yan yê îro? Wan got ku ferqa di navbera wan de gelekî mezin e, doh tenê zehmetî hebû, îro jî her tişt xweş bû. Kîros bi vê gotinê girt û armanca xwe eşkere kir bi van gotinan: "Gelî Persîyan, va rêya li ber we vebûye, ger hûn guh bidin min, hûn dikarin ji van û gelek zewqên mîna wan bidest bixin û kesek nikare we wekî koleyan bixebitîne; lê heke hun guhê xwe nedin min, karekî wekî yê doh tu wextî ji ser serê xwe kêm nabe. Werin guhê xwe bidin min, bibin insanên azad. Ez bawer dikim ku qederê ji bo ez vî karî bikim ez anîm dinyê; ez bawer dikim ku hûn jî di tu warî de, bi taybetî di warê şer de, ne kêmî Medîyan in. Rewşê baş fêhm bikin, wext derbas nekin li hember Astîyago serî hildin."

[127] Farisên ku ji zû ve li hember desthilatdarîya Medîan ketibûn bin fedîyê, dema ku rêberek ji xwe re dîtin, bi kêfxweşî xwe dan pêş. Di vê navberê de, Astîyago, ji kirinên Kîros agahdar bû û qasid şand ku gazî wî bike. Kîros lê vegerand û got: "Ji Astîyago re bêje; ez ê bêm balê, heta zûtirîn ji wextê ew dixwaze ez ê li bal bim." Astîyago, gava ev xeber stand, di cih de hemû kesên xwe bi çek kir û mîna ku Xwedê hişê wî ji serî kiribe, êşa dabû Harpagos jibîr kir û ew kir fermandarê artêşa xwe. Ji ber vê yekê, dema herdu artêş ketin hember hev, tenê çendek ji Medan, yên beşdarî komployê nebûbûn şer kirin; yên din hişkere derbasî alîyên Persîyan bûn; wê demê hejmareke zêde bi tirseke sexte ber bi paş ve revîyan.

[128] Astîyago, dema fêrî rev û belabûna artêşa xwe ya ku di halekî şermezarîyê de bû, li dijî Kîros dest bi zirta kir û got: "Çi dibe bila bibe wê Kîros negihe armanca xwe!" Û piştre ew Magî yên ew razî kiribûn ku bihêle Kîros bişîne bal malbata wî, girt û ew li singan da; piştî wê, li bajêr ji Medan kî mabûn, zarok û kal jî tê de, tevde seferber kir û rêberîya wan li hember Persan kir, ket şerekî ku bi tevahî şikest, leşkerê wî hatin kuştin û ew bi xwe jî kete destê dijmin.

[129] Paşê Harpagos dît ku ew girtî ye, nêzîkî wî bû û bi qerf û tinazan kela xwe lê hênik kir. Di nav axaftinên wî de behsa birîna ku kezeba wî dişewitand jî hebû, bûyera şîva ku tê de goştê kurê wî jê re hatibû dayîn û ji Astîyago xwest ku niha bersîva wî bide, ka ew çawa li şûna keya îro bû kole? Astîyago li rûyê wî mêze kir û jê re got: "Ew karên Kîros kirine tu ji xwe re dikî mal?" Harpagos got: "Belê, ji ber ku nameya min kir ku vê serhildanê bike û ji ber vê yekê ez mafdar im di serkeftinan de behra min hebe. Lê Astîyago jê re got: "Tu insanê herî ehmeq û neheq î! Tu yê herî ehmeq e, ji ber ku, madem ev kar te bi xwe karîbû bikira, te karîbû tacê jî deynî serê xwe; lê niha tenê ji sisiyan yekê vê hêzê di destê te de ye û tu yê herî neheq î, di miqabilî heyfa xwe de te Medîayî ber bi koletîyê ve rakêşaye; heke di cihê te bixwe hikumdarî bigirta destê xwe de, hewce dikir te bidaya destê yekê din, di cihê Persîyekî de yekî Medîayî hê rastir bû. Lê niha, Medîayî, yên ku tu sûcê wan di neheqîya li te hat kirin tunebû, ji efendîtîyê daketin û bûn kole û Persî, koleyên Medîayan yên doh, îro bûne efendîyê wan."

[130] Astîyago, piştî sih û pênc sal seltenetê, bi vî awayî ji hukum ket û Medîayî ji ber zalimîya wî, mecbûr man li hemberî Persîyan serî bitewînin; împaratorîya wan li ser beşên Asyayê yên ji Rûbarê Halysê wêdetir sed û bîst û heyşt salan dom kir, dema desthilatdarîya Îskîtîyan ne tê de.[55] Di 'eslê xwe de piştre poşman bûne û li hemberî Daryûs[56] serî hildane; lê ceribandina ji bo serxwebûnê ji ber sebebê şerekî bêtalih netîce neda, mecbûr man ji nû ve serî bitewînin. Lê niha, di dema Astîyago de, ew Pers bûn ku di bin destê Kîros de li hember Medîayan serî hildan û ji hingê ve bûn serwerên Asyayê. Em bên ser Astîyago, Kîros tu xerabî li wî nekir, heta mirîye li ba wî maye. Belê, rewşa jidayikbûn û mezinbûna Kîros weha bûn û gavên ku ber bi hukumdarîyê de diavêtin bi vî rengî bûn. Dûra Kroîsos êrîş biribû ser, wî ew jî wekî min li jorê behs kir, kire bin desthilata xwe. Bi hilweşandina hukumranîya Kroîsos, bu serdestê temamê Asyayê.

55 Li ser salên hikumdariya Medan, heke em hejmarên Herodotos bi xwe li ber hev bixin, ev yekûn şaş derdikeve. Dîyako 53, Ferhat 22, Keyxusrew 40, Astîyago 35 sal hikum meşandine, yekûn dike 150 sal. Dikare bê hizirkirin ku Herodotos dewra Ferhat ya 22 salan qevastibe. Jixwe Sayce temamê vê kronolojîyê şaş hesêb dike.

56 Navê Daryûs di nav Kurdan de weke Dara tê bikaranîn. Di hin çavkanîyan de Dareîos yan Daryûş jî derbas dibe. Wekî din bi navê Dara hîn jî gelek kes hene, li nêzîkî Mêrdînê bajarekî antîk yê bi vî navî yê navdar heye.

ÛRF Û ADETÊN PERSÎYAN

[131] Em bên ser adetên Persîyan, yên ez dizanim ev in: Nizanin peykerê xwedayan, perestgeh û qurbangehan ava bikin; heta ê wan çêdikin bêaqil dibînin; ez difikirim ku ev, ji ber wê ye ku ew wekî Yûnanîyan xwedayan ne di şeklê insanan de difikirin. Lê belê, adeta wan ew e ku hilkişin lûtkeyên çiyayên herî bilind û li wir qurbanî bidin Jupîter ku vî navî li tevahîya çerxa zemînê dikin. Bi heman awayî ew pêşkêşîyan ji bo rojê, heyvê, axê, agirê, avê û bayê jî dikin. Ev tenê xwedayên ku perestîya wan ji demên kevnar de maye. Lê piştre perestina Ûranîa jî hîn bûn, ev ji Asûrîyan û Ereban derbasî wan bûye. Asûrî ji vê xwedawendê re Mylîtta, Ereb Alîlat û Persî jî Mitra dibêjin.

[132] Persî ji van xwedayan re bi vî awayî qurbanan pêşkêş dikin: Ji bo qurbanê li ser serjêkin kevirê merasimê tune, agir jî nakin. Li ser qurbanê reşandina ava pîroz, flût, kinc û lixwekirin û libên cehê pîroz nizanin. Kesê ku bixwaze ji yek ji wan xudayan re qurban serjê bike, qurban dibin cihekî paqij, bi gelemperî taceke ji şaxên dara mêrsînê datînin serî, qurban ji bo kîjan xwedayî tê serjêkirin navê wî xudayî tê bibîanîn û dua dikin. Yê qurban serjê dike, mafê wî tune alîkarîya îlahî tenê ji bo xwe bixwaze; lê ew ji bo bextewarîya hukumdar û tevahîya gelê Faris, ku ew jî di nav wan de ye, dua dike. Piştre qurbanê hûr dike, goştê wê dikelîne, giyayê nerim, bi taybetî nefelê di bin de radixe û goşt datîne ser vê raxistinê. Dema ku her tişt amade ye, yek ji Magan derdikeve pêş û hewayekî behsa zincîra nesla xudayan dike dixwîne. Ev hewayê îlahî, li gor ew dibêjin wiha ye; dîn bêyî ku Mag li wir be, serjêkirina qurbanê qedexe kirîye. Piştî sekneke kurt qurbanê jê dike, goşt berhev dike û çawa bixwaze wisan dike.

[133] Rojbûna xwe, ji hemî rojên din ên salê bêhtir pîroz dikin; wê rojê ji hemî rojên din zêdetir xwarin derdixin; dewlemend ga, hesp, deve yan jî kerekî sax di firinê de dipêjin û pêşpêş dikin; yên feqîr bi heywanekî biçûk qîma xwe tînin. Bi gelemperî hindik dixwin, lê di dawîya xwarinê de tiştên wekî fêkî, şêranî gelek tê xwarin, care sifrê nû dikin; ev yeka han dike ku Persî dibêjin, ji ser xwarinê rabûna Yûnanîyan ya bêyî têr bixwin, ji ber ku piştî xwarinê tiştekî hêjayî gotinê ji wan re nayê dayîn, cardin dibêjin ku

heke piştî xwarinê tiştekî wekî şêrînahî bê dayîn, wî wextî qet ji ser xwarinê ranabin. Gelek ji şerabê hez dikin, li ba yekî verşandin û ba li ber ketin qedexe ye. Di temamê van xalan de adetên tetbîq dikin ev in. Ez vê jî bêjim, axaftina mijarên herî girîng di esnayê vexwarinê de, yek ji adetê wan e. Heke biryarek di esnayê vexwarinê de hatîbe dayîn, wextê ji hevdû veqetîyan, roja din biryar li mala kê hatîbe dayîn, li wir careke din biryarê dikin dengdanê; heke bi serê hişyar jî bêjin erê, wî wextî ew biryar derbas dibe; heke na dev jê berdidin; bi eksê wê, bi mejîyê hişyar tiştek hatibe melhezekirin jî di dema vexwarinê de ji nû ve li ser diaxifin.

[134] Dema di kolanan de li hevdu rast tên, mirov bi rehetî dikare fêhm bike bê ew xwedîyê çi paye û sevîyeke civatî ne. Ew jî bi vî awayî ye: Heke bêne cem hev, ew di heman astê de ne û di cihê bi hevdû re biaxifin, lêvên hevdû maçî dikin. Heke yek ji yê din hinekî kêmtir be, wî wextî rûyên wî maçî dikin. Heke ferqa mertebeya wan zêde be, yê kêm, li ber yê din çokekî xwe datîne erdê û li ber sucude dibe. Ev rewşa di nav wan de ye, lê ji bo xelkê din, ew herî zêde qedrê cîranên xwe yên herî nêzîk digrin, yên ku ji cîranên wan wêdetir in, di dereceya duyemîn de rûmetê dibînin, bi vî awayî dom dike. Çiqas ji wan dûr dibe ew qîmeta didin wan jî kêm dibe, ji ber ku di her warî de xwe li hemberî miletên din payebilindtir didîtin, yên din bi pîvana peywendîyên bi wan re dikarin bi rûmet bin. Tê wê manayê yên herî dûr yên herî paşvemayî ne. Di dema desthilata Medîan de, çend neteweyên împaratorîyê bi vî awayî desthilatdarî li ser hev kirin: Medîayî li ser hemûyan serwer bûn û miletên li ser sînorên xwe yê nêzîk bi rê ve dibirin, ew cîranên wan jî hukum li cîranên xwe yên piştî xwe dikirin û yên dawîyê jî li cîranên xwe yên piştî wan dihatin hukum dikirin. Ev bi temamî rewşeke li gor pîvana qîmetê ya Persîyan bû, wan jî ev domand; ji ber ku ew gel jî wek Medîayî xwedî asteke pêşketî ya rêveberî û hikûmetê ye.

[135] Li gel vê jî, Persî rehettir û hêsantir ji gelên din, ûrf û adetê biyanîyan werdigirin; kincên Medîyan ji yên xwe xweşiktir dîtine, bi xwe jî weke wan li xwe kirine. Di warê şer de jî mertalên Misrî nimûne wergirtine. Zewqên li ber guhê wan dixistin di cih de werdigirtin; wekî nimûne, bi lawên xort re peywendî danîn ji Yûnanîyan wergirtine. Em bên jiyana zewacê, her yekî xwedîyê çend jinên mehirkirî ne, lê bi ser vê re gelek carîyê wa jî hebûn.

[136] Qîmeta yekî li ba raya giştî, pêşî bi mêrxasîya wî ya di şer de ye, piştre jî bi hejmara zarokên wî dihat pîvan; yê herî zêde xwedîyê zarokan, her salê ji hikumdar diyarî werdigirt; bawer dikirin ku ji zêdebûnê qiwet çêdibe. Sê tişt hînî zarokên xwe yên ji sê salî heta bîst salîyan dikirin: Siwarîya hespê, tîravêtin û rastî gotin. Berî pênc salan bike zarok nîşanî bav nedikirin; di nav jinan de dijîyan, bi vî awayî heke zarok di temenê biçûkatîyê de bimre, pêşîya tesîra wê şînê ya xerab li ser bav dihat girtin.

[137] Bi dîtina min ev qaîdeyek jîr e, her weha ev jî: Ji ber tenê xeletîyekê kesek nayê kuştin, keya bixwe jî nikare biryarek wisa bide. Wekî vê, tu Persî ji bo yek tawanê, nikare yek ji xizmetkarên xwe bi tundî ceze bike, lê di her rewşê de dê xizmetên sûcdar li hember xeletîyên wî bêne danîn û heger bê dîtin ku, hejmar û giranîya xerabîyan ji başîyan zêdetir e, wî wextî ceza tê dayîn. Tê gotin ku qet nehatîye dîtin, kesek dê yan bavê xwe bikuje; em bêjin tawaneke wiha hat kirin, heke eslê wê baş bê lêkolîn, di dawîyê de derdikeve ku ew zarok yan yê gunehkarîyê ye yan jî zarokekî ku dûra kirine ewladê xwe; ji ber ku li gor wan di tebîetê de kuştina dê û bavekî eslî bi destê zarokên wan tune.

[138] Tiştekî ku kirina wê qedexe be, axaftina wê jî qedexe ye. Eyba herî mezin derew e, piştî wê deyndarî tê, sebebê vê jî ew e ku dibêjin, piştî deyndarîyê tu bixwazî û nexwazî derew tê. Hemwelatîyek bi nexweşîya cûzamê ketibe, destûr nayê dayîn ku bikeve bajarekî, an jî bi Persîyên din re têkeve têkilîyê; ew dibêjin, dibe ku li hember rojê guneh kiribe û hatibe cezekirin. Biyanîyên ku bi vê nexweşîyê ketine ji welat tê derxistin; piranîya wan ji bo ku bi eynî nexweşîyê ketine, bera kevokên spî jî didin. Tiştên ku qet nakin, mîzkirina nav rûbarê, tifkirin, destşûştina tê de ye û tehemûla yekî din ya van karan bike jî nakin; ji ber ku rêz û hurmeta herî mezin nîşanî rûbarê didin.

[**139**] Taybetmendîyeke Persîyan a din jî heye, ku zêde ji wan re ne xem e, lê ji ber çavê min xelas nebûye: Navê wan yan xisusîyeteke fîzîkî yan jî rûmeta şexsîyetê dide nîşan, hemî bi eynî tîpê, ya Dorîyan "san", ya Îonîyan ku jê re "sigma" tê gotin diqedin; ev ne ji bo hinekan wiha ye, bêîstîsna ji bo tevan derbasdar e.

[140] Tiştên ez behs dikim, yên esseh in, ji ber ku di derbarê wan de bi zelalî û vekirî min zanyarî vergirtin. Li hemberî vê, ji bo ku veşartina mirîyan nîşanî yên ne ji dînê wan in nadin, mirîyekî mêr yê Persî, ez nikarim bi zelalî bêjim ku ji alîyê teyrekî dirinde yan kuçikekî ve neyê perçekirin nayê veşartin. Lê ez dikarim bêgûman bêjim ku ji bo magan wiha ye, ji ber ku li ber çavê herkesê tê kirin. Ji derveyî vê, Persî berî mirî veşêrin bi şima helandî mûmya dikirin. Magî ji insanên din bi taybetî ji mirovên ayînî yên Misrî gelekî cihê ne; kahînên Misrî li gor ola xwe destnîşan dikin ku, ji derveyî serjêkirina qurbanê, heywanên zindî nakujin. Berevajî vê, magî, ji bilî kûçik û mirovan, her cûre heywanan dikujin. Tewra dixuye ku ew ji vî karî kêfê distînin, wekî ku bi hev re bikevin pêşbirkê mûrî, mar û çi dibe bila bibe, heywanên li erd û hewa dijîn, dikujin. Ev ûrf û adetê wan jî, wekî daxwaza yê ku pêşî dest pê kirîye, bila wiha be, ez ê cardin vegerim ser çîroka xwe.

ÎONÎ, DORÎ, AÎOLÎ

Girtina Van Cihan ji Hêla Kîros ve

[141] Hema piştî teslîmbûna Lîdyayîyan li hemberî Persan, Îonîyan û Aîolîyan, qasid şandin Sardesê bal Kîros. Dane xuyakirin ku çawa girêdayî Kroîsos bûne, amade ne desthilata wî jî bi eynî şertan qebûl bikin. Kîros bersiva wan bi çîrokeke nesîhetan daye, gotîye ku: "Bilûrvanek di deryayê de masî dîtibûn, ji bo derkevin qiraxan dest bi lêdana bilûrê kir û xeyal kir ku bi dengê bilûrê ew ê bên ba wî. Dema dît ku nayên, toreke masîyan peyda kir, gelek masî girtin; piştre ji masîyên bêsekin dilivin re wiha got: Wextê min ji we re li bilûrê dixist yek ji we ji avê derneket neleyîst, niha jî bi vî awayî neleyzin êdî." Sebebê ku Kîros bi vî awayî bi Îonî û Aîolî re axifîye hebûye; berîya wê ji bo ji Kroîsos veqetin ji wan re qasid şandine, lê wan guhê xwe nedanê, niha piştî her tişt qedîyaye, hatibûn ser gotina wî. Ji ber hêrsa xwe ev bersiv dabû. Dema ku ev bersiv ji wan re anîn, ji bilî Mîletosê, xwe kirin kelehên sîteyên Îonîyan, li Panîonîonê berhev bûn; ji ber ku Kîros, ji bo eynî mercan a li Lîdyayîyan dihatin tetbîqkirin, tenê bi Mîletosîyan re li hev kiribû. Hemî Îonîyên din, bi yekdengî biryar dan ku ji Spartayê re qasid bişînin û alîkarîyê bixwazin.

ÎONÎA

[142] Îonîyên ku li Panîonîonê berhev bûn, bajarên xwe di bin asmanê herî sipehî yê ser rûyê dinyê yê em dizanin û avûhewayê de damezirandine. Ne herêmên hê li bakur û ne jî yên hê li başûr dimînin bi Îonîayê re nikarin weke wê bên; heta ne rojhilat û ne jî rojavayê wê; li hinekan sarî û şilî, li hinekan jî germî û hişkî heye. Em bên ser ziman, Îonîayî hemû bi heman zaravayî napeyivin, lê li cihên cuda çar zaravayên cuda bi kar tînin. Ji başûr dest pê bike bajarê wan yê yekem Mîletos e; hema piştî wê Myûs û Prîene tên; ev her sê jî li Karyayê ne û xwedîyê heman zaravayî ne. Li Lîdyayê Ephesos, Kolophon, Lebedos, Teos, Klazomenaî, Phokaîa hene. Zimanê wan ne mîna wan bajarên berîya niha me hejmartin, hemî zaravayekî mişterek yê herêma xwe diaxivin. Ji bilî van sê bajarên din ên Îonîayê hene, dudu jê di giravan de ne bi nave Samon û Khîosê, yê sisiyan Erythraî li bejahîyê ye.[57] Ji van Khîos û Erythraî xwedîyê heman zaravayê ne, Samosî jî zimanekî wan yê taybet heye. Bi vî awayî çar cureyên min behsa wan kir ev in.

[**143**] Di nav van de tenê Mîletosî ji tirsê rizgar bûn, ji ber ku di navbera wan û Kîros de peyman hebû; yên li giravan rûdinin jî tiştekî jê bitirsin tunebû, ji ber ku hê Fenîkî neketibûn bin desthilata Persîyan û Persî ne deryavan bûn. Mîletosî tenê ji ber qelsîya zêde ya Îyonîyan ji doza hevpar veqetîyabûn, ji ber ku hêza tevahîya nijada Helenî di wê demê de lawaz bû, di nav hemû qebîleyên wê de Îyonî jî yê herî lawaztir û herî kêm qedir bû. Ji bilî Athenayê yek ji wan nedihat pejirandin. Ji ber vê Îonîyên din û bi taybetî Athenayî vî navî qebûl nakin, nedixwestin ji wan re Îonî bê gotin; îro jî ez wisan texmîn dikim ku ji ber vê fedî dikin. Lê ew duwazdeh bajarên min navê wan hejmartin, bi navê xwe pesnê xwe didin; wan li ser erdê xwe perestgehek ava kiribûn û navê Panîonîon lê kiribûn û ji bo Îonîyên din nexin hindur li hev kiribûn. (Jixwe ji bilî Symîrnayîyan kesekî bixwaze bikevê derneketibû.)

[144] Bi heman awayî Dorîyên herêma ku niha jê re Pentapolîs tê gotin, lê berê wek Hexapolîs dihat zanîn, hemû cîranên xwe yên Dorî nêzîkî pe-

57 Ev bajar tev, îro dikeve rojavayê Tirkiyê.

restgeha Trîopîonê nakin; heta di nav wan de yên li hemberî perestgehê bêrêzîyê bikin derkevin, ew jî nedixistin hundur. Berê, kesên di lîstikên merasimên ku ji bo rûmeta Apollon dihatin çêkirin qezenc dikirin, wekî xelat bronzên sêpê dihat dayîn; yê vê qezenc dikir nedikarî bigre û ji perestgehê derêxe, wekî nezir ji xuda re tê de dihişt. Yekî navê wî Agasîklesê Halîkarnasosî, guhê xwe nedaye vê adetê, sêpêyê ku wek xelat stendîye birîye mala xwe û bi dîwar ve daliqandîye. Li ser vê ew pênc bajarên din, Lîndos, Ialyos, Kameîros, Kos û Knîdos, ji Halîkarnassosê re derîyê perestgehê girtine. Wan jî ew bi vî awayî ceza kirine.

[145] Damezrandina konfederasyoneke ji duwazde bajaran ji alîyê Îonîyan ve û sebebê nexwestina wan a zêdekirina vê hejmarê, ez texmîn dikim ji ber ku hê dema li Peloponezê rudiniştin jî cardin bi vî awayî bi ser duwanzde bajaran ve parve bibûn. Ew Akhayên wan ji vî welatî derxistine jî wisan in: Pêşî Pellene tê, dema ku mirov ji Sîkyonê derdikeve bajarê ewil ev e, piştre Aîgeîra û Aîgaî, ev li ser Rûbarê Krathîsê ne ya ku qet ziwa nabe û navê xwe li rûbareke din yê li Italyayê kirîye; piştre Bûra, piştre Helîke, cihê Îonîyên ku di şerekî bi Akhayîyan re têk çûbûn û koçê wir kiribûn, piştre ew cihê rûbarê mezin yê bi navê Peîros diherike Aîgîon, Rhypes, Patras, Phares, Olenosê û piştre Dyme û Trîtaîa; tenê ya dawîyê di hundur de ye. Ev duwazdeh bajarên ku berê di destê Îonîyan de bû, îro di destê Akhayîyan de ye.

[146] Sebebê damezirandina konfederasyoneke duwazdeh bajarî ya Îonîyan ev e; gotinên ku dibêjin ev ji Îonîyên din hê kevintir in, yan jî ji eslekî hê bilindtir tên, ji henekan pê ve ne tiştekî din e, ji ber ku, Abantên ji girava Euboîayê hatine jî beşek ne hindik in û bi tu awayî naşibin Îonîyan, heta navê wan jî ne weke hev in û ji bilî vê, ev bi Orkhomenosê Mynîaîyî re, bi Kadmosîyan, Dryopîyan re, bi Phokaîayî, Molosî, Pelasgîyên Arkadîayî, Dorîyên Epîdaûrosî yê ji welatê xwe veqetîyane re û hê bi gelek xelkan re tevlihev bûne. Tewra yên ku ji Prytaneûm ya Athenayê hatine û xwe ji Îyonîyên herî pak dihesibînin jî, jin bi xwe re neanîn welatê nû, lê bi jinên Karyayî yên ku dê û bavên wan kuştine zewicîne. Ji ber van qetilkirinan, jinan di navbera xwe de bi sondeke qewîn qanûnek danîne û ev qanûn ji dê derbasî keçê bûye û hatîye parastin. Li gor vê qanûnê, tu jin bi mêrê xwe re li ser xwarinê rûnanin û navê mêrên xwe hilnadin. Bi vê, xwestine heyfa

mirina bavên xwe, mêrên xwe yên berê û kurên xwe hilînin, ji yên ku kuştin kirine û dûra xwestine bi wan re bijîn. Cihê ev bûyer qewimîne Mîletos e.

[147] Taximek ji van Îonîyan, hikumdarên xwe ji nesla Glaûkhosê kurê Hîppolokhosê Lîkyayî, taximeke din ji nesla Kordosê kurê Melanthosê Pylos Kaûkonî; taximeke din jî kesên ji nav van herdu neslan hatine hilbijartin. Madem girêdana wan bi Îonîyan re ji yên din zêdetir e, dil dixwest ku Îonên xwedîyê xwîna saf ev bin; lê Îonên eslî yên Athenayî û cejna Apatûrayê pîroz dikin ew in. Ev cejn, ji derveyî Ephesosî û Kolophonî hemî pîroz dikin; tenê ew Apaturîayê pîroz nakin; ev jî cardin, ji ber xwîndarîyek e ku ez eslê wê nizanim.

[148] Panîonîon, li Pozê Mykaleyê cihekî pîroz e; li bakur dinêre; bi beşdarîya peymaneke hemî Îonîyan, herêmeke ji Poseîdaona Helîkonê re hatîye nezirkirin. Mykale li bejahîyê pozek e, di îstîqameta Samosê de ber bi rojava ve dirêj dibe; bûye adet ji bo pîrozkirina cejna ku Îonî jê re Panîonîa dibêjin, ji temamê bajaran tên li vir berhev dibin. Ev ne tenê taybetîyeke cejnên Îonîyan e. Bê cudahî, ev di hemî cejnên Yûnanî yên ku navê wan, wekî navên Persan her tim bi eynî tîpê temam dibin de taybetîyeke hevbeş e.

BAJARÊN AÎOLÎYAN

[149] Belê, bajarên Îonîyan ev bûn. Em bên ser bajarên Aîolîyan, ew jî ev in: Kyme ku jê re Phrîkonê tê gotin, Larîssa, Neonteîkhos, Temnos, Kîlla, Notîon, Aîgîroessa, Pîtane, Aîgaîa, Myrîna, Gryneîa; deh sîteyên kevin yên Aîolî ev in; yê duwazdehan Symîrna, ji konfederasyona Îonîyan veqetandibûn; ji ber ku li welatê eslî jî ev sîte duwazdeh lib bûn. Aîolî li erdekî ji yê Îonîyan bi berekettir, lê hewayê wê ne bi qasî wê xweş bi cih bûne.

[150] Lêbinêrin Aîolîyan çawa Symîrnayê wenda kirin: Kolophonîyên li hemberî dijberên xwe yên polîtîk têk çûn û ji welatê xwe koç kirin, xwe avêtibûn vî bajarî. Ev Kolophonîyên koçber, man li hêvîya Symîrnayîyan ku ji bo pîrozkirina cejna Dîonysosê derkevin ji derveyî sûran, piştre dema ku ew derketin, derî girtin û bajar kirin destê xwe. Hemî Aîolî bazdan alîkarîyê; peymanek çêbû: Dê Îonî hemî eşyayên tên hildan paşve bidin, wê Aîolî jî wan

hildin û ji Symîrnayê derkevin. Symîrnîyan qebûl kirin, yanzde bajarên din ev kes di navbera xwe de parve kirin û kirin nav hemwelatîyên xwe.

[151] Bajarên Aîol yên li bejahîyê ev in, ji ber ku yên li herêma Îdayê hatibûn damezirandin ji van veqetîyabûn. Em bên ser yên giravan, pênc libên wê li Lesbosê ne. (Bajarê Lesbosê yê şeşem Methymnayîyên Arîsbayî, ew jî ji eynî xwînê ne, lê ew kirine kole) Li Tenedosê tenê bajarek heye, yek jî li girava ku jê re Sedgirav tê gotin heye. Wekî temamê Îonîyên li giravan, bajarên li Lesbosê û Tenedosê jî ji Kîros neditirsîyan. Yên din biryar dan bi Îonîyan re bibin yek, li pey wan biçin.

BERXWEDANA BAJARÊN ÎON Û AÎOL LI HEMBERÎ KÎROS

[152] Dema ku qasidên bajarên Îonê û Aîolê bi lez çûn Spartayê, di nav xwe de ji bo berdevkîyê qasidê Phokaîyê hilbijartin, navê wî Pythermos bû. Ji bo Spartayî seh bikin û baz bidin bên û gelek kes berhev bibe, cilekî binefşî li xwe kiribû û li cihekî navendê sekinîbû; gotereke dirêj pêşkêş kir û daxwaza alîkarîyê kir. Lakedaîmonîyan guh nedanê û xwe nêzîkî alîkarîya Îonîyan nekirin. Li ser vê qasid paş ve vegerîyan; lê piştî Lakedaîmonîyan ev daxwaz paşve vegerandin, li pey wan keştîyeke pêncî bêrî ya mirovên xwe şandin, li gor min mebesta wan, dixwestin bibînin rewşa navbera Kîros û Îonîyan wê bigihe çi netîceyê. Dema ku ev çavdêr gihiştin Phokîayê, kesê herî giring yê di nav wan de, hemwelatîyê navê wî Lakrînes şandin Sardesê, wî mesaja Lakedaîmonîyan gihand Kîros û ji wî re got, ew naxwazin bajarekî Yûnanê kavil bibe û heke tiştekî wiha bibe dê wekî bîner nemînin.

[153] Tê neqilkirin ku li ser van gotinên qasid, Kîros, ji Yûnanîyên li ba xwe pirsîye, "Ev Lakedemonî kî bûn û hejmara wan çend bû, ku wan cesaret kir xeberek wisa jê re bişînin??" Piştî agahdarî wergirtin, bi vî awayî bersiva qasidê Spartayê daye: "Ez ji xelkekî bi vî awayî natirsim, yên ku di nîvê bajarê xwe de cîhek diyar kirine û li wir têne cem hev da ku bi derewa sûnd bixwin û hevdû bixapînin. Heke ez nemrim û sax bimînim, dê mijara gotegotên wan ne ew felaketên hatine serê Îonîyan, wê bibin ew felaketa bên serê wan bixwe." Kîros ev heqaret li rûyê temamê Yûnanîyan dida, ji ber ku

ji bo hemî tiştên li wir dihatin firotin û kirîn sûk hene; li ba Persîyan tiştên wiha tunene, nizanin sûk çiye; tiştên wan yên wekî van tune. Kîros, piştî vê rêveberîya Sardesê emanetê yekî Persî kir, yê bi navê Tabalos û wezîfeya anîna xezîneya Kroîsos û anîna Lîdyayîyên din da kesekî Lîdyayî yê bi navê Paktyas; ew bi xwe jî vegerîya Akbatanê, Kroîsos jî bi xwe re bir. Em bên ser Îonîyan, di destpêkê de ewqas girîngî nedida wan, sêwiranên mezintir di hişê wî de bûn. Yê jê re asteng derdixistin Babîlî bûn, Baktrîanî, Sakesî û Misrî jî eynî, dê li hemberî van dijminan artêşa xwe bi xwe bimeşanda, ew fikirîbû ku tenê çend generalan derxe hemberî Îonîyan.

[154] Lê dema ku Kîros artêş bir û ji Sardesê dûr ket, Paktyas Lîdyayî teşwîq kir ku li dijî wî û cîgirê wî Tabalos serî hildin. Temamê xezîneya Sardesê di destan de bû, ber bi deryayê ve meşîya, eskerên bi pera berhev kirin û di heman demê de gelê peravê jî bi xwe re ber bi şer ve rakêşa. Ew anîn Sardesê û Tabalos di kelehê de dorpêç kir.

[155] Kîros di rê de ev xeber bihîst û ji Kroîsos re wiha got: "Kroîsos, dê netîceya van bigihe ku? Ihtîmal e ku ev Lîdyayî her tim tiştên bêhna min teng dikin wê bikin, lê wê bi eynî awayî berdelê wê bidin. Ez difikirim gelo ya herî baş ew e ku mirov wan bi temamî bike kole. Ez dibê qey, niha ya ez dikim, wek ku mirov bav bikuje û kur biparêze; rewşa min tam dişibe vê: Tu ku ji bo Lîdyayîyan ji bavekî jî wêdetir bû, ez te digrim û dibim, min bajarên wan ji wan re hişt û rû da wan; ma wê demê heqê min û şaşmayînê heye ji bo serhildana wan ya li hemberî min?" Çi di hişê Kîros re derbas dibûn ew digotin; Kroîsos ji surgunkirina hemî kesên li Sardesê rûdinin ditirsîya û ev bersiv dayê: "Ey şahê min, gotinên te maqûl in; lê bêhna xwe fireh bike, tawanker ji bêtawanê veqetîne, bajarekî kevin vala neke, ji ber ku ne di şaşîyên berê de û ne jî di şaşîyên niha de guneheke bajêr tuneye; çunkî qisûrên berê yên min in, kêşana cezayê wê jî dikeve ser min. Qisûrên îro jî yên Paktyas in yê te Sardes emanetê wî kir, kêşana cezayê dikeve ser wî; em bên ser Lîdyayîyan, wan efû bike û ji bo nema serî hildin û ji te re nebin tehlîkeyek jî van tedbîran werbigire: Yekî bişeyne, bi xwe re gerandina çekên şer qedexe bike; bila di binê qapotên xwe de fîstanên dirêj û solên kothornos[58] li xwe bikin; bila zarokên xwe hînî lêdana kîtarê, mijûlîya bi

58 Kothornos, di Yûnanîya kevin de nave solê dox dirêj û bi pêşîyê ve girêdayî ye.

mûzîkê û ticaretê bikin. Dê piştî demeke kurt wisan li wan bê ku ne wekî mêr, wê bibin wekî jinan û êdî tu nema ditirsî ku li hemberî te rabin."

[156] Kroîsos difikirî ku di cihê ku Lîdyayî bibin kole, bên ajotin û firotin, wiha bin baştir e û dixwest vê têke serê Kîros; dizanîbû heke tiştekî bibawer nebêje, nikare biryara wî biguhere û ji bilî vê, vê tehlîkeya îro bide milekî jî, ditirsîya ku Persî di esnayê serhildaneke nû de Lîdyayan bi carekê ji holê rakin. Gelek kêfa Kîros ji vê fikrê re hat, nerm bû û got, ev fikreke baş e û dê tetbîq bike. Bang yekî Medaîyî yê bi navê Mazares kir. Jê re got, tiştên Kroîsos gotine bigihîne Lîdyayîyan, yên bi Lîdyayîyan re bûn yek û li hemberî Sardesê şer kirin jî wê bikin kole; em bên ser Paktyas, çi dibe bila bibe gerek wî sax bînin. Piştî van fermanan, Kîros rêwîtîya xwe ber bi xaka Persan ve domand.

PENABERÎYA PAKTYAS

[157] Paktyas, dema seh kir ku ew artêşa şandine ser wî wê di demeke nêzîk de bê, tirsîya û baz da çû Kymeyê. Dema Mazaresê Medîayî, bi qismeke zêde ya artêşa Kîros ve gihişt Sardesê, li bajêr yên bi Paktyas re hereket dikirin kesek nemabû, yekser ket nav bajêr; ji bo fermana Kîros bi cih bike, pêşî hişk bi ser Lîdyayîyan de çû. Bi saya bicihkirina van fermanan jiyana wan dihat guhertin. Piştre Mazares qasid şandin Kymeyê, xwest ku Paktyas teslîm bikin. Kymeyî biryar dan ku bi îlahê kurên Brankhosîyan bişêwirin. Li wir mîhrabeke kahînan hebû, hê ji dewrên berê ve hatibû avakirin û ji berê ve Îonî û Aîolî bi wî dişêwirîn. Li ser erdê Mîletos û ji bendera Panormos wêdetir bû.

[158] Kymeyîyan jî mirov şandin ba Kurên Brankhosîyan û dan pirsîn: "Ji bo em rizayê xudayan werbigirin, em di derbarê Paktyas de çi bikin?" Kahîn di cih de dibêje; Paktyas teslîmî Persîyan bikin. Dema Kymeyîyan ev bersiv wergirtin, xwe amade kirin ku wî teslîm bikin û her çend piranîya zêde bi vê biryarê re bûn, Arîstodîkosê kurê Herakleîdes, ku hemwelatîyekî navdar bû, pêşîya wan girt; ji ber ku bawerîya wî bi wî kahînî tunebû û şik pêre çêbibû ku qasid rastîyê nabêjin. Got ku; em ji bo Paktyas careke din bipirsin, bila niha neyê teslîmkirin û ew bixwe jî beşdarî vê sefera duyem bû.

[**159** Dema ku hatin ba Kurên Brankhosîyan, nûnerên din ji bo bi kahîn bişêwirin di navbera xwe de Arîstodîkos hilbijartin, wî wiha got: "Efendîyê me, Paktyasê Lîdyayî bi hêvî û lavayan hat ba me; ew ji ber mirineke bi êş a ji destê Persan baz dide. Persî ji Kymeyîyan dixwazin ku wî teslîmî wan bikin. Her çend em ji hêza Persîyan ditirsin jî, heta niha me cûret nekir em dev ji daxwazkarê xwe berdin; pêşî em dixwazin ji devê we bi awayekî vekirî seh bikin ka gelo em çi bikin." Piştî bi vî awayî hat pirsîn, Kahîn heman bersiva berê da, ji wan xwest ku Pactyas teslîmî Persîyan bikin. Wî wextî Arîstodîkos ku di pêşî de hazirî kiribû, wiha kir: Li dora perestgehê zivirî, berda çûkên di mihrabê de û teyrên nû ji hêkan derketibûn û dikir ku birevin; di vê nave re ji kûrahîyên perestgehê dengek hat, wî dengî wiha digot: "Ey, tu! Bêdînê herî mezin yê insanan, tu çi dikî? Tu dike ku yên xwe avêtine perestgeha min birevin." Arîstodîkos, bê xem bersiv da: "Lê tu, efendîyê me, parêzvanê bi xîret yê penaberan, ma tu jî bangî Kymeyîyan nakî ku penaberekî teslîm bikin?" Tê gotin ku kahîn bi vî awayî bersiv daye: "Belê, ez bang dikim, lê ez ji bo hûn bikevin gunehan û demeke nêzîk de tune bibin vê dikim da ku careke din hûn neyên ba kahînekî û pirs nekin ka em penaberan teslîm bikin an na."

[**160**] Piştî Kymeyîyan ev bersiv wergirtin, fikirîn ku heke Paktyas bidin dest wê ew bi xwe jî tune bibin û nedin wê bajarê wan wêran bibe, ji ber vê Paktyas şandin Mytîleneyê.[59] Li ser vê yekê Mazares qasid şandin ba Mytîleneyîyan, wan jî xwe amade kirin ku di miqabilî perekî mezin de wî teslîm bikin; ez nikarim bêjim çiqas pere bû, ji ber ku bazar temam nebûbû dema Kymelîyan nîyeta Mytîleneyîyan fêhim kirine û keştîyek şandine Lesbosê, Paktîyas birine Khîosê. Khîosîyan jî ew ji perestgeha Athene Polîûkhosê derxistine û firotine. Di miqabilî wê de Atarneûsê wergirtine; Atarneûs, perçekî erdê aîdê Mysîayê yê li hemberî Lesbosê ye. Persên ku Paktyas bi dest xistin, ji bo ku derxin pêşîya Kîros ew baş veşartin. Di ser vê bûyerê re wextekî gelek dirêj jî derbas bûbû, Khîosî li serê wan qurbanên ji xudayan re tên nezirkirin cehê Atarneûs nareşînin; ew genimê li ser vî erdî hêşîn dibin nakin nan û çi tiştên li wir hêşîn dibin nakin nav perestgehên xwe.

59 Mytîlene, bajarek li ser giraveke Yûnanîstanê ye ku dikeve rojavayê navçeya Ayvalik ya Tirkiyê. Tê texmînkirin ku ev ji navê Muvatallî tê yê di Lûvî ya Hîtîtî de tê bikaranîn.

[161] Bi vî awayî Khîosîyan Paktyas teslîm kirin; piştî vê Mazares, li hemberî serhildêrên alîkarîya dorpêçkirina Tabalosê kiribûn, sefer da destpêkirin. Di serî de Prîene zep kir û rûniştevan kirin kole, temamê Deşta Maîanderosê[60] seranser stend; artêş, Magnesîa jî tê de, her cih talan kir. Piştî wê nexweş ket û mir.

[162] Piştî mirina wî, Harpagos ket cihê wî; ew jî Medîayîyek bû; ew kesê ku Astîyagoyê hikumdarê Medî ziyafeteke heram pêşkêşî wî kiribû, wî jî di bin re ji bo hikumdarîyê bide Kîros xebitîbû. Dema ku Kîros ew anî ser fermandarîya artêşê, meşîya ser Îonîyayê, bi komkirina girên axî bajar stendin. Piştî eskerên bajarên dorpêçkirî diketin pişt dîwaran, ax dikir pêşîya wan surhan û eskerên xwe derbas dikir. Li Îonîayê êrîşa ewil bir ser Phokaîayê.[61]

KOÇBERÎYA JI PHOKAÎAYÊ

[163] Yûnanîyên ku cara ewil derketin sefera dirêj Phokaîayî bûn û ew bûn yên ku Yûnanî bi Adrîyatîk, Etrurîa, Ibedîa û Tartessosê[62] dan naskirin; ne bi tekneyên gilover, bi keştîyên bi pênceh bêran ve diçûn. Hikumdarê li Tartessosê yê bi navê Arganthonîos gelek ji wan hez kir. Vî hikumdarî li Tartesîyan heyştê salî hikumdarî kir û sed û bîst salî jiya. Gelek qencîya wî gihiştîye Phokaîayan, pêşî gotîye, "Îonayê terk bikin, werin li vir bi cih bibin, hûn ê ji vir hez bikin." Ew razî nebûne, li ser vê, ji bo ku hîn bûne Medî roj bi roj bi hêz dibin, ji bo bajarên xwe bi surhan rapêçin pere dane wan. Bêhesab pere dane wan, ji ber ku dîwar seranser gelek stad digre û tevde ji kevirên birrî hatine çêkirin.

[164] Belê Phokaîayan surhên xwe bi vî awayî çêkirine. Harpagos bi artêşa xwe ve hat, dora bajêr girt û pêşî şert û merc pêşkêşî wan kir: "Heke milekî vê tertîba parastinê xera bikin û avahîyekê tenê bidin Hikumdarê Mezin, dê bi vê qinyat bikin." Phokaîayî, ji ramana ku bibin kole pir dilgiran bûn,

60 Îro Tirk jê re dibêjin Deşta Menderes.

61 Phokaîa, navçeyek li qeraxa behra Egeyê ye ku Tirk jê re Foça dibêjin û girêdayî bajarê Îzmîrê ye.

62 Tartessos, bajar û kendaveke ticaretê yê Îspanyayê yê li ber devê çemê Betîsê (Guadalquivir).

rojekê izin xwestin, dê bersiva wî piştre bidana; gotin "Wextê em di navbera xwe de diaxivin, hûn jî artêşa xwe ji surhan dûr bixin." Harpagos jî got ku: "Ez fikra di serê we de dizanim, lê bila wisan be." û ji bo di navbera xwe de bi hev bişêwirin, muhlet da wan. Di midetê Harpagos artêşa xwe ji bajêr dûr xistibû, keştîyên xwe yên pênceh bêrî berdan deryayê, jin û zarokên xwe siwar kirin, hebûn û tunebûna xwe bar kirin -tenê perçeyên kevirî û bronzî û lewha û tablo hiştin- bi xwe jî siwar bûn û berê xwe dan Khîosê; tiştek li pişt xwe nehiştibûn, dema ku Persî ketin hundur Phokaîa vala bû.

[165] Phokaîyan xwestin giravên Oenûssaeyê bikirin, lê Khîosîyan nexwestin van deran bifroşin, ew ditirsîyan ku dê ew cihên kar vekin û bi wan re bikevin reqabetê. Wî wextî Phokaîayîyan berê keştîyên xwe zivirandin ber bi Kyrnosê.[63] Bîst sal berê, li ser emrê kahînekî, li Kyrnosê bajarekî bi navê Alalîa damezirandibûn, li milê din di vê tarîxa em dibêjin de, êdî Argonthonîos tunebû. Ji ber wê çûn Kyrnosê, lê pêşî serî li Phokaîayê dan. Harpagos parêzger li bajêr bi cih kiribû, Phokaîayî ew garnîzon bi şûran bertaraf kirin. Piştî toleya xwe vekirin, nifirên herî giran li wî mirovê ku divê paşve vekişe û ji hêzê daryayî veqete kirin. Hesinekî mezin yê di agir de sorkirî avêtin deryayê, sond xwarin ku heta ev perçeya hesin dernekeve ser rûyê avê venegerin Phokaîayê. Piştre berê kelekên xwe dan ber bi Kyrnosê; lê ji nîvê wan zêdetir bi hesreta welat bûn û bêrîya hewayê welatê xwe yê hîn bûbûn kirin, ji sonda xwe vegerîyan û berê keştîyên xwe dan Phokaîayê. Yên ji sonda xwe venegerîyan, ji giravên Oînûssayê rabûn û rêya xwe dewam kirin.

[166] Dema gihiştin Kyrnosê, li gel nîştecihên berê li Alalîa bi cih bûn, perestgeh ava kirin. Ji ber ku pênc salan cîranên xwe talan kirin û ew bi her awayî aciz kirin Karthagînîan û Tyrrhenîan di navbera xwe de li hev kirin, li hemberî van her yekî bi şêst keştîyan ve derketin seferê. Li milê din Phokaîayîyan jî şêst keştî techîs kirin û li Deryaya Sardînîayê meşîyan ser dijmin. Şerekî deryayî çêbû; Phokaîayî bi ser ketin, lê serkeftina wan tenê celebek serfirazîya Kadmeîan bû. Ji ber ku wan di şer de çil keştî winda kirin, bîst keştîyên ku mabûn jî mehmûzên wan şikestibûn û bi kêrî tiştekî nedihatin. Vegerîyan Alalîayê, jin û zarokên xwe hildan, eşyayên wan yên

63 Korsîka

bikaribin li keştîyê bar bikin çi hebû tevde bar kirin, piştre Kyrnosê terk kirin û çûn Rhegîûmê.

[167] Tayfeyên keştîyên xerqbûyî di navbera Karthagînîan û Tyrrhenîan de bi qûrayê parve kirine. Ji Tyrrhenîan herî zêde Agyllayî tayfe wergirtin, birin welatê xwe û li wir dan ber keviran û kuştin. Ji wê rojê şûn ve, insan yan heywanên biçûk û mezin, li Agyllayê dema di wî cihê ku Phokaîayî dabûn ber keviran û kuştibûn re derbas be, xenîm li wan dixe, ya felc dibin yan seqet dimînin. Li ser vê yekê gelê Agyllayî serî li Delphoîyê dan da ku ji şîretkar bipirsin, ka gelo ew çawa dikarin gunehên xwe bidin efûkirin. Pythîa ji wan re gotîye; ew tiştê ku niha jî li Agyllayê bûye adet û tê kirin bikin, yanî li ser navê wan Phokaîyên ku kirin qurban, bi hurmetkirina mirîyan bi ayînên cenazeyan ên bi heybet û lîstikên bi heybet, wek pêş-birkên bazdana hespan û lîstika bi nave tertîb bikin û piştre qurban serjê bikin. Ev Phokaîayî wiha mirine. Yên din, yên xwe avêtin Rhegîûmayê, ji wir derbasî Oînotrîayê bûne û bajarê Eleayê yê niha damezirandine. Ji yekî Poestûmî hatîye zanîn ku, dema Pythîa ji wan re Kyrnos dibêje, xwestîye navê mêrxasekî ku bê pîrozkirin bide wan, ne ku ji wan re gotibe giravekê bikirin û bikin kolonî, vî bajarê Eleayê, piştî vê hîn bûne damezirandine.[64]

[168] Aqûbeta bajarê Phokaîayê yê li Îonîayê wiha bû; kêm-zêde eynî tişt hat serê Teosîyan jî. Dema ku Harpagos, di saya terasên axîn sûrên wan bi dest xist, hemîyan xwe avêtin keştîyan û çûn Trakyayê, li wir bajarê Abderayê damezirandin; xîmê vî bajarî berîya wan Tîmesîosê Klazomenaîyî avêtibû; lê ji bo Trakyayî wî raqewirandibûn, jê sûd wernegirtibû; Teosîyên li Abderayê bi cih bûbûn, ew di qatê nîv-îlah de digrin.

[169] Tenê ev Îonî ne ên ku gotine, ji bedêla bibin kole, baştir e ew welatê xwe terk bikin. Îonîyên din, ji bilî Mîletosîyan tev jî wekî yên koç kirine li hemberî Harpagos sekinîne, şer kirine û yek jî ji bo welatê xwe biparêzên ji mêrxasîyê paş ve nemane. Lê yek li pey ê din têk çûne; bajar hatine girtin, rûnîştevan jî teslîm bûne û her yekê cardin li welatê xwe mane û ketine bin desthilata yê bi ser ketine. Mîletosî, wekî min berê jî got, bi Kîros re peyman

64 Kyrnos, hem navê kurekî Korsîka, hem jî yê Herakles e.

çêkiribûn û bi vî awayî di aştîyê de berdewam kirin. xwe bi xwe bi Kîros ve girêdane û tiştekî wan yê jê bitirsin tunebû. Îonîayî, bi vî awayî cara duyem diketin bin bindestîyê. Harpagos, piştî serî li yên bejahîyê da tewandin, Îonîyên giravan ji eynî aqîbetê tirsîyane, xwe bi xwe teslîmîKîros bûne.

[170] Îonî, bi ser tiştên hatin serê wan de jî, wekî her wextî dîsa civînên Panîonîonan dikirin. Li gor ji min re gotin, Bîasê Prîeneyî ji wan re riyeke rizgarîyê nîşan kirîye ku, heke bihata qebûlkirin, dê di nav Yûnanîyan de yên herî bextewer ew bûna; wî gotibû ku bi fîloyeke mişterek biçin Sardûnyayê û li wir ji bo hemî Yûnanîyan sîteyekê damezrînin; heke wiha bûya wê ji koletîyê rizgar bibûna û bextewer bûna. Ji ber ku dê girava herî mezin di navbera xwe de parve bikirina, giravên din jî bikirina bin desthilata xwe; digot heke bi awayê din be, yanî li Îonîayê bimînin, ji bo wan êdî fikra azadîyê nedihat melhezekirin. Piştî wêranbûnê şîreta ku Bîasê Prîeneyî dabû Yûnanîyan ev e. Di eslê xwe de berî wêranbûnê, fikra ku Thalesê Mîletosî, yê di rehên wî de xwîna Fenîkîyan digerîya, dabû wan jî pir baş bû. Wî, xwestibû fikra mecliseke bilind ya li Teosê ya di navenda Îonayê de bê damezirandin bide qebûlkirin, bajaran cardin wekî xelkê azad dê xwe bi xwe idare bikirina. Wan kesan fikrên dabûn Îonîyan ev bûn.

KARYA – KAÛNÎA - LÎKYA

[171] Harpagosê serî li Îonîyan tewand, meşîya ser Karyayî, Kaûnîayî û Lîkyayîyan; Îonîayî û Aeolîyanî bi xwe re dibirin ji bo di artêşê de xizmetê bikin. - Yek ji van sê miletan, Karyayî, ji giravan hatibûn bejahîyê. Berê di bin navê Lelegeyê de li giravan rûdiniştin û di bin hukmê Mîr Mînos de bûn; her çend bi yên ji min re hatine gotin zêde li hev nekin jî, bac nedane, tenê wextê Mînos dixwest, ji wî re kesên di keştîyan de bixebitin dişandin. Û Mînos, ji bo ku şer qezenc dikirin û bi gelek welatan serî dabû tewandin, wê demê Karyayî neslên herî bi nav û deng û qelebalix bûn. Ev hersê tişt wan dîtibûn û Yûnanîyan jî ji wan wergirtibûn: perê li ser mîgfera şerî tê danîn, kolandina îşaretan li ser mertalan û yek jî ji bo girtina mertalê kulp çêkirin, ev ji alîyê wan ve hatine îcadkirin; heta wî wextî mertal bi qulpê wê bi dest nedihat girtin, qayîşeke di stû de hatî kirin li ser milê çepê dihat girtin û bi wî awayî dihat bikaranîn. - Gelek wexit piştre Dorî û Îonîyan,

Karyayî ji giravan derxistine, wan jî li ser vê, koçê bejahîyê kirine. Girîtîyan ji bo Karyayîyan ev gotin; lê Karyayî bi xwe vê qebûl nakin; ew dibêjin em xwecîhê bejayîyan in û her tim ev nav bikar anîne. Ji bo îsbatkirina vê yekê, li Mylasayê, perestgeheke gelek kevin a aîdê Zeûsê Karyayê didin nîşan ku, mafê Mysîayî û Lîdyayî yên miletin bira dihatin hesêbkirin hebûn ku tê de îbadetê bikin; ji ber ku dibêjin, Lîdya û Mysîa birayên Kar bûn. Ev herdu milet ji bo vê dihatin qebûlkirin; lê yên ji neslên din, zimanê Karyayî biaxiftina jî, nedigirtin vê perestgehê.

[172] Bi dîtina min, Kaunîanî xwecihên vir in; lê ew bi xwe dibêjin ew ji Kreteyê [65]hatine. Di zimanê wan de tesîra Karyayî heye yan jî di zimanê Karyayî de tesîra wan (li ser vê yekê ez nikarim bi teqezî tiştekî bêjim). Lê di hêla ûrf û adetan de ji Karyayîyan pir dûr in, ne tenê ji wan ji insanên din jî cuda ne. Ew difikirîn ku ji bo hevalên xwe an jî kesên di heman temenî de, çi mêr be, çi jin, çi zarok bin, ji bo vexwarina şerabê bicivin ev kirineke herî bi rûmet e. Wekî din carekê wan biryar da ku ew ê êdî perestgehên biyanî yên ku ji mêj ve di nav wan de hatine damezrandin bikar neynin, lê ew ê tenê xwedayên bav û kalên xwe yên kevn biperizin. Paşê hemû xortên wan çek hildan, bi rimê xwe li hewayê xistin, ber bi sînorê Kalyndikê ve meşîyan û diyar kirin ku ew xwedayên biyanî derdixin. Bi awayê "Me wisa bera wan xudayên biyanî da" ev behs dikirin.

[173] Ûrf û adetên vî miletî wiha ye. Em bên ser Lîkyayan, ev ji Kreteyê hatine. (Ji ber ku gelek berê li Kreteyê tenê barbar rûdiniştin.) Kurên Eûropa Mînos û Sarpedon, ji bo hikumdarîya Kreteyê şer kirine, şerekî sîvîl derketîye; Mînos, bi saya kesên terefdarên xwe qezenc kir; Sarpedon û hevalên wî ji welat derxistin; van koçî Asyayê û erdê Mîlyasê kirin; ji ber ku ew erdê niha Lîkyayî rûdinin berê Mîlyas bûn û ji Lîkyayîyan re Solymî dihat gotin; heta wî wextî rêberê van koçberan Sarpedon bû; navê xwe yê dema hatin bi kar dianîn, cînarên Lîkyayîyan niha jî bi wî navî, yanî bi navê Termîlî bang wan dikin; Lykosê kurê Pandîonê Atenayî jî ji alîyê birayê xwe Aegeûs ve hatîye derxistin, hatîye welatê Termîlê ba Sarpedon û piştî vê ji van xelkan re ji ber navê Lykos, Lîkyayî hatîye gotin. -Adetê wan li milekî dişibe yê Girîtîyan, li milê din dişibe Karyayîyan. Lê adetekî wan heye ku, mirov li ba tu miletê din

65 Krete/Girît

lê rast nayê, ne navê bavê xwe navê dêya xwe hildigirin; Lîkyayek ji yê din bipirse, bêje, tu ji kê yî, piştî navê xwe yê dêya xwe û paşnavê wê dibêje. Heke jineke hevwelatî di bin banê koleyekî de bijî, qanûn zarokan azad hesêb dike; bi eksê wê dema giregirekî herî li pêş yê welat jî be, mêrek, heke bi jineke biyanî yan koleyekê re bijî, zarokên wan ji mafê hevwelatîyê bêpar dimîne.

[174] Ji van miletan, Karyayî bêyî ku berxwedaneke birûmet bikin teslîmî Harpagus, bûn Yûnanîyên din ên di vê herêmê de dijîn jî di hêla mêrxasîyê de ji Karyayîyan ne baştir bûn; Knîdosê, kolonîya Lakedaîmon jî di nav van de ye. Erdê wan li deryayê dinêre; ji ber vê jê re Trîopîon dibêjin; vir dewama nîvgirava Bybassosê ye; hemî erdê Knîdosê ji bilî bejahîyeke zirav bi avê hatîye rapêçan; li bakurê wê Kendava Keramîkê, li başûrê wê jî giravên Syme û Rhodesê heye. Dema Harpagos daket Îonîayê, Knîdosî di vê bejahîya zirav ya kêm û zêde pênc stad firehîya wê hebû, dest bi kolanê kirin; dixwestin erdê xwe bikin wekî giravê. Bi vî awayî bi temamî dê bikêşana welatê xwe, ji ber ku ew cihê dixwestin bikolin, perçeyê erdê ku Knîdosê bi bejahîyê ve girê dida. Ji bo vî karî kedeke mezin hat xerckirin; lê bûyereke nedîtî hat serê wan, dema ku karkeran kevir dişkandin di laşê wan de li cihên cuda cuda de, axilbe di çavên wan de birînên mezin vebûn. Qasid şandin Delphoîyê û şêwirîn gelo ev çiye. Knîdosî bi xwe dibêjin, Pythîa bi vê sêbenda îambos bersiva wan daye:

> Bejahîya zirav ne keleh dixwaze ne kolan
> Heke Zeûs bixwesta gelo nekarîbû vê zinarê bikira girav?

Li ser vê kahînîyê Knîdosîyan dev ji vî karî berdan û dema ku artêşa Harpagos hat bê şer teslîm bûn.

[175] Pedasîanî ji Halîkarnassosê wêdetir, ji peravan dûr ber bi hindur ve rûdinîştin; li gel vî gelî, dema ku xerabîyek tê serê wan an jî cîranên wan, rîha rehbika Mînerva derdiket û direj dibû. Ev bûyera nedîtî, sê caran qewimîye. Ji hemû rûnîştvanên Karyayê tenê wan qasekî li hemberî Harpagos li ber xwe dane; li herêma çiyayî ya jê re Çiyayê Lîdayê tê gotin tahkîmat çêkirine, gelek zehmetî derxistine. Lê bi demê re ew jî neçar man ku teslîm bibin.

[176] Em bên ser Lîkyayîyan. Dema ku artêşa Harpagos daket Deşta Xanthûsê, ew jî li hember rabûn, li hemberî hêzeke ser û binê wê tune, bi hejmareke kêm ve şer kirin; di mêrxasîyê de nav û deng dan, lê mexlûb bûn, paşve ber bi bajarên xwe ve hatin dehfandin; jin, zarok, xezîne û koleyên xwe di kelehê de kom kirin, ji binî û rexan ve agir dan ber, bi awakî wisan şewitî ku keleh ser û bin kir. Piştî bi sondên giran bi hev ve hatin girêdan, êrîşî dijmin kirin û temamê yên li Xanthûsê rûdiniştin, hatin kuştin. Îro hemî kesên li Lîkyayê xwe Xanthosî hesêb dikin, ji bilî heyştê malan, hemî jî xerîb in; ev heyştê malbat, wî wextî li derveyî welat diman; ji ber vê sax mane. Belê Harpagos, Xanthosê bi vî awayî sitend û Kaûnosê jî kêm-zêde bi eynî awayî bi dest xist; ji ber ku Kaûnosî jî eynî wekî Lîkyayîyan kirine.

[177] Gava ku deverên jêrîn ên Asyayê bi vî rengî ji hêla Harpagos ve hate xistin, Kûros bixwe herêmên jorîn xist bin zorê, her milet zeft kir û nehişt ku yek xelas bibe. Em ê behsa piranîya van miletan nekin, tenê yê herî zerar dayê û heq kirîye bê bibîranîn kîjan in, em ê behsa wan bikin.

B A B Î L

[178] Kîros, piştî dest danî ser temamê herêmê, meşîya ser Asûrîyan. Gelek bajar di destê Asûrîyan de hebûn. Di nav wan de yê herî bi hêz û bi nav û deng Babîl bû û piştî Nînûa[66] ket, hikumdarê wan jî barkiribû wir; lêbinêrin bajarekî çawa bû: Li ser deşteke fireh hatibû avakirin, her alîyekî wê çargoşeyê sed û bîst stad bû; bi vî awayî tevahîya dîwarê çargoşeyê çarsed û heyştê stad dike. Mezinahîya bajarê Babîlê ev e; ji bilî vê di warê damezirandin û tehkîmatê de em bajarekî wekî vê nizanin. Dora bajêr, di serî de bi xendeqeke kûr û fireh û tije av hatîye dorpêçkirin, piştî wê dîwarek tê, firehîya wê pêncî enîşka hikumdar e, bilindahîya wê jî dused enîşk e (Enîşka hikumdar ji enîşkên din du tilî dirêjtir e).

[179] Ew axa ji xendeqê derket çi lê hat û dîwar çawa çêbû, ez ê behsa vê jî bikim. Dema ku Babîlîyan xendeq dikolan, ji wê axa derdiket qermît/kerpîç dibirîn; dema ku miqtareke maqûl berhev dibû ew di firinan de di-

66 Nînûa/Nînova/Nînewe/Naînûwa

pehtin; pêşî rexên xendeqê û piştre dîwarên wê dihûnandin; ji bo xerca wê zifta helandî ya germ bikar dianîn û her ji sîh rêza kerpîçan yekê qatek qamişên hûnandî datanîn. Li ser bedenên kelehê û ber bi milê derve bircên li hember hev hebûn; di navbera bircan de qasî erebeyên şer yên çar hespî bikaribin bifetilin, valahîyek hatibû hiştin. Derîyên bajêr kiribûn nav van bedenan; sed derî hebûn, hemî jî di mesafeya wekî hev de, tev qalibê jora derî û stûnên kêlekê û ji bronzê hatibûn çêkirin. Zifta ku di xercê de tê bikaranîn, ji çemeke biçûk a ku diherike Firatê ya bi navê Îsê anîne Babîlê. Ev çem li bajarekî bi heman navî ye ku ji Babîlê rêya heyşt rojan dûr e. Di vî çemî de tertîyên bîtumenê pir tê dîtin.

[180] Belê Babîl bi vî awayî hatîye tehkîmkirin. Ev bajar du tax e, ji bo ku rûbarê jê re Firat dibêjin di nav re derbas dibe; çavkanîya vê rûbarê li Ermenîstanê ye; mezin, kûr û bi sur'et e; dirije Deryaya Erythraîayê. Bedenên kelehê ji herdu milan heta rûbarê dirêj dibe, li wir goşekê çêdike; xeta surhê ji nuqteya digihijin hev dest pê dike û li gora fetla çemê di navbera du dîwarên ji kerpîçên pehtî hatî çêkirin berdewam dike diçe. Hundirê bajêr tijî xanîyên sê-çar qatî ne; hemû kolanên wê rast in, hem yên paralelê rûbarê, hem yên ber bi rûbarê ve diçin. Li cihên ku kolan digihijin çem, di nava surhên ku qiraxên çem pêçane, derîyên nehênî hene, çend kolanên wiha hebin ewqas jî derî hene; wekî derîyên bajêr ev jî ji bronzê çêbûne û vedibin rûbarê.

[181] Ev dîwar, ji bo bajêr wekî zirhekê ye; li milê hindur dîwareke din jî bajêr radipêçe; ji ya yekem ne kêmtir saxlem hatîye çêkirin, lê tengtir e. Di nava van herdu taxan de, di yekê ji wan de seraya hikumdar ya bi surheke fireh û saxlem tê parastin heye, di ya din de perestgeha Zeûs-Baal ya xwedîyê derîyê bronzî heye ku, îro jî di cihê xwe de sekinîye. Çargoşek e ku her milekî wê du stad e. Di navenda vî cihê pîroz de di firehî û dirêjahîya stadekê de birceke ku saxlem tê xuyakirin çêkirine. Li jora wê yeka din heye; piştî ya duyem di eynî şiklî de ya sêyem û bi vî awayî heta ya heyştem, hemî heyşt bircên li ser hev hatine çêkirin hene. Bi mêrdewanên li derve helezonî yên li hemî bircan dizîvire mirov derdikeve ser. Di hilkişandinê de, kêm-zêde di nîvê rê de hol û cihê rûniştin û bêhnvedanê hene, kesên wê ziyaret dikin li vir radiwestin û bêhna xwe vedidin. Li ser birca dawîyê perestgeheke mezin bilind dibe; di nava perestgehê de textekî mezin yê ku

bi dewlemendî hatîye xemilandin û li rexê wê jî maseyek zêrînî heye. Lê tê de qet peyker tune. Destûr tune tu fanî bi şev tê de bimîne, li gor Khaldeayîyên ku kahînên vî îlahî ne, tenê jinên xwecîh yên xuda ji nav hemî jinan ew hilbijartîne xwedîyê vî mafî ne.

[182] Cardin heke mirov bawerîya xwe bi van kahînan bîne, ku ez bawer nakim, xwedê bi xwe tê, dikeve nav wî nivînê perestgehê, bêhna xwe vedide; eynî Misrî jî behsa çîrokeke wekî vê dikin ku li bajarê wan Thebaîyê diqewime, li wir jî jinek her dem bi şev dikeve perestgeha Zeûs û radikeve. Dibêjin, qedexe ye ku peywendîyên van herdu jinan bi mêran re hebe. Adetên Patara ya li Lîkyayê[67] jî mîna vê ne, li cihê ku kahîn şîretan radigihîne -ji ber ku li vî bajarî her wext bi kahîn nayê şêwirîn- di dema ku ew bi vî rengî dixebite, kahîna jin her şev di perestgehê de dimîne.

[183] Perestgeheke din girêdayî vê perestgeha Babîlê heye, ev hê li jêrê ye û tê de peykereke mezin ya ji zêr çêkirî ya Zeûs heye; xuda rûniştîye; li tenişta wî maseke zêrîn ya mezin heye, pêlika ku ling li ser bê danîn û text jî zêr in û li gor gotina Khaldeayan, ji bo çêkirina van heşt sed talant zêr çûye. Li dervî perestgehê cihê qurbanjêkirinê ya zêrînî heye. Lê cihekî din jî heye, heywanên mezin li vir tên qurbankirin; ji ber ku li ya zêrîn tenê izna jêkirina heywanên ku hîn li ser şîr in hatîye dayîn. Ji bilî vê ji herdu cihan, li ser ya mezin, dema ku her sal Khaldeayî cejna xwedê pîroz dikin, rojane hezar talent bixûr tê şewitandin. Ji bilî vê di hindur de, di dema Kîros de, bejna wê duwazdeh enîşk peykereke ji zêrê safî hebû; min bi xwe bi çavê xwe nedît, ez vegotinên Khaldeayî yê di vê derbarê de radigihînim. Daryûs kurê Hîstaspes[68]çavê xwe berdaye wê, lê çavê wî nebirîye wê bibe. Xerxesê[69] kurê Daryûs peyker birîye û kahînê ku astengî derxistîye ji bo peykerê ji wir raneke, kuştîye. Ji xeynî xemilandinên ku min behs kirin, di vê qada pîroz de hejmareke mezin pêşkêşîyên taybet hene.

[184] Gelek serdestan hukum li bajarê Babîlê kirine û ji bo avakirina dîwarên wê, xemilandina perestgehên wê ku ez ê di dîroka Asûrîyan de

67 Lykîayê/Lîkyayê

68 Hîstaspes/Hystaspes wek Guştasp jî tê zanîn.

69 Xerxes weke Xerses yan Kserkses jî tê bikaranîn.

behsa wan bikim, wan gelek sipehîtî bexşandine bedena kelehê û perestgehan; di nav wan de du hebên wê jin in. Ya yekem pênc nesil berîya ya duyem hatîye, navê wê Semîramîs e; ew bendên li seranserê deştê wê çêkirine; ev tiştên hêjayî dîtinê ne; berîya avakirina wan bendavan, lehîya çem temamê Deşta Babîlê digirt.

ŞAHBANÛYA BABÎLÊ NÎTOKRÎS

[185] Şahbanûya duyem ku navê wê Nîtokrîs e, ji ya yekem biaqiltir bû; ev abîdeyên ez ê behs bikim wê çêkirine û dema ku hêzên Medî yên şerker û giran û di nav girtina bajarên din de Nînîveyê jî dibîne, li hemberî van ji bo zêdekirina berevanîya împaratorîya wê temamê tedbîrên ji destan tê wergirtine. Pêşî bihura ava Rûbarê Firatê guhertîye, berîya wê ew wekî xeteke rast diherikî û di nav bajêr re derbas dibû. Çend kanalên ji Rûbarê Firatê ber bi jor ve daye kolandin, naçar kirîye ku ava çem bi fetil û lûl biherike û wisan kirîye ku rûbar sê caran di nav hinek gundên Asûrîyan re derbas bibe. Ji wî gundî re digotin Arderîkka. Bi vî awayî îro kesek bixwaze ji vê deryayê bi rêya Firatê dakeve Babîlê, di nav vî gundî re di sê rojên cuda de(ne di rojê li pey hev) sê caran derbas dibe. Belê, karê yekem yê kirîye ev e. Ji bilî vê li herdu milên rûbarê bend çêkirine ku di hêla mezinî û bilindahîyê de mirov heyranî wan dibe. Yek jî, qederek li jorê Babîlê golek kolandîye, ava zêde ya rûbarê neqlî wir kirîye; li qiraxê rûbarê û hinek ji wê wêdetir e; wekî kûrahîyê heta sevîya ava rûbarê daye kolandin; firehîya wê çarsed û bîst stad e; axa derketîye, ji bo çêkirina sedên herdu milên rûbarê hatine bikaranîn. Piştî gol kolane kevir dane anîn û dora golê bi lengergehekê rapêçaye. Daneçêkirina van herdu karan, girtina rûbarê nav fetlan û kolana korteke tijî av, ji bo vê yekê bûye: Bi rêya vekirina çend kanalan herikîna avê sist dibû; wekî din, ji bo gihiştina Babîlê bi rêya avê, gerek çend zîvronek bihata derbaskirin û bi rêya van çivan wê derketina golê û li dora wê ya fireh bizîvirîna. Û ev kar li herêma ku wê dijmin ewil li wir nig bavêta welatê wan dabû çêkirin; ev der ji alîyê Medîayê ve rêya herî kurt bû, bi vî awayî Medî dê bi xelkê wan re peywendî danenîna û li vî milî çi diqewime dê xebera wan jê çênebûya.

[186] Kemera parastinê ya li ser erdê wiha bû û lêbinêrin piştre xebata xwe çawa temam kir: Bajar bûbû du tax, di navberê de rûbar hebû, di dema hi-

kumdarên kevin de, ji bo ji milekî derbasî milê din bibin pêwist bû li qeyiqê siwar bibin û bi min, ev ne rehet bû. Ew jî bi vî awayî fikirî; golek sûnî da çêkirin ji bo ava çem biherikîne ser, dema gol dikolan ew jî difikirî ku bi vê xebatê wê nerehetîyê ji holê rake û wê bikaribe abîdeyeke din ya xwe li Babîlê çêbike. Pêşî kevirên mezin hatin birrîn û dema ku kevir hazir bûn û karê kolînê jî temam bû, berê ava rûbarê da korta hatîye kolan; di midetê ku ew tijî bibe, besta rûbarê zuha ma; di wî wextî de herdu teniştên rûbarê û derîyên vedibin rûbarê yê di beşa di nav bajêr re derbas dibe, wekî di bedenê kelehê de bi hûnandina dîwarên kerpîç ên pehtî hat zeximkirin; piştre li cihê ku bi texmînî dikeve navenda bajêr, kevirên ji ocaxên keviran hatin anîn bi hesin û risas bi hev vekirin û pirek da çêkirin. Bi roj textên çargoşeyî li ser lingan radixistin û Babîlî ji milekî derbasî milê din dibûn; ji bo ku diz û yên nêt xerab ji tarîyê sûd wernegirin û derbas nebin, bi şev text dihatin rakirin. Dema gola çêkirî bi ava çem tijî bû û bû weke goleke rastîn û di vê navê re çêkirina pirê jî temam bû, Firat cardin vegerandin ser besta wê ya berê; bi vî awayî hem hewzeke bi kêr, hem jî pirek ji xelkê bajêr re hate çêkirin.

[187] Cardin ev şahjina han e ku bîr bi hîlekê kirîye. Li ser derîyê bajêr yê herî zêde çûn û hatin lê çêdibe, goreke vekirî çêkirîye û li ser vê abîdeyê ev nivîs daye kolandin: *"Çi hikumdarê piştî min desthilata bajarê Babîlê bigre destê xwe û bikeve tengîyê, bila vê gorê veke û ji nava xezîneya wê çiqas dixwaze bila bigre. Lê bila xwe biparêze, hek bi rastî ne di tengîyê de be bila veneke, ji ber ku xêrê jê nabîne."* Kesekî destê xwe neda vê gorê, heta sal derbas bûn Daryûs derket ser text; hem bikarneanîna vî derîyî, hem jî di bin destan de xezîneyek hebe û jê sûd wernegire, ji bo Daryûs ev ne karê aqilan bû (Ji vî derîyî nedibû derbas bibin, ji ber ku dema derbas bibûna wê di binê mirîyekî re derbas bibûna.) Wî gor da vekirin, lê xezîne mezîne tunebû; tenê mirîyek û nivîsek: "Heke tu evqas tamahê pereyan û çavbirçî nebûya, te cihê mirî lê hêwirîne venedikir."

KÎROS LI BABÎLÊ

[188] Belê, tê gotin ku ev keybanû wiha bûye. -Kîros li hemberî kurê vê jinê dest bi seferê kiribû; navê vî kurî û yê bavê wî yekbûn, navê wî Labynetos bû û hukim li Asûryayê dikir. -Hikumdarê Mezin, bêyî ku xwarina zêde û

birên pez bi xwe re bibra, dernediket seferê; heta av jî. Ava ji Çemê Khoaspesê yê nêzîkî Susayê diherikî bi artêşê re dibir, Hikumdarê Mezin tenê ava wî çemî vedixwar. Ava vê Khoaspesê dihat kelandin, dikirin firaxên zivîn û li erebeyên çartekel yên ji alîyê hêstiran ve dihatin kêşan, dihatin barkirin; hikumdar artêşa xwe bibra ku, li ku biketa şer, ev av jî pê re dibirin.

[189] Dema ku Kîros meşîya ser Babîlê, hat ber qiraxa Gyndesê, çemê ku ji welatê Matîeniyê derdikeve ya ku herêmeke çiyayî ye, di welatê Dardanîyan re derbas dibe û xwe diavêje çemê Dîcleyê. Piştî Gyndes tev lê dibe Dîcle jî di nêzîkî bajarê Opîsê re derbas dibe û dirije deryaya Erythreîayê. Kîros, ji bo çem derbas bike amadekarî dikir, ev kar tenê dikarîbû bi keştîyan bê kirin. Hespekî spî yê ji revda Hespên Pîroz, bêsebir bû, da nav çem û xwest derbas bibe; çem, hesp di nav pêlan de li hev qulipand, bin'av kir û li ber xwe bir. Kîros ji ber vê bêrêzîyê gelekî ji çem qeherî û gef lê xwar ku hêza wê bişkîne bi awayê di pêşerojê de jin jî bêyî ku çokên xwe şil bikin, bi hêsanî karibin derbas bibin. Ji bo gefa xwe bi cih bîne, derengîxistina sefera xwe ya ser Babîlê jî da ber çavê xwe. Artêşa xwe kir du beş û li herdu qiraxên Gyndesê, li cihê wî bi xwe nîşan dayî bi benên pîvanê, li her alîyekî di îstîqametên cihê de sed û heyştê xet da kêşan û emir da mirovên xwe yên ji bo vî karî veqetandibû, da ku kanalan bikolin. Gelek insan dixebitîn, kar temam bû, lê bi vê yekê havîna xwe jî li van deran xerc kir.

[190] Piştî ku Kîros ava wê bi ser sêsed û şêst kanalan ve parve kir û toleya xwe ji Gyndesê hilda û tîşkên biharê careke din dest bi biriqandinê kirin, hikumdar ji nû ve dest bi sefera ser Babîlê kir: Babîlî ji bajêr derketibûn û li hêvîya wî bûn. Di dawîyê de gihişt wir, wî wextî Babîlîyan hêzên xwe ajotin ser, lê di şer de mexlûb bûn, ji bo careke din xwe berhev bikin, ber bi hundur paş de vekêşîyan. Wan ji zû ve dizanîbûn ku Kîros rehet nasekine, bi eksê wê qet bêyî ku ferqê bixe nav wan êrîşî hemî miletan dike û ji ber vê, bi qasî têra çendîn salan bike li pişt dîwaran zexîre kom kiribûn; heta henekê xwe bi dorpêçê dikirin, dema ku Kîros bi zehmetîyên mezin re rûbirû dibû, dorpêç dirêj dibû, serkeftinek çênedibû û kar nedimeşîya.

[191] Belkî di vê rewşa tengav de kesekî ev fikir dayê, belkî jî ew bi xwe fikirî, di dawîyê de wiha kir: Artêş li du nuqteyan berhev kir, li jor li cihê ku

çem dikeve nav bajêr û li jêr li cihê ji bajêr derdikeve û emir da, got; "Dema ava çem, bi qasî mirov karibe bikeve nav kêm bibe, hûn bimeşin û bikevin nav bajêr." Piştî ev rewş hat amadekirin û emir hat dayîn, ji wir vekişîya, ew bi xwe bi yekîneyên di xizmetê de yên derî şervanan re çû ba golê, şahjina Babîlê berîya wê çi li çem û golê kiribû wî jî eynî tişt kirin; ava çem di kanalekê re derbas kirin û berê wê dan gola ku bûbû çirav. Piştî ev netîce bi dest ket, Persîyên ku bi armanca têkevin Babîlê cihê xwe girtibûn, di çemê Firatê re derbas bûn û ketin nav bajêr, av têra xwe nizim bûbû, digihişt hinekî jora çokên eskeran. Esas, heke hayê Babîlîyan gihiştiba plana Kîros yan jî wan xetere ferq kiriba, wan ê tu carî nehiştana ku Faris bikevin bajêr, dê wan bi tevahî tune bikirana; tenê herdu derîyên vedibin çem bigirtana û derketina ser dîwarên herdu qiraxên çem, dikarîbûn yên tên mîna ketine xefkan bigirtana. Lê wiha nebû, ji ber ku Faris ji nişkê ve girtibûn ser wan. Heke mirov ji yên li wir rûdinin bawer bike, ji ber mezinbûna bajêr, yên di navenda Babîlê de rûdinin, hay ji tiştên hatin serê kesên li taxên qiraxan rûdinên nebûn; ji bilî vê ew roj cejin hebû, di nav şahîyê de kilam digotin û dileyîstin; dema ku hayê wan gihişt rewşê, pir dereng bû.

[192] Ketina yekem a Babîlê wiha bû. - Di nav gelek delîlên ku ez karim bidim xuyakirin ê di derbarê hêz û dewlemendîyên Babîlîyan de, mînaka jêrîn girîng û taybet e. Hikumdarê Mezin ji bilî baca berhev dikir, ji bo peydakirina xwarina xwe û erzaqa artêşa xwe, temamê welatê di bin destê xwe de li ser herêman parve kiribû. Çar mehên ji duwazdeh mehên yekûna salekê, Babîlê artêş xwedî dikir, erzaqa heyşt mehan jî temamê welatên din ên diketin Asyayê pêk dianîn. Tê wê maneyê ku Asûrya, tenê bi serê xwe xwedîyê ji sê behra behrek yê hemî çavkanîyê Asyayê bû. Ev hikumeta eyaletê, ku qesta min ji vê ya Persîyan jê re "Satrapî" digotin, ji hemî eyaletên din zêdetir berhemdar bû, Tritantaikhmesê kurê Artabazos, her roj artabek tijî zîv dişandin.(Artabe pîvaneke Persîyan e, ji medîmnoseke Attîkî sê Khoînîx Attîkî zêdetir e.[70]) Di tewleyên vê satrapê de, bê hesêbkirina hespên şer, tenê ji bo kêşana ser mehînan heştsed hespên nêr dihat xwedîkirin, hejmara mehînên wî jî şanzdehhezar bû; ji ber ku her yek ji

70 Khoînîx: Ji lîtreyekê hebekî zêdetir e. Medîmnos: Kêm-zêde 52,80 litre ye.(Herdu jî pîvanên zad in.)

van hespê nêr dikêşan ser bîst mehînan. Em bên ser revdên kuçikên nêçîrê, ewqas kuçikên Hindî hebûn ku, çar gundên mezin qet bac nedidan, tenê ev kuçik xwedî dikirin.

A S Û R Y A

[193] Hikumeta Babîlî xwedîyê van tiştan bûn. -Li Asûryayê demsala baranê kurt e; ji bo mezinbûna kokê çandinîyê baran pêwist e, tevî vê jî bi saya avdanê çandinî mezin dibe, genim digehe; ne mîna yê li Misrê ye, rûbar ji ber xwe ve gur nabe û nade ser erdê hatîye ajotin; avdanî bi destê insan û bi rêya kanalên avdanîyê tê kirin. Ji ber ku temamê Babîlê, wekî li Misrê, bi kanalan hatine xetkirin ku qayêx jî dikarin bikevin ya herî mezin; ev kanal di îstîqameta noqteya hilatina roja zivistanê de ye. Ji Firatê derdikeve diçe rûbarekî din, diherike ber bi Dicleyê ve ya ku li teniştê Ninîve hatîye avakirin. Erdê herî bi bereket yê em dizanin ev erd in û çandinîya Demeterê ya herî zêde ber dide li vir e; di miqabilî vê de darê hejîr, rez û yên wekî zeytûnê hêşîn nabin. Lê di hêla berhemên Demeterê de ewqas axeke baş e ku, herî hindik ji yekê dused û di salên bi bereket de ji yekê sêsed dide. Firehîya pelên genim û cehê nêzîkî çar tilîyan e. Garis û kuncî, wekî daran bejin davêjin; ez dizanim ev bejin çiqas e, lê ez nabêjim, ji ber ku ez vê baş dizanim ku, heke kesek neçûbe Babîlê, li tiştên min li ser çandîyê gotin nêrîbe, ji zû de ye wê ketibe şikê. Li vir insan, dohnê zeytûnê bikar naynin; ron ji kuncîyê derdixin. Li seranserê deştê palmîye hatine çandin; piranîya wan ber didin, xwarin, şerab û hingivîn tê çêkirin; em çawa li hejîran baş dinêrin, ew jî li van baş dinêrin; fêkîyê dara ku Yûnanî jê re palmîyeya nêr dibêjin bi darê xurmeyê ve girê didin, di vê fêkîyê de cûre mêşek heye, ev mêş dikeve nav fêkîyê dara xurmeyê wê digehîne û nahêle ji darê bikeve; ji ber ku di fêkîyê palmîyê de, wekî hejîrê ku dereng ber dide, ji vê mêşê heye.

[194] Lê li vî welatî, ji bilî bajar bi xwe ya herî zêde min matmayî dihêle, ya ku ez ê niha behis bikim. Ji bo mirov biçe Babîlê, ew qayiqên berdidin avê gilover in û ji çermê hatine çêkirin. Li Ermenîstana dikeve jorê Asûryayê, darên bîyê dibirin ji bo keştîyan dikin çetelên parsûyê, li ser derveyê wê çerim radikêşin û babirk derdikeve orteyê, firehî û dirêjahîya wê wekî hev e, serî û binî nekifş e; vê keştîyê wekî min got gilover çêdikin, eynî wekî mer-

taleke gilover; ka direşînin navê û eşya datînin ser û ber bi herikîna avê ve berdidin; barên wan yên taybet ew kûpên ji darê palmîyeyê hatine çikirin in, wan tijî şerab dikin. Çûna keştîyê ya rast, bi du bêrên bêserî tê pêkanîn, du kesên li ser pêyan disekinin wan bikar tînin; yek jê bêrê dikêşe vî milî yê din av berevajî dehf dide. Hinek keştî qederekî mezin in, hinek jê biçûk in. Yên herî mezin heta pênc hezar talant giranî hildigirin. Di her keştîyekê de kerekî sax heye; di yên mezin de hê zêdetir heye. Bi vî awayî li ser avê digehin Babîlê, barê wê difroşin, piştre bi qêr dikin gazî û texte û kayê keştîyê difroşin; piştre çermê xwe li kerên xwe dikin û vedigerin Ermenîstanê; ji ber ku mirov nikare bifikire ku bi rêya rûbarê ber bi jor ve biçin, herikîn dest nade, jixwe sebebê çêkirina keştîyên xwe ji çermê ev e. Dema ku gihiştin Ermenîstanê keştîyên din çêdikin.

[195] Belemên wan wiha ne. Em bên kincên wan: Îşligên dirêj yên ji ketenê li xwe dikin, yeka ji hirîyê jî bi ser de datînin; ebayeke spî û biçûk davêjin ser milê xwe; pêlavên wan yên xwemalî hene, dişibin pêlavên Boîotîayîyan yên qemçikên/doxên wan dirêj; li ser porê xwe yê dirêj kefî/pêçek girê didin; bedena xwe bi bêhnan miz didin. Herkes muhrek û çovek di destê xwe de digerîne; li ser çovê çend îşaretên wekî sêv, gul, zembaq, êlo û. hwd. hatine neqişkirin; ji ber ku ne adet e çovê îşareteke taybetî li ser tunebe bi xwe re bigerînin.

[196] Kincên wan wiha ye. Niha jî em qanûnên li welatê wan derbas dibe yan berê hatine danîn[71] û derbas dibûn, binêrin. Bi min ya herî nêzî aqil, ew qanûnên ku ji min re gotin li nav Îllyrîayên Eneteyê jî derbas dibin. Li her gundî salê carekê merasîmeke wiha tê kirin: Keçên salên wan yên zewacê hatine berhev dikin; hemîyan bi hev re dibin cihekî, mêr jî tên li dora wan berhev dibin; delal ji ya herî xweşik dest pê dike û hemîyan yek bi yek radike û pêşkêşî firotinê dike; wextê ew bi perekî baş hat firotin, yên paşde mayîn ya herî sipehî derdixe mezatê; ew dibin jinê yên wan distînin. Hemî Babîlîyên dewlemend yên hatine salên zewacê, ji bo ku ya herî sipehî bikire, fîyetê li ser hev bilind dikin; kesên ji xelkê yên zêde mereqa wan li ser

71 Gotina "yan berê hatine danîn" me li ser zêde kir, ji ber ku Herodotos hinek wê de, di dawîya vê beşê de dibêje "qanûna wan a herî sipehî ev bû; lê heta roja me nehatîye". (Nota wergêrê Fransizî)

sipehîtîyê tune, ji ber ku yên ne rind bistînin di ser de pere jî digirtin. Piştî delal firotina yên sipehî temam dikir, yên herî berbat yan seqet radikir, bi awayê herî kêmdanê pêş kesên bi wan razî bûn dikir, vê carê di ser re pere jî didan. Ew pere ji pereyên firotina xweşikan derdiket; bi vî awayî bi saya yên xweşik, yên nexweşik û seqet dizewicandin. Mafê tu kesî tunebû keça xwe bide yê ew dixwaze, ji bilî wê kesê ku keçek sitandîye, bêyî kefîlekî nîşan bide nedikarî bibe mala xwe. Piştî sozdana ku dê keçikê bibe mala xwe û soza xwe bi saxlemîyê girê da, dikarîbû bigehe wê şahîyê. Heke hûn bi wê keçê re ranekevin, qanûn we mecbûrî dayîna pera dike. Ji gundên din jî yên bixwazin dikarîbûn bên vê bazarê. Qanûna wan ya herî bedew ev bû; lê heta roja me nehatîye, demek kurt berîya niha fikra hinek tiştên din kirine (ji bo xerabî neyê serê keçan û baz nedin neçin bajarekî din); piştî Babîl ket, mala wan jî xera bû û bela hat serê wan, ji bo îdareya xwe sivik bikin keçên xwe berdane kolanan.

[**197**] Niha ûrf û adeteke din, ku dema li hiş û aqil dixim ez rêza duduyan didimê. Kesên nexweş dibin datînin meydana bajêr, ji ber ku hekîm tune. Yên tên û diçin li ser nexweşîya nexweş nesîhetan lê dikin, hinek heman nexweşî derbas kirîne, hinek ji kesin din dîtine; tên li ba nexweş, çareyan didin nîşan, dibêjin ku ew bi xwe ji vê nexweşîyê bi vî awayî xelas bûne yan ji hinekan dîtîne ku ji vê nexweşîyê rizgar bûne. Mirov ji nexweş re tiştekî nebêje û derbas bibe, qedexe ye; berî bi rêya xwe de here, lazim e hîn bibe ka derdê wan çiye.

[**198**] Ew mirîyên xwe di nav hingiv de defin dikin û mîna Misrîyan şîna cenazeyan digirin. Çi gava yekî Babîlî bi jina xwe re radikeve, piştre li ber bixûrê rûdine û jin jî li hember wî rûdine. Di berbanga rojê de jî xwe dişon, çimkî heta ku xwe neşon, nikarin dest bidin tu firaxên xwe yên hevpar; ev adet li ba Ereban jî heye.

[**199**] Li hemberî van, adeteke herî şerm yên Babîlîyan heye: Her jin pêwist e carekê di temenê xwe de, di perestgeha Afrodîteyê de rûne û bi yekî biyanî re rakeve. Jinên bawerî bi pereyên xwe hene û yên nexwazin tevlî qelebalixê bibin, heta ba perestgehê bi erebeyan diçin û di pey wan de birek xizmetkar li hêvîyê dimînin. Lê ji bo piranîya wan wiha dibe: Di nav dîwarên Afrodî-

teyê de, serê wan bi qurdeleyê girêdayî gelek jin rûdinin; hinek diçin yên nû tên; cih bi benên şidandî ji hevdû hatine veqetandin; biyanî li pêşîya wan digerin, ya bixwazin hildibijêrin. Ew jina bikeve nav van dîwaran û rûne, heta biyanîyek neyê û ji bo li derveyî perestgehê bi wê re rakeve, pereyekî neavêje ser çogê wê, nikare vegere mala xwe; wextê pere bavêje jî mecbûr e vê bêje: "Ez di şexsê te de bangî xwedawend Mylîtta dikim." Mylîtta, Afrodîteya bi Asûrkî ye. Çiqas pere dayê ne giring e; tirsa ku jinik qebûl neke tune; dîn vê qedexe kirîye, ji ber ku ev pere pîroz e. Jin, li pey yê pêşî pere bavêje ve diçe û kî dibe bila bibe paşve venagerîne. Piştî pê re raketinê jinik dilê îlaheyê xweş dike û vedigere mala xwe û piştî wê hûn çi bidenê, êdî careke din hûn nikarin wê ji rê derêxin. Ew keça ku afirîner rûyeke sipehî û endameke xweşik dayêyê zû vedigerin malên xwe; lê yên ne spehî, dimînin li hêvîyê, yên sê-çar sal li hêvîyê dimînin hene. -Li hin derên girava Qibrîsê jî adeteke wekî vê heye.

[200] Belê, eva çend qanûnên Babîlîyan bûn. -Li vir sê hoz hene ku, ji masîyan pê ve tiştekî nakin devê xwe; masîyên digrin li ber tavê hişk dikin û bi vî awayî dixwin: Dikin nav hawinê û bi destîyê hawinê dikutin, bi kitanê bêjing dikin û canê wan çawa bixwaze, yan li hev dixin wekî lapayê dixwin, yan jî di nav cureyek nan de dipêjin.

M A S S A G E T Î

[201] Kîros, piştî karê Babîlê temam kir, xwest Massagetîyan jî têke bin desthilata xwe. Heke li riwayetên pêşîn bê nêrîn, ev milletekî mezin û bi hêz in, li cihê şefeqa sibeyê, li milê hilatina rojê, li milê din yê Araxesê(Araksê), li hemberî Issedonîyan rûdinin. Yên dibêjin ev ji neslê Îskîtîyan in jî hene.

[202] Araxes, li gor hinekan ji Isterê (Danube) hê mezintir, li gor hinekan hê biçûktir e; bi qasî tê zanîn, tê de kêm û zêde qasî Lesbosê taximên giravan hene, insanên li wir dijîn, havînan rehên ji erdê derdixin û di demsala wê de fêkîyên ji daran berhev dikin datînin alîyekî û ji zivistanê re vedişêrin. Yek din jî tê gotin ku, hin cure darên din dîtine ku fêkîyên wan naşibin yên darên din: Li cihekî hevdû dibînin û berhev dibin, agir vêdixin û li dora wê rûdinin, van fêkîyan dikin nav agir, ew bêhna fêkîyê ya dişewite dikêşin,

Yûnanî çawa bi şerabê serxweş dibin, ew jî bi vê bêhnê serxweş dibin; çend fêkî bavêjin navê hê zêde serxweş dibin, ewqas ku, di dawîyê de radibin dest govend û stranan dikin. Tê gotin ku jiyana wan wiha ye. - Çemê Araxesê jî mîna Gyndesê ku Kîros li sêsed û şêst kanalan belav kirîye, çavkanîya wê li welatê Matîenîyê ye; ava wê ji çil devan dirije, ji van ji derveyî yekê hemî jî hezekên ne kûr in/tenik in. Li vir xelkên masîyê xav dixwin û kincên ji çermê masîyên fokê li xwe dikin hene. Tenê devekî Araxesê, bêyî ku rastî astengekê bê dirije Deryaya Hazer(Xezer)ê.

[203] Hazer, bi serê xwe deryayek e, tevlî deryayeke din nabe. Ez dibêjim "deryayeke din", ji ber ku deryaya keştîyên Yûnanê li ser dixebitin û ji stûnên Herkules wêdetir ew deryaya ku jê re Deryaya Atlantîk(Atlas)ê tê gotin û Deryaya Erythreîayê, ev hemî yek derya ye. Hazar deryayeke cihê ye; ne girêdayî yên din e, dirêjahîya wê keştîyeke bi bêr dikare panzdeh rojan derbas bike, cihê herî fireh jî rêya heyşt rojan e. Ji hêla rojavayê ve ji alîyê çiyayên Qafqasyayê ve ku çiyayê herî dirêj û herî bilind e hatîye dorpêçkirin. Li Qafqasyayê gelek cûre neslên insanan hene; piranîya wan idareya xwe li ser daristanên bejî dikin; tê gotin, li vir darên ku xwedî cure cure pel in hene. Yên li vir van pelan dikutin û tev li avê dikin boyaxekê bi dest dixin û pê li ser kincên xwe wêneyên heywanan çêdikin; ev wêneyên heywanan bi şûştinê dernakevin; heta mîna ku ji pêşî ve di qumaşê de hene, heya kevin bibe lê dimîne. -Dibêjin ev insan wekî heywanan li ber çavê herkesî bi hev re radikevin.

TOMRÎS

[204] Wekî tê dîtin ev deryaya jê re Hazer tê gotin, ji alîyê rojavayê ve bi rêzeçiyayên Qafqasyayê sînordar e; ji alîyê berbanga sibeyî û rojhilatê ve vedibe deşteke bê ser û bin. Qismeke zêde yê vê deşta mezin di destê Massagetîyan de bû, ew xelkê ku Kîros dixwaze bêsebir leşkerê xwe bajo ser wan ew in. Gelek sebeb hene ku vê xwestek û êrîşê dide wî. Bi taybetî, jidayîkbûna wî, wî di çavê wî de ji insanên din bilindtir dida nîşan; yek jî suûda wî yê di şer de ew bernedida hebû; ji ber ku Kîros ajot ser kê, ji serîtewandina xelas nebûn.

[205] Massagetî di bin birêvebirîya şahjineke bi navê Tomrîs de bû, piştî mêrê wê mir derketibû ser text. Kîros qasid şandin, jê re da diyarkirin ku gelek dixwaze ku pê re bizewice. Lê Tomrîs dizanîbû ku daxwaza wî ya esil ne ew e, hikumdarîya Massagetîyê ye û qebûl nekir. Ji ber vê yekê Kîros dît ku bi vê xapandinê planên xwe pêş naxe, ber bi Araxesê ve meşîya û bi awayekî hişkere dest bi amadekarîya seferekê kir; ji bo leşker bikaribe çem derbas bike, dest bi çêkirina pirê û çêkirina bircên li ser qeyikan kir ku dê di rêgehê de bihatana bikaranîn.

[206] Dema ku ew bi van karan mijûl dibû, ji alîyê Tomrîs ve qasidek hat û ev got: "Hikumdarê Medan, dev ji van karan berde; tu nizanî yên tu dikî ji xêr û qencîya te re ye yan na; ez dibêjim dev jê berde, hukim li miletê xwe bike, tevlî hikumkirina me li miletê me nebe. Lê ez texmîn dikim ku tê guh nede vê şîretê; ne wisa ye? Heke illeh tu dixwazî xwe li hember Massagetîyan biceribîne, wî wextî ji bo gihandina hev ya herdu milên rûbarê evqas zehmet neke; em ê ji rûbarê bi rêya sê rojan paşve bikêşin; ji avê derbas be û were welatê me; na heke tu dixwazî em bên, ya ku em dibêjin tu bike." Li ser vê xeberê, Kîros bangî giregirên Persîyan kir, rewş ji wan re got û bi wan şêwirî ku hewce ye rêyeke çawa bidin pêşîya xwe. Raya hemûyan li ser wê yekê bû ku bihêlin Tomyrîs û leşkerê wê ji çem derbas bibe û li ser axa Persîyan şer bikin.

[207] Lê Kroîsosê Lîdyayî ku di civîna serokan de bû li hemberî vê nêrînê derket û bi vî awayî hestên xwe eşkere kir: "Hikumdarê min, min berê jî ji te re gotibû, madem Zeûs ez dam te, dema ku ez kemîneke nesla te bavêje tehlîkeyê bibînim, gerek ji bo berterafkirina wê çi ji destê min bê ez bikim. Ew bêtalhîya ez lê rast hatim û wendakirina her tiştê xwe, gelek tişt hînî min kirin. Heke tu nemir bûya û artêşa te jî artêşeke nemiran bûya, ne hewce bû ez fikarên xwe ji te re vekim; lê heke tu qebûl dikî tu jî insanek î û tu fermandarîya insanan dikî, pêşî pêwist e tu hîn bibî ku, çerxek heye kar û barên mirovan li ser dizîvire û heman mirov her dem bextewar namîne. Niha ez li ser vî karê em rûbirû ne, bi awayekî din difikirim. Heke em pêşberîya êrîşa dijmin di vî welatî de bikin, em ê bikevin van tehlîkeyan: Heke tu mexlûb bû, tê hem şer, hem jî temamê împaratorîyê wenda bikî; heke Massagetî şer qezenc bikin, paşve venagerin, ev tiştekî zelal e, dê li hemberî

hikumdarîya te sefer dewam bike. Em bêjin te ew mexlûb kirin, wî wextî qezenca te wê ne bi qasî tu şer li ser erdê wan qezenc bikî mezin be, ji ber ku dema tu leşkerên wan li alîyê din ê çem bişkîni, tu dikarî bi carekê bikeve dilê welatê wan.

Yeka din, van gotinên min tevda deyne alîyekî, dema Kîrosê kurê Kambîses li ber jinekê paşve bikêşe û perçeyek erdê welatê xwe jê re berde, wê gelekî eyb be û kes nikare xwe li ber vê bigire. Niha pêşnîyaza min ew e ku, hûn rûbarê derbas bikin, ber bi pêş ve bimeşin heta cihê ku dujmin vekişe; piştre bi şiklê ez ê niha bêjim gerek hûn têkevin rewşeke ji ya wan baştir. Ya ku min got ez ê bêjim jî ev e: Massagetî bi wan tiştên bedew ên ku Pers pê dijîn nizanin û tu carî kêfên mezin ên jiyanê tam nekirine. Îcar em ji wan re li cihê baregeha xwe şahîyeke mezin li dar bixin; em gelek heywanên ji kerîyên me serjê bikin, gelek cure xwarin amade bikin, fincanên şerabê tijî araqên bedew bikin û raxin meydanê; em paşê leşkerên xwe yên herî bikêrnehatî li pey xwe bihêlin, em qismê din berhev bikin û ber bi rûbarê ve paşve bikêşin. Yan ez bi temamî şaş difikirim yan jî dema ku ew evqas tiştên xweş bibînin dê xwe bavêjin ser û wê meydanê ji me re bihêlin da ku em bi mêranî xwe bidin pêş."

[208] Gava ku herdu plan bi vî awayî li ber wî hatin danîn, Kîros fikra xwe guhert û şîreta Kroîsos hilbijart. Ji Tomrîs re got ku paşve bikêşe, ji ber ku dê ew ji rûbarê derbas bibe û li hemberî wê bimeşe. Tomrîs rîayetî ew pêşnîyaza xwe ya di serî de kiribû kir û paş de vekişîya. Kîros, birêvebirîya împaratorîyê ji kurê xwe Kambîses re hişt, Kroîsos jî emanetê wî kir û emir da ku heke di şerê hemberî Massagetîyan de xerab bikeve, çiqas ji destan tê gerek dilê wî xweş ragire; piştî vê emir da ew paş ve şandin welat, ew bi xwe jî bi artêşa xwe ve ji rûbarê derbas bû.

[209] Dema gihişt milê din yê Arexesê şev bi ser de hat, di erdê Massagetîyan de xewnekê ew ziyaret kir; ew bi vî awayî bû: Li Kîros wisan bû ku ew di xewna xwe de kurê Hîstaspes yê mezin dibîne, li ser herdu milên wî du bask, siha yekê li Asyayê, siha ya din li ser Ewrûpayê dirêj dibe. Hîstaspesê kurê Arsames Axamenîyek bû; kurê wî yê mezin Daryûs bû, wî wextî xort bû, herî zêde di salên xwe yên bîstî de bû û ji bo ku hêj neketibû dewra xwe

ya şer, li paş ve hiştibûn. Dema ku hişyar bû, fikirî gelo ev çi ye. Ji bo li ber çavê wî giring bû, şand pey Hîstaspes, dema ku bi tenê man, ev jê pirsî: "Hîstaspes, kurekî te li hemberî min û dewletê hinek plan digerîne. Min ev xeber çawa wergirtîye jî ez ê ji te re bêjim. Xuda min diparêzin û hemî tiştên li hemberî min tên amadekirin ji min re dibêjin. Îşev jî wextê ez radiketim min kurê te yê mezin dît, li ser milên wî du baskên mezin hebûn, siha yekê li ser Asyayê, siha ya din diket ser Ewrûpayê. Heke mirov xewneke wiha bibîne, gûman ji mirov re çênabe gelo. Niha bi rêya herî kurt vegere û rewşê wisan îdare bike ku, wextê ez vî welatî mexlûb bikim û vegerim, kurê te bînin hizura min, kar çiye bila baş bê fêhimkirin."

[210] Kîros bi vî awayî diaxift, ji ber ku difikirî Daryûs li dijî wî di nav tevgerê de ye. Lê wateya rastîn ya xewnê ev bû ku Xwedê jê re şandibû, da ku wî hişyar bike; ew ê paşê li wir bimire û padîşahîya wî dê herî dawî bikeve destê Daryûs. -Hîstaspes bi van gotinan bersiv da: "Hikumdar, ji nav yên xwîna Persan bi wan re heye, kesekî ji bo te xerabîyê bifikire dernakeve. Heke derbikeve, pêwist e di cih de bimre. Te, yê kole bûn, Persên di bin desthilata yên din de dijîyan kirin insanên azad, tu ew kesî ku te ew kirin efendîyê dinyê. Madem xewnê kurê min li hemberî te dijmintîyê dike daye nîşan, ez ê wî teslîmî te bikim, tu jî çi bixwazî tê wê bikî."

[211] Piştî Hîstaspes ev bersiv dayê, cardin Araxes derbas kir û wekî parêzvanekî Kîros yê saxlem, ji bo kurê xwe Daryûs kontrol bike, vegerîya welatê Persê û Kîros, piştî rêya rojekê ji Araxesê pêş ket, tiştên Kroîsos gotibû kir. Piştre yên bê kêr li wir hiştin û bi yekîneyên xwe yên bi tesîr û şerker ve ber bi Araxesê paşve kêşîya. Ji sê behra behrek artêşa Massagertê hatin; ji bo ku yên Kîros li wir hiştibûn li hemberî wan derketin, kuştin û piştî şikandina dijmin şahî dîtin; li ser sifreyan rûniştin û dest bi xwarinê kirin; heta qirika wan tijî xwarin û şerab bû, xwe dirêj kirin û raketin. Persîyan ajotin ser wan û piranîya wan di ber şûran de derbas kirin, gelek jî sax bi dest xistin ; di vê navê re kurê Tomrîs jî girtin, navê wî Spargapîses bû û fermandarîya Massagetîyan dikir.

[212] Şahjin, dema yên hatin serê artêşa wê û kurê wê hîn bû, ji Kîros re qasidek şand, vê xeberê gihandê: "Kîrosê ku ji xwînê têr nabe, bi vê serkeftinê

xwe nenepixîne; ev serkeftin ya ava tirî bû, ya dema ku hûn jî vedixwin hişê we ji serê we dire, dema ku ket rahên we ji devê we gotinên xerab derdixe. Ez dibêjim, yê bi hîlebazî tu kirîye efendîyê kurê min ew jehr e; ev ne şerekî heşkere û himbersekinîna hêzan bû. Lêbinêre, ez ê niha şîreteke baş li te bikim, guhê xwe bide min; kurê min paş ve bide min, bêyî ku tu tiştekî tevlihev bikî ji vî erdî derkeve here, qîma xwe bi serkeftina li ser parek ji sisiyan ji artêşa Massagetîyan bîne. Lê heke tu van gotinên min nekî, ez bi Roja efendîyê Massagetîyan sond dixwim ku, ez ê te mirovê ji rijandina xwînê têr nabe, bi xwînê têr bikim."

[213] Kîros guhê xwe neda van gotinên qasid. Em bên ser kurê Tomrîs, Spargapîses, dema ku ji serxweşîyê hişyar bû û yên hatine serî dîtin, lava li Kîros kir ku destê wî vekin; daxwaza wî bi cih kirin, dema ku destê wî vekirin û serbest ma, di cih de xwe kuşt.

[214] Dawîya vî şerî wiha bû. Dema ku Tomrîs cewaba Kîros wergirt û dît ku guh nedaye gotinê wê, temamê hêzên xwe berhev kirin, meşîya ser Kîros. Bi min, wê sibê şerê di navbera barbaran de derbas bû, şerê herî giran bû û ji bilî wê ew çîroka wê ya ji min re hatîye gotin jî bi vî awayî ye: Di destpêkê de ji dûr ve tîr avêtine hevdû. Dema ku tîr xelas bûne bi rim û xenceran ajotine ser hev û destpirçkî dest bi şer kirine. Demeke dirêj di cihê xwe de daçikandî mane, ne ev alî û ne jî yê din nexwestine bihûstekê paşve vekêşin; di dawîyê de Massagetîyan qezenc kirîye. Qismekî zêde artêşa Persê di cih de helîyaye. Selteneta Kîros ya bîst û neh salan dom kir, dawî lê hat. Tomrîs, di destan de meşkek tijî xwîn, di nav mirîyan de li Kîros digerîya; ew dît û serê wî kir nav meşkê. Piştî her derê laşê wî di xwînê de hişt wiha digot: "Canê mîn sax e û ez di şer de bi serkeftî derketim, lê te ez kuştim, te bi hîle kurê min girt; lê va tu jî wekî min di pêşîyê de gotibû, bi destê min bi xwînê têr dibî!" Gelek çîrok li ser dawîya Kîros çawa bû hene; min behsa ya herî zêde nêzîkî rastîyê ye kir.

[215] Lixwekirin û jiyana Massagetîyan wekî ya Îskîtîyan e; siwarî yan peyade şer dikin (ji ber ku bi herdu awayan jî dikarin şer bikin), bi tîr û rim şer dikin û herî zêde bivirê jê re sagarîs tê gotin bikar tînin. Çekên xwe tenê ji sifir/paxir û zêr çêdikin; serê rim û tîrên wan û biviran her timî ji sifir

çêdikin; mîxferê şer, qayîşê şûran û perçeyên binçengê wan diparêzin, bi neqşên zêran hatine xemilandin. Hespê wan jî wisan in; Bersingên wan ji sifrê ye; gem, rişme û plakên rûyê wan diparêze serzêrkirî ne. Hesin û zîv bikar naynin; sebebê vê, wekî li ba Îskîtîyan, li ba wan jî nedîtina van madenan in, li hemberî vê zêr û sifir gelek zêde ne.

[216] Niha jî ûrf û adetê wan: Her mêr bi jinekê re dizewice, lê mişterek jê sûd werdigirin; ev adetê ku Yûnanî dikin malê Îskîtîyan, ne ya Îskîtîyan e ya Massagetîyan e. Massagetek ku kêfa wî ji jinekê re bê, kîsê tîrên xwe bi pêşîya erebeya jinikê ve dialiqîne û bêtirs pê re dimîne. Dixwazin tenê bi vî awayî dawî li temenê wan bê: Kesek ku gelekî pîr û kal be, xwedîyên wî tên ba hev, bi gelek heywanên ji nav pezên wan, wî/wê jî dikin qurban; pişt-re dikin nav hevdû û wî goştî dipêjin û dixwin. Vê, aqibeta herî bextewar hesêb dikin; yên ji nexweşîyê bimrin nayên xwarin, tên veşartin, negihiş-tina temenê sala qurbankirinê bêtalihîyeke mezin tê hesêbkirin. Bi erdan danakevin û çandinîyê nakin; bi birrê heywanan û bi masîyên zêde yên Araxesê îdareya xwe dikin; vexwarina wan şîr e. Tek xudayê ku dihebînin roj e û hespan dikin qurbanê wê; ev qurban bi vê melhezeyê tê kirin: Qur-bankirina zindîyê herî xurt, ji xudayê herî xurt re hatîye nezirkirin.

PIRTÛKA DUYEM

EUTERPE

[1] Dema ku Kîros mir, desthilat ket destê Kambîsesê[72] kurê Kîros yê ji Kassandaneya keça Farnaspes.[73] Dêya wî berîya Kîros miribû, bavê wî gelek şîna wê kişand û xwest ku li seranserê cihên di bin hukmê wî de jî şîna wê bê kişandin. Kambîses ku kurê Kîros yê ji wê jinê bû, xelkê Îonîayî û Aîolîayî wekî kole û xulamên bavê xwe hesêb dikir û dema ku biryara leşkerkêşîya li ser welatê Misrê da, ji bilî miletên di bin destê xwe de, Yûnanîyên di bin destê xwe de jî bi xwe re birin.

MISIR Û NÎL

[2] Berîya Psammetîkos hikumranîya welatê Misrê bike, Misrî di wê bawerîyê de bûn ku kevintirîn xelkê vê cîhanê ne. Lê dema ku Psammetîkos bû hikumdar, mereq kir û hewl da bizanibe bê kîjan millet insanên herî pêşî ne, êdî ji wê demê şûn ve Misrî hatin ser wê bawerîyê ku Frîgyayî berîya xelkê din hebûne û piştî wan Misrî derketine meydanê. Psammetîkos hewleke zêde da û guh da gelek zanyarîyan, lê nekarî îsbat bike ku kîjan civata insên pêşîyê hatine dinyê. Naçar bû bi vî awayî pirsgirêkê çareser bike: Du zarokên nû ji dayîkbûyî yên ji rêzê da destê şivanekî, ji bo têxe axoyekî û wan li wir xwedî bike: Gerek kesek li ba zarokan devê xwe venekira û yek gotin negota, di odekê de wê bi serê xwe mezin bibûna. Wê şivan di saetên kifşkirî de bizin bibirna ba wan û şîr bidaya wan û wan baş têr bikira û piştre karê xwe bimeşanda. Di vir de mebesta Psammetîkos ew bû ku bizanibe, dema zarok nû dest bi axaftinê bikin, dê pêşî kîjan bêje ji devê wan derkeve. Bi rastî jî wisan çêbû. Piştî derbasbûna du salan, rojekê şivan derîyê odeyê vekir ket hindur, du zarokên li ser çoka xwe rûniştî, destê xwe dirêj dikin, dikin qêjîn û dibêjin "Bekos". Dema ku şivan di destpêkî de vê gotinê seh

72 Kambîses, ji sala 530î heta 522yan li ser text maye. Di sala 525an de çûye Misrê.
73 Farnaspes/ Pharnaspes

dike, tiştek nabêje, lê dema ku di her çûna xwe de vê gotinê seh dike, xeberê dide efendîyê xwe û li ser daxwaza wî ku wan bibîne dibe bal wan. Piştî ku Psammetîkos bi guhê xwe seh dike, dest bi lêkolîna kîjan insanan cara pêşî ji çi re bekos gotine dike. Piştî lêkolînê derdikeve ku Frîgyayîyan ji nan re "bekos" gotine. Piştî vê ronîbûnê, Misrî dest ji îddîaya xwe ya ku kevintirîn milet in berdan û qebûl kirin ku Frîgyayî ji wan kevintir in. Min ev çîrok ji Hephaîstosê ji kahînên Memphîsê seh kir. Li vir jî Hephaîstos dihebînin.[74] Helbet Yûnanî behsa gelek nêrînên neguncav dikin, ên wekî ku xwedê giravî Psammetîos ev zarok teslîmî jinên zimanê wan jêkirîye kirîye, tê gotin. Lê kahînan gotin ku mezinbûna wan bi vî awayî ye ku min li jor gotîye.

[3] Tiştên li ser mezinkirina zarokan ji min re hatine gotin ev in. Dema ku min li Memphîsê kahînên perestgeha Hephaîstosê dîtin, ez fêrî gelek tiştên din jî bûm. Heta ez careke din çûm Helîapolîs û Thebaîyê, min lêkola gelo tiştên ew dibêjin bi yên Memphîsê re li hev dikin yan na; ji ber ku ev Helîapolîsî xwe wek herî zanayên Misrê dibînin. Ez ne di wê niyetê de me ku ez behsa wan sirên li ser îlahan kirin bikim û ez ê tenê behsa navê wan bikim. Ji ber ku li wir herkes van dizane û ger ez di vî warî de tiştekî bêjim, dê tenê ji bo hewcedarîya vegotina vê çîrokê be ya ez behsa wê dikim.

[4] Ji nav vegotinên di warê insanan de yên li hevdû dikin ev in: Di nav insanan de, Misrî yekem kes bûn ku sala rojê kifş kirine û demsal bi ser 12 mehan ve parve kirine û wan ev zanîn piştî stêrk şopandine û hesab kirine bi dest xistine. Li gor min, Misrî salê ji Yûnanîyan baştir bi zanistî hesêb kirine. Yûnanî ji bo ku demsalan denk bikin, ji du salan carekê mehekê li ser salê zêde dikin. Misrî her 12 mehan 30 roj hesêb dikin û tenê pênc rojan ji derve li salê zêde dikin û bazinda perîyodîk a demsalan temam dikin. Cardin ji min re hat gotin ku yekem car Misrîyan 12 nav ji bo xudayên mezin bikar anîne û Yûnanîyan jî ji wan girtine. Her wiha cardin wan qurbangeh, peyker û pe-

74 Berê îlah yên xwecih dihatin zanîn. Her sîteyê îlaheke wan hebû. Herodotos, di qirnekê de perwerde bûye ku mejîyê insanan wekhevîya di navbera îlahên cûda de dîtin, peywendîyên wan bi hev re danîn û fêhm kirin ew di bin navê cûda de lê eynî îlah in. Yên Herodotos ji bo îlahê Misrê kirin, piştre wê Romayî jî eynî ji bo îlahên Yûnanî bikin. Wê ji Zeûs re Jupîter, Hereyê re Jûno bêjin û bi vî awayî temamê îlahên Yûnanê qebûl bikin. Hephaîstosê Vûlcanûsê Latînîyan, îlahê Misrîyan yê jê re Ptah dibêjin ew e.

restgeh pêşkêşî xudayan kirin û cara yekê şiklê ajelan li ser keviran kolane. Ji bo van zanyarîyên zêde, kahînan nêrînên xwe bi belgeyan nîşanî min dan. Her wiha ji min re gotin ku di nav insanan de yekem yê li Misrê seltenetî meşandîye kesekî navê wî Menes bûye. Di serdema wî de, ji bilî parêzgeha Thebaîyê, seranserê welatê Misrê hezek û avzêm bûye û ew erdê ku niha dikevin bakurê Gola Moîrîsê jî wiha bûye. Ji ber wê, ku mirov ji qiraxê deryayê bi rêya rûbarê bişopîne here vê golê, lazim e heft rojan bimeşe.

[5] Bi bawerîya min, ew nêrînên zaneyên Misrî yên di warê welatê xwe de dan min, bi temamî rast in. Heke kesek hişê wî li serê wî be, bêyî ku berê peyvek li ser wê bihîstibe, ew herêma Misrê ya Yûnanî bi keştîyên xwe diçin wir, di cih de dikare fêm bike ku ew welat diyarîya çem e û ez ê erdê jora golê jî têkim ser ya di rêwîtîya sê rojan de tê dîtin. Misrî li ser wê tiştekî wiha ji min re ne gotine, lê ew erd bi rastî wiha ne. Ji ber ku rewşa vî erdê Misrê wiha ye: Dema ku mirov ji alîyê deryayê ve tê Misrê û rêya rojekê mabe mirov bighe Misrê, heke tu şîşekê bera binî bide herî derdikeve û kûrahîya wê jî yanzdeh qulaç e. Ev jî dide nîşan ku rûbar heta vir bi xwe re alûvyon tîne.

[6] Hinek çavdêrîyên din: Misra eslî li qiraxên deryayê bi dirêjahîya şêst skenesan[75] cih digre, ji bo dîtina vê pîvanê du sînor lazim in, li gor me ev herdu sînor ji Kendava Plînthînetikê heta Gola Serbonîsê yê rexê Çiyayê Kasîonê ye, ew şêst skenesan e em dibêjin, ew navbera van herduyan e. Xelkên ku erdê wan hindik bin di pîvanê de qulaçê bikar tînin û yên xwedîyê erdekî zêde bin stadê bikar tînin. Yên xwedîyê milkên hê zêde bin bi parasangan hesab dikin û heke ji vê mezintir be bi skenesanê dipîvin. Parasangek sî stad e. Skenesan pîvana Misrê şêst stad e. Bi wî awayî heke stad bê hesêbkirin, xeta qiraxê deryayê ya Misrê digehe sê hezar û şesed stadan.

[7] Ji qiraxê deryayê heta Helîopolîsê, di navendê de Misir firehtir e û erdê wê hezek û çirav e. Ji qiraxan ber bi hindur, dirêjahîya rêya diçe Helîopolîsê kêm-zêde bi qasî rêya Çiyayên Duwazdeh Xudayan yên li bajarê Athenayê heta perestgeha Xuda Zeûs ya li çiyayên herêma Pîsayê ye. Heke ev herdu rê bên pîvan, ferqa wan wê pir kêm be û ji panzdeh stadan derbas nabe. Ji ber

75 Skenes: Pîvaneke Misrî ye, 60 stad e, yanî skenesek 10 kîlometro û 656 metro ye.

ku mesafaye navbera Athenayê û Pîsayê, ji bo bikaribe bibe hezar û pêncsed stad, panzdeh stadên din hewce dike. Mesafeya navbera deryayê û bajarê Helîopolîsê, tam hezar û pêncsed stad e.

[8] Piştî bajarê Helîopolîsê ber bi hindur ve Misir teng dibe. Li milekî wê zincîra Çiyayên Erebîstanê ber pê de tê, ev ji bakur ber bi başûr û ber bi herêma bayê Notosê ve dirêj dibin û piştre cardin di bejahîyê de li qiraxên deryaya ku jê re Erythreîa tê gotin dom dike. Ocaxên kevirî yên ji bo pîramîdên Memphîsê hatine vekirin li vir in. Cihê çiya xelas dibe û berîya niha ku min got, ew cihê ber bi wî milî ve difetile li vir e. Qasî ez hîn bûm, ew cihê herî fireh yê çiya ji rojhilatê ber bi rojavayê ve bi qasî meşa du mehan dikişîne û alîyê rojhilatê bi herêma ku gîhayên bêhnxweş yê bixurê lê tê çandin sînordar e. Ev çiya wiha ye. Li rexê Lîbyayê jî Misir, weke milê din bi vî çiyayî vediqete, vir cihê kevir yên pîramîdan in; kevir, li ser keviran jî qûm; Çiyayê Erebîstanê yê ber bi başûr ve dirêj dibe, paralel dikêşe. Belê tê wê maneyê ku ji Helîopolîsê wê de axa Misrê ne gelek fireh e; kêm-zêde di midetê rêya çardeh rojan ya ser avê de,[76] Misir ber bi hindur ve ji şerîdeke erd pêk tê. Navbera van herdu çiyayên em dibêjin deşt e, di navbera Çiyayê Erebîstanê û cihê jê ra Çiyayê Lîbyayê tê gotin, herî cihê teng, li gor min ji 200 stadan ne firehtir e. Ji vir şûn ve Misir cardin fireh dibe.

[9] Xweza bi vî awayî ev welat çêkirîye. Rêya navbera Helîopolîsê heta Thebaîyê, bi rêya çem neh rojan dikêşe û heke em bi stadê bipîvin çar hezar û heyşt sed û şêst stad e, ji ber ku heyştê û yek skenes e. Heke em hemî pîvanan bigrin dest, her wekî min di pêşîyê de behis kir, rexê qiraxan sê hezar û şesed stad e. Ez ê niha ji qerayê deryayê heta Thebaîyê, dirêjahîya wê ya ber bi hindur ve têkim ser, hemî şeş hezar û sed û bîst stad e. Ji Thebaîyê û heta bajarê jê re Elephantî tê gotin, hezar û heyşsed stad e.

[10] Wekî ku kahînan jî ji min re gotin û ji bo min jî ronî bû, mezintirîn beşa wî welatî, erdek e ku bi avê qezenc kirine. Ew herêma ber bi Memphîsê ve dirêj dibe û di navbera du rêzeçiyayên min gotin de ye, ez texmîn dikim berê kendav bûye. Heke van nimûneyên biçûk em bikaribin ji bo tiştên me-

76 Di eslê xwe de, çar roj hatîye nivîsandin. Yê wekî 14 rast kirîye Dîetsch e û ya rast jî ev e.

zin jî bidin nîşan, em karin bêjin wekî Ilîum, Teuthranîa, Ephesos û Deşta Meîanderê ye. Lê yek ji çemên van herêman jî, ji alîyê mezinbûnê ve mirov nikare bi yek devê Rûbara Nîlê re muqayese bike ya ku xwedî pênc deva ye. Komek çemên din jî hene ku di warê hecmê de bi qasî Rûbarê Nîlê mezin nîn in, her çend guherîn bingehê wan afirandibe jî. Wekî Çemê Akheloosê ku piştî di navçeya Akarnanîayê re derbas dibe dirije nav deryayê. Ew çem bûye sebebê bi hev ve girêdana Giravên Ekhînadê bi erdê din ên welat ve û çêbûna deştên wê herêmê.

[11] Li Erebîstanê ku ne zêde dûr e ji welatê Misrê, kendaveke dirêj û teng heye ji deryaya bi navê Deryaya Erythrîayê dirêj dibe û tê nav erdê bejahîyê. Ez ê niha behsa dirêjahî û tengîya wê kendavê bikim. Heke kesek ji devê kendavê bi rêya deryayê û bi kêşana bêran bikeve rê û bixwaze bigehe deryaya jêr ya vekirî, ev rêwîtî çil roj dikşîne. Lê li hinda herî fireh ji alîyekî derbasbûna alîyê din nîv roj e. Di vê deryayê de herroj rabûna avê û paşvekêşîya wê çêdibe. Madem wiha ye, Misir jî berîya wê kendaveke bi vî awayî bûye. Vê kendavê ji deryaya li bakur ber bi navenda erdê Ethîapîayê ve pozek çêdikir û Kendava Erebîstanê jî ji deryaya başûr ber bi Sûrîyê dirêj dibû û ji bo gihandina-tevlihevbûna van herdu kendavan yê ku di navbera wan de seranser şerîdeke teng ya bejahîyê hebû û bi awayekî tersî hev dirêj dibûn tiştekî pir hindik hewce dikir. Îcar heger rojekê Rûbara Nîlê bixwaze ava xwe ber bi vê Kendava Erebî ve biherikîne, çi kare bibe asteng ku wê kendavê jî bi tiştên bi xwe re bîne qe nebe di hundurê bîst hezar salan de tije bike? Ez di wê bawerîyê de me ku îhtîmal e tenê deh hezar sal jî bes e ji wê re. Naxwe, di demên derbasbûyî yê berîya hatina min ya dinyê, rûbarek pir mezin û bi hêz wê nikaribe kendavek ji vê mezintir tijî kiribe?

[12] Ez bi xwe di wê bawerîyê de me ku, zanyarîyên li ser pêkhatina Misrê yê ji min re hatine gotin rast in û dema ez li van dinerim ez bi temamî qebûl dikim: Ji min re zelal bû ku erdê welatê Misrê li gor cîranên xwê yên qiraxê deryayê, bêhtir bi nav behrê de çûye. Kakilên ji deryayê yên biçûk li ser girên wê tên dîtin û di erdê wê de giyayên ku di axên bi xwê de digihin hene(xwê ziyan gihandîye pîremêdan jî). Di gel vê, di nav çiyayê Misrê de, tenê li Memphîsê li ser çiyan qûm heye. Li milê din Misir, ne dişibe Erebîstana li rexê xwe û ne jî Lîbyayê, heta naşibe Erebîstana ku Sûrîyeyî li ser

dijîn ya beşa herêma qiraxan a Sûrîyê pek tîne. Axa Misrê, ji sêlav û herîyên rûbar ku ji Ethîopîayê kêşaye anîye pêk te, axeke reş û nerm e. Em dizanin axa Lîbyayê ber bi rengê sor ve ye û li ser tebeqeke qalind ya sêlekê(qûmê) heye. Li Erebîstanê û Sûrîyê jî, ser axê kîl e û binî kevir e.

[13] Ew zanyarîyên din ên kahînan di derbarê vî welatî de dan min: Tê gotin ku di serdema hikumdar Moîrîs de, ji bo ku Misir ji Memphîsê vê de di nav avê de xerq bibe, bes bû ava rûbarê heyşt pîxîs bilind bibe. Dema ku kahînan behsa vê ji min re kirin, nehsed sal bi ser mirina Moîrîs re derbas nebûbû. Niha sevîya ava çem heta panzdeh û şanzdeh pîxîsî ranebe, bi ser erdê nakeve. Heke rûberê erdê bi berdewamî bilind bibe û ji deryayê hinek din cih bistîne, ew tê wê manayê ku wê li Rûbarê Nîlê êdî lehî ranebe. Ew Misrîyên li jêra Gola Moîrîsê dijîn û bi taybetî nişteciheên Deltayê, wê ji lehîyên Nîlê bêpar bimînin û wê aqûbeta wan jî bibe wekî siberoja Yûnanîyan ya ku ew bi xwe dibêjin. Ji ber ku fêr bûne li seranserê erdê welatê Yûnanê(Yûnanîstanê) ne bi ava çem, bi rêya baranê tê avdan, dibêjin ku wê rojekê hêvîyên Yûnanîyan bişkên û bi xela û birçûbûnê dê bimrin. Ev gotin dihat wê manayê ku Xwedê demekê baranê nebarîne û sal hişk be, wî wextî wê Yûnanî birçî bimînin û ji bilî ew barana îlah Zeûs ji wan re dişîne çavkanîyeke wan a din a cihê baranê bigre tune.

[14] Çavdêrîya Misrîyan a li ser Yûnanîyan rast e. Lê gelo dê ji bo wan çawa be, ka em lê binêrin. Wekî berê min got, erda li xwarî navçeya Memphîsê ya ku her dem bilind dibe, bi rêjeya ku di demên borî de bilind bûye, bilindbûna xwe bidomîne, gelo ew Misrîyên li wir rûdinin wê di siberojê de tûşî birçîtîyê nebin û nemirin, ku qet baran li wir nebare û rûbar jî nikaribe zevîyan têrav bike? Ez ji bo îro qebûl dikim, ji insanên din, heta bi hewleke kêm ji Misrîyên din çandinîyê hildidin, nakevin zehmetîya ku erdê xwe cot bikin, yek karê zehmet yê wan insanên ji bo nanekî bi dest bixin nakin, rûbar bi xwe ji ber xwe ve tê, diherike ser zevîyan, wan av dide û piştre paşve dikêşe û diçe ser cihê xwe ya berê, wî wextî herkes derdikeve tovê xwe davêje, piştî wê berazan berdidin nav zevîyan û axê pêpez dikin, bizir dikeve nav axê, êdî ji bilî libendemayîna rakirina zad pê ve tiştek namîne. Wî wextî jî cardin derxistina liban ji ûşûyê wan bi pîkola berazan ya ser zad pêk tînin, piştre wê jî radikin dixin embara.

[15] Piştî yên me behis kirin, ka em carekê jî li nêrînên Îonîayan ên li ser Misrê binêrin. Îonîayî gotina Misrê tenê ji bo Deltayê bikar tînin. Bi bawerîya Îonîayan, Misrê ji alîyê qiraxa behrê ve tenê herêma di navbera Tehtê Perseûsê û kara xwê ya Pelûsîonê de ye ku mesafeya wê çil skhoenes e. Her wiha ew dibêjin, erdê Misrê ji deryayê ber bi kûrahîya welat digehe bajarê Kerkasorosê, yanî ew cihê Rûbarê Nîlê dibe dubeş, şaxeke wî çemî ber bi Pelûsîonê ve diçe û ya din jî ber bi Kanobosê. Ew vê jî pê ve zêde dikin ku erdê Misrê yê mayî yan milkê Lîbyayê ye, yan beşek ji Erebîstanê ye. Diyar e Misrî bi xwe jî di wê bawerîyê de ne û li gor min jî dirust e ku navçeya sêgoşeyî ya Deltayê wekî paşvemayê erdê dawîn yê lehîyê ye û ne ji zû ve çêbûye. Lê heger ji zû ve cihekî ji bo rûniştina wan tunebûye, Misrî wê ji bo çi şanazî pê kiribana ku yekem rûniştîyê ser rûyê dinyê bûne. Bi bawerîya min, ceribandina zarokan jî ji bo ku bizanibin kîjan ziman yekem car pê hatîye axaftin hewce nedikir. Lê bi rastî ez yeqîn nakim ku, Misrî di dema çêbûna herêma ku Îonîayî navê Delta lê kirine hatine holê. Ez difikirim ku ew ji destpêka neslê mirovan ve her tim hebûne; her ku erd ber bi behrê zêde dibû, beşek ji nifûsê dadiket welatê nû, beşek jî li wargehên xwe yên berê dima. Jixwe cihê ku Misira kevnare jê re tê gotin tenê herêma Thebaîyê ye ku tevahîya dora wê şeş hezar û sed û bîst stad bûye.

[16] Heke melhezeyên me di cih de bin, wî wextî nêrînên Îonîayîyan yên li ser Misrê şaş in. Heke em nêrînên Îonîayan rast hesêb bikin, wî wextî jî ez ê bêjim Yûnanî û Îonîayî nizanîn hejmaran bihejmêrin, ji ber ku ew dinyê bi awayê Ewrûpa, Asya û Lîbyayê dikin sê perçe, lê divê ew beşek çaremîn, Deltaya Misrê lê zêde bikin, madem ew ne di Lîbyayê û ne jî di Asyayê de ye; ji ber ku Rûbarê Nîlê weke sînorê navbera Asya û Lîbyayê qebûl nakin. Di rastîya xwe de Nîl, li herêma Deltayê ya di navbera Asya û Lîbyayê de tengav bûye, bi ser çend şaxan belav bûye.

NÎL Û DEVÊN WÊ

[17] Wî wextî em gotinên Îonîayîyan deynin milekî û careke din em bêjin, cihên ku Misrî lê dijîn Misir e, çawa ku Kîlîkîa cihên Kîlîkîayî lê dijîn û Asûrya cihê Asûrî lê dijîn e. Heke manaya bêjeyan hebe, sînorê di navbera Asya û Lîbyayê de, em ji derveyî welatê Misrê tiştekî din nabînin, lê heke

em parvekirina Yûnanîyan kirine qebûl bikin, bi temamî, em ê ji sûlavan û bajarê Elephantîneyê dest pê bikin, nîvê wê li erdê Lîbyayê, nîvê din jî li erdê Asyayê, weke du beşên girêdayî du qitayan lê binerin. Ji ber ku Nîl ji sûlavan dest pê bike heta deryayê, Misrê dike du beş. Heta Kerkasorosê di yek bestê de diherike û piştî vî bajarî dibe sê şax. Yek berê xwe dide başûrê rojhilatê û navê devê Pelûsîonê hildide, ya duyem ber bi rojavayê ve diçe û navê Kanobosê hildide û ya sisiyan dewama berdewamîya Nîlê ya ji erdê jorîn tê heta Deltayê û piştre wê jî heya bi deryayê dike du beş; ne bi mîktara ava xwe û ne jî bi nav û dengê xwe ji herdu yên din ne kêmtir e. Ji vê re jî devê Sebennytîkê tê gotin. Du devên din jî hene ku ji Sebennytîkê vediqetin û heta deryayê diçin: ew jî, devên Saîtîkê û Mendesîan in. Devên Bolbîtînê û Bûkolîkê jî ne ew dev in ku bûne du şax, bi destê insanan hatine kolan.

[18] Ez ê belgeyek ku ez dikarim ji bo rastîya zanyarîyên xwe yên di warê mezintî û firehîya welatê Misrê de ku piştre ket destê min, rayêxim ber çav, ew jî gotin û nêrînên kahînê navenda ayînî ya Ammonê ne. Ahalîyên bajarên Apîsê û Mareayê yên li herêma sînorê navbera Lîbyayê û Misrê de dimînin, ne Misrî ne û ketibûn nav endîşeya ku wan Misrî hesêb bikin, ji qedexeyên dînî westîyabûn û li hemberî qedexekirina goştê çêlekan derketibûn. Wan serî li Ammon dan ku bi Misrîyan re hevbeşîyeke wan tune û dan diyarkirin ku ew li cihên derveyî Deltayê dijîn û awayê jiyana wan ne wekî wan e û bi cûreke din dijîn. Derdê wan ew bû ku, dilê wan çi bixwazin karibin bixwin. Lê xuda nexwest guhê xwe bide wan û got: "Dema ku ava Nîlê radibe, ew cihên ava wê lê belav dibe, ji Misrê û Elephantîneyê dest pê bike, çi kesê ava wê vexwe Misrî ye." Bersiva navenda ayînî ev bû ji wan re.

[19] Wextê Rûbarê Nîlê bi coş dibe, ne tenê erdê herêma Deltayê dide ber xwe, lehî li hin deran digihe erdên Lîbya û Erebistanê jî û li herdu milan geh kêm û geh zêde bi qasî rêya du rojan sefera xwe didomîne. Li ser diyardeya lehîyê û rabûna ava Rûbarê Nîlê zanyarîyeke zêde bi destê min neket. Min ne ji kesên ayînî û ne jî ji devê xelkê tiştek wisan seh nekir. Lazim bû ez bizanim ku ji bo çi Çemê Nîlê ji yekem roja rojvegera havînê dest pê dike radibe, navçeyên dora xwe digre, tam sed rojan dewam dike û dema ku ber bi dawîya temambûna wê demsalê ve diçe, ji ber xwe ve dikêşe û dibe çemekî eslî yê wekî xwe û di seranserê zivistanê de kêmav e û çaverêya hatina

demsala barana destpêka havînê ye? Li ser vê bûyerê zanyarîyeke wisan ji tu çavkanîyeke Misrê bi dest min neket, her çend min ji wan pirsî ku sebebê wê çiye Çemê Nîlê bi eksê hemî çemên din hereket dike? Pirseke din ku min dixwest ronî bibe; gelo çima ew hejebayê ji hemî berdewamîyên çeman radibin, tenê mirov li vî çemî lê rast nayê? Min dixwest ez vê jî hîn bibim.

[20] Li gel vê jî, hinek Yûnanîyên hişê wan ne li serê wan, rabûne û xwestine sebebê lehîyên ava Nîlê îzah bikin. Sê teorî pêşkêş kirine ku dudu ji van ne hewce ye mirov behsa wan jî bike, tenê ji bo bêne zanîn ez ê binivîsim. Ya yekê, lehîyê wê bi bayê Etesîosê ve girê didin. Ev hejeba çem ber bi paş ve diajo û dibin asteng ku av biherike, bigehe nav deryayê. Lê hatîye dîtin ku Nîl berîya heja bayê Etesîosê bilind bûye hatîye. Ji bilî vê heke bilindbûna wê girêdayî vî bayî bûya, ew çemên din yê li himber vî bayî diherikin jî gerek di bin eynî tesîrê dê bimana û di heman rewşê de bana. Ji bilî vê jî, ji bo ev biçûk bûn dê hê zêdetir di bin tesîra heja vî bayî de bimana, ji ber ku hêza wan a li hemberî vê bisekinin hê lawaztir bû. Rûbarên wiha li Sûrîyê gelek in, li Lîbyayê jî zêde ne û yek ji wan bi herikîna Nîlê re nikarin bên miqayesekirin.

[21] Ronîkirina duyem ji ya pêşî kêmzanistîtir û ecêbtir e. Li gor vê, Nîl vê mucîzeyê dide nîşan, ji ber ku ew, ji Okeanûsê derdikeve û Okeanûs jî temamê dinyê radipêçe.

[22] Em bên îzaha sêyem, her çend ji yên din baştir bê dîtin jî, lê ew jî bi qasî wan beredayî ye,[77] ji ber ku sebeb hilandina berfê dide nîşan. Nîl ji Lîbyayê derdikeve, di Ethîopîayê re derbas dibe û digehe Misrê. Madem pêşî di cihên germ re derbas dibe û dûra digehe hin cihên hênik, gelo dê berfê ji ku bibîne? Ew kesên ku ji van mijaran fêhm dikin, dema ku bibînin bûyer bi berfê ve tê girêdan, xala yekem ya dijîtîyê ku dê li ber çavê wan bikeve, nehesibandina ku ew bayê li van herêman timî tên bayên germ in. Ji bilî vê, ev herêm ne baranê nas dikin û ne jî berfê. Halbûkî dema ku berf dibare, pênc roj piştî wê bêgotin baran dibare, ji ber ku ev bûyereke xwezayê ye,

77 Belê, îzaha rast ev e. Av, bi hilandina befrê û ji ber baranên tropîkal yên Hebeşîstanê bilind dibin/di ser re diçin (Sayce). Anaxagoras û piştre jî Strabon jî eynî sebeb dane nîşan.

heke berf bibarîya dê ev bûbûya herêmeke ku baran lê tê. Ya sisiyan, çermê insanan ji ber germîyê reş dibe, teyrên wekî sîsarkê û reşêleyê temamê salê ji vir venaqetin û ew qulingên ji ber zivistanên Îskîtê direvin, hêlînên xwe yên zivistanî li vir ava dikin. Ew herêma ku Nîl tê re derbas dibe, heke hindik jî bûya berf bibarîya, dê mirov rastî van taybetmendîyan nehatibûya. Qanûnên xwezayê rê nadin van awa melhezeyan.

[23] Heke em bên ser yê ku vê rewşê bi Okeanusê ve gire dide, ev rîwayeteke wisa ye ku ne mimkûn e bi argumanan were îspatkirin. Ji alîyê xwe ve ez bejim, ez tu çemekî bi navê Okyanûsê nas nakim û ez difikirim ku Homeros, an yek ji helbestvanên berê, ev nav îcad kirîye û di helbesta xwe de bi kar anîye.

[24] Niha jî piştî me rexne li van nêrînan girtin, belkî hewce be ez nêrînên xwe yên di warê van siran de îzah bikim û li gor xwe bidim xuyakirin ka ji bo çi Rûbarê Nîlê havînan hil dibe: Roj di demsala zivistanê de, ji ber bahozan, ji eksena xwe ya berê derdikeve û ber bi navenda Lîbyayê ve diçe. Ji bo îzaheke kurt tiştekî din tune ku ez têkim ser vê. Ji ber ku wisan tê dîtin ku, ev xuda çiqas xwe nêzîkî herêmekê bike, li wir hişkî ewqas zêde dibe û ew çemên di nav re derbas dibin jî bi wê dereceyê bêav dimînin.

[25] Lê heke îzaheke hê firehtir bê xwestin, wî wextî ez ê wiha bêjim: Roja/Tava ku li jora navenda Lîbyayê derbas dibe van tesîran tîne meydanê. Li herêmê hewa her tim vekirî ye, ji bo ku bayê hênik nayê her tim erd germ e, ji ber wê, dema ku roj li ser van cihan sobanîyê dike, eynî wek rojê havînan ku tê di navenda asman de disekine, tesîrê dike; avê dikêşe û pêpesê beşa atmosferê yê herî jorê dike. Ba avê ji wir hildidin û dikêşin her cihî, vê hêlmê wekî dilopan konsantire dikin û gelek xwezayî ye ku ew bayên li van herêman dihejin, bayê Notosê û başurêrojavayê, ji tevan zêde baranbarkirî ne. Heta cardin ez wisan difikirim ku, roj ew ava ji Nîlê kêşaye, temamê wê wekî baranê nabarîne, hinek jî ji bo xwe hildide. Dema ku zivistan nerim bû, roj cardin cihê xwe yê navenda asman digre û wî wextî ji rûbarên din jî avê dikêşe. Rûbarên din heta wî wextî kutleyên avê yên mezin hildidin, ji ber ku bi pîvaneke zêde yên welatê xwe av didin û gelek zêde bi avên lehîyan yên berdewamîya lehîyan çêdikin, tên xwedîkirin. Lê havînan ji bo ku ji ba-

ranê mehrûm in û ji bilî wê ji alîyê rojê ve jî tê mêtin, ava wan kêm dibe. Nîl bi eksê wê, roj ava wê dikêşe, di nava rûbaran tenê ew e ku baranan xwedî nake û ava wan ne havînan zivistanan dikêşe. Bi vî awayî bi rastî, ew jî qasî rûbarên din di bin tesîra rojê de dimîne, lê zivistanan tenê ava wê kêm dibe. Belê bi vî awayî ez vê bûyerê bi rojê ve, bi rêya vê nêrînê re girê didim.

[26] Bi dîtina min, ew roj e dîsa ya temamê hewaya van welatan ziwa dike, ji ber ku dera derbas dibe dike agir û pêt; jixwe navenda Lîbyayê her tim havîn e. Em bêjin avûhewayan/îklîman cih guhertin, li asîmanan Notos û bayê başûr têkevin cihê zivistan û poyrazê, ew jî herin şûna Notosê bigirin, ez dibêjim heke wiha bûbûya, dê poyraz û firtone roj ji nîvê asîman biajota û di navenda Ewrûpayê re derbas bikira, îro wekî li Lîbyayê çi rewş heye û ez wisan difikirim ku îro Nîl çi dike, wî wextî jî dema Istros di Ewrûpayê re derbas bûba, dê eynî tişt bikira.

[27] Em bên ser sebebê nerabûna hewaya hênik ya li Nîlê, ez li ser vê xalê wiha difikirim: Nabe mirov li bende be ku hewayê hênik ji erdê germbûyî rabe, ji bo rabûna bayê hênik, bi gelemperî hênikî dixwaze.

[28] Bihêlin ev tişt hemû îro û berê çawa bûn bila wisan bimînin. Em bên ser çavkanîyên Nîlê, yên di vî warî de min sohbet bi wan re kir, ji bilî berpirsyarên xezîneya Atheneyê ya Saîsê ya li Misrê, ne Misrîyan, ne Lîbyayîyan û ne jî Yûnanîyan, kesek pesnê xwe neda ku bêje ez wan dizanim. Lê wî berpirsyarî jî dema ku ji min re got ez dizanim, dil min de heneka dike. Wî digot ku, li herêma Thebaîyê, di navbera bajarên Syeneyê û Elephantîneyê de, du çiyayên bi serên xwe yên tûj bala mirov dikêşin hene; navê yekî Krophî û yê din Mophî ye. Di nav van herdu çiyayan de qelşeke bêbinî heye, çavkanîyên Nîlê li vir in, nîvê avê ber bi Misrê û Boreasê û nîvê din jî diherikî ber bi Ethîopîayê û Notosê ve. Lê çawa dizanin ew qelş bêbinî ye? Li gor wî, hikumdar Psammetîkos ev îspat kirîye, wî bi hezaran gaz ben daye hunandin, ew berdaye wê qelşê, hê jî binê wê nedîtine. Heke bi rastî wekî birêvebir digot wisan bûya, qasî ku ez dizanim, dema ku av pangor dide û radibe, dide nîşan di wan noqteyan de anaforên bi hêz çêdibin. Ew ava li çiyan dikeve û dişkê, ew benê berdane qelşê kaş kirîye û bûye asteng ku binê wê bê dîtin.

[29] Ez di vî warî de ji kesekî din tiştek hîn nebûm. Lê zanyarîyên din ku ji van yên heta Elephantîneyê ne, di ber Nîlê re heta cihê min karîbû ez biçim, ez bixwe çûm û bi çavdêrîyên xwe min ew dîtin û bi dest xistin, ji wir pê ve jî min lêkola, min dan pirskirin û ji min re hatin qisekirin, ez hîn bûm. Ji Elephantîneyê wir ve, ber bi hindur ve erd asê ne; li vir lazim e werîsên stûr bavêjin herdu rexên qeyixê, wekî ku mirov ga bide ber xwe, bikêşe. Ji wir şûn ve Nîl wekî Meanderê[78] dest bi fetlan dike, ew rêya bi vî awayî pêwist e jê derbas bin duwazdeh skenes e. Li vir tenê gelîyek heye. Nîl li dora girava Tamhompsoyê difetile û di nav vî gelîyî re diherike. Piştî Elephantîneyê herêma ber bi hindur ve, êdî Ethîopîayî li wir rûdinin. Nîvê giravê jî aîdê wan e, di nîvê ya din de jî Misrî rûdinin. Girav li ber devê goleke mezin e, li dora vê golê koçerên Ethîopîayî hene. Wextê mirov vê golê derbas bike, cardin berdewamîyên Nîlê tên dîtin, ji ber ku Nîl ji vir belav dibe û ev gol pêk anîye. Dê hûn li vir ji keştîyê peya bibin û ji wir şûn ve çil rojan peya bimeşin. Ji ber ku vir tijî kevirên mezin ên serê wan tûj yên li ser rûyê avê û bin avê hene. Bi tu qayixê mirov nikare biçe. Piştî çil rojan mirov bimeşe û ji vê herêmê derbas bibe, dê mirov li qayixeke din siwar bibe û duwazdeh rojên din biçe. Wî wextî mirov tê bajarekî mezin ku navê wê Meroa ye, tê gotin ku vir, navenda Ethîopîayên din e. Ev sîte ji xudayan tenê Zeûs û Dîonysos dihebînin. Rêzeke mezin ji wan re digrin û ji bilî wê kahînekî Zeûs heye. Ev xelk bi rêya kahînên Zeûs, kengî û li hemberî kê bêje, wî wextî li hemberî wan şer dikin.

[30] Mirov ji vî bajarî derkeve û ji bo bi rêya avê bigihe "Revokan", bi qasî ji Elephantîneyê heta navenda Ethîopîayê çiqas wexit derbas bûye, lazim e hê bi qasî wê zeman xerc bike. Ji van revokan re "Asmakh" dibêjiin. Ev bêje di Yûnanî de tê maneya "yên li rexê çepê yê hikumdar disekinin". Lêbinêrin, ji bo çi ew 240 hezar şerkerên Misrî baz dane û hatine li ba Ethîopîayîyan bi cih bûne Di wextê hikumdar Psammetîkos de, li bajarê Elephantîneyê li hemberî Ethîopîayan, li Daphneya nêzîkî Pelusîonê li hemberî Ereb û Asûrîyan û li Mareayê li hemberî Lîbyayîyan garnîzon hatine damezirandin. Îro jî Persî di eynê cihan de garnîzonên xwe diparêzin, wekî dewra Psammetîkos li Elephantîneyê û Daphneyê garnîzonên wan hene. Belê, Misrîyan sê salan nobedarî kirine, di ewqas dem de kesek bi ser wan neketî-

78 Meander: Bi Tirkî Menderes dibêjin.

ye. Di nav xwe de bi hev şêwirîne û bi yek dengî biryar dane, Psammetîkos terk kirine û ber bi Ethîopîayê ve çûne. Wextê Psammetîkos vê seh dike, bi pey wan dikeve, digehe wan û bi beredahî dest bi hêvî û lavahîyan dike, dibêje, "Xudayên welatê xwe yê eslî, jin û zarokên xwe nehêlin û neçin". Tê gotin ku wî wextî yek ji wan şerkeran organê xwe yê cinsî derdixe û dibêje "wextê ev bi min re be, li ku be ez dikarim jin jî bibînim û zarok jî çêkim". Dema ku ev digihin Ethîopîayê ketine bin fermanrewatîya hikumdarê li wir. Wî jî wan baş ragirtîye û hinek Ethîopîayên ku li hemberî wan rabûne haş kirîye, ûrf û adetên Misrîyan bi wan dane nasîn.

[31] Bi vî awayî em di derbarê mesafeyek ku rêya bi qasî çar mehan a bejahîyê û ya avê ya piştî Misrê bigre hîn bûn; heke em rêya ji Elephantîneyê heta cihê Revokan hesêb bikin, ev tenê dikare bi mehan bê pîvan. Em dizanin Nîl, ji başûrêrojavayê ji herêmên rojavayê tê. Lê ji wir û pê ve kesek tiştekî rast nikare bêje. Ji ber ku erd, ji ber avûhewayê germ, ji derveyî çolan pê ve ne tiştekî din e.

[32] Di gel ve, va çîrokeke ku Kyreneyîyan ji min re behs kirin: Ji bo şêwrê çûne ba kahînê Ammonê, bi hikumdarê Ammonîyan Etearkhos re jî hevdîtinek pêk anîne û hevdû nas kirine. Gotin dizivire û tê ser wê yekê ku kesek Rûbarê Nîlê û çavkanîyên wê nas nake. Wê demê Etearkhos, behsa wextekî ku Nasamonî hatine serdana wî kirîye. Ev Nasamoyên han, xelkê Lîbyayê ne. Yên li Syrteyê û li rojhilatê welatên cînar yên li ser saheke biçûk rûdinin ev in. Hikumdar, dema ku bi Nasamonîyan re diaxife, dipirse ka gelo ew dikarin ji bilî zanyarîyên tên zanîn yên li ser çolên Lîbyayê agahdarîyeke din bidin wî. Ew jî cewab didin û dibêjin, wextekî ji nesla giregirên welatê wan, zarokin ku ji melkemot neditirsîyan gihiştine; piştî ku ev mezin dibin û dibin mêr, dest bi karê ji derveyî taqeta insên dikin, rojekê biryar didin bi pişkavêtinê pênc kesan ji nav xwe hildibijêrin ji bo biçin çolên Lîbyayê, cihê ku berîya wan kesek evqas dûr neçûbe û lêkolînê bikin. Li seranserê deryaya li bakur dirêj dibe, ji Misrê heta Pozê Solunteyê ku cihê herî dawî yê Lîbyayê yê, li qiraxê Lîbyayê Lîbyayîyên eslî û xelkê din yên ji eynî neslî bi cih bûne. Tenê çend nuqte Yûnanî û Fenîkeyîyan di destê xwe de girtine; li herêmên hindur û li rexên din yên li qiraxan û nêzîkî deryayê rûdinin; Lîbya tijî heywanên nekedîkirî ne, ji bilî wê jî qûm, hişkîyeke nedîtî û çol heye. Belê, Nasamonî

behs dikin: Xortên me yên ji alîyê hevalên wan ve tên birêxistin, xwarin û av bi xwe re dibin, pêşî ew cihên insan lê dijîn, piştre jî erdên bejî derbas dikin û ber bi îstîqameta heja bayê zephîrê dikevin çolê. Bi rojan di erdê fireh yê çol û mesafeke dûr de meşîyan, di gelîyekî de darên bilind bûne dîtin, çûn ba daran, ji fêkîyên wan berhev kirin. Di vê navê re, insanên bejinkurt derketin û ew girtin birin. Ew û Nasamonî ji zimanê hev fêhim nedikirin. Piştî ew di erdê hezek yên fireh re derbas kirin, ew birin bajarekî ku kesên wekî wan yên bejinkurt lê rûdiniştin. Li rexê bajêr, rûbarekî ji rojava dihat û ber bi rojhilatê ve diherikî hebû, di nav de timsah dilebitîn.

[**33**] Min behsa gotinên Etearkosê Ammonî heta vir kirin û evqas bes e. Lê ez ê tenê vê têkim ser, li gor vê çîroka Kyreneyîyan ji min re gotin, Nasamonî vegerîyane welatê xwe û behsa rêwîtîya xwe kirine. Her çi hal be, em vegerin ser wî çemê di rexê bajêr re derbas dibe: Etearkhos di navbera wê û Nîlê de peywendî datîne, ya nêzîkî aqil e jî ev e. Bi rastî Nîl ji Lîbyayê derdikeve û wê di nêvî de dike du beş. Heke em bikaribin bigrin ber çav û bi rêya li ya tê zanîn binêrin û ya nayê zanîn derêxin û bigehin netîcekê, ew çavkanîya xwe ji mesafeke dûr ya wekî Îstrosê[79] werdigire. Îstros, ji welatê Keltîyan û bajarê Pyreneyê tê, di navenda Ewrûpayê re derbas dibe; Keltî li rexê din yê stûnên Herkulesê rûdinin; dibin cîranên xelkê Kynesîyan yên li dawîya rojavayê Ewrûpayê ne. Îster, di navenda Ewrûpayê re derbas dibe û digihe Deryaya Reş, li nêzîkî bajarê Îstrîayê ya kolonîya Mîletosê dirije deryayê.

[34] Di eslê xwe de Çemê Îsterê, di nav herêmên ku nîştecî lê hene derbas dibe, loma rêça wê bi tevahî tê zanîn; lê kesek li ser çavkanîyên Nîlê nikare tiştekî bêje. Ew erdê Lîbyayê yê tê re derbas dibe cihek e ku insan nikarin lê rûnin, çol e. Lê ji bo cihên derbas dibe, bi qasî ku gengaz bû bi lêpirsînê agahîyên bi dest min ketin û ez çi dizanim min tevde gotin û di dawîyê de em heta Misrê hatin. Misir, kêm-zêde dikeve hemberî beşa çiyayî ya Kîlîkyayê, ji wir heta Sînopeya dikeve qiraxê Behra Reş, ji bo kesekî lingsivik meşa rêya pênc rojan e. Sînope dikeve hemberî ew cihê ku Isterê dirije nav deryayê. Bi vî awayî mirov dikare Nîla ji seranserê Lîbyayê derbas dibe, bişibhîne Îsterê.

79 Îstros, Tûna ye. Ew bajarê Pyreneyê yê dibêje jî, dibe Çiyayên Pireneyê be.

[35] Ez dibê evqas behsa Nîlê bes e. Lê ez ê hinekî din li ser Misrê bisekinim, ji ber ku vir tijî tiştên ecêbmayî û berheman e (mirov ji temamê cihên din ên dinyê berhev bike bi qasî yê li vir nabin), ewqas ku ji bo behiskirinê gotin têrê nakin, ji ber wê ez ê dirêj behs bikim. Misrî ne tenê xwedî avûhewa û rûbareke ku naşibe yên deverên din, bi awayekî fireh bi her tiştî, bi ûrf û adetên xwe û bi qanûnên xwe naşibin yên mayî. Li ba wan jin derdikevin bajêr, kirîn û firotinên biçûk ew dikin. Mêr li malê li ser dezgeh kar dikin, li derên din yê dinyayê dema ku caw dihûnin tayê xwe ber bi jor ve diavêjin, lê ew ber bi jêr ve diavêjin. Mêr bar li ser serê xwe, jin li ser milên xwe dikêşin. Jin li ser pêyan destava xwe ya biçûk dikin, mêr li ser tutikan. Pêdawistîyên xwe yên xwezayî di nav malê de pêk tînin, lê xwarina xwe li derve li kolanan dixwin û vê bi vî awayî îzah dikin; pêdivîyên şermîn ji ber çav dûr tên xistin û yên ne şermî vekirî dikin. Naxwazin jinek xizmeta kevirê mîhrabê yê tu xudayek jin yan mêr bike; rêberên dînî ji bo îlahên mêr jî û yên jin jî mêr in. Zarokên li dê û bavê xwe nenêre, nikare ji bo vî karî ew bên mecbûrkirin, lê keç nexwaze jî mecbûr e li dê û bavê xwe binêre.

[36] Rêberên dînî(ayînî) li cihên din pordirêj in; li Misrê serê xwe rût dikin. Li cihên din dema ku kesekî nêzîk yan xwedî bimre, ji bo şîn bigre serê xwe rût dikin, li Misrê bi eksê wê, ew por û rihê ku berê kurtkirî dirêj dikin. Cihên din ji heywanan dûr û cihê dijîn, Misrî malên xwe bi heywanên xwe re parve dikin. Cihên din genim û ceh dixwin; lê li Misrê ku îdareya xwe bi vê dikin, qet qîmet nadinê, nanê xwe ji zadê ku hinek jê re dzeîa dibêjin, çêdikin. Vê bi pêyan, hawanan û bi destan distirên. Li welatê din, xwezayî organ çawa çêbûbe wisan dihêlin. Lê Misrî û yên ev adet ji Misrîyan wergirtine sunet dibin. Di lixwekirinê de, mêrên Misrî du perçeyan li xwe dikin, jin yek perçe. Li cihên din xelek û benên babirkan ji derve pê ve girê didin, li Misrê ji hindur ve. Ji bo nivîsandinê yan kevirên xîç hesêbkirin, Yûnanî destê xwe ji milê çepê ber bi milê rastê ve dimeşînin, Misrî ji milê rastê ber bi milê çepê ve: bi ser vê de, dixwestin bidin yeqînkirin ku ew bi xwe ber bi milê rastê ve nivîsandinê, yên ber bi milê çepê ve dinivîsin jî Yûnanî ne. Ji bo nivîsandinê du cure tîp bikar tînin, ji yekê re pîroz, ji ya din re nivîsa xelkê dibêjin.

[37] Hinek ûrf û adetên Misrîyan yê ku ji insanên din zêde û gelekî zêdetir dîndar in: Ji bo vexwarinê îskanên bronz bikar tînin û herroj bi firkandineke zêde dişon û vê ne filankes yan bêvankes tenê, herkes dike. Kincên wan ji ketenê ye, tim şûştî û paqij li xwe dikin, di vî warî de gelek birêûpêk in. Ji bo ku paqij in sunet dibin, ji ber ku paqijîyê di ser sipehîtîyê re digrin. Keşe(kahîn) herroj ji serî heta binî xwe kur dikin, bi vî awayî dema ku xizmeta dîn bi cih bikin, pêşî lê digrin li ser wan sipî û kêç û tiştên qirêj hebe. Keşe ji bo lixwekirinê ji bilî ketenê pê ve tiştekî din bikar naynin, pêlavên ji papîrusê li xwe dikin, ji bo wan qedexe ye kincên din û pêlavin din li xwe bikin. Du car bi roj û du car jî bi şev xwe bi ava sar dişon. Vegotina wê gelekî dirêj e, merasimên wan yên ayînî yên dawîya wan nayê hene. Di miqabilî vê de qezenca wan tune. Ji bêrîka xwe û malê xwe tiştekî xerc nakin. Ji bo xwarinê, herroj ji bo her yekî xwarinên pîroz tên pehtin û guhestin, ev ji goştên serjêkirinê û yên qazan gelekî zêde tên amadekirin. Ji derveyî vê şeraba rezan jî tê dayîn, lê mafê wan yê masîxwarinê tune. Em bên ser baqleyê, Misrî vê qet naçînin; heke bi xwezayî hêşîn bû, ne dicûn û ne jî wekî xwarin dipêjin, keşe tehemul nakin vê bibînin. Ji ber ku vê pincareke paqij nahesibînin. Ji bo xudayekî ne tenê keşeyek heye, gelek keşe hene, di nav wan de yek serekkeşe ye; dema ku keşe dimre kurê wî cihê wî digre.

[38] Ga, malê Epaphos tê hesêbkirin; wan bi vî awayî miayene dikin: Heke li ser yek mûyê reş hebe, ew qirêj tê hesêbkirin. Ji bo vî karî keşeyek hatîye vezîfedarkirin; heywan li ser pêyan û li ser rex raketî miayene dikin, zimanê wan dikêşin û lê dinêrin, piştre gelo ji yek ji van qisûrên ku ez ê behs bikim, qirêj bûye yan na, bi ser de jî li duvê wî dinêrin ka gelo mû rast derketine yan na. Heke tu qisûr di heywên de tunebe, wek nîşandan qalikê papîrusê li qiloçê wî dipêçin; herî datînin ser û mihur dikin; bi vî awayî heywan digrin û dibin. Cezayê serjêkirina gayekî yê bê mihur mirin e. Belê heywan bi vî awayî tê miayenekirin.

MERASIMÊN QURBANAN

[39] Merasimên qurbanê bi vî awayî ne: Heywanê demxe lê hat xistin, dibin ser kevirê mîhrabê; agir tê vêxistin, şerab li serê heywên û kevirê mîhrabê tê reşandin, navê xudê hildidin û heywan tê serjêkirin. Piştre serê wê tê

veqetandin. Tê gurandin. Nifiran li serî dikin û dibin. Bazarek heye, tê de Yûnanî hene, ew kirîn û firotinê dikin, serî dibin li wir difroşin Yûnanîyekî. Heke Yûnanîyek nebînin, digrin davêjin çem. Nifir jî ev e: Ew belayê bê serê yê qurban jê kirîye yan jî hemî Misrê, bila bê vî serî. Nifirlêkirina li serê ew heywanê tê serjêkirin û reşandina şerabê, di her serjêkirina qurbanê de adetek e ku her Misrî riayetê wê bike û netîceya vê adetê ye ku kesekî Misrî ne serê ga û ne jî serê heywanekî din nakin devê xwe.

[40] Paqijîya organên hindur ên heywanê tê qurbankirin û merasima ji bo şewitandina wan tê kirin, li gor qurbanan tê guhertin. Ez ê behsa ûrf û adetê qurbana ji bo wî xudayî bikim ku li ba xelkê giringtir ji yên din e û ji bo wê jî cejna mezintirîn ji bo wî rêk dixin. Piştî ga hat gurandin, li ser dua dixwînin, temamê hindurê wî tê paqijkirin. Lê tenê piska wî ya spî, kezeb, dil û bezên hindur tê de dihêlin û dest lê nadin. Piştre rehnan jê dikin û stû û milên wî jê dikin. Piştî ku ev hatin veqetandin, gewdeyê wî tijî nanê ji genimê xas, hingiv, mewîj, hejîr û biharatên cure cure dikin. Piştre zêde rûn lê dikin û dişewitînin. Piştî xelk rojî digrin qurban tê serjêkirin û di dema şewitandina qurbanê de xelk li singa xwe didin. Piştre rûdinin û dest bi xwarina goştê li ber şewatê mayî dikin û şahîyê girê didin.

[41] Misrî ga û conegayên paqij dikin qurbanî, ew nikarin çêlek û nûgonan serjê bikin, ji ber ku ew ajalên pîroz yê Xuda Îsîs in. Peykerê vê xwedawendê di şiklê jineke ku strûhên wê wek yê çêlekê ne çêkirine, wekî çawa Yûnanî Xuda Io nîşan didin. Misrî ji temamê heywan û teyrên din zêdetir, rêz li çêlekê digrin. Tu jin û mêrekî Misrî devê kesekî Yûnanî maçî nake, yan kêr, şîş û beroşên wan bikar naynin. Misrî heta goştên bi kêrên Yûnanî hatibe perçekirin jî naxwin. Dema ku ga yan çêlekên wan bimrin, bi vî awayî dikin: Kelaxê yên mê davêjin nav ava çem, yê nêr li taxên bajaran têne veşartin, gerek yek an herdu strûhên wan li ser rûyê erdê xuya bikin ku cîh nîşan bidin. Dema ku kelaxê heywan rizîya û bû ax û wextê wê hat, komek keştî ji girava Prosobîtîsê ya girêdayî herêma Deltayê tên û bi mebesta berhevkirina hestîyên ga yên binaxkirî, li bajaran digerin. Dora wê giravê neh skenes e. Li vê girava Prosobîtîsê çend navçeyên din jî hene. Navçeya ku keştî jê tên û hestîyan berhev dikin navê wê Atarbekhîs e û tê de perestgeha Afrodîte heye. Ji bajarê Atarbekhisê hertim gelek xelk bi rê dikevin her yek ji wan bi

alîyekî ve diçe li bajarên din bela dibin, piştî derxistina hestîyên heywanên veşartî, hemûyan berhev dikin, tînin û li cihekî vedişêrin. Dema ajalên din yê axo dimrin jî bi heman rewşê wan vedişêrin, qanûn wisa emir dike; ji ber ku wan heywanan jî nakujin.

[42] Yên ji bo Zeûsê Thebaîyî perestgeh çêkirine yan jî yên li devera Thebaîyê rûdinin, yanî ez dixwazim bêjim hemî, rêz li mihan digrin û ji bo qurbanê bizin serjê dikin. Ji ber ku hemî Misrî heman xudayan nahebînin, tenê hemî Îsîs û Orîsîs dihebînin, ku ev yê duyem li ba wan di miqabilî Dîonysosê me ye; van herduyan wekî hev dihebînin. Di miqabilî vê de yên ji dînê Mendes in yan jî yên li wê deverê rûdinin, li ba wan bizin pîroz e, mihan dikin qurban. Thebaîyî û yên wekî wan rêz li mihan digrin, bi vî awayî behsa danîna vê qanûnê dikin: Ji bo ku Herkules Zeûs bibîne li ber xwe dide, lê Zeûs naxwaze wî bibîne. Zeûs ku nikare li ber rûlêdanînên Herkules yên zêde bide, lîstikekê dide ber xwe; dixwaze beranekî bigurînin, serê wî jê bike û wekî maske têxe serê xwe, postê wî jî li pişta xwe bike û bi vî awayê pêkenok Herkules bibîne. Belê, ji bo Misrî vê serpêhatîyê bi bîr bînin serê beran dikin serê peykerên Zeûs. Ammonî jî li ser rêça wan meşîyane, ku ew ji tevhevbûna kolonîyên Misrî û Ethîopîayî pêk hatine û zimanê diaxifin jî wekî yê van herdu welatan e. Li gor qeneeta min, navê Ammonîyan jî navekî pêvek e, ji ber ku ev Ammon, navê Zeûs yê bi zimanê Misrî ye. Sebebê ku Thebaîyî beran pîroz dihesibînin û qurban dikin ev e. Lê tenê salê rojekê, di cejna Zeûs de beranekî serjê dikin, tenê yek, digurînin û wekî di çîrokê de tê dîtin li pişta peykera Zeûs dikin, piştre jî peykerekî ku Herkules dide nîşan tînin. Di esnayê vê merasimê de herkes dengê xemgînîyê derdixin û li singa xwe didin, şîna beran digrin, piştre dikin tabuteke pîroz.

XUDAYÊN MISRÊ Û MERASIMÊN WAN YÊN AYÎNÎ

[43] Min seh kirîye dibêjin ku ev Herkules yek ji 12 îlahan bûye. Ji bo yê din, yanî li ser Herkulesê ku Yûnanî bawerîyê pê dikin, min tu zanyarî ji kesekî Misrî nebihîst. Tenê evqas ji bo min ronî bûye ku Misrîyan navê wan xudayan ji Yûnanîyan wernegirtine, lê bi pirayî mirov kare bifikire ku Yûnanîyan ew nav ji Misrîyan wergirtine, yanî ez dixwazim bêjim, ew navê

Herkules ku Yûnanîyan li kurê Amphîtryon kirine ji Misrîyan fêr bûne. Yek ji belgeyên min ku ez ê behs bikim: Dayîk û bavê Herkules, yanî Amphîtryon û Alkmen e, bi regez Misrî bûne. Helbet nêrîneke din jî heye, Misrî dibêjin ne navê Poseîdon û ne navê Dîoskur seh nekirine û wan nakin nav rêza xudayan. Heke navê xudayan ji Yûnanîyan wergirtiban, dibû di bîra wan de bimaya. Ji ber ku ew ji zemanê qedîm ve bi karê deryayî mijûl bûne. Helbet em vê jî bêjin ku Yûnanî jî her bi wî karî ve mijûl bûne, heke wiha bûya dibû Misrîyan wan herdu xudayên dawîyê nas kiribûna. Xuya ye yek ji xudayên Misrî yê kevin bi wî navî hatîye nasîn û wekî bi xwe dibêjin Herkules yek ji wan 12 xudayan e ku 17 hezar sal berya niha û di serdema fermanrewayîya Amasîs de ku heyşt xuda kirine 12, ew jî yek ji wan e.

[44] Ji bo ku ez hinek ronahî bikim ser vê mijarê, heya Tyraya Fenîkê min rêwîtîyeke deryayî kir. Min seh kiribû ku li wir perestgeheke Herkules a hikumran tê girtin heye, yên karibin agahîyan bidin min li wir min ê bidîta. Min perestgeh dît; bi amadekarîyeke dewlemend hatibû xemilandin, du sutûn hebûn, yek safî zêr û ya din ji kevirê ʻeqîqê yê kesk, bi şev diçurisîn. Ez bi kesên ayînî yên perestgehê re axivîm û ji wan pirs kir ku "ev perestgeh ji kengî ve heye?". Ji ber ku min dît dînê wan ji yên Yûnanan cuda ye; jixwe ji min re gotin ku perestgeh dema Tyr hatîye avakirin heta niha heye û ji dema insan li Tyrê bi cih bûne heta niha 2 hezar û 300 sal derbas bûye. Min li Tyrê perestgeheke Herkules ya din dît, jê re Herkulesê Thasos digotin. Ez ji wir rabûm û çûm Thasosê û min perestgeheke Herkules dît, ew ji alîyê Fenîkeyîyên ji bo Eûropeyê bibînin vebûne deryayê û li Thasosê jî kolonîyek damizerandine hatîye çêkirin. Ev bûyer diçe pênc nifş berîya li Yûnanê Heraklusê kurê Amhîtryon bê dinyayê. Ev tê wê manayê ku lêgerînên min îspat dikin Herkules xudayekî kevn e û Yûnanî, li gor fikra min, baş dikin bi navê Herkules du olan li ser pêyan digrin. Dema ku sifetê Olymposî pê vedikin, qurbanên layîqî nemirekî be pêşkêş dikin, yê din jî tenê wekî qehremanekî pîroz dikin.

[45] Yûnanî gelek mijaran bêyî binirxînin pêşkêş dikin. Wekî nimûne, ev rîwayeta xwarê ku gelek nemaqûl e û behsa Herkules dike, yek ji wan e. Dibêje, dema ku Herkules geşta Misrê kirîye, Misrîyan taca gulê danîne serê wî û bi pêşwazîyê re ji bo qurbanîkirinê birine ber destê Xuda Zeûs. Tê

neqilkirin ku Herkules di destpêkê de gelek hêmin û bêdeng bûye, lê dema ku gihiştîye ber sekoya cihê qurbanê, ji hêza xwe sûd wergirtîye û hemî xelkê dora xwe kuştîye. Dema ku Yûnanî gelek tiştên wiha tînin ber behsê, bi bawerîya min, ew siruşt, qanûn û ûrf û adetên Misrê nagrin ber çav. Dibû vê zanîbûna ku Misrî ji bilî kavir, beraz, conega û qaz ku ew jî pêwist e paqij û temîz bin, nikarin tu ajelekî din bikin qurbanî, vêca çawa dikarin insan bikin qurbanî? Ji bilî vê jî, wekî ku bi xwe dibêjin, Herkules kesekî fanî bûye û her çend bi hêz jî bûbe, çawa karîbûye hezar kesan bikuje? Ez hêvî dikim ev gotinên min îlah jî û qehreman jî neêşandibin.

[**46**] Niha jî em ê bên ser wê ku ev Misrîyên ez behsa wan dikim, ji bo çi dest nedane bizin û nêrîyan. Mendesî Pan jî dikin nav wan heyşt xudayên berîya wan 12 xudayan. Yên wêneyan xêz dikin û peykerê insanan çêdikin, wek Yûnanîyan, Pan bi awayê serî bizin û pêyên nêrîyê nîşan didin; ev, ne we ye ku wî bi vî awayî texmîn dikin, di eslê xwe de wî jî wekî xudayên din dibînin; wî wextî ji bo çi wiha çêdikin? Heke izin hebe ez ê li vir rawestim, ez sebebê wê nebêjim. Mendesî hemî bizinan û bi taybetî nêrîyan pîroz hesêb dikin, ji bo şivanê birên bizinan diçêrînin rêzeke mezin digrin; di nav nêrîyan de yek heye, ku bi serê xwe mijara dînekî ye, wextê bimre li gor qanûnê, li seranserê Mendesê şîn tê girêdan. Di zimanê Misrî de gotina Mendes tê manaya nêrî û hem jî Îlah Pan. Di wextê min de li vê herêmê mucîzeyek qewimî; nêrîyek li ber çavê herkesî bi jinekê re raket, ev bûyer belavî hemî dinyê bû.

[**47**] Li ba Misrîyan beraz ajelekî nepak e û heke di dema derbasbûnê de li kesekî bikeve, li ser wî kesî ferz e ku bi kincên xwe ve, xwe di nav çem de bişo. Şivanê berazan heke Misrî jî bin, ew nikarin bikevin hindurê perestgehê û kesek hez nake xwe nêzîkî wî bike, kesek ne keç dide wan ne keç ji wan dixwaze û ew tenê di navbera xwe de dizewicin. Misrî ji bilî du xudayên navê wan Selenes û Dîonysos, beraz ji bo tu xudayî nakin qurbanî; ew jî tenê wextê heyva çardeşevî hebe ji bo wan xudayan beraz dikin qurbanî û goştê wan dixwin. Çima Misrî di van cejnan de beraz dikin qurbanî lê di cejnên din de jê aciz in û xwe jê dûr dixin? Yê sebebê vê vedibêjin hene, di vî warî de zanyarîyên min jî hene, lê ez rast nabînim ku ez behsa wê bikim. Binerin, Misrî bi wî awayî beraz ji bo Xuda Selens dikin qurbanî:

Dema serjê dikin, çerm, gunik, hûr û rovîyên wî datînin milekî, bezê ji zik derdikeve jî tevdî datînin ser û di nav agirê paqijîyê de dişewitînin. Goştê din di wê rojê de, di dema ku heyv çardeşevî ye ya ku şahidî li qurban kirîye dixwin. Lê tevaya salê de tu rojên din nikarin êdî goştê berazan bixwin. Xelkê hejar ku imkanên wan tune, peykerên beraz ji hevîr çêdikin, dipêjin û weke qurbanî pêşkêş dikin.

[48] Ji bo Dîonysos, roja xwarina êvarê ya pîroz, her kes li ber derê xwe berazekî biçûk serjê dike û piştre dide wî şivanê berazan ku ew jê kirîye, ew jî wê digre û dibe. Hemî teferuatên vê cejnê di nav Misrî û Yûnanîyan de eynî ne; tenê di nav Misrîyan de koroya govendê tune. Yek jî di cihê phallosê(organê cinsî) de, bejna wî bi qasî anîşkekê peykerokan çêdikin, jin van digrin destê xwe û phallosê ku mezinahîya wî ji qismê mayî yê peykerê ne kêmtir e û bi benan tê hereketkirin, radikin û datînin û bi komî gund bi gund digerînin. Li pêşîya komê bilûr dimeşe, jin stranên hewayê ayînî yên ji Dîonysosê re hatine pêşkêşkirin dibêjin û li pey bilûrê dimeşin. Ji bo çi phallos ji qismê mayî yê gewdeyê mezintir hatîye girtin û ji bo çi tenê wî dilivînin? Çîrokeke pîroz vê îzah dike.

[49] Ez wisan hizir dikim ku Melampûsê[80] kurê Amythaon li ser vê merasimê tiştin dizanî. Bi rastî yê navê Dîonysos, ew merasima ji bo wê pêşkêşkirina qurbanan û merasima ji bo phallosê anîye Yûnanistanê ev Melampûsê han e. Wî ev ayîn tam fêhim nekiribû, ew perdeya li ser heyî ranekiribû, lê ew zanayên piştî wî hatin karîbûn hinekî pêşve biçin. Tiştekî ji sedî sed ya rast hebe ev e, yê birina phallosê bi merasimên şetafet û şahîyan ve ji Dîonysosê re anîye Yûnanê ew e û îro Yûnanî çi dikin, ji wî hîn bûne. Ez li ser hesabê xwe piştrast dikim, belê, Melampûs zanayekî kûr bûye, di xwe de hêzeke pêxemberîyê didît û bi saya zanetîyê Misrê, di nava adetên din de, dînê Dîonysos jî wî anîye Yûnanê, lê bi hinek guhertinên sivik ve anîye. Jixwe ez nikarim bêjim li Misrê û Yûnanê bi eynî awayî vî xwedayî dihebînin; heke wisan bûya, di cihê anîna nû de, lazim bû di eynî wextî de xwedîyê taybetmendîyên îbtîdaî û modern bûya. Ez nikarim bêjim Misrî ev

80 Melampûs: Kahînê bi nav û deng. Li gor neqilkirinê, wî keçên hikumdarê Proîtosê rehet kirine û di miqabilî wê de nîvê hikumdarîyê xwestîye (Kitêb 9, beş: 34).

dîn û hinek adetên din ji Yûnanan girtine. Bi bawerîya min, ya herî nêzîkî aqila ew e ku, Melampûs ev awa perestina Dîonysos ji Kadmosê Tyreyî[81] û Fenîkîyên bi wî re hatibûn û li herêma Boîotîayê nîştecih bibûn hîn bûbe.

[50] Navê hemî xudayan ji Misrê hatine welatê Yûnanê. Ji ber ku ez bi lêkolîna xwe tê gihîştim ku me ev ji barbaran yan bi pirayî ji Misrîyan wergirtine. Wekî berê jî min got, Poseîdon û Dîoskurî li milekî, Here, Hestîa, Themîs, Kharit û Nereîdî û hemî xudayên din, li erdê Misrê her wextê dihatin zanîn. Ez yên ku Misrî bi xwe behs dikin dibêjm. Û ew navên xudayan yên dibêjin em nizanin, ji derveyî Poseîdon, ez texmîn dikim ew nav yên ku Pelasgîyan danîne; ev xuda ji wan re ji Lîbyayê hatîye. Bi rastî ji Lîbyayê pê ve li ba tu miletî, ji destpêkê ve navê Poseîdon tune. Wan her wextî ew hebandine. Ji bilî vê ez vê jî bidim xuyakirin, li Misrê naperisin qehremanan.

[51] Belê, ji bilî yên ez ê pêş de behs bikim, deynê Misrîyan yê di stûyê Yûnanan de ev in. Em vê jî bêjin, fîgurê Hermes yê phallosê wî rabûyî ji Misrîyan hîn nebûne. Vê cara pêşî Athenayî ji Pelasgîyan, Yûnanîyên din jî ji Athenayîyan dîtine. Girêdana Athenîyan bi nijada Hellenê, berîya Pelasgî bên û li ser erdê cîranên wan bi cih bibin û ji Hellenîyan bên hesêbkirin e. Yên nehênîyên Kabîrîyan yên ji Pelasgîyan ji bo Samothrakîyan mîrate maye dizanin, fêhm dikin ka ez çi dibêjim. Pelasgî ku piştre hatine nêzî Athenayê, berîya wê li Samothrakeyê rûniştine û wan ev nehênî(sur) ji Samothrakîyan re hiştine. Athenayî bûn, yê berî Yûnanîyên ku ji Pelasgîyan fêr bûn, yê peykerê Hermes yê phallosê wî rabûyî çê kirin û belav kirin; Pelasgî di vê mijarê de adetekî pîroz hiştin ku yê ne biyanîyê nehênîyên Samothrakîyan in pê zanîn.

[52] Pelasgî, di destpêkî de dema ji xudayan re qurban jê dikirin dua dikirin, lê ez ji yên min li Dodona guhê xwe dan wan dizanim; qet behsa navê rastîn yan navê din yê xudayekî nedikirin. Ji ber ku heta wî wextî ew nav seh nekiribûn. Ew wekî xuda bi bîr anîne. Ji ber ku yên pergalek didan cîhanê û ew bi rê ve dibirin ew bûn. Piştre û demeke gelek dirêj şûn ve, navên xudayan yên ji Misrê hatine hîn bûne, tenê Dîonysos gelek wext piştre hîn

81 Tyre: Bajarê ku îro bi navê Sûr e li Lubnanê.

bûne. Qasek şûn de, serî li kahînên Dodona dane û ji bo van navan şêwirîne; ev kahîn wekî herkes dibêje, kahînê Yûnanê yê herî kevn e, ev zemanê em behs dikin ji wî pê ve tu kahîn tunebûye. Pelasgî bi kahînan şêwirîn, pirsîn; gelo ew navên ku ji biyanîyan hatine bela ew jî bikar bînin an na? Kahîn bikaranîna wan pêşnîyaz kir. Paşê Pelasgî di serjêkirina qurbanên xwe de xweda bi navên wan bi bîr anîn û piştre jî Yûnanîyan wekî mîrata Pelasgîyan ev nav pejirandin.

[53] Baş e, ev xuda ji ku dihatin? Hêj ji serî de hebûn? Şiklê wan çawa bû? Heta doh tiştek nedihat zanîn. Ji ber ku, bi min Homeros û Hesîodos ne zêdeyî çarsed salan berî min in; yên ji Yûnanîyan re zincîra secereyê çêkirin, sifetên xudayan, wezîfeya wan, taybetmendî li gor wan kifş kirin û yên behsa nêrînên wan dikin ew in. Ew şairên dibêjin em berîya wan hatine, li gor min piştî wan in. Di vî warî de, ji bo tiştên min di serî de gotin, min pişta xwe da kahîna Dodonayê, lê ew çavdêrîyên di dawîyê de yên li ser Homeros û Hesîodos, yên min in.

[54] Li ser kahînên Yûnanê û Lîbyayê gotinên Misrîyan wiha ne. Kahînên Zeûsê yên li Thebaîyê gotine ku, wextekî Fenîkîyan du kahînên perestgehê revandine, piştre xeber hatîye bihîstin ku ji van kahînan yek jê firotine Lîbyayîyan û ya din jî firotine Yûnanîyan û kahîngeha li van welatan van jinan ava kirine. Min pirsî, çawa bi vî awayî ji sedî sed dizanin. Di bersivê de ji min re gotin ku, ji bo van jinan gelekî bi hûrgilî lêkolîn hatîye kirin, ew bi xwe nehatine dîtin, lê yên ji min re hatine qisekirin, hîn bûne.

[55] Yên ji devê kahînên Thebaîyê ji min re hatin gotin ev in. Li milê din, va çîroka ku kahînên Dodonayê qise kirine: Ji Thebaîya Misrê du kevokên reş firîyane, yek jê çûye Lîbyayê û ya din çûye Dodonayê. Ya duyem li ser dareke berûyê veniştîye, hatîye ziman û gotîye "bila li vir bi navê Zeûs perestgehek bê avakirin". Dodonayî ev gotin wek fermana Xuda hesêb kirine û perestgehek ava kirine. Ji bilî vê tê gotin ku, kevoka çûye Lîbyayê jî emir kirîye ku bila li vir perestgeheke Ammon bê avakirin. Bi rastî jî li wir perestgeheke Zeûs heye. Belê navê kahîna Dodonayê ya herî bi temen Promenaîa ye, ya piştî wê Tîmarete û ya herî ciwan Nîkandra ye, yên behis kirin ev in. Nêrînên min yên di warê van çîrokan de jî ev in:

[56] Heke bi rastî Fenîkîyan ew kahîn birin û yek firotin Lîbyayîyan û ya din jî firotin Yûnanîyan, li gor min ya firotine Yûnanîyan, li nav Thesprotîyên ku niha bi Yûnanê ve hatine girêdan, yanî lazim e li erdê Pelasgê hatibe firotin; dema weke kole li vî welatî jiyaye, li wir li bin dareke hêşînbûyî, perestgeheke Zeûs ava kirîye; kahîneke perestgeha Zeûs ya li Thebaîyê, jibîrnekirina bîranîna perestgeha xwe ya kevin li welatê xwe yê nû, tiştekî normal e; piştre dema zimanê Yûnanî hîn dibe, dest bi kahîntîyê kirîye. Ya ku behsa revandina xweha xwe ji alîyê Fenîkîyan ve û firotin û birina wê ji alîyê Lîbyayîyan ve li wir kirîye, cardin ew e.

[57] Ji bo van jinan navlêkirina kevok ji alîyê Dodonîyan ve, li gor min, ji ber barbarbûna wan û derxistina dengê wekî teyran ên nayên fêhimkirin e; gotina wan ya ku dibêjin, piştî demekê kevok weke insanan dest bi axaftinê kirin jî, ji bo ku bidin zanîn ku îca jinikê gotinên ew fêhim dikin ji wan re gotine. Dema bi awayê ku fêm nedikirin diaxivî, ji wan re dibû weke çivçiva çûkan; yan na meriv çawa dikare bifikire ku kevok bi rastî bi dengê merivekî biaxive? Ji bo rengê kevokê gotina reş jî, nîşan dide ku jinik Misrî bû.

[58] Bi rastî jî kahîntî li Dodonayê û li Thebaîya Misrê gelek nêzîkî hev e. Bi nêrîna li rûvîyan vegotina rewşa siberojê ji Misrîyan wergirtine. Merasimên ayînî, civîn û duayên bi girseyî li Misrê dest pê kirine û Yûnanîyan ji wan wergirtine. Belê va îspatek, pir hişkereye ku li welatê Misrê gelek sal in ew merasim tên kirin, lê li Yûnanê di van salên dawîyê de dest pê kirîye.

CEJNÊN MISRÎYAN

[59] Misrî salê ne tenê carekê, gelek caran ser hev cejn û civînên dînî çêdikin. Di serî de mezintirîn û giringtirîn cejnê li bajarê Bûbastîsê ji bo rêzgirtina ji Xwedawend Artemîs[82] re dimeşînin. Piştre, ji bo Xuda Îsîs li bajarê Bûsîrîsê merasimekê pêk tînin. Li wî bajarî mezintirîn perestgeh ji bo rêzlêgirtina Xuda Îsîs ava kirine. Ew bajar dikeve navenda Deltayê. Xuda Îsîs di zimanê Yûnanî de jê re Demîter tê gotin. Sêhem cejn li bajarê Saîsê ji bo rêzlêgirtina Xuda Athene hatîye amadekirin. Çarem cejna Misrîyan

82 Xwedawend Artemîs: Di mîtolojîya Romayîyan de nave wê dibe Dîana.

li navçeya Helîopolîsê ji bo rojê û ronahîyê hatîye danîn. Pêncem, li bajarê Bûtoyê ji bo Xwedawend Leto (Latona) û şeşem li Papremîs ji bo xuda Ares cejin tên pîrozkirin

[60] Dema ku Misrî li bajarê Bûbastîsê berhev dibin, bi vî awayî hereket dikin: Girseyek zêde jin û mêr bi babirk û keştî tên wî bajarî. Hinek ji jinan li aleta muzîkê kastanyetan[83] dixin. Mêr li seranserê rê li bilûrê didin. Jin û mêrên mayî klaman dibêjin û çepik lê didin. Dema ku qayiq tê ber bajarekî, ew derdikevin qiraxan û bi gelek awayan henekan dikin. Hinek jin yên min berê gotin dikin û hinekên din bi qêrîna ecêb û bi dengê bilind bang li jinên li wir dikin, hinek dileyzin û hinek li ser pêyan kincê xwe ji xwe dikin. Li hemî bajarên li ser rê wiha dikin. Dema ku digehin Bûbastîsê gelek qurban jê dikin û cejn dikin û di vê cejnê de, şeraba di salekê de tê xerckirin tê vexwarin. Li gor gotinên rûniştîyên li vir, heke em zarokan nehesibînin, hejmara mêr û jinên li wir berhev dibin, digihe 700 hezaran.

[61] Me dît bê cejin li bajarê Bûbastîsê çawa hatin meşandin. Li ser awayê meşandina cejnê li perestgeha Îsîsê jî min berîya niha behs kir. Min gotibû ku bi hezaran jin û mêr piştî pêkanîna qurbanê çawa li singa xwe didin. Lê dîn destûrê nade ez navê xwedayê ku li ser wî digrîn û li xwe dixin bêjim. Karyayîyên li welatê Misrê nîştecîh bûne, hîn bêhtir tiştên ecêb dikin. Ew rûyên xwe bi kêran perçe perçe dikin û dema mirov li vî awayî wan binêre, mirov dizane ew biyanî ne û ne Misrî ne.

[62] Dema ku Misrî li bajarê Saîsê ji bo jêkirina qurbanê berhev dibin, wê şevê li dora xanîyên xwe gelek çirayan pê dixin. Ew çira di şiklê fincanan de ne, tije rûn û xwê ne, fitîla di hundirê wê de pêketîye. Vana tevahîya şevê pêxistî dihêlin û navê Cejna Çirayan didin vê cejnê. Ew girseya xelkê Misrê yên naçin wê merasimê, ew jî çirayan vêdixin. Bi vî awayî ne tenê bajarê Saîsê, seranserê erdê Misrê ronî dibe. Ji bo çi wiha ronahî tê vêxistin û ew şev bi merasimeke taybetî tê pîroz kirin? Çîrokeke dînî ya vê îzah dike heye.

[63] Li bajarê Helîopolîsê û Bûtoyê, tenê ji bo qurban jêkin diçin. Li bajarê Papremîsê pêşî, wekî her cihî, qurban tê jêkirin û cejna ayînî tê kirin. Lê

83 Wek du perçe cêwik di kefa dest de tê bikaranîn.

wextê roj çû ava, çend kahîn baz didin û diçin ba perestgehê, yên din topiz di destê wan de derîyê perestgehê digrin; yên hejmara wan li dora hezarî jî di nezirgehekê de ne; di destê wan de jî topiz hene û ew bi hişkî berhev dibin û li hemberî kahînan radiwestin. Peyker, di mihrabeke biçûk ya ji dar çêkirî ya zêravkirî de ye; ew rojek berîya wê ji avahîyeke pîroz hilgirtine û anîne. Kahînên ji bo xizmeta wê bikin hatine danîn, girê didin erebeke çar tekel, mihraba biçûk, bi peykerê tê de li erebeyê bar dikin; lê yên derî girtine naxwazên wan berdin hindur. Wî wextî yên din yên duayên xwe kirine, yên diçin hawara xuda, bi daran dimeşin ser parêzerên perestgehê yên xwe diparêzin. Topiz bi topiz şerekî yeman çêdibe; serî tên şikandin, heta piranîya yên birîndar dibin, ez texmîn dikim dimrin; lê Misrîyan ji min re gotibûn ku kesek namre. Ev cejn, li gor xwecihên li wir ji bo vê yekê tê pîrozkirin: Di vê perestgehê de dêya Ares rûdinişt; Ares ku ji wê dûr mezin bûbû, dema tê salên xwe yên mêranîyê dixwaze biçe dêya xwe bibîne. Kahînên vê Îlaheyê yên pêşî de qet Ares nedîtibûn, dema ku dibînin ew dikeve hindur, xwe dişidînin û dixwazin wî bavêjin jiderve. Ew jî diçe ji bajarekî din hêzên pê re bibin alîkar tîne, li kahînan dixe, wan paşve diavêje û diçe dêya xwe dibîne. Belê, dibêjin ew lêxistina di cejna Ares de ji vê tê.

[**64**] Qedexeya li cihekî pîroz bi jinan re raketin yan jî ji himbêza jinekê derkeve û xwe neşo bikeve cihekî pîroz jî ji Misrê hatîye. Ji derveyî Misrî û Yûnanîyan hema bêje herkes, li cihên pîroz jî hez ji jinan dikin û ji nav milê jinekê derkeve, bê xwe bişo dikare bikeve perestgehekê. Ji ber ku li insanan wekî heyvanan dinêrin û heywanên hem li erdê ne û hem li asmanan difirin, ew dibînin hem li perestgehan û hem jî li ew cihên ji bo xudayan hatine veqetandin, baz didin ser hev; ew netîceya, heke tiştekî ne xweşa xudayan hatibûya, heywanan jî nedikirin, jê derdixin.

MISRÎ Û AJEL

[**65**] Belê ew pişta xwe bi van şiroveyan girê didin, lê li gor min ew ne tiştên xweş in. Li rexê hinek ûrf û adetên ayînî, Misrî li ser van tiştên ez ê behs bikim jî gelek hûrbîn in. Her çend cîranê Lîbyayê ne, lê li Misrê gelek heywan tune; lê dîn, perdeke pîrozîyê dikêşe ser yên li Misrê dijîn; qismek ji wan bi insanan re dijîn, yên din ne kedî ne. Rêzlêgirtina heywanan û pîrozragirtina

wan ji bo çiye? Îzaha van ketina nav surên dînî ye, ez jî bi hûrgilî dixwazim ji îzaha van nehênîyan dûr bikevim. Heke ez dest didim hinek nokteyan, ez van tenê ji bo îzahên mecbûrî dikim. Belê, va hinek hişyarî ji bo heywanan: Hemî cins heywan, yên li wan dinerin hene, êmên wan ew didin; ew, ji nav jin û mêrên Misrî hatine hilbijartin; ev kar piştî bav ji kur re dimîne. Yên li bajaran dijîn, mecbûr in bi vî awayî bi heywanan re miamele bikin: Dema ji xudayê ku heywan jê re hatîye nezirkirin dua bikin, porê zarokên xwe rût dikin, yan hemî, yan nîvê wê yan jî ji sisiyan yekê wî porî li mêzênê dikin û li hember wê zîv dipîvin, ew çiqas girtibe ewqas zîv didin kesê li wî heywanî dinere, ew jî bi wî pereyî masî distîne, perçe perçe dibire û dide heywanê xwe ji bo bixwe. Şertên ji bo xwedîkirina wan wiha ye. Heke kesek bi zanetî van heywanan bikuje, cezayê mirinê didinê; bêyî riza û xwesteka xwe kuştibe, cezayekî ku kahîn tespît dikin dixwe. Lê heke yê mirîye seqir û baz be, heke bi nezanî jî kiribe, yê wan dikuje tên kuştin.

[66] Bêguman heywanên kedîkirî gelek in. Lê heke pisîk qurbanê hinek qezayan nebûna, ew dê hin zêdetir bûna. Dema ku pisîka mê têjik anîn, xwe nêzîkî pisîkê nêr nake; pisîkê nêr dixwazin xwe nêzîkî ya mê bikin, lê beyhûde ye, wî wextî hîleyekê li pisîka mê dike, têşkan yan bi hîle yan jî bi zorê direvînin, dikujin lê naxwin. Ya mê ku bê têjik dimîne, dixwaze têjik çêke, ji bo vê jî xwe nêzîkî yê nêr dike, ji ber ku di van cins heywanan de hisa dayêkîyê heye. Yeka din: Wextê li derekê şewat derdikeve, pisîk dikevin nav harîyeke pîroz. Misrî, ji bo ku wan biparêzin, derdikevin pêş û xelekekê li dora pisîkê çêdikin, hetta vemirandina şewatê jî ji bîr dikin, pisîk di navbera wan de baz didin û xwe davêjin nav rivîna. Misrî vê wendabûneke mezin hesêb dikin. Heke pisîka malekê bi awayekî xwezayî bimre, hemî kesên li wê malê rûdinin birûyên xwe jê dikin, heke ya mirî kuçik be, bi serî re hemî gewde kur dikin û rût dikin.

[67] Dema ku pisîk dimre, dibin Bûbastîsê û piştî tahnît dikin[84] li goristaneke taybetî tê veşartin; laşê kuçikan dikin tabutekê pîroz û li bajarê ku dimrin vedişêrin; heman pratîk di derbarê ichneumonan de jî eynî ye. Mişkên sehrayî û bazan dibin Bûtoyê, hacî leylek dibin Hermapolîsê. Hirç gelek tune; gur ne gelekî ji rovîyan mezintirin, van herduyan jî li cihê laş lê diveşêrin.

84 Şiklek mûmyakirinê ye.

[**68**] Belê, niha jî tîmsah. Di mehên herî xerab yên zivistanê de tiştekî naxwe; çar lingên wan hene, lê hem di avên sekinî de û hem jî di bejayê de dijî. Hêkên xwe datîne bejahîyê û li wir jî kurk dikeve. Hema bêje hemî roja xwe li bejahîyê û şevên xwe di rûbarê de derbas dike; ji ber ku ava rûbarê ji hewayê stêrkan û hejebayan gerimtir e. Di nav heywanên em dizanin de, yê evqas biçûk tê dinyayê û piştre ewqas mezin dibe, tenê ev heye. Hêka wê ji ya qazan ne mizintir e û dema ku ji hêkê derdikeve jî ewqas e; lê dema ku mezin dibe bejna wê digihe 17 pîxîsan û heta derbas jî dibe. Çavên wan dişibe yê berazan; diranên wan li gor bejna wan e, dirêj û bigoşeyî ye. Di nav heywanan yê zimanê wî tune tenê ew e û çeneya wî ya xwarê nalive, ji ber wê jî tek e, çeneya xwe ya jorê dilivîne. Pençeyên wî yên xurt hene, çermê wî pul pul e û ev pulên han li pişta wî qalikên kun nabin pek tînin. Çavên wî di nav avê de nabîne, lê ji derve, dîtineke wî ya bi hêz û xurt heye. Ji bo ku di nav avê de dijî devê wî tijî zûrî ne. Heywanên çarpê û teyr nikarin nêzîk bibin, tenê navbera wî teyrê kolîbirî û mêşan xweş e, ji ber ku bi kêrî wî tê; wextê ji avê derkeve bejahîyê devê xwe vedike, kolîbirî dikeve nav devan û zûrîyan dadibeli'îne; ji bo sivik dibe kêfxweş e û zerar nagehîne teyrê kolîbirîyê.

[**69**] Hinek Misrî tîmsahê pîroz radigirin, qismê din wan dijmin dihesibînin; yên li Thebaîyê û dora Gola Moîrîsê rûdinin bi temamî wan pîroz qebûl dikin. Lê di van herdu herêman de xelk, tîmsahên perwerdekirî û kedîkirî xwedî dikin; guharên ji mûrî û zêran çêkirî dikin guhê wan, bazind dikin destê wan; bi xwarinên qanûnan dane xuyakirin xwedî dikin; di temamê temenê xwe de xweş tê ragirtin, wextê dimre mûmya dikin û datînin tabûta pîroz de. Li Elephantîneyê pîrozbûnê deyne dera han, dema hewce dike jê dikin û dixwin. Navê van heywanan ne krokodil e, khamsae ye; Yûnanî jê re krokodil dibêjin, ji ber ku di navbera bi vê û ew krokodîyên biçûk û tutemarên li welatê wan yên di nav çîtan de dijîn wekhevîyekê dibînin.

[**70**] Nêçîra tîmsahan bi gelek awayan tê kirin; ez ê behsa tenê ya herî bala min dikşîne bikim: Wek tahmikê/êmê goştê beraz yê qismê piştê bi serê çengelekî vedikin; berdidin heta here nîvê rûbarê; li milê din li qiraxê li berazeke şîrdayî dixin. Timsahê dengê wê seh dike ber bi wê ve tê; di rê de rastî pişta berazê tê û wê dadibeli'îne; nêçîrvan dikêşe; piştî heywan anîn

bejahîyê, karê ewil ew e ku çavên wî bi herîya sor bigrin, piştî ku ev jî çêbû, êdî ne zehmet e mirov wî bîne rê, yan na rewş dikare xerab bikeve.

[71] Hîppopotamî, yanî hespê avê li herêma Papremîsê pîroz in, lê li cihên din ên Misrê ne pîroz in. Lêbinêrin, ev heywanekî çawa ye: Çar lingên wî hene, lingên wî çetel in, wekî lingê ga ne, pozpelixî ye, bijîyên wî wekî yê ga ne; diranên wî bigoşeyî ye, duvê wî wekî yê hespê ye û wekî wî dihîre, bi qasî gayekî mezin e; çermê wî ewqas stûr e ku, hişk dikin û dikin mertal.

[72] Di Nîlê de kutikên(seyên) avê jî dijîn û ew pîroz tên qebûlkirin; ji masîyan yên pulçerm û marên avê yên di Nîlê de dijîn û ji teyran jî ordeka serkesk pîroz in.

[73] Yek jî, teyrekî jê re Phoînîx tê gotin heye. Min bi xwe ev teyr nedît, lê min tenê wêneya wê dît; jixwe her wext nayê dîtin. -Helîpolîsî dibêjin 500 salê carekê, lê cardin dibêjin, dema bavê wî bimre derdikeve holê. Wêneya wî fikrên rast didin, bejna wî û şiklê wî wiha ye: Hinek perên baskê wî zerê zêrîn, qismên din sor in; belavbûna baskan û bilindahîya wî bi qasî yê eloyê ye. Gelek karên hostetî jêre divê li vî teyrî tînin ku, qet li ba min ne cihê bawerîyê ye. Ew bavê xwe dike nav qalibekî ji "myrrha"yê(murê)[85] û dibe Erebîstanê û di perestgeha rojê de vedişêre. Ev kar wiha dibe: Pêşî ji myrrhayê di bîçima hêkê de ku bikaribe rahêjê tiştek çêdike; piştre carekê diceribîne ku gelo dikare hilde û piştî vê cerabeyê ji bo bavê xwe têkê dest pê dike nava wê diqewêre; piştî bavê xwe tê de bi cih kir, ser wê cardin bi myrrhayê digre, bi vî awayî giranahîya ew qismê qewartî û ya bavê wî dibe qasî hev; piştî devê wê girt, ji erdê Misrê digre û dibe perestgeha rojê. Yên ji bo vî teyrî tên gotin jî ev in.

[74] Li dora Thebaîyê marên pîroz hene, qet êrîşî insanan nakin. Bejna wan biçûk e û li ser serê wan du sturehên wan hene; dema ku dimrin di perestgeha Zeûs de tên veşartin; ji ber ku tê gotin nezrî vê perestgehê hatine kirin.

85 Mur: Cureyek reçine ye ku axilbe li Rojhilata Nêzik di çêkirina dermanan de û yê parfuman de tê bikaranîn.

[75] Li Erebîstanê cihek heye. Dikeve nêzîkî Bûtoyê, ji bo ku ez zanyarî li ser marên bi bask berhev bikim ez çûm wir. Dema ku ez çûm wir, min hestî û diranên maran dîtin, ewqas zêde bûn nedihatin hejmartin; ji hestîyê maran gir çêkiribûn, hinek gelek mezin wekî koman bûn, yên din hinek din biçûk, heta ji yên navîn jî biçûktir; wekî wan gelek kom hebûn. Ev cihê diranên maran kom kiribûn, wekî gewrîyekê bû, piştî mirov ji bihureke çiyayê derbas dibe vedibe gelîyekî mezin; ev gelî cîranê sînorê gelîyê Misrê ye. Li gor riwayetekê, dema ku bihar tê, marên bi bask ji Erebîstanê difirin tên Misrê, li milê din li vê gewrîyê leylekên ku nahêlin ew derbasî Misrê bibin hene, ew li hêvîya wan in û dema ku tên, wan digrin û dikujin. Belê ji ber vê li Erebîstanê tê gotin, gelek rêz û hurmeta Misrîyan ji wan leylekan re heye û Misrî jî vê îtîraf dikin.

[76] Leylek/îbîs teyrekî wiha ye: Gelekî reş e; pençeyê wî dişibe yê qulingan; nikilê wî gelekî xwar e; mezinahîya wî bi qasî ya mirîşka avê ye; ev a ez behs dikim, ew leylekên reş yên bi maran re şer dikin. Yên zêdetir mirov li cihê insan dijîn rastî wan tê (ji ber ku du cûre leylek hene) serî û qirika wan bêpirç in; tenê serî, gewrî, serê baskan û serê duvê wan rengekî reş yê xweşik e; pençe û nikilê wan ne wekî yên din in. Em bên ser maran, ev dişibin marên avê. Em gotinên li ser van heywanên pîroz jî li vir biqedînin.

[77] Cardin em bên ser Misrîyan, di nav temamê insanên Misrê de, yên li herêmên çandinî lê heye dijîn, yên herî zêde girêdayî bîranînên xwe ne û ew di nav insanên min dîtin û nas kirin de, di vî warî de ji hemûyan zanetir in. Jiyana wan bi vî awayî ye: Mehê carekê sê rojan li ser hev hindurê xwe paqij dikin; ji jor û jêr ve dermanê valakirinê û çareyan bikar tînin, ji ber ku li gor wan temamê nexweşîyan ji xwarin û vexwarinan çêdibin. Bi rastî insanên di her warî de yên herî bi sihet, piştî Lîbyayîyan Misrî ne; li gor min ew avûhewaya Misrê ku guherînên demsalê zêde tune bandorê dike; ji ber ku di herî serî de yê insanan nexweş dike, qutbûna wî ji tiştên hînbûyî tê û ev jî her wextî tiştekî rast e ku, herî zêde ji guherîna demsalan pêk tê. Nanê ji speltayê/tarîkanê tê çêkirin dixwin, ji vî nanî re "kyllestes" dibêjin. Şeraba ceh vedixwin, ji ber ku li erdê wan rez tune. Hinek masîyan xav yan jî li ber rojê hişk dikin û dixwin; hinek jî dikin nav xwê/salamurayê û piştre dixwin. Di nav teyran de yên xav û xwêkirî tên xwarin; kûresor, werdek û yên biçûktir in; teyrên din û masîyên ne pîroz, dibirêjin yan dipêjin û dixwin.

[78] Di şahîyan de yan qet nebe şahîyên di malên dewlemendan de tên dayîn, dema ku ji ser xwarinê radibin, kesek peykereke ji text ku wek mirîyekî di nav tabutê de nîşan dike, digre û li her derê digerîne; ew, ewqas rind hatîye neqişkirin û rengkirin ku, insan dikare wê wek mirîyekî heqîqî bibîne; bejna wê pîxsîyek(anîşkek) yan du pîxsîye, ew li pêşîya her mêvanî disekine dide nîşan û dibêje: "Li vê darê baş binêre û baş bixwe û vexwe; ji ber ku wextê tu bimrî dê tu jî wiha bî." Belê, ew di dawîya şahîyê de wiha dikin.

[79] Ûrf û adetên wan yên millî hene, yên nû wernagirin; di nav ûrf û adetên wan yên herî sipehî de, yek jî strana kilamekê ye; kilama Lînosê, li Fenîkeyê, Qibrisê û li cihên din jî distirên, lê li gor welatan navên cihê lê tê kirin; herkes hemfikir e ku hewayê bi tesîr û giran jî yê Yûnanî jê re Lînos dibêjin, eynî hewa ye. Li Misrê tiştekî ku ez ecêbmayî hiştim jî ev bû, min ji xwe bi xwe dipirsî, gelo qesîdeya Lînosê ya ji kevin ve tê stran ji ku anîne. Di zimanê Misrî de Lînos, bi navê Maneros tê stran. Li gor Misrîyan ji min re gotin, ev, kurê hikumdarê Misrê yê yekem e û mirina wî ya bêwext, wisan kirîye ku Misrî wî bi vê hewayê şînê bilind bikin; ew dibêjin ev hewa û didomînin, sirûda wan ya millî ye û her tim wiha û tek maye.

[80] Belê va noqteyek mişterek ya di navbera Misrî û Yûnanîyan de, lê ne hemî Yûnanîyan de, tenê bi Lakedaîmonîyan re: Dema ku xort li kal û pîran rast tên xwe didin alîyekî û rê didin wan; dema ku kalek ket hindur radibin ser pêyan. Di miqabilî vê de, ûrf û adetek ku qet di nav civata Yûnanî de tune: Di cihê gotina rojbaş de, di kolanan de xwe ditewînin û destê xwe heta ber çokê xwe tînên xwarê.

[81] Îşligên bi rêşî yên ji ketenê hatî çêkirin û heta ser çoka wan tê li xwe dikin, ji van re "kalasîrîs" dibêjin, çîteyeke ji hirîya spî davêjin ser milê xwe li ser îşligê; lê di merasimên ayînî de nikarin hirî li xwe bikin û nikarin hirî bikin kefen jî; qanûnên wan yên ayînî ev qedexe kirine; di ayînên Orphîk û Bakhîkê de jî eynî qedexe hene ku van jî çavkanîyên xwe ji Misrê û Pythagorasîyan wergirtine. Di van dînan de mafê mirov tune di nav hirîyê de bê veşartin. Di vî warî de çîrokeke pîroz heye û belav e.

[82] Çend tiştên din ên Misrîyan dîtine: Çi meh û roj ji kîjan xudayî re hatine nezirkirin, bi nêrîna li roja hatina dinyê ya insanekî, zanîna wê çi bê serî, wê çawa bimre û texmîna wê bibe mirovekî çawa, wan dîtîye. Li Yûnanê kesên bi helbestê mijûl dibin ji nêrînên wir sûd wergirtine. Ji bo îzaha mucîzeyan, ji temamê insanên din zêdetir xwedîyê tecrûbeyê ne; ji ber ku dema mucîzeyek diqewime wê dişopînin, netîceya wê li rexekî dinivîsin û dema ku mucîzeke wekî wê qewimî, li hêvîya eynî netîceyê dimînin.

[83] Em bên ser mijara kehanetê, li gor wan ev pîşe emanetî tu fanîyî nehatîye kirin; tenê hinek xuda xwedîyên wê danê ne; li wir kahînekî Herkules, yekî Apollon, yekî Athene/Mînerva, yekî Artemîs/Dîana, yekî Ares/Mars û yekî Zeûs/Jupîter û li Bûtoyê -ya ji hemîyan bilindtir tên girtinkahînekî Letoyê heye. Jixwe kahîntî cûre cûre ye, li her cihî bi eynî awayî nayê çêkirin.

[84] Em bên hekîmtîyê, li ba wan ev kar bi vî awayî hatîye sazkirin: Hekîmek tenê li nexweşîyekê dinêre, ji yekê zêdetir nanêre. Ji ber vê hejmara hekîman zêde ye; çav, ser, nexweşîyên zik û nexweşîyên hindur, hekîmên cude cuda lê dinêrin.

VEŞARTINA MIRÎYAN Û MÛMYAKIRIN

[85] Niha jî veşartina mirîyan û hêsir barandin. Dema ku li malekê kesekî bi qedir mir, temamê jinên malê herî di ser û çavên xwe didin; piştre mirî di mal de dihêlin û derdikevin kolanan, dawên kincên xwe di nevqa xwe de diçikilînin, pêsêrên xwe vedikin û bi lixwexistinê kolan bi kolan digerin; hemî xwedîyên wan jî bi wan re diçin. Li milê din mêr jî bi herîyê molekirî digerin û li xwe dixin. Piştî vê merasimê mirî ji bo mûmyakirinê dibin cem yê vî karî dike.

[86] Pisporên nehênîyên mûmyayê dizanin û yên bi vî karî wezîfedar hene. Dema ku jê re mirîyek tê, modelên ji textên boyaxkirî û gelek baş hatî teqlîdkirin nîşanî xwedîyê cenaze dike. Ji miştirî re dibêje; di nav van de yên herî baş ev e, dişibe wî kesî ku bi min guneheke mezin e ez navê wî bi lêv bikim; piştî wê modeleke din nîşan dide, ew ne bi qasî ya yekem baş e û hê erzan-

tir e, piştre ya sisiyan û ya herî erzan. Piştî van îzahetan ji xwedîyê mirî re dibêje, hûn kîjan modelê dixwazin. Piştî miştirî di fiyet de li hev kir diçe, mûmyaker, bêyî ku ji mal derkeve dest bi kar dike. Ew mûmyakirina herî baş ev e: Pêşî bi çengeleke hesin ji pozê wî mejîyê wî tê derxistin; lê nikare hemî derxin, yê mayî bi derman dihelînin. Piştî wê, bi kevirekî Ethîopîayî sênga mirî bi dirêjahî dibire û çi tiştê tê de hene vala dike; piştî hindurê wî bi vî awayî vala kir di şeraba xurmeyê re derbas dike û bêhnan lê direşîne; zikê wî tijî giyayê hişk û bêhnan dike û didrû. Piştre dike nav sodyum karbonatê û xwê dike û 70 rojî tê de dihêle. Piştî 70 rojan derdixin û dişon û ji serî heta binî, bi şerîdên tenik yên di zemqa ku Misrî ji bo zeliqandinê bikar tînin dakirî, dipêçin û teslîmî xwedîyê mirî dikin. Ew jî wê mûmyayê dikin nav tabuteke bi qasî bejna mirî yê hatîye çêkirin. Piştî kirin nav vê tabutê dibin odeya kesê mirî û li ser pêyan pala wî didin dîwar.

[87] Belê mûmyakirina herî buha ev e. Heger mirov bixwazin ji xerca zêde dûr bikevin û pêvajoya duyemîn hilbijêrin, rêbaza jêrîn tê şopandin: Mûmyaker qiyaseke zêde ronê dara sedirê ji kunên laşê mirîyê berdide nav zikê wî û pêwist nake zikê wî bê qelişandin û paqijkirin. 70 roj di nav xwê de dimîne û roja dawîyê ew ronê darê sedirê jê tê kêşan. Ev dohnê han ewqas bi hêz e, bi xwe re çi di hindurê mirî de hebe, wekî avê derdikeve derve. Xwê goşt dixwe û mirî tenê çerm û hestî dimîne. Piştî vê, pêwistî bi kirina tiştekî din nake û mirî teslîmî xwedîyê wî dikin.

[88] Awayê sêyem jî ji bo xelkê feqîr û hejar e. Bi ava ceh hindurê mirî dişon û 70 roj di nav sodyum nitratê de tê danîn û piştre teslîmî kes û nasên wî tê kirin.

[89] Dema jina kesekî bi nav û deng, jinên sipehî û naskirî bimre, bi lez nabin kargeha mûmyakirinê. Piştî sê-çar rojan dibin. Sebebê vê xweparastinê ew e ku îmkana têkilîya cinsî ya hostayan pê re nehêlin. Tê neqilkirin ku yek ji wan bi jineke nû mirîye re raketîye û ew kesê pê re xebitîye ew daye dest.

[90] Heke Misrîyek yan kesekî biyanî di rûbarê de bixeniqe yan rastî êrîşa timsahekî bê, mirî nêzîkî kîjan bajarî be, wezîfeya wî bajarî ye mirî bi awayekî herî baş mûmya bike û têke tabûteke pîroz; tu kes, yên nêzîkî wî û

dostên wî jî nikarin dest lê bidin, merasima veşartina wî bi destê kahînên Nîlê bi xwe tê kirin, wekî ne insan be, ruhek be.

[91] Misrî, yên Yûnanîyan yan jî bi yek gotinê, ji derveyî yên xwe ûrf û adetên tu miletî qebûl nakin. Ji ber vê gelekî girtî ne. Tenê di herêma Thebaîyê de, bajarê mezin yê Khemmîsê yê nêzîkî Neapolîsê, ne di nav vê de ye; li vî bajarî perestgeheke li ser navê Perseûs yê kurê Danaeyê heye; ev perestgeh çargoşe ye, bi palmîyan hatîye rapêçan. Riya ketina hundur bi keviran hatîye raxistin; gelek mezin e; du peykerên ji kevir hatîye birîn tê de heye. Dora perestgehê bi dîwar pêçane, di nav vê de peykereke Perseûs heye. Ev Khemmisî, dibêjin Perseûs xwe nîşanê wan daye, hinek caran li herêmên cihê yên welat tê dîtin. Rûniştîyên navçeyê her wiha dibêjin ku car û carnan pêlavê wî xudayî dibînin. Pêlav du pîxîs mezin e û dema tê dîtin, xêr û bereket li welatê Misrê tê bexişandin. Bi vî awayî qise dikin û ji Perseûsê re li gor isûla Yûnanîyan merasim çêdikin: ew hemî lîstikên jîmnastîkê yên em dizanin nîşan dikin; ji bo xelatê kerîyan, hirî û çermên lixwekirinê datînin. Dema ku min ji wan pirsî "ji bo çi Perseûs tenê xwe nîşanî we dike û nîşanî kesekî din nake û hûn wî bi eksê Misrîyên din çima bi lîstikên jimnastîkê pîroz dikin?", ji min re gotin ku, "Perseûs bi eslê xwe ji bajarê wan e û Danaos û Lynkeûs jî berî ku bi gemîyê ber bi Yûnanîstanê ve bi rê bikevin, ji Khemmîs bûn; Perseûs jî ji wê malbatê tê". Gotinên xwe didomandin û digotin, Perseûs bi sebebekî ku Yûnanî jî piştrast dikin, yanî dema ku ji bo serê Gorgo ji Lîbyayê paşde bibe hatîye Misrê, çûye ba wan û hemî kesên xwedîyê xwe nas kirine. Jixwe navê Khemmîsîyan ji dayîka xwe hîn bûye, bi wî awayî hatîye Misrê û yê xwestîye leyistik li ser navê wî bên lidarxistin jî, ew bi xwe ye.

LOTOS Û PAPÎRÛS

[92] Hemî ev ûrf û adetên ez behs dikim, yên Misrîyên li başûrê çiravan dijîn; ûrf û adetên yên li herêmên çiravan dijîn jî wekî Misrîyên din in. Ji derveyî vê li binê banê her yekî, wek Yûnanan tenê jinek dijî; ji bo erzan bijîn ji wan çavkanîyên aîdê wan in sûd werdigirin. Piştî rûbar herikî û deşt wekî deryayê lêhat, li ser rûyê avê, gelek zambaqên ku Misrî jê re lotos dibêjin hêşîn dibin. Ew van berhev dikin, li ber tavê hişk dikin, navka lotosê

ku dişibe haşhaşê dikutin, li ser agir dipêjin û nan jê çêdikin. Koka lotosê jî tê xwarin; tahmeke wê ya şêrîn heye; qasî sêvê û gilover e. Hinek zambaqên din jî hene, ew jî wekî yên din di avê de hêşîn dibe û dişibin gulan; fêkîyê wê ji eynî kokê û li rexê eynî nebatê di nav kumikeke din de hêşîn dibe, eynî dişibe şana hingivînê ya zirqîçk çêdikin. Di hindur de bi qasî mezinahîya dendikê zeytûnê gelek dendik hene, ev hem taze û hem jî hişkkirî tên xwarin. Em bên ser papirûsê, ev nebateke demsalî ye, piştî di nava kevîyên/komên avê de berhev bûn destikê wan jê dikin, yên ji destîyê jêr û cihê qasî pîxîsekê mayî tê xwarin yan firotin, destikê wê di karên din de jî tê bikaranîn. Ya herî baş ew e ku papîrus di agirê gûrr de bê biraştin û xwarin. Di nav wan de yên tenê masî dixwin û dijîn jî hene. Ew masî distînin, hindurê wê paqij dikin, li ber tavê hişk dikin û dixwin.

[93] Di rûbaran de masîyên ku wekî revde dijîn nayê dîtin; yên wiha zêdetir di gerên avadan de tên dîtin û bi vî awayî dijîn: Dema ku wextê bergirtina yên mê tê, wekî revde/komikî ber bi deryayê ve koç dikin; yên nêr li pêşîyê diçin û tov direşînin; yên mê ku ji paşde tên van tovan dadibelînin û piştre dizên. Piştî gihiştin deryayê paşve vedigerin û cardin tên berdewamîyên rûbarê û wekî berê dijîn. Lê vê carê yên li pêşîyê diçin hinekên din in; niha yên rêberîyê dikin yên mê ne; ev li pêşîyê berhev dibin û niha berê yên nêr çi kirine eynî tiştî dikin; hêkên wan bi qasî libên garisê ye û wekî pakêtan dirijînin; masîyên nêr yên li pey wan tên ew dadibelînin; ev libikên han qasî birrên masîyan zêde ne. Ji nav wan libên ji alîyê yên nêr ve nehatibin dabelandin jê masî derdikevin û mezin dibin. Di dema koçberîya ber bi deryayê de, ew masîyên tên girtin, serê wan ji milê çepê kumik in; dema ku ber bi rûbarê ve tên milê rastê serê wan bi kumik e. Sebebê vê ev e: Di koça ber bi deryayê ve, xwe ber bi milê çepê yê reşahîyê ve dixwişiqînin û tên, dema ku tên nav rûbarê jî cardin di eynî qiraxan re derdikevin û ji bo nekevin ber herikînê û ji rêya xwe dernekevin, bi qasî ku bi qiraxan ve nexijiqin dixebitin nêzîkî qiraxan derbas dibin. Dema ku Nîl pangor da û rabû, pêşî av cihê nizim û avzêman dide ber xwe; dema ku vir di bin avê de man, di cih de tije masîyên hûrik dibin. Ev ji ku derdikevin? Ez bawerim bi vî awayî ye: Salek berê dema ku Nîl paşve kêşa, masî hêkên xwe yên dawîyê dikin nav avzêman û piştre diçin û dema ku cardin demsala wê hat û derûdor di bin avê de ma, ew masîyên hûrik yên em dibêjin, zû ji hêkan derdikevin.

[94] Belê yên ji bo van masîyan ez bikaribim bêjim ev in. Misrîyên li herêmên avzêm dijîn, rûnekî ji dendikên ricinê derdixin bikar tînin, ji vê rûnî re "kîkî" dibêjin û gîhayê ku wê didin li qiraxê rûbaran û cihê av digrin diçînin, digehînin. Halbukî li Yûnanê yên bejîyê wê bi xwe hêşîn dibin, lê li Misrê diçînin, digehin û berên bi bereket hildidin, lê bêhna wê berbat e. Piştî hat berhevkirin, yên bixwazin diperçiqînin û ronê wê derdixin, hinek dikelînin û ava derdikeve berhev dikin. Aveke gelek tîr e û wekî zeytê di karê ronahîyê de tê bikaranîn, lê bêhna wê xerab e.

[95] Gelek pêşî hene, binêrin ji bo xwe jê biparêzên çi dikin: Yên li jorê evzêman/çiravan dimînin derdikevin ser quleyan û radikevin. Ji ber ku ba, nahêle pêşî ewqas li bilindahîyan bifire. Yên li avzêman rûdinin, di cihê quleyan de çareyek din dîtine; li mala herkesî torek heye, bi roj pê masî digrin, bi şev vê li ser nivînê ku radikevin vedidin û di bin de radikevin. Tu tiştekî din li ser nivînê raxî cardin pêşî mirov dixwe, lê dema ku tor be, nikare xwe nêzîk bike.

[96] Misrî qayixên veguhestinê ji darê akasyaya Misrê çêdikin û ew dar dişibe darkutika navçeya Kyreneyê, ji şîrê wê zemqê derdixin. Dara Akasya Misrê bi qasî du zendan dirêj dibirin, wekî kerpîçan bi ser hev vedikin û keştîyan bi van çêdikin. Serê wan daran bi martakên xwarê ve bi hev vedikin. Cotek karîte bi awayê xaçê di nav keştîyan de di'edilînin û perçeyên birî bi wan karîteyan ve girê dikin. Wextê textê binî yê keştîyê amade bû, darên tewandî li qiraxên qayixê wekî çeper girê didin û ev awa dîwar pêwistî bi xwarkirinê nîn e, tenê bi pelên papîrusê bi milê jorê ve girê didin. Tenê dumeneke wan a ji nav paresuyan derbas dibe heye. Dîrek ji akasyayê û cawê bayê ji papîrusê ye. Dema bayê gûrr tunebe ev qayixên han dernakevin seferê û li rexan wekî îhtîyat dimînin. Wextê ber bi herikînê ve biçe bi vî awayî dikin: Babirkên wan yên bi qamîş û saz hinek darên li hevdû alandî û kevirekî wan yê kun yê bi qasî du talant bikêşe heye. Babirk bi serê keştîyê ve tê girêdan û ber bi herikînê ve tê berdan. Kevir bi benekê li paşîya keştîve ve girêdayî ye. Babirk ber bi herikînê dikeve û bi surat pêş ve diçe û "Barîs"ê jî (navê vê keştîyê wiha ye) li pey xwe radikêşe. Ew kevirê li pişt girêdayî binî pêşkîn dike û pêşîya keştîyê digre ku li ber herikînê nekeve û ji rêya xwe dernekeve. Ji van keştîyan gelek in û hinek jê dikarin barên giranahîya wan bi hezar talantan bikêşin.

[97] Dema ku ava Rûbarê Nîlê radibe û lehî çêdike, tenê bajar derve dimînin û ew dibin mîna giravên nav Deryaya Egeanê/Egeyê. Seranserê erdê Misrê wekî deryayê lê tê û avahî di nav avê de wenda dibin. Çi wextê ev bûyer diqewime, xelk seferê li ser Rûbarê Nîlê nakin, rêyên bejahîyê tercîh dikin. Wekî nimûne çi kesê bixwaze ber bi bajarê Neûkratîsê yê li navçeya Memphîsê ve biçe, di nêzîkî pîramîdan re derbas dibe. Heke ew rê nebûya, mirov neçar dibû ji serê goşeya Deltayê û di herêma Kerkasorê re derbas bibûya. Heke kesek bixwaze bi rêya deryayê ji Kanobosê biçe Naûkratîsê, digehe bajarê Anthyllayê û bajarê naskirî yê Arkhandrosê.

[98] Bajarê Anthyllayê yek ji bajarê sereke ye; bi taybetî xercê temînkirina pêlavên jina paşê spartine rûniştîyên vî bajêrî û devereke milkê jina paşê ye. Piştî Misir ketîye bin desthilata Persan, ev bûye adet. Bajarekî din jî bi bawerîya min navê xwe ji zavayê Danaos yanî ji lawê Akhaîos, Arkhandrosê Phtîosî wergirtîye û ji bajêr re Arkhandros tê gotin. Îhtîmal e kesekî din jî bi wî navî hebûbe. Her çi hal be ne navekî Misrî ye.

HIKUMDARÊN MISRÊ Û BERHEMÊN HIŞTINE – MENES

[99] Min heta niha lêkolînên xwe, nirxandinên xwe û yên min bi çavê xwe dîtine gotin. Niha jî ez ê yên Misrîyan ji min re gotine wekî wan gotine neqil bikim; bêguman ez ê çavdêrîyên xwe yên şexsî jî têkim ser. -Li gor kahînan ji min re gotin, hikumdarê Misrê yê yekem Menes van yekan kirine: Pêşî benda ku Memphîsê biparêze çêkirîye. Berê rûbar ji alîyê Lîbyayê ber bi îstîqameta çiyayê qûmê(xîzê) herikîye, Menes, bendeke kêm-zêde sed stad jorî Memphîsê û li ser şaxê başûr yê rûbarê da hûnandin, berdewamîya kevin ziwa kirîye û ji bo rûbarê di navbera herdu çiyayan de derbas bike kanaleke nû daye kolan. Îro jî Persî, ji bo venegere ser berdewamîya xwe yê kevin gelek giringî didin vê enîşkê û hersal bendê tamîr dikin; ji ber ku heke rûbar bendê hilweşîne û biherike vî milî, dê Memphîs têkeve bin tehlîkeya ku bi carekê re di bin avê de bimîne. Belê ev Menesê ku hikumdarê yekem yê Misrê bû, rûbar raguheste milekî din û piştî ev erd qezenc kirin, li vir bajarek ava kirîye; ew, ev bajarê Memphîsê yê niha ye. Memphîs niha jî di beşa Misrê ya teng de ye. Di pey vê de, li derveyî bajêr, li deverên bakur

û rojava (ji ber ku Nîl rojhilatê digre) goleke bi rûbarê tê xwedîkirin daye kolandin, piştre di nav bajêr de perestgeheke Hephaîstos a mezin û hêjayî rêzê ava kirîye.

HIKUMDARA JIN NÎTOKRÎS

[100] Kahînan ji min re kitêbek vekirin, navê 330 hikumdarên piştre tên xwendin; di nav evqas neslê insanan de, 18 Ethîopîayî û yek jin, jineke xwecihî hebû; yên din mêr bûn û Misrî bûn. Jina şahbanû bû, xwedîyê eynî navê Nîtokrîsa Babîlî bû. Ji min re bi vî awayî gotin: Hikumdarê Misrê birayê vê Nîtokrîsê bûye, lê Misrîyan hikumdar kuştine û ew danîne ser text, ez texmîn dikim ew jî li pey toleya birayê xwe ketîye, gelek Misrî bi tawanbarkirina xiyanetê kuştîye. Wê di bin erdê de hêwaneke mezin daye çêkirin û bi navê merasîma vekirina wê hêvanê, bang kesên Misrî yên ku tilîya wan di kuştina birayê wê de heye kirine, şahîyek li dar xistîye; lê niyeta wê tiştek din bûye: Di nîvê şahîyê de berê, ava rûbareke ku ji cihekî nehênî diherike daye ser wan. Ji min re li ser vê jinê tiştekî din negotin, lê tenê piştî ew vê niyeta xwe pêk tîne, ji bo tirsa tiştekî wiha bê serê wê jî, tê gotin xwe avêtîye odeke hindurê wê tijî xwelî.

MOÎRÎS

[101] Li ser hikumdarên din, ku tiştekî giring yê navê wan bide bibîranîn negotin, tenê ji van li ser yê dawîyê Moîrîs ku li milê bakur yê li beşa ketina hindur ya perestgeha Hephaîstosê xatira wî maye, çend tişt gotin. Wî jî golek daye kolan ku li çaralî çend stad girtîye, ez ê pêşde behsa wê bikim. Yek jî pramîdan çêkirîye, ez ê behsa mezinahîya wan jî bêjim, dema ez behsa golê bikim. Wî ev kirine, lê yên din tiştek nekirine.

SESOSTRÎS

[102] Ez ê niha ji wan derbas bim û bêm ser hikumdarê navê wî Sesostrîs yê piştî wan tê; li gor kahînan ji min re gotin, vî hikumdarî keştîyên şer bi xwe re birine û ji Bendera Erebî derketîye rê, xelkên li qiraxên Deryaya Erythreîayê dijîn kirine bin hukmê xwe û di dawîya vê sefera deryayî de, gihiştîye

deryayekî ku ji bo ava wê tenik e nikarîbû bigihe qiraxên wê; gotinên xwe didomînin û dibêjin ku ew piştre vegeryaye Misrê. Vê carê leşkerekî xilbe pê re, di bejahîyê re derbas dibe û temamê miletên li hemberî wî radibin serî li wan ditewîne. Lê çi cihê şerê bi kesên mêrxas yên girêdayî serxwebûna xwe kiribe, ji bo bide nîşan çawa ew mexlûb kirine, lewhe û sutûnên navê xwe û welatê xwe û ew çawa mexlûb kirîye nivîsandîye, daçikandîye; li bajarên parêzgerî nekirine û teslîm bûne jî, li ser sutûnan eynî tişt daye nivîsandin. Lê piştî eynî tişt ji bo wan jî nivîsandîye, di binî de peykerokên ku heyayê jinan nîşan dane daye çêkirin, goya bi vî awayî wî miskînîya xelkê li wir ji derûdorê re daye îlankirin.

[103] Piştî bejahî seranser derbas kirîye, ji Asyayê derbasî Ewrûpayê bûye û bi Îskîtî û Thrakîyan serî daye tewandin. Ez bawer im sekna dawî ya leşkerê Misrê vir e; ji ber ku ew sutûnên daçikandine li vir jî tên dîtin, lê ji wir şûn ve êdî tune. Ji wir paşve vegeryaye û hatîye Phasîsê. Beşeke leşker li wir maye, li wir bi cih bûye; lê gelo Sesostrîs ew bi xwesteka xwe hiştîye, yan ev esker ji seferên gerok aciz bûne û xwestine li qiraxê Phasîsê[86] bimînin, ez wê nizanim.

[104] Kifş e ku Kolkhîsî Misrî ne; berîya ez vê ji hinekan seh bikim, min bi xwe fêhim kiribû. Dema ku ev ket serê min, min ji hinekên din jî pirsî û lêkola; Ji Kolkhîsîyên di bîra Misrîyan zêdetir Misrî di bîra Kolkhîsîyan de ne; di gel vê, li gor Misrîyan, Kolkhîsî bermayîyên leşkerê Sesostrîs in; piştî nêrîna çermê wan yê reş û porê wan yê xelekî ez bi xwe jî gihiştim vê qeneetê. Bêguman ji vê tiştek dernakeve, ji ber ku xelkên din yên wiha hene; lê ya esas bandor li min kir ev bû: Di nav insanan de tenê Kolkhîsî, Misrî û Ethîopîayî sûnet dibin. Fenikî û Sûrîyîyên li Filîstînê, bi xwe dibêjin ku, ev adet ji Misrîyan wergirtine; Sûrîyî û cîranê wan Makronên li qiraxê rûbarên Thermodon û Partheníosê dijîn, dibêjin ku ew vê ji Kolkhîsîyan hîn bûne. Xelkên ku sunetê dikin tenê ev in û tê fêhimkirin ku wekî Misrîyan dikin. Ev adet kî ji kê hîn bûye, gelo Misrî ji Ethîopîayan, yan jî van ji wan? Ez vê nizanim; ji ber ku tiştekî kifş e ku ev adet li ba wan gelekî kevn e. Lê miletên bi Misrîyan re ticaretê dikin, vê ji Misrê hîn bûne, di vî warî de bi ser de jî ez

86 Phasîs-Fasîs: Bajarekî li qiraxa rojhilatê Behra Reş e.

ê delîleke zelal bidim nîşan: Fenîkeyîyên bi Yûnanê re peywendî danîn, êdî wekî Misrîyan, zarokên xwe yên nû hatine dinyê sunet nakin.

[105] Tu işareteke din ku xwedîtîya Kolkhîsîyan bi Misrîyan re dide nîşan tune. Tenê ev heye ku, li ba Misrîyan jî bi eynî awayî keten bikar tînin; di jiyan û zimanê wan de hin şibandin hene. Ew ê ku Yûnanî jê re ketenê Sardûnya dibêjin, ketenê Kolkhîsê ye; ji yê ji Misrê bê, jê re ketenê Misrê tê gotin.

[106] Em bên ser wan sutûnên ku hikumdarê Misrê Sesostrîs li wan welatên mexlûb kirine daçikandine, piranîya wan wenda bûne; yên li ser pêyan mane û li ser organên jinan yên mêyînî û bi nivîsên wan ve, min ew li Sûrîya Filistînê bi çavê xwe dîtin. Ji bilî li du cihên Îonayê, wêneya vî qehremanî yê li ser kevir hatîye neqişkirin heye, yek jê li ser rêya Phokaîa-Ephesosê, ya din li ser rêya ji Sardesê diçe Smyrnayê ye; li van herdu cihan jî bilindahîya wan dudu û nîv pîxîs peyker qewartine; di destê rastê de rim û di destê çepê de kevan digre; techîzatên din jî dane nîşan; bi tîpên Misrî nivîsek hatîye kolan û manaya wê ev e: "Min bi lêdana navmilekî ev wêlat mexlûb kir û stend." Navê xwe û welatê xwe nedaye nivîsandin, lê wan bi awakî din daye xuyakirin. Ev peykerên han, li gora hinekan dîtine, peykerên Memnon in; yên wiha dibêjin ji rastîyê gelek dûr in.

[107] Li ser vî Sesostrîsê ku gelek kesên ji miletên ku kiribû bin hukmê xwe bi xwe re anîbûn, kahînan ev ji min re gotin: Dema vegerîya welatê xwe û gihişte Daphneya li devê Pelusîonê, birayê wî yê ku Misir teslîmî wî kiribû, ew û bi zarokên wî ve ji bo mêvanîyê vexwendibû; vî birayî li dora xanî hesareke ji daran çêkirîye û agir berdaye vê hesara ku kes nikare jê derbas bibe. Dema ku Sesostrîs bi rewşê dihese, di cih de bi jina xwe dişêwirê, ji ber ku dema derketibû seferê ew jî bi xwe re biribû; şeş zarokên wan hebûn, jinikê pêşnîyaz kiribû ku dudu ji zarokan wekî pirekê li ser agirê daran yê bi gûrrî vêketîbû razîne û pê li van bike, derkeve derve. Seostrîs wisan kirîye, dudu ji zarokan wisan kirine; yên mayî bi bavê xwe ve rizgar bûne.

[108] Wextê Sesostrîs vegerîya Misrê birayê xwe ceza kir û girseyên insanan yên ji welatê mexlûb kiribû anîbûn di karên awa awa de xebitandin: Di wextê wî de yê ku ew kevirên gelekî mezin kişandine perestgeha Hephaîs-

tosê ev girtîyên han bûn û ev in yê ku bi zorê ew qenalên îro Misrê bi xetên xwe dagirtine, kolane; bi vî awayî bêyî ku bixwazin, li vî welatî ku berê bi hesp û erebeyan rêwîtî dihat kirin, ji hesp û erebeyan mehrûm hiştine. Di eslê xwe de welatê Misrê yê repûrast, ji vê tarîxê şûn ve hesp jî û erebe jî ji bîr kirine; sebebê vê ew kanalên hejmara wan gelek zêde yên seranserê welat parve dikin e. Danekolandina ewqas qenal li her alîyî ya hikumdar, ne ji bo yên li qiraxên çeman rûdinin bû, daxwaza birina avê ji wan Misrîyên li bajarên hindur rûdinin, ji ber ku dema ava rûbaran vedikêşin û kêm dibin, tengîya avê dikêşin û mecbûr dimînin ava bîran a tehl vexwin.

[109] Sebebê hebûna evqas zêde kanalan li Misrê ev e. Cardin kahînên Misrê ji min re behis kirin ku wî hikumdarî temamê erdên welatê Misrê bi ser cotkaran ve parve kirîye. Ji her kesî re eynî pay hatîye dayîn û her xwedîyê erdê salê carekê û di wextekî kifşkirî de tiştekî wekî kirê dida. Hikumdar jî bi wî awayî ji xwe re xerca hikumdartîyê temîn dikir. Heke kêlgeha cotkarekî biketîya bin avê, ew kes yekser diçû ba hikumdar û behsa bûyerê jê re dikir. Sesostrîs jî ji yekî re digot, here bizane ka kêlgeh çiqas ketîye bin avê, êdî ji wî wextî şûn ve û bi wê miqdara baca wê salê li ser wî kesê cotkar kêm dibû. Ji vê pratîkê, ez difikirim, geometrî yekem car li Misrê hat zanîn û piştre derbasî Yûnanistanê bû. Kathejmêra rojê, Gnomon[87] û parvekirina rojê bi ser 12 beşan jî Yûnanî ji Babîlîyan hîn bûn.

[110] Prensê Misrî yê li Ethîopîayê hikum meşand tenê ev hikumdar bû; wek bîrdarî peykerên li pêşîya perestgeha Sesostrîsê hiştîye. Ji van du heb ên dirêjahîya wan 30 pîxîs yên wî û jina wî ne. Çar jî yên zarokên wî hene û ev jî 20 pîxîs in. Demeke dirêj piştî wê Daryûsê Persî xwestîye li pêşîya wan peykerê xwe daçikîne lê kêfa kahînê Hephaîstosê ji vê re nehatîye û gotîye ku mirov nikare serkeftinên Daryûs bi yên Sesostrîsê Misrî re miqayese bike. Ji ber ku boşahîya miletên ku Sesostrîs di miqabil wan de bi ser ketibû ne ji yên Daryûs hindiktir bû, serî li Îskîtîyan jî tewandibû, lê Daryûs nekarîbû vê bike. Daçikandina peykerê mirovekî li pêşîya kesekî serkeftinên wî ji yê din derbas nebûbe, ne rast bû. Tê gotin Daryûs ev axaftina bi cesaret efû kirîye.

87 Gnomon, kevirê daçikandî yê ji bo rewşa rojê bizanibin sîha wê dipîvan (Milot).

PHERON

[111] Bi qasî ez hîn bûm, dema ku Sesostrîs dimre, hikumdarî derbasê kurê wî Pheron[88] dibe, wî, dest neavêtîye karekî eskerî, tenê di netîceya qezayekê de kor bûye: Wextê herikîna herî zêde ya rûbarê bû; kûrahî gihiştibû 18 pîxîsan, piştî av her cih girt, bayek hejîya, pêlên mezin rakirin; dibêjin vî hikumdarî, wî wextî wekî dînan ket ber bayê jixwerazîbûnê, rima xwe girt li pêlê xist; tam piştî wê çavên wî xera bûn û êdî nedît. Deh salan kor ma; sala yanzdehan ji bajarê Bûtoyê gotina kahînekî gihiştê; wextê wî temam bûbû. Dê êdî çavên wî vebûna, lê ji bo vê pêwist bû çavê xwe bi mîza jinekê bişo, lê ev jin gerek ji bilî mêrê xwe nêzîkî kesekî nebûyî û dostek din negirtî bûya. Pêşî mîza jina xwe ceriband; çavên wî venebûn; piştre ew kirin rêzê û hemû ceribandin; wextê çavên wî vebûn ji bilî jina şûştina rizgarîyê jê re peyda kiribû, temamên wan jinên ceribandibûn, li bajarê îro jê re Erythrobolos (axa sor) tê gotin berhev kirin; bi wan re agir berda temamê bajêr û şewitand. Ew jina mîza wê bi kêrî çavên wî hat jî ji xwe re bir. Piştî ji nexweşîyê rehet bû ji perestgehên cihê cihê re dîyarî şandin; yek ji van bi taybetî hêjayî bibîranînê ye; ev, du kevirên daçikandî yên li Perestgeha Rojê ye, herdu jî yekpare ne, bilindahîya wan sed pîxîs, firehîya wan heyşt pîxîs in, abîdeke hêja ye.

ÇÎROKA PROTEÛS Û HELENE

[112] Li gor ji min re hate gotin, yê piştî wî tê, yekî Memphîsî ye, navê wî bi telafûza Yûnanan Proteûs e û îro li Memphîsê cihekî wî yê pîroz yê gelek sipehî û paqij heye; dikeve hemberî rûyê başûr yê perestgeha Hephaîstosê. Fenîkeyîyên Tyreyê li dora wê rûdinin û ji temamê vî cihî re taxa Tyrîyan tê gotin. Li vî cihê Proteûs, perestgeheke jê re perestgeha Afrodîteya Biyanî tê gotin heye. Ev perestgeh, lazim e ji bo Heleneya keça Tyndareos hatibe avakirin. Li gor yên ji min re hatine gotin û çîroka Heleneyê li ba Proteûs dide nîşan û ew sifetê "biyanî" yê li Afrodîteyê tê kirin, ez wiha jê derdixim. Ji ber ku ev îlahe, di tu perestgeheka xwe de bi vî awayî nehatîye bibîranîn.
[113] Bersiva kahînan a ji bo pirsa min a li ser Helene ev e; piştî Alexander,

88 Pheron, awayê guhertî yê Pharaon yê temamê navê hikumdarên Misrê yê mişterek e. Tê texmînkirin ku Herodotos ev navekî taybet hesêb kirîye.

Helene ji Spartayê rakir, ber bi welatê xwe vebû deryayê. Li ser rêya Deryaya Egeanê(Egeyê) bahozek rabû, ew ji riya xwe derxist û daxist Behra Misrê û ji bo ku ba nesekinî, çûn qiraxên Misrê, tam devê Nîlê yê jê re Kanobîk tê gotin û xwe da ber Tarîkheîayê. Li qiraxan perestgeheke Herkules hebû -niha jî heye; heke koleyek bixwaze ji xwedîyê xwe bireve û xwe bispêre vê perestgehê, hinek deqên pîroz li ser çermê xwe dide çêkirin, wî wextî kesek nikare dest bidêyê. Roja ev qanûn derket heta niha derbas dibe. Dema ku koleyên Alexander taybetmendîyên vê perestgehê hîn bûn, efendîyê xwe terk kirin û meşîyan, çûn di perestgehê de rûniştin, ji xudayan re dua kirin, Alexander tawanbar kirin, ji bo xerabî li wî bikeve temamê kirinên wî raxistin meydanê. Çawa Helene revandîye û ew tawanên li hemberî Menelaos kirine gotin. Dema ku ev tawan ji kahîn re digotin, Thonîsê li vî milê devê Nîlê walî jî li wir bûye.

[114] Dema ku Thonîs guhê xwe da wan, ji bo xeber bidin Proteûs di cih de ji Memphîs re raporek nivîsand: Digot "biyanîyek hat", ji nesla Troya ye; bi gunehekî ku li Yûnanîstanê kirîye tê tawanbarkirin; xwedîyê jina malê revandîye; gelek malê wî jî girtîye û ba ew dane ber xwe û avêtîye qiraxên te, rexê me. Gelo em wî berdin û tu ceza nexwe vebe deryayê, yan ên anîne em ji destan bistînin?" Proteûs ji bo bersivê qasidek derxist rê û ev talîmat şand: "Ew mirov, ji bo ku li hemberî kesekî li mala wî mayî gunehek kirîye, kî dibe bila bibe bigrin û ji min re bişeynin, ka em lê binêrin dê li vir çi bêje!"

[115] Dema ku Thonîs ev emir stend, Alexander da girtin, dest danî ser keştîya wan, çiyê wî hebû û Heleneyê û tev koleyên wî yên xwe avêtibûn îlah, şande Memphîsê. Wextê ev hatin, Proteûs ji Alexander pirsî; hûn kî ne û keştîyên we ji kîjan welatî tê. Ji ku ye, welatê xwe û navê xwe jê re got, rêwîtîya xwe keştîyên wan ji ku tên vekirî û zelal gotin. Li ser vê, Proteûs jê pirsî ku Helene ji ku anîye; di vê derbarê de Alexander gotin vir de wêde bir û dest bi xapandinê kir, nexwest rastîyê bêje, lê mirovên wî yên xwe sipartibûn îlah, gotinên wî di devê wî de hiştin û dest bi qisekirina xiyanetên wî kirin. Di dawîyê de Proteûs, biryara xwe bi van gotinan hişkere kir: "Heke dilê min riza bidaya min mêvanekî ji alîyê bayê ve rêya wî hatîye guhertin û avêtîye welatê min bikuşta, min toleya Yûnanîyekî ku ji te re mêvanperwerî kirîye û te xiyanet û nehêjatî lê kirîye, nedihişt li erdê. Te dest avêt kesekî

ku derîyê mala xwe ji te re vekir; tu bi vê tenê jî nemayî; di fira te ya ters de ji bo li pey te bê te bask jî danê; çavê te têr nebû, te ew mala tu tê de mêvan şelihand. Lê ez mêvanekî bêyî ez firsetekê nedimê naxwazim bikujim, dê tu vê jinê û eşyayên wê li vir bihêlî, -ez ê van heta roja bê lê bigere, ji bo wî Yûnanîyî li vir bihêlim- tu û hevalên te yên rêwîtîyê di nav sê rojan de welatê min terk bikin û herin, ji bo lengeravêtinê welatekî din bibînin; yan na ez li dijmin çi dikim ez ê li we jî bikim!"

[116] Li gor kahînan ji min re gotin, Helene bi vî awayî hatîye ba Proteûs; jixwe li gor min, Homeros jî ev çîrok dizanî; îhtîmal e ji bo wê destana dê vegota layîq nedîtîye, bi zanetî ev biçûk xistîye, lê kifş kirîye ku dizane; ev, ji rêzên Îlyada yê ku behsa gera koçberî ya Alexander û dema ku Helene direvîne, herî dawî berî xwe bigihîne Sîdona li Fenîkeyê çawa ji wê qiraxê hatîye avêtîn ber bi vê qiraxê ve kirîye (ku di cihekî din yê destanê de tersî vê nehatîye gotin) tê fêhimkirin. Di biserketinên Dîomedes de behsa vê bûyerê dike. -Dibêje, li wir dihat dîtin.

Ev cawên destan yên balkêş yên ji destê jinekê derketî
Ku Parîsê mîna îlah ji Sîdonê anîbû
Ji rêwîtîya maceraya li ser deryaya berîn
Dema ku Heleneya esîl direvîne welatê xwe yê dûr

Nîşana din jî di van rêzên Odysseîayê de ye:

Dermanên keça Zeûs ên bi vî awayî bi şîfa hebûn
Jina Thon, Polydamna
Daye wan wê, di erdê bi bereket de
Yên Misrê, ku li wir gelek hêşîn dibe
Nebatên bi şîfa û jehrî li rex hev

Va yên Menelaos ji Telemakhos re gotine:

Pozê keştîya hesreta welat dikêşe li Misrê girêdayî ma
Ji ber ku îlahan îlla ji min qurban dixwestin

Ev rêzên han[89] baş didin nîşan ku Homeros, derbasbûna Alexander ji Misrê dizanî; jixwe Sûrîye hevsînorê Misrê ye, Fenîkeyîyên xwedîyê Sîdonê jî li Sûrîyê dijîn.

[117] Ji van rêzan[90] û bi taybetî ji vê beşê bi awayekî vekirî kifş dibe ku, destana Kyprîayê[91] ne ya Homeros e, ya yekî din e. Ji ber ku di Destana Kyprîayê de, tê gotin ku Alexander piştî geşta di deryayeke hêmin ya bi bayekî nerim de, roja sisiyan a derketina ji Spartayê, bi Heleneyê re gihiştîye Îlîonayê. Halbukî di Îlyadayê de herdu bi hev re di deryayê de serberadayî digerin, tê gotin.

[118] Lê ka em êdî dev ji Homeros û Destana Kyprîayê berdin. Dema ku min pirsî, "Gelo çîrokên Yûnanî yên li ser Îlîonê dibêjin tiştên rastî ne, yan esil û bingehê wan tune ne?", kahînan bersiva min bi gotina vê çîroka ku çavkanîya wê Menelaos bi xwe ye dan. Li ser revandina Helene, artêşeke mezin ya Yûnanan, ji bo piştgirîya Menelaos derdikevin erdê Teûkros[92]; piştî esker derdikeve bejahîyê û leşkergeh tê damezirandin, ji Îlîonayê re qasid tên şandin ên Menelaos jî di nav de. Wan digrin nav surhan û dixwazin Heleneya ji alîyê Alexander ve hatîye revandin û paşvedayîna serwetê û tezmîna/qereboya vê êrîşkarîya neheq bê dayîn; lê Troyayî, wek ku piştre jî her tim dê bikin, bi yekdengî û bi sûndan dibêjin ku ne Helene û ne jî serwetê tê gotin ku hatîye dizîn, li ba wan e; ew li Misrê ne û ji bo tiştên di destê hikumdarê Misrê Proteûs de ne, ew bên mesulkirin ne rast e. Yûnanî, difikirin ku henekên xwe bi wan dikin, dora bajêr digrin û di dawîyê de digrin. Lê lêdinêrin ku, Helene tune û ji wan re di serî de çi hatîye gotin eynî tişt tê gotin, di dawîyê de bawer dikin û Menelaos dişînin ba Proteûs.

[119] Menelaos tê Misrê. Ber bi Memphîsê ve ba dide keştîyan; çi bûye çi nebûye tevda dibêje; gelekî baş pêşwazî lê tê kirin, tev Heleneya ku tu

89 A yekem ji Îlyada VI. 289-292. Herduyên din jî Odysseîa IV. 227-230 û 351-352

90 Bal hatîye kêşandin ser ku şiroveya Herodotos ya li ser van rêzan û bi taybetî yên ji Odysseîayê hatine wergirtin, tam li hev nakin. Yên di esnayê kopîkirinê de difikirn ku metin xerabûye jî hene.

91 Kyprîa: Qibris

92 Teûkros (Teûcros): Nevîyê mîrê Troyayê.

tengasî nekêşaye hemî serweta wê jî hildide û vedigere. Lê Menelaos, bi ser van hemî qencîyan de neheqî li Misrê kirîye. Dema ku dikeve rê, ji bo bayê guncaw nabîne di cihê xwe de dimîne; dema ku ev wiha dirêj dibe xwestîye li dijî ayînê qurbanekê jê bike; du zarokên Misrî girtine, bi kêrê serê wan jê kirîye. Piştre, dema ev sûc derdikeve holê, nema zane wê çi bike, bi keştîyên xwe ve baz daye Lîbyayê. Ji wir çûye ku? Misrîyan ev ji min re negotin. Li ser ew bûyerên ji min re vegotin, hin ji wan gotin, me bi xwe lê pirsî û em hîn bûn; hinekan jî gotin, ew li vir qewimîn, ji ber wê em baş dizanin.

[120] Yên ku kahînên Misrî gotin ev in. Ez ê van fikaran, li tiştên li ser Helene hatine gotin zêde bikim: Heke Helene li Îlîonê bûya, Alexander bixwesta yan nexwesta dê paşde bidana Yûnanîyan. Ji ber ku hem Prîamos hem jî malbata wî, ewqas ne dîn bûn ku ji bo Alexander Helene di bin banê xwe de ragirta, zarokên xwe û welatê xwe bidin ber linga. Heta heke di destpêkê de wiha jî be, di hemî şerên bi Yûnanîyan re, ez dibêjim, li gel bi koman Troyayîyan, du-sê zarokên Prîamos yên hatine kuştin em binêrin (ji ber ku, heke bawerî bi yên di destanan de tê gotin bê kirin, yek şerê ku ew beşdar nebûne tune), Prîamos li hemberî felaketên wiha, ji bo ji wan felaketên hatine serî rizgar bibe, heta heke evîndara wî bi xwe jî bûya, dê Helene paşde bidaya Yûnanîyan, ez wiha difikirim. Ji bilî vê, dema ku Prîamos kal bû, hikumdarî wê derbasî Alexander nebûya, wê pê re beşdarîya birêvebirîyê nekira, dema ku Prîamos bimira text wê ji birayê wî Hektor re yê ji wî mezintir û ji wî hê mêrxastir bimaya û nedihat melhezekirin ku ew jî birayekî tawanbar yê evqas zêde bela bi serê wî û serê Troyayîyan direşîne, biparêze. Rastî ev e ku, wê Helene paşve bidana û ne xwedîyê niyeta xerab bûn, lê Yûnanîyan ew hîlekar hesêb dikirin; bêguman nêrîna min bi xwe ew e ku Xuda ji bo wan wêranîyek amade kiribû, heta ku bê zanîn xudayan neheqîyên mezin bi cezayên mezin ceza dike û jê îbret bê wergirtin. Belê çîroka ez bawer dikim rast e, ev e.

HIKUMDAR RHAMPSÎNÎTOS

[121] Bi qasî ji min re hatîye gotin, piştî Proteûs, Rhampsînîtos ketîye cihê wî û wî jî wekî bîranîna selteneta xwe, di hewşa rojavayê ya perestgeha Hephaîstos de, du peykerên li hemberî vê hewşê yên bejna wan 25 pîxsî daçi-

kandî, hiştîye; Misrîyan ji van ya berê wê li bayên Boreasê re havîn, ji ya alîyê Notosê re jî zivistan gotine. Ji ya jê re havîn dibêjin, dihebînin û dua dikin; ji ya jê re zivistan dibêjin jî bi eksê wê dikin.

a) Ji min re gotin ku, di hêla dewlemendîyê de, ewqas zîvên vî hikumdarî hebûne ku, hemî hikumdarên piştî wî hatine, dev ji derbaskirina wî berdin, nêzîkî wî jî neketine. Ji bo xezîneyên xwe baş biparêze, odeya rûyekî wê li derveyî serayê binêre daye çêkirin. Lê niyeta mîmarê wî xerab e û serî li hîleke wiha dide: Kevirekî wisan datîne nav keviran ku, du kesan û hetta kesekî karîbûye bi rehetî ji dîwarê derêxe. Dema ku çêkirina odeyê temam dibe, hikumdar xezîneya xwe li wir berhev kir; zeman derbas bû; hoste dibîne ku dawîya wî nêzîk bûye, bang li du kurên xwe dike û ji wan re dibêje; sirf ji bo di wan de fikirîye û ji bo ew jiyaneke rehet derbas bikin, di çêkirina odeya xezîneya hikumdar de hîlek kirîye; ew ji wan re bi awayekî teferuat pîvana kevir û çawa dê bê hildan û heke ew van gotinên wî baş têkin serê xwe, dê bibin wekî xezînedarê hikumdar. Piştre dimre. Kurên wî ji bo dest bi kar bikin, gelek li hêvîyê neman. Çûn seraya hikumdar, bi şev cihê kevir dîtin, bi rehetî ji cihê wê derxistin û qederekî tişt birin.

b) Dema ku hikumdar hat û derî vekir ecêbmayî ma, zîvên di torbeyan de kêm bûbûn; nedizanî dê ji kê şik bikira, ji ber ku ode baş girtî bû, dest nedabûn muhran. Du-sê carên din derî vekir; her carê hinek din kêm dibû, ji ber ku dizan navbir nedidan dizînê. Lêbinêrin ka wî wextî wî çikir: Tor da çêkirin, dora kîsê zîvan bi van pêça. Diz cardin hatin; yek ket hindur û çawa hat ba kîs ket davika torê, dema fêm kir ku belayek hatîye serî, bangî birayê xwe kir û ya ku hatîye serî jê re got, zor dayê ku bikeve hindur û serê wî jêke, ji ber ku wê rûyê wî bibînin û wê bêjin ev filan kes e, wî wextî ji bilî wî wê yê şirîkê sucê wî ye jî serjê bikin. Yê din jî xelasî di vê fikrê de dît û di cih de ya hate xwestin kir; piştre kevir danî cihê wê û da ser rêya mala xwe û serê birayê xwe jî bi xwe re bir.

c) Dema ku roja wê hat û hikumdar ket xezîneyê ma şaş, kesekî ketîye toran û gewdeke bê serî hebû, lê dest li xezîneyê nehatibû dayîn, cihekî ketin û derketinê jî nedihat dîtin. Bi carekê serê wî tevlihev bû û wiha kir: Cesedê yê mirî bi dîwarê kolanekê ve daliqand, çavdêr danîn goşe û kenaran, emir

kir ku heke yên rûndikan birjînin û berketî hebin bigrin bînin. Melhezeya daliqandina cesed êşeke nedîtî dida dêya wî; ev ji kurê xwe yê din re jî got û xwest ku çi dike bila bike lazim e laşê birayê xwe yê mirî ji wir bîne û bide wê; heke gotina wê neke, hema nuh li xwe bifitile, dê biçe hikumdar bibîne û jê re bêje yên ji xezîneyê hatine dizîn, li ba wî ne.

d) Dayîk, bi vî awayî dida ser devera wî kurê xwe yê di destan de mayî, lawik her tiştê ku ji destê wî dihat got, da ku wê razî bike ku dev ji meselê berde, lê tu encam bi dest nexist. Dawî nêrî ku çi bêje nikare meqseda xwe îzah bike, dest bi hîleke wiha kir: Çend ker kirrîn, kurtan kirin, meşkên tijî şerab li wan bar kirin; piştre dest bi ajotina kerên xwe kir. Dema ku hat ba nobedarên çavdêrîya mirîyê daliqandî dikin, benê devê du-sê meşkan vekir, şerab belavî meydanê bû; dest bi qîr û girî kir û li serê xwe xist, wisan lê hatibû wekî ecêbmayî mabe ka wê li kîjan kerî binêre. Nobedarên ku dîtin şerab ziyan dibe, firaxek girtin destê xwe û dest bi tijîkirinê kirin; lawik jî wekî ku gelek hêrs bûye dest bi dijûnan kir; nobedar xebitîn wî haş bikin, hinek şûn de wekî ku haş bûye sekinî, qîr û hawarên xwe birrîn; di dawîyê de kerên xwe berhev kirin û kişand alîyekî rê, barên wan rast kirin. Ji her serî dengek derdiket, yek ji nobedaran hinek henek kirin, kêfa wî jî jê re hat, meşkek da yekî ji wan, qasek şûn de herkes li erdê veziliyabû, mecalê kesekî nemabû xwe bilivînê û ji bilî vexwarinê melhezeya tiştekî nedikirin; bangî wî jî kirin ku bê bi wan re vexwe; ew jî ket nav wan, rûnişt bi wan re dest bi vexwarinê kir. Li milekî vedixwarin û li milekî jî wesfê wî didan, ewqas ku di dawîyê de wî meşkeke din vekir; gelek hat vexwarin, nobedar heta qirika xwe tijî bûbûn, di dawîyê de her yek ji wan li milekî xamoş bûn ketin. Şev dabû ser, mêrik laşê birayê xwe vekir û wekî henekê xwe bi wan bike, milê rastê yê rîhên nobedaran kur kir; piştre mirî li yek ji wan keran kir û bire mal; daxwaza dêya xwe bi cih kir.

e) Hikumdar ku dizîya laşê dizê mirî seh kir, dîn bû; dixwest bi çi halî be, yê ev lîstika xerab leyistîye derxe meydanê; dibêjin wiha kir, lê ez gelekî bawer nakim: Keça xwe ya helal danî umumxaneyê, daxwaz jê kir ku kî wê bixwaze qebûl bike; tenê berîya bi wan re rakeve, wê ji wan bixwesta ku di temamê jiyana xwe de ew karê baş û xerab kirine jê re bêjin; heke şik ji kesekî bike ku ev dizîyê kirîye, dê bigre û bernede ji derve. Keçikê emrê bavê xwe bi cih anî. Diz bi vê rewşê hesîya û xwest careke din bejna xwe bide ber bejna hikumdar;

wiha kir: Milê yekî nû mirî ji sermilan ve jêkir, kir bin paltoyê xwe, veşart û çû ba keçikê. Ket ba keça hikumdar. Keçikê ya ji herkesî dipirsî ji wî jî pirsî; dema ku birayê wî di odeya xezîneyê de ketibû kemînê serê wî jêkiribû, tawanê herî giran yê kiribû ew bû, bi vî awayî bersiv da; lê kirina wî ya herî bi hostayî, serxweşkirina nobedaran û revandina laşê birayê wî bû. Dema ku keçikê ev gotin seh kirin, xwest wî bigre; lê diz ji tarîtîyê sûd wergirt û ew milê ji mirîyê jê kiribû direj kir, keçik ew milî girt û berneda, ji wê webû wê milê qatil girtîye; lê diz mil berda û ji derî derket û çû.

f) Dema ku hikumdar ev bûyer seh kir, heyranê zeka û netirsîya wî bû; li her milî bang daliqandin û îlan kir ku, bila bê û xwe bide nasîn, wê ne tenê teştekî pê neke, wê qencîyên mezin lê bike. Diz bawer kir û hat. Rhampsînîtos gelek kêfxweş bû, ew weke insanê herî bikêrhatî hesêb kir û bi keça xwe re zewicand; ji ber ku li gor wî Misrî ji insanên din şarezatir û bilindtir in, lê ew ji wan jî bilindtir û şarezatir e.

[122] Ji min re ev jî gotin: Ev hikumdar, bi saxî daketîye ba xudayê ku Yûnanî wî bi navê Hades dizanin û li wir bi Keres re zar avêtîye, carnan wenda kirîye û carnan jî qezenc kirîye, di dawîyê de bi pêşgîreke ji benên zêrîn hûnandî ya Keres jê re diyarî kirîye careke din vegerîyaye ser rûyê dinyê. Ji daketina cehenemê ya Rhampsînîtos, ya rast ji derketina wî şûn ve, li gor ji min re gotin, Misrî cejnekê pîroz dikin, ez dizanim niha jî wê cejnê pîroz dikin, lê gelo sebebê wê ev e, ez nizanim. Kahîn ji bo wê rojê bi destê xwe ebayekî dihûnin, di nav wan de çavê yekî bi paçekî girê didin, vî mantoyî lê dikin û li ser rêya perestgeha Keres datînin û ji wir paşve vedigerin; du gur vî kahînê çavê wî girêdayî dibin, piştre jî paşve tînin û datînên cihê ku ew biribûn.

[123] Kesên bawerîya wan bi van awa çîrokan bê, dikarin ji çîrokên Misrîyan jî bawer bikin; ez li vir tenê yên min ji cihên cûre cûre seh kirine neqil dikim. Xudayên hakimê cehennemê ne, li gor Misrîyan, Keres û Bakkhos in. Cara yekem yên gotine ruhê insên nemir e jî cardin Misrî ne, li gor wan, ruhê kesekî mirî li ser hev dikeve gewdeya jîndarekî din û temamê heywanên li bejahîyê, deryayê û hewayê dijîn dewir dikin cardin tên dikevin gewdeya insanekî; ji bo serûbinkirina vê koçê lazim e sê hezar sal derbas bibe. Yûnanîyên kevin yên bawerî bi vê kirine hebûne; vê bawerîyê

wekî ku ya wan e nîşan dane; tê zanîn ew kî ne, lê ez naxwazim li vir behsa navê wan bikim.

KHEOPS – PIRAMÎD

[124] Tê gotin heta zemanê Rhampsînîtos, li Misrê qanûnên baş derbas dibûn û welat gelekî dewlemend bû; lê piştî wî Kheops hatîye, dest bi zordestîyê kirîye. Hemî perestgeh girtine, qurbanjêkirina Misrîyan qedexe kirîye; ji bilî vê herkes ji bo xwe daye xebitandin. Hinek şandîye ji ocaxa keviran a Erebîstanê heta Nîlê kevir bi wan daye kêşan; ji hinekan re jî karê barkirina van keviran li keştîyan û birina wan li alîyê din û ji wir jî kêşana wan heta çiyayê Lîbyayê daye. Di cihê kar de bi berdewamî sed hezar karker xebitîne û ji sê meha carekê ew guhertine. Deh salên destpêkê xelk, ji bo çêkirina rêya ku kevir li ser bên kişandin hatin perçiqandin; ji ber ku wan ev rê jî bi destê xwe çêkirine. Li gor min giringî û qîmeta van rêyan ji piramîdan ne kêmtir e; dirêjahîya wê pênc stad, firehîya wan deh qulaç e; bi kevirên cîlakirî hatine çêkirin; li ser keviran neqşê heywanan hatine kolan. Ez dibêjim ev odeyên li peyarêkan û di girên pîramîd li ser bilind bûne hatine kolandin, malê keda deh salan e; li cihekî ku kanaleke ji Nîlê hatîye veqetandin li doralî gerandîye û giravek pêk anîye, ev ode daye kolan û hikumdar ji bo xwe wekî gor/tirb daye çêkirin. Ji derveyî vê, ji bo pîramîdan jî deh sal hatîye xerckirin; bejna her rûyekî wê 800 plethroh e, di bîçima çargoşeyî de ye, bilindahîya wê jî eynî ye; kevir cîlakirî ne û bi hûrgilîyeke mezin hatine bicihkirin, her kevirekî wê ji 30 pêyan ne kêmtir e.

[125] Pîramîd bi vî awayî hatine avakirin: Pêşî selende/dikên ku hinek jê re "lêsiwarkirin" û hinekên din jî "cihê serjêkirina qurbanên biçûk" dibêjin, li ser hev hatine rêzkirin. Piştî ev hatin çêkirin, kevir, bi makîneyên ji darên kurt hatine birîn çêkirine, derbasî jorê dikirin; ev makîne kevir ji erdê radikirin û datanî ser selendeya yekê, li ser vê selendeyê jî makîneyek heye, ew makîne jî kevirê digre û derdixe selendeya duyem û li wir jî vîncek heye; ji ber ku çiqas selende hene ewqas jî makîne hene, belkî jî makînek tenê ya bi rehetî mirov hilgire hebûye, dema kevirê yekê xelas dibûn derbasê ya din dihat kirin; em behsa herdu awayan jî dikin, ji ber ku ji me re jî bi vî awayî hat gotin. Bi vî awayî cihê pêşî tê çêkirin serê pîramîdê ye, piştre derbasî qatek

jêrê dibin û kevirê herî dawîyê, binê avahîyê yê herî jêr, cihê herî nêzîkî axê dihat bicihkirin. Karker di seranserî avahîkirinê de çiqas gêzer, çiqas pîvaz û çend serî sîr xwarin, li ser pîramîdê dinivîsin û didin nîşan û ew bi herfên Misrî hatine nivîsandin. Heke gotinên rêberê min yê ev ji min re dixwendin û digotin rast di hişê min de mabin, yekûna wê 1600 taland zîv digirt. Heke ew evqas bigrin, vêca hûn hesab bikin mesrefên din, xercên hesin, xwarin û lixwekirina karkeran çiqas girtîye? Hem jî bêguman zemanê li perestgehê hatîye xerckirin ne tenê evqas e, li gor min lazim e karê ser keviran, veguhestina wan û yek jî kolana odeyên bin erdê bên ser ku ev jî ne hindik in.

[126] Bi qasî ji min re hat gotin, Kheops ewqas insanekî xerab bûye ku, ji ber tengîya pereyan keça xwe kirîye umumxanekê, jê xwestîye qismek pere jê re bîne, lê negotin çiqas pere. Keçika ne bi dilê xwe ji bavê xwe re serî tewandî, bi xwe jî ketîye sewdaya li pey xwe hiştina perestgehekê; ji hemî kesên hatine balê daxwaza diyarîya kevirekî jê kirîye. Dê piştre wan keviran ji bo wê mebestê bikar bianîye. Pîramîda navendê ya dikeve pêşîya pîramîda mezin, ku bejna her milê wê plethron[93] û nîvek e, bi van keviran hatîye çêkirin, ji min re wiha gotin.

KHEPHREN

[127] Bi qasî Misrîyan ji min re gotin, vî Kheopsî pêncî salan saltanat meşandîye; wextê mir birayê wî Khephren li cihê wî rûnişt; ew jî ji birayê xwe paşve nema, wî jî dest bi çêkirina pîramîdekê kir, lê ya wî bi qasî ya Kheops nebû (herdu jî me bi xwe pîva; ya vê odeyên bin erdê û wekî ya din, kanalên jêneqilkirina ava Nîlê tunebûn), guya xendeqek di nava pîramîda Kheops de hatîye kolan û cihê laşê Kheops danîne wekî giravekê li wir maye,[94] wiha tê gotin. Bingehê avahîyê ji kevirên Ethîopîayê yên reng reng hatîye boyaxkirin e; firehîya wê bi qasî ya din e, tenê ji ya din çil pê nizimtir e; bi qasî hema hema hindik mabe bigihin hev nêzîkî hev in. Herdu jî li ser gireke bilindahîya wan sed pê hatine rûniştandin. Qasî tê fêhimkirin, Khephren 56 salan hikum meşandîye.

93 Plethron: Pîvaneke ku kêm-zêde teqabulî 27-35 metreyî dike.

94 Metin li vir rizîyaye, nayê xwendin.

[128] Li gor hesabê Misrîyan hemî li ser hev dibe 106 sal; salên feqîrtîyê, derîyê perestgehan girtî ne, qet nayên vekirin. Ji van hikumdaran nefret dikin, naxwazin behsa navê wan jî bikin; dema ku behsa pîramîdan jî dikin, dibêjin; wî wextî li van deveran şivanekî navê wî Phîlîtîs/Phîlîtîon yê kerîyên pez diçêrandin hebûye, ev pîramîd yên wî ne.

MYKERÎNOS

[129] Dibêjin ku piştî Khephren, li Misrê Mykerînosê kurê Kheops saltanat meşandîye. Wî qet helwêsta bavê xwe nepejirandîye; perestgeh vekirine û xelkê ku hatîye radeya herî qels vegerandîye ser karûbarên wan û ji bo xudayan serjikirina qurbanan serbest kirîye; di nav hemî hikumdaran de, yê ji ser rêya dadê veneqetyaye tenê ew bûye. Ev rastî kirîye ku di nav hikumdarên Misrê yên heta niha de yê herî zêde jê hatîye hezkirin û rûmet dîtîye ew be; bi tenê di biryarên xwe de ji rastîyê dûrneketinê namîne, heke kesin hebin li hemberî biryarên wî derkevin, zerarê wan ji bêrîka xwe dide û hemî daxwazên wan bi cih tîne. Lê bi ser yên di bin destê xwe de evqas xweş hereket dike, evqas birêvebirîyeke baş damezirandîye, felaketê pêşî bi keça wî lêda; ewlada tekane ya vê ocaxê mir. Bi qedera mirinê ya dilê wî şewitand, ket hewesa veşartina keça xwe ya bi şiklekî nedîtî, ji daran çêlekek da çêkirin, hindurê wê vala, derveyê wê bi zêr da seyandin û mirî -termê keça xwe- kir navê.

[**130**] Ev çêlek di bin axê de nehat veşartin; wextê ez di Saîsê re derbas bûm min dît; di seraya hikumdar di navenda odeke şetafetî de dima; bi roj di odeyê de bixûr pê dixistin, bi şev, heta roj derketa lambe vêdiketin. Di odeke din ya rexê vê çêlekê de, bîst lib peykerên jinan yên tazî hebûn, peykerên gelek mezin bûn, ji daran hatibûn çêkirin û li gor kahînên Saîsê ji min re gotin, ev herema Mykerînos bû. Ev jinên han kî bûn? Ez jî ji yên ji min re hatin gotin zêdetir nizanim.

[131] Ji bo vê çêlekê û peykerên rût, yên wiha dibêjin hene: Mykerînos, ji keça xwe hez kirîye û bê daxwaza keçikê wê ji xwe re anîye; zarok ji kerban wekî dînan lê hatîye û xwe xeniqandîye; wî jî ew kirîye nava vê çêlekê; dayîka keçikê, destê hemî wan carîyên ku ew kirine nav destê bavê wê, dane

jêkirin; gotin ku wextê sax bûn ew ceza kêşan, îro jî dikêşin. Heke bi min bimîne ev hemî çîrok in, bi taybetî yên ji bo destê peykeran tên gotin; dest bi tesîra zeman jê ketine û li ber lingên peykeran in, wextê em tê re derbas bûm min ew bi çavê xwe dîtin.

[132] Perdeke di rengê erguvanê li ser çêlekê heye, ser û stû li derve maye, bi tebeqe stor a zêran hatîye poşîn; sebmoleke rojê ya ji zêran çêkirî danîne navbera herdu şaxên wê ku ji serî heta binî dirêj dibe; çêlek li ser pêyan nasekine, li ser çokên xwe rûniştîye; qasî mezinahîya çêlekeke sax e. Dema ku Misrî ji bo roja rûmeta xudayekî ku ez li her cihê naxwazim behsa navê wî bikim, her salê pîrozbahîyê dikin, li singa xwe dixin û dinalin, di vê roja cejnê de vê çêlekê jî derdixin ji derve.[95] Bi vî awayî derdixin ber ronahîya rojê, ji ber ku dibêjin, keça Mykerînos, dema mirîye ji bavê xwe re gotîye, destûrê bid salê carekê ez rojê bibînim.

[133] Piştî keça wî mir, ew felaketa duduyan a hatîye serê wî ev e: Kahînekî ji Bûtoyê hatîye, xebera şeş sal temenê wî maye û dê di sala heftan de bimre anîye. Ev xeber gelek zora wî çûye, li ber kahîn ji îlah re gotinên xerab gotine; bi hêrs gotîye ku bavê wî û mamê wî -ew êşa bi xelkê dane tahmkirin neyên hesab kirin jî- perestgeh dane girtin û li hemberî îlahan guneh jî kirine, lê demeke dirêj jiyane, bi xwe evqas dîndar e, dê ew çawa wiha zû bimre. Lê kahînan gotin û bersiv dan; jixwe ji bo ku girêdayî dîn e, temenê wî kurt dibe, tiştê ku kirin ne ew bû ku bike; di eslê xwe de Misir ketîye nav dewra felaketeke ku pêncî salan domandîye, du hikumdarên berîya wî vê fêhim kiribûn. Dema Mykerînos ev nehênî/sur hîn bû, êdî ku kurtîya temenê kir serê xwe, gelek lambe dan anîn, dema ku dibe şev hemîyan dide vêxistin, dest bi xwarin û vexwarinê dikir; şev û roj nedigot; li golan û daristanan digerîya, li cihên zewqa xortînîya herî bicoş digerîya. Temenê xwe bi vî awayî derbas kir û şeva xwe dikir ser roja xwe, di cihê şeş salan de 12 sal jiya û bi vî awayî derewên kahîn derxistîye orteyê.

[134] Pîramîdeke ji ya bavê xwe gelekî biçûktir hiştîye; milekî wê ji sê plethoran bîst pê kêm e. Di bîçima çargoşeyî de ne û heta nîvê wê ji kevirên

95 Îlahê ku naxwaze navê wî bêje Osîrîs e.

Ethîopîayê hatine çêkirin; Yûnanîyên vê ji Rhodopîs re dikin mal hene, lê ew şaş in, heta ez wisan texmîn dikim ku nedikarîn mesrefa pîramîdeke wiha bikin ser milê jinekê, ji ber ku ev mesref bi hezaran talantan nedihat hesêbkirin; ev jî pêwist e neyê jibîrkirin ku Rhodopîs, temenê xwe yê biharê ne di zemanê Mykerînos de, di zemanê hikumdar Amasîs de jiyaye. Bi rastî Rhodopîs, gelekî piştî hikumdarên pîramîd li pey xwe hiştine hatîye; ev jin Trakyayî ye, koleya Iadmonê kurê Hephaîstopolê Samosî ye, belê va belgeyek hêja ya vê rast derdixe: Delphîyî, li ser mirina Aîsopos, dema ku bi israr lêkolîn dikirin ka dê bihayê xwînê bidin kê, tenê kesek derket orteyê; ew Iadmonekî din bû, Iadmon kurekî kurê Iadmon bû; wî wextî Aîspos, malê Iadmon bû.

[135] Xanthosê Samosî Rhodopîs anîbû Misrê: ji bo hunera xwe pêk bîne anîbûn, lê di miqabilî perekî mezin de hat azadkirin. Ev pere Kharaxosê Mytîleneyî[96] yê ku kurê Skamandronyos û birayê helbestvana jin Sappho ye temîn kiribû. Rhodopîs azadîya xwe bi vî awayî bi dest xistibu; li Misrê bi cih bû û ji bo ku jineke gelek spehî bû, serweteke mezin da hev, bêguman ji bo Rhodopîsekê mezin bû, lê ne bi qasî ku pîramîdekê ava bike ewqas mezin bû, ji dehan yekê serweta wê çiqas e, yên îro bixwazin jî dikarin bibînin û mirov pîramîdeke wiha mezin bike malê wê wê mibalexe be. Rhodopîs, ji bo wê bibîr bînîn xwestîye yadîgarekê li Yûnanistanê bihêle, ji bo vê jî hewl daye yadîgareke ku nayê aqlê kesekî pêşkêş bike, pêşkêşek ku li tu perestgehê nayê dîtin û pêşkêşeke ku di Delphîyê de navê wê bihêle şandîye. Ji dehan yekê serveta xwe veqetandîye, bi vî bi qasî ku gayekî bike kebab şîşên hesin daye çêkirin; çend şîş bi dehan yekê serveta wê çêdibin, ewqas şîş dane çêkirin û ew şandine Delphîyê; ew niha jî li wir in û hemî li cihekî ne, li pişt cihê Khîosîyan ya ji bo nezrê li hemberî mîhrabê dane çêkirin. -Jixwe li Neukratîsê dîtina jinên şûx ne zehmet e. Navê ya ku em behis dikin ewqas belav bû, di nava Yûnanîyan de yên navê Rhodopîs seh nekirin nema; piştre li Yûnanistanê, yeka navê wê Arkhîdeke li ser devan bûbû destan, lê ne bi qasî ya din. Em bên ser Kharaxos, dema ku Rhodopîs azad kir û vegerîya Mytîleneyê, Sappho qederekê bi helbestên xwe kêfa wî şikandibû.

96 Mytîlene: Bajareke di girava ku îro bi Tirkî jê re Mîdîllî tê gotin û pir nêzîkî erdên Îzmîrê ye.

HIKUMDAR ASKYHÎS

[136] Êdî ez dest ji Rhodopîs berdidim. Kahînan ji min re gotin ku piştî Mykerînos, Asykhîs bû hikumdarê Misrê; derîyê perestgeha Hephaîstosê yê dinêre rojhilat, wî daye çêkirin; derîyê herî mezin û herî sipehî ev e. Di hemî derîyan de fîgûrên qewartî û neqiş di hemî avahîyan de hene, lê yek ji wan nikare himberîyê pê re bike. Qasî tê gotin, ji bo ku di zemanê wî de pere kêm bû, li Misrê qanûnek hatîye derxistin, li gor vê qanûnê kesekî ku ji yê din pere deyn bikira, laşê bavê xwe yê mirî rehîn nîşan dida; yek jî ev: Mafên kesê deyndar yên li ser goristana malbata wî derbasî kesê ku deyn daye dibû; heke bi van şertan kesek nekaribe deynê xwe bide, wê ev bêne serê wî: Dema bimre ne di goristana malbata xwe de û ne jî li cihekî din nayê veşartin; kesekî nêzîkî wî bimre, nikarîn li goristana rehîn veşêrin. -Vî hikumdarî ji bo ku bikeve pêşîya hikumdarên Misrê yên berîya xwe, wekî bîranîn pîramîdeke ji kerpîçan hiştîye ku, li ser ev nivîsa han hiştîye: "Li pîramîdên din ên kevir nenêre û min biçûk nebîne; Xuda Zeûs çawa ji hemî xudayên din baştir e, ez jî ji pîramîdên din baştir im. Ji ber ku heke binê hezekê bê tevdan herî derdikeve, ji vê jî kerpîç tê birîn, belê min jî wiha çêkirin."

HIKUMDARÊ KOR ANYSÎS

[137] Karê hikumdarek bike evqas e. Piştî wî ji bajarê Anysîsê, yekî çavên wî nabîne derdikeve ser text, wisan tê gotin, navê wî bi xwe jî Anysîs bûye. Di wextê wî de leşkerekî bi hêz yê Ethîopîayê meşîyaye ser Misrê, hikumdarê Ethîopîayê Sabakos bûye fermandarê wê. Hikumdarê kor, ber bi herêma hezekê ve direve û Ethîopîayî 50 salan bûne hakimê Misrê. Hin karên berbiçav yê kirine ev in: Dema Misrîyek tawanek dikir, ew nedida kuştin, li gor tawanê wî cezayek didayê ku ew jî, xebitandina tawanbar bû di karê bilindkirina axa bajarê ku lê hatîye dinyê. Bi vî awayî bajarên wan bilindtir dibûn; cara ewil ev bajarên han di wextê Sesostrîs de, bi destê yên kanal vekirin hatibû bilindkirin; di dema Ethîopîan de careke din hatîye bilindkirin. Bi awayekî gelemperî li Misrê di vî karê bilindkirina axê de, ez texmîn dikim yê derketîye sevîya herî bilind, Bûbastîs e. Di vî bajarî de perestgeheke gelek xweşik a aîdê Xwedawend Bûbastîs heye, perestgehên din dikarin hê mezin û hê bihatir bin, lê yek ji wan bi qasî vê çav şa nake. Bûbastîs, Artemîsa Yûnanan e. Perestgeha wê wiha ye:

[138] Heke em ketina hindur hesêb nekin, wekî giravekê ye: Av, bi kanalên cihê ji Nîlê anîne û ava van herdu kanalan tevlî hev nabe; herdu jî heta qismê ketina hindur tên, yek wê ji alîyê milê rastê ve, ya din jî ji alîyê milê çepê ve wê dipêçin; firehîya herduyan jî 100 pê ye û dar siha xwe berdidin ser. Bilindahîya ketina hindur deh qulaç e û binî bi qasî enîşkekê bi fîgûrên sipehî hatîye neqişkirin. Perestgeh dikeve navenda bajêr, dema ku tu li derûdora bajêr bigerî, ji her cihî tê dîtin; ji ber ku ew axa bajar li ser rûniştîye bilind bûye, lê perestgeh di eynî sevîyê de maye bi rehetî tê dîtin. Dora wê bi dîwareke ku bi fîgûrên di keviran de kolayî ya neqişkirî ve hatîye pêçan; di nav hesarê de komek darên bilind û mezin ên pîroz hene û perestgeh himbêz kirine, di navenda vê de jî perestgeha mezin a peyker tê de hatîye çêkirin; dirêjahî û berê wê stadek e. Bi rêya peyarêkeke kevirîn re diçin; ev rê sê stad dikêşe, ji agorayê derbas dibe û ber bi alîyê rojhilatê ve diçe; firehîya wê bi qasî çar plethron e; li herdu milên vê rêyê darên ber bi asman ve bilind bûne hene; ew heta perestgeha Hermes diçe. Belê, ev perestgeh jî bi vî awayî ye.

[139] Ethîopîayî çûye û ev bûye dawîya vê seltenetê, yên di vî warî de ji min re hatine gotin ev in: Rojekê xewnek dîtîye û bi lez û bez baz daye û çûye. Li ser pêyan mirovek li balê sekinîye û jê re gotîye; hemî kahînên Misrê berhev bike û bikuje. Ev xewn wî teşwîqî xerabîyê kirîye û wek ku ji bo piştre duçarî xezeba xuda yan jî insanan bibe, xapandineke ku ji jor ve hatîye tertîbkirin, hatîye dîtin; lê wê ew tiştek nekira; wext û zeman tijî bûbû, li gor kahînan êdî hewce bû dawî bi selteneta wî ya li Misrê bê, pêdivî bû êdî welat terk bike û biçe. -Bi rastî hîn li Ethîopîayê bû, kahînan xeber dabûnê ku selteneta wî ya li Misrê ji 50 salan zêde dom nake. Rewş zelal bû, wextê hatibû dayîn tijî bûbû, xewna dîtibû jî serê wî tevlihev kiribû, Sarbakos bi daxwaza xwe ji Misrê derket û çû.

[140] Piştî Ethîopîayî Misir terk kir çû, yê kor cardin desthilat girt destê xwe; Ji wê herêma hezek derket ku 50 sal bû tê de dijîya, li vir giraveke ji herî û xwelîyê çêkiribû. Misrî, di nav xwe de ketibûn dorê, bêyî ku hayê yê Ethîopîayî jê hebe jê re xwarin biribûn, wî jî ji wan xwestibû ku her carê dema tên bi xwe re xwelî bînin. Ev heta zemanê Amyrtaîos nehatibû dîtin. Hikumdarên ji 700 salan zêdetir berîya Amyrtaîos hikum meşandibûn,

nikarîbûn vê giravê derxînin orteyê. Navê wê Elbo[97] bû; dirêjahî û firehbûna wê deh stad e.

HIKUMDARÊ KAHÎN SETHOS

[141] Piştî vî hikumdarî, li gor ji min re gotin, kahînekî Hephaîstosê derket ser text, navê wî Sethos[98] bû. Ji ber ku wî ji bo xwe qet pêwîst nedît, guhê xwe nedabû çîna cengawerên Misrîyan; beşek din ji neheqîyên li wan kirin ev bû, erdê ku hikumdarên kevin wek diyarî dabûn wan, yanî diyarîyeke ne ji rêzê ya ji sê plethronî erd pêk dihat ji destê wan stend. Bi ser vê de, Sennakherîbê hikumdarê Ereban û Asûrîyan, leşkerekî mezin şandibû ser Misrê, şerkerên Misrî nexwestin welatê xwe biparêzin; kahînê Hephaîstosê yê serê wî ketibû belayê, ket perestgeha xudayê xwe, li hemberî peykerê wî sekinî û dest bi gilî û gazinan kir; wextê bi vî awayî gilî û gazin dikir ket xew, di xewna xwe de xuda dît, li tenişta wî sekinîbû, jê re digot, qet bêhna xwe teng neke, êrîşî ser leşkerê Ereb bike, wê serê te nizim nebe; ji bo xweparêzîyê çi pêwist bû wê ew jê re temîn bikira. Pişta xwe bi vê xewnê girê da, bi Misrîyên ku razî bûn pê re biçin derket rê û daket ser erdê Pelûsîoyan (ji ber ku ev kilîda Misrê bû). Ji şerkeran kesek nehatibû; li balê ji bilî esnaf, pîşekar û dikandaran pê ve kesek tunebû. Dema ku gihiştin Pelûsîonê, bi şev mişkê zevîyan avêtin ser artêşa dujminê wan, ji torbeyên tîran, kevanan û qayîşên mertalan bigir her tişt kirkitandin, wisa bû ku roja din ew bêçek û tedarik man, ji bilî bazdanê pê ve rêyek nedîtin û gelek jê mirin. Îro ev hikumdar, wekî peykereke kevirî, di nava perestgeha Hephaîstosê de disekine; di destekî wî de mişkek û kitabeyek heye, li ser dinivîse: "Li min binêre û xwe baş bi dînê xwe ve bigre."

[142] Yên heta vir min gotin, yên min ji Misrîyan û kahînên Misrî seh kirine; bi qasî tê gotin, piştî hikumdarê yekem, heta vî hikumdarê dawîyê kahîn Hephaîstosî, 341 nifşê insên û bi qasî hejmara van nifşan jî kahînên mezin û hikumdar hatine. 300 nifş 10 hezar sal dike; ji ber ku sê nifş dike sed sal; ew 41 nifşê mayî jî hezar 340 dike. Yekûn, 11 hezar 340 sal û di vî midetî de, tu xuda di şiklê insên de nehatîye dîtin, ji min re wisan gotin; jixwe ne

97 Goşeya başûrêrojhilatê Gola Bûtoyê.

98 Zehmet e bê dîtin ka gelo ev kî ye. Îstîlaya Sennakherîb di sala 701an de ye, rastî dema Tîrhakah tê.

berîya wê û ne jî piştî wê, di zemanê hikumdarên Misrê yên din de tiştekî wiha ku neqewimî be ji min re nehat gotin. Di miqabilî vê de ji min re gotin ku, di nava vî zemanî de roj çar carî ji rêya xwe ya xwezayî derketîye; du car ji cihê çûye ava hilatîye, du carê din jî ji cihê hiltê çûye ava. Lê van di rewşa Misrê de tiştek neguhertine; ne di bereketa axê de, ne di feydeya rûbarê de kêmbûn çêbûye û ne jî di rîjeya nexweşî û mirinan de zêdebûn çêbûye.

[143] Berî min rojekê, dîroknas Hekataoîs, li Thebaîyê behsa zincîra nesla xwe kirîye û kalê xwe yê di xeleka 16an de xuda daye nîşan; kahînên Zeûs wî wextî çawa hereket kirine, ji min re jî bêyî ez tiştekî li ser zincîra nesla xwe bêjim, bi eynî awayî hereket kirin; ez birim nav perestgehê, cihekî fireh; peykerên Kolos yên ji daran çêkirî yek bi yek nîşanî min dan û hejmartin, yekûna wê tam ew hejmara ku min gotibû; ji ber ku her kahînekî di saxîya xwe de peykerê xwe dabû çêkirin û danîbû wir; dema ku kahînan ev nîşanî min dan û hejmartin, gotibûn ku kahînîya mezin ji bavê derbasî kur dibe; ji ya dawîyê dest pê kirin û hemî peyker nîşanî min dan. Dema ku Hekataîos zincîra dawîyê hejmart û xwe bi xudayekî xeleka 16an ve girê da, bi zincîra neslekî ku hejmaran jî ew rast dikirin, dikete nav nelihevîyê û gotinên wî yên li ser insanek ji xudayek tê nehatibûn qebûlkirin; ji ber ku wan jê re kalên xwe hejmartine û jê re gotibûn hemî kesên li vir peykerê wan hene "pîromîs"ekî ji "pîromîs"an tê û yek lib ji 345 peykerên ne ji ewladên xudayan yan mêrxasan in, lib lib hejmartibûn û dabûn nîşan. Ev "Pîromîs" ew e ku li Yûnanistanê em jê re "mirovê rast" dibêjin.

DI DERHEQÊ XUDAYAN DE

[144] Di wê navê re yên peykerên wan li wir heye tevde bi vî navî bibîranîn û yek jê bi xudayan ve girê nedan. Digotin ku berî van insanan xudayan Misir îdare dikirin û bi xwe jî bi insanan re li vir rûdiniştin û îktîdar her wext di destê yek ji wan de bû; ji van yê dawîyê Horosê kurê Osîrîs bû, yanî yê Yûnanî jê re Apollon dibêjin; wî Typhon mexlûb kirîye û herî dawîyê wî li Misrê hikum meşandîye. Osîrîs, li Yûnanistanê Dîonysos e.

[145] Li Yûnanistanê Herkules, Dîonysos û Pan xudayên herî ciwan tên hesêbkirin; li gor Misrîyan, Pan ji van sisîyan yê herî kevintir e û di nav

nifşê xudayên destpêkê de yên wek heyşt xudayan tên nişandan tê hesêbkirin; Herkules dikeve nav nifşê duyem yê ji 12 xudayan pêk tên, Dîonysos jî di nav nifşê sêyem de ye yê ji van 12 xudayan çêbûne. Li gor Misrîyan Herkules, heta zemanê hikumdar Amasîs çend sal jiya, min berîya niha gotibû; ji bo Pan hê jî dirêjtir dibêjin; ji bo Dîonysosê ku di nav hersîyan de yê herî temenkurt e jî, heta Amasîs 15 hezar sal hesab dikin. Li gor Misrîyan ev hejmarên han mitleq in, ji ber ku sal bi rêkûpêk hejmartine û bûyer nivîsandine. -Ka carekê jî em li Dîonysosê din, yê jê re kurê Semele ya keça Kadmos dibêjin binêrin: Heta roja me hezar û şesed sal hesêb dikin; Herkulesê ji Alkmene hat dinyê, herî zêde 900 sal e; Panê ji Penelopeîayê çêbû (Yûnanî Pan, zarokê Hermes yê ji insanekê-jîndareke bi mirin- çêbûye hesêb dikin), di şerê Troyayê de hê xort e, zemanê ji wê heta roja me derbas bûye, ji 800 salan ne zêdetir e.

[146] Belê, va ye du derbirîn; yên dixwazin kîjanê rast dibînin bila wê qebûl bikin. Li gor min, min nêrîna xwe li jorê got. Heke Dîonysosê ji Seleme çêbûye û Panê ji Penelopeîa çêbûye jî wekî Herkulesê kurê Amphîtryon ji nav Yûnanîyan derketibaya û di nav wan de salên xwe buhurandiba, dikarîbû bihata gotin ku ew jî wekî wî di pêşîyê de insan bûn, piştre navê xudayên berîya wan hatine li xwe kirine. Lê rastî tiştekî din e. Yûnanî ji bo Dîonysos dibêjin ku, piştî hatîye dinyê Zeûs wî bi lingê xwe ve dirûtîye û birîye ji Misrê hê wêdetir, bajarê Nyasê yê li Ethîopîayê; em bên ser Pan, ew nikarin bêjin piştî hatîye dinyê birine ku. Ji ber vê li gor min, tiştekî zelal e ku, Yûnanî navê van xudayan piştî navê xudayên din hîn bûne û piştî hînî van navan bûne ew dane jiyandin û dikarîbûn secerekê tertîb bikin.

[147] Min yên ji çavkanîyên Misrê wergirtibûn gotin. Yek jî hûrgilîyên li ser van welatan yên ji cihên din hatine wergirtin û Misrîyan jî gotine rast in hene ku, ez ê niha jî wan bidim û ez ê hinek çavdêrîyên xwe jî têkim ser. Dema ku Misrî, piştî selteneta kahîn Hephaîstos azadîya xwe bi dest xistin (di eslê xwe de di tu qonaxê de bêyî hikumdarek li ser wan hebe nejîyane), Misrê bi ser 12 herêman ve parve kirine, li ser her yekî hikumdarek danîne. Wan keç dane hevdû û girêdana navbera xwe xurt kirine; wan dest neavêtine yekî ji cihê wî bileqînin yan ji yê din zêdetir erd di dest bixe, di nav dostîyeke şidyayî de yekîtî çêkirine û hukmê xwe domandine. Sebebê

vê girêdana ku gelekî giringî didanê, ev bû. Wextê ew duwazde hikumdarî hatin damezirandin, kahîn ev xeber şandibû: Di nav wan de kî di perestgeha Hephaîstosê de bimîne, ji firaqê ava pîroz bireşîne, dê ew bibe hakimê temamê Misrê; ji ber ku ji bo merasimên ayînî hemî dihatin ba hev.

L A B Y R Î N T H O S

[148] Xwestin abîdeke mişterek bihêlin û ji bo vê mebestê, li dora bajarê Krokodeîlosê û ji Gola Moîrîsê hinek wêdetir, Labyrînthos ava kirin. Min bi xwe ew dît: Gotin têra wesifdana wê nakin. Heke ji bo liberhevxistinê kesek li karê avakirina dîwar û avahîyên ku Yûnanîyan çêkirine binere, wê bighe wê encamê ku tevde ji Labyrînthosê erzantir û bi zehmeteke kêmtir hatine avakirin. Dîsa jî heqqê wan heye ku bi perestgehên Ephesosê û Samosê serbilind bin û pesnê xwe bidin. Pîramid jî wisan, ew jî di ser hemî pesnan re ne û her yek ji wan di qîmetê çendîn avahîyên mezin yên Yûnanîyan de ne; lê Labyrînthos pîramîdan jî li paş xwe dihêle. Ji 12 hewşên sergirtî hatîye çêkirin, derîyên hewşan li hemberî hev in, şeşên wê li bakur û şeşên din jî li başûr dinêrin; li pey hev rêz bûne û bi yek dîwarî hatine pêçan. Di hindur de du cûre ode hene, yek di binê erdê de, ya din li jorê li ser yên yekemîn; ji her yekê hezar û pênsed, hemî sê hezar ode. Em li odeyên jorê gerîyan, me bi çavê xwe dîtin û em li gor vê diaxifin, lê li ser odeyên xwarê tenê yên ji me re hatin gotin em dizanin, ji ber ku nobedarên serayê xwe nedan ber ku nîşanê me bidin; li wir gorên hikumdarên ku çêkirina Labyrînthosê dane destpêkirin û yên krokodîlên pîroz hene, ji me re wisan gotin. Ji ber wê, di derbarê odeyên xwarê de ji min re çi gotin, ez jî dikarim tenê wan bêjim; em bên ser yên min bi çavê xwe dîtine, beşên qatê jorê nîv bi nîv karên ji derveyî şiyana insên in; di nav wan hewşan de ku mirov tê de wenda dibe, gera serayê bi min re heyirîneke mezin pêk anî; em ji hewşekê derbas dibûn diketin dayîreyên hindur, ji vir derbasî derîyan dibûn; wextê ji van derîyan derdiketin cardin derbasê hinek odeyan dibûn, piştî van odeyan hinek hewşên din dihatin. Hem ev dîwar û hem avahi, banên wan tevda kevir bûn; dîwar bi peykeran tijî bûn; li hewşan sûtunên kevirî yên spî hebûn. Li cihê Labyrînthos temam dibû, pîramîdeke 40 qulaç a bi peykeran xemilandî dest pê dikir; bi rêyek di bin erdê re derbasî vir dibûn.

[149] Ev Labyrînthos gelek sipehî bû, lê gelek alîyên Gola Moîrîsê jî yên mirov lê biheyîre hebûn (Labyrînthos li nêzîkî vê golê hatibû avakirin); dora wê sê hezar û şesed stad dikêşe, yanî 60 skenes, bi qasî hemî rûyê Misrê yê li deryayê dinêre; ev rûbera serî û binî tune, ji bakur ber bi başûr ve dirêj dibe, cihê herî kûr şeş qulac e. Bi destê insên hatîye kolan, bi keda insên hatîye çêkirin û ji hebûna du pîramîdên kêm-zêde di navenda wê de kifş e ku goleke çêkirî ye, qismê van pîramîdan yên li ser avê 50 qulaç in û ewqas jî di bin avê de mane; di girê serê herduyan de jî du kolossosên kevirîn yên li sertext rûniştî hene. Bi vî awayî bilindahîya van pîramîdan digihin 100 qulaçan ku ev jî dike stadek û şeş plethron, ji ber ku qulaç, şeş pê yan jî çar enîşk e, çar palme pêyek, şeş palme enîşkek e. Erdekî pir zêde zuha ye, çavkanîyên ku golê xwedî bikin tunene; av bi rêya kanalekê ji Nîlê werdigire. Av, şeş mehan ji Nîlê tê golê, şeş mehan jî ji golê diçe Nîlê. Şeş mehên herikîna ber bi Nîlê ve, gol di saya masîgirtinê de, ji xezîneyê re di rojê de talantek qezenc dihêle; dema herikîn ber bi golê ve be qezenc 20 mana ye.

[150] Xwecihan ji min re gotin ku ev gol bi rêyeke bin erdê re girêdayî Syrteya Lîbyayê ye; bi rastî ber bi rojavayê û ji tenişta girên li jora Memphîsê ber bi rojava ve bi hundir de dirêj dibe. Dema min axa wextê gol kolana li cihekî nedît, min mereq kir û min ji kesên nêzîkî golê rûdinên pirsî, gelo wextê gol kolane çi kirine ji wê axa derdixistin. Cihê ku biribûn nîşanê min dan û min jî ji wan bawer kir. Ji ber ku min behsa bûyereke wiha li Nînîveya Asûryayê derbas bûbû, seh kiribû. Xezîneya Sardanapalê hikumdarê Nînîveyê gelek dewlemend bû û wî ew di binê erdê de vedişard; dizan plana birina wê çêkirin. Ji mala xwe dest bi kolana rêyeke bin erdê kirin û piştî îstîqameta wê bi benekî baş hesab kirin, gihiştin heta seraya hikumdar; axa ji cihê kolanê derdiket bi şev dibirin dikirin Dîcleyê, yanî dikirin rûbarê ku Nînîve av dida; heta dawîyê ew karê plan kiribûn bi vî awayî meşîya. Bi qasî ez hîn bûm, li Misrê di karê kolana vê golê de jî, eynî tişt kirine; lê tenê ev kar ne bi şev, bi roj kirine; Misrîyan axa ji ber kolanê derdiket dikirin Nîlê. Ji ber ku dizanîn wê rûbar vê axê li ber xwe bibe û here. Belê, gotin ku gol bi vî awayî hatîye kolan.

[151] Ev 12 hikumdar, ji rêya rastîyê derneketin. Wextek hat, di perestgeha Hephaîstosê de qurbanek jê kirin, roja merasimê ya dawîyê çûbûn ava pîroz bireşînin, kahînê mezin wekî her wextê, kupayên zêrîn dirêj kirin lê hejmar şaş kiribû, di cihê 12 kupayan de 11 hebûn. Psammetîkos yê ku li herî dawîyê bû, lê nêrî ku kupa tune, ji serê xwe mîxfera xwe derxist, hilda û ava pîroz bi wê reşand. Mîxferên hikumdarên din jî hebûn û wî wextî li serê wan bû. Niyeteke xerab ya Psammetîkos di bikaranîna mîxferê de tunebû; lê yên din peywendîyek di navbera hereketa wî û ya kahînê berê de danîn, li gor kahîn, kesê di firaxa bronzê de ava pîroz bireşîne, wê tenê bi serê xwe bibe hikumdarê Misrê; ez dibêjim, ev gotin hat bîra wan; dîsa jî Psammetîkos layîqî mirinê nedîtin, ji ber ku dema lêpirsîn kirin, bersivên wî ewqas zelal bûn ku şik jî ne kirin; ew sirgûnî herêma hezekê kirin, piranîya qezenca wî ji destan stendin û qedexe kirin ku biçe cihekî din yê Misrê.

[152] Ev Psammetîkosê han berê careke din jî baz dabû çûbû gurbetê, ji bo ji destê Sabakosê Ethîopîayî yê bavê wî Nekos kuştibû rizgar bibe, çûbû Sûrîyê; dema Ethîopîayî, li ser xewna dîtibû lêxist çû, Misrîyên li Saîsê rûdinin, bang lê kiribûn ku paşde bê. Belê niha, di midetê saltanata xwe de ev cara duyem e bextê wî reş dibe û ji ber vê mîxfera bêixûr, hikumdarên din wî sirgunî herêma kezekê dikin. Li himberî vê rûmetşikandinê, dixwest tola xwe ji zilmkarên xwe hilîne. Yek şand Bûtoyê bi kahînê Letoyê şêwirî; kahînê herî zêde Misrîyan bawerî pê dikirin yê li wir bû. Di bersivê de jê re hat gotin ku, wê tole ji deryayê bê û mirovên bronzî derkevin meydanê. Pêşî dudilî bû, bawer nedikir ku hinek bên û alîkarîya wî bikin. Hinek wext derbas bû: Îonîayî û Karyayî yên ji bo korsanîyê vebûbûn deryayê, rojekê mecbûr mabûn xwe dabûn ber Misrê; mirovên bronzî yên çekdar derketin qiraxan. Misrîyek ku di temamê jiyana xwe de mirovên şerker yê bi çekên bronzî nedîtibû, baz da çû herêma hezekê ji Psammetîkos re got ku, ji deryayê "mirovên bronzî" hatin û derûdor şelihandin. Wî fêhim kir, kehanet rast derdiket. Bi Îonîayî û Karyayîyan re li hev kir, soz da wan ku wê gelek fêdê bikin û ji bo lihevkirinê ew razî kirin. Piştî vê lihevkirinê, bi alîkarîya Misrîyên terefdarên wî, hikumdar xistin.

[153] Psammetîkos, temamê Misrê kir bin desthilata xwe, li Memphîsê ji bo Hephaîstos, derîyên bîrdarîyê yên li başûr dinêrin çêkir; piştre jî li hemberî van bîrdarîyan ji bo Apîs serayek çêkir, dema Apîs derdiket orteyê li vir dihat xwedîkirin; ev, hewşeke dora wê bi sûtunên ku bi fîgûran hatine xemilandin hatîye dopêçkirin e; sutûn peykerên kolos ên bejna wan 12 enîşk in û serbanê digrin. Ji Apîs re di zimanê Yûnanî de Epaphos tê gotin.

[154] Psammetîkos, ew erdên li herdu teniştan yê li himberî hev yê Rûbarê Nîlê ji navbera wan re derbas dibe, da Îonîayî û Karyayîyên ku alîkarîya wî kirin. Ji wan re "Kamp" hatin gotin. Ji bilî van erdan, çi soz dabû wan hemî bi cih kirin. Ji bo zimanê Îonanî hîn bibin, zarokên Misrê emanetê wan kirin; îro wergêrên li Misrê ne, nevîyên wan zarokên wî wextî zimanê Yûnanî hîn bûne. Ew cihên dabûn wan, dikevin hinekî jêrî Bûbastîs yê li ser devê Elusîona Nîlê û qiraxê deryayê ye, Îonîayî û Karyayî midetekî dirêj li vir rûniştine. Piştre hikumdar Amasîs ew ji wir anîne Memphîsê û ji bo xwe li hemberî Misrîyan biparêze, ji van yekîneyek damezirandîye. Bi saya bicihbûna wan li Misrê ye, em Yûnanîyên din yên bi wan re peywendî danîne, di zemanê hikumdar Psammetîkos de û di wextê hikumdarên piştre hatine de, li Misrê çi diqewimin, em tam hîn dibin; bi rastî ev, yekemîn kes in ku yên bi zimanekî din diaxifin û hatine nav Misrê. Piştre ew erdên jê veqetîyabûn, wextê ez tê re derbas bûm cardin eynî di halê xwe de mabû. Cihê keştîyên xwe kêşabûn bejahîyê û kavilên malên wan kifş bû.

ORAKLA[99] LETOYÊ

[155] Psammetîkos, Misir bi vî awayî bi dest xistîye. Min li ser oraklên Misrê gelek tişt gotin, lê ez ê hê jî bêjim, ji ber ku hêjayî zehmetê ye. Ev orakl, pêşkêşî Leto hatîye kirin; li bajarekî mezin yê li ber devê jê re Sebennytîka Nîlê tê gotin; dema bi rêya rûbarê ji qiraxê deryayê diçin, di wir re jî derbas dibin. Min berê jî got, navê vî bajarî yê orakl tê de ye Bûto ye. Li vî bajarê Bûtoyê du perestgehên din jî hene, yek ya Appolon û ya din jî ya Artemîs e. Em bên ser perestgeha Letoyê, yanî cihê kahîn lê dimîne, ev jî avahîyeke

99 Orakl: Çend wateyên orakl hene, yek jê navê kesên ku bi Xwedê re dikeve têkilîyê de ye; carina ji perestgehê re jî orakl tê gotin; ya din jî, dema pirsin ji kahîna tê kirin, bersiva xwedê ya bi riya kahîn e. Di vir de mijar perestgeha Leto ye.

mezin e, derîyên wê yên bilindahîya wan 10 qulaç hene, di nav tiştên min di nav van dîwaran de dîtin, yên herî zêde ez şaş kirim, mihraba xwedawendê bû: bi kevirekî yekpare hatîye çêkirin, firehî û dirêjahîya wê yek e û 40 enîşk digre. Serban jî ji yek kevirî ye û selendeyeke çar enîşk çêdike.

[156] Di vê perestgehê de, tiştê herî ez matmayî hiştim ev mihrab bû. Piştî wê girava bi navê Khemîs tê. Di nav goleke fireh û kûr de, ya rexê perestgeha Bûtoyê ye û Misrî dibêjin ku girav sobanîyê/melevanîyê dike. Bi rastî min ne sobanîya wê û ne jî cihguhertina wê dît û dema ku min seh kir giravek dikare sobanîyê bike, ez mam şaş. Di nav de perestgeheke mezin ya Apollon heye û li vir sê nezirgeh hene; palmîye û gelek darên ber didin û nadin hene. Lêbinêrin, li gor Misrîyan sebebê sobanîkirina wê çi bûye: Di demên berê de, dema ku girav hîn sabît û bêtevger bû, Îsîs, Apollon emanetî Letoyê kiribû ku yek ji heyşt xudayên sereke bûye û li Bûtoyê li cihê kahîn dima; ji bo wî ji ber Typhon birevîne, ew li girava ku îro dibêjin sobanîyê dike, veşartibû; ji ber ku Typhon li her derî lê digerîya, îlla dixwest kurê Osîrîs bibîne. Bi rastî jî dibêjin ku, Apollon û Artemîs, zarokên Dîonysos û Îsîs in, Leto tenê dayîna wan û parêzvanê wan bû. Di zimanê Misrê de Apollon Horos e, Demeter Îsîs e, Artemîs Bûbastîs e. Ji ber vê çîrokê, Aîskhylosê kurê Ephorîon, Artemîs dike keça Demeter; tu çavkanîyek din tune û heta bi wî wextî tu ozan behsa vê nekirîye. – Belê, sobanîya giravê bi vî awayî îzah dikin, bi kêmanî Misrî dibêjin; girav, di encama vê bûyerê de, yekem car hate çêkirin..

[157] Psammetîkos, li Misrê 54 salan hikum meşand; bajarê Sûrîyê yê mezin Azotos dorpêç kirîye û 29 salan li wir leşkergeh vedaye, di dawîyê de bajar stendîye. Bi qasî em dizanin, bajarê ku herî dirêj li ber abloqayê daye ew e.

NEKOS

[158] Nekos[100] kurê Psammetîkos e, hikumdarê Misrê ye. Yekem kes bû yê hewl da qanala avê ya ber bi Deryaya Erythreîayê veke û piştre Daryûsê Aryanî ew kanal da kolan û temam kir. Di dirêjahîya wê re derbasbûn li

100 Zanyarîyên Herodotos didin, çiqas nêzîkî dema wî dibin hê zêdetir bawerîyê didin. Lîsteya hikumdarên Misrê ji Psammetîkos şûnve rast in.

ser avê çar rojê seferê ye, bi qasî ku du kadirgayên xwedî sê rêz bêran yê li hember hev karibin derbas bibin fireh e. Ava wê ji Nîlê tê û li hinek jorî bajarê Ereban Bûbastîsê yê nêzîkî Patûmosê ji Nîlê vediqete, dirije Deryaya Erythreîayê. Ji herêma sînorê Erebîstanê yê Deşta Misrê dest bi kolana wê hatîye kirin. Çiyayê li rexê Memphîsê bilind dibe yê ocaxên keviran lê hene jî li vir dinêre; xeta qanalê pêşkên vî çiyayî teqîb dike û demeke dirêj ji rojavayê ber bi rojhilatê ve diçe, piştre ber bi gewrîya çiyê ve dizîvire, di îstîqameta bayê başûr û Rotosê de dewam dike û ber bi Kendava Ereb ve dirêj dibe. Li cihê herî teng yê welat, firehîya wê tam stadek hatîye hesêbkirin ku li vir deryaya bakur û deryaya başûr yanî Erythreîa, cihê herî nêzîkî hev in, yanî cihê Kasîona Misrê ji Sûrîyê vediqetîne û navbera Bendera Ereban e. Ya ez dibêjim cihê herî kurt e, lê ji bo ku kanal li gelek cihan xeteke xwahr pêk tîne, gelekî dirêjtir e. Di zemanê Nekos de, wextê vir tê kolan 120 hezar Misrî can didin, Nekos karê kolanê di nêvî de daye sekinandin, ji ber ku kahînek li hemberî temamkirina kar derketîye, sebebê wê jî, ew weke xebateke ji bo fêda barbaran e daye xuyakirin. Ji bo Misrîyan, her kesê ku zimanê wan neaxive barbar e.

[159] Dema ku Nekos ji karê vê kanalê dest dikêşe, vedigere ser karê şer, li deryaya bakur, Bendera Ereb û Deryaya Erythreîayê, dest bi çêkirina kadirgayên mezin dike; cihên ew tê de hatine çêkirin yên hawuzên hişkbûyî hêj kifş in. Dema hewce kirîye ev keştî bikar anîne, di bejahîyê de jî, di şerê li Magdolus de ehlê Sûrî mexlûb kirîye. Bi vî şerî bajarê Kadytîsê yê li Sûrîyê qezenc kirîye. Di vî şerî de kincên li xwe kiribûn pêşkêşî Apollon kirîye û ji kahînên Brankhîdayên Mîletosî re şandine. Piştî vê, mirinê dawî bi sultanatîya wî ya 16 salan anîye. Kurê wî Psammîs cihê wî girtîye.

P S A M M Î S

[160] Dema ku li Misrê Psammîs hikum dimeşand, ji Elîsê qasid hatin; Elîsîyan, pesnê xwe didan ku di lîstikên olîmpiyatê de qaîdeyên herî rast û herî sipehî wan danîne. Bawer dikirin ku Misrî, yanî insanên herî bi aqil jî, di vî warî de wê hê zêdetir nikaribin pêşve biçin û yên ji vê baştir nebînin. Dema qasidên Elîsê hatin Misrê û ji Psammîs re sedema serdana xwe diyar kirin, hikumdar gazî meclîsek ji zanayên Misrê kir û bi wan şêwirî. Ev zane

berhev bûn, ji Elîsîyan hemî qaîdeyên di lîstikan de tên tetbîqkirin, guhdarî kirin; dema ku îzahat temam bû, Elîsîyan ji Misrîyan re gotin; heke ji van baştir qaîde hene, ji me re pêşniyaz bikin, ji ber ku em ji bo vê yekê hatine vir. Ew piştî di nav xwe de bi hev şêwirîn, ji Elîsîyan pirsîn; hemşehrîyên we di van lîstikan de bi hinekên din re jî pêşbirkîyê dikin gelo. Wan jî got, her Yûnanîyê ku bixwaze, çi ji bajarên wan çi ji bajarekî din be dikarin bikevin pêşbirkê. Wî wextî Misrîyan gotin, ev destûr ji edaletê gelekî dûr e, ji ber ku ne mumkun e meyle wan ne li ser pêşbirkvanê ji bajarê wan be û ji bo vê zerarê negihînin pêşbirkvanê biyanî. Heke bi rastî dixwazin destûreke bi edalet çêkin û bi vê niyetê jî hatibin Misrê, ji bo Misrîyan bi vê bidin bawerkirin, bila lîstik di navbera biyanîyan de bê tertîbkirin û izin neyê dayîn kesek ji Elîsê beşdarî wê bibe. Cewaba Misrîyan ji Elîsîyan re ev bû.

APRÎES

[161] Psammîs ji şeş salan zêdetir li ser textê Misrê nema. Bi Ethîopîayê re şer îlan kir û piştî wê mir. Kurê wî Aprîes ket cihê wî, heke bavê bapîrê wî Psammetîkos neyê hesêbkirin, ji temamê hikumdarên Misrê yê heya wê demê yê herî dewlemend ev bûye; 25 salan seltenatî meşand. Li hemberî Sîdon derket seferê û li hemberî Tyrlîyan jî şerekî deryayî kir. Lê zemanê bêşensîyê ya ku rev jê tune hat û firsetek ket destê qederê, ku dema ez behsa Lîbyayê bikim ez ê bi dirêjî behs bikim, niha ez ê bi çend gotinan bînim ziman. Aprîes, leşkerekî gelekî bi hêz şandibû hemberî Kyrene; bi awayekî xerab şikest. Misrîyan ew tawanbar kirin û serî hildan. Wisan texmîn dikirin ku Aprîes ew bi zanetî dehf daye nav vê felaketê, tiştekî zelal bû ku dê ev wiha bibûya; ya ku wî xwest, wan tevan bide kuştin û li ser Misrîyên mayî li gor kêfa xwe di nav ewlekarîyê de seltenetê bimeşîne. Yên vegerîyan malên xwe gelek xerab hêrs bûn, kesên nêzîkî yên mirî jî wisan û hemîyan bi hev re bi awayekî vekirî serî hildan.

[162] Aprîes, dema ku xebera serhildanê seh kir, ji bo pêşîya wan bigre û wan haş bike Amasîs şand. Amasîs hat li hemberî Misrîyan, pêşî nesîhet kir, got bisekinin, nekin; wextê wî ev digotin, Misrîyek ji pişt ve hat û nêzîkî wî bû, mîxfera wî da serî û got ku "tu bûyî hikumdar". Van gotinan û ev şêl dixuyê bêhna wî teng nekirîye ku, piştî Misrîyên serhildêr ew hikumdar

îlan kirin, di cih de vê carê ji bo ku bimeşe ser Aprîes dest bi amadekarîyê kir. Dema ku Aprîes yên qewimîn seh kirin, Patarbemîsê Misrî yê kesekî xatirê wî dihat girtin şand, jê re got "Amasîs bi zindî bigre û bîne". Patarbemîs, hat li ba Amasîs, bi navê wî bang lê kir, Amasîs ku wî wextî li ser hespê bû, xwe rast kir, bayek berda, got "bigre ji Aprîes re bersiva min ev e". Patarbemîs ji bo wî bigre ji hikumdar re bibe, gelekî li ber da; lê Amasîs ji wî re got, jixwe demeke dirêj bû ji bo vê amadekarî dikir, lazim e Aprîes jê razî be, ji ber ku di demek nêz de bi yên pê re dê bên û wî bibînin. Van gotinan, di derheqê nîyeta Amasîs de li ba Patarbemîs de tu şik nehiştin û dema ku dît amadekarîyên xwe jî zêde dike, ji bo ku xebera rewşê bigihîne hikumdar bi lez paşve hat. Dema ku hikumdar dît ku ew bê Amasîs bigre bîne vegerîyaye, ji hêrsan har bû, bêyî ku bifikire, poz û guhên wî jê kirin. Dema Misrîyên ku terefdarên Aprîes mabûn dîtin tiştên nemayî bi serê yê di nav wan de herî xwedî îtîbar û bi rûmetê hat, bêsekin derbasî nav sefê dijmin bûn, çûn ba Amasîs.[101]

[163] Dema ku Aprîes dît ew jî jê veqetîyan, yekîneya parastinê ya ji biyanîyan pêk tê bi çek kirin û dest bi êrîşa ser Misrîyan kir. Li balê 30 hezar alîkarvanên wî yên ji Karyayî û Îonîayî hebûn. Textê wî yê şetafet û mezin li Saîsê bû. Herdu alî li hember hev, mirovên Aprîes dimeşîyan ser Misrîyan û yên Amasîs jî bi ser biyanîyan de, wê xwe li hev biceribandina. Li Momemphîsê ketin miqabil hev.

[164] Li Misrê hevwelatî li ser heft sinifan parve bûne; kahîn, esker, şivan û gavan, gavanên berazan, tacir, wergêr û kilawûzên keştîyan. Qatmanên civatê ev in û navê karên dikin wergirtine. Esker dibin du beş: Kalaskîrîanî û Hermotybîanî; ev ji nomosan hatine berhevkirin. (Misir bi navê nomos bi rêveberîyê herêmî hatîye parvekirin.)

[165] Hermotybîanî di nomosên Busîrîsî, Saîsî, Khemmîsî û Papremîsî û girava Prosobîtîsê û nîvê beşa Nathoyê de dijîn. Min gotibû ku Hermotybîanî ji van nomosîyan tên berhevkirin, dema herî zêde bin hejmara wan

101 Me li jorê jî gotibû, zanyarîyên Hedodotos yên li ser coxrafya Misrê didin rast in. Di miqabilê vê de, di yên warê dîrok û kronolojîyê de, şaşîyên mezin di wan de hene. Hinek ji van di notên jorê de hatin dîtin.

digihe 160 hezaran. Di nav wan de kesekî xwedîyê pîşeyekê be tune, ji bilî bikaranîna çekan pê ve tiştekî nizanin.

[166] Em bên ser nomosên Kalaskîrîanî: Ew Thebaî, Bûbastîs, Aphtîs, Tanît, Mendes, Sebennytîs, Athrîbîs, Pharbaîtîs, Thmûîs, Onûphîs, Anysîs, Myekphorîs in; ya dawîyê giraveke dikeve hemberî Bûbastîsê. Nomosên Kalaskîrîanî ev in; di berhevkirina herî zêde de hejmara wan digehe 250 hezaran. Xebateke destkarîyê ji bo wan jî qedexe ye; tenê dizanin şer bikin û eskerîya wan ji bavê derbasê kur dibe.

[167] Gelo Yûnanî ji Misrîyan hîn bûn, kesên karê pîşeyên destkarîyê dikin û zarokên wan ji hevwelatîyên din kêmtir cihê rêzlêgirtinê bibînin û yên bêpîşeyî û bi taybetî eskeran di ser hemûyan re bigrin? Ez baş nizanim, ji ber ku min di Thrakî, Îskîtî, Persî, Lîdyayî û hema bêje hemî barbaran de ev wiha dît; dixwaze bila wiha yan awayekî din be, hemî Yûnanî û bi taybetî Lakedaîmonî jî wiha ne; di miqabilî vê de Korînthosî zeneetkaran biçûk nabînin.

[168] Di nav Misrîyan de yên xwedî îmtîyaz yek ev şerker û yên din kahîn in: Her yekî ji wan bê bac 12 arûrae axa wan heye. Ev dike 100 enîşkê çargoşe ya Misrî, enîşkê Misrî bi qasî enîşka Samosê ye. Ev îmtîyaza han ji bo tevan hatibû naskirin; lê bi dorê îstîfadewergirtina hinek îmtîyazên din jî hene. Hezar Kalaskîrîanî û hezar jî Hermotybîanî, her yek bi dorê, salekê xizmeta parastina hikumdar dikin; ew ji bilî erdê wan, rojê serê mirovekî mafê wan yê tayîna pênc mana nanê pijyayî, du mana goştê dewaran û çar pîvan şerab heye. Yên di yekîneyên parastina hikumdar de bûn, tiştên jê sûd werdigirtin ev bûn.

[169] Her çi hal be, Aprîes bi leşkerên xwe yên kirêgirtî û Amasîs jî bi xelkê serîhildayî yê Misrê, meşîyan ser hev û li Momemphîsê rastî hevdû hatin û dest bi şer kirin; eskerê biyanî bi mêrxasî şer kirin, lê bi hejmar gelekî kêm bûn û zorîya wan çû. Tê gotin Aprîes, di wê qeneetê de bû ku Xuda jî nikarin desthilatê jê bistînin; ewqas bi xwe bawer bû. Belê va niha mexlûb bûbû, bi saxî ketibû dest, anîbûn Saîsê, cihê textê wî ku wextekî ya wî bû û niha ya Amasîs e. Midetekî di vê serayê de ma, xwar û vexwar û Amasîs pê re baş miaele kir. Lê di dawîyê de Misrîyan gilî û gazin ji Amasîs kirin, gotin ku

xwedîkirina kesekî hem dijminê wan û hem jî yê wî di serayê de, bi edaletê re nagunce, li ser vê Aprîes teslîmî Misrîyan kir; wan jî ew xeniqandin, di goristana bav û bapîrên wî ya di nav dîwarên pîroz yên Atheneyê de veşartin; ev gor li rexê salona mezin e, wextê mirov dikeve perestgehê li milê çepê ye. Saîsî ew hikumdarên ji nomosan tên di nav dîwarên Atheneyê de vedişêrin. Abîdeya Amasîs, li gor abîdeya Aprîes û bav û kalên wî, dikeve hinek dûrî salona mezin, lê di hewşa pîroz de ne wiha ye; galerîyeke ji keviran, bi fîgûrên palmîyan û bi xemlên li gor xwe balkêş hatî poşîn, goreke di nav sûtunan de derîyê wê du qanadî û tê de gora Amasîs heye.

[170] Li Saîsê goreke wê jî heye ku, ez texmîn dikin gotina navê wê guneh jê tê; ew jî di nav dîwarên pîroz yên Atheneyê de ye, dikeve pişt mîhrabê û bi dîwara wê ve ye, ev seranserê rûyekî dîwar digre. Cardin di nav vî dîwarî de kevirên mezin ên daçikandî hene, li ba wan goleke gilover jî heye, lengergeha/îskeleya wê ji keviran e, gelekî bi dîqet hatîye kolan û bi qasî Gola Delosê mezin e ew gola jê re tekerlek dibêjin, min wisan dît.

[171] Li ser vê golê bi şevan, xwenîşandanên ew ezîyetên wê kêşayî nîşan didin û Misrî ji van merasiman re Nehênî dibêjin. Ez dikarim di vî warî de hê zêdetir biaxifim û ez van Nehênîyan baş dizanim, lê pêwist e em li hemberî Suran bi rêz bin. Wekî vê ji bo Nehênîyên Demeter yên Yûnanî jê re Thesmophoros dibêjin, em devê xwe venekin û em îzaha van ji kesên ji bo van berpirsîyarîya wan heye re bihêlin. Yên ev Nehênî ji Misrê anîne û hînî jinên Pelasgî kirine, keçên Danaosê ne; piştre dema ku Dorî hatin yên li Peloponezê rûdinin tevde ji welatên wan raqewirandin, ev merasimên han bi carekê re wenda bûne; tenê Arkadîayî yên Peloponezîyên pêşî bûn û koç nekirine û li cihê xwe mane, van diparêzên.

A M A S Î S

[172] Wekî min got, piştî Aprîes ji hikum ket Amasîs bû hikumdar. Ew di nomosa Saîsê de ji bajarê Sîûphê bû. Amasîs, pêşî zêde bi qîmet nehatibû ber çavê Misrîyan, di maleke ji rêzê de mezin bûbû, hemşehrîyekî doh yê basît bû, ewqas zêde hurmet nedidît; lê Amasîs mirovekî bi kêrhatî bû, bê dest bavêje zorîyê ket çavê tevan. Di nav malên wî yên bêhesab de teşteke wî

ya ji zêr hebû; di her civînê de ew bi xwe û mêvanên wî di vê teştê de lingên xwe dişûştin. Teşt da şikandin, ji zêrê wê peykereke xuda çêkir û danî cihekî bajêr yê herî musaîd; Misrîyên di ber peyker re derbas dibûn berhev kirin û ji wan re got ku ev peykera xuda, berê teştek bû û tê de lingên xwe dişûştin; Misrî di nav yekê de vedirşîyan, mîz dikirin û tê de lingên xwe dişûştin; li pêş ya din jî îro secde dibin. Got wekî wê, qedera wî bi xwe jî dişibe ya vê teştê; bêguman berê hemşehrîyekî wan yê neberbiçav bû, lê niha bûbû hikumdar, bangî wan dikir ku rêz lê bigrin û bi can û ruh xizmeta wî bikin.

[173] Belê, wî bi vî awayî xwe dabû hezkirin, Misrî wekî koleyan bi wî ve hatibûn girêdan. Rojên xwe bi vî awayî derbas dikirin: Serê sibehan zû radibû, heta cihê bazarê bihata dagirtin, li karên dianîn pêşîya wî dinêrî; piştre rûdinişt ser vexwarinê, bi mêvanên xwe re henek dikirin, bêxem û bêkeder wext derbas dikir. Heskirên wî ji vî halê wî xemgîn dibûn, ew îqaz dikirin: Digotin "Hikumdar, ev sivikahîyên tu dikî ji te re ne baş in. Pêwist e tu li ser textekî bi heybet bi awayekî dilkêş rûnê û wextê xwe bi nêrîna kar derbas bikî. Heke tu wiha bikî wî wextî dê Misrî fêhim bikin ku hikumdarekî mezin li ser wan heye û tê gotinên baş yê ji te re jî bên gotin seh bikî. Yên tu niha dikî ne layîqî hikumdarekî ne." Wî jî bi van gotinan bersiva wan dida: "Yên kevan dikirin, kevanê dema ku tîr bavêjin amade dikin; piştî avêtin sist dikin; ji ber ku her tim amadekirî bimîne dişkê û di dema hewcedarîyê de bi kêrî wan nayê. Ji bo insanan jî wiha ye. Kesê di wextê wê de nizane şahî û kêfê bike û kesê her tim cidî bisekine, di dawîyê de dîn dibe, qet nebe sersem dibe; ez vê wiha dizanim, ji ber wê hem ji bo vê û hem jî ji bo wê wext vediqetînim." Ji kesên nêzîkî xwe re wiha bersiv dida.

[174] Ji xwe dibêjin ku, berîya Amasîs bibe hikumdar jî ji vexwarin û kêfê nefret nedikir û qet jî ne kesekî cidî bû. Wextê pereyê wî têra vexwarin û kêfê nedikir, ha li vir û ha li wir ji çirpandinê neditirsîya. Li hemberî kesên wî bi çirpandina pereyên wan tawanbar dikirin, li ber xwe dida, wan jî ew digirtin û derdixistin pêşberî kahînê herî nêzîk. Kahîn, hinek car wî tawanbar derdixist, hinek car jî rûmeta wî diparast. Lêbinêrin, wextê bû hikumdar çi kir: Ew xudayên wî bêtawanbar derxistine rûmeta wî parastine, biçûk didît; ji bo lênêrîna perestgeha wan pere nedida, nediçû taxa wan û qurban jênedikir; ev xudayên bêqîmet bûn, kahînên wan derewîn bûn. Lê

yên rê nedan ji tawanê dizîtîyê pêsîrê xwe xelas bike, li himberî wan gelekî bi rêz hereket dikir; ew xudayên heqîqî didît û dikarîbû bawerî bi kahînên wan bê kirin.

[175] Li Saîsê, di perestgeha Atheneyê de, rewaqên sipehîtîya wan nehatine dîtin dane çêkirin, ev yên heta niha hatine çêkirin gelekî paşde dihiştin. Gelek fireh û bilind bûn û kevirên wan jî gelekî sipehî û bilind bûn. Peykerên kolos û sphinxên[102] dêwî yên serê wan insan dane çêkirin û pêşkêşî xwedawendê kirine; ji bo tamîrkirinan jî bloqên kevirî yên mezin dane anîn. Qismek ji van ji ocaxên keviran ên derdoran, yên din, yên gelek mezin ji bajarê Elephantîneyê, bi rêya rûbarê re, bi hindikî rêya bîst rojan dane kêşan û anîne Saîsê. Lê di nav van tevan de, ya herî mirov heyirî dihêle û min jî ji tevan zêdetir heyran hişt, avahîyeke bi yek blokê kevirî hatîye avakirin e, ev kevir ji Elephantînê di sê salan de hatîye anîn; ji bo vî karî hemî jî deryavan du hezar kes xebitandine. Dirêjahîya avahîyê ji derve 21 enîşk, firehîya wê 14 enîşk û bilindahîya wê heyşt çeng e. Ev avahîya bi yek blokê bi birîn hatîye çêkirin, pîvana wê ya derve wiha ye: Ji hindur dirêjahîya wê 18 enîşk û bîst tilî, firehîya wê 12 enîşk û bilindahîya wê pênc enîşk e. Avahî li ketina hindur ya saheya pîroz e; tê gotin sebebê ku nikarîbûn bînin hindur ev e: Wextê kevir dikêşin, mîmar di netîceya bi saetan xebatê de westîyaye, bêhal dest bi nalînê kirîye; Amasîs ji vê aciz bûye û musaede nekirîye hinek din bikêşin pêş. Hinekên din jî dibêjin ku dema karkerek li ser vîncan xebitîye, ketîye û perçiqîye, li ser vê kar dane sekinandin.

[176] Amasîs, ji perestgehên din ên navdar re jî diyarîyên bi heybet şandine; ev karên mezin ên balkêş in. Bi taybetî kolosek danîye Memphîsê, li pêşîya perestgeha Hephaîstos, wekî li ser piştê raketî disekine, bejna wê 75 pê ye. Li ser eynî kapangê du peyker bilind dibin, herdu jî ji eynî blokê çêbûne, bejna her yekî 20 pê ye û peykera mezin radipêçe. Li Saîsê peykereke din ya kevirî heye, bi qasî mezinahîya kolosê li Memphîsê ye û wekî wê disekine. Di herî dawîyê de avakirina perestgeha Îsîs ya li Memphîsê jî temam kirîye, ew avahîyeke gelek fireh û balkêş e.

102 Sphînx: Peykerên serê wan insan û laşê wan şêr û bi ling.

[177] Tê hesêbkirin ku Misir demên xwe yên herî bi bereket, di dewra Amasîs de jiyaye. Rûbar tu wextî evqas bereket neanîye, axê tu wextî evqas ji insanan re ber nedaye. Tê gotin hemî li ser hev, hejmara bajaran digihişt du hezaran. Cardin jî Amasîs, Misrî mecbûr kirîye ku beyana malên xwe bidin hikumdar, kesê riayetê vê qanûnê neke û yan jî Misrîyên çavkanîyên îdareya xwe rast û bi heq îspat neke, serê wî dihat jêkirin. Solonê Athenayî ev qaîde ji Misrê anîye û li Athenayê tetbîq kirîye. Îro jî li wir derbas dibe û gelek adeteke bi eqilane ye.

[178] Amasîs, bi Yûnanîyan re bûye dost, ji hinekan re ji bilî dayîna sûdên taybet, yên hatine Misrê lê nefikirîne li wir bi cih bibin, ji bo bikaribin ji xudayên xwe re cihê hebînê/perestinê çêkin, cih veqetandine. Ji van perestgehan ya herî mezin û herî daxwazî dibîne ya bi navê Helenîon tê zanîn e. Van sîteyan ev bi hev re çêkirine: Ji Ionayê Khîos, Teos, Phokaîa, Klazomenaî; ji Doran Rhodos, Knîdos, Halîkarnassos, Phaselîs; ji Aîolan tenê Mytîlene. Ev perestgeh ya van sîteyan e; jixwe komîserên ticaretê jî wan dişandin; kesên derveyî van li ser vê perestgehê heq îddîa bikin neheqîyê dikin. Aîgînayîyan li ser hesaba xwe perestgeha Zeûs, Samosîyan Hereyek û Mîletosîyan perestgeheke Apollon ava kirine.

[179] Berê li Misrê, Bendera bazarê tenê Naûkratîs bû; derveyî wê cihekî din tunebû; tucarekî ku xwe dida ber devekî din yê Nîlê, lazim bû sond bixwara ku ev bi qestî nekirîye. Pêşî wê sond bixwara ku ev ne bi zanebûn kirîye û xwe biparasta, piştre dê careke din daketa deryayê û ji bo biçe devê Kanobosê ba bidaya babirkên xwe; heke ba berevajî bûya û ji bo meşa keştîyê dest nedaya, malên xwe dewrî keştîyên Nîlê dikir û bi ser Deltayê re dizivirî diçû Naûkratîsê, ku ev bajar xwedîyê îmtiyazek taybet bû.

[180] Ji bo çêkirina perestgeha Delphoîyê ya niha, Amphîktyonîyan hesabeke 300 talant derxistibûn (perestgeha kevin rastî qezayekê hatibû şewitîbû), wê Delphoî ji çar behran yekê wê bidana. Li ser vê bajar bajar gerîyan û alîkarî berhev kirin; bi taybetî alîkarîya ji Misrê wergirtin mezin bû, Amasîs talantek şap dan; di miqabilî wê de Yûnanîyên li Misrê bi cih bûbûn, tevde li ser hev 20 mana dan.

[181] Amasîs, bi Kyreneyîyan re peymaneke dostîyê çêkir. Ji bilî vê xwest ji wana jinekê bîne, belkî ji bo bibe xwedîyê jineke Yûnanî, belkî jî ji bo bi Kyreneyîyan re peywendîyên xurt pêk bîne. Kesekî bitesîr yê bajêr, li gor hinekan bi keçeke ji Battosan, li gor hinekan ji Arkesîlaosîyan yan jî belkî ji Krîtobulosîyan re zewicî; navê keçikê Ladîke bû; lê dema ku dixwaze bi vê jinê re rakeve ji taqet diket, nedikarî tiştekî bike; lê dema ku bi jinên din re dibû rastî astengîyeke wiha nedihat. Her carê wiha bû. Di dawîyê de, Amasîs, ji vê jina navê wê Ladîkeyê re got: "Xatûn te sêhr ji min re çêkir, lê tu jî ji mirinê rizgar nabî; tê di nav êşa ku tu jinê nekêşabe de bimrî!" Ladîke jê re got "Naxêr", lê befêde bû Amasîs nerim nedibû; li ser vê keçikê, ji Afrodîteyê re dua kir, heke wê şevê heta serê sibehê Amasîs bikaribûya tiştekî bike -ji ber ku rizgarîya wê bi vê ve girêdayî bû- ji bo xwe wê ji Kyrene re peykerek bişanda. Amasîs tam piştî duayê, karîbû tiştek bike. Ji wir şûn ve çi wextê nêzîkî vê jinê bûbûya, bi ser diket, hem jî ewqas baş ku, êdî gelek ji wê hez dikir. Ladîke, nezra xwe ya li hemberî xuda bi cih kir. Peykerek da çêkirin û ji Kyreneyê re şand. Wextê ez li wir bûm qet xera nebûbû û di cihê xwe de bû. Ber bi derveyî bajêr dinêrî. Kambîses, efendîyê Misrê, dema ku hîn bû ev Ladîke kî ye, bi wê re muameleya xerab nekirîye û ji Kyreneyê re şandîye.

[182] Amasîs, ji welatên Yûnanistanê re jî yadîgar şandine; ji Kyrene re peykera Atheneyê ya di ava zêr dakirî û yek jî wêneya xwe. Ji Lîndosê re ji bo perestgeha Atheneyê du peykerên kevirî û ji keteneke gelek sipehî êşlikeke/gomlekeke zirhî; ji Samosê re, ji bo perestgeha Hereyê re du peykerên xwe yên ji darê çêkirî. Ew îro jî di perestgeha mezin de li cihên pişt derî disekinin. Van ji Samosê re, ji bo xatirê mêvanperwerîya navbera wî û ya Polykratesê kurê Aîkes şandibû. Wê merdîya li hemberî Lîndos dabû nîşan, ji peywendîyeke bi vî awayî nedihat, sebebê vê, ji alîyê keçên Danaosê ve daneçêkirina perestgeha Atheneyê ya li wir bû, li gor gotegotan ev keç, dema ku ji ber kurên Aîgyptos baz dabûn hatibûn vir. Belê pêşkêşên Amasîs ev in. Cardin yê cara yêkê Qibris bi dest xist û bi xeracê girê da ev Amasîs e.

PIRTÛKA SÊYEM

THALIA

MISIR DIKEVE DESTÊ PERSÎYAN

[1] Belê, li hemberî vî Amasîsî, Kambîsesê kurê Kîros derketîye seferê, ji bilî xelkên din yên di bin hukmê wî de, Yûnanîyên Îonîayê û Aîolîayê jî bi xwe re birîye, ew sebebê dida nîşan ev bû: Kambîses çawîşek şandibû Misrê, keça Amasîs dabû xwestin, ev nesîheta kesekî Misrî bû yê ku kîna wî bi Amasîs re hebû; wextekî Kîros serî li Amasîs daye, gotîye ku hekîmê çavan yê herî baş yê Misrê kî ye, jê re bişeyne, wî jî ev Misrî hilbijartîye û ji jina wî û zarokên wî qut kirîye û ji Kîros re şandîye. Yê Misrî ev efû nekiribû, birek nesîhet li ber guhê Kambîses xistibû û kiribû ku keça Amasîs bixwaze; bi vî awayî ew kiribû tengîyê, ya wê keça xwe ji çav derxista yan jî wê bigota na û kîna Kambîses bikişanda ser xwe. Amasîs li milekî ji hêza Persîyan ditirsîya û disilikîya, li milekî din jî qebûlkirina vê daxwazê lê giran dihat. Ji ber ku gelek baş dizanî ku, Kambîses keça wî ne weka jin, weka dostekê dê bibe. Piştî van tevan bi hûrgilî melheze kir, ji nav vî karî bi vî awayî derket. Hikumdarê kevin Aprîes, keçeke sipehî, kûbar û bifors li pey xwe hiştibû -jixwe ji malbata wî ew mabû- navê wê Nîtetîs bû. Amasîs ev keçik bi zêr û cil û bergên giranbuha xemiland û wekî ku keça wî ye ji Farisan re şand. Wext ket navberê, rojekê Kambîses bi navê bavê wê bangî wê kir, keça ciwan got: "Hikumdar, ez dibînin ku tu nizanî Amasîs tu xapandîye? Ez xemilandim û wekî ez keça wî me ez ji te re şandim, lê ez bi rastî keça efendîyê wî Aprîes im ku bi destê wan Misrîyên niha serokatîya wan dike da kuştin." Ev bersiv Kambîsesê kurê Kîros gelekî hêrs kir û sefera Misrê ji ber vê hat kirin. Yên Faris wisa dibêjin.

[2] Lê Misrî, Kambîses ji xwe hesêb dikin; ji bo vê keça Aprîes dibêjin dêya wî ye; yê xwestîye bi keça Aprîes re bizewice Kîros bûye, ne Kambîses. Di vê de çewt têdigihin. Bi xwe jî baş dizanin (ji ber ku heke miletek hebe yê adetên Persîyan dizanin, ew jî Misrî ne), li gor qanûnên Persan kurekî

meşru hebe, text nadin yekî pîç, ev yek, ya duduyan dêya Kambîses ne ev keça Misrî ye, Kassandaneya keça Farnaspes[103] ya ji Axamenîşîyan[104] e; lê ew bûyer diguherînin û dixwazin bi xanedana Kîros re xizmatîyê deynin. Di vî warî de ya rastî ev e.

[3] Bi vî awayî behsa van bûyaren dikin, lê ez bawerî bi yekê jî nakim. Behs dikin, dema ku rojekê jina Kîros Kassandane bi zarokên xwe re rûniştîye, jineke Persî tê zîyareta wê, dibêje ku ev zarok çiqas xweşik û saxlem in, ji wan re heyran maye û dayîk pîroz kirîye û gelek gotinên xweşik gotine; lê jina Kîros Kassandane bersiv daye û gotîye "Lê min evqas zarokên xweşik anîne, cardin Kîros min biçûk dibîne û rû dide biyanîya ji Misrê hatîye." Wê dexesî ji Nîtetîs kirîye, ji ber wê wiha gotîye; wî wextî kurê wê yê herî mezin Kambîses gotîye: "Dayê tu mereq neke, ka ez mezin bibim, ez ê wê Misrê serûbin bikim, kavil û wêran bikim." Wî wextî deh salî bûye; jinik şaş mane; lê Kambîses gotinên xwe ji bîr nekirine û piştî mezin bûye, bûye mêr û desthilatî girtîye destê xwe, li hemberî Misrê sefer daye destpêkirin.

[4] Siûda wî hebû, di seferê de ji tesadufeke giring alîkarî girt. Di yekîneya eskerên biyanî yên Amasîs de, yekî navê wî Fanes[105] yê ji Halîkarnassosê hebû; ew rawêjkarekî zîrek û eskerekî baş bû. Ev Fanes, ji Amasîs hez nedikir, rojekê bi xef xwe avêt keştîyekê û ji Misrê baz da, mebesta wî ew bû ku bikeve bin xizmeta Kambîses. Ji bo ku hemî tiştên li ser Misrê gelek baş dizanîbû û di nav alîkarvanên wî de xwedîyê cihekî giring bû, Amasîs mirov li pey xistin; gelek giringî dida girtina wî; ji ber wê mirovê xwe yê herî zêde pê bawer, yek ji axayê heramserayê, li keştîya şer siwar kir û li pey xist. Axayê heremê ew qaçax li Lîkyayê girt, lê nikarî bîne Misrê, ji ber ku Fanes qurnaztir bû, gardîyan serxweş kirin û çû ba Persîyan. Kambîses amadekarîya çûna ser Misrê dikir, lê nizanîbû wê çawa ji çolê derbas be, bêhna wî teng dibû. Çû wî dît û di nav tiştên li ser rewşa Amasîs de, wê çawa bikevin nav erdê wî jî nîşan da: Pêşnîyaz kir ku kesekî ji hikumdarê Erebîstanê re bişeyne û izin jê bixwaze ku di nav erdê welatê wî re di nav ewlekarîyê de derbas be.

103 Farnaspes/Pharnaspes
104 Axamenîş/Akhemenîd
105 Phanes/Fanes

[5] Ji bo vegirtina Misrê tek rê ev bû. Cihê ji Fenîkeyê wê ve heta bajarê sînor Kadytîsê, yê Sûrîyên ji wan re Sûrîyên Filistînê tê gotin, ya wan e; ji Kadytîsê, ku heke hûn ji min bipirsin bajarekî qasî Sardesê ye, heta Ianysosê welatê Ereban e; ji Îanysosê wê ve heta Gola Serbonîsê ya Sûrîyan e, li vir dikeve cihekî nêzîkî Çiyayê Kasîonê yê ber bi deryayê ve xwehrî çêkirîye; ji Gola Serbonîsê wê ve êdî erdê Misrê ye; li gor yên kevin, xwedêgiravî cihê ku Typhon xwe lê veşartîye ev gol e. Di navbera Îanysosê û Çiyayê Kasîonê yê rexê Gola Serbonîsê, cihekî fireh e, bi kêmasî sê rojan mirov dikare jê derba bibe, çoleke ku dilopek av tê de nayê peydakirin.

[6] Ez ê niha behsa tiştekî bikim ku hindik ji yên ku bi keştîyan diçin Misrê jê haydar in. Ji her cihê Yûnanistanê û Fenîkeyê salê du caran şerab tê Misrê, wan dikin nav dankên axîn; lê li tu cihekî Misrê dankên axîn ên vala peyda nabin. Mirov dikare bipirse, gelo çi bi van dankan tê? Ez ê behsa vê jî bikim. Demarkhos,[106] mecbûr e dankên herêma xwe berhev bike û bişîne Memphîsê; li wir ew tijî av dikin û ji yekîneyên parastinê yên di çola Sûrîyê re derbas bibin re tên şandin. Bi vî awayî dankek, li Misrê piştî rêwîtîyeke biçûk cardin diçe Sûrîyê, li wir ew û hevalên xwe yên rêwîtîyê yên kevin digehin hevdû.

[7] Ji bo çûna Misrê av lazim bû, ev jî wekî min behs kir, rêya dîtina wê peyda kirine û piştî Misrê girtine ev tetbîq kirine Persî ne. Lê di pêşî de komkirina avê tunebûye; ji ber wê Kamyses guhê xwe daye gotinên Halîkarnassosî, ji bo ji çolê derbas bibin, qasid şandin ba hikumdarê Ereb; daxwaza wî hat qebûlkirin; ji bo li ser soza xwe bisekinin herdu alî sond xwarin.

[8] Kesekî bi qasî Ereban girêdayî sondên xwe tunene; peyman wiha tê çêkirin: Herdu kesên wê sond bixwin li ser pêyan disekinin, di navbera wan de kesekî sêyem heye, ew kevirekî tûj digre, nava lepê herduyan di binê tilîya beran de dibre, piştre ji îşlîka wan perçeyekî jê dike û vê dike ser ew xwîna tê ya cihê hatîye birîn, heft kevirên li ber lingên wan bi vê xwînê boyax dike; wextê vî karî dike behsa navê Dîonysos û Uranîayê jî dike. Wextê ev merasim xelas dibe, kesê sondxwarî, kesê pê re lihevkirîye, ku ev dikare

106 Dem: Demos. Arkhos: Fermandar, birêvebirê herêmê.

yekê biyanî be yan jî hemşehrîyêkî wî be, bi hemî dostên xwe dide naskirin, wan agahdar dike; ew jî vê sondê erê dikin û soz didin ku bi xwe jî bikin. -Ew ji xudayan tenê Dîonysos û Uranîayê nas dikin û dibêjin em jî wekî Dîonysos porê xwe jê dikin; porê xwe di ser cênîkê xwe re wek xelekekê jê dikin. Ji Dîonysos re Orotalt, ji Uranîa re Alîlat dibêjin.

[9] Piştî bi mirovên Kambîses re li hev hat, Ereb wiha kir: Meşkên deveyan tijî av kir, bi qasî karîbû deve berhev kirin û ew meşkên avê li wan bar kirin û ev karwan şand çola wê artêşa Kambîses derbas bibe. Behskirina herî nêzîkî rastîyê ev e; yek jî ya zêde bawerî pê nayê kirin heye, lê madem behsa wê tê kirin, ez ê wê jî bêjim. Li Erebîstanê rûbareke mezin yê navê wê Korys heye; ew dirije nav Erythreayê. Niha dibêjin ku, hikumdarê Erebîstanê ji çermê ga û ji yên ajelên din rêyeke avê çêkirîye, lê çerm nehatine debax kirin û ne jî bi hev ve hatine dirûtin; serîyekî rêya avê di wê rûbarê de ye û serê din di çolê de ye, ewqasî dirêj; di çolê de bîrên mezin hatine kolan, ava rûbarê herikandine van bîran. Navbera rûbarê û çolê rêya duwazdeh rojan e, bi ser de rêya avê ne tenê yek e, tê gotin ji sê cihan bi vî awayî sê rêyên avê hatine çêkirin.

ŞERÊ PERS Û MISRÊ

[10] Psammenîtosê kurê Amasîs, leşkergeha xwe li ber devê Nîlê yê bi navê Pelusîonê damezirandibû û li hêvîya Kambîses bû. Di esnaya îstîlaya Kambîses de êdî Amasîs tunebû; piştî selteneta çilûçar salan ku qederê tu astengeke giring jê re dernexistibû, miribû; laşê wî hatibû mumyakirin û li aramgeha ku bi xwe di saxîya xwe de di perestgeha Atheneyê de dabû çêkirin, veşartibûn. -Di zemanê Psammenîtosê kurê Amasîs de li Misrê mucîzeke hêjayî nivîsandinê çêbûbû: Li Thebaîyê baran barîyabû, di pêşî de qet baran nebarîyabû; ji ber ku li Misra Jorê qet baran nabare. Lê di zemanê wî de li ser Thebaîyê baraneke biçûk û tenik hatibû xwarê.

[11] Persî ji çolê derbas bûn û hatin li hemberî Misrîyan leşgergeh damezirandin, amadekarîya şer kirin. Eskerên bi heq yên di nav artêşa hikumdarê Misrê de, -ku ew, Îonîayî û Karyayî bûn- ji bo ku artêşeke biyanî anîbû erdê Misrê, plan dikirin ji Fanes tolê werbigrin û ceza bikin. Fanes, zarokên xwe

li Misrê hiştibû; ew anîn; di navbera herdu artêşan de di navendê de kraterosek danîn; zarok yek bi yek birin, li ber çavê bavê wan û li ser kraterosê stuyê wan jê kirin; piştî hemî zarok bi vî awayî kuştin, av û şerab kirin hindurê kraterosê û heta dilopa dawîyê xwîna zarokan vexwarin. Destpêkirina wan a bi şer wiha çêbû. Şer giran derbas bû. Ji herdu milan jî gelek şerker ketin; di dawîyê de Misrî serûbin bûn.

[12] Xwecihên li wir ji min re tiştekî gelek bi mereq gotin, min bi çavên xwe bi xwe jî dîtin. Hestîyê di vî şerî de yên ji herdu milan hatibûn kuştin wekî koman di orteyê de sekinîbû. (Min bi xwe dît, li milekî yên Persîyan û li milekî din yên Misrîyan cihê cihê, wekî di roja şer de). Serê Persîyan ewqas tenik bû ku te bi pincûkek lê bidaya qul dibû; yên Misrîyan bi eksê wê bû, ewqas hişk bû ku te bi kevir lê bidaya zor dişkest. Ev wiha îzah kirin û min jî bi rehetî qebûl kir; Misrî hê di salên zaroktîya xwe de serê xwe rût dikin û tevna hestî bi tesîra rojê hê zêdetir gur dibe; bi vî awayî rê li ber weşandina pora wan jî digrin; bi rastî herî zêde mirov li Misirê rastî serrûtan tê. Bi vî awayî hişkbûna serê wan ji vê ye. Tenikbûna serê Persîyan jî ji ber wê ye ku hê di salên zaroktîyê de girêdana serê xwe bi kulav û serpêçan û hiştina wê di bin sihê de ye. Belê bûyera min digot bi mereqek ev e; min eynî tişt li Papremîsê, li cihê ku Înarosê Lîbyayî,[107] Akhaîmenesê kurê Daryûs şikand, di hestîyê Persîyên li wir miribûn de jî dît.

[13] Misrîyên meydana şer terk kirin, berbelav bûn û baz dan; çûn û li Memphîsê berhev bûn; Kambîses bi rûbarê re keştîyeke Mytîleneyê şand, di keştîyê de, ji bo ku bi Misrîyan re hevdîtinê çêke û pêşnîyaza peymanekê ji wan re bibe, kesekî Persî hebû. Lê dema ku Misrîyan dît keştî ket Memphisê, ji surhan derketin û avêtin ser keştîyê, perçe kirin û yên tê de birin, perçe perçe kirin û birin nav surhan. Piştî vê dorpêçek çêbû. Qasek şûn de Misrî teslîm bûn; Lîbyayê cîran, li tiştên hatin serê Misrê nêrîn, bê şer teslîmî Kambîses bûn, xwe bi xwe bi xeracê girê dan û diyarî şandin. Kyreneyî û Barkayîyên cîran ên bi qasî wan tirsîyan, wekî Lîbyayîyan kirin. Kambîses, diyarîyên Lîbyayî bi kêfxweşî qebûl kirin, lê yên Kyreneyîyan biçûk dîtin, ji

107 Serhildane Înarosê, sala 460an a B. Z. Atînayîyan jê re 200 keştîyên şer şandine. Di sala 455an de ket dest û hêza deryayî ya Atînayê jî xerq bû.

ber ku ez difikirim, gelek hindik bû; Kyreneyîyan bi qasî pêncsed mana zîv şandibûn, wî jî bi destê xwe ew li eskerên xwe belav kirîye.

[14] Deh roj dibû ku Keleha Memphîsê ketibû, Kambîses xwest hikumdarê Misrê Psammenîtos biceribîne û sivik bixe; Psammenîtos ku şeş meh di îktîdarê de mabû, bi hinek Misrîyan re ajot taxên derûdorê bajêr: işlîka koletîyê li keça wî kir, sîtilek da destan û şand avkêşanê; li balê keçên Misrîyên din jî hebûn, li wan jî wekî keça hikumdar kiribû, hemî jî zarokên malbatên Misrî yên kifş bûn. Keçên ciwan dema ku di ber bavê xwe re derbas bûn dest bi girî kirin, dema ku bavê wan ev helwêsta rûmetşikandina keçên xwe dîtin dest bi girî kirin; Psammenîtosê tenê rewş fêhm kiribû û çavê xwe kiribû erdê û bê liv sekinîbû. Keçên av dibirin derbas bûn, piştre kurê hikumdar anîn, di nav du hezar Misrîyên hevtemenê xwe de bû, bi stuyên xwe hatibûn girêdan, gem kiribûn devê wan. Diçûn îşkenceyê, wê tola Mytîleneyîyên bi keştîyê hatibûn Memphîsê û hatibûn kuştin ji van vekirina; dadgerên hikumdar bi vî awayî biryar dabûn; di miqabilî Mytîleneyîyek de deh kesên ji aîleyên Misrê yên bijarte. Psammenîtos derbasbûna van jî dît; fêhm kir ku kurê wî diçe mirinê; Misrîyên li balê rûniştibûn digirîyan, kula xwe didan derve; lê ew, dema ku keça wî derbas bû çawa disekinî, cardin bi eynî awayî disekinî. Ew jî derbas bûn, lê niha Misrîyek bi temen yê mêvanê daîmî yê merasimên hikumdar, hemî hebûnên wî ji destan hatîye sitandin, tiştekî wî nemabû, hatîye mecbûrkirin ku ji vir û wir re destê xwe veke, ji eskeran sedeqe pars kirîye hatîye, li ber Psammenîtos, kurê Amasîs û Misrîyên di hêşetên bajêr de rûdinên derbas dibû. Dema ku Psammenîtos ew dît kelogirîyek hatê, gewrîya wî şidand; bi navê wî bangî dostê xwe kir, serê xwe kir nav herdu destê xwe û li xwe xist. Li rexê wî esker sekinîbûn, bi derbasbûna her qefîlekê re çi dikir diçûn ji Kambîses re digotin. Kambîses ji vê rewşê ecêbmayî ma û qasidek şand û da pirsîn, qasid got: "Ey Psammenîtos, efendîyê min Kambîses ji te dipirse, te keça xwe di halekî şermîn de dît, kurê te di ber çavê te re derbas kirin û birin mirinê, ne tu girîya û ne jî gotinek ji devê te derket, dema ku dor hat vî kalî te gelek eleqe nîşan da, halbukî ew ne tiştekî te bû, sebebê vê çi ye?" Qasid bi vî awayî pirsî û hikumdar bi van gotinan bersiva wî da: "Kurê Kîros, ew êşa min bi xwe bûn û ewqas mezin bûn çavê min zuwa man; lê niha ez ji dostekî her tiştên wî ji destan hatine sitandin û lingekî wî di gorê de ye û hatîye mecbûrkirin ku

parsê bike, ez li ser wî digrîm." Kambîsesê guhê wî li xeberên qasid bû, ji bo van gotinan got ku heqê wî heye; Misrî dibêjin ku, ji çavên Kroîsosê ku pê re hatibû Misrê û Persîyên li dora hikumdar rûndik barîyan; Kambîses jî hat merhemetê; di cih de emir da û got, kurê hikumdar ji nav yên dibin mirinê bela bê veqetandin, ji bilî wê xwest hikumdar bi xwe jî ji cihê niha dimîne bigrin û bînin.

[15] Yên çûn kurê hikumdar rizgar bikin, wî sax nedîtin; pêşîya tevan li wî xistibûn; Psammenîtos ji cihê wî hildan û ji Kambîses re anîn û li ba wî bêyî xerabîyek lê bê kirin jiya. Heta heke serî li hinek kirinan nedabûya, dikarî-bû birêvebirîya Misrê jî emanetê wî bikin, ji ber ku li ba Persan qayîde ye, rêz li kurên hikumdaran tê girtin; heta kurên wan tînin cihê kesî li hemberî wan rabûne. Gelek nimûneyên vê adetê wan hene; Thannyrasê kurê Înaros kiribûn cihê bavê wî, yek jî Paûsîrîsê kurê Amyrtaîos heye, ew jî anîbûn ser ocaxa bavê wî; halbûkî ya ku Persîyan ji destê vî Înaros û Amyrtaîos kêşabûn, ji destê kesekî nekêşabûn. -Lê Psammenîtos ketibû nav karên xerab û hemberîya wê jî dît; Misrîyan teşwîqî serhildanê kir. Kambîses xeber wergirt û kir ku xwîna ga vexwe, Psammenîtos jî di eynî demê de mir; dawîya vî hikumdarî wiha bûye.

[16] Kambîses, ji Memphîsê hat Saîsê, tiştê dixwest bike jî li wir kir: Ket seraya Amasîs, emir kir Amasîs ji gorê derxistin anîn; emir hat bi cih kirin, mirî da qamçîkirin, mûyên wî da hilkirin, stirî kir laşê wî, bi gelek awayan da ezabê. Di dawîyê de cellad westîyan, efûya xwe xwestin (mirî hatibû mumyakirin, çi dikirin perçe nedibû, li ber xwe dida), Kambîses mirî da şewitandin: Ev rabûna li hemberî dîn bû û gunehkarî bû. Persî agir cewherekî îlahî hesêb dikin. Di nav van herdu miletan de jî adetê şewitandina mirîyan tune; ji ber vê Persî rast nabînin laşê insanekî wekî xwarin pêşkêşî xudayekî bikin, xwe ji tiştên wiha dûr dixin; Misrî jî agir cenawerekî ku her tiştê tê pêşîyê dixwe hesêb dikin, piştî nêçîra xwe xwar xelas kir, bi ya xwarîye re ew bi xwe jî dimre. Halbûkî ne adet e ku bi heywanan goştê insên bidin xwarin; heta sebebê mumyakirina mirî jî ji bo di gorê de kurmik wan nexwin. Ji ber vê ye ku, emrê Kambîses li dijî adetên herdu miletan jî bû. Di eslê xwe de li gor Misrîyan yê ku ev îş hatin serî ne Amasîs bû; Amasîsekî din yê Misrî yê ji eynî hozê bû, Persîyan ew laşê Amasîs hesêb kirine û ji ber

wê ezab danêyê. Tê gotin kahînek, piştî bimre wê çi bê serî jê re gotîye; wî jî xwestîye piştî bimre ew qeder neyê serî, ew kesê laşê wî dane ezabê, tam danîye ber derî û cihê gora xwe û tembîh li kurê xwe jî kirîye ku dema bimre gora wî bibin deynin alîyê hindur, herî dawîyê. Lê bi min ev lihevanînek e û derew e ku Amasîs hem ji bo laşê wî kesî û hem jî ji bo yê xwe emrekî wiha dabe, li gor min Misrî ji bo xwe ji tiştekî wiha bişon vê dibêjin.

[17] Piştî vê Kambîses dest bi plana sefereke sêşaxî kir; li hemberî Karthaginian/Kartacayîyan, Ammonîyan û Makrobîosên Ethîopîayî yên li qiraxên başûrê Lîbyayê ne; ji bo vê armancê biryar da, wê hêzên deryayî li hemberî Kartacayîyan, li hemberî Ammonîyan qismeke ji artêşa bejahîyê bihata şandin. Wê niha tenê sîxûr bişandina Ethîopîayê, wê binêrîna gelo bi rastî li Ethîopîayê xwedîyê banga rojê/Sofreya Rojê heye yan na û ji bilî vê zanyarîyên bi kêrî tiştekî bên bianîna; xwedê giravî wê diyarîyên pêşkêşî hikumdarê Ethîopîayê bikirna bi xwe re bibirna, sebebê çûna wan a dihat dîtin ev bû. -Kêm-zêde Sifreya Rojê tiştekî wiha ye:

SIFREYA ROJÊ

[18] Li gor rîwayetên ku li ser wê hatine gotin, dikare bi vî rengî were ravekirin: Li rexê bajêr deştek û li vir goştê hatine pehtin heye, goştê ji hemî cinsê heywanên çarling; bi şev, kesên ji bo vî karî hatine xezîfedarkirin vî goştî dikişînin wir û bi roj kesên dixwazin diçin li wir zikê xwe têr dikin. Xwecihî dibêjin ku, "her şev ev goşt ji axê hêşîn dibe".

[19] Bi texmîna min Sifreya Rojê tiştekî wiha ye. -Piştî Kambîses biryar da ku mirovên wî biçin, emir kir ku ji bajarê Elephantîneyê Îkhthyophagosîyên zimanê Ethîopîayî diaxifin bînin;[108] li milekî ev wê bên anîn, li milê din jî emir da hêzên deryayî, li hemberî Kartacayê derkevin rê. Lê Fenîkeyîyan gotin "nabe", ew bi sondên giran girêdayî wan bûn, bi şerê li hemberî yên ji wan çêbûne wê biketina nav gunehkarîyê. Wextê Fenîkeyî nebûna, tiştek ji hêza deryayê nedima. Bi vî awayî Kartacayî ji bin desthilata Persîyan rizgan

108 Coxrafyazanên kevin van qebîleyan dikin qiraxên Deryaya Sor. Navê wan tê wateya "yên masî dixwin".

bûn; Kambîses rast nedîtibû ku zorê bide Fenîkeyîyan, ji ber ku wan bi xwe, xwe bi Persîyan ve girê dabûn, ji bilî vê temamê hêza deryayî di destê wan de bû. Qibrisî jî wisan bûn, xwe bi xwe beşdarî sefera Misrê bûbûn.

[20] Ji Elephantîneyê Îkhthyophagosî hatin, Kambîses, wê çi bêjin ew hîn kirin û derxist rê; ji bo diyarî kinceke sorê erguvanî, gerdenîyeke zincîra zêrîn, bazind, bêhneke di nava kavanozeke mermer de û kûpek tijî şeraba xurmeyan dibirin. Ev Ethîopîayên ku Kambîses qasid şandin cem wan, xwe wek insanên herî mezin û xweşik yê dinyê hesêb dikirin. Adetê wan yê ew ji dinyê cihê dikirin, yê li ser hilbijartina hikumdar jî hebû: Kesê ji bajêr yê herî dirêj û xurt û hêza wî jî wekî bejna wî, ji xwe re serok hildibijartin.

[21] Ikhthyophagosî hatin welatê van kesan, diyarî pêşkêşî hikumdar kirin û jê re ev gotin: "Hikumdarê Persan Kambîses, dixwaze bi te re bibe dost û bibe mêvanê te, wî em ji bo vê ji te re bêjin şandin; ji we re ev diyarîyên ku ew bi xwe jî gelek hez jê dike şandin." Lê Ethîopîayî tê derxistibû ku ew ji bo sîxûrîyê hatine, wiha got: "Naxêr, hikumdarê Persîyan ne ji bo giringî dide dostanîya min hûn û ev diyarî şandine; hûn rast nabêjin; hûn ji bo sîxûrîyê hatine nav erdê hikumdarîya min; naxêr, ew ne kesekî rast e; heke ew kesekî rast bûya, erdê hinekan din ji destê wan nedistand û ew nedikirin ser erdê xwe; kesên ku qet xerabîya wan negihiştîye wî nedikirin kole. Bigrin vê kevanê jê re bibin û vê nesîheta hikumdarê Ethîopîayê jî bigihînin wî: Kengî Persî bikaribin di vê bejnê de kevanan li dar bixin, wî wextî bila bajon ser Makrobîosîyên Ethîopîayî, bila hêzên ji yên wan bi hêztir bişînin ser wan; heta wî wextî jî bila şikur bikin ku xuda fikra erdekî din têkin ser erdê xwe neke serê zarokên Ethîopîayê."

[22] Ev gotin û kevanê barkirî vala kir û dayê. Piştre rahişt kincê di rengê erguvanîyê de, pirs kir bê ew çiye û çawa tê çikirin. Îkhthyophagosî erguvan çiye û cawê wê çawa boyax dikin, jê re gotin. Hikumdar ji wan re got, "Derewîn, we kincên derewîn anîne." Piştre ji wan pirsî, ew zincîr û xelekên ku dikin stu û destê xwe çine; Îkhthyophagosîyan ew çine û çawa ji bo xemlê tên bikar anîn jê re dûvdirêj vegotin, hikumdar dest bi ken kir, carekê dîtibû ku ev zincîr in, ji wan re got, di welatê wî de ji van gelekî saxlemtir hene. Ya sisiyan jî pirsa bêhnê kir, ji bo vê jî tiştên ji bo kincan gotin got. Lê dema ku

dor hat şerabê, ev çawa tê çêkirin hîn bû, kêfa wî ji vê vexwarinê re hat; pirsa Hikumdarê Mezin wekî xwarin çi dixwe û temenê herî dirêj di nav Persîyan de çend e, kir. Jê re gotin ku ew nan dixwin û genim çawa tê çandin jê re gotin; ji bilî vê jê re gotin, temenê herî dirêj heyştê sal e. Li ser vê Ethîopîayî got; ev tiştekî ne ecêb e, yên bi zibil bê xwedîkirin gelek dirêj najî, heke ev vexwarin jî nebûya nikarîbûn evqas jî bijîn(şerab nîşanî Îkhthyophagosîyan dida) û îtîraf kir ku di vî warî de Persî di ser miletê wî re ne.

[23] Niha dora pirsan hatibû Îkhthyophagosîyan, pirs ji hikumdar kirin ku çawa, bi çi û çiqas dijîn. Wî got "Hema bêje temenê herkesî digehe sed û bîst salan; yên zêdetir dijîn jî hene; goştê kelandî dixwin û şîr vedixwin." Sîxûr şaşmayî man bê çawa evqas dikarin bijîn. Wî wextî ew girtin birin çavkanîyekê, ava vê çavkanîyê çermê insanan dibiriqand, wekî zeyt lê bê dan û li wan wer bû ku wekî hinek bêhna binevşê jê bê. Bi qasî ku digotin ava wê çavkanîyê ewqas sivik bû, tiştek li ser sêbahî nedikir, dar jî, heta tiştên ji van siviktir jî, çi bikeve hindur, dikêşa binî. Heke ev av wekî ew dibêjin be, sebebê dirêjahîya temenê wan ev e, ji ber ku vê di her tiştî de bikar dianîn. Piştî vê çavkanîyê nîşanî wan kir ew birin hepisxaneyê jî; yên li wir bûn bi zincîrên zêrînî hatibûn girêdan. Ji ber ku li Ethîopîayê sifir tunebû û ew madenê herî bi qîmet bû. Piştî hepisxaneyê çûn cihê jê re Sofreya Rojê tê gotin û ew dîtin.

[24] Piştî Sifreya Rojê, herî dawî çûn goristanê; digotin mexber ji krîstalan tê çêkirin; mirî pêşî, wekî Misrî dikin yan jî bi awayekî din tê mumyakirin, piştre dikin nav qalibê çirêşekê, li ser vê bi boyaxê, heya ji wan bê resmeke ku bişibe yê mirî çêdikin; piştre wî/wê li ser lingan, dikin nav tabuteke krîstal ya qewartî; ji wan kevirên krîstalî yên bi rehetî têne kolan gelekî zêde derdixin; mirîyê ku datînin nîvê tabutê tê dîtin; bêhn nade, dîtina wî/wê dilhevketin/bêmirêsî nade; wek ku kesê mirî bi xwe disekine. Kesên nêzîkî wî/wê salekê di mala xwe de dihêlin; fêkîyên dixwen ji wan re jî vediqetînin û li ser navê wan qurbanan jêdikin, dema ku wextê wan temam dibe, dibin datînin goristana nêzîkî bajêr.

[25] Piştî tiştê dixwestin bibînin dîtin, Sîxûr paşve vegerîyan. Netîceya wezîfeya xwe neqil kirin; Kambîses gelek hêrs bû, bêyî li tedarîka erzaq û

wasîteyan binêre û dirêjahîya rêya wê hesab bike, bêsekin meşîya ser Ethîopîayê; tiştên Îkhthyophagosîyan gotibûn hişê wî ji serî biribû, bêsekin derket rê, tenê Yûnanî hiştibûn, hemî yekîneyên peyade yên din girtibû ba xwe. Li Thebaîyê 50 hezar ji artêşê veqetand şand ser Ammonîyan, wê Ammonî bigirta bin desthilata xwe, perestgeha kahînê Zeûs dihewîne wê xera bikirina; bi xwe, fermandarîya hêzên mayî girt dest û meşîya ser Ethîopîayê. Lê hê di pêncan yekê rê de bû xwarin xelas bû; piştî xwarinê heywanên bar jî xelas bûn, ji ber ku ew jî xwaribûn. Heke Kambîses, rewş bidîta û artêş paşve vegeranda, bi ser ew şaşîya di serî de kir, cardin dê kesekî biaqil bihata hesêbkirin; lê wî guhê xwe nedayê, pêşve ajot. Esker, hindê heya li ser axê tiştek didît ku zikê xwe pê têr bike, gîya dixwar û li ber xwe dida; lê dema ku derketin çolê, di nav wan de yên serî li rêyên sawdar dan derketin; di nav xwe de pişk diavêtin û ji dehan yek dixwarin; dema Kabyses bi rewşê hesîya, tirsîya ku hevdû bixwin, dev ji sefera li hemberî Ethîopîayê berda, paşve vegerîya; dema ku hat Thebaîyê qismekî mezin ji artêşa xwe di rê de xerc kiribû; ji Thebaîyê derbasî Memphîsê bû, li wir Yûnanî li keştîyên wan siwar kir û paşde şand welatê wan.

[26] Netîceya sefera Ethîopîayê wiha çêbû. Em bên ser wan eskerên ku şandibûn ser Ammonîyan, şopa wan ji Thebaîyê heta bajarê Oasîsê cihê ku rêberan ew birine tê domandin; Samosîyên ji qebîleya Aîskhrîon li vî bajarî rûdinin û ji Thebaîyê rêya heft rojan e û di çolê re derbas dibin diçin; di zimanê Yûnanî de ji vî welatî re Girava Bexteweran tê gotin. Belê, tê gotin ku ev artêş, hatîye vir; ji vir şûn ve ji bilî Ammonîyan û yên çîrok ji wan guhdarî kirine kesek tiştekî nizane; artêş negihiştîye welatê Ammonîyan, paşve jî venegerîyaye. Yên Ammonî jî dibêjin ev e; dema ku ew ji bo herin welatê wan ji bajarê Oasîsê derketin, esker rastî çolê hatine, çol di nîvê Oasîsê û welatê Ammonîyan de ye; rûniştine ser xwarina nîvroyê, ji başûr bayek derketîye, gelek xedar, piştre zivirîye bagerê, firtona xîzê/qûmê rakirîye û ew di bin de mane, wenda bûne, tu şop nemaye. Belê, ji bo vê seferê Ammonîyan ev gotine.

[27] Wextê Kambîses vegerîya Memphîsê, Apîs ku Yûnanî jê re Epaphos dibêjin, ji Misrîyan ve xuya bû; li ser vê bûyerê Misrîyan kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin, cejin kirin. Dema ku Kambîses şahîya Misrîyan dît, wi-

san his kir ku ew ji bo mexlûbîyeta wan şahî dikin; wî bangî birêvebirên Memphîsê kir, wextê hatin pêşberê wî ji wan pirsî; di hatina wî ya yekem de Misrîyan tiştên wiha nekirin, ji bo çi di hatina wî ya vê carê de ku bi evqas wendayîyan sih ket ser, cejn û şahî dikin. Wan gotin ku xuda xuya bûye, ev ji hezar caran carekê diqewime û Misrî ji ber vê şa bûne, cejin dikin. Li ser vê bersivê Kambîses wan bi derewkerîyê tawanbar kir û mehkumî mirinê kirin.

[28] Birêvebir şandin îşkenceyê, vê carê bang kahînan kir, wan jî eynî tişt gotin; piştre got, wî wextî ez ê fêhm bikin gelo bi rastî xudayekî wiha rast û dirûst hatîye Misrê yan na. Tiştekî din negot û emir da kahînan ku, "Apîs bînin"; ew jî çûn ku bînin. Ev Apîs yan jî Epaphos, ji çêlekekê hatîyê dinyê, piştre ew çêlek careke din qet ne zaye. Misrî dibêjin ku, ji asman brûskek dikeve ser vê çêlekê, ew jî ji vê ronahîyê bi gayê Apîs avis dibe. Boxeyê ciwan yê jê re Apîs tê gotin, bi van nîşaneyan tê zanîn: Rengê wî reş e, li ser enîya wî sêgoşeke spî û li ser pişta wî resma eyloyê heye; mûyên dûvê wî cot in; di bin zimanê wî de resmê kêzikê kêşandîye.

[29] Kahîn, Apîs anîn, Kambîsesê ku mirovekî delîdîno bû, kêra xwe derxist û avêt zikê heywanê; lê rastî ranê wî hat. Wî wextî dest bi ken kir û ji kahînan re ev gotin: "Hûn ji vî re xuda dibêjin, kevirmejîyan? Û bi kêrê jî birîndar dibin, ne wisan? Bêgûman Misrî layîqî xudayên wiha ne. Lê henekpêkirina bi min wê li ser we biha rûne!" Emir kir ku heta xwîn ji bedena wan bê kahînan bidin ber qamçîyan û Misrîyên ku cejnê dike derkeve, bela ew jî bên kuştin. Misrîyan dîtin ku cejn hat birîn; kahîn hatin cezakirin; Apîs di perestgehê de bi lingê xwe yê birîndar ve raket û mir.

[30] Mirina wî ji ber wê birîna birîndarîya wî bû, kahînan bê haya Kambîses jê hebe ew veşartin. Lê Kambîses cezeyê gunehê xwe bi harbûnê kişand; jixwe berê jî nedihat hesêbkirin ku hiş di serî de heye. Pêşî birayê xwe Smerdîs da kuştin, ji dê û bav bira bûn û wî ji ber hesûdîyê ji Misrê vegerandibû Persê, ji ber ku kevanê hikumdarê Ethîopîayê ku dabu Îkhthyophagosîyan, tenê wî bi qasî du tilîyan karîbû bar bike; yê ku bikaribe vî karî bike derneketibû. Dema ku Smerdîs di rêya vegerê de bû, qasidek hatibû xewna Kambîses, xeber didayê ku Smerdîs li ser text rûniştîye û serê wî gihiştîye asîman. Ji bo xwe ket tirsê, lerizî bi fikara ku birayê wî wî bikuje û li ser textê

hukumdarîyê rûne; Prexaspes di pey de şand, di nava temamê Persîyan de herî zêde bawerîya wî bi wî hebû, wezîfeya wî kuştina Smerdîs bû. Prexaspes hat Sûsayê û Smerdîs kuşt, hinek dibêjin bir nêçîrê wisan kuşt, hinek jî dibêjin, bir Deryaya Erythreîayê û avêt deryayê.

[31] Cinayeta yekem a Kambîses ev bû; piştî vê xweha xwe kuşt; ew jî pê re hatibû Misrê; ji dê û bav xweh û bira bûn, lê pê re radiket. Ew bi vî awayî zewicîbû (ji ber ku di nav Persan de bi xwehê re zewac tune): Çavê xwe berdabû yek ji wan xwehê xwe, dixwest bi wê re rakeve; lê ew xwestek ne li gora adetê wan bû, serî li dadwerên dewletê da û ji wan pirsî: "Heke herdu teref jî bixwazin, qanûneke ku iznê bide xweh û bira bi hev re bizewicin heye gelo?" Dadwer ji tebeqeyên bilind ên Persîyan bûn; biryareke wan ya bi awayekî vekirî ya neheq nebe, heta bimrin li ser wê wezîfeyê dimînin. Ew li dozan dinêrin, qanûnên millî ew şîrove dikin; her kar di bin destê wan re derbas dibe. Bersivên rast û bibawer dan pirsên Kambîses; qanûneke ku izin dide zewaca xweh û birayê nedîtibûn, lê digotin, qanûneke gelek kevin dîtibûn, vê qanûnê ji hikumdarê Persan re mafê tiştê ku bixwaze bike dida. Bi vî awayî, bêyî ku ji Kambîses bitirsin û qanûnê xera bikin, ne jî bi hişkî qanun parastin ku serîjêkirina xwe bînin hole, bi qanûneke din rê vedikirin ji hikumdar re da ku karibe bi xweha xwe re bizewice,. Kambîses bêsekin, bi wê xweha xwe ya çavê xwe berdabûyê re zewicî, demek kurt şûn de bi xweha xwe ya din re jî zewicî. Ya bi xwe re anîbû Misrê û li wir kuştibû ya duyem, yanî ya biçûk bû.

[32] Ji bo mirina wê jî wekî ya Smerdîs du riwayet hebûn. Li gor gotina Yûnanan, Kambîses têşkê/cewrikê kuçikê û yê şêrê berdida hevdû, ew jin jî bi wî re rûniştibû û lê dinêrî, kuçik di binî de maye, di wê navê re cewrikekî din yê kuçikan, birayê yê din, benê xwe diqetîne û diçe hawarê; herdu dibin yek û şêrê biçûk dixwin. Ev Kambîses pir kêfxweş kir, lê jina wî ya li rex rûniştîbû girîyaye. Kambîses rondikên çavên wê dîtine, jê dipirse çima; wê jî gotîye ku dema min dît kuçik çû hawara birayê xwe min nekarî ez rondikên çavên xwe bigrim, ji ber ku Smerdîs hat bîra min, kesek nikarîbû biçe hawara wî. Li gor Yûnanîyan, Kambîses, li ser van gotinan ew kuştîye. Li gor Misrîyan jî, li ser maseyê rûniştine; keçikê rahiştîye xesekê û pelên wê yên derve jê kirine û ji mêrê xwe pirsîye, "Xes bi vî awayî pelên wê ji serê

bê avêtin xweşik e yan pelên wê li ser be?" Wî jî gotîye ku "Hemî pelên wê li ser bin xweşiktir e"; jina wî wî wextî gotîye: "Lê te jî temamê xanedana Kîros şibhande vê xesê, te ji mil û baskan kir." Bi hêrs çûyê bi ser jinikê de, daye ber pehînan; jinik bi zaro bûye; zaroka wê ji ber çûye û mirîye.

[33] Belê, Kambîses bi vî awayî ezîyet li kesên nêzîkî xwe dikir. Yan Apîs heyfa xwe hiltanî yan jî nexweşîyeke wî hebû, wek gelek felaketên ku miselletî serê insanan dibin: Bi rastî tê gotin ku Kambîses ji zikmakîyê ve nexweşîyeke wî ya giran hebûye. Normal e ku seqetîyeke bedenî bikaribe tendirûstîya mejî xera bike.

[34] Belê, niha jî kirêtîyên Kambîses yên li hemberî Persîyên din kirine: Mirovê herî zêde bawerîya wî pê hebû, Prexaspes bû, karên qasidîyê bi wî dida kirin, vexwarin ji destê kurê wî vedixwar, ku ev wezîfeke giring bû, rojekê got: "Prexaspes, Persî min çawa dibînin, ji bo min çi dibêjin? Yê din bersiv da û got: "Efendîyê min, ji bo te gotinên gelek baş, yê zêde te bilind dikin dibêjin, lê tenê dibêjin hinek zêde şerabê vedixwe, evqas." Wî hisên Persîyan dida xuyakirin, lê Kambîses hêrs bû û got: "Çi, Persî min girêdayî şerabê hesêb dikin û dibêjin şerabê ez ji rê derxistime û hişê min ji serê min birîye? Naxwe axaftinên wan ên berê yên li ser min ne rast bûn!" Bi rastî Kambîses rojekê, ku Kroîsos jî di civatê de bû, pirs kirîye ku dema Persî min bi bavê min re miqayese dikin çi dibêjin. Persîyan jî gotine, ew ji bavê xwe bilindtir e, ji ber ku ew erdê bavê wî hiştîye wekî xwe maye, bi ser de, wî heta Misrê û deryayê jî kirîye ser. Lê Kroîsos ku di nav wan de bûye, ev nirxandin zêde rast nedîtîye û ji Kambîses re gotîye: "Ey kurê Kîros, ez te bi bavê te re wekî hev nabînim; ji ber ku wî, ewladekî wekî te hişt, lê hêj ewladekî te yê wisan tune." Gelek kêfa Kambîses ji van gotinan re hatîye, pesnê nêrînên Kroîsos daye.

[35] Ev hatibûn bîra wî û berê xwe da Prexaspes û bi hêrs got: "Lêbinêre, niha Persî rast dibêjin, yan jî bêserûber diaxivin? Lêbinêre kurê te li vir e, li wê holê li ser pêyan sekinîye, heke ew tîra ez bavêjim tam li dilê wî bikeve, tê wê manayê ku gotinên Persîyan vala ne; heke ez lê nedim, wî wextî heqê Persîyan heye û hûn dikarin bêjin min aqlê xwe wenda kirîye." Ev got û kevan bar kir û kurik kuşt; zarok ket, gewdeyê wî da qelaştin, lê da nêrîn ka li

ku derê wî xistîye; tîr tam li dilê wî ketibû; gelek kêfa wî hat, devê wî gihişt ber guhê wî, ji bavê kurik re got: "Te dît "tê wê manayê ez ne dîn im û Persî vala diaxifin; va te bi çavê xwe dît. Lê niha bêje, te qet kesekî wekî min tîr bavêje û lêxe dîtîye? Kifş û zelal bû ku ew kesê li ber çavê Prexaspes dînek bû, ji serê xwe tirsîya û bersiv da: "Efendîyê min, li gor min xuda jî nikare evqas nîşanvan be." -Belê me'rîfetê Kambîses ev bûn; careke din jî duwazdeh kes ji giregirên Persan, bêyî ku sebebek berbiçav hebe, bi saxî serberjêr di nav axê de çikilandibû.

[36] Dema ku kar ket vî halî, Kroîsosê Lîdyayî xwestibû wî bi van gotinan îqaz bike: "Hikumdar, her wextê li pey xortînîya xwe û ew mêranîya xortînîyê daye te nekeve; xwe ragire, hakimê nefsa xwe be. Tiştê layîqî mirovên mezin dîtina pêşîya xwe ye, hinek giran be. Pêwistîya eqlî ev e. Tu belasebeb kesên ji miletê xwe didî kuştin. Heke tu wiha hereket bikî, diqet bike, Persî wê te terk bikin. Bavê te Kîros ji min xwestibû ku ez guh bidim te, şîretan li te bikim û fikrên ku bi kêrî te bên ji te re bêjim, ez ji ber vê van tiştan dibêjim." Kroîsos bi van gotinan girêdana xwe bi wî dida diyarkirin; lê Kambîses bi vî awayî bersiva wî da: "Tu eqil didî min, gelo te welatê xwe gelek baş birêve biribû, di şerê Massagetîyan de jî, wan dixwestin bimeşin ser me, lê yê derbasbûna ji Araxesê û êrîşa ser wan kir serê bavê min, ne tu bûyî? Ji ber ew rêya xerab ya te da pêşîya xwe, te bele anî serê xwe; ji bo Kîros jî guh da te serê wî jî ket belayê. Lê êdî bes e. Ji bo ez hesaba te jî bibînim, zû de bû ez li hêvîya vê firsetê bûm!" Ev gotin û ji bo bavêje wî dest avêt tîr û kevan. Kroîsos ji cihê xwe rabû û xwe avêt jiderve. Piştî ku tîr lê neket, emir da mirovên xwe û got: "Bigrin û bikûjin." Mirovên wî exlaqê hikumdar dizanîbûn, Kroîsos veşartin, dizanîbûn piştre wê poşman bibe û li Kroîsos bigere û fikirîn dê wî wextî ew derêxin (ji ber ku ji bo canê wî rizgar kirin dê hê bi ser de ji hikumdar pere jî werbigirin); heke poşman nebe û li ber nekeve, wî wextî çawa be wê îşê Kroîsos biqedandina. Û bi rastî gelek derbas nebû Kambîses, ji kirinên li Kroîsos poşman bû, dema ku mirovên wî ev dîtin, jê re gotin ku Kroîsos nemirîye. Wî wextî Kambîses, ji bo ku Kroîsos dijî ji wan zêdetir şa bûye, lê rizgarkirina wî dê feydekê nede wan û got dê ew bimrin û wisan jî kir.

[37] Di midetê li Memphîsê mayî de, li hemberî Persan û miletên hevalbendên wan tiştên dînîtî yên wekî van kirin; gorên zemanê kevin dan ve-

kirin û li mirîyan temaşe kir; ket perestgeha Hephaîstosê, henekên xwe bi peyker kir; ji ber ku peykera Hephaîstos eynî dişibe fîgûrên Fenîke yên jê re Pataîkos tê gotin ku Fenîkeyî dikirin pêşîya keştîyan û li dinyê digerandin. Ji yên nedîtine re ez dibêjim, ev di şiklên Pygmaîsonê de ne. Ketîye hindurê perestgeha goran jî, halbukî dîn tenê misaede dike kahîn bikevin vê perestgehê; bi ser de pêşî henekên xwe bi peykerên hindur kirine û piştre jî şewitandine. Ev peykerên han jî dişibe yên Hephaîstosê û tê gotin ku, ev xuda kurên wî ne.

[38] Ez li van tevan dinêrim û hukmê ku Kambîses dîn e didim. Yan na henekên xwe bi tiştên pîroz û adetên millî nedikir. Ji ber ku heke insanan azad bihêlin ji bo qanûnên herî sipehî hilbijêrin, her kes wê bigerîya û biçûya û bihata cardin wê yên xwe hilbijarta; herkes bawer dike ku qanûnên li welatê wan hene yên herî baş in. Ji ber vê, kesekî ku hişê wî li serî wî be, gerek henekên xwe bi tiştên rêz lê tên girtin neke. Gelek emareyên ku girêdana insanan bi ûrf û adetên wan ve xwedîyê rahên kûr in hene; vaye ji nav gelekan yek jê: Dema ku Daryûs hikumdar bû, rojekê Yûnanî li dora xwe berhev kirin û pirsî; "Hûn ji bo xwarina laşê bavê xwe yê mirî çiqas pere dixwazin?" Ev bersiv wergirt; wê di miqabilî tu fiyetî de tiştekî wiha nekin. Li ser vê Daryûs bangî Hindîyên ji wan re Kallatîaî tê gotin kir, wan dê û bavê xwe dixwarin, adetên wan wiha bû û li ba Yûnanîyan bi rêya wergêrekî ji wan pirsî, ji bo hûn bavê xwe yê mirî bişewitînin çiqas pere dixwazin; Hindîyan ev dijûn hesêb kirin, hêvî kirin ku bi wan re bi vî awayî neyê hereketkirin. Ev ûrf û adetên han ewqas xwedî reh in û ev rêzên Pîndaros çiqas rast in: "Qanûn, şahbanûya dinyê ye."

DÎKTATORÊ SAMOSÊ, POLYKRATES

[39] Dema ku Kambîses dimeşîya ser Misrê, li milê din Lakedaîmonî jî dimeşîyan ser Polykratesê kurê Aîakes yê li Samosê; Polykrates bi zorê derketibû ser text û pêşî komar kiribû sê beş û birayên xwe Pantagnotos û Syloson danîbû ser wan, piştre yê yekem kuştibû; Syloson jî, yanî yê duyem raqewirandibû, hemî girav kiribû bin hikmê xwe û bi vî awayî piştî hemî îktîdar kir bin hikmê xwe, ew û hikumdarê Misrê Amasîs diyarî pêşkêşî hevdu kiribûn û pê re peymaneke dostîyê imze kiribû. Di midetekî kurt de

Polykrates bûbû xwedî hêz, li her cihê Îonîayê û Yûnanistanê bûbû destan ketibû ser zimanan; sed keştîyên wî yên pênceh bêrî û hezar tîravêjê wî hebûn; bêyî ferqa dost û dujmin, biçûya çi cihî hemû talan û wêran dikir; Ji ber ku digot "Ji bedêla tu tiştekî ji dostekî wernegire, tu jê bistîne û piştre bidêyê tê çêtir wî dilxweş bike." Gelek girav, ji bilî wê di bejahîyê de jî gelek sîte bi dest xistibûn. Şerkerên Lesbosê yên bi lez hatibûn alîkarîya Mîletosîyan, piştî serkeftineke deryayî esîr girtibûn; temamê xendeqa dora Keleha Samosê, bi van hêsîrên zincîrkirî dabû kolan.

[**40**] Serkeftinên Polykrates ji ber çavê Amasîs nedirevîyan, heta ew dikir nav gûmanan. Dema ku si'ûda wî her diçû zêdetir li rûyê Ploykrates dikenîya, nameyek nivîsand û şand Samosê û hişyarîyeke wiha kir: "Amasîs ji Polykrates re dibêje ku, sehkirina serkeftîyên dostekî tiştekî xweş e. Lê ev bextewarîya te ya mezin bi min ne xweş e, ji ber ku ez xudayan nas dikim û ez dizanim çiqas hesûd in. Ji bo xwe û ji bo hezkirîyên xwe ez ji bedêla bextewarîyeke bê navber, jiyaneke hem serkeftin û hem neserkeftinê dihewîne dixwazim û ez hêvî dikim temenê insên bi wê çûn û hatina bextewarîyan dawî lê bê; ji ber ku heke kesek di hemî karên xwe de bi serketî be, talihê wî di nav zeman de dizîvire, dawîya wê xerab dibe; min ji bilî vî awayî qet seh nekirîye. Ji ber vê, heke tu jî bi min bawer bikî, li hemberî serkeftinên xwe wiha bike: Ji bo te tiştê herî bi qîmet e çi ye û ya ku tu ji wendakirina wê ditirsî çiye? Wê hilbijêre û bavêje dûr, ewqas dûr ku, careke din li ber çavê kesekî nekeve. Piştî wê heke si'ûda te li te nezîvire û heya ji te re yar be, her tim ya ez ji te re dibêjim bike, xwe xelas bike."

[41] Dema ku Polykrates ev gotin xwendin, heq da Amasîs; xezîneya xwe li hev xist, lêkola ka çi wenda bike dê herî zêde jê re bibe xem; hişê wî hat ser muhreke di tilîya wî de ya qet dernedixist, zumruteke di nav çarçoveke zêrîn de, karekî ji destê Theodorosê kurê Teleklesê Samosî derketî. Biryar da ku vê ji çav derxîne, siwarê keştîyeke pênceh bêrî bû û piştî qederekê ji giravê dûr bû, gustîl derxist û li ber çavê kesên di keştîyê de avêt deryayê. Piştre vegerîya û hat mala xwe, dest bi derxistina tahma xemê kir.

[42] Di ser vê bûyerê re çar-pênc roj derbas bûbûn, masîgirekî masîyekî mezin yê gelek sipehî girt û biryar da ku vê pêşkêşî Polykrates bike; rahişt

masî û bir serayê, xwest ku derkeve hizûra Polykrates û derket, masî pêşkêşî wî kir û got: "Hikumdar, min ev masî girt; ewqas rind e ku, di gel îdareya min li ser girtina masîyan e, lê min dil neda ez bibim li bazarê bifroşim; ez fikirîm ev tenê layîqî ji bo xwarina hikumdarekî wekî te ye; ji ber wê min ew ji te re anî." Ev gotin xweşa Polykrates çû û bersiv dayê: "Te gelekî baş kir û te wisan kir ku qîmeta diyarîya te derket du qatî; ez jî te bangî xwarina êvarê dikim." Ji bo masîgir daweta şîvê şerefek mezin bû pê serbilind bû, vegerîya mala xwe. Di vê navberê de xizmetkaran masî vekirin û dema paqij kirin mora axayê xwe di zikê wî de dîtin. Gelekî şa bûn, girtin û di cih de ji efendîyê xwe re birin, gustîl danê û çawa dîtine jê re gotin. Polykrates fêhim kir, di vî karî de tilîya îlahan hebû; tomareke papîrus girt, yên qewimîne nivîsand û bi qasidekî re şand Misrê.

[43] Amasîs, nameya Polykrates xwend û fêhim kir ku, rizgarkirina insanekî ji pençeyên felekê ne heddê kesekî ye û wê dawîya Polykrates bigihaya cihekî xerab, ji ber ku ewqas bextewer e ku, qurbanên wî jî jê re paşve tên vegerandin. Çawîşek şand Samosê, da xuyakirin ku peymana dostîyê xera kirîye. Wiha kir, ji ber ku heke belayek bê serê Polykrates, nedixwest di rêya dostîyê ew jî têkeve belayê de.

[44] Lakedaîmonîyan, li ser Polykrates yê bi vî awayî her wext bextewer bû sefer dabûn destpêkirin, yên ew teşwîqî vê seferê kiribûn jî, Samosî bûn yên piştre li Girîtê bajarê Kydonîayê ava kiribûn. -Wextê ku Kambîsesê kurê Kîros amadekarîya êrîşa ser Misrê dikir, Polykrates bêyî xeber bide Samosîyan çawîşek şandibu wir; ji Kambîses rica dikir, jê re qasidekî bişeyne û ji Samosê jî esker bixwaze, daxwaza wî ev bû. Kambîses ku ji vê gelekî kêfxweş bû, ji Polykrates xwest ku bila Samosî jî bi hêzeke deryayî beşdarê sefera Misrê bibin. Polykrates, bêpayîn kesên bi çavekî baş li wî nanêrin berhev kirin, çil keştî hazir kirin, ew tijî kirin û şandin, ji Kambîses re jî, xeber şand û got ku "eman van careke din paşve neşeyne".

[45] Hinek dibêjin ku, Samosîyên ku Polykrates ew şandin, heta Misrê neçûn, wextê gihiştine girava Karpathosê rewş fêhim kirine û ji wir wê de neçûne; li gor hinekên din jî, belê, gihiştine Misrê û di bin çav de hatine girtin, lê baz dane; dema ku gihiştine Samosê, Polykrates heza xwe ya deryayî

girtîye derketîye pêşberê wan û dest bi şer kirine; yên sirgunkirî şer kazanc kirine, derketine giravê, lê di şerê bejahîyê de wenda kirine û çûne Lakedaîmonê. Hinek jî dibêjin, di vegera xwe ya ji Misrê de, Polykrates mexlûb kirine, lê ev nêrîn bi min şaş tê, ji ber ku heke bi qasî li hemberî hikumranîyê bikarîbûna bisekinin bi qewet bûna, nediçûn ji Lakedaîmonîyan alîkarî nedixwestin. Jixwe kesekî ku di bin destê wî de eskerên bi heq yên biyanî, tîravêjên Samosî û artêşeke bi hêz hebe, nakeve serê kesî li hemberî Samosîyên koçber ên hejmara wan gelek kêm mexlûb bibin; heke hûn behsa hemwelatîyên di bin desthilata Polykrates de bikin, zarok û malbatên wan jî di bin destê wî de bûn: Ew li tersxaneyan berhev kiribûn, hazirî kiribû ku tev dezgehên deryayî agir berde tevan, yên hemwelatîyê wî bûn, nikarîbûn beşdarê yên din, serhildêran bibin.

[46] Samosîyên ji alîyê Polykrates ve hatin ajotin, dema ku gihiştin Spartayê derketin hizura mezinên bajêr, ji bo daxwazên xwe bidin qebûlkirin, gotarên dirêj xwendibûn. Roja ewil mezinên bajêr wekî bersiv gotin ku, di serî de çi gotibûn ji bîr kirine, di dawîyê de jî çi hatine gotin fêhim nekirine. Piştre careke din derketin hizurê, di destê wan de çewalek hebû, tenê gotin, "Çewal li hêvîya ardê cehî ne." Bersiv dan gotin, ne pêwist bû behsa "çewal" bikin; lê biryar hat dayîn ku alîkarîya wan bikin.

[47] Lakedaîmonîyan amadekarîya xwe kiribûn û ji bo şerê li hemberî Samosîyan derketin rê. Samosî vê li hemberî qencîyeke berê hesêb dikin, ji ber ku di şerekî li hemberî Messenîayan de, wan jî bi dayîna keştîyan alîkarî bi Lakedaîmonîyan re kiribûn; lê li gor gotina Lakedaîmonîyan, dema ku ev derketin seferê, armanca wan ji bo alîkarîya Samosîyên ricakar zêdetir, ji bo wergirtina toleya ew kraterosa(107)[109] wextekî ji Kroîsos re şandibûn û ew gomleka zirhî ya diyarîya Amasîsê hikumdarê Misrê bûye. Ji ber ku qorsanên Samosî, salek berîya ku kraterosê bidizin, ev gomleka zirhî jî bi dest xistibûn: Gomleka zirhî ji ketenê hatibû çêkirin, di vehûnandina wê de resmên ajalan hebû, bi sirme û pembûyan hatibû vehûnandin, ya taybetmendîya wê pêk dianî, girêkên wê bûn; di gel ku girêk ewqas tenik bûn, her yek ji sêsed û şêst benan hatibûn hûnandin û hemî jî lib lib dihatin

109 Pirtûk 1, beş 70

xuyakirin; ew gomleka zirhî ya Amasîs ji perestgeha Atheneyê ya li Lîndosê re diyarî kiribû wiha bû.

SEFERA SAMOSÊ Û PERÎANDROS

[48] Korînthosî jî beşdarî sefera Samosê bûn, bi can û ruh beşdar dibûn, ji ber ku ew jî neslek berîya vê seferê, di tarîxeke nêzîkî dizîna kraterosê de, Samosîyan heqaret li wan kiribûn. Perîandrosê kurê Kîpselos, sêsed zarokên ji malbatên bijarte yên Kerkyrayê hatibûn danhev, ji bo bixesînin şandibûn Sardesê ba Alyattes; Korînthosîyên zarok dibirin, di rê de serî li Samosê dan; Samosîyan guhê xwe dan zarokan. Ji bo çi ji Sardes re tên şandin hîn bûn; ji zarokan re gotin ku bikevin perestgeha Artemîsê û ji wir dernekevin; piştre gotin, em nikarin çavê xwe li kaşkirin û derxistina kesên di hindur de dua dikin bigrin. Lê Korînthosî jî izin nedidan ji zarokan re xwarinê bibin. Wî wextî Samosîyan merasimeke din ya ayînî peyda kirin ku, îro jî bi eynî awayî tê pîrozkirin. Ev zarok dema ku ji xwedawendê re dua dikin, êvaran koroyeke ji law û keçikan pêkhatî dişandin perestgehê; zarokan, ji bo ji xwedawendê re bê pêşkêşkirin kadeyên bi kuncî û hingivîn dibirin; zarokên Kerkyrayî jî ew didizîn û dixwarin, yanî wiha li hev kiribûn. Heta Korînthosî zarok hiştin û çûn bi vî awayî dewam kirin; Samosîyan zarok paşde birin Kerkyrayê.

[49] Dema em li eslê wê binêrin, heke piştî mirina Perîandros, navbera Korînthosî û Kerkyrayîyan baş bûya, nayê hizirkirin ku ji ber sedemeke weha Korînthosî beşdarî sefera li hemberî Samosîyan bibin; bi rastî piştî girav kirin kolonî û heta niha, dijmintîya di navbera wan de (di gel ku pismamên hev bûn) nehatibû bidawîkirin. -Sebebê neyarîya Korînthosîyan li himber Samosîyan ev e.

[50] Sebebê Perîandros hebûn, dema zarokên malbatên xuyayî ji bo xesandinê şandin Sardesê, ji ber ku berî wê Kerkyrayîyan jî li hemberî wan tawanên giran kiribûn. Piştî Perîandros jina xwe Melîssa kuşt, bi felaketa hate serî derdê wî nû bûbû; ji Melîssayê du kurên wî çêbûbûn, yek jê hivde salî û yê din jî ketibû hîjdehan. Proklosê bavê dayîka wan yê hikumranê Epîdaûrosê, zarok biribûn ba xwe, gelekî qenc bû ji wan re, ev tiştekî nor-

mal bû, ji ber ku zarokên keça wî bûn. Roja wê vegerin ji wan re wiha gotibû: "Zarokên min, hûn dizanin kê dayîka we kuşt?" Yê mezin guhê xwe nedabû van gotinan, lê yê biçûk ku navê wî Lykophron bû, êşek ketibû ser dilan; dema ku vegerîya Korînthosê, bi bavê xwe re neaxivt, li wî bi çavê qatilê dêya xwe dinêrî; bersiva gotinên bavê xwe nedida; pirs bêdeng dihiştin. Piştre Perîandros hêrs bûbû û ew ji seraya xwe raqewirandibû.

[51] Piştî vê ji kurê xwe yê mezin pirsî, bapîrê we ji we re çi got. Kurê wî behsa çawa bi dilovanî hatine pêşwazîkirin kir, lê axaftina ku Prokles di dema veqetandinê de kiribû, ji bîr kir behsa wê bike, jixwe baş seh nekiribû. Lê Perîandros, qebûl nedikir ku bapîrê wan tiştek nexistibe serê zarokan, bi israr pirsên xwe domand; di dawîyê de axaftina veqetandinê hat bîra kurik û qise kir. Perîandros fêhim kir û ji bo ku nexwest xwe nerm bûye bide nîşan, xeber şand ji wan kesên lawik li ba wan dihewe, got; wî raqewirînin û careke din jî bila kesek wî neke bin banê xwe. Lawik bi vî awayî dema ku ji malekî davêtin diçû maleke din, piştre Perîandros emrê qedexeyê ji wir re jî dişand; lê wextê ji cihekî dihat avêtin, ji ber ku kurê Perîandros bû, bi tirs be jî, cardin maleke din ew qebûl dikir.

[52] Di dawîyê de Perîandros belav kir ku, kesê kurê wî bigre bin banê xwe û yan jî bi wî re biaxive, wê wek ceze hinek pere bide perestgeha Apollon; ceze çikaseye di pêşî de hatîye kifşkirin. Li ser vî emrî kesekî nexwest wî bigre mala xwe û bi wî re biaxive; jixwe xort jî li hemberî emir nesekinî; zemanê xwe di bin kemeran de derbas dikir, ji halê xwe gazin nedikir. Roja çaran Perîandros halê wî yê bêşûştin û birçî dît, dilê wî pê şewitî; kerba wî sivik bû; çû balê û ev jê re gotin: "Tu çi dibêjî kurê min, kîjan baş e, ev halê te, yan jî tu guhê xwe bidî bavê xwe û ji hêza wî û ji nîmetên di destê wî de hene sûd werbigirî? Tu kurê min î, tu hikumdarê vê Korînthosa dewlemend î û tu wekî parsekan dijî, tu kesê ku canê te deyndarê wî ye rexne dikî, li hemberî wî radibî. Ji bo ew felaketa hat serê me tu gazina ji min dikî, lê di eslê xwe de felaket hatîye serê min, yê herî zêde canê wî şewitîye ez im, berpirsyarîya min çiqas mezin e ew êş û elema ez dikêşim jî ewqas mezin e. Em bên ser te, niha di cihê ku dilê xelkê bi te bişewite, pêwist e tu bibî kesek ku hesûdî jê bê kirin û gerek te fêm kiribe, kerb û kîna ji bavan û kesên bi hêz insan dikêşe ber bi ku ve; niha êdî vegere mal." Perîandros bi vê dixwest

kurê xwe ji nû ve qezenc bike. Lê kurê wî ji bavê xwe re, tenê, ji bo ku bi wî re axivîye, pêwist e ji xudawendê re ceza bide, got. Perîandros lê nêrî ku çareya vî derdî tune û bi vê re nikare îdare bike, ji bo ku çavê wî nebîne lawik li keştîyê siwarê kir û ajote Kerkyrayê, jixwe wir jî di bin hukmê wî de bû. Piştî zarok çû Perîandros meşîya ser xezûrê xwe Proklos, yê ev derd anîn serê wî. Epîdaûros zept kir, Proklos da girtin û wekî girtî li ba xwe hişt.

[53] Zeman derbas bû; Perîandros kal bû, didît ku êdî nema bi kêrî karê dewletê, birêvebirîyê tê. Mirov şandin Kerkyrayê bangî kurê xwe Lykophron kir, dê wî danîbûya cihê xwe, ji ber ku ronahîya jêhatîyê di kurê xwe yê din de nedidît, kesekî bêkêr bû. Lê Lykophron ji xebera girt re bersiv jî neda. Perîandros dev ji kurê xwe bernedida, vê carê keça xwe şand, hesab kir xelkê din ku nekarîn kurê wî bînin, belkî xweha wî wî bîne. Keçik çû û bi vî awayî pê re axift: "Lawo, tu dixwazî hikumranî bikeve dest hinekên din? Heke tu serveta bavê me negrî destê xwe, yê wê bigre dê di destê wî de bimîne, ya tu dixwazî ev e? Were wiha neke, vegere ba me; êdî dev ji wê ezîyeta ku tu dide xwe berde. Evqas rikdarî ne tiştekî baş e(108); xerabî bi xerabîyê rast nabe. Gelek kes wextê hewce dike dest ji edaletê dikêşe. Hinek jî doza dayîka xwe dimeşînin û pêhînekê li malê bavê xwe dixe. Hikumranî tiştekî bi şêlûbêl e; gelek derdan derdixe; bavê me êdî kal bûye, ketîye; tiştên di destê wî de ji xelkê re nehêle." Tiştên bavê wî pê dabû jiberkirin tekrardubare dikir û tiştên bawerpêkirî digotin; lê wî got, heta bavê wî sax be wê venegere Korînthosê. Keçik vegerîya, ev gotin gihandin bavê xwe. Perîandros vê carê, cara sisiyan çawîşek şand; digot, wê ew bi xwe biçe Kerkyrayê li wir bi cih bibe û bila kurê wî bê Korînthosê li cihê wî, hikumdarîyê bigire destê xwe. Kurê wî ev şert qebûl kirin. Perîandros ji bo biçe Kerkyrayê, kurê wî jî vegere Korînthosê dest bi amadekarîyê kir. Lê Kerkyrayî vê hîn bûbûn, ji bo ku Perîandros neyê li ba wan rûnene, ew xort kuştin. Perîandros, ji bo vê dixwest zarokên Kerkyrayîyan bixesîne.

[54] Lakedaîmonî bi hêzeke mezin ya deryayî hatin û Samos dorpêç kirin, meşîyan ser kelehê, hê pê xwe nedanîbûn ser birca qiraxê deryayê, ku ev birc dikeve rexê hêşeta bajêr; Polykrates yekîneke boş girt ba xwe û hat vê noqteyê û yên din belav kirin. Eskerên bi heq û hejmareke zêde hevwelatîyên Samosî yên hakimê pêşkên çiyê, ji îstîqameta milê ku hindur dipa-

rast tûj ajotin ser Lakedaîmonîyan; lê nikarîbûn demeke dirêj xwe li hemberî wan ragirin û baz dan.

[55] Lakedaîmonîyên ketin pey wan, digihiştinê kê dikuştin. Heke wê rojê hemî Lakedamonîyan yên li wir weke Arkhîasê û Lykopasê kiribûna, dê Samos biketa. Arkhîas û Lykopas bi tena serê xwe ketibûn pey Samosîyên baz didan, dîtin ku kes li pişt wan nemaye û di nav bajarê Samosê de can dan. Min Arkhîasekî din nas kir, ew zarokê Samîosê kurê Arkhîas bû. Yanî dibû nevîyê yê din; ez li Pîtaneyê lê rast hatim, cihê ku lê xwecih bû; di nav biyanîyan de wî herî zêde rêz li Samosîyan digirt; navlêkirina Samîos li bavê wî, wî bi xwe ji min re got, ji ber ku kurê Arkhîas bû yê li Samosê bi mêrxasî canê xwe dabû. Ji Samosîyan re hurmeta wî hebû, ji ber ku wan rêz li bapîrê wî girtibûn, li gor ûrf û adetên xwe merasima cenazeyê bapîrê wî çêkirine, bi wî awayî veşartine.

[56] Lakedaîmonî li pêşîya Samosê çil roj mane, bi ser neketine û vegerîyane Peloponezê. Li gor gotegoteke ehmeqî ya zêde belav bûye, Polykrates gelek pere tab kirîye, ew û pereyên welatê xwe yên ji risasê û di ava zêr dakirî daye wan; wan jî qebûl kirine û bi vî awayî ji destê wan rizgar bûye. Ev cara ewil e ku Dorên Lakedaîmonî li hemberî Asyayê sefer dane destpêkirin.

[57] Samosîyên li hemberî Polykrates tevdigerîyan, dema pê hesîyan wê Lakedaîmonî wan terk bikin, bazdin, ber bi Sîphnosê ve ba dan babirkên xwe. Pêwist bû bi awayekî pere bi dest bixistana û rewşa Sîphnosîyan gelekî baş bû; yên herî dewlemend ên li giravê dijîyan ew bûn, ji ber ku li giravê kanên zêr û zîv hebûn û ji dehan yekê serweta ji bin erdê derdixistin, didan Delphîyê û kiribûn xwedî xezîneyeke mezin; hatinîyên ji madenan bi dest diket, her salê di navbera xwe de parve dikirin. -Dema ku xezîneya wê pêşkêşî Delphîyê bikirina berhev dikirin, bi kahîn şêwirîn û pirsîn, dê ev dewlemendî her tim bi vî awayî dom bike; Pythîa ev bersiv da wan:

Lê kengî ku Sîphnos spîbûna Prytaneîon bibîne
Û meydanên xemilandî spî li xwe kirin
Dê nesîheteke bi aqilane gelek bi kêrî wan bê
Li hemberî qasidên sor û texteyên çav boyax dikin

Wî wextî li Sîphnosê, Prytaneîon û agora bi mermerên Parosê yên balkêş hatibûn çêkirin.

[58] Ev kehanet wî wextî, heta piştî Samosî hatin jî nehate fêhimkirin û ma. Dema Samosî gihiştin qiraxên Sîphnosê, qasidê xwe li keştîyekê siwar kirin û şandin. Berê keştî bi sorê biriqandî dihatin boyaxkirin. Dema ku Pythîa, Sîphnosî li hemberî texteyên ku çav dadigrin û qasidên sor hişyar dikir, xwestibû vê bêje. Qasid hatin û ji Sîphnosîyan deh talant deyn xwestin. Dema ku Sîphnosîyan xwe nedan ber, Samosîyan dest bi talanê kirin. Sîphnosî ji bo malên xwe biparêzên derketin pêş, şer derket, mexlûb bûn; Samosîyan nehiştin piranîya wan têkevin nav bajêr. Piştre sed talant bac li wan girêdan.

[59] Samosî ji Hermîonîyan girava Hydreîayê ya nêzîkî Peloponezê kirrîn û emanetî Troîzenîyan kirin. Bi xwe çûn Giritê û li wir Kydonîayê ava kirin; mebesta wan a çûna vir ne ew bû, ji bo Zakynthosîyan ji giravê derxînin çûbûn. Pênc sal li wir man, dewlemend bûn; îro ew perestgehên li Kydonîayê tên dîtin ji destê wan derketine, erdê Dîktynnayê jî yê wan e. Di sala şeşan de şerekî deryayî çêbû. Aîgînîayîyan ew mexlûb kirin, bi alîkarîya Gîrîtîyan ew kirin kole, mehmuzên di şibyetê serê beraz de yên pêşîya keştîyan dixemilînin, jê kirin, birin û li perestgeha Atheneyê ya li Aîgînîayê daliqandin. Ev netîceya dijmintîya Aîgînîayîyan ya li hemberî Samosîyan bû; ji ber ku berî wê Samosî, di zemanê ku Amphîkrates li Samosê hikum dimeşand, li hemberî Aîgînîayê sefer dabûn destpêkirin û bi xwe jî ku gelek zerar dîtibûn, gelek xerabîyên wan gihiştibû Aîgînîayan.

[60] Hêrsa Aîgînîayan ji ber vê bû. -Ez zêde li ser Samosîyan sekînim, ji ber ku temamê Yûnanistanê ji bo sê berhemên xwe yên mezin deyndarê wan in. Di serî de, tunelek tê ya li çiyayekî hatîye vekirin yê bilindahîya wê sed û pêncî qulaç tê; li binê çiyê ji devekî dikevêyê, çiyê qul dike, ji devê wê yê li milê din derdikeve. Dirêjahîya wê heft stad e, firehî û bilindahîya wê heyşt pê ne. Di seranserê vê rêyê de firehîya wê sê pê û kûrahîya wê bîst enîşk cihekî duyem yê hatîye kolan heye; ev jî riya avê ye, ava ji çavkanîyeke gurr derdikeve, bi borîyan di vê riyê re dikşînin bajêr. Yê vî karî îdare dike, Eupalînnosê Megarayî yê mihendis e, ew kurê Naustrophos e. Ji wan sê berhemên ez dibêjim,

ev yek ji wan e. Ya duduyan mendîreka ku benderê radipêçe, kûrahîya wê firah firah bîst qulaç dikêşe, dirêjahîya wê jî du stadan derbas dike. Ya siyiyan perestgehek e, ya herî mezin ew perestgehên em dizanin ew e;[110] mîmarê wê yê yekem kesekî xwecihê wir e, ew Rhoîkosê kurê Phîles e. Belê, ez ji ber van berheman hinek zêde li ser Samosîyan sekinînim.

SERHILDANA MAGÎYAN (MAXAN/MOXAN)

[61] Bila Kambîsesê kurê Kîros li Misrê bi tiştên tewş û mewşî ve xwe mijûl bike, du Magî, du bira, li hemberî wî serî hildan; yek ji wan ew kes bû ku wezîfeya îdareya mal û milkê xwe dabûyê; hemî îş ji bin serê wî derdiket. Lênêrî ku mirina Smerdîs dizî tê girtin û yên dizanin gelek kêm in û piraya xelkê digotin qey dijî. Plana xwe li ser vê danî û êrîşî serayê kir. Birayekî wî hebû, min berîya niha jî gotibû, ew jî tevlî wî bû. Ev bira, eynî dişibîya Smerdîsê kurê Kîros û birayê Kambîses yê ji alîyê Kambîses ve hat kuştin. Hem tenê ne dişibîya wî, navê wî jî Smerdîs bû. Patîzeîthesê Magî, bawerî da wî ku, wê temamê kar li ser navê wî bigirta ser xwe û bir li ser text da rûniştandin. Piştre peyamnêr şandin her milî, heta Misrê û got: "Dê ji vir şûn ve artêş ne ji Kambîses, ji Smerdîsê kurê Kîros emir werbigire."

[62] Peyamnêran xeber belavî çaralîyan kirin; ji van yên şandibûn Misrê, li bajarê Akbatanê yê Sûrîyê, rastî Kambîses û artêşa wî hat; di navenda esker de li ser pêyan gotinên Magan da xuyakirin. Kambîses jî gotinên qasid seh kiribû; dil wî de ku rast dibêje û fikirî ku Prexaspesê ji bo kuştina Smerdîs şandibû, gotina wî pêk neanîbû û xayîntî kiribû. Berê xwe da Prexapes û jê re got: "Naxwe Prexapes, ew emrê min da te bi vî awayî pêk anî!" -Wî bersiv da û got: "Efendîyê min, xebera serhildana birayê te Smerdîs li himberê te, ne rast e, tu nikarî rojek ji rojan li hêvîya serhildaneke ji alîyê wî ve bê bibî. Min bi xwe piştî min emrê te pêk anî, bi destê xwe min ew veşart. Belê, heke mirî ji gora xwe rabin, wî wextî tu dikarî bifikirî Astîyagoyê Medî jî dikare li hemberî te rabe; lê heke tiştê ku doh rast bû îro jî rast be, bila tirsa te ji ajardana belayekî ji kokê ve tunebe. Heke hûn ji min bipirsin, lazim e em qasid bigrin û jê bipirsin, em lê binêrin yê dibêjin guhê xwe bidin emrên Smerdes kî ne?"

110 Yanî perestgehên li Yûnanistanê.

[63] Kambîses, bawerî bi van gotinên Prexaspes kirin; qasid girtin û anîn, Prexaspes wiha jê pirsî: "Madem tu dibêjî Smerdîsê kurê Kîros tu şandîye, heke tu rastîyê ji me re bêjî, em îşê xwe ji te naynin, cardin tê vegerî û biçî, te ev emir ji Smerdîs bi xwe wergirtin, yan ji kesekî ji mirovên wî?" Qasid got ku "Min Smerdîsê kurê Kîros, ji dema Kamsyses Misrê girtîye heta niha qet nedîtîye; ew mirovê ev emir da min, Magê li karê Kambîses dinêre; ew wezîfeya em wan bêjin, Smerdîsê kurê Kîros ji wî re gotîye, wî wisan got." Qasid tiştek veneşartibû, rastî gotibû. Kambîses ji Prexaspes re got, "Wî wextî ew emrê te girt bi awayekî rast te bi cih kir, ez bawerî bi te dikim; lê kî dikare navê Smerdîs werbigire û li Persê li hemberî min serî hilde?" Prexaspes bersiv dayê û got: "Hikumdar, we ku tiştên diqewimin ez fêhim dikim, yên serê vî karî dimeşînin Magî ne; Patîzeîthes û birayê wî Smerdîs ên te karên xwe emanetê wan kirin."

[64] Dema ku navê Smerdîs seh kir, hevgirtîya di van gotinan de û xewna dîtîbû fêhm kir; tê bîra we, bi şev kesek hatibû dîtin û gotibû ku wê Smerdîs li ser textê hikumdarîyê rûne û serê wî bigehe asîman. Fêhm kir ku beleheq birayê xwe daye kuştin û ji bo Smerdîs rondik barandin, gazin ji van tesadufan kir, piştre li hespê xwe siwar bû, bêyî ku wext derbas bike dixwest biçe Sûsayê û êrîşê Magîyan bike. Dema ku derket ser zînê, xeleka destîyê şûrê wî digre vebû, şûr rût ma û di rehnê wî re çû. Ji cihê wextekî li Apîsê Misrî dabû birîndar bûbû. Kambîses fêhm kir birîn kuştarî ye, pirs kir ku niha li kîjan bajarî ne; jê re gotin "Akbatana". Berê kahîn Bûto jê re gotibû ku tu dê rojên xwe yên dawîyê li Akbatanê derbas bikî. Wî ew Akbatana Mediayê fêhm kiribû, hemî hebûna wî li wir bû, dê li wir bijîya û li wir jî bimra. Niha dihat fêhimkirin ku, Akbatana kahîn behs kirîye, yê li Sûrîyê ye. Piştî ku pirsa navê bajêr kir û hîn bû, tesadufa di navbera serhildana Magan û birîndarbûna xwe de peymendî danî, hişê wî hat serî, maneya di gotinên kahînê de fêhm kir û got "Kambîsesê kurê Kîros, tê wê maneyê dawîya te li vir e". Û ji wê rojê şûnve êdî careke din devê xwe venekir.

[65] Bîst roj şûn de bangî giregirên Persîyan yên di nav artêşê de bûn kir û ji wan re ev axaftin kir: "Rewş ez mecbûr kirim ku tiştên min gelek bi hûrûkûr veşartibûn ji we re bêjim. Wextê em li Misrê bûn reşahîyek hat xewna min, Xweda careke din nede nîşan. Min got qey qasidek ji welatê me

hatîye; ji min re got, Smerdîs li ser textê hikumdarîyê rûniştîye û serê wî gihiştîye asiman. Ez tirsîyam: Wê birayê min cihê min ji destê min bistenda. Di cihê ku ez baş bifikirim min lez kir; ez niha fêhim dikim ku, tiştek ji dest nayê ku mirov li hemberî nivîsa enîyê derkeve. Serê min yê bêhiş. Ji bo ku Smerdîs bikuje, min Prexaspes şand Sûsayê. Piştî ev cinayeta sawdar hat kirin, qet nehatibû hişê min ku wê rojek kesek li hemberî min serî hilde. Lê ez li ser nivîsa enîyê xapiyabûm; ji bo wê ku qet ne pêwist bû destê min tevlî xwîna birayê min bû û cardin min textê xwe wenda kir; yê ew ji min stend ev Magî bû, yê xuda di xewnê de ji min re xeber şandibû ku wê serî hilde ev Smerdîs bû. Bi goteneke kurt, min ev kuştin kir; dê hûn bêjin ev tê wê wateya ku, Smerdîsê kurê Kîros êdî tune. Niha yên li seraya hikumdarîyê emiran dişînin Magî ne. Ew kesê min ji bo li mal û milkên min binêre li wir hiştibû û birayê wî Smerdîs e. Yekem kesê ku ez li hemberî vê destdirêjîya rûmetşikandinê ya Magîyan biparasta êdî najî, ji alîyê kesên herî nêzîk û ezîz ve ji jiyanê hatîye bêparkirin. Madem ew êdî tune, gelî Persîyan, ji bo rewşa piştî min, di dawîya temenê xwe de yên ez bikaribim daxwazên xwe ji wan re bêjim, tenê hûn in. Bi navê xwedayên ku nobedarîya mala me ya hukumdarîyê dikin, ez ê ji we re wezîfeya we çiye bêjim; izin nedin text dîsa bikeve destê Medîyan; heke bi hîle bi dest bêxin, hûn jî serî li hîleyan bidin; heke bi zorî bistînin, hûn jî bi zorê, bi artêşa xwe ji destê wan bistînin. Heke hûn van tiştên ez dibêjim bikin, ez jî hêvî dikim, axa we çandinîya bi bereket, jinên we zarokan û kerîyên we dewlemendîyê bidin we. Her wext azad bijîn. Lê heke hûn hukumdarîyê bi dest nexînin, yan qet nebe ji bo wê nexebitin, ez ji xudayan daxwaz dikim ku serê we ji beleyan xelas nebe û cardin ez hêvî dikim aqûbeta hemî Persîyan bila wekî ya min be." Wextê Kambîses ev digotin, ji bo qedera xwe rondik dibarandin.

[66] Persîyên ku girîyê hikumdarê xwe dîtin, wekî bi hev re ketibin pêşbirkîyê ser û rûyê xwe veçirandin û dest bi zarîna dawîya wan nayê kirin. Piştre birîn giha hestîyan, goşt dest bi rizînê kir û nexweşî Kambîses kurê Kîros hilda û bir, tev li ser hev heft sal û pênc meh seltenet meşandibû, tu kur û keç li pey xwe nehiştibûn. Persîyên guhê xwe dan gotinên wî, zêde bawer nedikirin ku Magî desthilat girtine destê xwe; wan texmîn dikir ku mebesta gotinên Kambîses yê li ser mirina birayê wî, ji bo xerabîyê bi birayê xwe bike û beşa împaratorîyê ya Aryanê li hemberî wî rake. Bi rastî jî bawer

dikirin ku seltenet di destê Smerdesê kurê Kîros de ye. Jixwe Prexaspes jî nedigot min Smerdîs kuştîye; ji ber ku piştî Kambîses mir, nedihat hesaba wî ku bêje min bi destê xwe kurê Kîros kuşt.

[**67**] Mag, piştî Kambîses mir, bi navê hevnavê xwe Smerdes bê xem seltenet dimeşand, di midetê heft mehan de, ku sala heyştem ya selteneta Kambîses tijî dibû; di vî midetî de feydeya wî gihiştibû herkesî yên di bin hemwelatîya wî de; bi awayekî wisan ku, dema mir, ji derveyî Persê hemî miletên Asyayê şîn girêden. Bi rastî ev Mag, mirov şandibûn her derê welat û dabû xuyakirin ku wê sê salan bac ji wan nestîne û kesekî jî negre eskerîyê; ev biryar bi derketina wî ser seltenetê hatibû belavkirin. -Lê di meha heştan de hîlebazîya wî bi vî awayî derket orteyê:

AMADEKARÎYÊN XISTINA MAG

[**68**] Otanes, kurê Farnaspes bû; hem di hêla hatina wî ya dinyê de û hem jî di hêla dewlemendîyê de, di nav Persîyan de kesekî guzîde dihat hesêbkirin. Pêşî gûman bi vî Otanesî re çêbû, fêhim kir ku ev Smerdîsê han ne kurê Kîros e û ji bilî vê yekê texmîn kir ku ew bi rastî kî ye; Mag, gav nediavêt derveyî serayê û bi kesên esîl yên Persîyan re rûbirû nedibû; vê rê da ku rastîyê texmîn bike. Belê, piştî bi vî awayî şik pê re çêbû, ka em lêbinêrin çi kir: Kambîses bi keçeke wî re zewicîbû, navê wê Phaîdyme bû; piştre Mag pê re zewicîbû û bi hemî jinên Kambîses yên din re di herema Mag de dijîya. Otanes ji keça xwe da pirsîn, yê tu nivînê xwe pê re parve dikî kî ye? Ew kurê Kîros Smerdîs e yan kesekî din e? Keçikê bersiv da û got: "Ez nizanim." Wê qet kurê Kîros Smerdîs nedîtîye û nedizanî ka yê di nivînê wê de ye kî ye. Otanes xebereke din şand û got: "Madem te kurê Kîros Smerdîs nedîtîye û tu wî nas nakî, wî wextî ji Attosa bipirse, ev mirov kî ye, ji ber ku hûn herdu jî di eynî cihî de dijîn, qet nebe ew birayê xwe nas dike."

[**69**] Keça Otanes vê carê ev bersiv da: "Ez ne dikarim bi Atossayê re biaxifim û ez ne jî dikarim jineke di vê serayê dijî bibînim. Yê li ser text rûdine kî dibe bila bibe, wî roja yekem em ji hevdû veqetandin û di cihên cihê yên serayê de da girtin." Van gotinan rewş di çavê Otanes de ronî dikir. Cara sisiyan ji keça xwe re xeber şand û got: "Ey keça min, tu keça malbateke esîl

î, pêwist e bicihkirina ew emrên bavê te dide te, tu xwe ji avêtina xeterê neparêzî. Heke ev ne Smerdîsê kurê Kîros be û ew kesê ez texmîn dikim ew be, hewce ye em bi awayekî rehet ne bibe xwedîyê te û ne jî hikumdarîya Persê; ya pêwist e bê kirin, ew cezayê wî heq kirîye jê re bê dayîn. Ji ber vê tiştên ez dibêjim bike: dema ku di nivînê te de radikeve, bi destê xwe lê bipelîne, lê binêre ka gelo guhên wî hene, heke hebin, wî wextî tê fêhim bikî ku yê di nivînê te de radikeve Smerdîsê kurê Kîros e; lê heke tunebe, fêhim bike ku yê li rexê te Smerdîsê Mag e." Phaîdyme bersiv da û got ku wê ew bi vê xwe bavêje nav xeterîyeke mezin; heke bi rastî guhên wî tune û pê bihese dest li guhê wî tê dayîn, bêgûman dê wê ji orteyê rake; lê cardin dê emrê wî bi cih bike. -Wezîfe ji bo xatirê bavê xwe qebûl kir. Dema ku Kambîsesê kurê Kîros li ser desthilatê bû guhê vî Magî dabû birîn, bêguman tawanê wî ne tiştekî sivik bû. -Belê, ev Phaîdyme, keça Otanes, gotinên bavê xwe bi cih kirin. Dema dora çûna ba Mag hat wê -ji ber ku jinên Persî bi dorê diçin nivînê mêrê xwe- çû û dema ku Mag ket xew, dest da guhê wî û bêyî ku rastî xeterekê bê, dît ku guhê wî tune. Dema ku bû sibe ji bavê xwe re xeber şand.

[70] Otanes, du kesên Persî yên herî mezin kêşan milekî, ew kesên herî bawerpêkirî yên bikare nehênîyan ji wan re bêje û tiştên qewimîne ji wan re got. Ew bi xwe jî di nav şikê de bûn. Otanes ew hazir dîtin ku bawerîyê bi wî bikin. Wê her yekî ji wan Persîyekî din yê ku pê bawer e, mesele vekira, bi vî awayî biryar dan. Otanes, Întaphernes, Gobyryas, Megabyzos, Aspathînes û Hydarnes girtin nav xwe. Dema ku Daryûsê kurê Hîstaspes hat Sûsayê hejmara wan şeş bû; bavê Daryûs li Persê satrap bû. Dema ku Daryûs hat, biryar dan ku wî jî bigrin nav xwe.

[71] Ev heft kesên organîzator di navbera xwe de berhev bûn, sûnda girêdana bi hev ve xwarin û rûniştin dest bi axaftinê kirin. Dema ku dora axaftinê hat Daryûs, nêrînên xwe bi van gotinan îzah kirin: "Min texmîn dikir ez tenê dizanim kurê Kîros Smerdîs hatîye kuştin û yê li ser text rûniştîye Mag e. Sebebê hatina min ya vir bi lez jî, rakirina wî ya ji orteyê bû. Lê madem hûn jî rewşê dizanin û ez di vî warî de ne tenê me, bi min, pêwist e bêyî em bisekinin dest bi hereketê bikin; em beredayî wext winda nekin." Dema ku dora wî hat, Otanes jî axivî û got: "Kurê Hystapes, tu kurê bavekî esîl î û ez dibînim tu jî bi qasî bavê xwe bi qîmet î; lê di vî karî de lez neke, hûrûkûr

bifikire, rêya herî ewlehî kîjan e wê bibîne û li ser wê bimeşe; ji bo em dest bi hereketê bikin, pêwist e em hê qelebalix bin." Daryûs bersiv da û got: "Ey kesên li vir amade ne, heke hûn yên wekî Otanes dibêje bikin, bizanibin dê hûn bi awayekî laletayîn bimrin; qet şika we tunebe, yekî xayîn derkeve, ji bo menfeta xwe ya şexsî, dikare biçe we bifroşe Mag. Her yek ji me ev kar bi tena serê xwe bigirta wê baştir bûya; lê madem we baş dîtîye surê ji hinekên din re jî vekin û we ez jî tevlî vî karî kirim; ji îro pê ve, em bê sekin dest bi hereketê bikin, heke na, hûn baş bizanibin, em îro nekin, ez namînim li hêvîya ku yek xebera min bigehîne wî, ez ê bi xwe biçim û her tiştî ji Mag re îzah bikim."

[72] Dema Otanes dît ku Daryûs kelgermî ye bi vî awayî bersiv da wî: "Madem tu zor didî me ku em a niha dest bi hereketê bikin û ji bo baş fikirînê zeman nahêlî, wî wextî bêje ka em ê çawa bikevin serayê, em ê çawa êrîşê van kesan bikin? Ez texmîn dikim ku tu jî bi qasî me dizanî, her cih ji alîyê nobedaran ve hatîye girtin; te bi çavê xwe bi xwe nedîtibe jî te ev seh kirîye; wî wextî em ê çawa wan derbas bibin." Daryûs got: "Ew tiştê bi kar tê pêkanîn, îzahkirina wê bi gotinan gelek car têrê nake; wekî din jî carna gelek gotin têne gotin, lê dema pêkhatina wê mirov nikare bigihîne serkeftinê. Vê zanibin, derbasbûna ji nobedaran ne tiştekî zehmet e. Pêşî ji kesên wekî me re, dixwaze bi rêzgirtinê û dixwaze ji tirsan, yê derîyê serayê ji me re veneke tune; ji bilî vê ji bo ez bikevim serayê sebebên min yên taybet jî hene; ez ê bêjim ez ji Persê nû hatime û min ji bavê xwe ji bo hikumdar xeber anîne. Ji ber ku cihê derew pêwist be lazim e em xwe jê nedin alîyekî; dixwaze em derewîn bin yan dixwaze em qet ji rastîyê dernekevin, gelo em ne ji bo eynî armancê dixebitin? Hinek ji bo ji xwe re menfeetê bi dest bixe derewan dike, hinek jî rastîyê dibêjin, ji bo ku bê gotin ew insanekî rast dibêje û di pêşerojê de ji wî bê bawerkirin. Tê wê wateyê em bi rêyên cihê dixwazin bigihin eynî armancê. Heke di holê de feydeke bi dest bikeve tunebe, ha kesekî rastîn derew kirîye, ha derewînekî rast gotîye, tu ferqa wê tune. Ew nobedarên ku me bi aramî bigrin hindur, wê di rojên pêş de poşman nebin; heke yên bixwazin rê li me bigrin derkevin, em ê di cih de wan dujmin bihesibînin û bê sekin em ê bikevin hindur û karê xwe biqedînin."

[73] Gobryas dest bi axaftinê kir û got: "Gelî dostan, wê firseteke wiha kengî bi destê me bikeve? Em ê împaratorîyê rizgar bikin, heke em rizgar nekin

jî em ê canê xwe bidin. Em Persî ne û Medîyek, magîyek li ser serê me ye, bi ser de magîyekî guhên wî jêkirî. Di nav we de, yên ku dema Kambîses mir li wir bûn hene, ji bo Persîyên ku ji nû ve dewletê careke din negrin dest, ez bawer im ji bîr nekirine ku wî nifir barandibû; wî wextî me guhê xwe nedabû gotinên wî; me gotinên wî îftira hesêb kiribû. Lê îro raya min bi Daryûs re ye û ez dibêjim, piştî em ji vê civînê rabûn, em rast biçin ba Mag." Gobryas bi vî awayî axivîbû, yên din jî guhê xwe dan wî.

[74] Dema ku ew bi vî karî mijûl bûn, qeder wisan kiribû ku, piştî Magî baş fikirîbûn, biryar dabûn bi Prexaspes re li hev bikin û bihevre tev bigerin, ji ber ku Kambîses xerabîya herî mezin li wî kiribû û bi tîrê kurê wî kuştibû. Ji ber ku tenê wî dizanî Smerdîsê kurê Kîros mirîye. Wî bi destê xwe ew kuştibû. Di herî dawîyê de jî di nav Persîyan de cihekî wî yê bilind hebû. Bi vê niyetê bangî wî kiribûn û bi vî dostê nû re bi sondan bi hev hatibûn girêdan; sond xwaribûn ku ew hîleyên wî li hemberî Persîyan kirine ji tu kesekî re nebêjin, di miqabilî vê de gelek soz dabûn wî. Prexaspes soz da wan. Piştî ku ew kiribûn hevalbendê xwe, Magîyan xwestekek din jê kirin: gotin ku wê hemî Persîyan li binê dîwara serayê berhev bike, ew jî dê derkeve ser kulekê û wê ji herkesî re ragihanda ku, efendîyê wan yê niha Smerdîsê kurê Kîros e, ne yekî din e, ji ber ku li hemberî Persîyan ji wî baştir yê bawerîya wan pê tê nikarîbûn bibînin. Ji ber ku gelek caran şahidî kiribû ku Smerdîsê kurê Kîros dijî û çîroka ku ew qatilê wî ye dabû jibîrkirin.

[75] Prexasper got ku ez amade me vê jî pêk bînim; Magîyan bangî Persîyan kirin, Prexaspes jî danîn ser serê bircê û jê re gotin ku axaftina xwe bike. Lê wî, bi zanetî hemû tiştên ku Magan jê re gotibûn ji bîr kirin. Dest pê kir heta Akhaîmenes behsa bav û kalên Kîros kir û piştî ket nav sedsalan û hat ser Kîros, ew qencîyên li Persîyan kirine û piştî van tevan jî rastîya meseleyê got. Berê vedişart, ji ber behskirina tiştên bûyî ji bo wî tehlîke bûn, bi vî awayî got; lê niha wek ku hêzek ji bo vê zor didayê. Çawa Smerdîsê kurê Kîros, bi destê wî yê ku Kambîses bi çek kiribû can da û yên niha seltenetê dimeşînin Magî ne, tevde gotin. Dûra got; heke van Magîyan hilneweşînin û dewletê ji destê wan rizgar nekin, bila hemî belayên xudayan li ser Persîyan bibare û piştre xwe ji bircê avêt. Prexaspes, mirovekî ku di tevahîya jiyana xwe de bi navûdeng bû, bi vî awayî mir.

[76] Di vê navê re, ew heft kesên biryar dabûn bêsekin êrîşê Magan bikin, bêyî haya wan jê hebe, xwe avêtibûn xudayan û derketibûn rê. Di nîvê rê de yên qewimîbûn seh kirin. Wan xwe dan milekî û ji nû ve rewş di ber çav re derbas kirin. Qismek bi Otanes re digotin, pêwist e vî karî paşve bêxin û di nav vê keşmekêşîyê de bi vî karî ranebin; Daryûs û yên din jî dixwestin, ber bi pêş ve bimeşin û ew biryara ku girtibûn bêyî ku wext derbas bikin bi cih bînin. Hîn ew wilo munaqeşe dikirin, heft cot şahîn dîtin, dabûn pey du cot sîsark, nikil li wan dixistin û perên wan vediçirandin. Ew heft kesên ev dîtin, di yek fikarê de gihiştin hevdû. Ev, fikra Daryûs bû û ber bi serayê ve meşîyan, xuyabûna teyran hêz dabû dilê wan.

MIRINA MAG SMERDÎS

[77] Dema gihiştin ber ketina hindur, Daryûs, berê çi di hişê xwe de ji xwe re gotibû wisan çêbû; nobedar li hemberî van kesên bijarte yên Persî bi rêz hereket kirin û bê bikevin şikeke biçûk, ev kesên ji alîyê xudayan ve hatibûn şandin, berdan hindur, kesekî ku tiştekî ji wan bipirse derneket. Hatin hewşê, li vir rastî axayê heremê yê qasid hatin. Ji wan pirsîn bê ji bo çi hatine; li milekî ji wan agahdarî distandin û li milekî din jî ji nobedarên derî hêrs dibûn û ew tehdîd dikirin û digotin "We ji bo çi ew derbasî hindur kirine" û dixwestin pêşîya wan bigrin zêde pêşve neçin. Ew heft kes, bi dizî di nav xwe de li hev kirin, xencerên xwe kişandin, li wir li dijminê xwe xistin û baz dan ketin hindur.

[78] Herdu Mag jî tam di wê navê re di hindur de bûn û li ser ew qelebalixa Prexaspes pêk anîbû, bi hev dişêwirîn. Dema ku qelebalixa axayê heremê seh kirin, bêsekin herdu ji cihê xwe rabûn, fêhim kiribûn çi diqewime, wê xwe biparastina. Yekî xwe avêt dîwar xwest tîr û kevanê xwe bigre û yê din baz da rimê. Tevlihevîyek çêbû. Tîr û kevan bi kêrî tiştekî nehat, ji ber ku dijmin gelek nêzîk bûn, bi destpirçkî şer dikirin, yê din xwe bi rimê diparast; wî rimek li rehnê Aspathînes û çavê Întaphernes xist; vê lêdanê çavê Întaphernes derxist; lê bi vê nemir; yê din dît ku kevan bi kêrî tiştekî nehat, xwe avêt odeyeke li teniştê yê mêran û dixwest ku derîyan bigre; lê du kes ji heftan, Gobryas û Daryûs xwe li pey wî avêtibûn hindur. Gobryas bi hişkî Mag rapêça; Daryûs jî li ba wan bû, di tarîyê de ditirsîya li Gobryas bixe, ne

dizanî dê çi bike ma sekinî. Dema ku Gobryas dît ew destgirêdayî sekinîye û dinêre, jê pirsî û got: "Tu çima alîkarîyê nakî?" Daryûs got ku "Ez ditirsim li te bixim." Gobryas got "tu şûrê xwe têxê, dixwazî bila em herdu jî li ber bikevin." Daryûs bi ya wî kir, bi xencera xwe lêxist û bi bextewerî dît ku, yê lêxist Mag bû.

[79] Piştî li Magan xistin serê wan jêkirin, herdu birîndar halê wan ne yê meşê bû, ew li serayê hiştin, jixwe pêwist bû kelehê jî biparêzin, her pêncên din serê Magan birin û dest bi bezê kirin, qîr dikirin, bûyer qise dikirin, serî didan nîşan û hemî Magên diketin destê wan dikuştin. Persên ku serkeftina heftan û hîlekarîya Magan hîn bûn, ji bo ku ji wan paşve nemînin xencerên xwe kişandin, dest bi herikandina xwîna Magên digirtin kirin; heke şev bi ser wan de nehata, Magek sax nedima. Persî vê rojê hê wekî cejneke netewî pîroz dikin; her sal ew roj merasimên mezin li dar dixin û jê re "Qirkirina Magan" dibêjin. Wê rojê izna derketina Magek ya derve tune, hemî di malên xwe de dimînin.[111]

MINAQEŞEYA DEMOKRASÎYÊ DI SERAYA PERSAN DE

[80] Derûdor sakin bûbû, pênc roj di ser re derbas bûbû, yên li hemberî Magan serî hildabûn, ji bo rewşê binirxînin berhev bûn; axaftin hatin kirin ku bêguman hinek Yûnanî bawer bi vê nakin, lê yê din çiqas rast bin, ev jî qet nebe ewqas rast e. Otanes, pêşnîyaz dikir xelkê Persî xwe bi xwe xwe îdare bike û ev delîl didan pêş û digot: "Ez rast nabînim ji nav me yekî veqetînim û deynim ser text; ev ne tiştekî xweş e ne jî rêyeke rizgarîyê ye. Hûn dizanin Kambîses dînîtî û rezîlî heta ku bir, we bêrêzîya Magan jî ceriband. Bi rastî çawa gengaz e ku hukumkirinek baş û durust bê meşandin, dema kesek bêyî ku hesab bide dilê wî çi bixwaze bike? Hûn evqas hêz û quwetê bidin destê insanê herî bi aqil yê dinyayê jî, dê ew jî ji rê derkeve û ji ser xwe biçe. Ji xwe razîbûn tiştekî bêoxir e, hêza di destan de wî xwedî dike û hesûdî ji dema çêbûnê ve insên dixe nav lepê xwe. Ev herdu insûr insan

111 Magophonî, "Qirkirina Magan." Sayce dibêje; ev cejna han li Persê demeke dirêj hatîye pîrozkirin û wê demê Mag nikarîbûn derkevin hole.

dikin weke cenawir; nîvê kuştinan ji jixwerazîbûnê, nîvê din ji hesûdîyê tên. Lê mirov dikare bêje, dîktatorek hesûdîyê ji kesekî nake, ji ber ku her tiştê wî heye. Halbûkî tam eksê wê ye, hesûdî û dîktatorî di nav hevdû de ne û li hember welatîyan dixebite; ji bo hesûdîyê ji mirovê qenc bike, hebûna wan tenê bes e, di bajaran de ji bilî xeraban pê ve ji kesekî hez nakin; îftîra di nezdê wî de tiştekî baş e. Lê rewşa herî neçê di vê de ye: Hûn rêz lê digrin zêdetir dixwaze, dema hûn zêde hurmetê bidin nîşan wî wextî jî dibêje şelaf. Ez ya hê xemgîn û hê xerab bêjim: adetên ji bav û kalan mane xera dikin; tecawizî jinan dikin, bê dadgeh mêran dikuje. -Di miqabilî vê de îdareya xelkê, serê her tiştî navê wê xweş e, Isonomî, li hemberî qanûnan wekhevî. Ya duduyan zêdegavîya hikumdarîyê di vê de tune; birêvebir bi pişkê tên hilbijartin; berpirsyarîya birêvebiran heye; biryar tevde pişta xwe bi xelkê girê dide. Pêşnîyaza min ev e, em vê monarşîyê terk bikin, em derbasî îdareya xelkê bibin; ji ber ku qencî di girseyên gel de ye."

[81] Nêrînên Otanes ev bûn. Megabyzos olîgarşî pêşnîyaz kir û got: "Ez di dîktatorîyê de bi nêrînên Otanes re me, ez jî yên ew dibêje dibêjim; lê heke em bên ser nesîheta berdana îktîdarê bi destê xelkê ve, ya herî baş ne ev e. Qelebalixek ku hêvîya tu tiştî tê de tunebe, ji vê ehmeqtir û biserxweveçûyî tiştek tune. Mirov ji biserxweveçûyîna dîktatorekî bazde û bê bikeve destê biserxweveçûyîyên bêhevsar yê xelkê, tu wextî nayê qebûlkirin. Dîktatorek wextê tiştekî bike dizane ji bo çi dike, lê girse wê jî nizane; wê ji ku bizanibin? Tiştek hînî wî nehatîye kirin, tu wextê jî nikare xwe bi xwe tiştekî hîn bibe; dişibin lehîyên çemên ku zivistan ew gur kirine, bi gavavêtinên bêzanîn her tiştî serûbin dikin. Em hêvîya îdareya xêlkê ji bo dijminên Persîyan bixwazin; lê em ji xwe re heyeteke ji kesên têgihiştî pêk bînin, em dewletê teslîmî wan bikin; bêguman em ê jî di nav wan de bin; biryarên herî baş ji kesên herî baş derdikevin."

[82] Nêrînên Megabyzos jî wiha bûn. Yê sisiyan Daryûs nêrînên xwe bi van gotinan îzah kirin: "Ew gotinên Megabyzos ji bo îdareya xelkê gotin, bi min gotinên gelekî baş in, lê yên ji bo olîgarşîyê gotin, ne rast in. Em li sê awa dewletan binêrin, bila hersê jî ji yên cûreyên xwe yên herî baş bin, îdareya xelkê ya herî baş, olîgarşîyeke bêqisûr û monarşîyeke herî bi fezîlet. Ez dibêjim ku, ji van hersêyan ya herî baş monarşî ye. Ji ber ku ji fezîleta herî bilind ya hi-

kumdarekî baştir tiştek nikare bê nîşandan. Bi karîna hizrî ya ku bi wî re heye em hesêb dikin, wê ji bo fêdeya xelkê baştir bixebite û bi vî awayî ew biryarên tên wergirtin li hemberî niyetxeraban baştir tên parastin. Di olîgarşîyê de ev heyeta insanan ya ji bo xelkê baştir tê hesibandin, qet ne wisan e, bi gelemperî bi xirecira şexsî ya têrbûnê nizane, perçe dibe; ji ber ku her yek dixwaze ji yê din bilindtir bibe û gotinên xwe bide meşandin, di dawîyê de hemî dikevin rikeberîya hev; pergal xera dibe, piştî wê mirin tê. Mirin monarşîyê tîne, ev jî dide nîşan ku ew ya herî baş e. Li milê din, nabe demokrasî bê'esilbûnê bi xwe re neyne; ev xerabûna ku ji bo herkesî felaketa mezin e, dijmintî nake navbera hemwelatîyên xerab bûne, bi eksê wê rê vedike dostîyeke saxlem bê ava kirin; ji ber ku ji bo dewletê bişeli'înin desteka hevdû pêwist dibînin. Ev jî heta yek derkeve xelkê îdare bike û dolabên tên gerandin bide sekinandin, dom dike. Wî wextî ev kes dibe taca serê xelkê û tînin ser hikumdarîyê. Belê serkeftbûna monarşîyê ya bi çav tê dîtin li vir jî derdikeve pêşberî me. Heke em van tevan bi gotinekê kurt bikin, ev tiştê em jê re azadî dibêjin, çi bi me dide qezenckirin? Kê ew da me? Xelkê, olîgarşîyê yan monarşîyê? Ez di vê fikrê de me ku, îktîdara insanekî em xelas kirine, em girêdayî vê rejimê bimînin û -em vê deynin milekî jî- adetê bav û kalê me ye, em xera nekin, ji ber ku ew baş e; heke em wê xera bikin, em nikarin tiştekî bi dest bêxin."

[83] Hersê nêrînên hatin îzahkirin ev bûn; her çar Persîyên din beşdarê vê netîceyê bûn. Otanes ku dixwest li Persê wekhevîya polîtîk ava bike, lê nêrî ku di kêmanîyê de dimîne, ev gotin kirin: "Şefên vê şoreşê, ji nav me yek wê bibe hikumdar, wisan dixuyê, dixwaze bi qur'ayê bê hilbijartin, dixwaze em bihêlin bila xelkê Persê hilbijêre, yan rêyekê re em bi xwe hilbijêrin; di bin van şert û mercan de, ez li hemberî we namzedîya xwe danaynim. Ya ez dixwazim ne emir bidim û ne jî emir bigrim. Çavê min ne di îktîdarê de ye, li hemberî vê tenê şertek min heye, ez û yên ji malbata min, di nav we de wê kesekî ji me wek efendîyê xwe ranegire!" Ew bi vî awayî axivî û ew şeş kes şertên wî erê kirin. Ew jî êdî di asta wan de nema, xwe da milekî û li wir rûnişt, niha jî tek malbata Persê ya azad ew in; li hemberî qanûnên ku heye dest nadin tiştekî, ji derveyî vê tenê ew serbest in wezîfeyên ew minasib dizanin bi cih bikin.

[84] Şeş kes mabûn, fikirîn ew rêya herî baş ya ji bo hikumdar hilbijêrin kîjan e; pêşî di navbera xwe de biryar dan, dema di nav wan de yek bibe

hikumdar, wê ji malbata Otanes re ferqîyetên awarte nas bikin: Dê ji Otanes re her salê kinceke Medan û diyarîya herî baş ya ji alîyê Aryanîyan ve tê zanîn, bihata dayîn. Ev rûmet tevde danê, ji ber ku yê yekem car şoreş plan kir û ew anîn ba hev ew bû. Îmtîyazên taybetî yên Otanes ev bûn. Ji bo xwe jî ev îmkan dane hev: Ev heft kes, çi wextê bixwazin û bêyî ku ji pêşî de xeber bidin wê bikaribûna biçûna ba hikumdar, ji bilî dema ku hikumdar bi jineke xwe re di nav nivînan de be. Hikumdar, wê tenê ji van heft malbatan jin ji xwe re bianîya. Yek jî, gerek biryar bidana bê wê hikumdar çawa bihata hilbijartin: Wê li hespê xwe siwar bûna û biçûna derveyî bajêr, wextê roj derketa hespê kîjanî pêşî hîrehîr bikira, wê ew bibûya hikumdar.

[85] Seyîsekî Daryûs yê navê wî Oîbares yê bikêrhatî hebû. Piştî civîn xelas bû, Daryûs ji vî mirovî re got: "Oîbares, binêre kîjan ji me, wê çawa bibe hikumdar: Em ê siwarê hespê xwe bin û derkevin derveyî bajêr, wextê ku roj derkeve hespê kê pêşî bihîre, ew wê bibe hikumdar. Baş bifikire, heke tiştekî bi kêr bê hişê te, bêyî tu wext derbas bikî bike, em yên din derbas bikin û vê rûmetê em qezenc bikin." Oîbares bersiv da û got: "Heke hikumdarbûna te bi vê mabe, qet li ber nekeve; tu dikarî ji min bawer bike, cihê tu li wir kesek nikare bibe hikumdar; çareya herî baş ya vî karî ez dizanim." -Daryûs got : "Heke bi rastî tu evqas bi çavvekirîbûna xwe bawer e, qet wext derbas neke bilezîne; ji ber ku ev îş wê sibe sibehî bibe." Piştî Oîbares bi vî awayî rewş hîn bû, lêbinêrin çi kir: Hespê Daryûs, ji nav hemî mehînan yeka ciwan ya herî zêde lê digerîya hebû, wextê bû şev ew girt derxist derveyî bajêr, li cihekî girê da; piştre hespê Daryûs girt û derket, demeke dirêj li nêzîkî mehînê gerand, bêhna mehînê pê da hildan, piştre berda, hesp çû û hilkişîya ser mehînê.

[86] Roj ber bi hilatinê bû, ew şeş kes li gor biryara xwe bi awayekî normal ber bi derveyî bajêr diçûn; dema ku hatin ew cihê bi şev mehîn li wir hatibû girêdan, hespê Daryûs kir hîrehîr û rabû ser du lingan; wî wextî ji 'ezmanê bêewr brûsk veda û bû gurmîna 'ezmên. Ev elamet wek ku bi taybetî derketibû orteyê, ev bûyereke îlahî ya hilbijartina Daryûs qebûl kiribû; yên din bêpayîn ji hespê xwe peya bûn li ber çok dan erdê.

[87] Li gor hinekan qurnazîya Oîbares ev e, li gor hinekên din jî, -ji bo ku di nav Persîyan de du awa tê qisekirin- bi destê xwe nav lingê mehîna ciwan

miz daye û piştre destê xwe di bin serçoka fireh de veşartîye. Dema ku roj hiltê û hesp dikevin rê, Oîbaresê me destê xwe dirêj kirîye û gihandîye firnîkên pozê hespê Daryûs, dema ku heywan bêhn girtîye di cih de dest bi hîrînê kirîye.

DARYÛS – BIRÊVEBIRIN – EREB Û HINDÎ

[88] Daryûsê kurê Hîstaspes êdî bûbû hikumdar,[112] ji derveyî Ereban temamê miletên Asyayê, tev erdê ku Kîros zept kiribûn û Kambîses fireh kiribû, di bin hukmê wî de bûn; em bên ser Ereban, ev bi tu awayê neketine bin desthilata Persîyan, tenê dema ku Kambîses biryar da bikeve Misrê, bûbûn hevalbendê wan; ji ber ku heke Ereb li hember bisekinîna, Persîyan nikarîbûn Misrê bigrin. Daryûs, ji bo di nezdê Persîyan de ji xwe re cihekî hê bilindtir pêk bîne, mehr birîn; bi keçên Kîros Atossa û Artystona re zewicî; Atossa berîya wê bi birayê xwe Kambîses û piştre jî bi Mag re zewicîbû; Artystona keçeke ciwan bû; ji bilî vê bi keçeka Smerdisê kurê Kîros ya navê wê Parmys re jî zewicî; ji bilî van bi keça Otanes ya Mag derxist meydanê re jî zewicî. Her tişt emareyên hêza wî nîşan dida. Pêşî kevirek da tiraş kirin û daçikand, li ser hespek dabû neqişkirin û ev nivîs hebû: "Daryûsê kurê Hîstaspes, di saya çelengîya hespê -li vir navê heywan nivîsandîye- wî û bikêrhatîna seyîsê wî Oîbares, derket ser textê Persê."

[89] Ew bîrdarî/abîde da avakirin, piştre welat ya ew jê re dibêjin satrap, bi ser bîst hikûmetan ve parve kir, li ser her yek ji wan yek danî, yên di bin hemwelatîya wî de bûn li gor nijada wan parve kirin, ji her yek ji wan re bac birîn, dema ku ev payêkirin dikir, hinek caran yên cîran kirin yek, hinek caran jî cîranê wan yê di sinor de diqewazt, miletekî hê dûr bi hev ve girê

112 Daryûs di sala 521an de derketîye ser text, di sala 486an de, di temenê xwe yê 63 salan de mirîye. Selteneta wî mezin e. Wekî organîzator hatîye naskirin. "Di dîrokê de cara pêşî polîtîkayeke merkezîyetî (sentralizasyon) çêbûye" (Sayce). Ji bo împaratorîya mezin bi Susayê ve girê bide rêyên baş û başxwedîkirî vekirîye (Pirtûk pênc, beş: 52), li gor zemanê xwe nûçevanên fermî yên gelek bi lez daye xebatê. (Pirtûk 8, beş 98) Li kêleka satrapan ku yekane mîrên wan cihan bûn sekreterên hikumdar hebûn û hemû kirinên satrapan ji navendê re radigihandin. Mufetiş digerîyan. Ksenefon bi bi devê Sokrates bi heyranî behsa hukumranîya Farisan vedibêje. (Economique, beşa IV)

dida. Lêbinêrin ev hikûmet çawa teqsîm kirîye û baca salane ya hatinîya wan çawa saz kirîye: Pîvana yên baca xwe bi zîv didan, talanta Euboîayê bû. Talanta Babîlê dike heftê heyşt manaya Euboîayê. Di wextê Kîros û Kambîses de, di warê bacê de qaîdeke kifş û guhernebar tunebû; ji hikumdar re diyarî dihatin pêşkêşkirin. Bi vî awayî rêkxistina bacê û reformên wekî wan, Persî ji bo Daryûs ticar, ji bo Kambîses zorbe, ji bo Kîros bav daye gotin, ji ber ku yê yekem di her tiştî de li qezencê digerîya, yê duyem hişk û bêhis bû, yê sêyem mirovekî insan bû û ji bo qencîya wan dixebitî

[90] Îonîanî, Magnesîanîyên Asyayî, Aîolîayî, Karyanî, Lîkyanî, Mîlîeanî, Pamphylîanî (ev hemî di hêla bacê de bi hev re dihatin hesêbkirin) ji xezîneyê re çarsed talant zîv didan. Hikûmeta/satrapa yekê li vir bû. Mysîa, Lîdya, Lasonîa, Kabalîa û Hygenneîa pêncsed talant. Hikûmete duduyan ev bû. Li Hellespontosê, wextê mirov ji Yûnanistanê tê yên li milê rastê rûdinin, Frîgya, Thrakîyên Asyayî, Paflagonya, Marîandyn û Sûrîye sêsed û şêst talant. Hikûmeta sisiyan ev bû. Ji Kîlîkîayan li gora rojê yek heb, sêsed û şêst hespên boz û pêncsed talant zîv; sed û çil talantê wê ji garnîzona yekîneyên hespan yên li Kîlîkîayê re hatibû veqetandin û sêsed û şêst talantê wê ji Daryûs re diçû. Vir jî hikûmeta çaran bû.

[91] Bajarê Poseîdon yê Amphîlokhosê kurê Amphîaros li ser sinorê Kîlîkîa û Sûrîyê ava kiribû û erdê ji vî bajarî heta Misrê dirêj dibû -ji derveyî cihên Ereb li ser rûdiniştin, wan tiştekî nedidan- sêsed talant, ev hikûmeta ku ji temamê Fenîkeyê û Sûrîya jê re Filistîn tê gotin û girava Qibrisê pêk tê, hikûmeta pêncan. Misir û erdê cîranê Misrê Lîbya, herêmên girêdayî Misrê Kyrene û Barka heftsed talant, ji bilî vê hatinîya masîgerîya Gola Moîrîsê; ji ber ku wekî hatinîya ji genimê bi dest diket, ev pere di nav wê heftsed talantê de nebû. Sed û bîst hezar medimhos genim, ji Persîyan û alîkarvanê wan yên li garnîzona Keleha Spî ya Memphisê diman dihat belavkirin. Ev hikûmet a şeşan bû. Sattagydî, Gandarî, Dadîkî û Aparytî di nav hikûmetekê de berhev bûbûn, ev dibû hikûmeta heftan û sed û heftê taland didan xezîneyê. Susayî û Kîssîayî yên din sêsed talant; ev jî hikûmeta heyştan bû.

[92] Ji Babîlê û qismê cihên din yên mayî yên Asûryayê hezar talant zîv û pêncsed zarokên kur yên xesandî, vir hikûmeta nehan bû. Cihên mayî yên

Akbatanayê û Medîayê, Parîkanî, Orthokorybantî çarsed û pêncî talant; ev hikûmeta dehan bû. Kaspîanî, Pausîkaîyî, Pantîmathîyî, bi van re hemî Darîtaîyî bi hev re wekî bac dused talant didan, ev hikûmeta yanzdehan bû. Ji Baktîanê heta welatê Aîglesê sêsed û şêst talant. Hikûmeta duwazdehan bû.

[93] Ji welatê Paktykayê û ji Ermenistanê û welatê cîranên wan, heta cihên Deryaya Reş çarsed talant dihat; vir hikûmeta sêzdehan bû. Sagartîanî, Sarangîanî, Thamanaolûyî, Ûtîayî, Mykosî û yên li girava Erythreîayî rûdinin ku, Hikumdarê Mezin "Koçber" li wir bi cih kiribû, ji van di manaya koçberîyê de wiha tê gotin, bi vî awayî temamê van miletan yekûn şeşsed talant bac didan; ev hikûmeta çardehan bû. Sakaeyî û Kaspîanî dused û pêncî talant didan, ev hikûmeta panzdehan bû. Parthî, Khorasaî, Safad û Aryayî, hikûmeta şazdehan bû û sêsed talant didan.

[94] Parîkanî, Ethîopîayîyan Asyayî çarsed talant, ev hikûmeta hevdehan bû. Ji Matîenî, Saspeîrî, Alarodîayîyan dused talant dihat xwestin. Ew hikûmeta hejdehan bû. Moskhîyî, Tîberanî, Makronaîyî, Mossyoîkîayî û Marsayî sêsêd talant û ev hikûmeta nozdehan bû. Em bên ser Hindîyan, yên ku ji hemû miletên din yê em nas dikin pirtir in, ji her miletî zêdetir bac dan. Sêsed û şêst talant toza zêr; ev jî hikûmeta bîstan bûn.[113]

[95] Berdêla vê talanta zîvî ya Babîlê, bi talanta Eûboîayê dike neh hezar û heyşsed û heyştê talant; heke em pereyê zêr sêzdeh qatê pereyê zîv hesêb bikin, toza zêr çar hezar û şeşsed û heyştê talantê Eûboîyê dike. Heke em hemî li ser hev hesêb bikin, hatinîya Daryûs ya salê çardeh hezar û pêncsed û şêst talanta Eûboîyê dike. Em kisûrê wan hesab nakin.

[96] Ev hatinîya Daryûs ya ji Asyayê û ji goşeke biçûk ya Libyayê bû. Piştre bac danî ser giravan, heta Tesalyayê û herêmên Ewrûpayê jî. -Lêbinêrin Hikumdarê Mezin pereyên ji xezîneyê re dihatin çawa diparast: Maden diheland û dikir firaxên axînî; wextê firax tijî dibûn ew dişikandin, wextê pêwistî bi pere hebûya û her carê bi qasî pêwistîyê pere tab dikirin.

113 Kitabeyên Persî ji bo van hikumetan sê lîsteyan didin. Di zemanê Daryûs de guhertin tê de çêbûne. Di herdu lîsteyên destpêkî de 23 eyalet/satrab hene, ya sisiyan de, yanî ya li ser gora Daryûs de 29. Ji bo temamê van miletan li Sayce binêrin (rûpela 273an û ji wir pê ve).

[97] Hikûmet [satrap] û bacên li wan hatibûn girêdan ev bûn. Di nav yên bac didan de, min tenê behsa navê Persê nekir; ev ji ber wê bû ku Persa eslî ji derveyê bacê hatibû hiştin. Yên bi xeracê nehatibûn girêdan jî ji ber xwe ve diyarî pêşkêş dikirin; yên ez dibêjim Ethîopîayên li ser sinorê Misrê yên di esnayê meşa Kambîses ya ser Ethîopîayên Makrobîosê de kiribûn bin hukmê xwe; li bajarê pîroz yê Nysayê û li dora wê rûdiniştin û cejnên bi nav û deng yên Dîonysos pîroz dikirin. (Ev Ethîopîayî û cîranên wan, bi Hindîyê Kalantîayê ve eynî genimî[114] diçînin(118), malên Hindîyan di bin erdê de ne. Wekî min got ev herdu milet, ji du salan carekê diyarî pêşkêş dikirin û îro jî pêşkêş dikin. Diyarîyên wan du khoînîx zêrê saf, dused qurmên abanozê, pênc zarokên Ethîopîayî û pênc jî diranên fîlan bûn. Kolkhîsî û cîranên wan yên heta Qafqasyayê bi dilxwazî beşdarê dayîna bacê dibûn. (Ji ber ku desthilata Aryanîyan heta vî çiyayî dirêj dibû, li bakurê Qafqasyayê Aryanî tunebûn.) Van miletan jî bi vî awayî ji ber xwe ve diyarî didan, ji pênc salan carekê dianîn û pêşkêş dikirin û îro jî pêşkêş dikin; pêşkêşa wan sed kur û sed keç in. Ereb her salê hezar talant bixûr dişandin. Ji derveyî bacên ku van miletan didan hikumdar, pêşkêşên wan jî ev bûn.

HINDISTAN

[98] Em bên ser wan zêrên zêde yên Hindîyan dikirin toz û ji hikumdar re dişandin, lêbinêrin, wan ew çawa berhev dikirin: Rojhilatê Hindistanê çol e; yên li milê beyana sibeyî û di îstîqameta derketina rojê de, yekem miletê Asyayê yên di derheqê wan de tiştek bi rastî tê zanîn Hindî ne; Rojhilatê Hindê çol e, ji ber qûmê kes nikare li wir rûne. Ji derveyî vê li Hindistanê gelek nijad dijîn, zimanê wan ne wekî hev e; hinek koçer in, hinek ne koçer in, yên ne koçer in li qiraxên avzêmên çeman rûdinin, bi qayixên bambû masî digrin û xaf dixwin; ji her girêyeke bambûyê qayixek derdikeve. Ev Hindîyên han kincên xwe ji sazan û qamîşan çêdikin; ji rexên çeman qamîş berhev dikin, jê dikin, wekî hesîrê vedihûnin û wekî zirhan li xwe dikin.

[99] Hinek Hindîyên din jî hene ku, li hinek rojhilatê wan dijîn, koçer in û goştê xaf dixwin; navê wan Padaeî ye. Tê gotin ku adetên wan yên wiha

114 Di vegotinê de 'eynî lib' derbas dibe, belkî birinc be.

hene: Ji nav wan kesek, jin yan mêr, dema ku nexweş dikeve dikujin; heke mêr be hevalê wî yê nêzîk vî karî dike; tê gotin ku nexweşî dohn dihelîne û tahma goşt xera dike; nexweş, xwe diparêze û dibêje ez ne nexweş im; lê guhê xwe nadinê, dikujin û bi afîyet dixwin. Heke nexweş jin be, cardin wekî ya mêran dikin, vî karî ji keseke nêzîk ya nexweşê re dihêlin, ew stûyê wê jê dikin. Heke kesek pîr û kal be, ew kes tê qurbankirin û jê re merasim çêdikin; lê ev şerefek e ku dibe nesîbê kêm kesan; ji ber ku kesên berîya kal û pîr bibe nexweş bikeve tê kuştin.

[100] Adetên hinek Hindîyên din gelekî cuda ne; tu jîndarekî nakujin, çandinîyê nakin, adetên jiyana nav malê nizanin; gîya dixwin; nebateke di nava qalikekî de û bi qasî liba garis ber dide heye, bêyî bê çandin berhem dide; vê berhev dikin û bi qalikê wê ve dipêjin. Di nav wan de kesek nexweş bikeve, bi serê xwe diçe cihekî radikeve; çi lê hat, mir û ma, kesek lê nagere û napirse.

[101] Hemî ev Hindîyên min behsa wan kir, wekî heywanan li ber çavê herkesî bi hev re radikevin; rengê çermê wan dişibe hev û bi ser yê Ethîopîayan ve diçe; tovê wan yê jinan bi hemil dike, wekî yê mêrên din ne spî ye, wekî çermê wan reş e; ji yên Ethîopîayî jî tovekî wekî yê van dirije. Ev Hindî ji Persê gelek dûr in û li milê başûr dijîn; tu wextê nebûne hemwelatîyên Daryûs.

[102] Wekî din, Hindîyên li deverên Paktyîkayê[115] nêzîkî bajarê Kaspatyrosê dijîn hene; ev dikevin bakurê Hindîyên din; di hêla bîçima jiyanê de nêzîkî Baktrîayîyan in; Hindîyên herî şerker ev in û yên ji bo gera li pey zêr derdikevin rêwêtîyê jî ev in. Me gotibû çolek heye ku, ji ber qûmê kesek nikare tê de bijî. Li vê çolê di bin qûman de gêrik gelekî zêde mezin dibin, ji kuçikan biçûktir û ji rovîyan mezintir in. Di nav heywanên hikumdarê Persê de ev jî hene ku, li wir hatine girtin. Şikeftên van gêrikan di bin erdê de ne û qûmên binê erdê dikêşin derve, wek gêrikên Yûnanistanê dikin, jixwe ev jî eynî dişibin wan, qûma dikêşin ser rûyê erdê qûmeke bi zêr e. Belê Hindî ji bo wî zêrî berhev bikin diçin çolê. Her yekî bi sê deveyan diçin. Li deveya mê ya di nêvî de siwar dibin, li herdu milên wî deveyên nêr yên

115 Paktyîka, welatê li bakurêrojhilatê Afganîstanê ye.

hevsarên wan bi wî ve girêdayî diçin; deveya mê bi taybetî lazim e nûzayî be. Deve ji hespê hê xurttir e; bi ser de jî zêde bar hildide.

[103] Yûnanî jî dizanin ev çawa dibe, ez ê di vî warî de tiştekî nebêjim; lê tenê ez ê taybetmendîyeke wêya bêjim; çogên wê yên lingên paşîyê cot in, di her yekê de du rehn û du çog heye; qamîşê yê nêr ku ji nav lingên wî yên paşîyê derbas dibe, ber bi alîyê terî ve zîvirandî ye.

[104] Belê, Hindî bi van heywanan diçin gera zêr; berhevkarên zêran rêwîtîya xwe dixin dema herî germ; wî wextî gêrik ji ber germê dikevin kunên xwe yên binê erdê. Li ba van miletan dema rojê ya herî germ berî beyana sibehê ye, ne wekî ba hinek cihan dema nîvroyê ye; di zemanê heta derkeve nuqteya topa serî, yanî heta saeta girtina çarşîyê, dişewitîne û diperitîne; di vê midetê de ji ya dema nîvroyê ya Yûnanistanê gelekî zêdetir dikele, bi awayekî wisan ku xuya dike Hindî hey vê saetê xwe dikin avê. Di nîvê rojê de germ hema bêje bi qasî cihên din û cihên Hindê ye din e; piştî nîvroyê çiqas diçe wekî ba miletên bakur nerim dibe û her roj dadikeve hewa sartir dibe, di dawîyê de dema ku roj çû ava hewa baş sahî çêdike.

[105] Dema ku Hindî digihin çolê, bi lez torbeyên xwe tijî dikin û vedigerin; ji bo çi bi zû, ji ber ku heke mirov bawerîya xwe bi gotinên Persîyan bîne, gêrikên bêhn digrin li pey wan dikevin û ji bo ku jîndarên dinyê yên herî pêsivik in, heta ew xwe didin hev, heke Hindî bi lez hereket nekiribin, careke din venagerin ser axê. Deveyên nêr bi qasî yên mê ne xurt in, bi mesafeke hindik li paş di ihtîyatê de dimînin, lê yên mê ku bêhna têjikên xwe yên hiştine hildidin, qet pêjna westanê ji wan nayê. Belê Hindî, wekî gotina Persîyan, piraya zêr bi vî awayî berhev dikin; ji bilî vê li welatê xwe ji binê erdê jî derdixin, lê ew hindik e.

[106] Afirîner, fêkîyên xwe yên herî sipehî daye serê herdu milên serzemînê, eynî çawa wekî avûhewayê herî nerim daye Yûnanê. Ber bi alîyê rojhilatê ve, wekî min berê jî got, cihê herî dawîyê yê insan dijîn Hindistan e; jîndar, çarpê û xwedî bask, ji yên cihê din gelekî zêdetir mezin in, tenê hesp ne wisan in; hespê Medîyan ji yên van mezintirin, ji van re hespên Nesaîa tê gotin. Ji bilî vê li vir zêrên kanaya wan qet xelas nabin heye, ev zêr

ji binê erdê tên derxistin, ev li ber ava çeman tên yan wekî min behs kir di netîceya xebateke zêde de bi dest dixin. Li wir dar, hem jî darên bejî, hemî cûre berhem didin ku, di hêla sipehîtîyê û bikaranînê de ji hirîya em ji mihan werdigirin ne kêmtir in. Hindî bi vê kinc çêdikin.

E R E B Î S T A N

[107] Cihê li başûr yê herî dawîyê yê insan rûdinin Erebîstan e; yekem welatê ku bixûr, murra[116], kassîa, kînnamon[117] û ladanon derdixin ew in. Ji derveyî murrayê ji bo bidestxistina van mehsûlan gelek zehmetîyê dikşînin. Zemqek heye, Fenîkî wê tînin Yûnanistanê û Yûnanî tenê bi vî awayî dikarin bi dest bixin, bixûrê bi şewitandina wê dikarin bi dest bixin; ji ber ku li dora darên bixûrê didin, marên baskê wan kurt û biçûk dikelin, rengê wan cûre cûre ne, li dora her darê ji van tijî ne û heta hinek caran Misrê îstîla dikin. Tenê dixana vê zemqê dikare maran ji darê dûr bixe.

[108] Cardin Ereb dibêjin ku, heke yên em dizanin hatin serê margîskan, nehatina serê van, wê temamê rûyê erdê bi van maran bihata dagirtin. Bêguman hêza îlahî tedbîrên ji hikmeta wî tên payîn wergirtîye: hemî cûreyên tên xwarin û ji bênxwarinê ditirsin, ji bo ji ber têne xwarin nesla wan xelas nebe, zayokîyeke zêde daye wan; li hemberî vê yên tehlîke ne û xerabîya wan digehe, zayokîyeke kêm daye wan. Em bêjin keroşk; heywan, teyr û insan hemî li pey wê ne û tovê wê bi bereket e. Di nav temamê heywanan de, tenê keroşka mê ye ya ku wextê bi zaro ye, berîya têjik bîne, cardin bi zaro dibe. Bi awayekî wisan ku di zikê dêya xwe de bi tijikên bi pûrt re, hê tijikên nû bîçîm wergirtîye û nû ducanî bûye jî hene. Belê keroşk wiha ye. Di miqabilî vê de şêrên mê, heywanê herî bi hêz û cesur, di seranserê temenê xwe de carekê û yek têjik tîne; ji ber ku wextê dizê malzaroka xwe jî bi tijkê xwe ve davêje derve. Îzaha vê: Dema ku şêrê têjik xwe di zikê dêya xwe de tev dide, malzarokê didirîne, ji ber ku pençeyên wê ji yên heywanên din gelekî tûjtir e û wextê mezin dibe wê malzarokê hê zêdetir perçe dike; wextê tê dinyê yek cihê ku xera nekiribe nahêle.

116 Murra, cûre reçîne ye ya ji gelek daran tê derxistin. Latînîya wê încensûm e.
117 Kînnamon, cinseke darçînê ye.

[109] Wekî wê margîsk û marên Erebîstanê yên bi bask jî, heke çawa dixwazin bi wî awayî zayokî bûna, ji insên re di dinyê de imkana jiyanê nedihiştin; lê wextê bazdana ser hev, mara mê çawa bi tovê tê avdan, marê nêr hê li ser karê xwe yê afirînerî ye qirika wî digre, diranê xwe tê re dike û heta perçe neke nexwe bernade. Aqûbeta yê nêr bi vî awayî ye; lê ew jî li ya mê bi rêyeke din re mirina xwe tezmîn dike. Têjkên wê li pey toleya bavê xwe dikevin, hêj di zikê dêya xwe de wê dixwin û ji bo derkevin ronahîyê zikê wê didirrin ji xwe re rêyekê vedikin; halbukî marên din, yên îşê xwe ji insanan naynin, hêk dikin û gelek têjikên mar qalik dişkînin û derdikevin. Margîsk belavî temamê dinyê nebûye; marên bi bask jî li Erebîstanê berhev bûne; li cihekî din tunene; ji ber vê hejmara wan li wir zêde ye.

[110] Belê Ereb bixurê bi vî awayî berhev dikin; em bên kassîayê, ji bo vê jî wiha dikin: Wextê biçin berhevkirinê postê heywanên mezin li xwe dipêçin, hemî cihê xwe û rûyê xwe jî dipêçin, tenê çavê wan vekirî dimîne. Ev nebat li hezekên tenik hêşîn dibe, cihên ku lê ne, heta nava wan, tijî heywanên dişibin beraçemkên bi bask; dengekî bi qasî ku guh kerr bikin derdixin û gelek êrîşkar in, wextê kassîa tê berhevkirin pêwist e mirov hay ji çavê xwe hebe.

[111] Em bên ser kînnamonê, berhevkirina vê hê jî ecêbtir e. Li ku hêşîn dibe kesek nizane; wekî hinek dibêjin, belkî li deverên Dîonysos hêşîn dibe heye; kînnamon navekî Fenîkî ye, em jî wisan dibêjin, çiqên wê zirav in, teyrên mezin wê berhev dikin, tînin û tevlî herîyê dikin û pê hêlîn çêdikin, hêlin li ser tehtên asê yên serê çiyan in, li cihê destê insan nagihinê. Belê eva îcada Erebên bikêrhatî. Ew leşê mirî yên ga, ker yan heywanên bar yên din dikin perçeyên mezin; dibin wan deveran û datînên cihekî nêzîkî wan hêlînan û bi xwe paş de vedikişin. Teyr êrîşî perçeyên goşt dikin û dikşînin dibin hêlînên xwe; lê hêlîn tenik hatîye avakirin, nikare xwe li ber vî barî bigre, ji cihê xwe vedirişe û dikevin, li erdê perçe dibin; yên çavdêr baz didin û diçin wan kînnamonan berhev dikin. Ew kinnomonên bi vî awayî tên berhevkirin, dibin welatên din.

[112] Em bên ser ladanonê, Ereb jê re ladamûn dibêjin, eslê wê hê ecêbtir e; bi ser ku bêhneke wê ya tenik û şêrîn heye, li cihê ku bêhnên xerab jê tê

çêdibe: Ji rîhê bizin û nêrîyan ve tên daliqandin, wekî reçîneyê ye. Gelek bêhn ji vê tê derxistin û li Erebîstanê bi gelemperî wekî dûkel tê bikaranîn.

[113] Em nebatên bi bêhn li vir bihêlin. -Li Erebîstanê bêhneke gelek xweş tê hiskirin. Li wir du cûre mîh hene ku, li cihekî din nayên dîtin, ew heywanên layîqî dîtinê ne. Dûvê yekî dirêj e, ji sê zendan ne kêmtir e; heke ev dûv bi vî awayî bê hiştin, wê bi erdê ve bê kişkişandin, canê heywan biêşe û wê kul bibe; lê her şivan bi qasî ku erebokekê çêke û dûv têke navê zane textan bike telaş; her heywanek xwedîyê erebokekê ye ya ku dûvê xwe pê hilgire. Firehîya dûvê cinsê mîha yê din berbiçav e û dikare bibe bi qasî zendekî.

[114] Li başûr li cihê ku ber bi rojava ve nizm dibe welatê bi navê Ethîopîa heye, ev erdên dawî ye yên di vî alî de yêninsan lê rûdinin; li van erdan gelek zêr hene, fîlên mezin, cûreyên darên bejî û abanoz hene, insanên wan girs in, gelekî xweşik in û temendirêj in.

[115] Cihên Asya û Libyayê yên herî serî vir in. Em bên ser dawîya rojavayê Ewrûpayê, ez nikarim îzaheke fireh bidim. Bi rastî çemekî ku barbar wê bi navê Erîdanûs nas dikin hebûye, rijyaye nav deryaya li bakur, cihê ji me re amberîn tê, ez li ser hesabê xwe tiştekî wiha qebûl nakim, -wekî din, dibêjin giravên Kassîterosê hebûne, qelay ji me re ji wir dihatê; ez vê jî qebûl nakim. Carekê kokê vê Erîdanusê Yûnanî ye, ne biyanî ye, ji vê kifş e; dikare şaîrek ev nav li hev anîbe; li milê din min ewqas lê nepirsî. Ez rastî kesekî nehatim ku li milê din ê Ewrûpayê deryayek dîtibe. Wiha yan wisa, ji me re qelay û enber ji serîyên din ên dinyê tên.

[116] Çavkanîyên zêran yên herî mezin, wisan tê xuyakirin ku, li bakurê Ewrûpayê ne; lê ev zêr ji ku tên? Ez nikarim bersiveke tam ji vê re jî bidim. Tê gotin ku Arîmaspesî hebûne, bi yek çavî bûne, wan zêr ji Grîffonan birrîne. Lê di her cihetê de, bila wekî insanên din bin yan jî yekçav bên dinyê, ez bawerî bi tiştekî wiha jî nakim. -Lê em dikarin bêjin, ji bo me tiştên herî xweşik û kêm têne dîtin, li qiraxên herî dûr yên çembera dinyê rapêçane hene.

[117] Li Asyayê deştek heye. Her alîyê wê bi çiyayekî hatîye rapêçan û pênc buhêrkên çiyê hene; ev deşt berê ya Khorasanîyan bûye; Hyrkanîayî, Part-

hîayî, Sarangîayî û Thamanaeîyî cîranên wan bûne; lê niha ew yên Persîyan in û milkê Hikumdarê Mezin e. Ji wî çiyayî ku dora wê pêçaye rûbarekî navê wî Akes derdikeve. Berê ev rûbar dibû penc şax, erdê ew welatên min behsa navê wan kirin av dida; di her yek ji wan buhêrkên çiyayê asê qanal derbas dibû û erdên pênc miletên ku li dora wan rûdiniştin av dida. Lê piştî desthilata Persê dest pê kir, bi vî awayî bû: Hikumdarê Mezin, bi bendan û derîyên ber lehîyê bigrin ev buhêrk tevde girtin, dema pêşîya çem hat xitimandin, deşta di navenda çiyayê bilind de tije av bû, ji ber ku çem derbasî deştê dibû, lê ji wir nediherikî nediçû ji derve. Xelkê ku berê ji rûbarê sûd werdigirtin, êdî ji vê sûdê mehrum mabûn û ketin tengîyên mezin. Zivistanan, Xuda çawa ji insanên din re baran dişand, ji wan re jî baran dişand, lê ava çem, dema ku havînan kuncî û garis diçandin ji wan re lazim dibû. Dema ku ji vê avê mehrum man, jinên xwe jî girtin ba xwe û berê xwe dan ba Persîyan, li ber derîyê seraya hikumdar li ber xwe dan, gazinên dil û hinav bişewitîne kirin. Wî wextî hikumdar emir da ku qapaxên bendan bên vekirin, av pêşî dan cihê herî zêde pêwistîya wan pê hebû; piştî erdê vî welatî gihişt avê, hikumdar ew girt û ji yê din re da vekirin, cardin yê bi lez pêwistîya wan hebû ji wan re hat şandin; lê bêyî ez vê jî bêjim ez derbas nabim, ji bo vê hewzê pere distand û ev ji bilî xeraca li wir dihat stendin werdigirt, bi vê rêyê hatinîyeke mezin bi dest dixist.

MIRINA ÎNTAPHERNES

[118] Belê, yên ez ê di derheqê wan de bêjim evqas in. Întaphernes, ku yek ji wan heft kesan bû yê li hemberî Mag serî hildabûn, piştî bûyera serhildanê, ji ber bêrûtîya xwe mirin heq kiribû. Rojekê çûbû seraya hikumdar û xwestibû hikumdar bibîne; wan di navbera xwe de wisan li hev kiribûn; yên ku Magî anîn xwarê, wê bêxeber biçûna ba hikumdar, tenê lazim bû hikumdar di wê saetê de ne bi jina xwe re bûya. Întaphernes jî ji bo pêwistî bi xeberşandinê nebû, ji ber ku bi xwe jî yek ji wan heftan bû, xwest biçe ba hikumdar. Dergehvan û çawîşê perdeyê nehiştin, gotin ku hikumdar li ba jina xwe ye. Lê Întaphernes ferz dikir ku ew derewan dikin, şûrê xwe derxist û guh û pozê herduyan jî jê kirin û bi hevsarê hespê xwe ve kir rêz kir, bi stûyê wan vekir û bi wî awayî şandin.

[119] Ew derketin hizura hikumdar, yên hatî serê wan gotin. Daryûs, pêşî ji xwe re got; gelo di navbera şeşên din de peymanek heye, silikî. Mirov şandin pey yên din, ji tevan pirsî; Gelo hûn ev tiştên kirinê rast dibînin? Piştî baş fêhim kir ku Întaphernes ev kar bêyî bi wan bişêwire kirîye, wî bi hemî zarok û pismamên wî ve da girtin; ji ber ku ferazîyên xurt didan xuyakirin ku wî bi malbata xwe ve amadekarîya serhildanekê li hemberî wî dikir; hatin girtin, ji bo bên kuştin kirin hepsê. Lê jina Întaphernes ji ber derîyê serayê venediqetîya, digirîya û dinalîya. Ev gilî û gazindên sekin nedizanîn, tesîr li Daryûs kirin; jê re xeber şand: "Xatûn, tu bi xwe hilbijêre, bila Daryûs kîjan xwedîyê te yê di hepsê de ye ji bo te bibexşîne." Jinik melheze kir, bersiv da: "Heke Hikumdarê Mezin wê canê yekî ji min re bibexşîne, bila birayê min berde." Hikumdar şaş bû û jê re xeber şand: "Xatûn, tu bi kîjan eqlî hereket dikî ku bi ser mêrê xwe û zarokên xwe re diqevêze û birayê xwe yê bi qasî zarokên te ne nêzîkî te ye û bi qasî mêrê te ne hezkirîyê te ye, tu hildibijêrî?" Jinikê ev bersiv şand: "Ey hikumdar, heke ez yên xwe wenda bikim, helbet dikare mêrekî min û heke xuda bide zarokên min yên din jî çêbin; lê niha ne dê û ne jî bavê min hene, birayekî min nikare çêbibe. Ya van gotinan bi min dan gotin ev melheze bû." Gotinên jinikê bi Daryûs gelekî bi aqilane hatin. Daxwaza wê hat bicihkirin, birayê wê dayê, ji bo gotinên wê xweşya wî çûbûn, kurê wê yê herî mezin jî bexşand; yên din tev da kuştin. Bi vî awayî kesekî ji wan heftan, di midetekî kurt de ji holê rabûbû.

DAWÎYA POLYKRATES

[120] Di esnayê nexweşîya Kambîses de, lêbinêrin li cihekî din çi diqewimîn: Kîros hê wî wextî yekî Aryanî yê navê wî Oroîtes wek rêvebir danîbû ser Sardesê; xwestekeke xerab ket hişê wî; di navbera wî û Polykratesê Samosî de tu serborîyek tunebû, di derheqê wî de tiştekî xerab jî seh nekiribû, heta rûyê wî jî nedîtibû û niha xistibû serê xwe ku wî bigre û bikuje û ji bo sebebê wê jî bi gelemperî wiha dibêjin: Rojekê Oroîtes li seraya hikumdar rûniştibû, li balê kesekî din yê Aryanî yê navê wî Mîtrobates hebû, ev kes satrabê Daskyleîonê bû.[118] Xeberdana di navbera wan de gihişt devjengîyê,

118 Daskyleîon/Daskîleîon navê navenda herêmê ye, li qeraxê Propontosê (Marmara), di nav sînorê bajarê Bandirma/Balikesîr ya Tirkî de dimîne.

bi tu wiha yî û ez wiha me re, Mîtrobates bi vî awayî li himber Oroîtes rabû: "Ma tu zilam î! Te ev girava bin pozê xwe Samosê jî nekir ser împaratorîya Hikumdarê Mezin, halbûkî karekî hêsan e, xwecihekî ku panzdeh hoplit[119] berhev kirîye jî, hê seltenetê dimeşîne." Tê gotin, ev erzşikenandin gelekî bi Oroîtes giran hatîye û di cihê toleya xwe ji wî kesî veke yê ku ev heqaret layiqî wî dîtîye, gotîye ku ez li ser rûyê Polykrates rastî heqaretê hatim û çi dibe bila bibe xistina wî kirîye hişê xwe.

[121] Li gor gotinên hinek kêmtir belav: Oroîtes, ji bo karekî (nayê gotin çi kare) çawîşek şandîye ba Polykrates. Polykrates di odeya pêşwazîyê de raketî bûye; Anakreonê Teosî jî li balê bûye;[120] belkî jî ji bo otorîteya wî sivik bixe bi zanetî wisan kirîye, belkî jî tawanê wî tenê tesadufek e; her çi hal be, çawîşê Oroîtes çûye balê, tiştî jê re bêje gotîye; rûyê Polykrates ber bi dîwar ve bûye, ne berê xwe zîvirandîye û ne jî bersiv daye.

[122] Mirina Polykrates ji van herdu sebeban bi yekê ve girê didin; kîjan xweşa kê diçe bila bi wê bawer bike. Belê, Oroîtes hat Magnesîaya li ser Maîanderê, Myrsos kurê Gîgesê Lîdyayî şand Samosê; dizanîbû ku Polykrates hakimîyeta deryayan kirîye serê xwe; ew Yûnanîyê cara ewil yê vê hisa xurt kiribû serê xwe ev e; belê, Minosê Knossosî hebû û hê zemanê kevin yê ku împaratorîya deryayê kiribûn destê xwe hebûne; lê ji wextê zemanê çîrokên kevin xelas bûne heta niha, bêguman kesê cara ewil xwestîye li ser Îonîayê û giravan desthilatê damezrîne Polykrates e. Belê Oroîtes bi vê plana wî hisîyaye û ji wî re ev mesaj şandîye: Va yên Oroîtes ji Polykrates re gotine: "Di serê te de planên mezin hene, min wisan xeber girt û çavkanîyên te yên pereyan bi qasî projeyên te ne mezin in. Heke tu bi ya min bikî, hem wê karên te rehet bibin, hem jî tê min xelas bike. Hikumdar Kambîses dê min bikuje. Min ji cihekî saxlem xeber wergirt. Were guhê xwe bide min, pereyên min jî ji niyeta wî ya xerab birevîne; bila perçeke pereyan ya te be,

119 Li Yûnanîstanê ji eskerên peyade yên çekên giran ser wan re hoplit dihat gotin. Wateya hoplon, çek e.

120 Anakreon, pêşî li Samosê li ba Polykrates, piştre li Atînayê li ba Hîpparkhos jiyaye. Welatê wî Teos e ya yek ji duwazdeh bajarên konfederasyona Ionê ye. Teosî piştî Harpagos çûne Trakyayê û bajarê Abderayê ava kirine (Pirtûk 1, beş 168). Anakreon gelek kal mirîye, kesekî şêrîn û şairek bû ku ji jiyana xweş hez dikir.

yên mayî ji min re bihêle; ev pere têrê dike ku te bikî efendîyê temamê Yûnanistanê. Heke bi rastî tu şik bikî ka gelo pereyên wî hene, yekî tu jê bawer bişeyne, bila bi çavê xwe bibîne."

[123] Ev pêşnîyaz xweşîya Polykrates diçe, dibêje baş e. Ji bo ji pereyan têr nedibû, pêşî ji bo ku xezîneyê kontrol bike Maîandrîosê kurê Maîandrîos şand. Ew kesekî ji xwecihan bû û karê nivîsandinê bi wî dida kirin. Piştre xemlên dayîreyên taybetî yên Polykrates ku, gelek tiştên hêja bûn, yê ji perestgeha Hereyê re pêşkêş kirin ev kes bû. Oroîtes, çawa xeber girt ku dê mifetişek bê, wiha kir: Heyşt sindoq girt, hindurê wan tijî kevir kirin, tenê ser wan vala hişt; li ser keviran zêr raxist û sindoq bi benikan girê da hazir kir, Maîandrîos hat, dît û ji Polykrates re got.

[124] Polykrates guh neda îqazên ji xuda û dostên wî hatin, ji bo biçe wir li keştîyekê siwar bû, heta guhê xwe neda xewneke keça xwe jî. Keçikê dîtibû ku bavê wê derxistine ber bi hewa ve. Zeûs wî dişo, Helîos jî dohn lê dike û difirkîne. Dema ku wê ev dît, xebitî ku pêşî li bavê xwe bigre ji bo neçe ba Oroîtes; heta siwarî qayixa xwe ya pêncî bêrî bû jî ji pey veneqetîya, hewil dida jê re bêje ku bêixûrîyek li hêvîya wî ye. Wî jî digot; heke ez sax vegerim, ez ê te bi salan wekî keç bihêlim û çavê wê ditirsand. Keçikê digot; xwezî wisan bûyat, ji bedêla ez bê bav bimînim, baştir e ez bi salan keç bimînim.

[125] Lê Polykrates guhê xwe neda tu hişyarîyê, li ser pêlan ber bi Oroîtes ve diçû; gelek hevalrê girtibûn ba xwe, Demokedesê kurê Kallîphonê Krontonîayî jî di nav wan de bû, hekîmê herî mezin yê 'esra xwe bû. Dema ku gihişt Magnesîayê[121], Polykrates, rastî dawîyeke bi kul û êş ya ne layîqî hisa wî ya mezin ya xurt hat; ji ber ku ji bilî zorkerê Syrakûsê pê ve tu zorkerekî Yûnanî yê bikaribe bejna xwe bide ber ya Polykrates derneketibû. Oroîtes wî wisan da kuştin ku, ne hêja ye ku mirov li ser bisekine, yanî wî li singê da xistin. Hevalên wî yên rê yên Samosî bûn, ji wan re got, şikur bikin ku hûn azad man û ew paşve şandin; biyanî û kole wekî kole li wir hiştin. Polykrates li hewa hat girêdan û xewna keça wî pêk hat; Zeûs bi baranê dişo, Helîos rahên wî miz dide û ava laşê wî vediguhere hilmê.

121 Magnesîa: Bajarê ku li rojavayê Tirkîyê ye, îro jê re Manîsa tê gotin.

[126] Belê, si'ûda wî ya zêde, di dawîyê de Polykrates gihandibû kehaneta ku Amasîs di pêşî de xeber dabûyê. Lê demek kurt şûn de, heyfa wî ji Oroîtesê hat hildan. Piştî mirina Kambîses û hikumdarî ket destê Magan de jî Oroîtes li Sardesê rûdinişt, ji bo ku împaratorî ketibû destê Medan bi sûda Persîyan tiştek nedikir. Ji van zemanên tevlihev sûd wergirt, berî wê Mîtrobatesê satrabê Daskyleîonê, yê di derbarê Polykrates de erza wî şkenandibû kuşt. Kranaspesê kurê Mîtrobates kuşt. Herdu jî li Aryanê gelekî dihatin hezkirin. Ji van awa tawanên wî yên bêserûber yek jî ev bû: Ji Daryûs xeber hatibû, xeber pê ne xweş bû, qasid di rêya vegerê de bi destê qatilên kirêkirî dabû kuştin, laşê qasid û yê hespê wî jî ji holê dabû rakirin.

[127] Piştî Daryûs derket ser text, ji bo hemî kirinên wî yên xerab û bi taybetî kuştina Mîtrobates û kurê wî, xwest Oroîtes ceza bike. Bi awayekî vekirî nedixwest artêşekê bişeyne. Ji ber ku dengê guhertina text hê xelas nebûbû, hê demek kurt bû ku derketibû ser text, li gor xeberên girtibû, hêzeke giring ya Oroîtes hebû; ji alîyê hezar eskerên Aryanî ve dihat parastin, herêmên Frîgya, Lîdya, Îonîayê di destê xwe de digirt. Li hemberî vê rewşê mecbûr ma serî li qurnazîyê bide; giregirên Persê bangê civînekê kir û ji wan re ev got: "Gelî Persîyan, di nav we de, ev karê ez ê niha bêjim, kî dê bigre ser xwe? Lê ne bikaranîna zorê û derxistina qelebalixîyê, karek e ku bi hostayî dikare bê kirin. Ji ber ku karekî jê re hostayî bixwaze hêz bi kêrî tiştekî nayê. Di nav we de wê kî Oroîtes mirî yan sax ji min re bîne? Vî mirovî tu karekî ji bo fêdeya Aryanîyan nekir; bi ser de jî gelek sûc kirin. Hemî li milekî, ji nav we du kes, Mîtrobates û kurê wî da kuştin; hê bi ser de yên emrên min jê re dibe dide kuştin, kirinên wî yên bêedebî hed û hudûd derbas kirin. Pêwist e em zeman nedinê hê zêdetir xerabîyan bi Aryanîyan bike; ji bo em dawî bi xerabîyên wî bînin pêwist e em wî bikujin."

[128] Wezîfeya ku Daryûs li hêvî bû ev bû; sî kes ji bo wezîfeyê bigrin ser xwe derketin. Di nav xwe de li ser vî karî bi hev diçûn; Daryûs got: "Bila pişk bê avêtin"; navê Bagaîosê kurê Artontes derket; Bagaîosê navê wî derketibû wiha kir: Li ser gelek mijaran gelek name nivîsandin, mohra Daryûs li binî xist, rahişt wan û çû Sardesê. Gihişt Sardesê, derket pêşberî Oroîtes, yek bi yek benên nameyan vekirin; ji bo nameyan bixwîne ew didan sekreterê hikumdarîyê, ji ber ku li ba her satrabî sekreterên hikumdarîyê hebûn.

Dema ku name dida Bagaîos li eskerên parastinê dinêrî, gelo ev dikarin ji Oroîtes veqetin, dixwest wê fêhim bike. Dît ku lepta wan li hemberî emran gelekî bi rêz e, heta ji bo ya di wan de hatibû nivîsandin zêdetir bi hurmet pêşwazî dikirin. Wî wextî ji sekreter re, ew nameya ev gotinên han tê de hatibûn nivîsandin dirêj kir: "Gelî Aryayî, hikumdar Daryûs xizmetkirina we wekî eskerên parastinê ji bo Oroîtes qedexe kirîye." Wextê ev gotin seh kirin rimên xwe danîn. Dema ku Bagaîos dît ku îtaetî emra dikin, ajot ser û nameya dawîyê dayê, di vê nameyê de ev hatibûn nivîsandin: "Hikumdar Daryûs, emrî Aryayîyên Sardesê dike ku Oroîtes bikujin." Dema ku ev gotin seh kirin, eskerên parastinê xencerên xwe kêşan û bêsekin ajotin ser, lêdan û kuştin. Belê, toleya Polykratesê Samosî, ji Oroîtesê Aryanî bi vî awayî hatibû wergirtin.

ÇÎROKA DEMOKEDES

[129] Piştî xezîneya Oroîtes anîn Sûsayê û girtin bin parastinê, tiştek qewimî, Hikumdar Daryûs, dema li nêçîrê ji hespê xwe peya bû, lingê wî wergerîya; wergerandineke geleki zor bû; bazinê lingê wî ji cih derketibû. Di serayê de hekîmên Misrî yên qaşo ji hemûyan baştir hebûn, bangî wan kir lê nêrîn. Lê lingê wî ewqas bi xurtî tewandin û birin û anîn, êş hê zêdetir bû. Heft şev û heft rojan xew neket çavên Daryûs. Roja heyştan cardin rewş baş nebûbû, yek ji wan yê li wir, Demokedesê Krotonî pêşnîyazî Daryûs kir, wextekî nav û dengê hekîmtîya wî ya li Sardesê seh kiribû. Daryûs emir kir ku bêsekin wî bibînin û bînin. Wî di nav koleyên Oroîtes de dîtin; wî ji wir girtin anîn û birin ba Daryûs. Zincîrên xwe kaş kir hat; di nav paçik û kevnikan de bû.

[130] Dema ku derket hizura hikumdar, jê pirsîn: "Tu ji hekîmtîyê fêhm dikî?." Nedixwest bêje ez fêhm dikim, ji ber ku heke zanetîya xwe eşkere bike, ditirsîya careke din nekaribe Yûnanistanê bibîne.[122] Daryûs fêhm kir, bi vî karî zane lê naxwaze kifş bike; ji yên wî anîbûn re emir kir ku çov û qamçîyên bizmarkirî bînin. Demokedes wî wextî got, belê, lê got, cardin ji pîşeya hekîmtîyê ewqas zêde fêhm nake, lê ji bo ku gelek caran hekîm dîtîye

122 Daryûs, nedixwest hekîmekî bikêrhatî berde.

hinek hîn bûye. Bi ser vê de jî hikumdar xwe teslîmî destê wî kir, wî jî ew li gor isûla Yûnanîyan tedawî kir; piştî lênerîneke di ser re bi saya dermanên êşbir, nexweş pêşî dest bi raketinê kir û piştre jî di demeke kin de rehet bû. Daryûs ditirsîya ku careke din venegere ser çelengîya xwe ya berê, du cot zincîrên zêr danê. Li ser vê Demokedes pirsî û got: "Ji bo ku min ew rehet kir zincîrên min du qat zêde kir?" Ev gotin kêfa Daryûs anî, ew şand haremê; axayên haremê ketin pêşîyê, bi awayê ku yê hikumdar rehet kirîyê bi jinan dan naskirin. Jinan tasik kirin nav sindoqên tijî zêr û tijî kirin û danê, Demokedes ewqas zêr girt ku, xizmetkarê navê wî Skîton jî, bi wan zêrên ji tasan rijîyabûn û ketibûn erdê, qedereke pere bi dest xistibû.

[131] Lêbinêrin ev Demokedes, ji Krotonê çawa hatibû ba Polykrates: Ew li Krotonê li ba bavê xwe yê gelek bi hêrs bû dijîya. Rojekê êdî nema îdare kir, ew terk kir û çû Aîgînayê. Li giravê bi cih bû û hê sala ewil hemû hekîmên li wir derbas kir, lê ne di destan de aletekî wî hebû û ne jî ji bo pîşeyekî pêwistîyên din. Sala duyem Aîgînayîyan bi fermî salê bi talantekê me'aş jê re girêdan; sala sisiyan Atînayîyan sed mana danê; sala çaran Polykrates du talant danê. Belê bi vî awayî çû Samosê û nav û dengê hekîmên Krotonê bi wî dest pê kir; ji ber ku ew dewra ev bûyer dibûn, hekîmên Krotonî li Yûnanistanê li ser dest dihatin girtin; piştî wan Kyreneyî dihatin; ber bi eynî demê ve, hunermendên herî baş yên mûzîkê yên Yûnanistanê ji nav Argosîyan nav û deng dan.

[132] Piştî Demokedes Daryûs rehet kir, li Sûsayê bû xwedîyê qonaxeke mezin; bûbû hevalê hikumdar yê herî nêzîk û serbest bû çi bike, tenê izna vegera wî ya Yûnanistanê tunebû. Berîya wî ew hekîmên Misrî yên li hikumdar dinêrîn, ji bo ku li hemberî hekîmekî Yûnanî mexlûb bûbûn, wê li qazoxê bixistina; wî hêvî û lava ji hikumdar kir, canê wan da efûkirin; yekî li f'ela dinerî yê Eleûsîsî jî rizgar kir, ew jî ji yên bi Polykrates re hatibûn û di nav koleyan de hatibû jibîrkirin. Ev Demokedes, bûbû kesek xatirşînaz li ba hikumdar.

[133] Midetek kurt piştî van bûyaran tiştekî din bû. Keça Kîros Atossa û jina Daryûs, li singa wê pizrikek derket, xurand, pizrik har kir, di serî de veşartibû, ji şerman ji kesekî re negotibû; lê dema nexweşî pêş ket bangî

Demokedes kirin û pêşê kirnê. Wî jî got: “Ez dikarim vê rehet bikim, lê ez jî ji wê tiştekî dixwazim. » Gerek wê jî soz bidaya ku tiştê dixwaze wê bike; tiştê dixwest ne tiştek bû ku rûmeta wê bişkîne.

[134] Piştî Atossa, bi tedawîya Demokedes gihişt siheta xwe, şeveke ku bi Daryûs re radiket, jê re wiha got: “Ev çi ye hikumdar, di destê te de evqas hêz û quwet heye, tu tiştekî nake û rûdine, tu miletek û erdekî nakî ser Împaratorîya Persê? Kesekî xwedîyê evqas xezîne û bi ser de jî xort, pêwist e biserketin bi dest bİxe, xwe bide nîşan, wî wextî wê Persî jî fêhm bikin ku mêrek wan îdare dike. Bi vê kirinê wê du fêdeyên wê ji te re hebe; ya yekê wê te bidî nîşanî Persîyan ku mêrek li ser serê wan heye, ya duyem tê enerjîya wan di şer de xerc bikî û ji wan re wexit nehêlî li hemberî te serhildanekê bifikirin. Wextê tu xwe bidî nîşan a niha ye; ji ber ku tu xort î; enerjîya insan bi hêza gewdeya wî ve zêde dibe; lê rojek tê kal dibe û êdî halekî wî ku kar bike namîne.” Wiha diaxifî, derza girtibû tekrar dikir, hikumdar bersiv dayê û got: “Xatûna delal, tiştên tu dibêjî bi temamî tên hişê min jî. Belê, min jî biryar daye, ez ê ji vê bejahîyê desthilateke wekî pirekê bavêjim bejahîya din û ez ê bimeşim ser Îskîtîyan; di demeke kurt de wê ev kar bimeşin.” Wî wextî Atossa wiha got: “Guhê xwe bide min, dev ji meşa ser Îskîtîyan berde; tu çi wextê bixwazî tu dikarî wan bigrî. Di eslê xwe de pêwist e ku tu bimeşî ser Yûnanan. Ez dixwazim wekî xizmetkar jinên Lakonîayî, Argosî, Atînayî û Korînthosî bigrim ba xwe, min gelekî nav û dengê wan bihîstîye. Di bin destê te de mirovekî hemî welatên Yûnanistanê bi te bide naskirin û rêberîyê bike heye; mebesta min ew kesê tu baş kir.” Daryûs bersiv da û got: “Madem tu bawer dikî baştir e em hemî hêza xwe li hemberî Yûnanistanê bikar bînin, li gor min pêwist e berîya wê em çend Persîyan bişînin wir, ew mirovê tu dibêjî jî em têkin rexê wan; dê rewşê bibînin, hîn bibin û zanyarîyên li ser Yûnanan ji me re bînin; piştî em wan hîn bûn, ez ê jî berê xwe bidim wan.”

[135] Wiha got û gotinên xwe jî pêk anîn. Eynî roja din sibehê wezîfe da panzdeh Aryanîyan, wê li qiraxên Yûnanistanê bigerîyana, Demokedes jî kiribû rexê wan, ji bo baz nede wê guhê wan li ser wî bûya û çi dibe bila bibe wê paşve bianîna. Piştî ev emir da ji bo bangî Demokedes bikin; ji wî re jî wek wezîfeya wî got ku, tê Persîyan li Yûnanistanê bigerîne û her tiştî nîşanî

wan bike; piştre jî wê bêpayîn paşde vegerîya. Heke bixwesta wê karîba bi xwe re hemî serweta xwe ya guhêzbar bibira û diyarî bav û birayên xwe bikira, di wextê vegerê de wê jê re sed qatê wê bihata dayîn; ji bo bikaribe van diyarîyan bibe wê bi emanetî keştîyeke bar bidana wî, bi qasî ku tije jî bike dikarîbû diyarîyên hêja têxê û bi wê vebûya deryayê. Li gor min bi van gotinan niyeteke Daryûs ya xerab tunebû; lê Demokedes ferz kir ku hikumdar wî diceribîne; ji vê destvekirîyê sûd wernegirt; got ku wê eşyayên xwe ji bo di vegerê de werbigire li vir bihêle; lê ew tişên ji bo dê, bav û birayên wî bidênê wê bi xwe re bibe. -Daryûs, piştî ev agahdarîyên pêwist dan Demokedes, keşifdarên xwe ji bo vebin deryayê şandin.

[136] Hatin Fenîkeyê, ya rastîn Sîdonê û li wir bêyî xwe mijûl bikin du trîrem[123] techîz kirin, wekî din keştîyeke bar ya hindurê wê tijî diyarîyên hêja. Piştî hemî hazirî temam bûn, ber bi Yûnanistanê ve derketin rê; di qiraxan re diçûn û li hemî qiraxan lêkolîn dikirin û nexşeya wan derdixistin; beşên wê yên herî mezin û bi taybetî li cihên navên wan gelekî derbas dibûn gerîyan û piştre hatin Tarantoya li Italyayê. Li vir hikumdarê Tarantoyan Arîstophîlîdes, ji bo xatirê Demokedes dumena keştîyên Aryanîyan jê da derxistin, ji ber sûcdarîya sîxûrîyê ew jî avêtin hepsê. Dema wan li hepisxaneyê ezîyet dikişandin, Demokedes çû Krotonayê; piştî ew çû welatê xwe, Arîstophîlîdes Aryanî berdan û perçeyên ji keştîyên wan dabû derxistin paşve da wan,

[137] Aryanî vebûn deryayê, ketin pey Demokedes û hatin Krotonê;[124] dema di meydanekê de digerîya ew dîtin û girtin. Di nav Krotonîyan de yên xwe ji Dewleta Aryanan disitirandin, amade bûn ku Demokedes teslîm bikin; lê yên din jî hebûn, bi darên qerase xwestin Demokedes ji destê Aryanîyan rizgar bikin. Aryanîyan dikirin hawar û digotin "Ey Krotonî, hişê xwe bînin serê xwe, ev mirovê hûn dixwazin ji destê me bistînin, yê Hikumdarê Mezin e, qaçax e. Dil we de Hikumdar Daryûs wê iznê bide heqaret lê bê kirin! Qey hûn nafikirin wê çi bê serê we, heke hûn vî mirovî ji destê me bistînin? Dê wî wextî artêşa me raste rast nemeşe ser bajarê we? Gelo berîya herkesî hûn ê nebin kole? Çi gotin nikarîbûn Krotonî ji ya wan vegerînin.

123 Trîrem, keştîyeke şer ya mezin ya sê rêz bêrî.

124 Li Îtalya, li başûrêrojavayê Kendava Tarantoyê, Crotoneya niha.

Yên din Demokedes wergirtin; Aryanîyan ew keştîya bar ya li ba wan jî wergirtin û ji nû ve rêya Asyayê dan ber xwe, rêberê wan tunebû, nefikirîn cihên hindur yên Yûnanistanê bigerin. Wextê li keştîyê siwar bûn, Demokedes ji wan re got: "Ser çevan, ji Daryûs re bêjin wê biçe bi keça Mîlon re bizewice." Ji ber ku navê vî pêlewanî di seraya Hikumdarê Mezin de dihat zanîn. Demokedes ji bo vê zewacê pereyên mezin dane, li gor min tenê ji bo bi Daryûs bide zanîn ew di welatê xwe de jî kesekî qedirşînaz e ev kirîye, ne tiştekî din e.

[138] Keştîya Aryanîyan ya ji Krotonê rabû li Îapygîayê li bejahîyê xist,[125] Aryanî li vir wek kole hatin ragirtin; lê koçberekî ji Tarantoyê yê navê wî Gîllos ew xilas kirin û heta ba Daryûs bi wan re çû. Hikumdar ji bo dilê xweş bike jê re got ku, tu çi bixwaze em ê bidin te. Gîllos yên hatibûn serê wî jê re gotin û daxwaza wî tenê ew bû ku wî cardin bigihînin Tarantoyê; lê şandina hêzeke mezin ya deryayî heya Italyayê, wê temamê Yûnanistanê rakira ser pêyan, gotin "Ji bo vê, Knîdosî vî karî bi serê xwe dikarin bikin." Knîdosî û Tarantoyî dost bûn, wan ji herkesî baştir dikarîbûn vegera wî pêk bînin. Daryûs ev xwestek qebûl kir, ji bo bê bicihkirin hereket kir. Ji Knîdosîyan re qasid şand û emir da wan ku Gîllos bibin Tarantoyê. Knîdosîyan guhê xwe dan gotinên Daryûs, lê nikarîbûn têxin serê Tarantoyîyan, hêza wan a gotinên xwe bi zorê bidin kirin jî tunebû. Ev çîrok jî wiha ye; Aryanîyên cara ewil derbasî Yûnanistanê bûne ev in û sebebê sîxûrtîya wan jî ev e.

ÇÎROKA SYLOSON

[139] Piştî vê Hikumdar Daryûs, Samos zept kir; cihê yekem yê li Yûnanistanê û bajarê barbaran girt ev bû û sebebê êrîşa wî jî kêm-zêde ev e: Di dema sefera Misrê ya Kambîsesê kurê Kîros de, qefîleyên Yûnanî yên qelebalix jî hatibûn vî welatî, hinek jê wek ku wê bê zanîn ji bo bazirganîya xwe bikin, hinekên din jî tenê ji bo gerê û dîtinê; Syloson jî di nav wan de bû, ew birayê Polykratesê kurê Aîakes bû û ew ji Samosê sirgun kiribûn. Ev Syloson mirovekî xwedî talih bûye. Bi vî awayî ku, qapûteke xweşik yê sor diavêt ser milê xwe, li agoraya Memphîsê serberedayî digerîya; Daryûs

125 Îapygîa yan jî Apûlîa, erdên li bakurê Tarantoyê li qiraxên Adrîyatîkê dirêj dibin.

ku wî wextî di yekîneya parastina Kambîses de bû û çalakîyeke wî yê şexsî tunebû, ew dît, kêfa wî ji qapût re hat, ji bo ku bikire çû ba Syloson. Syloson dît ku gelekî kêfa Daryûs ji qapût re hatîye, li gor îlhameke îlahî jê re wiha got: "Ji vî qapotî re nikare fîyet bê teqdîrkirin, lê madem te evqas jê hez kir, kerem bike bila ji te re be." Daryûs sipas kir û wergirt.

[140] Syloson aciz dibû ku belasebep ji qapûtê xwe bû. Zeman derbas bû, Kambîses mir. Heftkes li hemberî Mag serî hildan û yek ji nav wan, ku Daryûs bû, derket ser text. Syloson, hîn bû ku ew kesê qapotê xwe diyarî dabûyê bûye hikumdar. Çû, li Sûsayê li ser şîpaneya seraya hikumdar rûnişt û xwe kesekî qencîya wî gihaye hikumdar da nasîn. Dergehvan çû û ji hikumdar re got. hikumdar ecêbmayî ma, cewab da: "Ew Yûnanîyê ku min qencî jê dîtîye û li hemberî vê qencîya wî ez deyndar mame kî ye? Ne ji zû ve ye ku ez derketime ser text û di vê navê re kesekî Yûnanî ji bo dîtina min nehatîye. Ez ne bawer im ez deyndarê vî Yûnanîyî me. Bînin ka, eslê wê çi ye em fêhm bikin." Dergehvan, Syloson bir hindur; di hizurê de li ser lingan sekinî, wergêran navê wî û çi xizmet ji hikumdar re kirîye, jê pirsîn. Li ser vê Syloson behsa çîroka qapût kir û got, ew ez bûm. Wî wextî Daryûs got: "Ey mertirê hemî insanan, hê ez ne di iktidarê de bûm, ew kesê ew diyarî da min tu yî. Belê, ne diyarîyeke ewqas mezin bû, lê bi qasî ez îro dîyarîyekî layiqî hikumdarekî werbigirim, ewqas ez kêfxweş kiribûm. Ez dixwazim te di zêr û zîvên hesaba wê tune de bihêlim, ku tu ji qencîya te bi Daryûsê kurê Hîstaspes kirîye poşman nebî." Ji van gotinan re Syloson vê bersivê dide: "Ey hikumdar, ji min re ne zêr û ne jî zîv lazim e, lê Samosê rizgar bike, welatê min bide min, ji ber ku niha ew, piştî mirina birayê min, di destê koleyekî me de maye û Oroîtes piştgirîya van koleyan dike; wê bêyî xwînrijandin û kolekirin paşde bide min."

[141] Daryûs li ser vê daxwazê artêşek şand, fermaderê wan Otanesê ku yek ji wan heftan bû; emrê hemî daxwazên Syloson pêk bîne wergirtibû. Otanes, ber bi qiraxa behrê ve meşîya û sefer birêve bir.

[142] Li Samosê Maîandrîosê kurê Maîandrîos di iktidarê de bû; Polykrates hikûmet emanetî wî kiribû. Vî mirovî dixwest bibe rastirîn insan, lê ji bo vê imkan nedîtin. Dema ku hîn bû Polykrates mirîye, lêbinêrin ka yekem

tiştê ku kir çi bû: Li taxeke derveyî Samosê cihek veqetand, dora wê pîroz da ragihandin û di navenda wê de li ser navê Zeûsê Rizgarker mihrabek ava kir; wextê ev kar temam bû, bangî hemşehrîyê xwe kir ji bo civînekê û ev gotin gotin: "Hûn hemî dizanin, asayê hikumdarîyê û taca Polykrates dan min; niha meşandina hikmê li ser we di destê min de ye. Lê di destê min de be jî, tiştê ku ez ji bo hinek din rexne dikim, ez naxwazim wê bikim. Ez 'aciz bûm ji bo ku Polykrates insanên wekî wî kole bi kar tanî, xweşa min naçe yên din jî bên bikar anîn. Belê, niha êdî Polykrates tune; ez iktidarê ji milet re dihêlim û ez wekhevîya mafan di navbera we de îlan dikim. Di miqabilî vê de ez ji bo xwe tenê vê dixwazim: Ji xezîneya Polykrates ji min re şeş talant me'aş bê girêdan û ya din jî xizmeta perestgeha pîroz ya Zeûs bela ji min û sulala min ya wê bên re bihêlin, ji ber ku ev mihrab min ava kirîye û min azadî daye we." Wî ji Samosîyan re ev gotin. Wî wextî yek ji nav wan rabû û wiha got: "Naxêr, tu nikarî emir bidî me, bêeslê kurê bêeslan, rezîl. Tê hesaba pereyên di destê xwe de çawa bidî? Melhezeya wê bike!"

[143] Yê ev gotin gotin, hemwelatîyekî xatirşînaz bû, navê wî Telesarkhos bû. Wî wextî Maîandrîos lê nêrî ku, heke ew dev ji hikumdarîyê berde, wê yekî din bigre û zordestîyê bike, dev ji hiştina wê berda; bêsekin ket nav kelehê, di bin perdeya hesêbdayînê de bang giregirên[126] hemwelatîyên xwe kir û tevde şidyayî girê dan û avêtin hepsê. Li wir hemî hatin zincîrkirin; lê Maîandrîos nexweş ket, birayê wî yê navê wî Lykaretos ku li hêvîya mirina wî bû, ji bo li Samosê bi rehetî hikumdarîyê bigre destê xwe, yên di hepisxaneyê de bûn tevde da kuştin; wisan dihat fêhimkirin ku Samosîyan azadî nedixwestin.

[144] Dema Persîyên ku Sylosonîyan rê nîşanê wan dida hatin ber Samosê, kesekî li hemberî wan destê xwe neda çekan; yên terefdarê Maîandrîos û Maîandrîos bi xwe, xwestin ku peymanek çêbibe, li gor peymanê dê ew ji giravê derketina. Otanes peyman qebûl kir û dualî agirbest îlan kir; qismeke zêde artêşa Aryanîyan li hemberî kelehê bi cih bû û dest bi dorpêçê kir.

126 Gotina 'giregirên' me îlawe kir, ji bo ku me ji bo manayê pêwist dît. (nota wergêrê Fransizî)

[145] Birayekî Maîandrîosê hikumran hebû, hinek mirovekî çeleng bû û navê wî Kharilaos bû; wî hinek tawan kiribû û di zindana hepisxanekê de cezayê xwe dikişand. Ji bo guh li yên dibûn kiribû, xwe ji pencereya arîkan dirêj kir û lê nêrî, Aryanî bêyî tiştekî bikin rûniştibûn; wî wextî dest bi gazî û qêrînan kir, dixwest Maîandrîos bibîne. Maîandrîos jî qelebalix seh kiribû. Benên wî da vekirin û da anîn. Ew çawa derket pêşberî wî dest bi sixêfan kir, ew sor dikir da bi Aryanîyan re şer bike: "Ey rezîlê rezîlan, ev çiye tu dikî, ez ku birayê te me, min tiştekî ku ez têkevim hepisxaneyê nekirîye tu min zincîr dikî û davêjî zindanê; Aryanî hatine te ji mala te davêjin derve û dixwazin hemî hebûna te ji destê te bistînin, tu çima vê bêşermîyê ji wan re dihêlî? Halbûkî mexlûbkirina wan ne tiştek e. Lê tu ditirsî, yekîneya xwe ya parastinê bide min, ez wan ji hatina vir poşman bikim. Derxistina te sax û silamet ji giravê jî ez ê bigrim ser xwe."

[146] Kharîalos wiha axift. Û Maîandrîos, tiştên gotin kirin. Li gor min ne ku hêvîya wî hebû eskerên wî zora eskerên hikumdar bibin; zêdetir ji bo hesûdî ji Syloson dikir, nedixwest bajarekî bê berxwedan û bê şer teslîmê wî bike. Bi vî awayî dixwest Aryanîyan hêrs bike û berîya Samosê teslîmî destê wan bike, çiqas jê tê ewqas xerabî bike. Ji ber ku wî dizanîbû heke Aryanî zêde telefatan bidin, dê êşa wê ji Samosîyan derxînin. Em bên ser wî, wî çi wextî bixwesta bêyî zirarek bigihêyê dikarîbû ji giravê derketa. Ji kelehê heta deryayê di bin erdê de rêyek dabû kolan. Û Maîandrîos, Samos terk kir û xwe avêt keştîyê, çû. Kharîlaos, temamê eskerên parastinê bi çek kirin, derîyên kelehê da vekirin û eskerên xwe ajot ser Aryanîyên ku dil wan de her kar hatîye tekûzkirin û ne li bende êrîşekê bûn. Eskerên bi heq, êrîşî Aryanîyan kirin. Yên ketin ber erîşê, yên herî bijarteyên Aryanîyan bûn, ew bi textêrewan beşdarî artêşê bûbûn; qetlîameke mezin çêbû. Ew bi vî karî ve mijûl bûn, beşa din ya artêşa Aryanîyan hat alîkarîyê; eskerên bi heq hatin perçiqandin û xwe avêtin nav kelehê.

[147] Wextê derketibûn rê Daryûs gotibû ku wê kesek ji Samosîyan neyê kuştin û şertên kolekirinê neyê tetbîqkirin û bajar bê zerarekê bibîne teslîmî Syloson bê kirin. General Otanes dema dît Aryanîyan zayîateke mezin dane, ew emrê di vî warî de hatibû dayîn ji bîr kir; ev îqazên han gelek baş di zêhna wî de hatibûn kolandin, lê cardin ji bîr kir û ji eskerên xwe re got,

mêrên bikevin destê wan, ji biçûkan heta mezinan bikujin. Wî wextî qismeke artêşê Akropol dorpêç kir, yên mayî dest bi qetlîameke tevayî kirin, yên ketin destê wan kuştin, yên xwe avêtibûn cihên pîroz jî rizgar nebûn.

[148] Piştî Maîandrîos ji Samosê derket, berê keştîya xwe da Lakedaîmonê. Dema gihişt wir, xezîneya bi xwe re anîbû danî cihekî emîn û tiştekî wiha kir: Li cihekî ku tê dîtin kûpayên zêr û zîv rêz kirin, dema ku xizmetkaran ew paqij dikirin û dibiriqandin, ew çû dîtina Kleomenesê kurê Alexandrîdasê hikumdarê Spartayê û ew girt anî mala xwe. Dema ku Kleomenes kûpa dîtin, ma heyran û nikarîbû çavên xwe ji wan veqetîne. Maîandrîos got çi dixwaze dikare bibe, gelek israr kir. Lê Kleomenes ji rastîyê derneket; lê ji bo diyarîyên dabûnê paşve vegerandibû, wê Maîandrîos biketa şikê, destê wî jî vekirî bûn, ji nav hemwelatîyên wî dikare hin kesan bixapîne û ji wî heyfê hilîne, bi van melhezeyan çû, Ephorosî dîtin, got ku ji ber berjewendîyên Spartayîyan ev biyanîyê Samosî ji Peloponezê bê derxistin wê baş bûya, bi vî awayî wê pêşîya tehlîkeya ji rêderketina wî yan jî Spartayîyekî din bihata girtin. Wan jî gotin baş e, çawîşek şandin û biryara sirgûnê gihandin Maîandrîos.

[149] Aryanî, wekî ketibe nav torekê Samos rapêçabûn; dema ket destê Syloson yek mêr nemabû, hemî miribûn. Piştre general Otanes, ji bo ji nû ve geş bike kolonî anîn bi cih kirin, ji ber ku xewn dîtibû û di organên wî yên zêdebûnê de nexweşîyekê dest pê kiribû.

SEFERA BABÎLÊ YA DARYÛS

[150] Dema ku sefera deryayî ya Samosê hat destpêkirin, Babîlîyan serî hildan; gelek baş amade bûbûn; ji ber ku, dema Magan hikum dimeşandin û heft kesan serî hildan, ji tevlihevîyên dirêj kêşan sûd wergirtibûn û hatibûn rewşekê ku bikaribin xwe li hemberî dorpêçekê li ber xwe bidin; bêguman amadekarîyên xwe nehênî digirtin. Dema hatin rewşeke serhildanê ya vekirî, lêbinêrin çi kirin: Her mêrî tenê jinek ji mala xwe hilbijart derxist (Yên dayîk bûn ji xwe veqetîyabûn.) Temamê jinên mayî berhev kirin û xeniqandin. Ji bo xwarinçêkirinê her yekî tenê yek hiştibû; yên din xeniqandibûn. Ji ber ku dixwestin pêşîya xerckirina xwarinê bigrin.

[151] Dema Daryûs ev xeber wergirtin, temamê hêza xwe berhev kirin û meşîya ser Babîlê; artêş anî ber dîwarên bajêr, bajar dorpêç kir; Babîlîyan guhê xwe nedidanê. Derdiketin cihên bilind yên tabyayan cihê bêne dîtin û govend digirtin, henekên xwe bi Daryûs û artêşa wî re dikirin; kesek ji nav wan wiha digot: "Ey Aryanî hûn çima li vir disekinin? Hûn derkevin biçin dê ji we re baştir be. Kengî hêstir bizê, hûn ê jî wî wextî me bikin destê xwe." Vî Babîlîyî wiha diaxift, ji ber ku difikirî hêstirek tu wextî nazê.

[152] Nozdeh meh bû, Daryûs û artêşa wî, bêyî Babîl bigrin sekinîbûn, bêhna wan teng dibû. Pergaleke ku serî lê bidin nehiştibûn, her rê ceribandibûn; lê nedikarîn bajêr bigrin. Di nav rêyên din de, serî li rêya ji Kîros re derî dabû vekirin jî dabûn. Lê êdî Babîlî ji xafîl de nediketin xefkan û bajar nedihat girtin.

[153] Di meha bîstan de, Zopyrosê kurê Megabyzos yê ji heftan yên li hemberî Magan serî hildabûn, bû şahidê mûcîzeyekê: Yek ji hêstirên wî yên erzaq dikêşan za û hêstirek anî. Baz dan xeber gihandinê, pêşî bawer nekir, piştre çû hêstira çêlik bi çavê xwe dît û tembîh li şahidên mûcîzeyê kir ku "Ji kesekî re nebêjin" û dest bi melhezeyan kir. Tiştên Babîlî gotibû difikirî, hê di serî de gotibû, heke hûn zayîna hêstirê bibînin, dê hûn kelhê bigrin; van gotinan û vê bûyerê li hev dikirin; pişta xwe da van gotinan û kir serê xwe ku wê Babîl bikeve; xudayê van yê ev gotin bi Babîlî dabû gotin, kir ku hêstirek bizê û hêstirekê bîne.

[154 Li gor wî êdî roja ku qederê ji bo ketina Babîlê veqetandîye hatîye; çû, Daryûs dît, gelo girtina vî bajarî ji bo wî gelek giring bû? Pêşî wê hîn bû. Piştî qeneet kir ku hikumdar gelek giringî dide vî karî, dest bi xeyalan kir û digot, ez çi bikim ku yê bajar bigre ez bim, vî karî ez bi xwe bikarim bikim; ji ber ku li ba Aryanîyan serkeftinên mezin rûmetên mezin pêk tînin. Ji bo vê yekê çareya ku hat hişê wî ev bû:. Wê ew bi xwe cihekî xwe jê bike û derbasî nav sefê Babîlîyan bibe. Seqetmayîneke ku vegera wê ne mimkun be da ber çavê xwe; guh û pozê xwe jê kir, wekî yekî bextreş porê xwe bi temamî kur kir, xwe bi xwe xwe da ber qamçîyan û çû ba Daryûs.

[155] Dema Daryûs kesekî esîl yê ji qata herî bilind bi vî awayî di nav birîn û halekî perçekirî de dît, gelek xemgîn bû; ji cihê xwe rabû, dest bi qêrînê

kir, pirsî û got "Kê ev kir, çima kir?". Aryanî bersiv da û got "Ji te pê ve kesekî fanî ku karibe wiha li yekî weke min bike tune, ey hikumdar yê li min ev birîn vekirin, ne destê kesekî ye; destê min bi xwe ye, ji ber ku êdî ez tehemulî henekpêkirinên Asûrîyan li Persîyan nakim" -hikumdar got "Ey bêtalihtirîn kesê ji insanan, tu dixwazî li ser tiştekî şermîn bi bahaneke bi rûmet bigrî û tu dibêjî sebebê van birînên bêderman ev dorpêç e. Hey dîno, ma ev birînên han mexlûbbûna dijmin pêk tîne? Kesekî hişê wî li serî çawa dikare wiha li xwe bike?" Yê din bersiv da? "Heke tiştê min plan kirîye di pêşî de min ji te re bigota, te izin nedida min, lê ji bo ew karê ku ez ê bikim, ez tenê bi xwe şêwirîm. Niha heke tu kar sist negrî, Babîl wê bibe ya me. Ez ê bi vî halê xwe wekî qaçaxekî biçim teslîmî wan bibim; ez ê wan bixapînim û fermandartîyekê ji wan bistînim. Tu ji dema ez ketim bajêr pê ve deh rojan bihejmêre; ji artêşa xwe, ya windakirina wê ne giring, yekînekê veqetîne; hezar kesan bişeyne nêzîkî derîyê jê re Derîyê Semîramîs tê gotin. Dûra, piştî wan deh rojan heft roj din derbas bû, du hezar kesan deyne ber derîyê ku jê re Derîyê Nînîve dibêjin; piştî van heft rojan, berde bila bîst roj din derbas bibin, piştre yekîneke din bişîne ber derîyê jê re Derîyê Khaldeayî[127] dibêjin, vê carê bila çar hezar kes bin. Lê hem di destê yên berê de û hem jî di destê van de, ji bo ku xwe biparêzên ji xencerê pê ve bela tiştek tunebe; berde bila xencerên wan li ser wan be. Wextê ev bîst roj jî derbas bûn, hemî artêşê pêşve bibe; bila tenê Aryanî bimînin, hemî tabyan bizivirîne, Îranîyan jî deyne hemberî derîyê Belosê û Kîssîayê. Piştî ew serkeftinên ez bi dest bixim, qet şika min tune ku wê Babîlî miftên derîyan emanetê min bikin. Ji wir şûn ve êdî kar dimîne ji min û Aryanîyan re."

[156] Piştî ev agahdarî dan, ber bi derîyê bajêr ve meşîya; wekî qaçaxeke rastîn, car carnan wekî bi şik e li pişt xwe dinêrî. Nobedarên li kuleyên li vî milî dinêrîn, bazdan jêrê, derî nîvco vekirin û pirs kirin "Tu kî yî, çi dixwazî". Wî got "navê min Zopyros e" û got dixwaze derbasî nav sefê wan bibe. Li ser van gotinan nobedaran ew girtin ji Heyeta Bilind Ya Babîlê re birin. Ew li wir rûnişt, dest bi gilî û gazindan kirin, ew birînên bi destê xwe vekiribû nîşan da, got "Ev tevde Daryûs wilo kir", temamê ev kirinên han, ji bo ku ji Daryûs re gotîye artêşa xwe paşve bikêşe û imkana stendina kelehê

127 Khaldeayî/Xaldeayî

tune, ji ber wê ev hatine serî. Gotinên xwe domand û got "Halbûkî niha hebûna min di nav Babîlîyan de ji bo we taliheke mezin e, ji bo Daryûs û Aryanîyan felaketek mezin e. Wê ew, cezayê seqethiştina min bikşîne; ez hemî planên wan dizanim, hemî nehênîyên wan dizanim."

[157] Ew wiha axift. Mirovê li hemberî Babîlîyan ji qata herî esîl ya Aryanîyan dihat, pozê wî û guhê wî hatibû perçekirin, li ser bedena wî rêça qamçîyan hebû, ser û çavên wî di nav xwînê de bû, bawerî bi gotinên wî kirin ku ji bo bi wan re hevkarîyê bike hatîye; xuya dikir ku wê daxwazên wî qebûl bikin; wî wextî wî ji wan fermandarî xwest. Piştî fermandarî girt destê xwe, wekî bi Daryûs re li hev kiribû kir; roja dehan bi wan Babîlîyên di bin fermandarîya wî de serkeftinek pêk anîn, ew hezar kesên ku ji Daryûs xwestibû cara pêşî derkevin pêşîya wî dorpêç kir û bi şûran ew perçe kirin. Babîlîyan lê nêrîn karê dike bi gotinên wî re li hev dike, gelek şa bûn û ketin halekî ku her gotinên wî çavgirtî bikin. Ew ma li hêvîyê, heta roja kifşe bê, ji nav Babîlîyan yekîneke nû hilbijart û kir nav şer û du hezar eskerên Daryûs yên din bi şûran kuştin. Piştî ev serkeftina duyem jî dîtin, Babîlî bi yek dengî re, tenê ji bo Zopyros dest bi pesnan kirin. Ew cardin li hêvîyê ma, ji bo midetekî din derbas bibe, piştre yekîneya di bin fermandarîya wî de bir cihekî kifş ya berê biryar dabû, dora çar hezar kesên din pêça û kuştin. Vê carê êdî Zopyros li Babîlê her tişt bû; serokfermandarî danê, parêzîya tabyayan emanetê wî kirin.

[158] Daryûs, wekî ku li hev kiribûn dest bi êrîşa gelemperî kir, yekîneyên xwe ajot ser tabyayan, wî wextî Zopyros fêlbazîya xwe raxist orteyê. Artêşa Daryûs êrîş li ser êrîşê nû dikir, Babîlîyan ji ser dîwarên kelehê ew paşve diavêtin; lê Zopyros, derîyên Belosê û Kîssîayê vekirin, Aryanî histin hindur, Babîlîyên ku kirinên wî dîtin, ber bi perestgeha Zeûs Belosê baz dan; yên nedîtin jî, heta dema fêhim kirin ku xayîntî bi wan re bûye, ji cihê şer veneqetîyan.

[159] Belê, Babîl, cara duyem bi vî awayî hat stendin. Piştî Daryûs hakimîyeta xwe li bajêr bi cih kir, dîwar da xerakirin, hemî derî da rakirin; berîya wî dema Kîros Babîl sitendibû, ne ev kiribû û ne jî wê; ji bilî vê Daryûs, izin da ku Babîlî li bajêr bimînin. Ji bo ji xwe re jin bibînin tedbîrên xwedî

pêşbînî wergirtin, ji ber ku nedixwest neslê wan xelas bibe. (Me li jorê gotibû, Babîlî ji bo ji xwarinê sûd werbigirin jinên xwe xeniqandibûn.) Daryûs ferman belav kirin, ji miletên derûdorê xwest ji Babîlê re jinan bişînin. Her yekî wê çend jinan bişînin, kifş kirin, bi vî awayî pêncî hezar jin berhev bûn; Babîlîyên niha ji van jinan zêde bûne.

[160] Di çavê Daryûs de Zopyros, bi vê serkeftina xwe re, ji derveyî Kîros, di ser hemî Aryanîyên hatine û çûne bilindtir girtîye; ji ber ku heta niha tu Aryanîyek, xwe bi Kîros re miqayese nekirîye. Tê gotin, Daryûs gelek caran, ji bo guh û pozê Zopyros gotîye, bila bîst Babîl feda bin. Ew bi rûmetan xemilandîye; her sal diyarîyên di çavê Aryanîyan de herî bi qîmet didan wî; ew danîbû ser Babîlê, dê ew di temamê temenê xwe de li wir bimaya, dê temamê hatinîya wê ji xwe re bistendina û wê bac jî nedaya û hê gelek qencîyên din lê kirin. Kurekî vî Zopyros yê navê wî Megabyzos çêbû, fermandarîya artêşa li hemberî Atînayê û hevalbendên wî ku şandin Misrê kirîye; kurekî vî Megabyzos yê navê wî Zopyros jî çêbûye, ew jî ji bo bikeve bin xizmeta Atînayîyan, Aryanê terk kirîye.

PIRTÛKA ÇARAN

MELPOMENE

ÎSKÎTÎ - WELATÊ WAN - TAYBETMEN-DÎYÊN WAN

[1] Daryûs, piştî Babîl zept kir, li hemberî Îskîtîyan derket seferê.[128] Asya gelek pêşve çûbû, nifusa wê zêde dikelîya û di nav dewlemendîyê de sobanî dikir. Daryûs cezakirina Îskîtîyan kiribû serê xwe, yên cara yekê avêtibûn ser Medîayê ew bûn, şer derxistine, dijminên xwe mexlûb kirine û bûbûn pêşengên şerên neheq. Wekî min di pêşîyê de jî got, Îskîtîyan li Asyaya Jorê bîst û heyşt salan hikum meşandin. Wan bera dû Kîmmerîyan dane piştre hatine;[129] derbasî Asyayê bûne, dawî bi desthilata Medîyan anîne, berîya Îskîtî bên xwedîyê vî welatî Med bûn. Îskîtî, piştî bîstûheyşt sal veqetînê, dema ku vegerîyane welatê xwe, zehmetîyên şerên bi Medan re kişandine, bi zehmetîyên hê ji wê zêdetir re rûbirû bûne; artêşek rêya wan birrîbû, ev artêş ne awayek bû ku sivik lê bê nêrîn; ji ber ku jinên Îskîtîyan dîtibûn ku mêrên wan venegerîyan, bi koleyên xwe re raketibûn.

[2] Îskîtî ji bo vexwarina xwe ya şîr bi dest bixin, çavê temamê koleyan derdixin, lêbinêrin çawa şîr didoşin: Kole, borîyeke cûreyê hestîyê ku gelekî dişibe bilûrê digrin; wê dikin malzaroka mehînê û bi devê xwe pif dikinê; dema ku ew pif dikin, yên din jî didoşin. Ji bo çi wiha dikin, heke hûn ji wan bipirsin, dibêjin hewa rehên mehînê vedike, dihêle ku şîr dakeve memikan. Şîrê tê dotin vala dikin kodên darînî; li dora wê koleyên kor berhev dibin û şîr li hev dixin; yên li ser dimînin vediqetînin û digrin. Di çavê Îskîtîyan de şîrê herî baş ev e; yên di binî de dimîne bêqalîte hesêb dikin. Belê Îskîtî, kesên dikevin destê wan ji bo vî karî bi wan bidin kirin, kor dikin; ji ber ku çandinîyê nakin, koçer in.

128 Tê qebulkirin ku ev sefer di sala 513an ya B. Z. de çêbûye.

129 Di beşên 11 û 12an yên vê pirtûkê de li ser van miletan agahî hene.

[3] Ji van koleyan ji jinên Îskîtî neslek xort gihişt, ew hîn bûn ku çawa hatine dinyê û li hemberî ew Îskîtîyên ji Medîayê vegerîyan rabûn. Pêşî ji çiyayên Taurîsê heta Palus-Maîotîsê[130] heta cihê herî fireh xendeqeke fireh kolan, bi vî awayî welatê xwe veqetandin. Îskîtî xwestin ji xendeqê derbas bin; dijminên wan hatin li hemberî wan baregeh vedan û şer dest pê kir. Bê navbir şer kirin, lê Îskîtîyan nekarîbûn gavekê pêşve bavêjin; wî wextî yekî ji nav wan qîr kir û got: "Ey Îskîtî, ev çiye hûn dikin, em bi koleyên xwe re şer dikin. Me dikujin, çiqas diçe em kêm dibin; em jî wan dikujin, ji bo sibeyî ew koleyên em karên xwe bi wan didin kirin, wê di destê me de nemînin. Li gor min lazim e em tîr û riman berdin. Em qamçîyên xwe bigrin û bi wî awayî bimeşin ser wan. Dema ku di destê me de sîleh dibînin xwe û me weke hev dibînin, xwe ji xwîna me dihesibînin. Lê heke di destê me de di cihê sîleh de, qamçî bibînin, wê xwe koleyên me hesêb bikin, dema ku ev fêhim kirin jî êdî li hemberî me ranabin."

[4] Guhê xwe dan vê nesîhetê û wisan kirin. Dema dijmin ev hal dîtin, man şaş, şer berdan û baz dan. Piştî li Asyayê bûn xwedî desthilat, Îskîtîyên ji alîyê Medîyan ve hatin raqewirandin, bi vî awayî vegerîyan welatê xwe. Belê, Daryûs artêşa xwe ji bo cezakirina vê hednezanîna wan û meşa ser wan berhev dikir.

[5] Îskîtî, xwe ji nijada herî xort hesêb dikin û koka xwe bi vî awayî didin nîşan: Ev welat vala bû, li vir cara pêşî kesekî navê wî Targîtaos hat dinyê. Zeûsê bavê vî Targîtaosî û dêya wî jî keça rûbarê Borysthenesê[131] bû, wiha tê gotin. -ez ji çîrokê bawer nakim, lê min tijê ye, efsane wiha dibêje- Belê, koka Targîtaos ev bûye; sê zarokên wî çêbûne, Lîpoxaîs, Axpoxaîs û yê herî biçûk Koloxaîs. Di zemanê van de, ji asman aletên çandinîyê yên ji zêr hatîye çêkirin dikevin Skytayê, cotek, nîrek, bivirek û tasek. Pêşî birayê wan yê mezin vê dibîne, nêzîk dibe ku wan bîne; zêr dibe pizoteke sor. Ew paşve vedikêşe, yê navîn pêşve diçe, cardin eynî tişt dibe. Maden wisan agir direşîne ku, mecbûr dibin paşve dikêşin. Dor tê yê sisiyan, yanî yê herî biçûkê wan, wî wextî zêr sar dibe, ew jî wan digre tîne mala xwe. Mezinên ku mûcîzeyê dibînin, iktidarê ji yê herî biçûkê xwe re dihêlin.

130 Palûs-Maîotîs, Deryaya Azaqê ya niha. Taûrîs yan jî Khersonnesosa Taûrîkayê jî Qirim e.

131 Borysthenes: Dînyeper-Ûkrayna

[6] Ji Lîpoxaîs, Îskîtîyên ji wan re Aûkhatea tê gotin hatine dinyayê. Ji Arpoxaîsê yê navîn, Katîarî û Traspîesî çêbûne û ji yê herî biçûk jî hikumdarê wan derketine ku, navê wan Paralataîyî ne. Hemî jî weke Skolotî tên nasîn ku, ev leqebê hikumdaran e. Lê Yûnanî ji wan re Îskîtî dibêjin.

[7] Heke mirov li gotinên wan binêre, Îskîtî bi vî awayî derketine meydanê; tê gotin, ji hikumdarê wan yê yekem Tarîtaos heta seferê Daryûs yê li hemberî welatê wan daye destpêkirin, nijada wan, naçe heta hezar sal berê, tevde evqas e. Ev zêrê pîroz yê ji asman ketîye, hikumdarên wan gelekî baş diparêzên û ji bo dilê wî xweş bikin qurbanên mezin serjê dikin. Kesê ku wezîfeya wî parastina zêrê pîroz e, heke di hewaya vekirî de rakeve, nikare wê salê derbas bike. Îskîtî wisan dibêjin û ew nobedar di nava rojekê de li ser pişta hespê li dora çiqas erd bigere, ew ax jê re wekî diyarî tê dan. Welatê wan gelek mezin e. Ewqas mezin e ku, Kolaxaîs ew kirîye sê hikumdartî, her yekî daye kurekî xwe; yek ji van hikumdartîyan ji yên din mezintir e, zêr li vir tê veşartin. Ber bi bakur ve, di herêma bayê Boreas de û li derveyî herêmên insan lê dijîn, ne mirov dikare pêş ve biçe û ne jî dikare tiştekî bibîne. Ji ber ku tijî pûrtên bi qasî serê teyran e; ev pûrt erd û asman digrin(-bagera berfê), perde dikêşin ber asoyê.

[8] Îskîtî ji bo xwe û herêmên bakurê welatê xwe çi gotine, min jî ew gotin. Niha jî em bên ser gotinên Yûnanîyên li Euxeînosa Pontosê bi cih bûne: Dibêjin ku Herkules, dema gayên Geryonê[132] daye pêşîya xwe û diçe, hatîye ew cihên niha Îskîtî lê rûdinin, wî wextî li wir kesek tunebûye; Geryon, gelek dûrî Pontosê rûdinişt; ji stûnên Herkulesê bi wêdetir, girava nêzîkî Gadeîresa Okeanosê[133] ya Yûnanî jê re Erytheîa dibêjin, girtîye û li wir bi cih bûye. Di derbarê Okeanosê de jî dibêjin, ev ji herêmên rojhilatê derdikeve û li temamê derûdora erdê/bejahîyê dizivire, wiha tê gotin, lê belgeyek nadin nîşan. Belê, Herkules ji van deran rabûye, hatîye welatê niha jê re Îskîtîa tê gotin; rastî hewayekî sir û seqem hatîye, postê şêr kêşaye ser xwe û raketîye; du mehînên girêdayî erebeya wî yên diçêrîyan, di vê navê re wekî mûcîzekê wenda bûne.

---

132 Geryon, dêwa sê serî ye. Herakles wî dikuje û gayên wî jê distîne. Di nav Latînîyan de jî li gor Breal (1832-1915), eynî myth bi awayekî cihê, di şerê navbera Herkul û Kakus de tê dîtin.

133 Gadeîresa Okeanos, Cadix/Cadiz e, ya îro li rojavayê başûrê Îspanyaye.

[9] Herkules hişyar bûye, li mehînan geraye, temamê welat derbas kirîye, di dawîyê de hatîye cihê ku jê re "Daristan" dibêjin. Di nava şikeftekê de mexlûqatek dîtîye, nîvê wê keç û nîvê wê mar; ji newqa wê ber bi jor jin, alîyê jêr jî mar. Piştî ji wê şaşmayîna li hemberî ya dîtîye rizgar dibe, pirs kirîye ku gelo du mehînên bi serê xwe digerin dîtîye; wê jî gotîye mehîn di destê wê de ne û ji bo wan werbigire pêwist e bi wê re rakeve. Herkules ji bo mehînên xwe paşde bigre pê re raket. Wê dayîna mehînan paşve dixist, ji ber ku dixwest demeke dirêj bi Herkules re bimîne, yê din jî dixwest demek zûtir mehînan bigre û biçe. Di dawîyê de mehîn dan û wiha got: "Ew mehînên hatin vir min ji bo te veşartin; te jî bedelê wê da, vaye ji te sê zarokên min çêbûn. Dê ew mezin bin, wî wextî ez çi ji wan bikim? Tê vê bêjî. Gelo ez wan li vir mezin bikim -ji ber ku ev erd yê min in- yan jî ez bişînim ba te?" Bi vî awayî pirsî û belê, dibêjin, bersiva ku girt ev bû: "Dema ku zarok mezin bûn û te dît ku bûne mirov, heke tu bi ya van gotinên min bikî, tê tiştekî baş bikî: Ji nav wan kîjan wekî min vê kevanê bar bike û vî şûrî wekî min girê bide wî li vî welatî bi cih bike; yên nikaribin van tiştên ez dibêjim bikin, ji van erdan raqewirîne bila ji van deran biçin. Heke tu van gotinên min bikî, tê bextewar bî, tê ji ya min jî derneketibe."

[10] Herkules kevanek bar kir (ji ber ku heta wî wextî du kevanên wî hebûn), qayîşa şûr ya girêdana wê di ser mil re nîşan da, piştre kevan û qayîşa şûr da jinikê; di toqaya qayîşa şûr de kupake zêrîn hebû. Piştî ew dan çû. -Zarok hatin dinyê. Wextê mezin bûn dayîka wan nav li wan kirin; navê yê yekî Agathyrsos, yê piştî wî Gelonos û yê herî biçûk Îskîtes. Piştre bi girêdayîmayîna gotinên Herkules, tiştên wî emir kiribûn wisan kir. Dudu ji zarokan, Agathyrsos û Gelonos tiştên dihat xwestin nikarîbûn bikin, dayîka ew anîbûn dinyê berda wan, ew derketin çûn; yê herî biçûk Îskîtes yê pêwist bû kir û di cihê xwe de ma. Hemî hikumdarên Îskîtîyan yên piştre hatin, ji vî Îskîtesê kurê Herkules zêde bûne. Îro jî ew kupayên bi qayîşê şûrên Îskîtîyan ve daliqandî, bîranîna kupaya Herkules didomînin. -Belê ya Yûnanîyên Euxeînosê Pontosî behs dikin ev e (û vê jî dikin ser ku, dêya wan ev ji bo sûda Îskîtes li hev anîyê).

[11] Vebêjeke din jî heye. Ez jî vê qebûl dikim, ew jî ev e. Îskîtîyên koçer li Asyayê bûn; bi Massagetîyan re şerek kirin û mexlûb bûn, Rûbarê Arexesê

derbas kirin, koçî ba Kîmmerîyan kirin. (Cihên Îskîtî rûdinin berê yê Kîmmerîyan bûye, wisan tê gotin). Dema ku Îskîtî tên, Kîmmerî bi fikra ku li beramberî îstîlayeke mezin in, berhev dibin û mizakere dikin. Lê li hev nekirin û dubendîtî çêbû; herdu alî jî ji gotinên xwe daneketin xwarê, lê fikra yên tereftarê hikumdar bûn hê mêrxastir bûn. Ji ber ku yên din digotin ku ya herî baş ew e em ji welêt derkevin û xwe ji pêşbirkek bi qewetek ewqas mezin dûr bixin; li hêvîmayîna vê alaya çapulcîyan xweavêtina tehlîkeyeke mezin bû; hikumdaran jî dixwestin welatê xwe li hemberî van dagirkeran heta dawîyê biparêzên. Ne xelkê ji gotinên hikumdaran re digot erê, ne jî hikumdaran ji yê xelkê re. Xelkê dixwest bê şer welatê xwe ji dijmin re bihêlin û paşve bikêşin; lê hikumdaran biryar dan, di şûna bi xelkê re bazdin û herin, li welatê xwe bimînin û bimrin baştir e, çawa be hema wê tirba wan li welatê wan be; heta niha xweşîya li welatê xwe derbas kirin anîn bîra xwe û difikirîn heke wê berdin, wê belayê nemayî bihata serê wan, rewş wisan xuya dikir. Di dawîyê de xelk û hikumdarên wan bûn du beşê bi qasî hev û bi hevdû re şer kirin; xelkê Kîmmerî yên bi destê biratîyê hatin kuştin li qiraxên Çemê Tyrasê[134] veşartin, gorên wan hê sekinîne. Yên man, piştî ew veşartin, welatê xwe terk kirin û çûn. Dema ku Îskîtî hatin kesek nemabû.

[12] Îro jî li Îskîtîayê kelehên Kîmmeran hene. Rêbuhêrka Kîmmerê heye. Herêmeke jê re Kîmmerîa tê gotin heye. Zelal e ku dema Kîmmerî ji ber Îskîtîyan baz dane, di Asyayê re derbas bûne û li Khersonesosê, bajarên niha tê de kolonîyên Yûnanîyan yên Sînopeyî rûdinin ava kirine. Cardin zelal e, Îskîtîyên li pey wan hatine, ji bo rêya xwe şaş kirine Medîayê îstîla nekirine. Ji ber ku dema Kîmmerîyan baz dane, xwe ji qiraxan dûr nekirine, lê Îskîtî heta roja ber bi hindur ve çûne û ketine Medîayê, Qafqasyayê girtine milê xwe yê rastî û ew teqîb kirine. Ev jî sêyem gotine, Yûnanî û barbar jî wiha dibêjin.

ARÎSTEAS

[13] Li milê din, kesekî navê wî Arîsteasê kurê Kaystrobîos yê li Prokonnesosê[135] hatîye dinyê hebû, destan dinivîsandin, dibêje ku, wextê ew ji ber

134 Tyras: Çemê ku îro jê re Dinyester tê gotin, dirije rojavayê bakurê Behra Reş.
135 Prokonnesos, Girava Marmarayê ya niha ye.

hêrsa Apollon baz daye, xwe nêzîkî welatê Îssedonosîyan kirîye û ji Îssedonosîyan wêdetir nîjada Arîmaspesê yekçav dijîyan, ji wan wêdetir Grîffonîyan nobedarîya zêrê pîroz dikirin, hê wêdetir cihê vedibe deryayê miletê Hyperboreyê dijîn. Gotinên xwe didomîne û dibêje, ev hemî yên di nav sinorên xwe de ne, ji bilî Hyperboreyîyan, ji bo bi hev re şer bikin li mahneyan digerîyan; yên yekem dest pê kirin Arîmaspesî bûn. Ev Arîmaspesî, Îssedonosî ji welatê xwe avêtibûn. Îssedonosîyan jî Îskîtî ji welatê xwe avêtibûn; Îskîtîyan êrîşê ser Kîmmerîyên li qiraxê Deryaya Notosê rûdiniştin kiribûn û ji herêmê derxistibûn. Lê yên Arîsteas li ser welatê Îskîtê neqil dike bi gotinên Îskîtîyan re li hev nakin.

[14] Arîsteasê ev destan nivîsandine ji ku ye, min gotibû; ez ê agahdarîyên di derheqê wî de yên min li Prokonnesos û Kyzîkos wergirtine jî îlawe bikim. Li gor ku ji min re gotin, Arîsteas di hêla hatina xwe ya dinyê de di qata herî bilind ya hemwelatîyê de ye; rojekê li Prokonnesosê ket kargehe caw, ji nişkê ve li wir ket û mir. Xwedîyê kargehê dikana xwe girt û çû xeber da kesên nasê wî. Hê xebera mirina Arîsteas nû belavî bajêr dibû, kesekî ji Kyzîkosî hat, xebera mirina wî derew derxist, ew ji Artakeyê dihat û di rêya Kyzîkosê de rastî Arîsteas hatibû, heta bi wî re axiftibû. Mirov di gotinên xwe de bi israr bû, di vê navê re nasên mirî hatin dikanê û ji bo rakirina cenazeyê pêwistîyên hewcedarî anîbûn. Dema ku derî vekirin ketin hindur, ne cenazeyê Arîsteas hebû û ne jî ew bi xwe. Lê piştî şeş salan li Prokonnesosê cardin derketibû holê û îro destanên ku li Yûnanistanê bi navê "Arîmaspea" tên nasîn nivîsandine û beste kirine. Piştî bestekirina wan careke din winda bûye.

[15] Yên li Prokonnesosê û Kyzîkosê tên gotin ev in. Li milê din, ez bûyereke din ya dused û çil sal piştî cara duduyan wendabûna Arîsteas, ya li Italyayê, li Metapontûmê derbas bûye dizanim. Ez vê hijmarê bi miqayeseya ew tarîxên li Prokonnesosê û Metapontûmîyê dane min derdixim. Metapontûmî dibêjin ku Arîsteas li wir hatîye dîtin, emir daye wan û gotîye: "Li ser navê Apollon pêşkêşgehekê ava bikin" û xwestîye li rexê wê jî peykereke bi navê wî Arîsteasê Prokonnesosî bê danîn; vegotîye ku cihê Apollon li Îtalyayê serî lê daye tenê Metapontûm e û bi xwe jî li pey xuda hatîye, lê ne di bîçima xwe ya îro de, di şiklê qijikê de. Piştî van gotinan ji holê wenda bûye, Metapontûmîyan mirov şandine Delphoîyê û ji xuda pirsîne; gelo

“manaya vê şiklê çiye?” Pythîa emir kirîye, pêwist e tiştê dîmenê gotîye pêk bînin û heke guh bidin gotinên wî wê gelek fêde li wan bibe; li ser vê ew wezîfeya ji wan re hatîye dayîn bi cih kirine û îro li Metapontûmê li rexê peykera îlahî ya Apollon, peykera kesekî navê wî Arîsteas bilind dibe; dora wê bi darên defneyê hatîye pêçan; peykera Apollon di meydana bajêr de ye. Lê ji bo Arîsteas evqas bes e.

[16] Li bakurê vî welatê ku em dixwazin behis bikin çi heye, kesek tiştekî rast nizane; ji bo ez van hîn bibim, ez rastî kesekî ew bi çavê xwe dîtibe nehatim. Aresteasê qasek berê min behsa wî kir, dema ku destanên xwe nivîsandine, nabêje ku ji Îssedonosîyan wêdetir çûye; li ser welatên hê li bakur, wî jî tiştên ji vir û wir bihîstine û Îssedonosîyan çi gotine, wan neqil dike. Li gel vê jî, em ê bi lêpirsînên xwe yên heta sinorê dawîyê zanyarîyên me berhev kirine û kêm û zêde yên me rast hesêb kirine, bidin.

[17] Li jora Rûbarê Borysthenesê, ku li navenda tevahîya peravên deryaya Skîthyayê ye, pêşî mirov rastî Îskîtîyên Kallîpîdaîyê tê, ev ji nesla Yûnanîyan in; mirovên pêşîn ên ku li ser van erdan dijîn Kallîpîdaî ne, nijadek Greko-Skît. Hê li bakur miletekî din yê navê wan Halîzonî hene. Jiyana van jî wekî yê Kallîpîdaîyan ji ya Îskîtîyan gelekî cihê ye, genim diçînin û bi vê xwe xwedî dikin, ji bilî vê pîvaz, sîr, nîsk û garis jî diçînin. Li jorê Halîzonîyan, Îskîtîyên cotkar hene; ew jî genim diçînin, lê ne ji bo xwarinê, ji bo firotinê. Hê jortir Neûrîyî dijîn. Li bakurê Neûrîyan, bi qasî em dizanin herêmeke ku insan najîn dirêj dibe. Ev miletên han, li rojavayê Borysthenesê li seranserê Rûbarê Hypanîsê belav bûne.

[18] Wextê mirov di îstîqameta deryayê re tê û Çemê Borysthenesê derbas dike, herêmeke daristan tê, piştre li alîyê hindur Îskîtîyên cotkar rûdinin, Yûnanîyên Rûbarê Hypanîsê[136] ji van re Borysthenesî dibêjin. Ew bi xwe dibêjin navê wan Olbîopolîtî ye. Ev Îskîtîyên cotkar, herêmeke ber bi rojhilatê ve ya rêya sê rojan girtine; digihin rûbareke jê re Pantîkapes[137] tê gotin. Dema ber bi bakur ve mirov di ber Çemê Borysthenesê derdikeve, seran-

136 Rûbarê Hypanîsê: Rûbarê li Ûkrayna yê ku îro bi navê Pivdennyi Buh tê zanîn.
137 Pantîkapes: Rûbarê li Ûkrayna yê ku îro bi navê Inhul tê zanîn.

serê deh rojan mirov di welatê wan re derbas dibe; ji wir şûn ve çolên mezin in, ji çolê hinek wê de miletekî din, Androphagî hene, ev ne ji nesla Îskîtî ne. Hê jortirê wê cardin çol e. Vê carê bê serî û bê binî, bi qasî em dizanin mirov rastî nesla insanan nayê.

[19] Li bakurê van Îskîtîyên cotkar, piştî mirov ji Pantîkapesê derbas bû, tê dîtin ku Îskîtîyên koçer pezên xwe diçêrînin; ew erd najon, nizanin çandinî çiye. -Ji bilî herêma bidar, li seranserê van erdan dar tunene.- Ev koçerên han ber bi îstîqameta rojhilatê ve, herêma heta digihe Çemê Gerrhûsê[138] digrin ku, firehîya çardeh roj rê ye.

[20] Ji Gerrhûsê wêdetir, cihên jê re welatê Îskîtîyan yê Şahane tê gotin; beşa Îskîtîyan ya herî mêrxas û boş li vir dijîn; bi çavê koleyan li Îskîtîyên din dinerin. Sinorên wan wiha ye: Li milê başûr Taûrîk, li milê rojhilatê xendeqa ji alîyê zarokên koran ve hatîye vekirin û sûka deryayê ya jê re Kremnes[139] tê gotin ya li ser Palûs-Maîotîsê; qismek welatê wan heta Tanaîsê[140] dirêj dibe. Li bakur, ji Îskîtîyan wê ve Melankhlenosî rûdinin, ev ji nijadeke cihê ne, ne Îskîtî ne. Ji Melankhlenosan wêdetir çirav û çol in, em wisa dizanin.

[21] Gava meriv Tanaîsê derbas dike, êdî meriv ne li Îskîtyayê ye; miletê yekem Saûromatî ne; ev Saûromatî, ji binê kendava ji alîyê Palûs-Maîotîsê ve pêk hatîye ber bi bakur ve bi seranserê rêya panzdeh rojan dirêj dibe; temamê vî welatî rût e, ne darên hatine çandin û ne jî yên bi xwe hêşîn bûne hene. Hê li bakur herêmeke din tê, ew Bûdînî ne û gelek bi dar e, ji serî heta binî bi darên cur be cur hatîye dagirtin.

[22] Bakurê Bûdînîyan rêya heft rojan çol e; mirov ji vê çolê derbas be û hinek ber bi rojhilatê ve biçe, welatê Thyssageîyan e, miletekî eslê wan cihê û boş in, îdareya xwe bi nêçîrvanîyê dikin. Di sinorê wan de, di eynê herêmê de kesên ji wan re Îyrkaîyî tê gotin dijîn, nêçîrvanîya wan bi vî awayî ye: Derdikevin serê daran û çavdêrîya nêçîrê dikin. Ji ber ku hemî welat bi daristanan hatîye rapêçan; hespekî her nêçîrvanî yê hazir heye, ji bo neyê

138 Gerrhûs: Rûbarê li Ûkrayna yê ku îro bi navê Molochna tê zanîn.
139 Sûka deryaya Kremnesê, kendaveke tîcaretê ya li ser Deryaya Azaqê bû.
140 Tanaîs: Bajarekî antîk e, li devê Rûbarê Don cihê dirije ser behra Azov/Azak.

dîtin li ser zik tê razandin; yek jî kuçikê wan heye. Dema ku li serê darê heywan dîtin tîr davêjinê, li hespê xwe siwar dibin û li pey dikevin, kuçik jî şopê dimeşînin. Li bakurê rojhilatê vî miletî Îskîtîyên din hene, piştî ev ji Îskîtîyên Şahane veqetîyane, hatine li vî welatî bi cih bûne.

[23] Temamê vî welatî yê heta van Îskîtîyên dawîyê min behsa wan kirin, deşteke dewlemend e, axa wê ji madeyên organîk yê rizyayî pêk tê. Ji wir wê ve kevirîn û zinar in. Piştî ji vê herêma kevirîn derbas bû, mirov derdikeve rastîn fireh yên li ber pêşkên çiyan, li vir cihê rûniştina kesên ku tê gotin bi xwezayî keçel in, jin û mêr hemî keçel in, pozê wan pehn, çena wan derketî ye; zimanê wan cihê ye, çekê wekî Îskîtîyan li xwe dikin û bi fêkîyên ji daran didin hev xwe xwedî dikin. Ji dara jê dohn derdixin re dara bindeqê dibêjin. Kêm-zêde bi qasî dara hejîrê ye; bi qasî liba baqleyê fêkî dide, ev fêkîyeke bi dendik e. Dema ku ev fêkî giha di nav çaputê de diperçiqînin û ava wê dadwerivînin, aveke reş û tîr jê derdikeve; ji vê ava derdikeve re "askhû" dibêjin; bi zewq tê vexwarin, tevlî şîr dikin û wilo jî vedixwin; tilta wê di awayê zemqeke zeliqokî de ye, ji vê kade çêdikin û hiltînin; kerîyên vî miletî hindik in, ji ber ku çêrîngehên wan feqîr in. Her kesek di bin darekê de radikeve; dema ku bû zivistan li dora darê tiştekî weke çadirê yê ji hirîyê çêkirî û spî, perdekê radikêşin; havînan perdeyê radikin. Kesek zerar nade vî miletî, pîroz tên hesêbkirin; çekên wan yên şer tunene. Dema li ba cîranên wan pirsgirêkek çêbibe, wekî dadwer serî li wan tê xistin û heke kesek ji welatê xwe baz bide û xwe bavêje wan, êdî kesek nikare dest bidê. Ji van re Arêîpeîayî tê gotin.

[24] Temamê herêmên mirov jê derbas dibe heta welatê van insanên keçel û miletên li van deran rûdinin, tên zanîn û nasîn. Ji ber ku Îskîtîyên çûne welatê van miletan hene. Li ser wan berhevkirina agahdarîyan ne zehmet e; Yûnanîyên li sûka devê deryayê ya Boysthenesê û sûkên din yên Pontosê diçin van deran. Ew Îskîtîyên diçin ba van miletan, ji bo karê xwe pêk bînin heft wergêran bikar tînin, ji ber ku li wan deran heft zimanên ji hevdû cihê tê axaftin.

[25] Tê dîtin ku em heta Arpîpeîayê hîn bûn; lê kesek ji bo herêmên bakurê van keçelan nikare tiştekî tam bêje. Ji ber ku derûdora wê bi çiyan hatîye rapêçan; çiyayên bihur nadin û kes jî jê derbas nebûye. Insanên keçel dibêjin ku li van çiyan insanên lingbizinî dijîn, lê min zêde bawer nekir. Yek

jî dibêjin, mirov rastî insanên ji wan wêdetir tê ku salê şeş meh bi raketinê derbas dikin, ez bawerî bi çîrokên wiha jî nakim. Li welatê rojhilatê keçelan, tam tê zanîn ku Îssedonî dijîn; lê li herêmên dikevin bakurê wê, ji derveyî hinek riwayetên jar, ne yên keçel û ne jî Îssedonî wir nas nakin.

[26] Hinek adetên bi Îssedonîyan ve tên girêdan; dema ku bavê yekî mir, temamê pismamên wî jê re birên pez dibin; dikin qurban, perçe dikin; bavê xwedîyê malê jî serjê dikin û goştê wî dikin nav wan goştên din, merasimekê çêdikin. Serê mirî dikolin, mejî jê derdixin; bi pelên zêrînî radipêçin û wekî sûretê xudayekî her sal bi qurbanên mezin wî bilind radigirin. Li Yûnanistanê çawa salvegera mirinê pîroz dikin, li vir jî her kur ji bo bavê xwe wisan dike. Ji bilî vê Îssedonî jî wekî Argîpeîayîyan bi adetên xwe hatine naskirin û jin jî wekî mêran xwedîyê eynî mafî ye.

[27] Ev miletên han jixwe dihatin zanîn, lê ji wir wê ve, li bakur insanên yekçav hene û Grîffonên ji zêrê pîroz re nobedarîyê dikin jî hene, em van tenê ji Îssedonîyan hîn dibin; Îskîtî tenê gotinên wan tekrar dikin, ewqas. Ji bo me jî ev bawerî ji Îskîtîyan hatîye û dema ji vanê yekemîn re em nave Arîmaspes bikar tînin, em gotineke Îskîtî bikar tînin, ji ber ku di zimanê Îskîtî de "arîma" tê bi manaya yekê û "spu" jî tê bi manaya çav.

ZIVISTANÊN ÎSKÎTÎYAN

[28] Ev herêma ez behs dikim, hewa wê zivistanan xedar e. Ji bo fikrekê bide ez didim dîyarkirin: Heyşt mehan sermayeke mirov nikare xwe li ber bigre çêdibe, ewqas sar e, av birje erdê nabe herî û agir bê pêxistin ji herîyê pê ve tiştek bi dest nakeve û derya qeşa digre, Bosphorosa Kîmmeran diqerime. Di şer de Îskîtîyan artêşa xwe di ser qeşayê re derbasî milê din yê xendeqê, alîyê welatê Sindîyan kirine. Bi vî awayî zivistan heyşt meh dikêşe û di wan çar mehên din de jî hişkîyeke xurt çêdibe. Zivistanên Îskîtîyan ji zivistanên welatên din gelek cihê ye, ev demsal di eslê xwe de ya baranê ye, lê li wir dipolek baran nabare, lê havînan baran qet nasekine. Dema ku li herêmên din demsala brûsk lê dide, li vir lê nade, lê havînan hema bêje li hemî herêman lê dide. Heke zivistanan brûsk bikeve, wekî mûcîzekê tê dîtin û şaş dimînin; wekî vê, erdhej jî dixwaze zivistanan û dixwaze havînan, li Îskîtîyê wekî

mûcîze tê dîtin. Hesp baş li ber sermayê didin, lê hêstir û ker qet li ber xwe nadin; halbukî li cihên din bi eksê wê ye, hespên li ber sermayê bimînin ji kangrenê telef dibin, di miqabilî vê de hêstir û ker li ber xwe didin.

[29] Li gor min li van herêman astenga li ber gayên kol ku sturehan dernaxin cardin ev serma ye. Û ez di vî warî de xwe dispêrim otorîteya Homeros, ji ber ku wiha dibêje: "Lîbya jî, ku sturehên berxan zû li enîya wan dikevin.[141]" Ev tê wateya ku li welatê germ stureh zû mezin dibe, ev tiştekî rast e. Ji ber vê yekê jî li welatên ku serma lê giran e heywan an bê stureh in, an jî sturehên wan qels in.

[30] Naxwe li van welatan serma rê dide tiştên wiha biqewimin. Lê tiştekî ez jê şaşmayî mame heye ku, -ev gotinên navberê ne, bêguman bi mijara min ve eleqedar e[142]- li seranserê Elîsê hêstir xwedî nakin; halbukî van deran ne sar e û sebebekî li ber çav jî tune. Heke em li gotinên Elîsîyan binêrin, tiştê asteng ya li pêşîya xwedînekirina hêstiran nifir e. Wextê demsala fehl xwarina mehînê tê, wê dibin welatên cîran û heta avis bibin, ker davêjin ser wan. Piştre digrin û tên welatê xwe.

[31] Em bên ser wan pûrtên ku tê gotin Îskîtî bi wan hewa reş dikin, perde didin ber bînahîyê yan jî pêşîya çûna welatên jorê yên rexê xwe digrin, di vî warî de nêrîna min ev e: Li bakurê vê herêmê her tim berf dibare, bêguman havînan ji zivistanan kêmtir dibare; kesê ku barîna berfê ya şidayî dîtîye dê fêhim bike ez dixwazim çi bêjim; kûlîyên berfê dişibin pûrtan. Belê ji ber vê sermaya şidyayî mirov nikare li herêmên bejahîyê yên bakur rûne. Gotina vê pûrtê li gor min îluzyonek e. Îskîtîyan bi vê xwestine behsa berfê bikin. -Ji bo saheyên bê serî û bê binî ev bes e.

H Y P E R B O R E Y Î

[32] Li ser Hyparboreyîyan ne Îskîtîyan û ne jî yên li van herêman rûdinin tiştek negotine. Belkî Îssedonîyan tiştek gotibin, lê li gor min wan

141 Odysseîa, beşa çaran, 85

142 Di wergera Îngilîzî de ev navber wiha derbas dibe: - Ji serê xebatê min ve, min hertim tiştên bandor li xebata min kirine lê zêde kirinê-

jî tiştek negotine. Heke gotibûna, dê Îskîtîyan jî li ser van tiştek bigotina, helbukî ji bo yekçevan gotine. Lê Hesîodos; behsa Hyperboreyîyan kirîye. Wekî Homeros di Epîgonosîyan de kirîye, heke bi rastî Homeros ev destan nivîsandibe.

[33] Agahdarîya li ser van ji me re ji Delosîyan tê. Tê gotin têdayînên/dîyarîyên pîroz yên bi sapê genimê hatîne girêdan, ji alîyê Hyperborayê tên Îskîtîyê; ji wir jî heta li herêmên Adrîyatê, dest ji dest ji vî welatî derbasî welatên din dibe; dîyarîyên ber bi başûr ve diçin, pêşî li Yûnanê digehe destê Dodonayîyan; ji wir derbasî bendera Malîayê dibe û ji Gewrîya Euboîayê derbas dibe; ji wilayetekê diçe ya din heta Karystosê tê şandin; piştî ji wir derket derbasî Androsê nabe; ji Karystosê raste rast diçe Tenosê û ji Tenosê jî dikêşin Delosê. Belê, Delosî dibêjin ev dîyarî bi vî awayî hatine giravên wan. Lê di sefera yekem de Hyperboreyîyan van bi du nêmokan dane kêşandin ku, Delosî ji van re Hyperokhe û Laodîke dibêjin; pênc kes ji hemwelatîyên xwe jî dane rexê wan ku, îro ew li Delosê rêzeke mezin dibînin û bi navê "Hilgir" tên bibîranîn. Lê Hyperborayî dîtine ku ew kesên şandine venegerîyane. Li ser vê ketine endîşeyê ku gelo ew qasidên me yên em ê nû bişeynin dê venegerin; ji wir şûn ve dîyarîyên bi sapên genim hatine girêdan anîne dane cîranên xwe û xwestine ew jî bidin cîranên xwe yên din. Bi vî awayî tê gotin, dest bi dest heta Delosê tê. Ez li ser hesaba xwe, dizanim ku li ba jinên Thrank û Paîonîayî jî adeteke wiha ya ji bo van dîyarîyan tê kirin heye. Wextê li ser navê Şahbanû Artemîs qurban jêdikirin, merasimê bêyî sapê genim tunebe çênakin.

[34] Ew adetê ku van jinan rêz lê digirtin ev e. Keçên ciwan yên ji Hyperboreyê dihatin, li Delosê mirine, ji bo rêzlêgirtina wan li vê giravê zarokên keç û kur porê xwe ji binî ve kur dikin. Keç berîya bizewicin porê xwe jê dikin; li şivekê digerînin û datînin ser gora du bakîreyan. Ev abîde di hindurê dîwarên Artemîsê de ne, di ketina hindur de dikeve milê çepê; siha dareke zeytûnê dikeve ser. Xortên Delosê jî porê xwe bi baqeke gîha dipêçin, wekî yên din datînên ser gorê. Ji van keçên ciwan re li Delosê bi vî awayî rêz tê girtin.

[35] Cardin ji eynî çavkanîyê ev agahdarî ketine destê me, du keçên Hyperboreyî, Arge û Opîs di eynî cihî re derbas dibin, hem jî berîya Hyperokhe û

Laodîkeyê, hatine Delosê. Ji bo zû hemla xwe deynin xerac didan Eîleîthyîayê. Adetan wiha dixwestin, ew jî ji bo vê pêk bînin hatine. Ev Arge û Opîs bi xudayan re di eynî wextî de hatine giravan, wisan dibêjin û Delosî rêza xwe bi awayekî din ji wan re nîşan didin: Jin dikevin rêzê, Olen ya Lîkyayî îlahîya ji bo pesnê keçan bide rêkxistîye dixwîne û navê wan bi bîr tîne. Ji bilî vê dibêjin ku, Îonîayên ilahîya Opîs û Arge bi bîranîna nave wan dibêjin û li ser nave wan alîkarîyê didin hev, yên li giravan dijîn jî ev navên han ji wan hîn bûne. (Îlahîyên kevin yên li Delosê tên xwendin cardin ev Olen bi rêk xistîne. Ew ji Lîkyayê hatîye wir.) Dema li ser nezergehan rehnên qurban tên şewitandin, xwelîya wan li ser gora Opîs û Arge tê reşandin. Ev gor danîne pişta perestgeha Artemîs. Rûyê wê li rojavayê dinêre û li rexê salona merasima Kealîyan e.

[36] Ez êdî li ser Hyperboreyîyan tiştekî nabêjim. Ez naxwazim li ser gotegota Abarîs tiştekî bêjim ya ku guya Hyperboreyî bûye û bi tîra destê xwe bêyî tiştekî bixwe li dinyê geryaye. -Heke li Hyperboreyê, yanî li serê din yê çima dinyê yê herî bakur kesekî dijî hebe, bêguman li serê çima başûr jî yên dijîn hene. Û ez li van "rêwîtîyên dora dinyê" dinêrim û dikenim, ji van li ba me gelek hene û zanyarîyeke têkeve serê mirov nadin. Ev dinivîsin ku, Okeanos weke kemberekê dora bejahîyê rapêçaye, Asya û Ewrûpayê jî di eynî mezintîyê de nîşan didin. Ez ê van herdu bejahîyan bi hev re bi pîvan çiqas mezinin û şiklê her yekê bi çend gotinan bidim nîşan.

ZANETÎYÊN COGRAFYAYÊ

[37] Welatê Persê, digihe Deryaya Erythreîayê ya jê re Deryaya Başûr tê gotin; li ser sinorê bakur Medî rûdinin, li jora Medîyan Saspeîrî, li jora Saspeîrîyan Kolkhîsî ku ew heta Rûbarê Phasîsê[143] ya dirije Deryaya Bakur diçe. Temamê saheya di navbera van herdu deryayan de van çar miletan girtine.

[38] Ji van welatan ber bi rojavayê ve, qiraxên herdu deryayan heta deryaya herêma ber bi alîyê rojavayê ve dirêj dibe. Rewşa wan wiha ye: Heke em ji bakur ve bigrin, ya yekem ji Phasîsê dest pê dike û qiraxê deryayê teqîb dike û seranserê Pontos Euxeînosê û Hellespontosê dirêj dibe, tê Pozê Sîgeîonê

143 Rûbarê Phasîsê: Di roja me de li bakurê Gurcistanê bi navê Rûbarê Rîonî tê zanîn.

yê li Troasdê; em ji başûr bigrin, çembera eynî qiraxê heta Fenîkeyê Kendava Myrîandîkosê û Pozê Trîopîonê dirêj dibe. Li seranserê vê qiraxê deryayê sîh neslên insanan rûdinên.

[39] Yek ji wan du herêmên qiraxan ev e. Ya din ji Persîyayê derdikeve ber bi Deryaya Erythreîayê ve dirêj dibe û li wir diqede; Persîya, wekî dewama wê Asûrya û Erebîstana girêdayî Asûryayê di nav vê de ye. Ev herêm heta Kendava Ereban ya cihê berdewamîya kanala Nîlê ya ji alîyê Daryûs ve hat guhertin temam dibe. -di eslê xwe de temam nabe, lê herkes wisan dibêje. - Di navbera Persê û Fenîkeyê de deşteke fireh heye; ji Fenîkeyê dest pê dike, ji seranserê qiraxên Surîyeya Filistînê û Misrê teqîb dike, dirêj dibe digehe deryaya me; li vir tenê sê milet hene.

[40] Welatên Asyayê yên ji Persê ber bi rojavayê ve ev in. Ji Persîyan hê dûrtir Medî, Saspeirî û Kolkhîsî, ber bi herêmên rojhilatê Asya, li başûr bi Derya Erythreîayê, li bakur jî Deryaya Hezarê û Araxesa ber bi rojhilatê ve sinordar e; ji wir wê ve ber bi rojhilatê ve tenha ye, kesek nikare tiştekî kifş bêje. Damezrandina Asyayê û mezinahîya wê wiha ye.

L I B Y A

[41] Libya ji du herêmên qiraxî ya duyem e. Ji ber ku piştî Misrê Libya ye. Li dora Misrê şerîdên qiraxan teng dibe. Bi rastî ji deryaya me heta Deryaya Erythreîayê tenê sed hezar qulaç, yanî hezar stad dikêşe. Lê piştî vê bejtengê şerît gelekî fireh dibe û cihê ku jê re Libya tê gotin ev e.

[42] Ez matmayî dimînim ji bo wan kesên xwedî aqilê berz yê sinoran datînin navbera Libyayê, Asyayê û Ewrûpayê û wan ji hevdû vediqetînin. Ew ferqên di navbera van erdan de ne hindik in. Heke hûn bêjin dirêjahî, Ewrûpa bi qasî wan herdu bejahîyan cih digre; lê di hêla firehîyê de, wisan bi min xuya dike ku, miqayese jî nayê kirin. Libya, ji derveyî herêma wê ya sinorê wê bi Asyayê re heye, bi avê rapêçayî tê dîtin; yê cara yekem vê anî holê, yê ku em dizanin, Nekosê hikumdarê Misrê ye; piştî wî kolana kanala ji Nîlê biherikîya Kendava Ereb da sekinandin, heyeteke keşfê ya ji Fenîkîyan veqetîyan li keştîyan siwar kir û şand. Wezîfeya wan, çûna bi

rêya stûnên Herkules heta Deryaya Bakur bû û bi vê rêyê re vegera Misrê bû. Ev Fenîkî, ji Deryaya Erythreîayê derketin û ber bi Deryaya Başûr ve bi pêş ketin. Dema ku dawîya payîzê hat, keştî li kîjan qiraxên Libyayê be xwe didin ber wir, erdê diçînin û li hêvîya wextê hilanîna çandinîyê diman; dema ku havînan çandinî radikirin cardin vedibûn deryayê. Bi vî awayî du sal derbas bûn û sala sisiyan stûnên Herkulesê derbas kirin û gihiştin Misrê. Û -ya ku hişê min nebirî, lê dibe hinek qebûl bikin- tiştek gotin: Wextê li dora Libyayê dizîvirîn roj her tim li milê wan yê rastî bûye.

[43] Cara pêşî Libya bi vî awayî hat zanîn. Zanyarîyên ji Kartacayîyan hatine jî hene, ji ber ku ji xanedana Akhaîmenîyan, di gel ku bi wezîfeke taybet Sataspesê kurê Teaspîs hatîye şandin, tûra li dora Libyayê nekirîye. Ji demeke dirêj mayîna li ser deryayê û ji tenêmayînê tirsîyaye û ev karê giran ya dêya wî bi zorê li ser bar kirîye, neqedandîye û vegerîyaye. Keçeke Zopyrosê kurê Megabyzosê xera kiribû; ji ber vî sûcî wê bi emrê Hikumdar Xerxes li qazoxê bixistina, dêya wî ket navberê, ew xweha Daryûs bû, soz da ku wê ji cezayê hikumdar hê xerabtir cezayekê bidêyê, kurê xwe da efûkirin: Dê ew li dora Libyayê bigerîya, heta bigihe Bendera Ereban, wê ji keştîyê peya nebûya. Xerxes ev şert qebûl kirin. Sataspes çû Misrê, keştîyek sitand, deryavan dîtin û ber bi stûnên Herkules ve vebû deryayê; ji stûnan derbas bû, ji Pozê Lîbyayê yê jê re Pozê Soluntê tê gotin zivirî û ber bi başûr ve ba da keştîya xwe; li ser deryayê gelek salên dirêj gelek rê stend; lê her tim pêwist bû dûr biçe. Ji ber vê, rêya vegerê da ber xwe û paşve hat Misrê. Li wir çû ba hikumdar Xerxes, rapora xwe dayê û got: Li cihê herî dûr yê qiraxan, rastî kesên bejinkurt hatine, kincên wan ji pelên darê palmîyê bûne; çi wextê keştî xwe daye ber qiraxan, bajarên xwe terk kirine û baz dane çiyan; jixwe wan jî xerabîyekê li wan nekirine, tenê birrên pezên wan wergirtine. Sebebê nezivirandina temamê Libyayê jî, nebûna bayê û neçûna keştîyan ber bi pêş ve daye nîşan[144]. Xerxes bi vê çîrokê nexapîye; wî bi pêkneanîna karê jê re hatîye dayîn hesêb kirîye û cezayê ewil daye tetbîqkirin, li qazoxê xistîye. Herem axayekî vî Sataspesî hebûye, li ser mirina efendîyê xwe baz daye Samosê; li balê xezîneke mezin hebûye, ew jî bi destê Samosîyekî ve berdaye; ez navê vî Samosîyî dizanim, lê ez naxwazim qet bi bîra xwe bînim.

144 Îhtîmal e di hewayê sekinî yê tropîk de ba nebûbe.

A S Y A

[44] Beşeke mezin ya Asyayê, bi însîyatîfa Daryûs hatîye keşifkirin. Wî dixwest hîn bibe Çemê Indosê li ku digihe deryayê, - yek ji du çeman e yê ku tê de timsah hene- kesên bi gotinên wan bawer û di vê navê re Skylaxê Karyandayî bi keştîyan derxist rê. Ew ji bajarê Kaspatyrosê û erdê Paktyîkayê derketin rê; di çem de bi îstîqameta beyanê û bi alîyê ku roj derdikeve heta deryayê çûn; dema ku gihiştin deryayê ber bi rojavayê ve fitilîn û di meha sihî de gihiştin wî cihê ku hikumdarê Misrê ew Fenîkîyên li jorê navê wan derbas bûn, ji bo li dora Libyayê bigerin derxistibû rê. Piştî sefereke deryayî ya çaralî, Daryûs Hindî kirin bin desthilata xwe û Deryaya Hindê ji keştîyên xwe re vekir. Heke herêma rojhilatê em deynin milekî, bi vî awayî temamê Asyayê hat zanîn û hat fêhimkirin ku bi Libyayê re di eynî tebîetê de ne.

E W R Û P A

[45] Em bên ser Ewrûpayê, kesek nizane gelo bakur û rojhilatê wê derya ye yan na. Dirêjahîya wê tê zanîn, bi qasî herdu beşên dinyê yên din e. Jixwe bi tu awayî hişê min nagihêyê, li gora çi ji yek erdî re, hemî jî xwedî paşgireke mê sê nav hatîye dayîn û çima ji bo sinorê navbera herêman li Misrê Nîl û li Kolkhîsê Phasîs (li gor hinekên din li Palûs-Maîotêsê Tanaîs û Tengava Kîmmerê) hatîye hilbijartin. Ji bilî vê ev ferqî kê danîye, kî ev nav li wan kirine? Bi tu awayî ev jî nedîtîye dernexistîye. Em bên ser Libyayê: Li Yûnanistanê bi gelemperî tê gotin ku navê wê, ji navê jineke ji wir ya navê wê Libye tê; navê Asyayê jî ji jina Prometheûs tê; lê Lîdyayî dixwazin li vî navî xwedî derkevin. Dibêjin Asya, navê xwe ne ji navê Asîaya jina Prometheûs, ji navê Asîas yê kurê Kotysê kurê Manes wergirtîye. Ev navê Asîas Asîadên ji hozeke Sardes in jî bikar tînin. Em bên Eûropeyê, gelo ew jî bi avê hatîye dorpêçkirin? Kes nizane; navê wê ji ku tê? Kê ev nav dîtîye? Ev jî nayên zanîn, belkî jî Eûropeyê Tyrosî navê xwe daye vî welatî. Pêwist e bê qebûlkirin ku berîya wê navê wir tunebûye, herduyên din jî wisan. Lê yê vî Eûropeyî ku eslê wî Asyayî bû, tê qebûlkirin ku ew nehatîye vî welatê Yûnanî jê re Eûrope dibêjin. Ew, tenê ji Fenîkeyê çûye Girîtê û ji Girîtê jî çûye Lîkyayê. Lêbelê em dev ji van mijaran berdin, îro bi tevayî bi kîjan navan tên nasîn, em ê jî wan navan bikar bînin.

[46] Derûdora Pontosê ya ku Daryûs sefera ser dabû destpêkirin, heke Îskîtîyan deynin milekî, bi insanên herî paşvemayî hatîye dorpêçkirin. Li milekî deryayê ji bilî Îskîtîyan, em nikarin miletekî mejîyê wî ronî bûye nîşan bidin, em ji Anakharsîs pêve bîranîna kesekî ya rast û dirûst nikarin bibînin. Heta miletê Îskîtê jî ku ji bo insanan gelek di saheke giring de serdestîyeke bêemsal dane nîşan, ez zêde guh nadim karên wan yên din. Lê Îskîtîyan ev pirsgirêka giring, bi hostatîyeke nedîtî hel kirine. Ez dixwazim vê bêjim: Tu kesê êrîşî wan kiribe, ji destê wan xelas nabe û heta ew nexwazin kesek nikare wan bibîne, pê li wan bike; insanên wisan ku ne bajarên wan hene, ne kelehên wan, hemî jî siwarî ne û tîr davêjin şer dikin. Malên xwe li pey xwe digerînin, -ji ber ku ne bi çandinî û rakirina hesadê, bi xwedîkirina heywanan îdareya xwe dikin, mala wan erebeya wan e- ma insanên wiha dikare bên mexlûbkirin û xistin?

ÎSTROS[145] Û RÛBARÊN DIN

[47] Xwezaya welatê wan, çemên ku tê de diherikin, dibe sebebê bikaranîna ev hawê berxwedanê li hember êrîşan. Welat, deşteke çêrîngeh ya baş tê avdan e; hejmara rûbarên van erdan av didin ji kanalên Nîla Misrê ne hindiktir e. Ji van rûbaran, ez ê navê yên herî bi nav û deng ên keştîyên ji deryayan tên û tê de sêbahî dikin bihejmêrim: Yên ji pênc devan dirijin deryayê: Îstros, piştre Tyras, Hypanîs, Borysthenes, Pantîkapes, Hypakyrîs, Gerrhûs û Tanaîs. Û va xet û berdewamîyên wan yên bingehîn.

[48] Îstros, rûbarê herî mezin yê em dizanin ev e. Ava dirêje nav deryayê, havîn û zivistanan naguhere. Rûbarê welatê Îskîtîyê yê milê rojava yê herî dawîyê ye û yê herî giring e. Ji ber ku hin çemên din jî dirijin nav vê. Rûbarên ava vê xwedî dikin ev in: Dema ji Îskîtîyê tên penc heb hene: Çemê ku Îskîtî jê re dibêjin Porata, Yûnanî dibêjin Pyretos, piştre Tîarantos, Araros, Naparîs, Ordessos. Rûbarê yekemîn çemekî mezin e, ber bi rojhilatê ve diherike û dirije nav Îstrosê; yê duduyan Tîarantos yê dikeve herî rojavayê û yê herî biçûk e; Araros, Naparîs û Ordessos, di navbera van herduyan de

145 Istros (di wergera Îngilîzî de Ister e) ji alîyê dirêjahîyê ve 2yemîn rûbarê Ewrûpa ye, di gelek welatan re derbas dibe û dirije rojavayê Behra Reş. Ji vî rûbarî re bi Latînî Danûbîûs, bi Slavkî Dûnav, bi Almanî Donau, bi Tirkî Tûna tê gotin.

diherikin û dirijin nav Îstrosê. Ev, rûbarên aîdê Îskîtîyan yên Îstros xwedî dikin, ew in; cardin rûbarê Marîsê yê tevlî Îstrosê dibe, ji welatê Agathyrsê derdikeve.

[49] Sê rûbarên din yên ji Çiyayên Haîmosê (derdikevin) û ber bi bakur ve diherikin û tevli Îstrosê dibin, Atlas, Auras û Tîbîssîs in; Athyrs, Noes û Artanes yên li Trakyayê û tam ji erdê Krobyzosên Trakyayê diherikin û tevli Îstrosê dibin; Skîosê ji çiyayên Paîonîa û Rhodopê tê û piştî ji herêma navîn ya Haîmosê derbas dibe digehe Îstrosê. Angrosê ji Illyrîayê ber bi bakur diherike û derbasî Deşta Trîballîayê dibe, tevli Brongosê dibe, ew jî tevli Îstrosê dibe û bi vî awayî Îstros di eynî wextî de ava du rûbarên din hildide. Îstros, li Umbrîaya Jorê jî cardin yên ber bi îstîqameta bakur ve diherikin Karpîs û Alpis pêşwazî dikin. Ji ber ku Îstros, ji serî heta binî di Ewrûpayê re derbas dibe; çavkanîya xwe ji Ewrûpayê, piştî Kynetê, ji erdên Keltî yên herî rojavayê rûdinin digre û Îstros vê bejahîyê ji serî heta binî derbas dibe li rexê Îskîtîyan dirije deryayê.

[50] Ev rûbarên me hejmartin û gelekên din, ji bo ava xwe dirêjin wê, Îstros dibe rûbarê herî mezin; heke ava ku hildidin û dirêjahîya wan em hesab nekin û miqayese bikin, di hêla zêdeyîya avê de Nîl Îstrosê derbas dike; ji ber ku ava Nîlê ji alîyê tu rûbarekê û tu çavkanîyekê ve nayê xwedîkirin. Sebebê herikîna ava Îstrosê havîn û zivistanan wekî hev, li gor min ev e: Sevîya avê di zivistanê de bi gelemperî ji ya her wextî hinekî zêdetir e; ji ber ku ev welatên han zivistanan zêde baran nabare, ya li vir dibare berf e. Tebeqeyên berfê yên ji zivistanan mane, havînan dihelin û ji her milî ve diherikin nav Îstrosê; ava rûbarê bilind dibe û baranên wekî lehîyan yên zêde dibarin wê hê bilindtir dike, ji ber ku havîn demsala baranê ye; havînan bi saya rojê ava çem ji zivistanan zêdetir dibe buhar, lê Îstros bi stendina wan alîkarîya ev telafî dibe; ev herdu bûyerên zidê hev dengekê pêk tîne û rûbar di nav pergalekê de her gav di heman astê de dimîne.

[51] Îcar ev Îstros rûbarekî mezin ê Îskîtê ye; piştre Tyras tê; ew ji bakur diherike û çavkanîya xwe ji goleke di sînorê navbera Îskîtayê û Neûrîsê werdigire, di başûr re ber bi behrê de dirêj dibe. Li cihê dirije nav deryayê, Yûnanîyên bi navê Tyrîtos bi cih bûne.

[52] Rûbarê sêyêm Hypanîs e, çavkanîya xwe ji Îskîtayê, ji goleke mezin ya li dora wê hespên kovî yên boz diçêrin digre. Ji vê golê re bi awayekî bi heq bavê Hypanîs tê gotin. Ava rûbarê Hypanîsê, piştî ji vê golê derdikeve di midetê pênc roj rêwîtîya keştîyê de gelek hindik e û şêrîn e; lê piştî ji qiraxê deryayê rêya pênc roj dûr, ava wê gelekî zêde tehl e; ji ber ku ava çavkanîyeke bi xwê tevlê dibe, hem ewqas bi xwê ye ku di gel ewqas gurr naherike jî, ava Rûbarê Hypanîsê ya ji gelek rûbaran mezintir xera dike. Ev çavkanî, li ser sinorê di navbera Îskîtîyên cotkar û Halîzonan de ye; di zimanê Îskîtî de navê wê Exampaîos e, navê cihê derdikeve jî eynî ye; di Yûnanî de wateya wê "Rêyên Pîroz" e. Berdewamîyên Tyras û Hypanîs piştre di welatê Halîzonan de nêzîkî hevdû dibin; piştre her yek ji wan bi îstîqameteke cuda de diçe û di navbera wan de erdek berfireh cih digre.

RÛBARÊ BORYSTHENESÊ (DINYEPER)

[53] Rûbarê çaran Borysthenes e, piştî Îstrosê ji hemî van rûbaran mezintir e û li gor min, ne tenê rûbarên Îskîtî ji bilî Nîlê li Misrê, ji hemî rûbarên din berhemdartir e, bi Nîlê re tu rûbar nikare bê miqayesekirin. Em Nîlê nehejmêrin, bi qasî Borsthenesê yeke bi feyde tune. Ji bo kerîyan çêrîngehên herî xweşik, çêrîngehên herî pimboxî pêk tîne, ava wê tije masîyên mirov ji tahma wan têr nabe, ji bilî wê ava wê gelekî xweşik tê vexwarin; li welatê ku çemên wê bi herî diherikin, ew zelal diherike, li qiraxên wê çandinîyên bi bereket tê rakirin, li erdê wê yê nayê çandin çêrîngehên gumreh hêşîn dibin. Cihê dirêje deryayê depoyên xwê yên xwe bi xwe çêdibin yên ser û binê wan tune hene. Masîyên gelekî mezin, bê hestîyên tûj yên jê re Antacaeî tê gotin û ji bo kesidandinê baş, têra xwe tên girtin. û feydeyê wê yê gelek mezin yên din hene. Tê zanîn ku ji welatê Gerrhusê yê rêya çil roj rêwîtîya bi keştîyê, ji bakur ve diherike, lê li ser berdewamîya wê yê ji wir şûn ve kesek nikare tiştekî bêje; tenê tiştî tam tê zanîn, heta tê erdê Îskîtîyên cotkar, di erdê rût re derbas dibe; ji ber ku li qiraxên wê, li seranserê rêya deh roj rêwîtîya bi keştîyê hozên Îskîtî rûdinin. Yek Nîl û yek jî ji bo vî rûbarî ez nikarim bêjim cihê derketinê filan cih e û ez bawer im kesekî Yûnanî jî nikare bêje. Li nêzîkî deryayê avên Hypanîsê dirijin nav Borysthenesê û herdu bi hev re kortikên bê serî û bê binî yên avê pêk tînin. Di navbera van herdu rûbaran de dikek axê heye. Ji vê re Pozê Hîppolas tê gotin; li ser wê

perestgeheke Demeter(Ceres) bilind dibe; li jorê perestgehê, li ser Hypanîsê Borysthenesî rûdinin.

[54] Yên ji bo vî rûbarî hêjayî gotinê bin ev in. Piştî van yê pênca jî heye ku, navê wê Pantîkapes e; ew ji bakur ji çolekê derdikeve tê; li nav saheyên wê û Borysthenes Îskîtîyên cotkar rûdinin. Ew tê Herêma Bidar û piştî vir derbas kir dirije nav Borysthenesê.

[55] Rûbarê şeşem Hypakrîs e; ji golekê derdikeve, di welatê Îskîtîyên koçer re derbas dibe û Herêma Bidar û Meydana Hespan a Akhîslleûsê li milê xwe yê rastî dihêle, li ba bajarê Karkinitisê bi dawî dibe.

[56] Rûbarê heftem Gerrhûs e, yek ji şaxê Borysthenesê ye; ji vî rûbarî êdî li cihekî Borysthenes nayê zanîn vediqete; ji vir şûn ve cihê tê hesêb kirin û navê Gerrhûs digre, navê vê herêmê jî ev e; dema ku ber bi deryayê ve diherike Welatê Koçeran û welatê Îskîtîyên Şahane ji hevdû vediqetîne û dirije nav Hypakyrîsê.

[57] Rûbarê heyştem Tanaîs e; ji goleke li bakur ya dûr derdikeve û dirêje nav goleke hê mezintir ya navê wê Palûs-Maîotîs ku, ev gol sinorê di navbera Îskîtîyên Şahane û Saûomatan pêk tîne. Tanaîs jî tevlî rûbareke navê wê Hyrgîs dibe.

[58] Rûbarên bi nav û deng yên Îskîtîyan ev bûn; li Îskîtayê giyayên kerîyê xwe pê xwedî dikin, li gor zanyarîyên me, ji îfrasa zirav re baş e; dema ku hindurê heywanan tê vekirin, rastîya vê gotinê tê dîtin.

ÛRF Û ADETÊN ÎSKÎTÎYAN

[59] Kêm-zêde feydeyên di destê Îskîtîyan de ev in. -Li milê din adetên wan wiha ne: Di nav xudayan de yên dixwazin xwe pê bidin hezkirin, di serî de Hestîa tê û piştre Zeûs[146] û Ax tên -ku vê wekî jina Zeûs nas dikin- piştre Apollon, Uranîya Afrodît/Celestîal Venus, Herkules û Ares/Mars in. Hemî

146 Zeûs: Li Romayê wek Jupîter tê zanîn.

ev xuda li Îskîtayê mezin tên ragirtin; ji bilî vê Îskîtîyên Şahane, Poseîdonê jî pîroz dikin. Di zimanê Îskîtî de ji xuda Hestîa re Tabîtî tê gotin û ji bo xuda Zeûs, li gor fikra min gelek bi rast Papaîos[147] hatîye gotin, ji Axê re Apî, ji Apollon re Oîtosyros, Uranîya Afrodît re Argîmpasa, ji Poseîdonê re Thagîmasadas dibêjin. Ji derveyî Aresê, adetê wan yê mîhrab û perestgeh avakirinê tune, ev tenê ji bo Ares tê kirin.

[60] Di nav temamê van civatên îbtîdayî de tenê awayek qurban heye, di hemî merasimên ayînî de eynî ne. Merasimên ayînî wiha ne: Qurban datînin nêvî, destên wê yên pêşîyê girê didin; kesê wê qurban serjê bike li pişt heywan disekine, serê ben dikêşe, heywan dixe erdê; dema heywan dixe erdê, dê ew ji bo kîjan xudayî bê pêşkêşkirin, ji wî xudayî re dua dike, piştre benekî zirav li stûyê wê digerîne, çovek dike nav ben, çovê dizivirîne û dişidîne û qurban dixeniqîne; agir nayê kirin, di pêşî de merasimek nayê kirin, ava pîroz nayê reşandin. Piştî qurban hat xeniqandin digurînin û dipêjin.

[61] Li Îskîtayê dar zêde peyda nabin, ji ber wê goşt bi vî awayî dipêjin: Piştî qurban hat gurandin, temamê goştê li ser hestîyan radikin, piştre li gor welatê wan distê wan hene. Heke distek wiha li ber destê wan hebe, goşt dixinê. Ev dist eynî dişibin kraterosên Lesbosê[148], tenê ji wan gelek mezintir in; goşt dikin nav wan de, distê datînin ser hestîyê heywanê û agir berdidin hestîyan. Heke dist tunebe, goşt dixin zikê heywên[149], av jî dikinê, di binî de agir bi hestîyan dixin; hestî baş dişewitin û zik wan goştên ji hestîyan hatine veqetandin, baş digrin. Ji bo pehtina temamê gayekî, bi vî awayî agirê xwe jî bi xwe tedarik dike û ji bo her qurbanê eynî tişt tê kirin. Dema ku goşt pijîya, yê qurban serjê dike perçekî vediqetîne, ji bilî vê ji hinava wê jî perçeyek digre û wan datîne ber pê xwe. Ji bo qurbanê hemî heywanan û bi taybetî hesp serjê dikin.

[62] Qurban, ji bo hemî xudayan bi vî awayê me got tê pêşkêşkirin. Tenê Ares mijara perisîneke din e. Di her herêmê de, li cihên civînê bi navê vê

147 Papaîos: Bavê mezin.

148 Lesbos: Giraveke Yûnanistanê ya bi navê Lesvos e, li Tirkî jê re Mîdîllî dibêjin, miqabilî bajarê Ayvalikê ye.

149 Di wergera Tirkî de "goşt datînin ser îskeletê heywên" hatîye nivîsandin.

xudayê, weke vê nimûneyê perestgehek bilind dibe: Li ser saheke berê wê sê stad û dirêjahîya wê sê stad, desteyên ji şaxên zirav hatîne çêkirin yê ji sê stadan nizimtir tên komkirin. Ew teraseke çargoşe ya ser, ber û dirêjahîya wê wekî hev e; sê milên wê tîk tên xwarê, ji milê çaran derdikevin ser. Her sal sed û pêncî erebe darên nû tînin dikin ser wê komê. Ji ber ku ji ber bageran hertim diqulipe. Li serê jorê yê vî girê biçûk, şûreke ji hesin çêkirî tê daçikandin, ji bo ku ev şûr gelek kevn e ji hemî herêman gelek rêz dibîne û jixwe peykerê Ares ev e. Ji vî şûrî re her sal wê heywanên kerîyan bên qurbankirin û bêguman hesp, ji xudayên din hê zêdetir bi merdî qurban tên kirin. Dema ku di şer de hesîr bigrin, ji sedî yekî ji wan dikin qurban, lê ew merasimên ji heywanan re tê kirin çênakin. Şerabê li ser serê wî direşînin, serê wî li ser teştekê jê dikin, teştê dikêşin ser serê gurzên daran, ew xwîna tê de dirjînin ser şûr. Ya li jorê tê kirin ev e; di vê navê re li jêr, li rexê vî girikê biçûk yê pîroz ev merasim tê çêkirin: Ji qurm ve milên kesên tên qurbankirin yên rastî tev destê wan jê dikin û ber bi ʻesman ve tên avêtin, piştî yên din jî qurban kirin diçin. Mil li ku bikeve, gewde jî li nuqteke din, di cihê xwe de dimîne.

[**63**] Merasimên qurbanjêkirênê wiha ye. Em vê jî bêjin ku, beraz nakin qurban, heta li ser erdê xwe xwedî jî nakin.

Adetên Îskîtîyan Yên Di Warê Şer de

[**64**] Adetên wan yên di warê şer de ev in: Îskîtîyek, dema ku dijminê xwe yê yekê dikuje xwîna wî dike tasekê û vedixwe; di şer de serê herkesî ku jê kirîye ji hikumdar re dibe; ji ber ku tenê dema serî bibe, ji xenîmetê para xwe werdigire; yan na tiştekî nadênê. Serê dijminê xwe bi vî awayî digurînin: Guh tev dora wê hemî tê jêkirin, serî digre û dihejîne û çermê wê digre, ji bo ku baş nerim bibe bi hestîyê parsûyên ga paqij dike û di destê xwe de miz dide, ji bo wekî destmalê bikar bîne hiltîne. Van bi gema hespê xwe ve dike rêz û bi vê pesnê xwe dide, ji ber ku kesê herî zêde ji van destmalan li ser hebin, ew xwe herî mêrxas dihesibîne. Heta di nav wan de gelek kes ji perçeyên çermên hatine gurandin, qapûtên wekî qazaxên şivanan çêdikin û li xwe dikin. Cardin gelek ji wan, çermê destê rastî yê dijminê xwe yê mexlûb kirîye tev neynûkan, digurînin û dikin qapaxa tîrdankan. Ji ber ku

çermê destê insanan stûr û bê kêrtûkort e; ji nav çerman jî yê herî spî ye. Heta gelek jê temamê çermê mirî digurîne, dikêşe ser çarçoveke darîn û li ser hespê digerîne.

[65] Merasimên wan yên di vî warî de wiha ne. Belê niha jî ne ji bo temamê serîyan, tenê ji bo serê dijminê xwe yê herî zêde jê nefret dikin, tiştên ku dikin ev in: Qoqê serî di hîzaya birûyan de tê birîn, hindurê wê tê paqijkirin; yên feqîr derveyî wê bi çermê xam yên ga dipêçin; dewlemend jî her çend derveyî wê wiha dipêçin, hindurê wê bi zêrê rûkaş dikin û di cihê tasê de bikar tînin. Heta ji hemwelatîyê xwe re jî, heke navbera wan vebe û wan li ber hikumdar mexlûb bikin, eynî tiştî dikin. Heke mêvanekî bi qedir bê ziyareta wan, van serîyan nîşanî wan jî dikin û di îzahê de bê kêmanî dibêjin ku, di gel ku ev kes ji miletê wî bû li hemberî wî şer dane destpêkirin û mexlûb bûne ; ev hemû wek delîlê mêrxasîyê tê dîtin û pesnê xwe pê didin.

[66] Salê carekê, her walî di herêma xwe de di nava kraterosekê de av û şerabê tevlihev dike; her Îskîtîyê ku dijminek mexlûb kiribe tê wê vedixwe; kesê ku serkeftineke wî ya wiha tunebe ji vê şeraba rûmetê nikare vexwe, tê kêmxistin û li qiraxan dimîne; ev hal heqareta herî mezin e. Di miqabilî vê de yên gelek dijmin kuştibin, bi du tasa tên û li ser hev vedixwin.

Di Nav Îskîtîyan de Falgerî/Kehanetî

[67] Di nav Îskîtîyan de gelek kahîn hene, ew yên di pêşîyê de wê biqewimin li şaxên bîyan dinêrin û dibêjin. Ew bi vî awayî ye: Ji van şaxan destîyên mezin tînin, datînin erdê û belav dikin, piştre şaxan lib bi lib vediqetînin û yên wê pêş de biqewimin dibêjin; dema ku diaxivin şaxan berhev dikin, dikin wek qeflan. Kahînîya bi vî awayî ji bav û kalên wan ji wan re maye, lê "Enareyî" yanî nêrûmêk, îddîa dikin ku Afrodîte qabîlîyeta dayîna xebera ji bo rojên pêş daye wan; ew li ser qaşilên ixlamûrê li falê dinêrin; qaşil bi dirêjahîya wê dikin sê perçe, li serê tilîyên xwe dipêçin, piştre vedikin û ji bo rojên bên xeberê didin.

[68] Dema ku hikumdarê Îskîtê nexweş dikeve, sê kahînên herî baş tînin, ew jî wekî min got li falê dinêrin. Bi gelemperî tiştên ku dibêjin, filan yan

bêvan kesan (li vir navê wan hemwelatîyan tê dayîn) li ser xanedana hikumdar bi derewa sûnd xwarin e. Di nav Îskîtîyan de, adet e di warê mijarên giring de bi serê xanedana hikumdar sûnd bixwin. Ew kesên ji alîyê falgeran ve bi tawanê sûndxwarinê tên sucdarkirin, bêsekin tên girtin û tenê bi serê xwe derdixin hizura hikumdar; li ba kahînan ji wan re tê gotin ku, van di saya pîşeyê xwe de derxistine ku, wî li ser xanedana hikumdar bi derew sûnd xwarîyê û ji ber wê hikumdar nexweş ketîye. Ew inkar dike, dibêje qet bi derewa sûnd nexwarîye, dixeyîde. Li ser inkarê hikumdar ji du qatê wan zêdetir kahîn dide anîn; heke ev jî li zanînê xwe bişêwirin û beşdarî sûcdarkirina bi derewan sûndxwarinê bibe, di cih de serê wî kesî tê jêkirin, hebûn û tunebûna wî di navbera kahînên yekem de pêşk tê avêtin û parve dikin; heke falgerên piştre hatin wî kesî bêtawan derxînin, careke din, careke din kahînan nû dide anîn. Heke di dawîyê de piranî wî kesî bêtawan hesêb bikin, falgerê cara pêşî hatîne, mehkumê mirinê tê kirin.

[69] Van bi vî awayî dikujin. Qirş û mirş tijî dikin erebekê û bi ga girê didin; kahînan lingên wan û destê wan ji pişt ve girêdayî, devê wan xitimandî li erebeyê siwar dikin û dixin nav êzingan, agir pêdixin, piştre ga tên ajotin, ji bo ku bilez biçin wan ditirsînin. Gelek caran bi kahînan re ga jî dişewitin; hinek car jî nîra erebeyê ji ber gurrîyê dişewite û difilite, ga jî di halekî ku her cihê wan şewitî baz didin diçin. Hatîye dîtin ku kahîn ji ber hinek sebebên din jî eynî bi vî awayî hatine şewitandin û navê wan derewîn derdikeve. Dema ku hikumdar yek kuşt zarokên wî jî li pişt wî nahêle, zarokên kur jî pê re dikuje, dest nadin keçan.

[70] Îskîtî bi vî awayî sûnd dixwin: Şerab dikin nav taseke axînî; yên sûnd dixwin xwîna xwe tevlî wê dikin; ji bo vê bi tiştekî tûj qulekê vedikin yan jî bi şûr hebekî xêz dikin, piştre şûr, tîr, bivir û rim di tasê dadikin; piştî ev jî hat kirin, li ser navê hêrsa îlahî sûnd dixwin û ji şeraba di tasê de hinekî vedixwin û kesên li wir yên giregir jî bi wan re vedixwin.

GORÊN HIKUMDARÊN ÎSKÎTÎYAN

[71] Gorên hikumdaran di erdê Gerrhûsê de ne, yanî li herêmên herî dawîyê yên keştî dikarin li ser Boryshenesê re biçin. Dema hikumdarên

wan dimrin, li wê herêmê dirêjahî û firehîya wê wekî hev, çargoşe, goreke gelek mezin dikolin û dema ku hazir bû mirî tînin: Gewde bi mumê helandî hatîye rapêçan; di pêşîyê de zik hatîye qelaştin, hindurê wê hatîye valakirin û bi bizrê beqdûnis, anason, nane û nebatên bêhnxweş hatîye tijîkirin, piştre hatîye dirûtin; mirî dikin erebekê û ji civateke xelkê ya din re tê birin; yên teslîm digrin adetên Îskîtîyên Şahane tetbîq dikin: Memikê guhekî xwe jê dikin, serê xwe hawîrdor kur dikin, goştê milên xwe xêz dikin, enî û pozê xwe tîş dikin, tîr dikin destê xwe yê çepê. Piştre laşê hikumdar yê di erebeyê de, cardin ji komeke din yê hemwelatîyê wan re tê birin; ahalîyê ku cara pêşî laş biribûn cem wan jî li pey diçin. Piştî li hemî komên xelkê hat gerandin mirî dibin welatê împaratorîyê yê herî dûr, dibin welatê Gerrhûsê; gor li wir hatîye kolan. Gîha li nav gore radixin, hikumdar datînin ser; mirî bi rimên di erdê de hatine daçikandin tê rapêçan, siheke ji daran çêkirî dikin ser, ew bi zilan tê girtin; li ew cihê fireh yê di gorê de vala dimîne yek ji jinên wî, kesê ji destê wî mey vexwarîye, aşpêjek, sîlahdarê wî, yek ji xulamên wî, qasid û hespê wî, tên xeniqandin û tê de datînin; her yek ji wan tiştên bikar anîye û tasên zêrînî tê de datînin (zîv û sifir nayê bikaranîn). Dema merasim temam bû, herkes bi bêran ax diavêje ser gorê û ji bo girê herî mezin çêkin bi hev re pêşbirkîyê dikin.

[72] Piştî salek di ser re derbas bû ev merasim tê çêkirin: Mirovên hikumdar yên herî zêde jê re xizmet kirine tên hilbijartin; ew ji nijada Îskîtîyan in, ji ber ku hikumdar kê bixwaze digre bin xizmeta xwe û koleyên wî yên bi heq stendine tune; ji van û ji hespên wî yên herî xweşik, pêncî hebên wan tên xeniqandin, hindurê wan tê derxistin, tên paqijkirin, tijî ka dikin didrûn; bi awayê her yekî du cot bin rêzek dar tên çikandin, li navbera du darên destekê nîvê tekerê ku milê gilover ber bi jêr ve ye tê danîn; nîvê din bi eynî awayî û bi du singên cihê ve tê girêdan; ji van bi vî awayî gelekan çêdikin. Singekî bi dirêjahî heta stuyê wî dikin nava hespê û hildidin datînin ser wan destekan. Hinek ji pêş ve bin stûyê hespê digrin radikin; yên din ji paşê ve, li ba hêtên wî zikê wî digrin radikin; herdu lingên hespê ji rexan ve dadiliqe lê nagihe erdê. Hesp gem û hevsar dikin û serê hevsar li lingekî girê didin. Her yek ji wan xortên xeniqandine derdixin ser hespekî û bi vî awayî dikin: Singeke sert ji seranserî hestîyê piştê heta stûyê wî dixin gewde; serê milê xwarê yê sing derdikeve ji derve û li ser wî singî kirine nav hespê

ku korteke taybetî tê de çêkirine, didin rûniştandin. Piştî li dora gorê van siwarîyên nedîtî rêz dikin, diçin.

[73] Belê, ew hikumdarên xwe bi vî awayî vedişêrin; dema ku ji Îskîtîyên din kesek dimre, yên herî nêzîkî wî wî dikin erebekê, bi rêzê li malên nêzîkî wî yê din digerînin; her yek ji wan, dema ku dibîne qefîle tê, ji wan re xwarinê derdixin û ji her xwarinê perçeyek derdixin û datînin ber mirî. Çil rojan mirî bi vî awayî ji yekî ji bo yê din tê gerandin, piştre tê veşartin. Piştî mirî hat veşartin, Îskîtî xwe paqij dikin: Serê xwe baş difirkînin û dişon, ji bo gewdeyê xwe paqij bikin merasimekê çêdikin, sê singên serê wan yê jorê ber bi hev xwahr dadiçikînin erdê, li ser kulavan radixin, di hindurê kulavan di nîvê singan de teştek heye, kevirên baş hatine sorkirin tînin dikin nav vê teştê.

[74] Di axa wan de kinif hêşîn dibe, ew eynî wekî ketenê ye, lê ew sitûrtir û mezintir e. Hem bi destê insanan tê çandin, hem jî xwe bi xwe hêşîn dibe. Thrakî ji van, kincên dişibin ketenê çêdikin. Heta yên ji vî karî baş fêhim nakin, ew qet ferq nakin ev kinc ji kinifê yan jî ji ketenê hatîye çêkirin û yên kinifê nizanin dikarin sûnd bixwin ku ev keten e.

[75] Îskîtî radihêjin bizrê kinifê, dikevin nav wê kulava li ser singa ya me behis kir û wî bizrî davêjin ser kevirê sorbûyî; dema ku tov li kevir dikeve dûman derdixe û hilmeke wisan derdixe ku, di hemamên me yên Yûnanê de jî evqas hilmeke xenîqok dernakeve. Îskîtî ji vê re hişê xwe diavêjin û ji kêfan diqîrin; ev ji bo wan dikeve cihê xweşûştinê, ji ber ku qet av li gewdeyê xwe nakin. -Em bên jinên wan, ew jî servî, sedar û telaşên xwe yên rojane li ser kevirekî kêrûkort baş dikutin û av dikin ser; vî hevîrî di rûyê xwe û hemî bedena xwe didin; bêhneke mirov jê têr nabe peyda dibe û roja din dema ku vê lepeyê radikin çermê wan diçurise û rengekî nû werdigire.

GIRÊDANA ÎSKÎTÎYAN BI ÛRF Û ADETÊN XWE VE

[76] Belê, miletek ku ji adetekî biyanî kîjan dibe bila bibe, lê bi taybetî ji yên Yûnanan ziravê wan diteqe. Di nimûneyên Anakharsîs û piştre ya Skyles

de; ev hatîye nîşandan. Anakharsîs li gelek welatan gerîyaye, çandeke fireh bi dest xistîye. Dema vegerîya ocaxa bavê xwe û Hellespontos derbas kir derket Kyzîkosê, wê rojê Kyzîkosîyan ji bo rûmeta Dayîka Xudayan cejn dikirin. Ew jî ketibû navenda cejna ku gelekî bi balkêşî dihat pîrozkirin. Anarkharsîs jî nezir pêşkêş kirîye, heke bi sax û silamet vegere welatê xwe wê li gor isûla Kyzîkosan ji Dayîka Xudayan re qurbanek serjê bikira û wê şahîya şevê çêkira. Dema ku gihişt Îskîtîayê çû Herêma Daran(Daristan), vir nêzîkî Meydana Hespan a Akhîlleûsê ye û bi her cûre daran rapêçayîye; di navenda van daristanan de, temamê merasimên ji bo Xwedawendê tên kirin tevde bi cih kirin; trampetek û temamê nîşanên Xwedawendê kiribûn stûyê xwe. Lê hemwelatîyek ev kirinên wî dîtin, baz da çû xeber gihand Saûlîosê hikumdar; hikumdar rabû, çû wir û dema ku Anakharsîs pêwistîyên dîn pêk dianîn ew girt. Tîrek avêtê û ew kuşt. Îro hûn Anakharsîs bipirsin, Îskîtî wê bêjin em kesekî wiha nas nakin. Ji ber ku wî welatê xwe terk kiribû û çûbû û ji cihê çûbû bi adetên xerîb vegerîyabû. Bi qasî min ji Tymnestê[150] berpirsyarê Arîapeîthes[151] seh kirîye, Anakharsîs, mamê Idanthyrsosê hikumdarê Îskîtê û kurê Gnûros bûye. Gnûros kurê Lykos û nevîyê Spargapeîtes bûye. Heke Anakharsîs bi rastî ji vê xanedanê be, wî wextî ew ji alîyê birayê xwe ve hatîye kuştin; ji ber ku Idanthyrsos, kurê Saûlîos bû û yê Anakharsîs kuştîyê ev Saûlîos e.

[77] Li gel vê jî riwayeteke din a min ji Peloponezîyan seh kirîye heye: Gotin ku hikumdarê Îskîtîyan Anakharsîs şandîye. Li Yûnanistanê ketîye xwendegehekê; di vegera xwe de raporek daye wî hikumdarê ku ew şandîye. Ji derveyî Lakedaîmonîyan, temamê Yûnanîyan wextê xwe didin karê cure cure û yê jê ra hostayî dixwaze, lê axaftineke rast û dirûst jî tenê karîbûye bi yên din re bike. Lê ev, çîrokek e ku Yûnanîyan hûnandine û Anakharsîs wekî hatîye gotin mirîye. Belê aqûbeta kesekî ku ketîye ber bayê adetên ji derve û bi Yûnanîyan re rabûye û rûniştîye ev bûye.

[78] Wextekî dirêj piştî vê, bi serê Skylesê kurê Arîapeîthes de jî tiştekî wekî vê hatîye. Yek ji zarokên Arîapeîthesê hikumdarê Îskîtê, Skyles e; ev li bajarê

150 Hauvette dibêje ku ev navê Karyayî ye.

151 Arîapeîthes, dijminê Daryûs, hikumdarê Skythîyan yê piştî Îdanthysos e

Îstrîayê[152] û ji jineke ne Îskîtî hatibû dinyê. Ji dêya xwe ziman û edebîyata Yûnanî hîn bûbû. Piştre Arîapeîthes, bûbû qurbanê xîyaneta bi nehenî hatibû danîn ya Spargapeîthesê hikumdarê Agathyrsê û miribû; Skyles ket cihê wî û di eynî wextî de jina bavê wî ya navê wê Opoîayê jî sitend; ev jin ji Îskîtîyan bû û bi navê Orîkos zarokek ji Arîapeîthes anîbû. Hikumdarê Îskîtîyan Skyles, ji adetên xwecih hez nedikir; li gor ew perwerdeya dîtibû, nêzikahîya wî zêdetir bi tiştên aîdê Yûnanîyan re hebû. Û wiha dikir: Dema ku artêşa Îskîtê ber bi bajarê Borysthenesîyan ve dibir, ku ev ji xwe re eslê wan ji Mîletosê ye dibêjin, min gotibû çi wextê biçûya vî bajarî eskerên xwe li taxên qiraxên bajêr dihişt, bi xwe diçû kelehê, derî didan girtin, kincên Îskîtîyan derdixist, wekî Yûnanîyan li xwe dikir û bi wan kincan derdiket ji derve, li ba xwe ne eskerê parêzvan, ne jî kesek digirt, diçû agorayê/meydanê û digerîya. Ji bo ku Îskîtî wî di vî qilixî de nebînin, derî di bin çavdêrîyê de bûn. Li vir tam wekî Yûnanîyekî dijîya, ji xudayan re li gor adetê Yûnanîyan qurban pêşkêş dikir. Mehekê yan hê zêdetir bi vî awayî dijîya, piştre kincên xwe yên berê li xwe dikir û diçû. Vê kêfa han gelek caran tekrar dikir. Li Borysthenesê serayek dabû avakirin, jineke ji xwecihan tê de danîbû û bi wê re zewicîbû.

[**79**] Lê hewce bû felaketek bête serî û bahaneya vê felaketê ev çêbû: Hewesa ku tev li nehênîyên Dîonysos yên pîroz bibe pê re çêbû. Tam di dema ku van daxwazên xwe bicih bikira, bû şahidê mûcîzeke bitesîr. Wekî hinek li jorê min got, li Borysthenesê serayeke wî ya bi şatafat û mezin hebû; dora wê bi sfenks û grîfonên ji mermerên spî hatibû xemilandin; xuda çavê xwe berda vê avahîyê û şewitand; lê ev mûcîze pêşîya gava ku Skyles diavêt negirt. Halbukî Îskîtî, merasimên Yûnanan yên di warê ayînê Dîonysos de biçûk dibînin û dibêjin; ne maqûl e ku meriv bifikire, xwedayekî ku mirovan ber bi dînbûnê ve dibe heye. Skyles, dema ku ket nav dînê Dîonysos, kesekî Borysthenesî bi xef ji bajêr derket û çû Îskîtê: Got, "Hûn Îskîtî henekê xwe bi me dikin ku em bi cezbeya Dîonysos dikevin û qurbana îlahî dibin; baş e. Lê niha hikumdarê we jî eynî tiştî dike, xwe teslîmî Dîonysos dike, dînîtîya îlahî ew jî girtîye. Hûn bawer nakin? Werin, bi çavê xwe bibînin." Mezinên Îskîtî ketin pey; wî jî ew kirin nav bajêr, bi xefî li ser kulekê bi cih kirin, ji

152 Îstrîa: Bajarekî li ser Deryaya Reş e.

wir di nav alaya ayîna Dîonysos de, Sykylesê xwe bi cezbeya pîroz ve berdayî dîtin. Îskîtîyan ev felaketeke mezin hesêb kirin. Ji bajêr derketin û ya dîtin di nav temamê artêşê de belav kirin.

[80] Piştî Skysles vegerîya cihê xwe yê her wextê, Îskîtîyan, birayê wî Oktamasades yê ji keça Teres danîn ser desthilata xwe û li hemberî wî serî hildan. Skysles yên dê bên serî û sebebê wê fêhim kiribû, bazda Trakyayê. Dema ku Oktamasades ev xeber stend, seferî Trakyayê kir; li ser Îstros rastî hêza dijmin hat, dê tam şer dest pê bikirîya Sîtalkes, ji Oktamasades re ev xeber şand: "Hûn çima şer dikin? Tu xwarzîyê min î û birayekî min di destê te de ye; tu wî bide min, ez ê jî Skyles bidim te; em çima qedera xwe teslîmî şer bikin?" Xebera Sîtalkes şandibû wiha bû; bi rastî jî birayekî Sitalkes baz dabû, li cihekî ku xwe bavêjê gerîyabû û niha li ba Oktamasades bû. Oktamasades ev pêşnîyaz baş dît, xalê xwe teslîmî Sitalkes kir û serê birayê xwe Skyles da jêkirin. Belê Îskîtî evqas girêdayî ûrf û adetên xwe ne, kesên xwe yên rîayetî adetên biyanîyan dikin bi vî awayî ceza dikin.

[81] Min nikarîbû ez hîn bibim ka nifusa Îskîtîyan çiqas e; tiştên cûda gotin, ji min re gotin ku gelek qerebalix in, lê di nav wan de Îskîtên esîl kêm in. Li gel vê jî va yên nîşanî min dan: Cihekî bi navê Exampeîa yê di navbera Borysthenes û Hypanîsê de heye; dema hinek li jorê, me behs kir ku li vê herêmê çavkanîyeke tehl heye, dirije nav Hypanîsê û ava vî çemî xera dike û nayê vexwarin, gotina wê derbas bûbû. Li wir qazaneke sifir heye, ji qazana li ber devê Pontos Euxeînasê[153] heye ya ku dîyarîya Paûsanîasê kurê Kleombrotos e şeş cara mezintir e. Ez ji bo yên qazana ber devê Euxeinos Pontos nedîtine dibêjim, qazana Îskîtê bi rehetî şeşsed amfora hildide û qalindbûna wê şeş tilî ye. Yên li wî welatî rûdinin ji min re gotin, ev bi helandina serê riman çêkirine. Hikumdarê wan Arîantas, xwestîye hejmara Îskîtîyan çiqas e hîn bibe, xeber şandîye ku her Îskîtî jê re serê rimekî bişîne û yê ku neyne wê bê kuştin. Gelek serê riman anîne û wî jî xwestîye ji van abîdeke mayînde çêke. Wî wextî ev qazana sifir hatîye çêkirin, li ev cihê bi navê Exampeîa, qurbanan dikin hundirê wê. Belê, tiştê ku ez di derbarê hejmara Îskîtîyan de hîn bûm ev bû.

153 Pontos Euxeînasê: Behra Reş e.

[82] Heke em rûbarên wê yên zêde û gelek mezin deynin milekî, li van erdan tiştekî awarte tune. Li gel vê jî ji bilî van rûbaran û deştên serî û binê wan tune, ez tiştekî din yê balkêş bidim xuyakirin: Li ser zinarekî şopa lingê Hercules didin nîşan; ew li ba Rûbarê Tyrasê ye, dişibe şopa lingê insên û dirêjahîya wê du zend e. Ev mijar jî evqas; niha ez têm behsa çîroka esasî.

DARYÛS, DERDIKEVE SEFERA ÎSKÎTÊ

[83] Daryûs, hazirîya sefera li hemberî Îskîtîyan dikir, li pey hev xeber dişandin, ji hinekan eskerê peyade, ji hinekan keştî, ji hinekan jî dixwest li ser Bosphorosa Trakyayê pir çêkin, lê birayê wî Artabanosê kurê Hîstaspes hewil dida ku bike ew dev ji sefera li ser Îskîtîyan berde. Wî digot ku ew civatên îbtîdayî ne û di nav tuneyîyê de ne. Lê netîceke ji van pêşnîyazên melahîm û aqilane wernegirt; dev ji hewlên xwe berdan. Daryûs, dema ku her tişt hazir bûn, serekatîya artêşê girt destê xwe û ji Sûsayê derket.

[84] Wî wextî bû, dema Oîobazosê(Oeobazûs) Aryanî yê sê kurên wî girtibûn eskerîyê derket hizura Daryûs û xwest ku bihêle yek ji kurên wî li ba wî bimîne. Bersiva Daryûs dayê ev e, dibêje madem dostê wî ye û daxwazeke di cih de kirîye, wê tevan berde. Oîobazos di nav şahîyê de dimîne; li hêvî bû ku kurên wî ji seferê bên veqetandin; Daryûs emir da wezîfedarên li dora wî berhev bûne, hersê kurên wî jî da kuştin.

[85] Belê laşê van hersê xortan dan bavê wan. Daryûs ji Sûsayê derket, hate Khalkedona Bosphorosê ya pir li ser hatibû avakirin; li wir li keştîyê siwar bû û çû giravên Kyaneîayê. Li gor Yûnanîyan, ew girav berê sobanî dikirin. Di nav dîwarên pîroz de rûnişt û dest bi temaşekirina dîmenên sipehî yên Euxeinosa Pontosê kir. Di nav deryayan de ya herî mirov şaş dihêle ev e: Dirêjahîya wê yanzdeh hezar û sed stad e; cihê herî fireh sê hezar û sêsed stad e. Firehîya devê vê deryayê çar stad e û kanaleke ku jê re Bosphoros tê gotin ya pir li ser hatîye çêkirin, dirêjahîya wê sed û bîst stad e; Bosphoros digihe Propontîsê. Firehîya Propontîsê pencsed û dirêjahîya wê hezar û çarsed stad e, ew derdikeve Hellespontosê[154], li seranserê wê çarsed stadan

154 Hellespontos: Niha bi navê Tengava Çanakkale di nav sînorê Tirkîyeyê de ye.

firehîya wê heta heft stadan teng dibe. Hellespontos, bi deryayeke vekirî ya navê wê Egeanê bi dawî dibe.

[86] Lêbinêrin ev pîvanên han çawa hatine girtin: Keştîyek, di demsaleke baş de bi gelemperî bi roj li dora heftê hezar qulaç, bi şev şêst hezar qulaç rê diçe. Piştî ku ev hat zanîn, ji cihê fireh yê deryayê heta Phasîsê, yanî heta cihê herî dirêj neh roj û heşt şev dikêşe, ev jî dike hezar û sed û deh cara hezar qulaç, bi gotineke din yanzden hezar û sed stad digre. Ji welatê Sîndosan heta Themîskyraya li ser Thermodonê re -cihê fireh yê Euxeînosa Pontosê- sê roj û du şev rê ye, ev jî dike sêsed û sîh hezar qulaç yan jî sê hezar û sêsed stad. Belê, min firehî û dirêjahîya Euxeînosa Pontosê, Bosphorosê û Hellespontosê bi vî awayî hesêb kirin. Ev îzahên min dan tam bi rastîyên coxrafyayê re li hev dikin. Ez ê vê jî têkim ser: Li Euxeînos Pontosê kêm-zêde bi qasî wê golek jî heye; navê wê Palûs-Maîotîs[155] e, jê re Bavê Euxeînos[156] tê gotin.

PIRA BOSPHOROSÊ/TENGAVÊ

[87] Daryûsê li deryayê dinêrî paş de vegerîya û bi gemîyê çû ber bi pira ji alîyê Mandroklesê Samosî ve hatibû çêkirin. Wî Bosphoros jî dît û li qiraxê deryayê ji mermerên spî du stûn da daçikandin; li ser yekê bi tîpên Asûrî û li ser ya din bi tîpên Yûnanî, agahîyên miletên dibirin şer da nivîsandin; temamê miletên di imparatorîya wî de bûn dibirin. Hêza deryayî ne tê de, hesaba temamê van yekîneyan hatine kirin, siwarî û piyade tevde heftsed hezar e; ji bilî vê şeşsed keştî hatine berhevkirin. Piştre Bîzansîyan ev stûn birine bajêr û di gorîgeha Orthosîa Artemîs de bikar anîne; yek kevir yê tijî nivîsên Asûrî ye, ji bo perestgeha Dîonysosê ya li Bîzansê hatîye veqetandin. Li gor hesaba min, ew pira Daryûs li ser Bosphorosê daye avakirin, dikeve navbera Bîzansê û perestgeha li devê Euxeînosa Pontosê.

[88] Kêfa wî ji vê avahîya ku gelekî bi lez hate çêkirin re hat; mîmarê wê Mandroklesê Samosî ji çi çiqas heq dikir deh qatê wê dayê. Mandrokles bi van, ji bo tabloyeke ku li dîmenê binêrin û wek orîjînala wê xêz bikin, xe-

155 Behra Azov/Azak

156 Di wergera Îngilîzî de, wek Dayika Pontûs hatîye nivîsandin.

latek danî û tablo li perestgeha Hereyê ya li Samosê daliqandin: Wêne, pira li ser Bosphorosê/Tengavê hatîye avêtin, Daryûsê li cihê şerefê rûniştîye û artêş jî di Tengavê re derbas dibe dide nîşan; ev nivîs jî daye nivîsandin:

Mandrokles ev pêşkêşî ji bo Here veqetand
Pireke li Bosphora ku masîyên wê pir, hukum li pêlan dike
Ev tabloya bêqîmet bila li van dîwaran bê daliqandin
Ji ber ku mirovê planên Daryûs tetbîq dike
Şerefa xwe û ya Samosê bilind kir.

Abîdeya wî mirovê ku ev kar birêve dibir hiştîye ev e.

[89] Piştî Daryûs Mandrokles perû kir, derbasî Ewrûpayê bû. Wezîfeya dabû Îonîayîyan ew bû ku wê keştîyên xwe bikirina Euxeînosa Pontosê û pirek bavêtina ser Îstrosê û li wir bimana li hêva hatina wî; hêza deryayî di bin birêvebirîya deryavanên Îonîa, Aîolîa û Hellespontosê de bû. Fîlo giravên Kyaneîayê derbas kir û rast derket Îstîrosê; vebû rûbarê, du rojan çû û di îstîqameta ku Îstîrosê dike du şax pirek da çêkirin. Daryûs, piştî bi lez bi pira hatibû çêkirin Bosphoros derbas kir, ber bi Trakyayê ve çû, gihişt çavkanîyên rûbarê Tearosê û li wir sê rojan bêhna xwe veda.

[90] Yên li dora Tearosê dijîn dibêjin ku, ji bilî ku bi kêrî gelek nexweşîyan tê, gurrîya di insan û heywanan de derdikeve jî rehet dike. Li ser eynî tehtê ji sîh û heyşt çavkanîyan diherike, ya sar û germê wê jî hene. Ev çavkanî tam di nîvê navbera bajarê Heraîonê yê nêzîkî Perînthosê û Apollonîa li ser Eûxeînosa Pontosê de ne û ji herduyan re jî rêya du rojan e. Tearos diherike ser Kontadesdosê, Kontadesdos dire ser Agrîanesa, Agrîanes dire ser Hebrosê û Hebros li nêzîkî bajarê Aînosê dirije deryayê.

[91] Dema ku Daryûs gihişt qiraxê vê avê, li vir baregeha xwe veda û ji ber ku rûbar xweşa wî çû, stûnek jî li vir daçikand û li ser wiha da nivîsandin: "Çavkanîyên Tearosê, ava herî xweş û herî sipehî ya ku rûbarek bikaribe bide, didin û hikumdarê Aryanîyan û yê temamê bejahîyê, insanê herî mêrxas û baş, Daryûsê kurê Hîstaspes û artêşa wî, dema ku meşîyan ser Îskîtîyan di ber van çavkanîyan re derbas bûn." Ew kitabeya li vir da kolîn ev bû.

[92] Ji vir rabû, hat ber qiraxê rûbareke din, ev rûbarê Artîskosê ya li welatê Odrysîyan bû. Dema ku gihişt ba vî rûbarî, lêbinêrin çi kir: Cihek nîşanî artêşa xwe kir, emir kir ku çi kesê ji vir derbas bibe kevirekî deyne wir. Temamê artêşê ev emir pêk anî, ev girê mezin yê ji keviran li wir hişt û çû.

[93] Berîya bigihe Îstrosê, yekem miletê ku mexlûb kir Getaîyî bûn, yên ku bi nemirîya xwe bawer dikirin; ji ber ku Thrakîyên bi navê Skyrmîadaî û Nîpseîa dihatin naskirin û li Salmydessosa jora bajarên Apollonîayê û Mesambrîayê dijîyan, bê şer teslîmî Daryûs bûbûn; Getaîyîyên ketin nav dînîtîya rabûna li hemerî wî, di cih de kirin kole; halbukî ew Thrakîyên herî mêrxas û rast bûn.

[94] Bawerîya Getaîyîyên di derbarê nemirîyê de ev e: Bawerîya wan bi fanîbûna wan tune; hesêb dikin ku kesê bimre wê biçe bigihe ruhê îlahî Zalmoxîs, yan jî weke ku hinek ji wan jê re dibêjin Gebeleîzîs. Her pênc sala carekê di nav hemwelatîyên xwe de, bi pişkê yekî hildibêjêrin, ji vî Zalmoxîsî re wekî qasid dişînin; wezîfeya qasid, jê re pêşkêşkirina daxwazên wan e. Lêbinêrin wî çawa dişînin: Ji nav wan sê kes di destê wan de rimên biçûk derdikevin orteyê; yên din yê wê biçe ba Zalmoxîs dest û pîyên wî digrin û radikin hewa û serê rimên xwe yên tûj li binî digrin. Heke têre biçe bimre, tê fêhimkirin ku xuda ji wan razî ye; heke nemre ji qasid diqeherin, bi tawanê nîyeta neqenc sucdar dikin û ji bo ji wî razî nabin, yekî din dişînin; jixwe hê di saxîya wî de jê re tê gotin ku ew wezîfedar kirine. Ew Thrakên ji bo çavê xudayê xwe bitirsînin, li himberî brûskê tîr davêjin ev in; ji ber ku bawer nakin li wir ji bilî yê wan xudayêkî din hebe.

[95] Li gor çîroka Yûnanîyên Euxeînos Pontos û Hellespontosê ji min re gotin, ev Zalmoxîs insanek bû, li Samosê koleyek bû, efendîyê wî jî Pythagorasê kurê Mnesarkhos bû[157]. Piştî azad bûye serweteke mezin qezenc kirîye, gelek dewlemend vegerîyaye welatê xwe. Thrakî bi awayekî xerab dijiyan û nijadeke nezan û belengaz bû; herçî Zalmoxîs e, luksa Îon nas kiribû, ji Thrakîyan hê zêdetir xwedîyê hişmendîyeke kûr bû; peywendîyên wî bi Yû-

157 Pythagoras, li Samosê hatîye dinyê, di sedsala 6an de jiyaye. Nayê zanîn ku tiştek nivîsandîye, wî jî wekî Sokrates bi axaftinên xwe bal kişandîye. Tesîra wî ya bi berdewamî ya li ser fikrên Yûnanîyan li ba Platon û Aristoteles tên dîtin.

nanan re çêbûbûn, hem jî ne bi awayekî kêm, ji ber ku zana Pythagoras nas kiribû. Ez difikirim ji ber vê, sofreya xwe ji herkesî re vekiribû, kiribû wekî cihekî ji civînan re; li wir li milekî ji giregirên welat re şahî li dar dixistin, li milekî din hînî wan dikir ku ne ew, ne mêvanên wî, ne jî nifşên din wê bimrin, wê hemî jî biçin cihekî. Wextê ku bi van re dida û distend, tiştên wiha digotin; li milê din jî di binê erdê de xanî ava dikir. Piştî ew hazir bû ji holê winda bû, ket wir, sê salan li wir ma. Thrakî, wekî ji mirîyan re dikirin, ji bo wî jî xem dixwarin û digirîyan. Sala çaran derket orteyê -û wan bi vî awayî bi gotinên xwe da bawerkirin. Belê tê neqilkirin ku Zalmoxîs wiha kirîye.

[**96**] Heke pêwist be ez li ser vî kesî û xanîyê wî yê binê erdê fikrên xwe bêjim, bi ser inkarnekirina bûyerê re, tenê ez dikarim bêjim bawerîya min ne bi tevayî ye; lê ez bawer dikim ku Zalmoxîs gelekî berî dema Pythagoras jiyaye. Li gel vê jî gelo kesekî bi navê Zalmoxîs hebûye yan jî ew xudayê Getaîyan yê millî bûye, li gor min ne giring e. Dixwaze bila wisa be yan jî wiha be, Aryanîyan ev miletê min behsa karekterên wan yê taybet kirin, mexlûb kirine, girtine eskerîyê û tevlî artêşê kirine.

[**97**] Daryûs, gihişt Îstrosê û bi eskerên xwe ve rûbar derbas kir; piştre ferman da Îonîayan ku pirê hilweşînin û bi tevahîya hêza deryayî artêşê di bejahîyê de bişopînin. Dema ku Îonîayan ji bo bicihkirina fermanê xwestin pirê xera bikin, Koesê kurê Erxandros yê birêvebirîya Mytîlenîyan dikir, bi bawerîya ku kesek fikra xwe bêje wê gotinên wî nexweş neyên pêşwazîkirin, ji Daryûs re wiha got: "Hikumdar, tu diçî welatekî wisan, ne qemçek erdê wan yê hatî ajotin û ne jî bajarên wan yên insan tê de rûdinin heye; bihêle bila ev pir di cihê xwe de bimîne, yên ew çêkirine wekî nobedar bihêle. Heke hûn wiha bikin, em bi Îskîtîyan re rûbirû bibin û plana xwe bi cih bikin, em ê bikaribin vegerin welatên xwe; na heke em wan mexlûb nekin, wî wextî em çi bikin, cardin em ê bi sikûnet vegerin cihê xwe. Fikreke ku li hemberî Îskîtîyan mexlûb bibin di hişê min re jî derbas nabe, lê zêdetir tirsa min ew e ku em nikaribin wan bibînin û wextê em li nav erdê wan bigerin, ji ketina nav tuneyîyê ditirsim. Wê bê gotin ku, ez ji bo menfeeta xwe û ji bo li vir bimînim diaxifim. Lê naxêr, li gor min ya herî baş ev e, ya ku ez dibêjim e; ji ber ku ez bi xwe biryardar im bi te re bêm, ez ê paşve nemînim." Gelekî kêfa Daryûs ji vê nesîhetê re hat. Bi van gotinan bersiv da: "Biyanîyê

Lesbosî, heke ez bi saxî vegerim seraya xwe, ji bo di miqabilî van şîretê te yê xweş ez bersivekê bidim, firsetekê bidî min, miheqeq were min bibîne."

[98] Wî ev gotin û şêst girêk avêtin qayîşekê, emir da bangî hikumranên bajarên Îonîayê bikin û ev gotin: "Îonîayî, ew emrê min ji bo pirê dabû min neda bihesibînin: Vê qayîşê bigrin û ez çi dibêjim wê bikin: Ez dibêjim, roja hûn bibînim ez ketime erdê Îskîtîyan pê ve, her roj girêkekê vekin, heke di wî midetî de ez paşve venegerîyam û rojên vekirina girêkan temam bibe, vir terk bikin paşve vegerin, ber bi welatê xwe ve bikevin rê. Lê heta wî wextî, madem min biryareke nû wergirt, li pirê baş binêrin, baş biparêzên û ji bo hûn wê li ser lingan bihêlin baş bixebitin. Baldarîya we ji bo min gelekî hêja ye." Piştî ev emir da, Daryûs bi lez ber bi hindurê welêt ve meşîya.

ÎSKÎTÎA Û MILETÊN LI VIR DIJÎN

[99] Qiraxên Îskîtîa dewama qiraxên Trakyayê ye; Trakya kendavekê xêz dike, piştî wê mirov dikeve erdê Îskîtîa û digehe ber devê Îstrosê ya ber bi îstîqameta bayê Eurosê diherike û dirije deryayê. Ji Îstrosê wê ve êdî qiraxên eslî yên Îskîtîa ne, niha ji bo ku dirêjahîya wê bê fêhimkirin, ez ê van bêjim: Piştî Îstros tê derbaskirin, wir Îskîtîa kevn e; li başûr ber bi îstîqameta bayê Notosê ve, heta bajarê Karkînîtîsê dirêj dibe, piştî wê dewama eynî qiraxê ye ku çiyayî ye û ber bi Euxeînosa Pontosê ve dikekê çêdike, heta nîvgirava Khersonesosa Taûrîayê[158] yan jî bi navê din Khersonesosa Qelaçî dirêj dibe û li vir Taûrî rûdinin; ev nîvgirav vedibe deryayê û ber bi rojhilatê ve dirêj dibe. Ji ber ku sînorê Îskîtîa ji du alîyan ve derya ye, Deryaya Başûr û Deryaya Rojhilatê, eynî wekî Attîkayê ye. Miletê Taûrî li vê herêma Îskîtîyan rûdinin. Heke li Attîka, li Pozê Sûnîonê yê bi daketin û hilkişandin yê ber bi behrê ve dirêj dibe ku di navbera navçeya Thorîkosê û navçeya Amaphlystosê de ye, miletekî ji Athenîyan cihê nîştecih bûna, wê rewş li vir jî wilo bûya. Helbet ev welatên biçûk mirov çiqasî kari bide ber yê gelekî fireh, gerek mirov vê jî ewqasî binirxîne. Rewşa Taûrîsê wiha ye. Ji bo kesên derdora Attîkayê nedîtine, ez ê bi şibandineke din ronî bikim: Eynî wekî dika di navbera kendava Brîndesê ya li Îapygîayê û Tarantoyê de miletekî biyanî

158 Qirim

rûdine û wekî ku Îapygîayê dike du perçe. Ez naxwazim nimûneyên din yên wextê Taûrîs tê gotin tên hişê mirov rêz bikim û bi min tenê vegotina van herdu mînakan bes in.

[100] Piştî Taûrîsê cardin em bi Îskîtîyan re rûbirû dibin; ev, li welatê bakurê rojhilatê Taûrîsê, li qiraxê Deryaya Rojhilatê, yanî li beşa rojavayê herêma ji Bosphorosa Kîmmerîyan û Palûs-Maîotîsê hetaTanaîsê dirêj dibe, rûdinin; Tanaîs li çimikeke vê deryaya hindur dirêje deryayê. -Li milê din, heke ji Îstrosê ber bi bakur ve ji alîyê bejahîyê ve mirov têkevê, wekî sinorê Îskîtîa pêşî mirov digihe welatê Agathyrsan, piştî wê welatê Neûrîyan, piştre jî welatê Androphagîyan, herî dawîyê digehe welatê Melankhlenosîyan.

[101] Îskîtîa, çargoşeke herdu milên wê qiraxên deryayê ye, rexên wê yên li deryayê dinêrin wekî hev in. Bi rastî ji Îstrosê heta Borysthenesê bi peyatî rêya deh rojan e; ji Borysthenesê heta Palûs-Maîotîsê cardin deh roj e û ji deryayê ber bi hindur ve, heta welatê Melankhlenosê yê li bakurê Îskîtîyan rûdinin, rêya bîst rojan e. Li gor hesaba min, rêya rojekê dused stad e. Wî wextî ji serekî heta serê din ya dirêjahîya Îskîtîayê çar hezar stad e. Ber bi hindur ve firehîya wê cardin çar hezar stad e. Firehî û dirêjahîya vî welatî ev e.

[102] Îskîtîyan li ser rewşa xwe fikirîn, fehm kirin ku ew bi serê xwe têra xwe ne xurt in ku di deştekê rast de bi artêşa Daryûs re şer bikin û wan bi paş de bişînin; ji cîranên xwe re qasid şandin. Birêvebirên van miletan tam di wê navê re berhev bûbûn, bi hev dişêwirîn, meşa hêzeke wiha mezin dîtibûn û ketibûn lezê. Hikumdarên Taûrîs, Agathyrs, Neûrî, Androphag, Melankhlenos Sauromat, Gelon û Bûdînê hatibûn ba hev.

[103] Adetên miletê Taûrîsê wiha ne: Temamê Yûnanîyên ku keştîyên wan rastî qezayê bê û yên di deryayê de bikevin destê wan, ji bakîreyên xwe re dikin qurban; lêbênirên vê çawa dikin: Merasimeke qurbanê hazir dikin û darekî stûr li serî dixin û dikujin. Li gor hinek gotinan; laş ji perestgeha li ser zinar davêjin xwarê û serî dikin serê singan; gotinên din ji bo serî eynî tiştî dibêjin, lê ji bo laş qebûl nakin ku tê avêtin, dibêjin ku ew tê veşartin. Ev xudaya ku Taûrîsî qurban pêşkêşî wê dikin, li gor îtîrafa wan bi xwe, Îphîgenîaya keça Agamemnon e. Aqûbeta dijminên di şer de dikeve destê wan jî wiha ye: Her

şerkerek serîyek dibire û dibe mala xwe, dike serê darekî dirêj û li jorê qubeha xanîyê xwe, tam serê cihê ku duman derdikeve dadiçikîne; dibêjin ev nobedar e, guhdarîyê li malê dike. Îdareya wan şer û çapûl e.

[104] Mêrên Agathyrsî gelekî zêde bûne weke jinan; kêfa wan pir ji xemlên biriqî re tê; jin a herkesî ye, bi vî awayî herkes bi hev re dibe xweh û bira û ev xwedîtîya gelemperî hisa hesûdîyê û kîna li hember hev radike. Di hêla adetên din de nêzîkî Thrakîyan in.

[105] Adetên Neûrîyan wekî yê Îskîtîyan e. -Neslek berî îstîlaya Daryûs, maran welatê wan dagir kirine, li vir berîya wê jî jixwe tijî mar bûye, mecbûr mane welatê xwe terk bikin û derkevin. Ji bakur wekî artêşeke biçûk yên nû hatine, welat êdî tijî mar bûye, di dawîyê de çûne li ba Bûdînan bi cih bûne. Li gor min, ev hemî girêdana çav e. Heke em li Îskîtîyan û Yûnanîyên li Îskîtîayê bi cih bûne binêrin, her Neûrî salê carekê û ji bo çend rojan dikeve şiklê gur, piştre vedigere ser halê xwe yê kevin. Di eslê xwe de ez bi şik li van gotinan dinêrim, lê gez nakin, ew vê dibêjin û sûnd jî dixwin.

[106] Androphag, insanên herî hov in; ne edalet dizanin, ne qanûn; koçer in, wekî Îskîtîyan li xwe dikin, lê zimanê wan cihê ye, di nav van hemî miletan de tenê yê goştê insanan dixwin ev in.

[107] Melankhlenosî[159] reş li xwe dikin; -navê wan ji vê tê.[160] Adetên Îskîtîyan tetbîq dikin.

[108] Bûdînî miletekî bi hêz û boş in; çavê wan biriqî, porê wan zerê sore ye. Li herêma wan bajarek heye bi navê Gelonos, yê ji textan çêkirine. Her rexekî bedena kelehê sî stad e û ew bedenên ji daran hatîne çêkirin bilind in; xanîyên wan ji daran in, perestgehên wan jî wisan in. Belê, perestgehên wan jî hene. Ji bo xudayên Yûnanîyan hatine çêkirin. Wekî yên Yûnanîyan bi peyker, pêşkêşgeh û mîhrabên darîn hatine techîzkirin û sê salan carekê cejnên li ser navê Dîonysos tên pîrozkirin, merasimên Dîonysos çêdikin.

159 Di wergera Îngilîzî de wek Melanchaenî hatiye nivîsandin.
160 Melankhlen, tê manaya yê reş li xwe kirîye.

Eslê Gelonîyan Yûnan e, ji ber wê wiha dikin; piştî ji cihê xwe yê qiraxê deryayê koç kirin, hatine li ba Budînan bi cih bûne; zimanekî bi Yûnanî û Îskîtî tevlihev diaxifin.

[109] Ne adet û ne jî zimanê Budînan wiha ye; ji ber ku Budînen xwecihê li vir koçer in û di nav hemî miletan de yên spî dixwen tenê ev in; lê Gelonî çandinîyê dikin, genim dixwin, bexçe datînin; ne şiklê wan û ne jî rengê wan wekî Budînan e. Li gel vê jî Yûnanî ji Budînan re Gelonî dibêjin, lê ev şaş e. Welatê wan deşt û daristan e, bi gelek nebatan tije ye; li deşta herî zêde nebat lê heye, golek gelekî mezin e û kûr heye; li rexê wê yê hezek qamîş çêdibin. Li wir seyê avê, qûzik û heywanên din ên pozê wan çargoşe tên girtin, kurkê wan di hindurê kurkên din ên adî de tên dirûtin û heyayê wan ji bo nexweşîya malzarokê wekî derman bikar tînin.

AMAZONÎ

[110] Em bên ser Saûromatîyan, yên ji bo van jî tê gotin ev in: Amazonî ku Îskîtî ji wan re Oîorpata dibêjin, yanî bi Yûnanî, yên mêr dikujin -ji ber ku di zimanê Îskîtî de "oîor" tê manaya mêr, "pata" jî kuştin- tê gotin ku Yûnanîyên şer derdixin, piştî şerê Thermodonê qezenc kirin, Amazonên sax girtin, kirin sê keştîyan û vebûn deryayê; Amazonî di deryaya vekirî de êrîşî ser mêran kirine û bi lêxistinê ew kuştine. Lê nizanîbûn ev keştî çawa tên îdarekirin, dumen çawa tê girtin, cawê babirkê çawa tê bikaranîn, bêr çawa tê kêşan, hayê wan jê tunebû. Piştî mêr kuştine ketine ber pêlan û ba. Gihiştine Palûs-Maîotîsê yê jê re "Berpala Asê" tê gotin. Ev cih di nav erdê Îskîtîyên Azad de ne. Amazonî li vir derdikevin bejahîyê û diçin herêmên ku insan tê de dijîn; dema hespê diçêrin dibînin, li wan siwar dibin û dest bi talana erdê Îskîtîyan dikin.

[111] Îskîtî manayek nedidan ya hatîya serê wan; ne zimanê wan fêhm dikirin, ne lixwekirina wan nas dikirin û ne jî dizanîbûn kî ne; şaş mabûn û digotin ev ji ku derketin, dil wan de ev xortên çeleng yên di heman 'emrî de ne; di dawîyê de şer kirin; piştî şer dema ku Îskîtîyan mirîyên wan dîtin, fêm kirin ku ew jin in; di nav xwe de bi hev şêwirîn û biryar dan ku êdî wan nekujin. Wê lê binêrin, ka gelo bi qasî tên dîtin çend kes in? Wê ji nav xwe

û yên herî xort, mêr veqetandina û ew derxistina hemberî wan; wê wan qampên xwe tam li hemberî kampên jinan vedana û li gor şêla wan hereket bikirina; heke jin bihatina ser wan dê şer nekirina û tenê dê navbeyna xwe û wan hinekî din vekirna; piştre wextê ew bisekinîna dê ew jî bisekinîna û bihatina qampên xwe. Îskîtî wiha fikirîbûn, ji ber ku dixwestin ji van jinan zarokên wan hebin.

[**112**] Xortan emrê girtin bi cih kirin. Dema Amazonan fêhm kirin ku wê ziyan ji wan çênebe, êdî guhê xwe nedan wan. Xort çiqas diçûn zêdetir nêzîkî kampên wan dibûn. Yê wan jî wekî Amazonan ji bilî hesp û sîlehên wan tiştekî wan tunebû; ew jî bi nêçîr û talanê dijîyan.

[113] Dema ku dibû nîvro Amazonan kiribûn adet wiha dikirin: Yek-dudu belav dibûn û ji bo îhtîyacên xwe yên tabiî pêk bînin ji hev vediqetîyan. Li gor wê Îskîtîyan jî wisan kirin. Ji nav wan yekî xwest keçeke bi serê xwe mayî razîne erdê; Amazon, negot na û ji yên wî xortî li ser bedena wê kirin hêrs nebû. Nedikarî ji wî re tiştekî bêje, -ji ber ku ji zimanên hevdû fêhm nedikirin- lê bi îşaretan jê re got ku, sibê cardin were, hevalekî xwe jî bîne, dê bi xwe jî keçeke din bîne. Xort zivirî, yên qewimîne ji yên din re got. Roja din hevaleke xwe girt ba xwe û çû; Amazon bi yeka din a Amazonî re li hêvîyê bû. Dema xortên din ev rewş dîtin, dest bi ehlîkirina Amazonên mayî kirin.

[114] Piştre kampên xwe kirin yek û bi hev re jiyan. Her xort, keça ku cara pêşî pê re mabû bû jina wî. Mêran nikarîbûn zimanê jinan fêr bibin, lê jinan dest pê kiribûn zimanê mêran fêhm dikirin. Dema ku êdî ji hevdû fêhm kirin, xortan ji Amazonan re wiha gotin: "Dê, bav, mal û milkên me heye. Êdî em dev ji jiyaneke wiha berdin; em bi yên me re bibin yek, wekî wan bijîn. Dê hûn bibin jinên me, em di ser we re nazewicin." Wan bersiv dan û gotin: "Em nikarin bi jinên di malê we de bijîn. Adetên me naşibin hev. Tîr avêtin, cîrît avêtin, siwarbûna li hespan, ev kar û hunera me jinan e, jinên we tu tiştêkî ji van nakin; tim di hundirê malan de dimînin, karên jinan dikin, dernakevin nêçîrê; ji ber wê em nikarin bi wan re li hev bikin. Lê heke hûn dixwazin em wekî jinê we bimînin û bi me re baş miamele bikin, herin bavên xwe bibînin, yên dikevin payê we hildin bînin, em li vir li gor qanûnên xwe bijîn.

[115] Ev ket serê xortan û wisan kirin. Wextê ya ket payê wan girtin û hatin ba Amazonan, jinan ev gotin: "Me we ji mezinên we veqetand û me çendîn car malên we talan kirin, piştî van qewimandinan em dipelikînin li vî welatî bimînin, em hinek jî ditirsin. Madem hûn me wekî jin ji xwe re dixwazin, em hemî bi hev re wiha bikin; em ji van erdan biçin, em Tanaîs derbas bikin û li milê din bi cih bibin.

[116] Xortan ji vê re jî gotin erê. Tanaîs derbas kirin. Ber bi rojhilatê Tanaîsê rêya sê roj peya meşîyan û hatin welatekî, ev der ji Palûs-Maîotîsê ber bi bakur ve dîsa rêya sê rojan dikêşa. Hatin vir û li vir bi cih bûn, zarokên wan îro jî li vir rûdinin. Ji wî wextî heta niha û îro jî jinên Saûromatî wekî dayîkên xwe yên mezin dijîn. Bi mêrên xwe re yan bi serê xwe diçin nêçîrê, diçin şer û wekî mêran li xwe dikin.

[117] Saûromatî, zimanê Îskîtî diaxifin, lê ji destpêkî ve gelek şaşîyan dikin, ji ber ku Amazonî tu wextî vî zimanî gelek baş hîn nebûn. Em bên ser mijara zewacê, adetê wan wiha ye: Keçek, heta dijminekî nekuje nikare bizewice. Ji bo pêdivîyê vê qanûnê bi cih nekirîye, gelek keç hene bê zewac pîr bûne.

[118] Belê, qasidên Îskîtîyan, ji temamê hikumdarên van miletên di civînê de bûn, hatibûn şandin. Aryanîyan temamê bejahîyên cîran girtine bin desthilata xwe, li ser Tengava/Bosphorosê pir dane çêkirin û ber bi vî milî ve, derbasî bejahîyên wan bûbûn, ev agahî didan; Thrakî mexlûb kirine, pir avêtine ser Îstrosê, ji ber dixwestin desthilata xwe heta van welatan belav bikin. Digotin, "Li rexekê nesekinin û li felaketa bê serê me temaşe nekin, em tev bibin yek li hemberî dagirkeran serî hildin. Gelo hûn qebûl nakin? Wî wextî em mexlûb bibin yan nebin jî, yan em ê erdê xwe berdin û biçin û heke em neçin, em ê bi Daryûs re peymanê çêkin. Heke hûn qebûl nekin û neyên alîkarîya me hûn ê çi bikin? Ji bilî vê, wextê hûn wiha bikin, hûn tehlîkeya ser xwe jî sivik nakin; Aryanî ne tenê li dijî me ne, li dijî we jî dimeşin; dema em kirin kole nayê wê manayê ku dê we rehet bihêlin. Hûn delîlekî bi çav bê dîtin dixwazin? Heke Aryanîyan ji bo toleya kolekirina kevin ya li Asyayê tenê sefer li hemberî me bikirina, berîya bên vir êrîşê hemî miletên din nedikirin; belê, dê wî wextî bidana nîşan ku tenê li hem-

berî Îskîtîyan dimeşin, ne li hemberî herkesî. Lê hê çawa lingê xwe danîn ser bejahîyê, hemî kesên ketin ser rêya wan bi xwe ve girê dan. Heke em Thrakîyan nehejmêrin jî, ma bi cîranê me yê nêzîk Getaîyan serî nedan tewandin?"

[119] Serokên miletên min hejmartin li ser pêşnîyazên Îskîtîyan peyîvîn, nêrîn cihê bûn; hikumdarên Gelonê, Bûdînê û Saûromatê terefdarê alîkarîya Îskîtîyan bûn. Lê hikumdarên Agathyrsê, Neûrîyê, Androphagê û hikumranên Melankhlenosê û Taûrîsê bersiv dan Îskîtîyan: "Heke we pêşî êrîşî Aryanîyan nekira û nimûneya dijmintîyê nedaya, dikarîbû daxwaza we ya niha di cih de be, wî wextî me yê jî qedera xwe bi ya we re girê bidaya. Lê pêşî hûn ketin welatê wan; bi qasî ku xuda daqet da we, bêyî me hûn li wir bûn xwedîyê desthilatê. Îro jî dora Aryanîyan e, heman xuda wan jî birê ve dibe. Me wî wextî êrîşek li hemberî wan kesan nekir; îro jî em ranabin pêşî wan nakujin. Heke bên ser me û pêşî ew êrîşê me bikin, em vê ji wan re nahêlin. Lê heta em dijminîyekê ji wan nebînin em ê di cihê xwe de rehet bisekinin; ji ber ku em gûman nakin Aryanî ji bo êrîşî me bikin hatine. Li gor me ew, li hemberî êrîşa pêşî hatin kirin dimeşin."

TEQTÎKÊN ŞER YÊN ÎSKÎTÎYAN

[120] Dema ku ev gotin gihiştin Îskîtîyan, wan biryar dan, madem cîranên wan naxwazin bi wan re yekîtîya qederê bikin, dê ew jî nekevin şerekî meydanî yê vekirî, wê hindik hindik erd berdana û paşve bikêşîyana; wê bîrên li ser rêya xwe tijî bikirina, kanî bixitimandina û gîha biçinîna. Bûn du beş. Hikumdarê yekê Skopasîs bû, wê ev grub bi Saûromatîyan re bibûna yek; heke Aryanî bimeşîyana ser wan, wê ber bi Palûs-Maîotîsê û Tanaîsê ve hêdî hêdî bikêşîyana, heke Aryanî dûr biketina wê biketina pey wan. Ev gruba Skopasîs yek ji wan sê hikumdarîyên li jorê navê wan derbas bû.[161] Ji herdu hikumdarîyên din, ya mezin ya di bin fermandarîya Îdanthyrsos de û ya sisiyan ya di bin hukmê Taxakîs de, wek yek artêş berhev bûbûn û bi Gelon û Bûdînê hatibûn teqwîyekirin; ev artêş ji ber Aryanîyan rojek bi navbir wê hêdî hêdî paşve bikêşîya û erd berdana û biryarên hatibûn

161 Beşa 7an Kolaxîas, Îskîtyayê dike sê hikumdarî.

wergirtin tetbîq bikirina. Wê ber bi dewletên di pêşîyê de alîkarîya ji wan re red kiribûn bimeşîyana, bi vî awayî wê zor bidana wan jî ku bikevin şer; madem jiberxweve beşdarî şerê li hemberî Aryanîyan nebûbûn, niha wê ew mecbûr bikirina. Piştre ev artêş wê ber bi Îskîtayê paş ve vegerîya û heke rewş musaîd bidîtina, wê dest bi êrîşê bikirina.

[121] Piştî ev biryar hatin girtin, Îskîtî ber bi Daryûs ve meşîyan; siwarîyên xwe yên herî baş ji bo kefşê pêş ve şandibûn. Ew erebeyên jin û zarokên wan tê de dijîyan û bi van erebeyan re kerî jî veqetandibûn, di pêşîyê de derxistibûn rê, tenê biqasî têra xwarina wan bike hinek li ba xwe hiştibûn; bêsekin wê ber bi bakur ve vekişîyana.

[122] Ev karwan pêşî rêya paşvekêşanê da ber xwe; di vê nave re beşa Îskîtîyan a kefşê, di rêya sê rojan de û li dora Îstrosê rastî Aryanîyan hatin; yên din jî dema ku hîn bûn ew li ku ne, di navbera wan û artêşa Aryanîyan de rêya rojekê hebû; sekinîn û li ser rûyê erdê çi hebû hemî maliştin û paqij kirin. Aryanî çawa hespên Îskîtîyan dîtin, ketin pey wan, lê yên din carna winda dibûn û carna xuya dikirin. Piştre dema ku ji herdu gruban ketin pey ya yekem, Aryanî ber bi rojhilatê, ber bi Tanaîsê ve meşîyan. Îskîtî Tanaîs derbas kirin û Aryanî jî li pey wan Tanaîs derbas kirin. Wisan ku, di dawîyê de welatê Saûromatan ji derbas kirin gihiştin welatê Budînê.

[123] Aryanî, dema ber bi hindurê Îskîtîa de li nav welatê Saûromatan pêş diketin, nikarîbûn zerarekê bidinê, ji ber ku her alîyê wan vala bû; lê dema ku ketin welatê Bûdînan li wir bajarekî ji texteyan çêkirî dîtin; Bûdînîyan bajar hiştibûn; yek kes nemabû; bajar şewitandin. Piştre ketin pey dijmin, lê her timî ji dûr ve; welatê wan derbas kirin; deştên vala derketin pêşîya wan. Li van deştan kesek najî; li bakurê welatê Bûdînan rêya heft rojan bi wî awayî dirêj dibe. Li rexê jorê deştê Thyssageteîayî hene, çavkanîyên çar rûbarên mezin yên ji erdê Maîotîsîyan derbas dibin û dirijin gola navê wê Palûs-Maîotîsê li wir in. Ev rûbarên Lykosê, Orosê, Tanaîs ê û Syrgîsê ne.

[124] Dema ku Daryûs derket deştê, ketina pey wan da sekinandin û artêşa xwe li ser Oarosê bi cih kir. Li vir tehkîmat da çêkirin, heyşt kelehên mezin yê navbera wan kêm-zêde şêst stad da avakirin ku, kavilên wan hê hene, hîn ew bi van karan mijûl bûn, Îskîtîyên ji ber wan revîyabûn li bakur zîvirîn ji nû ve vegerîyan ser rêya Îskîtîayê. Bi carekê re ji ber çav wenda bûbûn. Daryûsê ku êdî ev siwarîyên xeyalet nedidîtin, kelehên nîv avakirî yên biçûk berdan û îstîqamet guherand, ber bi rojavayê ve meşîya; ji ber ku guman dikir ku Îskîtî ber bi rojavayê ve baz dane û wê bikaribe wan li wir bibîne.

[125] Artêş bi meşa cebrî dibir. Dema gihişt Îskîtîayê vê carê bi du grubên Îskîtî yên bûbûn yek re rûbirû bû. Ket pey wan, wan jî her tim bi rêya rojekê navbir didan paşve dikêşîyan. Ji bo ku Daryûs ji pey wan venediqetîya, Îskîtîyan li gor plana xwe, wî dikişandin ser miletên bi wan re yekîtî nexwestibûn, di serî de ew ber bialîyê Melankhaenîyan ve dikişandin. Ev welatî pêşî wan û piştre Aryanîyan kavil û wêran kirin, vê carê Îskîtîyan, Aryanî kişandin ser erdê Androphagîyan. Piştî vir jî ser û bin kirin, piştre Aryanî derbasî nav Neûrîyan kirin; piştî kêfa van jî revandin, Îskîtî berê rêya paşvekêşanê dan nav erdê Agathysîyan. Agathysîyên halê cîranên xwe yên ji ber Îskîtîyan baz didin dîtin, bi lez hereket kirin, çavuşek şandin ba Îskîtîyan, ew agahdar kirin ku erdê xwe ji wan re qedexe kirine; heke bixwazin bikevin nav erdê wan, pêşî dê mecbûr bimînin bi wan re şer bikin. Piştî Agathyrsîyan ev xeber şandin, ji bo sinorê xwe biparêzên dest bi meşê kirin; niyeta wan ew bû ku bibin maniê îstîlakeran. Melankhaenî dîtibûn Aryanî bi Îskîtîyan re avêtibûn ser Androphagî û Neûrîyan, li hember derneketibûn; ew tehdîtên di serî de kiribûn ji bîr kiribûn û di rêzê de tevan rêya deştên li bakur yên imkana tê de rûniştinê tune dabûn ber xwe. Îskîtîyan, li hemberî xweparastina Agathyrsîyan dev ji ketina nav erdê wan berdan; piştî Neûrîsê Aryanî kişandin ser erdê xwe bi xwe.

[126] Û ev leyz bê navbir bi vî awayî diajot û diçû. Daryûs bi siwarîyekî re ji hikumdarê Îskîtîyan Îdanthyrsos re xeber şand û got: "Ey mirovê xerîb, du tiştên din yê tu bikaribe bike hebin tu çima baz didî? Heke tu xwe bi qasî li hemberî min rabe bi hêz hesêb dikî, li gor wê hereket bike, dev ji bazdanê

berde, dest bi şer bike; na heke tu xwe kêm dibînî, cardin her tim dev ji meşê berde; ji efendîyê xwe re wekî xerac av û ax bîne, derkeve hizûra wî."

[127] Hikumdarê Îskîtîyan Îdanthyrsos ev bersiv dayê "Ey Persî, va qeneeta min: Ne kes dikare min bitirsîne, ne jî dikare zor bide da ji ber bazdim; ez ji ber te jî baz nadim: Tiştî heta niha min kirîye, yên di esnayê aştîyê de jî min kirine ew in. Ez ji bo çi niha nakevim şer, ez ê wê jî îzah bikim: Ne bajarên me hene, ne jî yek darê me yê çandî ku, ji bo ji dest dernekevin û yan jî neyên şewitandin em bitirsin bêsekin bikevin şer; lê heke hûn illa dixwazin şer bikin, gora bav û kalên me hene; wan peyde bikin, heke hûn dest bidin wan, wî wextî hûn ê bibînin ka em ji bo gorên xwe şer dikin, yan nakin. Ev mijar evqas. Em bên ser mijara efendîtîyê, ez tenê du efendî nas dikim; mezinê min Zeûs û şahjina Îskîtîyan Hestîa. Û yek jî xeraca tu dixwazî di cihê nan û avê de, ez ê tiştên layîqî te ji te re bişeynim; madem tu xwe efendîyê min hesêb dikî, ez jî ji bo bersiva vê derewa te, ji te re bigrî dibêjim." (Di zimanê Îskîtî de ev biwêjek e di hikmê gotinên pêşîyan de.) -Çawîş ji bo vê bersivê bigihîne Daryûs veqetîya û çû.

[128] Gotina efendî gelek tesîr li hikumdarê Îskîtîyan kiribû. Tev Saûromatîyan, gruba di bin fermandarîya Skopasîs de hatibû damezirandin, ji bo bangî konferansekê bikin şandin ba Îonîayan; yên ez dibêjim, Îonîayên ku pira li ser Îstrosê diparastin. Îskîtîyên paşde mabûn jî biryar dan ku êdî zêde Aryanîyan nedin bezandin, di cihê wê de, wê ew kontrol bikirina û di dema rûniştina li ser xwarinê de wê ew aciz bikirina. Wextê xwarina wan kontrol dikirin û biryara xwe bi cih dikirin. Siwarîyên Îskîtî her wextî siwarîyên Aryanî didan pêşîya xwe û radiqewirandin, lê siwarîyên Aryanî li dor eskerên xwe yên peyade berhev dibûn, peyade baz didan alîkarîya siwarîyan. Piştî siwarîyên Îskîtîyan siwarîyên wan paşde dibirin, ji ber ku ji peyadeyan ditirsîyan, îca ew bi xwe paşde vedigerîyan, Îskîtîyan bi şev jî tiştên wiha dikirin.

[129] Tiştek seyr hebû ku bi kêrî Aryanîyan dihat û ji wan êrîşên bêwext yên Îskîtîyan yên dikirin ser kampa Daryûs re zehmetî derdixistin: Ew jî zirezira keran û xuyanga hêstiran bû. Li ser erdê Îskîtîyan ker û hêstir tune ne. Zirîna keran hespên Îskîtîyan ditirsandin. Piranîya hespan dema ku zirîna keran seh dikin disilikin, hilkehilk bi wan dikeve, guhên xwe miç dikin û emareyên

dînîtîyê didin nîşan, ji ber ku ne dengekî wiha seh kirine, ne jî heywanekî wiha dîtine. Belê, qe nebe ev jî bandorek hindik bû li ser pêşveçûna şer.

[130] Dema ku Îskîtîyan nerehetîya Aryanîyan dîtin, ji bo wan demeke dirêj di Îskîtîa de bihêlin, rojên wan yên li vir dirêj bikin û tam bikêşin nav tunebûnekê û wan biêşînin, tiştekî wiha fikirîn: Car caran ji kerîyên xwe çend lib digirtin û bi destê xwe bi rêya şivanên xwe bi dizî ew dikirin nav kampa Aryanîyan. Aryanî derdiketin û kerî digirtin, di vê sayeyê de vedijîn.

[131] Daryûs çend caran ket vê davikê û lê piştre dît ku dikeve nav xelayê. Wî wextî hikumdarên Îskîtîyan ku rewş fêhm kiribûn, bi çawîşekî re ji Daryûs re diyarî şandin: Ew teyrek, mişkek, beqek û pênc lib jî tîr bûn. Aryanîyan ji yê ev anîbûn pirsîn "Bi şandina van mebesta we çiye?" Lê ji wî re tenê wezîfeya anîna wan û bêpayîn vegerê hatibû dayîn; heke hişê Aryanîyan heye, wê manaya van diyarîyan bi xwe derxistibûna.

[132] Vê bersivê kir ku Aryanî ponijin. Daryûs wekî ramana xwe da zanîn ku, niyeta Îskîtan heye ku xwe û welatê xwe, teslîmî destên wî bikin. Fikra wî ev bû: Mişk di nav axê de dijî û wekî insên bi berhemên axê xwe xwedî dike; beq di avê de dijî; teyr eynî wekî hespê ye; tîr jî tê wê manayê ku sîlehê xwe teslîm kirine. Fikra ku Daryûs pêşkêş dikir ev bû; lê tam nêrîneke bi eksê vê jî ji Gobryasê ji heftan yek bû yên Magî xistibûn dihat; wî digot, diyarî dixwazin vê bêjin: Ey Aryanî, heke hûn nebin teyr û bifirin, nebin mişk têkevin binê erdê û nebin beq xwe neavêjin hezekê, hûn ê venegerin welatê xwe; dê hûn bi tîran bên lêdan û bimrin."

[133] Aryanîyan ev diyarî bi vî awayî şirove dikirin -Di vê navê re gruba yekem ya Îskîtîyan, yê di destpêkê de bi kontrolkirina herêma Palûs-Maîotîs û niha jî ji bo dîtina Îonîayan hatibûn wezîfedarkirin, gihiştibûn ba pira Îstrosê. Ji Îonîayan re wiha gotin: "Ey Îonîayî, heke hûn guhê xwe bidin me, ji bo em azadîyê bidin we em hatin. Bi qasî ku ji me re hatîye gotin, Daryûs ev pir ji bo şêst rojan emanetî we kirîye û ji we re hatîye gotin ku, heke di dawîya vê midetê de venegere neyê, dev ji vir berdin herin welatê xwe. Niha heke hûn tiştên wî gotine bikin, ji we re tiştekî nabêje. Em bên ser me, tu hesabê me û we bi hev re tuneye; dema rojê we qedîyan derkevin

herin." Îonîayan ev gotin qebûl kirin, yên din jî ji bo paş de herin vegerin ba Îskîtîyên din lez kirin.

[134] Piştî ji Daryûs re diyarî şandin, qismê Îskîtîyên di cihê xwe de man, her wekî dê êrîşeke bi siwarî û peyade bikin, li hemberî Aryanîyan ketin ber rêzbenda şer. Tevan cihê xwe girtibûn ku, keroşkek derbas bû: Yên dîtin li pey ketin, sef tevlihev bûbû, deng bilind bûbûn. Daryûs, sebebê tevlihevîyên di sefên dijmin de pirsî. Gotin ku derketine nêçîra kêroşkan. Ji kesên li rexê xwe re got: "Gelî hevalan, bi rastî ev mirovên han guhê xwe nadin me û ez niha fêhm dikim ku, Gobryas diyarî rast şirove kirîye. Belê, ez jî dibînim ku manaya wan ev e, ji me re niha nesîheteke me ji vir rizgar bike divê." Wî wextî Gobryas bersiv da û got: "Ey hikumdar, li yên min seh kiribû dinêrî, min ji xwe dizanîbû ev kes nayên girtin; lê piştî em hatin vir û min dît ku henekên xwe bi me dikin, min hê baştir fêhm kir. Belê, ez wiha difikirim: Dema ku bû şev wekî her carê em hemî ronahîyên xwe vêxin; eskerên me yên herî qels ketine bi bahenekê li vir bihêlin, keran jî girê bidin, berîya Îskîtî bigehijin Îstrosê û pirê xera bikin, yan jî ji Îonîayan re wext nehêlin leyzeke rêya felaketa me vekin bilîzin."

DARYÛS PAŞVE DIKÊŞE

[135] Pêşnîyaza Gobryas ev bû. Dema ku bû şev Daryûs wisan kir. Eskerên ku wê ji windakirina wan zerar nebîne yên wekî nexweş û bêtaqet, wekî din jî temamê keran girê dan û li qampê hiştin. Sebebê hiştina keran û eskerên bi kêrî karekî nedihatin, ji ber vê bû; wê zirîna keran bihata sehkirin, esker jî jixwe bi kêrî tiştekî nedihatin. Ji wan re jî ev dihate gotin; dema Daryûs bi eskerên saxlem ên artêşê bigire û êrîşî Îskîtîyan bike, dê hûn jî kampê biparêzin. Piştî ev fikir kir serê yên di cihê xwe de bimînin û ronahîyên leşkergehê vekirî hiştin, Daryûs bi lez rêya Îstrosê girt. Dema ku keran xwe di qampeke hema bêje vala de dîtin, hê zêde dest bi zirînê kirin û Îskîtîyên ev deng seh kirin jî ferz kirin ku Aryanî di cihê xwe de ne.

[136] Roj derket. Eskerên ji çav derxistibûn û paşde hatibûn hiştin, fêhm kirin ku Daryûs ew xerc kirine. Bangî Îskîtîyan kirin, bi îşaretan, xwestin yên qewimîn bêjin. Grûba duyemîn ya Îskîtîyan ya rewş dîtin, tev Saûroma-

tan, Bûdînan û Gelonên bi hev re li pey Aryanîyan ber bi Îstrosê ketin rê. Di nav Aryanîyan de peyade zêde bûn, baş rê nedizanîn, jixwe tiştekî ku jê re rê bê gotin jî tunebû. Li hemberî vê Îskîtî siwarî bûn, rêyên kurtebir dizanîbûn, ji ber vê bêyî rastî Aryanîyan bên berî wan gihiştin wir. Aryanî hêj nehatibûn, ji Îonîayên derketibûn ser keştîyên xwe re gotin: "Gelî Îonîayan, roja ji we re hatîye dayîn tijî bû, hûn bi mayîna li vir ji rêya heq derdikevin. Berê yê we li vir girtibû tirs bû; lê niha bêsekin vê bihurê xera bikin, bila dilê xwe şa be, ji xudayan û Îskîtîyan re şikur bikin bazdin azadîya xwe. Ji bo wî efendîyê we jî, em ê wî bikin halekî wisan ku êdî bela xwe li kesekî nexe."

[137] Îonîayî, di nav xwe de axiftin. General Mîltîades yê Athenayî yê hikumranê xelkên li qiraxên Khersonesosê dijîyan, fikara bicihanîna gotinê Skîtîyan û bidestxistina azadîya Îonîa pejirand. Lê Hîstîaîosê Mîletosî li dijî vê şîretê derket; li gor wî her yek ji wan di welatê xwe de bi saya Daryûs wekî hikumranan dikarîbû bimînin. Heke hêza Daryûs bişkê, ne ew bi xwe li ser Mîletosîyan û ne yên din dikarîbûn li ser miletên din bimînin; hemî ev sîteyên han di sewdaya hilweşandina hikumranîyê û damezirandina demokrasîyê de bûn. Çawa Hîstîaîos fikrên xwe gotin, yên di pêşîyê de fikrên Mîltîades qebûl kiribûn, fetil dan xwe û ev nêrîn qebûl kirin.

[138] Yên di vê rêyê de deng dan û bi nêrîna terefdarê Hikumdarê Mezin re bûn, hikumranên Hellespontosê, Daphnîsê Abydosî, Hîppoklosê Lampsakosî, Herophantosê Parîonî, Metrodorosê Prokonnesosî, Arîstagorasê Kyzîkosî û Arîstonê Bîzansî; yên ji Hellespontosê jî ev bûn; ji Îonîayê jî Strattîs ji Khîasê, Aîakesê ji Samosê, Laodarnosê ji Phokaîayê, û Hîstîaîosê ji Mîletosê yê nêrîna Mîltîadesê mexlûb kirîye; ji nav Aîolîayan navê kifşe Arîstagorasê ji Kymeyê hebû.

[139] Hikumranên nêrînên Hîstîaîos qebûl kirin, minasib dîtin ku vê bi gotin û kar perçîn bikin: Dê beşa milê pirê yê li Îskîtîyan dinêre bi qasî avêtina bejna tîrekî xera bikirina, bi vî awayî di cihê ku tiştekî nakin û di cihê xwe de disekinin, wê her wekî tiştek dikin bihatina xuyakirin, hem jî wê pêşîya fikra Îskîtîyan a ji pirê sûd werbigirin û Îstrosê derbas bikin bigirtina; wextê milê pirê yê li alîyê Îskîtîyan xera bikirina wê bang bikirina û bigotina "Ya hûn dixwazin em dikin." Bi vî awayî wê pêşnîyaza Hîstîaîos bihata temamkirin. Li ser vê Hîstîaîos li ser navê tevan bersiva Îskîtîyan da û got: "Gelî

Îskîtîyan, we fikreke baş da me, tiştî wê bihata kirin tenê ev bû. We rêya ku em ê xwe pê bigrin nîşanî me da, dê em ê jî yên we gotin tam bikin. Belê niha hûn dibînin, em pirê xera dikin û ji bo em xera bikin bi can û ruh dixebitin, ji ber ku em dixwazin azad bin. Lê dema ku em vê xera dikin, hûn jî li artêşa dijmin bigerin û wextê hûn bibînin hem li ser hesaba me, hem jî li ser hesaba xwe, ew cezayê ku wan heq kirine bidine wan."

[140] Îskîtîyan cara duyem bawerî bi gotinên Îonîayan kirin û ketin pey Aryanîyan; lê di şopandina rêya wan de ketin şaşîyê. Qebehet ya wan bû: Çêrîngehên dê hesp biçêrîyana xera kiribûn û bîr tijî kiribûn. Heke wiha nekiribûna, dê wan zû bidîtina. Lê ev helwêsta wî wextî ya bi kêrî wan hatibû, niha wan dikir nav şaşîyê. Li herêmên ku ji bo hespan giyayên taze û av mayî li dijmin digerîyan. Ji ber ku hizir dikirin ku wê ew ji wan herêman re derbas bibin. Lê Aryanî di kîjan rêyê re çûbûn, di eynî rêyê re vedigerîyan û bi ser vê de jî cardin zor gihiştin pira Îstrosê. Bi şev hatin, dîtin ku pir xera bûye. Ferz kirin ku Îonîayî ew terk kirine û çûne, di nav sawekê de man.

[141] Di nav mirovên Daryûs de yekî Misrî hebû, dengê wî gelekî bilind bû. Daryûs ew anî qiraxê Îstrosê, emir kir ku bangî Hîstîaîosê Mîletosî bike. Bang kir, Hîstîaîos di banga ewil de guh lê bû û di cih de ji bo rûbarê derbas bibin û pirê bi qiraxan ve girê bidin temamê keştîyên xwe kir bin emrê artêşê.

[142] Aryanî bi vî awayî rizgar bûn. Îskîtîyên cara duyem li pey Aryanîyan gerîyan ew nedîtin. Wextê gotin tê ser Îonîayan, yên ne kole bin, qeleştirîn û nehêjatirîn kesên dinyê dihesibînin, ji bo yên kole jî dibêjin, yên herî kêm difikirin ku baz bidin ew in û xulamên herî baş ji van derdikevin. Belê Îskîtî bi vî awayî heqaretê li Îonîayan dikin.

[143] Daryûs, di nav Trakyayê de bi pêş ket. Hat Sestosa li Khersonnesosê[162]; keştîyên wî ew derbasî Asyayê kirin; yekîneyên xwe yên li Ewrûpayê hiştibûn emanetî yekî Persî yê navê wî Megabazos kiribû, hê di pêşîyê de bi axaftinekê ev mirov bilind kiribû; rojekê hinar dixwar, dema ku hinara ewil vekir, birayê wî Artabanos jê pirs kir "Tu dixwazî çi bi qasî libên hinarê zêde

162 Khersonnesos: Îro li rojavayê Tirkîyê ye û wek Nîvgirava Gelîbolû tê binavkirin.

bin?" Daryûs bersiv dayê û got "Di cihê ez Yûnanistanê têkim ser dewleta xwe, ji mirovên min yên wekî Megabazos, bi qasî libin hinaran zêde hebin baştir e." Li ber Persîyên din kirina vê gotinê şerefekî mezin bû û ji bo heyştê hezar eskerên xwe teslîm bike, belê ev hikumran hilbijartibû.

[144] Ev Megabazos, ji Hellespontosîyan re wek bîranîneke nayê jibîrkirin, gotineke bikeve dîrokê hiştibû. Dema ku li Bîzansê bû, hîn bûbû ku Khalkedonîyan bajarên xwe ji Bîzansîyan hevdeh sal berê ava kiribûn; li ser vê got, naxwe gerek wî wextî Khalkedonî kor bin; heke çavê wan ne kor bûya, li gel ku di bin destê wan de evqas cihekî xweş hebû, nediçûn cihekî ewqas ne xweş hilnedibijartin. -Ev Megabazos, di midetê li herêma Hellespontosê ma, kir ku sîteyên ji derveyî desthilata Medan mabûn jî serî bitewînin.

BÛYERA LIBYAYÊ –AVABÛNA KÎRENEYÊ

[145] Dema Megabazos bi van karan ve mijûl bû, hereketekî giring yê din jî li hemberî Libyayê vebûbû, pêşî ez ê hinek îzahatan bidim û sebebê wê jî piştre bêjim. -Pelasgîyên li Braûronê jinên Athenîyan revandin,[163] xwarzîyên nifşê sisiyan yê deryavanên keştîya Argosê ji Lemnos[164]ê raqewirandin, ew jî bi rêya deryayê re çûne Lakedaîmonê, li ser Taygetosê qamp vedan, agir kirin. Dema Lakedaîmonî vê dibînin, yekî dişeynin û dipirsîn ew kî ne û ji ku hatine. Vê bersivê didin qasid, dibêjin ku ew ji Mînyaîyan in, nevîyên mêrxasên keştîya Argosê yên serî li Lemnosê dane û li wir tovê xwe hiştine. Lakedaîmonîyên ku bi vî awayî hebûna Mînyaîyan hîn bûn, yekî din jî dişeynin û ji wan dipirsin; ji bo çi hatine welatê wan û ji bo çi van agirê gur ber bi asman ve bilind kirine. Di bersiva xwe de dibêjin ku, ji ber Pelasgîyan baz dane û hatine welatê bav û bapîrên xwe û mafê wan bi vê heye; dixwazin bi Lakedaîmonîyan re bijîn, ji wezîfeyên giştî ji wan re jî pay bê veqetandin û erd bidine wan. Kêfa Lakedaîmonîyan jê re hat ku Mînyaîyan li gor şertên bi xwe danîne bigrin nav xwe. Wan ji bîr nekiribûn ku kurên Tyndareos[165]

163 Braûron, li Attîkayê perestgehek. Revandina jinên Atînayîyan ji alîyê Pelasgîyan ve, di pirtûka 6an û beşa 138an de hatîye gotin. -Mînyaîyî, nevîyên Mînyasan in, çîrok wî kurê Poseîdon dide nîşan.

164 Lemnos: Giraveke Yûnanistanê ye, bi Tirkî jê re Lîmnî tê gotin.

165 Kurên Tyndareos… Kastor û Pollûx. Yên ji bo postê zêrîn, bi keştîya Argoyê beşdarî sefera Kolkhîsê bûne.

jî beşdarî sefera Argosê bûbûn, sebebê eslî yê danûstendina bi vî awayî ya bi wan re jî ev bû. Mînyaî xistin nav xwe, ax dan wan û wek qebîleyan ew parve kirin, Mînyaîyî bêsekin peywendîyên zewacê danîn, jinên ji Lemnosê anîbûn jî bi hinekên din re zewicandin.

[146] Lê demek şûn de xwesteka mezinahîyê ket serê Mînyaîyan, xwestin di hikumdarîyê de bibin xwedî gotin û hinek daxwazên wan yê diçûn zorîya xudayan jî çêdibû. Wî wextî Lakedaîmonîyan xwestin wan tevan bikujin. Tevde girtin û kirin hepsê. Lakedaîmonî mehkûman bi şev dikujin, bi roj nakujin. Tam wê îşê van Mînyaîyan temam bikirina, jinên wan ku, ji ber hatina wan a dinyê hemwelatîyên wan û keçên giregirên Spartayî[166] bûn, izin xwestin ku biçin hepisxaneyê û bi mêrên xwe re biaxifin. Spartayîyan izin dan, ji ber ku ji wan hêvî nedikirin ku xiyanetê bikin. Lêbinêrin, dema ku ketin hepisxaneyê çi kirin: Yên li ser xwe derxistin û li mêrê xwe kirin, bi xwe jî yên li ser wan li xwe kirin. Mînyaîyên bi kincê jinan, jin hesibandin û berdan ji derve, ew jî derketin; bi saya vê hîleyê rizgar bûn û ji nû ve derbasî Taygetosê bûn.

[147] Cardin nêzîkî wî wextî Theras ku, bi rêya Aûtesîon, Tîsamenos û Thersandros re ji nesla Polyneîkes dihat, ji bo biçe kolonîyekê ava bike, hazirîya derketina ji Lakedaîmonê dikir. Ev Theras, ji nesla Kadmosîyan bû, ew dibe kurê Arîstodemos û xalên Eûdysthenos û Prokles. Hîn ev di temenê zaroktîyê de, Theras, hikumdartîya Spartayê, bi sifetê wekîltîyê li ser navê van zarokan bi rêve biribû. Lê dema zarok mezin bûn û kar girtin destê xwe, Therasê ku tahma iktidarê wergirtibû û nedixwest bikeve bin hukmê kesekî, xwest li Lakedaîmonê neminîn û ber bi cihê ku miletê wî dijî ba bide babirka xwe. Girava ku em jê re Thera dibêjin, ku berê jê re "Girava Xweşik" digotin, kesên ji nesla Memblîarosê kurê Poîkîlesê Fenîkî dihatin rûdiniştin. Kadmosê kurê Agenor,[167] wextê li pey Eûrope diçû, serî li girava îro em jê re Thera dibêjin dabû; piştî xwe da ber vir, belkî ji bo sîte xweşîya wî çûbû, belkî jî ji ber sebe-

166 Spartayî û Lakedaîmonî heman kesan îfade dike.

167 Kadmos kurê yek ji hikumdarên Tyrê yê bi nave Agenor e. Zeûs dikeve şiklê ga û Eûropeyê direvîne. Bavê wê birayê wê Kadmos li pey dixe. Kadmos li pey xweha xwe tê Boîotîayê, ejderhayekî (dragon) dikuje, diranên ejderha belavî erdê dibin û ji navê kesên çekdar derdikevin, ew tevan paşve diavêje, ji bilî pêncan ji wan, tevan dikuje. Ew pênc kes di avakirina Kadmeîayê ya keleha Thebaîyê de alîkarîya wî dikin.

bekî din, bi kolonîyên Fenîkeyîyan re pismamekî xwe yê navê wî Memblîaros li vir hiştibû. Dema Thares derket vir, ev kolonî ji heyşt neslan vir ve, li vê giravê -ya wî wextî jê re Girava Xweşêk dihat gotin- dijîya.

[148] Ew girav bû ya Theras hazirî dikir bi hevalên xwe yên ji hozên Spartayê hilbijartibû û dixwestin bi hev re ber bi wê ve ba berdin babirkên xwe. Ne ku yên li vir rûdinin ji giravê derxîne, dixwest bi wan re tam di nav lihevkirinekê de bijî. Di vê navê re Mînyaîyîyên ji hepsê baz dabûn, xwe avêtibûn Taygetosê. Theras ji Lakedaîmonîyên dixwestin wan bikujin re got, "Bihêlin ez van bi xwe re bibim û biçim." Bi vî awayî dê ew ji mirinê rizgar bibûna. Lakedaîmonîyan gotin baş e. Bi sê keştîyên sîh bêran ber bi kurên Memblîarosîyan ba dan babirkên xwe. Ne temamê Mînyaîyan, qismek hindik ji wan dibirin, ji ber ku piranîya wan çûbûn erdê Paroreatî û Kaûkonîyan, ew avêtine, kirine şeş beş û li vê derûdorê bajarên Lebreonê, Makîstosê, Phrîxasê, Pyrgosê, Epîonê û Nudîonê ava kirine. Piranîya wan di zemanê me de, di bin derbeyên Eleîayîyan de tune bûne. - Theras ev girav kirîye kolonî û navê xwe lê kirîye.

[149] Kurê Theras, ne xwestibû bi bavê xwe re derkeve deryayê; gotina Theras a "ez mîhekê dikim nav guran" ev e, li ser vê gotinê navê Oîolykos li kurik hat kirin û bi wî awayî maye. Aîgeûs kurê Oîolykos e, navê Aîgîdîyan ku hozeke mezin ya Spartayê ne ji vê tê. Van nikarîbûn kurên xwe biparêzin, ji ber wê guhê xwe dan kahînekî, li ser navê Erînysîyên ku Laîos û Oîdîpûs ceza kiribûn perestgehek çêkirin; ji wî wextî şûn ve karîbûn zarokên xwe biparêzin. -Li Therayê, eynî tişt hatîye serê nevîyên eynî malbatê.

[150] Çîroka me ya heta vir Therayî dibêjin û Lakedaîmonî jî qebûl dikin. Lê ji vir şûn ve Therayî bi vî awayî dibêjin. Grînnosê kurê Aîsanîos, ku tê gotin hikumdarê giravê û nevîyên Therasê me ye, bi hekatombeke[168] ji sîteya xwe anîbû çû Delphoîyê; di nav Therayîyên li balê de Battosê kurê Polymnestos yê ji nevîyên Eûphemos e ji nesla Mînyaîyan jî hebû. Grînnosê hikumdarê Therayê, bi Pythîa şêwirî; ew got, qet guhê xwe nede tu pirsan û li Libyayê bajarekî ava bike. Grînnos bersiv da û got "Ezbenî, ez êdî kal

168 Hekatombek, di ferhengê de weke qurbana sed ga derbas dibe.

bûme, yexçarîyê baskên xwe li ser min vedaye; emir bike vê wezîfeyê bide yek ji van xortan." Wextê ev gotin digot, Battos îşaret dikir. Yên wî wextî qewimîn ev in. Piştre dema ji wir çû, êdî guhê xwe neda kahîn; nezanîbû Libya li ku ye û çavê wî nedibirî kolonê bişeyne cihekî evqas esrarengîz.

[151] Piştî wê li Therayê heft salan baran nebarî; darên di giravê de hişk bûn, tenê darek jê filitî. Therayî bi Pythîa şêwirîn; wî cardin behsa koloníkirina Libyayê kir. Fêhm kirin ku bi awayekî din wê nikaribin ji ew felaketa hatîye serê wan rizgar bibin, qasidek şandin Girîtê û dan pirsîn; gelo di nav Girîtîyan de yan jî di nav biyanîyên li wir bi cih bûne de kesek heye ku Libyayê dizane. Dema ku li giravê digerîyan gihiştin bajarê Îtanosê, li wir kesekî navê wî Korobîos yê boyaxkerê cawên sor naskirin; wî mirovî got ku di esnayê rêwîtîyekê de ba ew ji rêya wî derxistîye û avêtîye Libyayê, ya rastî avêtîye girava Plateayê.[169] Ev mirov bi qeweta zêran girtin û anîn Therayê, ji Therayê pêşî di bin rehberîya Korobîos de ji bo lêgerînekê li wî welatî bike grubeke biçûk şandin. Koroîbos li wê girava Plateayê hiştin, têra çend mehan xwarin danê û bi xwe jî ji bo zû vegerin Therayê û raporê bidin, derketin rê.

[152] Lê di dema ku gotibûn venegerîyan. Tiştekî Korobîos nemabû. Belê, di wê navê re keştîyeke Samosê ya wê biçûya Misrê ketibû ser vê girava Plateayê, patronê keştîyê kesekî navê wî Koloîos bû. Piştî Samosîyan tiştên qewimîne ji Korobîos seh kirin, têra salekê xwarin danê. Ew jî ji bo demeke zû bigehin Misrê derketin rê, lê bayê bakur mecal nade wan. Ji bo ku ba nasekine heta stûnên Herkulesê kaş dibin û tên Tartessosê; bêguman xudayekî wan bi rêve dibir, ji ber ku ev kendava ticaretê bi xezîneyên destlêneketî ve dagirtî bûn; di vê sayeyê de ji malên xwe karên mezin bi dest xistibûn û vedigerîyan. Ewqas ku, -heke em Sostratosê kurê Laodamosê Aîgînayî hesêb nekin- ticarên Yûnanî, qet nebe bi qasî ez dizanim, qezenceke wiha hê bi dest nexistibûn. Samosîyan ji sedî deh ji karên xwe yên net, yanî şeş talant veqetandin; bi vê kraterosa Argosê kirin nimûne û vazoyeke ji sifrê çêkirin; ew derûdor tev bi serên Grîffon ên belbûyî ve hatibû xemilandin û ev ji qiraxên vazoyê derketibûn; wekî pê her yek jê di bejna heft enîşkan de bi sê lib kolosên tunç ve pêşkêşî perestgeha Hereyê kirin. Peywendîyên

169 Girava Plateayê, Girava Bombayê ya niha ye. Li qeraxê Trablûsgarpê ye.

dostîyê yên di navbera Therayîyan û Kyreneyî û Samosîyan de, bi alîkarîya van deryavanên Samosî dest pê kirîye.

[153] Deryavanên Therayê, Korobîos li giravê hiştine û vegerîyane û dane diyarkirin ku di giraveke qiraxa Libyayê de, xîmê koloneke ku dê bê avakirin avêtine. Wî wextî Therayîyan biryar dan, ji her malbatê kurekî ji du kuran yê wê bi pişkê bê hilbijartin û ji heft herêmên giravê her yekî çend kolonên bên veqetandin wê bên şandin; wekî rêber û hikumdar jî wê Battos biçûya. Bi vî awayî du keştîyên pêncî bêrî ber bi Plateayê ve ketin rê.

B A T T O S

[154] Yên Therayî dibêjin ev in; ji bo qismê mayî yê vê çîrokê, em ê bibînin ku bi Kyreneyîyan re bi temamî mitabiq bûne; li ser rola Battos û derketina rê, Kyreneyî û Therayî gelek tiştên cuda dibêjin. Va yên li Kyreneyê tên qisekirin: Li Girîtê bajarekî Oaxosê hebûye, li vir hikumdarekî navê wî Etearkhos hikum dimeşand; keçeke hikumdar heye, navê wê Phronîme ye. Hikumdar ji keça xwe re, ji bo cihê dêya wê ya mirîye bigre bi jineke din re dizewice; lê ya ku nû tê, tiştên bi Phronîmeyê dike, bi rastî tam layîqî nave jinbavê ye; çi xerabîyên ji destan tê dike, ji bo keçikê mehf bike nema zane wê çi bike, ewqas ku, di dawîyê de bi bêexlaqîyê tawanbar kirîye û mêrê xwe jî bi vê daye bawerkirin. Bav, li ser fîtneya, di dawîyê de plana cezayeke rezîl ji bo keça xwe çêkirîye. Li Oaxosê ticarekî navê wî Themîson yê Therayî hebûye, Etearkhos ew girtîye nav mala xwe û dayê sûndê ku çi bêje dê wê bike. Piştî sûnd xwarinê keça xwe birîye, keçik daye wî û emir kirîye ku wê bavêje deryayê. Themîson, ji ber ku bi qelleşî sûnd wergirtîye, dilê wî li hev ketîye. Peywendîyên xwe ji Etearkhos birîne û ji bo ji nav vî karî derkeve wiha kirîye: Keçik girtîye û vebûye deryayê, ji bo wê sûnda Etearkhos bi cih bîne ew avêtîye nav pêlan, lê keçik bi ben girêdayî bûye, cardin kişandîye û derxistîye ji derve. Piştre bi keçikê re çûye Therayê.

[155] Phronîme, derbasî mala Polymnestos yê li Therayê xwedîyê qedir bûye û dest bi xizmeta zewqa wî kir. Meh derbas bûn, kurek jê re çêbû; zarok zimangiran bû û bi zorê diaxift. Kyreneyî û Therayî jî dibêjin navê wî Battos bûye; lê li gor min navê wî yê eslî tiştekî din bûye, navê Battos wextê çû Libyayê wergirt, ji ber wezîfeya ku li Delphoîyê danê û ev wezîfe pêk anî-

ye, ev leqeb danêyê. Di zimanê Libyayî de ji hikumdar re Battos tê gotin û li gor min, Pythîa zimanê Libyayî bikar anîye û ev nav wekî wezîfeke pêşwextî daye wî, ji ber ku wî dizanîbû dê ew bibe hikumdarê Libyayê. Wextê mezin bû ket salên xwe yên mêranîyê, çûye Delphoîyê, li ser zimangiranîyê şêwirîye û Pythîa, ev bersiv daye pirsên wî:

Battos, tu ji bo dengê xwe tê vir,
Apollon dixwaze ku lingên te, Libyaya çêrîngehên wê bi bereket
Rojekê kerîyê pez bibe.

Heke bi Yûnanî gotibûya,wê bigota "Hikumdar, tu ji bo dengê xwe tê vir". Battos bersiv daye û gotîye: "Ey xudayê min, ez ji bo kêmasîya zimanê xwe hatim vir, tu guhê xwe nadî pirsên min. Tiştên bi min pêk nayên dixwazî, Tu dibêje Libyayê kolonî bike. Ez ê vê bi çi bikim? Bi kê re bikim?" Di miqabilî van li hember derketinên wî, kehaneteke din nedanê. Kahîn gotinên xwe yên berê tekrar kirin, ew li hêvîya ku gotinê xwe temam bike nema, derket û vegerya Therayê.

[156] Lê piştî wî hem ew, hem jî temamê kesên di giravê de rûdiniştin ketin ber xezeba Îlah. Û ji ber ku sebebê wê felaketa hat serê wan nizanîbûn, mirov şandin Delphoîyê û şêwirîn. Pythîa di bersiva xwe de got; bila bi Battos re biçin û li Libyayê Kyreneyê ava bikin, wî wextî wê bibînin talihê wan dê vegere. Therayîya, Battos bi du keştîyên pêncî bêrî re şandin. Kolon ber bi Libyayê ve vebûn, lê ji bo ku nedizanîn dê çi bikin, vegerîyan Therayê. Li Therayê nehiştin ew derkevin bejahîyê, nehiştin keştî nêzîk bibin û emir kirin paşve biçin û biçin wir. Lênêrîn nabe, paşve vegerîyan û wekî pêşî jî hat gotin, girava Plateayê ya nêzîkî qiraxê Libyayê vekirin. Tê gotin ku ev girav bi qasî bajarê Kyreneyê yê niha ye.

[157] Li giravê du salan man, xuya dikir ku wê rewşa wan baş bibûya, ji nav xwe yek li wir hiştin, hemî ber bi Delphoîyê ketin rê. Hatin ba kahîn û pirsên xwe kirin; çûne Libyayê, lê talihê wan baş nebûye. Li ser vê Pythîa ev bersiv daye:

Erdê Libyayê yê çêrîngehên wê bi bereket
Min, ku wir dîtîye, lê di gel te hê nedîtî
Tu ji min baştir dizanî, bi rastî ev mûcîzeyek e ku ez bibim heyranê wê.

Battos û hevalên wî ku ev bersiv wergirtin, paşve vegerîyan; ji ber ku kifş bû îlah hesab nedikir ku xwesteka wî bi cih anîne û ji bo avakirina kolonê lazim bû biçin erdê Libyayê bi xwe. Ew vegerîya girava Plateayê, wan hevalên xwe yên li wir hiştibûn girtin, derketin erdê Libyayê yê li hemberî giravê, navê vir Azîrîst bû, cihekî ji herdu milan bi du gelîyên bi dar dihat parastin û bi çemekî dihat avdan.

[158] Şeş salan li vir man; sala heftan Lîbyayîyan israr kirin û gotin ku em ê we bibin cihê hê xweşiktir û di dawîyê de biryar dan ew birin ji wir. Libyayî bi vî awayî kirin ku koç bikin û ber bi rojavayê ve birin. Ji bo ku erdê xwe yê herî xweşik nîşanî Yûnanîyan nedin, meşa xwe li gor rojê rêkxistibûn û bi şev ji wir derbas bûn. Navê wir Îrasa ye. -Yûnanî birin çavkanîyeke ku jê re Kanîya Apollon tê gotin. Gotin ku "Ey Yûnanî, va ji we re cihekî musaîd, li vir li asman qul vebûne."

[159] Di saxîya Battoyê damezrîner de yê çil salan birêvebirîya kolonîyê kir, di şanzdeh sal zemanê kurê wî Arkesîlaos hukum kir, Kyreneyî ji zemanê kolonî hat danîn ne zêdetir bûn. Lê di zemanê hikumdarê sisiyan yê jê re Battosê Bextewer dihat gotin, Yûnanîyên îlham ji Pythîa wergirtin, ji her herêmê rabûn û ji bo bi Kyreneyîyan re bijîn hatin Libyayê; ji ber ku Kyreneyî li welatê xwe beşên erd didan wan. Wî wextî kehaneta ku Pythîa dabû wan wiha bû:

Kî ji erdê Libyayê di wergirtina payê
Xwe de dereng bimîne, ez dibêjim wê poşman bibe.

Bi vî awayî li Kyrenê qelebalixek berhev bû; lê Libyayîyên derûdorê didîtin ku erdekî fireh yê li derûdora wan ji wan tên qutkirin; hikumdarê wan yê navê wî Adîkran, Kyreneyîyan her tiştî wî ji destan girtibûn, heqareta lê nekiribûn nemabû, wî jî ji hikumdarê Misrê Aprîesê re xeber şand, jê re da xuyakirin ku bi xelkê xwe ve teslîmî wî bûye. Aprîes artêşeke bi hêz bi rê kir, şand himberî Kyreneyê. Kyreneyî ji bo şer ji welatê xwe derketin û hatin cihekî jê re Îrasa tê gotin ya li ba kanîya Thestîsê; şer qezenc kirin. Misrî ku heta wî wextî bi Yûnanîyan re qet rûbirû nebûbûn û karên xwe ters digirtin, perçe perçe bûn; bi awayekî wisan ku ji nav wan gelek kêm karîbûn vegerin Misrê. Sebebeke ku Misrî ji Aprîes veqetand jî ev e.[170]

170 Binêre pirtûka duduyan, beşa 161ê.

[160] Kurek ji vî Battosî re çêbû, Arkesîlaos, çawa bû hikumdar nav wî û birayên wî xera bû; ew jî ji Kyreneyê derketin, çûn cihekî din yê Libyayê û bêyî bi kesekî bişêwirin bi xwe çawa dizanin, bajarê ku ji wî wextî ve û niha jî wek Barka tê bibîranîn ava kirin;[171] di vê navê re dixebitîn Libyayîyan ji Kyreneyîyan veqetînin. Arkesîlaos guh da gotinê wan û êrîş bir ser Libyayîyên serî hildidan; Libyayî tirsîyan, baz dan cem cîranên xwe yê rojhilat. Arkesîlaos ji pey wan veneqetîya; lê yên baz dan li Libyayê, li Leûkondayê hikum kirin ku wextê êrîşê hatîye bajon ser dijminên li pey wan ketine. Şer ji bo Kyreneyîyan şikestin û wêranî bû, heft hezar kes winda kirin. Piştî vê qetlîamê, rojekê dema Arkesîlaosê nexweş ket û dermanê xewê vexwar, birayê wî Learkhos ew xeniqand û kuşt. Ew jî ket dehfika Eryxoya jina Arkesîlaos û mir.

[161] Battosê kurê Arkesîlaos ket cihê wî; topal û xweşmêr nedihat hesêbkirin. Kyreneyîyên talihê wan çewt wergerîyabû, mirov şandin Delpoîyê û şêwirîn, pirs kirin ka wê karê xwe çawa bi rê ve bibin. Pythîa got, bila ji Mantîneîaya Arkadîayê[172] birêvebirekî bînin. Kyreneyîyan ji Mantîneîayan kesekî wiha xwestin, wan jî giregirekî hemwelatîyê xwe kesekî navê wî Demonax şandin. Ev zane hat Kyreneyê, rewş bi hûrûkûrî di bin çav re derbas kir; pêşî bi vî awayî Kyreneyî bi ser sê hozan ve parve kir: Therayî û yên li dora bajêr rûdinin li yekî ji wan danî, ji ya din re Peloponezî û Gîrîtî, ji ya sisiyan re jî temamê Yûnanîyên ji giravan hatine danî; erdê pîroz û wezîfeyên ayînî ji hikumdar Battos re hiştin, ew mafên berê di destê hikumdaran de bû tevde da xelkê.

[162] Di esnayê hikumdarîya Battos de rewş wiha meşîya. Lê di zemanê kurê wî Arkesîlaos de, di warê wezîfeyên polîtîk de tevlihevîyên mezin derketin. Topal Battos û Arkesîlaosê kurê Pheretîme, îlan kir ku wê stûyê xwe li ber pergala ku Demonax anîye xwar neke û xwest mafê bav û kalên xwe paşve werbigre. Bi ser neket û ew koçberî Samosê kirin. Dayîka wî çû Salamîsa Qibrisê. Wî wextî Euelthon hakimê Salamîsê bû ku, ew buxurdanga hêja ya di xezîneya Korînthosê de ye wî pêşkêşî Delphoîyê kirîye. Pheretîme, ji bo wê û kurê wê vegerîne Kyreneyê artêşek xwest. Euelthon ji wê re ji bilî artêşê, çi tiştê bixwesta dida, jinikê diyarîyên wî qebûl dikirin û digot

171 Barka, li rojavayê Kyreneyê ye. Herdu jî li Kyrenaîka ne.

172 Herêmek li nîvgireva Mora ye/Yûnanistan

“Ev gelekî xweşik in, lê ya herî baş ew e ku eskerên ez jê dixwazim bişîne.” Di wergirtina her diyarîyê de ev gotin tekrar dikirin, rojekê Eûelthon jê re teşîyeke ji zêr û hinek hirî şand û di miqabilî xwesteka wê ya her carê de jî got “Ji qismê jinan re diyarîya herî baş ev e, ne artêş.”

[163] Di vê navê re Arkesîlaos, ji Samosê herkes bangî Libyayê dikir, digot wê erd bide wan. Qederekî baş xelk li dora xwe berhev kirin, ber bi Delphoîyê ve ket rê, ji bo dakeve Kyreneyê wê bi kahîn bişêwirîya. Pythîa jê re wiha got: “Loxîas hikumdarîya Kyreneyê ji bo midetê çar Battos û çar Arkesîlaosan û heyşt neslên insanan dide we; piştî wê tewsîye nake hûn wê di destê xwe de bigrin. Tu vegere mala xwe û rehet bisekine. Heke tu firinê bi amphora tijî bibînî, amphorayan nede pehtin, bide bayê derve; heke tu firinê pêxe, nekeve nav dîwara avê; yan na hem tê bimrî, hem jî bi te re gayê herî xweşik.”

(164] Bersiva Pythîa ji Arkesîlaos re ev bû. Ew bi yên bi xwe re derket Kyreneyê, îktîdar paşve sitend, lê kehanet ji bîr kir; plana ji dijminê xwe wergirtina toleya koçberîyê dikir. Hinek ji wan welat terk kiribûn û çûbûn; Arkesîlaos yên din girtin, ji bo ku bikujin şand Qibrisê; lê ew ketin qonaxên Knîdos, Knîdosî ew rizgar kirin û şandin Therayê. Qismek ji Kyreneyîyan jî xwe avêtibûn birceke mezin, xwedîyê wê bircê hebû, jê re birca Aglomakhos dihat gotin. Arkesîlaos dar li dora bircê kom kirin û agir berdayê. Û piştî vê hişê wî hat serî, ya Pythîa digot neke ev bû, jê re gotibû heke tu firinê bi Amphorayîyan tijî bibînî, Aphorayîyan nepêje. Wî wextî dev jê berda bikeve Kyreneyê, ji xebera kahîn ya ji bo mirinê ditirsîya û dîwara avê ya bi nav û deng jî, ferz dikir ew çemê Kyreneyê av dide ew e. Jina wî, keça Alazeîrê hikumdarê Barkayîyan bû, di eynî wextî de xwedîya wî bû. Ji ber wê çû ba xesûya xwe. Dema ku Barkayî xebera hatina wî seh kirin, bi Kyreneyîyên xwe avêtibûn wir re bû yek, Arkesîlaos û Alazeîr di meydana bajêr de kuştin. Arkesîlaos bi zanetî yan bi nezanî riayetî emrê kahîn nekiribû, bi vî awayî ji canê xwe bûbû.

[165] Arkesîlaos, dema ku li Barkadayê mirina xwe hazir dikir, dêya wî Pheretîme, li ser navê kurê xwe kar bi rê ve dibir, dest danîbû ser tev karan û di civînên meclisê de amade dibû. Dema ku seh kir kurê wê li Barkayê hatîye kuştin baz da çû xwe avêt Misrê. Dikarîbû berdêla xizmeta Arkesîlaos a ji Kambîsesê kurê Kîros re kiribû, werbigire; yê Kyrene dabû Kambîses

û bi rizaya dilê xwe, xwe bi xeracê girê dabû ev Arkesîlaos bû. Pheretîme ku hat Misrê, ket ocaxa Aryandes, hêvî û lava kirin, yên hatine serê kurê wê bi dostîya wî ya li hemberî Medîyan ve girê da, xwest ku toleya wî bê hildan.

[166] Ev Aryandes, yê Kambîses ew kirîye walîyê Misrê ew e. Piştre ji bo xwe bi Dareîsos re yek hesêb kirîye ji canê xwe bûye ev e. Daryûs, wekî bîranîna desthilatdarîya xwe, dixwest tiştekî ku tu hikumdarî nedanîye deyne, Aryandes ev seh kiribû û bi çavên xwe jî dîtibû û ya Daryûs dikir dixwest bike, cezayê xwe jî dîtibû. Daryûs perçeyên zêran dihelandin, mebesta wî ji zêrê herî safî perekî nû lê bide; Aryandes, di Misra bin destê xwe de eynî tişt bi zîv çêkir; îro jî pereyê herî saf yê ji zîv pereyê Aryandes e. Lê Daryûs xeber wergirt û tawaneke nedîtî lê bar kir; bi serhildanê tawanbar kir û kuşt.

[167] Aryandes, di dewra çîroka me derbas dibe dilê wî bi Pheretîmeyê şewitî û temamê hêzên deryayî û bejahîyê kirin bin emrê wê; fermandarîya hêza bejahîyê da destê Amasîsê ji Maraphîyan, ya hêza deryayî jî da destê Badresê ji nesla Pasargadîyan. Lê berîya van hêzan derxîne rê, çawîşek şand Barkayê û navê yê Arkaselîos kuştîye pirsî. Barkayîyan gotin berpirsyarî ya hemîyan e, ji ber Arkesîlaos tu xerabî neman ku li wan nekir. Aryandes li ser vê bersivê artêş, Pheretime jî pê re derxist rê. Bahaneke wekî paravan bikar bîne jî dîtibû, lê bi ya min armanca rastîn ya vê seferê, xwestina desthilatîya Libyayîyan bû. Libyayî di rewşeke gelek belavbûyî de bûn, yên girêdayî Hikumdarê Mezin gelek hindik bûn, piranîya wan henekên xwe bi Daryûs dikirin.

MILETÊN LIBYAYÊ

[168] Rewşa bicihbûna Libyayîyan wiha bû: Piştî Misrê yên yekem Adyrmakhîdî tên; hema bêje temamê adetên wan wekî yên Misrîyan in, lê wekî Libyayîyan li xwe dikin. Jinên wan heleqên sifir dikin herdu bazinên lingên xwe; li ser serê wan komeke himbiz ya por belav dibe; heke di nav de sipî hebin, van parazîtan gez dikin û tif dikin erdê. Tenê ev miletê Libyayê adeteke wan ya wiha heye. Yek jî keçên xwe yên tên salên zewacê pêşkêşî hikumdar dikin; hikumdar ya bixwaze wê ji keçînîyê dixe; ev adet jî tenê li ba van heye. Adyrmakhîdî, herêma di navbera cihê Misir û kendava Plynosê girtine.

[169] Cîranên wan Gîlîgamî ne, ew belavî cihên ber bi rojava ve ya heta girava Aphrodîsîasê belav bûne. Girava Plateayê ya Kyreneyîyan vekirine li vê navberê ye û li qiraxan kendava Menelaosê û Azîrîs hene, Kyreneyî li wir rûdinin. Zevîyên Sîlphîûmê ji vir dest pê dikin û ji girava Plateayê heta Syrtîsê dirêj dibe. Adetên van miletan jî wekî yên pêşî ne.

[170] Piştî Gîlîgaman di îstîqameta rojavayê de Asbystî tên; ew li başûrê Kyreneyê rûdinin, seranserê qiraxan Kyreneyî ye. Di nav miletên li Libyayê dijîn de erebeyên çartekelî herî zêde ev bikar tînin. Piranîya adetên wan ji Kyreneyîyan hatine wergirtin.

[171] Cardin ber bi rojavayê ve cîranên sinorî yên Asbystîyan Aûskhîsî ne; ew dikevin başûrê Barkayan û di herêma Euesperîdesê de derîyên wan yên vedibin deryayê hene. Di navenda erdê Aûskhîsê de Bakalesî rûdinin, hijmara wan ne zêde ye, li rexê bajarê Taûkhîrayê yê welatê Barkayê derdikevin qiraxên deryayê. Lixwekirina wan wekî ya miletên li başûrê Kyreneyê dijîn.

[172] Li rojavayê van Auskhîsîyan Nasamonî rûdinin, miletekî xilbe ye, havînan kerîyên xwe li qiraxê deryayê dihêlin, diçin wehaya Augîlayê xurmeyan berhev dikin, ji ber ku li wir darê xurmeyan pirr in û darên wan tijî xurme ne. Nasamonî nêçîra kulîyan jî dikin, li ber tavê hişk dikin, piştre dikutin û ew toza kulîyan ya bi dest dixin dikin nav şîr û vedixwin. Em bên ser mijara jinan, her yekî çend jinên wan hene; kêm-zêde wekî li ba Massagetîyan mişterek bikar tînin; li pêşîya wan şivekê dadiçikînin, piştre bi hev re radikevin. Dema ku Nasomonek jina xwe ya ewil girt, jinik şeva ewil bi mêvanan re derbas dike, adetê wan wisan dibêje, wê şevê ji yekî heta yê din bi tevan re radikeve; her yek dema ku bi keçikê re raketin diyarîyek didinê, ew jî wê dike nav cihêza xwe. Di warê sûnd û kehanetê de jî wiha dikin: Ji bo kesê herî baş yê ji nav wan mezin bûyî dua dikin; destê xwe datînên ser gora wan û sûnd dixwin. Ji bo kehanetê jî cardin diçin ser gora yên kevin û bi wan dişêwirin; dua dikin û li rexê gorê radikevin; çi di xewna xwe de bibînin, wisa hereket dikin. Ji bo nezda sûndê jî her yek ji bo yê din vexwe bi destê xwe mey dide wî, heke wê demê di destê wan de tiştekî vexwarinê tunebe, ji erdê radihêjin hinek toz û bi hev didin alistin.

[173] Li nêzîkî Nasamonîyan, yên niha êdî şopa wan nemaye, welatê Psylîyan dirêj dibe; ew hemî bi vî awayî mirine: bayê Notosê yê dişewitîne temamê sarincên wan hişk kiribû; li alîyê hindur yê welat tu av tunebû. Berhev bûn û bi hevdû şêwirîn û biryar dan ku li himberî Notos şer bikin. (Ez gotine Libyayîyan dibêjim) Dema ku gihiştin navenda xîzan, Notos dest bi hejê kir, bagerên tozê rakirin û tevde veşartin. Piştî ew ji orteyê wenda bûn, Nasamonîyan erdê wan girtin.

[174] Hê li başûr, li welatê heywanên kovî yên sinorê van miletan, Garamantî dijîn, dema insanan dibînin baz didin, bi wan re peywendî danaynin; ji bo şer çekên wan tune û nizanin xwe biparêzên.

[175] Yên ez behs dikim, yên li başûrê Nasamonanê dimînin ew in, li alîyê rojavayê û qiraxê deryayê Makî hene; piştstûyê xwe heta tepa serê xwe kur dikin, tenê li tepê por dihêlin, porê alîyê herdu milan jî ji kokê ve jê dikin. Di warê şer de, ji çermê çûkên bêbask[173] yên mezin yên jê re Strûthîon dibêjin, mertalan çêdikin. Çemê Kînypsê yê di nav welatên wan re derbas dibin, ji gireke bilind ya jê re Kharît dibêjin tê û dirije nav deryayê. Ev girê Kharîtê bi dar e, lê welatên din yên Libyayê rût in; ji deryayê du stadan di hindur de ne.

[176] Cîranên Makan Gindanî ne, jinên wan xirxalên çermî dikin qeydikên lingên xwe. Sebebê wê; xuyaye her yek ji wan dostekî wan bi wan vedike; yên herî zêde xirxal danîbin ew guzîde jin tên hesêbkirin, ew hê zêde mêr ji rê derxistine.

[177] Pozê ji welatê Gîndanîyan ber bi deryayê ve dirêj dibe, welatê Lotophagîyan e yê tenê bi fêkîyên lotosê xwe xwedî dikin. Mezinahîya vî fêkî bi qasî fêkîyê darê benîştê ye û hema hema bi qasî xurmeyê şêrîn e. Lotophagî ji van cûreke şerab jî derdixin.

[178] Li qiraxê deryayê piştî Lotophagîyan Makhlyesî tên, ew jî lotos dixwin, lê ne bi qasî yên din. Welatê wan heta çemê mezin yê navê wê Trîton e dirêj dibe, ev çem dirije nav goleke mezin ya navê wê Trîtonîs[174] e; di

173 Hêştirme

174 Gola Trîtonîsê, li başûrê Tûnûsê, li rojavayê Kendava Gabesê Şetu l-Cerîd e.

vê golê de giraveke navê wê Phla heye û tê gotin, kahînekî ji Lakedaîmonîyan re gotîye ku li vê giravê bi cih bibin.

[179] Li ser vê golê çîrokeke wiha jî tê qisekirin: Dema ku Jason li ber pêşkên Çiyayê Pelîonê keştîya Argo çêkir û temam kir, bi Hekatombeyê re sêpêyeke ji bronzê hatî çêkirin jî kir hindur û ji bo biçe Delphoîyê ber bi Peloponezê ve ket rê. Dema ku hat nêzîkî pozê Maleayê ket ber bayê bakur û ba ew avêt qiraxên Libyayê. Berîya bejahîyê bibîne ket nav ava tenik ya nêzîkî Gola Trîtonîsê, nezanî ka wê çawa jê xelas bibe. Çîrok dibêje, wî wextî Trîton derket pêşîya wî; ji Jason re got ku, heke tu sêpêyê bidî min ez ê bihurê nîşanî te bikim û deryavanên wî bêyî zerarek bigehe wan paş ve vegerin. Jason razî bû; Trîto jê re wê çawa ji ava tenik û xîzan derbas bibe, nîşan da û sêpê danî perestgeha xwe û li ser vê sêpêyê kehanetek got: Jason ji hevalên xwe yên rê re vekirî got, dema ku yek ji nevîyên deryavanên Argoyê sêpêyê rake, wê li dora Gola Trîtonîsê sed bajarên Yûnanê derkeve orteyê. Nivîsa enîyê wiha bû. Libyayîyên li vê herêmê rûdinin xebera vê pêşbînîyê wergirtine û sêpê veşartine.

[180] Cîranên Makhlyesan Aûseîayî ne. Ew bi yên berîya van li qiraxê Gola Trîtonîsê rûdinin, di navbera wan de Trîton dibe sînorê wan. Makhlyesî porê xwe ber bi paşstuyê xwe ve, Aûseîayî ber bi enîya xwe ve dirêj dikin. Di cejnên Atheneyê yên salê carekê tên çêkirin, keçên vî welatî dibin du beş, bi kevir û daran şer dikin; ew dibêjin ku, bi vî awayî li gor adetên bav û kalên wan xwedawenda xwecih ya em jê re Athene dibêjin, pîroz dikin. Ji keçên ji ber birînên xwe dimrin re bakîreya derewîn dibêjin. Her salê berîya bişeynin şer, hemî bi hev re şahjineka sipehîtîyê hildibijêrin, kumekî şer yê li gor nimûneya Korînthosê yê ji çerm hatîye çêkirin û serî heta binî taximeke zirhî ya Yûnanî didin serî, piştre dikin erebekê û li dora golê digerînin. Berîya Yûnanî bên wir û bi cih bibin, çi li van keçan dikirin, ez nikarim tiştekî bêjim, belkî jî zirhên Misrî li wan dikirin; ji ber ku mertal û kumên şer ji Misrê derbasî Yûnanê bûye. Îddîa dikin ku Athene, keça Poseîdon û Gola Trîtonîsê ye, piştre ji bavê xwe xeyîdîye û çûye xwe avêtîye Zeûs, wî jî ew ji xwe re kirîye ewlad, bi vî awayî qise dikin. Li ba van jin ya herkesî ye; bi hev re najîn û wekî heywanan digihin hev. Jinek, zaroka xwe heta bête dinyê hildigre, piştî hatina dinyê du mehan dimîne, piştre mêr tên ba hev, zarok dişibe kê, ew bavê wê zarokê tê hesêbkirin.

[181] Me behsa koçerên Libyayê yên qiraxên deryayê kir; li başûr ber bi erdê herêmên hindur ve, cihên Libyayê yên heywanên mezin yê kovî tê; ji war û mexelên van heywanên kovî şûn ve herêmên qûmê yê ji Thebaîya Misrê heta stûnên Herkules tên. Li van çolan piştî meşa her rojekê, mirov li ser giran rastî bloqên xwê tê yên ji libên mezin yên bi hev ve zeliqî pêk tên; li her girê di nîvê van bloqan de aveke şêrîn û sar dipişiqe; li serê van çavkanîyan, li sinorê çolên piştî herêma heywanên kovî tên insanên li herî dawîyê dijîn rûdinin. Ji Thebaîyê dest pê bike di roja dehan ya destpêkê de mirov rastî Ammonan tê, perestgeha wan wekî ya Zeûsê Thebaîyê ye; ji ber ku wekî min di pêşîyê de jî gotibû, serê peykera Zeûs ya li Thebaîyê jî beran e. Ji derveyî vê çavkanîyeke wan ya taybet heye, ava wê dema ku roj derdikeve şîrgerm e, wextê bazarê sar û di nîvê rojê de gelekî sar e; ew baxçeyên xwe wî wextî av didin; dema roj dadikeve hêdî hêdî şîrgerm dibe, heta roj biçe ava wiha dimîne, wî wextî şîrgerm e. Hîn jî heye: Heta nîvê şevê germbûna wê dewam dike, dema ku bû nîvê şevê wek ava bifûre dikele. Piştî ew wext derbas bû heta berê şifeqê sar dibe; ji vê çavkanîyê re "Çavkanîya Rojê" tê gotin.

[182] Piştî Ammonîyan bi derbasbûna deh rojên din di herêmên qûmê de, mirov rastî gireke xwê tê ku dişibe ya li welatê Ammonîyan; li vir jî av û civatên xelkê hene; ji vir re Aûgîla tê gotin; di demsala wê de ew cihê Nasamonî ji bo berhevkirina xurmeyan tên vir e.

[183] Piştî Aûgîla deh rojên din, ji nû ve gireke xwê û av, wekî ya berê gelek darên xurmeyan. Li vir insanên ji wan re Garamantî tê gotin dijîn, miletekî girîng in, ax tînin li ser xwê direşînin û diçînin. Riya herî kurt ya bi peyatî sîh rojan dûr a welatê Lotophagosan, di nav qebîleyên wan re derbas dibe, li vir mirov rastî tiştekî balkêş tê, ew jî ew gayên wexêî diçêrin paşpaşkî diçin. Sebebê ber bi paş ve çêrîna wan ev e: Qiloçên wan ber bi pêş ve ne; ji ber vê dema ku diçêrin paşpaşkî diçin, ber bi pêş ve nikarin biçêrin, ji ber ku qiloçê wan di erdê de dialiqe. Ferqa wan ji gayên din tune, tenê ev detaya han û stûrîya çermê wan û pirtikbûyîna wê cihê dibin. Ev Garamantên han, bi erebeyên çarhespî Ethîopîayîyên di şikeftan de dijîn radiqewirînin; ji ber ku ev Ethîopîayên şikeftan di warê bezê de di dinyê de, yan jî qet nebe ji yên ev ji me re gotin, insanên herî xurt in. Insanên şikeftan bi mar, gûmgûmok û bi van cinsê heywanên xuşende xwe xwedî dikin. Zimanê diaxifin naşibin tu zimanî; wekî beraçemkan dengê kurt derdixin.

[184] Piştî Garamanta cardin deh roj navbir, gireke din a xwê û av, li vir jî insanên jê re Atarantî tê gotin dijîn; bi qasî em zanin, li ser rûyê dinyê yên navê wan tune, tenê ev in; navê qebîleyê Atarantes e, lê navê kesan tune. Wextê roj di ser wan re derbas dibe lanetê dikin, dijûnên qelew yên giran dibarînin, ji ber ku ew bi germîya xwe insanan û axê mehf dike. -Piştî wê deh rojên din, piştre gireke xwê û av ya din heye, insan li vir jî dijîn. Piştî vê gira xwê, çiyayê navê wê Atlas tê. Her milê wê asê û çiyayekî tûj e, ewqas bilind e tê gotin, kopên wî nayên dîtin; 'ewran kopên wê pêçane, bi rastî havîn û zivistanan belav nabin. Xwecihî dibêjin ev dîreka asman e.[175] Xwecihî navê xwe ji vî çiyayî girtine; bi rastî ji van re Atlanta tê gotin. Tiştekî jîndar naxwin û xewn nabînin.

[185] Min karîbû ez navê qebîleyên li ser vê xeta qûmê dijîn heta vir bidim; ji wir pê ve ez nizanim. Ev erdê biqûm heta stûnên Herkules, hetta hê wêdêtir jî dirêj dibin û bi deh roj navbiran re çavkanîyên xwê û komên insanan hene. Temamê van qabîleyan ji krîstalên xwê kulûbeyan çêdikin, ji ber ku baran nabare li vê qismê Libyayê; heke baran bibarîya ev dîwarên ji blokên xwê hatine çêkirin li ser pêyan nediman. Ew xwêya li vir tê derxistin carnan spî ye, hinek caran jî di rengê sor de ye. Ji van erdê biqûm wê ve, ber bi başûr, yanî ber bi navenda Libyayê ve welat çol e, av tune, heywanên kovî tune, baran, daristan tune, ji her awa şilahîyê mehrum e.

[186] Ji Misrê heta Gola Trîtonîsê Libyayî koçer in; ya ku dixwin goşt û vedixwin şîr e. Wekî Misrîyan ew jî goştê çêlekan naxwin, beraz xwedî nakin. Jinên Kyreneyî jî, bi tesîra Îsîsa Misrî xwarina çêlekê minasib nabînin; ji bo rûmeta vê xwedawendê rojî digrin û cejnê çêdikin; jinên Barkayî her wekî ku çêlek naxwin, beraz jî naxwin.

[187] Belê ev welat wiha ye. Lê Libyayîyên li rojavayê Gola Trîtonîsê êdî ne koçer in, adetên wan jî cuda ne û yên ku koçer bi zarokên xwe dikin, ew nakin. Libyayîyên koçer -Gelo hemî? Ez nikarim bêjim belê- wiha bi zarokên xwe dikin: Dema ku dibin çar salî bi hirîya pez yê dohnê wê nehatîye paqijkirin, rehên reş yên serê wan, heta hinek yên cênîkên wan jî dişewitînin,

175 Dîreka asman: Cûreyên çîrokê mîtolojîk yê Atlas hene. Li gor ya herî belavbûyî Atlas, îlahek yan jî tîtanek e. Asîman li ser milê xwe digre.

mebest bi ava ji mejî tê rêya nexweşîyê ji kokê ve bibirin. Dibêjin em wekî insanê saxlem deyndarê vê ne. Ev rastîyek e ku Libyayî, di nav insanên em dizanin yên herî saxlem in. Gelo ji bo wiha dikin ji ber wê ye? Ez nikarim teqqez bêjim erê, lê nayê inkarkirin ku saxlem in. Dema vî karî dikin, ji bo ku negevizin dermanek dîtine: Mîza nêrîyan direşînin ser zarokê, helkefta zarok di cih de disekine. Libyayîyan ji min re çi gotine ez jî wê dibêjim.

[188] Di nav koçeran de adetê qurbanê wiha ye: Pêşî guhê qurbanîyê jê dikin û davêjin ji derve, piştre stûyê heywanê badidin û dikujin. Tenê ji roj û heyvê re qurban jê dikin û ji bo xudayan her tiştî serjê dikin; lê yên li dora Gola Trîtonîsê rûdinin, di serî de Athene, dînên Trîton û Poseîdon jî nas dikin.

[189] Ew mertal û kincên li ser peykera Athene tê dîtin, Yûnanîyan ji Libyayîyan wergirtine; lê jinên Libyayî kincên xwe ji çerm çêdikin û rexê mertalê ne wekî mar e, mar ji qayîşê çêdikin; yên din eynî ne. Jixwe navê ew kincên peykera Athene dixemilînin jî didin nîşan ku ew ji Libyayê ne; jinên Libyayî postên bizinan yên bê mû û bi rengê sor yê boyaxa kokî hatîye boyaxkirin û qiraxên wê bi rêşîk davêjin ser kincên xwe; Yûnanîyan têgîna aîgîsê[176] ji gotina postê bizinê derxistine. Heta ez dibêjim, çavkanîya van qîjînên me yên dînî jî ji van civatên îbtîdayî tê; ji ber ku jinên Libyayî di ayînên dînî de dengên wiha derdixin. Wekî vê, Yûnanîyan kêşana erebeyê bi çar hespan jî ji Libyayîyan wergirtine.

[190] Dema mirîyên xwe vedişêrin, ji derveyî Nasamonan, koçer eynî wekî Yûnanî dikin, merasiman çêdikin. Mirîyên xwe bi şiklê rûniştî vedişêrin û ji bo nefesa xwe ya dawîyê dema li ser pişt be nedin, lê miqate ne ku rûniştî wê nefesa dawîyê bidin. -Bistikê pincarê gûlik[177] li qamîşan dipêçin, kulûbeyên xwe bi vê çêdikin, ev qulûbeyên guhêzbar in. Adetê civatên ibtîdayî ev e.

[191] Li rojavayê Çemê Trîtonê, cîranên Aûseîayan cotkarên Libyayî hene, dizanin xanî çêkin, navê wan Maxy ne; li milê rastî serê wan por heye, milê çepê kur dikin û zincifrê[178] di bedena xwe didin, ev qebîle dibêjin ku ew

176 Mertal=Çermê bizinê
177 Asphodel
178 Zîncîfre: Vermillon

ji Troyayîyan zêde bûne. Ev welat û qismê milê rojavayê Libyayê, cihê ku heywanên kovî ji yê li welatê koçeran hê gelek zêdetir in û gelek zêdetir bidar in. Ji ber ku qismê rojhilatê yê koçerên Libyayî tê de ne, heta Çemê Trîtonê nizm û xîzgeh in; piştre ber bi rojavayê ve erdê cotkaran gelek çiyayî ye, li wir gul û giya heye, tijî heywanên kovî ne; li vir welatê marên dêwîn, şêr, fîl, hirç, marên bi jehr, kerên bi qiloç, li gor Libyayî dibêjin heywanên çavên wan di singa wan de, mêrên kovî, jinên kovî û yên di tu çîrokan de tune birrek mexluqatên cenawir e.

[192] Li ba koçeran yek ji van tune. Heywanên li wir ev in: xezal, şûl, antîlop, -ker lê ne yê bi qiloç, lê ev tî nabin û av venaxwin- antîlopên din yên qiloçên wan ji bo herdu çarçoveyên Îyrîna Fenîkeyîyan pê çêkin tê bikaranîn (mezintîya van kêm-zêde bi qasî ga ne), -rovîyên biçûk, keftar, jûjîyên bi tîr, beranên kovî dîkty,[179] çeqel, panter, borye, tîmsahên di bejahîyê de dijîn yên ji familya tutemaran û bejna wan kêm-zêde sê enîşk, beytikên bêbask ên gir yan jî struthion,[180] marên biçûk yên di serê wan de qiloç heye. Heywanên di vî welatî de hene ev in, tenê pezkovî û berazên kovî tûne; li Libyayê mirov rastî rêça pezkovî û berazên kovî nayê. Sê cûre mişkên bindeqan hene: Dîpod, zegerî (gotineke Libyayî yê di manaya gir de) û yek jî mişkên jûjî. Cardin li wir di zevîyên Sîlphîûmê de Mûstela Nîvalîs[181] hene; gelek dişibin ên li Tartessosê. Belê, va di erdê Libyayîyên koçer de, heta cihê lêkolînên me gihiştinê, cûreyên heywanan ev in.

[193] Libyayîyên nêzîkî Maxayan in, Zaûtekî ne; di şeran de jin erebeyên wan dajon.

[194] Piştî van Gyzantî tên. Li welatê wan mêşên gelek hingiv didin hene û bi qasî tê gotin hosteyên wan yên bikêrhatî hene, ew hê zêde hingiv çêdikin. Hemî jî zincîfre di xwe didin û li çiyayên wan gelekî zêde meymûn hene, ew wan dixwin.

---

179 Nayê zanîn kîjan heywan e.

180 Bêbask. Di Yûnanî de eynî bêje, hem ji bo beytik û hem jî ji bo hêştirmeyê tê bikaranîn. Ji ber ku ji bo hêştirmeyê navek tunebûye, jê re çûka bêbask gotine.

181 Mûstela Nîvalîs: Heywaneke dişibe kûzik.

[195] Çîrokên Kartacayê, girava Kyraûnîsê di vê herêmê de didin nîşan, dirêjahîya wê dused stad e, firehîya wê kêm e; çûna wê ya di bejahîyê de rehet e, tijî darên zeytûnê û rezên tirî ne. Tê gotin li vir golek heye, keçên wan derûdoran ji nav herîya binê golê, bi alîkarîya perên teyran yên di ziftê de hatîye dakirin, zêr derdixin. Bi rastî wisane, ez nizanim; yên ji min re hatine gotin ez dibêjim. -Dikare ji sedî sed rast jî be. Min bi çavê xwe dît ku ji ava goleke li Zakynthosê zift derdixistin; li vê giravê qederek gol hene, lê ya herî mezin ji heftê pêyan derbas nabe û kûrahî ji du enîşkan ne zêdetir e, li serê çengelekî çiqên dara mûtikê girê didin û dikin navê, zift bi çiqê ve dizeliqe, dikêşin jor; wekî bitum bêhn dide û ji zifta Pîerîayê baştir e; wê dikin kurteke li rexê golê hatîye kolîn; wextê zêde berhev bû, ji bo têxin amphorayan vir tijî dikin. Dema ku tiştek bikeve golê, ji kanaleke bin erdê diçe deryayê û wê li wir dibînin; navbera deryayê û golê kêm û zêde çar stad e. -Tê dîtin ku, yên li ser giravên qiraxên Libyayê tên gotin, dikarin rast bin.

[196] Cardin li gor Kartacayîyan, li Libyayê li cihekî alîyê din yê stûnên Herkules heye, li wir insan rûdinên, bi keştîyan diçin wir, barê xwe vala dikin; malên tînin li qiraxan rêz dikin, piştre vedigerin keştîyê û ber bi asman ve dumanekê bilind dikin. Xwecihên duman dibînin tên qiraxên deryayê, di miqabilî malan de zêr datînin erdê û dûr dibin. Kartacayî ji keştîyên xwe peya dibin tên, hesab dikin, heke zêr têra heqê wî malî bike, zêr digrin diçin; heke kêm be vedigerin keştîyê û li bende dimînin. Îca yê din tên, cardin zêr datînin û heya zêr bê qebûlkirin ev dewam dike. Herdu alî jî xerabîyê li hevdû nakin, heta Kartacayî têrê nebînin destê xwe nadin zêran, xwecihî jî heta Kartacayî zêr negrin destê xwe nadin malan.

[197] Libyayîyên me karîbû em behsa navê wan bikin ev in. Di nav wan de ji hikumdarê Medan ji îro zêdetir neditirsîyan. -Ez ê vê jî li tiştên min li ser vê herêmê gotine zêde bikim ku, li vir -ya ez dizanim- çar nijadên insên dijîn, ne zêde û dudu ji van nijadan xwecihên vir in, yên din nîn in; Libyayî û Ethîopîayî xwecih in, yek jê li bakurê Libyayê, yê din li li başûr bi cih bûne; Fenîkî û Yûnanî ji derve hatine.

[198] Di hêla berhemdarîyê de, li gor dîtina min, ku mirov bide ber hev Libya, bi qasî Ewrûpa û Asyayê ne xwedî axeke comerd e, lê tenê herêma

Kînypsê ya xwedîyê rûbarê bi eynî navî ye[182] li derveyî vê dimîne. Ev herêm di hêla berhemdarîyê de wekî erdê herî baş e; naşibe qismên din yên Libyayê; welatekî axa wê reş e, bi çavkanîyên zêde tê avdan, tirsa zûhabûnê yan jî lehîya ji ber baranê tune. (Li vê herêma Libyayê baran heye.) Li vir hilberîna çandinîyê wekî ya Babîlê ye. Erdên yên li Euesperêdesê rûdinin jî baş e; ji ber ku dema karîgerî bilind be yek sedî dide, Kînyps yek sêsedî dide.

[199] Welatê Kyreneyê yê koçer lê rûdinin, alîyê vî milê Libyayê yê herî bilind in, xwedîyê sê herêmên awarte yên çandinîyê ye. Ji bo rakirina hasadê û rezan pêşî ji qiraxan ên berhem tijî şerbet in tê destpêkirin; piştî li vir kar temam bû, berhemên li qismê jorî van qiraxan ku ji wan re "Gir" têne gotin û cihê rastî navenda herêmê ye tê rakirin; piştî ev hasata duyem temam bû nebû, li herêmên dikevin pişt welat lib bi şîre diwerimin. Bi vî awayî dema ku xwarin û vexwarina berhemên hasada yekem xelas bûn, ya dawîyê hêşîn dibin; bi vî awayî li Kyreneyê hasat û rakirina rezan heyşt meh dikêşe. -yên em li ser vî welatî bêjin, evqas bes e.

[200] Persên li ser emrê Aryandes ji bo vekirina toleya Pheretîme ji Misrê dest bi meşê kirin, hatin Barkayê, bajar dorpêç kirin û xwestin ku kesên berpirsê mirina Arkesîlaos e bidin wan. Lê temamê xelkê Barkayê mesulîyetê parve dikin; ultîmatom nayê qebûlkirin. Wan Barkayê neh mehan dorpêç kirin; li binê erdê xendeq dikolan û nêzîkî tabyayan dibûn, êrîşên xurt dikirin. Lê hesinkerekî, bi mertalê di sifir de hatibû dakirin, xendeq li ku hatine kolan didît; ji bo vê wiha dikir: Mertal li alîyê hindur yê tabyayan digerand, datanî ser erdê; heke li wir xendeq nedihat kolîn, dema ku mertal li axê diket nediricifî; lê dema ku datanî ser cihê kolayî, sifrê mertal deng derdixist. Wî wextî Barkayîyan ev erdî ber bi alîyê dijmin ve dikolan û Aryanîyên bin erdê tev dikuştin. Ew stratejîya Barkayîyan ya li hemberî xendeqan bikar dianîn ev bû; êrîş jî paşve diavêtin.

[201] Bi vî awayî gelek zeman derbas bû; ji herdu milan jî wendayî çêdibûn û Aryanîyan jî hindik tengasî nedikişandin. Amasîsê fermandarê artêşa bejahîyê, dema ku fêhm kir wê nekaribe Bakayê bi zorê bistîne, dest bi hîleyan

182 Wadî Ka'am ya niha

kir; difikrî ku bi vê rêyê dê netîcekê bi dest bixe. Bi şev kortalek fireh da kolan, li ser bi texteyên li ber xwe nade da girtin; li ser vê jî, di eynî sevîya axa derûdora wê de, ax da rastkirin. Dema ku bû sibe, ji bo hevdîtinê bangî Barkayîyan kir; wan jî bi şahîya wê di dawîyê de bigehin netîcekê, qebûl kirin. Ya hat gotin kêm zêde ev bû: Sûnda dixwarin, heta ev erd bi vî awayî bimîne -li ser axeke ku nedihat xuyakirin sûnd dixwarin- wê li vî welatî derbasdar bûya; Bakayîyan qebûl dikirin ku baceke adîl bidin Hikumdarê Mezin, wê Aryanî jî îşê xwe ji wan neanîna. Barkayîyên ku piştî sûnd xwarinê bi xwe bawer bûn ji bajêr derketin, ji bo ku dijmin bikaribe bi rehetî bê hindur derî heta piştê vekirin. Wî wextî Aryanîyan pira veşartî xera kirin, ji tabyayan ketin hindur. Xerakirina pira texte ji bo girêdana wan bi sûnda wan re bû; ji ber ku sûnd xwaribûn peymana li hemberî Barkayîyan heta dinya hebe wê derbas be -lê heta erd bi vî awayî bimîne; madem pir hatibû xerakirin, hesêb kirin ku sûnda hatibû xwarin jî xera bûye.

[**202**] Aryanî, tawanbarên ji Barkayîya teslîmî Pheretîme kirin, ew jî sing li derûdora tabyayan daçikand, temamê Barkayîyên sucdar li singan xistin. Memikên jinên wan jê kirin û bi dîwarên sûran ve daliqandin. Barkayîyên din, wekî xenîmet di nav Aryanîyan de parve kir. Dest nedan yên ji nesla Battos û yên berpirsyarîya wan di mirinê de tune; bajar jî teslîmî wan kirin.

[**203**] Aryanîyan, Barkayîyên din wekî kole girtin ba xwe û paşve vegerîyan. Dema ku gihiştin nêzîkî bajarê Kyreneyê, Kyreneyîyan li gor pêwistîya ayînî ku ji alîyê kahîn ve hatibû dayîn, izin dan ku Aryanî di nav bajêr re derbas bibin. Dema ku artêş ji nav bajêr derbas dibû Badresê fermandarê hêzên deryayî, ji bo bajêr bigrin emir da, lê Amasîsê fermandarê hêzên bejahîyê nehişt û got; "Barka, tek bajarê Yûnanê yê em şandinê ye". Piştre ji bajêr derbas bû, dema ku gihişt cihê perestgeha Zeûs[183] yê xudayê Lykaîyê, poşman bû ku Kyreneyê negirtin, ceribandin careke din bikevin bajêr, lê vê carê Kyreneyî li hember rabûn. Persî bêyî ku di holê de şerek hebe têkçûn û heta 60 stadan wê ve baz nedan nesekinîn, li wir baregeh vedan. Wextê ew li wir qasidek hat, bangî Aryandes dikirin. Vê carê Aryanîyan hêvî û lava

183 Zeûsê îlahê Lykaî. Li Arkadîayê jî Çiyayê Lykaîyê yê ji Zeûs re hatîye nezirkirin heye. Li gor Arkadîayan Zeûs li vî çîyayî hatîye dinyê.

ji Kyreneyîyan kirin, ji bo rê xwarin xwestin, yên xwestin girtin û ketin ser rêya Misrê. Ji vir şûnde Libyayîyên di rêya wan de, heta gihiştin Misrê bûn miseletê serê wan, tamahî li giranahî û techîzatên wan kirin, zarok û bermayên wan yên li paşve mabûn di ber şûran re derbas kirin.

[204] Li Libyayê nûqteya herî dawî ya artêşa Aryanê gihiştê Eûesperîdes bû.[184] -Barkayîyên wekî kole hatin anîn, li Misrê ji Hikumdarê Mezin re hatin şandin. Daryûs, navçeyeke Baktrîayê wekî milk da wan. Navê Barka li vê navçeyê kirin, ew hê li herêma Baktrîayê ye.

[205] Pheretîme, temenê xwe bextewer temam nekir. Piştî toleya xwe ji Barkayîyan wergirt û ji Libyayê vegerîya Misrê, bi nexweşîyeke pîs ket û mir. Bi saxî ji kurmikên di gewdeya wî de xalxala wan bû, bû xwurek. Ji ber ku tûj tol wergirtin, hêrsa xudayan dikêşe ser insanan. Û ji jina Battos Pheretîme jî ji Barkayîyan, wekî min got, bi awayekî giran tol wergirtîye.

184 Euesperîdes. Li rojavayê Barka û Kyreneyê.

PIRTÛKA PÊNCAN
TERPSIKHORE

HELLESPONTOS Û TRAKYA
SERÎ LI BER PERSÎYAN DITEWÎNIN

[1] Persên ku Daryûs Megabazos kiribû fermandarê wan û li Ewrûpayê hiştibûn, pêşîyê ji nav miletên Hellespontosê, serî li Perînthosîyên hemwelatîya Daryûs qebûl nekirin da tewandin.[185] Berîya wan ew ji alîyê Paîonîayan ve jî hatibûn êşandin. Ev Paîonîayî ji qeraxên Strymonê bûn, dema ku meşiyan ser Perînthosîyan û li hemberî wan ketin nav rêzbendîya şer, wan ji kahînekî emir wergirtibûn, heke Perînthosî bi navê wan bangî wan bikin û qebeqebê bixwînin gerek wî wextî şer bikin, heke behsa navê wan nekin, bi tu awayî gerek nekevin şer. Li ser vê Paîonîayan wiha kirin: Perînthosî li hemberî wan, li derveyî bajarên wan sef girtibûn; li ser xwendina meydanê şerekî sêalî yê nedîtî qewimî; Li hemberî mirovekî mirovek, li hemberî hespekî hespek û li hemberî kuçikekî kuçikek derxistin. Şampîyonên Perînthosê bi dudu û yekArê qezenc kirin û Perînthosîyan di nav şahîyê de dest bi xwendina Paîanê kirin. Wî wextî Paîonîayan rewş bi kehanetê re li ber hev xistin û ji xwe bi xwe re kêm-zêde wiha gotin: "Belê, niha hindik maye gotinên kahîn pêk bên; niha dora me ye." Tam di nîvê Paîanê de Perînthosî xwe şidandin, bi ferqeke mezin qezenc kirin, kêm kes ji destê wan filitî.

[2] Felaketa Paîonîayîyan anîne serê Perînthosîyan bi vî awayî bûye. Di vê tarîxa min got de, Perînthosîyan bi mêrxasî azadîya xwe parastine; lê Persên Megabazosê ew bi serdestîya hijmara xwe perçiqandine. Piştî Megaba-

185 Li kitêba çaran û beşa 143yan binêre. -Perînthos, Ereglîya Marmaraya niha, navê wê berê Heraklea ye. Propontîs, yanî qeraxên bakur yên Deryaya Marmarayê. Paîonîa, li rojhilatê Îllyrîayê, erdên fireh yên ber bi bakurê Makedonîayê ve dirêj dibin, wî wextî qebîleyên cûre cûre li ser rûdiniştin.- Paîonîayî, dema ku seh kir Paîan tê gotin, şa dibin ku kehanet bi cih bû, ji ber ku gotina navê Paîanê û Paîonîayê dişibin hev. –Paîan mûsîkeke îlahî ye, li vir ji bo serkevtinê pîroz bikin tê gotin.

zos, serî li Perînthosîyan tewand, di nav Trakyayê de pêş ket, temamê sîte û miletên vî welatî li ser navê Hikumdarê Mezin bi dest xist. Jixwe emrê Daryûs jî ev bû, serî li Trakîyan tewandin bû.

[3] Li ser rûyê dinyê piştî Hindîyan yên herî qelebalix Trakyayî ne; heke di bin yek fermandarekî de yan bi yek îradeyê hereket bikin, tu wextê naşkên û li gor min dikarin bibin miletê herî bi hêz û yên herî qelebalix. Lê ji bo wan bêimkanî di vê de bû û ev yekîtî tu wextê nehat damezirandin; milê wan yê jar ev e. Li gor cihê rûdinin gelek nav werdigirin, lê adetê van miletan tevde di her noqteyê de hema bêje yek e, tenê Getaîyî û Traûsî û yên li bakurê Krestonê rûdinin li derveyî wan dimînin.[186]

[4] Min berîya niha ûrf û adetên Getaîyên xwe fanî hesêb dikin qise kiribûn. Traûsîyî, ji adetên Trakîyên din, tenê di warê hatina dinyê û mirinê de cihê dibin. Wextî zarokek tê dinyê, kesên nêzikî wê li dora wê mexluqê biçûk berhev dibin, ji dema ya niha ya hatina wê ya dinyê dest pê bike, ji bo xerabîyên wê bêne serî li xwe dixin û gilî û gazindan dikin û ew êşên dikevin payê insanan tevde tînin ziman; li hemberî vê, mirîyan di nav şahîyan de dispêrin axê û bi fikra ku ji barê sefaletê rizgar bû û gihişt bextewerîya dinyaya din vê dikin.

[5] Em bên ser miletên li bakurê Krestonîyan rûdinin, va noqteyên ew ji wan cihê dibin: Her mêr xwedîyê çend jinan in; wextê mêr mir, di navbera jinan de minaqeşeya kîjan ji me zêde jê hez dikir dest pê dike, dost jî tevlî vî karî dibin; ya tê hilbijratin, yanî bi vê hibijartinê ya rûmet wergirtîye, di esnayê pîrozkirina jinan û mêran de, ew li ser gora wî tê dirêjkirin û serê wê tê jêkirin û dikujin û vî karî pismamekî wê yê nêzîk dike; laşê wê bi yê mirî re tê veşartin û yên din xwe wekî felaketek hatîye serê wan hesêb dikin; ji ber ku ev neserkeftin ji bo jinekê eybeke mezin e.

[6] Trakîyên din xwedîyê van adetan in: Zarokên xwe wekî kole difroşin biyanîyan; keçên xwe nagirin, ji bo biçe ba kesê dixwaze serbest berdidin; di

186 Kreston, sinorê Makedonîayê ye. Traûsîyî, li herêma çiyayên Rodopê, Getaîyî, li bakurê Trakyayê, li jora Çiyayê Haîmosê û Tûnayê rûdiniştin. Ji bo vê li pirtûka çaran û beşên 93-94an binêrin.

miqabilî vê de qet nahêlin yê ku ji dê û bavên wê di qabilî pere de hatine sitandin çavê xwe veke. Deq çêkirin îşareta esaletê ye; bêdeqî xerabîyê tîne. Nekirina tu karekî kibarî ye; li ser axê xebat şerefsizîya herî nizm e; jiyana wekî esaletê, çûna şer û şelihandina kesekî din e. Adetên wan yên kifşe ev in.

[7] Di nav xudayan de tenê rêz li Ares, Dîonysos û Artemîs digrin.[187] Tenê hikumdarên wan, ji derveyî hemwelatîyan rêza herî mezin ji bo Hermes digrin, wî bav û kalê xwe hesêb dikin û tenê bi navê wî sûnd dixwin.

[8] Adetê dewlemendan ya veşartina mirîyan wiha ye: Mirî sê rojan ji bo seyrê tê danîn, qurbanên cûre cûr tên serjêkirin, dipijin dişewitin û piştî wê şahîyeke mezin tê kirin. Piştre ya dixin tirbê vedişêrin, yan tê şewitandin û xwelîya wê tê girtin; girekî çêdikin, cûre cûre leyîstin tên lîstin, qezenca mezin, xelata ji bo lîstika bi navê ya yekûyek tê kirin. Adetê Thrakîyan a mirîveşartinê ev e.

[9] Kes nikare rast bêje ka gelo li bakurê erdê van miletan kî dijî; ji Îstros wêdetir, bi qasî tê zanîn tenê erdê fireh û vala hene. Miletê tikûtenê ku ez hîn bûm li jora vê çemê dijî, Sîgynnaîyên kincên Medîyan li xwe dikin, ew in. Tê gotin ku temamê gewdeyê hespê wan bi pirçên dirêjahîya wan pênc tilî nixumandîne, bejna wan kurt û firnikên wan pehn in, bi kêrî siwarîyê nayên, lê ji bo kêşana erebeyê baş in; ji ber wê yên li vî welatî rûdinin li erebeyan siwar dibin. Erdê vî miletî, bi qasî tê zanîn, heta herêma Eneteyan ya ser Adrîyatîkê dirêj dibe.[188] Tê gotin ev kolonîyeke ku ji Medîa hatine. Ev kolonîya Medan çawan hatîye danîn? Min bi tu awayî ev fêhm nekir; lê di hundirê sedê salan de her tişt dikare bibe. Li bakurê Massalîayê,[189] Lîgûr-yayîyên li herêmên hindur, navê Sîgynnaî dane bazirganên gerok yên biçûk; Qibrisî jî ji erebeya ga re wiha dibêjin.

[10] Li gor Trakî dibêjin, welatê ji Îstrosê wêde tijî mêş in, astengîya li ber çûna wan ya wir jî ev kêzik in. Lê ev gotin ji bo min ne zêde cihê bawerîyê

187 Li gor Yûnanîyan, îlahê şer Ares ji Trakya ye. Dîomedesê hikumdarê çîrokî yê Trakyayê, kurê Ares e…

188 Cihên Enetî rûdinin, li Adrîyatîkê, ew herêma niha Venedîkî tê de ne.

189 Massalîa, Marsilyaya niha.

ye. Ji ber ku bi qasî em dizanin, mêş hez ji sermayê nake; li gor min ya dest nade jiyana li van herêman serma ye. -Belê, agahîyên li ser wî welatê ku Megabazos qiraxên wê dixist bin desthilata Persan ev in.

ÇÎROKA PAÎONÎAYÎYAN

[11] Daryûs, nuh derbasî Hellespostê bû hat Sardesê, wî ew xizmetên Hîstîaîosê Mîletosî û nesîhetên Koesê Mytîleneyî ji bîr nekiribûn. Ew da anîn Sardesê û ji wan pirsî ka di miqabilî van xizmetên xwe de çi dixwazin. Hîstîaîosê hikumranê Mîletosê, tenê herêma Myrkînosê[190] ya di erdê Edonîyan de xwest, dixwest li wir bajarekî çêke, çavê wî di tiştekî din de tunebû. Wî wir wergirt, Koes ku wî wextî ne hikumran bû, hemwelatîyekî ji rêzê bû, rêvebirîya Mytîleneyê xwest.

[12] Piştî daxwazên wan hatin qebulkirin, ji bo kêfa yên bi dest xistine derxînin çûn. Daryûs jî ketibû ser hewesa bi rêya Megabazos re anîna Paîonîayan ji Ewrûpayê û bicihkirina wan li Asyayê, ji ber ku bûbû şahidê ya ez ê niha behs bikim: Piştî Daryûs vegerîya Asyayê, du kesên Paîonîayî, Pîgres û Mantyes hatibûn Sardesê, dixwestin bibin hikumranê Paîonîayê; xweha xwe jî bi xwe re anîbûn ku, keçeke bejin dirêj û çavên wê tijî evîn bû. Dest bi sextîkirina zemanê ku wê Daryûs li qeraxê Sardesê dîwan deyne û wiha kirin: Xweha xwe çiqas ji destê wan hat xemilandin û şandin avê; cereke biçûk li ser serê keçikê hebû, hevsarê hespekî di milê xwe re derbas kiribû, di pê xwe de dikişand û li milekî din jî keten dirist. Keça ciwan, di ber Daryûs re derbas bû û ev dîmen bala hikumdar kişand; ji ber ku ev teşîrêsîya keçikê ne adetê Persan yan jî Lîdyayîyan bû û di nav miletên Asyayê de rastî tiştên wiha nedihatin. Hikumdar dest bi meraqê kiribû, ji bo ku fêhim bike gelo wê çi bi hespê bike, çend kes li pey xistin. Esker li pey ketin; piştî wê hesp av da û cerê xwe tijî av kir, cardin di eynî rêyê de û careke din di ber hikumdar re derbas bû; av li ser serî, hevsarê hespê li milê xwe pêçayî û di nav tilîyên xwe de teşî dizîvirand.

190 Myrkînos, li Makedonîayê li rojavayê Çiyayê Pangaîon û qiraxa Gola Korkînîtîsê(tê texmînkirin ku Gola Achînos ya îro zuhabûyî be)dikeve.

[13] Daryûsê ku bi qisekirinên zilamên xwe û bi dîmena li ber çavê xwe ma heyranê, keçik xwest ba xwe; keçik anîn û ji hikumdar re birin; birayên wê jî li wir bûn, li sahneyê dinerîn. Dema Daryûs jê pirsî tu ji ku yî, di cih de xort derketin pêş, gotin ku ew xelkê Paîonîayê ne û ew jî xweha wan e. Li himber vê hikumdar pirsî, ev Paîonîayî kî ne, li kîjan cihê dinyê rûdinin û ew ji bo çi hatine Sardesê. Wan gotin ku ew ji bo teslîmî wî bibin hatine, Paîonîa li qeraxê Strymonê ye, welatekî ku bajêr li ser bilind dibin, Strymon ne zêde ji Hellespontosê dûr e û di dawîyê de jî gotin ku ew ji nesla kolonên ji Troyayê hatine. Wan ev yek bi yek jê re gotin. Hikumdar pirsî, jinên li wir hemî wekî vê xweha we jêhatî ne; wan gotin belê, ew wiha ne. Jixwe ev sehne ji bo vê bêjin organîze kiribûn.

[14] Li ser vê Daryûs, ji Megabazosê re yê li ser eskerên xwe yên li Trakyayê hiştibû, nameyek da nivîsandin; emir da ku Paîonîayan ji welatê wan derxîne, bi jin û zarokên wan ve jê re bişîne. Qasidek di cih de tev vê xeberê ber bi Hellespontosê bi lez ket rê û di dawîya rêwîtîya xwe de name gihand Megabazos. Ew jî dema fêr bû çi hatîye nivîsandin, wekî rêber tenê Trakyayî bi xwe re bir û li himberî Paîonîayan derket seferê.

[15] Paîonîayan, xebera hatina Persîyan stendin, xwe dan hevdû û ji bo rûbirûyê wan bibin çûn qeraxê deryayê, ji ber ku fikirîbûn wê Persî di wir re derbas bibin. Paîonîayan, ji bo bi Megabazos û artêşa wî re şer bikin xwe amade kiribûn, lê Persîyan dema xebera seferberîya Paîonîayan û amadekarîya wan ya li himber hereketeke ji alîyê deryayê ve stendin, zivirîn û bi saya rêberên xwe ber bi hindurê welat ve ketin rê û bêyî hayê Paîonîayan jê hebe, avêtin ser wan bajarên ku mêran vala kiribûn. Ev cihên bê parastin mabûn, ji êrîşkeran re serkeftineke rehet pêk anî. Paîonîayên ku dîtin bajarên wan ketine, belav bûn, her yek çû bajarê xwe û teslîmî Persîyan bûn. Bi vî awayî xelkê Sîrîopaîonê û Paîoplaîyê û qebîleyên heta herêmên Gola Prasîasê dirêj dibe, ji welatên xwe hatin qutkirin û birin Asyayê.

[16] Zerara Megabazos negiha Paîonîayên li dora Çiyayê Pangaîonê [Doberî, Agrîanî û Odomantî] û qebîleyên li dora Gola Prasîasê rûdinin. Lê xwestibû yên li dora golê yên ez ê niha behs bikim çawan dijîyan jî têke nav wan: Di nîvê golê de li ser stûnên dirêj ji textan holek çêkirine; ji bo

derkevin bejahîyê ji pireke teng pê ve tiştek tune; stûnên ku text li ser in, ji destpêkê ve bi keda mişterek ya hemî hemwelatîyan hatîye çêkirin; piştre jî ev rê dane ber xwe: Mêran di her zewaca xwe de, ji bo li vir bê daçikandin ji Çiyayê Orbelosê deh stûn anîne; jixwe her yekî çend jinên wan hene. Jiyana xwe wiha bi rêkxistine: Her yek ji wan li ser vî textî qulûbeke wî heye, di nav wê de dijîn, di textê binî de qapaxeke vedibe golê heye. Ji bo zarokên wan yên biçûk nekevin avê, ew bi lingên xwe bi benekî ji giyagêzk hûnandî hatine girêdan. Di cihê giha de masî didin hespan û heywanên din ên gir. Di golê de ewqas masî hene ku, heke tu qapaxê rakî, zembîleke hûnandî bi benik ve girê bidî û daxe, vê seetê tijî masî dibe û tu wê dikşîne jor. Ev masîyên han du cins in, Paprax û Tîllon.

[17] Paîonîayên serî tewandine, tînin Asyayê. Megabazos pêşî ew kirin kole, piştre heft qasid şandin Makedonîayê, ew ji Persan hatibûn hilbijartin û piştî wî zilamên herî navdar ên artêşê bûn. Ew dişandin ba Amyntas. Wê li ser navê Hikumdarê Mezin Daryûs erd û av bixwestina.[191] Makedonîa ji Gola Prasîasê ne gelek dûr e; serîyekî vê golê digehe madenê ku Alexandros rojê talantek zîv jê derdixist; piştî vê madenê ku di Çiyayê Dysoronê re derbas dibin êdî Makedonîa ye.

[18] Belê, çawan ev qasidên Persî digihin seraya Amyntas,[192] hevdîtina wan hat qebûlkirin. Li ser navê Hikumdarê Mezin Daryûs erd û av xwestin. Daxwaza wan di cih de hat pêk anîn, rica kir ku bibin mêvanê wî, şahîyeke dewlemend da hazirkirin, yanî bi van Persîyan re muameleya dinyê ya herî dostane kir. Persên ku wekî ketine pêşbirkê mey vexwarin, di dawîya xwarinê de jê re ev gotin: "Makedonîayîyên mazûbanê me, li ba me Persîyan adet e, dema ku em şahîyeke mezin çêdikin, wekî keçên şahîyê, anîna jinên xwe yên meşrû û danerûniştandina wan jî heye. madem te bi rêz pêşwazîya me kir, te gelek baş bi me re muamele kir û te erd û av da Hikumdarê Mezin, êdî pêwist e tu adetê me jî qebûl bikî." Amyntas ev bersiv dayê: "Ey Persî,

191 Ax û av. Me ev gotin di sefera Skythîyê de jî dît, em ê di beşên bên de jî bibînin. Xwestina ax û avê, bi zelalî tê bi wateya hûn ê bikevin bin desthilata min. Yên av û ax didan, desthilata Persê qebûl dikirin.

192 Amyntas. Nevîyê Perdîkkas yê ji binemala heftan. Alexandrosê îxanet bi Persan kir kurê wî ye (Kitêb neh, beş 45).

ew adetê hûn dibêjin li ba me tune, adetê me, dûrgirtina mêran ji jinan e; lê madem hûn wisa dixwazin -û efendîyê vir in- ya hûn dixwazin dê bê kirin." Amyntas gotin dirêj nekir û emir kir, jin hatin anîn. Li hemberî Persan li rexê hev rûniştin. Persên li hemberî xwe jinên xweşik dîtin, cardin berê xwe dan Amyntas û gotin "Kirina wiha ne rast e, danerûniştandina jinan ne li rexê me, bi vî awayî li hemberî me, baştir bû qet nehatina anîn, ji ber ku ev ji bo me îşkenceyek e." Amyntas ket nav tengasîyeke mezin, jin li rexê wan da rûniştandin; jinan gotina wî kirin û Persîyan di cih de dest avêtin mizdana sêngê wan -hinek zêde vexwaribûn- bêguman dest avêtibûn maçîkirinê jî.

[19] Amyntas bi ser hemî van xemgînîyan jî, ewqas ji Persîyan ditirsîya ku, bûbû tameşevanê rewşê. Lê Alexandros, kurê Amyntas ku wî jî ev sehne didît -hê xortekî felaket çiye nedizanî, zêde tehemul nekir, vê rewşê ew ji eyarê wî derxistibû, ji bavê xwe re got: "Bavo, mirov nikare li himber pêwistîyê temen rabe; tu here rakeve, vê alema vexwarinê zêde dirêj neke. Ez li vir im, ez ê bi daxwazên mêvanê me re eleqeder bibim." Amyntas, fêhm kir çi gurmînî di serê Alexendros de derbas dibin, got: "Kurê min, ez bi yek kelîmeyê fêhm dikim tu çi dibêjî; tu ji hêrsan dişewitî, tu ji bo tevlihevî derxîne min dişîne. Lê ez rica dikim, heke tu naxwazî em mehf bibin, îşê xwe ji wan neyne; bêhna xwe fireh bike. Jixwe ez ê jî ya tu dibêjî bikim û biçim."

[20] Piştî Amyntas ev gotin, çû. Wî wextî Alexandros ji Persan re "Gelî mêvanên me, ev jin bi temamî di bin emrê we de ne, ji kîjanê re hûn çawan bixwazin pê şah bibin, wisan bikin. Lê niha wextê raketinê tê; bi tesîra şerabê hûn qederekê şa bûn; ji ber vê, heke hûn guhê xwe bidin min, berdin bila ev jin biçin xwe bişon û wextê ji serşokê derkevin lutif bikin û careke din wan qebûl bikin." Kêfa Persîyan bi van gotinan hat. Şahzadeyê xort, jin da derxistin, şand heremê. Piştre bi qasî wê hejmarê xortên hêj simbêlê wan xwê nedane hilbijartin û derxistin, kincên jinan li wan kirin, her yek jê xencerek da destê wan, ew xistin hindur û bi vî awayî bi Persan da nasîn: "Ji bo ku we di mala me de şahîyeke baş hatîye tertîbkirin dît, em pê serbilind in. Çi tiştên me yên layîqî we hene me tevde derxistin, kirin bin emrê we. Lê niha ji tevan xweşiktir, jinên me û dayîkên me, ji bo bi we bidin bawerkirin ku hûn bi awayekî layîq hatine pêşwazîkirin, bi van em ê îkrameke şahane ji we re bikin. Wextê hûn ji vir vegerin, ji bîr nekin, ji Hikumdarê Mezin yê we

şandîye vir bêjin, hikumdarekî Yûnanîyan û Makedonîayan hûn çawa li ser sifreyê û nivînên gelekî baş pêşwazî kirine." Piştî van gotinan Alexandros, li ba her Persîyekî, yek ji wan xortê Makedonî yê kincê jinan li wan kirî da runiştandin. Wan jî, dema Persîyan dest bi mizdana wan kirin, ew dan ber xinceran û tevde kuştin.

[21] Belê wiha mirin, hem ew û hem jî mirovên bi xwe re anîbûn; ji ber ku bi xwe re alayek balkêş ya xizmekaran jî anîbûn. Hemî ji orteyê hatin rakirin, tu şopa wan nema. Piştre Persî li van mirovan geriyan. Lê Alexandros bi hosteyî gera wan vala derxist; mirovê ku fermandar ji bo li wan bigere şandibû yê bi navê Bubaresê Persî, di nav zêran de hişt. Xweha xwe ya navê wê Gygea da wî; lêgerîn dan sekinandin, ser vî karî hat girtin û karê kuştina qasidan hat jibîrkirin.

[22] Ev şahzadeyên Makedonî yên ji nesla Perdîkkas dihatin, wekî ku bi xwe jî dibêjin Yûnanî ne, bi wan lêkolînên min kirine, ez vê tam hîn bûme û di pêş de bi rastî ez ê bidim nîşan ku ev ji nesla Yûnanîyan in;[193] jixwe Yûnanîyên wezîfeya rêkxistina leyzên Olîmpîyatê dikirin jî wisan digotin. Alexandros rojekê ket hewesa qezenckirina xelatekê, ji bo vê armancê daketibû meydanê; Yûnanîyên ku di pêşbirkê de daketin meydanê, xwestin pêşî lê bigrin, gotin ku "Tenê bezayên Yûnanî dikarin beşdarî van leyistikan bibin, ji barbaran re qedexe ye." Lê Alexandros, îspat kir ji Argosê ye,[194] ew bi fermî Yûnanî hat qebûlkirin, di stadyûmê de beşdarê pêşbirkan bû; heta şens ew kir nav du pêşbirkvanên sereke. Ev karên han kêm û zêde bi vî awayî bûne.

HÎSTÎAÎOS Û ARÎSTAGORAS LI ÎONÎAYÊ LEPTÊN DESTPÊKÎ

[23] Megabazos, Paîonîayî dan ber xwe anîn Helespontosê, wir derbas kir û gihişt Sardesê. Hîstîaîosê Mîletosî, li cihê di miqabilî parastina pira li ser Îstrosê ji Daryûs bi dest xistibû, ji niha ve hesar dabûn çêkirin; ev li qeraxê Strymonê ne û jê re Myrkînos tê gotin. Megabazos, hîn bûbû ku Hîstîaîos

193 Kitêb heft, beş 137

194 Herodotos, dibêje bav û kalên Alexandros Perdîkkas ji Argosê hatine, lê Yûnanîyan midetekî dirêj Makedonî barbar hesêb kirine.

çi dike; ji ber wê çawan bi Paîonîayan re hat Sardesê, ji Daryûs re wiha got: "Ey hikumdar, tu çi dikî? Tu çawa izna avakirina bajarekî li Trakyayê dide Yûnanîyekî wiha qurnaz û jêhatî? Li wir daristan pir in, ji bo keştî û bêran çêke çiqas bixwaze ewqas dikare dar peyda bike, madena zîv heye, hem ji Yûnanîyan û hem jî ji barbaran, girseyên xelkê yên zêde hene ku, heke kesek hebe serokatîya wan bike, şev û roj nabêjin çi tiştî bêje wê bikin. Heke tu di nav bendeyên xwe de şerekî navxweyî naxwazî, dawî li van karên ev mirov dike bîne. Pêşî bi hêminî bigre û bîne, dema ku carekê ket nav lepên te, emir bide, bila careke din venegere ba Yûnanîyan."

[24] Ev gotinên Megabazos yên wê dawîya vî karî bigihe ku baş texmîn dikirin, li ser Daryûs tesîreke dihat xwestin kirin. Qasidek şand Myrkînosê. Emir kir û got: "Hîstîaîos, va gotinên hikumdar Daryûs ji te re. Ez kesekî bi qasî te bi dil û can girêdayî dewleta xwe û xwe nas nakim; ez van ne ji gotinên te, ji kirinên te hîn bûm. Niha planên mezin di serê min de hene; her tiştî berde û were, ez ê van tiştan emanetî te bikim." Hîstîaîosî bi van gotinan bawer kir, xwe pê nepixand, dil xwe de digot ez ê bibim şêwirmendê Hikumdarê Mezin û hat Sardesê. Dema derket pêşberê wî, Daryûs jê re wiha got: "Hîstîaîos, binêre ka min ji bo çi bangî te kir: Ji dema ez ji Îskîtîayê vegerîyame û tu ji min veqetyaye heta niha, ji xwesteka min ez te bibînim û bi te re biaxifim pêştir hisek bi min re çênebû; ji ber ku tiştî herî bi qîmet, dostekî bi aqil û bi bawer e; ev herdu jî bi te re hene, ez dizanim û ji bo ku ez vê nîşanî te bidim te digrim bin xizmeta xwe. Ji bo ku tu hat ez kêfxweş bûm û ez vê pêşniyarî te dikim: Mîletosê û ew bajarê te nû ava kirîye berde; bi min re were Sûsayê; bibe hevalê min, şêwirmendê min û bibe şirîkê hebûna min."

[25] Piştî Daryûs ev ji Hîstîaîos re gotin, birayê xwe yê ji yek bavî yê bi navê Artaphrenes kir walîyê Sardesê, ew bi Hîstîaîos re vegerîya Sûsayê. Otanes, bû fermandarê ser miletên li qiraxan dijîyan. Bavê wî yek ji hakimê hikumdarîyê bû; ji bo ku bertîl xwaribû û bi awayekî neheq biryarek dabû, hikumdar Kambîses kiribû ku wî bigurînin û bikujin; ji çermê wî qayîş dabû birîn, ew kûrsîya ku Sisamnes dadgerî li ser kiribû bi van pêça; piştî kûrsî hat rûkêşkirin, li cihî vî Sîsamnesê hatibû gurandin, kiribû ku wekî dadger kurî wî bixwe rûnê û ew tembîh kiribû ku ji bîr neke li ser kîjan kûrsîyî dadgerîyê dike.

[**26**] Di cihê Megabazos de fermandarîya artêşê dabû destê vî Otanesî, yanî kesekî li ser kûrsîyeke wiha rûniştibû anîbû; wî Bizans û Khalkedonê[195] sitend, Antandrosa li Troasê[196] sitend, Lamponîonê sitend, bi keştîyên ji Lesbosîyan bi dest xist, herdu giravên Lemnos û Îmbrosê yên di destê Pelasgan de sitendin.

[**27**] Lemnosîyan baş şer kirin, li ber xwe dan, lê piştre rastî felaketê hatin; Persîyan ji bo yên sax mane bi rê ve bibe, desthilatdarî dan Lykaretosê birayê Maîandrosê[197] ku li Samosê hikum meşandibû. Ev Lykaretos, dema ku Lemnos îdare dikir mirîye. Kesekî ji Otanes hez dikir tunebû; milet dikirin kole, diperçiqand, ji bo hinekan reva ji sefera Îskîtayê, ji bo hinekan jî xwestina zerardana artêşa Persê yên ji sefera Îskîtê vegerîyane, dikir mahne.

[**28**] Biserketinên sefera Otanes ev in. Piştre ji bo midetek kurt aramî çêbû, lê Naxosî û Mîletosîyan, hinek bela anîn serê Îonîayan. Naxos, herî dewlemendê giravê bû û wî wextî li Mîletosê dewra xwe ya herî geş dijiyan. Ew durra Îonîayê bû; berîya wê di seranserê du neslan de, ji hemî bajarên din zêdetir afetên gengeşeyê kişandîye; bi saya alîkarîya Parosîyan ji wî halî xelas bûne; ji ber ku Mîletosî di nav temamê Yûnanîyan de, ji bo ku di welatê wan de geşîyê pêk bînin ew bijartine.

[**29**] Lêbinêrin Parosîyan ew çawan li hev anîne. Ji nav hemwelatîyan yên herî zane hilbijartine û şandine Mîletosê, wan bajar di nav tuneyîyeke mezin de dîtine û xwestine li seranserê welat bigerin, gerîyane. Li her cihê mêrgên Mîletosê gerîyane, welat ji ber koçberîyê vala bûbû; dema rastî zevîyekî sipehî û çandî hatine, navê xwedîyê wê nivîsandine. Di dawîyê de dîtine ku yên navê wan tê nivîsandin gelek kêm in; li ser vê, nuh hatine bajêr meclisa xelkê berhev kirine û ji bo dewletê birêve bibin yên zevîyên wan birûkûpêk in hilbijartine; ji ber ku digotin, yên di menfeetên xwe de bi dîqet bin wê di karên xelkê de jî bi dîqet dibin û wek karê ewil, hiştin Mîlatosîyên berê şerê navxweyî sor dikirin bêdeng bimînin.

195 Khalkedon, Kadikoya Stenbolê ya niha ye.
196 Troas, navê herêma ku navenda wê Troya ye.
197 Kitêb sisê, beş 142-148.

[30] Parosîyan, li Mîletosê nîzam bi vî awayî damezirandine. Belê, niha jî ev bajar, di vê dewra em behs dikin de çawa bi Naxos re bûn çavkanîyên pirsgirêkên Îonîayê? Hemwelatîyên Naxosê yên ji alîyê xelkê ve hatin raqewirandin yên hal û wextê wan xweş, hatin Mîletosê. Li Mîletosê destihilatî emanetî Arîstagorasê[198] kurê Molpagoras kiribûn, ev, zava û birazîyê Hîstîaîosê kurê Lysagoras bû yê ku Daryûs li Sûsayê li ba xwe hiştibû; dema Naxosî hatin, hikumranê Mîletosê Hîstîaîos li Sûsayê bû û bi van re peywendîyên wî yên mêvanperwerîyê hebû. Yên ji Naxosê hatibûn derxistin, hêvî û lava ji Arîstagoras kirin, xwestin ku ji bo vegerin welatê xwe esker bidin wan. Ew jî fikirî ku, heke ew bi alîkarîya wî vegerin welatê xwe, belkî bikaribe Naxos jî bi dest bixe û dostîya xwe ya bi Hîstîaîos re da pêş û wiha got: "Di destê min de, bi qasî ez li himber yên îro Naxosê di destê xwe de digrin bisekinim û we bibim welatê we, hêzek tune ye; ji ber ku min seh kirîye ku heyşt hezar eskerên wa yên bi mertal û gelek keştîyên şer yên Naxosê hene; lê ez ê rêyeke ku alîkarîya we bike bibînim û ez ê ji bo vê bi hemî hêza xwe bixebitim; plana tê hişê min ev e: Artaphrenes dostê min e; hûn dizanin Artaphrenes kurê Hîstaspes û birayê Hikumdarê Mezin e; fermandarê hemî hêzên qiraxê Asyayê ew e, di destan de artêşeke mezin û keştî hene; ez serbilind dibim ku kesekî wiha daxwazên me pêk bîne." Li himberê vê axaftinê, Narxosîyan desthilatdarî dan Arîstagoras; wezîfe danê ku li ser navê wan diyarîyan pêşkêş bike û li ser hesabê xwe, soz dan wê hemî mesrefa sefera bê kirin bigrin ser xwe. Hesêb dikirin ku hema hinekî li Naxosê bên xuyakirin, wê herkes li ber wan serî bitewîne û wî wextî wê bi zorê serî li xelkên giravên Kykladê yên hêj yek ji wan jî ne di bin hukmê Daryûs de bûn, bidin tewandin û pozbilindî dikirin.

[31] Li ser vê Arîstagoras çû Sardesê. Ji Artaphrenes re behsa Naxosê kir, got; wir bêguman ne ewqas fireh e, lê nêzîkî Îonîayê ye, xweş e û giraveke bi bereket û dewlemend e, tijî kole ye, dewam kir û got: "Artêşekê bişîne wir û yên ji wir surgun bûne jî bigre bibe. Heke tu vê bikî, li ba min gelek pere hene ku ez bidim te, mesrefên ji bo artêşê jî bên kirin cihê. (Ji ber ku yên dixwazin ev kar bê kirin bêguman wê pere bidin me.) Ji bilî vê, pêşî Naxos û piştre, yên girê-

198 Arîstagoras. Ev şeqsê sereke yê pirtûka pêncan e; Herodotos, vî kesê ku serhildana Îonîayê daye destpêkirin, ne bi qasî Hîstîaîos bi qîmet, lê bi qasî wî fêlbaz dide nasîn.

dayî wê, giravên Paros û Androsê û hemî giravên din ên ji wan re Kyklad tê gotin, hûn ê têkin ser împaratorîya Hikumdarê Mezin. Wê ev jî ji bo girtina ser Eûboîayê bibin xalên destekê; wir giraveke mezin û dewlemend e; firehîya wê ji Qibrisê ne hindiktir e, bidestxistin leyistika zarokan e. Ev girav hemî bi sed keştîyan dikarin bên girtin." Pers bi van gotinan bersiv dayê: "Tu ji bo xanedana hikumdar şêwirmendekî bi aqil î û ji bilî hejmara keştîyan hemî tiştên tu dibêjî gelekî baş in. Wê biharê ne sed wê dused keştîyên te çêbibin, lê ji bo plane, pêşî pêwist e hikumdar jî biryarê bide."

[32] Arîstagorasê ev bersiv wergirt, bi şahî vegerîya Mîletosê, Artaphrenes, piştî pêşniyarên Arîstagoras li Sûsayê pêşkêşî erêkirina hikumdar kirin û erêkirina Daryûs wergirt, dused trîrem[199] û yekîneyên qelebalix yên ji welatê hevalbendên Persê hatine berhevkirin amade kirin; Persîyekî navê wî Megabates yê ku hem birazîyê wî û yê hikumdar Daryûs yê ji xanedana Akhaîmenîdan kir fermandarê wê û heke mirov ji çîrokê bawer bike, Paûsanîasê kurê Kleombrotosê Lakedaîmonî, piştre wê bikeve sewdaya hikumranîya temamê Grekîyan û bixwaze bi keça wî re bizewice. Piştre di bin fermandarîya Megabates de, ev artêş şand ji Arîstagoras re.

[33] Li Mîletosê artêşa Îonê û bi koçberên Naxosê re, Arîstagoras jî beşdarî Megabates bûn; ber bi Hellespontosê ve ketin rê, lê dema ku hatin Khîosê li Kaûkasayê[200] sekinîn, dixwestin ji bayê Boreasê sûd werbigirin û bigrin ser Naxosê. Lê qederê nedixwest ev hêza deryayî Naxosê xera bike, belê, yên ku qewimîn ev bûn: Magabates karê nobedarîya keştîyan kontrol dikir, di keştîyeke Myndosê de nobedar nedît; bi karekî giran ve rabû, eskerên xwe yên parêzerîyê şandin û fermandarê keştîyê da anîn ku navê wî Skylax bû; emir kir, ew bi nîvê newqa wî ve bi kuneke lombarê ya keştîyê ve da girêdan, serî ji derve, gewde li hindur daliqandî ma. Dema Skylax bi vî awayî hatibû girêdan, xeber gihişt Arîstagoras ku mêvanê wî yê Myndosî bi emrê Megabates li zincîrê xistine û di halekî xerab de ye. Çû yê Persî nerim bike, lê ricayên wî netîce nedan; wî wextî rizgarkirina mêvanê xwe girt ser xwe. Magabates bi vê hisîya û gelekî bêhna wî teng bû; çû ku bi Arîstagoras re bixeyîde, lê

199 Cureyek keştîyên şer.

200 Kaûkasa, kendava girava Khîosê

wî ev bersiv dayê? “Tu çima tevlî van kara dibî? Ma Artaphrenes tu neda bin emrê min û negot cihê ez emir dikim tê biçî? Tu çima pozê xwe dixe her tiştî?” -Li ser vê rabûnê yê din hêrs bû, dema ku bû şev keştîyek şand Naxosê, tê de mirovên wezîfedar hebûn yên ku amadekirîyên li hemberî wan bigihînin xelkê wê derê.

[34] Şik ji Naxosîyan re çênebibûn ku ev hêzên deryayî wê bigrin ser giravên wan. Piştî haya wan ji rewşê çêbû hemî tiştên li deştê kişandin nav hesaran, li hemberî dorpêçê hazirî kirin û bi lez xwarin û vexwarin kişandin nav bajêr. Texmîn dikirin şer pir nêzîk e û bi vî awayî hazirî dikirin; hêza dijmin ya deryayî ya ji Khîosê rabûn, hatin Naxosê. Lê li hemberî xwe bajarekî bi hesaran hatîye pêçan dîtin û çar mehan ew di bin dorpêçê de hiştin. Xwarina Persîyan xelas bûbû. Arîstagoras ji kîsê xwe jî ketibû bin mesrefeke mezin, lê dorpêç hê zêdetir dixwest; di dawîyê de ji bo koçberên Naxosê kelehek çêkir, di nav neserkeftineke berbiçav de vegeriyan bejahîyê.

[35] Arîstagoras, soza ji Artaprenes dabû nikarîbû bi cih bike; ji derveyî vê bi dayîna mesrefên şer yên jê dihatin xwestin jî aciz bûbû, ji bilî vê, ji mexlubîyeta hatibû serê wî û biserderabûnên Megabates jî xemgîn bibû. Li bende bû ku desthilata wî ya li ser Mîletosê ji destan bê wergirtin. Di nav xeman de serhildan dihat hişê wî. Û hatina mirovê serî wî deqkirî diket heman wextî, ew ji Sûsayê dihat, jê re talîmata ku Hîstîaîos ji Hikumdarê Mezin veqetîyaye dianî. Hîstîaîos, dixwest Arîstagoras teşwîqî serhildanê bike, ji bo bêyî polisê parastinê pê bihisin û bê tehlîke xeber bigihînê, rêyeke din nedîtibû; ji nav koleyên xwe yên herî pê bawer yek veqetandibû û serê wî rût kiribû; emrê xwe li ser wî çermî dabû xêzkirin; mabû li hêvîyê ku por cardin dirêj bibe, dema ku por têra xwe dirêj bû, bêsekin şandibû Mîletosê. Dema kole gihişt Mîletosê, wê tenê ji Arîstagoras re bigota serê wî kur bike û lê binêre, wê tiştekî din negota; deq, wekî min got, tenê emrê serhildanê bû. Ragirtina wî di Sûsê de Hîstîaîos aciz dikir, loma ev kiribû. Bi hêvî bû ku serîhildan çêbibe, wê wî berde, bişîne qiraxê deryayê. Dizanîbû heke li Mîletosê tevlihevîyek çênebe wê paşve venegere.

[36] Mebesta Hîstîaîos a birêkina qasid ev bû. Ev sebeb tevde, wek ku ji bo di eynî wextî de derkevin pêşîya Arîstagoras hatibûn ba hevdû. Bi terefdarên

xwe şêwirî, nêrînên xwe û agahdarîyên Hîstîaîos îzah kirin; raya wan bi tu alî de neçûn, hemî bi serhildanê re bûn; di serî de, belê, dîroknivîs Hekataîos li hember derketibû, rast nedîtibû bi hikumdarê Persê re şer bikin, miletên girêdayî Daryûs yek bi yek hijmartibûn, xwestibû hêza wî nîşanî wan bide. Lê dema ku nêrîbû kesek guhê xwe nadêyê, gotibû pêwist e di deryayê de serdestî bi dest bê xistin, ji bo vê jî lazim e xezîneya Kroîsosê Lîdyayî ya ji perestgeha Kurên Brankhosîyan re pêşkêş kirîye bê wergirtin û gotibû ji vê pê ve çareyek nabîne. –Ji ber ku dizanîbû çavkanîyên hatinîya Mîletosê çiqas kêm in. -Bawer dikir ku bi saya vê xezîneyê wê serdestîya deryayê bi dest bê xistin. Ji bilî vê bi wergirtina vî pereyî dê pêşîyê bigirtina ku ew bikeve destê dijmin. Ev xezîne gelek giring bû, min di çîrokên xwe yên ewil de behs kiribû.[201] Ev nêrîn nehat pejirandin; biryara serhildanê hat dayîn; ji nav xwe yek hilbijartin û şandin Myûsê, ji dema ku hêza deryayî ji Naxosê vegerîyabû li wir lenger avêtibû, wê serokên beşdarî seferê bûbûn bi dest bixista.

[37] Ev wezîfe dabûn Îatragoras, ev mirov, Olîatosê kurê Ibanollisê Mylasayî, Hîstîaîosê kurê Tymnesê Termerayî, Koesê kurê Erxandros yê ku Daryûs Mytîlenê bexşî wî kiribû, Arîstagorasê kurê Herakleîdasê ji Kymeyê û gelekê din kirin xefkê. Bi vî awayî Arîstagoras bi awayekî vekirî serî hilda û li himber Daryûs serî li hemî awa tedbîrên dijmintîyê dabû. Di serî de ji bo Mîletosî jî bi dilxwazî beşdarî serîhildanê bibin, qaşo dev ji hikumranîyê berdabû û li Mîletosê hikumeteke demokratîk damezirandibû; piştre jî ev şoreşa xapandinê belavî her cihê Îonîayê kiribû; li gelek cihan hikumran raqewirandibûn, yên beşdarî seferên derveyî welat bûbûn û di keştîyan de bi dest ketibûn paşde şandibûn welatên wan; hikumdarên her yekî ji wan teslîmî wan kiribû û bi vê xwestibû dilê wan ber bi xwe ve bikêşe.

[38] Koes teslîmî Mytîlenîyan hatibû kirin, ji surhan ber bi jêr hat kişandin û dan ber keviran kuştin; Kymerî tenê bi raqewirandina efendîyên xwe man; gelek bajarên din jî bi vê kirinê tenê man. Bi vî awayî li sîteyên Îonî navbir dan zordarîyê. Piştî Arîstagorasê Mîletosî hikumdar hilweşandin, emir da ku xelkê her bajarî ji xwe re Strategosan[202] hilbijêrin, piştre li trîre-

201 Pirtûka yekê, beşa 92yan.

202 Strategos, fermandarê artêşa Yûnanê. Hejmara wan deh kes bû û her salê bi hilbijartinê dihatin ser kar.

meyê siwar bû û wekî delegeyê Îonîayê ber bi Lakedaîmonê ve ket rê, ji ber ku pêwist bû terefdarên nû bên peydakirin.

SPARTA Û ATÎNA – HEWILDANÊN ARÎSTAGORAS

[39] Li Spartayê desthilat êdî ne ya Anaxandrîdasê kurê Leon bû, wî koça dawîyê kiribû, hikumdarî ketibû destê kurê wî Kleomenes[203] û ji bo vê ji aqilê xwe zêdetir deyndarê bavê xwe bû. -Jina Anaxandrîdas, xwarzîya wî bû; li ber dilê wî şêrîn bû, lê ji wê zarokên wî çênebûnê. Li hemberî vê rewşê Ephorosîyan dîrektîf dan wî û jê re wiha gotin: "Tu dikarî di pêşeroja xanedana xwe de nefikire, lê em çavê xwe li vemirandina nesla Eûrysthenes nagrin; jina li mala te rûniştîye zaroka nade te; wê paşve bişeyne û yek din bistîne; heke tu wiha bikî tê Spartayîyan kêfxweş bikî." Wî bersiv da û got ew wê ne vê û ne jî ya din bike, ew ji jina pê re zewicîye kêfxweş e, li hemberî wî tu xerabî nekirîye, avêtina wê û xwestina yek din ne rast e; ji bo vê wê guhê xwe nedaya wan.

[40] Li ser vê Ephorosî û Meclisa Pîran civîneke mişterek çêkirin û ev pêşniyar li hikumdar kirin: "Em dibînin tu ketîye tora jina di destê xwe de, mademwisan e, qet nebe van gotinên me bike û vê carê jî li himber nesekine ku Spartayî jî mecbûr nebin li himberî te bisekinin. Niha daxwaza me ne berdana jina te ya di mala te de ye; tu dikarî heta niha te çawa pê re daye û stendîye tu cardin wisa bikî; lê ji bilî jina xwe jineke din jî bigre mala xwe û bila ev jin jineke biber be, ji me re ev tenê bes e." Tiştekî wiha yan jî nêzîkî vê jê re gotin û Anaxandrîdas razî bû, ji wê rojê pêve li dijî qanûnên Spartayê, bû xwedîyê du jinan û du malan.

[41] Jina duduyan a pêre zewicî, gelek derbas nebû bû xwedîyê zarokekî, ev Kleomenesê me ye. Lê tam di dema wê zarokê di pêşerojê de bibe hikumdarê Spartayîyan da, ew jina heta wê rojê sitewr, bi tesadufeke xerîb bihemil bû. Di zikê wê de bi rastî zarokek hebû, lê mirovên jina duyem dema ku

203 Kleomenes, di sala 520an de bûye hikumdarê Spartayê. Çûna Yûnanistanê ya Arîstagoras di sala 499an de ye. Salek piştî girtina Sardesê û şewitandina wê de ye (Kitêb pênc, beş 100-101).

ev seh kirin tevlihevî derxistin, gotin ku dixwaze bi derewa pesnê xwe bi zarokekî bide û tenê ji bo xerabîyê bi me bike wiha kirîye. Çiqas roja hatina dinyê ya zarok nêzîk dibû, qelebalixî zêdetir dikirin, piştre Ephorosî ku ketin şikê, di esnayê hemla xwe deyne hatin li ber nivînê nobet girtin. Jinikê Dorîeûs anî dinyê, dûra li pey wî bê sekin bi Leonîdas, di cih de piştî wî jî bi Kleombrotos bihemle ma; hinek dibêjin Leonîdas û Kleombrotos cêwik in. Em bên ser jina wî ya duduyan, dayîka Kleomenes, ev jina ku keça Prînetadesê kurê Demarmenes bû, tu zaroyên din jê re çênebûn.

[42] Bi qasî tê gotin, Kleomenes, kesekî wisan zêde bi aqil nedihat hesêbkirin; heta di sinorê dînîtîyê de bû; di miqabilî wî de Dorîeûs, bijarteyê yên di 'emrê xwe de bû û gelek baş dizanîbû ku hikumdarî bidana kesê layîqî wê, dê ew bi xwe bibe hikumdar. Lê dema ku Anaxandrîdas mir Lakedaîmonî ji adetên xwe derneketin û kurê wî yê mezin Kleomenes anîn ser text. Dorîeûs pê êşîya; li xwe danetanî bibe pêgirtîyê Kleomenes, hin hevalên rêwîtîyê bi xwe re bir, bi Spartayîyan re ji bo damezirandina kolonîyekê çû. Li ser welatê wê bi cih bibe jî ne bi kahînê Delphoîyê şêwirî û ne jî ew şahîya di rewşê wiha de tê kirin çêkir. Ket ber bayê hêrsa xwe û keştîyên xwe birin qiraxê Libyayê; Therayîyan jê re rêberî dikirin. Hat, li herêmeke Libyayê ya herî xweşik Kînypsê yê qiraxê çemê bi eynî navî bi cih bû, lê qebîleyên Libyayê yên Magî û Kartacayî nehiştin li wir vehewe, du sal şûn de vegerîya Peloponezê.

[43] Antîkharesê Eleonî,[204] bi minasibdîtina kahînê Laîosê, tewsîye kir ku biçe Sîcîlyayê û bajarê Herakleîayê damezrîne; digot: "Temamê welatê Eryxê yê kurên Herkulesîyan e, ji ber ku Herkules ev der vekirine." Dorîeûs bi van fikran çû Delphoîyê; ji kahîn pirsî, gelo ew welatê biçê wê bikaribe bistîne; Pythîa gotê dê bisîne. Li ser vê Dorîeûs, ji nû ve bi wan mirovên ji Libyayê anîbû derket rê û ew ber bi qeraxên Italyayê ve birin.

[44] Dibêjin, di van dema de Sybarîsî, ew û hikumdarê wan Telys, kirî biçûna seferekê li himberî Krotonê; Krotonên ketin nav tirsê, ji Dorîeûs alîkarî

204 Eleon, ji bajarên Boîotîayê ye. -Welatê Eryxê rojavayê Sîcîlyayê ye. Eryx, kurê Poseîdon yê ji Afrodîte ye…

xwestin, wî jî qebul kir; li gor Sybarîsî dibêjin, paya Dorîeûs û yên pê re di van bûyeran de ev e; lê heke mirov ji Krotonîyan bawer bike, tu biyanîyek, di wî şerê li hemberî Sybarîsan de bi wan re yekîtî çênekirîye, tenê Kallîasê kahînê Elîsîyê yê ji nesla Îamîdê,[205] ji ba zordarê Sybarîsê Telys bi xef baz daye û razî bûye tevlî wan bibe, ji ber ku di esnayê serjêkirina qurbanekê de ew xudayên bi wan şêwirîye, biyomî nedaye nîşan ku li hemberî Krotonayê şer bê lidaxistin.

[45] Yên ev herdu xelk dibêjin ev in, herdu jî li gor xwe bawerîyên wan hene: Sybarîsî li rexê besta hişk yê Krathîsê daristanek û perestgehek didin nîşan; li gor wan Dorîeûs, piştî bajar sitendîye vir ji Athene yê jê re Krathisî tê gotin re veqetandîye; ji bilî vê esasê gotinên xwe ji mirina Dorîeûs derdixin; balê dikşînin ser ku ji bo guhê xwe nedaye kahîn mirîye; ji ber ku heke pozbilindî nekiribûya û tenê li karê xwe binêrîya, dê welatê Eryxê bistenda û di cihê tev artêşa xwe mehf bibûya, dê bibûya efendîyê van erdan û hikûm bimeşanda. -Li milê din Krotonî jî milkên bêhed û hesb yên Kallîasê Elîsî yên li ser erdê Krotonê didin nîşan. Dibêjin, îro jî ev yên mîratgirên wî ne, lê tiştekî Dorîeûs û nevîyên wî tunene. Heke Dorîeûs, beşdarî şerê Sybarîs bibûya, ji yên dane Kallîas zêdetir bidana wî jî. Bawerîyên her yek ji wan ku didin nîşan ev in. Xwendevan kîjanê hê zêde cihê bawerîyê dibînin, bila wê qebûl bikin.

[46] Bi Dorîeûs re kesên wekî Thessalos, Parebates, Kelees, Eûryleon û hinek Spartayîyên din jî li keştîyê siwar bibûn; dema gihiştin Sîcîlyayê temamê kolonîyê, di dawîya şerekî bi felaket de yê bi Fenîkeyî û Segestayîyan re kiribûn, mirin. Di nav damezrênerên bajêr de tenê Eûryleon canê xwe rizgar kiribû. Bi yên ji artêşê paşve mane kolonîya Selînûsê Mînoa sitendibû û ji bo desthilatdarîya Pythagorasê Tyran bihejîne bi wan re hevkarî kirîye. Piştî ew xist, ceribandîye ku bi xwe hikumranîya Selînûsê bistîne, desthilateke mitleq ava kirye lê ev demkî bûye, ji ber ku hemwelatîyên Selînûsê di esnayê serhildanekê de, ew di mîhraba Zeûs Agoraîosê ya xwe avêtibûyê de kuştine.[206]

205 Îamîdî, malbateke kahînan ya navdar.

206 Zeûsê ku li meydanê mîhraba wî heyî. Wekî parastvanê civînên xelkê dihat perestin. Jiyana polîtîk ya xelkê diparast.

[**47**] Hemwelatîyê Krotonê Phîlîpposê kurê Bûtakîdes jî weke qedera Dorîeûs hatîye serê wî û mirîye; bi keça Telysê hikumranê Sybarîsê re bi dergistî bû û ji Krotonê hatibû raqewirandin; dema ev zewac çênebû ji bo biçe Kyreneyê li keştîyê siwar bû; ji wir bi trîremeke aîdê xwe ya ku kesên berhev kiribûn jî tê de û bi Dorîeûs re vegerîya; wî di lîstikên Olîmpîyadê de serkeftin bi dest xistibû; herî spehîyê zemanê xwe yê Yûnanistanê bû; Li Segestayê bi saya sipehîtîya xwe, hurmeteke nimûnêya wê tune kezenc kiribû: Li cihê tirba wî perestgehek hat avakirin; li wir jê re wekî nîv xuda qurban tên serjêkirin.

[**48**] Dawîya Dorîeûs wiha hat; heke li ber xwe bidaya hemwelatîyê Kleomenes qebûl bikira û li Spartayê bimaya wê hikumdarî bistanda, ji ber ku Kleomenes demek dirêj li ser desthilatê nemabû û ji bilî keçeke navê wê Gorgo zarok li pey xwe nehişt û mir.

[**49**] Arîstagorasê tyranê Mîletosê, dema ku Kleomenes di iktidarê de bû hatibû Spartayê. Bi wî re hevdîtin pêk anîbû û tableteke bronz jî anîbû, Lakedaîmonî dibêjin, li ser bi derya û rûbarê wê ve hemî dinya hatîye neqişkirin. Dema derdikeve himberî Kleomenes, Arîstagoras pê re wiha axift: "Kleomenes, bi vî awayê hatina min a bi lez şaş nebe. Rewşa me wiha ye: Kolebûna zarokên Îonîayî pêşî heqareteke mezin û ezîyetek e ku hatîye serê me, ev berîya temamên Yûnanîyan tesîrê li we dike, ji ber ku ji nijada me yên herî li pêş de hûn in. Ez li ser navê xudayên Yûnanistanê têm ba we, Îonîayan ji koletîyê rizgar bikin; ew jî ji xwîna we ne. Ev ji bo we ne zehmet e; barbar ne ewqas sawdar in û hûn jî wekî şerker gihiştine noqteya herî bilind. Ew bi tîr û rimên kurt şer dikin; di şer de pantorên fireh li xwe dikin û li serê wan kumên bilind hene; ji bo ku bi vî awayî hatine astengkirin mexlûbkirina wan rehet e. Herêma welatê wan lê ye gelek dewlemend e, di serî de zêr ji yên temamê miletan gelekî zêdetir e. Ji bilî vê zîv, sifir, cawên biriqî, heywanên bar û koleyên wan hene; ev tev dikarin bibin ya we, tenê hûn bixwazin. Ez cihê wê jî nîşanî te bidim. Belê, va Îonîayî li vir e, tam piştî wan cihê Lîdyayî rûdinin ku erdekî bi Bereket e, di hêla zêr û zîv de gelekî dewlemend e." Dema ev digotin, li ser nexşeya dinyê ya wê lewheya ji bronzê ya bi xwe re anîbû, cihê van welatan dida nîşan. Dewam kir û got "Cîranên Lîdyayîyan Frîgyayî ne, va Kappadokîayên em ji wan re Sûrîyeyî

dibêjin; li ser sinorê wan Kîlîkîa; ji vir derdikevin ser Deryayê û va girava Qibrisê. Kîlîkîa, her sal pêncsed talant xerac didin Hikumdarê Mezin. Piştî Kîlîkîayê Ermenîstan tê, çêrîngehên wan yên dewlemend hene; piştî Ermenîyan va herêma Matîenîyan. Li rexê vê herêmê Kîssîa û li vê herêma han, li rexê Rûbarê Khoashes mirov Sûsayê dibîne ku, Hikumdarê Mezin li vir rûdinê; xezîneyên wî li vir in; dema ku em vî bajarî bi dest bixin, em dikarin di hêla dewlemendîyê de bejna xwe bidin ber ya Zeûs, ê wî wextî! Di oxira şerîdên teng yên erdan yên ne ewqas mezin de û bêguman ne ewqas bi bereket, hûn bi Messennîayî, Arkadîayî û Argosîyên bi qasî we xurt re şer dikin; helbûkî li wan deran qet zêr û zîvên ku insan ji bo bi dest bixin hevdû dixwin, tune. Niha ji bedêla ku Asya bi rehetî bê stendin sekinîbe, ma tiştekî din tê kirin?" Arîstagoras wiha axift û Kleomenes bi vî awayî bersiv dayê: "Mîletosîyê biyanî, ez bersiva xwe paşve dixîm, ez ê di navbera du rojan de ji te re bêjim."

[50] Wê rojê hevdîtin bi wî qasî ma. Dema ku roja wê bersiv bihata dayîn hat, tam di wextê wê de hevdû dîtin; Kleomenes, ji Arîstagoras pirsî; gelo rêya ji deryayê dest pê bike ya di navbera Îonîayê û seraya hikumdar de çiqas e. Arîstagorasê heta wî wextî bi zîrekî diaxift û yê din kiribû qefesê, li vir gaveke şaş avêt; bi rastî heke dixwest Spartayîyan bikşîne Asyayê, pêwist bû ev negotaya; halbûkî saf saf îtîraf kir ku ev sê meh rê ye. Wî wextî Kleomenes gotin kurt birî, guhê xwe neda îzahên Arîstagoras ên wê di warê rê de bikirina û bersiv da, got: "Biyanîyê Mîletosî, hê roj derneketîye ji Spartayê derkeve û here, Çirku tu peyvên ku bi guhên Lakedaîmonîyan xweş bên nabêjin, lê tu dixwaze rêwîtîyeke ji qeraxa deryayê rêya sê mehan bide ber me.

[51] Kleomenes bi vî awayî axift; piştre vegerîya mala xwe. Arîstagoras çiqeke zeytûnê girt û çû mala Kleomenes; wekî bi sifetê xwedîyê daxwazkerekî çû balê, xwest keça wî derkeve ji derve û guhê xwe bidêyê; ji ber ku keça Kleomenes ya navê wê Gorgo, li ba bavê xwe li ser pîyan disekinî; ewladê wî ya tekane bû û wî wextî hejdeh-nozdeh salî bû. Kleomenes jê re got, keça wî ya biçûk dikare bimîne, çi dixwaze bêje bila bêtirs bêje. Li ser vê Arîstagoras, bi gotinên, heke tu yên ez dixwazim bikî, ez ê deh talantan bidim, dest pê kir. Kleomenes, çiqas îşaretên tên wateya "nabe" dikirin, Arîstagoras zêde dikir, dema ku derket 50 talantan keçik qêrîya: "Bavo, heke tu bernedî neçî, wê ev biyanî te bixapîne!" Kleomenesê bi van nesîhetên keça xwe şa bû, li ser van

gotinên wê rabû, derbasî odeke din bû û Arîstagoras, ji vî cihê ku firseta rêya bigehe Hikumdarê Mezin hê baştir bide naskirin nedît, derket çû.

RÊYA HIKUMDAR

[52] Em ê bi xwe jî li ser vê rêyê hinek tişt bêjin: Seranserê rê avahîyên hikumdarîyê û kerwanserayên gelek xweşik hene; her tim di cihên insan hene û rêyek ku mirov di nav ewlehîyê de derbas dibe. Di hindurê Lîdyayê û Frîgyayê de seranserî bîst stathmetîkos yan jî qonaxan dirêj dibe ku, ev dike 94,5 parasang. Li sinorê Frîgyayê mirov rastî Rûbarê Halysê(Rûbarê Sor) tê, ji bo mirov vî rûbarî derbas bike pêwist e ji rêzêçiyayên hakimî vir in û keleheke giring ya rûbar di bin çav de digre derbas bike. Piştî mirov vir derbas kir, heta sinorên Kîlîkîayê di nava Kappadokîayê de 28 qonaxan, yanî 400 parasang diçe; hûn ê ji sinor du rêzeçiyayan derbas bikin û di ber du kelehan re bibhurin. Ji wir wê de, rêya ji nav Kîlîkîayê derbas dibe sê qonax, 15,5 parasang e. Sinorê di navbera Kîlîkîayê û Ermenîstanê de rûbarek e ku di nav de keştî dixebitin û navê wê Firat e. Di nav Ermenîstanê de ku her yekî bi garnîzonekê tê meşandin, rêya 15 qonaxan heye, ew dike 56,5 parasang. Vê herêmê çar rûbarên ku keştî tê de dixebitin av dide; mirov van derbas neke nikare biçe. Ya yekê Dîcle ye, ya duyem û sêyem ji eynî cihî dernakevin û ne rûbarek tenê ne lê navê wan yek e. Yê yekê ji Ermenîstanê û yê duyem ji welatê Matîenê tê. Navê yê çarem Gyndes e; ew rûbarê ku berê Kîros ew kiribû 360 kanal ev e. Dema mirov ji Ermenîstanê derbasî welatê Matîenê dibe, çar qonax heye û piştî mirov gihişt Kîssîayê, heta Khoaspesa ku bajarê Sûsayê li ser hatîye damezirandin û tê de xebata keştîyan pêkan e, 11 qonax, 42,5 parasang rê ye. Yekûna temamê van qonaxan 111 e; Belê, hejmara qonaxên di navbera Sardes û Sûsayê de ev in.

[53] Heke rêya hikumdarîyê bi parasangan baştir bê pîvan û parasangek 30 stad bê hesêbkirin ku bi rastî jî evqas e, ji Sardesê heta qonaxa hikumdar ya jê re "Saraya Memnon"ê tê gotin, 13. 500 stad dikşîne, ji ber ku 450 parasang e. Rojê 150 stad bê stendin, mirov dikare vê rêyê tam di 90 rojan de derbas bike.

[54] Belê Arîstagorasê Mîletosî, dema ku ji Kleomenesê Lakedaîmonî re digot mirov heta qonaxa hikumdar pêwist e sê mehan bimeşe, rast digot. Heke ke-

sek rabe Li ya rastir bigere, ez ê qismê di navbera Sardesê û Ephesosê jî têkim ser û ji Deryaya Hellenê heta Sûsayê (bajarê jê re Memnon tê gotin ev e) 14. 040 sitad e bêjim; ji ber ku navbera Ephesos û Sardesê 540 stad e, ew sê mehên hatine nîşandan bi vî awayî hewce ye mirov sê rojên din dirêj bike.

RIZGARÎYA ATÎNAYÊ JI HIKUMRANAN – NIVÎSA YÛNANÊ

[55] Arîstagorasê ji Atînayê hat derxistin çû Spartayê; Atînayî ji hikumranên xwe wiha rizgar bûbûn: Hîpparkhosê birayê Hîppîasê Hikumran û kurê Peîsîstratos, di xewna xwe de dîtibû wê çawa bimre û bi destên Arîstogeîton û Harmodîos yên berê ji Gephyrayê[207] hatibûn, can dabû; Atînayî piştî mirina wî jî çar salan ji destê zordestîya ku qet nerm nebû, heta hê jî giran bû kişandibûn.

[56] Xewna Hîpparkhos ev bû: Şeva berîya cejna Panatheneyê,[208] mirovekî bejindirêj û gelekî sipehî li Hîpparkhosê peyda bû û ev tiştanok jê pirsîn:

Ey şêr, bêtirs li ber qedera xwe ya bi felaket bide
Baş zanibe ku, tu xerabî bêbedel namîne.

Dema ku sibehê xewna xwe ji şirovekarên xewnan re got; piştre guh neda yên jê re hatin gotin, alaya ayînê îdare kir û li wir mir.

[57] Gephyrayîyên ji nesla yên Hipparkhos kuştin, dibêjin ku eslê wan ji Eretrîayê ye; lê li gor lêkolîna min, bi rastî ev Fenîkeyî ne û ew bi Kadmos

207 Navê kevin yê Tanagraya li Boîotîayê Gepnyra ye. Harmodîos û Arîstogeîton, di sala 514an de Hîpparkhos kuştine. Atînayîyan ew mêrxas hesibandine. Bi navê wan besteyên mûzîkê çêkirine, ku di wê de navê van herdu mêrxasan "Yên hikumran kuştin û wekhevî damezirandin" tên bibîranîn. Lê Atîna, wê kuştina Hîpparkhos zû ji bîr bike, sedsalek piştre Thukydîdes, wê binivîse ku di vî warî de tiştek nayê bîra Atînayîyan (Thukydides I. 20).

208 Panathene. Cejna herî mezin ya li Atînayê bi navê Xwedawenda parastina sîteyê Athene tê pîrozkirin. Peplosa nû ya keçên ciwan yên Atînayî heta dawîya Hekatombeonê (tîrmeh-tebax) amade dikirin bi alayî dibirin perestgehê û pêşkêşî Atheneyê dikirin. Peplos, çevreya neqişkirî ya pêşkêşî xwedawendê dikirin. Rojên berîya cejnê şahîyên mezin tên kirin, xwenîşandanên govend, dans û koro dihatin pêkanîn.

re hatine ew welatê ku îro navê wê Boîotîa ye; li wir, li erdê Tanagrayê yê ku felekê ji wan re veqetandibû rûdiniştin. Cara pêşî Argosîyan Kadmosî raqewirandin; piştre jî Gephyrayîyên me yên ji alîyê Boîotîayan ve hatin raqewirandin, bar kirin hatin Atînayê. Atînayîyan bi hinek mercan ew kirin nav hemwelatîyên xwe; ew ji derveyî hinek îmtîyazên ku ne hêja ye mirov li vir binivîse hiştin.

[58] Ev Fenîkeyîyên ez behsa wan dikin, hevrêyên Kadmos ê Gebhyrayî, piştî li vî welatî bi cih bûn, gelek zanyarî anîne Yûnanistanê û bi taybetî nivîs anîne ku, ez texmîn nakim ku Yûnanî ev berê zanibin; di destpêkê de hemî tîpên Fenîkeyîyan bikar dianîn; piştre bi demê re wekî xwendina wan şiklê îşaretan jî hatin guhertin. Wî wextî piranîya li welatên dorê dijîyan Îonîayî bûn; wan alfabeya Fenîkeyîyan wergirtine, hinekî guhertine û bikar anîne û di parastina navê "nivîsa Fenîke"yê de pirsgirêk nedîtine ku ya rast jî ev bû, ji ber ku Fenîkeyîyan ev tîp anîne Yûnanistanê. Heta Îonîayî rîayetî adetên kevin dikin, îro jî ji kitêbên li ser papîrûsê hatine nivîsandin re diphtera yan jî kitêba li ser çerm hatîye nivîsandin dibêjin, ji ber ku berê pelên papîrûsê kêm peyda dibûn, nivîs li ser postên mih yan bizinan dihatin nivîsandin. Niha jî gelek barbar, ji bo nivîsandinê çerm bikar tînin.

[59] Min jî tîpên Kadmosîyan li Thebaîya Boîotîayê, di perestgeha Appolon ya Îsmenîosê de dîtin; li ser sê heb sêpêyan hatine kolandin û piranîya wan dişibin tîpên Îonîayê. Nivîsa li ser sêpêyek ev e:

"Pêşkêşîya Amphîtryonê ji Teleboaîyê vegerîyaye"

Tarîxa vê nivîsê, bi qasî tê fêhimkirin di dema Laîosê kurê Labdakosê kurê Polydorosê kurê Kadmos de ye.

[60] Rêza hexametron a di sêpêya duyem de:

"Skaîosê pêşbirka kulmbazîyê qezenc kir ev nimûneya
Sen'etê zirav pêşkêşî Xudayê Apolon yê Tîravêj kir"

Gelo ev Skaîos, nikare bibe kurê Hîppokoon yê di zemanê Oîdîpûsê kurê Laîos de jiyaye? Belkî jî yê ev dîyarî daye, kesekî eynî navê kurê Hîppokoon lê, Skaîosekî din e.

[61] Di sêpêya sêyem de jî cardin rêza hexametron bi vî awayî ye:

"Hikumdar Laodamos ev nimûneya sen'eteke zirav
Ev sêpê ji Tîravêjê Dijwar re pêşkêş dike"

Vekişîna ber bi Enkheleayê ya Kadmosîyên ku ji alîyê Argosîyan ve hatine raqewirandin, di dema hikumdarîya vî Laodamasê kurê Eteokles de ye; wî wextî Gephyrayîyên li welat hatin hiştin, piştre di bin zexta Boîotîayîyan de koçî Atînayê kirin û li Atînayê li gor ûrf adetên xwe perestgeh ava kirin. Atînayîyên din nediçûn van perestgehan; ew dezgeh ji perestgehên ayînên din cihê bûn; bi taybetî em dikarin perestgeha Demeter ya li Akhaîayê û Mysterên wan wekî nimûne nîşan bidin.

[62] Min behsa xewna Hîpparkhos û kokê Gephyrayîyan yê ji nesla kesên ew kuştin kir; niha ez ê vegerim ser mijara min di destpêkê de girtibû dest ku Atînayî çawa ji hikumranan rizgar bûn. Hîppîas hikumranî girtibû dest û ji ber mirina Hîpparkhos kîna Atînayîyan ketibû dilê wî. Alkmaîonîdîyên[209] ku malbateke Atînayî bûn û ji alîyê Peîsîstratîdan ve ji Atînayê bi zorê hatibûn koçberkirin, bi Atînayîyên din yên koçber re yekîtî pêk anîn, xwe ceribandin ku êrîşeke bi qewet bikin û bi vî awayî vegerin Atînayê; lê negihiştin armanca xwe, gavek avêtin ji bo hikumranîyê bixin, lê rastî têkçûneke mezin hatin; wî wextî li Leîpsîdriona jora Paîonîayê berhev bûn û li himberê Peîsîstratîdan dest bi hazirîyê kirin. Di wê navê re ji bo avakirina perestgeha Delphoîyê ya niha ku hê wî wextî nehatibû çêkirin, bi Amphîktyonîyan re li ser destheqê bi qubale li hev kirin. Ew dewlemend bûn, ji bilî vê şexsên giring yên ji malbateke kevin bûn, ji bo avakirina perestgeheke muhteşem, ji ya hatibû plankirin hê pêştir çûn; li gor lihevhatinê wê avahî ji kevirên tûfê/esfencî bihata çêkirin, lê temamê rûyên wê bi mermerên Parosê hatin rûkêşkirin.

[63] Li gor yên Atînayî dibêjin, ev kesên han yê li Delphoîyê bi cih bibûn, bertîl didan Pythîa, dema ku kesek ji bo şêwrê ji Spartayê dihat, mijara şêwrê dixwaze li ser karekî taybet be, dixwaze jî li ser karekî dewletê yan jî

209 ... Çîroka di navbera Alkmaîonîdî û Sîkyon de derbas bûye, wê piştre bê (kitêb 6, beş 125 û yên piştî wê). Di nav malbatên Atînayê yên herî dewlemend û xwedî xatir de bûn...

şer be, ew ji bo Atînayê rizgar bikin şîret li wan dikirin. Ji ber ku Lakedaîmonîyan eynî bersiv werdigirtin, di dawîyê de Ankhîmolîosê kurê Asteryê ku hemwelatîyekî naskirî bû, ji bo Peîsîstratîdan ji Atînayê raqewirîne bi arteşekê re şandin; di gel ku di navbera wan de peywendîyê cîrantîyê yên baş hebûn; lê emrê xuda di ser peywendîyên insanan re digirtin. Ji ber wê ew bi rêya deryayê şandin. Ankhîmolîos, xwe da ber Phaleronê û esker kişandin bejahîyê. Peîsîstratîdî di pêşîyê de bi rewşê hesiyabûn û ji Thessalîayê hêzên alîkar anîbûn, ji ber ku di navbera wan û wî welatî de peyman hebû. Thessalîayî, li ser daxwazê bi yekdengî û hikumdarê wan Gonnos di bin fermandarîya hemwelatîyê xwe Kîneas de hezar siwarî şandin; Peîsîstratîdîyên ku ev alîkarî bi dest xistin, fikra vê taktîkê kirin: Temamê darên li rasta Phaleronê birrîn, saheya ku ji bo êrîşa siwarî hat amadekirin, kir ku Lakedaîmonî gelek kesan wenda bikin, Ankhîmolîos jî di nav qurbanan de bû. Yên canê xwe xelas kirin mecbûr man vegerin keştîyan. Sefera yekem a Lakedaîmonîyan bi vî awayî temam bû. Gora Ankhîmolîos, li Attîkayê li rexê perestgeha Herkules ya li Kynossargesê, li navçeya Alopekaîyê ye.

[64] Li ser vê, Lakedaîmonî seferek hê bi hêztir amade kirin û şandin ser Atînayê; vê carê artêş ne di ser deryayê re, di bejahîyê re şandine û Kleomenesê kurê Anaxandrîdasê hikumdarê xwe kirine serokê wê. Vê artêşê Attîka îstîla kir û pêşî ketin ber êrîşa siwarîyên Thessalîayê; lê Thessalîayî di demeke kurt de 40 kes li erdê hiştin û paşve ketin; yên canê xwe xelas kirin rast baz dan Thessalîayê. Kleomenes heta bajêr meşîya, bi Atînayîyên terefdarê azadîyê re yekîtî çêkirin, hikumranên ku xwe kiribûn keleha Pelasgê dorpêç kirin.[210]

[65] Heke tesadufeke ku ji bo dijminê Lakedaîmonîyan bê şensî û ji bo wan şens bû nebûya, nikarîbûn Peîsîstratîdî ji vir derxistina, -ji ber ku niyeta wan tunebû dorpêçê direj bikin, xwarin û vexwarina Peîsîstratîdîyan zêde bû- piştî çend roj dorpêçê wê vegerîyana Spartayê; Peîsîstratîdî ji bo bişînin cihekî ewle zarokên xwe bi dizî revandibûn, ew ketin dest. Vê bûyerê, rewşa Peîsîstratîdîyan ji binî ve guhert; bedelê rizgarkirina zarokên wan gelekî

210 Keleha Pelasgê. Cara pêşî Atîna li girê Akropolê hatîye avakirin. Hesareke mezin bû, dîwarên wê 4-6 mêtro fireh bûn. Qasî tê neqil kirin, Pelasgîyan keleh çêkirine, ji bo heqê destkarîyê nêzîkî Hymettosê erd dane wan. (Kitêb 6, beş: 137).

giran bû, Atînayîyan xwestin di navbera pênc rojan de ji Attîkayê derkevin, li ser vê vekêşîyan Sîgeîonaya li ser Skamandros. Wan li Atînayê 36 salan hikum meşandine; ʻeslê wan biyanî bû, ji Pylosayê hatibûn, bi Kodros û Melanthosên ku berîya wan hatibûn Atînayê û li vir hikumdarî danîbûn, ji eynî neslê ne, ji nesla Neleûs dihatin. Ew ji bo girêdayî adetên xwe bin, Hippokratos, navê Peîsîstratosê kurê Nestor li kurê xwe Peîsîstratos kirîye. Atînayî ji hikumranan bi vî awayî rizgar bûne; niha jî ez ê behsa piştî rizgarîyê û serhildana Îonîayîyan li hemberî Daryûs, yanî berîya alîkarî xwestina wan ji Arîstagorasê kurê Mîletosî, çi kirine û çi hatîye serê wan, bikim.

[66] Atîna jixwe mezin bû, lê piştî ji hikumranan rizgar bûn hê mezintir bû. Du kesan iktîdar parve dikirin, Alkmaîonê ewil Kleîsthenes yê Pythîa ji rê derxistibû û yek jî Îsagorasê kurê Teîsandros yê min behsa koka wan nekirîye ku eslê wan diçe digehe demên kevin yên ji xanedanên bi nav û deng. Lê baş tê zanîn ku wan ji Zeûsê Karyayê re qurban jêkirine. Pevçûna van kesan li ser iktidarê rê ji tevlihevîyan re vedikir; dema ku Kleîsthenes qels ket ji xelkê alîkarî xwest. Çar hozên Atînayê bi ser deh beşan parve kirin; navê wan çar hozan ji navên kurên Ion yên bi navên Geleon, Aîgîkoreûs, Argades û Hoples dihatin, tevde guhertin û navê mêrxasên xwecih dane wan, tenê yek jê, ji bo ku ew jî mitefiq û cîran bû, navê Aîas yê biyanî bû lê kir.

[67] Li gor min, Kleîsthenes di vî warî de, Kleîsthenesê hikumranê Sîkyonê yê ji alîyê dê de bapîrê wî bû nimûne wergirtîye. Bi rastî ev Kleîsthenesê han, qedexe kirîye ku Rhapsodosî şiîrên Homeros bixwînin, ji ber ku van şiiran bi piranî wesfê Argos û Argosîyan dida, halbukî ew bi Argosîyan re di nav şer de bû; piştre li Sîkyonê jî tam di navenda agorayê de perestgeha ji mêrxasan kurê Talaos a Adrastos hebû, Kleîsthenes, ji bo Argosî ye xwest vî mêrxasî jî ji welat bavêje. Ew çû Delphoîyê û şêwirî ka gelo "ez dikarim dînê Adrastos rakim?"; Pythîa bersiv dayê û got, "Adrastos, hikumdarê Sîkyonê bû, lê tu haydutekî hewce ye bê recimkirin!" Lê nêrî ku xuda vê qencîyê pê nake, di vegerê de ji bo Adrastos bi xwe biçe dest bi lêgerîna çareyan kir. Dema di dil xwe de çare dît, agahî da Boîotîayê, ji Thebaîyîyan re xeber şand ku ew dixwaze Melanîpposê kurê Astakos bigre nav sîteya xwe; Thebaîyan jî jê re peykera vî mêrxasî şandin. Wî wextî Kleîsthenes, Melanîppos şand Sîkyonê, heta li Prytaneîonê mihrabek veqetand û peyker danî cihê herî baş

tê parastin. Kleîsthenes, Melanîpposê wê danîbûya wir, (divê ev îzah lê bê zêdekirin) ji ber ku Melanîppos, dijminê Adrastos bû, birayê wî Mekîstes û zavayê wî Tydeûsê kuştibû. Ne bi dilê wî bû jê re perestgehek bê veqetandin, qurban û cejna wan jî rakirin û ev dan Melanîppos. Xelkê Sîkyonê hîn bûbû ku rêz lê Adrastos bigre, ji ber ku ev welat berê yê Polybos bû, kurê yek ji wan keçên Adrastos û Polybos bû û dema bêyî warîs bihêle miribû dewlet jê re hiştibû. Di nav gelek tiştên Sîkyonîyan de yên wî payebilind kirine, di koroyên wan yên trajîk de, behsa felaketên hatibûn serê wî jî dikirin, ji ber ku merasim ne li ser navê Dîonysos, li ser navê Adrastos dihat kirin. Kleîsthenes koro paşde da Dîonysos û şahîyên din jî ji Melanîppos re veqetand.

[68] Yên ji bo Adrastos kirin ev bûn. Ji bo navên hozên Dorîs yên li Sîkyonê ne wekî yên li Argos bin, ew guhertin; heta ji bo henekên xwe bi Sîkyonîyan bike, ji navên îbtîdayî paşgir li hev anîn û navên nuh wekî beraz, ker û yên din li wan kirin; lê ji bo hoza xwe wiha nekir, ji bo desthilata xwe bide nîşan jî navê qebîleyê kir Arkhelaoî (yanî, birêvebir). Navên yên din bûn Hyatîayî, Oneatîayî û Khoîrîayî.[211] Ev navên han wekî di zemanê Kleîsthenes de, piştî mirina wî jî 60 salan li Sîkyonê hatin bikaranîn; van navên pêkenînê piştre bi navên Hylleûsî, Pamphylîayî û Dymanatîayî hatine guhertin; cardin navê hoza çaran jî guhertine û kirine Aîgîlaîos, ev nav ji Aîgîlaîosê kurê Adrastos hatîye wergirtin.

[69] Belê Kleîsthenesê Sîkyonî bi vî awayî kirîye;[212] Kleîsthenesê Atînayî, kurê yek ji keçên vî Kleîsthenesê yekem yê navê wî wergirtîye jî, ew nizimdîtina bapîrê wî ya li himber Dorîsîyan, eynî tişt wî ji bo Îonîayan kirîye û ji bo hozên Atînayê eynî navên Îonîayan wernegirin, eynî tiştên hevnavê wî Kleîsthenes kirine, wî jî kirîye. Atînayîyên ku berî wî bi temamî li derveyî polîtîkayê mabûn, piştî bi doza xwe dan bawerkirin, navê hozan guhertîye,

211 Khoîrîataîyî. Di Yûnanîyê de, Khoîros dihat maneya berazê şîrî, Hys beraz yan jî berazê berî û Onos jî ker. Gotina Arkhelaîyê ji du bêjeyan hatîye çêkirin, tê maneya qebîleya berpirsiyar û rênîşander.

212 Ji ber ku Kleîsthenes ji sê bira yê herî biçûk bû, melhezeya derketina wî ya ser text nedihat kirin. Hatibû zanîn ku birayê mezin Myron, bi jina birayê xwe yê navîn Îsomedes re zina kiribû, Kleisthenes vê firset dibîne û yê navîn han dide, yê navîn yê herî mezin dikuje. Kleîsthenes rêya bi yê navîn re derketina ser text dibîne, dûra cardin rêyek dîtîye yê navîn jî raqewirandîye û ew bi tenê hikumdar maye.

hejmara wan zêde kirîye. Hejmara serokên hozan ji çaran derxistine dehan, xelkên di nav van hozan de jî kirîye deh grub. Bi saya piştgirîya xelkê, ji yên hemberî xwe bi hêztir bûye.

[70] Li milê din Îsagorasê ku rewşa wî ketîye xetereye, fikirîye alîkarîyê ji Kleomenesê Lakedaîmonî bixwaze, yê ji dema ku Peîsîstratîdî abloqe kiribû heta niha mêvanê wî bû. (Jixwe gotegotên sûcdarkirinê ya ku têkilîyên Kleomenes bi jina Isagoras re hene, hebûn). Kleomenes, pêşî çawîşek şand Atînayê û xwest Kleîsthenes û bi wî re qismek Atînayîyan, yên ji alîyê wî ve "Enageosî", yanî yên bi navê lanetîyan bi nav kiribûn ji bajêr derxîne. Yê kirîye vê ûltîmatomê bide Îsagoras bû; ji ber ku Alkmaîonî û terefdarên wan, di gel ku bi cinayetê dihatin tawanbarkirin, navê wî û yên terefdarên wî tevlî tiştekî wiha nebûbû.

[71] Em bên ser bê çima ji hinek Atînayîyan re lanetî hatîye gotin, Atînayîyekî navê wî Kylon yê lîstikvanê Olîmpîyad qezenc kiribû hebû. Kesekî ji xwe razî bû û çav berdabû hikumranîyê; xortên hevalbendê xwe dan hev û ji bo têxe destê xwe êrîşî Akropolê kir, wextê dît nikare bi dest bixe, xwe avêt ba peykera xuda û li wir rûnişt. Wî wextî Naûkrarosê ku Atîna birêve dibir, Prytaneîonî, ew û hevalên wî ji cihê ku xwe avêtibûnê derxistin; wê hesabê tawanê xwe bidin lê wê dest canê wan nedin, wisa soz dabûn. Halbûkî Alkmaîonî ew bi kuştinê tawanbar kiribûn. Ev bûyer berîya dewra Peîsîstratîdan bû.

[72] Li ser ku Kleomenes çawîşek şand û xwest Kleîsthenes û lanetî ji welat bên derxistin, Kleîsthenes bi daxwaza xwe bi dizî çû; lê dîsa jî Kleomenes bi arteşeke biçûk ve jî be hat Atînayê; çawan hat guhê xwe da gotinên Îsagoras, ocaxa 700 Atînayîyan vala kir. Piştî vê xwest meclisê belav bike û iktidarê bide destê 300 kesên hemwelatîyên terefdarên Îsagoras. Li hemberî israra meclisê ya ji vê razî nebûbû, Kleomenes, bi Isagoras û hevalên wî ve li Akropolê xwe asê kirin. Atînayîyên bi van re hevkarîya wan hebû, ew du rojan mihasere kirin; roja sisiyan teslîm bûn û yên Lakedaîmonî bûn ji welat derketin. Bi vî awayî ew xebera dabûn Kleomenes rast derket; ji ber ku dema dixwestin Akropolê bigrin û hilkişîyan, ji bo bi îlahe bişêwirin ketibûn perestgehê; lê kahîn hê ew ji derî neketibû hindur ji cihê xwe rabibû û wiha gotibû: "Paş-

ve here Lakedaîmonîyê biyanî, tu nikarî bikevî vî cihê pîroz; xuda nahêlin Dorîsî bikevin vir!" -Wî bersiv da û got "Lê jinik, ez ne Dorîsî me, ez Akhaîayî me." Lê bêyî ew guhê xwe bide van gotinan, karê xwe kiribû. Lê ew bi Lakedaîmonîyan re paşve hat. Em bên şirîkên wî yên tawanê, Atînayîyan ji bo wan bikujin ew avêtin hepsê; Tîmesîtheûsê Delphoîyî yê li ser karên kirîye û mêrxasîya daye nîşan, gelek gotin hene bên gotin, di nav wan de bû. Ev mirov avêtine hepsê û temenê xwe tê de derbas kirine.

[73] Atînayî, Kleîsthenes û 700 kesên Kleomenes ew ajotibûn paşve xwestin; piştre ji bo bi Persan re peyman çêkin qasid şandin Sardesê; ji ber ku dizanîbûn dê ew bi Lakedaîmonîyan û Kleomenes re bikevin şerekî. Qasidên hatin Sardesê, ji walîyê Sardesê Artaphrenesê kurê Hystasp re ji bo çi hatine gotin; wî ji wan kesên ku dixwazin bi Persan re peyman çêkin, ji kîjan miletê ne û li kîjan welatî rûdinin pirsî; piştî yên dixwestin hîn bû, bi vê formûla kurt bersiv da wan? "Heke Atînayî erd û av bidin hikumdar Daryûs wê peyman çêbibe; heke bi vê razî nebin, ji kerema xwe re bila vegerin welatê xwe." Qasidan bersiva razî bûnê dan -ji ber ku bi biryar bûn vê peymanê pêk bînin. Lê dema ku vegerîyan welatê xwe ji bo vê bersivê rastî êrîşên tund hatin.

[74] Di vê navê re, Kleomenes ku zanîbû Atînayî wî hem bi gotin û hem jî bi tevgerên xwe wî dikin qeşmer, ji temamê Peloponezê artêşê berhev dike, lê cihê wê biçe veşartî dihêle; mebesta wî tole ji Atînayîyan werbigire û Îsagorasê ku piştî ji Akropolê derket pê re hatibû cardin bike hikumran. Ji bo vê Kleomenes bi hêzên mezin girt ser Eleûsîsê, Boîotîayî jî pişt dan peymaneke di navberê de, demosên sinorê Attîkayê yên Oenoe û Hysîaî stendin; Khalkîsîyên li qiraxên hember jî ketibûn Deşta Attîkayê, her der talan dikirin. Atînayîyên ji çend alîyan ve rastî êrîşê hatin, mihasebeya bi Boîotîayan û Khalkîsîyan re hiştin piştre, li himberî Peloponezîyên li Eleûsîsê baregeha xwe vedabûn rawestîyan û ketin nav pergala şer.

[75] Tam wê herdu milan dest bi şer bikirina, pêşî Korînthosîyan ferq kirin ku ev karê dikin ne rast e û bêpayîn paşve vegeriyan, çûn; Demaratosê kurê Arîston jî wekî wan kir; ev hikumdarê Spartayê bû; bi Kleomenes re li hev kiribû û hêzên Lakedaîmonî girtibû hatibû û berîya niha di navbera wan

de tu nêrîneke cihê çênebûbû. Dema ku li Spartayê artêş biçe şer, qanûna qedexekirina ku herdu hikumdar bi hev re biçin şer, li ser vê lihevnekirinê hatibû derxistiin. (Ji ber ku heta wî wextî herdu jî beşdarî şer dibûn.) Piştî ji herdu hikumdaran yek ji fermandarîyê hat stendin, biryar hat dayîn ku ji herdu Tyndareosên[213] heta wî wextî wekî xudayê parastinê bi artêşê re diçûn, yek ji wan li Spartayê bê hiştin. -Qismê mayî yê artêşê yê hevalbendan yên li Eleûsîsê berhev bûbûn jî dema ku nelihevkirina navbera hikumdarên Lakedaîmoyan û paşvekêşana Korînthosîyan dîtin, belav bûn û her yek jê çûn welatê xwe.

[76] Ev îstîlaya çarem a Attîkayê ji alîyê Dorîsîyan ve ye; du car wekî dijmin û du caran jî ji bo alîkarîya xelkê Atînayê bikin hatine. Hatina wan a cara yekê zemanê kolonîkirina Megarayê ye. (Ji vî şerî re Şerê Kodrosê dikare bê gotin, ji ber ku wî wextî hikumdarê Atînayê ew bû.) Sefera duyem û sêyem, ji bo Peîsîstratîdê bavêjin çûne; cara çarem jî ya ez behis dikim ew e, di bin birêvebirîya Kleomenes de Eleûsîs stendine. -Sefera çarem a Dorîsîyan li himberî Atînayê kirine ev e.

[77] Li ser ku hevalbend bêyî serkeftinê bi dest bixin belav bûn, Atînayî ketin ber hêrsê tolegirtinê û pêşî meşîyan ser Khalkîsîyan. Lê Boîotîayî meşiyan ser Eûrîposê û bazdan hawara Khalkîsîyan. Atînayîyên ev hêza nû dîtin, biryar dan dev ji Khalkîsîyan berdin pêşî êrîşî Boîotîayîyan bikin. Û avêtin ser wan, serkeftineke mezin bi dest xistin; gelek jê kuştin, 700 hêsîr girtin. Eynî rojê Tengava Eûboîayê derbas kirin û ji bo bi Khalkîsîyan re şer bikin meşîyan, ew jî mexlûb kirin û li ser erdên ku kerîyên mezin dihat xwedîkirin, 4 hezar klerûkhos[214] hiştin: Ji Khalkîsên dewlemend yên xwedî milk re wiha digotin. Temamê yên sax hatin girtin, bi girtîyên Boîotîayî re li zincîrê hatin xistin û kirin hepisxaneyan. Lê qasek şûn de di miqabilî du

213 Kaston û Pollûks. Du Tyndareos. Dînekî gelek kevin yê li Lakonîayê ye. Dema Dorî hatine Peloponezê ev dîn qebûl kirine.

214 Li Atînayê ji cihên bi şer dihatin sitendin yan jî ji kolonên dişandin welatên hevalbend re klerukhos dihat gotin, ev ji yên diçûn ji bo li cihekî kolonî deynin cihê bûn. Yên cihekî vala bidîtina û li wir kolonî damezirandina dibûn dewleteke cihê, lê klerukhosî wekî hemwelatîyên Atînayê diman, dewleteke cihê danetanîn. -Yên kerîyên mezin xwedî dikirin, bi taybetî hemwelatîyên Khalkîs û Eûboîayî bûn yê ku bi xwedîkirina hespan dewlemend bûbûn.

manayan de serbest hatin berdan. Ew zincîrên li van dan li Akropolê hatine daliqandin; di zemanê min de jî milê perestgehê yê li rojavayê dinêre, li ser dîwarên ku Medan gelek cihê wê şewitandibûn, daliqandî bûn. Ji dehan yekê ku filitînê, ji bo erebeya çar hespî ya ji bronzê hatîye çêkirin ya Atînayîyan ji Pallasê re pêşkêş kiribûn, hat veqetandin; pêşkêşa ewil ya dikevin milê çepê yê dema ziyaretvan dikevin Propûlaîona Akropolê ev e; li ser ev kitabe/lewha heye.

Khalkîsî û Boîotîayî xwe li cihekî hişk dan
Zarokên Atînayî êrîşên wan şikandin;
Hesin û zindanên tarî xirûra wan tefandin,
Pallas, ji dehan yekê van mehînan qebûl bike.

[78] Atîna ji van felaketan mezinbûyî derdiket; azadî û wekhevî tiştên bi qîmet in, ne ji bo carekê, ji bo her wextî çiqasî rast e! Atînayê di bin birêvebirîya hikumranan de, di hêla eskerî de, ji yek miletên cîran ne bilintir bû; lê dema ji hikumranan(tyranan) xelas bûn derketin pêş, ev jî vê dide xuyakirin ku di bin emrê efendîyekî de hemwelatî ne bi dilê xwe hereket dikin, ji ber ku ji bo efendîyekî dixebitin, lê dema ku azad dibin, êdî ew tiştê bûne wekî zarokên wan, bi can û ruh diparêzên.

ŞERÊ DI NAVBERA ATÎNA Û THEBAÎ Û AÎGÎNAYÊ DE

[79] Belê, qedera Atînayîyan wiha bûye. Piştî vê Thebaîyên ku xwestin ji Atînayîyan tole werbigirin, qasid şandin Delphoîyê. Pythîayan ji wan re gotin, hûn tenê bi hêza xwe nikarin tole werbigirin û şîret li wan kirin, got "Pêşî iş hewaleyî gevezeyan bikin, piştre biçin hêvî û lavayê ji kesên herî nêzîkî wan bikin." Şêwirmendan Meclisa Xelkê berhev kirin û gotinên kahîn ji wan re gotin; dema ku Thebaîyan nesîheta hêvî û lava ji kesên herî nêzîkî xwe bikin, seh kirin, gotin ku: "Ev çiye! Cîranên me yên herî nêzîk ma ne Tanagra, Koronaî û Thespîayî ne? Ev her wextê bi me re beşdarî şer dibin. Em ji bo çi hêvî û lavayê li wan bikin? Gelo manaya kehanetê tiştekî din e?"

[80] Di nav van şiroveyan de, yê kahîn fêhm kiribû, ji nişkave derket û got: "Ez ne şaş bim min fêhm kir ka îlah ji me re çi dibêje. Tê gotin du keçên

Asopos hebûn,[215] Thebe û Aîgîna; madem ev xwehên hev in, bi min wisa dixuyê ku, xuda dixwaze ji bo em heyfa xwe hilînin lazim e em hêvî û lavayê ji Aîgînayan bikin." Yek ji wan fikrên din evqas bi aqilane nedihatin dîtin. Di cih de ji Aîgînîayan re xeber şandin, kahîn nîşan dan û alîkarî ji wan xwestin, ji ber ku ew pismamê wan yên herî nêzîk bûn. Li ser vê daxwazê Aîgînayan soz dan, ji bo li rexê wan bikevin şer wê Aîakîdîyan bişînin.

[81] Thebaîyî, bi alîkarîya Aîakîdîyan ji nû ve dest bi şer kirin, lê Atînayîyan ew perîşan kirin. Wî wextî ji Aîgînayan re qasidên din şandin. Aîakîdî paşve vegerandin û di cihê wan de kesên din xwestin. Aîgînayên ku ji ber refahê pozê wan bilind bûbû, kîneke berê ya li hemberî Atînayîyan hate bîra wan, li ser lavaya berdewamî ya Thebaîyan, berî qasid bişînin û bi fermî şer îlan bikin, li hemberî Atînayê şer li dar xistin. Atînayîyan her tim Boîotîayî dixistin tengayîyê de. Aîgînayî jî li keştîyên xwe yên şer yên dirêj siwar bûn û çûn Attîkayê. Phaleron û gelek demosên din ên li qeraxan tevde şewitandin. -Ev talankirin ji bo Atînayîyan wendayîyeke gelekî mezin bû.

[82] Sebebê eslê kîna Aîgînayîyan li hemberî Atînayîyan, ev bûyerên ku niha ez ê behs bikim in: Li welatê Epîdaûrosê êdî erd hêşîn nedibûn; ji ber vê felaketê Epîdaûrosî bi kahînê Delphîyê şêwirîn. Pythîa ji wan re pêşniyar kir ku peykerên Damîa û Aûxesîayê daçikînin;[216] dê wî wextî bibînin ku rewşa wan baş dibe; Epîdaûrosîyan vê carê jî gotin, "Bila peyker bronz be yan mermer; Pythîa got, "Herdu jî nabin", dixwest ji darê zeytûnê yê tahmdayî be. Wî wextî ji bo dareke zeytûnê bibirin ji Atînayîyan izin xwestin; bawer dikirin ku zeytûnê herî pîroz yê li Attîkayê ne; ji bilî wê hinekan jî digotin ku wî wextî darên zeytûnê tenê li Attîkayê hebûne. Atînayî razî bûn darekê bidin, lê dê wan jî her salê ji Athene Polîasê û Erekhtheûsê[217] re dîyarî bianîna, ev şert dan ber wan. Dema li ser vê xalê lihevhatin çêbû, Epîdaûrosîyan rahiştin tiştên dixwestin û peykerên îlahî yên ji vê dara zey-

215 Asopos, xwedawenda Boîotîayê ya rûbaran bû; keçên wê Thebe û Aîgîna, nymphayên*("nympha"bi pirayî bi wateya "perî" tê bikaranîn*) parêzvanên îlahî yên van bajaran ku ev nav li wan in. –Aîgînaya ji Zeûs bi hemle bû, Aîakos tîne dinyê û yên ji wan re Aîakosî (Aîakîdî) tê gotin û Aîas û Telamon ji nesla van in.

216 Damîa û Aûxesîa: Îlahên bereketê yê xwecih yê Epîdaûros û Aîgîna ne.

217 Erekhtheûs, yek ji hikumdarên çîrokî yên Atînayê ye, yê ku weke 'tov direşîne erdê' tê zanîn.

tûnan hatin çêkirin, li erdê xwe çandin; erdê wan dest bi bereketê kir û wekî bi Atînayîyan re li hev kiribûn, baca xwe dan.

[83] Wekî ku berê jî bûbû, wê dewrê jî Aîgînayî hemwelatîyên Epîdaûrosîyan bûn; bi taybetî ji bo dozên di navbera xwe de safî bikin, fêhim bikin bê kî xwedî heq e û kî neheq e, derya derbas dikirin diçûn Epîdaûrosê. Lê ji vê demê şûn ve dest pê kirin ji xwe re keştî çêkirin û guh nedan nesîhetên ku ihtiyatê ji destê xwe bernedin, li himberî Epîdaûrosîyan serî hildan. Şer dest pê kir, wan ji serdestîya xwe ya li deryayê sûd wergirtin welatê dijmin talan kirin, peykerên Damîa û Aûxesîa jî rakirin û birin erdê xwe û di navenda welatê xwe de, bîst stad ji bajêr wê de, li cihekî ku jê re Oîa dihat gotin daçikandin. Ji bo xêr ji van xudayên peykerê wan li wir daçikandin bibînin, qurban pêşkêş dikirin û Koroya Jinên Dijûnker vediqetandin; ji her îlahekê re deh jinên koroyê hatibûn veqetandin; dijûnên koroyan ne li hemberî mêran, li hemberî jinên xwecih bû; ev adetê ayînî li Epîdaûrosê gelek giring bû û li wir hinek adetin din yên vegotina wan qedexe ên nehênî jî hebûn.

[84] Piştî peyker ji destê wan derketin Epîdaûrosî, êdî ew bac nema dan Atînayîyan. Atînayî nerehetîya xwe ji Epîdaûrosîyan re dan xuyakirin. Lê wan gotin ku ev ne sûcê wan e; heta peyker li welatê wan bûn baca xwe dabûn. Wan digotin, heke ew ne li ba wan bin, dayîna bacê dibû neheqî; pêwîst e kesên ew peyker li ba wan in, yanî gerek Aîgînayî bacê bidin. Li ser vê Atînayîyan ji Aîgînayîyan re xeber şandin û peyker xwestin; Aîgînayîyan jî bersiv dan û gotin ku "Tiştekî me yê em bi we re bidin û bistînin tune".

[85] Li gor Atînayî dibêjin, piştî peyker xwestin, trîremek ya tenê wezîfedarên resmî tê de, derket rê, gihişt Aîgînayê, wezîfedaran ew peykerên ku digotin ji darên Atînayîyan hatibûn çêkirin xwestin û ji bo rakin û bibin, dest bi kişkişandina wan ji qaîdeyên wan kirin. Dema dîtin ku nikarin ji qaîdeya wan weqetînin, ben lê girê dan û dest bi kişandinê kirin; wextê kêşan bû gurmîna asman, erd hejîya; yên trîrem anîbûn û ew kesên ben dikêşan dîn bûn û di nav vê dînîtîyê de dest pê kirin wekî dijmin hevdû kuştin, kesek tenê jê ma, yên din tev mirin, ew jî tenê bi serê xwe vegerîya Phaleronê.

[86] Yên Atînayî behs dikin ev e. Lê Aîgînayî dibêjin ku, Atînayî ne tenê bi keştîyekê hatin. (Ne yek, dixwaze bila bi çend keştîyan hatibin, hêza wan

a deryayî jî hebû, dikarîbûn wan bi rehetî paşve bidehfînin.) Dibêjin, hêza deryayî tevde ya wan hatibû himber welatê wan; lê ew li himber wan derneketibûn, di deryayê de neketibûn şer. Gelo ji bo ku zanîbûn di şerekî deryayî de wê nekaribin li himberî Atînayîyan rawestin li himber wan derneketibûn, yan wê çi bikin, cardin wê ew bikirina dev jê berdabûn? Vê nadin diyarkirin. Dom dikin û dibêjin, Atînayî, lênêrîn kesek li hemberî wan dernakeve û şer nake, wî wextî derketin bejahîyê, çûn ba peykeran, lê dema ku nekarîbûn peykeran ji hîmê wan bifeşkilînin, ben li dora wan girê dan û dest bi kaşkirina wan kirin û du peyker bi vî awayî hatin kişandin, - belkî hin kes ji wan bawer bikin, lê ez bi xwe bawer nakim - herdu jî eynî tişt, dema dihatin kişandin herdu peyker li ser çogên xwe ketin û piştre jî her bi wî awayî man. Atînayî, -heke em guhê xwe bidin Aîgînayîyan- ev ên min gotin kirin û Aîgînayî jî dema ku xeber girtin wê Atînayî bimeşin ser wan, serî li Argosîyan dan. Bi vî awayî Atînayî, dema ku derketin Aîgînayê, li hemberî xwe Argosîyên wê Aîgînayîyan biparêzên dîtine; wextê ji Epîdaûrosê hatin Aîgînayê xebera wan ji vê tunebû; Atînayîyan dîtin ku ew dimeşin ser wan û bi keştîyan navbera wan tê birîn, di eynê demê de asman kir xurmîn û erd hejîya.

[87] Yên Argosî û Aîgînayî qise dikin ev in û Atînayî, ji nav wan ku tenê yek filitîye û vegerîyaye Attîkayê hemfikir in. Argosî tenê xirûra mayîna tek kesî ji artêşa Atînayê ji xwe re dikin mal, lê Atînayî vê ji hêza îlahî dizanin. Jixwe dibêjin, yê paşve hat jî gelekî nejîya; mirina wî wiha bûye: Vedigere Atînayê û xeberê dide; jinên hevalên wî yên pê re çûbûn Aîgînayê, dema ku xeber werdigirin ew tenê vegerîyaye hêrs dibin û wî feqîrî digrin, dikin nav xwe, derzîyên xilqandî yên bi mantoyê wan ve dikin laşê wî û mêrên xwe ji wî dixwazin, yê paşve mayî jî bi vî awayî dimre û ji felaketa din zêdetir li ber vê serhildana jinên Atînayîyan ketine. Ji bo ku nikarîbûn jinan bi awayekî din ceza bikin, kincên wan bi kincên Îonî diguherin; ji ber ku berê jinên Atînayî, kincên ku gelekî dişibîyan yên Korînthosîyan ên Dorîs li xwe dikirin. Ji bo careke din derzîyê xilqandî bikar neynin, gomlekên keten li wan kirin.

[88] Di eslê xwe de ev kinc ne yê Îonîyan e, yên Karyanîyan in; ji ber ku temamê kincên millî yên jinên Yûnanê yên berê, weke yên em niha jê re kincên Dorîsî dibêjin. -Li hemberî vê, dibêjin ev buyer kirîye ku di welatê Argosîyan û Aîgînayan de adeta çêkirina derzîyên ji yên heta wî wextî nîv

bejin dirêjtir belav bûye; ev derzîyên han bûn pêşkêşa herî bi qîmet a jinên wan ji van herdu perestgehan re. Ji vê perestgehê re tiştekî ku li Atînayê hatiba çêkirin, bi taybetî firax û amûr nedihatin stendin; êdî li welatê xwe tenê vexwarina bi firaxên li welatê wan dihatin çêkirin bûye adet. Ji wî wextî şûn ve û îro jî jinên Argosî û Aîgînayî, ji bo jinên Atînayî biçûk bixin derzîyên ji berê dirêjtir bikar tînin.

[89] Çavkanîya kîna Aîgînayîyan a li hemberî Atînayîyan ev bûyera me behs kir e. Dema ku Thebaîyî ji wan alîkarî xwestin, Aîgînayên ji ber sebebê van peykeran rastî heqaretê hatibûn coş bûn û bazdan alîkarîya Boîotîayan. Aîgînayan qiraxên Attîkayê wêran dikirin û derbas dibûn; Atînayîyan tam wê hêza deryayî şandibûna ser Aîgînayan, ji Delphoîyê oraklek hat: Pêwist bû di ser vê xerabîya ku Aîgînayan kirine re 30 sal derbas bibûya, sala 31ê gerek ji bo Aîakos perestgehek vekirina û piştre li hemberî Aîgînayan biçûna şer; dê wî wextî serkeftin ya wan bûya. Heke niha têkevin şer, serkeftina dawî dîsa wê ya wan ba, lê di vê navê re li gor pêwistîyên şer, serkeftin wê her ji destekî derbasî destê din bibûya. Piştî Atînayî ev kehanet bihîstin, perestgeha ku niha jî li agorayê li cihê xwe ye, ji bo Aîakos veqetandin, lê piştî ew lekeya Aîgînayan li wan xistibû ya nedihat paqijkirin, nikarîbûn 30 salan bê deng rûnin.

[90] Di hazirîya tolewergirtinê de bûn ku, bûyereke ji alîyê Lakedaîmonîyan ve hat derxistin, kir ku ji rastiyê hay bibin. Lakedaîmonî, hîn bûn ku Alkmaîonîyan Pythîa xapandine û Pythîa li hemberî wan û Peîsîstratîdîyan qelleşî kiriye. Du qat xemgîn bûbûn, ji ber ku mêvanê xwe ji Attîkayê raqewirandine û bi ser de jî ev xizmeta ji Atînayîyan re kirine bi avê de çûbû, li hemberî wê ji wan tiştek wernegirtibûn, ev baş fêhm dikirin. Ji bilî vê, oraklên ku digotin "ji Atînayîyan ji xerabîyê pê ve li hêvîya tiştekî nemînin" jî hebûn; ev oraklên ku eslê wan nedizanîn, Kleomenes anîbûn Spartayê û herkes jî hîn bûbû. Kleomenes ev li keleha Atînayê bi dest xistibûn, ji ber ku ew berîya wê di destê Peîsîstratîdîyan de bûn, wextê baz dabûn li perestgehê hiştibûn, Kleomenes jî ji wir anîbû.

[91] Lakedaîmonîyên ev orakl bi dest xistin û di eynî wextî de dîtin ku hêza Atînayîyan zêde bûye û ne amadeyî serîtewandin û rêzlêgirtina desthilata Lakedaîmonîyan in, ji ber wê gihiştin wê netîceyê, heke ew xelkê Atînayê bi

vî awayî azad bibe, di siberojê de dikarin li dijî Lakedaîmonîyan rabin. Lê heke di bin destê hikumranekî de bijîn, hêza wan wê kêm bibe û neçarî îtaetê bibin. Piştî ev fikir ket serê wan, bangî Hîppîasê kurê Peîsîstratos kirin ku wî wextî tev Peîsîstratîdîyan xwe avêtibûn Sîgeîona li Hellespontosê û li wir diman. Dema ku Hîppîas bang wergirt, hat ba wan. Spartayî ji hevalbendên xwe yên din jî delege dan anîn û bi vî awayî axiftin: "Ey hevalên me yên çekan, me şaşîya kirinên xwe fêhm kir; em bi kahînên sexte xapîyan, yên bi ewqas hisên mêvanperwerîyê ve bi me ve girêdayî û kesên ji bo em Atînayê bigrin bin desthilata xwe dengê xwe dernexistin, me ew ji welatê wan raqewirandin; wek ku ev ne bes be, di gel ku bajar bi saya me gihişt azadîyê, me ew da destê yên li hemberî me û hikumdarê me bêrêzî kirin û raqewirandin. Ev xelk niha bi hêz bû û mezin bû, ji xwe razî bû, cîranên wan Boîotîayî û Khalkîsî vê ji herkesî baştir dizanin -yên nizanin jî wê di gelek nêzîk de, dema ku bixwazin Atînayî tiştekî hindik yê kêmasîya wê his dikin ji destê wan bigrin, wê hîn bibin. Niha madem me şaşîyek kir, em hevkarîyê bikin û vê şaşîyê rast bikin. Belê, va Hîppîas li vir e, me ew û hûn ji bo vê ji bajarên we girtin û anîn vir, da ku em hemû dest bidin hev û wî ji nû ve li Atînayê bi cih bikin û tiştî me ji destan girtibû paşve bidinê."

[92] Belê bi vî awayî axiftin. Lê piranîya hevalbendan ji van gotinan bawer nekirin. Tevde jî bêdeng diman; Sosîklesê Korînthosî xwest biaxive û got:

a) "Ax, wê esman bê xwarê, erd derkeve hewayê û hikum li esman bike, insan wê bên mecbûrkirin ku di deryayê de bijîn, wê masî jî wekî insanan bijîn, ji ber ku hûn Lakedaîmonî, hûn dixwazin wekhevîya di navbera hêzan de bişkînin û zordestîyê bînin sîteyan, yanî hûn dixwazin neheqî û tiştekî destê wê di xwînê de vejînin. Heke hûn minasib dibînin sîte bi destê hikumranekî bê birêvebirin, pêşî hûn hikumranekî deynin ser serê xwe, bila piştre dor bê yên din; lê naxêr, hûn wê ji bo xwe naxwazin û wekî bila qet nekeve Spartayê lê dinêrin, tenê hûn dixwazin bi zorê vêna bi hevalbendên xwe bidin qebulkirin. Heke we jî wekî me ev ceribandiba, we yê bizanîba tiştekî çawan e û hûn ê bi awayekî din biaxiftîna."

b) Berê kar li Korînthosê wiha bû: Olîgarşî hebû, bajar ji alîyê Bakhîadên endamên olîgarşîyê ve dihat îdarekirin; ew tenê di navbera xwe de dizewicîn.

Ji yekî ji nav wan re, ji Amphîon re keçeke seqet çêbû; navê wê Labda bû. Ji Bakhîadîyan kesek nexwest pê re bizewice; qismet ya Eetîonê kurê Ekhekrates bû, ew ji demosa Petrayê bû, lê di eslê xwe de ji Lapîtîyan bû û ji Kaîneîdîyan dihat. Ne ji vê jinê, ne jî ji yên din zarokên wî çêbibûn. Ji bo bişêwire çû Delphoîyê. Çawa ket perestgehê, Pythîa bi van rêzan pêşwazîya wî kir:

Tu ku bêşeref dijî, tu layîqî şerefê yî
Kevirek di zikê Labya de heye, giranîyeke dimeşe
Ji bo perçiqandina hikumdarên bajêr û ji bo
Danetewandina serê wan li hemberî qanûnên Korînthos

Ev kehaneta ji bo Eetîon hatibû gotin, çawa bû li ber guhê Bakhîadîyan ket. Berê jî kehaneteke di derbarê Korînthos hatibû sehkirin, lê manaya wê fêhm nekiribûn û bi kehaneta Eetîon re dihat eynî manayê.

Li ser zinaran, ji eyloyek dê şêrek bê dinyê,
Di bin lapûşkên wî yên goştxwir û bi hêz de çok dê bilerizin
Bila bê melhezekirin, ev gotin di qiraxên xweşik yê
Peîreneyê[218] û li pozbilinda Korînthosê

c) Bakhîadîyan ev kehanet, heta roja kehaneta ji Eetîonê re hate gotin fêhm nekiribûn. Niha fêhm dikirin, ev herdu kehanet eynî deng didan. Qet kifş nekirin ku ew fêhm kirine, ji ber ku biryar dabûn ku ew zarokê di mala Eetîon de bê dinyê bikujin. Jina Eetîon çawa hemla xwe danî, di nav wan de deh kes ji bo zarokê bikujin çûn mala Eetîon û xwestin zarokê bibînin. Labda ew dostê bavê zarokê hesêb kiribû, şik ji tiştekî nekir, zarok da dest yekî ji wan. Wextê di rê da hatibûn li hev kiribûn, yekem kesê ku zarok hilde, dê li erdê bixista û serê wî biperçiqanda. Lê xudayan zarok diparastin, zarok bi mêrik re bişirî, ev bişirîn tesîr li mêrik kir, dilê wî pê şewitî, nikarîbû bikuje; dilşewatî serdest derket, zarok da destê yê duyem, piştrewî da yê sêyem… Bi vî awayî li ser destan gerîya, her deh kesan jî zarok dabûn destê yê rexê xwe, lê nikarîbûn bikujin. Zarok dan dayîka wî û derketin. Li ber derî ketin hevdû, hevdû tawanbar kirin, bi taybetî çûn ser wî kesê cara pêşî rahiştibû zarok; qasek şûnde li hev kirin, wê hemî bi hev re bikevin hindur û wê tev bi hev re zarok bikuştina.

218 Peîrene: Serêkanîya nêzîkî Korînthosê

d) Lê pêwîst bû kurê Eetîon belayek bianîya serê Korînthosan. Labda ku li ber derî sekinî bû her tişt seh kir. Ji guhertina fikra wan û ji kuştina zarokê tirsîyabû, zarok danîbû cihê herî hindik bê hişê mirov, di kewarê de veşartibû; ji ber ku dizanîbû, heke careke din bên, ji bo zarokê bibînin cih nahêlin ku lê negerin; wisan jî bû. Ketin hindur, lê geriyan, lê tu şopa zarokê nedîtin. Wî wextî biryar dan paşve vegerin û ji kesê ew şandine re bêjin, emrê wan bi temamî hatîye bicihkirin. Çûn û bi rastî jî wisan kirin.

e) Zarokê Eetîon mezin bû, bi teşbîha cihê ji tehlîkeyê rizgar bû, navê Kypselos lê hatibû kirin. Piştî mezin bû çû Delphoîyê û bi kahîn şêwirî; bersiva girtibû baş bû, lê xetereke wê hebû, cardin jî bawerî bi kahîn kir, dest bi kar kir û Korînthosê zept kir. Kehaneta tê behskirin ev e:

Mirovekî bextewer Kypselosê kurê Eetîon yê hatîye mala min
Dê ew û kurên wî li Korînthosa bi nav û deng bibin hikumdar
Lê ne kurên kurê wan

Kehanet wiha bû. Kypselos piştî hikumdarî wergirt bû mirovekî wiha: Gelek Korînthosî raqewirandin, ew surgun kirin, dest danî ser mal û mewdanê gelek kesên din û hê ji wê jî zêdetir, canê gelekan sitend.

f) 30 salan hikum meşand û her tim bextewer jiya; piştre kurê wî Perîandros bû hikumran. Perîandros pêşî ji bavê xwe hinekî nerimtir bû; lê piştî qasidên wî bi Thrasybûlosê hikumranê Mîletosê re hevdîtin kirin, ji Kypselos hê zêdetir bû xwînrij. Qasidek şandibû ba Thrasybûlos, dixwest hîn bibe, ji bo sîteya xwe baş birêve bibe, pêwist bû sîstemeke hikumetê ya çawa damezrîne. Thrasybûlos, mirovê Perîandrosê bir derveyî bajêr; di nav zevîyên çandinîyê de gerîyan, wextê di nav zevîyên çandinîyê de digerîyan, qasid dida axaftin, jê dipirsî ka ji bo çi hatîye û di wê navê re ew simbilên ku yên din derbas kiribûn jê dikirin û diavêtin erdê; **di dawîyê de hemî simbilên baş û bi berhem nemabûn. Piştî ji zevîyê derket, tiştek ji qasid re negot û ew şand. Qasid vegerîya Korînthosê, Perîandros, bêsekin jê pirsî ka çi nesîhet kirine, lê qasid, got ku Thrasybûlos tu nesîhet lê nekirine. Perîandros mabû şaşmayî ku çawan kesekî kêmaqil yê zerar dide malê wî şandîye; di vê navê re tiştên Thrasybûlos kiribûn jî qise kiribûn.

g) Perîandros, fêhm kiribû ka wî xwestîye çi bêje; Thrasybûlos xwestibû jê re bêje ku yên ji nav hemwelatîyên wî derkevin pêş bikuje, wî jî ev fêhm kiribû; ji wir şûn ve li hemberî hemwelatîyên xwe gelek zalim bû. Yên ji destê Kypselos ji mirinê filitîn yan jî nehatin koçberkirin jî, Perîandros kuştin. Li ser rûyê jina wî Melîssa, rojekê temamê jinên Korînthosê tazî kirîye. Ji bo hînbûna cihê wî pereyê ku wextekî mêvanekî emanetî vê Melîssa kirîye, mirovekî xwe şandibû ba Thesprotîyan ba kahînê li Akheronê; li vir bangî mirîyan dikirin û pirs ji wan dihat kirin. Sîha Melîssa tê dîtin lê tiştek negotîye, îşaretek nedaye. Ji bo ku tazî bû cemidîye û bersiv nedaye; kincên bi wê re kiribûn gore bi kêrî tiştekî nedihatin, ji ber ku nehatibûn şewitandin û ji bo hikumran manaya rastîn ya van gotinan fêhm bike, ev jî li gotinên xwe zêde kirin; dema ku Parîandros nan kirin firinê, firin êdî cemidî bû. Ev gotin ji Preîandros re hatin gotin, ji bo fêhmkirina gotinên xwe ew hişyarîyên kiribûn ji bo wî xwedî mana bûn, ji vê şik nedihat kirin, ji ber ku dema bû xwedîyê Melîssa jinik miribû. -Çavîş derxistin û dan îlankirin, emir kir ku temamê jinan li perestgeha Hereyê berhev bibin. Jinan kincên xwe yên cejnan li xwe kirin û hatin, xişrên xwe yên herî xweşik bi xwe vekiribûn, xwe xemilandibûn. Di hindur de esker hebûn; bêyî ferqa azad û kole bê kirin tev jin hatin tazîkirin, kinc kirin kurtekê, ji bo Melîssa dua hatin kirin û kinc hatin şewitandin. Piştî vê merasimê qasidekî din şandin perestgehê, vê carê dîmena Melîssa cihê pere got: "Belê, ey Lakedaîmonî, fêhm bikin ka zordestî çawan e, ew tiştên wiha dikin. Dema ku me Korînthosîyan seh kir ku we bangî Hîppîas kirîye, em ecêbmayî mabûn, niha ew gotinên we yên em seh dikin hê jî ecêb in; li ser navê temamê xudayên hûn dihebînin em ji we ricayê dikin, di sîteyên me de hikumranîyê danemezrînin. Bêguman hûn ê guhên xwe nedin me, hûn ê li dijî dadê rabin û Hîppîas bînin; lê zanibin ku, herî kêm wê Korînthosî vê qebûl nekin."

[93] Delegeyê Korînthosê Sosîkles wiha axift. Piştre Hîppîas dest bi axaftinê kir. Eynî xuda şahid da nîşan û got, roja ku qeder bêje erê, wê Atînayî êrîşî Korînthosê bikin, wî wextî wê Korînthosî bi çirayê li Peîsîstratîdîyan bigerin. Hîppîas ev wek kesekî ku kahîn baş nas dikir digot. Yên din heta wê demê devê xwe venekiribûn. Piştî guhê xwe dan gotinên bi zimanê insanê azad yê Sosîkles, wan jî dest bi axaftinê kirin, terefdarîya Korînthosîyan kirin, bi bîranîna navê xudayan, xwestin ku Lakedaîmonî rûreşîyeke nû neynin sîteyên Yûnanê.

[94] Ev kar wiha temam bû: Gotin ku bila Hîppîas ji welat derkeve. Amyntasê Makedon Anthemûsê dayê; Thessalîayî kirin ku Îolkosê bidenê; wî herdu jî nexwestin. Vegerîya Sîgeîona[219] ku Peîsîstratos bi zora şûr ew ji Mytîleneyîyan sitendibû; Peîsîstratos, Hegesîstratosê pîç yê ji jineke Argosî peyde kiribû, kiribû hikumranê vir. Vî hikumranî baş sûd ji vê diyarîyê wernegirt. Şerê di navbera Mytîleneyîyên li Akhîlleîonê baregah vedabûn û Atînayîyên xwe li Sîgeîonê ragirtibûn dirêj kêşabû; yekî digot ez ew erdên ji destê min hatine sitendin dixwazim û yê din jî digot ez nadim, digotin ku mafê Aîolîyan li ser welatê Îlîonê ji wan, yanî ji hevalbendê wan yên Yûnanî yê Menelaosê yê kesên Heleneyê revandin ceza kir, nikare hê zêdetir be.

[95] Û şer dikirin, di navberê de gelek bûyer diqewimîn; di pevçûneke ku rewşa Atînayîyan hê baştir bû, ozan Alkaîos[220] baz dabû û canê xwe xelas kiribû, lê çek di destê Atînayîyan de mabû. Atînayî ev sîleh li perestgeha Atheneyê ya li Sîgeîonê daliqandibûn. Alkaîos ev bûyer kiribû mijara helbestekê û yên hatibûn serê wî, ji bo bigehîne hevalê wî Melanîppos, helbest şandibû Mytîlene. -Mytîleneyî û Atînayî, li ser erêkirina herdu milan bi navberkarîya Perîandrosê kurê Kypselos li hev hatibûn. Lihevhatin, li ser esasê ku herkes bibe xwedîyê erdê di destan de. Bi vî awayî Sîgeîon ji Atînayîyan re dima.

[96] Hîppîas ku ji Lakedaîmonê vegerîyabû Asyayê, li hemberî Atînayîyan çi ji destan dihat dikir. Di derbarê Atînayîyan de Fesadî dikir ji Artaphrenes re; hewl dida Atînayîyan têke bin desthilata Artaphrenes û Daryûs. Atînayîyan ku xebera gerandina dolabên Hîppîas seh kirin, qasid şandin Sardesê, xwestin rê li ber bigrin ku Persî li ber bayê gotinên kesên ji Atînayê koç kirine ranebin. Lê Artaphrenes emir kir, got; heke naxwazin serê xwe têkin belayê, bela bangî Hîppîas bikin û wî vegerînin. Atînayîyan ev qebûl nekirin û piştî ev daxwaz red kirin, êdî dijminatîya xwe li hember Persan hişkere didan xuyakirin.

[97] Dema ku Arîstagorasê Mîletosî yê ji alîyê Kleomenesê Lakedaîmonî ve hate raqewirandin û ji Spartayê hatê avêtin û hat Atînayê, Atînayî di vê rewşê

219 Sîgeîon: Li herêma Troya (Çeneqele) alîyê rojava, bajarekî qeraxê deryayê.

220 Alkaîosê hozan, di nîvê duduyan yê sedsala 7an de, li girava Lesbosê li Mytîleneyê hatîye dinyê.

de bûn; Atîna di nav sîteyan de ya herî bi hêz bû. Arîstagorasê ku derxistin pêşberî Meclisa Xelkê, axaftina xwe ya li Spartayê kiribû, li vir tekrar kir; behsa Asya çiqas dewlemend e kir, li ser rehetîya şerê bi Persan re sekinî û behs kir ku, ji ber ew nizanin mertal û rim çine, nêçîreke ku bi rehetî dikare bê bidestxistin. Ev li ser hev tekrar dikirin, delîlên nû dikirin ser gotinên xwe; îddîa dikir ku Mîletosî kolonîya Atînayîyan in, rizgarkirina wan ji tuneyîyê qerzê li ser Atînayîyan e. Heta biryara dixwest bi wan da qebûlkirin, her gotin bi kar anî. Tê wê manayê ku xapandina girseyekê ji xapandina kesekî rehetir e ku, di gel ku nikarîbû Kleomenesê Lakedaîmonî bixapîne, niha karîbû 30 hezar Atînayî bixapîne. Atînayîyên ev îş ket serê wan, ji bo biçin alîkarîya Îonîayan, ji bo biryara şandina 20 keştîyan deng dan; Melanthîosê hemwelatîyê xwe, yê di hemî hêlê de pê bawer bûn kirin fermandarê wê hêzê. Belê, çi belayên hatin serê Yûnanîyan û barbaran, çavkanîya tevan ev keştîyên han in.

KETINA SARDESÊ Û ŞEWATA WÊ

[98] Arîstagoras, berîya hêza deryayî derkeve rê, xwe avêt keştîyê û çû Mîletosê; wê bi Îonîayan tiştek nedaya qezenckirin, lê projeya planeke ku Daryûs têke şikê amade kiribû û jixwe ya dixwest jî tenê ji vê pêk dihat; ji Paîonîayan re yê ku ji alîyê Megabazos ve ji qeraxên Strymonê yên welatên wan bi zorê hatibûn derxistin û di erdê Frîgyayê de koloniyek dabû avakirin, mirovek şand. Vî mirovî, ji Paîonîayîyan re ev gotin: "Gelî Paîonîayî, ez ji alîyê Arîstagorasê hikumranê Mîletosê ve ji we re hatime şandin, ji we re radigihîne ku heke hûn guhê xwe bidin min hûn ê rizgar bibin. Temamê Îonîa li hemberî Hikumdarê Mezin serî hildaye, êdî hûn dikarin bi saxî û silametî vegerin welatê xwe. Ji bo ku hûn bikaribin xwe bigihînin qiraxên deryayê derkevin rê, li milê din em eleqedar dibin." Paîonîayî bi van gotinan şa bûn; jin û zarokên xwe girtin û bi nehênî baz dan û Paîonîayîyên gihiştin qeraxê deryayê, birin Khîosê; di vê navê re yekîneke bi hêz a siwarî ya Persan ketibû pey wan, dema ku ev gihiştin qeraxan, li cihê ku yên din li keştîyan siwar bûbûn, ji Paîonîayan re xeber şandin û xwestin paşde vegerin. Lê Paîonîayî guh nedan wan. Khîosîyan ew birin Lesbosê, Lesbosîyan jî ew şandin Dorîskosê.[221] Paîonîayî ji wir di rêya bejahîyê re çûn Paîonîayê.

221 Dorîskos: Li qiraxên bakurê Behra Egeyê, li Trakyayê, li rojavayê rûbarê Hebrosê ye.

[99] Arîstagoras, dema ku bi 20 keştîyên Atînayê û tev pênc trîremên Eretrîayîyan şandibûn hat (Eretrîa ev trîrem ne ji bo xatirê Atînayîyan, ji bo xatirê Mîletosîyan şandibûn, ji ber ku dema berê Eretrîa li hemberî Khalkîsîyan şer kiribûn, Samosîyan jî li hemberî Eretrîa û Mîletosê piştgirîya Khalkîsîyan kiribûn, li ser vê Mîletosîyan jî pişta Eretrîayê girtibûn.) Me gotibû Arîstagoras, dema ku ev keştî hatin û hevalbendên din jî berhev bûn, dest bi sefera Sardesê kir. Bi xwe beşdarî seferê nedibû; ew li Mîletosê mabû û birayê xwe yê eslî Kharopînos û Hermophantosê hemwelatîyekî din danîbû ser serê Mîletosîyan.

[100] Îonîayên bi hêzên deryayî re hatin Ephesosê, keştî li erdê Ephesosê li Koressosê hiştin, bi hêzên xilbe ji bejahîyê derketin rê. Wekî rêber Ephesosî biribûn bi xwe re. Ava Kaystrosê şopandin. Tmolos derbas kirin û xwe li pêşberê Sardesê dîtin û bê şer bajar stendin; ji bilî Akropolê temamê bajêr ket destê wan. Artaphrenes bi xwe Akropol diparast û di destan de hêzeke giring hebû.

[101] Bajêr stendin lê talan nekirin, piranîya xanîyan ji qamîşan hatibûn çêkirin; avahîyên ji qermîtan hatibûn çêkirin jî qamîş li ser hatibûn raxistin. Yek ji eskeran agir berda xanîyekî. Agir ji malekê belavî mala din bû û temamê bajêr şewitand. Lîdyayî û Persên di bajêr de bûn, di cih de di nav gurrîya agir de man. Şewatê temamê bajêr, goşeyên herî dûr girtibû nav xwe, bazdan û jê filitîn nemabû; xelk, kom bi kom baz didan meydanê û qiraxên Paktolosê; ev çemê han ku ji Tmolosê pelikên zêr bi xwe re dianî, di navenda meydanê re derbas dibû û tevlî Hermosa dirijîya deryayê dibû. Lîdyayî û Persên berhevî meydanê û qiraxan Paktalosê bûn, mecbûrî xweparastinê bûn. Îonîayîyên ku dîtin hinek dijmin li hemberî wan in û hinek jî dimeşin ser wan, tirsiyan û baz dan, ber bi Çiyayê Tmolosê ve vekişîyan û piştre dema ku bû şev ji bo vegerin keştîyên xwe paşve vegerîyan.

[102] Sardes şewitîbû û di vê navê re perestgeha yek ji xwedawenda welat ya Kîbele(Kybeba)yê jî şewitîbû,[222] piştre Persan ev ji bo şewitandina temamê perestgehên Yûnanistanê kirin mahne. Persên li vî milê Halysê bûn, xebera seferê girtibûn û ji bo biçin hawara Lîdyayan berhev bûbûn. Lê dema ku

222 Kybele: Xwedawenda Lydîayê. Navê guhertî yê Kybele hene. Perestgeha Sardesê ji mermerên spî hatibû çêkirin, avahîyeke gelek xweşik û bi îhtişam bû.

Îonîayî li Sardesê nedîtin, li pey wan ketibûn û hatibûn Ephesosê. Îonîayî li vir ketin şer û têkçûn. Persan piranîya wan kuştin, di nav mirîyan de yê herî naskirî Eûalkîdas jî hebû yê li ser serê Eretrîayan û di lîstikan de tac qezenc kiribûn û ji ber vê ji Sîmonîdesê Keosî pesnê wî dabû. Yên ji şer paşve man belavî sîteyên xwe bûn.

[103] Ev şer wiha çêbû. Atînayîyan, Îonîayî terk kirin û çûn û qasidên Arîstagoras çiqasî israr kirin jî careke din nehatin alîkarîyê. Di gel ku ji alîkarîya Atînayîyan bêpar mabûn jî, Îonîayî ji bo li hemberî Hikumdarê Mezin şerekî bikin ji amadekarîya paşve nediman; ew helwêsta li hemberî Daryûs wergirtibûn wan mecbûrî vê dikir. Keştî şandin ser Hellespontosê û Bîzans jî tê de, serî li hemî sîteyên herêmê tewandin; heta piştî Hellespontosê, Karyayî jî kirin nav hevalbendên xwe û bajarê Kaûnosê jî ku berê nexwestibûn bi wan re tevlî şer bibin, piştî Sardes şewitî bi wan re bûn yek.

[104] Temamê Qibrisê jî ji derveyî Amathûsîyan, xwe bi xwe tevlî Îonîayan bûbûn. Di eslê xwe de Qibrisî jî li hemberî Medan serî hildabûn. Kesekî bi navê Onesîlos hebû, birayê biçûk yê Gorgosê hikumdarê Salamîs yê Qibrisê û kurê Khersîsê kurê Sîromosê kurê Eûelthon bû; ev kes, dixebitî ku birayê xwe Gorgos ji Hikumdarê Mezin veqetîne. Dema ku wî serhildana Îonîayîyan seh kir, cardin dest bi zextan kiribû. Ji derketina Gorgos bi mirovên xwe ve ji bajêr sûd wergirt, derîyên Salamîsê dan girtin û Gorgos berneda hindur. Gorgosê bajarê wî ji destan derketî, xwe avêt Medan. Bi vî awayî Onesîlos, dest danî ser Salamîsê û temamê girava Qibrisê jî kir pey xwe û serî hilda. -Temamê giravê, lê ji derveyî Amathûsîyan; van guhê xwe nedabûn wî, wî jî ew kiribûn bin dorpêçîyê.

HÎSTÎAÎOS TEVLÎ ÎŞ DIBE

[105] Onesîlos, Amathûs dorpêç kiribû. -Dema xeber gihandine Daryûs ku Atînayî û Îonîayan Sardes sitendine û ew şewitandine û ev kar ji bin serê Arîstagorasê Mîletosî derketine, tê gotin ku, Daryûsê ku zanîbû çawa be gelek rehet wê heq ji Îonîayan derkeve, ew nekirine paçê xwe û pêşî pirsîye, gotîye, "Ev Atînayî kî ne?"; dema ku fêr bû bê kî ne, kevanê xwe daye anîn, tîrek lê siwar kirîye û ber bi ezman ve avêtîye, dema tîrê xwe ber bi qata xwedayan

ve avêtîye qêrîyaye û gotîye: “Ey Zeûs! Min berde, ez heddê Atînayîyan bidim wan.” Ev gotîye, piştre emir daye zilamekî xwe, gotîye; her cara jê re xwarin tînin, bila bêjin “Ey hikumdar, Atînayîyan ji bîr neke!” bila bînin bîra wî.

[106] Piştî ev emir daye, Hîstîaîosê ku ji zûde li ba xwe girtibû, bang kirîye hizura xwe û wiha gotîye: “Hîstîaîos, li gor xeberên min wergirtine, walîyê ku te Mîletos emanetî destê wî kirîye, li hemberî desthilatdarîya min serhildanek rêk xistîye; li hemberî min ji bejahîyên din û Îonîayê mirov anîne -ku wê Îonîayî hesaba vê bidin-, van Îonîayan jî bi biyanîyên din re ji bo bekivin pey wan xapandine û Sardes ji destê min derxistine. Ka ji min re bêje; ev kar bi te xweş e? Bêyî hayê te jê hebe serhildaneke wiha dikare çêbibe? Lingê xwe bi hemd biavêje û qenc di xwe bifikire, careke din rûbirûyî tawanbarîyên wiha nemîne!” Hîstîaîos bersiv da û got: “Ey hikumdar! Tu çi dibêjî! Ma ez kesekî wisan im ku hebekî jî be bêhna te teng bikim? Ji vê ez ê çi bi dest bixim! Ma çî min kêm e? Te ez kirim şirîkê her tiştê di destê xwe de, te surrê xwe bi min re ayê kirin. Naxêr, heke walîyê min hiştîye bi rastî tiştê te gotin kiribe, wî bi serê xwe kirîye. Ez bi tu awayî bawer nakim ku walî û Mîletosî rabin û di peywendîyên bi te re guhertinekê çêkin. Lê heke kiribin û heke yên te seh kirine rast bin, ey hikumdar, wî wextî fêhm bike bê bi dûrxistina min ji deryayan, te çi kir. Dixuyê ku, piştî ez ji navberê derketim, Îonîayên ku zû de dixwestin vê plan bikin, kirine; heke ez li Îonîayê bûma, yek sîteyê nikarîbû stûyê xwe di nîr de babida. Niha min paşde bişîne Îonîayê, ez karûbaran rast bikim û wî walîyê serhildan derxistîye teslîmî te bikim. Piştî kar bi awayê tu dixwazî hat bi rêkûpêkkirin, ez li ser navê xudayên parêzgerê hikumdaran sûnd dixwim ku, niha ev gomlekê şer yê ku dema ez diçim Îonîayê min li xwe kirîye, heya ew girava mezin ya Sardunyayê ji te re mecbûrî dayîna xeracê nekim, dernaxim!”

[107] Hîstîaîos, bi van gotinan dixwest Daryûs bixapîne. Daryûs xapîya û yên ku gotin pêk anîn, tembîh kir ku cardin vegere Sûsayê û izin da çûna wî.

ŞERÊ QIBRISÊ

[108] Di vê navberê de, yanî ez dixwazim bêjim ku, dema xebera bûyera Sardesê gihişt Hikumdarê Mezin, Daryûs tîr avêt hewayî, bi Hîstîaîos re axift

û ew ber bi deryayê ve bi rê kir; Onesîlosê li Salamîsê ku Amathûs dorpêç kiribû, xebera di bin fermandarê Persê Artybîos de berhevbûyî hêzeke mezin ber bi Qibrisê ve tên wergirt. Li ser vê, çawîş şandin her cihê Îonîa û bangî Îonîayan kirin ku alîkarîyê bikin. Îonîayî bêyî têkevin hevdîtinên dûr û dirêj, bi hêzeke giring ya deryayî ve çûn Qibrisê. Îonîayî û Persên ji Kîlîkîayê bi keştîyan hatin derketin giravê, bi riya bejahîyê meşîyan ser Salamîsê; di vê navê re keştîyên Fenîkîyan jî li pozê jê re Kilîda Qibrisê digotin, difitilîn.

[109] Hikumranên Qibrisê ku ji rewşê silikîbûn, bang karbidestên Îonîayan kirin û ji wan re wiha gotin: "Îonîayî, hûn dixwazin li hemberî Fenîkeyîyan yan yê Persîyan şer bikin? Hûn bi xwe biryar bidin. Heke hûn dixwazin di bejahîyê de li hemberî Persan şer bikin, bêsekin ji keştîyên xwe derkevin û di bejahîyê de bikevin nav pergala şer, wî wextî em ê jî siwarî keştîyên we bibin û li hemberî Fenîkeyîyan derkevin. Heke hûn tercîh dikin bi Fenîkeyîyan re rûbirû bibin, hûn serbest in, lê heke li bejahîyê yan jî li deryayê be, wisan hereket bikin ku, di dawîyê de Îonîa jî û Qibris jî bila wekî welatên azad bimînin." Îonîayan bersiv dan: "Meclisa Îonîayê em ji bo parastina deryayê şandin, ne ji bo em keştîyên xwe ji Qibrisîyan re bihêlin û di bejahîyê de bi Persan re şer bikin. Em ê jî bixebitin ew wezîfeyaku dane me pêk bînin. Heke em bên ser we, hûn di bin desthilata Medîyan de gelekî nalîyan, hûn jî bi mêrxasî şer bikin."

[110] Îonîayan bi vî awayî bersiv dan. Di vê navê re Persî gihiştibûn Deşta Salamîsê. Hikumdarên Qibrisê artêşên xwe kirin nav pergala şer; Salamîs û Soloî eskerên xwe derdixin hemberî Îranîyên xwîna safî, Qibrisîyên din yên mayî jî dixistin şer li hemberî artêşa dijmin ya din. Onesîlos bi xwe derdiket hemberî fermandarê Persî Artybîos.

[111] Hespê Artybîos, bi awayê li hemberî kesekî xwedîyê çekên giran şer bike, bi taybetî hatibû perwerdekirin; Onesîlos ev xeberê wergirtibû. Seyîsekî wî yê bi kêrî karên şer tê yê ji Karyayê hebû, bang wî kir û jê re got: "Bi qasî min seh kirîye hespê Artybîos radibe ser lingên xwe yên paşî, bi dest û difnê xwe li dijminê derkeve pêşberê wî dixe, bi vî awayî hatîye perwerdekirin. Niha bifikire û bersivekê bide min, di vê rewşê de pêwist e êrîşî Artybîos bê kirin yan yê hespê?" Mirovê şer bersiv da: "Hikumdar, ez li ser

hesaba xwe, herduyan bi hev re yan jî yek jê, bi yek gotinê hûn çawan emir dikin min ê wisan bikira, lê em bên ser hûn ê çi bikin, ez wê jî bêjim: Ji bo hikumdarek yan desthilatdarekî a minasib ew e ku têkeve hemberî hikumdar yan bi desthilatdarekî; tu desthilatdarekî bikujî ev ji bo te dibe rûmeteke mezin, lê Xuda biparêze, yan ew te bikuje, tu bi destê kesekî hemkûfê xwe bê kuştin jî rûmetek e; ya layîqî yên wekî me xulam jî, bi destê yên wekî me yan ji alîyê hespekî ve kuştin e. -Ji ber wê ji vî heywanî netirse; ez soz didim te, ji niha pêve wê ew heywan li hemberî tu kesî ranebe."

[112] Ew wiha axift û tam piştî wê li bejahîyê û deryayê şer dest pê kir. Wê rojê Îonîayîyên di deryayê de serkeftî bûn, ji Fenîkeyîyan serdestir derketin; yên di vî şerî de herî serkeftî Samosî bûn. Herdu artêşên di bejahîyê de hatin hemberî hev û dest bi şer kirin. Rûbirûbûna herdu desthilatdaran bi vî awayî bû: Dema ku Artybîos li ser hespê xwe êrîşê Onesîlos kir, Onesîlos wekî bi wî kesê Karyayî re biryar dabûn, bi hemî hêza xwe li Artybîos xist; hespê rabû ser herdu lingên xwe, bi pêhnên xwe bi mertala Onesîlos ket; di wê navî re yê Karyayî, bi şûrê xwar herdu çogên heywan ji hev bela kir. Fermandarê Persî Artybîos bi hespê xwe re ket.

[113] Ji her milî ve şerekî giran dest pê kiribû ku, hikumranê Kûrîonê Stesenor, bi yekîneyên girîng yên li ba xwe derbasî milê dijmin bû. (Ji bo Kûrîon tê gotin ku ji kolonîya Argosê ne.) Piştî xiyaneta van erebeyên şerker ên Salamîsê jî derbasî milê din bûn. Wî wextî Persî ketin rewşeke ji Qibrisîyan bi hêztir. Yekîneyên Yûnanî dest bi bazdanê kirin, ji nav wan gelek kes ketin erdê, Onesîlosê kurê Khersîs yê ku kiribû Qibris serhildanê bike, Arîstokyprosê hikumdarê Soloîyê kurê Philokypros jî di nav kuştîyan de bûn. Ev ew Phîlokyprds e, dema ku Solonê Atînayî tê Qibrîsê û di helbestên xwe de ji nav hikumranan pesnê wî dide.

[114] Yên serê Onesîlos jê kirin û li yek ji wan derîyê bajêr daliqandin Amathûsî bûn, ji ber ku wî, ev bajar dorpêç kiribû. Ev qoqê serê yê hat daliqandin û hindurê wê vala bûbû, mêşên zeyî tê de berhev bûn û tijî hingiv kirin. Sîteyî ketin meraqê, serî li kahîn dan; kahîn got, serî bînin xwarê û veşêrin û ji bo Onesîlos her salê, wekî qehremanekî jê re qurban serjê bikin; heke hûn wiha bikin ji bo we xêr e.

[115] Di roja me de jî jê re qurban tê serjêkirin. -Îonîayên li qeraxê Qibrisê dest bi şer kiribûn, xeber wergirtin ku Onesîlos mexlûb bûye û sîteyên di giravê de hatine wendakirin; tenê Salamîs nehatibû dorpêçkirin û xelkê Gorgosê hikumdarê kevin paşde anîbûn. Îonîayê bi rewşê hesîyan, ber bi Îonîayê ve ba dan babirkên xwe. Di nav sîteyên Qibrisê de ya herî dirêj li ber xwe dabû Soloî bû; Persîyan li dora mezin a bajêr xendeq kolan û di meha pêncan a dorpêçê de bajar sitendin.

[116] Qibrisîyên salekê azad bûbûn, cardin ketin halê koletîyê. -Daûrîsesê ku bi yek ji keçên Daryûs re zewicî bû û cardin fermandarên Persî yên navê wan Hymaîas û Otanes yên bi keçên Daryûs re zewicî bûn, bi Îonîayên meşîyabûn ser Sardesê re şer didomandin; wan Îonîayî mexlûb kiribûn, ew mecbûr kiribûn paşve vegerin keştîyên xwe, piştre temamê sîteyan parve kiribûn û talan kiribûn.

SERHILDANA KARYAYÊ

[117] Daûrîses, meşîya ser sîteyên Hellespontosê û Dardanos stend; Abydos, Perkote, Lampsakos û Paîsosê stendin; ev bajar bi rojek navberî hatin stendin. Dema ku ji Paîsos meşîya ser Parîonê, xeber girt ku Karyayî jî bi çavlêkerîya Îonîayan li hemberî Persan serî hildane. Ji Hellespontosê paşve vegerîya û meşîya ser Karyayîyan.

[118] Bi tesadufî wisan çêbû ku, Karyayîyan xebera hatina wî wergirtin. Ji welatê Îdrîasê derbas bû, li qeraxê Çemê Marsyasê yê tevlî Maîandrosê cihekî ku jê re Dîrekên Spî tê gotin, berhev bûn. Di meclisa ji alîyê Karyayîyan ve hatibû damezirandin de, gelek nêrîn avêtin orteyê. Li gor min ya herî baş ya Pîxodarosê kurê Maûsolosê Kîndyeyî yê bi yek ji keçên hikumdarê Kîlîkîayê Syennesîs re zewicî bû. Nêrîna vî kesî ew bû ku Maîandros derbas bikin û pişta xwe bidin çem, yanî daketina şerekî ku firset nede bazdana Karyayîyan û heta dawîyê berxwedanê bikin. Lê guhê xwe nedan wî. Ew helwêsta lazim bû ew bi xwe bikin dan Persîyan, yanî biryar dan ew çem derbas bikin; bi vî awayî heke Persî di şer de têk biçin, wê xwe bavêjin çem û nikaribin baz bidin.

[119] Persî hatin û çem derbas kirin. Karyayî li qeraxên Marsyasê dest bi şer kirin. Bi mêrxasî şer kirin û demeke dirêj li ber xwe dan, lê di dawîyê de, li hemberî hejmara zêde hatin perçiqandin. Persîyan di meydana şer de nêzîkî du hezar kes hiştin, Karyayîyan deh hezar. Yên sax man li Labrandadê, li perestgeha Xudayê Artêşan Zeûs ya di navenda daristana pîroz a mezin ya bi darên çinarê rapêçayî berhev bûn. (Ya ku em dizanin tenê Karyayî Zeûs wek Xudayê Artêşan nas dikin.) Li vir berhev bûn, dixwestin rêya rizgarîyê peyda bikin: Teslîmî Persîyan bibin, yan jî temamê Asyayê terk bikin û biçin baştir e?

[120] Wan bi vî awayî lê dinêrîn, hevalbendên wan yên bazdabûn hatin hawara wan. Li hemberî vê alîkarîyê, Karyayîyan dev ji plana xwe ya kevin berdan, biryar dan bi şerekî nû re şensê xwe biceribînin. Bi Persên dihatin ser wan dest bi şer kirin, lê rastî têkçûneke ji ya berê xerabtir bûn; hejmara yekûna wendayîyên wan bilind bû; wendayîyên Mîletosîyan hê mezintir bû.

[121] Lê piştî vê felaketê Karyayî xwe dan hev û cardin dest bi şer kirin. Dema ku dîtin Persî xwe amade dikin ku biçin ser sîtayên Karyayan, li ser rêya diçe Pedasosê kemîn vedan. Persî bi şev ketin kemînê û bi serokên xwe yên wekî Daûrîses, Amorges û Sîsîmakes jî tê de, bi şûran hatin kuştin; bi van re Myrsosê kurê Gîges jî mir. Yên ev kar bi serkeftin meşandin, di serî de Heraklîdesê kurê Îbanollîsê Mylasayî hebû. Belê, ev artêşa Persîyan bi vî awayî hatîye mehfkirin.

[122] Hymaîasê ku yek ji wan yê ji bo raqewirandina Îonîayîyan hatibû wezîfedarkirin û tevlî sefera Sardesê bûbû, meşîyabû ser Propontîsê, li Mysîayê Kîos stendibû, piştî wê, dema ku hîn bûbû Daûrîes ji bo biçe Karyayê ji Hellespontosê hereket kirîye, Propontîs terk kiribû û artêşa xwe ajotibû ser Hellespontosê. Temamê Aîolîyên li ser erdê Îlîonê û yên bi wan re li ser vî erdî mabûn, Troyayîyên kevin, yanî Gergîthî jî wergirtîye. Piştî van serkeftinên xwe, wextê li Troyayê bûye nexweş ketîye û mirîye. Rojên wî bi vî awayî temam bûne.

[123] Armancên Artaphrenes yê walîyê Sardesê û generalê sêyem Otanes, erdên Aîolê yên Îonîa û cîranên Îonîayê bû. Ji Îonîayan Klazomenaîyê, ji Aîolîyan jî Kymeyê sitendin.

[124] Dema ku wan ev erd wergirtin, Arîstagorasê Mîletosî jî ev dikirin: Wekî tê dîtin ne zilamekî ku wek mêrxas bê hesêbkirin bû, Îonîa tevlihev kiribû, bûbû sebebê bûyerên mezin û niha jî dema dît iş ketîye çi halî, dest bi gera rêya bazdanê û xwe jêrizgarkirinê kiribû; niha pê meşa ser Daryûs bi zelalî bêimkan xuya dikir. Bang terefdarên xwe kir û ji wan re wiha got: "Sibê heke em ji Mîletosê bên raqewirandin em ê biçin ku, wê baş be em ji niha ve vê bifikirin." Ya wê hemî bi hev re biçûna girava Sardunyayê û li wir kolonîyek damezirandana, yan jî wê koçî Myrkînosê kiribana ya ku Daryûs li erdê Edonîayê hîbeyî Hîstîaîos kiribû û wî jî dest bi hûnana dîwarên wê kiribû. Arîstagoras pêşniyaz dikir ku ji herduyan yek bê hilbijartin.

[125] Hekataîosê kurê Hegesandros yê çîrok li pişt xwe hiştine, got ku ne ev û ne jî ew. Heke em mecbûr bibin ji Mîletosê derkevin, lazim e em bikêşin Lerosê,[223] kelehekê ava bikin û xwe bidin jibîrkirinê; piştî midetek derbas bû, cardin vegerin Mîletosê.

[126] Pêşniyaza Hekataîos ev bû. Lê ji Arîstagoras re fikra çûna Myrkînosê û li wir avakirina kolonîyekê baştir dihat. Mîletos ji Pythagorasê giregirekî bajêr re hişt, bi yên dixwestin bi wî re herin, bi rêya deryayê çû Trakyayê û çû wî welatê ku dixwest bigihêye, xwe li wir girt. Di sefereke derveyî ya vî welatî de, hem ew û hem jî artêşa wî di destê Trakyayîyên ku xistibû bin dorpêçê de mehf bûn.

223 Leros: Li başûrê girava Samosê, giraveke dikeve pêşberî Karyayê.

PIRTÛKA ŞEŞAN

ERATO

PAŞÎYA TEVLIHEVÎYÊ - ŞERÊ DERYAYÎ YÊ MÎLETOSÊ- ŞERÊN DIN

[1] Mirina Arîstagorasê ku bu sebebê serî hildana Îonîayê, bi vî awayî çêbû. Di vê navberê de Hîstîaîosê ji alîyê Daryûs ve serbest hat hiştin, derbasî Sardesê bû. Dema ku ji Sûsayê hat, Artaphrenesê walîyê Sardesê jê pirsî bê ka li ser sebebê serhildana Îonîayan çi difikire. Wî jî di bersivê de got, ew bi tiştekî nizane û wekî kesekî ku li tiştên dibin şaş dimîne û tiştekî nizane hereket kir. Artaphrenes ku his kir ew lîstikek zirav dilîze û sebebê serhildanê baş dizane, wiha got: "Ji bo welatê te ya rastîn ew e ku Hîstîaîos, te pîne li sola xwe xist, Arîstagoras jî ew kir lingên xwe."

[2] Artaphrenes di warê serhildanê de ev gotin. Hîstîaîos ket şikê ku wî tiştin fêm kirine, di eynî şevê de bi dizî baz da û ber bi deryayê ve çû; wî lîstik li ser serê hikumdar Daryûs digerand; soz dabû ku girava herî mezin Sardûnyayê jê re bistîne, niha jî ji bo şer geş bike diçû ba Îonîayan. Serî li Khîos da; Khîosîyan ew avêtin hepsê, ew bi tawanê ajanê tehrîkkirinê yê Daryûs tawanbar kirin. Lê dema ku yên di serî de derbas bûne hîn bûn û fêhm kirin bi awayekî vekirî dijmintîya Daryûs dike, berdan.

[3] Dema Îonîayan jêpirsînê ka te çima Arîstagoras teşwîqî serhildanê kir û serê Îonîayan bi vî awayî kir belayê, Hîstîaîos sebebên wê yên rastîn îzah nekir; got, Daryûs Fenîkeyî ji welatê wan rakir û li Îonîayê da bicihkirin, di miqabilî wê de xwest Îonîayan bajo Fenîkeyê; loma ew nesîhet gotibûn. Halbûkî planeke wiha di hişê hikumdar re derbas nebûbû û ev, tirsandina Îonîayan ji alîyê Hîstîaîos pê ve ne tiştekî din bû.

[4] Piştre, Hîstîaîos ji Persên li Sardesê bi cih bûne, bi Hermîpposê Atarneûsî re xeber şandin, ev xeber derdixist meydanê ku di warê serhildanê

de di pêşî de jî hevdîtin çêbûbûn. Lê çi heye Hermîppos di cihê nameyan bide xwedîyê wan, di cih de biribûn teslîmî Artaphrenes kiribû; walîyê ku ji temamê entrîkayan hîn bû, ji Hermîppos re got; nameyên Hîstîaîos bide xwedîyê wan û bersivên ku tu bigre cardin ji min re bîne. Bi vî awayî şirîkên wan ên tawanê derketin holê û Artaphenes ji vê firsetê sûd wergirt û qesta canê gelek Persîyan kir.

[5] Dema ku li Sardesê ev kar dihatin kirin, Hîstîaîos ku li vî milî hêvîşikestî bûbû, Khîosîyan li ser daxwaza wî ew biribûn Mîletosê, ji bo hatina hikumranekî ji bo welatê wan qet bi iştah nedihatin xuyakirin. Hîstîaîos bi şev xwest bi zorê bikeve Mîletosê: Mîletosîyekî wî ji lingê wî birîndar kir, ji welatê xwe hat avêtin û careke din ji nû ve vegerîya Khîosê; dema ji Khîosîyan keştî wernegirt, derbasî Mytîlenê bû û ji bo hêzeke biçûk ya deryayî bidinê, Lesbosî xapandin; Lesbosîyan jê re heyşt trîrem rêk xistin û pê re ber bi Bîzansê ve ketin rê. Li wir tengav ze kirin û dest pê kirin keştîyên ji Deryaya Reş derdiketin digirtin. Yên rîayetî emrê Hîstîaîos dikirin nedigirtin.

[6] Hîstîaîos û Mytîlenî ev sefer dimeşandin, li Mîletosê jî li hêvîya artêşeke bejahîyê bûn ya bi hêzeke deryayî ya giring bihata destekkirin. Fermandarên Persî bûbûn yek, temamê yekîneyên xwe di şiklê yek artêşê de berhev kiribûn û giringî nedan sîteyên din, rast ber bi Mîletosê ve dest bi hereketê kiribûn. Di nav hêza deryayî de yên herî zêde dilê wan dibijiya şerekî Fenîkeyî bûn; Qibrisî, Kîlîkîayî û Misrîyên ku demek berîya wê serî tewandibûn jî bi wan re dihatin.

TÊKÇÛNA GIRAVA LADEYÊ

[7] Bi vî awayî li hemberî cihên din ên Mîletosê û Îonîayê sefer hatin destpêkirin. Mîletosî ku ji rewşê hîn bûn, qasid şandin Panîonîonê; li wir hevdîtin hatin kirin û biryar hat dayîn li hemberî Persan artêşa bejahîyê neyê derxistin; wê Mîletosîyan bi xwe kelehên xwe biparastina, bêyî ku yek keştî wek yedek bê hiştin wê hêzeke deryayî ya mezin bihata amadekirin û ji bo Mîletos bi keleheke ji keştîyan pêk hatî bê parastin, wê li Ladeyê berhev bibûna. (Lade giraveke biçûk ya li pêşîya Mîletosê ye.)

[8] Piştî ev biryar hat wergirtin, Îonîayên keştîyên xwe tam bi rêk û pêk kirin, li gel ku Aîolên li Lesbosê bi wan re hatin cihê civînê; pergala wan a şer bi vî awayî bû: Mîletosî li milê rojhilatê, wê baskê hêza deryayî ya rastî bigirtina; bi rêzê ve 80 keştî rêz kiribûn; piştî wan 12 keştîyên Prîeneyî, sê keştîyên Myûs, piştî keştîyên Myûsîyan 17 keştîyên Teosîyan hebûn; piştî keştîyên Teosê 100 keştîyên Khîosî rêz dibûn. Piştî wan keştîyên Erythraî û Phokaîayî hatibûn rêzkirin; Erythraî bi heyşt û Phokaîayî bi sê keştîyan beşdar bûbûn. Piştî Phokaîayan 70 keştîyên Lesbosî dihatin; ya herî dawîyê yê li milê goşeya rojavayê 60 keştîyên şer yên Samosîyan dirêj dibû. Tev li ser hev153 keştî beşdarî hêza deryayî bûbûn.

[9] Hêzên Îonîayê wiha bûn. Lê 600 keştîyên barbaran hebûn. -Dema ku hêza deryayî ya Persan û artêşa bejahîyê hatin pêşîya Mîletosê, fermandarên Persî ku dîtin hêza Ionê giring e, li ser serkeftinê ketin şikê; heke di deryayê de têk biçin û Mîletosê nestînin, wê ji destê Daryûs ezîyet bixwarina. Herî zêde ji vê ditirsiyan û hikumranên kevin yên Îonîayê bangî civînê kirin yê ji alîyê Arîstagorasê Mîletosî ve ji iktidarê hatibûn xistin û xwe avêtibûn Persan û vê carê jî li rexê Persan beşdarê seferê bûbûn. Wextê ew berhev kirin ev gotin: "Gelî Îonîayan, va ji we re wextê hûn bi kêrî hikumdar bên hat; bixebitin hemwelatîyên xwe yên li milê din qezenc bikin; ji wan re sozên wiha bidin: ji bo ku serî hildane dê neyên cezakirin, ne perestgehên wan û ne jî milkên wan wê bên şewitandin, wê miameleke ji berê girantir bi wan re neyê kirin. Lê heke guhê xwe nedin we, bêjin çi dibe bila bibe em ê beşdarî şer bibin, wê çi bê serê wan jî ji wan re baş bêjin: Wê şer wenda bikin û bibin kole; wê kurên wan bên xesandin, keçên wan ji Baktrayê re bên şandin, wê erdê wan bidin hinên din."

[10] Wiha gotin û hikumranên Îonîayê bi şev ji kesên sîteya xwe re xeber şandin. Lê Îonîayên ev xeber girtin, qebûl nekirin, bi îxanetê razî nebûn, her yek ji wan dil wan de ev xeber tenê ji wî re hatîye şandin. -Belê Persên hatin pêşberî Mîletosê, karê wan yê ku destpêkê kirin ev bû.

[11] Fermandarên Îonîayî li girava Ladeyê berhev bûn û meclisa şer damezirandin. Di nav axaftvanan de yên mafê axaftinê wergirtin Dîonysîosê fermandar yê Phokaîayî jî hebû, wî wiha got: "Belê, hemwelatîyên Îonîayê,

em li ser devê gwîzanê ne; bi ferqa mûyekî ya em ê azad bibin yan jî bibin kole û bi ser de em ê bikevin rewşa yê bazdayî ku hatin girtin û bûn kole. Niha heke hûn zehmetê bigrin ber çavê xwe; bêguman hûn ê demeke zehmet derbas bikin, lê piştre hûn ê dijmin bişkînin û azad bibin; heke hûn kar sist bigrin û pergalê xera bikin, hûn ê cezayê serhildanê ji hikumdar gelekî zêdetir bikşînin. Bawerî bi gotinên min bikin û bihêlin ez we îdare bikim û ez, heke xuda izin bidin, dikarim ji we re bêjim wê dijmin nekeve şer, heke bikeve şer jî wê wendayîyên mezin bide û piştre jê derkeve."

[12] Îonîayên guhê xwe dan Dîonysîos, ketin bin emrê wî. Wî, her sibe keştî bi awayê rêzeke dirêj derdixist deryaya vekirî, bi tam techîzatî bêrjenan re perwerdeya derbasbûna ji nav du keştîyên dijmin dida kirin. Piştre di saetên mayî yên rojê de keştî li ser lenger dihiştin û heta êvarê Îonîayî di karên cûre cûre de dida xebitandin. Heft rojan hemî gotinên wî kirin, emrên wî bi cih kirin; lê piştî wê, Îonîayên ku hînî van karan nebibûn, di bin tava kelijandî de westîyayî dest bi gotinan kirin û digotin: "Em li hemberî gotinên kîjan xudayî derketin ku ev qas rezîlî hat serê me. Me hişê xwe wenda kirîye heta em ketine bin fermana vî Phokaîayê derewîn ku bi sê keştîyan hatîye, me serê ben winda kirîye. Me wekî xulamê bavê xwe dide xebatandin û di bin karê giran de me dikuje; va gelek ji me nexweş ketin, wê ev bê serê gelek kesê ji me jî. Ji bedêla kêşana evqas ezîyet, em dev jê berdin çi dibe bila bibe. Di cihê ji îro ve em li zincîrê kevin, em bimînin li hêvîyê û siberoj bibin kole baştir e. De here lo! Êdî em destê xwe nedin tiştekî!" Bi vî awayî diaxivîn û êdî kesek nedixwest emir werbigire; wekî artêşa bejahîyê di giravê de diman û bereqe ava dikirin û li ber sihê radiketin; xwe nêzîkî siwarbûna keştîyan û perwerdeyê nedikirin.

[13] Dema ku fermandarê Samosî ev halê Îonîayan dîtin, ku berîya wê Aîakesê kurê Syloson, li ser emrê Persîyan, ji wan xwestibûn ji nav sefên Îonîayan veqetin, belê ev fermandarên Samosî, dema ku bayê tevlihevîyê di nav sefên Îonîayan de dîtin, dest bi fikra wan pêşnîyazan kirin, ji derveyî wê jî bi awayekî zelal biserketina li hember Hikumdarê Mezin jî bêîmkan didîtin; ji ber ku heke vê hêza deryayê mexlûb bikin jî, tu şika wan tunebû ku wê paşê pênc qatê wê xurtir bihata. Vî halê Îonîayan ji xwe re firset dîtin û berîya perestgeh û malên xwe wenda bikin, baş dîtin xwe ji nav vî karî

bidin milekî. -Ev Aîakesê han yê Persîyan ew wekî navbeynkarî bikar dianîn, kurê Sylosonê kurê Aîakes bû; dema ku li Samosê hikumran bû, wekî hikumranên din ên Îonê, Arîstagoras iktidar ji destan sitendibû.

[14] Dema ku Fenîkeyîyan hereket kirin, Îonîayan jî keştîyên xwe bi sefên dirêj ajotin cihê vekirî. Herdu mil rûbirû bûn, şer dest pê kir. Di vî şerê deryayî de ji Îonîayan kîjan di nehêjatîyê de, kîjan di mêrxasîyê de pêş ve çûye, ez tam nikarim tiştekî bêjim, ji ber ku temaman wan hevdû tawanbar kirine. Bi qasî tê gotin Samosî, li gor peymana bi Aiakes re kirine, ba li babirkên xwe kirine û ji sefê derketine û ber bi Samosê ve ketine rê, lê tenê yanzdeh kes ji wan beşdarî wan nebûne; fermandarên van yanzdeh keştîyan, guhê xwe nedane emrê ji wan re ji jor hatîye, li cihê xwe mane û şer kirine. Meclisa Xelkê ya Samosê, ji bo bîranîna vê mêrxasîya wan nîşan daye, biryar dane kevirekî abîdeyê daçikînin û navê van kesan tev yên bavê wan li ser binivîsin; ev kevirê abîde îro jî li agorayê di cihê xwe de sekinîye. Lesbosîyên ku dîtin cîranên wan yên şer baz didin, wan jî wekî Samosîyan kirine, qismeke mezin ji Îonîayî jî beşdarî wan bûne.

[15] Di nav yên man û şer kirin de, wendayîya herî mezin Khîosîyan dan, ji ber ku serkeftinên baş qezenc kirin, bi dil û can şer kirine. Wekî me li jorê got, bi 100 keştîyan beşdarî sefê bûn û li her keştîyê 40 kes ji hemwelatîyên xwe yên bijarte siwar kiribûn. Dîtin ku gelek hevalên wan yên şer îxanet kirin. Lê wekî wan bi nehêjatî hereket nekirine û bi hejmareke hindik yên hevalbendên wan ên şer yê li dora wan mane ve şer kirine, xwe avêtine ser keştîyên dijmin piştî gelek keştîyên dijmin ji derveyî sefê hiştin, piranîya keştîyên xwe jî wenda kirin. Bi yên di destê wan de man, ber bi welatê xwe ve baz dan.

[16] Khîosîyên keştîyên wan gelek zerar dîtin û dijmin da ser pişta wan, xwe avêtin Mykaleyê. Wan keştîyên xwe li bejahîyê dan rûniştandin û li wir hiştin. Piştre derketin rêwîtîya bejahîyê. Gihiştin erdê Ephesosê; jinên Ephesosê Thesmophorîa pîroz dikirin; Ephesosîyên haya wan ji yên hatine serê deryavanên Khîosê tunebû, dema ku dîtin hêzeke çekdar ketine welatê wan, dil wan de ku ev çeteke eşqîyan e û ji bo revandina jinên wan hatine; temamê bajêr, ji bo jinên xwe biparêzên derketin û temamê Khîosî bi şûran kuştin. Qedera wan wiha bûbû.

[17] Li gor Dîonysîosê Phokaîayî, sê keştîyên dijmin bi dest xistîye, piştre dîtîye ku xêr di rewşa Îonîayan de nemaye û xwestîye vegere Phokaîayê; wî jî wekî temamê Îonîayan dizanîbû wê welatê wî bê kolekirin. Bêrawestan rast çû Fenîkeyê, gelek keştîyên ticaretê xerq kirin, malê dinyê bi dest xist û ji wir ber bi Sîcîlyayê ve ket rê, li wir bi cih bû û dest bi qorsanîyê kir; tenê êrîşî Kartacayîyan û Etrûskîyan dikir, îşê xwe ji Yûnanîyan nedianî.

NETÎCEYÊN ŞERÊ LADEYÊ

[18] Persîyên di deryayê de Îonîayî mexlûb kirin, Mîletos ji derya û bejahîyê ve dorpêç kirin. Axa bin dîwaran kolabûn, her cûre amûrên dihat zanîn bikar anîbûn; bi vî awayî di sala şeşem a serhildana Arîstagoras dabû destpêkirin,[224] bajar bi dest xist û ji binî ve hilweşand. Xelkê wê kirin kole. Ev felaket, rastîya gotinên kahîn yên ji bo Mîletosîyan gotibû, rast derxistin.

[19] Argosî ji bo rizgarîya bajarên xwe li Delphoîyê şêwirî bûn. Kahîn bersiv dabû, beşeke bersivê Argosîyan, beşeke din jî Mîletosîyan eleqedar dikir. Yên ji bo Argosîyan, di çîroka min de dema ku cihê wê bê ez ê bêjim. Bêyî hayê wan jê hebe, beşa ku behsa Mîletosîyan dike ev e:

> Wî wextî, Mîletos, ey karkerê belayan, wî wextî
> Ji bo gelek kesan şahîyeke dewlemend, xenîmeteke geş
> Tu yê bibî, wê jinên te têkevin dest,
> Wê lingên axayên por dirêj bişon û Dîdyma,
> Perestgehên me, wê bibe malê efendîyên biyanî

Belê, ev hatibû serê Mîletosîyan, piranîya mêrên wan di destê pordirêjên Persîyan de can dabûn, jin û zarokên wan bûbûn kole û Dîdyman, avahîyên pîroz,[225] perestgeha kahîn dihewand û mîhrab hatibû talankirin, şewitandin. Ev dewlemendîya nav van dîwaran, min berê di gelek cihên çîroka xwe de dabû xuyakirin.

[20] Mîletosîyên hatin esîrkirin, şandin Sûsayê. Hikumdar Daryûs xerabî bi wan nekir; tenê ew li qiraxên deryayê yê jê re Erythreîa tê gotin û li bajarê

224 Serhildana Aristagoras derxistîye sala berîya zayînê 494 e.
225 Perestgeha li başûrê Mîletosê ya Apollona Dîdymayê.

Ampeyê ya li ber devê ava Dîcleyê bi cih kirin. Erdê Mîletosê di navbera Persan û Karyayîyan de hat parvekirin; Persîyan bajarê Mîletosê û cihên nêzîkî wê yên deştî, Karyayên Pedasosî jî cihên li ber pêşkên çiyan girtin.

[21] Sybarîsîyên piştî erdê xwe wenda kirin li Laos û Skydrosê bi cih bûn, ji Mîletosîyên li ber Persan şikestibûn, li hemberî ew nêzîkahîya ku berê ji wan dîtibûn, eleqe nîşan nedan. Dema Krontonîyan Sybarîs bi dest xistin, temamê xortên li Mîletosê serê xwe kur kiribûn û şîneke mezin girtibûn. Bi qasî em dizanin, wek van herdu sîteyan yên dostê hev, du sîteyên din tunebûn. Helwesta Atînayîyan ji ya Sybarîsîyan gelekî cuda bû. Atînayî, ji ketina Mîletosê ya destê Persîyan, bi qasî ku gotin têra îzahkirinê nake ewqas li ber ketine; ji nav nimûneyên wê em dikarin tenê vê bidin: Dema ku Phrynîkhos dramaya ketina Mîletosê qise dike dide leyistin[226] temamê kesên li tîyatroyê hêsir barandine, ji bo ku êşeke wiha mezin û millî bibîr anîye, drahmîyek ceza lê hatîye birîn û leyistina dramayê hatîye qedexekirin.

[22] Êdî li Mîletosê Mîletosî nemane. Li Samosê jî yên xwedî milk, ji wê helwêsta kaptanên wan ya li hemberî Medan nîşan dane, nerehet bûne. Piştî şerê deryayî bêsekin berhev bûne, di cihê li Samosê bimînin û bibin koleyê Medan û Aîakes, biryar dane berîya hikumran Aîakes were, biçin kolonîyekê ava bikin. Tam di vê navê re hevwelatîyên bajarê Zankleyê[227] ya li Sîcîlya qasid şandin, pêşnîyazî Îonîayan kirin ku bên li ser Qeraxê Xweşik bajarê Îonê ava bikin, ya ku wan dixwest ava bikin; ew cihê jê re Qeraxê Xweşik dihat gotin ya Sîcîlyayê bû; vir herêma Sîcîlyayê ya li Etrûrîayê dinêrî. Tenê Samosîyan û yên ji Mîletosê baz dabûn ev pêşniyaz qebûl kirin.

[23] Ew bûyerên di esnayê vê seferê de qewimîn ev in: Samosîyên çûn Sîcîlyayê, gihiştin Pozê Zephyrîonê[228] yê li welatê Lokroîyê. Di vê navê re Zankleyîyan, ku hikumdarê wan Îskîtes li ser serê wan bû, bajarekî Sîcîlyayê yê

226 Ev trajedî ya Aîskhylos, di sala 492an a berî zayînê de hatîye leyîstin.

227 Zankle, li bakurê Sîcîlyayê ye, navê wê piştre bûye Messana. Navê wê yê niha Messîna ye.

228 Zephyrîon: Li başûrêrojhilatê Italyayê, Pozê Spartîvantoya niha. Gela, li qeraxên başûrê Sîcîlyayê bû. Hikumranîya Hîppokrates ya Gelayê heft sal kişandîye, Gelon cihê wî girtîye

dixwestin talan bikin û bişewitînin dorpêç dikirin. Anaxîlosê hikumranê Rhegîonê yê ku navbera wî û Zankleyîyan ne baş bû, dema ev xeber wergirt, bi Samosîyan re hevdîtinek çêkir. Ew xapandin, kir ku dev ji Qeraxê Xweşik berdin û Zankleya ku wî wextî tê de mêr tunebûn bigrin. Zankleyîyan dema seh kirin bajarê wan ji destê wan derdikeve, baz dan hatin, heman demê bangî alîkarîyê ji Hîppokratesê hikumranê Gelayê yê hevalbendê wan kirin. Hippokrates, bi artêşa xwe ve wekî ku wê bê hereket kir; lê ziddê wê kir. Bi mahneya ku bajar winda kirîye, Îskîtes li zincîrê xist, bi birayê wî Pythogenes re şand bajarê Înyxê; piştre bi Samosîyan re li hev kir, bi hev re sûnd xwarin û Zankleyiyên mabûn jî teslîmî wî kir. Di miqabilî vê de Samosîyan jî, wê nîvê kole û malên guhêzbar yên di nav bajêr de û temamê yên li derveyî bajêr bidana wî. Em bên ser xelkê, qismekî mezin Hîppokrates ji xwe re veqetand û li zincîrê dan û kirin kole, ji nav wan 300 kesên kifşe bijartin, ji bo bên kuştin da Samosîyan. Lê Samosîyan tiştekî wiha nekirin.

[24] Îskîtesê hikumdarê Zankleyîyan, ji Înyxê baz dabû Hîmerayê; ji wir derbasî Asyayê bû û çû ba hikumdar Daryûs, Daryûs ew kesekî herî rast yê ji Yûnanê hatibûn hesêb kiribû; ji ber ku bi izna hikumdar vegerîyabû Sîcîlyayê, lê bi ser vê de jî li wir nemabû û heta dawîya temenê xwe di nav Persan de bi şan û şeref jiyabû û li wir kal bû û li wir mir. -Samosî ji destê Medan bi vî awayî rizgar bûne û bê şer bûne xwedîyê bajarekî şahane yê wekî Zankleyê.

[25] Fenîkeyîyan, piştî şerê deryayî yê li ser Mîletosê, Aîakesê kurê Syloson birin Samosê; emrê Persîyan wiha bû, wî ji xwe re alîkarvanekî hêja hesêb dikirin, dixwestin qencîyê pê bikin. Di nav miletên li hemberî Daryûs serî hildabûn, tenê perestgeh û bajarên Samosîyan ji şewatê filitî, ji ber ku di esnayê şer de keştîyên xwe girtibûn û çûbûn. Tam piştî sitendina Mîletosê, Persan Karya jî kirin bin desthilata xwe, hinek bajarên Karyayê ji ber xwe ve, hinek jî li hemberî zorê serî tewandibûn.

DAWÎYA HÎSTÎAÎOS

[26] Dema ku li vir ev diqewimîn, Hîstîaîosê Mîletosî yê dora Bîzansê girtibû û bi lêdana keştîyên Îonê yên ji Deryaya Reş dihatin mijûl bû, xebera yên li Mîletosê diqewimîn girtibû. Hellespontos ji Bîsaltesê kurê Apollophanesê

Abydosî re hişt, bi xwe bi Lesbosîyan re ber bi Khîosê ve ket rê; garnîzona Khîosê, nehişt ew derkeve bejahîyê, li ser vê, li cihê jê re "Nekûr" tê gotin bi garnîzonê re şer kir, piranîya wan bi şûran kuştin. Hîstîaîos û Lesbosîyên pê re yên Polîkhnayê[229] wek baregeh bikar dianîn, Khîosîyên ku jixwe di şerê deryayî yê Mîletosê de bi ziyanên mezin derketibûn, mexlûb kir û girav kir bin destê xwe.

[27] Berîya wêranîyên mezin bên serê bajarekî, bi gelemerî tiştên wê xeber didin diqewimin. Yên wê bihatina serê Khîos jî di pêşîyê de kifş bûbû. Ji sed xortên wekî koroyê şandibûn Delphoîyê tenê dudu jê vegerîyabûn; 98ên din, bi nexweşîya webayê ya wî wextî derketibû ketibûn û miribûn. Ji bilî vê cardin di wê navê re û demek berîya şerê deryayî, xwendegehek hilweşîyabû ser xwendekarên tê de ders didîtin; ji 120 zarokan tenê yek jê filitîbû. Hişyarîyên xudayan bi vî awayî bûbû. Piştî van, şerê deryayî hatibû ya ku temamê bajêr wekî pêlewanê bikeve ser çokan, hejandibû; niha jî wekî ku ev hemî ne bes be, Hîstîaîos li serê Lesbosîyan derdiket orteyê; êdî Khîosîyên gelek ezîyet kêşabûn, nikarîbûn li ber vê wêranîyê bidin.

[28] Hîstîaîos, ji vir şûn ve hejmareke zêde bi Îonîayî û Aîolîyên di destê xwe de, li hemberî Thasosê sefer dabû destpêkirin. Dema ku Thasos dorpêç kir, xeber wergirt ku Fenîkeyî ji Mîletosê rabûne û ber bi herêmên din yên Îonîayê meşîyane. Li ser vê dev ji girtin û talankirina Thasosê berda û bi temamê artêşa xwe ve çû Lesbosê. Lê di nav arteşê de hejarîyê dest pê kir, ji ber vê, ji bo çandinîya deştên Atarneûsê li Mysîayê û Kaîokoyê rake, ji Lesbosê rabû derbasî qeraxê din bû. Tam wê demê, kesekî Aryanî yê navê wî Harpagos bi fermandarîya artêşeke bi hêz li vê herêmê bû. Dema ku artêşa Hîstîaîos derket bejahîyê, avêt ser wan, Hîstîaîos ze kir û qismekî mezin ji artêşa wî kuşt.

[29] Hîstîaîos bi vî awayî hatîye girtin: Yûnanî û Persî, li Meleneya li ser erdê Atarneûs dest bi şer kiribûn, demek şûn de yekîneyên siwarî yên yedek jî avêtin ser Yûnanan; li ser êrîşa siwarîyan eskerên Hîstîaîos dest bi bazdanê kirin; Hîstîaîos her çend li hemberî hikumdar tawanbar bû, lê bawer dikir ku wê wî efû bike, ket nav tevgera rizgarkirina canê xwe: Dema ku baz

229 Polikhna: Bajarek li girava Khîosê.

dida, Persîyek pêşîya wî birrî, hindik mabû wî bigre û bikuje, lê wî navê xwe got, got ku ew Hîstîaîosê Mîletosî ye.

[30] Ez wisan texmîn dikim ku, heke piştî hat girtin ji hikumdar Daryûs re bihata şandin, cezayê tawanê wî ewqas giran nedibû. Lê Artaphrenesê walîyê Sardesê û Harpagos ew girtibûn, texmîna wê ew bê efûkirin dikirin û bi filitîna ji cezayê tenê namîne, ditirsîyan careke din bikeve çavê hikumdar; sirf ji bo vê çawan anîn Sardesê li sing xistin; serê wî birîn mûmya kirin û ji Hikumdar Daryûs re şandin Sûsayê. Daryûs ji bo wî sax jê re neşandin, ʻerza wan şikenand; serê Hîstîaîos da şûştin, bi kefen pêça û li gor layîqî şanê wî, her wekî ji Persîyan re xizmeteke mezin kirîbe, da veşartin.

ROJÊN WÊRANÎ YÊN ÎONÎAYÊ

[31] Dawîya Hîstîaîos wiha bû. -Hêza deryayî ya Persê li Mîletosê zivistana xwe derbas kir, sala duduyan vebû deryayê û li giravên Khîos, Lesbos û Tenedosê yên nêzîkî bejahîyê bi rehetî serî dan tewandin. Dema ku barbaran girav distendin, xelk wekî bi toran bigrin berhev dikirin. Wextê ez tor dibêjim bi vî awayî: Her yekî destê yê rexê xwe digirt, ji serê qeraxê bakur yê giravê heta qeraxê başûr dirêj dibûn û zincîrek derdiket meydanê, piştre ji serekî heta serê din dimeşîyan û insanên derdiketin pêşîya wan wekî di nêçîra koçberîyê de berhev dikirin. Bajarên Îonê yên di bejahîyê de jî bi eynî rehetîyê distendin; lê manewraya vê torê nikarîbûn tetbîq bikin, ji ber ku li van deran tiştekî wiha nedibû.

[32] Fermandarên Persî, dema ku bi keştîyên xwe hatin li hemberî keştîyên Îonîayê rêz bûn, ew tehdîtên li hemberî Îonîayîyan kirin tevde bi cih anîn. Dema ku diketin sîtekê, zarokên kur yên herî xweşik û mêrên bikaribin zarok çêkin, ji bo bixesînin vediqetandin; keçên herî sipehî diçûn seraya Hikudarê Mezin. Di eynî demê de bajar û perestgeh dişewitandin. Bi vî awayî Îonîayî cara sisiyan bû dibûn kole; cara yekem bi destê Lîdyayan bibûn kole, piştre cara duyem jî bi destê Persîyan rastî eynî aqibetê dihatin.

[33] Hêza deryayî ya ji Îonîayê veqetîya, ji serî heta binî qeraxê Hellespontosê kir bin desthilata xwe. Qeraxên rojhilatê, sirf yekîneyên ji Persan pêk

hatibûn, jixwe berîya wê bi şerekî di bejahîyê de dest danîbûn ser. Qiraxên Ewrûpayê yên Hellespontosê -ku gelek cihên rûniştinê tê de hebûn- wekî Perînthosê, kelehên Thrak, Selybrîa û Bîzans tê de hebûn. Bîzans û Khalkedonên hemberî wan, li hêvîya hatina keştîyên Fenîkeyîyan jî nemabûn; welatê xwe terk kiribûn û derketibûn, ketibûn Deryaya Reş û li wir bajarê Mesambrîayê damezirandibûn. Fenîkeyîyan ev welatên ez behsa wan dikim şewitandibûn, kevir li ser kevir nehiştibûn, piştre ber bi Prokonnesosê û Artakeyê ve çûbûn, piştî van deran jî şewitandibûn; ew wilayetên di sefera yekem de dest lê nedabûn, ji bo ku talan bikin cardin vegerîyabûn Khersonesosê. Tenê dest nedan Kyzîkosayê, ji ber ku wan berîya Fenîkeyî bên, bi Oîbaresê kurê Mgabazos yê walîyê Daskyleînê re li hev kirin, qebûl kiribûn ku bikevin bin desthilata hikumdar. Ji derveyî wilayeta Kardîayê temamê Khersonesosê bi vî awayî ketibû destê Fenîkeyîyan.

M Î L T Î A D E S

[34] Hikumranê van wilayetan, heta wî wextî Mîltîadesê kurê Kîmonê kurê Stesagoras bû. Mîltîadesekî din ku kurê Kypselos bû, gelek berîya wê van deran bi vî awayî kiribû destê xwe: Khersonesos, di destê Dolonkîyên ji miletê Thrakan de bû. Ev Dolonkîyên han di şerekî de li ber Apsînthîayan têk çûbûn û li ser şêwra vî şerî hikumdarên xwe şandibun Delphoîyê. Pythîa jê re tewsîye kirîye ku, piştî ji perestgehê derket kesê ji ber xwe ve ji wan re mêvanperwerîyê nîşan bide, bigre bibe welatê xwe û li wir bi wî kolonî bide damezirandin. Dolonkî di seranserê Boîotîa û Phokîsê de li ser rêya pîroz meşîyan, kesekî ew dawetî mala xwe nekir; li ser vê ber bi Atînayê ve çûn.

[35] Di wê dewrê de Atîna bi serê xwe di bin desthilata Peîsîstratos de bû; lê Mîltîadesê kurê Kypselos jî kesekî xatirşînas bû; ji malbateke hesp xwedî dikirin bû, bav û kalên wan digihiştin Aîakos û Aîgînayan, lê gelek çênebibû ev malbat hatibûn û bi Phîlaîosê kurê Aîas re li Atînayê bi cih bûbûn. Ev Mîltîades, dema ku rojekê li ber derîyê xwe rûniştîye, Dolonkî di wir re derbas dibin, kinc û lixwekirin û çekên wan dida nîşan ku ne ji xwecihan in; bangî wan kir; hatin, ew dawetî mala xwe kirin. Wan gotin "baş e", bûne mêvanê Mîltîades, behsa kehanetê kirin, rica kirin ku emrê xuda pêk bîne. Mîltîades bê lam û cîm bike got "Baş e", jixwe birêvebirîya Peîsîstratos lê

giran dihat û difikirî xwe jê xelas bike. Ji bo hîn bibe wê kahîn çi bêje, gelo wê rast be yan na bi Dolonkiyan re biçe, bêpayîn rabû çû Delphoîyê.

[**36**] Dema ku Pythîa jî eynî tiştî got, Mîltîadesê kurê Kypselosê di leyzên Olîmpiyatê de bi erebeya xwe ya çarhespên bi rexê hevdû hatine girêdan, pêşbirk qezenc kirine, Atînayîyên pê re beşdarî bikin jî girtîye ba xwe, bi Dolonkîyan re ba berdan babirkên xwe; welat kir bin desthilata xwe, yên bi wî re hatibûn ew kirin hikumranê welat. Wî bi avakirina hesareke di navbera Kardîayê û Paktyayê ya wan ji bejtenga Khersonesosê cihê dike û li hemberî êrîşên Apsînthîayan wan biparêze dest bi kar kir. Firehîya bejtengê 36 stad e. Li rexê din ê bejtengê dirêjahîya Khersonesosê 420 stad e.

[**37**] Piştî ev bihêr da girtin û Kharsonesos ji êrîşên Apsînthîayê rizgar kir, ji nav miletên din wekî dijmin pêşî Lampsakosî hilbijart. Lê Lampsakosî ketin kemînê û ew girtin. Li milê din Mîltîades, hezkirina Kroîsosê Lîdyayî qezenc kiribû; ku yên hatine serê wî Kroîsos seh kirin, ji Lampsakosîyan re xeber şand ku Mîltîades berdin; yan na wê ew wek dara qaçê biperçiqandîya. Lampsakosî li ser vê gotina Kroîsos yanî bi gotina weke dara qaçê perçiqandin mebesta wî çiye, dûr û dirêj fikirîn. Kalekî piştî serê xwe gelek li ser êşand, fêhm kir û îzah kir: Di nav daran de tenê dara qaçê dema ku cara ewil hat birîn hişk dibe, careke din şax nade. Xelkê Lampsakos yê ku ji hêrsa Kroîsos tirsiya, Mîltîades berdan.

[**38**] Piştî ku ji alîyê Kroîsos ve hat rizgarkirin, bêyî zarokên wî çêbibe koça dawîyê kir û bi iktidara xwe re hebûna xwe ya mal jî da destê Kîmonê kurê zirbirayê wî yê ji alîyê dayîkê ve. Navê vî kurî Stesagoras bû. Dema ku Mîltîades mir, miletên Khersonesosê li ser navê wî wekî ji damezrênerên bajaran re tê kirin, rojê qurbanjêkirinê veqetandin; ji bo şerefa wî xwenîşandanên jîmnastîkê û misabeqeya hespan kirin. Beşdarîya Lampsakosîyan di van misabeqeyan de qedexe kirin. Bi vî bajarî re cardin dest bi şer kirin û vê carê jî Stesagoras û ew jî bêyî zarok li pey xwe bihêle mir; kesekî li Prytaneîonê bivirek li serî xistibû, vî kesî xwe qaçaxê eskerîyê da nîşan, lê ew dijminekî destsivik bû.

[**39**] Piştî bi vî awayî hat serê Stesagoras jî, Peîsîstratîdî, Mîltîadesê kurê Kîmon û birayê Stesagorasê ku mir, ji bo ku desthilatdarîyê bigre destê xwe

li trîremekê siwar kirin şandin Khersonesosê. Li Atînayê, wekî di kuştina bavê wî Kîmon de tilîya wan tunebe, Atînayî gelekî rêz lê digirtin, ez ê behsa bûyera li ser Kîmon di çîrokeke din de bikim. Dema ku Mîltîades hat Khersonesosê, ji bo rêzlêgirtina bîranîna birayê xwe Stesagoras bide nîşan, ket hindurê mala xwe û xwe îzole kir. Dema ku giregirên Khersonesosê ev seh kirin, ji hemî wilayetan heyetek hilbijartin û şandin ba wî û jê re gotin, em êşa te parve dikin: Wî jî ew avêtin hepsê. Bi vî awayî bû efendîyê Khersonesosê; 500 esker bi pera girtin û bi keça hikumdarê Trakyayê Oloros ya bi nave Hegesiyle re zewicî.

[40] Mîltîadesê kurê Kîmon, dema ku hat Khersonesosê jî, ji bilî yên me behs kirin, vir di zehmetîyên din yên girîng de jî dîtibû. Du sal berîya vê dewra em gihiştinê,[230] ji ber Îskîtîyan baz dabû; ji ber ku koçerên Îskîtîyê yên Hikumdar Daryûs han dabûn heta Khersonesosê daketibûn. Mîltîades bêyî li hêvîya wan bisekine baz dabû û heta ew neçûbûn jî venegerîyabû; piştre Dolonkî çûbûn û ew dîtibûn û paşde anîbûn. Ev bûyer du sal berîya niha a vê tarîxê ku em behs dikin bû.

[41] Çawan hîn bû Fenîkeyî hatine Tenedosê, di cih de hebûn û tunebûna xwe li pênc trîreman bar kirin û ber bi Atînayê ve ket rê. Ji bo ji Kardîayê derketibû rê di Kendava Melasê re derbas dibû; dema ku bi dirêjahîya Khersonesosê dihat xwarê, ket ser hêza deryayî ya Fenîkeyê; bi çar trîreman ve baz da û xwe avêt girava Îmbrosê; Fenîkeyîyên ketibûn pey, trîrema pêncan girtin. Fermandarê vê keştîyê Metîkhosê kurê Mîltîades yê ne ji keça Olorosê Trakyayî, yê ji jineke din bû. Fenîkeyî bi keştîyê re ew jî girtin û dema fêm kirin ku kurê Mîltîades e, ji Hikumdarê Mezin re şandin; ferz dikirin wê hikumdar gelek kêfxweş be. Ji ber ku, dema Îskîtîyan ji Îonîayan re gotin pira li ser Îstrosê xera bikin û vekêşin ser erdê xwe, Mîltîades tewsîye li Îonîayan kiribû guhê xwe nedin gotinên Îskîtîyan. Lê dema ku Metîokhosê kurê Mîltîades ji Daryûs re anîn, dest neda wî xortî; tam eksê wê, gelek qencî pê kirin; seray, mal, milk û wekî jin jî keçeke Persî dayê, zarokên ji wan çêbûn ji nesla Persê hatin hesêbkirin. Di wê navê re Mîltîades jî ji Îmbrosê derbasî Atînayê bûbû.

230 Du sal berîya vê dewra em gihiştinê ... (Ev sala B. Z. 493 ye. Di tarîxê de pirsgirêk xuya dike, di vî warî de minaqeşe hene...)

[42] Persîyan îsal li hemberî Îonîayan tiştek nekirin; bi eksê wê, tedbîrên bi vî awayî yên Îonîayan rizgar bikin wergirtin: Araphrenesê walîyê Sardesê, delegeyên sîteyên Îonîayê dan anîn, zor da wan ku bi van şertan peyman çêkin: Ji vir şûn ve nakokîyên di navbera wan de derkevin, wê bi rêya serîlêdana hekeman hal bikin, wê li hevdû nexin û talan nekin. Ev bi wan da qebûlkirin. Ji bilî vê erdê wan da pîvan; pîvana hat bikaranîn, pîvana Persan parasang a di miqabilî 30 stadyonê de bû û her yekî li gor vê pîvanê bi bacê ve girê da; ji wê rojê pêve bac li gor hesabê Artaphenes tên wergirtin û ferqa nisbeta bacan ji yên kevin tune.

[43] Tedbîrên rewşa heyî nerim bikin ev bûn. Di destpêka biharê de Daryûs fermandarên din ji ser kar hildan, Mardonîosê kurê Gobryas[231] bi fermandarîya hêzeke deryayî ya giring û artêşeke gelek bi hêz ya bejahîyê, şand qeraxê deryayê. Ew hê xort bû û nû bi keça Daryûs Artozostra re zewicîbû. Mardonîos bi vê artêşê ve hat Kîlîkîayê, li wir siwarî keştîyê bû, fermandarên din artêş di bejahîyê de dibirin Hellespontosê, ew jî bi hêza deryayî re diçû. Mardonîos li Asyaya Biçûk fitilî hat Îonîayê. Niha ez ê li vir, ji bo Yûnanîyên ku qebûl nakin Otanes di civîna heft kesî de, fikra ku li Aryanê demokrasî bê damezirandin parastîye, behsa tiştekî dûrî aqilan bikim: Mardonîos, temamê hikumranên li Îonîayê avêtibûn, li sîteyan demokrasî damezirandibû. Piştî ev kar temam kir bi lez meşîya ser Hellespontosê. Li wir hêzeke deryayî ya giran û hêzeke bejahîyê ya ji wê ne biçûktir berhev kirin, Bi keştîyan Hellespontos derbas kir, ji bo ber bi Eretrîayê û Atînayê ve here, ber bi hindurê Ewrûpayê ve meşîya.

[44] Ev bajar bahaneya vê seferê bû; esil armanca fermandarîya bilind a Persê, çiqas dest bide ewqas stendina bajarên Yûnanistanê bû; ji ber vê ye Thasosa ku li ber wan dest ranekiribû bi hêza deryayî sitendin û xelkê wê kirin kole, bi hêza bejahîyê Makedonî jî li miletên din ên pêşî kiribûn kole zêde kirin; ji ber ku temamê miletên din ên milê din î Makedonîayê jixwe

231 Mardonîosê kurê Gobryas, fermandarê Persê, xwarzîyê Dareios. Di şerê Plataîayê de mirîye (Pirtûk neh). Ev sefera Atînayê ya yekem di 492yan de û ya Maratonê di 490î yê B. Z. de ne.

di bin desthilata wan de bûn. Piştî Thasosê rêya xwe dewam kirin û heta Akanthosê bi qiraxan ve daketin;[232] piştre ji Akanthosê rabûn li Çiyayê Athosê fitilîn. Wexta ji vir fitilîn rastî bagereke ji bakur ve siwar dikir hatin, bagereke yeman bû, xerab hejîyan; piranîya keştîyan qulipîn, li Çiyayê Athosê ketin. Bi qasî dihat dîtin 300 keştî û ji 20 hezarî zêdetir insan telef bû; ji ber ku li van herêmên Çiyayê Athosê gelek masîyên wekî cenawaran hebûn, piranîya wan bûn xwarina van masîyan; hinek jî li keviran ketin perçiqîn; yên sêbahî nizanîbûn xeniqîn û yên ji sermayê mirin jî hebûn.

[45] Dawîya sefera deryayê wiha bû. Mardonîosê bi artêşa bejahîyê re li Makedonîayê baregah vedabû, bi şev ketin ber êrîşa Brygîyên Trakyayî ketin. Brygîyan gelek mirovên Mardonîos kuştin, bi xwe jî birîndar bû. Bi ser vê de ev milet jî ji bin desthilata Persan rizgar nebû, ji ber ku Mardonîos bê serî li wan bide tewandin ji wir veneqetîya. Li wir ma, piştî Brygî mexlûb kirin artêş bir Asyayê, ji ber ku ji bilî ew belayê Brygîyan anîbûn serê wan, hêza wî ya deryayî jî li nêzîkî Athosê rastî wendayîyên giran hatibû. Dikare bê gotin ev sefer neserkeftî temam bû, artêş û hêza deryayî vegerîya Asyayê.

THASOS Û KANÎYÊN ZÊRAN

[46] Cîranên Thasosê[233] fesadî di derbarê Thasosîyan ji Daryûs re kiribûn, gotibûn ku nîyeta wan a serhildanê heye. Daryûs dilxwişûşî bûye, salek piştî seferê ji wan re emrek şandîye û gotîye; hesarên xwe hilweşînin û keştîyan jî bibin Abderayê. Thasosîyên ku gelekî dewlemend bûn, ji dema dorpêça Hîstîaîosê Mîletosî şûn ve di nav tirsekê de dijîyan, ji ber vê keştîyên şer yên nû kiribûn ser dezgehan, li milê din jî dest bi tehkîmkirina hesarên ku bajar dorpêç kiribûn kirin. Ji milkên wan ên li ser axa sereke û madenên wê qezencên wan hebûn. Ji madenên zêr yên li Skapte-Heyleyê normal 80 talant qezenc dikirin. Ji madenên zêr yên li Thabobê ewqas qezenc nedikirin, lê ji bo ku ji bo wan bac nedidan cardin di qezencê de bûn. Ji erdan û madenan salê 200 talant qezenc bi dest dixistin; di salên baş de qezenca wan heta 300 talantan derdiket.

232 Akanthos: Cihê kanala bi nav û deng ya Xerxes hatîye kolan (Pirtûk heft, beş: 22).
233 Thasos di ya Ingilîzî de weke Thasîan derbas dibe.

[47] Min ev maden dîtine; yên min gelekî ecêbmayî dihêle, ew ê ji alîyê Fenîkeyîyan hatine vekirin ên ku bi Thasos re ji bo kolonîzekirina vir hatibûn. (Ji ber ku navê xwe jî ji Thasosê Fenîkeyî wergirtîye.) Ev madenên di giravê de ji alîyê Fenîkeyîyan ve hatine dîtin, li cihê dikevin Aînyra û Koînyrayê yê li hemberî Samothrakeyê ne; çiyayekî mezin e û ocaxên wê kûr hatine kolan.

[48] Belê, va li ser vê noqteyê çend hûrgilî. -Ez vê jî têkim ser; li ser emrê hikumdar Thasosîyan hesarên xwe xera kirine, keştîyên xwe şandine Abderayê. Piştre Daryûs, li devê Yûnanîyan gerîya, gelo wê şer bikirina, yan wê teslîmî wî bibûna? Dixwest vê hîn be. Ji bo vê mebestê qasid şandin her derê Yûnanistanê, xwest ji Hikumdarê Mezin re ax û av bişeynin. Ji bilî yên şandin Yûnanistanê, ji hemî wilayetên seranserê qeraxan yên bac didan re jî çawîşên xeberan şandin, emir kir jê re keştîyên şer û keştîyên bikaribin hespan neqil bikin çêkin.

[49] Gemî kirin ser dezgehan; çawîşên şandibûn Yûnanistanê, li bejahîyan û temamê giravên ku çûbûn, miletên ku ji emrên hikumdar re gotin ser çavan, kirin bin desthilata xwe. Wekî min got, temamê giravan û bi taybetî Aîgîna, ax û av dan Daryûs. Atînayîyên ev helwêsta Aîgînayîyan seh kirin, hêrs bûn, ev li hemberî xwe xwenîşandana dijmintîyê hesêb kirin, wek ku wê bi hikudarê Persê re bibin yek û li hemberî wan şer bikin, şîrove kirin. Atînayî ji bo mahneyek wiha bi dest xistin şa bûn, çûn Spartayê û Aîgînayî bi îxanetkirina Yûnanistanê tohmetbar kirin.

ŞERÊ ATÎNA-AÎGÎNAYÊ

[50] Li ser vê tohmetê Kleomenesê kurê Anaxandrîdas yê hikumdarê Spartayê, ji bo di nav Aîgînayîyan de yê herî tawanbar dihesibînin bigre, çû Aîgînayê. Lê dema ku xwestin van bidin girtin, Aîgînayîyan qiyamet rakirin; Krîosê kurê Polykrîtos yek ji yên li hember derdiketin yê sereke bû, ev hemwelatîyê mêrxas got, tu dest yek Aîgînayî jî nade, heke tu dest bide kesekî tê cezayê wê bikşîne; îddîa kir ku, ew bêyî erêkirina Spartayîyan werbigire, sirf ji bo ji Atînayîyan bertîl xwarîye bi vî karî rabûye; heke ne wiha bûya wê hikumdarê din jî pê re bihata, bi hev re ew bigirtina. (Yê ev

gotin pif kir guhê wî nameya Demaratos bû.) Kleomenesê ji Aîgînayê hat qewirandin, navê Krîos jê pirsî, wî jî got: "Krîos". Kleomenes got, "beranê min"[234] tê baş bikî ku tu qiloçê xwe di tuncê dake; ji ber ku di demek nêzîk de tê li qoçê dijminekî dijwar biqelibe!"

[51] Di vê navê re Demaratosê kurê Riston[235] ku li Spartayê mabû, dixebitî fikrên herkesî li hemberî Kleomenes xera bike; ew jî hikumdarê Spartayê bû, lê xanedana wî li pey yên din dihat; di eslê xwe de wekî hev bû, ji ber ku bav û kalên wan yek bû, lê tenê ew mafê ku ji ber temenê wî yê mezin didayê, şaxê Eûrysthenes serdestîyeke giring pêk dianî.

[52] Lakedaîmonîyan, bi eksê ku hozanan gotine, dibêjin, bi destê hikumdar Arîstodemos bi xwe (ne zarokên wî) ew hatina vî welatê xwe yê îro. Arîstodemos, kurê Arîstomakhosê kurê Kleodaîosê kurê Hyllos e. Di demeke kurt de ji jina Arîstodemos zarokên wî çêbûn. Navê jina wî Argeîa bû; tê gotin ku bavê wê Aûtesîonê kurê Tîsamensonê kurê Thersandrosê kurê Polyneîkes e; ji vê jinê cêwikên wan çêbûn. Arîstodemos, tam piştî çêbûna zarokên xwe nexweş ket û mir. Li ser vê Lakedaîmonîyan, li gor qanûnên xwe, ji bo yê mezin bikin hikumdar berhev bûn; lê nizanîbûn wê kîjanî hilbijêrin, ji ber ku cêwik hem di hêla girsayî û hem jî lihevhatinê de wekî hev bûn. Wextê dîtin nikarîn yekî ji wan hilbijêrin, heta belkî hê dest bi hilbijartinê nekiribûn, serî li dayîkê dan; wê jî bersiv da û got ku ew ê nikaribe cudatîyê bike. Wê baş dizanî kîjan mezintir e, sebebê kirina wê bi vî awayî ew bû ku wê dixwest herdu bi hev re hikumdarîyê bikin. Lakedaîmonî nikarîbûn ji nav vî karî derkevin û di nav vê şaşbûnê de, ji bo biirsin ka em çi bikin, serî li Delphoîyê dan. Pythîa got; bila herdu bi hev re bibin hikumdar, lê bila yê mezin rêzdartir bê girtin. Şîreta Pythîa kir, ev bû; lê jixwe Lakedaîmonîyan nizanîbûn ji wan kîjan mezin e, di wê navê re kesekî navê wî Panîtes yê Messanîayî fikrek da wan; ew fikra kesê navê wî Panîtes bû ev bû: Wê çavê wan li dayîkê be, ji bo şûştin û şîrdayînê pêşî radihêje kîjanî wê hîn bibin; heke hertim pêşî radihêje eynî zarokî, ne lazim e tiştek din bifikirin; na heke ferqê nake navberê, hinek car radihêje yekî û carna jî yê din, wî wextî wê bê zanîn ku ew jî ji wan zêdetir tiştekî nizane û wê rêyeke din bê ceribandin. Spartayîyan ya Messanîayî got

234 Krîos, yanî beran.

235 Di ya Îngîlîzî de Arîston derbas dibe.

kirin, çavê wan ma li dayîka zarokên Arîstodemos û dîtin ku, wextê dişo û dide pêşî radihêje eynî zarokî, -ji ber ku jinikê nizanîbû ji bo çi wê dişopînin. Zaroka ku dêya wî bi taybetî pê re eleqedar dibû birin û di Prytaneîonê de perwerde kirin. Navê Eûrysthenes dan wî, ji yê din re jî gotin Prokles. Tê gotin dema ku mezin bûn ev herdu zarok, her çend bira bûn, lê hevdû bûn dijmin û zarokên wan jî ev dijminayî domandin.

[53] Di nav Yûnanîyan de yên vê diaxifin tenê Lakedaîmonî ne; yên li jêrê wê bên xwendin, yên min li ser zêde kirine û di vî warî de ez pişta xwe bi gotine Yûnanîyan girê didim: Ev hikumdarên Dorîsê yê bav û kalên xwe heta Perseûsê kurê Danaeyê dihejmêrin lê bav û kalên xwe yên îlahî nabêjin, ji nesla Hellen in; Yûnanî secereke rast derdixin û didin xuyakirin ku, di dewrê kevin de ew jî di nav Hellenan de bûn. Em zêde dernekevin jorê, min got tenê heta Perseûsê, ji ber ku weke Amphîtryon ku kirine paşnavê Herkules, li Perseûs jî navekî fanî lê nekirine; ji ber wê bi awayekî rast, ez dibêjim heta Perseûs.[236] Lê heger li gor Danaeya keça Akrîsîos bê dest pê kirin û ji alîyê dayîkê ve biçin, wê bê dîtîn ku fermandarên Dorîsê ji xwîna safî ya nijada Misrê ne.

[54] Ew zincîra secereyê ya ku min da, li gor Yûnanîyan e. Ya Persî dibêjin ev e: Perseûs di eslê xwe de Asûryayî bû, bi xwe bû Yûnanî, lê bav û kalên wî ne Yûnanî ne; em bên ser nesla ji Akrîsîos zêde bûne, ku tu pismamtîya wan bi Perseûs re tune, ev wekî Yûnanî jî dibêjin Misrî ne.

[55] Ez bawer dikim di vî warî de evqas îzahat bes e. Jixwe Misriyan çawan û di karên bi çi awayî de bi ser ketine ku bûne hakimên ser Dorîsîyan, hinekên din ev îzah kirine; ji ber vê ez ji vê noqteyê derbas dibim; ez bes yên hinekên din behs nekirine vedibêjim.

ÎMTÎYAZÊN HIKUMDARÊN SPARTAYÊ

[56] Îmtîyazên Spartayîyan ji hikumdarên xwe re nas kirine ev in: Ew, rahîbên du xudayan in, yek jê Zeûsê xudayê Lakedaîmonan, yê din Zeûsê

236 Herodotos, behs dike ku Perseûs yê kurekî xuda bû, di nav insanan de ocax ava kiribû. Perseûs, kurê Zeûs e yê ji Danae hatîye dinyê. Herakles jî kurê Zeûs e, lê wekî insan kurê Amphîtryon yê mêrê Alkmene tê qebûlkirin.

xudayê Asmanî; li hemberî kîjan welatî bixwazin dikarin şer bidin destpêkirin, tu Spartayî nikare li hember derkeve, heke derkeve guneh kirîye tê hesêbkirin; di şer de hikumdar di pêş de diçe, piştre vedigerin; di şer de ji alîyê kesên bijarte tê parastin; di seferê de kîjan kerîyê bixwazin dikarin wê bistînin, hirî û çermê heywanên tên serjêkirin dibe yê wan.

[57] Ev ji bo dema şer in. Ev jî mafên wan yên di dema aştîyê de ne: Di merasimên fermî yên qurbanan û şahîyan de li serê jorê tên rûniştandin, pêşî xizmeta wan tê kirin; ji her xwarinê ji wan re du qat ji yên din zêdetir tê dayîn; di esnayê reşandina şerabê de di serî de tên, postê qurbanan jî ji wan re ye. Ji du meha carekê û di roja heftan a mehê de, dewlet ji herduyan re jî qurbaneke bê leke ya li perestgeha Appolon hatîye mezinkirin, medîmnosek ardê ceh û li gor pîvana Lakonîayê ji çaran yekê şerabê tê dayîn. Di temamê lîstikan de serê jorê yê wan e. Di nav hemwelatîyan de hilbijartina mafê proksenan[237] jî ya wan e; ji bilî vê her yekî du Pythîayî hildibijêrin; di demên pêwist de şêwra bi Delphoîyê re wezîfeya van Pythîayan e. Wekî hikumdaran îdareya wan jî aîdî dewletê ye. Heke hikumdar beşdarî şahîya gelemperî nebûbe, ji mala wan re cotek khoînîx ceh û kotuleyek şerab tê şandin; heke beşdar bûbe di her xwarinê de du porsîyon digre, heke bangî maseya hinekên din bên kirin cardin bi vî awayî tên pêşwazîkirin. Kehanetên werdigirin di arşîvên xwe yên taybetî de diparêzin, Pythîayî jî vê dizanin. Tek dadgerê wan hikumdar e, lê darizandina desthilatdarîyê di van rewşan de sînordar e: Keçek, heke ji alîyê bavê xwe ve nehatibe nîşankirin û bibe xwedîyê mîrata bavê xwe, wê bi kê re bizewice ew biryar didin; rêkxistina karên rêyên millî aîdê wan e; yek din jî, heke kesek bixwaze zarokekî bike ewladê xwe, pêwist e merasim di hizura wan de bê çêkirin. -Di Meclisa Pîran a 28 kesî de ew jî hene. Di civînên ku tunebin de, ji nav pîran yê herî nêzîkî wî, wî temsîl dike û ew ji bilî dengê xwe xwedîyê du dengên din in.

[58] Di saxîya wan de ew mafên cuda yên ji hikumdarên dewleta Spartayê re tên naskirin ev in; wextê dimrin jî: Ji temamê Lakonîayê siwarî tên derxistin, ji herkesî re xeber tê ragihandin; jin (wek ku li daholê dixin) li beroşa

237 Proksen: Kesê li welatên biyanî wezîfeya çavdêrîya welatê xwe ya polîtîk û ekonomîk dike. Qasidên welatê xwe dihewîne, rê nîşan dide û beşdarî hevdîtinan dibe. Wezîfeke wekî konsolosîya niha bû.

dixin û li bajêr digerin; yên vî dengî seh dikin ji malan du kesên azad, jinek û mêrek kincê şînê li xwe dikin; yên riayetê vê qanûnê nekin bi cezayên giran tên cezakirin. Dema ku hikumdar mir tiştên tên kirin jî, barbarên Asyayê çi dikin, Lakedaîmonî jî eynî tiştî dikin; li ba piranîya barbaran jî dema ku hikumdar mir eynî tiştî dikin; Yanî dema ku hikumdarekî Lakedaîmonî dimre merasima cenazeyê, ji derveyî Spartayîyan, ji temamê welatê Lakedaîmonê re, hejmareke kifş perîek jî beşdar dibin. Ev, Hilotî û Spartayî bi xwe, bi hezaran kes, li cihekî berhev dibin. Dema ku ew li serê xwe dixin, li milê din jin dikin qêjîn, dikin qîr ku ev hikumdarê çûyî, di nav hikumdaran de yê herî baş bû. Heke hikumdar di şer de hatîbe kuştin, peykerê wî tê çêkirin, li ser nivîneke ji qumaşên bi qîmet hatî çêkirin radizînin û peyker bi vî awayî dibin merasimê. Di esnayê veşartinê de meydan deh rojan girtî dimîne, hilbijartina berpirsiyar jî bi qasî wê midetê paşve tê xistin. Deh roj şîn tê girtin.

[59] Adeteke din jî ya dişibe ya Persîyan ev e: Dema ku hikumdarek dimre û yekî din dikeve cihê wî, hikumdarê nû, temamê deynên hikumdar yan yên dewletê yên li Spartayîyan efû dike. Di Persan de hikumdarê nû yê derkeve ser text, temamê deynên wilayetê yên heta wê tarîxê xera dike.

[60] Xaleke ku Lakedaîmonîyan nêzîkî Misrîyan dike: Wezîfeya Kerûxîyan,[238] flûtjenan û aşçÎyan ji bavê derbasî kur dibe; her flûtjen kurê filûtjenekî, her aşçî kurê aşçîyekî û her kerûx kurê keruxekî ye. Dengê kesekî dikare gurr be, lê bi vê nikare karê kurê kerûxekî bigre; pîşeya ji bav tê esasgirtin. -Belê ji hemî milan ve adetên wan wiha ne.

QAYÎŞA KLEOMENES-DEMARATOS

[61] Di vê qonaxa ez behs dikim de Kleomenes, dema ku li Aîgînayê ji bo xêra Yûnanîyan dixebitî, Demaratos jî ji bo zerara wî dixebitî û ne ji bo ku

238 Zabit, çawîşê nûçebirinê. Ev ne tenê nûçebir yan qasid e. Nûçeyên wezîfeyên resmî yên hikumdar, belavokên li xelkê tên belavkirin û ji hikumdarên bîyanî û miletan re dibirin, heke hebûya bersivên wan distendin û paşde dihatin, nikarîbûn hevdîtinan bikin. Di meydanê de belavokên dewletê bi qîr îlan dikir. Ev wezîfeyek girîng ya resmî bû ku tenê emanetî kesên bawerpêkirî dikirin. Destpênedayîna wî hebû, bi giranîya wezîfeya xwe di destan de kopalek hebû.

melhezeya Aîgînayîyan dikir, ji ber deqsokîyê û çavnebarîyê wisan dikir. Di miqabilî vê de Kleomenes jî di vegera Aîgînayê de dest bi lêgerîna rêya avêtina Demaratos ji hikumdarîyê kiribû û ji sûdwergitina van bûyerên ez ê behs bikim, bingehek jî dîtibû. Arîstonê hikumdarê Spartayê, bi du jinan re zewicîbû lê zarokên wî çênebibûn. Nedifikrî ku qisûr di wî de ye û bi jineke din re zewicî û wiha kir: Dostekî wî yê Spartayî hebû, di nav hevwelatîyên xwe de herî zêde girêdayî wî bû. Jina vî kesa herî sipehî ya Spartayê bû, lê berê ya herî kirêt ya Spartayê bû. Di zaroktîya xwe de kesî nikarîbû li rûyê wê binêre; dîya wê ya şîr ku dilê wê dişewitî bi nexweşikbûna zaroka mîratxwira malbateke dewlemend û xema dê û bavê wê ji ber vê, li çareyekê difikirî; zarok her roj dibir perestgeha Helene ya cihekî jê ra Therapna tê gotin, li rexê jorê perestgeha Phoîbosê; her carê dema ku zarok dibir, li ber peykera xuda li ser pêyan disekinî û ji bo zarokê ji kirêtîyê rizgar bike dua dikir. Rojekê dema ku ji perestgehê derdiket, jinekê rêya wê birî, wisan dibêjin, jê pirsî li ber sênga te çi heye; wê jî got zarokek heye. Jinikê jê rica kir ku zarokê nîşanî wê bide; ya din got nabe, ji ber ku dê û bavê zarokê qedexe kiribûn nîşanî kesên din bê kirin; lê jinikê gelek israr kir, illa xwest bibîne. Dayîka şîr lênêrî ev jinik illa dixwaze bibîne, di dawîyê de nîşan da; jinikê serê zarokê miz da û got ku wê ev zarok di nav jinên Spartayê de bi sipehîtîya xwe nav û deng bide. Piştî wê rojê bêtalihîya biçûkê guherî. Dema ku wextê wê hat bi hevalê Arîston, Agetosê kurê Alkeîdes re zewicî.

[62] Halbûkî, Arîston di hindurê xwe de li hemberî vê keçikê xwedîyê hisên evînê bû. Qelleşîyek wiha fikirî: xwest diyarîyekê bide hevalê xwe yê mêrê jinikê, got ku di nav xezîneya wî de çi bixwaze dikare bigre; li hemberî vê wê wî jî ji bo wî eynî tiştî bikira. Yê din tu şika wî ji alîyê jina wî tunebû, çawan be jina hevalê wî jî hebû, razî bû û li hev kirin, ji hevdû re sûnd xwarin. Li ser vê Arîston, ji Agetos re got biçe xezîneyê û tu çi dixwaze bigre, tu çi digre bigre ne giring e; dema ku dora wî ya diyarî wergitinê hat, jê re got jina xwe bîne. Li ser vê hevalê wî kir qêrîn û got ev di nav bazarê de tunebû. Lê di navberê de sûnd hebû, wî nekarîbû li hemberî vê leyza îxaneta serkeftî lê hate kirin tiştekî bike; jina xwe berda.

[63] Belê, Arîston jina xwe ya sêyem bi vî awayî anî, ya duyem berda. Jinikê, berîya roja hemla xwe, hê deh meh tijî nebûbû Demaratosê me anî

dinyê. Yek ji xulamên Arîston, çû xeber da hikumdar ku bi Ephosrosîyan re di civînekê de bû. Ji bo ku wî zanîbû kengî jinik anîye mal, bi tilîyên xwe hejmartin û bi navê xudayan sûnd xwar û got: "Ev ne ji min e!" Ephorosan ev gotin seh kiribûn, lê wê rojê zêde guhê xwe nedabûnê. Zarok mezin bû û Arîston bi wan gotinên xwe poşman bû, ji ber ku piştre bi awayekî zelal bawer kiribû ku Demaratos kurê wî ye. Em bên ser wê ku ji bo çi navê Demaratos lê hat kirin: Berîya van bûyeran Spartayî, ji bo ji Arîston, hikumdarê herî bi qîmet yên heta niha hatine re kurek çêbibe tevan bi hev re dua kiribûn. Ji ber wê navê Demaratos lê hat kirin.

[64] Wext derbas bû, Arîston mir. Demaratos bû hikumdar. Lê bi her halî pêwist bû ew gotin belav bibin û Demaratos hikumdarîyê wenda bike. -Ji ber ku Kleomenes, dema roja leşkerê xwe ji Eleûsîsê paşve kişand bibû dijminê ruhê wî û ji ber ku Kleomenes, dema ji bo partîzanên Medan ceza bike çû Aîgînayê ev kîn hê zêdetir mezin bûbû.[239]

[65] Kleomenesê çavên wî kîn girtibûn, bi Leotykhîdasê kurê Menaresê kurê Argîs yê bi Demaratos re ji eynî xanedanê bû li hev kir. Bazara di navbera wan de wiha bû: Heke ew wî di cihê Demaratos de hikumdar îlan bike, wê Leotykhîdas jî û li hemberî Aîgînayan bi wî re be. Jixwe Leotykhîdas jî li hemberî Demaratos kîneke mezin di dilê wî de hebû, sebebê wê ev bû: Keça Khîllonê kurê Damarmenos, evîndara Leotkhîdas bû; Demaratos dixwest evîndara wî ji destan bistîne; wî ev niyeta xwe zû bi cih anîye, Perkalos revandibû û bûbû jina wî. Kîna Leotykhîdas li hember Demaratos ji ber vê bû. Leotykhîdas, ji vê firseta Kleomenes amade kiribû sûd wergirt, sûnd xwar ku Demaratos ne kurê Arîston e, hilbijartina wî ji bo hikumdarîya Spartayê bi neheqî tawanbar kir. Derket pêşberî dadgeran, got; dema ku xulamê Arîston hat xeber gihand wî, piştî bi tilîyên xwe hesab kirin, xudayan şahid da nîşan ku ev zarok ne yê wî ye. Leotykhîdas wek ku siwarî hespekî şer bibe li van gotinan siwar bû, ev gotin ji bo îspata ku Demaratos ne kurê Arîstone bikar dianî, digot ku pêwist e hikumdarîya Spartayê nedin wî; di wê demê de Ephorosîyên bi Arîston re di civînê de bûn şahid nîşan dida.

239 Ji bo devjenîya Demaratos û Kleomenes binêre li kitêb pênc, beş: 75.

[66] Di dawîyê de di nav Spartayîyan de ev bûbû mijara lihevnekirinê, di dawîyê de biryar dan bi Delphoîyê bişêwirin gelo Demaratos kurê Arîston e yan na. Xebera Kleomenes jî ji vê biryarê hebû. Dema ku mijar anîn hizûra Pythîa, wî serî li Kobonê kurê Arîstophantos yê li Delphoîyê gotinên wî derbas dibûn da, wî jî serekkahîn Perîalla razî kir ku bersiva Kleomenes bide. Pythîa ji şêwirmendên hatin re got, Demaratos ne kurê Arîston e. Lê piştre ev pergal derket orteyê, Kobon ji Delphoîyê hatîye raqewirandin û serekkahîn Perîllayê jî ji wezîfeyê hatîye hildan.

[67] Belê, Demaratos ji hikumdarîyê bi vî awayî hatîye avêtin. Piştre xwe avêtîye Medan. Sebebê vê, lêrasthatina vê bûyera rûmetşikandinê ye: Piştî hikumdarî ji destan derket Demaratos tenê wekî dadger maye. Di esnayê xwepêşandaneke li Gymnopaîdîayê ew jî di nav bîneran de ye. Leotykhîdas di cihê wî de bûbû hikumdar, ji bo wî hêrs bike û henekê xwe pê bike xulamê xwe şand û da pirsîn: "Piştî hikumdarîyê dadgerî çawa ye?" Demaratos heqareta di pirsê de fêhm kir, wekî bersiv got, wî herdu jî ceribandine, lê Leotykhîdas neceribandîye[240] û ji ber vê pirsê jî wê yan tiştên gelek xerab yan gelek baş bên serê Lakedaîmonîyan. Piştî vê rûyê xwe girt û vegerîya mala xwe. Di cih de qurbanek hazir kir. Li ser navê Zeûs[241] da serjêkirin; piştî qurban da serjêkirin bangî dêya xwe kir.

[68] Dema ku dêya wî hat perçeyek ji rovîyên qurbanê kir nav destê dêya xwe û bi van rovîyan hêvî û lava li dêya xwe kir: "Dayê, ez li ser navê hemî xudayan û bi taybetî Zeûsê Xudayê Ocaxê yê li vir mihraba wî sekinîye hêvî û lavaya ji te dikim; rastîyê ji min veneşêre, bavê min kî ye? Leotykhîdas, kîna wî da serî, îlan kir ku wextê tu hatîye mala Arîston, tu ji mêrê xwe yê pêşî hemle bûyî; yên din jî bi rezîlî çîrokan dihûnin, dibêjin, tu ji xulamekî me yê gavanê keran hemle mayî, belav dikin ku ez kurê wî me. Belê niha ez têm ba te û ez li ser navê xudayan ji te rastîyê dixwazim; te yên tên gotin ki-

240 Ya ku Demaratos xwestîye bêje: Ji bo dadwerîyê bi dengê xelkê hatîye, ev heskirina xelkê dide nîşan. Halbûkî hikumdar bi hilbijartinê nayên. Ji bo vê, ji wezîfeya wî ya berê nizimtir jî be, ew bi wezîfeya xwe ya niha jî serbilind e. -Gymnopaîdîa, ji bo bîranîna şerkerên li Thyreayê hatine windakirin, ew cejna her sal tê pîrozkirin (Kitêb yek, beş: 82). Xort û zarokên tazî diraqisîn.

241 Di ya Îngîlîzî de ji bedêla Zeûs Jupîter hatîye nivîsandin.

ribe jî, yên dikin ne tu tenê yî; gelek jinan eynî tişt kirine, ji bilî vê gotegotên ku Arîston di taqeta zarokçêkirinê de nebû li temamê Spartayê belav e; heke wisan nebûya wê ji jinên wî yên din zarok çêbibûna."

[69] Wî wiha axift; wê jî bi van gotinan bersiv dayê: "Kurê min, madem tu wiha hêvî û lavayan dikî û xudayan şahid nîşan didî û ji min dixwazî ez rastîyê bêjim, tu yê temamê rastîyê hîn bibî. Dema ku Arîston min bir mala xwe şeva sisiyan, min dît kesekî yê xwe kiribû şiklê Arîston ber bi min ve hat. Nivînê min parve kir û ew çelengên bi xwe re anîbû danî ser serê min û çû. Piştre Arîston hat. Dema ku çelenga li serê min dît, pirs kir û got ku kê ev anîye: Min got ku te daye min; nexwest qebûl bike; min li ser navê xudayên mezin sûnd xwar û min got ku, bi vî awayî gotinên wî ne rast in, ji ber ku ew bi xwe demek berê hatîye ba min, nivînê min bi min re parve kiribû û çeleng dabû min. Li hemberî van gotin û sûndên min Arîston fêhm kiribû ku ev karê xudayan e; dîtibû ku çeleng yê mêrxasê navê wî Astrobakos bû yê li hewşê li ber derîyê ketina hindur bû; li milê din kahînan jî jê re digotin ziyaretçîyê wî ev mêrxas e. Belê kurê min, yên tu dixwazî tu hîn bûyî, tu tevan zane: Tu yan ji vî mêrxasî çêbûye, bavê te ev nîv-xuda Astrobakos e yan jî bavê te Arîston e; ji ber ku ez wê şevê bi te bi hemil bûm. Em bên ser wê xala ku dijminên te li ser disekinin, yanî dema Arîston xebera hatina te ya dinyê wergirt, li ber gelek kesan gotîye tu ne zarokê wî yî 'ji ber ku zemanê pêwist, yanî deh meh tijî nebûbû', ev gotin ji ber nezanîya Arîston a di vî warî de ye. Ji ber ku jin hê deh meh tijî nebûbe jî, di neh mehan de jî û heft mehan de jî dikare hemla xwe deyne; kurê min, min tu di heft mehan de anî dinyê. Jixwe Arîston jî fêhm kiribû ku bêmelheze axiftîye. Ji ber wê guhê xwe nede çîrokên li ser hatina xwe ya dinyê; yên niha te guh danê tam yên rast in. Em bên gavanê keran, ez hêvîdar im jina Leotykhîdas û yên van derewan belav dikin ji wan re ji gavanên keran gelek zarokan çêkin!"

[70] Jinikê wiha axift; ew jî piştî yên dixwest bizanibe hîn bû, dest bi hazirîya rê kir û got, ji bo bi kahîn bişêwirim ez ê herim Delphoîyê û çû Elîsê. Lakedaîmonîyan şik ji wan re çêbû ku wê Demaratos bireve û ketin pey. Berîya Lakedaîmonî bigehin wir, ew ji Elisê derket, derbasî Zaknthosê bû. Lakedaîmonî jî di pê de hatin, ew dîtin û xwestin ji kesên li balê bûn veqetînin. Zakynthosîyan nexwestin wî teslîm bikin, li ser vê derbasî Asyayê ba Daryûs bû. Daryûs gelek baş pêşwazîya wî kir, erd û bajar danê. Belê, Demaratos piştî ge-

lek bûyeran û bi vî awayî derbasî Asyayê bû. Li Lakedaîmonê gelek kar bi ser xistibûn, di meclisê de navê wî gelek caran hatibû sehkirin, heta bi erebeya çar hesp li rexê hev girêdayî ketibû leyzên Olîmpîyadê û serkeftin bi dest xistibû; tek hikumdarê Spartayê yê pêşbirk qezenc kiribû ew bû.

|71| Piştî Demaratos ji hikumdarîyê hat xistin, Leotykhîdasê kurê Menares derbasî cihê wî bûbû; kurekî wî yê navê wî Zeûxîdamos çêbû ku, hinek Spartayî leqebê Kynîskos lê kirine. Ev Zeûxîdamos, nikarîbû bibe hikumdarê Spartayê; kurekî navê wî Arkhîdamos li pey xwe hişt û berî Leotykhîdas mir. Leotykhîdas ku Zeûxîdamos wenda kir, bi jina duduyan re, keça Dîaktorîdes û xweha Menîos Eûrydame re zewicî. Lê ji vê zarokên wî yên kur çênebûn, tenê keçeke navê wê Lampîto hat dinyê ku, ev jî piştre bi Arkhîdamosê kurê Zeuxîdamos re zewicîye.

[72] Leotykhîdas jî rojên xwe yên dawî li Spartayê derbas nekirin û bi vî awayî tola Demaratos jî li erdê nema. Lakedaîmon yekîneyên xwe li hemberî Thessalîayan biribû şer, tam kirî ew bixistana ser çog, li hemberî perekî mezin xwe firot. Li baregahê li ser lepikeke zirhî yê hindurê wê tijî pere rûniştibû, li ser tawanê hat girtin, derxistin pêşîya dadger, ji Spartayê hat derxistin; mala wî ji serî heta binî hat xerakirin; wî xwe avêt Tegeayê, rojên xwe yên dawîyê li wir derbas kirin û li wir jî mir.

[73] Ev bûyerên piştre ne. Di dewra em behs dikin de, Kleomenes, piştî karê Demaratos qedandin, Leotykhîdas girt ba xwe, bêyî wext derbas bike meşîya ser Aîgînayê, li wir ji ber yên hatin serî, di hindurê wî de kîneke nedîtî hebû. Dema ku Aîgînayîyan dîtin du hikumdar tên, dev ji hemberderketinê berdan, Spartayîyan nesil, esil û di hêla dewlemendîyê de li pêş, deh kes veqetandin û birin. Krîosê kurê Polykrîtos û Ksambosê kurê Arîstokrates ên di sîteyê de xatirşînas bûn, di nav wan de bûn. Spartayî ew birin Attîkayê û teslîmî dijminê ruhê wan, yanî wekî emanet danîn ba Atînayîyan.

DAWÎYA KLEOMENES

[74] Piştre herkes ew qelleşîya Kleomenes ya li hemberî Demaratos hîn bû, ew jî silikîbû û bi dizî baz dabû Thessalîayê. Ji wir derbasî Arkadîayê bû û

li hemberî Spartayîyan dest bi handanan kir. Zor dida Arkadîayan ku sûnd bixwin da bixwaze wan bibe ku herin wir, bi taybetî ji bo fermandarên Arkadîayê li ser ava Styxê sûnd bixwin, dixwest wan bibe bajarê Nonakrîsê. Tê gotin di vê wilayeta Arkadîayê de, ava Styxê heye, ev ji kevirekî dizê û dirije nav kahnîyeke dora wê bi diwarekî hişkeber hatîye hûnandin. Ev serekanî li Nonakrisê ye, ew bajarekî Arkadîayê yê li nêzîkî Pheneosê hatîye avakirin.

[75] Dema ku Lakedaîmonî xebera gerandina dolabên Kleomenes seh kirin, tirsîyan û bangî wî kirin ku bi temamê desthilatdarîya xwe ve ji nû ve bê li Spartayê bi cih bibe. Lê çawa vegerîya, jixwe ew hişê wî yê gelek ne di cih de bû, bi carekê ji serî çû; dema ku rastî Spartayîyek dihat çovê xwe li nav çavan dixist. Li ser van rezîlîyên han û emareyên dînîtîyê, pismamên wî leleyeke darîn kirin stuyê wî û dan girêdan. Dema ku bi vî awayî şidayî girêdayî bû, rojekê ku tenê yek nobedar li balê bû, jê xencerek xwest; wî pêşî nexwest bide, lê jê re got, tê bibinî dema ku rojekê ez serbest bûm ez ê çi bi te bikim, ew tirsand -ji ber ku gardîyan hîlot[242] bû- xencer jê wergirt. Kleomenesê xencer bi dest xist, dest pê kir li xwe xist; pêşî ranên xwe jê kirin, perçe perçe kirin; piştî wê kulîmekên xwe, hindurê xwe, rovîyên xwe û zikê xwe dirand û mir. Yûnanî bi gelemperî, di karê Demaratos de ku bertîl daye Pythîa, dibêjin wî cezayê xwe dîtîye; lê Atînayî vê aqûbetê, bi girtina Eleûsîsê ve girê didin. Ji ber ku dema wî li wir girtîye, darên pîroz yên daristanê jê kirine û ev bûyer destrakirina li hemberî îlaheyên Eleûsîsê hesêb kirine. Şîroveya wan a di vî warî de ev e. Li gor Argosîyan jî, di esnayê şer de, ew Argosîyên xwe avêtibûn saheya pîroz[243] a ji Mêrxas Argos re hatibû nezirkirin, wî ew ji wir derxistine û dane ber şûran û bi vê kirinê li hemberî wê daristanê rêz nedaye nîşan û ew şewitandîye, bi vê jî cezayê xwe dîtîye.

[76] Di eslê xwe de Kleomenes, dema ku bi kahînê Delphoîyê şêwirî, ji wî re mîsogerîya wê Argos bistîne dabû. Li ser vê bi Spartayîyan re hatibû Çemê Erasînosê; tê gotin ku ev çem ji Gola Stymphalîsê derdikeve; ji ber ku gol, bi qasî tê zanîn dirije nav qelşeke binê wê nayê dîtin û piştre li Ar-

242 Hîlot(helot), Ew mirovên neazad in ku piraniya nifûsa herêmên Laconîa û Messînîa yên di bin desthilatdariya Spartayê de bûn.

243 Sehaya pîroz, Temenos: Perestgeha bi dîwaran dorpêçkirî, mihrab û piranî jî tûrbeyên pîroz tên hesêbkirin yên ji bo îlahan û mêrxasan hatine veqetandin.

golîsê cardin derdikeve ser rûyê erdê û Argosî ji vir şûn ve jê re Erasînos dibêjin. -Dema ku Kleomenes gihiştîye qiraxê vî çemî, qurbanek jêkirîye, lê ji bo derbasî milê din be bihurek nedîtîye. Gotiye ku ew şa bûye Erasînos ji hemwelatîyên xwe re xiyanet nekirîye, lê li gotinên xwe zêde kirîye ku cardin wê Argosî ji destê wî nefilitin. Piştre artêşa xwe girtîye birîyê Thyreayê, boxek ji deryayê re kirîye qurban û ji bo derbasî Naûplîaya li erdê Tîrynsê bike yekîneyên xwe li keştîyê bar kirîye,

[77] Argosî ji bo wilayetên xwe yê ketin tehlîkeyê biparêzên baz dan qiraxên deryayê. Dema gihiştin Sepeîaya nêzîkî Tîrynsê, li hemberî Lakedaîmonîyan û ji wan li menzîla avêtina çend riman dûr baregah vedan. Tirsa wan ji şerekî rast û dirûst tunebû, ya wan ditirsand xistina wan li kemînekê bû. Ji ber ku Pythîa kehanet dabû wan û tê de hem behsa têkçûna wan û hem jî ya Mîletosîyan kiribû, wiha gotibû:

Lê kengî ku mê wê bibe serdestê nêr
Wê li Argosê navekî bi pesn û rûmet qezenc bike,
Jina Argosî -nivîsa enîya wê wiha ye- wê biçikîne
Neynûkên xwe yên bihêrs li gewdeya xwe ya birîndar.
Û wê bi vî awayî behsa wê bike neslên siberoj:
Riman birînin mirinî vekirin
Di marekî sawdar yê bûye sê xelekî de

Li ser rasthatina van hemû tiştan, çavê Argosîyan tirsîya. Biryar dan ku guhe xwe bidin wan biryarên li baregahê dijmin tên dayîn. Bi vî awayî, dest pê kirin rewşa xwe li gor ew biryarên li baregeha Lakedaîmonîyan tên dayîn bi rêk bixin.

[78] Gelek derbas nebû Kleomenes bi xwe çi emir dan, ferq kirin Argosî jî wê dikin û tembî li Lakedaîmonîyan kir ku, dema ji bo xwarina nîvroyê emir kir, gerek bavêjin ser Argosîyan û wisan jî kirin; Argosî emrê milê din seh kiribûn û bi xwe jî li ser xwarinê rûniştibûn ku dijmin bi ser wan de girt; piranîya wan hatin kuştin, hê zêdetir jî xwe avêtin nav daristanên pîroz yên Argosê, dijmin dora wan pêça, ew kirin nav çemberê û hêsîr girtin.

[79] Wî wextî Kleomenes wiha kir. Li balê qaçaxên eskerîyê hebûn; ji wan navê ew Argosîyên xwe avêtibûn nav daristanê hîn bû, çawîşekî xeberan

şand û kir ku yek bi yek bangî wan bike, bêje; wê bikaribin derkevin ji derve, ji ber ku heqrizgarîya wan hatîye dayîn; li Peloponezê heqrizgarîya serê mirovekî du mana ye. Kleomenes bi vî awayî 50 kesên ji daristanê da derxistin serê wan jêkir. Yên di daristanê de girtî mabûn haya wan ji vê tunebû; daristan gelek bi tov bû, pelên daran tiştên dihatin serê hevalên wan yên derve, ji yên hindur vedişart. Di dawîyê de yek derket serê darekê û yên qewimîn dîtin. Êdî belasebeb bang dikirin, kesek derneket.

[80] Li ser vê, emir da hîlotan ku li dora daristanê qirş û mirşan tijî bikin; bi ya wî kirin û agir berdan daristana pîroz. Dema ku daristan dişewitî wî ji kaçaxekî li ba xwe pirsî, ev daristan ya kîjan xudayî ye. Got ku ya Argos e. Dema ku ev bersiv wergirt, ji hênava wî axek derket û wiha got: "Ey Apollon, tu ku dahatîyê dizanî, te çawan ez xapandim, te got tê Argosê bistînî! Niha ez fêhim dikim ya kahîn got ev bû!"

[81] Li ser vê Kleomenes beşeke zêde jiartêşa xwe paşve şand Spartayê, hezar kesên bijarte girtin ba xwe, ji bo qurban serjêke çû perestgeha Hereyê. Dema ku li ser mîhrabê bi destê xwe qurban serjê bike, kahîn li dij derket; qanûna îlahî, izin nedida biyanîyek li vir qurban jêke, ev jê re got. Kleomenes emir da hîlotên xwe kir ku kahîn rakêşin ji derve û bi qirbacan lê dan, piştre bi destê xwe qurban jêkir û vegerîya Spartayê.

[82] Dema ku vegerîya dijminên wî ew derxistin hemberî Ephorosîyan, Argos ya rehet dikarîbû werbigire, wernegirt, digotin bertîl daye. Belê ev bersiv ji vê re daye -raste yan şaş ez nizanim- bersiva rastî yan şaşî ev e: Piştî saheya pîroz a aîdê Argosê Mêrxas girt, qurban jêkirin, berî hîn bibe ka gelo xuda bajar jî nesîbê wî kirîye yan nekirîye, êrîş minasib nedîtîye. Li perestgeha Hereyê li hêvîya dîtina elametên minasib bû, ji singa peykera îlahî agirek pijiqî û; vê tam dida nîşan ku wê nekaribe Argosê bistîne. Ji ber ku heke agir ji serî derketa, wê ev nîşan bidaya ku bajêr bistîne û serûbin bike; lê ji bo ku ji sing derketîye, wî jî ya xuda jê xwestibû dikir. Spartayîyan ev gotinên wî yên bi rastî ji hinavê wî derketine qebûl kirin, eqlî dîtin, wî jî yên ew tawanbar dihesiband bi rehetî têk birin.

[83] Lê Argos, heta dilopa xwîna xwe ya dawîyê xelas bûbû; ewqas ku, mal û milk ketin destê koleyan, desthilat girtin destê xwe û dest pê kirin wilayet

bi xwe birêve birin, heta kurên kesên mirin hatin salên xwe yên mêranîyê wiha derbas bû; dema wext hat, van kuran Argos girtin destê xwe, kole raqewirandin, ew jî çûn û bi zorê Tîryns stendin. Herdu bajaran bi hev re baş îdare dikirin, lê qasek şûnde kahînek hat bajarê koleyan, navê wî Kleandros bû. Li Phîgalîayê hatibû dinyê û ji Arkadîayê hatibû. Vî kesî, kole xapandin, ew li hemberî efendîyê xwe meşiyan. Bi vê midetekî gelekî dirêj şer dom kir û di dawîyê de Argosî gelekî bi zehmetî bûn serdest.

[84] Argosîyan, dînbûna Kleomenes û bi vî awayî xerabhatina dawîya wî, bi ezîyetên bi wan dabûn kêşandin şirove kirin. Lê Spartayî dînbûna wî cezayê xudayan hesêb nakin; li gor wan di netîceya zêde bi Îskîtîyan re rabûn û rûniştinê, hîn bûbû şerab bêav vedixwar, sebebê dînbûna wî ev bû. Bi rastî Îskîtîyên koçer, dema ku Daryûs welatê wan îstîla kir, xwestine heyfê hilînin, qasid şandine Spartayê û ji bo çêkirina peymanekê dest bi hevdîtinan kirine; pêşnîyaz dikirin ku li ser van xalan li hev bikin: Dema ew di Phasîsê de bi pêş bikevin û bimeşin ser Medîayê, Spartayî jî wê ji Ephesosê dest pê bikin ber bi hindur ve biçin û bi wan re bibin yek. Tê gotin ku wî wextî, bi Îskîtîyan re yê ji bo peymanê çêkin hatine zêde rabûye û rûniştîye, vexwarina şerabê ya bêav hîn bûye û êdî careke din av nekirîye nav şerabê; li gor Spartayîyan Kleomenes ji ber vê aqlê xwe avîtîye; ji wî wextî pêve kesek bixwaze avê nexe nav şerabê, tê gotin "Wekî Îskîtîyan dike". -Li Spartayê ji bo Kleomenes wiha tê gotin. Heke ez bim, ez ê bêjim wî bedelê kirinên xwe dîtin.

[85] Aîgînayîyên xebera mirina Kleomenes seh kirin, qasid şandin Spartayê, di derbarê hemwelatîyên xwe yên li Atînayê rehîn hatine girtin, ji Leotykhîdas gazin kirin. Lakedaîmonî, dadgehek berhev kirin û biryar dan ku Leotykhîdas li hemberî Aîgînayîyan gelek xerab miamele dike, di miqabilî wê de Aîgînayî jî ji bo vekirina toleya yên li Atînayê kirine hepsê, wî bigrin bibin Aîgînayê. Wê Aîgînayî tam Leotykhîdas bigirtina bibirina, ji giregirên Spartayê Theasidasê kurê Leoprepes wiha got: "Hûn çi dikin Aîgînayî? Ji ber hemwelatîyên wan wî didin we, îca hûn ê hikumdarê Spartayê bigrin û bibin? Îro hêrs dibin biryareke wiha didin, lê heke hûn wî bibin, wê sibe bê li welatê we kevir li ser kevir nahêlin." Li ser van gotinan, Aîgînayî dev ji birina hikumdar berdan û bi vî awayî li hev kirin: Wê Leotykhîdas bi wan re biçe Atînayê û zilamên wan paşve bide wan.

[86] Leotykhîdas çû Atînayê, emanet paşde xwestin; Atînayîyan nedixwestin bidin û bi rêya hincetan re sersarî dikirin, "Du hikumdaran bi hev re ew ji me re anîn, niha dana ji yekî tenê re nabe," gotinên wiha digotin.

a) Di dawîyê de ku Atînayîyan li ser 'em nadin' israr kirin, Leotykhîdas ev axaftin ji wan re kir: "Baş e Atînayî! Hûn çawa dixwazin wisan bikin. Heke hûn emanetan bidin hûn xêrê dikin, heke hûn nedin hûn dikevin gunehan. Lêbinêrin, ez ê ji we re li Spartayê bûyereke ku li ser emanetê qewimîye bêjim. Li ba me Spartayîyan tê qisekirin; li Lakedaîmonê, sê nesil berîya niha Glaûkosekî kurê Epîkydes hebû, şens tiştên dinyê yê herî xweşik bexşî wî kiribû, bi taybetî hisên wî yên rastîyê ew di ser hemî Lakedaîmonîyên wî wextî bilindtir dikir. Belê ji me re tê qisekirin ku ev mirovê han, rojekê rastî bûyerekê hat: Ji Mîletosîyan kesek hat Spartayê, xwest bi wî re biaxive û wiha got: Ez Mîletosî me, ez ji bo ji rastîya te sûd werbigirim hatime vir. Ji ber ku rastîya te heta Îonîayê li temamê Yûnanistanê bûye destan û ketîye ser ziman; Îonîa her tim welatekî tijî tehlîke ne, di miqabilî wê de, Peloponez her tim di nav ewlehîyê de û rehet dijî û ez fikirîm ku talih her wextê ji eynî kesî re rûyê xwe nîşan nade. Bi vê hizrê û hesabê, min nîvê temamê serweta xwe zivirande zîvê û min biryar da ku ez wekî emanet li ba te bihêlim, ji ber ku ez dizanim ku, wê ew di destê te de bêyî dest lê bikevin bimîne. Van veşêre û ji bo naskirinê jî vê bigre, kê ku ji te re hevala wê bîne, tê teslîmî wî bikî.

b) Biyanîyê ji Mîletosê hatibû tiştekî din negot. Glaûkos emanetê wergirt û şertê hat gotin qebûl kir. Di navberê de gelek zeman derbas bû û îro zarokên kesê emanet danîye, hatin Spartayê; nasbûna xwe dan nîşan û zîv xwestin. Lê wî, ev bersiv da wan û xwest wan di ser guhê xwe re dehf bike: Tiştekî evqas kevin nayê bîra min, tiştên hûn dibêjin tiştekî naynin bîra min, heke bînin bîra min ez jî dixwazim bidim we. Heke min zîv stendibin, eynî ez ê li we vegerînim, lê heke min tiştekî wiha wernegirtibe ez ê qanûnên Yûnanistanê li we tetbîq bikim. Niha ez ê ji bo ev kar bê helkirin, ji îro pê de, sê meh mohlet didim we.

c) Kezeba Mîletosîyan şewitî, fikirîn ku wê zîvan wenda bikin, paşve vegerîyan. Ji bo Glaûkos bi kahîn bişiwêre çu Delphoîyê. Pirs kir ku gelo bi rêya sûndan wê bikaribe zîvan têke bêrîka xwe yan na. Pythîa bi van rêzan bersiv dayê:

Glaûkosê kurê Epîkydos, sûndeke tam di wextê xwe de
Ya bi paye, gelek bi kêrî malbatekê tê; sûnd bixwe,
Madem dawîya yên rast jî her mirine…
Xîyanet dayîk e, wê bîne keçek,
Bênav, bêdest, bêpê, lê cardin tê avêtin
Dişîne ser yên bi derew sûnd dixwin, dikuje.
Lê mirovê rast ji miletê xwe re rûmetê dide qezenckirin.

Glaûkosê ku ev gotin seh kirin, hêvî û lava ji xuda kirin, gotinên wî bibexşîne û hêrsa wî bitefîne; lê Pythîa, bersiv dayê û got, pirsa tiştekî ji xuda û kirina wî karî eynî tişt in.

d) Li ser vê Glaûkos, bangî biyanîyan kir û zîv da wan. Ey Atînayî min ev çima ji were qise kir, niha ez ê wê bêjim: Tek zarokê vî Glaûkosê ku ji îro re maye tune û yê wî bi bîra me bîne, mal û ocaxa wî jî nemaye. Wekî dara bêkok, nesil û eslê wî ji Spartayê hatîye avêtin. Belê bibînin, dema ku emanet bû mijara behsê, ji derveyî bêsekin dayîna wê ji wî kesî re rêya rizgarîyê tune!"

[87] Piştî ev çîrok got, Atînayî bi ser van gotinan de jî nexwestin guhê xwe bidênê. Leotykhîdas jî dûr ket. Wextekî Aîgînayîyan guhê xwe dane Thebaîyan û li hemberî Atînayîyan bêrêzî kirine, tiştên rûmeta wan bişkîne kiribûn û berî ji Atînayîyan hemberîya vê êrîşê bibînin, van Aîgînayîyan ev kirin: Dilê wan li hemberî Atînayê tijî kerb û kîn û bi bawerîya li wan neheqî hatîye kirin, ji bo tole werbigirin dest bi hazirîyan kirin; di wê demê de Atînayîyan li Sûnîonê cejna ji pêncsalan carekê çêdikirin pîroz dikirin; Aîgînayîyan kemîn vedan û keştîya pîroz a giregirên Atînayê tê de girtin; yên tê de kirin hepsê.

[88] Piştî kirina vê kirêtîya Aîgînayîyan, Atînayî êdî dev ji paşdexistina tolewergitinê berdan û li dijî dijminê xwe bi lez dest bi amadekarîyê kirin. Kesekî navê wî Nîkodromosê kurê Knoîthos hebû, hevwelatîyekî xatirşînas yê Aîgînayê bû; dilê wî ji Aîgînayîyan mabû, ji ber ku ji giravê hatibû raqewirandin. Dema ku seh kir Atînayî ji bo tolewergirtinê amadekarîyê dikin, ji bo ji bilî kirina xerabîyan li hemwelatîyên xwe pê ve tiştek nedifikirî, ji bo Aîgînayê teslîmî wan bike, bi Atînayîyan re li hev kir; ew ê kîjan rojê êrîş

bike û ew ê jî kîjan rojê bên û alîkarîya wî bikin, agahî dan wa. Li hev kirin, Nîkodromos rîayetî peymana di navbera wan de heye kir, cihê jê re bajarê kevin tê gotin girt. Lê Atînayî di roja kifşkirî de nehatin.

[89] Ji ber ku di wê demê de keştîyên wan yên di wê hêza ku bikaribin li hêza deryayî ya Aîgînayan bixin tunebû, dema hewl didan ji Korinthosîyan bi emanetî keştîyan bigrin, partî wenda kiribûn. Di wê qonaxê de Korînthosîyên ku têkilîyên wan bi Atînayê re baş bûn, li ser ricaya wan bîst keştî dan wan, lê guya wekî ku difroşin kirin, serê keştîyê kêm-zêde penc drahmî girtin; ji ber ku qanûn, izin nedida ji bo qencîyê keştîyan bidin. Atînayî ku ev kirin ser yên xwe, ser hev 70 keştî bi rêk xistin, meşîyan ser Aîgînayê, lê rojekê ji ya hatibû kifşkirin derengtir mabûn.

[90] Dema ku Atînayî di saeta kifşkirî de nehatin, Nikodromos li keştîyê siwar bûbû û baz dabû. Li balê hinek Aîgînayî jî hebûn, Atînayîyan Sûnîonê dan wan ji bo rûniştinê. Wan jî vir ji xwe re kirin baregah û dest bi seferên talankirinê yê ser Aîgînayîyên li giravê rûdinin kirin. Lê ev jî piştre çêbûne.

(91) Li Aîgînayê, çîna dewlemend ya ku xelk bi Nîkodromos re bûbûn yek û li hemberî wan serî hildabûn, hakimî rewşê bibûn û piştî serhildan şikandin, niha jî dest bi îşkencekirina dijminê xwe kiribûn. Ji ber vê ketibû nav gunehan jî, qebûlkirina hemî danên tên hişê mirov, bi kêrî tiştekî nehatibûn, nekarîbûn xwe ji vê gunehê bişon; nekarîbûn xwedawendê haş bikin, hatibûn têkbirin û ji giravê raqewirandin. 700 kesên sax bi dest xistibûn, ji bo kuştinê dibirin. Ji nav wan kesekî benên xwe qetandin, ber bi perestgeha Demetera Qanûnçêker ve baz da, xwe avêt wir, destika derî bi şid girt û tê de ma. Ji bo nekarîbûn bikşînin û derxin, destê wî jêkirin, bi awayekî perçebûyî birin îşkenceyê. Destên bi destika derî ve zeliqîbûn bi wî awayî pêve mabûn.

[92] Aîgînayîyan xwe bi xwe bi vî awayî xwe perîşan kirin. Lê piştre hêza deryayî ya Atînayîyan hat, bi 70 keştîyan li hemberî wan dest bi şer kirin, di bin de man û ji hevalbendên xwe yên kevin ji Argosîyan alîkarî xwestin. Lê wan nexwestin bên alîkarîyê. Li hemberî Aîgînayîyan bi hêrs bûn, ji ber ku di sefera Lakedaîmonîyan ya ser Argolîsê, li rexê Kleomenes bi zorê jî be ew jî beşdar bûbûn. Di esnayê wê hereketa îstîlayê de deryavanên Sîkyonê

jî hebûn. Ji ber vê Argosîyan, Aîgînayî û Sîkyonî, her yekî 500, bi hezar talantan ceza kiribûn. Sîkyon tawanê xwe qebûl kiribûn, bi sed talantan li hev kiribûn. Lê Aîgîna tawan qebûl nekiribûn, heta bilind firîyabûn. Belê niha jî Argos, daxwaza alîkarîya wan bi resmî paşve vedigerand. Di ser vê re jî hezar dilxwaz hatin û di nav sefên wan de şer kirin. Li ser serê wan, kesekî fermandar yê navê wî Eûrybates yê ji bo pêşbirkên Pentathlonê hatibû perwerdekirin hebû;[244] gelek kesên ji nav wan êdî welatê xwe nedîtin; li Aîgîna di bin derbeyên Atînayîyan de can dan. Fermandar bi xwe, Eurybates jî, ji bo di şerê tek û tekî de mahir bû, sê kesan kuştibû, lê di destê yê çaran Sophanesê Dekeleayî can dabû.

[93] Aîgînayî, ji hêza deryayî ya Atînayîyan ku hê neketibû pergala şer, sûd wergirtin û bi hêza xwe ya deryayî êrîş kirin, ew têkşikandin û bi tev yên tê de çar keştî bi dest xistin.

MARATHON

[94] Bi vî awayî şerê di navbera Atînayê û Aîgînayê de dest pê kir. Di vê navê re hikumdarê Persê dîdevanîya niyetên xwe dikir; xulam, bêyî di ser re biqevêze her bi bîr dianî ku Atînayîyan ji bîr neke, Peîsîstratîdî bi berdewamî bi handanan ew di nav çemberê de digirtin. Daryûs jî, ji bo serî bi Yûnanîyên di derya û bejahîyê de desthilata wî qebul nedikirin, bide tewandin, dixwest ji vê bahaneyê sûd werbigire. Mardonîos, heq ji sefera vekiribû nehatibû, ketibû halekî ku dilê mirov pê bişewite; ew ji fermandarîyê stendibû û hinek tiştên din danîbû cihê wî û şandibûn hemberî Eretrîa û Atînayê; ev, Datîsê Medîayî û birazîyê wî Artaphrenesê kurê Artaphrenes bû; wan emrê kolekirina Atînayê û Eretrîayê û anîna hizûrê ya xelkê wan girtibûn ser xwe.

[95] Ev fermandarên em behs dikin, ji ba hikumdar veqetîyan û derketin rê, çûn Kîlîkîayê, bi artêşa mezin ya baş hatibû amadekirin re li Deşta Aleîonê baregah vedan; eskerên ji wilayetan hatibûn xwestin jî hatin beşdarê wan bûn û ji bilî vê keştîyên bar yên par li cihên Daryûs ew bi xeracê girêdabûn

244 Pentathlon: Bazdan, gulaş, boks, xweavêtin û dîsk avêtin. Pênc şaxên sporê.

hatibûn çêkirin, ji bo hespan li wan bar bikin hatin. Hesp û yekîneyên bejahîyê li keştîyan hatin barkirin û 600 trîrem ber bi Îonîayê ve ket rê. Dema ku gihiştin wir, keştî li wê derê, di cihê derkevin bejahîya ber bi Hellospontos û Trakyayê, piştî serî li Samosê dan, navbera giravên Kykladê û Îkarosê birrîn. Ez wisan texmîn dikim ku, ji bo li dora Çiyayê Athosê nefitilin wiha dikirin, ji ber ku ji wir gelekî xerab ditirsîyan, salek berê ew felaketa hatibû serê wan ji bîr nekiribûn; ji bilî vê ji bo girtina Naxosê ku hêj neketibû bin desthilata wan, pêwist bû wê rêyê bidin pêşîya xwe.

[**96**] Hêza deryayî ya ji Deryaya Îkarosê[245] derket, Naxosê girt û xwe da ber wê, ji ber ku Persîyan dixwestin bi vê giravê dest bi şer bikin -Naxosîyên yên berê qewimîbûn dizanîn, bêyî li hêvîya dijmin bimînin kêşiyabûn serê çiyan. Persîyan, ên ketin destê wan kirin kole, perestgeh û bajar dan ber agir, piştre ji bo biçin giravên din vebûn deryayê.

[**97**] Dema ku li vir ev dibûn, Delosî jî dev ji Delosê berdabûn xwe avêtibûn Tenosê. Dema artêş ket avên bejahîyê, Datisê di pêşî de diçû, li pêşîya giravê bi keştîyan lenger neda avêtin, kêşand Rhenaîayê li milê din. Piştre hîn bû ku Delosî li ku ne, ji wan re qasid şandin û wiha got: "Ey mirovên pîroz, hûn ji bo çi baz didin? We min şaş fêhm kirîye. Ji ber ku Hikumdarê Mezin wiha li min emir kir, heta (ev emir nebûya jî) min ê jî eynî awayî hereket bikirîya: -Li cihê hatina dinyê ya du xudayên mezin dîtîye, bila tu zerar negihe erd û xelkê[246]- niha vegerin malên xwe, girava xwe biçînin û rakin." Xebera qasid gihand Delosîyan ev bû, piştre Datîs 300 talant rojane li perestgehê da komkirin û şewitand, dixan ber bi asman ve bilind bû.

[**98**] Dema ku ev kar temam bû, Datîs, pêşî bi artêşa xwe re meşîya ser Eretrîayê; li balê Îonîayî û Aîolî jî hebûn. Dema ku ew veqetîya li Delosê erdhej çêbû û ev, li gor Delosîyan, li vê giravê heta roja me, yekem erdhej bû ku hat dîtin. Û bêguman xuda felaketên wê bên serê insanan bi vî awayî bi dehşet agahdarî dida. Ji ber ku di zemanê Daryûsê kurê Hîstaspes de, piştre Xerxesê kurê Daryûsê û Artakserkesê kurê Xerxes de, li ser hev sê

245 Deryaya Îkaryayê/Ikarosê: Ava Egeya başûr ya ku giravên Andros, Tenos û Delos li wir in.

246 Apollon û Artemis. Zarokên Leto yên ji Zeûs ku li girava Delosê hatine dinyê.

nesil belayên wisan li serê Yûnanistanê gerandine ku, bîst nesil berî Daryûs evqas nehatîye dîtin; qismek ev belayên han li ser rûyê Persîyan bûye, qismê din jî di rûyê kesên xwestine li ser sîteyan bibin iktidar de bûye. Hejandina Delosê ya heta wî wextî rûyê erdhejê nedîtibû jî ne tiştekî ku dê nebe bû. Kehaneteke bi nivîskî hatibû veşartin jî hebû, jixwe wê xeber dida:

Ew Delosa heta niha nehejîyaye, ez ê bihejînim.

[Ji bilî vê em vê jî bidin xuyakirin, ev navên Daryûs, Xerxes û Artakserkses tên manaya "îcraker", "şerker" û "gelek şerker"; Yûnanî di zimanê xwe de ji van hikumdaran re, gelek rast ev nav bi wan vekirine.]

[99] Barbarên ji Delosê çûn, serî li giravên din jî dan: Cihên serî lê didan eskerên nû berhev dikirin, zarokên giravîyan rehîn digirtin. Dema ku di navbera giravan de digerîyan û hatin Karystosê,[247] Karystosîyan dayîna rehînan red kirin û bi awayekî zelal û vekirî gotin, li hemberî sîteyên cîran, yanî Eretrîa û Atînayê wê şer nekin. Li ser vê, barbaran ew kirin bin dorpêçê, heta desthilata Persîyan dan qebûlkirin ew şikandin.

[100] Dema ku Eretrîayan seh kirin Persî hatine, xeber şandin Atînayê û alîkarî xwestin. Atîna, xwestek paşve venegerand; 4 hezar klerukhosên li ba yê li heywanan dinêre yên li Khalkîsê hatibûn bicihkirin, wekî destek ji wan re şandin. Lê Eretrîayî bêqerar bûn, nedizanîn wê çi bikin; wextê ji Atînayê alîkarî xwestibûn, bûbûn du beş: Beşek dixwestin bajar terk bikin û derbasî girên Euboîayê bibin; beşa din jî ku melheze dikirin li ser hesabê xwe ya şexsî ji hikumdarê Persê hinek tişt bi dest bixin, hazirîya xîyanetê dikirin. Aîskhînesê kurê Nothon yê ji giregirê Eretrîayê ku ev herdu rewş jî dizanî, dema ku Atînayî hatin rewş ji wan re îzah kir û ji bo yên wê bên serê wan, neyê serê wan jî, ji wan rica kir ku paşve vegerin. Atînayîyan jî bi ya Aîskhînes kirin.

[101] Tengav derbas kirin û xwe avêtin Oroposayê. Di vê nave re Persîyên rêwîtîya xwe ya deryayê didomandin, gihiştin qiraxê Eretrîayê. Tamynaîyî, Khoîreayî û Aîgîlîayî derketin bejahîyê, hesp peya kirin, hazirîya xwe kirin

247 Karystos: Li başûrê girava Eûboîayê, li pêşberî qeraxên Eretrîa û Boîotîayê ye.

û ber bi dijmin ve meşîyan. Eretrîayî qet nedianîn hişê xwe ku derkevin pêşberî wan û bi wan re şer bikin. Lê gelo wê karibûna sûrên xwe biparêzin? Piştî fikra yên dixwestin bajêr biparêzên bi serketibû, tenê endîşeya wan ev bû. Êrîşeke bi hêz li hemberî sûran çêbû, şeş rojan ji herdu milan jî gelek insan şikestin. Roja heftan giregirên bajêr Eûphorbosê kurê Alkîmakhos û Phîlagrosê kurê Kyneos, bajar ji Persan re vekirin. Persî ketin hindur, ji bo tola avahîyên pîroz yên li Sardesê xera bûbûn, perestgeh şelihandin û şewitandin, li gor emrê Daryûs xelk kirin kole.

[102] Piştî Eretrîa kirin bin desthilatê, çend rojan bêhna xwe vedan, piştre ber bi Attîkayê ve ketin rê; li Atînayîyan dişidandin, plan dikirin wekî li Eretrîayan kirin li van jî bikin. Ji bo êrîşa siwarîyan Marathon cihê herî musaîd bû; ji bilî vê gelekî nêzîkî Eretrîayê bû; Hîppîasê kurê Peîsîstratos ew birin wir.

[103] Atînayîyên xebera rewşê seh kirin, li Marathonê tehlîke girtin ber çav. Li ser serê wan deh strategos hebûn. Yê dehan Mîltîades bû; bavê wî Kîmonê kurê Stesagoras yê di dema Peîsîstratosê kurê Hîppokrates de, ji Atînayê baz dabû. Dema ku di koçberîyê de bû, bextewerîya pêşbirka erebeyên çarhespî yên li rexê hev girêdayî tahm kiribû ku, ev serkeftina cardin berî wî birayê wî yê ji dê Mîltîades qezenc kiribû, nû bûbû. Di lîstika Olîmpîyadê ya piştî wê de jî cardin navê xwe dabû bangkirin; qezenc kiribû lê kir ku Peîsîstratos serketî were îlankirin, bi wî re peymanek çêkir ku gava vê rûmetê bide wî divê destûr were dayîn ku vegere welatê xwe. Bi eynî hespan cara sêyem di Olîmpiyatan de serkeftin bi dest xistibû, piştre ji alîyê kurên Peîsîstratos ê miribû, hatibû kuştin. Wî şevekê li nêzîkî Prytaneîonê bi qatilên kirêgirtî dabûn kuştin. Gora Kîmon, di daketina bajêr de ya li milê din ku jê re Rêya Gelî tê gotin, li wir e; li hemberî gora wî peykerê hespên di lîstikên Olîmpiyatê de sê car serkeftin bi dest xistine heye. Eynî serkeftin berîya wê mehînên Evagorasê Lakonîayî jî qezenc kiribûn; lê yê karîbûn vêê hejmar derbas bikin tunebûn. Kurê Kîmon yê mezin Stesagoras bû û wî wextî li ba mamê xwe Mîltîades li Khersonesosê dima; yê herî biçûkên wan li Atînayê li ba Kîmon dima û navê wî jî wekî yê mamê wî yê li Khersonesosê kolonî ava kiribû, Mîltîades bû.

[104] Piştî du caran ji mirinê rizgar bû, yê ji Khersonesosê hat li Atînayê bû fermandar, ev Mîltîades e. Ez dibêjim du caran ji mirinê rizgar bû, ji ber ku

carekê ji Fenîkîyên di miqabilî perekî mezin de xwestibûn wî bigrin û ji Hikumdarê Mezin re bişeynin rizgar bûbû û baz dabû hatibû Îmbrosê, piştre ji Atînayê baz dabû û tam hesêb kiribû ku filitîye, dijminê wî dest avêtibûn pêsîrê wî û zordarî li Khersonesosê nîşan dabûn ku di heqê wî de lêgerîn dabûn vekirin. Piştî ji vê belayî jî filitî, bi dengê xelkê weke strategosê Atînayî hatibû hilbijartin.

[105] Berî ji bajêr derkeve, strategosîyan, qasidekî yê navê wî Pheîdîppîdes, bi pîşe û pratîkê xwe bezvanek perwerdekirî, kerûxekî Atînayî şandibûn Spartayê; ev mirov, li gor bi xwe ji Atînayîyan re gotîye û bi resmî daye diyarkirin, dema ku gihiştîye Çiyayê Parthenîonê yê li ser Tegeayê, ji nişkê ve xuda Pan derketîye pêşîya wî, bi navê wî "Pheîdîppîdes!" bangî wî kirîye û daye diyarkirin ku ew îlahekî ku Atînayî parastîye, heta niha gelek qencîyên wî gihiştîye wan, ji vir şûn ve jî wê bike; emir kirîye ku ji Atînayîyan bipirse, wextê hal wiha be çima dînê wî qebûl nakin. Atînayî ev gotin rast qebûl kirine û piştî rewş rast dibe nabe li ber pêşkên Akropolê bi navê Pan perestgehek ava kirine; ji wî wextî heta niha ji bo dilê xuda xweş bikin qurbanan serjê dikin û pêşbirkên meşaleyan li dar dixin.

[106] Belê, Pheîdîppîdesê strategosan ew şand û yê dibêje xuda Pan xwe nîşanî min daye, roja piştî ji Atînayê derket gihişt Spartayê. Derket hizûra birêvebirên bajêr û wiha got: "Ey Lakedaîmonîyan, Atînayî ji we daxwaza alîkarîyê dikin û ji we rica dikin ku hûn çavê xwe li kolekirina sîteya herî kevin ya Yûnanistanê negrin. Belê, va ji niha ve Eretrîa bû kole û Yûnanistan ji sîteke xwe ya esîl mehrûm ma û hêza wê kêm bû." Belê ew xebera jê re emanet hatibû dayîn bi vî awayî ragihand; Spartayîyan, qebul kirin ku biçin hawara Atînayîyan; lê ev ne karek bu ku hema di cih de pêk bê, ji ber ku nedixwestin qanûnê xera bikin; ji ber ku hê nehê mehê bû û îzah kirin nehê mehê çembera heyvê hêj tijî nebûye, ji ber wê nedibû derkevin seferê.[248]

[107) Li hêvîya heyva çardeşevî bûn. Di wê nave re Pîppîasê kurê Peîsîstratos, ketibû pêşîya barbaran, ew dibirin Marathonê; şeva borî xewnek dîtibû; wek ku bi dêya xwe re radiket. Digot, ev tê manaya ku wê vegere Atînayê. Wê vegere Atînayê, desthilatê bigre destê xwe, bi salan wê li wir bijî, wê li

248 Lakedaîmonî berî heyva çardeşevî dernediketin rê.

welatê xwe bimiraya. Xewn bi vî awayî şirove dikir. Niha ji Persan re rêberî dikir û hêsîrên li Eretrîayê ketibûn dest, derbasî girava Aîgîleîayê ya di destê Styrayîyan de bû dikirin; piştre dema ku keştî ketin Kendava Marathonê, ji barbarên ku keştîyên xwe lenger kirin û derbasî bejahîyên bûn, pêwist e ku bigrin jî yê digot ew bû. Dema wan rewşa xwe biserûber dikirin ew pişkîya û ji her wextê zêdetir kuxîya; wî wextî jixwe temenê wî qederek pêşve çûbû, hema bêje temamê diranên wî dihejîyan. Dema ku bi vî awayî dikuxîya diranekî wî ji devê wî pekîya, ket ser qûmê, wî jî bi baldarî dest bi gera diranê xwe kir. Lê nedît. Di dawîyê de nefeseke kûr kêşa û ji yên li dora xwe re ev gotin: "Ev ax êdî ne ya me ye û em ê nikaribin vêderê bi dest bêxin; cihê ku ji min re hatîye veqetandin, ji ev cihê ku diranê min lê ketîye pêk tê!"

[108] Bi vê difikirî ku, xewna wî bi evqasî pêk dihat. -Atînayî meydana pîroz a ji Herkules re hatibû nezirkirin sef girê dabûn ku, alîkarîya temamê xelkê Plataîayê dîtibûn; sebebê vê girêdana wan ev bû: Plataîayan pêşî li hemberî wê ezîyeta ji Thebaîyan dîtibûn, xwestibûn bi Kleomenesê kurê Anaxandrîdas û Lakedaîmonîyên ku wî wextî li wir bûn, bên girêdan. Lê wan nexwestin û gotin: "Em dûrî we dikevin, heta alîkarîya me bigehe we wê mesele bicemide; tehlîkeya hûn rûbirû bimînin heta bigehe me hûn ê bîst carî bibin kole. Em ji bo we pêşnîyaz dikin ku bi Atînayîyan ve werin girêdan; ew cîranê we ne û wekî parêzvan ew ne kesên bêçare ne." Nesîhetên Lakedaîmonîyan ne ji bo qencîya wan bû, ya ku wan dixwest li hevdûxistina Atînayî û Boîotîayan bû. Wan ji ber vê bi vî awayî ji Plataîayan re digotin. Plataîayî li hember derneketin; di esnayê ku li ser navê 12 xudayan merasim dihatin çêkirin hatin Atînayê, li rexê mîhrabê rûniştin û daxwazên xwe gotin û xwe bi Atînayîyan ve girê dan. Thebaîyên ev seh kirin, li hemberî Plataîayan şer îlan kirin; wî wextî Atînayê baz da hawara wan. Dema ku wê şer dest pê bikira, Korînthosî hatin, ketin navberê. Hekemî kirin û herdu alî li hev anîn, sînor kifş kirin. Bi Thebaîyîyan dan qebûlkirin ku nebin asteng ji Boîotîyên nexwazin bi Boîotîayê ve girêdayî bimînin. Piştî hekemî kirin, Korînthosî paşve kêşiyan; wê Atînayî jî paşve bikêşiyana, Boîotîayî girtin ser wan; lê ev êrîş bi têkçûna wan dawî lê hat. Atînayî ji wî sinorê Korînthosiyan xêz kiribûn derbas bûn û sinorê di navbera bajarên Thebaî û Plataîayê heta Asoposê û Hysîayê birin. Belê, Plataîayî bi vî awayî min behs kir bi Atînayîyan ve hatin girêdan û niha jî ji bo alîkarîya wan dihatin Marathonayê.

[109] Fikra strategosîyên Atînayê bûbû du beş. Beşek nedixwestin bikevin şer. -Ji ber ku li gor artêşa Medan ew ji qemçek insan pêk dihatin. Qismê din û di vê naberê de Mîltîades, digot şer. Ji bo ku dengên herdu milan wekî hev bû, wê fikra hê hindik bikêrhatî qezenc bikira. Ji bo ku dengê yanzdehan aîdî polemarkhos[249] yê ji nav arkhontan bi rêya baqle kêşanê dihat hilbijartin -ji ber ku Atînayîyan berê ji polemarkhos re, ji strategosîyan re mafê dengê wekhevî nas kiribûn- Mîltîades çû polemarkhosê Kallîmakhosê Aphîdnaîyî dît û jê re wiha got: "Kallîmakhos, di nav insanan de bîranînên xweşik yên bi qasî Harmodîos û Arîstogeîton hiştin, îro di destê te de ye. Kolebûn yan azadbûna Atînayîyan girêdayî te ye. Ji ber ku roja Atîna hatîye damezirandin heta îro rûbirûyî tehlîkeke wiha nebûye. Heke Atînayî serî li ber Medan bitewînin, wê teslîmî Hîppîasan bên kirin û wî wextî ya wê bê serê wan zelal e. Lê heke ev sîte ji vê êrîşê biserketî derkeve, wê bibe serokê temamê sîteyên Yûnanistanê. Ev çawan dibe û rewş çima girêdayî biryara te dibe? Ez ê niha wê bêjim. Em deh strategosî ne û dengên me nîv bi nîv parve bûne; hinek ji me şer dibêjin, hinek din şer naxwazin. Heke em şer nekin wê di hişan de şaşmayîbûn çêbibe, bi qasî ku bixwazin nêzîkî Medan bibin wê tevlihev bibin; na heke berî di dilê hinek Atînayîyan de hinek tişt birizin em bikevin şer û dijmin mexlûb bikin, bes ku hema xuda bêteref bimînin. Her tişt di destê te de ye; heke tu bi fikra min re bî wê welatê te azad bimîne û wê bajarê te jî yekemîn ya Yûnanistanê bimîne; heke tu beşdarî fikra li hemberî şer derdikevin bibî, wê bi eksê ev tiştên min niha vekirî û zelal ji te re gotin bibe."

[110] Miltîades bi van gotinan Kallîmakhos kêşa alîyê xwe û dema ku dengê polemarkhos jî ket ser, biryara şer derket. -Dema ku wextê fermandarîyê hat[250] strategosên ji bo şer deng dan, fermandarî ji Mîltîades re hiştin; wî jî wezîfe stend, lê heta roja wî nehat şer neda destpêkirin.

---

249 Ji arkhontê(9 kesên bajardewlet bi rê ve dibirin) serekerkantîya artêşê dikir re polemarkhos dihat gotin. Di dema Herodotos de polemarkhosîyên hevdem ev wezîfe wenda kiribûn, strategosên(serekerkan) bi hilbijartinê hatibûn nav artêşê fermandarî dikirin. Halbukî polemarkhosî ne wekî arkhontên din bi hilbijartinê, bi kêşandina baqleyê (kêşandina nav) vediqetîyan. (Ji her qebîleyê pêşî deh namzed dihatin hilbijartin, ji nav van nav dihatin kêşandin. Navê namzedan li ser tabletan dihatin nivîsandin, dikirin nav firaxekê, sindoqa hilbijartinê, bi qasî wê baqle jî dikirinê, tabletek û baqleyek bi hev re dihatin kêşandin, heke baqle spî bûya, namzedê navê wî bihata kişandin, dihat hesêbkirin ku qezenc kirîye.)

250 Strategosîyan, her yekî bi dorê ji bo rojekê wezîfeya serekerkantî dikir.

[111] Di dawîyê de roja li hêvîyê bûn hat, Atînayîyan pergala şer bi vî awayî wergirtin: Polemarkhos Kallîmakhos ket milê rastê, ji ber ku wî wextî li Atînayê qanûn ew bû ku li milê rastê Polemarkhos disekinîn. Piştî Polemarkhos, li gor rêza di pêşîyê de kifş bû, bêyî navbir qebîle rêz bûbûn;[251] êdî di dawîyê de li milê çepê Plataîayî cih digirtin. Piştî vî şerî ye ku, di merasimên ayînî yên Atînayî de ku her çar salan carekê dikin, qurban hatin serjêkirin, dema keruxû xelkê Atînayê dua dikir, bi xelkê xwe re navê Plataîayî ji bi lêv dikir û ji xuda ji bo wan jî daxwaz dikirin. -Atînayî li Deşta Marathonê sef girtibûn û ev qewimîn: Ji bo sefên wan bi qasî yên Medan dirêj bû, di merkezê de kûrahîya wan hindik bû û cihê herî jar û bêtaqet vir bû; lê herdu bask bi îhtîyatan baş hatibû qahîmkirin.

[112] Piştî sef hatin danîn, ji qurbanên hatin serjêkirin emareyên baş hatin wergirtin, Atînayîyan xwe avêtin pêş û li hemberî barbaran dest bi bezê kirin. Navbera herdu artêşan ji heyşt stadan ne kêmtir bû. Dema ku Persan dîtin dijmin baz dide û tê, wan jî dest birin ber xwe. Atînayî weke dînên ber bi mirinê ve dilezînin didîtin, hejmara wan kêm bû, bi bazdanê dihatin, siwarî û tîravêjên wan yên ser êrîşa wan bigre jî tunebû. Barbaran wiha melheze dikirin. Lê dema ku hatin sing bi sing, Atînayî wek insanên bi ceger şer kirin. Bi qasî em dizanin, di nav Yûnanîyan de pêşî ew ber bi dijmin ve baz didan û êrîş dikirin, cara ewil wan rabûna li hemberî techîza Medan û eskerên bi vê techîzatê hatî techîzkirin, dan ber çav; heta wê rojê di nav Yûnanîyan de yek gotina Medê jî tirs diafirand.

[113] Di vê navê re şerê di Deşta Marathonê de dirêj kêşa; di sefên merkezê de serdestî ya barbaran bû; Persîyan bi xwe û Sakayan wir girtibûn; di vê noqteyê de serkeftin ya barbaran bû, dijmin paşve avêtibûn û ber bi hindur ve ew radiqewirandin. Lê li herdu baskan serkeftin ya Atînayî û Plataîayîyan bû. Dijmin şikandibûn û hiştibûn bi awayekî berbelav bazdin, herdu bask bibûn yek û li hemberî dijminê navend hilkola bû dest bi şer kiribûn û serkeftin ji Atînayîyan re ma. Persî baz didan, ew jî di destê wan de şûr li pey wan bûn; dema ku gihiştin qeraxê deryayê, kirin qêrîn û gotin "Biteqînin!", li milê din jî hewil didan dest deynin ser keştîyan.

251 Rêza di nav qebîleyan de her sal bi nav kêşanê dihat organîzekirin. Hê li xwarê merasimên ayînî ku wê bên, Panathenî ku, di salên sisiyan yên Olimpiyadê de bi taybetî hê geştir dihat pîrozkirin.

[114] Di vî şerê giran de Polemarkhos bi mêrxasî şer kir û mir; ji strategosîyan Stesîlosê kurê Thrasylos jî mir û Kynegeîrosê kurê Eûphorîon jî kevanên pêşîyê yê keştîyê girtibû, bi bivir lêdan û destê wî jêkirin, ew jî mir û hê gelek lawên Atînayê, hem jî yên herî bi nav û deng!

[115] Atînayîyan heft keştî bi dest xistin; Persî bi yên din bêr hejandin û vebûn; diçûn girava girtîyên ji Eretrîayê anîbûn û danîbûn wir. Bi vê mebestê ji Pozê Sûnîonê fitilîn, dixwestin berî Atînayîyan bigihin Atînayê; li Atînayê ji bo vê projeyê Alkmaîonîd hatine tawanbarkirin, digotin, wan ev li ber guhê Persan xistine; digotin hê Persî di keştîyên xwe de bûn, Alkmaîonîd ji bo îşaretê, mertalên xwe bilind kirine.

[116] Persî ji Pozê Sûnîonê difitilîn; lê Atînayî ji bo bajarê xwe biparêzin bi hemî hêz û taqeta lingên xwe dibezîyan; barbar derbas kirin, li Marathonê ji saheke nezrî Herkules hatibû kirin veqetîyabûn, niha cardin li erdekî Herkules yê din, li Kynosargesê berhev dibûn. Barbarên ku hatin rastî Phaleronê lengerên keştîyên xwe berdan avê. -Cihê lengeravêtinê yê Atînayê wî wextî wir bû- piştre pozê xwe ber bi Asyayê ve zîvirandin.

[117] Di roja vê Marathonê de nêzîkî 6 hezar û 400 barbar mirine; Atînayîyan 192 kes winda kirine. Ziyanê herdu milan evqas in. -Li vir mûcîzeke wiha qewimî: Atînayîyek yê navê wî Epîzalosê kurê Kuphagoras, di nav qelebalixê de bi dil û can şer dikir, ji nişkê ve çavên wî nedîtin, halbukî tiştek li gewdeya wî neketibû û birîndar nebûbû û ji wê rojê şûnve kor ma. Qasî min seh kirîye, tiştê hatine serê wî bi vî awayî qise kirîye: Li pêşîya wî eskerekî bejindirêj xuya bûye, yanî wî wisan dîtîye, siha rîha wî eskerî temamê mertal girtîye; ev dîmen di rexê wî re derbas bûye û hevalê wî yê şer yê rexê wî kuştîye. Bi qasî ji min re hat gotin, Epîzelos wiha gotîye.

[118] Datîs ku bi artêşa xwe ve vedigerîya Asyayê, dema ku hatîye Mykonosê[252] di xewa xwe de xewnek dît. Ew xewn çibû? Vê nabêjin. Dema bû sibe dest bi kontrola keştîyan kirîye û di yek ji wan keştîyên Fenîkeyîyan de peykare Apollon dîtîye. lêpirsîna ji ku hatîye kirîye, hîn bûye ya kîjan

252 Mykonos: Li nêzîkî Delosê giravek e.

perestgehê ye, li keştîyê siwar bû çû Delosê; Delosî nû vegerîyabûn giravê; peyker wekî emanet danîn perestgehê û ji Delosîyan re emir kir ku wê bibin Delîona li Boîotîayê; ev cihekî li qeraxê hemberî Khalkîsê ye; piştî Datîs ev emir kir cardin vebû deryayê. Delosîyan peyker paşve nebirin, piştî 20 sal di ser re derbas bûn, Thebaîyên ji kahînekî rewş hîn bûn, bi xwe hatin û peyker stendin û birin perestgeha Delîonê.

[119] Eretrîayî yên wekî kole hatin berhevkirin, Datîs û Artaphrenes ew bi rêya deryayê anîn Asyayê, piştre şandin Sûsayê. Hikumdar Daryûs, berî Eretrîayî bên girtin, li hemberî wan gelekî xerab bi hêrs bû, ew tawanbar dikirin ku bi êrîşên neheq kirin pê de here; lê piştî ew bi koçberî hatin anîn û teslîmî destê wî kirin, xerabî bi wan nekir; tenê bi şandina wan a Kîssîayê ma, li wir ji Sûsayê 200 stad dûr, cihekî navê wê Arderîkka û sekeneke aîdê wî hebû, li wir hatin bicihkirin; bîreke xerîb ya sê cûre berhem dide, dikeve 40 stad ji wê wêdetir: Ji vê kortê qîrr, xwê û rûn tê derxistin. Ev wiha tên derxistin: Di cihê satilê de çerxek tê bikaranîn, nîv meşk li çerxê tê girêdan, meşk berdidin bîrê, piştre dikêşin jorê, vala dikin nav hewuzekî, li wir jî dibe sê cûre û diherike; qîr dipale binî, xwê zû krîstalîze dibe û rûn jî dirêje nav firaqekê û tê de berhev dibe; Persî ji vî ronî re "Rhadimake" dibêjin; rengê wê reş e û bêhna wê giran e. Ew cihê hikumdar Daryûs Eretrîayî lê bi cih kirîye vir e, îro jî li wir rûdinin û zimanê xwe yê kevin diaxifin.

[120] Yên hatin serê Eretrîayan ev bûn. -Piştî heyva çardeşevî du hezar Lakedaîmonî hatin Atînayê; ji bo beşdarî şer bibin ewqas bi îştah bûn ku, roja sisîyan a ji Spartayê derketibûn gihiştibûn Attîkayê. Ji bo ku şer temam bûbû, gotin ku qet nebe em Medîyan bibînin, ew birin Marathonayê û ew dîtin. Piştre serkeftina Medan pîroz kirin û vegerîyan welatê xwe.

A L K M A Î O N Î D Î

[121] Ji bo min qet ne tiştekî bawerîyê ye; ku Alkmaîonîdî, ji bo Atînayê teslîmî barbaran û Hîppîas bikin, mertal rakin û îşaret bidin. Ez bi tu awayî bawerî bi vê çîrokê naynim; belê, ew jî bi qasî Kallîasê bavê Hîpponîkosê kurê Phaînîppos, heta belkî jî hê zêdetir û bi awakî zelal dijminê zordestan/hikumranan bû. Û dema ku Peîsîstratos ji Atînayê hat raqewirandin

û malên wî bi destê dewletê xerac-mezat hat firotin, yê cesaretî sitendina malê wî kir, ji Atînayî tenê Kallîas bû; jixwe ji nîşandana dijmintîya li hemberî wî, tu wextî netirsyaye.

[122] Ev Kallîas, kesekî her wextê û ji alîyê herkesî ve layîqî bibîranînê ye; her wekî qasek berî niha me got, mêrxasekî di rêya azadîya welatê xwe de xebitîye, ji bilî vê di olîmpiyatan de ketîye pêşbirkan, serkeftin bi dest xistîne, di pêşbirkîya çar hespên li rexê hev girêdayî erebekê de dereceya duyemîn wergirtîye; di leyîstikên Pythîayê de jî serkeftin bi dest xistîye, di nav Yûnanîyan de bi destvekirîya xwe hatîye nasîn. Ji bilî vê bi helwêsta li hemberî pênc keçên xwe, daye nîşan ka çi awa mirovek e: Dema ku hatine salên mêrkirinê, cihazên hêja dane wan û ji nav temamê Atînayîyan ji bo bi kî re bizewicin ew serbest hiştîye, her yek jê bi mirovên ku xwestine re zewicîne.

[123] Belê, Alkmaîonîdî jî bi qasî wan neyarên hikumranan bûn. Ji ber vê ez vê îftîraya sextekar qebûl nakim, li gor min tiştekî ku mirov pê bawer bike, van mirovan mertal rakiribin û îşaret dabin tune. Jixwe di dewra hikumranan de her tim di koçberîyê de mane û Peîsîstratîd bi pergala wan ji hikumrantîyê hatine avêtin. Bi awakî wisan ku, yên Atînayê rizgar kirine, li gor min ji Harmodîos û Arîstogeîton zêdetir ew in. Kuştina Hîhpparkos ji alîyê van herdu kesan ve, zêdetirkirina hovîtîya kurê dawîyê yê Peîsîstratos û terefdarên wî pê ve netîceyek din neanî, nekarîbû pêşîya zalimîya wan bigre; heke Pythîa razî kiribûna, wekî min di pêşîyê de behs kir, yên ji bo Atînayê rizgar bikin emir ji Lakedaîmonîyan re dabûn bi rastî jî ev Alkmaîonî bûn, tê wê manayê yên li Atînayê ji nû ve damezirandina azadîyê pêk anîne jî ev in.

[124] Lê wê bê gotin, belkî jî li hemberî demokrasîya Atînayê bi kîn bûn û ji ber vê xwestin xîyanetê li welatê xwe bikin. Yanî çawan? Li Atînayê bi qasî wan yên rêz lê dihat girtin û bi qasî wan bi rûmet kesek tunebû. Dûrî aqila ye ku ew ev mertala mijarê ji ber van sebeban hildabin. Mertal li ber çavê herkesî hatîye hildan, kesek nikare înkar bike, ev bûye, kê ev îşaret daye? Yên ez hîn bûme di vê nuqtê de radiweste.

(125) Alkmaîonî ji kevin ve malbateke Atînayê ya bi nav û deng bû; lê ji Alkmaîonan şûn ve yê Megakles jê gelek hez dikir, bilindahîyeke bê pîvan

qezenc kirine. Dema ku Kroîsos, ji bo şêwirîyê misyonekî Lîdyayî ji Sardesê ji kahînê Delphoîyê re şand, vî Alkmaîonê kurê Megakles ji bo alîkarîya wan çi ji destan hatîye kirîye; Kroîsos, hîn bûbû bê yê ji bo perestgehê evqas feydeya wî çêbibû kî ye; ew bangî Sardesê kirîye û jê re gotîye ku bi qasî bikaribe carekê hilgire, dikare zêr bibe. Alkmaîon, ji bo baş ji vê merdîyê sûd werbigire, gomlekeke gelek fireh li xwe kirîye, cuzmeke gelek fireh peyda kirîye û kirîye lingên xwe û li pey rehberan ketîye nav xezîneya hikumdar; li ber koma toza zêr rûniştîye û heya jê hatîye cuzmeyê xwe dagirtine, piştre hindurê gomleka xwe yê bi benekî pişta xwe şidandîye tijî kirîye, qemçek jî avêtîye devê xwe û her cihê wî tijî bi zor lingê xwe bi dû xwe de kişandîye û ji xezîneyê derketîye. Kroîsosê ev halê wî dîtîye ji kenan ji hişê xwe çûye, ji derveyî yên li ser, bi qasî wê jî dayêyê. Ev xanedan bi vî awayî gelek dewlemend bûye û Alkmaîonê me, ji bo xwedîkirina hespan tewle ava kirîye, di leyzên Olîmpîyatê de serkeftin bi dest xistîne.

[126] Neslek piştî wê, di netîceya girêdana bi Kleîsthenesê hikumranê Sîkyonê re, ev malbata han hê bilind bûye, gihiştîye şan û şohretekê ku heta wî wextî di nav Yûnanîyan de nehatîye dîtin. Keçeke Kleîsthenesê kurê Myronê kurê Andreûsê kurê Arystonymos ya navê wê Agarîste hebû. Dixwest kesekî herî bijarte yê Yûnanî bibîne û wê bide wî. Di leyistikên Olîmpîyadê ya pêşbirka erebeya çar hesp li rexê hev hatîne girêdan, agahdarîyekê belav kirîye û xwestîye ku Yûnanî tevîyên xwe layîqê zavetîya Kleîsthenes dibînin, di navbera şêst rojan de bên Sîkyonê, ji ber ku piştî roja şêstan di nava salekê de wê keça xwe bike bûk. Yên hem xwe û hem jî bajarî ku ew hemwelatîyê wê ye layiq dîtin baz dan û hatin civînê; Kleîsthenes bi niyeta pêşwazkirina mêvanan, stadyûm û gymnasyûmek dabû amadekirin.

[127] Ji Italyayê Smîndyrîdesê kurê Hîppokrates yê Sybarîsî hatibû, kesekî di ser vî mirovî re yê xweş bijî tunebû û Sybarîs wî wextî dewra xwe ya herî baş dijîya. Damasosê kurê Amyrîsê Sîrîsî hat. Ew, wekî min got ji Îtalyayê hatin. Ji Kendava Îonîayê Amphîmnestosê kurê Epîstrophosê Epîdamnosî hat; ji Kendava Îonîayê tenê ew hatibû. Aîtoloîya, Malesê birayê Tîtormos şand. Ji alî hêz û kuwetê ve li temamê Yûnanistanê yekî weke vî Tîtormos kesek nehatibû û ji bo ji insanan bireve li Aîtolîa vekişîyabû qeraxê deryayê cihê herî dûr. Ji Peloponezê Leokedes hatîye, ev kurê Pheîdon yê hikumdarê Argosê

bû. Ev Pheîdon, ji ber ku pîvanên dirêjahî û giranahîyê anîye Peloponezê bi nav û deng e; kesekî herî ters yê Yûnanistanê dihat zanîn, wextekî karê wî ew bûye ku Elîsîyan ji nav cihê organîzatorîya lîstikên Olîmpîyadê bavêje û bi xwe serokatîya merasiman bike; ji Arkadîayê Amîantosê kurê Laphanesê Trapezosî, bi kurê xwe re hatibû; ji Paînonê Laphanesê Azanîayî; ev bavê Laphanes Euphorîon, li gor Arkadîayî dibêjin, Dîoskûr li mala xwe kirîye mêvan û ji wî wextî şûn ve mala xwe ji herkesî re vekirî hiştîye û Onomastosê kurê Aîgaîosê Elîsî, ev yên ji Peloponezê hatine. Yên ji Atînayê wekî mêvanê Kroîsos hatine jî, Megaklesê kurê Alkmaîon û Hîppokleîdesê kurê Teîsandros ê di dewlemendî û sipehîtîyê de emsalê wan tunebûye. Yê ji Eretrîayê, Lysanîasê berpirsiyarê Eûboîayê. Ji Thessalîayê Dîoktorîdesê Krannoyî ku, ji nesla Skopadîyan e û ji Molossosîyan Alkon. Lîsteya zavayan wiha bû.

[128] Di roja kifşe de hemî hatin. Kleîsthenes, pêşî her yek ji kîjan malbatê ne û ji ku ne pirsî, hîn bû; ji bo aqil, tebîet, terbîye û karekterê wan baş biceribîne, xwest hevdîtina bi wan re bike hem yek bi yek û hem jî bi hev re civînên gelemperî amade bike, ji bo vê salek muhlet danî; bi yên herî xortên wan jimnastîk dida kirin û li her yekî ji wan, li cihê ku insan herî baş kifş dibe, li ser sofreyê vedinerî; di midetê mêvanên wî li balê bûn ew wekî şehzadeyan pêşwazî dikir, li milekî din jî rewşa wan bi her awayî dişopand. Meyla wî hêdî hêdî ber bi namzedên Atînayî, bi taybetî bi ser Hîppokleîdes ve diçû, ji ber ku ew, hem wekî mêr bi hêz û spehî bû, hem jî bi xanedana Kypselosê Korînthosî re ji dûr ve pismamtîya wan hebû.

[129] Roja erêkirinê hat, li ser sofreya merasimê rûniştin. Wê Kleîsthenes ji nav namzetan yek hilbijarta. Kleîsthenes 100 ga kiribûn qurban, bi namzedên zavayan re temamê xelkê sîteya Sîkyonê jî diezimand. Di dawîya xwarinê de yên ji bo zavatîyê di pêşbirkê de bûn, dest pê kiribûn hunera xwe ya muzîkê, ji bo civatê maharetê xwe yê axaftinê nîşan didan; merasim her dirêj dibû, Hîppokleîdes yên din tevde li paş dihişt. Emir da Fûlutjen ku hewayeke giran a govendê lêde, flûtjen lê lêxist; wî lîst; wisan xûya dike ku wekî zanîna xwe dilîst, lê dema Kleîsthenes li vê sahneyê temaşe kir me'dê xwe tirş kiribû. Hîppokleîdes piştî hinekî bêhna xwe veda, maseyek da anîn û piştî mase hat bicihkirin, derket ser, pêşî gavên Lakedaîmonan; piştre fîgûrên govenda Attîkayê nîşan dan û di dawîyê de li ser masê li ser serê xwe

çik sekinî, lingên xwe wekî destên xwe hejandin. Hê piştî govenda yekem û duyem Kelîsthenes, ev kesê bi vî awayê nelirê û hereketên tewş bêhna wî teng dikir, ji fikra wî bike zave bi dilxelandineke ji hinavan ji mejîyê xwe avêtibû; di gel vê jî hişk hereket nekiribû, xwe girtibû. Lê piştî wî lingên xwe hejandin nikarîbû bi xwe, teqîya û got: "Kurê Teîsandros, te bi van cambazîyan zewaca xwe xera kir!" Mirovê xort jî bersiv da û got: "Ev ji bo Hîppokleîdes ne xem e!" ev gotina pêşîyan ji vê maye.

[130] Kleîsthenes herkes da sekinandin, dengê xwe bilind kir û wiha got: "Gelî yên ji bo keça min bûn namzed, ez dixwazim bêjim, ez ji we tevan gelekî memnûn im; ji nav we ne tenê yek, min dixwest ez we tevan memnûn bikim; lê dema ku keçeke mirov a tenê hebe, nikare biryareke ku herkesî memnun bike werbigire. Yên di vê civînê de destvala derkevin, ez dixwazim talantek zîv diyarî wan bikim, ji ber ku we kerem kir we xwest em bibin xwedîyê hev û we zehmet kir hûn heta vir hatin; ez keça xwe Agarîsteyê li gor qanûnan didim Megaklesê kurê Alkmaîon." Megakles got ku ew vê emaneta hêja qebûl dike û Kleîsthenes biryara xwe ya zewacê bi vî awayî da xuyakirin,

[131] Belê, di nav namzetan de hilbijartina zava bi vî awayî bû. Û bi vî awayî navê Alkmaîonîdîyan li temamê Yûnanistanê belav bû. Kurekî navê wî Kleîsthenes ji jin û mêrê nû re çêbû, demokrasîya Atînayê û organîzasyona qebîleyan deyndarê wî ne; navê bapîrê wî yê hikumranên Sîkyonê yê ji alîyê dayîkê ve lê kirin. Kurekî wî yê duyem jî çêbû, Hîppokrates; ji vî Hîppokratesî Megaklesekî din û Agarîstekê duyem çêbû, navê keça Klesthenes jî li wê lêkirin. Ew bi Ksanthîpposê kurê Arîphron re zewicî, tam di dema wê bibûya dayîk xewnek dît, di xewna xwe de şêrek dianî dinyê û çend roj şûn de ji Ksanthîppos re kurek anî dinyê, ev kur Perîkles e.

DAWÎYA MÎLTÎADES

[132] Piştî li Marathonê li Persan xistin, di nav Atînayîyan de jixwe cihekî rêzê yê Mîltîades hebû, ew hê bilindtir bû. Ji Atînayîyan 70 keştî, artêşek û pere xwestin; nedigot wê li hemberî kîjan welatî şer bide destpêkirin; lê heke bi ya wî kiribana, wê wan di dewlemendîyê de xerq bikira û wê bibra cihekî ku bi koman zêr hene. Bi van gotinan keştî dixwestin, Atînayîyên bi van sozan hatin temahkirin, yên ku xwestin danê.

[133] Mîltîades artêş girt, ber bi Parosê ve derket rê; Parosîyan, bi Persan re trîremek şandibûn Marathonê, ev dikir bahane û dijmintîya wan dikir. Lê ev, sebebekî derve yê ji devê fermî belav dikir pê ve ne tiştekî din bû. Di eslê xwe de ev mahneyek bû, kîneke wî li hemberî Parosîyan hebû. Ji ber ku kesekî Parosî yê navê wî Lysgagorasê kurê Tîsîas fitneya wî li ber Hydarnesê Persî kiribû. Dema ku Mîltîades gihişt dawîya sefera xwe ya di deryayê de dikir, Parosîyên ketibûn nav surhan, abloqe kir; çawîş şand û sed taland xwest, got, heke nedin, heta wan bi dest nexin dê wê dorpêçê ranekin; Parosîyan nedifikirîn kêm-zêde pereyan bidin Mîltîades; ya ku ew difikirî, parastina xwe bû; di nav wan tedbîrên distandin de, cihên surhan ên di esnayê êrîşan de gelek tehrîb dibûn, bi şev lêkirin û du qat zêdetir ji berê, careke din ava kirin hebû.

[134] Temamê Yûnanîyan heta vir bi vî awayî behsa bûyerê dikin; lê ev hûrgilîyên ez ê behs bikim, tenê ji çavkanîyên Parosan derdikevin. Dema Mîltîades di nav zehmetîyan de din av hewldanê de bû, jineke ji girtîyan xwestîye pê re biaxive. Ew ji Parosê û navê wê Tîmo bû. Di perestgeha îlaheyên bin erdê(286) de, wezîfeke wê ya ji rêzê ya nizim hebû. Dema ku anîn pêşberî Mîltîades, wê got ku, heke dixwaze illa Parosê werbigire, pêwist e gotina wê bike. Jê re nehênîya wê gotîye; ew jî rast ber bi gira pêşîya bajêr a bilind dibû meşîya, li ser vî girê cihek pîroz yê ji Thesmophorosê Demeter re hatibû nezirkirin hebû; ji bo ku nikarîbû derî veke ji dîwar xwe avêt û xuda dizane ka ji bo çi bike, ber bi salona mezin a perestgehê ve meşîya. Belkî jî ji bo rakirina tiştekî ku gerek dest nedabayê; jixwe ne giring bû. Ji bo çi dibe bila bibe, dema ket cihê ketina hindur ji nişkê ve rastî erdhejê hat; bi bazdanê paş ve hat, wextê ji ser dîwarê kevirîn re xwe avêt ket, ling şikest; yên dibêjin çoga xwe li erdê xist jî hene.

[135] Mîltîades ketibû halê ku dilê mirov pê bişewite, keştîyên xwe birin û vegerîya, ne karîbû pere bibe Atînayê û ne jî dorpêça bîst û şeş roj kêşa netîcek dabû; nikarîbû bajêr bistîne, tenê girav şelihandibû. Parosîyên ku hîn bûn Tîmosa li ber destê du îlaheyan bû rê nîşanî Mîltîades kirîye, xwestin jinikê ceza bikin. Nuh ji dorpêçê filitîn, hecî şandin Delphoîyê; gelo wê Tîmoya ku Mîltîades şandibû perestgeha ji mêran re qedexe ye û ji dijminên welatê xwe re ji bo bajêr bistînin rêya herî emîn dabû nîşan, pêwist bû bê

kuştin? Ev dipirsîn. Pythîa izin neda; lazim bû dawîya Mîltîades xerab bûya û jinik, ji derveyî wasiteya enînivîsa wê ber bi tawanê ve dehf dida ne tişteke din bû. Ew kehaneta Pythîa da Parosîyan wiha bû.

[136] Mîltîades, piştî ji Parosê vegerîya, herkesî dest bi axaftina yên hatibûn serê wî kiribûn; Ksanthîpposê kurê Arîphron êrîşî ser kir, li ber Meclisa Xelkê kişkişand, ew bi xapandina Atînayîyan taxwanbar dikir, serê wî xwest. Mîltîades li wir bû, lê xwe neparast (birîna lingê wî xedar bûbû, halê wî yê axaftinê tunebû); ji nav livînê nexweşîyê anîbûn, dostên wî di cihê wî de axiftin. Behsa Marathonê û tolewergirtina ji Pelasgîyan û qezenckirina Lemnosê ji Atînayîyan re kirin. Xelkê cezayê mirinê ya jê ra hatibû dayîn qebûl nekirin, tenê ji bo hereketê şaş kiribû 50 talant cezayê pereyan danê. Piştî vê biryarê, kangrenê Mîltîades dixwar, ew dirizîya û piştre mirinê ew girt û bir. Kurê wî Kîmon tam 50 talant da.

[137] Mîltîadesê kurê Kîmon, Lemnos wiha stendibû. Berê Atînayîyan Pelasgî ji Attîkayê avêtibûn, biheq yan neheq; ez di vî warî de tenê yên min guhdar kirîye dikarim bêjim; Hekataîosê kurê Hegesandros dibêje neheq e, gotinên wî ev in: "Atînayîyan li ber pêşkên Çiyayê Hymessosê, welatekî aîdê wan, ji bo bi cih bibin dabûn Pelasgîyan. Ev heqê bedenên kelha Akropolê rapêçabûn. Ev dîwar ji alîyê Pelasgîyan ve hatibû hûnandin. Atînanîyên ku dîtin erdê berê bêbereket û bêqîmet dihatin hesêbkirin bi awakî xweşik hatin bikaranîn, poşman bûn ku ew dane wan û bêyî biçin dadger, Pelasgî raqewirandin." -Atînayîyan digotin yên me kirine rast e; Pelasgîyên li ber pêşkên Hymessosê bi cih bibûn dihatin Atînayê, tiştên nebaş dikirin; keçên ciwan yên Atînayê (û kur) her roj diçûn kahnîya Enneakrunosê û av dikişandin; ji ber ku wî wextî, wekî temamê Yûnanîyan xizmetkarên Atînayîyan jî tunebû. Di her çûna xwe de Pelasgîyan mekrohî dikirin, bi êrşkarîyên bêşerm û bêheyayî zor didan zarokan. Atînayî digotin "Cardin jî me bi wan re ji wan hê insanîtir hereket dikir"; "me dikarîbû em hemî Pelasgîyan bikujin, ji ber ku êrîşî me dikirin". Wan ew nekuştin, tenê xwestin ji welat derkevin. Pelasgî çûn welatên din, bi taybetî çûn Lemnosê û bi cih bûn. -Belê vaye du behiskirin, yek ji Hekataîos, min li jorê behs kir, yek jî ya Atînayîyan.

[138] Pelasgîyên dixwestin li Lemnosê ji Atînayîyan tole werbigirin. Rojê cejnên Atînayîyan zanîbûn, keştîyên 50 bêrî bi dest xistin û ji bo bavêjin ser

jinên Atînayîyan yên li Braûronê ji Artemîs re merasim çêdikirin birevînin, derketin rê; piranîya wan revandin, bi rêya deryayî re revandin anîn Lemnosê û bikar anîn; Ev jinên han gelek biber derketin; zarokên xwe her tim zimanê Atînayî û ûrf û adetên wan hîn dikirin. Zarokan, nedixwestin bi zarokên ji jinên Pelasgîya çêbibin tevlihev bibin; heke ji zarokên din li yek ji wan bixista, hemî bi hev re baz didan ew diparastin, her tim hevdû destek dikirin. Heta dixwestin bi zarokên din jî gotinên xwe bidin qebûlkirin û bi rehetî didan qebûlkirin jî. Pelasgîyên ku ev rewş qebûl nedikirin, rûniştin meclis damezirandin û ketin fikrek dil bi êş. Ev zarokên han, di miqabilî zarokên jinên xwe yên meşru yên wextê xort bûn anîbûn, ji niha ve yekîtî çêdikirin, ew têk dibirin, gelo wextê mezin bibin wê çi bikin? Li ser vê, baş dîtin ku van zarokên Atînayî bikujin, ji bo kar temam be bi zarokan re dayîkên wan jî kuştin. Gotina "tawanê Lemnos" a li Yûnanistanê ji bo tawanên gelek giran bikaranîna wê adet e, ji ber van kuştinan maye û yek jî ji ber ku ir zû de jinên Lemnosîyan temamê mêrên xwe û hikumdarê xwe Thoas kuştin.

[139] Piştî Pelasgî zarok û jinên xwe kuştin, axa wan êdî berhem neda wan; zayokîya jin û birrên pezê wan wekî berê nemabû. Kêmbûna nifusê û xela tirs kiribû dilê wan, mirov şandin Delphoîyê û pirs kirin ka wê ji vî belayê çawa rizgar bibin. Pythîa got: "Dilê Atînayîyan xweş bikin û çi dixwazin bidin wan." Li ser vê Pelasgî hatin Atînayê, di şûna wan qisûrê kirine de dixwazin tiştîna bidin. Atînayîyan li Prytaneîonê sofreyek hazir kirin, li dora wê livîn rêz kirin, tiştên herî bi qîmet yên dîtin li ser raxistin, hindik mabû sifre hilweşe, ewqas xwarinên zêde û xweşik tijî kirin û ji Pelasgîyan re gotin, erdê me di eynî rewşê de bidin me. Li ser vê Pelasgî ev bersiv dan wan: "Kengî bayê bakur keştîyek ku ji erdê we rabû, di rojekê de anî erdê me, wî wextî em ê girava xwe bidin we." Wiha gotin. Wan zanîbûn ku ev ne karekî dikare bibe, ji ber ku Attîka, qederek li başûrê Lemnosê ye.

[140] Wî wextî kar bi vê ma û sekinî. Gelek sal di ser re derbas bûn, Khersonesosa Hellespontosê ket destê Atînayîyan, Mîltîadesê kurê Kimon, ji bayê Etesîaosê[253] sûd wergirt, ji Elaîûsê kendava Khersonesosê derket rê, li Lemnosê peya bû. Kahînê ku ji Pelasgîyan re gotibû wê rojek bê pêk bê û

253 Bayê Etesîosê ji bakurêrojhilatê ve li ba dibe.

jê bawer nekiribûn anî bîra wan, xwest ji giravê derkevin. Hephaîstîayî serî tewandin, lê Myrînayîyan Khersonesos erdê Attîkayê hesêb nedikirin, heta teslîm bûn hatin dorpêçkirin. Belê, ew Atînayîyên ku Mîltîades ew birin, Lemnos bi vî awayî sitendine.

PIRTÛKA HEFTAN

POLYMNÎA

MIRINA DARYÛS – ŞERÊ HIKUMRANÎYÊ

[1] Hikumdarê Mezin Daryûsê kurê Hîstaspes, ji ber êrîşa ser Sardesê, jixwe kîna wî li hember Atînîyan çêbûbû, dema ku xebera şerê Marathonê hat ev kîn vegerîya ser hêrseke nedîtî û ji bo êrîşeke çekdarî ya li hemberî Hellasê ket nav xwestekeke mezin. Nûçevan bêsekin derketin rê, ji wilayetekê derbasî wilayeteke din bûn, xebera ji bo ji berê zêdetir esker berhev bikin, çêkirina keştîyan, hesp û xwarin û kincan amade bikin ferman belav kirin. Emir belavî her cihî bû û Asya sê salan hejîya; ji bo bên şandin Yûnanistanê kesên herî bikêrhatî hatin berhevkirin, hatin techîzkirin, perwerdekirin. Lê di sala çaran de, Misrîyên ku berê Kambîses ew kiribûn bin desthilata xwe, li hemberî Persan serî hildan.[254] Li ser vê Daryûs, ji bo li hemberî du miletan di eynî wextî de seferê bide destpêkirin, hewleke hê zêdetir xerc kir.

[2] Tam dê Daryûs li hemberî Misrê û Yûnanistanê dest bi seferê bikira, di navbera kurên wî de şerê derketina ser text dest pê kir: li gor adetê Persan, berî girtina bi dest ya fermandarîya esker, pêwist bû hikumdarê piştî xwe hilbijarta. Hêj Daryûs nebûbû hikumdar, ji jina wî ya ewil, ji keça Gobryas sê zarokên wî hebûn; piştî bû hikumdar ji Atossaya keça Kîros çar zarokên wî yên din çêbûn. Mezinê yên yekem Artobazanes bû, mezinê yên ji jina duyem Xerxes bû. Zarokên ji du jinan bûbûn du sefên li hemberî hev. Adetê mişterek ya li her cihî derbas dibe, iktidar heqqê yê herî mezin e. Artobazanesê mezinê tevan jî pişta xwe bi vê adetê girê dida; ya Xerxes jî girêdayî mafê dêya wî Atossa bû, ji ber ku ew keça Kîros bû yê ji bo Persan azadî bi dest xistibû.

[3] Daryûs hêj fikra xwe negotibû. Di vê navê re Demaratosê kurê Arîston yê piştî li Spartayê ji hikumdarîyê hatibû xistin û li ser daxwaza xwe ji La-

254 Serhildana Misriyan li hemberî Persan di sala 487an ya B. Z. de ye. Dareîos di sala 486an de mirîye.

kedaîmonê dûr ketibû, hê nû hatibû Sûsayê û ev hatina wî rastî vî şerê li ser text hatibû. Dema ku Demaratos ev şerê di navbera kurên Daryûs de hîn bû, li gor gotinên bawerî pê tên kirin, diçe ba Xerxes, şîreta lê dike, dibêje, li ser ew esasên tu dide nîşan ji bo hukumdarîyê bi dest bixe, vê yekê jî zêde bike: Tu, piştî Daryûs bû hikumdar û efendîyê Persê hatîye dinyê, tevî vê jî dema ku Artobazanes hat dinyê Daryûs kesekî wekî herkesî bû; ji bo wezîfeya hikumdarîyê ya gelek miqtedîr kesek têkeve pêşîya te ne heq, ne jî tiştekî qabilî imkanê ye; Demaratos ji bo gotinên xwe bi palpişt bike Sparta wekî mînak nîşan dida: Li wir heke zarokê kesekî berî ew bibe hikumdar hebe û piştî bibe hikumdar jî zarokên wî çêbibin, ew zarokê duyem cihê bavê xwe digre. Xerxes jî ev tiştên Demaratos di guhê wî de kiribûn wekî sedem nîşan da; Daryûs jî ev biheq dît; ew wekî hikumdar hat hilbijartin. Heke bi min bimîne, pêwîst nedikir Xerxes ji bo bibe hikumdar sedemeke wiha nîşan bide, Atossa çi bigota ew dibû.

[4] Piştî hikumdarê Persan yê dahatê hat hilbijartin, Daryûs êdî dest bi amadekarîya seferê kir; lê di sala piştî vê ya serhildana Misrê û şerê malbatê de û di navenda hazirîyan de, mirinê dest avêt pêsîrê wî. Wî tam 36 salan hikum meşandibû; ne karîbû Misra serî hildabû û ne jî Atînayê ceza bike. Dema ku Daryûs mir seltenet ket destê kurê wî Xerxes.

[5] Xerxes di destpêkê de ji bo sefera Yûnanistanê qet lez nedikir; artêş ji bo Misrê têke ser çogan amade dikir. Lê Mardonîosê kurê Gobryas li balê bû, Persekî ku bi qasî wî gotinên wî derbas bibin tunebû; Mardonîos, xwarzîyê Daryûs bû, bi Xerxes re zarokên xweh û birayan bû û bêsekin ji wî re gotinên bi vî awayî digotin: "Ezbenî, ji Yûnanistanê evqas xerabî li Persan kirine, em hedê wan pêş wan nekin nabe. Gelo nabe tu pêşî van karên di destê xwe de temam bikî û vê bêedebîya Misrîyan jî bişkînî û artêşên xwe li hemberî Atînayê seferber bikî? Di nav hemî insanan de wê navê te wekî mêrxasekî belav bibe û heke rojekê hinek rabin artêşên xwe ber bi axa te ve bajon, wê mecbûr bibin hişê xwe bînin serê xwe." Ev gotin banga tolevekirinekê bûn; ji bilî vê, ji behsa xweşikîya Eûropayê ya bi tu cihê re nayê miqayesekirin, cisnên daran, cûreyên wan û bereketa erdê wan jî ji paşve nedima, ev jî dikir ser ku, xezîneke wiha di nav hemî fanîyan de tenê layîqî Hikumdarê Mezin e.

[6] Wî ev digotin, ji ber ku kesek bû ji şer û macerayê hez dikir û ji ber ku dixwest bibe setrabê Yûnanistanê. Demek şûnde ev planên wî pêk hatin û hizra Xerxes ber bi şer ve bir. Ji bilî vê ji bo Xerxes bide bawerkirin, tesadufan jî feyde gihandinê. Di serî de gotûbêjvanên ji alîyê Aleûadîyên ji Thessalîayê şandibûn, di nav keftûleftê de bûn ji bo ku hikumdar bişînin ser Atînayê. (Ev kesên ji wan re Aleûad tê gotin, hikumdarên Thessalîayê ne.) Piştre pismamên Peîsîstratîdîyan yên hatibûn Sûsayê jî ev fikir han didan, bi sedemên nû xurt dikirin. Ev Peîsîstratîdî, Onamakrîtosê Atînayî jî bi xwe re anîbû, ev kes berhevkar û şîrovekarê kehanetan bû û kehanetên Mûsaîos belav dikir; şer û pevçûnên kevin yên bi wî re kiribûn ji bîr kiribûn, ji ber ku wextekî Hîpparkhosê kurê Peîsîstratos ev Onamakrîtos ji Atînayê raqewirandibû; Lasîsê Hermîoneyî, fêm kiribû ku vî kehaneteke derew kiribû nav kehanetên Mûsaîos û tê de gotibû ku wê giravên li herêma Lemnosê xerqî nav ava deryayê bibin, loma ew dabû girtin. Ev kesê heta wê rojê gelek hurmet dîtibû, ji ber van derewan ji alîyê Hîpparkhos ve hatibû raqewirandin. Di vê dewra em behs dikin de, li pey Peîsîstratîdîyan ve hatibû Sûsayê û wan jî ew wekî kesekî qenc bi hikumdar dabûn naskirin. Çi wextê ev kes derdiket pêşberî hikumdar behsa kahînan dikir; yên li ser ku wê barbar têk biçin tiştek nedigot, di ser van re diqewast; tenê behsa yên mizgînîya serkeftinên mezin didan dikirin, digotin; em bêjin qeder dixwaze Persîyek pirekê bavêje ser Hellespontosê, dirêj û dirêj behsa wê ev sefer çawa bibe dikir. Bi vî awayî li milekî Aleûadî û Peîsîstratîdî planên xwe ji hikumdar re îzah dikirin, li milê din jî bi kehanetên vî mirovî dora hikumdar pêçabûn.

XERXES, AMADEKARÎYA YÛNANISTANÊ DIKE

[7] Xerxes biryara vekirina şerekî li hemberî Yûnanistanê da, sala piştî mirina Daryûs, pêşî artêşek şand ser yên serî hildane. Temamê Misrê ji şertên dewra Daryûs gelek girantir careke din kir kole û Akhaîmenesê lawê Daryûs ku birayê wî bû, danî ser bakurê wê; ew, dema ku Misrê birêve dibir, ji alîyê Înarosê kurê Psammethîkos yê Libyayî ve hatîye kuştin.[255]

255 Ji bo Îarosê kurê Psammetîkos li pirtûka 3yan û beşa 15an binêrin.

[8] Piştî ji nû ve Misir hat stendin, Xerxes berî dest bi birêvebirîya sefera li hemberî Atînayê, bangî giregirên Persê kiri, komîsyonek ava kir, mebesta wî ew bû ku ew niyeta xwe bêjin û nêrînên wan werbigire.

a) Meclis berhev bû. Xerxes wiha got: "Gelî Persîyan, ne ez im ku cara yekem mecliseke wiha ava dike, ez tenê rîayetî adeteke kevin dikim. Bi qasî ku em ji mezinên xwe hîn dibin, piştî bi destê Kîros imparatorîya mezin a Medan ji Astyages hat girtin û ji me re hişt heta niha, me qet rûyê rehetîyê nedîtîye;[256] xudayek rê nîşanê me dide û em jî li ser rêya wî dimeşin, ev rê me digehîne serkeftinên her yekî ji ya din mezintir. Hûn hemî ew karên Kîros, Kambîses û bavê min Daryûs bi ser xistin û miletên kirin bin desthilata me dizanin, ne hewce ye em careke din bi bîr bînin. Min jî, ji roja textê hikumdarîyê ji wan dewr girt û heta niha, ji bo di vê wezîfeyê de ji yên berî xwe paşve nemînim û ji bilî fikra rêya firehkirina desthilata Persê ya di eynî rewşê de tiştekî din nafikirim û piştî fikirîn û hûrgilîyan, min biserketineke wê bê qezenckirin û erdekî wê bê wergirtin dît, ev erd bi qasî yê niha di destê me de fireh, bi qasî wê bi bereket, heta erdekî hê berhemên cûre cûre dide û ji bilî vê em ê toleya xwe werbigirin û ew birîna di rûmeta me de hatîye vekirin, bidin girtin.

b) Ez difikirim pirekê bavêjim ser deryaya Hellespontosê. Dixwazim artêşek bikim nav Ewrûpayê, ji bo tepisandina Atînayîyan, belê, wê ew cezayê kirinên li Persîyan û li bavê min bikşînin. We jî dît, Daryûs ji bo bimeşe ser van kesan amadekarî dikir. Niha êdî Daryûs tune; ew ji bo tolevekirinê dikelîya; vekirina toleya wî niha para min ketîye, toleya temamê Persîyan, heta ez Atînayê bigrim û bişewitînim ez ê şer bikim. Pêşî wan bi awayekî neheq li hemberî min û bavê min dest bi êrîşê kirin. Bi Arîstagorasê Mîletosî re yê koleyê me bû, yekîtî çêkirin û êrîşî Sardesê kirin; daristana pîroz û perestgeh şewitandin; piştre di esnayê seferên di bin birêvebirîya Datîs û Artaphrenes de, em derketin ser erdê wan, tiştek nema ku bi me nekirin. Hûn vê jî dizanin, ne wisan?

c) Belê, ez jî ji ber van sedeman şer dikim. Niha careke din qezencên em ê bi van seferan bi dest bêxin bifikirin: Heke em vî miletî û herêma Pelopsê Frîgyayî têkin ser çog, êdî li ber çavê Persîyan ji qubbeya asîman ya îlahî pê ve

256 Ji bo bê çawa împaratorî ji Astyages hatîye wergirtin, binêre li pirtûka yekê, temamê dîroka Kîros, bi taybetî beşên 107-131.

sînorek nemîne. Belê, wê roj êdî erdekî din yê sînorê wê bi me ve nebîne; bi alîkarîya we, bi wê gera hesan ya ez ê li nav Ewrûpayê bikim, ez ê temamê vî erdî têxim ser hev û bikim yek welat. Ji ber ku bi qasî ji min re hatîye gotin, rewş wiha ye: Carekê, piştî min ev miletên ez behs dikim ji orteyê rakirin, êdî tek sîteke ku bikaribe şer bike, di nav fanîyan de yê bikaribe bejna xwe bide ber ya me tu milet namîne. Bi vî awayî em ê zincîra koletîyê têkin stuyê dijminê xwe, herkesî, heta yên ne dijminê me ne jî em ê girêdin bi eynî nîrî.

d) Niha heke hûn yên ez ê bêjim bikin, hûn ê min şa bikin: Her yek ji we, dema ku ez bêjim heydê, hûn ê bi dil û can baz bidin ser wezîfeyên xwe; kî bi yekîneyên herî techîzkirî derkeve pêşîya min, wê diyarîya herî hêja ya welatê me ji min werbigire. -Belê ya pêwist e bê kirin min gotin; lê ez naxwazim wekî kesekî tenê guh li gotinên xwe bike derkevim pêşberî we; ez mijarê ji raberizînê re vedikim, yên dixwazin nêrînên xwe bêjin bila bêjin."

[9] Wî ev gotin û xwe kerr kir. Mardonîos xwest biaxive û wiha got: "Ez-benî, fikra we ya sevîyebilind ne tenê ya Persên heta niha hatine û çûne, li ser nifşê bên jî bilind dibe. We di axaftina xwe de behsa rastîyên herî mu-teber û berçav kirin, bi taybetî tu naxwazî tehemilî van Îonîayên Ewrûpayê yên li halê xwe nanêrin û bi me dileyzin bikî. Belê, wê gelekî xerîb be, piştî ku em Sakesî, Hindî, Ethîopîayî, Asûrî yên zerara wan negihişîye me û sirf ji bo em desthilata xwe fireh bikin bi hezaran miletên din ên koletîya me qe-bûl kirine, bigrin bin desthilata xwe, Yûnanîyên em mecbûr kirine bi eynî awayî bersivê bidin, ceza nekin wê gelekî xerîb be. Em ê ji ber çi bitirsin-Ma artêşeke wan a boş heye? Pereyên wan yên bêhed û hesab heye?

a) Em metodên wan yên şer dizanin. Çavkanîyên wan kêm in, em wê jî dizanin. Zarokên ji eynî nijadê yên îro di destê me de hene, yên ji wan re Îonîayî, Aîolîayî û Dorisî tê gotin, li ser erdê me ne, wekî koleyên me dijîn. Min bi xwe ev kes ceribandin, min bi emrê bavê te artêş birin ser wan; ez heta Makedonîayê çûm; hindik mabû ez bigihim Atînayê; kesek nekarîbû şerê bi min re bigre ber çav.

b) Bi vê re, tiştekî ku pêwist dibînim bêjim heye; Yûnanî gelek bêmelheze şer dikin, ne zêhatî ne û bêtedbîr in; hûn nimûne dixwazin, dema ku şer da-dixin cihê herî xweşik û deştan hildibijêrên; serûbin dikin, ji kelehan peya

dibin li wir şer dikin; di dawîyê de yê qezenc dike jî bi zerarên mezin jê derdikeve; em bên yê têk diçe, ez yek gotin jî li ser vê nakim; ji binî ve xelas dibin. Eynî zimanî diaxifin, ji bo çi ji hev re qasidan naşînin û naaxifin, karên xwe rast nakin û wiha her timî şer dikin? Em bêjin çi dibe bila bibe wê şer bikin, wî wextî jî pêwist e cihê herî misaîd hilbijêrin û li wir şer bikin. Lê halbûkî ev Yûnanîyên han, dema ez heta Makedonîayê meşîyam, ketine nav rewşeke ku kesên bi rûmet nepejirînin, heta dawîyê şer nedane ber çav.

c) Madem wiha ye, ey hikumdar, dema ku tu deryaya insanan a Asyayê dikî pey xwe bi keştîyên xweşik techîzkirî dimeşî, kî dikare şerê bi te re bigre ber çav? Cûreta Yûnanî heke heta vê noqteyê hatibe, heke izna te hebe, ez bawer nakim. Em bêjin ku fikra min şaş derket, bi ya kesekî yê ji aqlê xwe razî kirin û li hemberî me ketin şer, wî wextî jî wê fêr bibin ku em ji herkesî baştir şer dikin. Çi dibe bila bibe, carekê heta em neceribînin em dev ji vî karî bernedin; tu kar bêzehmetî nabe; insan bê hewil bide nikare tiştekî bi dest bixe."

[10] Mardonîos, piştî ber zehmetîya planên Xerxes xweş kir, paqij kir, bêdeng bûbû. Ji Persîyên din deng dernediket, kesekî nikarîbû bigre ber çav ku li hemberî fikrên dihatin pêşpêşkirin derkeve. Artabanosê kurê Hîstaspes ji ber ku dibû kurmamê Xerxes, pişta xwe dida wê û axift:

a) Wî got: "Hikumdar, heke du fikrên hemberî hev li hev nekevin, hilbijartin û ji herduyan kîjan baş e ji bo wê dayîna biryarê ne mimkun e; mecbûrîyeta beşdarîya qebûlkirina fikra hatîye meydanê, derdikeve holê; lazim e du fikir hebin ku tu yekê hilbijêrî. Em zêr bêjin, zêrê pak bi serê xwe nayê naskirin; lê heke du perçe zêr li kevirê mîhengê bên xistin, kîjan saf e derdikeve holê. Min ji bavê te re, ji birayê xwe Daryûs re jî gotibû, li hemberî Îskîtîyan seferê neke, min gotibû ew, li cihekî bajar ava nakin û nasekinin, lê wî plan kiribû Îskîtîyan, van koçeran têke bin desthilata xwe, bawerî bi min nekir;[257] derket seferê û bi wendakirina gelek mêrxasên ji artêşa xwe, paşve vegerîya. Lê tu hikumdarê min, tu dixwazî li hemberî kesên ji Îskîtîyan

257 Herodotos, bi kurtî behsa vê helwêsta Artabanos, di pirtûka 4an û beşa 83an de, dike. Di vê beşê de jî birayê Dareîos tam wekî Nestor, zanayekî dûrbîn dihesibîne. Gotinên wî, temamê ihtimalan digre nav xwe û helwêsteke bi eqilane îfade dikin.

gelekî biqîmettir bimeşî; tê gotin ku ew hem di şerê deryayî de û hem jî di şerên bejahîyê de gelekî bi meharet in. Hê ji vê xerabtir jî heye ku, wezîfeya min e ez wê jî ji te re bêjim.

b) Ji bo ku artêş li hemberî Yûnanistanê bê meşandin, pêwist e tu derbasî Ewrûpayê bibî, tu ji bo vê dibêjî, ez ê li ser Deryaya Hellespontosê pirekê ava bikim. Niha em hinekî bifikirin: Em bêjin ku, tu di deryayê, yan bejahîyê de, yan jî di herduyan de têk çûyî; ji ber ku ew kesên zexm in û heke em bigrin ber çav ku Atînayîyan tenê bi serê xwe artêşa giring a Datîs û Artaphrenes yên ji Attîkayê çûn mexlûb kirin, tê wê manayê bi rastî jî ev insanên zexm in. Em bêjin ku serkevtineke dualî qezenc nekirin. Lê heke ji deryayê êrîş bînin û qezenc bikin, wê bên Hellespontosê û pira me xera bikin, belê, ey hikumdar, wî wextî wê rewş zehmet bibe.

c) Ev ne ferazîyeke ku min li hev anîye; dema ku bavê te meşîya ser Îskîtîyan gihişt qiraxên Bosphorosa Trakyayê, pirek avêtibû ser Îstrosê, wî wextî jî hindik mabû felaketeke mezin bê serê me. Îskîtîyan, ji Îonîayên pira Îstrosê diparastin re, ji bo pirê xera bikin û rêya vegera me bigrin, çi ji destê wan hatibû kiribûn. Heke Hîstîaîosê hikumranê Mîletosê li pey yên din ketibûya û bigota erê, wê Persî bi temamî qirr bibûna. Melhezeya hiştina talihê Hikumdarê Mezin ji erêya yek kesî re, tenê sehkirina tiştekî wiha jî mûyê bedena mirov radikin ser xwe.

d) Niha heta tu di tengîyeke zêde de nemînî xetereke wiha negre ber çav. Bi min bawer bike: Niha vê civînê paşve bixe; baş bifikire û hilîne û deyne, di nav bêdengîya fikirkirinê de hemî milên mijarê lêbikole, piştre nêrîna herî baş ya ji bo te baş e bêje. Ji ber ku tiştê herî bifeyde, baş fikirîn e; li gor min qezenca herî mezin ji me re, dayîna îstîqametekê ji nêrînên xwe re ne; astengek rêya me bibire jî, cardin em ê bêjin em rast fikirîne lê qeder ji tedbîrên me serdest derket; hesab şaş bin şans alîkarî bike, ev qezenceke ku mirov ne li hêvîyê ye; hesabê şaş cardin wekî şaş dimîne.

e) Ma tu nabînî ku, xuda riya pozbilindîyê nade kesên ji yên din mezintir, bi brûska xwe lê dixe? Lê ji biçûkan re tiştek nabe. Û tu nabînî ku, avahî û darên herî bilind, her wextê li ber xezeba yê jorê dikevin? Ji ber ku xuda ji kezaxki-

rina yên ji xetê derkevin hez dike. Û wisan dike ku, tu lê dinêrî qemçek insan arteşeke mezin xelas dike; xudayê hesûd, têrê dike ku tirsek têke hindurê wî yan jî brûskekê li serê wî bide, wî wextî rastî felaketeke ne layîqî wî ye tê.

f) Ji ber ku xuda, xirûrê ji derveyî xwe ji kesekî din re nahêle. Û yek jî ev, lezkirin hemî karî dikşîne nav şaşîyan, bi gelemperî zerarên mezin ji vê derdikevin; lihêvîmayîn pîşeke bi qîmet e, qezenca wê zû neyê dîtin jî, di nav wextê de derdikeve orteyê.

g) Ey hikumdarê min, belê nesîheta ku ez ê li te bikim ev e. Û tu, kurê Gobryas, ji bo Yûnanîyan dev ji gotina van awa henekan berde, ew ne layîqî bi vî awayî biçûkxistinê ne. Qesta te ji îftîrakirina Yûnanîyan, ji bo tu hikumdar derxîne sefera hemberî wan; ji evqas hewildana te netîceya ez derdixim ev e. Ez hêvîdar im daxwaza te nebe! Ji ber ku îftîrakirin tiştekî xerab e! Ji ber ku di rewşeke wiha de qurban yek, tawanbar dudu ne; yê îftîra dike, ji bo ku li pişt te diaxive tawanbar e; yê guhê xwe didê jî, ji bo bê lêkolîn gelo rast e yan şaş e guhê xwe didê tawanbar e; yê îftîra lê hatîye kirin jî, ji ber ku yekî ew xerab nîşan da, yê din jî wî wisan hesêb dike, dikeve halê qurbanê.

h) Di dawîyê de, heke tu bêjî çi dibe bila bibe li hemberî van kesan em ê derkevin seferê, baş e! Lê qet nebe bila hikumdar bi xwe ji ocaxa miletê Persê veneqete; em herdu wekî rehîn zarokên xwe jê re bihêlin, tu fermandarîya artêşê bigre destê xwe; yên tu dixwazî hilbijêre û bibe, bi qasî tu dikarî bi artêşeke mezin ve here û heke wekî tu dibêjî tu nav û dengê hikumdar bilind bikî, bila min û zarokên min jî bikujin; heke netîce wekî ez dibêjim derkeve, zarokên te û heke tu bikaribî vegerî, bila te jî bikujin. Heke yên ez dibêjim tu qebûl nekî û cardin tu bêje çi dibe bila bibe û tu bixwaze tu bi xwe artêşê ber bi Yûnanistanê ve bibî, yên li vir bimînin, rojekê wê bibihîzin ku piştî ewqas xerabî bi Persan kir, Mardonîos li cihekî li ba Atînayîyan, ji alîyê kûçikan ve hatîye perçekirin û ji gur û teyran re bûye êm, heta belkî hê berî wê, hê di rê de ye wê di distê Lakedaîmonîyan de rastî eynî aqûbetê bê û tê hîn bibî ew kesên tu hikumdar li hemberî wan bi rê dike, kesên çawa in."

[**11**] Gotinên Artabanos ev bûn. Xerxes hêrs bû û bi vî awayî bersiv dayê: "Artabanos, tu birayê bavê min î; loma tu ji van gotinên hiş û aqil nagre rizgar dibî. Lê madem tu rezîl û tirsonek î, ez ê te bi lekeke namûsê ceza bi-

kim, tê bi min re beşdarî sefera Yûnanistanê nebî, tê li vir bi jinan re bimînî. Ji bo ku tu gotinên min bi cih bikî ez pêwistî bi erêkirina te nabînim. Heke ez heddê Atînayîyan nîşanê wan nekim, bila ji min re jî kurê Daryûsê kurê Hîstaspesê kurê Arsamesê kurê Arîaramnesê kurê Teîspesê kurê Kîrosê kurê Teîspesê kurê Akhaîmenes neyê gotin. Jixwe tu dizanî ku, em di cihê xwe de bimînin jî ew rehet nasekinin; berî niha jî bela xwe li me xistin, ketin Asyayê, Sardes şewitandin, bi hêvîya ku baştir şer bikin wê careke din bên. Naxêr, imkana derketina du şampîyonan ji saheke girtî nemaye; yan tê lêxî yan ew ê li te bixî, qanûna şer ev e -yan wê tev ev erdê han bikeve destê Yûnanîyan yan jî wê temamê erdê li wir bibe ya Persan; ji ber ku hêrs navbeîa herduyan nas nake. Pêşî wan êrîşî me kirin, em ê heyfa xwe hilînin-hem jî bi vê munasebetê ez ê hîn bibim, lêbinêrim bê bi meşa li hemberî van kesan, zerarê giring yê ku bigihin min çi ne; koleyê bav û kalên me Pelopsê Frîgyayî ev kes heta dawîyê kiribûn kole, heta îro jî welatê wan, navê kesê ew mexlûb kirin li ser e, bi xwe jî eynî navî bi kar tînin."

[12] Raberizîn êdî dirêj nekêşa; bi şev zaneyê nesîhetkar hat, hişê Xerxes li ser gotinên Artabanos mabû. Tevaya şevê fikirî û melheze kir, di dawîyê de gihişt bawerîya ku pêwist nake li hemberî Yûnanistanê seferek bê kirin. Biryar da ku neçe û ket xweke giran. Belê, wî xewnek dît -Persî vê qise dikin- Li balê mirovekî bejindirêj û xweşik disekinî, wî mirovî wiha got: "Tê dîtin te fikra xwe guhertîye, te hem emir kir yekîne berhev bibin, hem jî tu niha dev ji şandina artêşê li ser Yûnanê berdidî, ne wisan e? Lê mafê te tune tu fikra xwe biguherî, kesek jî heq nade te; naxêr, biryara te bi roj da, ew biryara ku tê rîayet bikî ew e." Piştî ev gotin, Xerxes hizir kir ku ew firîya.

[13] Lê dema ku roj hilat êdî guhê xwe neda xewnê; Persên doh berhev kiribûn dan anîn, wiha got: "Gelî Persan, biryara min gelek zû guherî, min bibexşînin; hêj min baş hişê xwe neanîbû serê xwe, ji bilî vê ew mijara doh em li ser axavîn yên dixwestin min bikêşin rexê xwe qet nedixwestin ji pey min veqetin. Dema ku min gotinên Artabanos seh kirin, xwîna xortanîyê pekyabû serê min, min ji kesekî di wî temenî de gotinên bêpîvan û şikestinê gotin. Lê ez niha bi nêrînên wî re me û ez ê guhê xwe bidim wî. Niha bizanin ku, min dev ji sefera li ser Yûnanistanê berdaye, hûn jî herin li rehetîya xwe binêrin." Persên ev gotinan seh kirin di nav şahîyê de man.

[14] Cardin bû şev, Xerxes di xewna xwe de eynî xewn dît, cardin ew mirov hat, jê re got: "Kurê Daryûs, yanî tu bi biryara devjêberdana plana şer derdikevî pêşberî Persan û tu guh nadî gotinên min, her wekî yê ev gotin kirin kesekî vala be! Lê vê baş zanibe, heke bênavbir tu amadekarîya vî şerî nekî, ya wê bê serê te ev e: Çawa di demeke kurt de tu mezin û bilind bûyî, cardin tê eynî bi wî awayî nizim bibî."

[15] Xerxes tirsîya, ji nivînê xwe hilpekîya û di cih de yek şand bangî Artabanos da kirin, dema ku hat Xerxes got: "Artabanos, wî wextî hişê min li serê min nebû, min bersivên ehmeqî ji nesîhetên te yên rizgarîyê re dan; piştre hişê min hat serê min, min fêhm kir ku pêwist e yên tu dibêjî bên kirin. Lê mixabin ev nesîheta te ya ez dixwazim guh lê bikim, ez ê nikaribim pêk bînim. Piştî min fikra xwe guherî û ez bi fikra te re bûm, kesek hat xewna min, li pêşber min sekinî bû û dilîst, lê ne ji bo pîrozkirina biryara min a nû. Bi tiştên sawdar çavê min ditirsîne. Heke yê ev şand xudayek be, tê manaya ku dixwaze em artêşên xwe li hemberî Yûnanistanê derxînin seferê, wî wextî yê ev ferman anîye wekî min wê baskên xwe li te jî bide. Û min melheze kir em vê biceribînin, tu dixwazî yên li ser min li xwe bike, li ser textê min rûne, piştre rakeve, di nivînê min de rakeve."

[16] Xerxes, ji Artabanos re ev gotin. Artabanos pêşî tirsîya, ji ber ku xwe ewqas layîqî rûniştina ser text nedidît; piştre negot nabe, li ber emrê Xerxes serî tewand, lê pêşî ev gotin:

a) "Ey hikumdar, li gor min ferq di navbera rast fikirîn û guhlêbûna gotinên rast tune. Li ba te ev herdu jî hene; yên dora te tu ji rê birin. Ya herî bi kêrî insanan tê derya ye; lê li gor bawerîya xelkê, ba radibe êrîşî deryayê dike, ji ber ku nikare xwe li ber qencîya wê ya di xulyaqetê de heye ragire. Em bên ser min, dema ku min ew gotinên hişk ji te seh kirin, heke ez gelek xemgîn bûm sebebê wê ev bû ku, ji du fikrên li ber Persan tên raxistin, yek jê xirûrê han dide, ya din dixwest bide nîşan ku xwedîkirina dilê insanan bi daxwazên zêde û têrnebûnê tiştekî xerab e û vê xirûrê sakin bike. Belê min digot ji van herdu fikrên zidê hev, te ji bo Persan û ji bo xwe ya tehlîke ye hildibijart.

b) Lê te niha tam ya baş hilbijartîye, te dev ji fikra xweçekdarkirina li hemberî Yûnanistanê berdaye, tu ji min re dibêje, te xewnek dîtîye û ev dikare

bersiva xudayekî be û ji te re terkkirina amadekarîya şer qedexe kirîye. Lê lawê min, di vê de dîtina tilîya xuda tune; ji ber ku ez ê ji te re ew xewnên insan dibînin, çi tişt in îzah bikim, ji ber ku ez qederek ji te mezintir im; dîmenên tên xewna me, bi gelemperî, peywendîya wan bi mijarên ku bi roj mejîyê mirov westandine ve hene; di hişê me de di van du rojên dawîyê de ji bilî vê seferê pê ve tiştek tune.

c) Na, heke ev xewn ne wekî ku ez fêhm dikim be, peywendîya wê bi tiştekî îlahî ve heye, baş e, jixwe te bi xwe got, ka çawa bi te xuya bûye bila bi min jî xuya bibe, bila gotinên xwe yên şer ji min re jî bêje. Lê ji bo vê ne pêwist e ez yên li ser te ne li xwe bikim, heke wê bê dîtin bi yên min ve jî tê dîtin, wekî vê ha ez di nivînên xwe de raketime ha ya te de, ew jî ferq nake -Tenê bila niyeta wî ya xwe bi min bide nîşandan hebe, ji ber ku ev dîmena di xewnê de bi te xuya dibe, kî dibe bila bibe, wextê min bibîne sirf li ser min kincên te hene, ji bo min tu ferq nake. Belkî jî min ji vê re layîq nebîne, qet li min xuya nebe, wî wextî li ser min ha kincên te hebin, ha jî yên min bi xwe, ew wê cardin bi te xuya bibe. Heke cardin tenê li te xuya bibe, wî wextî ez ê jî vê îşareteke îlahî hesêb bikim. -Her bi be, madem te wiha biryar da û madem min nekarîbû ez te ji fikra te poşman bikim, bila ya te be, ez ê di nivînê te de rakevim. Ez li ser hesaba xwe rola xwe bi zanetî dilîzim; de ka bila çawa bi te xuya dibe bila bi min jî xuya bike. Heta wî wextî ez çawa difikirim ez ê cardin wisan bifikirim."

[17] Piştî vê axaftina kurt Artabanos, fikirî ku wê wan fikrên vala yên di serê Xerxes de belav bike, çi emir kir ew kirin. Yên li ser Xerxes li xwe kirin, li ser text rûnişt, piştre ket û raket, di xewna xwe de eynî dîmena li Xerxes xuya bû dît; li ber serê Artabanos sekinîye, wiha diêje: "Tu bûyî ne wisan, ye ku kir Xerxes ji sefera Yûnanê poşman bibe? Tu gelekî ji vê ditirsî, ne wisan; ji bo ku tu derketî pêşberî qederê tê zû yan dereng cezayê xwe bibînî. Em bên ser Xerxes. Heke guhê xwe nede min, ew cezayê wê bikşîne, min jê re gotîye jixwe."

[18] Ew gotinên ku Artabanos hesêb dikir ji devê dêmenê derketine ev bûn; piştre wekî ku çavên wî bi hesinê sincirandî tê daxkirin lê hat. Qîr kir û ji nivînan hilpekîya, li rexê Xerxes rûnişt, bêyî ku yek hûrgilîyê derbas bike, yên di xewna xwe de dîtin yek bi yek gotin û jê re wiha got:

“Bêguman ey hikumdar, ez wekî kesekî min gelek teşebisên mezin û bi hêz, yê ji alîyê dijminên di hêla hejmar de hê hindiktir ve hatine puçkirin dîtîye, min xwestibû ez hinekî agirê xortînîya te aram bikim; ez xerabîya daxwazên nayên aramkirin dizanim; tê bîra min ku Kîros li hemberî Massagetan şer da destpêkirin û netîceya vî şerî tê bîra min; sefera Kambîses ya Ethîopîayê jî tê bîra min, ji bilî vê ez bi xwe jî beşdarî sefera Daryûs ya Îskîtê bûm. Min ev li ber çav girtin, ez fikirîbûm heke tu di nav aramî û aştîyê de bijî, wê herkes hesûdî jê bike. Lê wisan dixuyê ku, ji jor bangek heye, xuda bi hêrs e û dixwaze belayek bê serê Yûnanîyan, ji ber wê ez fikra xwe diguherim. Tu jî emrê îlah bigehîne Persan û ji wan re ji bo amadekarîyê emrê pêşî ku te dabû wan, riayetê wê bikin bêje; wisan hereket bike ku bila xuda memnûn bimînin û xerabîyek neyê serê te.” Piştî ev axaftin temam bû, bi hêza ji dêmenê wergirtin man li hêvîya sibehê; Xerxes yên qewimîn ji Persan re got û Artabanosê berê ku tenê bi serê xwe li hemberî seferê derketibû, niha pê re hereket dikir.

[19] Xerxes dest bi amadekarîya seferê kiribû, di xewa xwe de xewneke sisiyan a din dît; Magî şîrove kirin ku wê ev şer belavê temamê dinyê bibe û temamê dinyê wê bibin koleyên wî. Xewn wiha bû: Li serê Xerxes ji şaxên nû yên zeytûnê tacek hebû, çîçekên ji şaxan derdiketin temamê dinyê digirtin; piştre taca serî çiqas diçû wenda dibû. Piştî Magî ev şîrove kirin, her yek ji Persên ku li ba Xerxes di civînê de bûn, bi lez çûn satrapên xwe, soza diyarîyên hikumdar dida av bi devê wan dixist, ji bo van diyarîyan heq bikin bi dil û can dest bi amadekarîyê kirin.

AMADEKARÎ, ÇIYAYÊ ATHOSÊ, HIJMARTINA ARTÊŞÊ

[20] Çar salên piştî serî li Misrîyan tewandin, bi amadekirina artêşê, hazirîya beşên pêwist yên ji bo artêşê derbas kirin. Dema bi fermandarîya hêza sawdar ve derket seferê, sala pêncan tijî dibû. Ji nav ew seferên em dizanin, ev ya herî giring e; sefera Daryûs ya ser Îskîtîyan li ber vê ne tiştek e, bi eynî awayî, sefera Îskîtîyan a bera pey Kîmmeran dan û avêtin ser Medîayê û temamê Asya Jorî girtin û li wir bi cih bûn jî hakeza. -Daryûs, bi sefera Îskîtê dixwest toleya wê veke- heta li gor ji me re gotin, ne sefera kurên Atreûsîyan ya li hemberî Îlîonê kirin, ne jî Mysîayî û Teûkrîayî, ku berîya bûyerên

Troyayê pêşî Bosphoros derbas kirin û derketin Ewrûpayê û piştî temamê Thrakîyan kirin bin desthilata xwe û ber bi Deryaya Îonîayê ve daketin jêrê û sefera li başûr heta daketin Çemê Peneîosê, bi vê re nayê miqayesekirin.

[21] Temamê van belavbûnan û temamê seferên borî bînin ba hev, li ba vê seferê tek gotin jê re nikare bê gotin. Bi rastî, gelo miletekî Asyayê yê Xerxes nebiribû Ewrûpayê mabû? Ji bo bi eskerên xwe bide vexwarin, ji derveyî çemên mezin, ava kîjan çemî têrê dikir? Hinek miletên di bin desthilata wî de keştî techîz dikirin, hinekan artêşa bejahîyê hazir dikirin, hinek bi xwarina yekîneyên siwarî ve mijûl dibûn, hinekên din ji bilî şerkeran ji bo hespan wezîfeya techîzkirina keştîyên bar girtibûn ser xwe, hinekên din jî ji bo çêkirina keştîyên pirê yên taybet yên dirêj û hinek jî xwarin û keştî amade dikirin.

[22] Sefera yekê, piştî li Çiyayê Athosê difitilîn ji bo seranser bejahî bû, pêşî li vî çiyayî dest bi xebata hazirîyê hatibû kirin û ev sê sal bûn didomîya; li Elaîûsa Khersonesosê keştî li ser dezgehan diman, li vê kendava noqteya peywendîyan, ji her miletî gelek insan berhev bûbûn, keştîyan ew wekî ekîban dianîn, bi dorê û di bin qamçîyan de di karê kolanê di didan xebatandin; kesên li dora Çiyayê Athosê rûdiniştin jî beşdarî eynî xebatê dibûn. Li ser kar du Persî, Bubaresê kurê Megabazos û Artakhaîesê kurê Artaîos hebûn. Athos çiyayekî bi nav û deng yê mezin e, digihe deryayê, li ser insan dijîn. Li milê bi bejahîyê ve tê girêdan, kêm-zêde di firehîya 12 stadan de bejtengek heye, bi vî awayî dibe nîvgirav; li vir çiya nizim dibe, dibe deşt, girên ne zêde biçûk li ser hene. Ev deşt, di navbera qiraxên deryaya Akhantosa heyî û qiraxên Toronayê yên dikevin hemberî wê de ne. Li ser bejtenga ku Athos pêve girê dide, bajarê Yûnanistanê Sane heye; ji Saneyê wêdetir, li milê Athosê, bajarên din yê ku Persî dixebitîn wan ji bejahîyê veqetînin û bikin bajarên wekî giravan hene: Ew, bajarên Dîon, Olophyksos, Akrothoon, Thyssos û Kleoaî ne. Sîteyên di Çiyayê Athosê de ev in.

[23] Kolan bi vî awayî dihat kirin: Barbaran bejteng di navbera miletan de parve kiribûn; xeteke rast ber bi bajarê Saneyê ve hatibû kişandin; dema ku xendeq heta cihekî kûrahîyê yê kifşe dihat, qismek ji ekîban li xwarê ax dikolan, yên din jî ew axa berhev dibû ji îskeleyekê neqlî îskeleke din dikirin û derdixistin; yên li jorê jî ew ax dibirin û direşandin dûrî cihê dihat kolan.

Yên ji derveyî Fenîkeyîyan, mecbûr dibûn vî karî dîsa bikin: Herdu milên dihatin kolan bêsekin dirûxîyan, ew tiştekî mecbûrî bû, ji ber ku jor û jêrê xendeqê di eynî pîvanê de digirtin. Di karên wiha de di ser Fenîkeyîyan re tune, zekayê xwe dabûn nîşan. Dema ku pişk hat avêtin û cihê wê ew bikolin kifş bû, milê xendeqê yê jorê bi qasî du qatê firehîya jêrê girtibûn; dema ku kar pêşve diçû hêdî hêdî teng dikirin; dema digihiştin binî, ew qanala wan vekiribû, di eynî firehîya ya wan de bû. Li nêzîkî baregeh vedabûn deştek hebû, li wir cihekî wekî bazarê hatibû avakirin; ji Asyayê gelek ard dihat.

[24] Ez difikirim û ji xwe bi xwe re dibêjim ku Xerxes ev kar ji bo forsê dikir; ketibû hewesa nîşandana hêza xwe û hiştina abîdekê li pey xwe; ji ber ku bê kişandina vê ezîyetê, dikarîbû keştî di ser bejtengê re bên kişandin; lê wî emir kiribû di navbera herdu deryayan de bi qasî firehîya ku du trirem di rex hev de derbas bibin, qanalek bê vekirin. Ji bilî vê banê pira wê li ser çemê Strymonê bihata avêtin jî, yên ev kolan dikirin wê biavêtina.

[25] Ji derveyî van karan, ji bo çêkirina piran ji lîfên papîrûsê, keten û kinifê werîs dihatin amadekirin; ji bilî vê ji bo heywan û eskerên artêşê yên wê derbasî Yûnanistanê bikirina birçî nemînin, wezîfeya çêkirina depoyên alifên wan dabûn Fenîkeyî û Misrîyan. Cihê avakirina van depoyan, piştî lêkolîneke dirêj hatibûn hilbijartin û ji çar alîyên Asyayê, keştîyan dûbayên tijî xwarin dikişandin. Ji bo her miletî dikan hatibûn veqetandin, ew mecbûr bûn wan tijî bikin. Qismê xwarinê yê herî mezin li beşa Trakyayê cihekî navê wê Qesra Spî bû; yên din li bajarê Tyrodîzayê yê Perînthosîyan, qismeke din li Dorîskosê, beşeke din li Eîonaya li ser Strymonê, qismek din jî şandibûn depoyên Makedonîayê.

[26] Servîsên îstîhkamê û lewazimê bi van karan mijûl dibûn, Xerxes bi artêşa hatibû berhevkirin re dest bi meşa ser Sardesê kiribû. Artêş, ji Krîtallaya li Kappadokîayê derketibû rê; ji bo yekîneyên di bin fermandarîya Xerxes de yên wê bejahî derbas bikirina, vir ji bo cihê berhevbûnê hatibû hilbijartin. Gelo yên ji satrapan, yekîneyên herî baş hatine techîzkirin anîbin û ji hikumdar ew diyarîya soza wê hatibû dayîn wergirtibin kîjan in? Ez nikarim vê bêjim, heta ez nizanim ji bo vê kifş bike merasîmeke xwenîşandanê hatîye çêkirin yan na. Ji rûbarê Halysê derbas bûn û hatin Frîgyayê

û ji nav welat meşîyan gihiştin Kelaînayê, çavkanîyên Maîandros li vir in, rûbarê Kataraktesê yê bi qasî Maîandrosê li vir e, heta di agoraya Kelaînaîyê de dikele û tevlî Maîandrosê dibe. Meşka ji çermê Sîlenosa Marsyasê hatîye çêkirin jî li vî bajarî daliqandîne; li gor gotina Frîgyayîyan, Apollon sax sax ew gurandîye, bi dîwarê ve daliqandîye.

[27] Li vê sîteyê yekî Lîdyayî rûdinişt, navê wî Pythîosê kurê Atys bû; vî kesî artêş û hikumdar bi merdîyeke mezin pêşwazî kir; heta alîkarîya peran kir û xwest beşdarî mesrefa seferê bibe. Li hemberî vê merdîyê Xerxes, ji yên li ba xwe pirsî, ev Pythîosî kî ye û çend waridata wî heye ku dikarîbû pêşniyazeke wiha bike. Jê re gotin "Hikumdar, ew dara çinarê ya zêrînî û şaxê mêwa zêrînî ya tu dizanî, wî diyarî bavê te Daryûs kirîye; îro jî piştî te kesê herî dewlemend ew e."

[28] Devê Xerxes vekirî ma. Wî wextî ew bi xwe pê re axivî, jê pirsî çiqas serweta te heye. Lîdyayî got: "hikumdar, ez ê ji te veneşêrim, ez ê nebêjim ez nizanim çiqas e û xwe kerr bikim; ez gelek baş dizanim çiqas e, ez ê bi hûrgilî ji te re îzah bikim. Ji ber ku, dema min seh kir tu ber bi qiraxên Hellenê ve tê xwarê, ji bo ku min dixwest ez beşdarî mesrefa seferê bibim, min hebûn û tunebûna xwe hesab kir, li gor netîceya hesaban, du milyon zîv û ji bo çar milyon staterê Daryûs temam bibe, heft hezar zêr kêm in. Ez van dikim bin emrê te; hê di paş de koleyên min û milkên min hene, têr û tijî îdareya min pê dibe."

[29] Ew wiha axivî, Xerxes ku kêfa wî ji van gotinan re hat, bi vî awayî bersiv dayê: "Lîdyayîyê xwedîyê malê, ez ji Persê derketime heta niha, min kesekî ku min û artêşa min bi vî awayî pêşwazî bike û ji bo alîkarîya budçeya min a şer bike û xwe bi xwe xezîneya xwe raxe ber min, rastî kesekî nehatim; tenê te ev kir. Te eskerên min wekî şahzadeyan pêşwazî kir, te xwest tu bi perekî mezin alîkarîya min bikî. Di miqabilî vê de ez ê jî vê şerefê bidim te: Ji vir şûn ve tu mêvanê min yê resmî yî, em bên çar milyon stateran, heft hezar darîk jî ez ji bêrîka xwe didim te, bila hesab gilover be û bila qencîyeke me ya evqas biçûk ji te re çêbibe. Bila temamê yê di destê te de ji te re be û her tim kesekî bi vî awayî destvekirî bimîne; ne niha û ne jî di dahatîyê de tê bi helwestê xwe yê niha poşman nebî."

[30] Û gotina ku got kir, piştre ket rê. Ji rexê bajarê Anaûyayê Frîgyayê û goleke jê xwê derdixistin re derbas kir û hat Kolossaîyê bajarekî mezin yê Frîgyayê; rûbarê Lykosê yê ji qelşekê diherike û wenda dibe li vir e; kêm-zêde pênc stad pêşve cardin derdikeve ser rûyê erdê û tevlî Maîandrosê dibe. Artêşa ji Kolossaîyê derket, hat Kydrara sînorê ku Frîgyayê û Lîdyayê ji hev vediqetîne, li vir kevirekî li erdê daçikandî hebû, ji alîyê Kroîsos ve hatibû daçikandin û kîtabeya li ser sînor nîşan dike.

[31] Ji Frîgyayê derbasî Lîdyayê bûn. Rê bû du şeq, milê çepê diçû Karyayê, milê rastê diçû Sardesê; heke di vê rêyê de biçûna, pêwist bû di Maîandrosê re derbas bibûna û ji wir digihiştin bajarê Kallatebosê yê ku hosteyên bi huner ji genimên xas û ji çiçekên darê kifêrî [tamarîks] hingiv derdixistin. Xerxes di vê rêyê de meşîya; di vê rêyê de dareke çinarê dît, ewqas sipehî bû ku taceke zêrînî bi şaxê wê ve daliqand û ji bo biparêze yek ji wan Nemiran danî ber.[258] Roja din ket payîtexta Lîdyayê.

[32] Dema ku gihişt Sardesê qasid şandin Yûnanistanê av û ax xwest, ji sîteyan re xeber şand ku ji bo pêşwazîya Hikumdarê Mezin bikin şahî li dar bên xistin. Ji bo ji Atînayê û Lakedaîmonîyê ax bixwaze kesek neşandibû,[259] ji derveyî van ji her cihî re şand. Ji nû ve sebebê xwestina av û axê ev bû: Hizir dikir ku yên berê serî li ber Daryûs netewandibûn wê bitirsin çog bidin erdê, ji bo gelo ev nêrîn wê rast derkeve qasid dişandin.

[33] Piştre ji bo biçe Abydosê dest bi amadekarîyê kir, di vê navê re ji bo pira wê Asya û Ewrûpayê bi hev ve girê bide, îskele dihatin girêdan. Di navbera bajarên Sestos û Madytosê de ya li Khersonesosa Hellespontosê, li hemberî Abydosa qiraxan yê ber bi deryayê ve dadikeve, zinarên asê ne. Piştre, lê ne gelekî, ew cihê Atînayîyên di bin fermandarîya Ksanthîpposê kurê Arîphron de Artayktesê Aryanî yê walîyê Sestosê bi saxî li sing xistin

258 Nemir: Yekîneya parastina hikumdarên Persê ya ji eskerên bijarte hatîye damezirandin. Ji bo hejmara wan her tim eynî hatîye parastin, jê re Nemir hatîye gotin (Pirtûka 7an, beşa 83an).

259 Ji bo sebebê neşandina kesan ya xwestina av û axê ji Atîna û Spartayê, binêre li pirtûka 7an, beşa 133an.

ev der e; vî mirovî gelek caran jin dibirin perestgeha Protesîlaosa Elaîûsê û guneh dikirin.[260]

[34] Ji Abydosê dest pê dike, heta noqteya vê qiraxê, karkerên wezîfeya çêkirina piran girtibûn ser xwe, du pir çêdikirin; ji bo yekê Fenîkeyîyan benê keten û kinifê, ji bo ya din Misrîyan benê papîrûsê bikar dianîn. Ji Abydosê heta qiraxê din heft stad e. Dema ku ew bagera mezin derket, herdu qirax nû gihiştibûn hev ku, temamê werîsan qetîyan, karê gihiştibû dawîyê mehf bû.

[35] Dema ku Xerxes ev seh kir gelekî hêrs bû; emir kir 300 dar li Hellespontosê bixin û cotek werîs pêve bikin. Heta min ev jî seh kir: Celad şandine û gotîye "Hellespontos bi hesinên sorbûyî dax bidin." Dema li deryayê bixistina bê hed û hidûd wê xeber jî jê re bidana: "Derya derya, ev cezayê han efendîyê me daye te, ji ber ku te qet xerabîyek ji wî nedîtîye lê te xerabî pê kir. Tu bixwazî û nexwazî wê Hikumdarê Mezin te derbaske. Kesek ji te re qurban serjê neke heq e, ji ber ku tu ji çemekî ava wê pîs pêve ne tiştek î." Cezayên dan deryayê ev bûn; em bên ser kesên ku pir ava dikirin, ew jî serê wan jêkir.

[36] Kesên karên mezin kirin, bûne qurbana karê xwe yê nankor, mihendizên nû ketin ser kar. Lêbinêrin pir çawa avêtin: 50 keştîyên bi bêr û ji tîrîreman 360 heb kirin rexê hev, bi hev ve girêdan û ji bo neqliyatê pirê danîn, ev ji bo ya li milê Eûxeînosê bû, ji bo neqlîyata milê din jî 314 keştî bikar anîn; zawîya eksenên keştîyan bi Pontos re çêdikirin, bi herikîna Hellesontosê re paralel diket û bi vî awayî herikîn, barê li werîsan hatine kirin zêde nedikirin; keştîyên bi hev ve girêdayî, ji bilî vê hesinên gelek mezin avêtin û qahîmtir kirin, ji bo pirekê ji wan li alîyê Pontosê, li hember bayê ji wî milî ve ber bi Hellespontosê bê; ji bo ya din jî li milê Deryaya Egeyê û qiraxên rojavayê, li hemberî Zephyrosê û Notosê,[261] ji bo keştîyên biçûk yên diçin

260 Ji bo Artayktes, binêre li pirtûka 9an, beşên 116-120an.

261 Ev beşeke bi pirsgirêk e ku pêwendîdar gelekî mijûl kirîye. Metna ku me daye, piştî xebateke dirêj, ya herî nêzîkî rastîyê ye ya me tesbît kirîye. Agahîyên Herodotos yên li ser zanyarîyên hûrûkur yên mijara ku pir bi hesinan çawa hatine qehîmkirin, hesin li hemberî kîjan bayî li ber kîjan îstîqametê hatine avêtin, ketine şiklekî ku zehmet e mirov karibe pê re derkeve serî.

Pontosê, li sê cihan navbir hiştin. Piştî ev temam bûn, ji bejahîyê dest pê kirin û werîs kişandin, ji bo vî karî çirikên(bocurgatên) darîn bikar dianîn; vê carê benên keten kinif û papîrûsê cihê cihê bikar nedianîn, ji bo herdu piran jî werîsên ji çar papîrûs û du keten kinifan hatî çêkirin vezilandan. Ev herdu cûre werîs, di hêla storî û sipehîtîyê de wekî hev bûn, lê benên ji keten kinifê saxlemtir bûn; her enîşkekê talantek dikêşa. Piştî bi vî awayî banê pirê hat avêtin, li gor berê pirê qalasên mezin hatin birîn; piştî ev jî li pey hev hatin rêzkirin ji jor ve girê dan; piştre bi awayekî xweşik texte li ser hatin raxistin; tebeqeyek ax kêşan ser, rast kirin, herî dawîyê ji bo heywanên bar û hesp ji deryayê nesilikin, li herdu milên wê çît hatin danîn.

[37] Pir temam bibûn, karên li Çiyayê Athosê jî, dema ku xebera temambûna pêlşikênên mezin yên dema hem qanal û hem jî derya bilind bin, devên ketin û derketinê nexitimînin, artêşa ku zivistana xwe li Sardesê derbas kiribû, di biharê de hemî kêmasîyên xwe temam kiribû, ber bi Abydosê ket rê. Dema ku roj li cihê xwe yê her timî li asîman bû hat girtin, artêş derketibû rê, roj nedihat dîtin, hewa ya dinyê ya herî sipehî bû, qet ewr tunebûn û di nîvê rojê de bûbû şev. Li hemberî vê bûyera nedîtî Xerxes bi xem bû û ji Magan şîroveya vê bûyerê pirsî. Wan bi vî awayî îzah kirin: Xuda, xebera wê bajarên we tarî bibin dida, gotin: "Ji ber ku çawa heyv xebera dahatîyê dide me, ji Yûnanîyan re roj xeber dişeyne." Ev şîrove gelekî kêfa Xerxes anî û ji nû ve ket rê.

[38] Dema artêş ji nû ve ket rê, Pythîosê Lîdyayî ku ji vê bûyera îlahî gelek tirsîyabû, bi bawerîya merdîya li hemberî hikumdar kir, hat ba Xerxes û jê re wiha got: "Ezbenî, izna min bide ez ji te daxwazekê bikim, ji bo te pêkanîna wê gelek biçûk, lê di çavê min de daxwazeke gelek mezin." Xerxes ku li hêvîyê bû daxwazeke gelek cûda jê bike, got; daxwaza te çiye, wê ew pêk bê. Lîdyayî ku ji van gotinên xweş cesaret girt, got: "Ezbenî, pênc zarokên min hene, hemî jî bi te re derketine sefera Yûnanistanê. Ey hikumdar, tu dibînî ez kal bûme, bila dilê te bi min bişewite; yek ji kurên min, yê mezin azad bike, bila min û serweta min biparêze; her çarên din bigre û bibe, ez hêvî dikim hemî daxwazên te bi cih bibin, bi wî awayî paşve vegerîne!"

[39] Xerxes ku dilê wî ji dilneçûnê/dixelînê tijî bû, bi van gotinan bersiv da: "Nehêja! Ez bi xwe ku diçim sefera Yûnanistanê, ez kurên xwe, birayên xwe,

kesên nêzîkî xwe û dostên xwe dibim; tu ku koleyê min î! Çawa dibe tu ji bo kurekî xwe wiha difikirî. Tu ku pêwist bû bi hemî malbata xwe ve, heta tê jina xwe jî bigirta û di pey min de bihata! Niha vê zanibe, ji bo insên guh derîyê dil e; heke dil gotinên bi rûmet seh bike, ji serî heta binî bi kêf dibe; lê heke eksê wan seh bike bi kerb hil dibe. Te mêvanperwerî nîşanî min da, pêşkêşên helwêsta te derew dernexin te kir, lê di merdîyê de tu nikarî Hikumdarê Mezin derbas bikî, tê bi vê nikare pesnê xwe bidî. Te ku îro xwe li ber bayê melhezeyên ne layîq ve berda, ew cezayê tu layîq î tê nebînî. Ew mêvanperwerîya ku te nîşanî min da, te û çar kurên te rizgar dike; lê yê pêncan, yê tu gelek jê hez dikî, ez ê te bi wî ceza bikim." Piştî vê bersivê, emir da yên van cûre karan dikin, dê kurê Pythîos yê mezin bibînin, bikin du perçe, nîvê laşê wî deynin milekî rêya artêş derbas dibe û nîvê din jî deynin milê din.

[40] Emir hat bicihkirin û artêş di navbera van herdu perçeyên insên re derbas bû. Herî pêşî şaxên veguhastinê û heywanên bar diçûn; piştre şerkerên ji her nijadê yên bêferqîyet hatibûn berhevkirin. Nîvê yekîneyan ji van pêk dihat. Piştre navbirek. Navbireke rêzê dikirin navbera wan û Hikumdarê Mezin. Di serî de yekîneya taybetî ya hikumdar ya ji nav Persîyan hatibû hilbijartin û ji hezar siwarîyan hatibû damezirandin; piştre hezar kesên bi rim, ev jî ji nav temamên yekîneyan bi bijarte hatibûn veqetandin, serê rimên wan li erdê dinêrî; piştre deh hespên pîroz yên gelek balkêş yên hevsarkirî, ji van re Nesaîon tê gotin. Ev navê Nesaîon, ji deşteke fireh a Medîayan a cihê ev heywanên sipehî ya li Deşta Nesaîon tên mezinkirin tê. Piştî van deh hespan, erebeya Zeûs a pîroz a heyşt hespên boz girêdayî tê; li pişt hespan ajovanekî peya, di destan de hevsar; ji ber ku tu fanî nikare li ser vê textî rûne. Li pişt vê erebeyê Xerxes bi xwe, hespên wî ji cinsê Nesaîonan. Ajovan, li rexê erebeyê dimeşe, Persek, Patîramphesê kurê Otanes.

[41] Xerxes, ji Sardesê şûnve wiha rêwîtî dikir, di navê re dema ku dixwest erebeyên xwe dihişt, siwarî erebeke sergirtî dibû. Li pey wî, hezar rimdar ên ji nav yên herî esîl û herî mêrxas hatine hilbijartin, wan rimên xwe wekî her wextî digirtin. Li pey van, ji nav tevan hatîye hilbijartin, yekîneyek ji hezar siwarîyên din dihatin û piştî van yekîneyek bijarte ya ji 10 hezar kesan pêk hatî ya ji siwarîyan ji nav yekîneyên Persê hatibûn hilbijjartin; ev peyade: ji nav van, yên hezar kesan serê destîyê rimên wan, ne hesinên tûj, hinarek

zêrînî; van dora wan neh hezar kesan girtibûn, ev neh hezar kes di navenda wan de dimeşîyan, di serê destîyê rimên wan de narên zîvî hebûn. Yên serê rimên xwe ber bi jêr ve digirtin jî, cardin hinarên zêrî bûn û yên tam di pey Xerxes de dimeşîyan, sêva zêrînî bûn. Piştî van 10 hezar kesan, hezar siwarîyên Persî dihatin. Piştî van siwarîyan navbireke du stad û qismê mayî yê artêşê, yekîneyên tevlihev.

[42] Artêş, ji Lîdyayê ber bi Rûbarê Kaîkosê û Mysîayê ve diçû; piştî Kaîkos derbas kir Çiyayê Kaneyê girt milê xwe yê çepê, di nav Atarneosê re ber bi bajarê Kareneyê ve meşîya. Piştî vî bajarî ji bajarê Atramytteîonê û Antandrosa sîteya Pelasgê derbas kir daket Deşta Thebeyê. Çiyayê Îdayê hişt li milê xwe yê çepê, axa Îlîonê derbas kir. Û li wir, dema ku baregeha xwe li ber pêşkên Îdayê vedabûn, bagur rabû, brûskên bi zîqzaq dizîvirîn ketin û hejmareke zêde bûn qurban.

[43] Artêş gihiştibû Rûbarê Skamandrosê; ji dema ji Sandresê derketibûn heta niha cara yekem bû ku tengasîya avê hat kişandin, qasî têra esker û heywanan bike av peyda nebû. Dema gihiştin vî çemî Xerxes, derket ser girê Pergamonê Prîamosê, dixwest li derûdorê binêre. Lê nêrî, guhê xwe da bûyerên bi nav û deng yên li wir qewimîne û ji bo Atheneya Îlîonê hezar çêlekên nezayî kirin qurban, di vê navê re Magan av dirijandin axa van mêrxasan. Piştî ev merasim temam bû, saweke şevê baregeh ser û bin kir. Dema roj derket, bajarên Rhoîteîon, Ophryneîon û Dardanos (yê dawîyê li ser sînorê erdê Abydosê ye) girtin milê çepê û Gergîthîyên ji nesla Troyayan girtin milê xwe yê rastê û derketin rê.

[44] Gihiştin Abydosê, li vir Xerxes xwest temamê artêşê di ber çav re derbas bike. Berî niha li vir li cihekî bilind, ji bo hikumdar bi vê mebestê tribûneke ji mermerên spî hatibû avakirin. Derbasî wir bû û hêza deryayî û artêşa bejahîyê ya li wir berhev bûbûn temaşe kir, piştre xwest xwenîşandaneke şerê deryayî bê çêkirin. Teqlîdeke şerê deryayî hat çêkirin û Fenîkeyîyên Sîdonî qezenc kirin. Hikumadar gelek ji manewrayan hez kiribû.

[45] Temamê Hellespontosê tijî keştî bûn, temamê qiraxên Abydosê û erdê wê ji insanan reş bûbû, wî ev dîtin û xwe pîroz kir; piştre dest bi girî kir.

[46] Artabanosê mamê wî, hay lê bû; mirovê di serî de ji bo Xerxes ji fikra meşa li ser Yûnanê poşman bike nêrînên xwe bi awayekî zelal raxistibû orteyê, lênerî ku Xerxes rûndikan dibarîne, bi xef pirs kir ji bo çi, got: "Ey hikumdar, qasek berî niha tu bikêf bû, tu niha digrî, ev herdu reftarên te çiqas ji hev cihê ne." Xerxes bersiv da û got, ji bo vê ye: "Kurtîya jiyana insên hat hişê min, dilê min êşîya, ev insanên niha li ber çavê me, ji nav vê boşahîyê, di nava sed salan de yek kes jî namîne!" Artabanos got: "Di seranserê jiyanê de, em gelek bûyerên din yê ku heq dike zêdetir dilê me bişewitînê dibînin; ji ber ku di vî temenê kurt de ji van yan jî ji hinekên din kesek tune ku car caran, yan gelek caran, difikire ku mirin ji jiyanê xweştir e, ji ber ku tu bextewerî ne domdar e. Felaketên tên serî, nexweşîyên tahma dev xera dikin, vî temenê kurt ji wî re gelek dirêj nîşan dide. Belê ji bo kesekî ku ezîyetê dikşîne mirin, ji insan re wek cihê xelasîyê tê dîtin; lê xuda dike em tiştên şêrîn jî tahm bikin û ya me dixapîne jî tenikîya çavnebarbûna Wî ye."

[47] Piştre Xerxes axivî û got: "Artabanos, piştî insan bi vî awayî jiya, herî baş ew e em qet neaxivin; em cih nabînin xezîneyên xwe tê de deynin, em behsa bedbextîyê venekin. Tenê vê ji min re bêje: ew dîmena hat xewna me, ewqas vekirî û zelal nehatiba dîtin, cardin tê di fikra berê de israr bikira û bixebitîya min ji fikra sefera li ser Yûnanistanê poşman bikira, gelo tê îro bi awayekî din bifikirîya? Ez rica dikim bêtirs bersiv bide." Artabanos bersiv da û got: "Hikumdar, ez hêvî dikim ew dîmena hat xewna me, me bigehîne netîceya me dixwest! Em bên ser min, ez îro jî li gel ew hemî zehmetîyên mejîyê min tijî dikin, ez du dijminên ji van tevan bi tesîrtir li hemberî te rawestiyane dibînim û tirseke mezin dikeve hindurê min."

[48] Li ser van gotinan Xerxes wiha got: "Ey mirovê nêtxerab, ew herdu dijminê ji bo min xerab çi ne? Hejmara eskerên min yên peyade ye kêm tê ber çavê te yan tu difikirî hejmara ya Yûnanîyan wê ji ya me zêdetir be? Yan hêza me ya deryayî ji ya wan jartir e? Yan herdu jî ne? Heke tu amadekarîya di vî warî de tam nabînî, bêsekin em dikarin artêşeke yedek jî çêkin."

[**49**] Bersiva Artabanos ev gotin şopandin: "Naxêr hikumdar, kesê hinek hişê wî hebe nikare ji vê artêşê re bêje jar, ji bo hêza deryayî jî wisan. Heke hejmar zêde bibe, ew dijminê ez behs dikim wê hê xedartir be. Ji ber ku ev herdu dijmin, bejahî û derya ne. Heke bager bişide, li ser rûyê dinyê yek kendav tune ye ku vê hêza deryayî, hêza te ya deryayî bikaribe bigre nav xwe û keştîyên te bihewîne. Ji van kendavan, qet nebe yek hebûya; li seranserê bejahîyê kendaveke ku tu deryavanên xwe bikaribî bişîne wir tune. Dema kendaveke misaîd tunebe, talih li insên hikum dike, ne ku insan li talihê. Min ji du dijminên te yek nîşan kir; ez ê niha ji te re ya duyem bêjim. Binêre ji bo çi erd jî di sefa dijminê te de ye? Heke astengek dernekeve pêşîya te, tê biçî dûr, ji ber ku insan ji serkeftinê têr nabe; lê tu çiqas bimeşî wê dijmintîya wê jî zêde bibe. Ji bo ez difikirim kesek nikare li hemberî te raweste, ez vê dibêjim. Tu çiqas pêşve biçî, demek şûnde wê di nav artêşa te de birçîtî dest pê bike. Zanetîya rastîn fikirandina bi endîşe ye, hesêbkirina her bêtalihîyê ye, lê dema mirov carekê ket nav tevgerê, pêwist e mirov wêrek be."

[**50**] Xerxes bi vî awayî bersiv da: "Artabanos, tu yek bi yek yên temamê bextreşîyên dikarin bên serê mirov, wek nêzîkî rastîyê ye vedikole. Lê ewqas netirse, hewil nede ku tu her tiştî hesab bike. Insan her tiştî bi vî awayî dirêj lêbikole, her tiştî di eynî planê de bigre nikare destê xwe bide tiştekî; bi xwe bawer bûn û mirov ya xerab jî bigre ber çav, ji ya di serî de tirsonek hereket bike û bêje bila tiştek neyê serê min ez dev ji serkeftinê jî berdidim baştir e. Jixwe tu temamê fikran rexne bike û di dawîyê de ya rast tu bi xwe nebêjî, tu jî wekî yên li hemberî te difikirin tê bikevî şaşîyê. Herdu jî eynî tişt in. Kî ye ya rastîyê dizane? Ez yeqîn nakim kesekî wiha hebe. Halbukî ya bikeve tevgerê dikare bigihe serkeftinê; yên her tiştî hesab dikin û ji bo yên timî dudilî ne serkeftin tune. Tu dibînî, hêza Persîyan heta ku dirêj dibe; heke hikumdarên berê jî guhê xwe bidana kesên wekî te, tu wextê Persî nedigihiştin vê rewşa han; ji bo tehlîke dane ber çav, bi vî awayî bilind bûne. Karên mezin bêyî mirov xwe neavêje tehlîkeyên mezin pêk nayên. Belê, ji bo em jî bikaribin derkevin qata wan em hewl didin û dikelin, loma di demsala herî xweşik de em derketin rê û bêyî em rastî birçîtî û baleyeke din bên, em ê temamê Ewrûpayê têkin bin hukmê xwe û piştre vegerin welatê xwe. Em gelek xwarin bi xwe re hildigrin, ji bilî vê, çandinîya ew erd û miletên em bigrin jî heye; em artêşa xwe nabin erdê koçeran, em dibin erdê cotkaran."

[51] Artabaos got: "Ey hikumdar, madem tu ji tu tiştî natirsî, qet nebe guhê xwe bide vê şîreta min: Li ser karên evqas tevlihev dirêjkirina gotinê ne rast e. Kîrosê kurê Kambîses, temamê Îonîayê, ji derveyî Atînayê, mecbûr kir ku xeracê bidin Persan. Tu çi dikî bike, van Îonîayan, dernexe hemberî bav û kalên wan; ew nebin jî em dikarin dijmin bişkînin. Heke bi me re bên, yan ji bo welatê wan wê bê kolekirin wê bibin insanên herî neheq, yan jî wê ji bo rizgarîya wan bixebitin û bibin insanên herî bi heq. Guhê xwe bide vê gotina kevin jî: Mirov dizane wê çawa dest pê bike, lê nizane wê çawa temam bibe."

[52] Xerxes ev bersiv da: "Artabanos, di nav fikrên te de ya herî şaş ev e: Tu ditirsî Îonîayî derbasî nav sefê dijmin bibin; helbukî me delîlê girêdana wan bi me re dîtin; di sefera Îskîtê de tu jî li ba Daryûs bû, tu bi xwe jî dizanî; mehfbûna artêşa Persan yan rizgarîya wan di destê wan de mabû: Wan rast û vekirî hereket kirin, qelleşî nekirin. Em vê deynin alîyekî; temamê zarokên wan, jinên wan û mal û milkên wan li bajarên wan man, nayê melhezekirin ku ew tehlîkeyeke wiha bidin ber çavê xwe. Ji ber wê bila ji vê jî tirsa te tunebe; bi min, xanedana min û otorîteya min bawer bike; ji ber ku di nava herkesî de ez kopalê hikûmdarîya xwe, tenê emanetî te dikim."

[53] Dema ku hevdîtin temam bû Xerxes, Artabanos şand Sûsayê, piştre bang kir giregirên Persî, dema ku ew hatin hizura wî wiha got: "Ey Persîyan, ji bo ez ji we rice bikim, hûn mêrxasîyê nîşan bidin û leke neynin ser borîya tijî serkeftin ya Persîyan, min bangî we kir; pêwist e her yek ji me yek bi yek û bi tevayî hewil bide, ji ber ku sekeftina çekên me, me tevan wekhev eleqedar dike. Ez ji bo vê yekê dixwazim ku hûn bi dil û can şer bikin, li gor ji min re hatîye gotin, em li hemberî miletên mêrxas dimeşin; heke em wan têk bibin, êdî hêzeke ku bikaribe derkeve hemberî artêşa me namîne. -Niha em ji bo xudayên qedera Împratorîya Persê daye destê wan dua bikin, piştre ji em deryayê derbas bikin!"

ARTÊŞA PERSAN DI ERDÊ EWRÛPAYÊ DE

[54] Wê rojê ji bo derbasbûnê amadekarî hatin kirin, roja din sibehê li ser piran cûre cûre bixur hatin vêxistin, bi şaxên mêrsînê hatin xemilandin û ji bo hilatina rojê bibînin man li hêvîyê. Dema stêrk hat dîtin, Xerxes di

kûpa zêrîn de nezir reşand deryayê, berê xwe da rojê û dua kir; daxwaz kir ku heta bigihije sînorên dawîyê yên Ewrûpayê, izin nede bûyereke pêşîya wî bibire. Piştî duaya xwe temam kir tasa zêrînî û ji derveyî wê krateroseke zêrînî û şûrê Persî yê jê re akînakes dibêjin avêt deryayê. Ji bo çi ev diavêtin nav pêlan? Gelo ji bo nezrî rojê bike, yan jî ji bo ku kiribû bi daran li Hellespontos bidin poşmam bûbû, ez baş nizanim.

[55] Merasim temam bû û dest bi derbasbûnê kirin. Ji pireke ber bi îstîqameta Eûxeîonsê peya û siwarî derbas dibûn; ya ber bi îstîqameta Egeyê ve jî heywanên bar û servîsên artêşê yên din derbas dibûn. Di pêşîyê de yekîneya Persî ya ji 10 hezar kesan pêk dihat dimeşîya, li serê tevan gulbend hebûn; wan yekîneyên tevlihev yên ji miletên din dabûn hev bi dû wan de bûn. Roja yekem ev derbas bûn; roja din pêşî siwarî û ew plutonên serê rimên xwe ber bi jêr ve ragirtibûn û tacdar bûn, derbas bûn; piştre hespên pîroz û erebeya pîroz ya ew dikişandin; tam di pey wê de Xerxes, piştî wî leşkerên rimdar, hezar siwarîyên din û herî dawîyê jî temamê beşa artêşê ya din. Di vê navê re keştî derbasî milê din bûbûn. Min qalûqurt jî seh kirîne ku yê herî dawîyê derbas bûye hikumdar e.

[56] Dema ku Xerxes derbasî Ewrûpayê bû sekinî, li artêşa xwe ya ji avtengê di bin qamçîyan de derbas dibû nêrî. Derbasbûn bêsekin heft roj û heft şev kêşa, yek dem sekin çênebû. Tê neqilkirin ku kesekî li van qiraxan rûdinê, qasek berî niha li Xerxesê Hellespontos derbas kirîye nêrîye û gotîye: "Ey Zeûs, madem te dixwest Yûnanistanê xerq bikî, ji bo çi tu ketî şiklê vî Persîyî û navê Zeûs bi Xerxes guhert? Ev nebûna jî ya te dixwest te karîbû pêk bînî!"

[57] Dema avteng derbas kiribûn û li rê bibûn rêz, rastî bûyera nedîtî hatin; Xerxes ev giring nedît, lê fêhm kiribû tê manaya çi: Mehînek kêroşkek anîbû dinyê. Min gotibû rehet e mirov tê derxe bê tê çi manayê: Xerxes, artêşeke muhteşem û dibiriqand dişand ser Yûnanistanê, lê qedera wî wê ew bikira nav derdê serê wî û wê zor lê bikira wekî dînan ji nav wî welatî baz bide. Hê li Sardesê bû cardin rûbirûyî bûyereke wiha nedîtî hatibû: Hêstira mê zabû, hêstira zayî hem organên wê yên mêyînî û hem jî yê mêranî hebû; organê mêranî li ser organê mêyînî bû.

[58] Xerxes guhê xwe nedabû van herdu bûyeran; bi yekîneyên bejahîyê re dest bi rêya xwe kir. Hêza deryayî ji Hellespontosê derdiket, pişta xwe dabû artêşa bejahîyê ber bi qiraxan ve diçû; berê xwe dabû rojavayê, wê Pozê Sarpedonê bigirta û li gor ew emrê wergirtibû, li wan deran cihekî wê lenger biavêta; artêşa bejahîyê ber bi îstîqameta sibeyî û rojhilatê ve ketibû rê, abîdeya Helleya keça Athamas da milê xwe yê rastê, bajarê Kardîayê da milê çepê û raste rast di nav bajarê jê re Agora tê gotin derbas bû û ber bi Khersonesosê ve bi pêş diket. Ji wir dora Kendava Melasê teqîb kir û Çemê Melasê yê navê xwe dabû vê kendavê û ji bo têra artêşeke wiha bike ava wê tunebû û hişk bûbû derbas kir û berê xwe da ber bi alîyê rojava. Bajarê Aîolê Aînos û Gola Stentorîsê derbas kir û gihişt Dorîskosê.

[59] Dorîskos, cihekî li Trakyayê ye, deşteke fireh e, ji navenda wê çemekî mezin yê navê wê Hebros derbas dibe; li vir keleheke Hikumdarê Mezin heye -keleha jê re Dorîskos tê gotin-, Daryûs garnîzonek li vir hiştibû û ji sefera Îskîtê heta niha li vir bû. Ew ji bo rêkûpêkî bide esker, yekîneyan ji hevdû veqetîne ji Xerxes re misaîd hatibû, di vê navê re wê hijmartin jî bihata kirin; ev hatin kirin. Hêza deryayî jî tam taxim gihiştibû Dorîskosê; qeptanên keştîyan, li ser fermana Xerxes, keştîyên xwe kişandin nêzîkî qiraxên Dorîskosê, bajarên Sale û Zonayê yên aîdî bajarê Samothrakeyîyan li vir e û ev qirax heta Pozê Serrheîonê dirêj dibin. Ev welat berê yê Kîkonîyan bû. Belê dema ku gihiştin van qiraxan keştî kişandin bejahîyê, di vê navê re Xerxes bi hijmartina artêşê ve mijûl bû.

HIJMARTINA ARTÊŞA XERXES

[60] Hijmara eskerên ji satrapan hatibûn berhevkirin çiqas bû, ez vê baş nizanim (ji ber ku ev zanyarî li tu cihî tune). Lê hijmara artêşa bejahîyê li ser hev digihişt 170 myrîad[262] kesan. Hijmartin bi vî awayî hatîye kirin: 10 hezar kes dikirin cihekî kifşe, baş dihatin îstîfkirin, li dora wê çemberek xêz

262 Myrîad, ji gotina Yûnanî Myrîab-ados e, manaya wê deh hezar e. 170 lib 10 hezar, tê wê manayê artêş 170 hezar bûye. Heta wî wextî artêş, girseke bi ser yekîneyan ve nehatibû parvekirin. Li vir tê fêhimkirin ku bi rêkûpêk kirine. (Hauvette, rûpela 355an û piştî wê binêrin. Li vir lêkolîn li ser hejmara eskeran jî hatîye kirin.) Di wergera Îngîlîzî de hijmara artêşê wek 1.700.000 kes derbas dibe.

dikirin; piştî çember hat xêzkirin, ew 10 hezar jê dihat derxistin û çember heta navtengê bi dîwareke kevirî dihat hûnandin. Piştî dîwar hat hûnandin, 10 hezar kesên din dikirin hindur û bi vî awayî esker dihat hijmartin; piştî hijmartin temam dibû, li gor milîyeta wan ji hev dihatin veqetandin.

[61] Miletên beşdarî seferê bûbûn ev bûn: Di serî de Persî; techîza wan bi vî awayî bû: Li serê wan kumê ji kulavê yê nerim ku jê re tîara tê gotin, li ser wan zirhên bi mil, ev wekî pulên ser masîyan û gelek sipehî hatine çêkirin, di lingên wan de kirasên dirêj û rengîn; di cihê mertalên maden de, mertalên ji darê sorkunê hatine çêkirin li ser wan bûn, ew li ser sadaqên xwe daliqandibûn; bi rimên kurt, kevanên mezin û tîrên qamîş hatibûn çekdarkirin, ji bilî vê xencera wan a ji kemera wan bi lingê rastê ve dirêj bûyî hebû. Fermandarê wan Otanesê bavê Amestrîsa jina Xerxes bû. Yûnanîyan berê ji Persan re Kephen, Persîyan bi xwe jî Artae digotin û cîranên wan jî ew bi vî navî dinasîn. Perseûsê kurê Danae û Zeûs, hatîye ba Kepheûsê kurê Belos û bi keça wî Andromeda re zewicîye û kurekî wî çêbûye; navê Perses li kurê xwe kiriye û wî li wir hiştiye ku bikeve cihê Kepheûs yê zarokên wî yên kur tunebûn; Persîyan navê xwe yê nû ji vî kurî wergirtine.

[62] Medî jî wekî wan hatibûn techîzkirin; ev unîforma jixwe ya Medan bû, çavkanîya wê ne Persî bû. Fermandarê Medan, Akhaîmenîdekî navê wî Tîgranes bû; ev berê bi navê Arîanî dihatin naskirin; Medeîayê Kolkhîsî, piştî ji Atînayê hat welatê Arîanîyan navê wan hat guhertin; Medî bi xwe wiha dibêjin. Kîssîayî jî wekî Persan hatibûn techîzkirin, tenê li serê wan di cihê kulavê de kumên serê wan tûj hebûn. Kîssîaiyî, di bin fermandarîya Anaphesê kurê Otanes de bûn. Li ser Hyrkanîayên wekî Persan li xwe kiribûn, Megapanosê piştre bûbû walîyê Babîlê hebû.

[63] Asûrîyan di seferê de kulahên ji sifrê bi dest hatî hûnandin danîbûn serê xwe, ev adeteke kevin ya barbaran e, zehmet e mirov bikare bêje çawa ne; mertal, rim û xencerên wan wekî yên Misrîyan in, ji bilî vê topizên bizmar li ser hatine kutan û zirxên keten li ser wan heye. Yûnanî ji van re Surîyeyî, barbar jî Asûrî dibêjin. (Di navberna de ji wan re Khaldeayî jî hatîye gotin.) Fermandarê wan Otaspesê kurê Artakhaîes bû.

[64] Baktrîanî kumekî dişibiya yê Medan danîbûn serê xwe, çekên wan yên millî kevanên qamîş û rimên kurt li ser wan hebûn. Li serê Sakayîyan ji nesla Îskîtîyan kumikên di bîçima kovikê de yê hişk yê rast disekine hebû; poturên fireh dikirin lingên xwe, li gor taybetmendîyên welatê xwe kevan û xencerên wan hebûn, ji bilî vê di cihê bivir de saggarîsên wan yên millî hebûn. Her çend ji hoza Amyrgîa ya Îskîtî bûn, ji van re Sakesî dihat gotin. Baktrîanî û Sakesî di bin fermandarîya kurê Daryûs Hîstaspes de bû yê ji Atossa keça Kîros hatibû dinyê.

[65] Hindî, kincên ji wê darê derdixistin li xwe dikirin,[263] kevan û tîrên wan ji qamîşan bû, serê tîrên wan hesinî bû. Techîzata wan wiha bû û di şer de ew kiribûn bin fermandarîya Pharmazathresê kurê Artabatos.

[66] Kevanên Arîyan wekî yê Medan bûn, ji derveyî vê techîzata wan wekî ya Baktrîanîyan bû. Fermandarê wan Sîsamnesê kurê Hydarnes bû. Parthî, Khorasmîayî, Sogdûyî, Gandarî û Dadîkî, di seferê de wekî Baktrîayî hatibûn techîzkirin. Fermandarên wan ev bûn: Fermandarên Parthî û Khorasmîayîyan, Artabazosê kurê Pharnakes, yê Sogdûyîyan Azanesê kurê Artaîos û yê Gandarîayî û Dadîkîyan, Artyphîosê kurê Artabanos bû.

[67] Kaspîenî ebayên çermî li xwe kiribûn, li gor taybetmendîya miletê xwe kevanên qamîşî û şûrên wan hebûn; techîza wan wiha bû, fermandarê wan Arîomardosê birayê Artyphîos bû. Sarangîayî bi kincên xwe yên xweşrengî hatibûn boyaxkirin, bal dikişandin; cuzmeyên heta çoga wan dihat hebû, kevan û rimên Medan li ser wan hebû. Fermandarê wan Pherendatesê kurê Megabazos bû. Paktyayî kurkên çermîn li xwe dikirin, kevan û xencerên wan yên millî hebûn; di bin fermandarîya Artayntesê kurê Îthamîtres de bûn.

[68] Ûtîayî, Mykî û Parîkanîyan wekî Paktyayîyan li xwe kiribûn, fermandarê Ûtîayî û Mykîyan, Arsamensê kurê Daryûs û fermandarê Parîkanîyan jî Sîromîtresê kurê Oîobazos hebû.

[69] Ereban fîstanên xwe yên dirêj bi kemerekê dişidandin û di destê wan yê rastê de kevanên mezin ên karîbûn ters vezilandina hebû. Ethîopîayî

263 Pembo ye, pirtûka yekê, beşa 28an.

xwe li postên panter(şek) û şêran pêçabûn; kevanên ji destîyên palmîyan hatibûn çêkirin, gelek mezin, yên bi kêmasî dirêjahîya wan çar enîşk, dihejandin, tîrên wan biçûk bû û ji qamîşê hatibûn çêkirin; li serê wan di cihê hesin de kevirên tûj hatibû danîn, di destê wan de darên serê wan bizmarkirî hebû, nîvê gewdeya xwe bi tebeşirê, nîvê din jî bi zincifreya sor mole dikirin bi wî awayî diçûn şer. Fermandarîya ji bo Ereb û Ethîopîayên li jora Misrê rûdinişt, ji alîyê Arsamesê kurê Daryûs yê ji Artystona keça Kîros bû dihat kirin. Daryûs, ji nav jinên xwe ya herî zêde jê hez dikir Artystona bû û peykereke wê ya zêrîn ya bi çakûç li ser neqiş hatibû kirin, daye çêkirin.

[70] Tê wê manayê Ethîopîayî û erebên başûrê Misrê, kiribûn bin desthilata Arsames; Ethîopîayên li alîyê rojhilatê rûdinîştin (ji ber ku di seferê de bibûn du beş), bi Hindîyan re di eynî yekîneyê de bûn û bi şiklî ji Ethîopîayên din, ji bilî porên wan ferqekî wan tune, tenê axaftineke wan ya taybet ya li gora wan heye; Ethîopîayên rojhilatê porê wan rast e, porê Ethîopîayên Lîbyayî, yê dinyê yê herî helekî ye. Techîza van Ethîopîayên Asyayê kêm-zêde wekî ya Hindîyan bû, tenê li serê wan kumên ji çermê enîya hespan hatibû çêkirin hebû, çerm bi bijî û guhan ve hatibûn gurandin; bijî cihê perikê digirt û guhê hespê rast tîk dibû; mertalên ji çermê qulingan hatibû çêkirin bikar dianîn.

[71] Libyayîyan ji çerm tiştên ecêb li xwe dikirin, rimên wan yên hesinê wan di agir de hatibûn şidandin hebû, fermandarê wan Massagesê kurê Oarîzos bû.

[72] Paflagonyayî bi kumên hûnandî, mertalên biçûk, rimên gelek biçûk û xenceran diçûn şer; di lingên wan de pêlavên wan yê taybet yê heta nîvê çîmê wan dihat hebûn. Lygyayî, Matîenî, Marîanî û Surîyeyî, bi Paflagonyayîyan re bûn. Ji van Sûrîyîyan re Persî, Kappadokîayî dibêjin. Fermandarê Paflagonyayî û Mateîanîyan Dotosê kurê Megasîdros bû; fermandarê Marîandynîyan û Sûrîyîyan jî Gobryasê kurê Daryûs yê ji Artystone çêbûbû.

[73] Techîzata Frîgyayîyan gelekî dişibiya ya Paflagonyayîyan, lê ferqên wan yên biçûk hebûn. Li gor Makedonîayan, dema ku Frîgyayî li Ewrûpayê rûdinîştin, navê wan Bryg bû û cîranên wan bûn, dema ku derbasî Asyayê bûne bi welatê wan re navê wan jî hatîye guhertin. Ermenîyên ku kolonên

Frîgyayê bûne, wekî wan li xwe kirine û ew jî wekî Frîgyayî, di bin fermandarîya Artokhmesê ku bi yek ji wan keçên Daryûs re zewicîye de bûne.

[74] Çekên Lîdyayan gelek dişibiya yên Yûnanîyan, berê navê Lîdyayîyan Maîonîa bûye; navê xwe yê niha ji Lydosê kurê Atys wergirtine û navê wan yê kevin hatîye jibîrkirin.. Mysîayan kumên welatê xwe datanîn serê xwe, di destê wan de mertalên biçûk û rimên ji hesin yên di agir de hatibûn dijwarkirin hebû. Ev Mysîayî kolonên Lîdyayê ne û ji bo cîranên Çiyayê Olymposê ne, ji wan re Olymposî jî tê gotin. Fermandarê Mysîayî, yê bi Datîs re derketin sefera Marathonê, Artaphrenesê kurê Artaphrenes bû.

[75] Thrakî bi kumên ji postê rovî hatibûn çêkirin ve diçûn şer; pelerînên rangerang avêtibûn ser gomlekên zirhî; di ling û çokên wan de sol û saqên ji çermên pezkovîyan hebû; li ser wan rim, mertalekî sivik û biçûk û xencereke kurt hebû. Piştî çûbûn Asyayê navê Bîthynîayê wergirtibûn; li gor wan digotin, berê navê wan Strymona bûye, ji ber ku li qiraxên Strymonê rûdiniştin, dibêjin; "Troyayî û Mysîayî em ji welatê bav û kalên me raqewirandin." Fermandarê van Thrakîyên Asyayî, Bassakesê kurê Artabanos bûye.

[76] …[264] yî mertalên wan yên biçûk yên nehatibûn debaxkirin hebû; her yek ji hunera Lîkyayî du rim bi xwe re hildigirtin; kumên sifir datanîn serê xwe, van kuman bi perikên mezin dixemilandin û li ser guhan sturehên ga yên ji sifrê hatibûn çêkirin hebû; perçeyên sor bi lingê xwe ve girê didan. Kahînekî Ares yê van kesan hene.

[77] Kabayên li Maîonîayê rûdinin û bangî wan dikin bi navê Lasonîayê jî wekî Kîlîkîayan hatine techîzkirin; dema ku dor hat Kîlîkîayê ez ê behsa van bikim. Mîlyasî rimên kurt li ser wan heye, kincên wan bi bizmikan bi hev ve hatine zeliqandin; bi hinek ji nav wan re kevanên Lîkyayî û kumên sifrî hebûn. Fermandarê van tevan Badresê kurê Hystanes bû.

[78] Kumên Moskhoîyan darîn bûn, mertalên wan biçûk, rimên wan destîkurt bûn, serê wan tûj û dirêj bû. Çekên Tîbarenîyan, Makronîyan û Mossî-

264 Di metnê de valahî heye, tê gotin ku ev dikare Khalybîayî bin.

noîkîyan wekî yên Moskhoîyîyan bûn; fermandarên wan ev bûn: Fermandarê Moskhoî û Tîbarenîyan, Arîomardosê kurê Daryûs yê ji Parmysa keça Smerdîsê kurê Kîros çêbûyî; yê Makronîyan û Mossînoîkîyan jî, Artayktesê kurê Khorasmîsê walîyê bajarê Sestosê ya li ser Hellespontosê bû.

[79] Marîyan kumên taybetî yên welatê wan, mertalên sifrî yên biçûk û rim li ser wan bûn. Kumên Kolkhîsîyan darîn bûn, mertalên wan biçûk bû û ji çermê nedebaxkirî çêbibûn, rimên wan kurt, şûrên wan xwahr bûn. Fermandarê Marîyan û Kolkhîsîyan Pharandatesê kurê Teaspîs bû. Çekên Alarodan û Saspeîrîyan wekî yên Kolkhîsîyan bûn; fermandarê wan Maîsîstîosê kurê Sîromîtres bû.

[80] Miletên li giravên Deryaya Erythreîayê rûdinîştin û beşdarî şer bibûn -mebesta min yên ji alîyê Hikumdarê Mezin ve bi navê "Sirgûnî" li van giravan dabû rûnîştandin e- kinc û çekên gelek nêzîkî yên Medan li ser wan bûn; li ser birêvebirîya van giravan Mardontesê kurê Bagaîos hebû ku, ev kes salek piştî wê, dema ku wekî serekfermandar beşdarî şerê Mykaleyê bû mir.

[81] Belê, artêşa di bejahîyê de dimeşîya ji van yekîneyan hatibû damezirandin. Yên li jorê me behs kirin jî fermandarên artêşê bûn; yên artêş bi rûkûpêk dikirin, dihijmartin û fermandarek datanîn ser hezar û 10 hezaar kesan ew bûn; fermandarên taximên ji sed û ji deh kesan jî yên fermandarîya 10 hezar kesan dikirin hildibijartin. Fermandarên van kadroyên dihatin birûkûpêkkirin, ji her yekîneyên ji nav miletên xwe hatibûn neqandin.

[82] Di ser van hemî fermandaran re, wekî komîteya fermandarîya mezin ya artêşa bejahîyê Mardonîosê kurê Gobryas hebû, Trîtantaîkhmesê kurê Artabanos ku ne terefdarê sefera Yûnanistanê bû, yek ji wan xwarzî û yê din birazîyê Daryûs bûn, yanî herdu jî zarokên xweh û birayê Xerxes bûn, Smerdomenesê kurê Otanes, Masîstesê kurê Daryûs yê ji Atossa çêbû, Gergîsê kurê Arîazos, Megabyzosê kurê Zopyros hebûn.

[83] Komîteya fermandarîya bilind ya artêşa bejahîyê, ji derveyî 10 hezar kesan, dabûn destê van. Ev 10 hezar kesên han hilbijarteyê temamê Persan bûn, di bin fermandarîya Hydarnesê kurê Hydarnes de bû. Ji van re Nemir dihat

gotin, sebebê wê jî ev bû: Ji nav wan kesek ji ber mirin yan nexweşîyê kêm biba, bêpayîn yekî din tê hilbijartin, hejmara wan her tim deh hezar kes dima, ne kêm û ne zêde. Persî, bi lûksî ji yên din vediqetîyan û kesên herî mêrxas yên artêşê ew bûn. Ew çekên me li jor behsa wan kir li ser wan bûn, bi zêdehî li ser kincên wan pelikên zêr hatibûn raxistin, bi tevayî diçirusîn; li ba wan di nav erebeyên sergirtî de xizmetkarên wan, selikên xwe yên sindoqan û heremên xwe jî bi xwe re dibirin. Xwarinên wan jî bi taybetî hatibû veqetandin, li ser pişta deveyan û heywanên baran, ji yên din cihê dihatin veguhestin.

YEKÎNEYÊN SIWARÎ

[84] Temamê van miletan siwarî ne, lê hemî beşdarî yekîneyên siwarî nedibûn. Yekîneyên siwarî tenê ji van pêk dihatin: Persî, techîza wan wekî ya artêşa bejahîyê ye, tenê li serê hinekan hesinê kutayî û kumên ji sifrê hebû.

[85] Koçerên ji wan re Sagartî tê gotin ku, di eslê xwe de di hêla nijad û ziman de ew jî Pers in; techîza wan nêvî wekî Persan û nêvî jî wekî Paktyayîyan e; heyşt hezar kes dabûn yekîneyên siwarîyê; ji derveyî xencerê çekên bronz û hesin nizanin bikar bînin; kemendên ji qayîşan hatine hûnandin bikar tînin; bi ewqas çek bê tirs bi ser dujmin de dirin; bivî awayî şer dikin: Dema ku îsabetî hesp yan siwar kirin, bêsekin dikêşin; bi vî awayî dijmin dihat girêdan, ev tê wê wateyê ku îşê wî qedîya, taktîkên wan wiha ne. Ji bo yekîneyan bi Persan re hatine veqetandin.

[86] Medî û Kîssîayî di yekîneyên siwarîyê de wekî peyadeyan çek hildigirin. Yekîneyên siwarî û peyade ji bilî hespên techîzkirî yên Hindîyan, erebeyên wan yên bi hesp û kerên kovî hatine techîzkirî jî hene. Hespên Baktrîanê û Kaspîanê wekî peyadeyan kinc li wan hatibûn kirin; Libyayî jî wisan, tenê erebeyên wan yên şer jî hebûn û temamê wan li ser van erebeyan şer dikirin. Paktyayî û Parîkanî jî wekî peyadeyan hatibûn biçekkirin. Ereb jî eynî, lê ew li deveyan siwar dibûn û deve jî di hêla sur'etê de ne kêmî hespan in.

[87] Di yekîneyên siwarî de tenê ev milet hebûn; yekûna yekîneyên siwarî, ji derveyî deve û erebeyan, dibûn nêzîkî 80 hezar kesan. Yekîneyên siwarî

bi ser mangayan ve hatibûn parvekirin; ereb hêza paşî bûn, ji ber ku hesp ji deveyan disilikîn, ji bêhna wan hez nedikirin.

[88] Fermandarîya yekîneyên siwarî ji alîyê Harmamîthres û Tithaîos ve dihat kirin, herdu jî kurên Datîs bûn. Bi wan re fermandarekî sisiyan jî hebû ku, nexweş ketibû, li Sardesê mabû, navê wî Pharnûkhes bû. Dema ku ji Sardesê derketibûn qezayeke ne li hêvîyê bûn hatibû serî. Kûçikekî xwe avêtibû nav pêyên hespê wî, hespê ku di pêşîyê de kûçik nedîtibû silikîbû, rabibû ser herdu pêyên xwe û Pharnûkhes xistibû xwarê. Pharnûkhes xwîn verişiyabû û bêtaqet ketibû. Mirovên Pharnûkhes, hespê siwarê xwe avêtibû, li ser emrê wî, di cih de biribûn meydanê û lingên wî jê kiribûn. Belê, Pharnûknes bi vî awayî ji fermandarîyê bibû.

HÊZA DERYAYÎ

[89] Hejmara trireman gihiştibû hezar û dused û heftan; li gor cihê hatine beşên wan bi vî awayî bû: sêsed Fenîkeyî û Sûrîyeyên Filistînê; ûnîformayên wan wiha bû: Li serê wan hema bêje wekî ya Yûnanan, kumên çermî, zirhên keten, mertal û rimên qiraxê wan rast. Li gora wan digotin, berê li Deryaya Erythreîayê rûdiniştin; piştre Sûrîyê derbas kirine û li qiraxê Behra Spî bi cih bûne; ev herêmê Sûrîyê heta Misrê seranserê qiraxan jê re Filistîn tê gotin. Misrîyan dused keştî dabûn. Kumên wan yên neqişkirî, mertalên wan gilover, lêvên bazinda mertalên wan bi temamî stor û mehkem hatibûn çêkirin. Rimên wan yên deryayî û bivirên wan yên mezin hebûn. Ji nav wan piranî zirh li xwe dikirin û şûrên mezin li ser wan bûn. Bi vî awayî hatibûn techîzkirin.

[90] Qibrisîyan 150 keştî anîbûn; Kincên wan bi vî awayî bû: Hikumdaran şaşık li serê xwe girê dabûn, yên din di ser de qazax li xwe kiribûn, çekên wan dişibiyan yên Yûnanîyan. Di nav wan de grubên cihê yên etnîkî hebûn: Hinek jê ji Salamîsê û Atînayê, hinek jê ji Arkadîayê, hinek jê ji Kythnosê, hinek ji Fenîkeyê û hinek jî ji Ethîopîayê dihatin; yên ku wan bixwe digotin wiha bû.

[91] Kîlîkîayîyan 100 keştî anîbûn. Kumên welatê wan li serê wan bû; wekî mertal çermên ga yên debaxnekirî bikar dianîn, gomlekên hirî li xwe dikirin, bi her yekî re du rim û şûrekî gelek dişibiya yê Misrîyan hebû. Berê ji

wan re Hypakhaî dihat gotin, piştre navê Kîlîksînê kurê Agenor wergirtine. Pamphylîayîyan 30 keştî dabûn; techîza hêza wan a deryayî wekî ya Yûnanîyan bû. Ev Pamphylîayî, hevalên çekî yên Amphîlokhosî û Kalkhasî bûn, ji nesla yên ji Troyayê vedigerîyan û belav bûbûn dihatin.

[92] Lîkyayî bi 50 keştîyan ve hatibûn. Singparêz û çokparêz li xwe dikirin; kevanên wan yên ji dara belalûkê, tîrên wan yên ji qamîşê bêstirî û rimên wan hebûn; postên bizinan diavêtin ser milê xwe, kumên kulav yên derdora wê perî tê radikirin datanîn serê xwe. Ji bilî vê şûr û xencer li ser wan hebûn. Dema ku Lîkyayî ji Girîtê hatin navê wan Termîl bû; navê xwe yê niha ji Lykosê kurê Pandîosê Atînayî wergirtine.

[93] Dorîsên Asyayî 30 keştî anîbûn; Ji bo ku ji Peloponezê dihatin techîza wan wekî ya Yûnanîyan bû, tenê şûr û xencerê wan zêde bûn. Min behsa navê wan yê kevin di destpêkî de kiribû.[265]

[94] Îonîayan 100 keştî şandibûn; li gor isûla Yûnanan xwe çekdar kiribûn. Berî Danaos û Ksûthos bên Peloponezê, di esnayê li herêma Peloponezê ya niha jê re Akhaîa tê gotin demeke dirêj rûdiniştin navê Pelasgîyên Aîgîayê wergirtibûn; piştre navê Îonê kurê Ksûthos wergirtine.

[95] Yên li giravan rûdinên bi 17 keştîyan hatibûn. Ev ji nesla Pelasgîyan in û wek duwazde sîteyên Îonîyên ku serekanîya wan Atîna ye, navê Îonîayî wergirtine. Cardin Aîolîyên wekî Yûnanan xwe çekdar kiribûn, 60 keştî anîbûn. Ev jî li gor Yûnanî qise dikin, berê navê wan Pelasg bûye. Hellespontosî -ji derveyî Abydosîyên ku ji hikumdar izin xwestin li welatê xwe bimînin û piran ava bikin- bi yên ji Pontosê ji bo ku beşdarî seferê bibin hatibûn, tev 100 keştî techîz kiribûn. Ji bo ku ji kolonên Îonîa û Dorîsê bûn, li ser wan jî techîzatên Yûnanî hebûn.

[96] Di temamê van keştîyan de, eskerên deryayî yên ji Persan, Medîyan û Sakesîyan hatibûn hilbijartin hebûn, keştîyên ji alîyê Fenîkeyîyan ve û bi taybetî yên ji alîyê Sîdonîyan ve hatibûn anîn yên herî baş li ber deryayê di-

265 Pirtûka yekê, beşa 171ê

dan ew bûn. Wekî di artêşa bejahîyê de di van yekîneyên deryayî de jî yên li ser serê wan fermandar ji welatê wan bûn; lê sebebekî ku min mecbûr bike ez lîsteya van farmandaran biweşînim tune, ez navê wan nadim; ji ber ku, li milekî ku hêjayîya behiskirina navê wan tune, di nav her yek ji van miletan de, çiqas bajar hene, ewqas jî fermandar hene. Jixwe ne wekî general, wekî temamên şerkerên din wekî kole beşdar dibûn; wekî li jorê xuya dibe di artêşa bejahîyê de jî, min tenê behsa dereceyên fermandarîyên jorê û di nav cûre cûre miletan de bi taybetî min Persî hejmartine.

[97] Em bên ser hêzên deryayî, di serê wan de Arîabîgnesê kurê Daryûs, Preksaspesê kurê Aspathînes, Megabazosê kurê Megabates û Akhaîmenesê kurê Daryûs hebûn; Îonîayî û Karyayî di bin fermandarîya Arîabîgnesê kurê Daryûs yê ji keça Gobryas de bûn; fermandarîya Misrîyan di destê Akhaîmenesê birayê Xerxes yê ji eynî dê û bavê de bûn; yên mayî di navbera herduyan de hatibûn parvekirin. Keştîyên sîh û êncî bêrî, keştîyên sivik, keştîyên biçûk ên hesb lê hatibûn barkirin, yekûna tevan kêm-zêde nêzîkî sê hezaran bû.

[98] Piştî fermandaran serokên eskeran ên bi nav û deng ên di nav hêzên deryayê de bûn ev in: Ji Sîdonê Tetramnestosê kurê Anysosê, ji Tyrê Mattenê kurê Sîromosê, ji Aradosê Merbalosê kurê Agbalosê, ji Kîlîkîayê Syennesîsê kurê Oromedonê, ji Lîkyayê Kybernîskosê kurê Sîkasê, ji Qibrisê Gorgosê kurê Khersîs û Tîmonaksê kurê Tîmagaras, ji Karyayê Hîstîaîosê kurê Tymnesê, Pîgresê kurê Hysseldomos û Damasîthymosê kurê Kandaûles.

[99] Ez qaptanên din nahejmêrim, feydeya hijmartinê tune. Lê tenê ez Artemîsîayê dixwazim bi bîr bînim, ew di gel ku jinek bû, beşdarîya wê di sefera Yûnanistanê de bi heyran pêşwazî dikim; mêrê wê miribû; kurê wê biçûk bu, hikumranî wê bi xwe birêve dibir; xwedîyê ruhekî şixulker, bêtirsiya wê ya mêranî, bêyî pêwistî hebe ew kişandibû seferê. Navê wê Artemîsîa bû; keça Lygdamîs bû; ji alîyê bavê ve Halîkarnassosî bû, ji alîyê dê ve ji Girîtê bû. Fermandara Halîkarnassosî, Koslûyî, Nîsyrosî û Kalydnosîyan bû. Pênc keştî anîbûn û di temamê techîzê de piştî deryavanên Sîdonê keştîyên herî bi nav û deng yên wê bûn; Di nav temamê hevalbendan de ya herî fikrên baş didan hikumdar ew bû. Ez vê jî bêjim ku, hemî sîteyên ku min got fer-

mandarî dikin ji nijada Doran bûn; Halîkarnassosî ji Troîzenê û yên din jî ji Epîdaûrosê hatine.

[100] Ez artêşa deryayî jî êdî temam dikim. -Piştî di artêşê de hijmartin û tertîbkirin temam bû Xerxes, xwest her tiştî careke din di ber çav re derbas bike. Û di ber çav re derbas kir; erebeya wî li ber eskerên ji miletên cihê cihê berhev bibûn derbas bû; ji her yekî re talimat didan û sekreteran not digirtin; bi vî awayî li ber temamê sefên siwarî û peyadeyan re derbas bû û ew dîtin. -Piştî ev kar temam bû keştî daxistin deryayê; Xerxes ji erebeyê peya bû û siwarî yek ji wan keştîyên Sîdonê bû; li bin sîwaneke ji perdeyên bi pelikên zêrî hatine xemilandin rûnişt û di ber keştîyan re derbas bû, wekî artêşa bejahîyê, ji bo her keştîyê jî zanyarî dixwest û yên jê re digotin dikir ku not bigrin.- Qaptanan keştî ji qiraxê vekiribûn û kêm-zêde çar phletron li dervî qiraxê lenger avêtibûn, pêşîya wan li bejahîyê dinêrî, sef sef rêz bibûn; eskerên deryayî bi techîzatên xwe yên şer ve amade bûn; Xerxes saxtîkirina xwe bi derbasbûna di nav keştîyan û bejahîyê de kir.

AXAFTINA XERXES-DEMARATOS

[101] Piştî kontrola keştîyan temam bû, ji keştîyê peya bû û kir ku bangî Demaratosê kurê Arîston bikin yê di sefera li hemberî Yûnanistanê vekiribû girtibû ba xwe; wextê hat ev jê pirsî û got: "Demaratos, ez dixwazim niha li gor xwe hinek pirsan ji te bikim. Tu Yûnanî yî, hem bi gotinên te û hem jî li gor gotinên ew Yûnanîyên hatine ba min, sîteya te ne ya Yûnanistanê ya herî jar û biçûk e. Niha ji min re vê bêje, gelo wê Yûnanî li dijî min derkevin û li hemberî min rahêjin çek? Ji ber ku li gor fikra min, temamê Yûnanistanê bên ba hev, heta yên li milê rojavayê jî rûdinin beşdarî wan bibin, bi çek nikarin meşa min bidin sekinandin; ji ber ku berî her tiştî di navbera wan de yekîtî tune. Dîsa jî ez dixwazim fikra te werbigirim û tê çi bêjî bizanibim." Xerxes ev pirs kir û Spartayî bersiv da: "Hikumdarê Mezin, ez ji te re rastîyê bêjim, yan yên kêfa te jê re bê?" Xerxes got, ya rastî bêje û bi kirina tiştekî wiha tê ji çav nekeve.

[102] Li ser vê Demaratos wiha got: "Hikumdarê Mezin, madem tu ji min dixwazî di her warî de ez rast bêjim û di rêya piştre min derew dernexe ez

biaxivim, pêşî ez vê xeberê bidim te ku, Yûnanistan birayê şîrmij ê feqîrtîyê ye; rûmeta ku encama perwerdekirinek bi aqilî û bi qewet e, mêvanek e yê bi zorê qebûl kirîye; bi saya vê fezîleta ku rûmetê didiyê, li hemberî hejarîyê xwe diparêze; li hemberî hikumranîyê jî xwe bi vî awayî diparêze. Ez temamê Yûnanîyên li ser erdê vê Dora dûr bi cih bûne silav dikim, lê axaftina min ne ji bo tevan e; ez ji bo Lakedaîmonîyan diaxivim; pêşî ez vê xeberê bidim te ku, wê ew qanûnên te yên Yûnanîyan bike kole tu wextî qebûl nekin; ez vê jî bêjim, heta temamê Yûnanistanê bi te re be, wê ew cardin li hemberî te şer bikin. Hejmara wan? Di şertên wiha de ew fikra hejmarê nakin, hezar kes jî bimînin, wê cardin bikevin şer, hê zêdetir jî bin, hê kêmtir jî bin bi eynî awayî şer dikin."

[103] Li ser van gotinan Xerxes kenîya û got: "Demaratos, tu çi ji devê xwe direvînî? Ma hezar kes dikare li hemberî vê artêşê bisekine! Rabe ji wir lo, ma te ji insanên wiha re hikumdarî dikir? Ma niha tu dikarî serî bi deh kesan re derînî? Ê wî wextî? Heke milîsên sivîl bi temamî bi rastî wekî tu dibêjî wisan bin, em bêjin tu, ku hikumdarê vî miletî bû, li gor qanûna we bi xwe, lazim bû tu jî du qatê wan dijminên ew pê re şer kirin, te bikarîba şer bikira.[266] Her yek hemwelatîyekî te beramberê deh kesên di artêşa min de be, lazim bû tu jî beramberî bîst kesan bûya; wî wextî gotinên te wê rast bûna. Lê min tu û Yûnanîyên heya niha bi min re peywendî danîne dîtin, ez bejn û bala we dizanim û ma wî wextî bi vî awayî pozbilindîya we ne tiştekî vala ye? Em niha lêbinêrin, em temamê îhtîmalan bigrin ber çav. Hezar kes, 10 hezar, hadî em bêjin 50 hezar, bi ser de jî hemî azad û di bin desthilata kesekî de nîn in, bi vê hêza tu dibînî re dikare serî derêxe? Jixwe ger 5 hezar jî bin, em li hemberî wan di hêza li hember yekî hezar in. Heta wekî ba me, di bin desthilata yek kesî de bûna, li hemberî xwezayê, dikarîbûn hêzeke mezintir nîşan bidin; wî wextî bi hejmar kêm jî bin, li hemberî dijminekî bi hejmar ji xwe zêde, di bin zorê û qamçîyan de dikarîbûn bimeşin. Lê azadî wan dehfî hereketkirina sist dike, ew ne dikarin vê û ne jî ya din bikin; naxêr, ez bi hesaba xwe texmîn dikim ku, Persî bi tena serê xwe jî bin, gelek zehmet e Yûnanî bi me re şer bikin. Ew bêtirsîya tu dibêjî esil bi me re heye;

266 Xerxes henekên xwe pê dike. Spartayî di şahiyan de du porsiyon xwarin didan hikumdar(Pirtûka 6an, beşa 57an); dixwaze bêje, madem tu du qatê yên din dixwî, pêwist e tu bi du qatên dijmin re jî şer bikî.

ne ewqasî zêde; ji ber ku mirov kêm lê rast tê. Lê cardin li ba me, di yekîneyên min yên taybetî de, Persên bijarte yên li dijî sê Yûnanîyan jî derkevin hene, tu wan nas nakî, ji ber wê tu tiştên wiha vala dibêjî."

[104] Demaratos bersiv dayê û got: "Hikumdarê Mezin, min di serî de dizanîbû ku wê gotinên vekirî bi te ne xwea be. Lê te xwest ku ez gotinan vekirî bêjim; min jî ji te re ji bo Spartayîyan kîjan rast e ew got. Îro ji herkesî baştir tu dizanî ka ez ji wan hez dikim yan na: Wan mafê wezîfeya min a ji bav û rûmeta min ji min sitendin; min ji welatê min kirin, min kirin koçber; bavê te ez qebûl kirim, îdareya min temîn kir, seray bexşî min kir. Kesekî xwedî wijdan li hemberî van qencîyan melhezeya nankorîyê nake; qîmeta van ji herkesî zêdetir dizane. Ez li ser hesaba xwe, xwe di hêza rawestandina li hemberî deh dijminan de nabînim, heta li hemberî du kesan jî, heta heke di destê min de be ez naxwazim li hemberî yek kesî jî şer bikim. Lê dema pêwist be û bexşîna sûdeke bi lez mewzubahis be, li hemberî her yekî yê beramberî sê Yûnanan tên nîşandan, ez bi tena serê xwe û bi hizura ji dil û can, ez dikarim yek bi yek bi wan re şer bikim. Lakedaîmonî di şerê yek bi yekî de ji kesekî paşve namînin, lê wextê di halê artêşê de bin insanên herî bi qîmet ew in. Azad in, belê, lê ne di her xalê de; efendîyekî wan jî heye, ew jî qanûn e, mirovên te çiqas ji te ditirsin, ew jî ji qanûnan ewqas ditirsin. Tirs jî nebe bi korî serî li ber emrê qanûnê ditewînin. Û ev emir qet nayê guhertin: Hejmara dijmin çend dibe bila bibe, baznedana ji meydana şer, heta mexlûb neke yan nemre nederketina ji sefê. Lê ez dizanim, ev li ba te ji xwenîşandanên dînîtî pê ve ne tiştek in, ji vir şûnve jî ez ê êdî tiştekî nebêjim; îro jî te emir kir ji bo wê ez min axivîm. Cardin jî ez hêvî dikim, her tişt li gorî dilê te be, Hikumdarê Mezin!"

[105] Bersiva Demaratos wiha bû. Xerxes bi ken ev bersiv pêşwazî kir, emareyê hêrsbûnê nîşan neda; Demaratos bi rûgeşî şand; piştî vê hevdîtinê fermandarê ku Daryûs li keleha Dorîskosê hiştibû ji wezîfeyê hilda, Maskamesê kurê Megadostes li cihê wî danî û artêş di ser Trakyayê re ber bi Yûnanistanê ve derxist rê.

[106] Xerxes, ji Maskamesê ku li Dorîskosê danî re(tenê ji wî re) her salê bi awayekî berdewamî bexşîş şandin, ji ber ku walîyê herî baş yê hem Daryûs û hem jî wî tayîn kiribûn ew bû, kesekî xwedî karekter bû. Di şandina

bexşîşan de qet tu salan valahî ne ketê. ArtoXerxesê kurê Xerxes jî bi eynî awayî li hemberî zarokên Maskames hereket kirîye. Hê sefer dest pê nekiribû, walî tayînî her cihê Hellespontosa Trakyayê kiribûn. Ji derveyî walîyê Dorîskosê, ev hemî, yên li Trakya û Hellospontosê, di salên piştî vê seferê ji alîyê Yûnanan ve hatin derxistin; lê hemî êrîşên Yûnanîyan yên ji bo Persîyan bavêjin yê li pêşberî kelha Dorîskosa di bin fermandarîya Maskames de, heta îro netîceyek nedane. Sebebê bê sekin şandina bexşîşan ji alîyê Persan ve ji wan re ev e.

[107] Ji xwe yek ji wan walîyên ji alîyê Yûnanîyan ve hatin derxistin, çavê Xerxes tijî nekiribûn, tenê Bogesê fermandarê Eîonê derveyî van dima. Xerxes her wextî qîmet daye wî, zarokên wî yên di nav Persan de hiştine, ji îltîmasên taybet yên ji bo malbata hikumdar hene wan jî îstîfade wergirtine, tim qîmet dane wan. Boges jî layîqî pesnên mezin hatîye dîtin. Atînayîyên di bin fermandarîya Kîmonê kurê Mîltîades de, ew dorpêç kirine, pêşniyaz kirine ku vegere, jê re gotine, heke kelehê bide wê bikaribe vegere Asyayê; lê wî nexwestîye bi jiyaneke deyndarê rezaletekê derkeve pêşberî Hikumdarê Mezin; heta dawîyê li ber xwe daye. Dema xwarina wî nemaye, kirîye ku komek dar li meydanê berhev bikin, zarokên xwe, jina xwe, xizmetkarên xwe kuştine û avêtîye nav agir; di dawîyê de çiqas zêr û zîv di bajar de hebûye tevde di ser hisaran re avêtîye Strymonê, herî dawîyê xwe jî avêtîye nav agir. Ji ber wê, Persî îro jî wî bi hurmet bi bîr tînin.

ARTÊŞA XERXES LI TRAKYAYÊ

[108] Xerxes, ji Dorîskosê ber bi Yûnanê ve ket rê; di rê de temamê miletên rastî wî hatin bi zorê kirin nav artêşê. Ji ber ku wekî hê li jorê min îzah kiribû, jixwe heta Thessalîayê temamê herêmê serî tewandibûn, hatibûn kolekirin û bi xeracê girê dabûn; li van deran Megabazos berê ew kiribûn bin desthilatê,[267] piştre Mardonîos ew rewş qewîn kiribû. Xerxesê ku ji Dorîskosê rabû pêşî di kelehên Samothrakê re meşîya ku, keleha dawîyê ya ber bi rojavayê ve, bajarekî mezin yê navê wê Mesambrîa ye. Ji vir şûnve rê derbasî Strymeyê ya aîdê Thasosê dibe; Çemê Lîsosê di navbera van herdu wilayetan de derbas

267 Di vê derbarê de agahî di pirtûka 5an beşa 2yan û pirtûka 6an beşa 43-46an de hene.

dibe, ev av têra artêşê nekirîye û ziwa bûye. Ev welatê berê navê wê Gallaîka, niha navê wê Brîantîka ye; jixwe ew jî di destê Kîkonîyan de ye.

[109] Piştî rûbarê hişkbûyî yê Lîsosê derbas kirin, Xerxes di van bajarên Yûnanistanê re yên li ser rêya xwe derbas bû: Maroneîa, Dîkaîa û Abdera; di vê navê re di rexê golên bi nav û deng yên herêmê Îsmarîs û Bîstonîsê re derbas bû. Îsmarîs di navbera Maroneîa û Strymê de ye; Bîstonîs dikeve hêla Dîkaîayê; du çem, Traûos û Kompsatos dirijin nav vê ya dawîyê. Li dora Abderayê rastî goleke naskirî nehat, tenê çemê Nestosê yê dirije nav deryayê dît. Ji wê herêmê wê ve rêya xwe dewam kir û di wilayetên din re derbas bû, di nav yek ji wan de dora wê nêzîkî 30 stadan, hindurê wê tijî masî goleke ava wê şor hebû; tenê heywanên bar karîbûn ava wê vexwin û gol hişk bû; navê vê wilayetê Pîstyros e. Xerxes ev wilayetên tê de Yûnanî rûdiniştin da milê xwe yê çepê û meşîya.

[110] Miletên Thrakê yên di welatê wan re derbas bû ev in; Paîtîyî, Kîkonî, Bîstonî, Sapaîyî, Edonî û Satraîyî; yên li qiraxên deryayê rûdinin kirin nav hêza deryayî, yên di nav wan wilayetên min behsa navê wan kirin jî, wekî esker bi zorê hatin berhevkirin û kirin nav artêşa bejahîyê, tenê Satraîyî ji derveyî vê hatine hiştin.

[111] Satraîyî, bi qasî em dizanin, heta niha neketine bin desthilata kesekî; di nav Thrakîyan de heta niha yên azad mane tenê ev in, ji ber ku ew li serên çiyayên bilind dijîn. Ev çiya tijî gelîyên kûr in, bi cûre cûre daristanan nixûmandî ne û bi berfê rapêçayî ne. Ji bilî vê şerkerên ecêb in û wekî din jî kahînê wan Dîonysos heye; ev perestgeh, li jora kopa serê çiya yê herî bilind e û di nav Satraîyan de berdevkîya kahîna Bessîyî dikin; wekî li Delphoîyê, rehbikek kahîntîyê dike û ew kehanetên dide bi qasî yên din didin, rehet tên fêhimkirin.

[112] Dema ku Xerxes ji wê herêma min behs kir derbas bû, ber bi kelehên Pîerîayê ve dûdirêj çû, ji van navê yekê Phagres bû, navê ya din Pergamos bû. Di binê kelehan re derbas bû, Çiyayê Pangaîonê li milê rastê hişt, ev çiyayekî mezin û bilind e, madenên zêr û zîv li wir hene, li van deran Pîerîayî, Odomantî û bi taybetî Satraîyî dixebitin.

[113] Piştî Paîonîayên -Doberî û Paîoplî- li bakurê Pangaîonê rûdinin derbas kir, berê xwe da Ponantê; gihişt bajarê Eîonê yê li ser Styrmonê, ew Bogesê navê wî derbas bû, wî wextî sax bû û fermandarê wir bû. Navê vê herêma li dora Pangaîonê, Phyllîs e; vir ber bi rojavayê cihê Çemê Angîtesê dirije nav Strymonê ve nizim dibe û ber bi başûr ve heta Strymonê dirêj dibe. Dema ku gihiştin vî çemî, ji bo pêkanîna şîroveke bextewerîyê Magan wekî qurban neh hespên boz serjê kirin.

[114] Piştî çem bi vê xwînê efsûn kirin û bi hinek sihrên din lava kirin, ji bo bigihin pirên ku berê li ser Strymonê hatine avêtin, di welatê Edonîyan, di erdên Neh Rê re derbas bûn. Dema ku hîn bûn ji vir re Neh Rê tê gotin, bi qasî vê hejmarê keç û kurên vî welatî sax sax veşartin. Veşartina insanên sax adetekî Persîyan e; bi qasî ji min re hat gotin, dema ku Amestrîsa jina Xerxes pîr bûye, ji bo ku xwe bi xudayê binê erdê xweş bike, kirîye ku ji malbatên herî naskirî, du car heft xortên Persî yên hilbijartî veşêrin.

[115] Piştî artêş Strymon li pişt xwe hişt, ber bi rojavayê ve, seranserê qiraxê bajarê Argîlosê yê Yûnanê derbas kir; navê vê herêmê û bakurê wê Bîsaldîa ye. Ji wir, kendava nêzîkî perestgeha Posîdeîonê li milê çepê hişt, Deşta Syleosê û bajarê Stagîrosê yê Yûnanê derbas kir û gihişt Akanthosê. Guhê xwe dan ew prensîbên berî niha min gotin, temamê miletên li dora Çiyayê Pangaîonê bi xwe re radikêşan, cardin yên li qiraxan rûdiniştin dikir nav hêza deryayî û yên di hindur de rûdiniştin jî dikirin nav hêza bejahîyê. Thrakî niha jî ew cihên hikumdar artêş tê re derbas kirîye, erd cot nakin; vî erdî naçînin; ji vir re hurmeta ayînî didin nîşan.

[116] Xerxesê ket Akanthosê, îlan kir ku navê xwedîyê mala hikumdar li xelkê vî bajarî kirîye; cubbeyên Medan da wan û pesnê wan da, ji ber ku dîtibû ew ji bo şer bi dil û can dixebitîn û ji bilî wê li wir xeberên li ser kanala Athosê jî wergirtibû.

[117] Dema ku Xerxes li Akanthosê bû, endezyarê ev kar dimeşand nexweş ketibû û miribû, ew kesê navê wî Artakhaîes, ji Akhaîmenîdîyan û hezkirîyê hikumdar bû; di nav Persîyan de yê herî dirêj bû (ji pênc çengê hikumdar çar tilî kêm bû), tu insanên dengê wan bi qasî yê wî gurr nehatibû

dîtin. Li ser mirina wî Xerxes şîna mezin îlan kir; merasimên veşartinê yên mezin û goreke bi şatafat da çêkirin; ji bo li ser gora wî kumbetek bê bilindkirin temamê artêşê hat seferberkirin. Li Akhantosê li ser îşareta kahînekî ji bo Artakhaîes qurban tên serjêkirin û navê wî nîv-xuda tê bibîranîn. Belê, Xerxesê hikumdar, li ser mirina Artakhaîes bi vî awayî şîn girê dabû.

[118] Ji cihên artêş derbas dibûn Yûnanî artêş diezimandin, sifreya hikumdar amade dikirin, diketin hejarîyeke nedîtî; ewqas ku, malên xwe yên kavil dihiştin û diçûn. Ev tiştek çawa bû li vê nimûneyê binêrin û zanibin: Thasosîyan, ji yên pêşwazîya artêşa hikumdar kirin, ji wilayetên xwe yên bejahîyê hesab girtin; li gor hesabê Antîpatrosê kurê Orgeosê hemwelatîyekî giregirê sîteyên wan, şahî 400 talant girtibû.

[119] Hesabên ji wilayetên din hatibûn jî kêm-zêde eynî bû. Belê, ev ê ji bo amadekarîya wê gelekî ji pêşî ve emir dihat, her sîte xwe mecbûr didît ku wê bike, ka gelo tiştên çawa in em lêbinêrin. Dema ku qasidên şandine her cihî hat û emir gihand, pêşî çiqas qût li bajêr heye di nav xwe de parve dikin û bi mehan dixebitin, dihêrin û dikin ardê ceh û genim; li milekî din birrên pez xwedî dikin, bi bihayekî bilind dikirîn, ev ji bo pêşwazîya artêşê bû. Ji bilî vê ji bo li ser sifreyê bê bikaranîn, tasên zêr û zîv, krateros û taximên sofreyê yên din hazir dikirin. Ev tenê ji bo Hikumdarê Mezin û dawetîyên wî bû; ji beşa din ya artêşê re tenê bi qasî têrê bike xwarin dihat dayîn; dema ku artêş dihat çadirek hazir li hêvîya Xerxes bû; ew di wê çadirê de dima; artêş leşkergeha vekirî vedida. Dema ku wextê xwarinê dihat xwedîyê malan mecbûr diman bikevin zehmetîyên gelek mezin; dema ku mêvanan zikê xwe tijî dikirin, şev li cihê diman derbas dikirin û roja din sibehê, çadir difelişandin, firax û tepsî çi hebûn tevde berhev dikirin, bi vî awayî xwedîyê malê dişelihandin û piştre diçûn.

[120] Ev rewş e ya ku bi Megakreonê Abderayî ev gotina xweş daye gotin. Ji Abderayîyan re gotîye, bila jin û mêr tev berhev bibin bazdin perestgehê û ji bo hikumdar Xerxes rojê du dan xwarin naxwe ji îlahan re şikur bikin û ji vir şûn ve ji nîvê belayên bên serê wan ew bên parastin bela dua bikin; ji ber ku heke ji bo xwarina êvarê jî mecbûr bimana xwarineke wiha derxînin, wê Abderayî, yan li hêvîya vê êrîşa qirika Xerxes nemana û xwe vedizîna, yan jî biketina nav felaketeke mezin a feqîrîyê, wê ji herduyan bi yekê razî bûna.

[121] Van miletan gelekî zehmet bûya jî ev emir bi cih dikirin. –Xerxes, li Akanthosê ji hêza deryayî veqetîyabû, hêza deryayî şandibû Thermayê, ji fermandaran re gotibû li wir li hêvîya wî bimînin; ev Thermaya ez dibêjim, li Kendava Thermaîonê ye û kendav navê xwe ji vî bajarî werdigire. Xerxes hîn bûbû rêya herî kurtevebir jê re ev rê ye. Ji Dorîskosê heta Akanthosê pergala meşa artêşa bejahîyê bi vî awayî bû: Artêş bûbû sê beş, yek ji qiraxê deryayê teqîb dikir, bi hêza deryayî re têkilî datanî, li ser vê artêşê Mardonîos û Masîstes hebûn; beşa duyem di bin fermandarîya Trîtantaîkhmes û Gergîs de di hindur de diçû; Xerxes di beşa sêyem de bû, vê beşê navend digirt, li ser wan Smerdomenes û Megabyzos hebûn.

[122] Hêza deryayî ya Xerxes derxist rê, serê wê yê din kanala Çiyayê Athosê ya vedibe kendava ku bajarên Assayê, Pîlorosê, Sîngosê û Sartayê lê ne derbas kir û ji sîteyan jî ji nû ve esker berhev kirin. Piştre rabû, ber bi kendava Thermayê ve ket rê, li Pozê Ampelosê yê li ser Kendava Toronayê fitilî û li seranserê bajarên Toronayê, Galesposê, Sermyleyê, Mekybernayê û Olynthosê dirêj bû, ji van bajaran jî esker û keştî berhev kirin. Navê vê herêmê Sîthonîa ye.

[123] Hêza deryayî ya Xerxes, piştî vê ji zinarê Ampelosê rast li Pozê Kamastraîon yê niçika herî dirêj ya Girava Pelleneyê ya Mezin xistîye, ji Potîdaîa, Aphytîs, Neapolîs, Aîge, Therambo, Skîone, Mende û Saneyê keştî û tayfe berhev kirine; berê yê jê re Phlegra dihat gotin ew sîteyên li ser Girava Palleneyê ev bûn. Hêza deryayî ev qirax saxtî kirin, ber bi cihê hevdîtinê ve ba dan babirkên xwe, di rê da li sîteyên hatin pêşîya wan teqwîye wergirtin, navê van sîteyên rexê Nîvgirava Palleneyê û li ser sînorê Kendava Thermayê ev in: Lîpaksos, Kombreîa, Lîsaî, Gîgonos, Kampsa, Smîla û Aîneîa. Ev welat erdê Krossaîa ye, îro jî navê wê eynî ye. Hêza deryayî ji bajarê dawîyê yên min navê wan hijmartin ji Aîneîa derket, vê carê raste rast li Kendava Thermayê û Mygdonîayê xist û rêya girtibû ew rast gihand bajarê Thermayê, Sîndosê û Khalestraya li ser çemê Axîosa ku Mygdonîa û Bottîaîayê ji hev vediqetîne cihê wê rêwîtîya wan ew bigihandinayê ku, ev şerîdê qiraxê teng yê bajarên Bottîaîa, Îkhnaî û Pelayê digre.

[124] Hêza deryayî li vir, li Axîos û Thermanê û li hemberî bajarên di navbera du sînoran de lenger avêt; li wir li hêvîya hikumdar bûn; di vê navî re

Xerxes û artêşa wî ya bejahîyê ku ji Akanthosê rabibû, ji navenda welat ber bi Thermayê derketibû rê. Paîonîke û Khrestonîke derbas kir û ber bi çemê Ekheîdorosê yê ji Khrestonîkeyê dizê û Mygdonîayê av dide û dirije nav guhê deryaya nêzîkî Axîosê.

[125] Dema di vê herêmê re derbas bûn, şêran êrîşî deveyên erzaq dikişandin kirin. Şêr bi şev ji şikefên xwe derdiketin û ji çiyê dihatin xwarê; dest ne didan heywanên din ên bar û ne jî insanan; qurbanên wan tenê deve bûn. Min qet fêm nekir, ew hêza ku şêr ji êrîşa insanan û heywanên din radigirt û tenê êrîşî deveyan yê qet nedîtibûn dikirin çibû, min fêhm nekir.

[126] Bi rastî li van deveran şêr û gayên kovî yên sturehên wan dirêj gelek in; van sturehan tînin Yûnanistanê. Mirov di navbera çemê Nestosê yê li Abderayê diherike û çemê Akheloosê yê li Akarnaîayê diherike rastî şêran tê; mirov ne li Ewrûpayê yê dikeve milê din ê Nestosê yê qismê ber bi rojhilatê ve dirêj dibe û ne jî li rojavayê Akheloosê û li tu cihê bejahîyê rastî şêran nayê, ew tenê di herêma navbera van herdu çeman de dijîn.

[127] Dema ku Xerxes gihişt Thermayê, bi artêşê baregeh da vedan. Baregeh bi vî awayî li temamê qiraxên deryayê dirêj bibû: Bajarên Thermayê û Mygdonîayê digirt nav xwe û heta çemên Lîdyasê û Halîakmonê yê ava wan tevlihev dibe diçe ku Bottîaîa û Makedonîa ji hev vediqetîne. Belê hêzên barbar li vî welatî qonaxên xwe vedan û ji nav wan çemên min hijmartin, tenê rûbarê Ekheîdorosê yê ji Krestonaîyê tê, ava wê têra artêşê nekirîye û zuwa bûye.

[128] Xerxes, ji Thermayê şûnve çiyayên Thessalîayê, Olympos û Ossayê seyr dikir; ev çiya ecêb bilind in; hîn bû ku li wir gelîyek heye û çemê Peneîosê têde derbas dibe; dema ku jê re gotin wê bikaribe ji vê navbirê derbas bibe û bikeve Thessalîayê, daxwaza dîtina devê Peneîosê kir û ji bo vê jî ket hewesa siwarbûna keştîyê; lewre plan kiribû bikeve herêmên jor ê welêt, wê bajarê Gonnos derbas bikira û di îstîkameta Perrhaîbîa bi pêş de biçûya û xwe bigihanda Makedonîa ya li bakur. Li gor agahîyên stendibû ji bedêla di qiraxan re here ev rê hê ewletir bû. Wek ku zanîbû kir: Wek carên ku dixwest derkeve gerê bi vî awayî, dîsa siwarî keştîya Sîdonê bû, îşaret kir û emir da keştîyên din jî lenger hildin û artêşa bejahîyê di cih de hişt. Dema

gihişt cihê ku dixwest, devê Peneîos temaşe kir û ma şaş, bû heyran; kir ku klawûz bên, ji wan pirsî, gelo dikarin rêya vî çemî biguherin û bikin ku di cihekî din de biherike nav deryayê.

[129] Ji bo Thessalîayê dibêjin ku berê gol bûye, yanî her milê wê bi çiyayên bilind hatîye rapêçan. Bi rastî, li rojhilat pêşkên çiyayên Pelîonê û Ossayê dibin yek û pêşîya wê digrin; li bakur Olympos, li rojava Pîndos û li başûr ber bi herêma Notosê Othrys; navenda van çiyayan wekî leganê ye û jê re Thessalîa tê gotin. Lê di nav vê deştê re gelek çem diherikin; em ê pênc lib jê yên kifşe bihejmêrin: Peneîos, Apîdanos, Onokhonos, Enîpeûs, Pamîsos; ji çiyayên Thessalîayê dorpêç kirine tên xwarê li deştê dibin yek û wekî yek çem ji navbireke ne fireh derbas dibin û dirijin nav deryayê; berîya bigehin vir tevlî hevdû dibin; dema ku bûn yek, navê Peneîosê ya serdestî tevan distîne, navê yên din nahêle û êdî ew bê nav dimînin. Lê wisan tê fêhmkirin ku, ev navbira vedibe deryayê berê tunebûye; ev çemên han û ji bilî van çeman Gola Boîbeîsê wekî îro wî wextî jî navê wan tunebû, lê cardin li wan erdan diherikîn û ava hildigirtin temamê Thessalîayê dikirin çarşefeke ji avê. Thessalîayî dibêjin ku, Poseîdaon navbira Peneîos tê de diherike vekirîye; ev ewqas jî ne şaş e; ji ber ku piştî bawerî kirin erdhej ji alîyê Poseîdaon ve tê kirin û ew qelşên ji ber erdhejê çêbûne karê vî xudayî ye, ya ez dibêjim jî dikare bê gotin ku karê Poseîdaon e; ji ber ku li gor ez jî dibînim ev çiyayên han di netîceya erdhejê de qelişîne.

[130] Ji bo pirsa Xerxes ya di warê Peneîosê de ku ji cihekî din biherikîne deryayê, rehberên wir baş dizanîn bersiv dan. "Nabe berê çem vegerînin cihekî din; tenê vir heye, ji ber ku temamê dora Thessalîayê çiya ne." Tê gotin wî wextî Xerxes wiha gotîye: "Ev insanên Thessalîayê kesên biaqil bûne; di destpêkî de berê xwe zivirandine û ji xetereyan bi taybetî ji yên herî giring pêsîrê xwe filitandine; welatekî wan heye ne mezin e, ne jî zehmet e bi dest bê xistin; tek karê bikaribe bê kirin, devê çem bê xitimandin, kanala niha tê de diherike bê birîn û herikandina vê avê ber bi cihê jê tê paş de bê vegerandin, bi vî awayî wê temamê Thessalîayê di bin avê de bimîne, ji derveyî avê tenê wê çiya bimînin." Berê xwe dabû Thessalîayên ji nesla Aleûas yê cara pêşî ji nav Yûnanan teslîmî hikumdar bûbûn û ev digotin. Xerxes bi vî awayî diaxivî, ji ber ku dema wan pêşniyaza hevalbendîyê jê re dikirin, wî

digot qey ew li ser navê temamê welat diaxivin. -Piştî li van deran temaşe kir û ev gotinên dîrokî gotin vegerîya Thermayê.

[131] Li Pîerîayê çend rojan ma; ji ber ku ji bo temamê artêşê bikevin Perrhaîbîayê, ji sê behra yekê artêşê mijûlî jêkirina daristanên li ber pêşkên Makedonîayê bûn. Çawîşên ji bo ji Yûnanistanê av û ax bixwazin hatibûn şandin, dema ku ew li vir bû paşve vegerîyan; hinek jê destvala vedigerîyan û hinekan jî av û ax dianîn.

YÛNANISTANA LI HEMBERÎ XERXES

[132] Miletên av û ax dane ev in: Thessalîayî, Dolopî, Enîenî, Perrhaîbîayî, Lokrîsî, Magnetîayî, Malîsî, Akhaîayên li Phtîotîsê, Thebaîyî, Thespîayî û Boîotîayên li derveyî Plataîayê dimînin. Yûnanîyên li hemberî barbaran rawestîyane, ji bo van miletan bi vî awayî sûnd xwarine: Temamê miletên ji nesla Yûnanê yên bê şer teslîmî Persan bûne, dema ku rewş baş bû, wê bi dayîna ji dehan yekê hebûna xwe bên cezakirin û ev, wê vê bidin perestgeha Delphoîyê. Yûnanîyan bi vî awayî sûnd xwaribûn.

[133] Xerxes, ji ber vê yekê kesek ji bo daxwaza av û axê neşandibû Atînayê û Spartayê: Berîya niha, dema ku Daryûs ji bo vê mebestê qasid dişandin, yek ji van miletan ew çawîşên ji bo vê wezîfeyê hatibûn gindirandîye barathronê,[268] yê din jî avêtîyê bîrê, herduyan jî gotine, bila ew ax û ava Hikumdarê Mezin xwestîye, ji wê derê derxin û bibin. Belê, ji ber vê Xerxes kesek neşandîye ba wan. Ji bo helwêsteke wiha li hemberî qasidan dan nîşan, çi hatîye serê Atînayîyan, ez nikarim vê bêjim; tiştî ku ez dizanim, erd û bajarên wan tarûmar kirine, tiştek di wan de nehiştine, lê ez ne bawer im ev netîceya wê kuştinê be.

[134] Lê Lakedaîmonî, rastî xişma qasidê Agamemnon Talthybîos hatine. Ji ber ku li Spartayê perestgeheke Talthybîos heye, îro yên ji nesla wî hatine hene, Talthybîadî tê gotin û wextê pêwist be wezîfeya qasidîyê ya resmî ya Spartayê, wekî rûmetekê dane wan. Piştî wê cinayetê, dema ku Spartayîyan

268 Ji kortika ku mehkûm diavêtinê 'barathron' digotin.

qurban jê kirine û bi îlahan şêwirîne, bersivên baş negirtine. Û ev rewş bi vî awayî dirêj bû. Lakedaîmonîyên gelekî li ber ketin û hindurê wan kete tengasîyek xedar, çend caran Meclisa Xelkê berhev kirin û di dawîyê de kirin ku nuçebirek bang bike bêje "Ma kesekî Lakedaîmonî tune bixwaze di rêya Spartayê de bimre". Li ser vê Sperthîesê kurê Anerîstos û Bûlîsê kurê Nîkolaos hatin, herdu jî ji malbatên Spartayî yên baş bûn û ji rêza yêkê xwedî kesên dewlemend bûn. Ew ji bo tola qasidên Daryûs yê li Spartayê hatin kuştin bê wergirtin, bi dilxwazî qebûl kirin ku biçin teslîmî Xerxes bibin. Spartayîyan ji bo ew bên kuştin ji Medan re şandin.

[135] Bi rastî ji bo mêrxasîya van kesan tiştek tunebû ku bê gotin; gotinên wan jî ji ne kêmî vê helwêsta wan e. Dema ku ber bi Sûsayê ve ketin rê, çûn Hydarnes dîtin. Hydarnes, ji nesla Persan bû û fermandarê miletên qiraxê Asyayê bû. Ew vexwendin, anîn ser sifreya xwe û dema ku di bin banê wî de bûn, ji wan pirsî: "Ji bo çi hûn Lakedaîmonî, ji dostîya Hikumdarê Mezin ditirsin? Hûn dibînin hikumdar çawa rêz li kesên bi qîmet digre; belê li min û serweta min binêrin. Hûn jî teslîmî wî bibin (ji ber ku qîmet dide we jî), Hikumdarê Mezin, wê li ser erdê Yûnanê axên mezin bide we, hûn ê bibin efendîyê wir." Wan di miqabilî van gotinan de wiha bersiv dan: "Hydarnes, ew nesîheta tu li me dikî di xalekê de qels e: Tu ku nesîhetan li me dikî, tu ji du rewşan tenê yekê dizanî, tu ji ya din ne agahdar e; tu dizanî koletî çiye, lê tu azadî çiye, tehl e, şêrîn e, te qet tahm nekirîye, tu nizanî. Heke tu rojekê wê tahm bikî, ne bi riman, tê şîretê li me bikî ku em wê bi biviran biparêzin." Wan bi vî awayî bersiv dan Hydarnes.

(136) Ji nav welat heta Sûsayê çûn û wan derxistin pêşberî Hikumdarê Mezin. Eskerên parastinê di serî de li wan emir kiribûn ku li pêşberî hikumdar secde bibin û li ber lingên wî erdê maçî bikin; piştre xwestibûn vê bi zorê bi wan bidin kirin; lê wan bersiv dabûn ku bi zorê serê wan bitewînin jî, wê cardin ya ew dibêjin nekin. Li ba wan adeteke ji kesekî re secde kirin tune û nehatine vir ku xwe bi kesekî şelaf bikin. Piştî bi zorê ji ketina vê rewşa nizmketinê filitîn, ji hikumdar re bi kurtî wiha gotin: "Ey hikumdarê Medîyan, Lakedaîmoyan em ji bo hûn toleya ew qasidên li Spartayê hatine kuştin werbigirin şandine." Li hemberî zimanekî wiha Xerxes bi dilnizmî nêzîkî rewşê bû: da xuyakirin ku ew naxwazin bibin wekî Lakedaîmonîyan; wan

bi kuştina qasidan ûrf û adetê temamê insanên medenî ku rêz lê tê girtin binpê kirine; ew tiştî ew pê tawanbar dikirin nikare bike; nedixwest qasidê wan bikuje û Lakedaîmonîyan ji tawanê wan paqij bike.

[137] Piştî vê helwêsta Spartayîyan û vegera Sperthîes û Bûlîs, hêrsa Talthybîos ji bo demekê daket û nerm bû. Lê tê gotin gelek salan şûnve Lakedaîmonî, di dema şerê Peloponezê û Atînayîyan de careke din gurr bû. Bi min wisan xuya dike ku, ev yek ji wan bûyeran e tê de tilîya xudayan baş tê dîtin. Hêrsa Talthybîos dikarîbû li van herduyan bida û cardin dikarîbû netefîya, dikarîbû bê gotin ya heq ev bû; lê ji bo wî teskîn bike, di lêdana zarokên kesên heta Sûsayê çûbûn, Nîkolaosê kurê Bûlîs û Anerîstosê kurê Sperthîes -ev ew kes e ku tev keştîya ticaretê ya tijî esker, Halîeîsa kolonîya Tîrynsê bi dest xistîye- ez bi awayekî vekirî destê îlahan dibînim; Sîtalkesê kurê Teresê(324) hikumdarê Thrakê û Nymphodorosê kurê Pythesê Abderayî xayîntî bi van kurên ji Lakedaîmonîyan wezîfeya qasidîyê wergirtibûn kirine, li Bîsantaya Hellespontosê hatine girtin, birine Attîkayê û ji alîyê Atînayîyan ve, bi Arîsteasê kurê Adeîmantos ê hemwelatîyê Korînthosê re hatine kuştin. Ev bûyerên bi salan piştî sefera Hikumdarê Mezin in. -Ez cardin vedigerim ser çîroka xwe.

[138] Dihat xuyakirin ku sefera hikumdar li hemberî Atînayê ye, lê di eslê xwe de li hemberî temamê Yûnanistanê bû. Yûnanîyan zûde xeber wergirtibûn, lê di nav wan de hevdengî tunebû. Yên razî bûn av û ax dan hikumdarê Persê, bawer dikirin ku wê xerabîyek ji barbaran nebînin; hindurê wan rehet bû. Yên razî nebûn av û ax bidin, di nav tirsê de bûn; li Yûnanistanê bi qasî li hemberî lêdana îşgalkeran raweste keştî tunebûn, wan ev dizanîn, wan ev jî zanîbûn ku, piranîya miletan, şer li hemberî şer nedixwestin, tenê hewl didan ku dilê Medan bi xwe xweş bikin, tiştekî din nedifikirîn.

[139] Hêza rastîyê, zor dide min ez biryareke qederek dijmin ji bo min peyda bike bidim xuyakirin, lê cihê ku ez ê rastîyê derxînim holê, nikarim zorê bidim xwe û bêdeng bimînim. Heke Atînayîyan, ji îşgala bisaw ketibûna tirsê û welatê xwe terk kiribûna û yan jî di cihê terkirina wir de, ji bo li wir bimana teslîmî Xerxes bûbûna, di deryayê de kesekî nikarîbû li hemberî hikumdar derkeve. Dema di deryayê de kesek li hemberî Xerxes nesekinîya jî li vir wê ev biqewimîya: Em bêjin ku li Korînthosê, ji bo Îsthomasê li pey hev dîwar

lê kirin û Peloponez veqetandin; cardin tiştek dernediket; wê hevalbendên Lakedaîmonê yên ketine hawara canê xwe, mecbûr bimana xayîntî pê bikirina, ji ber ku hêza deryayê ya barbaran wê yek bi yek bajar bistendina; wê Lakedaîmonî bi tena serê xwe bimana û dema ku tenê bi serê xwe bimana jî wê mûcîzeyên mêrxasîyê biafirandina û bi mêrxasî bimrana, wê ji destê wan tiştekî din nehata. Yan wê ev wiha bûya yan jî wekî mîsala Yûnanîyên berê serî li ber Medan tewandibûn, wê bi Xerxes re li hev bikirina. Bi vî awayî di herdu halan de jî wê Yûnanistan biketa bin desthilata Persan; ji ber ku piştî hikumdarê Persê derya kir destê xwe, wê ew dîwarê ji bo Îsthmosê bibire bi kêrî çi bihata? Min ev bi tu awayî fêhm nekirîye. Ji ber vê dema ku tê gotin Atînayîyan Yûnanistan rizgar kirin, mirov xwe ji rastîyê dûr naxe; ji ber ku wan kîjan teref bigirtina, wê kefeya mêzênê ber bi wî milî ve bişkesta û dana biryara domandina hebûna Yûnanistanê û mabûna bi awayê azad, temamê miletên din yên Yûnanistanê yên teslîmî Medan nebûne hişyar kirin û bala wan kêşan û Hikumdarê Mezin paşve avêtin -bêguman piştî îlahan- ew bûn. Heta kehaneta ji Delphoîyê hat û tirseke mezin kir dilê wan, têrê nekir ku Yûnanistanê berdin biçin; di mewzîyên girtibûn de man; bê tirs li hêvîya yên dixwestin bên û welatê wan ji destê wan bistîne man.

[**140**] Atînayîyan, ji bo ku bi kahîn bişêwirin qasid şandibûn Delphoîyê; piştî merasimên adet bû di perestgehê de bên kirin temam bû, qasid ketin salona mezin, derbasî cihên xwe bûn û ji Pythîa ku navê wê Arîstonîke bû, ev kehanetê wergirtin:

Nesekine li vir; ey dîn, bimeşe, bicehime
Bajarê xwe, serbanên xwe û hîsarên pişta xwe dane zinaran
Berde, baz bide heta milê din î dinyê.
Gewde ne saxlem e, serî diheje; organên,
Dest, ling û gewde hemî perçe perçe;
Êdî bawerî bi bextê wan nayê kirin, rima wî tûj
Ares, ji nav tofanên agirîn
Erebeya xwe ya Surîye dajo ser wan
Li ser hîsarên hilweşîyayî bircan dirûxîne!
Perestgehên bêhijmar avêtine ber devê agirên têr nabin!
Peykerên îlahan bi vî şerê hişk diheje,
Ji rûyên wan xwêdanên sar vala dibe.

Elametên xerab ji bo dahatîya bextê wê
Li ser serayên wan xwînekê reş dinizile.
Derkeve ji perestgeha min û ji bo ji mirinê netirse
Li ser derbeyên wan bila mêrxasîya te bibiriqe.

[141] Qasidên Atînayê yên ev gotinên siberojê didin nîşan seh kirin, ketin nav tengasîyeke mezin. Ji van xeberên bi bele yên dan wan, ketin nav tirseke mezin û hêvîyên xwe wenda kiribûn ku, Tîmonê kurê Androbûlos yê hemwelatîyê Delphoîyê û kesê herî bijarte yê bajêr, şîret li wan kir ku şaxeke zeytûnê bigrin destê xwe û careke din biçin ba kahîn û hêvî û lavayan jê bikin. Atînayîyan wisan kirin, çûn li pêşîya kahîn rêz bûn û gotin: "Mîr, ji bo welatê me ji me re hinek tiştên bawerî bidin bêje; ji bo em derkevin hizura te bi eşqê ev şaxên me girtine destê xwe duayên me qebûl bike; yan na kesek nikare me ji perestgeha te derxîne; pêwist be em ê heta mirinê li vir bimînin." Li ser van gotinan kahîn ev kehaneta duyem da:

Parastina Pallas Athene ya kurt bi kêrî têştekî nehat;
Efendîyê Olymposê ji duayên wê re kerr ma; Lê
Ez ê ji te re careke din biryara xwe ragihînim, Pola ya
avdayî ji kevirê herî hişk hişktir dibe.
Axa Kekropsê, pêşkên îlahî yên Kîthaîronê,
Wê tev ji dest biçin, lê
Zeûsê xwedî awirê asîmanî, kemereke newqê ya ji dare dibexşîne,
Tenê tiştê li ser pêyan disekine, li hemberî barbarîyê
Wê ji bo zarokên te û ji bo te bibe dîwarê rizgarîyê.
Di cihê xwe de bê tevger nemîne, li hêvîya
Mehînên wê axa te biperçiqînin,
Û eskerên zêde yên miletên dijmin;
Pişta xwe bidê, tê rojekê wan ji nêzîk ve bibîne
Ax! di nav zarokên fanî de ev çiqas şîn,
Salamîsa îlahî, di cihên te yên pîroz de
Demeter bela baqên çandinîyan girê bide yan jî berhev bike!

[142] Ev bersiv ji qasidên Atînayê re hîn nerimtir xuya dikir -rastî jî wisan bû-; ew nivîsandin û ketin ser rêya Atînayê. Dema ku zivirîn û kehanet nîşanî Meclisa Xelkê dan, ji her serî dengek derket, herkesî li gora xwe şîrove

dikir; em ê li vir tenê behsa du nêrînên dijî hev bikin: Heke em li kalan binêrin, xuda dixwest bide nîşan ku wê Akropol li ber xwe bide; ji ber ku wextekî di borîya Atînayê de, wisan çêbûye Akropol bi dîwareke ji singan çêkirî hatiye girtin. Kemera piştê ya darîn bi vî awayî şîrove dikirin. Li gor yên din, xwedê keştî qest dikir û ji hemwelatîyên xwe re digot, dev ji tiştên din berdin û bangî techîza keştîyan dikir. Lê yên dîwarê darîn wek keştî şîrove dikirin, hersê rêzên dawî yên Pythîayê ew şaş dikirin:

Ax! di nav zarokên fanî de ev çiqas şîn,
Salamîsa îlahî, di cihên te yên pîroz de
Demeter bela baqên çandinîyan girê bide yan jî berhev bike!

Ev gotin, şîroveyên ji dîwarên darîn ên navdar re keştî digotin seqet dikir; ji ber ku şîrovekarên kehanetê yên fermî ev weke xeberek bê oxir hesêb dikirin, yanî ev agahî dida ku heke şerê deryayî çêbibe wê Atîna li nêzîkî Salamîsê têk biçe.

THEMÎSTOKLES

[143] Di nav Atînayîyan de kesek hebû, ew demek bû di nav siyasetmedaran de derketibû pêş; navê wî Themîstokles bû û bi navê kurê Neokles dihat naskirin. Ev hemwelatî, bal kişand ser wê yekê ku şîrovekarên fermî ji sedî sed li ser her bêjeyeke kahîn tiştek negotine; wî digot ku heke bi rastî, hevoka mijara minaqeşeyê ye Atînayî qest bikira sifeta dihat bikaranîn, li gor fikra wî evqas qencîxwaz nedibû; îlah wê bigota "Salamîsê reben" nedigot "Salamîsê Îlahî", heke yên di vê giravê de dijîn, li qiraxên wê bimrana. Naxêr, heke daxwaz heye manaya kehanetê tam bê fêhimkirin, bi vê hevokê îlah ne Atînayî, dijmin qest dikir. Ji bo vê pêwist bû amadekarîya şerê deryayî bikin, ji ber ku dîwarên dar bi awayekî zelal keştî bûn, Atînayîyên guhê xwe dan şîroveya Themîstokles, ev ji îzaha şîrovekarên fermî zêdetir bi sûd dîtin, ji ber ku şîrovekarên fermî, nedixwestin ji bo şerê deryayî amadekarî bê kirin, temamê xwesteka wan, li hemberî dijmin dest nedin çek, herkes welat terk bike û biçe, ji xwe re Attîkayeke din bibînin û tê de bi cih bibin.

[144] Themîstokles, berî wê jî tam di wextê wê de bi pêşniyaza qanûnekê serkeftin bi dest xistibû: Malîya Atînayê ketibû qezenceke giring, ev hatinî ji ma-

denên Laûrîonê dihatin û ev pere wê bi awayê serê her mirovî deh drahmî di nav hemwelatîyan de bihata parvekirin. Themîstokles, pêşniyaz kiribû ku di cihê ev pere bê belavkirin, ji vê hatinîyê sûd bê wergirtin û 200 keştî deynin ser dezgehan; ew li hemberî Aîgînayê şer difikirî. Û ew şer bû ya di navbera herdu miletan de qewimîbû kiribû di vê dewra em tê de Yûnanistan rizgar be, ji ber ku wî zor daye Yûnanîyan j ibo bibin deryavan. Keştî bi mebesta hatibûn çêkirin nehatin bikaranîn; lê Yûnanistanê tam dema pêwist bû ew hazir dîtin. Ev keştî wî wextî di destê Atînayê de hazir bûn, lê pêwist bû hinek din jî bên çêkirin. Hevdîtinên li ser kehanetê hatin kirin, ji bo di deryayê de bi barbarên Yûnanistan istîla kirine têkevin hemberî hev, bi netîceya biryara esker li keştîyan bên siwarkirin dawî lê hat; xuda wiha emir dikir, wê bi Yûnanîyên dixwazin di şerê deryayî de tevlî wan bin, bibin yek.

[145] Kehaneta dabûn Yûnanan wiha bû. -Yûnanîyan, menfeetên Yûnanistanê li ber çav girtin, wekî meclisa federe berhev bûn, rewş vekolan, bi sûndên beranber bi hev ve hatin girêdan; berhema hevdîtina yekem, berîya her tiştî hêminkirina ew kîna li hemberî hev û dawîlêanîna ew xirecirên di navbera wan de bû; şerê herî giran yê di navbera Atînayê û Aîgînayê de bû. Piştre dema ku xeber girtin Xerxes bi artêş ve hatîye Sardesê, biryar dan ji bo hîn bibin çi diqewimin çavdêr şandin Asyayê, ji bo tehlîkeya Persê pêkanîna peymana parastina mişterek qasid şandin Argosê û ji bo xwestina alîkarîyê ji Gelonê kurê Deînomenesê li Sicîlyayê, ji Kerkyrayê re û Girîtê re qasid şandin; armanca wan, heke mimkun be, pêkanîna yekîtîya cîhana Helenê, pêşkêşkirina tehlîkeyeke nêzîk a wê bê serê Yûnanîyan, pêwistîya dayîna bawerîyê ya mil bi mil û li rexê hev şerkirin bû. Ji Gelonê, ji wan dewletên din yên Yûnanistanê gelek zêdetir û mezintir hêvîya alîkarîyê hebû.

[146] Piştî ev biryar hatin girtin dawî bi nakokîyên di navbera xwe de anîn, karê pêşîn şandina çavdêran ya Asyayê bû. Ew hatin Sardesê, ji nêz ve artêşa Hikumdarê Mezin lêkolîn, lê hatin girtin û piştî ji alîyê fermandarê artêşa bejahîyê ve lêpirsîna wan hat kirin, ji bo ku bikujin avêtin girtîgehê. Wê serê wan hatiba jêkirin, wisan biryar hatibû dayîn; lê Xerxes ku ev xeber wergirtibû, ji vê biryara fermandaran hez nekir; emir kir, yek ji parêzvanê xwe şand, heke wan sax bibîne, gerek bigre jê re bîne. Dema parêzvan hatin ba wan hê serê wan jê nekiribûn, Ew girtin birin pêşberî Hikumdarê Mezin,

hîn bû ku ji bo çi hatine; piştre emir da parêzvanên xwe, wê klavuz danîna rexê wan, çi bixwestina wê bikirina; temamê artêşa bejahîyê, bi siwarî û peyadeyên wê ve wê şanî wan bikirina û çi wextê bixwestina, bêyî xerabîyekê bibînin wê biçûna.

[147] Sebebê van emrên xwe îzah kirine: Heke sîxûrên wan bihatina kuştin, Wê Yûnanî di pêşîyê de mezinahîya nayê gotin ya hêza wan nizanîbana û wendakirina sê kesan ji bo dijmin zerar nedihat hesêbkirin; lê dema ku ew vegerîyana Yûnanistanê, Yûnanîyên çavkanîya mezinahîya wan hîn bûna, bê li hêvîya îşgalê bimînin, wê bi xwe bihatina û azadîya xwe bikirina nav destê wî û wê pêwistî nedîtina li hemberî wî derkevin seferê, yanî hesêb dikir wê wiha bûya. Ev fikra Xerxes tiştekî din bi bîra min anî: Wextê Xerxes li Abydosê bû, hatina keştîyên tijî genim dîtibû, ew ji Eûxeînosa Pontosê dihatin; wê derbasî Hellespontosê bibûna û ji bo barên xwe vala bikin wê biçûna Aîgînayê û Peloponezê. Dema ku yên lê dinêrîn, fêm kirin ev keştîyên dijmin in berê xwe dan hikumdar, ji bo dest deynin ser keştîyan li hêvîya îşaretekê bûn. Xerxes ji deryavan pirsî ka gelo diçin ku: Wan gotin, "Ezbenî, em van geniman ji dijminê te re dibin." -Xerxes got "baş e, gelo em bi xwe naçin ew cihê wê ev biçin? Li rexê gelek tiştên din, genimên me bi xwe jî tune? Ew jî vî genimî ji bo me dikşînin, ma qey xerab e?"

[148] Piştî sîxûran her tişt dîtin û lêkolan, derketin rê û vegerîyan Yûnanistanê. -Yûnanîyên li hemberî Persîyan yekîtî çêkiribûn, piştî sîxûr derxistibûn rê, qasid şandibûn Argosê. Argosîyan li wir çi diqewimin bi vî awayî qise dikirin: Wan, li gor gotina wan bi xwe, di destpêkê de zanîbûn ku barbar li hemberî Yûnanistanê dest bi hazirîyê dikin; di vê navê re zanîbûn wê Yûnanî, li hemberî Persîyan ji wan alîkarîyê bixwazin, ji bo ji îlahî bipirsin ka gelo kîjan terefê bigrin hê baştir e, ji Delphoîyê re şêwirmend şandibûn; ji ber ku Lakedaîmonî û Kleomenesê kurê Anaksandrîdas, hê nû şeş hezar hemwelatîyên wan yên din kuştibûn, ji bo vê heqqê wan hebû ku bixwazin bişêwirin. Pythîa, di bersiva pirsên wî de ev kehanet dayê:

Yê ku hinek diranê xwe jê re tûj kirine, lê evîna
Yên li asman rûnîştî ne, rima xwe rehet bihêle
Çavê xwe baş veke û bimîne li hêvîyê, di tetikê de be; herî zêde
Serê xwe biparêze, ji ber ku heke serî xelas bibe tiştek bi gewde jî nayê.

Kehaneta ku Pythîa dabû wiha bû; piştre dema ku qasidên Yûnanistanê hatin Argosê ew birin salonê û wezîfeya wan çiye qise kirin. Argosî wekî bersiv, gotin ku çi ji wan bê xwestin, amade ne bikin, tenê lazim e pêşî di navbera wan û Lakedaîmonîyan de lihevhatineke sihsalî bê çêkirin, yek jî di serokatîya koalîsyonê de, nêvî bi nêvî beşdarî fermandarîyê bibûna; di eslê xwe de fermandarîya bilind bi temamî mafê wan bû; lê ew razî bûn ji duduyan yekê wê parve bikin.

[149] Li gor Argosîyan, bersiva meclisê da ev bû; li gel vê jî kahîn ji wan re hevalbendîya Yûnanîyan qedexe kiribû; lê li dijî derketina kahîn jî be, gelekî dixwestin peymaneke çekdanînê ya sihsalî çêkin, wê di vî midetî de zarokên wan mezin bibûna û bibûna mirov. Heke peymana çekdanînê çênebe, ew felaketa berî niha lê rast hatin, wê ya Persan jî bê ser, wî wextî wê ji ketina bin desthilata Spartayîyan rizgar nebin. Piştî biryara meclisa Argosê hat xuyakirin, qasidên Spartayê axiftin û gotin: "Em ê mijara peymana danîna çekan ji miletê xwe re bêjin." Herçî meseleya fermandarîyê ye, di derheqê bersiva di vî warî de biryara pêwist bû wergirtibûn; yê Argosîyan hikumdarek yê wan jî du hikumdarê wan hebûn; sitendina mafê hikumdarekî Spartayî ji destan, bêguman ne tiştekî kirinê bû; astengek tunebû ku hikumdarê Argosê jî wekî yê wan mafê wî yê yek dengî hebe. Tê gotin Argosîyan gotine tehemila wan ji vê rewşa Spartayîyan a pozbilindîyê tune; ji qasidan re gotin ku, berîya roj derkeve axa Argosê terk bikin, yan na wê miameleya dijmin bi wan re bikin.

[150] Gotinên Argosîyan yên li ser vê bûyerê eynî ev in. Lê li Yûnanistanê bi awayekî din tê gotin. Guya berîya Xerxes dest bi meşa li hemberî Yûnanistanê bike qasidek şandîye Argosê, qasid hatîye Argosê û wiha gotîye: "Gelî Argosîyan, Hikumdarê Mezin Xerxes vî emirî ji we re dişîne: 'Em Persî difikirin ku, em zarokên Perses in, Andromeda keça Kepheûs ew ji Perseûsê kurê Danae anîye dinyê. Ji ber vê wek pêwistîya me bi vekirina seferekê li hemberî bav û kalên me tune, hûn jî tenê ji bo hûn bîyanîyan biparêzin hewce nake hûn li pêşîya me bibin asteng; ya herî baş hûn jî rehet bisekinin, xwe tevlî vê tevlihevîyê nekin. Heke karê me baş biçe, miletekî ku em ji we bilindtir bigrin wê tunebe." Tê gotin li Argosê ev gotinên han şanseke mezin hat qebûlkirin; ji ber wê di dema niha de, xwestina tiştekî biçûk ji Yûnanîyan deyne milekî,

ji bo hevdîtineke biçûk jî xwe diparastin; heke Yûnanî di pêşerojê de ji wan bixwazin bikevin nav koalîsyonekê, wê ew jî mahnekê ku wan li rexekê bide sekinandin wê daxwazên xwe bidana pêş; wan baş zanîbûn ku Lakedaîmonî bi tu awayî fermandarîyê bi wan re parve nakin.

[151] Ji bo mildanaberîya vê derbirînê di nav hinek Yûnanîyan de, çîrokeke din a piştî bi salan çêbûye tê gotin: Qasidên Atînayê li Sûsaya li bajarê Memnonê bûn, ji bo karekî bangî wan kiribûn. Personelên sefaretê û Kallîasê kurê Hîpponîkos hebûn; di wê navê re qasidên Argosîyan jî li Sûsayê bûn; qasidan ji ArtoXerxesê kurê Xerxes pirsîne, gelo ew peymana çekdanîna bi Xerxes re çêkirine hê derbasdar e, yan wan dijmin hesêb dikin. ArtoXerxesê hikumdar bersiv daye ku ew ji hemî deman zêdetir derbasdar e û ji bo wî tu sîte bi qasî Argosê bi qîmettir nîn e.

[152] Gelo bi rastî Xerxes çawîşekî nûçeyan û agahîyeke wiha şandîye Argosê? Qasidên Argosê yên şandine Sûsayê di warê peymana çekdanînê de li devê ArtoXerxes gerîyane? Ez nikarim tiştekî bêjim, ez li ser hesaba xwe, didim xuyakirin ku ez bi gotinên resmî yên Argosîyan re me. Ez tenê tiştekî dizanim ku, ji bo insan qisûrên kirine bi hevdû biguherin wan raxin holê, wê bibînin yên din çiqas xerab in, wê cardin qisûrê xwe, hem jî bi hezkirîyeke mezin hildana û biçûna. Wekî vê, li ser wijdanê Argosîyan jî giranîyeke wiha tune. Wezîfeya min ew e ku, çi ji min re hatîye gotin, wê bidim. Em bên ser bawerkirinê, tiştek nikare min mecbûrî wê bike û ez vê ji bo temamê yên min gotin dibêjim. Ji bilî vê, li ser ku guya Argosîyan bangî Persan kirine bên Yûnanistanê, gelo nehatîye gotin ku çavê wan bi şerekî çekdarî yê bi Lakedaîmonîyan re nebirîye û rûmeta wan şikestîye, ji ber vê serî li rêyeke wiha dane?

[153] Li ser Argosan evqas. -Di nava qasidên çûn Sicîlyayê de ku Gelonê bigrin nav yekîtîya peymana çekdanînê, Syagrosê Lakedaîmonî jî hebû. Yek ji bav û kalê Gelonê, yê Gela kolonîze kirîye, ji girava Telosê ya nêzîkî Pozê Trîopîonê bû. Lîndosîyên Rhodosî û Antîphemosî, dema kolon anîn Gelayê, ew jî nehat jibîrkirin. Bi wextê re nevîyên wî, bûne hîerophantesê[269]

269 Hîerophantes, tê wateya vebêjê mysterê, hînker û rênîşandêr. Rê nîşanî kesên dixwestin bikevin terîqetê didan.

îlahên binerdî; ev rûmeta bilind, di malbatê de ji kesekî navê wî Telînes şûn ve yê ev maf qezenc kirîye dom dike tê û wî ev rûmet bi vî awayî bi dest xistibû: Hemwelatîyên Gelayê yên rûbirûyî xedreke gruba hemberî xwe bûbûn, xwe avêtibûn bajarê Maktorîonê yê li jorî Gelayê. Telînes ew paşve anîn Gelayê; li balê hêza çekdar tunebû, tenê elametên van îlahên pîroz hebû. Ez nikarim tiştekî bêjim ku wî ev çawa bi dest xist, gelo dizî, yan qezenc kir. Her çi hal be, di miqabilî soza yên ji vê neslê bên wê bibin hîerophantesê van îlahan, bawerî bi taybetmendîya xwe ya pîroz jî kir, yên koçber bûn paşve anîn. Ya ku min şaş dike, tiştên ez di derbarê de hîn bûme dibêjim, kesekî wekî Telînes çawa karekî wiha kir û qedand; karên wiha herkes nikare bide ber xwe û bimeşîne, ez baş bi vê bawer im, ji vê re dilekî polayî û mêrxwasî dixwaze; lê halbukî Sicîlyayî tam eksê vê, ji bo wî, kesekî jinewarî û gelek nerm e dibêjin.

[154] Belê, Telînes vê wezîfeyê bi vî awayî qezenc kirîye. -Piştî Kleandrosê kurê Pantares, heft salan li Gelayê hikumranî kir, bi destê Sabyllosê hemwelatîyê bajêr hat kuştin, Hîppokratesê birayê Kleandros îktîdara mitleq girtibû destê xwe. Di dema hikumranîya Hîppokrates de, Gelonê ji nevîyên Telînesê hîerophantes jî bi Aînesîdemosê kurê Pataîkos re û bi gelekên din re di yekîneya parastina hikumdar de bûn; di demeke kurt de xwe da nîşan, pêş ket û bû fermandarê temamê yekîneyên siwarî. Dema ku Hîppokrates ji bilî Syrakûsayê û gelek sîteyên barbaran yên din, Kallîpolîs, Sîcîlya, Naxos, Zankle û Leontînoîyê dorpêç kirin, Gelon bi rastî dabû nîşan ku eskerekî jêhatî ye. Ev bajarên min navê wan hijmartin, ji derveyî Syrakûsayê, yek jê li hemberî Hîppokrates, parêzgerîya azadîya xwe nekiribûn. Lê Syrakûsayîyên di şerekî li ser çemê Helorosê ku têk çûn, di saya Korînthosî û Kerkyrayîyan rewşa xwe baş kiribûn. Wan Hîppokrates, tenê bi stendina Kamarînaya ji dewrên kevin ve di destê Syrakûsayîyan de bû, ji bo çêkirina aştîyê razî kirin û bi vî awayî karîbûn Syrakûsayê rizgar bikin.

[155] Hyppokrates jî bi qasî birayê xwe Kleandros li ser hikumranîyê ma, piştre li nêzîkî bajarê Hyblayê, dema ku bi Sîkelan[270] re şer dikir mir; belê

270 Sîkelan di wergera Ingilîzî de Sicilians derbas dibe, xuyaye ev ya îro jê re Sîcîlya tê gotin.

tam wî wextî Gelon, di bin navê parastina mafên kurên Hîpokrates, Eûkleîdes û Kleandros, li hember welatiyên wan ên ku nedixwestin xizmetê ji wan re bikin, desthilatdarî girt destê xwe, Gelayî jî bi zora çek têk bir û ew ji mafê wan bêpar kir. Bi ser vê şansê xweşik de yek din jî hat: Xelkê Syrakûsayîyên ji wan re Gamorî dihat gotin û koleyên bi navê Kyllyrîoîyî dihatin nasîn raqewirandibûn; Gelon ew ji bajarê Kasmeneyê anî Syrakûsayê û ji nişkê ve ev bajarê dawîyê bi dest xistibû, ji ber ku Syrakûsayîyên Gelon dîtin, bajar dabûn wî û bi xwe jî teslîm bûbûn.

[156] Piştî Gelon Syrakûsa jî kir ser dewleta xwe, êdî hewesa wî ya li Gelayê hikum bimeşîne nemabû; ew emanetî birayê xwe Hîeron kir, bi xwe li Syrakûsayê bi cih bû. Syrakûsa bi temamî di destan de bû. Jixwe ev jî ji bo bajêr dewra hişyarbûn û vejîna bi lez bû; Gelon Kamarîani jî anîbû vir, ew kiribûn hemwelatîyê Syrakûsa. Wî bajarê Kamarînayê serûbinî hev kir; piştre zor da nîvê hemwelatîyên Gelayê jî eynî tiştî bikin. Bajarên Megarayîyên Sîcîlyayê jî abloqe kirin û ew razî kirin eynî tiştî bikin; li ser emrê ku daye, taxima dewlemend yên xwestin şer bikin, ji ber wê jî li hêvîya mirina xwe bûn, anîn Syrakûsayê û kirin nav hemwelatîyan; xelkê Megarayê yê di vî şerî de tu berpirsiyareke wan tunebû û ji ber wê jî daxwazeke wan a hemberîyê jî tunebû, anîn Syrakûsayê, lê bi şertê derxistina derveyî Sîcîlyayê wekî kole ew firotin. Di navbera wan de eynî ferqîyetî kir, bi kolonên Eûboîayê yên li Sîcîlyayê bi cih bûbûn jî eynî tiştî kir. Sebebê helwêsta li hemberî van herduyan, ji ber ku wî mirovên cîran di warê acizbûnê de pir berhemdar didît.[271] Belê Gelon, ji ber van kirinên xwe mezin bûbû.

[157] Qasidên Yûnanî hatin Syrakûsayê, derketin pêşberî Gelon û wiha gotin: "Em ji bo te beşdarî sefên li dijî barbaran bikin, ji alîyê Lakedaîmonîyan, Atînayîyan û hevalbendên wan ve hatine şandin. Nabe ku te tehlîkeya li dora serê Yûnanistanê digere seh nekiribe: Persekî, li ser Deryaya Hellespontosê pirek ava kir, temamê alayên çapûlcî kirine pey xwe, rabûye ji binê Asyayê derketîye û li hemberî Hellasê dimeşe; bi mahneya ku ev sefer li dijî Atînayê ye, lê daxwaza wî ya eslî, girtina temamê Yûnanistanê û ji xwe re kolekirina wê ye. Tu îro di kopa îktîdara xwe de yî û madem tu li Sîcîlyayê

271 Bi gotinek din, hevaltîya van xelka pir nexweş didît.

hikum dimeşînî, tê wê manayê tu erdê Yûnanê parve dikî; wî wextî pêwist e du baz bidî alîkarîya yên dixwazin Yûnanistanê biparêzin; bi wan re bibî yek û wê rizgar bikî. Ji ber ku heke hêzên Yûnanistanê berhevî ser hev bibin, dikarin bibin hêzeke sawdar û zexim û wî wextî dikarin derkevin pêşberî îşgalkeran û bejna xwe bidin ber bejna wan. Lê heke ji nav me hinek xîyanetê bikin û hinek jî nexwazin li hember derkevin û heke li Yûnanistanê gelek kêm kesên saxlem bimînin, wî wextî bêguman ji bo xerabûna Yûnanistanê tirs çêdibe. Ferz neke ku, piştî Persî şer qezenc kirin û em kirin bin desthilata xwe, wê tenê ji meşa ser te paşve bimînin; di vê tehlîkeyê de jî bifikire; alîkarîya te ji me re, alîkarîya ji te bi xwe re ye. Di her karî de di pêşîyê de bi aqilane hereketkirin, bi gelemperî pêkanîna netîceke xêrê bi xwe re tîne."

[158] Gotinê qasidên Yûnanî wiha bûn: Lê Gelon gelek hêrs bûbû û bi eksê wê bersiv da wan: "Gelî Yûnanîyan ev çiye! Hemalên pêşniyazên heddê xwe nizanin, çawa rûyê we heye hûn yekîtîya hemberî barbaran ji min dixwazin? Wextekî dema serê min jî bi Kartacayîyan re ket belayê, min bang li we kir ku hûn li hemberî artêşa barbaran bi min re yekîtîyê bikin, ji bo heyfa mirina Dorîeûsê kurê Anaxandrîdas ji Segesta hilînin, min ewqas li we şidand, min xwest ji bo bazarên deryayê û ticareta serbest bigrin bin ewlehîyê ku we bi xwe jî jê kar û qezencên mezin bi dest dixist, bi min re hevkarîyê bikin, gelo hûn wî wextî ji bo tola Dorîeûs yan ji bo min hatin, we alîkarîya min kir? Naxêr, heke bi we bimaya wê îro temamê van bazaran di bin destê barbaran de bûya. Lê niha, şikur ji xuda re, rewş baş bû, feydeya me geş bû û pêş ket. Û niha şer cih guhert, derbasî milê we bû û di cih de Gelon hat bîra we! Baş e! Di gel ew bêelaqîya bêrûmet a min ji we dît, ez ê nebim wekî we; ez ji bo alîkarîya we amade me, dused trîrem,bîst hezar hoplît, du hezar siwarî, du hezar tîrvan, du hezar berqanîkvan û du hezar siwarîyên sivik bidim we. Ji bilî vê çiqas dirêj dibe bila bibe, di midetê şer de ez ê temamê genimê artêşa Yûnanê bigrim ser xwe. Şertên min ev in: Wê li hemberî barbaran serê Yûnanan ez bim, wê birêvebirîya bilind li ba min be; heke na, ne ez têm û ne jî teqwîye dişeynim!"

[159] Syagros li hemberî van gotinan nikarîbû xwe û got: "Ax! Heke Agamemnonê kurê Pelops, rojekê seh bike hegemonîya Spartayîyan bi destê Gelonekî û Syrakûsayîyan ve hatîye berdan wê gelek xemgîn bibe! Naxêr, careke din gotinên wiha neyne ser zimanê xwe, fikra ku em ê fermandarîyê

bidin destê te ji hişê xwe derxîne. Heke tu bê alîkarîya Yûnanistanê, bizane ku tê bikevî bin desthilata Lakedaîmonîyan. Heke tu nikarî vê qebûl bikî, em çi bikin, bêje nabe."

[160] Dema Gelon li vî halê bêminet yê Syagros nêrî, bi van gotinan tawîza xwe ya dawîyê da: "Biyanîyê Spartayî, sivikxistina kesekî ku dakeve dilê yekî, bi gelemperî hêrsa wî derdixe ser zimanê wî. Li gel vê jî, bi van gotinên xwe yê belofacî tê nekaribe di van bersivên ez ê bidim te jî min ji sînorê terbîyeyê derxîne. Heke hûn evqas bi desthilata xwe ve girêdayî ne, ez ji we zêdetir girêdayî me, ji ber ku ez jî fermandarê artêşek û hêza deryayî ya gelek mezin im. Lê madem te pêşniyaza me evqas rûtirş pêşwazî kir, em ê jî pêşniyaza xwe ya pêşî hinekî nerim bikin. Di bejahîyê de hûn fermardarî bikin û di deryayê de ez, hûn çi dibêjin? Heke hûn deryayê bixwazin, wî wextî ez ê jî hêza bejahîyê werbigirim. Pêwist e ev tawîz têra we bikin, heke na hûn ê ji hevalbendekî wekî me bêpar bimînin."

[161] Gelon avans dida, lê vê carê qasidê Atînayê berî qasidê Lakedaîmonê hereket kir û bersiv da, got: "Hikumdarê Syrakûsayê, Yûnanistan em ne ji bo tu hikumdarekî bidî me, ji bo tu artêşekê bidî me şandîye, lê tu naxwazî artêşekê bişînî; li hemberî vê, ji bo tu bibî serfamdarê artêşa Yûnanê daxwazeke bêsînor bi te re heye. Dema ku te serfermandarîya temamê artêşa Yûnanê xwest me Atînayîyan dengê xwe dernexist, me zanîbû wê Lakedaîmonî mafê me herduyan jî biparêze; lê niha ku te dev ji fermandarîya bilind berdaye û tenê di deryayê de fermandarîyê dixwazî, baş guhê xwe bide min: Heke qasidê Lakedaîmonê ji te re berde, em bernadin, heke Lakedaîmonî vê fermandarîyê nexwaze, wî wextî em ê bigrin. Tenê em dikarin bi wergirtina wan razî bin; em hêza deryayî nadin destê tu miletî. Ma em bêsebep bûne miletê Yûnanistanê yê herî zêde deryavan derdixe, em Atînayî çawa dikarin birêvebirîya şerê deryayî bi destê Syrakûsayîyan ve berdin? Em ku nesla wê ya herî kevn in, di nav Yûnanîyan de tenê welat neguhertîye, Homeros jî di destanên xwe de, di nav şerkerên Troyayê de behsa navê bav û kalekî me dike, di rêzkirina artêşê û rêkûpêkkirina wê de behsa fermandarîyeke bilind dike! Belê, niha tu dibînî, tu sivîkatî bi raxistina van li ber çavê te tune."

[162] Gelon bi vî awayî bersiv da: "Biyanîyê Atînayî, ez dibînim ku serkantîya we heye, lê artêşa we tune. Baş e! Madem hûn bê beramberî dixwa-

zin her tiştî bi dest bêxin, niha bêyî ku hûn wext wenda bikin, vegerin xeber bidin Yûnanistanê ku, ji bo wê sal, wê ji taca biharê mehrûm bimîne." [Lêbinerin ev gotin çima got û manaya vê gotinê çiye: Bihar, zelal e, taca salê ye, wekî wê taca wî jî, wê bibe taca herî bi qîmet ya artêşa Yûnanê. Ji ber wê Yûnanistana ji wî mehrûm mayî, dişibe sala taca biharê xistîye.]

[163] Qasidên Yûnan bi Gelon re êdî zêde dirêj nekirin, siwarî keştîyê bûn û vegeriyan. Lê Gelon li ser Yûnanîyan ketibû şikê: Heke barbaran bişkînin? Li milê din wê ji bo wî şermezarîyek be, ew, hikumranê Sîcîlyayê, ji bo bikeve bin desthilata Lakedaîmonîyan rabe heta Peloponezê biçe, ne tiştekî kirinê bû; ev fikir ji hişê xwe avêt û dest bi hizirîna tiştekî din kir: Dema ku seh kir Persî ji Hellespontosê derbas bûne, Kadmosê kurê Îskîtesê Kosî siwarî keştîyeke pêncî bêrî kir ya wê xezîne û mesaja dostîyê jî daba û şand Delphoîyê; wê ew li wir bimana û çavdêrîya netîceya şer bikirina, heke barbar bi ser bikeve, wê xezîneya di destê xwe de, temamê desthilata deryayî û bejahîyê yên di destê Gelon de bidaya wê; heke Yûnanî bi ser bikevin, wê xezîne paşve bianîya Syrakûsayê.

[164] Ji vî Kadmosî re, ji bavê wî hikumranîyeke li girava Kosê bi cih bûbû mabû; tu xeterî li ser rêya wî tunebû, tenê bi netîceya nîyeta xwe û ji bilî dadwerîyê pê ve guhê xwe neda tiştekî, iktidar dewrî xelkê Kosê kir û çû Sicîlyayê; di girtina Zankleyê de ku piştre navê wê guhertin û kirin Messana, alîkarîya Samosîyan kir û li wir bi cih bû. Belê Gelon, Kadmosê bi vî awayî bi tesadifekê hatibû Sicîlyayê, hilbijart, ji ber ku bawerîya wî bi rastîya wî hebû, di her warî de kesek bi ewle bû; ev kesê bi namûs yê gelek nimûneyên rastîyê kirîne, nimûneke din a hê ji van xweşiktir kirîye ser wan; xezîneya emanet a Gelon dikarîbû ji xwe re bihişta; lê nekir. Bi serkeftina Yûnanîyan û vegera Xerxes, ya rast piştî têkçûna wî, tev xezîneyê vegerîya Sicîlyayê.

[165] Li Sicîlyayê ev jî tê gotin; dibêjin heke, di wê navê re Terîllosê kurê Krînîpposê hikumranê Hîmerayê ji alîyê Theronê kurê Aînesîdemosê hikumdarê Agrîgentûm ve ji Hîmerayê hatibû raqewirandin, bi artêşeke sêsed hezar kesî ve derneketa Sicîlyayê, Gelon, di gel ku biketa bin desthilata Lakedaîmonîyan jî, wê alîkarîya Yûnanîyan bikira. Ev artêş ji Fenîkeyîyan, Libyayîyan, Îberîayîyan, Lîgûrîayîyan, Helîsykîayîyan, Sardûnyayîiyan û Kor-

sykayîyan pêk hatibû, li ser wan wekî fermandar Hamîlkarê kurê Hannonê hikumdarê Kartacayê hebû. Yê hikumdarê Kartacayê ji bo vê seferê qanix kiribû Terîllos bû, benên mêvanperwerîya di navberê de derxistibû pêş û bi taybetî ji navbeynkarîya bi xîret ya Anaxîlaosê kurê Kratînas yê hikumranê Rhegîonê îstîfade kiribû; Anaxîlaos ji bo biçe Sicîlyayê û heyfa xezûrê xwe hilîne, zarokên xwe bi xwe wekî rehîn dabû Hamîlkar, -ji ber ku Anaxîlaos, bi Kydîppaya keça Terîllos re zewicî bû. Di van şertan de Gelon nikarîbû biçe alîkarîya Yûnanîyan û ji ber wê xezîneya xwe şandibû Delphoîyê.[272]

[166] Vê dikin ser, eynî roja Yûnanîyan li Salamîsê Persî şikandin, Gelon û Theron jî li Sicîlyayê Hamîlkar şikand. Ev Hamîlkar ji alîyê bavî ve Kartacayî, ji alîyê dê ve Syrakûsayî bû; ji bo ku kesekî bi qîmet bû li Kartacayê heta hikumdarîyê bilind bûbû; du artêşan şer kiribûn, Hamîlkarê têk çûbû wenda bûye, wisan tê gotin; Gelon lêkolînên bi dîqet daye kirin, mirî yan sax nehatîye dîtin.

[167] Kartacayî tiştên qewimîne gelek bi maqûlî neqil dikin. Barbaran heta êvarê bi Yûnanîyan re şer kirine (dibêjin, ji ber ku Hamîlkar karîbûye heta êvarê li ber xwe bide). Di wî wextî de fermandarê Kartacayî di baregehê de maye, li ser hev qurban jêkirine, gewdeyên tam ew qurbanên tên serjêkirin, di nav agirekî mezin a daye vêxistin de daye şewitandin û li hêvîya emareyên kêfxweşîyê bûye. Dema ku têkçûna eskerên xwe dibîne, hê jî ava pîroz li rovîyê heywanan dikir, piştre xwe bi xwe jî davêje nav agir; şewitîye, perçeyên wî nedîtine, bi vî awayî wenda bûye. Dixwaze bila awayê Fenîkeyî dibêjin, dixwaze jî bila awayî yên din be, piştî gewdeya wî wenda dibe, Kartacayîyan dest pê kirine li ser navê wî qurban serjê kirine, li her bajarê ku kolonî danîne bi navê wî peyker daçikandine; ya herî mezin li Kartacayê ye. Belê, yên li Sicilyayê qewimîne evqas in.[273]

[168] Em bên Kerkyrayîyan, bersivên dane qasidan û yên kirine ev in: Yên çûne Sicîlyayê çi gotine, yên hatine vir jî eynî tişt gotine. Yên ji Gelon xwestibûn, eynî tişt ji wan jî hatine xwestin. Soz dan bêsekin teqwîye bên şandin û

272 Herodotos navên Kartaca, Hannon û Hamîlkar, wek Karhedon, Annon û Anîlkas nivîsandine.

273 Ne zelal e ku şerê Hîmerayê bi şerê deryayî yê Salamîsê re rastî eynî rojê tên…

tevlî yekîtîyê bibin; gotin em nikarin çav li perçiqandina Yûnanistanê bigrin, rewşa xwe bi vî awayî nîşan dan; heke ew bişkê, çawa be wê ew jî ji roja yekem ve bên kolekirin; wê bi hemî hêza xwe ve alîkarîyê bidin wan. Belê qasid bi van gotinên xweş pêşwazî kiribûn. Ji bo alîkarîya Yûnanistanê şêst keştîy techîz kirin, -lê hesabeke wan hebû; di derxistina rê ya keştîyan de gelek giran hereket kirin, birin Peloponezê û li devera Pylosê û li Pozê Taînaronê yê erdê Lakedaîmonê lenger avêtin û li wir man. Li wir û di nav krîzê de, man li bende dawîya şer. Zêde texmîn nedikirin ku wê Yûnanî qezenc bikin. Wê Pers bi ferqeke mezin serkeftin bi dest bixista, biba temamê efendîyê Hellasê, ji vê şika wan tunebû. Ji ber wê wiha dikirin, ji bo ku ji Persan re bikaribin bêjin: "Hikumdarê Mezin, Yûnanîyan dixwestin me jî tevlî vî şerî bikin; hêza me ne ji ya wan kêmtir bû, heke em biketina şer hejmara keştîyên me ji yên din kêmtir nebû, helbet ya herî zêde, bêguman ji derveyî Atînayê me yê bidaya, lê me ev nekir, em li hemberî te derneketin, me nexwest em rêya te bibirin." Bi vî awayî gotinê, hesab dikirin wê bikevin nav rewşeke ji yên din baştir û ez texmîn dikim wê wisan jî bibûya. -Li milê din, xwesteka lêbihurîna li hemberî Yûnanîyan wê bikar anîbûna hazir bû û jixwe ev bikar anîne: Dema ku Yûnanî li wan rabûn û gotin hûn ji bo çi nehatin alîkarîya me; gotin ku "Me şêst keştî techîz kir, bayê demsalê nehişt, me nikarîbû em ji Pozê Maleayê bifitilin." Ji ber vê nikarîbûn bigehin Salamîsê, ji bo nekarîbûn beşdarî şer bibin, ne ji ber bêhêjatîya wan bûye. Belê Kerkyrayîyan daxwazên Yûnanîyan bi vî awayî ji ser xwe avêtin.

[169] Em bên Girîtîyan, dema ku ew Yûnanîyên wezîfedarê vî karî hatin, bi vî awayî hereket kirin: Qasidên fermî şandin Delphoîyê, ji bo alîkarîya bi Yûnanîyan re pê şêwirîn. Pythîa bersiv da û got: "Bêmejîyan! Piştî we alîkarîya Menelaosê kir, hûn ketin ber xezeba Mînos û we ewqas rondik barandin, hûn nalîyan, di gel ku dema Mînos li Kamîkosê mir, ji bo toleyê wan alîkarî bi we re nekir, we ji bo jinikekê ji alîyê barbarekî ve hatibû xapandin, piştgirîya wan kir!" Li hemberî vê bersivê, Girîtîyan biryar dan ku li derveyî vî şerî bimînin.

[170] Bi vî awayî tê gotin: Mînos, dema ku li Daîdalos[274] digere tê Sîkanîayê,

274 Labîrenta ku Mînos Mînotauros xistibûyê, ji alîyê mîmarê naskirî Daîdalos ve hatîye çêkirin. Piştre ji bo ji çavê hikumdar ketîye, ew jî kirîye wir. Piştre bi awayekî ji wir derdikeve û direve…

yanî bi navê îro Sîcîlyayê û li vir bi mirineke bi êş dimre. Lê di wextê piştî wê de, temamê Gîrîtî yên ji derveyî Polîkhna û Praîsîayê, guhê xwe didin hewesa dilkêşîyeke îlahî û bi hêzeke deryayî ya zexim diçin Sîkanîayê û bajarê Kamîkosê yê niha di bin birêvebirîya Agrîgentumîyan de, wê pênc salan dorpêç dikin. Lê nikarin bistînin û nikarin li ber birçîbûnê jî bidin, dorpêçê radikin û diçin. Dema ku rêwîtîya deryayî ew anîn ber Îapygîyê, bi bagereke gurr dikevin ser bejahîyê; keştîyên wan perçe dibin, ji bo ku vegerin Girîtê di destê wan de tu wasite namîne, li wir dimînin û bajarê Hyrîayê ava dikin; ji giravîyê dibin kolonîyeke bejahîyê, navê Girîtê jî diguherên û dikin Îapygîyên Messapîayê. Ji bajarê Hyrîayê belav dibin û sîteyên din jî ava dikin. Gelek şûnde Tarantoyîyan xwestine wan ji wir raqewirînin, lê ji bilî têkçûneke bi xwînî pê ve netîceyek wernegirtine. Şikestina Yûnanîyan ya herî mezin ku em dizanin ev e. Bi Yûnanîyan re Tarantoyîyan jî qurban dane û hinek Rhegîonîyên di bin zexta Mîkythosê kurê Khoîros de hatine alîkarîya Tarantoyîyan, nêzîkî sê hezar wendayî dane. Hejmara wendayîyên Tarantoyîyan di gora abîdeyê de nehatîye nivîsandin. Ev Mîkythosê koleyê Anaxîlaos, li Rhegîûmê wekî walî maye; yê ji Thegîonê hatîye raqewirandin û di Arkadîayê de li Tegeayê bi cih bûye û ew peykerên tên zanîn yên ji Olymposê re hatine pêşkêşkirin, ev kes e.

[171] Yên min ji bo Rhegîon û Tarantoyê gotin, di nav çîroka min de teferuatek in. Praîsîayî dibêjin Girîta vala bû, miletekî din hat tê de bi cih bû, di nav wan de hinekên din jî hebûn, lê piranîya wan Yûnanî bûn; piştî mirina Mînos nesla sisiyan, şerê Troyayê çêbû, di vî şerî de ji bo Girîtî Menelos biparêzin kêm hewildan xerc nekirin. Ji bo cezayê wê, di vegera Troyayê de birçîtî û nexweşîya bivêketin dest pê kir; hem ew û hem jî kerîyên dewarên wan telef bûn, bi awayekî wisan ku, Girît cara duduyan vala bû, cara sisiyan civateke din a insanan hat, bi yên paşvemayê cara duyem hatibûn tevlihev bûn, belê ev Girîtîyên niha ew in. Pythîa ev felaket bi bîra wan dixist, hewesa alîkarîya wan a ji Yûnanîyan re dişkenand.

[172] Em bên meseleya Thessalîayan, wekî bi xwe jî dibêjin, di serî de bê xwesteka xwe ketibûn nav destê Medîyan, ji ber ku ji dolabên Aleûadîyan digerandin hez nedikirin. Dema ku xebera amadekarîya Persan a derbasî Ewrûpayê bûn seh kirin, qasid şandin Îsthmosê. Li Îsthmosê komîteke ji de-

legeyên Yûnanistanê berhev bûbû, ew wekîlên sîteyan bûn yên dixwestin ji bo menfeeta welatê Hellenê bixebitin. Qasidên Thessalîayê yên hatin ba wan, wiha gotin: "Yûnanî, ji bo pêşîlêgirtina îstîlaya Thessalîa û Yûnanistanê ji serî heta binî, pêwist e bihura Çiyayê Olyposê bê parastin. Em amade ne bi we re wê biparêzin; ji bo pêwist e hûn jî artêşeke bi hêz bişînin; heke hûn neşînin, vê baş bizanin ku em ê bi Persan re peymanê çêkin. Ji bo ku em mewzîyê Yûnanistanê yê herî pêş in, ji bo em we biparêzin nabe em bi tena serê xwe bên şikandin. Ji dema hûn nexwazin alîkarîya me bikin şûnve, hûn nikarin bi teştekî zorê bidin me, ji ber ku j ibo tiştê nebe kes nikare zorê bike. Wî wextî jî em ê li çareserîya serê xwe bigerin." Thessalîayî wiha axifîn.

[173] Yûnanî, li ser vê ji bo zincîra çiya biparêzên, mecbûr man biryar bidin ku bi rêya deryayê re artêşeke bejahîyê bişînin. Artêşa zû zû hat berhevkirin, Tengava Eurîposê derbas kir. Dema ku gihişt Alosa li Akhaîayê derketin bejahîyê û keştî li wir lengeravîtî hiştin û ji bejahîyê ber bi Thessalîayê ve hatin şandin; gihiştin Deşta Tempeyê, bihura Makedonyaya xwarê bi Thessalîayê ve girê dide, ku ev bihur ji alîyê Çemê Peneîosê ya di navbera Olymposê û Ossayê de ye, hatîye kolan. Yûnanîyan li vir baregeha xwe vedan. Nêzikî 10 hezar hoplît hebûn, siwarîyên Thessalîayê jî dikirin ser. Fermandarê Lakedaîmonîyan, Eûaînetosê kurê Karenos yê ne ji nesla hikumdar bû û ji nav polemarkhosîyan hatibû hilbijartin; yê Atînayîyan Themîstoklesê kurê Neokles bû. Ji çend rojan zêdetir li wir neman; ji ber ku qasidên Alexandrosê kurê Amyntasê Makedonîayî hatin, behsa hêza zêde ya artêşa di bejahî û deryayê de kirin. Ji wan re gotin ku, heta vê bihurê bigrin û li ber pêlên îstîlacîyan bên perçiqandin, ya baştir ew e vê baregehê rakin. Ev fikra ku qet şik jê nekirin ji bo feydeya wan hatîye gotin, bi wan rast hat, bi rehetî bawer kirin. Bi min, bi vî awayî nerim hereketkirina wan, para tirsê tê de mezin e; ji ber ku hîn bibûn bihureke din heye ya vedibe Thessalîayê. Ev bihur, li Makedonîaya Jorê, li dora Gonnosê, di hindurê Perrhaîbîayê de bû; bi rastî jî artêşa Xerxes ji vir ketibûyê. Yûnanî li keştîyan siwar bûn û vegerîyan Îsthmosê.

[174] Ev karê şandina esker ji bo Thessalîayê, rastî wextê hêj hikumdar ji Asyayê derbasî Ewrûpayê nebûbû tê. Thessalîayî ku dîtin yên din wan terk dikin û diçin, bê niyeteke xerab û bi daxwazeke mezin derbasî milê Medan

bûn; bi awayekî wisan ku, di seranserê seferê de di nezdê hikumdar de hevalên wan yên çekan ên gelekî bi qîmet xwe nîşan dan.

HÊZA DERYAYÎ YA YÛNANÊ LI ARTEMÎSÎONÊ - THERMOPYLÎ

[175] Dema ku Yûnanî vegeriyan Îsthmosê, di bin ronahîya zanyarîyên Aleksandros de, li ser mijara şer çawa û li ku bê kirin, axivîn. Fikra girtina Bihura Thermopylê girantir ket, ji ber ku ew ji bihura vedibû Thessalîayê tengtir bû; piştre yek gelî bû û ya herî giring, nêzîkî welatê wan bû. Em bên ser rêya bizinan ya Yûnanî li Thermopylê ketin xefkê û dora wan hat pêçen, berî bên wir haya wan jê tunebû, piştî hatin ji Trakhîsîyan seh kiribûn. Di dawîyê de ji bo barbaran bernedin Yûnanistanê di fikra girtina vê rêyê de li hev kirin; em bên hêza deryayî, wê ew jî biçûya Pozê Artemîsîonê û li pêşberî erdê Hîstîaîotîsê bimaya li hêvîyê; Thermopyl û Artemîsîon nêzîkî hev in, bi vî awayî wê herdu hêz ji hev veneqetin; Dîmenê li vir wiha ye:

[176] Berîya tevan deryaya ku heta vir vekirî ye Derya Thrakê, li Artemîsîonê teng dibe, dibe wekî tengavekê. Di navbera girava Skîathosê û qiraxên Magnesîaya Thessalîayê[275] de dibe bihur, di derketina tengavê de qiraxê Eûboîayê û Pozê Artemîsîonê yê perestgeha Artemîs li ser tê hilbijartin. Li milê din rêya ji erdê Trakhîsê derbasî Yûnanistanê dibe, li cihê herî teng firehîya wê nîv phletron e. Wextê li cihên derûdorê bê nêrîn, tê dîtin ku ev ne cihê herî teng e; cihê herî teng li pişt û pêşîya Thermopylê ye. Li nêzîkî Alpenosê, ew cihê dikeve pişta Thermopylê, bi qasî erebeyek derbas bibe fireh e. Yek jî li pêşîya wê, ji çemê Phoînîxê ne gelek dûr e, li ba bajarê Anthelayê, vir jî bi qasî erebeyek derbas bibe ye. Milê rojavayê Thermopylê çiyayê Oîtayê ne, çiyayên gelekî bilind, asê û bihur nadin, rê li milê rojhilatê, li herêma çiravê bi deryayê dorpêçkirî ye. Li ser vê rêyê çavikên avê germ hene ku xwecih ji van re, "Niqre" dibêjin, li nêzîkê van mînbereke ji Herakles re hatîye nezirkirin hatîye çêkirin. Li ser vê rêyê dîwarek hatibû çêkirin, heta berê bi derîyan xemilandî jî bû. Van Phokîsîyan li hemberî Thessalîayan çêkiribûn, ditirsîyan ku ew ji Thesprotîayê rabin û bên Aîolîsê, ew cihê

275 Ev Magnesîa, li qiraxên Thessalîayê ye.

ku niha jî ew tê de rûdinin. Ev tedbîreke li hemberî êrîşîn wî miletî bû ku dixwestin wan bikin kole; heta wê dewrê kanîyên gerim anîbûn û herikandibûn ser rê. Mebesta wan, rê bi xendeqên tijî av bê birîn û kes nikaribe bibhure. Ji ber ku her tim li pey çareyên ku imkana Thessalîayîyan tunebe van deran bistînin digerîyan. Ev dîwarê kevin, gelek berî niha hatîye çêkirin û di nav wext de gelekî mihîya bû. Yûnanîyan baş dîtin ku careke din dîwar bilind bikin û ji bo ku şîpaneya Yûnanistanê li ber barbaran bigrin, vir di destê xwe de bigrin. Gundekî navê wê Alpenos yê gelek nêzîkî rê hebû; difikirîn ku xwarinên xwe ji wir bidest bixin.

[177] Yûnanîyan ev nuqteyên stratejîk, ji bo li hemberî dijmin rawestin minasib didîtin; her tiştî fikirîbûn û hesab kiribûn, barbaran li van noqteyan bi rehetî nikarîbûn peyade û siwarîyan bikar bînin; ji ber wê biryar dan ku derbeya îstîlakeran li vir pêşwazî bikin. Dema ku hîn bûn Persî hatine Pîerîayê, qismek di bejahîyê re şandin Thermopylê û qismekî din jî di deryayê re şandin Pozê Artemîsîonê.

[178] Bi vî awayî Yûnanîyên posteyên şer hatibûn veqetandin, bi lez ber bi dijmin ve dimeşîyan. Di vê navê re Delphoîyî ku bi qasî Yûnanistanê ji bo xwe jî ketibûn nav lezê, ji îlah nesîhet dixwestin; bersiv wergirtin ku hêvî û lava ji ba bikin, ji ber ku wê ew bibûna hevalbendên Yûnanistanê yên herî bi qîmet. Delphoîyên ev kehanet wergirtin, ew hizra ku xuda da wan, belavî temamê Yûnanîyên ji bo azadîya xwe di nav hewlê de bûn kirin û ew Yûnanîyên di bin zilma barbaran de dijîyan, di miqabilî vê mesajê de gelek sipasdar bûn û şikraneke bê payan hesêb kirin. Tam di pey wê de Delphoîyan, li Thyîayê ji bo ba mînberek veqetandin, ku li vir meydana pîroz a Thyîaya keça Kephîsos heye û welat navê xwe ji wê wergirtîye. Li wir qurban serjê kirin û îro jî girêdayî wê kehanetê ne û ji ba qencîyê dixwazin, dua dikin.

[179] Ji bo parastina hêza deryayî ya Xerxes ya li Thermayê cihê lenger avêtibû berhev bûbûn, deh babirkên bi sûret yên ji bo derûdorê saxtî bikin hatibûn veqetandin, wan rast berê xwe dan Skîathosê; sê keştîyên li ber giravê nobedarî dikirin hebûn, yek jê Troîzen, ya din Aîgîna û yek jî keştîya Attîkayê bû; dema keştîyên şer yên barbaran dîtin dest bi bazdanê kirin.

[180] Keştîya Troîzenê ya di bin fermandarîya Praxînos de di cih de ket destê barbarên di pey wan de, deryavanê herî xweşik yê di vê keştîyê de girtin û birin pêşîya keştîyê û li wir serê wî jêkirin, dixwestin ew hêsîrê Yûnanî yê herî xweşik ji wan re oxirê bîne. Ew eskerê wekî qurban hat serjêkirin Leon bû; gelo ev tersî ji ber navê wî nehatibe serî?

[181] Trîrema Aîgîna ya di bin fermandarîya Asonîdes de, ji bo wan zehmetîyên mezin derxist; Pytheasê kurê Îskhenoos di keştîyê de bû, wê rojê ket hewldanek bêemsal; piştî keştî ket dest, heya temamê gewdeyê wî ji serî heta binî perçe perçe kirin, çek di destan de şer kir; ketibû erdê, nedimir, hê nefes distend. Persî heyran mabûn, ji bo ku nemre hewil didan; mur di birînên wî dan, bi paçên tenik pêçan; dema ku paşde hatin, ew şanî hevalên xwe dan, herkesî bi rêz pêşwazî kir û bi xweşî ragirtin; li alîyê din, temamê yên di keştîyê de hatin girtin kole hesêb kirin.

[182] Ji sisiyan du keştî bi vî awayî hatibûn girtin; ya sisiyan ya di bin fermandarîya Phormosê Atînayî de, heta devê Peneîosê baz da, li wir li reşahîyê xist. Barbaran keştî bi dest xistin, lê ne yên tê de, ji ber ku keştî çawa li reşahîyê xist, bi lez keştî hiştibûn û çûbûn, di ser Thessalîayê re vegerîyabûn Atînayê.

[183] Yûnanîyên li rexê Pozê Artemîsîonê lenger avêtibûn, van bûyeran bi îşareta agir ya ji Skîathosê hatibû avêtin hîn bûbûn. Ji bo ketibûn nav tirsê li Artemîsîonê lenger avêtibûn û ji bo armanca parastina Eûrîposê çûn Khalkîsê. Li cihê bilind ên Eûboîayê çavdêr bi cih kirin. -Ji deh keştîyên barbaran sisê jê, çûn giravoka tehtînî ya di navbera Skîathosê û Magnesîayê de ya navê wê Myrmex, kevirê daçikandinê ya bi xwe re anîbûn li wir daçikandin. Hêza deryayî ya li ber asteng nemabû, bi temamî ji Kendava Thermayê derket û ba dan babirkan; roja yanzdeyan a hikumdar ji Thermayê derketibû.- Pammonê SKîrosî xebera vê giravoka Myrmexê dabû wan, cihê wê jî dabû nîşan. Barbaran rêya heta Pozê Sepîasê ya Magnesîayê, bi rêwîtîya deryayî ya tam rojekê dikêşa çûn û gihiştin qiraxên di navbera vî pozî û bajarê Kesthanaîayê de.

[184] Heta vir û Gewrîya Thermopylê qet wendayîyeke wan tunebûye û di vî wextî de cardin girseyeke nedîtî ya insanan bû; min hejmara wan berhev kir û bi vî awayî dît: Bi hesabê wekî ji tayfeyên xwecih yên ji miletên girêdayî împaratorîyê hatine berhevkirin, serê keştîyê kêm-zêde 200 kes, tenê 1.207 keştîyên li Asyayê hatine techîzkirin, 241.400 kes hebûn. Ji bilî vê di van keştîyan de ji derveyî şerkerên miletan dane, Med, Sakes yan jî eslê xwe Persî 30 eskerên deryayî hebûn ku, yekûna van jî digihişt 36.210 kesan. Em insanên li keştîyên bêrê hatibûn siwarkirin jî têkin ser van herdu yekûnan ku, di her yekî ji van de, kêm-zêde 80 kes hebûn; ji van cûre keştîyan jî wekî berê min got, nêzîkî 3.000î bû; dikare bê gotin ku di van de 240.000 kes hebûn. Belê ew techîza li Asyayê hatibû berhevkirin bi vî awayî bû; hemî li ser hev 517.110 kes dike. Artêşa bejahîyê 1.700.000 hezar peyade, 80.000 siwarî, em erebên li deveyan siwar bibûn û Lîbyayîyên erebeyên şer bikar dianîn jî têkin ser, ku ez ji bo van jî 20.000 dibêjim; netîce, bejahî û derya, herdu bi hev re yekûna wan 2.317.610 kes dike. Ev hejmara yên ji Asyayê hatine anîn nîşan dike, taximê xulaman ya paşê û keştîyên bar û tayfeyên wan, li derveyî vê hejmarê ne.

[185] Lê pêwist e yên li Ewrûpayê hatine berhevkirin jî têkeve ser vê hejmarê; ez li vir hejmara herî nêzîkî rastîyê ne didim. Wekî keştî, Yûnanîyên Trakyayê û giravên nêzîkî Trakyayê, 120 keştî techîz kiribûn; bi vî awayî em dikarin ji bo van keştîyan hejmara 24.000an bibînin. Ji bilî vê ji Trakyayîyan, Paîonîayîyan, Eordîayîyan, Bottîaîayîyan, Makedonîayîyan, Khalkîsîyan, Brygîyan, Pîerîayîyan, Perrhaîbîayîyan, Enîenîyan, Dolopîyan, Magnetîayîyan, Akhaîayîyan û artêşeke bejahîyê ya ji her kesê li qiraxê Trakyayê rûdinin hatibû berhevkirin hebû; li gor min yekûna van jî dibû 300.000 kes. Niha, dema ku van bi sedan hezar kesan têkin ser yên ji Asyayê hatibûn, em dikarin yekûna hejmara şerkeran bigihînin 2.640.610 kesan.

[186] Ev hejmar şerkeran dide nîşan, xulamên bi van re diçin, tayfeyên keştîyên erzak dikêşin, ji bilî vê heke tayfeyên keştîyên girêdayî hêza deryayî bên hijmartin, li gor fikra min, ji yên din kêm dernakevin, dikare zêde jî be; lê em kêm yan zêde nebêjin, em wekî hev hesêb bikin; madem me wekî hev

hesêb kir, di van servîsan de wekî hejmarên şerkeran nîşan da, wê milyonan û sed hezaran bidin nîşan. Wekî netîce, Xerxesê kurê Daryûs, heta Pozê Sepîasê û Thermopylîyê, yekûn 5.283.220 kes anîye.

[187] Yekûna hejmara artêşa Xerxes ev bû. Jinên nan dipehtin, odevan û yên xesandî tam çiqas in, kes nizane. Heywanên bar û heywanên bagajên din dikêşan, kuçikên di pey artêşê de dihatin jî wisan; hesabê van nikare bê kirin. Ji ber vê wextê ava hinek çeman têrê nedikir, ez qet pê şaş nabim; ya min şaş dike, pêkanîna xwarinê ji evqas insanan re ye. Ez hesab dikim, rojê serê mirovê, ne zêde, em bêjin khoînîxek genim be, dike 110.340 medîmnos. Ez jinan, xesandîyan, heywanan û kuçikan nahejmêrim. -Ev bi milyonan insan, di hêla sipehîtî û bejn û balayê de, yek ji wan bi qasî Xerxes layîqî taca serkeftinê nebû û li vê împaratorîyê nedihat.

FIRTONE

[188] Hêza deryayî ya ji Thermayê derket û vebû deryayê û piştre hat xwe da ber Magnesîaya navbera Kasthanaîayê û Pozê Sepîasê, keştîyên pêşî hatin li cihê nêzîkî qirax lenger avêtin; sêlewan ewqas ne mezin bû, ji ber wê keştî heyşt sefî bi kûrahîyê rêz bibûn û ber bi deryaya vekirî ve niçikek pêk anîbûn. Şev wiha derbas bû. Asîman sahî bû, hewa nedihejîya, lê dema ku roj derket derya bilind bû, ji alîyê rojhilatê ve bar kir hat û bi bayê ku xwecihî jê re Hellespontoyî dibêjin, bahozeke gurr dest pê kir. Herkesê ku dît ba tê û cihê lenger avêtine misaîd e, berîya bahoz baş rabe, ji bo keştîyên xwe bikêşin bejahîyê baz dan û kêşan jî, keştîyên wan û ew bi xwe jî derketin silametîyê; lê hinek keştîyên di deryaya vekirî de rastî bahozê hatin, ber bi cihekî devera Pelonê yê navê wê Îpnoîyê ve kaş bûn, hinek jî ber bi qiraxan ve; yên ber bi qiraxan ve kaş bûn, hinek jê li bejahîya dora Pozê Sepîasê xistin, hinek jî pêlan ew avêtin dora Melîboîayê û Kasthanaîayê. Bahozek wisa bû ku mirov nikarîbû li ber bide.

[189] Tiştekî wiha tê gotin, guya Atînayîyan guhê xwe dane kehanetekê û bangî Boreas kirine(336), ji ber ku kehaneteke taybetî wergirtine, gotîye ku ji zavayê xwe alîkarîyê bixwazin. Behseke Yûnanîyan heye; Boreas, mêrê Oreîthyîaya Attîkayî keça Erekhtheûs e; li gor tê qisekirin, dema ku zava dibêjin, ji ber wê ye ku Boreas tê hişê Atînayîyan. Li Eûboîa li Khalkîsê bûn;

dema ku nîşanên bahozê tên dîtin, heta berîya wê, Boreas û Oreîthya bangî alîkarîyê kirin, qurban jê kirin, ji bo xwe biparêzên û ji bo keştîyên barbaran perçe bikin, wekî berê li nêzîkî Çiyayê Athosê kirin, dua kirin. Gelo bi rastî ji ber vê bû ku Boreas êrîşî ser keştîyên barbaran yên lengeravêtî kir? Ez nikarim jê re bêjim, belê; lê ya rast ew e ku Atînayî vê qencîyê ji Boreas dizanin, dibêjin me berê jî qencîya wî dît û dema ku vegerîyane Atînayê li ser navê wî li qiraxê Îlîssosê perestgehek ava kirine.

[190] Em çiqas kêm hesêb bikin, ev qeza bi kêmasî 400 keştîyên barbaran mehf kir, ji bilî wendabûna bêhesab insan û mal. Ameînoklesê kurê Kratînes yê hemwelatîyê Magnesîayê yê li nêzîkî Pozê Sepîasê erdê wî hebûye, piştî vê qezayê baş barê xwe girtîye; xezîneyên Persan dîtîye û erdê xwe bi dewlemendîyeke gelek mezin tijî kirîye. Tenê dewlemend bûye, lê siûda wî di hêleke din de pê re nekenîyaye; ew jî birîndar bûye, ketîye ber leyzeke xerab ya qederê, kurê xwe kuştîye.

[191] Hed û hesabê keştîyên erzaqê û yên din yê xerqbûyî tune; ewqas ku, piştî vê felaketê, fermandarên ji êrîşa Thessalîayan tirsîyan, li dora hêza deryayê ji enqazên keştîyan metrîseke bilind pêçan. Bahoz sê rojan har bû; Magan qurban jêkirin, ji bo ba hêmin bikin afsûn şewitandin, ji Thetîs û Nereîd re qurban nezir kirin, di dawîyê de roja çaran karîbûn bahozê hêmin bikin, -helbet piştî evqas har bû xwe bi xwe nesekinî be. Qurbanjêkirina ji Thetîs re, ji vê çîrokê kifş e ku ev ji Îonîayan hîn bûne, Peleûs ew ji vir revandîye û temamê qiraxên vê Pozê Sepîasê, tev Nereîdîyên din yên wî bûne.

[192] Roja çaran, belê ba sekinîbû. Çavdêrên li girên Eûboîayê, roja duduyan a bahozê, ew zerarê bahozê pêk anîye, baz dabûn û gihandibûn Yûnanîyan. Yûnanîyan çawa ev xeber girtin ji rizgarker Poseîdon re dua kirin, ji bo şerefa wî avên pîroz reşandin; piştre bi melhezeya ku li pêşîya wan kêm keştî mane, ji nû ve çûn Pozê Artemîsîonê. Bi vî awayî cara duduyan li Pozê Artemîsîonê dest bi nobedarîyê kirin û ji wê rojê şûnve ye ku, Poseîdon bi navê Rizgarkerî bilind kirin û îro jî wî bi eynî awayî bibîr tînin.

[193] Piştî ba sekinî û derya hêwirî, barbaran cardin keştîyên xwe berdan deryayê û ber bi qiraxan ve bi pêş ketin; li Pozê Magnesîayê fitilîn û raste rast

berê xwe dan kendava digehe Pagasaîyê. Rêhevalên din yê di keştîyên Jason û Argo de ku li pey posteyê ber bi Aîaya Kolkhîsê ve diçûn, cihê ji bo anîna avê Herakles şandin û piştre ew li wir hiştin û çûn, belê, qiraxê vê Magnesîaya han e; weke kînaye ku piştî av hildana wê vebûna deryaya vekirî, ji vî cihî re Aphetaî hatîye gotin.[276] Belê, keştîyên Xerxes li vir lenger avêtin.

[194] Ji keştîyan 15 heb yên li herî serê baskê bûn û qederek pê de çûbûn, hebekî ew keştîyên Yûnanîyan yên li Pozê Artemîsîonê nobedarî dikirin dîtibûn. Barbaran hizir kirin ku ew keştîyên wan in, çûn ser wan û ketin navenda dijmin; fermandarê van keştîyan Sandokesê kurê Thamasîosê walîyê Kymeyê yê bajarê Aîolê bû; ev, ew kes bû ku hikumdar Daryûs wextekî wî li çarmixê dabû, wî wextî di nav dadgerên hikumdarîyê de bû û qeneet kiribû ku wî bertîl xwarîye û bûye sebebê dayîna biryareke neheq. Piştî wî bi hewa ve daliqandin, Daryûs fikirî ku ew xizmetên wî ji bo malbata hikumdar kirine, têra bi qasî vê qisûra wî binuxumîne dike; li ber ronahîya vê hizirkirinê Daryûs gihişt wê qeneetê û biryar da ku şaşî û lez kirîye. Belê, ev kes ji vî karê xerab, ji xezeba hikumdar û ji mirinê filitîbû, lê wê cara duyem nefilitîya. Vê carê bi babirkên xwe ve ketibû nav Yûnanîyan; ji ber ku Yûnanîyên dîtin ku dijmin tê bi ser wan de, fêhm kirine ku ew şaş tên û vebûne deryayê û bi rehetî ew bidest xistine.

[195] Di yek ji van keştîyan de, Arîdolîsê hikumranê Alabandaya Karyayê hat girtin; di keştîyeke din de qaptanê Paphosî, Penthylosê kurê Demonos hat girtin; ev, bi 12 keştîyan beşdarî vê seferê bûbû, di wê bahoza li Pozê Sepîasê rabibû 11 keştîyên xwe wenda kiribû. Ya dawîyê ku di destan de mabû jî, dema ku hatibû Artemîsîonê wenda kiribû, bi xwe jî hatibû girtin. Piştî Yûnanan lêpirsîn li hêsîran kirin û yên li ser artêşa Xerxes hîn bûn, li zincîrê dan û şandin Korînthosê, Îsthmosê.

[196] Artêşa deryayî ya barbaran, bi 15 keştîyan kêm a di bin fermandarîya Sandokes de, ku me yên hatin serî li jorê neqil kir, gihiştibû Aphetaîyê. -Xerxes û artêşa bejahîyê ji Thessalîayê û Akhaîayê derbas bûbûn û piştî du

276 Aphetaî. Tê fêhimkirin ku Herodotos vê bi gotina Yûnanî ya "noqteya derketina rê" ve girê dide.

roj rêwîtîyê, ketibûn cihê ku Malîsî rûdiniştin. Xerxes, li Thesalîayê pêşbirkên hespan dabû tertîpkirin, dixwest hespên xwe û yên Thessalîayê bide ber hev. Wî seh kiribû ku hespên herî baş li Thessalîayê tên perwerdekirin, wê ew biceribandina; mehînên Yûnanîyan gelekî li paş man. Di nav çemên Thessalîayê yê artêş têrav nekir tenê Onokhonos bû; lê tu ji çemên Akhaîa av didan, heta yê herî mezinê wan Epîdanos jî, nikarîbû hewcedarîya avê pêk bîne yan jî incex pêk anî.

[197] Xerxes, dema ku li Akhaîayê hat Alosê, rêberên ku xwestin tiştên balkêş nîşanî wî bidin, li ser perestgeha Zeûs Laphystîos çîrokeke xwecih qise kirin: Athamasê kurê Aîolos, ji bo Phrîxos bikuje bi Îno re qomloyek çêkiribûn; piştre Akhaîayî guhê xwe dan emrê kahînekî, ev bi yên ji nesla tawanbaran hatine kirine: Li mezinê vê malbatê ketina hindurê Mala Xelkê qedexe kirine û li ber derî nobedarî kirine. (Akhaîayî ji Prytaneîonê re Mala Xelkê dibêjin.) Heke bikeve hindur, tenê wekî qurban ji bo here mirinê wê derkeve. Bi vî awayî hatîye dîtin ku ev kes çendîn car şandine îşkenceyê, wan jî ji tirsan baz dane welatekî din; heke vegere û bê girtin dişandin Prytaneîonê û rehberan qurbanên tacên şerît danîne serê wan, çawa bi awayekî henekpêkirî dibirin mirinê, bi hûrgilî behs dikirin. Qedera nevîyên Kytîssorosê kurê Phrîxos wiha bû; ji bo çi ev ceza? Ji bo vê yekê, dema ku Akhaîayî guhê xwe dan kehanetekê û xwestin bi xwîna Athamasê kurê Aîolos axa xwe paqij bikin, Kytîssorosê ji Aîaya Kolkhisê hat, ew ji mirinê rizgar kirîye û bi vî awayî xezeba îlahan kêşaye ser nevîyên xwe. Xerxesê guhê xwe da van gotinan, hat li ba daristana pîroz, lê tirsîya bikeve hindur; nehişt eskerên wî jî bikevin hindur û ew rêza li hemberî saheya pîroz da nîşan, eynî awayî li hemberî mala nevîyên Athamas jî da nîşan.

[198] Dema ku di Thessalîayê û Akhaîayê re derbas bû, ev yek qewimîbûn; Xerxes ji van welatan derket û ket Malîsê, kendaveke dirêj, herroj av radibin û dikêşin. Piştî vê kendavê deşteke fireh e, hinek cihê wê fireh hinek cih teng in. Dora vê deştê, çiyayên bilind û bihur nadin ên dora welatê Malîsê pêçane hene; ji van re zinarên Trakhîsê tê gotin. Dema ku mirov ji Akhaîayê tê yekem bajarê nêzîkî vê kendavê rastî mirov tê Antîkyra ye; Sperkheîosa ji welatê Enîenîyan diherike û tevlî deryayê dibe, vir av dide. Ji vê, kêm-zêde 20 stad wêdetir, çemekî din yê navê wê Dyras heye, li gor tê gotin, ji bo

Heraklesê di nav gurîya agir de maye rizgar bike pijiqîye. 20 stad wêdetir mirov cardin rastî çemekî tê ku ev jî Melas e.

[199] Bajarê Trakhîsê bi qasî 20 stadî ji Melasê wêdetir e. Cihê herî fireh dibe ya temamê vê herêmê ya di nav çiyan û deryayê de vir e; li vir 2.200 plethron deşt heye; Trakhîs, li rexê çiya hatîye avakirin. Ev girên bilind yên erdê Trakhîsê pêçane, li milê başûr yê bajêr buhêrk hene û Asopos ji vê qelşê di bin pêşkên çiyan de diherike.

[200] Li başûrê Asoposê aveke din diherike, Phoînîx. Ev ewqas ne mezin e; ji giran tê xwarê û tevlî Asoposê dibe. Belê cihê herî teng yên li van deran dora Phoînîxê ye; şiverêyeke ku firehîya wê bi qasî erebeyek derbas bibe heye. Phoînîx, ji Thermopylê 15 stad e. Di navbera Phoînîxê û Thermopylê qesebeya Anthelayê heye, piştî Asopos van deran av dide dirije nav deryayê. Li dora wê saheke gelek fireh heye, di vê saheyê de patronê Amphîktyonîyan,[277] perestgeha Demeterê, meqamên Amphîktyonîyan û perestgeha Amphîktyonê bi xwe heye.

[201] Baregeha Xerxes li ser erdê Trakhîsê, li Malîsê bû, ya Yûnanîyan jî li Thermopylê (Thermopylîyan) bû, li cihê ku xwecih û cîranên wan jê re tenê digotin Pylaî. Herdu alîyan jî li van cihan baregeh vedabûn, yek jê xwedîyê temamê welatê li bakurê Trakhîsê dima; yê din jî erdê ji vê herêmê ber bi başûr ve diçû digirt.

[202] Yûnanîyên li vir li hêvîya hatina Persan bûn ev in: Ji Spartayê 300 hoplît, ji Tageayê û Mantîneîayê bi awayê nîv ew nîv yê din hezar, ji Orkhomenosa Arkadîayê 120, ji qismê mayî yê Arkadîayê hezar, ji Arkadîayê ev qas. Ji Korînthosê 400, ji Phlîûsê 200, ji Mykenaîyê 400. Ev jî ji Peloponezê hatine. Ji Boîotîayê 700 Thespîa û 400 eskerên Thebaîyê.

[203] Ji derveyî van, temamê Lokrîsîyên ji Opûsê ji bo banga hatibû kirin baz dabûn û hezar Phokîsî hebûn. Bi rastî bangî wan kiribûn û dabûn xuya-

277 Amphîktyon, hikumdarê Atînayê ye. Kurê Deûkalîon û Pyrrhan e. Konfederasyona ayînî û polîtîk ya jê re Amphîktyonî tê gotin, li ser navê wî hatîye damezirandin.

kirin ku, ew ji derveyê hêza pêşber ne tiştekî din in, li hêvîya hevalbendên din ên paşve mayî ne îro sibê bên. Qiraxê deryayê Atînayî, Aîgînayî û yên tayfeyên hêza deryayî pêk anîne diparêzin, ji bo wan tiştekî jê bitirsîn tune, jixwe yê dimeşe ser Yûnanistanê ne xudayek e, insanek e û piştî hatina dinyê tu fanîyek tune rastî felaketekê neyê, tu wextê jî wê nebe. Bi eksê wê, belayê mezin, tê serê mezin; tê wê manayê ku ji insanekî fanî pê ve ne tiştek e, îşgalker jî mehkûm e ku şanê xwe wenda bike. -Ev herdu miletên behsa mijarê, piştî rewşê hîn bûn, ji bo alîkarîyê artêşek şandibûn herêma Trakhîsê.

LEONÎDAS

[204] Li ser her eskerên herêmekê ji sîteyên wan farmandarek hebû, lê yê herî dihat teqdîrkirin, Leonîdasê Lakedaîmonî yê serefermandarê artêşê bû, kurê Anaxanrîdas, mîratgirê Leonîyan, Eûrykratîdesan û Anaxandrosan bû. Ji nesla Polydoros, Alkamenes, Telekleos, Arkhelaos, Hegesîlaos, Doryssos, Leobotes, Ekhestratos, Agîs, Eûryshenes, Arîstodemos, Arîstomakhos, Kleodaîos, Hyllos û Herakles dihat. Li gel ku hêvîyek wiha tunebû, bibû hikumdarê Spartayê.

[205] Du birayên wî yên ji wî mezintir hebûn, Kleomenes û Dorîeûs, hêvîya wî ya bibe hikumdar gelekî kêm bû. Lê Kleomenes bê zarokekî kur li pey xwe bihêle miribû. Dorîeûs jî ne sax bû; li Sicîlyayê miribû. Bi vî awayî hikumdarî ji Leonîdasê berî Kleombrotos hatibû dinyê re mabû (Kleombrotos, kurê Anaxanrîdas ê herî biçûk bû); ji bilî vê bi yek ji wan keçên Kleomenes re zewicîbû. Ew hatibû Thermopylê, sêsed kesên bijarte yê tam di salên mêranîyê de û hemî jî bavê malbatan bi xwe re anîbû. Ji bo vê seferê Thebaîyî jî tevlî xwe kiribû, li ser wan Leontîadesê kurê Eûrymakhos hebû, min hejmara wan jî gotibû. Sebeba ku Leonîdas ji nav temamê Yûnanîyan tenê ev girtibûn ba xwe, tawanbarkirina wan bi bazardanîna bi Medan re bû; em lêbinêrin bê wê yekîneyên xwe bi yên wî re bikin yek, yan wê bi Yûnanîyan re hevkarîyê nexwazin? Ew ji bo vê yekê bangî seferê kiribû. Thebaîyî mirovên xwe şandin, lê nikare bê gotin niyeteke wan a neqenc jî tunebû.

[206] Sebebê şandina vê yekîneya pêşeng a Spartayîyan di bin fermandarîya Leonîdas de, ji bo ji hevalbendên din re di meşa pêşî de bibin nimûne,

nekevin şika ku Spartayî jî ji bo beşdarîyê ne hewesdar in û pêşî li nêzîkahîya wan bi Medan re bigrin. Piştî cejnên Karneîos Apollon[278] yên di wê navê re rastî van rojan hatin, pîroz kir, tenê garnîzonek li Spartayê hişt, hemî bi hev re bi lez bazdane parastina bihurkê. Hevalbendên din jî amadekarî dikirin ku eynî tiştî bikin. Cejnên Olîmpîyatê jî rastî van rojan hatin; ji bo ku hêvî nebûn karê Thermopylê di midetekî evqas kurt de temam bibe, tenê perdeke raxistinê şandibûn.

[**207**] Belê rewşa wan wiha bû. -Dema ku Persî nêzîkî bihurkê bûn, tirs ket dilê Yûnanîyên li Thermopylê berhev bûbûn û dest bi melhezeyê kirin ku gelo em vegerin; piranîya Peloponezîyan, difikirîn gelo biçin li Îsthmosê bimînin, rêya Peloponezê bigrin; lê li hemberî xeyd û protestoya Phokîsî û Lokrîsîyan, biryar dan di cihê xwe de bimînin, ji sîteyan re xeber şandin û daxwaza alîkarîyê kirin, ji ber ku ji bo artêşa Medan paşve bavêjin gelek hindik bûn.

[**208**] Ew wiha difikirîn, Xerxes ji bo keşfê siwarîyek şand, dixwest hîn bibe çiqas in û çi dikin. Hêj li Thessalîayê bû, xeber girtibû ku di bin fermandarîya Leonîdasê ji nesla Herakles de hêzeke biçûk li wir berhev bûye. Siwarî nêzîkî baregehê bû; bêguman ne karîbû lênerînekê bike û ne jî karîbû tevan bibîne (ji ber ku dîwar hatibû bilindkirin, nobedarên li pişt bûn nedihatin dîtin). Lê yên wêdetir û çekên wan yên li binê dîwarê rêz bibûn didîtin. Rastî nobedarîya Lakedaîmonan hatibû. Siwarî dît ku hinek ji wan jîmnastîkê dikin û qismê din jî porê xwe şeh dikin. Yên dîtibûn ew şaş kiribûn. Hejmart ka gelo çendin, piştî rehet rehet not girtin, bêxem paşve vegerîya; kesek li pey neketibû; ne xema kesekî jî bû. Vegerîya baregehê, tiştên li ber çavan ketîye, eynî ji Xerxes re neqil kirin.

[**209**] Xerxes, rastîya tiştên hatin gotin dernexist, yanî fêhm nekir ew heta nefesa xwe ya dawîyê ji kuştinê re amade ne; tam eksê wê, fikirî ku ew bi karên bêmana û bêserûber mijûl in, bangî Demaratosê kurê Arîston yê li baregehê bû kir. Dema ku ew hat, Xerxes ew kêşa îfadeyê, xwest hîn bibe ev helwesta Lakedaîmonîyan tê çi manayê, Demaratos got "Hikumdar, min

278 Cejna Apollon Karneîos, li Spartayê di meha tebaxê de dihat pîrozkirin.

careke din, dema ku em ji bo Yûnanistanê derketin seferê, yên min li ser van kesan gotibûn te guhê xwe dabûyê, piştî tu hînî nêrînên min yên li ser vê macerayê bûyî, te henekên xwe bi min kiribû. Lê hikumdar, di hizura te de, her tim gotina rastîyê ji bo min tiştekî herî xweş e. Belê, ka careke din îro jî guhê xwe bide min: Ev mirov ji bo bihurkê li me bigrin hatine û ji bo vê amadekarîyê dikin. Adetên wan ev e: Dema ku mirin girtin ber çav, serê xwe dixemilînin. Û vê jî baş bizane, heke tu van û yên li Spartayê mayî têk bibe, ey hikumdar, êdî nesla insanekî bikaribe li hemberî te bisekine û çek bigre destê xwe namîne. Belê, niha tu li hemberî bajarekî Yûnanê yê herî giring û eskerên herî mêrxas dikeşî." Ev gotinên han li ba Xerxes qet ne cihê bawerîyê bûn û înad kir û pirsî, çawa bi vê hejmara kêm wê li hemberî eskerên min bisekinin? Demaratos bersiv dayê û got: "Hikumdar, heke wekî ku ez dibêjim nebe, tu jî miameleya derewînan bi min re bike."

LI THERMOPYLÊ ŞERÊN YEKEM

[210] Lê van gotinan tesîr li Xerxes nekiribûn. Çar roj ma li hêvîyê, li hêvî bû ku dijmin baz bide. Roja pêncan, paşvekêşan çiye, di mayînê de hêj bi biryar dihatin xuyakirin, -li gor wî nezanîna heddê xwe û dînîtî bû- wî wextî Medan û Kîssîayî şandin ser wan; hêrs dibû, emir kiribû tevan sax bînin hizura wî. Medên şandibûn ser Yûnanîyan, êrîş kirin û gelek jê mirin; yên din çûn hawara wan, qederek ji hêz ketin lê ew nesekinîn. Çavê herkesî ji cih pekîyabû, herî zêde jî yê Xerxes ku, di nav sefên wî de gelek kes û kêm mêr hebûn.

[211] Şer seranserî rojê dom kir, ji bo ku Medan hemberîyeke giran dîtibûn ji şer paşve vekişiyan û di cihê wan de Persên ku Hikumdarê Mezin ji wan re Nemirên Min digot ajotin pêş. Fermandarê wan Hydarnes bû û difikirîn wê vî karî zû temam bikin. Lê dema ku bi Yûnanîyan re dest bi şer kirin, hat dîtin ku wan jî ji Medan baştir netîcek bi dest nexistine; bi temamî wekî yên din çêbû; wan jî di cihekî teng de şer dikirin, rimên wan ji yên Yûnanîyan kurtir bûn, serdestîya wan ya hejmara zêde bi kêrî tiştekî nedihat. Lakedaîmonîyan şerekî hêjayî hemî pesnê dikirin; li hemberî xeşîmên şer, ew bi vê hunerê baş zanîbûn û ev di eslê xwe de, dema ku berepaşî dest bi revê dikirin -lê ne bi belavbûyî- dihat dîtin, barbarên ku didîtin ew baz didin,

dikirin qêrîn û hawar, bi awayekî tevlihev diketin pey wan û tam dikirin ku bigihin wan, yên din bê payîn paşve vedigerîyan û êrîş dikirin, hejmareke zêde eskerên Persî dikuştin û radixistin erdê. Ji Spartayîyan gelek hindik diketin. Hem bi sefên bi rêkûpêkî, hem jî bi êrîşîn her awayî û dayîna hewlên zêde, Persên ku nikarîbûn bihurê bi dest bixin, paşve kêşîyan.

[212] Hikumdar ku li sahneyê dinêrî, tê gotin ku di esnayê van şeran de, sê car ji bo artêşa xwe ricifîye û ji cihê xwe hilpekîyaye. Ev şerê îro wiha bû. Hewlên barbaran yên roja din jî vala çû. Difikirîn ku hejmara Yûnanîyan kêm e, birîndar in, êdî çek di dest de nikarin li hember rawestin, bi vê hêvîyê diçûn bi ser wan de. Lê Yûnanî li gor miletên xwe û yekîneyên xwe ji hevdû veqetîyabûn û di sefên bi rêkûpêk de bûn û tenê dema dor dihate wan diketin şer. Phokîsî beşdarî şer nedibûn; ji bo şiverêyê biparêzin ew derxistibûn çîyê. Dema ku Persîyan dîtin rewşa doh îro jî neguherî, paşve kêşîyan.

[213] Hikumdar gelek nerehet bû, nizanîbû ka wê çawa ji nav vî karî derkeve. Belê, di vê navê re kesekî Malîsî yê navê wî Ephîaltesê kûrê Eûrydemos, bi hêvîyên mezin ve hat, hikumdar dît, xebera şiverêya ji çiya derbas dibe û derdikeve Thermopylê dayê û bi vî awayî Yûnanîyên li wir girtine mirin. Piştre ev kes ji Lakedaîmonîyan tirsîyaye û baz daye çûye Thessalîayê. Di civîna Meclisa Amphîktyon de ya li Pylaîyê çêkirin, pylagoran[279] perekî mezin ji bo serê wî danîn. Piştre ew vegerîyaye Antîkyrayê û ji alîyê Athenadesê hemwelatîyê Trakhîsê ve hatîye kuştin. Vî Athenadesî, ji ber sebebên cihê Ephîaltes kuştîye, ez ê di beşên din de behsa wê bikim. Lê Lakedaîmonîyan soza pereyê hatibû dayîn nedan wî. Ephîaltes piştî vê bûyerê wiha mirîye.

[214] Bi awayekî din jî tê gotin; li gor wê, yên ketine pêşîya Persan û ji çiyê derbas kirine, Onetesê kurê Phanagorasê ji Karystosê û Korydallosê ji Antîkîrayê ne, lê ez hebekî jî ji vê bawer nakim. Ji ber ku ji bo di vî warî de em bigihin biryarekê di destê me de, biryara kesên ku Yûnanîyan ew pylagor bijartibûn heye, wan ne ji bo serê Onetes û Korydallos, ji bo serê Ephîaltesê Trakhîsî pere danîbûn û bêguman piştî baş lêkolînekê ev kiribûn; ji bilî vê em dizanin Ephîaltes ji ber vê tawanlêbarkirinê baz dabû. Her çend

279 Pylagor, delege ne yên ji sîteyan ji bo Meclisa Amphîktyohîyan hatine şandin.

Onetes ne Malîsî bû, heke gelek caran di vî erdî re derbas bûbe, ez inkar nakim dikare vê şiverêyê bizanibe, lê yên rê nîşanê Persan dane û li çiyê fitilandine Ephîaltes e; ez wî tawanbar hesêb dikim.

ARTÊŞA YÛNANÊ
JI PIŞT VE TÊ DORPÊÇKIRIN

[215] Xerxes ku gelek kêfa wî ji xebera Ephîaltes re hat, di cih de Hydarnes bi yekîneyên pê re derxist rê. Serê êvarê derketin rê. Ew şiverêya em behs dikin, Malîsîyên li wir rûdinin dîtibûn; ev wekî rêyeke derdikeve erdê Phokîsîyan, nîşanê Thessalîayan dabûn. Wî wextî Phokîsîyan Bihurka Thermopylê bi dîwar girtibûn û ji îşgalê rizgar bibûn. Jixwe bi salan bû dihat hesêbkirin ku ev şiverê ji alîyê Malîsîyan ve qet nedihat bikaranîn.

[216] Lêbinêrin ka ev şiverê çawa ye: Ji çemê Asoposê yê ji qelşeke çiyê diherike dest pê dike, wekî şiverêya bizinan ji van deran re jî Anopaîa tê gotin; ev şiverêya Anopaîayê di kopa serê çiyê re derbas dibe û li pêşberî bajarê Alpenosê diqede. Ev, dema ku mirov ji welatê Malîsê tê bajarê yekem a Lokrîsê ye ku mirov lê rast tê ev e û ne dûrî zinara jê re Melampygosê tê gotin û cihê Kerkopî dimînin; cihê herî teng yê çîyê vir e.

[217] Persî, piştî Asopos derbas kirin, pêşkên Oîtayê girtin milê xwe yê rastê, pêşkên çiyê yên dikevin îstîqameta Trakhîsê girtin milê xwe yê çepê, seranserî şevê di vê rêya çiyê de meşîyan. Dema ku roj derket gihiştibûn serê çiyê. Li vir, wekî min di pêşîyê de jî got, hezar hoplîtê Phokîsîyan hebûn, welatê xwe diparastin û şiverê digirtin. Bihurka Thermopylê ya li jêrê, yên berî niha min behsa wan kirin, diparastin; Phokîsiyan ji Leonîdas xwestibûn ku ew vê rêya di çiyê re derbas dibe biparêzin, bi dilxwazî wan ev xwestibûn.

[218] Lêbinêrin Phokîsî çawa dîtin Persî ji çiyê derbas bûne: Dema ku Persî ber bi jor ve diçûn nedihatin dîtin. Ji ber ku li pesarên çîyê darên çilo hebûn; lê bêyî ba hebe, xişîneke mezin dihat sehkirin, bêguman wê wiha bûya, ji ber ku li ser pelên raxistî dimeşîyan. Phokîsîyan dest dan ber xwe, rahiştin çekên xwe: Ji nişkê ve barbar li pêşberî xwe dîtin. Barbarên Ev şer-

kerên rahiştine çekên xwe dîtin, man şaş; ferz kiribûn ku Wê bi tu astengî re rûbirû nebin, niha rastî yekîneke esker hatibûn. Hydarnes tirsiyabû ku ev jî Lakedaîmonî ne. Ephîates pirsî ka ew ji ku ne û dema ku hîn bû ew ji ku ne, Persîyan kir sefê û amadekarîya şer kir. Lê dema ku Phokîsîyan dîtin wekî zîpikan tîr bi ser wan de dibare, bi bazdanê xwe avêtin serê çiyê, ji ber ku hesêb kiribûn ku wê dijmin di destpêkê de bavêje ser wan; ew amade bûn canê xwe feda bikin. Ya ku difikirîn ev bû; lê Persên Ephîaltes û Hydarnes, qet guhê xwe nedan Phokîsîyan, bi lez dest pê kirin ji pesarên çîyê ber bi jêr ve daketin.

[219] Yûnanîyên li Thermopylê, jixwe ji kahîn Megîstîas xeber girtibûn ku wê serê sibehê bimrin. Piştre qaçaxên eskerîyê yên dijmin hatibûn û xeber gihandibûn wan ku Persî derketine meşa dorpêçê. Ev xeber bi şev gihiştibû wan; dema ku bû sibe çavdêrên ji çiyê hatin xwarê ev xeber piştrast kirin. Wî wextî Yûnanî berhev bûn û hevdîtin kirin, fikra wan belav bû. Hinek jê nedixwestin cihên li wir in terk bikin, yên din li hemberî vê nêrînê derdiketin. Di dawîyê de perçe bûn: Hinek jê rabûn û çûn, belav bûn, her yek jê rêya sîteya xwe girt; yên din bi Leonîdas re di cihê xwe de man.

[220] Ev jî tê gotin; ji bo ku nemrin Leonîdas bi xwe Yûnanî şandîne; lê bi xwe û Spartayîyên pê re, terkkirina wezîfeya parastina wî cihê girtibûn ser xwe, bêrûmetî hesêb dikirin. Jixwe ez jî zêdetir bawer dikim ku Leonîdas, bêziravîya hevalbendên xwe û nehezîya wan a bi wan re tehlîkeyê himbêz bikin dîtibû, emrê paşvekêşîyê bi xwe dabû û çûnê ji xwe re eyb hesêb kiribû. Heke di cihê xwe de bimîne, wê serkeftineke mezin bi dest bixe û sih neketa ser bextewerîya Spartayê: Ji ber ku hê di destpêka şer de, kehaneta Pythîa dabû Spartayîyên di warê şer de pê şêwirîbûn hebû, li gor vê kehanetê, yan wê Lakedaîmon kavil bibe yan jî wê hikumdar bimre. Kehaneta bi rêzên Hexametron hatîye dayîn ev bû:

Tu ku xwedîyê Spartayê û erdê wî yên fireh î
Wê Pers sîteya te ya berz xera bike yan jî
Temamê welat ji serî heta binî
Ji bo hikumdarê kurê Herakles rondikan birêje.
Wê hêza gayan û şêran têrê neke,
Wê li hemberî eskerên te yên bi saw nesekinin.

Ez ji te re dibêjim yê tê Zeûs e, wekî êm
Yek ji wan neyê avêtin li ber, wê nesekine.

Belê, di hişê Leonîdas de, ez wisan difikirim ku ev gotin hebûn; ji bilî vê dixwest serkeftin tenê li dora serê Spartayîyan berhev bibe; ji bo vê hevalbendên xwe paşve şandin; ez yeqîn nakim bi wî re ketibin gemgeşeyê, ez naxwazim wan bi bazdaneke wiha kirêt tawanbar bikim.

[221] Belgeke min a vê hisê xurt dike heye ku, ew jî ji yên din ne zêde giringtir e: Tê gotin ku kahîn Megîstîasê Akarnanîayî yê ji nesla Melampûs tê, di nav artêşê de bû, dema ku wê yên bên serê wan, li qurbanan nêrî û xeber da wan, ev jî rastîyek e ku, ji bo Leonîdas bi yên din re nemre xwestibû wî jî paşve bişîne. Lê ev kahîn di gel ku izin jî hatibû dayîn, ew bi xwe ji wir veneqetîyaye; tenê kurê xwe yê di nav şerkeran de bû şandibû ku kurên wî yên din jî tunebûn.

[222] Hevalbendên izin wergirtin, guhê xwe dan emrê Leonîdas û çûn; tenê Thespîayî û Thebaîyî bi Lakedaîmonîyan re man. Thebaîyî qet nedixwestin bimînin û bi ser vê de jî mabûn. (Leonîdas ew rehîn digirtin.) Thespîayî qet nexwestin vegerin; gotin ku wê terka Leonîdas û hevalên wî nekin; di cihê xwe de man û bi wî re mirin. Serekê wan Demophîlosê kurê Dîadromas bû.

ŞERÊ THERMOPYLÊ

[223] Xerxes, piştî roj derket avên pîroz reşandin, piştre qasek şûn de, kêm-zêde ma heta seeta bazar tijî bibe û derket rê; li gor gotina Ephîaltes hereket dikir; ji daketina ji serê çîyê ji daketina wê hê kurtebir, rêya wê biçûna hê kurtir bû. Li milekî barbarên Xerxes ji bo êrîşî dimeşiyan, li milekî din jî Yûnanîyên li dora Leonîdas berhev bûbûn û fedakirina canê xwe jê re girtibûn ber çav, ber bi cihê bihurkê yê hinek fireh ve dikêşîyan. Heta wî wextî, Yûnanîyên ku dîwarê rewşa wan bi hêz dikir diparastin, bêyî ku dijmin pê bihisînin ew dikişandin cihê herî teng yê bihurkê û di ber re jî şer dikirin. Lê ev şerê man û nemanê, ji derveyî vî cihê teng çêbû û barbar kom bi kom ketin. Fermandarên yekîneyan, qirbaç di destê wan de li pişt wan disekinî, li mirovên xwe yên taxim taxim dişandin wekî zîpikan qamçî dibarandin. Gelek ji wan jî li beramberî hev, bi saxî li bin pêyan diperçiqîn.

Kesekî guhê xwe nedida qurbanîyan. Yûnanîyên dizanîbûn bi yên li çiyê bifitilîn re wê mirin hilweşe ser wan, li hemberî barbaran bi temamê hêza xwe, bêyî guhê xwe bidin tiştekî ruhê xwe didan ber çavê xwe û şer dikirin.

[224] Di destê piranîya wan de êdî rim tunebû, rim şikestibûn; lê şûrê wan di destê wan de bû û Pers hûr hûr dikirin. Leonîdas bi mêrxasî şer kiribû û ketibû; bi wî re, ji nav Spartayîyan yên navê wan nehatibûn sehkirin jî ketibûn; wekî kesên mêrxas min navê wan berhev kir; heta min navê wan 300 kesan jî berhev kir. Ji Persan jî gelek kesên giring mirin, di vê navê re du kurên Daryûs yên ji Phrataguneya keça Artanes, Abrokones û Hyperantes jî hebûn. Ev Artanesê han, birayê Daryûs, kurê Hîstaspesê Arsames bû; bi keça xwe re temamê hebûnê xwe dabû Daryûs; ji ber ku zarokên wî yên din tunebûn.

[225] Ev herdu birayên Xerxes di meydana şer de mirin û li ser laşê Leonîdas di navbera Persan û Lakedaîmonîyan de şerekî destepirçkî çêbû. Dijmin li hemberî mêrxasîya Yûnanîyan mecbûr man çar carî paşve kêşîyan. Şer, heta yên ji alîyê Ephîaltes ve hatin anîn, bi vî awayî dom kir. Lê dema ku Yûnanîyan hatina van dîtin rewşa şer hat guhertin. Ber bi cihê teng yê rê ve paşve kêşîyan, dîwar derbas kirin, li wir, ji derveyî Thebaîyan tevde, li ser gireke biçûk, li ew cihê ku îro ew şêrê mermerî yê ji bo bîranîna Leonîdas hatîye daçikandin, li hev civîyan. Yên şûrê wan di destê wan de mayî bi şûran, yên nemayî bi gulmistan, bi diran û neynûkê xwe şer dikirin. Qismek ji barbaran raste rast dan ser pişta wan û ew dîwarê qehîmkirî hilweşandin, yên din jî cihê ew li ser berhev bûbûn ji alîyê qiraxan ve pêçan û ji herdu milan ve li wan şidandin.

[226] Di nav mêrxasên Lakedaîmonî û Thespîayîyan de, kesekî bi taybetî di hêla mêrxasîyê de navê wî dihat bi bîr anîn hebû; ew Dîenekesê Spartayî bû; tê gotin berî bi Medan re şer dest pê bike wiha gotibû: Kesekî ji Trakhîsîyan gotîye: "Hejmara barbaran ewqas zêde ye, dema ku gîya davêjin hewa roj tarî dikin!" Spartayî bêtirs û guhlênebûyî, gotîye "Heke li gotinên Thrakîsîyê biyanî bê nêrîn, Yûnanî gelekî bi şans in, baş e ku Medî asman tarî dikin, tê wê manayê em ê jî ne di bin rojê de, di bin sihê de şer bikin!" Belê, va yek ji wan gotinên Dîenekesê Lakedaîmonî, abîdeya navê wî parastîye.

[227] Tê gotin ji vir şûn ve, taca mêrxasîyê du Lakedaîmonîyan, du birayan qezenc kirine, Alpheos û Maronê kurên Orsîphantos. Ji nav Thespîayîyan serkeftina herî mezin Dîthyrambosê kurê Harmatîdes qezenc kirîye.

[228] Şerkerên Thermopylê li cihên ketine hatine veşartin, kesên ji yekîneyên berî ji alîyê Leonîdas ve paşve bên şandin mirin jî, cardin bi vî awayî hatin veşartin. Li ser gora wan ev kîtabe heye:

Çar hezar ʻezkerên ji nîvgirava Pelopsê hatin
Li vir li hemberî sêsed car deh hezaran li ber xwe dan.

Ev kîtabe ji bo tevan e. Ya tenê ji bo Spartayîyan jî ev e:

Biyanî, here ji Lakedaîmon re bêje,
Ji bo em emrê wî bi cih bikin li vir mirin.

Ev jî ji bo Lakedaîmonîyan e. Ya ji bo kahîn Megîstîas jî ev e:

Megîstîasê kahîn yê serkeftin qezenc kir li vir radikeve,
Ew Sperkheîos derbas kir û hat û di bin derbeyên Medan de
Ket; mirin li pey ketibû û çavên tûj yên mêrxas
Ew dîtibû û nas kiribû; lê dilê wî yê payebilind
Bi qasî xiyanetê neyne fikara wî baş bû
Û wî baş dît ku li ba mêrxasên Spartayê bimre.

Ji derveyî ya kahîn, em ji bo van kîtabe û kevirên daçikandî deyndarê dînhezîya Amphîktyonîyan in. Kîtabeya Megîstîasê kahîn, ji ber dostîya di navbera wan de, ji alîyê Sîmonîdesê kurê Leoprepes ve hatîye rêkxistin.

[229] Li ser du kesên ji sêsedan, Eûrytos û Arîstodemos, ev çîroka han tê qisekirin: Heke di navbera xwe de li hev kiribûna, dikarîbû herdu rizgar bibin û vegerin Spartayê. (Ji ber ku nexweş ketine, bi nexweşîyeke giran a çav ketibûn, Leonîdas ji bo bêhnvedanê ew şandibûn Alpenosê.) Yan jî illeh nexwazin vegerin, dikarîbûn bi yên din re bimrin. Hilbijartina yek ji wan di destê wan de bû; lê di nav xwe de li hev nekirin; cûda cûda hereket kirin. Dema ku Eûrytos manewraya dorpêçîya Persan seh kir, çekên xwe da anîn, li xwe girê dan û hîlotê wî ew heta meydana şer bir; piştî hîlot ew bir danî wir baz da, Spartayî ket navenda şer û mir. Arîstodemos, bi eksê wî, fêhm kiribû ku cesareta wî ji bo

şer nemaye ji şer dûr ketibû. Heke Arîstodemos bi serê xwe nexweş ketibûya û vegerîyaba Spartayê, yan jî tê gotin herdu bibûna yek û vegerîyana, ez jî wisan texmîn dikim, wê Spartayî ji wan hêrs nebûna; lê yek ji wan miribû, yê din ku, gotineke wî ya din tunebû, nexwestibû bimre; xelasbûna Arîstodemos ji hêrsa Spartayîyan nedihat melhezekirin.

[230] Hinek wiha dibêjin û Arîstodemos bi mahneyeke wiha vegerîyaye Spartayê; li gor hinekan, ji bo xeberekê bibe şandine cihekî ji derveyî baregehê; dikarîbû vegere û beşdarî şerê nû dest pê kirîye bibe, lê beşdar nebûye; di rê de xwe mijûl kirîye û canê xwe xelas kirîye. Halbukî qasidekî din ê hevalê wî, rast vegerîyaye meydana şer û li wir mirîye.

[231] Herkesî bi çavekî xerab li Arîstodemosê vegeraye Lakedaîmonê nêrîye, wî nehêja hesêb kirine; kesekî wekî rûmeta xwe wendakirî dijîya û sivik dihat dîtin; navê wî weke Arîstodemosê tirsonek derketibû, bi wî re nediaxivîn; lê di şerê Plataîayê de, ji tawanbarîya bêrûmet rizgar bûbû.[280]

[232] Tam berevajîya vê jî heye, behsa kesekî ji sêsed kesan jî dikin, wekî qasid şandine Tessalîayê, sax maye -navê wî Pantîtes e- û zanîbû ku vegere Spartayê wê mohra nehêjayîyê lê bê xistin, xwe xeniqandîye.

[233] Thebaîyên di bin fermandarîya Leontîades de hatibûn, li hemberî yekîneyên hikumdar, demekê ji mecbûrî mil bi mil bi Yûnanîyan re şer kiribûn. Lê piştî kifş bû wê serkeftin ji Persan re bimîne, tam dema Leonîdas bi Yûnanîyan re ber bi gir ve baz dan û xwestin cardin xwe bidin hev, ji wî veqetîyan, destê xwe dirêjî barbaran kirin û ji bo pêşwazîya wan baz dan û -ev jî rastîyeke ku gûman jê re tune- ji wan re bi qîr û dengekî bilind gotine; em dostê Medan in, yên cara yekem av û ax dan hikumdar em in, tenê ji bo tirsa canê xwe em hatine Thermopylê û tu guneheke me di zayîata artêşa Hikumdarê Mezin de tune. Bi van gotinan canê xwe rizgar kirin, ji ber ku Thessalîayî jî şahidên rastîya van gotinan in. Lê cardin bêyî zerar bigehe wan rizgar nebûn, dema ku hatin teslîm bibin, barbaran hinek ji wan kuştin; piranîya wan piştî teslîm bûn hêsîr hatin girtin, li ser emrê

280 Ev mijar di pirtûka 9an, beşa 71ê de cih digre.

Xerxes, di serî de fermandarê wan Leontîdes, bi hesinê sincirandî damxeya hikumdarîyê li gewdeya wan xistin. Piştî kurê wî Eûrymakhos, di serê 400 Thebaîyan ve bajarê Plataîayê stend, ji alîyê Plataîayan ve hatîye kuştin.

[234] Yûnanî li Thermopylê bi vî awayî şer kirin. Xerxes, ji bo lêpirsînê bangî Demaratos kir û bi van gotinan dest pê kir: "Demaratos, tu mirovekî rast î; bûyer şahidê wê ne, te çi ji min re gotin tev qewimîn. Niha ji min re bêje: Çiqas Lakedaîmonî mane, di nav wan de çend kes bi vî awayî mêrxas in, yan hemî jî wisa ne!" Demoratos bersiv da: "Hikumdar, hejmara temamê Lakedaîomonîyan gelek e, bajarên wan zêde ne; lê tiştî ku tu dixwazî bizanî tê tam hîn bibî. Li welatê Lakedaîmonê bajarê Spartayê heye; hejmara mêrên li wir heyşt hezaran derbas dike; hemî jî wekî yên li vir şer dikin wisan in; Lakedaîmonê din ne wekî van in, lê cardin kesên mêrxas in." Xerxes ev bersiv dayê: "Demaratos, em bi awayekî herî rehet çawa dikarin bi van? Niha jî vê ji min re bêje; ji ber ku tu hikumdarê wan bû, tu dizanî çi di hişê wan re derbas dibe."

[235] Demaratos bersiv da û got: "Hikumdar, madem tu evqas giringî didî hevdîtinê bi min re, wê rast be ku ez jî bi te re fikrên rast parve bikim. 300 keştîyên xwe bişeyne hemberî Lakonîayê. Cihekî ne dûr ji qiraxê wan ku jê re Kythera tê gotin, giravek heye. Khîlon, kesê herî bi aqil yê ji nav me heta niha derketîye ew e, gotîye ku ji bo Spartayê dîtina vê giravê di bin avê de ji dîtina wê ya ser avê baştir e. Ji ber ku wî, her tim digot û ditirsîya ku wê rojekê ev girav ji bo êrîşeke li dijî Spartayê wekî bingehekê -wekî ku ez ê ji te re behs bikim- bê bikaranîn. Bêguman wî ev ji bo hêza te ya deryayî nedigot, ji bo temamê êrîşîn ji deryayê bên digot. Ew deryavanên ji vê giravê derkevin, dikarin Lakedaîmonan aciz bikin. Heke ew mecbûr bimînin raste rast li ber derîyê xwe şer bikin, qismê mayî yê Yûnanistanê dikare bi artêşa bejahîyê bê sitendin; tirsa wê ew bên alîkarîyê namîne. Qismê Yûnanistanê yê mayî dema ku rê lê teng bibe, li paş tenê Lakonîayek jihêzketî dimîne. Lê heke hûn wiha nekin, guhê xwe bidin van gotinên min: Li ber derîyê Peloponezê bejtengeke gelek teng heye, li vir, temamê Peloponezîyên sûnd xwarinê û bûne yek, wê li dijî te şer bikin û hesab bike, ev şer wê ji ya doh gelekî girantir be. -Lê heke tu plana min qebûl bikî, hem ev bejteng û hem jî sîte bê şer wê teslîmî te bibin."

[236] Piştî Demaratos, fermandarê hêza deryayî Akhaîmenesê birayê Xerxes, dest bi axaftinê kir. Di vê hevdîtinê de ew jî hebû. Hîs kir ku wê Xerxes vê planê qebûl bike, wiha got: "Hikumdar, ez lê dinêrim tu guhê xwe didî vî kesî ku, belkî hesûdîyê ji talihê te dike, yan jî belkî ew wê rojekê bi te re xiyanetê bike. Ev ziravrêsîyên ku Yûnanî gelek jê hez dikin; hesûdîyê ji yê bextewer dikin, ji kesê serdestê wan in jî diranê xwe disûn. Di halê niha de ku jixwe 400 keştî xerq bûne û çûne, heke ji bo ez Peloponezê dorpêç bikim, tu 300 keştîyên din jî bigrî û ji baregeha wan dûr bixî, wê hêza dijmin bibe dengê ya te; bi eksê wê heke hêza me ya deryayî li ser hev bimîne, nikarin bi rehetî êrîşî me bikin, ya rastir, bi zelalî nikarin bikevin şer; heke bi hev re bimeşin, wê hêza deryayî ji artêşa bejahîyê re bibe alîkarî, artêşa bejahîyê jî wê alîkarîya hêza deryayî bike; lê tu deryavanan belavî vir û wir bikî tu feydeke te nagehe wan, sûda wan jî ji te re çênabe. Heke tu dixwazî ji bo fêdeya xwe bifikire, nebêje wê ji ku dest bi şer bikin, wê çi bikin û çend kes in, serê xwe bi hesaba di nav sefên dijmin de çi dibin û diqewimin re newestîne, berde bila ew melhezeya wê bikin; ya pêwist e em bikin, gerek em li karê xwe bi xwe binêrin. Careke din şerkirina Lakedaîmonîyan bi Persan re, ne çareke baş e ji bo rehetkirina birînên wan yê hîn sax nebûne."

[237] Xerxes bi van gotinan bersiv dayê: Akhaîmenes, fikra te bi min rast xuya dike; ez ê wisan bikim. Demaratos jî li gor xwe tiştên hesêb kirin ku rast in ji min re gotin, lê plana wî di bin ya te re ye. Ez qebûl nakim ku ew ji dil ji bo feydeya min kar nake. Ez li yên berê ji min re gotibûn û piştre yên qewimîn dinêrim hikûm dikim: Ji sîtekê kesekî serkeftî derdike, ji hemşehrîyên wî filan kes jê hesûdî dike, ew jî ji filankesî nesîhet dixwaze, mirovê niyetneqenc bêguman wê nesîheta difikire ku baş e nade; ji bo nesîheta baş bide, pêwist e di rêya fezîletê de pêşve ketibe, lê yên wiha gelek kêm in; lê misafirekî biyanî, ji biyanîyekî serkeftî re nesîhetên baş dide. Ji ber wê ji vir şûnve bila kesek min ji bo Demaratos han nede, ew mêvanê min e."

[238] Xerxes piştî van gotinan, li meydana şer a tijî mirî bûn gerîya; dema ku hîn bû Leonîdas fermandar û hikumdarê Lakedaîmonîyan e, emir kir ku serê wî jêkin û gewdeyê wî li sing bixin. Ji nav gelek emareyan, bi taybetî ev helwesta wî jî, bi min dide bawerkirin ku di saxîya Leonîdas de jî ew kesekî herî zêde hêrsa Xerxes kêşaye ser xwe bûye; heke na, li hemberî laşê wî ne-

diket nav guneheke evqas giran. Ji ber ku bi qasî ez dizanim, kesek bi qasî Persîyan di rêzgirtina li hemberî şerkerekî de ne hesas e. -Li gel vê jî, yên ev emir wergirtn, ew bi cih kirin.

[239] [Niha ez ê paşve vegerim ser ya di çîroka min de valahî maye tijî bikim. Berî hemî kesî Lakedaîmonî hîn bibûn ku hikumdar li hemberî Yûnanistanê xwe çekdar dike; li ser vê mirov şandine Delphoîyê û şêwirîne û hinekî li jor ew bersiva min got wergirtibûn; ev xeber bi awayekî gelek ecêb wergirtibûn: Demaratosê kurê Arîston yê xwe avêtibû Medan, ji bo Lakedaîmonîyan qet tiştên baş plan nedikirin -ez ji vê bawer dikim û di her tiştî de rastîya vê derdikeve- û ev ji bo qencîyekê bi wan bike yan henekên xwe bi wan dikir, bi rastî hêjaye bê pirsîn; dixwaze wiha û yan awayekî din be, dema ku Xerxes biryar da bimeşe ser Yûnanistanê, Demaratosê li Sûsayê bû û her tiştî zanîbû, xwest xeberê bide Lakedaîmonîyan. Biserxistina vî karî ne ewqas rehet bû, tehlîkeya girtinê mezin bû; ew di rêyeke gelekî bi hostayî fikirî: texteke du zûl anî,[281] muma li ser kola û derxist, raste rast niyeta hikumdar li ser texteyê kola. Piştî vê bi qateke mumê ser nivîsê girt, tablet wekî dest lê nehatîye dan çêbû û bi vî awayî pêşîya belayeke bi polisên rê re hat girtin. Tablet gihişt Lakedaîmonê, lê Lakedaîmonî ji vê tiştek fêhm nekirin. Gorgoya keça Kleomenes ku jina Leonîdas bû, heke yên ji min re hatin gotin rast bin, tenê wê fêhm kir, ji yên din re jî vegot; got ku lazim e hûn mumê bikolin, dikare li ser texteya binî tiştek hatibe nivîsandin. Gotina wê kirin, xeber derxistin holê, xwendin û gihandin Yûnanîyên din jî. Tê gotin ku ev kar wiha bûye.]

281 Tabletên/Texteyên duzûlî, ji daran dihatin çêkirin. Şima li rûyê hindur didan, bi tiştekî serê wê tûj li ser dinivîsandin.

PIRTÛKA HEYŞTAN

URANIA

ŞERÊN ARTEMÎSÎONÊ

[1] Yûnanîyên beşdarî hêza deryayî bûn ev in: Atînayîyan 127 keştî techîz kirine. Di van keştîyan de wekî tayfe Plataîayî jî bi Atînayîyan re bûne, ew di warê deryavanîyê de ne gelek hoste bûn, lê mêrxas û xebatkar bûn. Korînthosî 40 keştî kirin nav sefê, Megarayî 20 keştî techîz kirin. Khalkîsîyan, tayfeyên 20 keştîyên ku Atînayîyan emanetî wan kiribûn pêk anîbûn; Aîgînayîyan 18 keştî, Sîkyonîyan 12 keştî, Lakedaîmonîyan 10, Epîdaûrosîyan 8, Eretrîayan 7, Troîzenîyan 5, Styrayî bi 2 keştîyan beşdar dibûn. Ji bilî vê Keosî 2 trirem û 2 keştîyên pêncî bêrî. Lokrîsîyên Opûsê jî heft keştîyên pêncî bêrî wekî taqwîye şandibûn.

[2] Miletên li Pozê Artemîsîonê şer dikirin ev bûn û min her yek jê ew keştîyên dabûn jî dan xuyakirin. Yekûna keştîyên li Pozê Artemîsîonê berhev bibûn, ji derveyî keştîyên pêncî bêrî, 271 bû. Eûrybîadesê kurê Eûrykleîdesê ji Spartayê hatibû şandin, Amîralîya fermandarîya bilind girtibû ser xwe; ji ber ku hevalbendan dabûn xuyakirin ku heke fermandarîya bilind Lakonîayî negrin destê xwe, wê qebûl nekirina yekî ji Atînayê bibûya serok û wê beşdarî sefera hatîye plankirin nebûna û paşve vegerîyana.

[3] Bi rastî jî, hê di serî de, heta berîya ji bo peyman çêkin mirov bişînin Sicîlyayê,[282] hiştina birêvebirîya hêzên deryayî ji Atînayîyan re bibû mijar. Lê li hemberî israra hevalbendan, Atînayîyan dev jê berdabûn, ji ber ku rizgarîya Yûnanistanê di ser her tiştî re digirtin û dizanîbûn ku, heke minaqeşeya vê fermandarîyê dest pê bike Yûnanistan mehf dibe -nêrîneke kûr, ji ber ku çawa şer ji aştîyê xerabtir be, dijîtîyên hindur jî ji lihevkirina li ser birêvebirîyeke şer gelekî xerabtir e. Xwe bi vê nêrînê ve girêdan û negotin na, razî bûn,

282 Pirtûka 7an, beşa 157an û piştî wê.

lê ji bo midetekî ji yên din dev jê bernedane û ev jî nîşan dan; Atînayîyan piştî Pers paşve avêtin û dest bi êrîşî kirin, nobranîya Paûsanîas kirin mahne, ji bin fermandarîya Lakedaîmonîyan derketin. Lê ev piştre çêbû.

[4] Ji bo şer wekî yên çûn Thermopylaîyê, Yûnanîyên hatin Pozê Artemîsîonê jî, dema ku hejmara zêde ya keştîyên xwe dan ber Aphetaîyê û mezinahîya hêza dijmin ya belavbûyî nêrîn, ketibûn nav tirsê; fikirîn ku Pozê Artemîsîonê berdin û ber bi alîyê qiraxên Yûnanê ve vekêşin, ji ber ku hêza barbaran qat qat ji ya difikirîn zêdetir bû, texmîna wan gelek xweşbînî mabû. Eûboîayên ku bihîstin çi minaqeşe dibe, ji Eûrybîades hêvî û lava kirin ku heta zarok û mala xwe bikêşin cihekî ewle, li van qiraxan bimîne, wextê daxwazên xwe nedan qebûlkirin, berê xwe dan milekî din, Themîstoklesê serokê Atînayîyan xapandin; ji bo mayîna hêza deryayî û li ber Eûboîayê bikevin şer 30 talant bertîl danê.

[5] Themîstokles, mayîna Yûnanîyan bi vî awayî pêk anî: Pênc talantê vî pereyî, wekî ji bêrîka xwe derdixe veqetand da Eûrybîades. Piştî serok bi dest xist, di navbera fermandarên din de tenê Adeîmantosê kurê Okytosê Korînthosî ma, yê digot illa ez ê ber bi cihekî dûrî Artemîsîonê ba bidim babirkan. Themîstokles got "na", sûndên giran xwarin, "Naxêr, tê me bernedî neçî, ji ber ku heke tu hevalbendan berdî herî ya tu ji hikumdarê Medîyan werbigirî hê zêdetir ez ê xezînekê bidim te." Ji bo vê soza xwe perçîn bike ji keştîya Adeîmantos re sê talant zîv şandin. Bi vî awayî dilê serokan bi diyarîyên wergirtin hatin xweşkirin û daxwazên Eûboîayan bi cih bûn. Di vê navî re Themîstokles jî behra xwe girt. Jixwe kesekî nizanîbû pereyên mane avêtîye bêrîka xwe, dil wan de pereyan girtin ji bo vî karî ji Atînayê hatîye şandin.

[6] Belê, bi vî awayî man li qiraxê Eûboîayê û li vir ketin şerê deryayî. Şer bi vî awayî bû: Barbar, piştî nîvroyê gihiştibûn Aphetaîyê; jixwe zanîbûn çend heb keştîyên Yûnanîyan li dora Artemîsîonê nobedarîyê dikin; dema bi çavê xwe jî dîtin ketin hewesa girtina wan. Lê li hemberî vê hêza deryayî j ibo meşa ji cebheyê wext misaîd nedîtin; Yûnanî ku bibînin diçin bi ser wan de wê baz bidin, bi şev şopa wan nayê dîtin, ditirsîyan ku rizgar bibin; lê barbaran nedixwestin hilgirê agirê pîroz jî baz bide.

[7] Ji bo pêşîya vê tehlîkeyê bigrin wiha kirin: Ji hêza deryayî 200 keştî veqetandin û derxistin rê, wê ew li pişt Skîathosê bifitilîna û ji Pozê Geraîstosê[283] bizivirîna û ber bi Eûrîposê ve biçûna, bi vî awayî dijmin, wê nedîta ku ew ber bi Pozê Kaphereûsê li dora Eûboîayê zivirîne. -Wê ev 200 keştî biketina pişt dijmin û rêya derketinê bibirîna, bi xwe jî raste rast di pey wan de bavêtina ser wan û dijmin bihata dorpêçkirin. Ew keştîyên wê di vê planê de bi cih bikirina derxistin rê; nîyeta wan ku wê rojê êrîşî Yûnanîyan bikin tunebû, heta îşareta dora Eûboîayê hatîye pêçan wernegirtina wê êrîş nekirina. Ji bo wê, keştîyên wê dijmin ji piştve rapêçe şandin û di vê navê re li Aphetaîyê hijmartineke bi hûrgilî kirin.

[8] Dema ku ji keştîyan re bihur dihat çêkirin tiştekî wiha qewimî: Di nav hêza deryayî ya Persan de kesekî Skîoneyî(349) yê navê wî Skyllîas hebû, xewasê herî baş yê dewra xwe bû; dema ku li dora Pelîonê keştî xerq bûn, gelek eşyayên bi qîmet yên Persîyan xelas kiribû, ji bo xwe jî qederek tişt berhev kiribûn. Ev Skyllîasê dixuya zû de bû dixwest derbasî milê Yûnanîyan bibe, lê heta wê rojê firset nedîtibû. Niha ew firset ketibû destan, lê gelo çawa kir ku gihişt Yûnanîyan, ez nikarim vê baş îzah bikim. Hêj jî ez hinek bi şaşmayî ji xwe bi xwe dipirsim: Gelo yên tên gotin rastin? Dibêjin ku xwe avêtîye deryaya Aphetaîyê û heta gihiştine Artemîsîonê ji avê derneketîye; ev tê wê wateyê ew mesafeya 80 stadîonê bi sobanîyê derbas kirîye! Ji bo vî mirovî hê gelek tiştên din tên gotin ku, tev jî devê mirov vekirî dihêlin; yên rast in jî gelek in, lê ji bo vê serkeftinê izin bidin ez çi difikirim bêjim: Her hal bi qayixê çûye Artemîsîonayê, dema ku gihiştîye wir ji srategosîyan re di derbarê keştîyên xerq bûne agahîyên hûrgilî dane û xeber daye wan ku keştî şandine dora Eûboîayê.

[9] Li ser vê xeberê Yûnanîyan rewş di ber çav re derbas kirin. Gelek plan derketine holê, di dawîyê de biryar dan ku ji bo bidin nîşan wê rojê derneketine cihekî, di cihê xwe de bimînin, piştî nîvê şevê derkevin rê û ji bo pêşwazîya keştîyên wê li Eûboîayê bifitilin pêş bikevin. Qasek şûnde, dema ku dîtin tu keştîyên dijmin nayên ser wan, Yûnanîyan bi xwe ji bo tarîya şevê sûd werbigirin û bavêjin ser wan, ji cihê lengeravêtinê derketin. Dixwestin bidin nîşan ka şer çîye û di manewrakirinê de ew çend zîrek in.

283 Pozê Geraîstosê, çima başûrêrojavayê girava Eûboîayê ye.

[10] Ji derveyî Îonîayan, temamê esker û fermandarên Xerxes, dema ku dîtin qemçek keştî ber bi wan ve tên, gotin ku ev dîn bûne; bêpayîn vebûn deryayê, hêvî dikirin ku wê wan rehet bikin nêçîr û ev hêvîya wan gelek xwezayî bû. Ji ber ku Yûnanî bi qemçek keştî derdiketin hemberî girseyeke zêde keştîyan, ji bilî vê keştîyên barbaran di hêla lezgînîyê de serdestir bûn. Bi van hêvîyên gelek zêde dora wan wekî çemberekê pêçan. Îonîayên bi can û ruh girêdayî Yûnanîyan bûn û bêyî daxwaze xwe beşdarî vî şerî bibûn, li hemberî vê dorpêçê gelek diêşîyan û bi wan hêza Yûnanîyan ewqas hindik dihat xuyakirin ku difikirîn wê kesek jê rizgar nebe. Li hemberî vê, yên ji meşa bûyeran kêfa wan xweş bûbû jî, digotin ku keştîya Atînayê ya yekem ez ê bi dest bixim ji bo ji hikumdar diyarîyan werbigirim û bi hev re ketibûn pêşbirkê; ji ber ku di kampa dijmin de qîmeta herî zêde ji bo Atînayîyan dihat dayîn.

[11] Dema ku Yûnanîyan îşareta yekem wergirtin, pêşî pozê keştîyên xwe ber bi barbaran ve zivirandin; paşîya keştîyên wan ber bi hindur ve bîçimeke wekî çemberê wergirtin; di işareta duyem de dest hildan, bêyî ku ji her milî ve hatine dorpêçkirin binêrin, raste rast dest bi êrîşî kirin. Di derbeya yekem de 30 keştîyên barbaran û di vê navê re di nav sefên barbaran de yê navûdengekî wî yê giran heyî, fermandarê navê wî Phîlaonê kurê Khersîs ê birayê Gorgosê hikumdarê Salamîsê bi dest xistin. Ê ji dijmin keştîya yekem stend, kesê navê wî Lykomedesê kurê Aîskhraîos bû û vê kir ku perûyê mêrxasîyê qezenc bike. Dema ku şev da ser û yên şer dikirin ji hevdû da veqetandin, serkeftin di orteyê de mabû. Yûnanî vegerîyan Artemîsîonê û barbar jî Aphetaîyê; şer ji bo barbaran ketibû rewşeke ku ne li hêvîyê bûn. Di vî şerî de yê li ba hikumdar bû û derbasî nav sefên dijmin bû, tenê Antîdorosê Lîmnosî yê Yûnanî bû; Atînayîyan ji bo vê helwêsta wî li Salamîsê erd danê.

[12] Tarîtî daketibû; nîvê havînê bû;[284] temamê şevê wekî lehîyê baran daket, li devera Pelîonê brûskan lê dida, bi ser hev gurmîn ji asîman dihat; deryayê ber bi Aphetaîyê ve laş û perçeyên şikestî yên keştîyan li ber xwe dibir; ev li pêşîya keştîyan berhev dibûn û ji bo xebata bêran dibûn asteng. Eskerên ji girmegirmê ketin nav tirsê, didîtin temamê belayan li ser serê wan berhev bûye, difikirîn ku demên xwe yên dawîyê dijîn; piştî bahoza

284 Tê fêhimkirin ku ev şer di dawîya meha hezîranê û destpêka meha tîrmehê de çêbûye.

‘ecêb li dora Pelîonê derket û xerqbûna gelek keştîyan, bêyî ku wextekî bikaribin nefesekê hildin derbas bibe, ketibûn nav şerekî ne li hêvîyê bûn û piştî ji vî şerî rizgar bûbûn, belê, niha jî barana wekî tofanê, deryayeke tijî anafor ya bisaw û rastî girmegirma asîman ya li ser hev dihatin.

[13] Şeva wan wiha bû. Em bên yên wezîfeya wan li dora Eûboîayê bifitilin, ew şev ji bo wan jî bû bele; tehlîkeyê ew di nîvê deryaya vekirî de girtibû; netîce rewşeke dilşewatî bû, bahoz û baran ew li ser qiraxê Eûboîayê girtibûn, nizanîbûn ka wê bi ku ve biçin, bi ketina ber ba, ketin ser zinarên di sewîya ser rûyê avê û li bejahîyê ketin. Bi kurtî, ji bo îlahî hejmara hêza deryayî ya Persîyan daxe sevîya ya Yûnanîyan û hejmara bi saw a serdestîyê ji destan bistîne, her tişt dikir.

[14] Ev bi vî awayî li ser zinarên ne kûr yê qiraxên Eûboîayê pêçabûn neman. Barbarên li Aphetaîyê jî bi ji nû derketina tîrêjên rojê nefeseke rehet sitendin; nikarîbûn keştîyên xwe bileqînin û ji bilî ku ji tengîya ketinêyê xelas bibin pê ve tiştekî din nedifikirîn. Yûnanîyan, ji Atînayê teqwîyeke 50 keştîyan wergirtibûn. Dema ku xebera hatina van keştîyên wekî alîkarî dabûn nîşan û hêza deryayî ya din li qiraxên Eûboîayê rastî bahozê hatîye û perçe perçe bûye wergirtin, cesareta Yûnanîyan zêde bû. Man li hêvîya saeta rojek berê û vebûn deryayê û avêtin ser keştîyên Kîlîkyayê. Ew xerq kirin û dema ku bû şev vegerîyan Artemîsîonê.

[15] Roja sisiyan, farmandarên barbaran ku ji ber hêzeke wiha biçûk ya deryayî ew bi vî awayî tengasîyê dîn bûn, ji bilî vê ji hêrsa Xerxes jî tirsîyan, berhev bûn, hevdîtin kirin û êdî bê li hêvîya êrîşên Yûnanîyan bin, di nîvê rojê de lenger hildan. Ev rojên şerê deryayî dihatin kirin, rastî rojên şerê bejahîyê yê li Thermopylaîyê dihatin. Çawa di bejahîyê de Leonîdas û hevalên wî ji bo bihurkê bernedin şer dikirin, di deryayê de jî armanca şer Eûrîpos bû. Yên parêzgerî dikirin çawa dixebitîn ji bo barbaran nekin nav Yûnanistanê hêz didan hev, dijmin jî han dida ku rê vekin yekîneyên Yûnanîya paşve bavêjin.

[16] Dema ku deryavanên Xerxes ketin nav pergala şer, Yûnanî li Artemîsîonê bêhna xwe vedidan. Hêza deryayî ya barbaran bîçima kevanê wergirtibû, dixwest yên din bi manewrayeke dorpêçî têke tengîyê. Wî wextî

Yûnanî derketin û ketin pêxêla hev. Di vî şerî de ji bo herdu milan jî şans kêm-zêde wekî hev bû, ji ber ku mezinî û serdestîya hejmaran ji bo hêza deryayî ya Xerxes zerar bû, keştîyan nikarîbûn serbest hereket bikin, diketin ser hev. Bi ser vê de jî xwe baş radigirtin, serî neditewandin; ji ber ku Persîyan li ber evqas keştîyên kêm paşvekêşî layîq xwe nedidîtin. Gelek keştîyên Yûnanîyan ji niha ve xerq bûbûn, gelek esker ketibûn; wendayîyên barbaran hem di hêla keştîyan de û hem jî di hêla insan de hê mezintir bû. Şerê bi vî awayî meşîya, bi vekişandina cihê xwe yê herdu alîyên dawî lê hat.

[17] Di vî şerê deryayî de, di nav eskerên Xerxes de yên herî zêde xwe nîşan dan Misrî bûn. Ji bilî qezenckirina serkevtînên giring, pênc keştîyên Yûnanîyan bi yên tê de girtin. Di nav Yûnanîyan de jî rûmeta rojê ji Atînayîyan re, ji nav Atînayîyan jî bû nesîbê Kleînîasê kurê Alkîbîades yê ji bêrîka xwe keştîyek techîz kiribû û bi 200 mirovên xwe ve beşdarî seferê bûbû.

[18] Dema ku şer temam bû, herdu alî jî di nav kêfxweşîyê de, çûn cihê xwe yê lengeravêtinê. Kelax û leşên keştîyan jî, man di destê Yunanîyên di vî beşê şer de bûn; lê hal di wan de nemabû, bi taybetî nîvê keştîyên Yûnanîyan ketibûn halekî êdî neyên bikaranîn. Plan dikirin ber bi başûr ve, ber bi Yûnanistanê ve vekişin.

[19] Lê Themîstokles difikirî ku heke yekîneyên Îonê û Karyayê ji barbaran bên veqetandin, wê heq ji yên mayî derkevin. Eûboîayî li qiraxê, ji bo li keştîyan bar bikin kerîyên xwe berhev dikirin. Themîstokles bangî farmandarên keştîyan ku bên wir, ji wan re got, di torbeya wî de, hîleke ku hesêb dike wê hevalbendên herî baş yên Hikumdarê Mezin ji destan bistîne heye. Ji wê pê ve tiştek negot û di rewşa wê rojê de wê çi bikin ji wan re got; pêwist bû kerîyên Eûboîayan ji dest wan derxînin (ji bedêla bikevin destê dijmin bila artêş jê sûd werbigire digotin); wê herkesî bikra ku zilamên wan agir pêxistina; wê wî bigota ka keştî kengî radibin, ji bo ku keştî bêyî zerarê bibînin bigihin Yûnanistanê çi pêwist bû wê bihata kirin. Yên gotin hatin kirin; agir hatin pêxistin û kerî avêtin ser.

[20] Bi rastî Eûboîayî kehaneta Bakîsê wekî ku ne giring e guhê xwe nedabûnê; ji giravan tiştek nekişandibûn, dorpêçî nefikirîbûn û xwarin depo

nekiribûn; hesab nekiribûn ku wê rojek şer bê ber derîyê wan jî û li hemberî bûyeran bi xwe jî vekirî bûn. Kehaneta Bakîs ya di warê Eûboîayê de ev e:

Kesê zimanê barbaran diaxive, bi nîrê Papîrûsê
Dema bi sûran serî da tewandin, kerîyên te yên dikalin,
Li dûrî girava bizinên te lê wenda bûn, di bin ewlehîyê de ne
Li çareya wergirtina wan binêre.

Di navenda belayên teqîyane yan kêm maye biteqin de, ji bo ku guhê xwe nedan van gotinan, bêsekin ji bo ruxandinek ji kokê ve berê belayê dan ser xwe.

[21] Yûnanîyan, dema ku tiştên Themostokles digotin dikirin, çavdêrê li Trakhîsê hat. Li Artemîsîonê çavdêrekî Antikyrayî yê navê wî Polyas hebû. Emrê ku wergirtibû, qayêxeke baş hatibe techîzkirin hazir bigre û heke artêşa deryayî têk biçe, bêpayîn biçe vê xeberê bigehîne şerkerên Thermopylaîyê; wekî vê li ba Leonîdas kesekî Atînayî yê navê wî Abronîkhosê kurê Lysîkles, ji bo siwar bibe xeberê bigehîne Artemîsîonayê keştîyeke sîh bêrî hazir li hêvîyê bû, ev jî heke di rewşa artêşa bejahîyê de guherînek çêbibe wê xeber bigihanda. Belê, yê hat ev Abronîkhos bû, ji bo xebera encama Leonîdas û artêşa wî ragehîne hatibû. Li ser vê xeberê dev ji paşxistina paşvekêşîyê berdan û wextê di lengeravêtinê de li ser kîjan pergalê ne, bêyî wê rêzê xera bikin, Korînthosî pêşeng, Atînayî li paşî, ketin rê.

[22] Themîstokles, babirkên herî baş yên Atînayîyan girt, ber bi çavkanîyên avê yên tên vexwarin ve çû; li wir li ser zinaran, ji bo Îonîayên wê sibehê bên Artemîsîonê bixwînin mesaj da kolandin. Van mesajan wiha digotin: "Îonîayî, hûn neheqîyê dikin li hemberî bav û kalên xwe şer dikin û ji bo kolekirina Yûnanistanê di tevgerê de ne. Ez ji we, pêşî ketina nav sefên me dixwazim; heke ev ji destê we neyê, wî wextî hêj ne dereng e, ji bo me vê bikin: ji şer re bibin temaşevan û bixebitin bila Karyayî jî eynî tiştî bikin; heke ev jî nebe, ew zincîra we girê dide ewqas hişk be, wî wextî tenê wekî hûn şer dikin bikin; ji bîr nekin ku hûn jî ji me ne û di serê pêşî de me ji bo we bi barbaran re şer da destpêkirin." Li gor fikra min, dema ku Themmîstokles ev mesaj nivîsand du pêkanî hesêb kirîye: Wê xebera hikumdar ji vê mesajê hebe, belkî jî çênebe, heke nebe jî wê ev tesîr li Îonîayan bikira û pêk bianîya ku ew bi Yûnanan re bibin yek. Na heke xebera Xerxes çêbibe, hikumdar

dikare vê xerab şîrove bike, bawerîya wî bi Îonîayan nemîne û wan ji şerê deryayê dûr bigre.

[23] Belê Themîstokles ev mesaj li ser zinêr da kolan. Tam di pey de kesekî Hîstîaîayî di nav qayixekê de hat ba barbaran, xeber gihand ku Yûnanî ji Artemîsîonê vekêşîyane. Wan bawerî bi xeberê nekirin, ew kes girtin bin çav, babirkên lezgîn şandin û xwestin rewşê bi çavê xwe bibînin; çûn û vegerîyan û xeber rast bû. Li ser vê dema rojê bi tîrêjên xwe şewq da derdorê, temamê hêza deryayî ber bi Artemîsîonê ve ket rê. Heta nîvê rojê li wir man, piştre çûn Hîstîaîayê.[285] Dema ku gihiştin wir serekbajarê Hîstîaîayan û Ellopîayan girtin û êrîşî temamê qesebeyên qiraxan yên Hîstîaîayê kirin.

BARBAR DIMEŞIN DELPHOÎYÊ

[24] Dema ew li wir bûn, qasidê Xerxes yê ji bo mirîyan tertîbeke sexte hazir kiribû hat; ew tertîba sexte ya ez dibêjim ev e: Eskerên ji artêşa xwe yên li Thermopylaîyê ketibûn, tenê bi qasî hezaran jê li meydanê hiştibû (hemû 20.000 bû); yên mayî di xendeqên taybetî yên dabûn kolan de veşartibûn, pel û axa hûrkirî li ser wan dabû raxistin; bi vî awayî wê wan ji ber çavê eskerên deryayî bidaya wendakirin. Dema ku qasid hat giravê û gihişt Hîstîaîayê, ji temamê artêşa deryayî meclisek berhev kir û mesaj da diyarkirin: "Eskerên hevalbend, li hemberî van dînên pozbilindîyê dikin ku xwe ji hêza Hikumdarê Mezin bilindtir dibînin, heke kesek hebe bixwaze ka çawa şer kirin, Hikumdar Xerxes izin dide ew dev ji wezîfeya xwe berdin."

[25] Piştî qasid ev xeber ragihand, yên dixwestin biçin û bibînin ewqas zêde bûn, peydakirina keştîyan bû karekî zehmet. Derketin bejahîyê, li meydana şer gerîyan û mirî dîtin; wan fêhm kirin ku yên li wir raketibûn hemî Lakedaîmonî û Thespîayî ne; hîlotî jî didîtin. Lê ew hîleya Xerxes ya ji bo mirîyên xwe veşêre serî lê dabû, nikarîbû ew deryavanên anîbûn bixapîne; hîle ewqas cihê pêkenînê bû ku di miqabilî hezar mirîyên li ser erdê hatibûn raxistin, çar hezar mirîyên bi kom yên li ser hev hatibûn danîn hebû, ji ber ku temamê mirîyên dijmin li cihekî kom kiribûn. Ew roj bi vî awayî

285 Hîstîaîa, bajarekî qeraxê yê li bakurê Eûboîayê ye.

ji bo gera meydana şer hat veqetandin; roja din qismek vegerîyan keştîya li Hîstîaîayê, qismê din jî bi Xerxes re derketin rê.

[26] Qismek kêm qaçaxên eskerîyê yên Arkadîayî hatibûn; kesên birçî û hejar bûn, kar dixwestin. Persîyan ew ji hikumdar re birin û xeberên li ser Yûnanîyan ji wan hatin pirsîn; li ser navê tevan yekî bersiv dida. Bersiva ku Yûnanî bi leyzên Olîmpîyadê re mijûl in û pêşbirkîyên jîmnastîkê û beza hespan dikin wergirtin. Yê pirs dikirin pirsî, di pêşbirkan de xelat çiqas in; bersiva yê qezenc dike taceke ji şaxên zeytûnê werdigire girtin. Belê, wî wextî ye ku, Trîtantaîkhmesê kurê Artabanos, ji bo hîseke payebilind anî ziman, hikumdar ew bi newêrokîyê tawanbar kiribû. Trîtantaîkhmes, dema ku seh kir xelat ne pere ye tac e, nikarîbû xwe bigre û di nava herkesî de got û qîr kir: "Ax Mardonîos! Lêbinêre te em bi insanên çawa re kirin nav şer. Ew ne ji bo pereyan, ji bo rûmetê şer dikin!"

[27] Trîtantaîkhmes bi vî awayî qîr kiribû. -Di vê navê re û piştî şikestina Thermopylaîyê, Thessalîayî çawîşekî qasid ji Phokîsîyan re şandibûn. Her wextê ji wan nefret kiribûn, bi taybetî piştî vê şikestinê, nefreta wan zêde bûbû. Bi rastî berî sefera hikumdar vekir ne bi gelekî, Thessalîayî bi terefdarên xwe re berhev bûne û bi hemî hêza xwe ve Phokîs îstîla kirine, Phokîsî ew mexlûb kirine û xerab têk birine. Phokîsî li Çiyayê Parnasosê berhev bûn. Tellîasê kahînê Elîsî jî bi wan re bû; Tellîas hîleke şer ya bi hostayî dît. 600 eskerên bijarte yên Phokîsî, ew û çekên wan di cilsê dakirin; bi şev li hemberî Thessalîayan dest bi êrîşê kirin; ji wan re gotibû ku çi kesî ku wiha nehatibe spîkirin bikujin. Nobedarên Thessalîayî yên pêşîyê ew dîtin, dil wan de bi tiştekî nexwezayî re rûbirû bûne û baz dan; artêş ji serî heta binî ket nav tirsê, ewqas ku, Phokîsîyan çar hezar dijmin kuştin, çar hezar mertal bi dest wan ketin; nîvê van mertalan ji Abaîyê re, nîvê din jî ji Delphoîyê re şandin. Piştî şer temam bû, ji dehan yekê wan xenîmetên wergirtibûn, pê peykerên mezin dan çêkirin, ew li Delphoîyê li dora sêpêyan disekinin, yên mîna wan li Abaîyê ne.

[28] Phokîsîyên, ew felaketa anîn serê piyadeyên Thessalîayê yên ew dorpêç kiribûn ev e; tiştên mûyê bedena mirov dikin şûşin jî anîn serê wan siwarîyên ketibûn nav erdê wan: Xendeqeke mezin li bihureke ne zêde ji

Hyampolîsê dûr kolane, hindurê wê tijî amphora kirine; ser bi axa ku ferqa wê ji ya dora wê tunebe rast kirine û êrîşa Thessalîayan li vir pêşwazî kirine. Dema ku wan êrîşî ser Phokîsîyan kirine, ketine nav vê xendeqa tijî amphorayê, lingê hespên wan şikestine.

[29] Ji ber van herdu şikestinan, kîneke mezin di dilê Thessalîayan de hebû; bi çawîşê qasid re ev xeber şandin: "Phokîsîyan, êdî pêwist e we qisûra xwe zêde fêhm kiribe, qebûl bikin ku hûn ne dengê me ne. Berê ku em bi Yûnanê re bûn, yanî di midetê ku me dixwest em bi wan re di nav yekîtîyekê de bin, em ji we serdestir bûn, niha jî em li rexê barbaran in, heke em bixwazin em dikarin erdê we talan bikin, heta heke pêwîst be we bikin kole. Em dikarin her tiştî bikin; lê di hindurê me de kîn tune, hûn jî di miqabilî vê de 50 talant zîv bidin, wî wextî em ê jî soz bidin ew tehlîkeya li ser erdê we dûr bêxin."

[30] Belavoka Thessalîayan ev bû. Bi rastî jî di vê herêmê de ya derbasî milê Medan nebû, tenê Phokîsî mabûn, wextê ez mijarê lêdikolim ez digihim qeneeta nefreta wan a li dijî Thessalîayan. Ez difikirim ku heke Thessalîayî derbasî sefên Yûnanistanê bibûna, wê Phokîsî jî bibûna terefdarê Medan. Wan gotin ku wê li hemberî belavoka Thessalîayan tiştek nedin, heke bixwestina wê wan jî hê di serî de wekî Thessalîayan ji Medîyan re bigotina hûn bi xêr hatine. Lê îlawe kirin ku wê tu wextê dilê wan razî nebe ku li Yûnanistanê xîyanetê bikin.

[31] Thessalîayên ji vê bersivê hêrs bûn, ji bo bimeşe ser Phokîsê rehber dan hikumdar. Artêşa Persê ji Trakhîsê derbasî Dorîsê bû; Dorîs li vir, di navbera Malîs û Phokîsê de ne, kêm-zêde bi firehîya 30 stadan wekî şerîdeke teng a erd dirêj dibe; berê Dorîsa jê re Dryopîs dihat gotin, welatê Dorîsîyên Peloponezê ye. Barbar ketin Dorîsê, lê xera nekirin, xelkê li ber Medan serî tewandibûn, Thessalîayan jî nexwestibûn kes destê xwe bidin wan.

[32] Persên ji Dorîsê derbasî Phokîsê bûn, nekarîbûn yên li vir rûdinên bigrin; hinek jê xwe avêtibûn girên Parnassosê (jora Parnassosê li herêma Neonê, di zîrweya Çiyayê Tithoreayê yê cûda û bi serê xwe disekine, ku dikare gelek kesan bihewîne); hinek jê, qismeke wan ê mezin, koçî ba Lokrîsîyên Ozolaîyê yên li Amphîssaya li Deşta Krîsa hatîye avakirin, kiri-

bûn. Barbaran tenê Phokîs talan û wêran kirin; ji bo rehberîya artêşê bikin Thessalîayan ev sîstem tetbîq dikirin. Ji cihê derbas dibûn çandinî dişewitandin, dar ji kokê wan jê dikirin, agir berdidan bajar û perestgehan.

[33] Deşta Kephîssosê teqîb dikirin, her cih şewitandin û xera kirin. Bajarên Drymosê, Kharadrayê, Erokhosê, Tethronîonê, Amphîkaîayê, Neonê, Pedîaîyê, Trîtaîyê, Elateîayê, Hyampolîsê, Parapotamîoîyê û Abaîya tê de perestgeha mezin a Apollonê û gelek dîyarî û xezîne hene şewitandin. Li wir wekî îro wî wextî jî kahînek hebû; ji talan û şewatê perestgeh jî nefilitî. Li ber pêşkên çîyê çend Phokîsî girtibûn, li ser hev tecawuzî jinan kirin û piştre ew kuştin.

[34] Barbarên ji Parapotamîoîyê derbas bûn hatin Panopeaîyê. Artêş li wir veqetîya. Qismê hê zêde û bi hêz, bi Xerxes re ber bi Atînayê ve çû, ji erdê Orkhomenosê ket Boîotîayê. Temamê miletê Boîotîayê bûbûn alîgirê Medan û ji alîyê Makedonîayên li bajaran belav bûbûn ve dihatin parastin; belê, yekîneke ji artêşa barbaran di vir re derbas dibû.

[35] Qismê din, li pey rehberên ketibûn pêşîya wan, Parnassosê li milê xwe yê rastê hiştin û dimeşîyan ser perestgeha Delphoîyê. Dema ku ew jî ji erdê Phokîsê derbas bûn kevir li ser kevir nehiştin; bajarên Panopîyan, Daûlîyan û Aîolîdîyan şewitandin. Mebesta wan a veqetandina ji artêşê û çûna ber bi vê rêyê ve, wergirtina perestgeha Delphoîyê û xezîneyên tê de û birina wê ji Xerxes re bû. Xerxes di perestgehê de, ji yên di seraya wî de hê bi qîmettir çi heye tevde zanîbû, ji min re wisan gotibûn; gelek kesan xezîne yek bi yek hejmartibûn û jê re gotibûn; bi taybetî ji êşkêşîyên Kroîsosê kurê Alyates agahdar bû.

[36] Delphoîyên dizanîbûn wê çi bê serê wan, ketibûn nav lezûbezekê; di nav gêjbûna tevlihevîyê, bi kahîn şêwirîn bê ka em ê çi bikin ji eşyayên pîroz: Gelo têxistana bin erdê, yan bişandina welatekî din? Îlah qedexe kir ku ji cihê xwe bilebitin; tiştên yê wî ne wê wî bi xwe nobedarî jê re bikira, bi vî awayî bersiv da. Li ser vê Delphoî ketin derdê malên xwe. Jin û zarokên xwe derbasî qiraxê milê din yê kendavê kirin, şandin Akhaîayê, piranîya wan hilkêşîyan serê girê Parnassosê, eşyayên xwe di şikefta Korykosê de veşartin; hinek jî bi xef derbasî Lokrîsê û Amphîssayê bûn. Bi yek gotinê Delphoîyan bajar vala kirin, li paş tenê 60 hemwelatî û berdevkê îlah ma.

[37] Dema ku îstîlaker bi qasî ku bên dîtin nêzîkî avahîya pîroz bûn, berdevk yê navê wî Akeratos bû, dît ku desteyek çek li pêşîya perestgehê ne, ew ji hindur, ji salona mezin anîbûn; halbukî ev çekên pîroz bûn, kî bûya bila bibûya kes nikarîbû dest bida wan, guneh bû. Baz da û ev bûyera nexwezayî gihande Delphoîyên li bajêr mabûn. Lê dema ku barbar di rewşeke bi belavî û bêserûber de hatin û gihiştin ber perestgeha Pronaîaya Atheneyê, dîtin ku hinek mûcîzeyên din ketin ser ya gavek berîya niha hat dîtin. Di rastîyê de hatina birek wasiteyên şer xwe bi xwe û derketina wan ji derveyî perestgehê, mûcîzeyek bû. Lê ya di esasê xwe de mirov lê şaşmayî dimîne, mûcîzeya piştî vê ye. Min digot, dema ku barbar hatin pêşberî perestgeha Pronaîaya Atheneyê, ji asîman brûsk rijîyan ser wan; du zinarên ji girên Parnassosê filitîn, bi dengekî nedîtî ketin ser îstîlakeran, gelek jê perçiqandin û di wê navê re ji hindurê perestgeha Pronaîaya Atheneyê dengek bilind bû, narayeke şer jê bilind bû.

[38] Ev bûyerên tev hatin ba hev, tirs kir dilê barbaran. Baz dan, Delphoyîyên ev xeber wergirtin ji çiyan daketin xwarê, li pey wan ketin û piranîya wan kuştin. Yên rizgar bûn bi zorê xwe avêtin Boîotîayê. Barbarên ji vir baz dan, li gorî wan digotin, ji derveyî van mûcîzeyan, gelek tiştên îlahî yên din jî dîtine: Du hoplîtên ji bejna insanekî bilindtir ketine pey wan, ew dane ber şûran, raqewirandine.

[39] Ev herdu, li gor Delphoîyan mêrxasên millî ne, kelehên wan yên pîroz li dora perestgehên Phylakos û Aûtonoosê hene. Ya Phylakos tam li qiraxa rê, tam li ser perestgeha Pronaîaya Atheneyê ye, ya Aûtonoos jî li ber pêşkên gir e ya jê re Girê Hyampîa tê gotin, li rexê Kahnîya Kastalîayê. Zinarên ji Parnassosê filitîn, îro jî li cihê xwe disekinin; di nav dîwarên perestgeha Pronaîaya Atheneyê de ne, li cihê ku piştî di nav barbaran de gindirîn çûn û sekinîn e. -Belê ev kesên han ji avahîyên pîroz bi vî awayî baz dane.

BERÎ ŞERÊ SALAMÎSÊ

[40] Hêza deryayî ya Yûnanîyan ya ji Artemîsîonê derket, li ser ricaya Atînayîyan xwe dabû ber Salamîsê. Atînayî ji bo jin û zarokên xwe bibin derveyî Attîkayê cihekî ewle û di warê karên wê bikin de hevdîtina bikin, ji

hevalbendên xwe çûna Salamîsê xwestibûn. Ji ber ku rewş ew careke din mecbûrî axaftinê dikir; tiştên li hêvîyê bûn nebûbûn: Ferz kiribûn ku wê artêşa Peloponezê li Boîotîayê li hemberî barbaran li ber xwe bide û li hemberî wan bi awayekî zexim raxweste; lê wiha nebûbû û pê hesîyan ku niha jî Peloponezî dest pê kirine li ser Îsthmosê dîwar lê dikin, ew ketine derdê xwe û guhê xwe nadin alîyê jor. Ji bo van bûyeran hîn bûbûn ku, ji hevalbendên xwe xwestibûn biçin Salamîsê.

[41] Bi vî awayî hatin Salamîsê. Atînayî jî hatin welatê xwe. Çawa hatin biryarek belav kirin, bang kirin ku yên li Atînayê rûdinin bi imkanên xwe, jin û zarokên xwe bigrin bin ewlehîyê. Li ser vê piranîyan jin û zarokên xwe şandin Troîzenê, hinekan şandin Aîgînayê û hinekên din jî şandin Salamîsê. Sebebê bi lez dûrxistina wan, guhdana bi kehanetekê bû, lê sebebê eslî ev bû: Atînayî dibêjin ku, marekî gelek mezin hebû, di nav perestgehê de dijîya û parêzvanê Akropolê bû; tenê bi van gotinan namînin, wî mêvanê perestgehê hesêb dikin, meh bi meh wekî bac didin, kadên hingivînî jê re dibirin; her wextê ev kade dixwar, lê niha kade bêdestlêdan li wir bû. Rehbik xebera rewşa heyî ragihandibû; Atînayî kêlîyekê dereng neman, bêsekin lez kirin ku ji bajêr derkevin, ji ber ku gihiştin qeneetekê ku îlahe jî perestgeh terk kirîye û çûye. Piştî malên xwe kêşan û girtin bin ewlehîyê, vegerîyan ketin nav artêşa deryayî.

[42] Dema ku yên ji Artemîsîonê hatin li Salamîsê lengerê keştîyên xwe avêtin, hêzên deryayî yên Yûnanî yên din jî, dîtin ku ew hatine, bi lez ji Troîzenê hatin û ketin nav wan, ji ber ku li gor emrekî berîya wê wergirtibûn wê temamê keştîyan li kendava Troîzenê ya Pagonê berhev bûbûn. Niha ji ya Artemîsîonê gelek giringtir hêzeke deryayî berhev kiribûn; jixwe ev ji alîyê zêdetir sîteyan ve hatibûn techîzkirin. Fermandarî cardin yê li Artemîsîonê bû, tim ew Eûrybîadesê Spartayî kurê Eûrykleîdes bû ku di eslê xwe de ne ji nesla hikumdar jî bû. Yên keştîyên herî zêde dabûn, bibabirk herî baş techîz kiribûn Atînayî bûn.

[43] Ew miletên beşdarî seferê bûbûn ev in: Ji Peloponezê, Lakedaîmonê 16 keştî, Korînthosî li Artemîsionê çiqas bûn cardin ewqas, Sîkyonî 15 keştî, Epîdaûrosî 10 keştî, Troîzenî 5, Hermîoneyî 3 keştî. Ji bilî ev ê dawî, yên din

tevde ji nijada Dor û Makedon in, berîya vê sekeneya wan a dawîyê Erîneos, Pîndoz û Dryopîsê ye. Hermîoneyî ji Dryopîsê ne, Herakles û Malîsîyan niha ew ji welatê jê re Dorîs tê gotin, raqewirandine.

[44] Yên ji Peloponezê beşdarî seferê bûbûn ev bûn. Derveyî Peloponezîyan ji bejahîyê, pêşî pêwist e Atînayî bên hijmartin, dikare bi temamê din yên keştî anîbûn re bên pîvan, tenê yên aîdê wan 180 keştî anîbûn; ji ber ku li Salamîsê Plataîyî ne bi wan re bûn, sebebê wê ev bû: Piştî Yûnanî ji Artemîsîonê veqetîyan û hatin pêşberî Khalkîsê, Plataîayî derketin qiraxên Boîotîayê yê li hemberî Eûboîayê dikevin; dema bi van karan ve mijûl bûn dereng mabûn. -Dema ku welatê niha jê re Yûnanistan tê gotin di destê Pelasgîyan de bû, Atînayî jî ji Pelasgîyan bûn û navê wan Kranaî bû; di dewra Hikumdar Kekrops de navê Kekropîdî wergirtine, piştre dema ku Erekhtheûs iktidar girt destê xwe, navê wê hatîye guhertin û bûye Atîna; piştre Îonê kurê Ksûthos bûye fermandarê artêşa Atînayê û bi wî re navê Îonîayê wergirtîye.[286]

[45] Keştîyên Megarayî bi qasî yê li Artemîsîonê beşdar bibûn; Amprakîayî ji hevalbendan re heft keştî anîne, Leûkasîyan jî 3 keştî; ev yên dawîyê ji nesla Dor in û ji Korînthosê hatine.

[46] Ji yê li giravan rûdiniştin Aîgînayî, 30 keştî dianîn. Hê zêde keştî techîz kiribûn, lê wan ji bo welatê xwe biparêzin bikar dianîn, li Salamîsê bi van 30 bibabirkan şer kiribûn. Aîgînayî ji Dorên Epîdaûrosê bûn; berê navê wan Oînone bû. Piştî Aîgînayîyan, Khalkîsî li Artemîsîonê bi 20 keştîyan ve ketin nav rêzê û di wî şerî de bi heft keştîyan ve Eretrîayî dihatin; ev Îonîayî ne; Keosî ku ev jî Îonîayîyên ji Atînayê hatine, bi eynî keştîyên li Artemîsîonê beşdar dibûn. Naxosîyan çar keştî techîz kiribûn; hemwelatîyên wan wekî giravîyên din kirine, ew ji bo beşdarî Medan bibin şandine, lê guhê xwe nedane emrê wergirtine beşdarî Yûnanîyan bûne û ev li ser daxwaza Demokrîtos yê ku fermandarê vê hêza deryayî û giregirekî giravê bû kirine. Naxosî, ji Îonîayên bi eslê xwe Atînayî ne. Styrayî bi keştîyên li Artemîsîonê beşdar dibûn; Kythnosî bi trîremekê û yek 50 bêrî; ev herdu

286 Di gelek cihên me Yûnan û Yûnanistan bi kar anîye di wergera Îngilîzî de nav wek Grek/Grîsî(Greece) û Grekî derbas dibe.

milet ji Dryopîsê ne. Eerîphos, Sîphnos û Malîsî jî beşdarî seferê dibûn; yên li giravê dijîyan û av û ax nedabûn barbaran tenê ev in.

[47] Temamê van miletên ji bo beşdarî vê seferê bibin berhev bûbûn, ji Thesprotan û Akheronê hinekî wêdetir rûdinin;[287] erdê Thesprotîyan bi erdê Amprakîayî û Leûkasî ve bû ku, ew jî di nav hevalbendan de bûn û yên ji cihê herî dûr hatibûn ev bûn. Yên li derveyî vî sînorî rûdinin tenê Krotonî hatibûn hawara Yûnanîyên ketibûn tehlîkeyê, ew jî bi keştîyekê ve; fermandarê wan Phayllos bû yê ku sê caran di leyzên Pythîayê de bi ser ketibû. Krotonî ji nesla Akhaîayê ne.

[48] Ji derveyî Melosî, Sîphnosî û Serîphosîyên ku keştîyên pêncî bêrî şandibûn, hemî bi trîreman beşdar dibûn; Melosîyên ji yên pêncî bêrî ku eslê wan Lakedaîmonî ne, dudu; Sîphnosî û Serîphosî ku ji Îonîayên eslê xwe Atînayî ne, her yekî yek dabûn. Ji derveyî yên pêncî bêrî, yekûn dike 378 keştî.

[49] Dema ku fermandarên sîteyên me hijmartin li Salamîsê hatin ba hev meclisek berhev kirin. Eûrybîades rûniştin vekir, da xuyakirin ku kesên dixwazin nêrînê xwe pêşkêş bikin, bila bikin: Gelo li kîjan herêma di destê wan de dest bi şer bikin başe? Madem Attîka êdî ne di destê wan de ye, wî wextî lazim e li ser cihekî din bifikirîn. Piranîya nêrînên dihatin pêşkêşkirin, digotin ku ber bi Îsthmosê ve vekişîn û di noqteke pêşberî Peloponezê ketina şer baştir e; bingeha vê nêrînê ji ber ku digotin, heke em li Salamîsê bimînin û di deryayê de têk biçin, em ê di giravekê de dorpêçkirî bimînin,. Li wir ji tu milekî imkana girtina alîkarîyê tunebû, lê heke li nêzîkî Îsthmosê be, wê her yek jê bikarîba biçûya welatê xwe.

[50] Di esnayê fermandarên Peloponezî ev nêrîn pêşpêş dikirin, Atînayîyek derket hat û got ku barbar ketine Attîkayê û welat ji serî heta binî şewitandine. Bi rastî jî yekîneyên di bin fermandarîya Xerxes de derbasî Boîotîayê bûbûn, bajarê Thespîayîyan yên xwe avêtibûn Peloponezê û cardin bajarê Plataîayê yê vala şewitandibûn. Ji ber ku hikumdar, ji Thebaîyan hîn bûbû ku, ew naxwazin bibin hevalbendên Medan.

287 Thesprotî. Li başûrêrojavayê Epîrê (Epeîros) rûdiniştin. Rûbarê Akheronê di erdê wan re derbas dibe.

XERXES AKROPOLA ATÎNAYÊ DIŞEWITÎNE

[51] Barbar, mehekê li Hellespontosê mabûn û di vî midetî de li Ewrûpayê hazirî kirine, ji dema Hellespontosê derbas kirin heta niha û heya gihiştin Attîkayê, sê meh derbas bûbû û ev dewr tê rastî dema ku Kallîades li Atînayê bûbû arkhont(hukumran). Bajarê vala stendin; tenê çend Atînayîyên xwe avêtibûn perestgehê, kehyayên perestgehê û hinek feqîr û bêmicalên Atînayî yên li hemberî êrîşîn dijmin barîqadên ji daran li ser Akropolê çêkiribûn pê ve kesek nedîtin; ev bi qasî nikaribin bazdana ji Salamîsê bifikirin, ewqas feqîr bûn. Ji bilî vê, dixwestin manaya kehaneta Pythîa ya rastî ya nestendina dîwara ya ji daran hîn bibin. Li gor fikra wan ew sitargeha kahîn dabû nîşan vir bû, ne keştî bûn.

[52] Persîyan, berpala tîk ya ketibû pêşberî Akropolê û Atînayîyan jê re girê Aresê digotin girtin û keleh dorpêç kirin û bi vî awayî kirin: Li serê tîrên xwe pertik girê dan, vêxistin û avêtin barîqadan. Atînayîyên hatibûn dorpêçkirin, di gel ku di rewşeke xerab de ketibûn tengîyê û dîwarê ji singan hatibûn çêkirin bi wan re xîyanet kiribû jî, li ber xwe didan. Peîsîstratîdî beyhûde bangî wan dikirin ku teslîm bibin, nedixwestin guhdar jî bikin; ji bo parastinê çi ji destê wan dihat dikirin û bi taybetî, dema ku barbar ber bi derîyan ve hatin, kevirên mezin bi ser wan de gindirandin; qederekê Xerxes bêçare kiribûn û kiribûn halekî ku nizanibe wê çi bike.

[53] Lê barbaran di dawîyê de çareya wê dîtin; ji ber ku ji bo kahenet bê pêkanîn, pêwist bû her tiştê wê yên li bejahîyê biketina destê Persan. Cihekî li pêşberî Akropolê û li ser rêya derdiket Akropolê û li ber derîyan hinek wêdetir hebû ku, nobedar dananîbûn wir, ne cihek bû ku insan bikaribe pê ve hilkişe, lê cardin hinek karîbûn hilkişin vê gira tîk ya diket pêşberî perestgeha Aglaûrosa keça Kekrops. Dema Atînayîyan dîtin ew derketine ser gir, hinekan xwe jê avêtin û felişîn, hinekên din jî xwe avêtin perestgehê. Persîyên derketibûn serê gir baz dan û derî vekirin, piştre bi ser hêvî û lavayan jî, temamê kesên di hindur de di ber şûran re derbas kirin; piştî tevde kuştin perestgeh talan kirin û Akropol bi temamî şewitandin.

[54] Xerxes ku seranserê Atînayê bi dest xist, siwarîyek şand Sûsayê, xebera serkeftina bi dest xistibû gihand Artabanos. Roja piştî ku qasid çûbû, koçberên Yûnanî yên di nav artêşê de da anîn, emir kir ku derkevin Akropolê û li gor adetên xwe qurbanan serjê bikin, belkî xewnek dîtibû, ji ber wê emrê serjêkirina qurbanan dida, belkî jî ji bo perestgeh şewitandibû kurmek ketibû hindurê wî. Koçberên Atînayî ferman bi cih kirin. Ez ji bo çi behsa vê dikim, ez ê wê jî bêjim.

[55] Li Akropolê perestgeheke aîdê Erekhtheûsê jê re kurê axê tê gotin hebû; di nav perestgehê de dareke zeytûnê, çavkanîyek bi xwê jî hebû; li Atînayê li gor gotineke belav, dema Poseîdaon û Athene pevdiçûn û digotin, ev ax ne ya te ye, ya min e, ji bo îsbata îddîayên xwe ev afirandibûn. Barbaran helbet bi temamê perestgehê re ev dara zeytûnê jî şewitandibûn. Roja piştî şewatê, Atînayîyên ji alîyê hikumdar ve ji bo merasime qurbanê hatibûn şandin, dema ku gihiştin cihê pîroz, dîtin ku ji dara zeytûnê ya şewitî terhek bişkivîbû û ji niha ve bi qasî enîşkekê bejin dabû. Yanî wan wiha vegotibûn.

[56] Yûnanîyên li Salamîsê berhev bûbûn, dema ku xebera yên hatine serê Akropola Atînayê seh kirin, ewqas bêhal ketin ku, hinek fermandar, neman li hêvîya plana ku ji bo bê qebûlkirin dest bi hevdîtinê kiribûn, baz dan keştîyên xwe û bêsekin ji bo paşvekêşîyê ba dan keştîyên xwe; yên di civînê de man jî ji bo li pêşberî Îsthmosê bikevin şer biryar wergirtin. Şev dadiket; meclisa şer temam bûbû, herkes belavî keştîyên xwe dibûn.

[57] Dema ku Themîstokles vegerîya keştîya xwe, Atînayîyek, Mnesîphîlos, pirs kir ku ji bo çi biryar hatîye dayîn. Û ji devê wî, dema ku hîn bû biryar hatîye dayîn wê keştîyan bibin Îsthmosê û li pêşberî Peloponezê bikevin şer seh kir, ev got: "Baş e! Heke keştîyên xwe ji Salamîsê bigrin û biçin, tu baş zanibe ku, êdî di dest de, ku dibe bila bibe, bi qasî tu karibe welatekî biparêzî bikevî şer keştî namînin, wê ew tev vegerin sîteyên xwe; ne Eûrybîades, ne jî kesekî din dikare pêşîya belavbûna hêzên me bigre; ev kor bûne, em ê ji ber vê Yûnanistanê wenda bikin. Di cih de paşve vegere, belkî tu bikaribe bike ku ew jî dev ji vê fikrê berdin; belkî tu bikaribî bike ku Eûrybîades fikra xwe biguhere û li vir bimîne."

[58] Ev gotin bi dilê Themîstokles bûn; bêyî tiştekî bêje berê xwe da keştîya Eûrybîades. Dema gihişt wir, got ku ji bo karekî hatîye hevdîtinê. Eûrybîades xwest derkeve keştîyê û daxwaza wî çiye bêje. Themstokles li rexê amîral rûnişt û Mnesîphîlos jê re çi gotine, wekî ku fikrê wî ne yek yek gotin, ji ba xwe jî gelek delîl danîn ser û heta ji keştîyê derneket û bang nekir ji bo meclisa şer ji nû ve bicivê nesekinî.

[59] Meclis çawa berhev bû, bêyî firsetê bide Eûrybîades ku ji bo çi ew bangî civînê kirine bêje, Themîstokles dest pê kir, wekî kesekî daxwazeke wî ya bi lez hebe axift û baş axift. Di nîvê axaftina wî de, Adeîmantosê kurê Okytos yê fermandarê Korînthosîyan wiha got: "Themîstokles, di pêşbirkê de yên dora wî nehatî derkeve, çov lê dixin." Yê din wekî ku bixwaze tawanê bide efûkirin got: "Belê, lê yên zû hereket nekin jî ji tacê mehrûm dimînin."

[60] Pêşî bersiveke wiha zirav da Korînthosîyê axaftina wî birî, piştre berê xwe da Eûrybîades. Qet behsa gotinên ku berê jê re kiribû, gotibû heke artêş derkeve Salamîsê wê belav be, nekir; ji ber ku wê li hemberî hevalbendan tawanlêbarkirineke giran bûya; tiştên din derxistin pêş.

a) "Îro rizgarkirina Yûnanistanê di destê te de maye, heke tu guhê xwe bidî gotinên min û şerê deryayî li vir qebûl bikî û guhê xwe nedî yên dibêjin em hêza deryayî paşve bikêşin heta Îsthmosê, tê bikaribî Yûnanistanê rizgar bikî. Niha guhê xwe bide herdu nêrînan û bipîve: Heke tu li rexê Îsthmosê şer bikî tê di deryaya vekirî de şer bikî ku ev rewş ji bo me dest nade, keştîyên me girantir in, hejmara wan kêm e; ji bilî wê em şer qezenc bikin jî, wê Salamîs, Megara û Aîgîna ji dest derkevin. Ji ber ku wê artêşa bejahîyê ya dijmin li pey hêza xwe ya deryayî bê; tê wê bi destê xwe bikşîne heta ber derîyê Peloponezê û temamê Yûnanistanê bavêjî tehlîkeyê.

b) Lê bi eksê wê, heke plana min bigre, tê van sûdan jî bi dest bixî: Pêşî, heke stratejîya rewşê li gor pêwistîyên xwe pêşve biçe, em ê hêzeke deryayî ya mezin di gewrîyeke teng de pêşwazî bikin û serkeftineke tam bi dest bixin; ji ber ku çawa îmkana serbest manewrakirin ji dijmin re bi fêde ye, di gewrîyeke teng de pêşwazîkirin jî ji me re bi fêde ye. Ji bilî vê ez vê jî li ser zêde bikim ku, Salamîsa jin û zarokên me xwe lê girtine jî wê rizgar bibe. Lê ya esas

ew e ku, plana min wê ji bo we tiştên herî bi qîmet ji we re deyne; bi mayîna li vir hûn ê bi keştîyan li pêşberî Peloponezê dîwarê kelehekê bikêşin.

c) Heke netîce ya ez jê bi hêvî me derkeve, heke di deryayê de serkeftin ya me be; wê barbar heta Îsthmosê nekaribin bên, ji Attîkayê wê ve nekarin gavekê bavêjin, wê bêserûber baz bidin. Em ê Megarayê, Aîgînayê û Salamîsa ku kahînekî gotibû em ê li pêşberî wê dijminê xwe têk bibin jî wenda nekin. Tenê planên insanan yên li gor eqlî dikarin pêk bên; heke plan bi aqilane nebe, xuda jî ji bo pêkanîna wê nabe alîkarvan."

[61] Li ser van gotinên Themîstokles, Adeîmantosê Korînthosî, careke din dest pê kir; dixwest vî bêwelatî bêdeng bike û pêşî li Eûrybîades bigre da ku van nêrînên wî neke dengdanê. Heke fikreke Themîstokles ya dixwaze lê bê nêrîn heye, dikarîbû wan li ser navê sîtekê pêşkêş bikira. Xeber jê re dida, ji ber ku êdî Atîna ji dest derketibû, ketibû bin nîr. Vê carê Themîstokles, bersiveke hişk da vî birêvebirî û Korînthosîyên wî; Atînayî heya bi vî awayê ku di destê xwe de tayfe û techîzat, bêkêmasî heta 200 keştîyî bigrin, wê ji yên din giringtir xwedîyê sîteyek û welatekî bên hesêbkirin; ji ber ku li hemberî êrîşa hêzeke evqas mezin, tu miletekî Yûnanî nikare raweste.

[62] Vê nêrîna xwe hêj jî geş kir, vê carê raste rast meşîya ser Eûrybîades, gotinên hişk kirin û got: "Heke tu li vir bimînî, tê bibî mêrxasek; heke nemînî tê Yûnanistanê mehf bikî; ji ber ku girêka şer li ser keştîyên me ye. Ji min bawer bike. Heke tu bêjî nabe, em ê jî bêsekin destê jin û zarokên xwe bigrin û bar bikin, biçin Îtalyayê, Sîrîsê. Wir demek dirêj e ya me ye û kahînan ji me re gotibûn wir kolonîze bikin; hûn jî dema ji hevalbendekî wekî me bibin, wê ev gotinên min bên bîra we."

[63] Gotinên Themîstokles çavê Eûrybîades vekir -û bi taybetî, ez texmîn dikim, heke rabe û keştîyan bibe Îsthmosê, ji veqetandina Atînayîyan ji wan tirsîya; bi rastî heke Atînayî biçin, yên din wê şer nekirina. Ji ber van biryar da di cihê xwe de bimînin û ji bo şer li vir xwe ragirin.

[64] Piştî van şerên devkî û biryardana Eûrybîades, Yûnanîyên li Salamîsê berhev bûbûn, dest bi amadekarîya li vir şer bikin kirin. Roj rohnî bû, tav

bilind bû û erd û derya bi erdhejekê hejîya. Bêsekin ji îlahan re dest bi duayan kirin û biryar dan ji Aîakîdîyan daxwaza alîkarîyê bikin û çawa biryar dan nedan tetbîq kirin; ji hemî îlahan re dua kirin; ji Salamîsê Aîas û Telamon xwestin û ji bo Aîakos û Aîakîdîyên din bînin, keştî şandin Aîgîayê.

[65] Lêbinêrin Dîkaîosê kurê Theokydes çi dibêje, ku wî wextî wekî koçberekî Atîna li ba Medan dima û ji wan rêzeke mezin didît: Dema ku yekîneyên Xerxes Attîka terk kiribûn û baz dabûn, Atîna xera kir û şewitand, rojekê bi Demaratosê Lakedaîmonî re li Deşta Thrîayê[288] bûne. Dîtine ku ji hêla Eleûsîsê, tozeke bi qasî artêşeke ji 30 hezar kesan pêk hatî bikaribe rake, ewreke ji tozê bilind dibe; şaş mane û ji xwe bi xwe pirsîne, gelo kî dikare tozeke wiha rake û qasek şûnde deng seh kirine, ev deng bi wan wekî dengên îlahîyên mîstik ên ji bo rûmeta Îakhos tên xwendin hatîye. Demaratos ku terîqeta Eleûsîs nizanîbû, pirs kirîye gelo ev qelebalixî ji ku tê; wî jî bersiv dayê û gotîye: "Demaratos, wê felaketek mezin bê serê artêşa hikumdar, ne mimkun e ku neyê. Kifş e, madem Attîka vala ye, ev hewayê ayînî yê îlahan e; ev alîkarîya ji Atînayîyan û hevalbendên wan Eleûsîs re ye ku ji jorê tê. Heke bavêje ser Peloponezê, wê tehlîke hem bê ser hikumdar û hem jî ser artêşa wî. Heke ber bi keştîyên li Salamîsê lenger avêtine ve biçe, wê hikumdar bi tehlîkeya mezin a wendakirina hêza xwe ya deryayî re rûbirû bibe. Atînayî her sal vê cejnê ji bo Dê û Keça wê pîroz dikin û hem di navbera xwe de, hem jî ji Yûnanîyên din kî bixwaze dikare bikeve nav vê terîqetê; ev hewayê te guh lê ye, îlahîya mîstik a Îakhos a di vê cejnê de tê gotin." Dibêje, li ser vê, Demaratos bi vî awayî bersiva wî daye: "Huş be û ji kesekî din re van gotinan nebêje; ez jî nikarim te xelas bikim û li ser rûyê dinyê yek kes, belê ez yek kes dibêjim, tune. Zimanê xwe bigre; wê dawîya vê artêşê çi lê bê? Ji xeyrî xudayan kesek nizane." Dîkaîos digot, dema wî ev nesîhet dikirin, hewrê tozê yê jê deng dihatin, bû wekî perçehewreke mezin, ber bi asîman ve bilind bû, çû Salamîsê, di ser hêza deryayî ya Yûnanîyan re firîya çû. Belê, bi vî awayî ew felaketa kirî bê serê hêza deryayî ya Xerxes hîn bûn. Belê çîroka Dîkaîosê kurê Theokydes ev e û Demaratos û çend kesên din jî şahid nîşan dide.

288 Deşta Thrîayê, li başûrêrojavayê Atînayê ye, di navbera Eleûsîs û Thrîayê de ye.

[66] Eskerên di hêza deryayî ya Xerxes de, piştî ew felaketa Lakedaîmonî lê rast hatin dîtin, rêya di navbera Trakhîsê û Hîstîaîayê de careke din derbas bûn û piştî sê rojan bêhna xwe vedan û Eûrîpos jî derbas kirin; piştî sê rojên din gihiştin Phaleronê. Li gor hesaba min, hem yên di artêşa bejahîyê de, hem jî hejmara şerkeran ên di keştîyan de, dema ku avêtin ser Atînayê, ji ya li Sepîasê û Thermopylaîyê ne hindiktir bû. Di bahozê de, wendayîyên li Tehrmopylaîyê û Artemîsîonê dan, ez dikarim bêjim ew kontenjanên nû yên ji artêşa hikumdar re dihatin, vê gelek rehet tijî dikirin. Ew Malîsî, xelkê Dorîs, Lokrîsi, Boîotîayî, ji derveyî vê ji bilî Thespîayî û Plataîayî, yên ji temamê herêman dihatin û Karystosûyî, Androsûyî, Tenosî û ji derveyî pênc hebên min li jorê navê wan hijmartin, ew ji temamê xelkên giravan hatibûn berhevkirin. Ji ber ku Persî, çiqas ber bi navenda Yûnanistanê ve diçûn, miletên ku beşdarî wan dibûn jî zêde dibûn.

[67] Niha, çi wextê ku temamê van insanan hatin Atînayê -tenê Parosî li Kythnosê mabûn, li hêvîya pêşveçûna bûyeran bûn- ez dibêjin çi wextê ku, ji bilî van temamên din hatin Phaleronê, Xerxes jî rabû hat ku hêza deryayê bibîne; dixwest bi hêza deryayî re peywendî deyne û nêrînên deryavanan werbigire. Piştî li meqamê şerefê rûnişt, bangî fermandarên deryayî û hikumranên miletên cûr be cûr yên bi keştîyên xwe ve hatibûn kirin; li gor rêza hikumdar nîşan kiribû, li serî Sîdon, piştre hikumdarê Tyrosê, tevan cihê xwe girtin. Piştre Xerxes, bi rêya Mardonîos ji her yekî pirsî, ma em beşdarî şerê deryayî bibin.

[68] Mardonîos, ji Sîdon dest pê kir, bi rêzê ji her qaptanî pirsî; tevan jî eynî tişt gotin, terefdarîya şer kirin; tenê Artemîsîa[289] tev li fikara wan nebû.

a) "Wê got Mardonîos, ji alîyê min ve ji hikumdar re vê bêje: "Min ku di şerê nêzîkî Eûboîayê de, ne ji eskerên wî hindiktir sûd gihandê, ne jî bûm alîkarvaneke wî ya herî sist. Tê niha jê re bêjî, ezbenî, fikra min a rastîn çiye gerek ez wê ji te re bêjim û tiştê ez hesêb dikim ji bo te herî zêde wê fêda wê

289 Artemîsîa di sedsala 5emîn ya B. Z. de jiyaye, yekem amîrala jin a navdar ya ku bi Împaratorîya Farisan ve girêdayî ye û bi heslê xwe Yûnanî ye. Bi şerê Selamîsê yê ku di Tengava Salamîsê de di navbera Faris ûYûnanîyan de bû, xwedî cihekî girîng bû.

hebe pêwîst e ez wê ji te re vebêjim. Loma ez ji te re vê dibêjim: Keştîyên xwe biparêze, di deryayê de nekeve şerekî; mêrek çiqas li ser jinekê serdest e, deryavanên li vir jî li ser deryavanên te ewqas serdest in. Çi pêwistîya şerekî di deryayê de heye? Ma tu ne efendîyê Atînayê ye, cihê ku sebebê sereke ya vê seferê ye? Êdî kesek nikare derkeve pêşberî te; Yên dixwestin rê li pêşîya te bigrin, têra xwe hatin maliştin.

b) Wê şer ji bo dijminên te li ku temam bibe? Niha ez ê ji te re ji bo vê ez çi difikirim bêjim; heke tu nekevî şerekî çavgirtî yê deryayê, heke tu keştîyên xwe li vir, li nêzîkî qiraxan ragirî, heta tu ber bi Peloponezê ve jî pêşve biçî, ezbenî, tê bibînî ku wextê tu hate vir temamê ew armancên te dixwestin tu bigihêyê pêk hatine. Yûnanî nikarin demeke dirêj li hemberî te rawestin; tê zor bide wan ku belav bibin û wê her yek jê baz bide û biçe sîteya xwe. Ji ber ku li gor xebera min girtîye, li vê giravê xwarin tune, li milekî din heke tu hêza xwe ya bejahîyê bişînî Peloponezê, ez qet texmîn nakim ku, yên ji wan welatan hatine li vir rûnin û temaşevan bimînin; nayê melhezekirin ku wê ew bixwazin tenê ji bo Atînayê biparêzên derkevin deryayê.

c) Di miqabilî vê de heke tu bêpayîn bikevî nav şerekî deryayî, têkçûneke di deryayê de, ez ditirsim wê serê artêşa bejahîyê jî bixwe. Yek jî, Hikumdarê Mezin vê bifikire, koleyên kesên merd bêqîmet dibin, lê ji xeraban re baş xizmet tê kirin. Niha ku tu, esîlê temamê insanan î, di bin navê hevalbendan de tu xwedîyê koleyên xerab î, Misrî, Qibrisî, Kîlîkîayî û Pamphylîayî, tu hêvî di van insanan de tune."

[69] Dema Artemîsîa ev ji Mardonîos re digotin, yên jê hez dikirin xemgîn bûn, difikirîn ku ji bo ji şerê deryayî hez nake wê hêrsa hikumdar bikêşe ser xwe; bi eksê wê, yên jê hez nedikirin û bi taybetî ji ber ku cihekî wê ya taybet hebû hesûdî jê dikirin, şa dibûn ku wê bi van gotinan dawîya xwe anîye. Lê, dema ku nêrînên hatin pêşkêşkirin ji Xerxes re hatin gotin, herî zêde ji nêrînên Artemîsîayê hez kir û jixwe vê jina ku weka insaneke payebilind qedir didayê, hê zêdetir pesnên wî yên ji dil qezenc kirin. Li gel vê jî guhê xwe da gotinên piranîyan; deryavanên Eûboîayê sist hereket kiribûn, ji ber ku ew bi xwe ne li wir bû, xeyaleke wiha diket serî û niha ji bo li ber çavên wî şer bikin hazirî dikirin.

[70] Dema îşaret hat dayîn birêvebirên vebibûn deryayê, keştîyên xwe ajotin Salamîsê û piştî di şer de cihên wê bigrin kifş bû, bêyî zehmetîyê bikşînin ketin sefê. Heta ev rewş temam bû, ji bo dakevin şer roj têrê nemabû; şev dabû ser û êdî ji bo roja bê dest bi şer bikin wê hazirî bihata kirin. Ji Yûnanîyan re ji bo Peloponezê tengasîyeke mezin dest pê kiribû. Didîtin û ditirsîyan ku, bi mayîna li Salamîsê, wê di oxira erdê Atîna de biketina şerê deryayî û heke têk biçin, wê di giravê de bihatina dorpêçkirin û girtî bimana û erdê wan yê eslî wê bê parastin bimaya.

[71] Di vê navê re artêşa barbaran ber bi Peloponezê ve diçû; ji bo pêşîlêgirtina pêşketina barbaran di bejahîyê de tiştên ne pêwist bûn bên kirin, hatibûn kirin. Peloponezî, dema ku xebera rewşa dawîya Leonîdas û hevalên wî ya li Thermopylaîyê wergirtin, ji temamê bajaran ber bi Îsthmosê ve herikîbûn û li wir dest bi hazirîya parastinê kiribûn; fermandarê wan birayê Kleombrotos yê Leonîdasê kurê Anaxandrîas bû. Li Îsthmosê baregeh vedabûn, rêya Skîronîayê xitimandibûn; ji vir şûnve li gor biryara li meclisa şer hatibû wergirtin, di navenda bejtengê de dîwarek jî lêkirin. Ji bo bi hezaran insan berhev bûbûn û temamê wê jî baş dixebitîn, kar baş meşîya; wekî bikevin pêşbirkê kevir, kerpîç, mertek, torbeyên xîzê kişandin û parêzvanan bi şev û bi roj kêlîyekê xemsarî di karên xwe de nekirin.

[72] Yûnanîyên bi temamê hêza xwe ve ji bo parastina Îsthmosê hatibûn ev bûn: Temamê Lakedaîmonî û Arkadîayî, Elîsî, Korînthosî, Sîkyonî, Epîdaûrosî, Phlîosî, Troîzenî û Hermîoneyî. Yên ji bo Yûnanistana ketibû tehlîkeyê diricifîn û baz dabûn hatibûn alîkarîyê ev bûn; Ne xema qismê mayî yê Peloponezîyan bû. Olimpîyad û cejnên Apollon Karneîos nû temam bûbûn.

[73] Li Peloponezê heft milet rûdinin. Ji van dudu xwecih in û îro jî li cihê pêşî bi cih bûne rûdinin; ew Arkadîayî û Kynûrîayî ne. Yê sisiyan, xelkê Akhaîayê yê ji Peloponezê derneketine; lê welatê xwe yê ewil terk kirine, li cihekî ku pêşî ji wan re xerîb bû bi cih bûne. Ji van heft miletan çarên din ji derve hatine; ew Dorî, Aîtoloîyî, Dryopî û Lemnosî ne. Gelek bajarên bi nav û deng yên Dorîyan hene; yê Aîtoloîyîyan tenê Elîs e; yê Dryopîyan Hermone û Asîne ne, ev nêzîkî Kardtamyleya li Lakonîayê ne; temamê

Lemnosîyan jî ew çiyayîyên ji wan re Paroreat tê gotin ew in. Em bên Kynûrîayan, her çend xwecih in, wekî ji nijada Îonî tên dîtin û tenê yên wiha ne ew in; lê ew bi bandora Argosîyan yên ku desthilatê wan bûn û yek jî bi tesîra zeman bi temamî bûne wekî Dorîyan; Orneatî û cîranên wan jî bi eynî navî tên naskirin. Ji van heft miletan, qasek berîya niha bi taybetî yên min nîşan nekirin, xwe bêterf hesêb dikirin, -heke izin hebe bi serbestî bê gotin- bi bêterefîyê bi Medan re li hev kiribûn.

[74] Belê, yên li Îsthmosê bûn ew wezîfeya girtibûn ser xwe ev bû, bawer dikirin partîya mezin wê di vê pêşbirkê de bê lîstin, zêde ne di wê qeneetê de bûn ku wê hêza deryayî serketinê bi dest bixe. Yên li Salamîsê, di gel agahîyên ji van milan digihiştin wan di nav tirsê de bûn, ji bo xwe zêdetir, ji bo Peloponezê ditirsîyan. Heta niha tenê di guhê hevdû de dikirin pistepis û bi şaşbûna xurtîya Eûrybîades qîma xwe dianîn; lê di dawîyê de nerazîbûna xwe kifş kirin û bi dengekî bilind dest bi axaftinê kirin. Ji nû ve meclisa şer hat danîn û li ser pirsgirêka berê dûdirêj munaqeşe kirin; hinek di wê fikrê de bûn ku digotin, ji bedêla em li vir bimînin û cihekî ketîye destê dijmin biparêzên, ya baş ew e em biçin Peloponezê û partîyê li wir bilîzin. Atînayî, Aîgînayî û Megarayî, dixwestin li vir bimînin û li vir şer bikin.

[75] Themîstokles têk çûbû; nêrîna Peloponezîyan qezenc kiribû. Ew bêyî kes pê bihisi ji meclisê derket, mirovek li qayixekê siwar kir û ji hêza deryayî ya Medan re şand, wê çi bêje bi wî kesî baş dabû jiberkirin; navî wî Sîkînnos bû, di nav mirovên Themîstokles de bû û wezîfeya wî perwerdekirina zarokên Themîstokles bû. Dema Thespîayan hemwelatîyên nû dinivîsandin, Themîstokles ew jî kiribû Thespîayî û gelek jî pere dabûyê. Ev mirov siwarî qayîxê bû, çû ba fermandarên barbaran û ji wan re ev got: "Fermandarê Atînayê bi dizî, bêyî Yûnanîyên din ez şandim (ji ber ku di eslê xwe de terefdarê hikumdar e û serkeftinê ji Yûnanan zêdetir ji we re dixwaze); xwest ez ji we re vê bêjim: Dijminê we di nav tirsê de ne, hazirîya revê dikin û heke hûn niha rê nedin wan ku birevin, hûn dikarin derbeya qet nakeve hiş li wan bixin. Di nav xwe de li hev nakin; ji vir şûnve nefikirin ku wê li hemberî we li ber xwe bidin; tam eksê wê, yên terefdarê we ne û yên dijminê we ne di navbera xwe de wê şer bikin, hûn ê jî tenê li şerekî deryayî binêrin." Ev fikir kir serê wan û bêsekin winda bû.

[76] Fermandarên dijmin ev xeber layîqî bawerîyê dîtin; pêşî li girava[290] di navbera bejahîyê û Salamîsê de hejmareke zêde taburên Persan peya kirin; piştre dema ku bû nîvê şevê, baskên xwe yên çepê vekirin û ber bi Salamîsê ve dest bi fetleke manewrayê kirin; li milê din keştîyên li dora Keos û Kynosûrayê jî vebûn, heta Mûnykhîayê temamê tengavê girtin. Mebesta wan bi vî awayî vekirina keştîyên xwe, pêşîlêgirtina bazdana Yûnanîyan, girtîhiştina wan li Salamîsê û cezakirina wan ji ber rikoyîya wan a serketî ya li Artemîsîonê. Tabûrên Persan yên li giravoka Psyttaleîayê peya kirin jî, piştî şer dest pê bike wê alîkarîya eskerên xwe bikin, eskerên dijmin bikuştina, ji ber ku -ew şerê dest pê bikira wê li pêşberî vê giravokê bûbûya- enqazên keştîyan û eskerên biketina deryayê wê ber bi vê qiraxê ve kaş bibûna. Temamê van hazirîyan di nav bêdengîyekê de dikirin, nedixwestin dijmin hay jê hebe û seranserê şevê, bê bifikirin rakevin û bêhna xwe vedin xebitîn.

[77] Dema ku ez çavê xwe dizîvirînim bi ser van bûyeran de, ez nikarim li hemberî kahînan derkevim û wan xapînok hesêb bikim û bêguman kehanetên wekî vê zelal, ji destê min nayê ez bêqîmet bihesibînim:

Belê, dema ku Artemîs şûrê xwe yê zêrîn hilde
Namzedê pîroz pira wan a sêbahî dike
Wê li pozê Kynosûra pêl lê dixin girê bide;
Dema ku dara sipehî ya Atînayê hat birîn ket sêlekanê
-Ey hêvîya dîn- wî wextî cezayê îlahî,
Yê dixwaze gema koletîyê têke devê dinyayê
Wê ew xwehezîya bêperwa vemrîne
Wê paxir bi paxirê bê perçiqandin; li ser pêla reş
Ji milê Ares wekî çem wê xwîn birije û ji bo me
Wê hilatina Roja Azadîyê be
Li ser sîteyên me Zeûsê çav belek û
Wê serkeftin bibiriqe.

Dema ku bûyerên wiha dibin mijar û ez dibînim Bakisek evqas zelal xeberek dide, belê, kehanetan ez bi xwe jî nikarim înkar bikim û dema ku van dikin mijara raberizînê, ez serê xwe dihejînim.

290 Girava Psyttaleîayê, di navbera Salamîs û Pîreyê de ye.

[78] Di vê navê re li Salamîsê strategos ketibûn nav hevdû. Haya wan ji keştîyên barbaran yê dest bi dorpêça wan kirine tunebû, hêj dihesibandin ku li cihê xwe yê kevin yê bi roj disekinin.

[79] Dema ku strategosan bi vî awayî bi hev re xirecir dikirin, ji Aîgînayê kesek hat; ew, Arîsteîdesê kurê Lysîmakhos bû; Atînayî bû, lê bi dengê xelkê ji sîteyê hatibû avêtin. Ez vî mirovî, bi nêrîna xwe ya li ser karekterê wî, hemwelatîyê herî bi rûmet û rast yê li Atînayê jiyaye dibînim. Hat ber derîyê ku meclis berhev bûye û kir ku bang Themîstokles bikin; ew ne ji yê kesekî dostê wî bû; bi eksê wê, dijminê wî yê herî har bû; lê rewş giran bû, wextê ku bê windakirin tunebû. Arîsteîdes nedixwest xeyda xwe bidomîne û ji bo fikrekê bide Themîstokles dixwest bangî wî bikin. Xeber wergirtibû ku Peloponezî ji bilî li Îsthmosê lenger hildin û paşve vekêşin, tiştekî din nafikirin. Dema ku Themîstokles hat bi vî awayî axift: "Lihevnekirina di navbera me de her tim ji bo feydeya welat bû, lê wê niha kifş bibe kîjan ji me wê bi fêde be. Min ê ji te re ev bigota, êdî dirêjkirina munaqeşeya bila hêzên deryayî biçin Peloponezê yan neçin, tiştek dernakeve. Min bi çavê xwe dît û ez vê xeberê ji te re jî dibêjim: Êdî berdin jî ne Korînthosî û ne jî Eûrybîades bi xwe dikarin biçin cihekî; dijmin her alî pêçaye. Baz bide xeberê bide wan."

[80] Themîstokles bi van gotinan bersiva wî da: "Te ez ji bo pêşbirkeke bi rûmet han dam û ji min re xebereke xweş anî; ya min dixwest jî ya te dîtine û ji bo min ragihandîye. Zanibe ku, Medan ev kar bi lêsorkirina min kirine. Madem Yûnanî ji ber xwe ve naxwazin şer bikin, wî wextî pêwist e ez emrêwaqî bikim û wan bînim ser nêrînên xwe. Madem xebereke wiha bextewer te anî, were bi xwe bêje. Heke ez bêjim wê hesêb bikin ku ez wan dixapînim, wê bi bawerîya ku barbar manewrayeke wiha nakin guhê xwe nedin gotinên min. Were tu bi xwe yên diqewimin qise bike. Piştî tu vê îzahatê bikî, heke bawer bikin baş e; heke bi gotinên te qanix nebin, ji bo me encamp dîsa eynî ye; heke wekî tu dibêjî em ji her milî ve hatibin dorpêçkirin, nahêlin em di nav tilîyên wan re biherikin biçin.

[81] Arîsteîdes got "baş e" û ket meclisê; got ku ew ji Aîgînayê tê û ji nav keştîyên dijmin yên ne zêde ji vir dûr in bi awayekî zehmet û xef derbas bûye; keştîyên Xerxes temamê hêza deryayî ya Yûnanistanê dorpêç kirine;

lazim e bêsekin dest bi kar bikin, ji ber ku wê di nêzîk de bikevin rewşa xweparastinê. Piştî rapora xwe da paşve hat. Lê strategosîyan cardin gelş derxistin, piranîya wan bawerî bi vê xeberê nekiribûn.

[82] Dema ku bi rast e ne rast e ve mijûl bûn, trîremeke bi qaçaxên Tenosî barkirî hat,[291] ew di bin fermandarîya hemwelatîyekî vê giravê yê Panaîtîosê kurê Sosîmenes de bû; van deryavanan jî bi awayekî hûrgilî behsa manewraya dijmin kirin. Di saya kirina vê xizmetê de navê Tenosîyan, ketîye nav lîsteya Yûnanîyan ya dikin barbar birevîn. Ev lîste li ser sêpêya li Delphoîyê nivîsandîye. Bi trîremeke ku li Salamîsê beşdarî Yûnanîyan bûye û bi trîrema Lemnosê ya hê li Artemîsîonê bû hatibû, hêza deryayî ya Yûnanîyan bi awayekî gilover gihiştibû 380 keştîyan; heta wî wextî ji bo bigihin vê hejmarê dudu jê kêm dima.

[83] Vê carê, li ser van tiştên Tenosîyan gotin, êdî Yûnanîyan bawer kirin; dest bi amadekarîya şer kirin. Dema ber beyana sibehê, fermandaran eskerên xwe yên deryayî berhev kirin; Themîstokles jî ji eskerên xwe re axaftinek bi hêz ya kurt kir. Mijara axaftinê şerê di navbera xerabî û qencîyê, li ser afirandina insên, li gor şert û mercên tê de ne, di navbera wan herduyan de kirina hilbijartinekê ye; bang li wan kir ji rêya rûmetê pêk bîne veneqetin û piştî gotinên xwe bi vî awayî girê da, îşaret da ku li keştîyan siwar bibin. Dema ew siwarî keştîyan dibûn, trîrema ji bo Aîakîdîyan bîne çûbû Aîgînayê jî hat. Wî wextî temamê hêza deryayî ya Yûnanîyan tevgerîyan.

[84] Tam wê hereket bikirina, barbaran êrîşî ser wan kirin. Yûnanî bêyî keştîyên xwe bizivirînin, ber bi qiraxan ve paşve kêşîyan û manewra kirin; tenê Atînayîyek, Ameînîasê ji Palleneyê, ji sefê derketibû û êrîşî keştîyeke dijmin kiribû; herdu keştî ketibûn hev, nikarîbûn ji hevdû veqetin, yên din ji bo alîkarîya Ameînîas derketin pêş. Atînayî dibêjin ku, şer bi vî awayî dest pê kir; Aîgînayî jî dibêjin ku, keştîya çûbû Aîakîdîyan bîne dabû destpêkirin. Li gor gotina wan, dîmena jinekê diyar bûye û bangî Yûnanîyan kirîye, gotinên cesaretê kirine, deng bi qasî ji temamê hêza deryayî ve bê sehkirin bilind bûye, pêşî bi tinazeke xemgîn dest pê kirîye û gotîye: "Hûn çawa esker in! Ma tim bi vî awayê serê we di ber we de hûn diçin?"

291 Tenos, giravek di Deryaya Egeyê de, nêzîkî Androsê ye.

[85] Fenîkeyî ketibûn hemberî Atînayîyan; hêza dijmin, hêla milê çepê ya dikete nêzîkî Eleûsîsê ew bûn; li hemberî Lakedaîomonîyan, Îonîayî yên ber bi Pîraeûsê saf girtibûn hebûn. Kesekî guhê xwe nedabû banga Themîstokles ya ji wan re gotibû birevin; piranîya wan baş şer dikirin. Ez dikarim navê gelek qaptanan ên keştîyên Yûnanîyan bi dest xistibûn bihejmêrim, lê ez ê ji van tenê du navên Samosî yên Theomestorê kurê Androdamas û Phylakosê kurê Theomester bêjim. Sebebê tenê nivîsandina van du navan, Theomestor, hikumranê Samosê yê Pers li Samosê bi cih kiribû; Phylakos jî navê wî yên di lîsteya sûda wan gihiştîye hikumdar de hatîye nivîsandin, jê re bê serûbin erd hatîye bexşkirin. Di zimanê Persî de yên sûda wan gihiştîye hikumdar re "Orosangî" tê gotin.

[86] Belê, qedera van kesan wiha bû. -Piranîya keştîyên Persan ên li Salamîsê ji derveyî sefê man; hinek jê di bin êrîşîn Atînayîyan, hinek jî yên Aîgînayîyan de perçiqîn. Yûnanîyan di nav pergalekê de bê sefên xwe xera bikin şer dikirin; barbar ne di nav yekîneyên bi rêk û pêk de bûn, pergala wan a şer tunebû û ya hat serê wan, ya pêwist bû bê serê wan ew bû. Cardin şer dikirin, ji Eûboîayê gelekî baştir bûn; çi ji destê wan hat kirin, bi hemî hêza xwe ve hereket dikirin, ji Xerxes ditirsîyan û her yek jê tenê difikirî ku Hikumdarê Mezin li wî dinêre.

SERKEFTINÊN ARTEMÎSÎAYÊ

[87] Piranîya barbaran û Yûnanîyan çawa şer kirin? Ez nikarim tam tiştekî bêjim, belê eva serkeftinên Artemîsîa ku, ev di nezdê hikumdar de hê biqîmettir kir. Dema ku hêza deryayî ya hikumdar tam ketibû nav tevlihevîyekê, keştîyeke Yûnanî ketibû pey trîrema Artemîsîa; wê nedikarî baz bide, ji ber ku keştîyên hevalbendên din li pêşîya wê hebûn û keştîya wê ya herî nêzîk ya dijmin bû. Di cih de bi çarekê ku hat hişê wê rewş vegerand lehê xwe. Bi ser de ku keştîyeke dijmin li pey bû, ya xwe siwarî keştîyeke hevalbendan kir, di vê keştîyê de deryavanên Kalydayê hebûn û Damasîthymosê hikumdarê Kalydayê bi xwe fermandarîya wê dikir.[292] Gelo hê ew li qiraxên Hellespontosê bûn tiştek di navbera wan de derbas bûbû, ez tam nikarim

292 Kalynda li Karyayê bû, wekî bajarê Halîkarnasos.

tiştekî bêjim, heta gelo Artemîsîa ev hereket bi xwesteka xwe kir, yan trîrema Kalyndayê bi tesadufî derketibû ser rêya wê, ez nizanim. Ji ber çi dibe bila bibe, lê siwar kir û xerq kir, talih li rûyê wê kenîya û ev kar bi du awayan fêda wê tê hebû: Pêşî dema keştîya Yûnanî dît ku ew meşîya ser keştîyeke barbaran, dil wan de trîrema Artemîsîa, trîremeke Yûnanî ye yan jî hesêb kir ku dijmin terk dike û dikeve nav sefên Yûnanîyan; ji pey veqetîya, êrîşî dijminên din kir.

[88] Belê eva sûda wê ya yekem: Baz da û keştîya xwe xelas kir; ya duduyan, bi ser ku xerabî bi Xerxes kiribû, di netîceyê de di çavê wî de qîmeta wê zêde bû. Bi qasî tê gotin, dema ku Hikumdarê Mezin li şer dinêre, ev keştîya ku wê li yan din siwar bike dîtîye; yek ji kesên li dora wî jê re wiha gotîye: "Ezbenî, tu dibînî, Artemîsîa çawa bi mêrxasî şer dike? Lêbinêre va keştîya dijmin xerq kir." Xerxes, ji yên rexê xwe pirsîye, bi rastî ev keştîya Artemîsîa ye yan na û yên li balê gotine: "Ya wê ye." Ji ber ku ji peykera di keştîya wê de nas kirine; dil wan de keştîya xerq bûyî jî ya dijmin e. Û esas şansê Artemîsîa, ji keştîya xerq bûbû kesek nefilitîbû ku derkeve wê tawanbar bike. Li ser vê biserketinê, dikin ku Xerxes van gotinan bêje: "Îro mêran wekî jinan û jinan jî wekî mêran hereket kirin." Bi qasî tê fêhmkirin bersiva wî wiha bûye.

[89] Di vî şerî de, Arîabîgnesê amîral yê birayê Xerxes û kurê Daryûs û gelek giregirên welatan ên hevalbendên Persan û Medan mirine; çend kes jî Yûnanî, lê gelek hindik; ji ber ku Yûnanîyan sobanî zanîbûn û yên keştîyên wan xerq dibûn, di nav tevlihevîyê de rêya xwe didîtin û heta Salamîsê sobanî dikirin; di miqabilî vê de piranîya barbaran sobanî nedizanîn, ji ber wê jî xeniqîn û mirin. Di eslê xwe de wendayîya herî mezin, wextê ew keştîyên li pêşîyê rêz bibûn bazdan çêbû, ji ber ku yên wekî yedek li paşîyê sekinîbûn, ji bo ku tiştekî bikin û bikevin çavê hikumdar xwe avêtine pêş û bi keştîyên hevalbendan re li hev ketine, ketine nav hevdû.

[90] Belê, va di nav vê tevlihevîyê de tiştekî din yê hêjayî nivîsandinê: Çend kesekî ji Fenîkîyan yên keştîya wan xerq bûye, çûn hikumdar dîtin û fesadîya Îonîayîyan kirin, wan bi xîyanetê tawanbar kirin û gotin, "Keştîyên me di rûyê wan de xerq bûn." Lê netîce wiha çêbû: Qaptanên Îonîayî nehatin

kuştin, bi eksê wê ew Fenîkeyîyên ew tawanbar kirin di miqabilî vê tawanlêbarkirinê de ev wergirtin: Hê ew diaxiftin, keştîyeke Samothrakeyê êrîşî ser keştîyeke Atînayê dikir. Keştîya Atînayê xerq bû, vê carê jî keştîyeke Aîgînayê derket pêş û keştîya Samothrakeyê xerq kir. Lê Samothrakîyên di avêtina riman de hoste bûn, deryavanên xwe ji keştîya dikir ku xerq bibe derxistin û kişandin nav trîremeke din û bi lêxistina riman li ser hev ew bi dest xistin. Vê tesadifê Îonîayî xelas kir; ji ber ku dema Xerxes ev serkeftin bi çavê xwe dît, bi hêrsa ku ji her milî ve li tawanbarekî digerîya, berê xwe da Fenîkeyîyan û ji bo ku hem bi xwe careke din kêmanîyê nekin û hem jî tawan li yên din bar nekin, serê wan da jêkirin. Xerxes yê li ber pêşkên[293] gira Aîgaleosê ya li hemberî Salamîsê sekinîbû, di seranserî şer de pirsa mirovên xwe yên di şer de serkeftî bûn dikir û hîn dibû; nivîsevanan navê qaptan, navê bavê wî û ji kîjan sîteyê ne dinivîsandin. Paya Arîaramnesê Persî yê dostê Îonîayan ku wî wextî li wir bû, di tiştên hatin serê Fenîkeyîyan de heye.

[91] Belê, Xerxes û Arîaramnes bi vî awayî ketin nav dijberîya Fenîkeyîyan. Di vê navê re barbarên ku têk çûn, ber bi Phaleronê ve vedikişîyan; Aîgîanî pêşî li wan birîn, serkeftinên neyên jibîrkirin pêk anîn. Bi rastî di navenda van tevlihevîyan de, Atînayî li keştîyên dixwestin li hember rawestin yan baz bidin, Aîgînanîyan jî li ew keştîyên dixwestin ji tengavê derkevin dixistin û xerq dikirin; yên pêsîrê xwe ji Atînayîyan xelas dikirin ji Aîgînayan re dibûn nêçîr.

[92] Li wir du keştîyên Yûnanîyan rastî hevdû hatin, yek jê keştîya Themîstokles ya ketibû pey keştîyeke dijmin, ya din jî ya Polykrîtosê kurê Krîosê Aîgînayî[294] ya dikir bavêje ser kadirgaya Sîdonê bû; kadirgaya li pêşberî Skîathosê ew kadirgaya keştîya Aîgînayê ya nobedarî dikir bi dest xistibû ev bû û Pytheasê kurê Îskhenoos tê de bû. Persî bibûn heyranê mêrxasîya wî, di keştîyê de didan ragirtin; keştîya Sîdon hat wergirtin û bi Persîyan re, keştî çû ku Pytheas jî pê re diçû û dawî ew jî teslîmî hemwelatîyên wî kirin. Belê, ev Polykrîtos, dema ku keştîya Yûnanî dît û ji ala wê nas kir ku keştîya amîral e, herdu destên xwe wekî borîyê kirin devê xwe bangî Themîstokles kir, tawanlêbarkirina bi nav û deng a Aîgînayîyan a "dostîya Medan" bi bîra

293 Aîgalîs, cihekî bilind yê dikeve pêşberî Salamîsê yê li qeraxê Attîkayê ye.
294 Ji bo Polykrîtosê kurê Krîos, li pirtûka 6an, beşa 50 û 73an binêre.

wî anî, bi kul û derd tinaz kirin. Polykrîtos, dema bi vî awayî gazin bi ser Themîstokles dibarandin, li milekî din jî êrîşî keştîya dijmin dikir. Li milê din barbarên keştîyên xwe rizgar kiribûn, baz didan û diçûn kendava Phaleronê û xwe tavêtin bin baskê artêşa bejahîyê.

[93] Di vî şerê deryayî de ji Yûnanîyan serkeftina herî mezin Aîgînayî û pişti wan Atînayîyan qezenc kirin; wekî şexis mêrxasên rojê ji Aîgînayan Polykrîtos; ji Atînayîyan Eûmenesê ji demosa Anagyrûs û Ameînîasê Palleneyî yê bera pey Artemîsîya dabû. Heke me bizaniba ku, keştîya bera pey dide ya Artemîsîa ye, bêguman ji pey venediqetîya, ya wê bi dest bixista, yan jî wê bi xwe biketa dest. Ji ber ku qaptanên Atînayî di vî warî de biryareke taybetî wergirtibûn, yê Artemîsîa sax bianîya wê deh hezar drehmî bistenda; gelek diqehirîn ku jinek li hemberî wan disekine. Lê wê, wekî tê gotin baz dabû. Keştîyên Persan yên rizgar bûn li Phaleronê berhev bûn.

[94] Li gor Atînayîyan amîralê Korînthosê Adeîmantos, dema ku şer dest pê kir keştî ketin ber pozê hev, ketîye nav tirseke mezin û ba li babirka xwe kirîye û baz daye; Korînthosîyên ku dîtine keştîya amîral baz dide ketine pey. Lê dema ku bi vî awayî paşve vekişîyane, hatine li pêşberî perestgeha Skîrasa Atînayê ya li qiraxê Salamîsê, rastî qayixekê hatine; yê vê qayixê şandîye, tu wextê xwe nedaye nasîn; qayix hatîye ser Korînthosîyên wî wextî di derbarê şer de tiştekî nizanîn -ji ber wê ye ku dibêjin ev hukmeke îlahî ye. Dema ku nêzîkî keştîya Korînthosîyan dibin, yên di nav qayixê de ev gotine: "Adeîmantos, te keştî paşve vegerand, tu xîyanetê li Yûnanîyan dikî û direvî; halbukî ew niha li hemberî dijmin serkeftinê bi dest dixin, serkeftineke bi qasî ew ji îlahan bixwazin." Dema ku lê nêrîn Adeîmantos bawerî bi van gotinan nake, gotine ku wî rehîn bigrin û heke Yûnanîyan bi rastî serkeftineke mezin bi dest nexistine bila wî bikujin. İncex wî wextî Adeîmantos û Korînthosîyên din keştîyên xwe vegerandine û beşdarî hêzên deryayî bûne, lê heta wî wextî êdî kar temam bûye. Tawanê Atînayî yê davêjin ser wan ev e; lê Korînthos vê qebûl nake; li wir, di pêşîya sefên şer de bûne dibêjin û Yûnanîyên din jî dibêjin ev rast e.

[95] Arîsteîdesê kurê Lysîmakhosê Atînayî ku min li jorê gotibû kesekî bi qîmet yê kêm peyda dibe, di şerê tevlihev yê li dora Salamîsê çêbû, karekî

wiha kir: Serokatîya hoplîtên Atînayî yên li qiraxên Salamîsê bûn û yekîneke bi hêz bûn girt destê xwe, derket giravoka Psyttaleîayê û temamê Persîyên danîbûn vê giravokê da ber şûran.

[96] Piştî yên şer dikirin ji hevdû veqetîyan, Yûnanîyan keştîyên parçe bûbûn û li ser avê mabûn kişandin qiraxê Salamîsî û ji bo şerekî din dest bi hazirîyê kirin; ji ber ku difikirîn ku wê hikumdar bi keştîyên di destan de maye careke din bikeve şer. Gelek bermayên Zephyrê dabû ber xwe, berhevî qiraxên Attîkayê yê cihekî jê re Kolîas tê gotin bibûn. Piştî temamê kehanetên ji alîyê Bakîs û Mûsaîos ve di warê van şerên deryayî de hatin dayîn, Lysîstratosê yalvaç ê Atînayî, bi salan berîya van bûyeran li ser aravên qiraxên deryayê yên li vê noqteyê berhev bûbûn, ev kehaneta manaya wê ji bo temamê Yûnanîyan tarî mabûn jî pêk hatibû.

Jinên Kolîasê wê bi bêran xwarin bipêjin

Piştî hikumdar çû wê ev jî bibûya.

NETÎCEYÊN ŞERÊN DERYAYÎ YÊN SALAMÎSÊ

[97] Dema ku Xerxes mezinahîya felaketa hatibû serî fêhm kir, tirsîya, heke yek ji Îonîayan biçe ji Yûnanan re bêje, biçin pira keştîyan a Hellespontosê -heke wan ev di pêşîyê de nefikirî bin- xera bikin! Wê wî wextî li Ewrûpayê bimînin û mehf bibin. Ji ber wê bêsekin plana çûnê çêkir; lê ji bo vê niyeta xwe bi qasî Yûnanîyan, ji yên xwe jî veşêre, ber bi alîyê Salamîsê ve dest bi avakirina pêlşikênekê kir; ji bo hem wezîfeya kelehê û hem jî ya pirê bibîne, mavnayên Fenîkeyîyan bi hev ve da girêdan; wekî ku wê careke din di deryayê de şansê xwe biceribîne, di karê şer de lez kir. Yên li vê dinêrîn ferz dikirin dê ew li vir şer bidomîne; yê nexapîya tenê Mardonîos bû, hîn bûbû ku yên di hişê Xerxes re derbas dibin bixwîne. -Xerxesê ku ev hazirî dikirin, li milekî din jî agahîyên vê felaketa nû dida Arîanê(Persê).

[98] Li ser rûyê dinyê ji servîsa ragihandina Persîyan bileztir tiştek tune; lêbinêrin Persî, li gor gotina wan, ev kar çawa tertîb kirine: Rê, ji serî heta binî,

bi awayê rêya rojekê ku mirov bikare biçe hatine parvekirin. Ji van re, ji bo hevguhertinê li her navbirê mirovek û hespek hatine danîn. Tiştek nikare li ber rêya wî mirovî bibe asteng ku bi rêya herî kurt re bigehe cihê xwe, ne berf, ne baran, ne agirê rojê û ne jî şev. Qasidê yekem, xeberê digihîne yê duyem, yê duyem ji sêyem re û bi vî awayî diçe. Nûçe wekî meşaleya lampadophoroîyên Yûnanî ji bo rûmeta Hephaîstos tertîb dikin, ji dest derbasî destan dibe digehe cihê xwe. Ji vê posteya hespî re Persî "Angareîon" dibêjin.

[99] Dema xebera ku Xerxes Atîna stendîye gihişt Sûsayê, Persîyên li welatê xwe mabûn ketin nav şahîyêke bêserûbin; kolan bi şaxên mersînan xemilandin, bixûr û bêhnên xweş şewitandin, qurban serjê kirin û li her derê bû cejn. Lê bi nûçeya piştre hat perîşan bûn, ser û çavên xwe rûçikandin, bêsekin qêrîna wan bû û ji Mardonîos diqeherîn. Evqas xem, bi qasî ji bo keştîyên hatibûn wendakirin, tirsa ji bo Xerxes bi xwe jî bû.

[100] Ev şîna millî, heta Xerxes hat da sekinandin jî dom kir. Em bên ser Mardonîos, krîza piştî şerê deryayî ku Xerxes ketibûyê didît û fêhm dikir ku bazdana ji Atînayê di hişê wî de ye, lê ji bo hikumdar kişandibû Yûnanistanê dikarîbû ew bi xwe jî bê cezakirin. Ya baş ji nû ve ketina şer e, gerek careke din şansê xwe biceribîne. Ya wê Yûnanî bibin kole, yan jî ew bi xwe cara dawîyê û bi hewleke bikêrhatî wê rûmeta xwe biparasta û bimira; di eslê xwe de zêdetir kolekirina Yûnanîyan heyal dikir. Bi van hizran ji hikumdar re ev gotin: "Ezbenî, ewqas mereq neke, ev tersîya îro hatîye serê me felaketeke mezin hesab neke. Ji ber ku ji bo me leyza zelal, ne leyza li ser text e, leyza di bejahîyê de bi esker û hesp tê lîstin e. Ji van mirovan kesek jî nikare ji keştîyê peya bibe û bejna xwe bide ber bejna te, li vê axa niha em li ser in jî kesek nikare vê bike. Me dît çi hate serê yên li hemberî te sekinîn. Heke em bixwazin di cih de em dikarin biçin Peloponezê biceribînin; heke em bixwazin em dikarin li hêvîyê bisekinin, ev jî dikare bibe. Xwe ber bi xemê ve bernede; Yûnanî bêçare ne, wê hesabê yên îro û di borîyê de bi me kirin bidin û ew ê bibin koleyê me. Berî her tiştî ez dixwazim tu yên berî niha min ji te re gotin bikî, na heke tu biryar bidî û artêşa xwe ji vir bigrî û biçî, wî wextî jî ez ê vê bêjim: Hikumdarê Mezin, Persîyan li hemberî Yûnanîyan nexe halê pêkenînê; yên karê me xera kirin ne Persî ne, te tu wextî ji me nehêjahîyek nedît. Heke Fenîkeyîyan, Misrîyan, Qibrisîyan û Kîlîkîyayên din bi nehêjayî hereket kirin, di

vê de tawanê Persîyan tune. Madem sebêbê êşandina Persîyan tune, bawerî bi min bike: heke te biryar daye tu li vir nemînî, qismeke mezin a artêşê bigre, bibe welatê wan, lê ez ê Yûnanê bi pozê wê bigrim bidim te; ji bo vê ji artêşê 300.000 eskerên bijarte bide, bes e."

[101] Li ser van gotinan Xerxes, ji wê tengîya ketibûyê xelas bû, xweşîyeke mezin ket dilê wî. Ev bersiv da Mardonîos; ez ê bifikirim, ji van herduyan kîjanî hilbijêrim ez ê ji te re bêjim. Pers berhev kir û mecliseke şer pêk anî, bi fikra ku ji destpêkê ve tiştên qewimîne bi şiklê herî rast dîtîye, kir ku bangî Artemîsîayê jî bikin. Dema ku Artemîsîa hat, Xerxes herkesî, temamê şêwirmedên Persê û parêzvanên wan jî derxistin ji derve û jê re ev got: "Mardonîos pêşniyazî min dike ku em li vir bimînin û êrîşî Peloponezê bikin. Dibêje, di vî karê ters de tawanê Persan û artêşa bejahîyê tune û ji bo îsbata vê dixwaze ez jê re imkanan pêk bînim. Ji min re yan wiha bike, yan jî ez ji artêşê 300.000 eskerên bijarte werbigirim, bi pozê Yûnanistanê bigrim û teslîmî te bikim, dibêje. Heke wiha bibe, ez ê qismê esker yê mayî bigrim û vegerim welatê xwe. Te ku, ji bo ez şerê deryayî nekim ewqas gotinên bi aqilane gotin, niha jî rê nîşanê min bide: Kîjan baş e? Kîjan rê min digihîne armanca min?

[102] Ji Artemîsîaya pirsî çi difikire, wê jî ev bersiv da: "Hikumdarê Mezin, bêguman ji bo karekî zehmet ji kesekî ku çare dixwaze, pêşniyazkirina çareya herî baş ne rehet e; li gel vê jî, li gor rewşa em tê de, ez di vê fikrê de me ku, çûna te ji vir baş dibe. Mardonîos bi yekîneyên hilbijêre re li vir bihêle, madem ew bi xwe jî vê dixwaze, bila bimîne. Em bêjin ku yên dibêjin wê bike, evn milet kirin bin desthilatê, xeyalên wî pêk hatin, wî wextî, ezbenî, vî karî cardin tu pêk tînî, ji ber ku yên vî karî dikin koleyên te ne. Di miqabilî vê de heke hêvîyên Mardonîos pêk neyên û kar berevajî biçin, ev felaketeke mezin nayê hesab, ji ber ku menfeetên bi te û xanedana te ve girêdayî, wê zerar nebînin. Belê, piştî tu bijî û xanedana te rizgar be, wê Yûnanî hê gelek caran rûbirûyî rewşên wiha bên, ez wiha difikirim. Ji ber ku behsa mijarê hebûn yan tunebûna wan e. Lê tersîyek bê serê Mardonîosekî, çi xem e? Yûnanîyên wî têk bibin, nayê hesêb ku qezenc kirine, ji ber ku yê têk birine tenê koleyekî te ye. Em bên te, te Atînayê şewitand, armanca sefera te pêk hat, tu biserketî û tê di rewşeke wiha de paşve biçî.

[103] Xerxes ji vê nêrîna melhezeyên wî yên veşartî didin xuyakirin hez kir; ji ber ku bela jin ya jî mêr, jê re bêje bimîne, jixwe li gor fikra min wê nemaya; ewqas ditirsîya! Pesnê Artemîsîayê da û ji bo kurên wî bibe ew şand Ephesosê, ji ber ku hin kurên Xerxes bi xwe pê re hatibûn.

[104] Ji bo li zarokan binêre bi Artemîsîa re Hermontîmos jî şand, ev ji Pedasosê bû û wezîfeya wî di nav axayên herema Hikumdarê Mezin de qet ne ji rêzê bû. Pedasosî ji Halîkarnassosê wêdetir rûdinin. Di welatê van de bûyereke wiha bi mereq qewimîye: dema li herêma nêzîkî sîteya wan wê di demeke kurt de belayek bihata serê wan, rîha rehbika Athene derdiket û direj dibû; ev bûyera nehatibû dîtin du car qewimîbû.

[105] Hermotîmos jî ji van Pedasosîyan bû. Di vê dinyê de kesek tune ku di wergirtina toleya xerabîya lê hatîye kirin, evqas bêmerhemet be. Wekî hêsîrê şer di bazara koleyan de derxistibûn firotinê; kesekî navê wî Panîanîosê Khîosî ew sitend, vî mirovî îdareya xwe bi rêya ticareteke herî normal pêk dianî; lawên sipehî dikirî, dixesand, piştre dibir li Sardesê, Ephesosê bi perekî mezin difrotin. Ji ber ku di welatê barbaran de, yên xesandî ji mêrên din zêdetir pere dikin, ji ber ku bi van zêdetir tê bawerkirin. Ev Panîanîosê em behs dikin, gelek kur dabûn xesandin -ji ber ku îdareya wî li ser vê bû- û di vê navê re kesê mijara behsê jî. Hermotîmos, di nav bêbextewerîya xwe de bextewer, di nav hinek diyarîyan de, ji Sardesê ji Hikumdarê Mezin re hat şandin. Bi wextê re di nav yên xesandî de qedir û qîmeta wî li ba Xerxes zêdetir bû.

[106] Hikumdar hê li Sardesê bû, artêşa Persê ji bo sefera Yûnanistanê hazirî dikir, Hermotîmos ji bo karekî çûbû Mysîayê, li wir li cihekî jê re Atarneûs tê gotin, ku Khîosî rûdiniştin; rastî Panîonîos hat; ew nas kir û gelek baş pê re hereket kir, ew bextewarîyê ku bi saya wî gihiştibûyê jê re rêz kirin û got naxwaze vê bê berdêl bihêle, heke ew jî jin û zarokên xwe bigre û pê re bê, wê gelek qencîyan pê bike. Panîonîos gelekî şa bû, jin û zarokên xwe berhev kirin û çû, li ba Hermotîmos bi cih bû. Piştî Hermotîmos wî bi jin û zarokên wî ve kirin dehfikê, ev jê re got: "Tu ku bi pîşeyeke herî xerab, bi karekî ku tu mêr dest lê nade pere qezenc dikî, te ji min çi xerabî dîtibû? Kesekî ji malbata min tiştek bi te yan bi kesekî ji malbata te kiribû ku, te mêrekî wekî min pûç kir? Ji ber van xerabîyê te kir, gelo tê ji cezayê xudayan

xelas bibe? Lê niha vaye wan edaleta xwe dan nîşan, ji bo cezayê wî gunehê mezin ya te kiribû tu dan destê min, niha mafê te tune tu gilî û gazina ji cezayê tu bikşîne bikî." Piştî ew bi van gotinan şikenand, zarokên wî anîn pêşberî wî û kir ku Panîonîos bi destê xwe wan bixesîne; bav, di bin zorê de ya jê re hatin gotin kirin û dema ev kar temam bû, zor da zarokan û bi zorê kir ku ew jî bavê xwe bixesînin. Panîonîos kefaretê xwe bi vî awayî da û Hermotîmos jî dilê xwe hênik kir.

HÊZA DERYAYÊ YA PERSÊ PAŞVE DIKÊŞE

[107] Piştî Xerxes, ji bo bibe Ephesosê zarokên xwe teslîmî Artemîsîayê kirin, şand dû Mardonîos û jê re got ku, kesên dixwaze ji artêşê hilbijêre û li hêvîyê ye ku soza daye bi kirinê bi cih bike. Wê rojê ev tenê bûn. Bi şev li ser emrê hikumdar, strategosîyan ji bo biçin Hellespontosê ji Phaleronê lengerên xwe rakirin, ji bo keştîyên pirê di bin emrê hikumdar de bigrin, her yekî bi qasî bikaribin bi lez bi gemîyên xwe derketin rê. Dema keştîyên barbaran nêzîkahî li Pozê Zosterê[295] kirin, niçikên ber bi qiraxê deryayê ve wekî benikan dirêj bûbûn, ji dûr ve bi wan wekî keştîyan xuya kiribûn û belavî saheke fireh bûbûn. Piştre fêhm kirin ku ev ne keştî ne, niçikên ji bejahîyê ber bi deryayê ve dirêj bûne, ji nû ve berhev bûn û rêya xwe dewam kirin.

[108] Dema ku bû sibe, Yûnanîyan dîtin ku artêşa bejahîyê xwe ji cihê xwe tev nedaye, hizir kirin ku keştî jî li dora Phaleronê ne û man li hêvîya êrîşekê û ji bo parastinê temamê hazirîyên xwe kirin. Dema hîn bûn ku keştî çûne, pêşî xwestin bera dû wan bidin, ketin pey wan, lê bê hêza deryayî ya Xerxes bibînin heta Androsê çûn. Li Androsê meclisa şer damezirandin. Themîstokles, dixwest di navbera giravan re li pey keştîyên dijmin bikevin û ji bo keştîyên pirê xera bikin rast biçin Hellespontosê. Fikra Eûrybîades tam eksê wê bû, wî digot: "Heke em pirê xera bikin, esil wî wextî em ê xerabîya herî mezin li Yûnanistanê bikin. Dema ku rêya wan hat birîn ew mecbûrin li Ewrûpayê bimînin, wê Persî rehet nesekinin, ji ber ku bi kêrî wan nayê ku rehet bisekinin û imkan nade wan ku vegerin welatê xwe; ji bilî vê wê artêşa wan jî ji birçîyan bimre. Lê heke dest bi êrîşî bike û ew karê dest pê

295 Pozê Zosterê, di navbera Pozê Pîreyê û Sûnîonê de, hema bêje di nîvê wan de ye.

kirîye bidomîne, wê temamê Ewrûpayê bajar bi bajar, milet bi milet, hinek car bi şer hinek car bi lihevkirinê bi dest bixe. Ji bo eskerên xwe têr bike jî wê her sal qûtê Yûnanîyan ji destê wan bistînin. Naxêr, wisan tê fêhmkirin ku ev Persî, piştî vê şikestina deryayî li Ewrûpayê namînin, em berdin bila biçin, bila heta welatê xwe baz bide û şer jî bibe welatê xwe." -Bi kurtî plana wî ev bû; fermandarên din ên Peloponezî jî nêrînên wî pejirandin.

[109] Piranîya wan, sefera Hellespontosê qebûl nedikirin, li ser vê Themîstokles teref guhert, berê xwe da Atînayîyan (yên herî zêde bêhna wan ji bazdana barbaran teng dibû ew bûn, heke yên din nexwazin jî, ger pêwist ba wê biçûna Hellespontosê û ev kar tenê bi serê xwe tamam bikirna.) û ji wan re wiha got:

> "Piranîya caran hem min ceriband, hem jî min gelek nimûneyên wê seh kirin, min li wan guhdar kir; heke insanê têk biçe bikeve tengîyê, ji nû ve dest davêje çek û careke din digehe hêza êrîşî, me ku, bi serkeftineke hêvî jê nedihat kirin vê hewrê esker paşve avêt û temamê Yûnanistanê û xwe rizgar kir, êdî em nekevin pey dijminekî ku baz dide. Ji ber ku yê dike ew birevin ne em in; xudayên me ne û mêrxasên me ne; dexesîya wan razî nebû yek insan, bêdînek, yê perestgehên pîroz û ew xanîyên insan tê de rûdinin weke hev hesêb dike, peykerên îlahî dişkîne û dike kavil û bi dara li deryayê dixe, astenga dike ber ava wan, kesekî jixwe razî, yekî xûrifî li Asyayê û Ewrûpayê hikum bimeşîne. Belê, di şertên îro de, ji bo me karê herî biaqil, mayîna li Yûnanistanê ye û êdî melhezekirina xwe û zarokên xwe ye; madem barbar ji welat derketine, em jî malên xwe ava bikin û zevîyên xwe biçînin û em biharê keştîyên xwe hildin ber bi Hellespontosê û Îonîayê ve bibin." Ew wiha diaxifî, ji ber ku qîmeta dostîya mezin a Persîyan hesêb dikir, di pêşerojê de dikare serê Atînayê bikeve tengîyê, pêwistî cihekî ku xwe lê bigrin hebe û bi rastî jî wisan çêbû.

[110] Themîstokles bi van gotinan bi Atînayîyan gavên şaş dida avêtin; lê wan bawer kir; ew kesekî bi aqil û bi kêrhatî dihat naskirin; wî ev hertim bi kirina nesîhetên bi sûd û aqilane yên şikjênekirî îsbat kiribû. Çi dibêje bila bêje, ew hazir bûn gotinên wî pêk bînin, Piştî Atînayî bi gotinên xwe kişand bi alîyê xwe de, Themîstokles bêsekin, mirovên xwe yên devgirtî û li ber îşkenceyên nedîtî jî bikaribe li ber xwe bide, kirin qayixekê û ji Hikumdarê

Mezin re şandin; koleyê wî Skînnos jî di nav wan de bû. Ew, dema ku gihişt qiraxê Attîkayê, yên din di qayixê de hiştin û derket bejahîyê, çû ba Xerxes û jê re wiha got: "Ez ji alîyê di nav temamê hevalbendan de kesê herî bi aqil, strategosê Atînayîyan, Themîstoklesê kurê Neokles ve hatime şandin; wezîfeya ku ez ji te re vê bêjim daye min: Themîstoklesê Atînayî yê dixwaze sûda wî bigehe te, kir ku Yûnanîyên dixwestin li pey keştîyên te bikevin û keştîyên pirê yên li ser Hellespontosê xera bikin, dev ji vî karî berdin. Niha tu dikarî êdî rehet biçî."

[111] Piştî ev mesaj dan, keştîya xwe paşde anîn ba yên Yûnanîyan. Yûnanîyên ku dev ji ketina pey keştîyên barbaran û fikra ji çûna Hellespontosê û birîna bihura navbera Ewrûpa û Asyayê berdan, Androsa ku dixwestin xera bikin dorpêç kirin. Ji ber ku dema Themîstokles ji wan pere xwestibû, yên li giravan dijîyan yekem kesên nexwestin xeracê bidin ev hemwelatîyên Androsê bûn. Themîstokles ji bo daxwaza xwe heq bide nîşan, ji bo alîkarîyê bangî Yeqinkirin û Mecbûrîyetê dikir; digot ev herdu îlahên bi hêz, bi Atînayîyan re ne; ji ber wê nabe ji wan re sedeqeyek neyê dayîn. Androsî di bersiva dabûn de, dan xuyakirin ku Atîna mezin e, xwedîyê hebûnê ye û di hêla îlahan de jî bi şens e; lê ew li ser axeke bêbereket dijîn û ew herdu îlah li girava wan bi cih bûne, li hemberî giravê evîneke mezin nîşan didin, lê tiştek nedidan wan; ev herdu îlah, Hejarî û Tengî bûn; hemwelatîyên Androsê yên bawerîya wan bi van herdu îlahan heye, wê pere nedin; bi qasî ku ji hêza Atînayîyan netirsin bêhêz in. Ev bersiv dan û pereyên xwe ji xwe re hiştin. Ji ber vê dihatin dorpêçkirin.

[112] Themîstokles ku ji melhezeya sûdwergirtinên xwe yên şexsî paşve nedima, ji giravên din re jî mesajên bi tirs şandibûn; ji wan re jî kesên ji hikumdar re şandibûn dişand, ew ditirsandin; dida diyarkirin ku heke yên ji wan tên xwestin nedin, wê artêşa Yûnanistanê bajo ser wan, wan dorpêç bike û tar û mar bike. Van tirsandinan ji Karystosîyan û Parosîyan jê re pereyên mezin temîn kiribûn. Wan xeber wergirtibûn ku ew ji bo Androsyan bi Medan re yekîtî çêkirine hatine dorpêçkirin û cihekî Themîstokles a giring di nav strategosîyan de heye, ji ber wê tirsîyabûn û pere şandibûn. Gelo li giravên din jî yên serî tewandibûn hebûn? Ez baş nizanim, lê ez texmîn dikim yên qurbanê vê şantajê bibûn tenê ne ew bûn û hinekên din jî

eynî wiha kiribûn. Li gel vê, ev fedakarî cardî jî ew belayê Karystosî jê ditirsîyan ew jê xelas nekirîye; Parosîyên Themistosles bi bertîlê nerm kiribûn, pêsîrên xwe ji êrîşê filitandin. Themîstokles ku li Androsê baregeh veda, bi vî awayî û bê hayê strategosîyên din jê hebe, girav talan dikir.

XERXES PAŞVE VEDIGERE

[113] Artêşa Xerxes piştî şerê deryayî bi çend rojan, bêyî dereng bimîne, di ser Boîotîayê re û di rêya hatibû re paşve vegerîya. Mardonîos jî di cih de dîtibu ku bi hikumdar re biçe; jixwe demsal ji bo şerekî ne misaîd bû, zivistana xwe li Thessalîayê derbas bikirna û di destpêka biharê de biketina Peloponezê, baştir didîtin. Em bên Thessalîayê, Mardonîos di nav artêşê de hilbijartinên xwe kirin; di serî de, ji derveyî birêvebirê wan Hydarnes, temamê Yekîneya Nemiran girtin. Hydarnes gotibû ku wê ji hikumdar veneqete. Piştre ji nav Persîyên din ên zirh li xwe kiribûn û hezar siwarîyên bijarte, piştre temamê peya û siwarîyên Medan, Sakesan, Baktrîan û Hindîyan wergirtin; ji paşvemayên hevalbendan tenê yên xweşik û berî wê yên bi serkeftinên xwe li ber çavên wî ketibûn hilbijartin. Yekîneya herî bi hêz ya Persîyan bû; eskerên xweşik bûn, gerdenî û bazin bi xwe vekiribûn. Ya duyem Medî bûn; ev jî ji Persîyan ne kêmtir bûn, lê bi Persîyan re nikarîbûn weke hev bihatina hesêb. Yekûn, tev siwarîyan nêzîkî 300.000 kes bûn.

[114] Di rojên Mardonîos yekîneyên xwe veqetandin û Xerxes li Thesaliayê bû, ji Delphoîyê ji Lakedaîmonîyan re kehanetek hatibû; dihat emirkirin ku li hemberî mirina Leonîdas ji Xerxes tezmînat bê xwestin û tezmînata bide bê qebûlkirin. Li ser vê Spartayîyan di cih de qasidek şandin, qasid gihişt artêşa hêj veneqetabû, karîbû derkeve hizura Xerxes û van jê re bêje:

> "Hikumdarê Medîyan, Lakedaîmonî û kurên Heraklesîyên Spartayî, di miqabilî mirîyekî de ji te tezmînatê dixwazin, ji ber ku te hikumdarê wan yê Yûnanistan diparast kuşt!"
>
> Xerxes bi dengekî bilind kenîya, Mardonîosê rexê xwe nîşan kir û bersiv da, got: "Baş e! Va ev Mardonîos wê tezmînata pêwist e bide we."

[115] Qasidê nûçeyan, tezmînata soz hatîye dayîn qebûl kir û xwe da milekî. Xerxes, Mardonîos li Thessalîayê hişt. Bi meşeke bi lez ber bi Hellespontosê

ve ket rê û di 45 rojan de gihişt pira bi keştîyan; di eslê xwe de, artêşa li balê êdî artêşeke bêgirtek bû. Di her cihê rêya wan tê re derbas dibû xelk dişelihandin, ji bo zikê xwe têr bikin qûtên wan ji destê wan distendin; heke zad bi dest wan neketa, bê ferqî temamê herêmê rût kirin, giya, qalikê daran, pel, darên bejî, fêkîyên daran her tişt dixwarin; tiştek nedihiştin, ji birçîna evqas ketibûn zorê. Di rê de weba û dîzanterî temamê artêşê şikandibû û pûç kiribû. Hikumdar, nexweş li bajarên derbas dibû dihiştin, ji bo bên xwedîkirin û rehetkirin emir dida; bi vî awayî ew li Thessalîayê, Sîrîsê û Paîonîayê belav kirin. Dema ku çû Yûnanistanê erebeya pîroz a Zeûs li wir hiştibû; di vegerê de nikarîbû bigre; dema ew ji wan dixwest, Paîonîayê ku hesp dabûn Thrakan di bersivê de digotin, Thrakîyên li Thrakya jorê rûdinin ew ji mêrgan revandine û erdê van kesan li nêzîkî serekanîya Strymonê ye.

[116] Hikumdarê Thrakê yê Bîsaltaîyê û Krestonaîyê, ew xerabîya li hemberî afirînîyê wî wextî kir; dabû xuyakirin ku wê bi zanetî nebe koleyê Xerxes, vekişîyabû ber bi hindur, li ber pêşkên Rhodopê, ji zarokên xwe re qedexe kiribû ku bikevin Yûnanistanê. Zarokên wî guhê xwe nedabûn vê qedexeyê yan jî xwestibûn tahma şer werbigrin û ketibûn pey Persan; dema kû sax vegerîyan - şeş kes bûn-, bavê wan wekî ceza çavên wan derxistin.

[117] Bedelê wê gava şaş wiha dan. Dema ku Persî ji Trakyayê derbas bûn gihiştin keştîyên pirê, ji bo ku ji Hellespostosê derbas bibin bi ser hev de ketin keştîyan û derketin Abydosê; ji ber ku êdî pir herdu qirax nedigihandin hevdû; bahozê ew feşkilandibû. Di midetê ku li vir man, ji dema rê zêdetir xwarin dîtin, lê ji bo ku êrîşî xwarinê kirin û yek jî ji bo ava vexwaribûn guherîbû, nexweş ketin, yên di dest de mabûn jî bi vî awayî mirin. Yên din di dawîyê de, bi Xerxes re gihiştin Sardesê.

[118] Vê paşvekêşîyê bi awayekî din jî dibêjin. Li gor wê, Xerxes ku ji Atînayê rabû, dema hat Eîona li ser Strymonê, rêya bejahîyê berdabû, karê birina artêşê li Hellespontosê dabû Hydarnes û li keştîyeke Fenîkîyan siwar bûbû derbasî Asyayê bûbû. Di rê de bêpayîn, dema ku ber bi Strymonê ve diçûn, bahozek rabibû, derya bilind kiribû. Keştîya barê wê giran hindik mabû di bin pêlan de bimîne; gelek Persên bi Xerxes re li keştîyê siwar bûbûn, guverte tije kiribûn; hikumdar tirsîyabû, kirîye ku bangî qaptanê rêber

bikin û pirsîye, gotîye "Gelo em ê xelas bibin? Wî jî gotîye ku "Ezbenî, heke em ji van rêwîyên zêde xelas nebin, em jî xelas nabin." Dibêjin ku wî wextî Krekses bi vî awayî qêrîyaye: "Gelî Persîyan, dema hûn ji bo hikumdarê xwe fedakarîyê bikin hatîye; ji ber ku wisan dixuyê xelasîya min bi we ve girêdayî ye." Hê gotinên wî temam nebûye, Persî xwe avêtine lingên wî, piştre jî xwe berdane deryayê; bi vî awayî keştî sivik bûye, bi silametî gihiştîye Asyayê. Belê, çawa lingê xwe tavêje bejahîyê karê yekem yê Xerxes kirîye ev e: Ji bo hikumdar xelas kirîye, çelengeke zêrînî danîye serê qaptanê rêber; piştre jî ji bo ewqas Persî daye kuştin serê wî daye jêkirin.

[119] Çîroka duyem a behsa vegera Krekses dike jî ev e; lê li gor min ji serî û heta binî derew e, bi taybetî ew beşa yên hatine serê Persîyan. Heke bi rastî qaptan ew bersiv dabe Krekses, ez texmîn nakim ji deh hezaran kesek derkeve û ji vê pêve tiştekî ku hikumdar bike wê bifikire: Persîyên li guverteyê bûn daxist xwarê û kir cihê bêrkêşan, ji ber ku ew Pers bûn, hem jî ji sefa yekê ya Persan û yên bavêtina deryayê wê Fenîkeyîyên bêrkêş buna yên ku hijmara wan bi qasî yê Persî bûn. Naxêr, wekî min li jorê got, ew jî bi qismê artêşe yê mayî re, ji bejahîyê vegerîyabû Asyayê.

[120] Va ev jî îsbata rastîyê: Xerxes di vegerê de di Abderayê re derbas bûye, ev zelal e, bi vê sîteyê re peywendîyên xwe yên resmî qahîm kirine, şûreke zêrîn û taceke bi zêr xemilandî diyarî kirîye. Heta Abderayî dibêjin: ji dema ku ji Atînayê derketîye heta wir cara ewil kincên xwe ji xwe kirîye, ji ber ku tenê li wir xwe di bin ewlehîyê de his kirîye; lê ez ji vê bawer nakim. Ji ber ku Abdera ji Hellespontosê, ji Strymon û cihê dibêjin li keştîyê siwar bûyî Eîonyê nêzîktir e.

[121] Yûnanîyên li hemberî Andros nikarîbûn tiştekî bikin, derbasî Karystosê bûne û piştî vir xera kirine vegerîyane Salamîsê. Pêşî ji bo xudayan wekî nezir sê trîremê Fenîkî, yek jê ji bo deynin Îsthmosê, ku îro jî li wir sekinîye, ya din li Sûnîonê, ya sisiyan jî li Salamîsê ji bo Aîas veqetandin. Piştî vê yên ji dijmin bi dest xistin parve kirin û nezir şandin Delphoîyê. Yek jî peykera kesekî di destan de dîreksîyona keştîyê hat daçikandin; bejna vê peykerê 12 enîşk e û li cihê peykera zêrîn ya Alexandrosê Makedonîayî disekine.

[122] Dema ku nezir dişandin Delphoîyê, ji îlahan li ser navê hemî hevalbendan pirsîn ; payê xwe bi temamî wergirtine û vê têr dibînin gelo. Îlah got, ji bilî Aîgînayan temamê Yûnanîyan deynê xwe dane. Ji Aîgînayan heqekî di hêjayîya serkeftina li Salamîsê bi dest xistin dixwest. Li ser vê Aîgînayan dîrekeke bronz a li ser sê stêrkên zêrînî şandin, ku li goşeke perestgehê, li cihekî nêzîkî kraterosa diyarîya Kroîsos disekine.

[123] Piştî parvekirina tiştên ji dijmin hatibûn wergirtin temam bû, Yûnanîyan xelata mêrxasîyê, ji bo di seranserê vî şerî de bidine yê herî layîq e, ber bi Îsthmosê ve ketin rê. Dema gihiştin wir, strategosîyan dengê xwe danîn ser pêşkêşgeha Poseîdaonê û dest bi hilbijartinan kirin. Wê yekî ji bo yekemîn, yek jî ji bo duyemînê bijartina. Xelata yekemîn tevan jî didan xwe, ji ber ku her yek jê pesnê xwe dida ku mêrxasê yekemîn ew e; ji bo kesê duyemîn piranîya dengan ji Themîstokles re çûbûn; di netîceyê de her yekî dengek wergirtibû, yê herî zêde deng wergirtibû Themîstokles bû, lê vê jî ew dikir yê duyemîn.

[124] Ji ber hesûdîyê Yûnanîyan ev kar temam nekirin; bê xelatdayîn her yek vegerîya welatê xwe. Ji ber vê, navê Themîstokles li temamê Yûnanê hê hindiktir bilind nebû, ew kesê herî biaqil yê Yûnanistanê dihat hesêbkirin. Lê ji bo ji nav şerkerên Salamîsê bi rûmeta têkbirinê nehat bilindkirin, hema di pey wê de bi hêvîya wergirtina payebilindîyekê çû Lakedaîmonê û bi rastî Lakedaîmonîyan ew gelekî bi serbilindî pêşwazî kirin, gelek hurmet nîşan dan. Xelata mêrxasîyê dan Eûrybîades; ev xelat taceke ji şaxên zeytûnê bû; Themîstokles layîqê hosteyî û aqiltîyê dîtin û wî jî tacek ji şaxên zeytûnê wergirt; erebeya Spartayê ya herî xweşik wek xelat danê; di pesnan de hiştin û yekîneke rûmetê ya navê wê Siwarî bû ya ji 300 Spartayîyên bijarte pêk hatî, dema ku çû ew heta sînorê Tegeayê bi rê xistin. Spartayî, bi qasî ez dizanim, tenê ew bi vî awayî bi rê xistibûn.

[125] Dema ku ji rêwîtîya Lakedaîmonê vegerîya û hat Atînayê, rûbirûyî şerên Tîmodemosê Aphîdnaîyî bûbû, ev kes yek ji wan dijminê wî bû û ji xwe mirovekî tarî bû, dexesî hindurê wî dikola û di warê rêwîtîya Lakedaîmonê de tevlihevîyeke mezin derdixist. Digot "Wî, li Lakedaîmonê ew rêz ji bo xatirê Atînayîyan dîtîye, ne ji bo xatirê xwe." Ji Tîmodemosê eynî tişt digotin,

Themîstokles got: "Heqê te heye, heke ez Belbînayî bûma[296] min ji Spartayîyan evqas rêz redidît. Lê mêrxasê min, Atînayîkî wekî te jî nikaribû bibine."

BÛYERA POTÎDAÎAYÊ

[126] Yên li Yûnanistanê diqewimîn ev bûn. Artabazosê kurê Pharnakesê Persî ku li welatê xwe baş dihat nasîn û piştî bûyerên Potîdaîayê nav û dengê wî hê zêdetir bû, bi 60.000 kesên pê re yên Mardonîos ji artêşê ji xwe re veqetandibû, hikumdar heta Hellespontosê bi rê kiribû. Dema ku hikumdar derbasî Asyayê bû ew jî paşve vegerîya. Dema ku hat nêzîkî girava Palleneyê, minasib nedît Potîdaîaya îxanet li hikumdar kiribû negre û xelkê wê neke kole derbas bibe biçe, çawa be Mardonîosê li deverên Thessalîayê û Makedonîayê cihê xwe yê zivistanê çêkiribû û ji bo zû vegere ew nedişidand. Ev Potîdaîayên han, hîn bûbûn ku hêzên deryayî yên ji Salamîsê baz dabûn hatibûn û dema ku hikumdar di bajarên wan re derbas bûbû, li hemberî barbaran bi zelalî serî hildabûn; temamê Nîvgirava Palleneyê jî li ser rêça wan meşîyabûn.

[127] Artabazos, dora Potîdaîayê rapêça; Olynthosa şik jê dikir ku dixwazin ji hikumdar veqetin jî rapêça. Ev wilayet ya Bottîaîayên bûn, yên ji alîyê Makedonîayan ve ji Kendava Thermayê hatibûn avêtin. Dema ku dorpêç bi wergirtina bajêr qedîya, temamên kesên tê de rûdinin, birin ber devê golekê û serê wan jêkirin. Û bajar dan Khalkîsîyan, wekî walî jî Krîtobûlosê Toroneyî danîn ser serê wan; Khalkîsîyan Olynthosê bi vî awayî bi dest xistine.

[128] Piştî Artabazos vir stend, avêt ser Potîdaîayê; ji bo werbigire hewleke zêde dida, Tîmokseînosê fermandarê Skîoneyîyan, ji bo bajêr teslîmî wî bike, pê re peywendî danî; vî karî çawa dest pê kiribû? Ez nikarim vê bêjim, ji ber ku di vî warî de tu zanyarî tune, lê di dawîyê de, lêbinêrin çawa kirin: Dema ku Tîmokseînos xwest xeberekê bigehîne Artabazos yan jî Artabazos ji Tîmokseînos re nameyekê binivîse, li kirtika tîrê dipêçin, tiştekî wek perikî jî pê vedikin, piştre bi kevan davêjin cihekî ku di pêşîyê de li ser li hev kirine. Lê derket holê ku Tîmokseînos dixwaze Potîdaîayê

296 Belbîna, giraveke biçûk ya li başûrê Attîkayê ye.

bigre; rojekê Artabazos ji bo tîrê bavêje cihê hatibû tesbîtkirin, tîr çû û di milê yek ji wan parêzvanên Potîdaîayî de çikilî, di cih de li ser serê birîndar berhev bûn, wekî her tim di şerde dibe, tîr girtin derxistin û name dîtin, ew ji fermandaran re birin; hevalbendên ji Nîvgirava Pallenê hatibûn jî li wir bûn. Name xwendin, strategosên îxanet ji ku hatîye hîn bûn, rast nedîtin ku Tîmokseînos tevlî karekî wiha bikin. Hem melhezeya Skîoneyê kirine, hem jî nexwestibûn navê wî ji bo heta hetayî xayîn derkeve. Ew dolaba Tîmokseînos digerand bi vî awayî derketibû orteyê.

[129] Sê meh bû Artabazos bajar dorpêç kiribû ku, av baş vekêşîya û demeke dirêj wiha ma. Persîyan ku dîtin sêlekan hema bêje tam zûha bûye, xwestin derbasî Palleneyê bibin; ji pêncan dudu yê rê derbas kiribûn û ji bo derbasî nîvgiravê bibin hê ji pêncan sisê yê rêya wan mabû, av ji nişka ve û qederekî bilind bû, ev çûnûhatin her wextê dibû, lê li gor xwecihan digotin, bi vî awayî qet nehatibû dîtin. Yên sobanî nizanîbûn mirin, yên zanîbûn jî kesên Potîdaîayê diparastin, êrîş kirin û bi qayixan avêtin ser wan; temamê wan bi şûran perçe kirin. Sebebê vê bilindbûna bi hêz ya deryayê ya kir ku Persî bişikin, li gorî li Potîdaîayê tê gotin, ji ber gunehên ku li hemberî perestgeh û peykera Poseîdaon kirin ya li taxa ku mirovên di nav pêlan de can dan. Li gor min tiştekî rast e ev sebeb bê nîşandan. Persên paşve man, Artabazos ew birin Thessalîayê ba Mardonîos.

HÊZA DERYAYÊ YA PERSÊ LI SAMOSÊ BERHEV DIBIN

[130] Dawîya kesên hatin hikumdar bi rê bêxin bi vî awayî bû. Yên ji artêşa deryayî ya Xerxes man, piştî ji Salamîsê baz dan derbasî Asyayê bûn, piştî hikumdar û artêşa bejahîyê ji Khersonasos girt û Abydos derbas kirin, ji bo zivistanê li wir bimînin xwe gihandin Kymeyê. Dema ku bi biharê re rojên xweş hatin, hêza deryayî bêyî wext derbas bike, li Samosa ku qismek keştî zivistana xwe li wir derbas kiribûn, berhev bûn. Piranîya van yekîneyên deryayî, kesên ji Persan û Medan hatibûn berhevkirin. Fermandarên wan Mardontesê kurê Bagaîos û Artayntesê kurê Artakhaîes bûn; Artayntes birazîyê xwe Îthamîtres girtibû ba xwe, ew jî farmandarî bi wan re parve dikir. Ew têkçûna giran ya hatibû serê wan, daxwaza wan ya çûna ber bi rojavayê

ve nehiştibû û ji bo kesek jî li hember dernediket, li Samosê man û çavdêrîya Îonîayan kirin ku ditirsîyan serhildanê bikin; bi keştîyên Îonîayê re 300 keştî bûn. Jixwe nedifikirîn ku wê Yûnanî rabin bên Îonîayê; ew ê qiraxên xwe biparêzin û ji bo ku lênerin piştî Salamîsê neketin pey hêza deryayî ya Persan, hizir dikirin ku ji bilî vegerin welatê xwe pê ve tiştekî melheze nakin. Ew bawerîya zêde ya bi xwe di şerê deryayî de wenda kiribûn, lê bawer dikirin ku wê di bejahîyê de Mardonîos rehet qezenc bike. Ji ber wê li Samosê man, dest bi plankirina wê çawa zerar bidin dijmin kirin. Li milekî din jî dest bi saxtîkirina rewşa sefera Mardonîos kirin.

[131] Em bên ser Yûnanîyan, bi biharê re hebûna Mardonîos li Thessalîayê ew hişyar kiribûn. Berî artêşa bejahîyê berhev bibe, hêza deryayî hat Aîgînayê; 110 keştî hebûn; fermandarê yekîneyên deryayî û tayfeyan Leotykhîdasê Spartayî bû; ew kurê Menares bû û zincîra secereya wî jî ev e: Hegesîlaos, Hippokratîdes, Leotykhîdas, Anaxîlaos, Arkhîdamos, Anaxandrîdas, Theopompos, Nîkandros, Khalîraos, Eûnomos, Polydektes, Prytanîs, Eûryhon, Prokles, Arîstodemos, Arîstomakhos, Kleodaîos, Hyllos û Herakles; ji du xanedanên hikumdaran ji ya duyem bûn. Ev bav û kalên han, ji derveyî heft kesên di serê lîsteyê de tên hijmartin, tev hikumdarê Spartayê bûne. Li ser Atînayîyan Ksanthîpposê kurê Arîphron hebû.

[132] Piştî temamê keştîyan li Aîgînayê berhev bûn, ji bo hêza deryayî ya Yûnanan ji Îonîayê qasid hatin; qasek berê di Spartayê re derbas bûne û ji bo Îonîayê rizgar bikin ji Lakedaîmonîyan alîkarî xwestibûn; di nav wan de Herodotosê kurê Basîleîdes jî hebû. Ji bo Stratîsê hikumranê Khîosê bikujin di nav xwe de li hev kiribûn; di destpêkî de heft kes bûn; lê yek ji sûndxwaran meselê derdixe holê, komplo hişkere dibe; şeşên din bi xef ji Khîosê baz dabûn, pêşî çûbûn Spartayê, piştre jî hatibûn Aîgînayê. Ya dixwestin, Yûnanî ba bidin babirkên xwe û biçin ser Îonîayê. Û bi zehmetîyên mezin heta Delosê ew kaş kirin jî. Ji wir şûn ve ji bo Yûnanîyan cihekî tijî tehlîkeyên bi saw bû, ji bilî vê vir nas nedikirin, hizir dikirin derya tijî keştîyên dijmin e. Samos ji bo wan bi qasî stûnên Herakles dûr dihat xuyakirin. Belê rewşeke ecêb derketibû holê, barbar ber bi rojavayê ve ji Samosê wê ve derbas nedibûn, ewqas ditirsiyan; Yûnanî jî bi hemî handanên koçberên Khîosê, ber bi rojhilatê ve ji Delosê wê ve nediçûn. Tirsê, navbereke mezin kiribû orteya herduyan.

[133] Dema Yûnanî ber bi Delosê ve diçûn, Mardonîos hê li Thessalîayê li hêvîya xelasbûna zivistanê bû. Ji baregeha giştî, kesekî navê wî Mysê yê Eûroposî[297] şandibû ba kahînan, wezîfeya wî wê biçûya li temamê kahînên ku Persî karîbûn bi wan re peywendîyê deynin bişêwirîya. Dema ku ev emir da çi difikirî, ji kahînan çi dipirsî, ez nizanim; di vê xalê de belge lal in; lê ez li ser hesaba xwe, texmîn dikim ku wî tenê pirsên li ser karên eskerîyê dipirsîn.

[134] Ev kesê navê wî Mys, zelal e ku çûye Lebadaîayê. Li wir yek ji wan xwecihan, bi hêza zêran daxistîye perestgeha Trophonîosê ya binê erdê, çûye perestgeha Abaîyê ya li Phokîsê jî. Çûye Thebaîyê jî û ji bo wê di pêşerojê de çi bibe, bêsekin bi Îsmenîosê Apollon şêwerîye. (Li vir jî wekî Olympîayê, bi qurbanjêkirinê bi kahîn dişêwirîn.) Piştre biyanîyekî -ne Thebaîyî- bi pera xapandîye û kirîye ku di perestgeha Amhîaraosê de rakeve; ji ber ku li vir mafê tu Thebaîyekî tune bi kahîn bişêwêre û sebebê vê jî ev e: Amphîaraos îradeya xwe bi rêya kahîn dide xuyakirin, ji Thebaîyan re emir kiribû ji herduyan yekê hilbijêrin: Wê wî yan wekî kahîn yan jî hevalbendekî nas kiribana; pêwist bû ji herduyan yekî hilbijêrin. Wan xwestibûn hevalbend bin, belê ji bo vê yekê izna raketina Thebaîyek di perestgehê de tunebû.

[135] Thebaîyan tiştekî gelekî ez jê ecêbmayî hiştim dibêjin. Tê gotin, dema ku Mysê Eûroposî di navbera perestgehan de diçe û tê, serî li saheya pîroz ya Ptoos Apollon jî daye. Ev perestgeh bi navê perestgeha Ptoonê jî tê naskirin û ew ya Thebaîyan e; ew li ser Gola Kopîasê, li ber pêşkên çiyê û nêzîkî bajarê Akraîphîayê hatîye avakirin. Belê, ev kesê navê wî Mys, hatîye vê perestgehê; li wir sê hemwelatîyên ji alîyê meqamên dewletê ve hatine şandin jî hebûne, wê kehanet binivîsandina, belê kahînê mezin bêpayîn dest bi axaftina zimanê barbaran kirîye. Thebaîyên li wir, dema ku di cihê zimanê Yûnanî de ev seh kirine şaş mane; nizanin ka wê çi bikin. Wî wextî Mysê Eûroposî, tableta di destê wan de kişandîye birîye, gotinên kahîn gotine nivîsandine û gotîye ku ev zimanê Karyayê ye; bersiv nivîsandîye û piştre vegeryaye Thessalîayê.

297 Eûropos, bajarekî Makedonîayê ye.

[136] Piştî Mardonîos bersiv xwendîye, Alexandrosê kurê Amyntasê Makedonîayî wekî wezîfedar dişîne Atînayê; peywendîyên vî şahzadeyî bi Aryanê re hebûn, ji ber wê wî ew hildibijart. Bi rastî jî yek ji wan xwehên Alexandros, Gygeaya keça Amyntas, bi Bûbaresê Aryanî re zewicîbû,[298] ji wî kurek, Amyntasekî din anîbû dinyê. Ev Amyntasê navê bapîrê wî yê ji alîyê dayîkê ve lê kiribûn, li Asyayê jiyabû, Hikumdarê Mezin ew kiribû walîyê bajarê Alabandayê yê mezin yê li Frîgyayê. Wekî din, ew jê re wek mêvanê Atînayîyan yê fermî û qencîya wî gihiştîye Atînayîyan dabûn naskirin. Bi vî awayî, Mardonîos hizir dikir wê bi vî karî, bikaribe Atînayîyan bike hevalbendê xwe, ji ber ku ew xelk hem wekî hejmara xwe ya zêde û hem jî mêrxas bûn û cardin her ew bûn di şerê deryayî de tesîrtirîn derb li Persîyan xistibûn. Mardonîos di wê bawerîyê de bû ku heke Atînayîyan razî bike, bi rehetî dikare serdestîya behran bidest bixe-ku bi rastî jî dikarîbû bi dest bixe-. Ji bilî vê wê di bejahîyê de jî serdestîya wî zêde bûba; wî wextî wê rewşa wî ji ya Yûnanîyan baştir bûba. Dikare bê fikirandin ku kahînan ev hevalbendî pêşniyaz kiribin û jê re gotibin; wî jî guhê xwe da wan û Alexandros derxist rê.

[137] Bav û kalê nesla heftan a vî Alexandrosî Perdîkkas e, zincîra hikumranên Makedonîayê bi wî dest pê dikin û bi vî awayî ye: Ji Argosê ji nesla Temenos[299] sê bira sirgûn hatine Îllyrîayê: Gaûanes, Aeropos û Perdîkkas; piştre ji Îllîyrîayê derbasî Makedonîaya Jorê bûne û gihiştine bajarê Lebaîayê. Li wir wekî rehîn li ba hikumdar xizmet dikirin, yekî jê hesp diçêrandin, yê din ga û yê herî biçûk Perdîkkas jî pez. Ji ber ku di dewrên kevin de, ne tenê malên girseyên xelkê, malên hikumranan jî di nav hejartîyê de bûye; xwarina wan jina hikumdar bi destê xwe çêdikir. Û kengî nan bipêje, nanê xizmetkarê xort yê Perdîkkas du carî zêde dinepixî. Dema ku her carî wiha çêbû, wê ji mêrê xwe re got. Dema hikumdar guhê xwe da jina xwe, fikirî ku wê ev bibe mûcîzeke mezin û giring. Kir ku bangî hersê xizmetkaran bikin û emir kir ku ji welatê wî derkevin. Wan jî deynên xwe jê xwestin, û gotin: "Dema ku em deynên xwe li gor edaletê werbigirin em ê biçin." Hikumdar, dema ku gotina deyn seh kir û tam di wê navê re, ji kuleka serê ban ya baceyê tîrêjên

298 Di derheqê Bûbares de li pirtûka 5an beşa 21ê binêrin.
299 Temenos, ji Heraklesîyan e.

rojê avêtin û wî jî wî wextî, xuyaye ji alîyê îlahekî ve hat şaşkirin, wiha got? "Deynê we? Ha ji we re deynê xwe bigrin, têrê nake?" Û roj nîşan da. Li ser van gotinan Gaûanes û Aeropos yên mezin tirsîyan; lê yê herî biçûk ku kêrek li ser bû bersiv da û got: "Hikumdar ew tiştên te dan me em qebûl dikin!" Bi kêra xwe li dora tîrêjên rojê yên erdê çemberek kişand; piştî çember hat kişandin, sê caran roj girt û kir paşla xwe, piştre bi yên din re çû.

[138] Bi vî awayî çûn û kesekî ku li wir bû, bala hikumdar kişand ser tiştên wî lawikî kir û da hiskirin ku ew diyarîya dan wî çawa wekî tinazê xwe pê bike hilda. Hikumdar hêrs bû, ji bo ku wan bikujin siwarî di pey wan de şandin. Li wê herêmê çemek heye, ji bo ku koçberên Argosê birazîyê wan yê biçek rizgar kiribû, jê re qurban tên pêşkêşkirin. Ji ber ku ev çem piştî nevîyên Temenos derbas bûne ava wê bilind bûye, siwarîyên di pey de hatine nekarîbûn derbas bibin. Hersê bira çûne herêmeke din a Makedonîayê û bi cih bûne, vir nêzîkî cihekî ku jê re baxçeyên Mîdasê kurê Gordîas tê gotin bûye. Di vî baxçeyî de gul bi xwe hêşîn dibin, pelên tacên wan dibin şêst lib û bêhna wan ji gulên din siviktir e. Tê gotin ku Sîlenos di van baxçeyan de ketîye dehfikê. Li ser van baxçeyan çiyayek bilind dibe: Çiyayê Bermîonê. Ji sermayê kesek nikare nêzîkî balê bibe. Xortên me ev welat kirine destê xwe û ji vir rabûne, çûne ku cihên Makedonîayê yên mayî jî bi dest bixin.

[139] Alexandros, bi vê zincîra secereyê bi Perdîkkas ve tê girêdan: Bi xwe kurê Amyntas e, bavê Alktas Aeropos e, bavê wî jî Phîlîppos, bavê Phîlîppos Argaîos, bavê wî jî, damezrênerê xanedana Perdîkkas e.

[140] Koka Alexandrosê kurê Amyntas ev bû. Dema ku ji alîyê Mardonîos ve hat şandin û hat Atînayê ev axaftin kirîye:

a) "Hemwelatîyên Atînayê, va ji we re emrên Mardonîos: Min ji Hikumdarê Mezin ev emir wergirt: 'Ez helwêsta xerab a Atînayîyan ya li hemberî min nîşan dan efû dikim. Mardonîos, niha tê wiha bikî: Pêşî erdê wan paşve bide wan;[300] piştre ji wan re bêje, erdê ku bixwazin bila hilbijêrin û bigrin

300 Xerxes, bi fermî dev ji temamê daxwazên xwe û yên bavê xwe berdide. Dareîsos ji Atînayê ax û av xwestibû.

bin desthilata xwe. Û min çiqas perestgehên wan şewitand, heke bi min ve bên girêdan ez ê tevan ji nû ve ava bikim!' Min ev emir girt, heke helwêsta we vê bêîmkan neke, ez ê wan bi cih bikim. Niha jî ez ê li ser navê xwe ji we re tiştina bêjim: Hûn ji bo çi li hemberî Hikumdarê Mezin li ber xwe didin? Ev dînîtî ye. Hûn nikarin wî têk bibin û nikarin heta hetayî li hember bisekinin. We dît, Xerxes çawa bi artêşên zêde meşîya ser we û tiştekî çawa kir; îro hûn hêza di destê min de ye jî dizanin; em hesêb bikin ku hûn ji me bi hêztir derketin û we em têk birin -heke hinek aqilê we hebe hûn tiştekî wiha nikarin hêvî bikin- wê deh qat zêdetir yên din bên. Bes êdî bejna xwe bidin ber bejna hikumdar, rê nedin welatê we ji destê we derkeve û dev ji şerekî ku her wextê leyzeke li ser hebûna we ye berdin; çekên xwe deynin. Rewşeke bi rûmet derdikeve pêşberî we: Hikumdar bi xwe serî li we dide. Bi me re peymaneke eskerî ya bê derew û hîle çêkin û azad bimînin."

b) "Belê, ey Atînayîyan, ew wezîfeya Mardonîos ya daye min ku ez bigihînim we ev e. Ez bi xwe, li ser tiştên min ji we re kirine naxwazim tiştekî bêjim. Hûn tevan dizanin. Ez jî gelek dixwazim hûn guhê xwe bidin Mardonîos. Ez we di rewşeke ku hûn karibin tim bi Xerxes re şer bikin nabînim: Heke min dîtiba, min anîna mesajeke wiha qebûl nedikir; çavkanîyên hikumdar derdikevin ser hêza insên û ev hêz heta dûr dirêj dibe. Ji îro zûtir tûne, heke hûn evqas şertên misaîd qebûl nekin û peyman çênekin, ez ê di cihê we de bitirsim. Ji ber ku welatê we saheke kifşe ya şer e. Berdin êdî; hikumdar, Hikumdarê Mezin, ji nav temamê Yûnanîyan tenê efûkirina qisûrên we û xwestina dostîya bi we re, ne rûmeteke kêm e." Axaftina Alexandros ev bû.

[141] Lakedaîmonî, hîn bûbûn ku Alexandros ji bo pêkanîna peymaneke di navbera Hikumdarê Mezin û Atînayîyan de hatîye Atînayê û kehaneta ku digot Atînayîyên bi Medan re bibin yek, bi Dorên din re, wê wan jî ji Peloponezê raqewirînin bi bîr anîbûn, ziravê wan qetîyabû ku wê Atînayî bi Persan re li hev bên û li ser vê bêpayîn biryar dabûn qasid şandibûn. Wisan çêbû ku, hatina qasidan rastî roja meclis berhev bûbû hat; ji ber ku Atînayîyan texmîn kiribûn ku wê Lakedaîmonî pêşniyaza barbaran seh bikin û bi lez qasid bişînin, ji ber wê xwe ştexilandibûn û ew kar dirêj kiribûn. Ji bo Lakedaîmonî jî helwesta wan bibînin Bi zanetî mabûn sekinî.

[142] Dema ku Alexandros gotinên xwe temam kirin, ji wê kûrsîya hat xwarê qasidên Spartayî derketin ser û gotin: "Lakedaîmonîyan, em ji bo we şandine û rica kirine ku hûn di polîtîkaya Yûnanîyan de guhertinên şermezarî nekin û pêşniyazên barbaran qebûl nekin; ev ji bo kîjan miletê Yûnanî jî be ne rast e, rûmetê nayne, lê di eslê xwe de ji bo we û ji ber gelek sebeban: Ne me ev şer xwest, we da destpêkirin; ev nelihevkirin di serî de ji bo parastina we derket; îro belavî temamê Yûnanistanê bû. Em vê deynin alîyekî, heke Atînayî bibin wasiteya kolekirina Yûnanistanê ev ne tiştek e ku mirov tehemmul bike; di gelek rûpelên dîroka me de, dema ku mirov ber bi yên kevin ve diçe, ma ne hûn in yê ji bo rizgarkerên xelkên din derdikevin? Bêguman yên hatine serê we me jî xemgîn dikin; ji niha ve ji bo we çandinîya xwe ya du demsalan wenda kirîye û bi mehan e ocaxên we xerabûne, dilê me bi we dişewite. Ji bo alîkarîya vê rewşê Lakedaîmonî û hevalbendên wê didin diyarkirin ku, di nav jin û malbatên we de yên ne di rewşa şerkirinê de ne, digrin ser xwe ku di temamê berdewamîya şer de wan têr bikin. Bi Alexandrosê ku gotinên giran yên Mardonîos nerm dike nexapin, ew tiştên bi kêrî wî bê dike. Ew bi xwe hikumran e, ji bo hikumran dixebite; lê hûn, heke hûn rast bifikirin, hûn nikarin wisan bikin, hûn zanin ji barbarekî hêvîya dirûstîyê û dilvekirîyê nayê payîn."

[143] Qasidên Spartayî wiha axiftin. Bersiva Atînayîyan ya dane Alexandros ev bû: "Çavkanîyên Medan ji yên me qat qat serdesttir in, em jî vê zanin, lê hewce nake hûn bi pîvaneke wiha me biperçiqînin. Evîna azadîyê ewqas tesîr li hinavê me kirîye ku, em dixwazin bi qasî ji destê me tê em wê biparêzin. Hêvîya çêkirina peymanekê bi barbaran re ji me nekin; em vê qebûl nakin. Kerem bike here, bersiva Atînayîyan bigihîne Mardonîos: Tu wextî, heta roj ew xeta li ser dimeşe bidomîne, em bi Xerxes re peymanekê çênakin. Ji ber wê qet bê tirs, em bawerî bi mêrxasên xwe û îlahên cihên wan yên pîroz û peykerên wan hatin şewitandin dikin. Em bên te, careke din bi van axaftinan dernekeve pêşberî Atînayîyan û wekî ku te ji wan re xizmetek kirîye xwe nîşan nede û nesîhetên nêhêjatîyê li wan neke. Ji ber ku em naxwazin Atînayî yên tu mêvanê wan yê fermî ye û dostê wan î, zirarê bidin te."

[144] Bersiva dan Alexandros ev bû; em bên ser qasidên Spartayî, ji wan re jî ev gotin: "Tiştekî siruştî ye ku Lakedaîmonî ji lihevhatina me bi barbaran

re bitirsin. Lê hûn zanin em xwedî fikarek û ruhekî çawa ne, ev tirsa we ne di cih de ye. Ne lodê zêr ê bi qasî di çîrokan de derbas dibe û ne cihê herî xweş û bi bereket yê li ser rûyê cîhanê, nikare bike ku em bi Medan re bibin yek û Yûnanistanê bikin kole. Heke rojekê vê qebûl bikin jî gelek kartêker hene ku binin asteng. Di serî de û ya herî giring, ew perestgeh û peykerên îlahên me yên raxistin erdê û hatin şewitandin; em bi yên ev nizmî kirin re ne lihevkirin, ji wan bi çi bihayî dibe bila bibe, hem jî bi awayekî herî giran dixwazin heyfê hilînin; ya duduyan, hisa welatê Hellenê heye; bi xwîna xwe, bi zimanê xwe, bi bawerîya eynî îlahî, bi qurbanîyên xwe, bi mişterekîya zewq û adetên xwe ve em girêdayê wê ne, xayîntîya bi Yûnanistanê re ne baş e ji bo Atînayîyan. Vê zanibin, heke we heta niha nizanîbû, li ser rûyê dinyê yek Atînayî bimîne jî, wê Atîna bi Xerxes re lihevhatinê çêneke. Li gel vê jî ew eleqeya we ji bo me nîşan daye, ew xema we ji bo xanîyên me yên xera bûye xwarîye û xwesteka têrkirina malbatên me em kêfxweş in. Hûn ji me re dostîyeke mezin nîşan didin, lê em naxwazin ji we re bibin bar. Ji bo vê rewşê, pêwist e hûn bêsekin ji me re artêşê bişînin; bi me derketina hole ya barbarian, ajotina yekîneyên xwe bi ser welatê me de nêzîk e; roja hîn bûn yên ji me dixwazin em ê nekin, wê li pêşberî me bisekinin. Ya baş hê ew neketîne Atînayê, em bimeşin li Boîotîayê pêşwazîya wan bikin." Li ser vê bersiva Atînayîyan, Spartayî vegerîyan sîteyên xwe.

PIRTÛKA NEHAN

KALLIOPE

ARTÊŞA PERSÊ CARA DUDUYAN DIKEVE ATÎNAYÊ

[1] Û Mardonîos, çawa fikarên Atînayîyan ji Alexandrosê ku ji Atînayê vegerîyabû hîn bû, derket rê û ji Thessalîayê bi lez artêşa xwe ajot ser Atînayê. Ji cihên derbas dibû teqwîye berhev dikirin. Birêvebirên Thessalîayê ji helwêsta xwe ya berê qet poşman xwiya nedikirin; bi îştaheke zêde ketibûn pêşîya Persîyan û rêberîya wan dikirin; Thoraxê Larîssayî ku, dema Xerxes baz dabû bi wî re çûbû, niha jî Mardonîos dikir nav dilê Yûnanistanê.

[2] Artêş ket Boîotîayê; li wir Thebaîyan Mardonîos sekinandin, nesîhet lê kirin, alîkerîya wî kirin; jê re gotin ji bo vedana baregahê ji vir baştir nikare cih peyda bike; dixwestin wî ji çûna cihekî dûr rawestînin, di nav xwe de bihêlin, digotin bêyî dest bavêje çek, bi rêya dîplomasîyê dikare temamê Yûnanistanê bigre bin desthilata xwe; ji ber ku dema Yûnanî wekî berê bi hevdû re yekbûyî bimînin, bi zorîya sîleh tu kes nikare serî li wan bitewîne. Û digotin: "Lê heke wekî em dibêjin tu bike, tu dikare temamê planên wan xera bike, pere bidin kesên gotinên wan di sîteyan de derbas dibe; bi saya pereyan tu dikarî bi tumenan esker têkî Yûnanistanê, wî wextî bi yên bi te re, bi rehetî tu dikarî heq ji yên li hemberî xwe derkeve."

[3] Thebaîyan bi vî awayî nesîhet dikirin; lê Mardonîos guhê xwe neda wan; ji bo careke din Atînayê bike bin destê xwe xwestineke hov pê re çêbibû; di gel vê zewqa gihandina xebera girtina Atînayê, bi rêya agirên ku ji giravan ronahî bigahindina giravê din bigihişta hikumdarê li Sardesê jî xwesteka wî zêde dikir. Careke din ket Attîkayê û Atînayî nedîtin; hîn bû piranîya wan li Salamîsê û di keştîyan de ne û bajarekî valabûyî dît. Ji dema ku Atîna ketibû destê hikumdar de û heya vê sefera Mardonîos neh meh derbas bûbû.

[**4**] Mardonîosê ket Atînayê, Mûrykhîdesê Hellespontosî şand Salamîsê, eynî tiştên Alexandrosê Makedonaîyî pêşniyazî wan kirin. Wan bi awayekî zelal jê re gotibûn ew dijmin in, li gel vê sebebê şandina mesaja duduyan ev bû ku, niha Attîka di nav destê wî de ye, ew bi devê şûrê xwe girtibû, hêvî dikir ku ev rewş terefê din nerm kiribe. Ji ber vê Mûrykhîdes dişand Salamîsê.

[**5**] Ew mirov derket pêşberî meclisê û pêşniyazên Mardonîos dan diyarkirin. Kesekî ji meclisê, Lykîdas, difikirî ku ew pêşniyazên Mûrykhîdes anîne bigrin ber çav û gihandina wê ji Meclisa Xelkê re wê baş be. Belkî wî ji Mardonîos bertîl wergirtibû, belkî jî bi rastî wisan difikirî, her çi hal be, nêrînên xwe vekirî gotibû. Lê hem di nav meclisê de û hem ji ber ku xeber gelekî zû belav bû li derve jî ev gotin bi Atînayîyan ne xweş bûn; kesên li dora wî berhev bibûn, Lykîdas dan ber keviran û kuştin; destê xwe nedan Hellespontosî, ew paşve şandin. Li Salamîsê ew tevlihevîya Lykîdas han dabû, gihiştibû guhê jinên Atînayîyan, tiştên qewimîbûn hîn bûbûn; her yekê cîrana xwe han da û girt ba xwe, baz dan mala Lykîdas, jin û zarokên wî dan ber kevran.

[**6**] Atînayî bi vî awayî derbasî Salamîsê bûbûn: Di midetê ku bi hêvî bûn ji wan re ji Peloponezê ji bo alîkarîyê wê artêşek bê, li Attîkayê mabûn; lê dîtîn ku Lakedaîmonî xwe zêde giran dikin, zêde li hêvîyê dihêlin, li milê din jî Mardonîos pêş dikeve, heta belkî jî ji niha ve ketîye Boîotîayê, wî wextî temamê firaxên xwe bi xef kişandin Salamîsê, ew bi xwe jî derbasî wir bûn. Di vê navê re hem li hemberî îstîlaya Attîkayê ji alîyê barbaran ve ew şêla guhlênebûna ku nîşan dan û dema dijmin ket Boîotîayê bi wan re li hemberî vê hereket nekirin bidin rûyê wan, hem jî di vê navê re bînin bîra wan ku dema vegerin bi Persan re bibin hevalbend ji wan re çi soz hatîye dan û heke baz nedin alîkarîya Atînayîyan, wê ew jî ji bo rêyekê bibînin wê li çareya serê xwe binêrin, qasid şandin Lakedaîmonê.

[**7**] Wan deman Lakedaîmonîyan merasimên ayînî dikirin; cejna Hyaklîn pîroz dikirin, bicihkirina wezîfeya li hemberî îlahan pêşîya hemî tiştî digirtin; ji bilî vê mehkemekirina dîwarên dora kelehê û avakirina birc û kelehê nû temam kiribûn. Qasidên Atînayê ku, nûnerên Megara û Plataîayê jî bi xwe re anîbûn, gihiştin Lakedaîmonê û derketin pêşberî ephorosan û ev gotin:

a) "Atînayîyan em şandin, ji we re vê dibêjin: Hikumdarê Medan wê welatê me paşve bide me, bi me re li ser esasê mafên wekhevî û bê hîle û derew, dixwazin hevalbendîyê bikin; heta qebûl dikin ji derveyî erdê me ew erdên em bixwazin jî bidin me. Lê em ji Zeûs û xudayê Hellenîyan tirsîyan, em nefikirîn xîyanetê bikin, me ew bi nefret paşve vegerand, me tamahîya vê pêşniyazê nekir. Her çend Yûnanîyên em di nîvê rê de hiştin û li hemberî me dirust hereket nekirin hebin û cardin her çend em dizanin di cihê bi Persan re şer de, feydeya bi lihevhatina wê em dizanin, lê cardin me red kir; di gel her tiştî em ê bi xwesteka xwe bi wan re li hev neyên. Belê, bawerîya zelal a me dayî Yûnanîyan ev e.

b) Em bên we, doh dil we de em ê bi Persan re bibin hevalbend hûn ditirsîyan, niha hûn nêrîna me hîn bûn û hûn zanin jî çi dibe bila bibe em xiyanetê li Yûnanistanê nakin, niha dîwarê kelehê ya li Îsthmosê we lêdikir jî temam bû, loma êdî Atînayî ne xema we ne; we soz da me ku li Boîotîayê li hemberî Persan derkevin, piştre jî we em di holê de hiştin, we dît ku barbar ketin Attîkayê, hûn tev nelebitîn. Ji ber vê rewşa we, Atînayî bêmenunîyeta xwe ji we re didin diyarkirin; ji ber ku di dema pêwist de we hereket nekir. Niha wezîfeya me ew e ku ji bo li hember êrîşa barbaran ya li Attîkayê hûn bi me re pêşwazî bikin, bêsekin em daxwaza şandina artêşekê bikin; mademem li Boîotîayê derneketin pêşîya wan, niha em ê li ser axa xwe şer bikin û ji bo vê cihê herî misaîd Deşta Thrîayê ye."[301]

[8] Ephorosan bersiva xwe hiştin roja din, sibe bû dusibe. Bi vî awayî sibe û sibe gotin û deh roj derbas bûn. Di vê navê re temamê Peloponezî bêsekin dixebitîn ku dîwarê Îsthmosê temam bikin, dîwar jî jixwe ser temambûnê bû. Ji bo çi dema ku Alexandros hat Atînayê, ji bo Atînayî bi Persan re hevalbendîyê nekin, bi dest û pê ewqas li ber xwe dan û niha jî bi vî awayî bêxem in, ez qet fêhm nakim. Ez dibêjim dîwarê li Îsthmosê temam bû, ewlehîya xwe pêk anîn, êdî pêwistîya wan bi Atînayîyan tune, ji ber wê ye dibêjim û ez sebebekî din nabînim. Ji ber ku di dema nûnertîya Alexandros de hê dîwar temam nebûbû û ji tirsa Persan bêsekin dixebitîn.

301 Di derheqê Deşta Thrîayê de li pirtûka 8an, beşa 65an binêre.

[9] Lêbinêrin di dawîyê de çawa Spartayî ketin zorê, bersiv dan û derketin seferê: Rojek berî wê bersiva xwe bidana, li Lakedaîmonê biyanîyekî ku herî zêde gotinên wî derbas dibin, Khîleosê Tegeayî, bi hûrgilî Atînayîyan çi ji ephorosan re gotine hîn bûbû. Li ser vê Khîleos ji wan re ev got: "Ephorosan rewş wiha ye, heke Atînayî di cihê bi me re bi barbaran re hevalbendîyê bikin, lêkirina dîwarê li Îsthmosê bi kêrî tiştekî nayê, derîyên erebe tê re derbas bibin, ji bo Persî bikevin Peloponezê wê heta piştê vebin. Hê ew derbasî milê din nebûne, berî rêya xerabûna temamê Yûnanistanê bê vekirin, guhê xwe bidin gotinên Atînayîyan."

SPARTA BAZ DIDE ALÎKARÎYA ATÎNAYÊ

[10] Nesîhetên vî mirovî kirin ev bûn. Ephorosan di cih de gotinên wî qebûl kirin û ji nûnerên sê sîteyên hatibûn re tiştek negotin, bi şev, li ba her yekî heft hîlot 5 hezar Spartayî derxistin rê; birêvebirî emanetî Paûsanîasê kurê Kleombrotos kiribûn. Fermandarî tenê bi nav di destê Pleîstarkhosê kurê Leonîdas de bû, lê hê ew zarok bû û Paûsanîas birazîyê wî û wasîyê wî bû. Ji ber ku Kleombrotos, bavê Paûsanîas û kurê Anaxandrîdas, êdî nedijîya; piştî demek kurt ku artêşa dîwar lêdikir ji Îsthmosê paşve anî, mirinê ew girtibû û biribû. Kleombrotos yekîneyên xwe ji ber vê yekê anîbû Îsthmosê: Dema ku li hemberî Persan ji bo hêvî û lava ji îlahan bike qurban jêdikir, ji nişkê ve roj li asîman hatibû girtin. -Paûsanîas, wek alîkar ji xwe re Eûryanaxê kurê Dorîeûs yê ji xanedana xwe hilbijart.- Ev jî bi Paûsanîas re ji Spartayê derketin.

[11] Serê sibehê, qasidên ji derketina wan li rê bêagahdar bûn, çûn ephoros dîtin, êdî biryar dabûn vegerin welatê xwe. Dema xistin hindur wan ev gotin: "Hûn ên Lakedaîmonî, di welatê xwe de, rehetîya we di cih de ye, hûn cejna Hyakînthos pîroz dikin, wekî zarokan şahîyê dikin; ev xîyaneta li hevalên xwe yê çekan e. Atînayî we belaheq ew êşandine hesêb dikin û ji bo hevalbendên xwe li rexê xwe nabînin, wê bi Persan re aştîyê çêkin. Dema ku aştî çêbibe, kifş e ku em ê di sefên hikumdar de şer bikin; li ser erdê ew me bibin, em ê bi yekîneyên wî re mil bi mil derkevin seferê. Û em ê ji îro pê ve, wê serê vî karî çawa bigehe we, bibînin!" Li ser van gotinên qasidan, ephosrosan sûnd xwarin û bersiv dan ku, eskerên wan niha di rê de ne, li hemberî

biyanîyan dikêşin û ji niha ve lazim e gihiştibin Orestheîonê;[302] mebesta wan ji gotina "biyanîyan" barbar bûn. Qasidên haya wan ji rewşê tunebû, pirs kirin ku ev çiye û yên qewimîbûn ji wan re gotin. Gelek şa bûn û ji bo bigihin artêşê bi lez derketin rê; 5 hezar hoplîtên ji nav Lakedaîmonîyan hatibûn hilbijartin ku ji wan re perîek[303] dihat gotin, bi wan re hatin şandin.

[12] Bila ew ber bi Îsthmosê ve bi lez bimeşin, Argosîyên seh kirin ku artêşa Paûsanîas ji Spartayê derketîye, deqîqek derbas nekirin, qasidekî di nav pîşeyê de pijîyayî û yê herî baş ku dîtin, ji bo xeberekê bibe bi lez şandin Attîkayê; berî wê Mardonîos wezîfe dabû wan ku pêşîya derketina Spartayîyan ji Peloponezê bigrin. Ev qasid hat Atînayê û ji Mardonîos re ev gotin: "Mardonîos, Argosîyan min ji bo xebera ku xortên Lakedaîmonê derketine seferê û hêza wan a li hemberî wan rê bidin girtin tune, bigihînim te ez şandime. Tedbîra pêwist tu bi xwe bigre." Qasid xeber gihandê û paş ve vegerîya.

[13] Mardonîosê ev xeber wergirt, êdî nexwest li Attîkayê bimîne. Berî ev xeber bê nedixwest ji wir derkeve, ji ber ku dixwest bibîne ka wê Attîkayî çi bikin; tu tiştekî ku zerar bigihîne Attîkayê nedikir, ji ber ku tim hêvî dikir ku wê bi wan re li hev bikin; xuyaye wê nehatina rê, niha xebera ku li hêvîyê bû jî girtibû, yên qewimîbûn hîn bûbû, berîya yekîneyên Paûsanîas bigihin Îsthmosê bêdeng paşve kêşîya, lê pêşî Atîna şewitand, çi tiştên li ser piyan mabûn, dîwarên kelehê, xanî, perestgeh tevde kavil û wêran kirin û li pişt xwe girên kavilan hişt û bi wî awayî çû. Lêbinêrin, ji bo çi paşve dikêşîya: Attîkayê ku ji bo belavbûna yekîneyên siwarî ne misaid bû, di halê têkçûnê de, ji bo paşve bikêşe rêyek tunebû. Tenê buhurkên ku qemçek insan bikaribin biparêzin hebûn. Loma vekêşîya ber bi Thebaîyê ve, dixwest li nêzîkî bajarekî dost û siwarî hê rehet bikaribin şer bikin, bimînin.

[14] Mardonîos bi xef paşve vedikişîya, hê nû derketibû rê xebera yekîneke din, şaxeke keşfî ya ji hezar Lakedaîmonîyan hatî damezirandin hatine Megarayê wergirt. Dema ku seh kir ew li wir in, pêşî fikirî ku wan bigre; artêş

302 Orestheîon, bajarek li Arkadîayê ye.

303 Perîek-Perîokos, termeke ji bo hemwelatîyên welatekî ku bi zorê bê wergirtin û nehatibe kolekirin, xwecihên li wir ji mafên hemwelatîyê tam sûdê wernagirin, tê bikaranîn.

ber bi paş ve vegerand û meşîya ser Megarayê; siwarîyên li pêşîyê dimeşîyan temamê erdê Megarayê perçiqandin; artêşa Persê ber bi rojavayê ve noqteya herî dawîyê ya gihiştibûyê vir bû.[304]

[15] Raporeke ku bi dû de nû hat, ji Mardonîos re dida xuyakirin ku Yûnanî li Îsthmosê berhev bûne, li ser vê wî jî rêya xwe paşve, ber bi rêya Dekeleîayê ve zivirand; Boîotîayan ji nav yên li qiraxên Asoposê rûdinin rêber anîbûn; rêya rast ya ber bi Sphendaleesê û Tanagrayê ve nîşanî wan didan; bi şev li Tanagrayê baregeheke vekirî vedan û roja din hatin Skolosê û gihiştin erdê Thebaîyê. Li wir, her çend Thebaîyî di nav sefên Medîyan de bûn, darên li deverê birîn, ne ji bo ku bi wan re dijmintî dikir, ji bo ku ketibûn tengîyê; hem ji bo mewzîyeke şer a saxlem ava bikin, hem jî heke şerê meydanî netîceyê nede, dixwest vir wekî parêzîyekê bikar bîne. Baregeh ji Erythraîyê[305] dest pê dikir û li seranserî Hysîaîyê diçû û besta Asoposê teqîb dikir heta erdê Plataîayê dirêj dibû. Lê dîwar ne ewqas dirêj bû, ji herdu milan ve tenê cebhekê bi qasî deh stadan digirt. -dema ku barbar bi vî karî ve mijûl dibûn, Attagînosê kurê Phrynonê Thebaîyî, ji Mardonîos û 50 kesên Persî yên giregirên artêşê re şahîyeke mezin çêkir, wan jî banga wî qebûl kirin û çûn. Ev şahî li Thebaîyê hatîye çêkirin.

[16] Ji vir şûn ve ez ê li gor gotinên Thersandros yê giregirekî hemwelatîyê Orkhomenosê bidim. Yên wî ji min re gotine ev in: Ew jî bangî wê xwarinê kirine; Persî û Yûnanî li ser maseyên cihê rûneniştine, li ser her nivînê Persek û Thebaîyek bi hev re rûniştine. Dema ku piştî xwarinê mey tê vexwarin, Persê li ba Thersandros rûdine, ji wî tu xelkê kîjan cihî yî dipirse, ew jî bersiv dide û jê re dibêje ku, ew xelkê Orkhomenosê ye: Persî gotîye ku "Madem em hevalên hev yên maseyê ne û em bi hev re vedixwin, ez dixwazin nimûneya pêşbînîya xwe ji te re bêjim, bila haya te jî jê hebe û li gor sûda we tedbîrên xwe werbigirî. Tu van Persîyên rûmet dane vê şahîyê û artêşa me li baregeha nêzîkî çem dibînî? Qasek şûn de têu seh bikî ku kêm kes ji van li heyatê mane." Dema ku Persî ev gotin gotine, girîyaye. Thersandrosê bi van gotinan şaş maye, jê re gotîye: "Lê ma ne pêwist e ev ji Mardonîos û

304 Pêwist bû bigota başûrê wê, ne rojavayê wê. Ji ber ku Persî, heta Delphoîyê çûbûn. Delphoî li rojavayê Megarayê ye.

305 Erythraî û Hysîaî, li ber pêşkên Kîthaîronê û li qiraxê rastê yê Asoposê ne.

wezîfedarên bilind yên din re bê gotin?" Wî jê re wiha gotîye: "Biyanî, ya xuda nivîsandîye insan nikare xera bike, Mirov dikare gotinên bi qîmet yên hêjayî bawerîyê ye bibêje; lê kesek bawerî pê nake. Yên ku min ji te re gotin gelek kes ji Persîyan wê dizanin, lê cardin mecbûrîyet em wekî zincîrê bi hev ve girê dane, di rêya li ser tê meşandin de em digindirin. Tehlîya herî mezin bi zanetî çûna insanan ber bi dawîyeke wiha ve ye, tiştek ji destan nehatin e." Yên Thersandrosê Orkhomenosî ji min re gotin ev bûn. Ev jî kir ser ku, van gotinên xwe berî şerê Plataîayê, ji hinekên din re jî gotine.

[17] Mardonîos, dema ku li Boîotîayê li baregehê bû, temamê Yûnanîyên li vê herêmê û terefdarên Medan bûn jê re yekîneyên nû şandine û bi wî re Attîka îstîla dikirin; yên tevlî vî karî nedibûn tenê Phokîsî bûn. (Li vir pêwist e bê diyarkirin ku, wî wextî ew jî xwe avêtibûn himbêza Medan, ne bi daxwaza xwe, bi zorê) Çend roj piştî kêşana ser Thebaîyê, ji wan jî şaxeke hezar hoplîtî hat. Li ser wan Harmokydesê giregirekî hemwelatîyê wan hebû. Dema ku hatin, Mardonîos yek şand û ji wan re got ku li cihekî cuda baregehê vedin; wisan kirin û tam bi dû de siwarî derketin. Di baregeha Yûnanîyên di sefên Medîyan de, gotegotên wê Mardonîos bi riman Phokîsîyan bikuje belav dibû; ev gotegotên han li baregeha Phokîsîyan jî belav bûbû. Harmokydesê li ser wan, axaftineke kurt a gotinên rehet dihatin fêhmkirin kir, cesaret da wan, got em ê bi israr bin: "Gelî Phokîsîyan, zelal e ku ev kesên han ji bo kuştina me tên; ji niha ve mirin li ber çavê me daçikandin; ihtimal e yên van li hemberî me han dan Thessalîayî ne; bila wisan be! Niha ji bo me tevan dema mêrxasîyê ye; em xwe bernedin û bi rezîlî nemrin, bila dawîya me bi şer be. Bila bibînin leyza li hemwelatîyê Yûnanê çiqas giran li ser barbaran rûdine!"

[18] Dema wî ev digotin, siwarîyên dora wan pêçabûn wekî wê tevan bikujin meşîyan ser wan; rimên xwe wekî wê bavêjin bilind kiribûn. Phokîsî di rewşa şer de, mil bi mil, jê nayê borîn, wekî çargoşeke bi hev şidyayî disekinîn. Siwarîyên wan paşve vegerîyan û dûr ketin. Bi rastî ew li ser ricaya Thessalîayan ji bo temamê Phokîsîyan ji orteyê rakin hatibûn, lê dema ku wan hazirîya parastina wan dîtin, gelo tirsîyabûn ku wê ji wan jî gelek kes bişkê, yan li ser îşareta Mardonîos paşve vegerîyabûn? Yan jî tenê Mardonîos xwestibû wan biceribîne, ez tam nizanim. Dixwaze bila wiha û yan wisan be, siwarî paşve vekişîyabûn û Mardonîos çawîşek şandibû ba wan

û ji wan re wiha gotibû: “Phokîsî netirsin, yên bi eksê ji min re hatibûn gotin we da nîşan, hûn kesên mêrxas in. Niha xwe di şer de jî bidin nîşan; ew xizmeta wê hûn ji hikumdar û ji min re bikin, wê her wextê bi yê layîqî wê ye bê pêşwazîkirin.” Belê, yên di serê Phokîsyan re derbas bûbû ev bûn.

[19] Lakedaîmonîyên hatin Îsthmosê li wir baregeh vedan. Peloponezîyên din jî, yên hîn bûn ku ew hatine vir û ji bilî hevalbendîya alîyê bi kar hesêb dikirin pê ve tiştek nedifikirîn -hinekan jî Spartayî nimûne digirtin- nexwestin paşve bimînin. Qurbanên hatin serjêkirin jî ku emareyên baş nîşan dan, hemî bi hev re heta Eleûsîsê bi pêş ketin. Li wir jî qurban hatin serjêkirin; cardin emareyên baş hatin dîtin û bi Atînayîyên ji Salamîsê hatibûn û li Eleûsîsê tevlî wan bûbûn, bi hev re rêya xwe dewam kirin. Dema gihiştin Erythraîya Boîotîayê, seh kirin ku barbaran li ser Asoposê baregeh vedane, rewşa wan hîn bûn û li pêşberî wan li ber pêşkên Kîthaîronê ketin mewzîyan.

[20] Mardonîos ku dît Yûnanî daneketin deştê, siwarîyên xwe ajotin ser wan, li ser serê siwarîyên Yûnanîyan kesekî jê re Makîstîos digotin, fermandarekî bi navê Masîstîos ê bi nav û deng hebû. Li hespekî Nesaîayê yê gemekî zêrînî û taximeke zînê narîn li ser, siwar bûbû. Dema ku nêzîkayî li Yûnanîyan kirin siwarîyan tumen tumen dest bi êrîşê kirin; vê êrîşê kir ku Yûnanî gelek wendayîyan bide; Persî diqêrîyan û ji wan re, “Xanimên biçûk!” digotin.

[21] Milê baregehê yê herî vekirî ji Megarayîyan re ketibû, siwarîyan herî rehet êrîşî wir dikirin. Megarayîyên di bin zexta siwarîyan de diperçiqîn, ji fermandarên Yûnanî re qasidek şandin; derket ba birêvebirê wan, ev gotin: “Megarayîyan xwestin ez vê ragehînim we: Hevalên çekvan, mewqîya me girtîye, imkana em wê li hemberî êrîşa siwarîyên Persan biparêzên tune; di gel perçiqandinê jî em hê xwe digrin û em bi mêrxasî li ber xwe didin, bila haya we jê hebe.” Piştî çawîşê nûçeyan ev gotin, Paûsanîas pirsî ku ji nav Yûnanîyan kî dixwaze biçe vê mewzîyê bigre û cihê Megarayîyan bigre ser xwe. Kesekî nexwest; tenê Atînayîyan ev wezîfe qebûl kirin, ji nav Atînayîyan yekîneyek ji 300 kesan pêkhatî veqetandin, wekî fermandar jî Olympîodorosê kurê Lampon danîn ser wan.

[22] Yên ev mewzî qebûl kirin, di sefên herî pêşî yên milê Erythraîyê yê Yûnanîyan de cih girtin; tîravêj jî girtibûn ba xwe. Demek bû şer dikirin ku, bi vî awayî temam bû: Siwarî di êrîşî de bûn; Masîstîosê herî li pêşî baz dida, tîreke li navika hespê wî ket, ji ber êşê rabû ser herdu pêyên xwe û Masîstîos ji ser xwe avêt. Atînayî xwe avêtin ser hespê ketî; hespê wî girtin û ji bo ku Masîstîos jî xwe diparast kuştin. Lê rehet nekuştin, ji ber ku zirh li ser bû; gomlekek sor a ji pulên zêrînî ya zirhî di binî de li ser bû. Bi lêxistina li ser madenê nikarîbûn tiştekî bikin; di dawîyê de yekî ku ev rewş zanîbû, li çavê wî xist; ket ser çokan û mir. Bûyer ji alîyê siwarîyên din ve nehatibû dîtin, ne dema ket û ne jî dema mir dîtin; di wê navê re erd berdidan û paşve dikêşîyan, bala xwe nedabûnê. Lê dema ku sekinîn nebûna wî his kirin, ji ber ku kesekî emir nedida; wextê fêhm kirin çi qewimîye, qet nebe ji bo laşê wî bistînin hemîyan bi hev re êrîş kirin.

[23] Atînayîyên ku dîtin siwarî ne wekî taxim taxim, bi komî êrîş dikin, qismê mayî yê artêşê jî bangî alîkarîyê kirin. Heta ku qismê mayî yê peya-deyan hat alîkarîyê, li ser mirî şerekî giran çêbû. Dema ku 300 kesî bi tenê bûn bi zelalî di binî de mabûn û laşê Masîstîos paşve hat wergirtin; lê dema ku yên din gihiştin alîkarîyê, siwarîyan nikarîbûn xwe ragirin û di dawîyê de mecbûr man laşê fermandarê xwe di cih de hiştin; bi wî re hinek mirîyên din jî hiştin. Bi qasî du stadan paşve kêşîyan û ji bo ka wê çi bikin bi hev şêwirîn; ji bo fermandarê wan li ser serê wan nebû, gotin; ya baş em biçin Mardonîos bibînin.

[24] Dema ku siwarî vegerîyan baregeha Persan, mirina Masîstîos temamê baregehê kir nav xem û şînê, Mardonîos jî ket nav kederê. Serê xwe kur kirin, ji bo nîşana şînê jî pirçên hesp û heywanên xwe yên bar jê kirin, dûrikên şînê avêtin ser, erd û asman hejandin û li Boîotîayê, hewadîsa mirina kesê ji Per-sîyan û hikumdar re, piştî Mardonîos yê herî bi qîmet hesêb dikirin belav bû.

[25] Barbaran, ji bo Masîstîos, merasimên li ba wan ûrf û adet bû hemî kirin. Heke em bên alîyê Yûnanîyan, piştî li hemberî êrîşa siwarîyan rabûn û ew belav kirin, hinek din bawerî bi xwe anîn. Pêşî mirî kirin erebeyê û yekîne yekîne gerandin; mirî di hêla bejin û bale û sehîbûnê de hêjayî dîtinê bû; sebebê gerandina wî bi vî awayî ew bû ku, esker her tim ji mewzîyên

xwe derdiketin û dihatin dîtina Masîstîos. Piştî vê biryar dan ku ber bi Plataîayê ve dakevin; vedana baregehê li erdê Plataîayê, ji ya li milê Erythraîyê misaîdtir xuya kiribû, ji ber ku bi taybetî peydakirina avê li vir rehetir bû. Ji ber wê misaîd dîtin ku li wir, tam di wê îstîqametê de, ber bi serkanîya Gargaphîayê ve dakevin û pergala şer li wir werbigrin. Çekên xwe berhev kirin, li ser seranserî pêşkên Plataîayê belav bûn, di nêzîkî Hysîaîyê re derbas bûn, ketin erdê Plataîayê, li nêzîkî serekanîya Gargaphîayê û meydana pîroz ya Androkratesê mêrxas, wekî xeteke li ser girên nizim û deştê re derbas dibe û li gor miletan veqetîyan û sef girtin.

[26] Dema li vir cihên şer dihat veqetandin, di navbera Tegeayî û Atînayîyan de şerê devkî derket: Li ser yek ji wan baskan devjenî dikirin, herdu jî ji bo xwe xwedî heq derxînin serkeftinên kevin û nû dihijmartin. Tegeaîyan wiha digotin: "Piştî mirina Eûrysheûs ji dewrên berê ve ku daketin Peloponezê, hem berê û hem jî hêj doh, di temamê seferên mişterek yên Peloponezîyan kirine, ev cih heta îro di nav hevalbendan de her tim ji me re hatîye veqetandin. Heke hûn bêjin me ev cih ji bo çi qezenc kirîye, wan wextan bi Akhaîayî û Yûnanîyên li Peloponezê rûdinîştin re, em ji bo parastina Îsthmosê hatibûn û me li pêşberî îstîlakeran baregeh vedabû. Bi qasî tê gotin, wî wextî Hyllos îzahatek kirîye: Gotîye ku ez herdu artêşan bi temamî neavêjim mirinê; bila Peloponezî şampîyonê xwe yê herî baş hilbijêrin, di bin mercên kifşe de, dê ew bi wî şampîyonî re şer bike. Ev nêrîn ji Peloponezîyan re jî erênî hatîye û bi van gotinan peymanek çêkirine û wê bi sûndan qahîm kirine. Heke Hyllos, zorîya Peloponezîyî bibe, wê Heraklesî bikevin erdê bav û kalên xwe; heke têk biçe, wê artêşê bigre û paşve vegere û sed salan, careke din wê hewl nedana ku dakevin Peloponezê. Di navbera hevalbendan de, bi erêkirina wî, serekê welatê me û hikumdarê me, Ekhemosê kurê Aeroposê kurê Phegeos hatîye hilbijartin; bi Hyllos re yeke-yek şer kirine û wî ew kuştîye. Belê piştî vê serkeftinê ye ku, ji Peloponezîyên zemanekî re, bi gelek imtîyazên din yê bi rûmet re, kengî dakevin şerekî mişterek, me mafê fermandarîya ji herdu baskan baskekî qezenc kir. Lakedaîmonî, gotineke me ji we re tune; hûn fermandarîya kîjan baskê bixwazin dikarin bigrin, em dengê xwe nakin; lê baskê din, em careke din dibêjin, wekî berê yê me ye. Ji bilî vê mêrxasîya me behs kir jî em ji Atînayîyan zêdetir layîqî vê wezîfeyê ne. Ji ber ku Spartayî, bi qasî bi yên din re, me bi were jî şer kirîye û me

rûmeta xwe parastîye. Ji herdu baskan yek, ne yê Atînayîyan e, mafê me ye, ji ber ku di dîroka wan de, hem di dewrên kevin de, hem di dewrên niha de bi qasî yên me rûpelên wan yên serkeftinê tûne."

[27] Delîlê wan ev bûn. Lêbinêrin Atînayîyan çawa bersiv dane: "Me digot qey, em ne ji bo bi hev re minaqeşeyê bikin, ji bo em bi barbaran re şer bikin hatine. Lê madem Tegeayî, ji destpêka dîroka xwe heta niha, serkeftinên kevin û nû kirine ser zimanê xwe, em ê jî rûmeteke ku her berdewam kirîye ya li ser mafê me yê xelata bav û kalên me hatîye damezirandin bidin pêş, em mecbûr dimînin bêjin em berî Arkadîayan in. Ev Heraklesî yanî ev Heraklesî yên îddîa dikin li Îsthmosê birêvebirên xwe kuştine, wextekî ji bin desthilata Mykenaîyan baz dan û temamê Yûnanîyan bi hev re ew ji cihê xwe avêtibûnê raqewirandibûn tenê me qebûl kiribû û wî wextî bi yên li Peloponezê rûdiniştin, cardin me bi çekên xwe Eûrystheûs têk bir û dawî li bêşermîya wan anîbû. Piştre dema ku bi Polyneîkes re, mirinê qirika Argosîyên li hemberî Thebaîyê dimeşîyan girt, yên çûn ji Kadmosîyan bi darê zorê mirîyên wan ên li meydanê mabûn girtin anîn û li Eleûsîsê, li goşeke erdê xwe veşartin, cardin em bûn.[306] Û hêj serkeftineke me ya wextekî li hemberî Amazonên ku ji Thermodonê herikîbûn erdê Attîkayê, me qezenc kirîye jî heye û em di şerên Troyayê de ji kesekî paşve neman. Lê bi bîranîn van buyerên kevin çi derdikeve; yên berê mêrxas bûn niha dikare kesên ji rêzê bin û yên berê ji rêzê dikarin niha bibin mêrxas. Ji bo yên bihurîne me gotin bes e; heke serkeftinên me yên em bidin xuyakirin tunebin jî, -ku heye û dema ku em li dîroka Yûnanistanê dinêrin, em dibînin gelek in û tev jî serkeftinên mezin in- tenê şerê Marathonê bes e ji bo em layîqî cihê taybet bin, halbukî hinek din jî hene û em, di nav temamê Yûnanîyan de tenê me, li himberî Persîyan şer kir û di vî şerê mezin de, me çil milet têk birin û bi serkeftî derketin! Gelo tenê ev ne bes e ew cihê em li ser xirecirê dikin ji me re layîq bê dîtin? Lê niha di wê rewşa em tê de, ji bo mafê dora pêşîyê minaqeşekirin ne xweş e; gelî Lakedaîmonîyan, em amade ne gotina we bikin; hûn me deynin cihê ku em ê li hemberî dijmin herî serkeftî bin;

306 Eteokles û Polyneîkesê kurên Oîdîpus, ji bo textê xwe yê Thebaîyê xirecir dikirin. Polyneîkesê ji bajêr hat derxistin, bi hikumdarê Argosê û Adrastos û bi şeş fermandarên din re vedigere. Thebaîyê dorpêç dike. Argosî û Polyneîkes dimrin. Thebaîyî wan venaşêrin, di meydanê de dihêlin…

li ku dibe bila bibe em ê wezîfeya xwe bikin; hûn dikarin bawer bikin ku ya hûn bêjin em ê bikin; niha emrê ku pêwist e bidin."

BAREGEHA YÛNANÊ LI PLATAÎAYÊ

[28] Bersiva wan ev bû û temamê baregeha Lakedaîmonê, gotin ku Atînayî ji bo girtina vê baskê, ji Arkadîayan layîqtir in. Bi vî awayî Atînayî li hemberî Tegeayan serdestî bi dest xistin û wir girtin. Pergala şer a yekîneyên Yûnanê hem yên nû hatin û hem jî yên di serî de li wir bûn, bi vî awayî bû: Li baskê rastê 10.000 Lakedaîmonî hebûn. Ji van 5 hezar yên ji nijada safî ya Spartayî bûn, bi hesaba ji bo her yekî heft hilot yên parastinê, 35 hezar hilotê peyadeyên sivik ew diparastin. Spartayî ji bo bi van re girêdanê pêk bînin, Tegeayî hilbijartibûn, bi vî awayî hem qîmeta ku didan wan didan xuyakirin, hem jî ji mêrxasîya wan sûd werdigirtin; ew ji 1.500 hoplîtan pêk hatibûn. Piştî van 5 hezar Korînthosî; wan xwestibûn ew 300 eskerên ji Potîdaîaya Nîvgirava Pallenê hatibûn, deynin rexê wan û ev bi Paûsanîas pêk anîbûn, piştî wan baskeke ji 600 kesên Arkadîayê Orkhomenosê hatîbû damezirandin dihat yê bi 3.000 Sîkyonî dihat destekkirin. Li ba wan 800 Epîdaûrosî, piştre 1000 Troîzenî hebûn; li rexê Troîzenîyan 200 eskerên Lepreonî, piştî wan 400 Mykenaîyî û Tîrynsî, 1000 Phlîosî û 300 hemwelatîyên Hermîoneyî. Piştî Hermîoneyîyan 600 Eretrîayî û Styreayî, piştre 400 Khalkîsî, piştre 500 Amprakîayî. 800 Leûkasî û Anaktorîonî, li rexê wan 200 Paleyên ji Kephalonîayê hatibûn. Piştî wan 500 Aîgînayî ketibûn sefê û piştî wan 3.000 Megarayî û bi 600 Plataîayîyan hem ji serî, hem jî tev yê herî di dawîyê de digihişt 8.000 Yûnanîyan yên baskê çepê girtibûn; fermandarê wan Arîsteîdesê kurê Lysîmakhos bû.

[29] Yekûn,- heke em her yekî heft kesê yê ji bo parastina Spartayan hatibûn veqetandin nehejmêrin- digihişt 38.700 hoplîtan. Hejmara hoplîtan yê li hemberî barbaran hatibûn berhevkirin ev bûn. Peyadeyên sivik yê li baskê Sapartayîyan, bi hesaba ji her Spartayîkî re heft kes, 35.000 kes hebû, tevên van jî li gor wê beşdarî şer bibin hatibûn çekdarkirin; li baskên din yên Lakedaîmonîyan, wekî di temamê artêşê de li rexê her şerkerekî eskerekî xwedîyê çekên sivik hebû, hejmara yekûna wan jî digihişt 34.500 kesan.[307]

307 Di hijmarê de pirsgirêk heye.

[30] Bi vî awayî dikare bê gotin ku hejmara peyadeyên sivik yên ji bo şer hatibûn çekdarkirin, 69.500 û hejmara yekûna temamê artêşa Yûnanistanê ya li Plataîayê berhev bûbû, hoplîtî û alîkarvanên wan -ez alîkarvanên bi çek dibêjim- jî tê de digihişt 108.200î. Dema ku em Thespîayan jî têkin ser, bi hesabeke gilover dike 110.000; ji ber ku li baregehê bi qasî 1.800 kesên Thespîayî yê li heyatê mabûn hebû; lê ev jî wekî alîkarvanên wan wekî hoplît nedihatin bikaranîn.

BAREGEHA BARBARAN LI PLATAÎAYÊ

[31] Ev yekîneyên han, wekî me got li rexê Asoposê baregeh vedabûn. Mardonîosê barbaran jî dema ku xebera Yûnanî li Plataîayê ne wergirt, pişti merasima cenazeyê Masîstîos, ber bi vê beşê Asoposê ve cih guhertin. Mardonîos ew li hemberî Yûnanîyan bi vî awayî bi cih kirin: Pers danîn hemberî Lakedaîmonan; ji ber ku Persî ir zêdetir bûn, bi ser ku ji dijmin zêdetir wekî sefên kûr rêz bûbûn, pêşmiqabilî Tegeayan jî derbas kiribûn. Mardonîos ew bi vî awayî tertîb kiribû: Mirovên xwe yên herî saxlem yên bi hûrgilî hilbijartibûn danî hemberî Lakedaîmonan; yên ne zêde saxlem bûn jî, li gor zanyarîyên Thebaîyan dabûn û guhê xwe da nesîhetan danîbû hemberî Tgeayan. Piştî Persan, Med danîn; ew diketin hemberî eskerên Korînthos, Potîdaîa, Orkhomenos û Sîkyona; li rexê Medan Epîdaûros, Troîzen, Lepreon, Tîryns û Mykenaî, li hemberî Phlîosîyan Baktrîanî danîn, piştî Baktrîanîyan Hindî; li hemberî wan Hermîone, Erythraî, Styrea û Leûkas, cihê diketin hemberî Pale û Aîgînayan, Sakayî bi cih kirin. Piştî Sakayan Atîna, Plataîa û li hemberî yekîneyên Megareyê Mardonîos, Boîotîayî, Lokrîsî, Malîsî, Thessalîayî û 1000 Phokîsî bi cih kirin. Ji ber ku temamê Phokîsîyan ne hevalbendên Medan bûn; bi eksê wê, ji nav wan hinek ketibûn nav sefên li hember; ji bilî vê yên kêşabûn ser Parnassosê jî hebûn, ji wir êrîşî ser artêşa Mardonîos û Yûnanîyên ketibûn pey wan dikirin. Mardonîos, ji bilî van, miletên li ser sînorê Makedonîayê û Thessalîayê jî li hemberî Yûnanîyan rêz kiribû.

[32] Min kêm û zêde miletên Mardonîos kiribûn sefê hijmartin, ev yên herî bijarte bûn û yên herî bi qîmet dihatin hesêbkirin. Li paş jî ji miletên din, Frîgyayî, Mysîayî, Trakyayî, Paîonîayî û boşahîyeke ji gelek eskerên din pêk

dihatin jî hebûn. Pêwist e em Ethîopîayên xencer li ser wan bûn û Misrîyên ji wan re Hermotybî û Kalasîrî tên gotin, sinifê şerker yê tekane yê Misrîyan jî bihejmêrên.[308] Ev eskerên deryayî yên hê Mardonîos li Phaleronê bû wergirtibûn; ji ber ku di nav artêşa bejahîyê ya Xerxes anîbû Atinayê de Misrî tunebûn, wekî berî niha min got, 300.000 kes bûn. Em bên Yûnanîyên hevalbendê Mardonîos, kesek hejmara wan nizane, ji ber ku nehatine hijmartin, lê wekî tê xuyakirin, ez wan 50.000 texmîn dikim. Temamê şerkerên li vir hatibûn berhevkirin peyade bûn; yekîneyên siwarî li cihekî din bûn.

[33] Roja piştî ku Mardonîos yekîneyên xwe li gor miletan û tabûran kirin mewzîyê, herdu artêşan ji îlahên xwe re qurban serjê kirin. Yûnanîyan qurbanên xwe ji Tesamenosê kurê Antîkhos re serjê dikirin; ew wekî kahîn beşdarî şer bûbû. Ji Elîsê û ji xwîna Îamîd [ji nesla Klytîas] bû, Lakedaîmonîyan hemwelatî dabûnê. Dema ku Tesamenos ji bo jê re zarok çêbibin bi kahînên Delphoîyê şêwirî, Pythîa bersiv dabûyê ku wê pênc carî ji cerabeyên herî zor bi serkeftin derbas bibe. Ji bo kehanet şaş şîrove kiribû dest bi xebata jimnastîkê kiribû; ji bo Pentathlonê dixebitî û hindik mabû ku lîstikên Olîmpîyatê qezenc bike; reqîbê wî Hieronymosê Androsî bû. Lakedaîmonîyan fêhm kiribûn kehaneta ji Tesamenos re hatibû gotin, ne di derheqê jimnastîkê de, di derheqê şer de bû; Tesamenos bi pera girtin, xwestin bi hikumdarê wan re yê ji nesla Herakles, ji artêşê re bikin rêber. Li qîmeta ku Spartayîyan dan wî û dostaya wî nêrî, bihayê herî bilind xwest; xwest wî wek hemwelatî qebûl bikin, temamê mafên ji hemwelatîyê bi dest dikevin, ji wî re jî bên naskirin. Wî wextî wê yên ew dixwazin bikira, ji bilî vê çi bidênê wê razî nebûya. Lakedaîmonîyên ku li hemberî daxwazeke wiha man, pêşî hêrs bûn û ev kar ji bîr kirin; lê piştre dema tirsa seferê Persê li dora serê wan gerîya, cardin bangî wî kirin, ew şertên dabû pêş qebûl kirin. Wî jî lê nêrî cardin tên, vê carê bi vî qasî razî nebû û xwest birayê wî Hagîas jî wekî wî ji mafê hemwelatîyê sûd werbigire.

[34] Bi van daxwazên xwe, tiştên Melampûs kiribûn dikirin, bi şertê ku ferqa hêrsa bûyîna hikumdar û daxwaza bûyîna hemwelatîyê dûr negire ji hişê xwe. Dema ku jinên Argosîyan dîn bûn, Melampûs ji Pylosê anîn,

308 Ji bo Hermotybîyî û Khala-Sîrî, binêre li pirtûka 2yan, beşa 165-166an.

xwestibûn li hemberî zêran jinên wan rehet bike; wî, wekî tehsîlat nîvê hikumdarîyê xwest. Argosîyan gotin na û paşve vegerîyan; lê hejmara jinên dîn dibûn çiqas diçû zêde dibû, ji rikoyîyê dest kişandin û careke din serî li Melampûs dan û gotin baş e. Wî wextî daxwazên nû da pêş, ji sê behra behrek hikumdarîyê jî ji birayê xwe Bîas re xwest û got: "Hûn nedin ez nayêm." Argosî di tengîyê de bûn, qebûl kirin.

[35] Eynî wekî vê Spartayîyan jî ji bo ku Tesamenos illeh dixwestin, hemî gotinên wî pêk anîn û ji vê re jî gotin belê; bi vî awayî Tesamenosê hemwelatîyê Elîsê, wekî kahînê resmî derbasî hemwelatîya Spartayê bû û pênc cerabeyên mezin qezenc kir. Ew û birayê wî, tek kesên biyanî ne ku hemwelatîya Spartayê qezenc kirine. Ew pênc cerabe jî ev bûn: Ya yekê şerê Plataîayê ye; ya duduyan şerê li hemberî Tegeayî û Argosîyan e; ya sisiyan şerê Dîapîayê yê ji derveyî Mantîneayan, li hemberî temamê Arkadîayan dabûn; piştre şerê Îthomeyê yê li hemberî Messenîayan qezenc kiribûn. Yek jî şerê Tanagrayê ya li hemberî Atînayî û Argosîyan qezenc kiribûn. Pênc cerabeyên bi serkeftin derbas bûbûn ev bûn.

[36] Belê, ew kesê li ser erdê Plataîayê ji Yûnanîyan re li ser dahatê xeber dida, ev Tesamenosê ku Spartayîyan ew anîbûn. Qurbanan ji Yûnanîyan re di midetê ew di parastinê de diman, başî nîşanî wan dida, lê heke ji Asoposê derbas bibin û ew şer bidin destpêkirin, wê rewş bi aweyekî din bûba.

[37] Ji bo Mardonîos jî wisan; heke li ber xwe nede, ew dest bi şer bike, baş nedihat dîtin, lê heke di parastinê de bimîne, fehl ji bo wî jî baş bû. Pêwist e ev jî bê gotin ku, Mardonîos jî li gor adetên Yûnanîyan, dikir ku jê re fehlê vekin; kahînê wî Hegesîstratosê hemwelatîyê Elîsê yê ji Tellîadîyan[309] ê herî bi nav û deng bû. Berî vî karî, ew kesê Spartayîyan ew girtin û ji bo bikujin avêtibûn hepsê ev bû, ji ber dijmintîya ji wî dîtibûn êdî jê bêzar bûbûn. Bi wê tirsa tehlîkeya tê de bû ji bo serê xwe xelas bike hewil dida û weke kesekî ku di midetê jiyana xwe de gelek îşkence dîtibû, tiştek wisan kir ku, gotin têrê nakin. Qeydeke ji textik ya bi zincîreke hesin ve girêdayî kiribûn lingên wî; di hindur de, ez nizanim çawa, perçeke hesin peyda kiribû û bi qasî ez

309 Tellîadaîyî, malbateke wekî Îamîdîyan e yê ku kahînên navdar perwerde kirine.

dizanim, karekî mêrxasî yê ku kesek nikare bike kir: Perçeya bimîne, bi qasî li derveyî qeyda textik bihêle, qismekî zêde lingê xwe tev tilîyên pê ve birî. Piştre, di gel hebûna nobedarên ber derî, dîwar qul kir û bi şev meşîya, bi roj di daristanê de xwe veşart, baz da çû Tegeayê û canê xwe xelas kir, temamê Lakedaîmonîyan bi dû ketin, lê ew şeva sisêyan gihişt Tegeayê; Spartayîyên ku nikarîbûn wî bi dest bixin, lingê wî yê jêkirî dîtin û li hemberî xweragirtina wî şaş mabûn. Piştî bi vî awayî ji destê Lakedaîmonîyan baz da û xelas bû, Tegeaya ku di wê navê re navbera wan û Lakedaîmonîyan ne baş bû, jê re bû sitargeh. Dema birîna wî rehet bû lingeke ji text daye çêkirin û bi Lakedaîmonîyan re bi fermî û zelal dijmintî dikir. Lê di himberîya zehmet a li hemberî Spartayîyan de, netîceya wê bi mirinê temam bû. Spartayîyan ew li Zakynthosa ku kahîntî dikir, girtibûn û kuştibûn.[310]

[38] Lê mirina Hegesîstratos piştî bûyerên Plataîayê ye. Di wê navê re Asopos jî di miqabilî perekî gelek zêde de yê ji alîyê Mardonîos ve hatîye dayîn, qurban dida serjêkirin û fehlê dinêrî, hem li hemberî Lakedaîmonîyan kîn û kerba wî hebû, hem jî li hemberî karê dikir gelek pere werdigirt, ji ber wê karê xwe bi dil û can dikir. Fehl ji bo êrîşê ne baş bû, ne ji Persan re û ne jî ji Yûnanîyên li ba wan re. Ji ber ku yê wan jî kahînê wan yê cûda hebû, Hîppomaklosê Leûkasî. Yekîneyên nû dihatin beşdarî hêzên dijmin dibûn û hejmara wan zêde dibû. Dema ku Tîmagenîdesê kurê Herpysê Thebaîyî ev dît, ji Mardonîos re got ku Bihura Kîthaîronê bigre. Her roj yekîneyên Yûnanîyan tê re derbas dibûn, wê baş bûya ev bigirtina û rêya baregehê bibirîya.

[39] Dema Thebaîyî ev pêşniyaz li Mardonîos dikir, herdu alî ew heyşt roj bûn li hemberî hev sekinîbûn. Mardonîos giringîya pêşniyazê di cih de fêhm kir û dema bû şev siwarîyên xwe şandin bihura vedibe erdê Plataîaya Kîthaîronê, ez behsa wî cihê Boîotîayî jê re "Sê Serî" û Atînayî jî "Serên Berû" dibêjin. Çûna siwarîyên bi avê de neçû; 500 barbir û zilamên wî yên ji Peloponezê ji artêşê re xwarin dianîn girtin. Persên ew girtin, dest bi kuştina temamê insan û heywanan kirin û piştî ji kuştinê têr bûn, yên mayîn dan pêşîya xwe û anîn baregehê û wekî xenîmet dan Mardonîos.

310 Zakynthos(Zanta), girava mezin ya rojavayê Elîsê.

[40] Piştî vê bûyerê herdu dijmin du rojên din sekinîn; herduyan jî şer nedidan destpêkirin; barbar ji bo Yûnanîyan han bidin heta Asoposê dihatin, lê herdu jî ji avê derbas nedibûn. Lê siwarîyên Mardonîos her tim Yûnanî nerehet dikirin, zerar didan wan; ji ber ku Thebaîyên bi dil û can bi Medan re bûn, ji bo bikevin şer çi ji destê wan dihat dikirin û kar digihandin noqteya destpêkirina şer; lê piştî wê jî Faris û Med hatin, delîlên mêrxasiyê dan.

[41] Bi vî awayî bêyî tiştek biqewime deh roj derbas bû. Dema ku ji yên li Plataîayê baregeh vedabûn roja yanzdehan dest pê kir, hêzên Yûnanî bi qasî çav bibire zêde bûbûn û ji derengmayînê Mardonîos pir bi hêrs bû. Kurê Gobryas, bi Artabazosê kurê Pharnakes ê li ba Xerxes rêzeke wî yê bilind a kêm Persî bi dest xistibûn hebû, hevdîtinek pêk anî. Ji hevdû re nêrînên xwe gotin: Li gor Artabazos bêyî ku wext bê wendakirin, pêwist e baregeh ji vir bê rakirin û temamê artêşê bikêşin pişt sûrên Thebaîyê, li wir ji bo insanan xwarin, ji bo heywanan jî ka û giya zêde bû, li wir bi cih bibin û rehet rehet li ser rêya dîplomasîyê bimeşin: Di destê wan de ewqas pereyê zêr, micewher, bêhed û hesab malê dinyê, bi koman eşyayên zîv û kupayên bi qîmet hebûn; gerek teqsîr nekirina û di nav Yûnanîyan, bi taybetî birêvebirên sîteyan de belav bikirina. Wê gelek zû netîce bihata wergirtin, wê dev ji azadîyê berdana û şer negirtina ber çav. Ev nêrîn nêzîkî ya Thebaîyan bû, ji ber ku ev fermandar, ji Mardonîos zêdetir fêhimdar bû. Lê Mardonîos, di nav fêhimkirineke mejîhişkî de, di biryarên xwe de dilêr û hişk bû: Artêşa wan ji artêşa Yûnanîyan gelek bi hêztir bû, bi çi halî be pêwist bû zûtirîn dem dest bi şer bihata kirin, nedibû bi destgirêdayî bi zêdebûna hêzên hatine berhevkirin bisekinîna. Lazim bû guh nedana Hegesîstratos jî, qurbanên wî jî, bawerî bi adetên ayînî yên Persîyan bihatina kirin.

[42] Piştî Mardonîos wiha gotin, kesek nikarîbû li hember raweste û nêrîna wî qezenc kir; ji ber ku Hikumdarê Mezin fermandarîya artêşê nedabû Artabazos, dabû wî. Kir ku bangî fermandarên yekîneyên Yûnanî û strategosîyan yê li balê bûn, ji wan pirsî, gelo kehaneteke artêşa Persê wê li Yûnanê mehf bibe seh kiribûn yan na. Fermandarên hatibûn dengê xwe nekirin, hinekan seh nekiribûn, ji ber wê dengê xwe dernedixistin, yên din seh kiribûn, lê ji bo serê xwe nekin belayê dengê xwe nedikirin. Wî wextî Mardonîos ev axaftin ji wan re kir: “Baş e! Belkî we seh nekirîye, belkî jî we

seh kirîye lê hûn newêrin bêjin, wî wextî weke kesê haya wî ji her tiştî heye, ez ê biaxivim. Kehanetek heye, li gor wê Persî wê bên Yûnanistanê, perestgeha Delphoîyê talan bikin û piştî vê talanê wê heta yek bimîne wê bişkên. Niha, madem ev vê kehanetê zanin, em ê nekevin vê perestgehê û em ê talan nekin, wî tawanî ku bibe sebebê qirkirina me em ê nekin. Wî wextî di nav de yên hevalbendên Persîyan in, dikarin şa bibin ku em ê Yûnanîyan bişkînin." Piştî ev gotin, emir kir ku bila amade bin, roja bê bi hilatina rojê re ji bo êrîşî bela cihê xwe bigrin.

[43] Ez wê kehaneta ku Mardonîos ji bo Persan hatîye gotin dizanim, ew ne li hemberî Persan, li hemberî artêşa Îllyrîayan û Enkheleayan[311] hatîye gotin. Ji alîyê din ve, Bakîs li ser şerê ku em niha behsa wê dikin ev gotîye:

Li Çemê Thermodînê, li qiraxên
Çemê Asoposê yên bi çîmen, qêjîna heya erş
Ya Hellenî û biyanîyên bên ba hev
Û li wir, berî Lakhesîs benên jiyanê bibire
Çendîn tiravêjên Medî wê serî li ber qederê bitewînin.

Ya ez dizanim, kehaneta li ser Persan a Mardonîos ev e û kehanetên mîna van yên din in. Thermodan, di navbera Taûgara û Glîsasê de diherike.

[44] Mardonîos, piştî hînî kehanetê bû û ji fermandarên xwe re gotinên cesaretê kirin, derûdor tarî bû, mewzî hatin girtin. Şev pêş ketibû; li baregehê pêjnek nedihat, herkes wek di xeweke giran de bû; li ber nobedarên Atînayîyan siwarek xuya bû; ev, Alexandrosê kurê Amyntas bû, fermandar û hikumdarê Makedonîayê; dixwest strategosîyan bibîne. Çend nobedaran ji bo xeberê bigihînin baz dan, piranîya wan di cihê xwe de man; yên çûn gotin, ji baregeha Medan siwarîyek hatîye, hin navê strategosîyan da dixwaze bi wan re hevdîtinê bike, bi navê wan behsa wan kirîye, tiştekî din negot.

[45] Strategosên guhê xwe dan vê raporê, bêsekin hatin cihê nobedarîyê yê pêş. Alexandros dîtin, wî wiha got: "Gelî Atînayîyan, ez vê xeberê emanetî we dikim, gerek ji devê we dernekeve, heke hûn bi mirina min kêfxweş nebin ji kesekî re nebêjin, ez vê ji we rice dikim, hûn karin tenê ji Paûsanîas re bêjin. Heke ez

311 Enkheleayî, miletekî li Îllyrîayê dijîn (Pirtûka 5an, beşa 61ê).

ji yekîneya Hellenê netirsîyama min ji we re jî nedigot; ji ber ku ez jî ji nesla kevin ve Yûnanek im û ez naxwazim Yûnanistana azad bibe kole. Niha ez xeberê didim we, Mardonîos û artêşa wî ji fehla qurbanê netîceya ku dixwestin dernexistin; yan na wê şer zû ve destpê kiriba. Lê niha Mardonîos êdî guhê xwe nade fehlê û biryar da ku sibe serê sibehê dest bi şer bike; ji teqwîyeyên we yên nû ditirse, ez wisan texmîn dikim. Ji ber wê hazir bin. Heke Mardonîos fikra xwe biguhere, şer paşve jî bixe, hûn hişyar bin, di cihê xwe de bisekinin; heta çend rojan wê xwarina wan xelas bibe. Heke ev şer wekî hûn dixwazin temam bibe, bi rizgarîya yên din re, roja pêkhatina azadîya Yûnanê jî bi xwe re tîne, wê demê yê ji bilî hezkirina welatê xwe guhê xwe neda tiştekî, tenê ji bo evîna li hemberî Yûnanistanê, vî kesê her tehlûke girt ber çavê xwe û baz da vir, ji bîra xwe dernexin. Ji bo barbar bêxeber negrin ser we, min xwest ez xebera plana Mardonîos bigihînim we. Ez, hikumdarê Makedonîayê Alexandros im." Piştî ev gotin, bi çarnalê ber bi baregeha xwe ve çû û gihişt cihê xwe.

[46] Strategosên Atînayî çûn baskê rastê, tiştên ji Alexandros hîn bûn ji Paûsanîas re gotin. Paûsanîasê ji vê xeberê silikî, ket nav tirseke mezin û wiha got: "Madem wê êrîş sibê dest pê bike, Atînayî hûn derbasî pêşberî Persan bibin, em ê jî niha derkevin yên pêşberî we Boîotîayan û Yûnanîyan. Ji ber ku hûn Medîyan nas dikin û dizanin ew çawa şer dikin, ji ber ku we li Marathonê şer kiribû; lê me tu wextî dema ew şer dikin nedîtîne û em nizanin; Spartayîyek bejna xwe dabe ber bejna Medîyan tune. Lê em Boîotîayî û Thessalîayan nas dikin. Niha hûn çekên xwe hildin û werin û li vî baskî bi cîh bibin, em ê jî derbasî baskê çepê bibin." Atînayîyan bersiv dan û gotin: "Dema me dît Persî ketine pêşberî we, me jî dixwest eynî tiştî bêjin. Lê me got belkî hûn pê aciz bibin em bêdeng man. Niha madem hûn bi xwe dixwazin, em jî bi kêf qebûl dikin û em amade ne ya hûn dibêjin bikin."

ŞERÊ PLATAÎAYÊ

[47] Herdu jî, Atînayî û Spartayî li hev kiribûn û mewzîyên xwe guhertibûn ku, tîrêjên serê sibehê hilatin. Boîotîayan manewra dîtibûn û xeber gihandibûn Mardonîos. Mardonîosê ku ji rewşê haydar bû, ji bo eynî tiştî bike, xwest Persan bibe baskê din, têke pêşberî Lakedaîmonîyan. Lê Paûsanîas jî ev manewra dît, fêhm kir ku haya wan ji yên wî kirine bûye û dema ku Mardonîos Pers derbasî milê çepê kir, wî jî Spartayî paş ve anî baskê rastê.

[48] Bi vî awayî piştî cihê xwe yê destpêkê girtin, Mardonîos ji Spartayîyan re keruxek şand û ev da diyarkirin: "Li gor yên li van deran dibêjin, di mêrxasîyê de di ser we re kesek tune; tev heyranê we ne, ji ber ku kesek nedîtîye we ji şer baz daye, bi eksê wê we gotîye yan bimir û yan bikuj û hûn ji cihê xwe ne leqiyane. Baş e ma ya niha! Yan jî gelo yên me sehkirine ne rast in? Hê şer destpê nekirîye û çek neaxivîne we sefên xwe terk kirin û hûn baz dan, we Atînayî dan pêşberî me, wek dijmin koleyên me ji xwe re bijart. Bêguman mêrxasî ne ev e û tê wê manayê em di derheqê we de çewt têgihiştine. Belê, me li pêşberî we dinêrî, em li hêvîyê bûn ku hûn kesekî bişînin ba me û bidin diyarkirin ku em ji bilî Persîyan bi kesekî din re naxwazin şer bikin; em jî hazir bûn ku daxwaza we bi cih bikin; halbukî hûn ne ji bo tiştekî ji me re bêjin, hûn eksê wê dikin. Baş e, madem hûn pêşniyazeke wiha nakin, wî wextî em ji we re dibêjin. Madem hûn ewqas mêrxas in, hûn li hêvîya çi ne tenê bi me re şer bikin û di nav Yûnanîyan de bibin şampîyon? Heke hûn dixwazin bila yên din jî şer bikin, ji wê re jî belê, piştî me bila ew jî bên pêşberî hev. Heke ew naxwazin, hûn dibêjin em herdu şer bikin bes e, em ê wisan bikin û kî bi ser bikeve li ser navê tevan dibe têkbir!"

[49] Kerux ev gotin û ma li hêvîyê: Bersiv derneket. Paşve vegerîya û çû, ji Mardonîos re neqil kir bê çawa hatîye pêşwazîkirin. Mardonîos şa bû û bi wê mêrxasîya ku dida nîşan kêfxweş bû; siwarîyan ajot ser Yûnanîyan. Siwarî nêzîk bûn, dest bi êrîşeke kuşdar ya bi rim û tîran ya li ser temamê enîya Yûnanîyan kirin, ew siwarîyên bi tîr bûn, îmkana sing bi sing ya şer tunebû; çavkanîya Gargaphîayê ya temamê ava baregeha Yûnanîyan temîn dikir lewitandin û xitimandin. Sefên Lakedaîmonîyan tenê digihişt çavkanîyê; Yûnanîyên din, li gor cihê xwe yê di sefê de, ber bi îstîqameta Asoposê kêm yan zêde hinekî dûr diketin; siwarî û tîravêjên dijmin dibûn asteng ku ji Asoposê av werbigirin, ew jî mecbûr bûn biçin çavkanîya avê.

[50] Artêş bê av mabû, siwarî ew dixistin zorê, li ser vê rewşê fermandarên Yûnanî civîyan, ji bo bi Paûsanîas re hevdîtina vê û mijarên din bikin derbasî baskê rastê bûn; ji ber ku ji bilî van zehmetîyên giran, hin derdên bi lêz yên din jî hebûn; xwarin xelas bûbû, şaxên ji Peloponezê xwarin dianîn ji alîyê siwarîyên dijmin ve dihatin girtin, xwe nedigihandin baregehê.

[51] Strategosîyan hûr û kûr hevdîn kirin û biryar dan ku heke Persî îro dest bi êrîşî nekin, wê vekêşin giravê. Girava ku digotin, deh stad ji Asoposê û çavkanîya Gargaphîayê wêdetir bû ya berê li balê baregeh vedabûn; berî bajarên Plataîyan e. Çawa dikare li ser bejahîyê giravek hebe? Ji ber vê: Çemê ji Kîthaîronê dadikeve deştê dibe du şeq; navbera herdu şeqan kêm-zêde sê mîl e; li xwarê cardin dibin yek. Navê vî çemî Oîroî ye. Xwecihên li vir ji Oîroîyê re keça Asopos dibêjin. Belê cihê dixwestin biçin vir bû, wê hem bi qasî têra wan bike av peyda bikirina û hem jî wê ji yekîneyên siwarî yên gelek ew dikirin tengîyê xelas bibûna. Difikirîn vî karî şeva berî-ya roja duwanzdehan bikin, ji bo ku Persî nebînin û siwarîyan nekin pey wan. Piştî gihiştin Oîroîna keça Asoposê ya ji Kîthaîronê dadiket vir dorpêç dikir, wê eynî şevê nîvê artêşê veqetandina û bişandina bihurên Kîthaîronê, rê bibirîna û xwarinên li çiyan mane bigirtina.

[52] Ev biryar stendin, ji ber êrîşîn bê sekin yên siwarîyan, temamê rojê bi ezîyet derbas kirin; dema bû şev siwarîyan êrîşîn xwe sekinandin. Dema ku tarî ket erdê, di saeta ji bo hereketê ya pêşî de hatibû tesbîtkirin, piranîya yekîneyan derketin rê û dûr ketin, lê ne ew cihê ku wê biçin ji wan re hatibû nîşandan; çawa îşareta hereketê hat dayîn, eskerên şa dibûn ku ji siwarîyên Persan rizgar dibin, ber bi bajarê Plataîayê ve çûn, 20 stad ji çavkanîya Gargaphîayê wê de, heta perestgeha Hereyê ya pêşîya Plataîayê çûn. Li wir li pêşîya perestgehê bi cih bûn.

[53] Van yekîneyan li perestgeha Hereyê baregeh vedabûn. Paûsanîas dema dît karê paşvekêşîyê dest pê kirîye, emir da Lakedaîmonîyan ku ew jî çekên xwe bidin hev bi hevalên xwe yên derketine rê re ber bi eynî îstîqametê ve biçin; ji ber ku bawer dikir yên di pêşîyê de derketin, çûne cihê berê li ser biryar hatibû dayîn. Fermandarên yekîneyan ji bo emrê Paûsanîas bi cih bi-kin baz dan; lê Amompharetosê kurê Polîades[312] ku fermandarîya yekîneya Pîtaneyê dikir, got, ew ê ji ber biyanîyan (yanî barbaran) baz nede û leke neyne ser rûmeta Spartayîyan. Ew beşdarî civîna piştî nîvroyê nebûbû, tiş-tên dîtibûn ew şaş kiribûn. Paûsanîas û Eûryanax nikarîbûn çav li bêîtaetîyê

312 Pîtane, li Lekonîayê qesebeyek e. Thukydîdes dibêje ku yekîneyeke bi vî awayî di nav artêşa Spartayîyan de tunebûye. Herodotos di vî warî de şaş dibîne (Thuky-dîdes I. 20).

bigrin, ji ber bêîtaetîya fermandarê wan, nikarîbûn yekîneya Pîtaneyê jî li wir bihêlin; hiştina wî ji derveyî biryara bi Yûnanîyên din re stendibûn, dihat wateya yekîneya ji wan veqetîyaye tev Amompharetos terkî tunekirinê dikin. Bi van melhezeyan hereketkirina yekîneyên Lakonîayê paşve xistin û ji bo rewşê bi Amompharetos bidin fêhimkirin, dest bi hewildanê kirin.

[54] Dema wan erza Amompharetos dişkandin, ku tenê wî bi fermandarên Lakedaîmonîyan û Tegeayîyan re hereket nekiribû, di nav Atînayîyan de ev dibû: Wan hê xwe ji cihê xwe tevnedabûn, wan Lakedaîmonî baş nas dikirin, tiştek digotin tiştekî din dikirin,[313] piştre dema baregehê dest bi hereketê kir siwarîyek şandin ji bo wan temaşe bike, ka gelo Spartayî jî ji bo hereket bikin hazirîyê dikin, yan jî niyeta wan ji cihê xwe bilivê tune û yek jî dixwestin ji Paûsanîas bipirsin, ka hewce ye çi bikin.

[55] Dema ku çawîşê nûçeyan hat cihê Lakedaîmonîyan, dît ku wan xwe ji cihê xwe tevnedane, li alîyekî jî serekên wan ketibûn nav hev. Ji ber ku Eûryanax û Paûsanîas ewqas israr kirin ku eskerên xwe li vir nehêle, lê nikarîbûn Amompharetos îkna bikin; minaqeşe ji halê normal derketibû dema çawîşê nûçeyan yê Atînayî hat. Bi hêrsa pevçûnê, Amompharetos bi şid bi herdu destên xwe rahişt kevirekî ji erdê û avêt ber lingê Paûsanîas û got; bi vî kevirî ez dengê xwe didim ku ez ê ji xerîban nerevim.» (Bi gotina «xerîb» mebesta wî barbar bûn.) Paûsanîas jê re got, dîn û har bûye û çawîşê nûçeyan ê Atînayî, ku pirsa hatibû dîyarkirin jê kir, jê xwest tiştên li vir diqewimin ji yên xwe re bêje û ji bo paşvekêşîyê bi hev re û bi hev girêdayî bê kirin, rice jê kir ku ew bi xwe jî nêzîkî vir bibin.

[56] Çawîş, ji bo vegere ba Atînayîyan çû; dema berbanga sibehê bû, hê fermandaran minaqeşe dikirin; Paûsanîas ku demeke dirêj bêdeng mabû, di dawîyê de fikirî ku piştî Lakedaîmonîyên din çûn dê ew jî nekaribe tenê li vir bisekine (bi rastî jî wisan çêbû). Emrê hereketê da û temamê yên li paşve mabûn di ser giran re birin; Tegeayan jî ew şopandin. Atînayî jî ketin rêzê û li milê din yê Lakedaîmonîyan girtibûn dest bi meşê kirin; ji bo ku tirsa Lakedaîmonîyan jê siwarîyan hebû, ber bi îstîqameta Kîthaîronê ve diçûn.

313 Ji bo helwêsta Lakedaîmonîyan binêre li pirtûka 8an, beşa 142 û pirtûka 9an, beşa 6, 7, 8an.

[57] Di destpêkê de Amompharetos bawer dikir ku wê wî bi yekîneya wî ve tenê nehêlin û neçin; ji ber wê li ber xwe dida û xwe ji cihe xwe tev nedida û mewzîya xwe berneda; lê dema ku yekîneyên Paûsanîas derketin rê, fêhm kir wan ew terk kirine; wî wextî yekîneya xwe berhev kir; çekên wan bi wan da hev û bi bazdanê çû gihişt Lakedaîmonîyan; piştî ev deh stadan dûr ketine, li qiraxê Çemê Moloeîsê, li cihekî jê re Argîopîon tê gotin ku perestgeha Demeterê Eleûsîsê li wir e, sekinîne û li hêvîya Amompharetos mane. Li hêvîmayîna li vir, ji bo dema pêwist be alîkarîya pê re bikin; ji ber ku Amompharetos, dikarîbû bi israr be ku mirovên xwe ji wir tev nede. Tam yekîneyên Amompharetos hatibûn û tevlî yên din bûbûn ku, siwarîyên barbaran avêtin ser wan. Ji ber ku siwarîyan ya hîn bibûn herroj dikirin îro jî dikirin, lê Yûnanîyan ew mewzîyê di destê wan de bû berdabûn, dema ku siwarîyan wir vala dîtibûn, hinek din dûr ketibûn û dema dijmin dîtibûn jî êrîşî ser wan kiribûn.

[58] Mardonîos, dema ku baregeha Yûnanîyan vala dît û fêhm kir ku bi şev çûne, kir ku Thoraxê Larîssayî û birayên wî Eurypylos û Thrasydeîos bên û ji wan re wiha got: "Kurên Aleûas, hûn ê niha ji bo baregeha vala çi bêjin? Wekî cîranên Lakedaîmonîyan, ên ji min re digotin ew ji şer narevin û eskerên herî baş yên dinyê ne hûn bûn; lê we doh dît, xwestin mewzîyên xwe bi mewzîyên din biguherin, îro jî hûn dibînin bi şev baz dane çûne. Tam jî bi rastî pêwist bû xwe li hemberî eskerê dijminê xwe yê herî baş bidin nîşan, lê wan îsbat kirin ku ne tiştek in û jixwe tenê di nav Yûnanîyan de ku ew jî ne tiştek in, qîmet dibînin. Em bên we, ji bo ku hûn Persîyan nas nakin ez qisûra we efû dikim, ji bo we pesnê kesê hûn di derheqê wan de tiştekî zanin; lê ji ber ku Artabazos ji Lakedaîmonîyan tirsîya û bi vê tirsê ji bo em herin bajarê Thebaîyê ew fikara rezîl ya pêşkêş kir ez şaş dimînim; ez ê vê ji hikumdar re bidim diyarkirin. Lê em ê vê wextekî din biaxivin. Niha pêwist e em nehêlin vekişin. Lazim e em bikevin pey wan, wan bigrin û bedelên tiştên bi Persan kirin bidin."

[59] Piştî ev gotin kirin, kir ku Persî ji Asoposê derbas bibin û dan pey ew Yûnanîyên ku bawer dikir baz dane, lê li hemberî xwe ji Tegeayan û Lakedaîmonîyan pêve kesekî din nedît; ji ber ku Atînayîyên rêya deştê girtibûn nedîtibû. Fermandarê yekîneyên barbarên din yên dîtin ku Persî li pey Yûnanîyan ketin, alên xwe vekirin û ne wekî yekîneyên bi rêkûpêk, bi tevlihevî û bi hemî hêza xwe ve baz dan, li pey yên din ketin. Bawer dikirin wê Yûnanîyan wekî yek loqmeyê dabeliînin, qîr dikirin û bêserûber baz didan.

[60] Di vê navê re Paûsanîasê ku siwarîyan lê şidandibûn, siwarîyek derxist rê û ji Atînayîyan re ev belavok şand: "Atînayîyan, em di demekê de ne ku azadbûna Yûnanistanê yan jî kolebûna wê bi vî şerê em didin girêdayî ye, em Lakedaîmonî û hûn Atînayî, em rastî îxaneta hevalbendên xwe hatin. Bi şev baz dan. Em zanin em ê ji vir şûn ve çi bikin: Çiqas ji destê me bê em xwe biparêzên û ji hevdû re bibin destek. Heke siwarîyan pêşî êrîşî we kiribûna, wî wextî bêguman me û Tegeayên bi me re bi doza Yûnanê re îxanet nekirine, em ê bazdana alîkarîya we. Lê ew tev bi ser me de rijîyan, niha pêwist e hûn alîkarî li cihê herî zêde tehde li ser e bikin, alîkarîkirin dikeve ser we. Heke hûn bi xwe nikarin bên, qet nebe, ji bo dilxweşîyê tîravêjin xwe bişînin. Me dît ku we di temamê vî şerî de çend yeman hereket kir; em bawer dikin hûn ê vê daxwaza me jî paşve venegerînin."

[61] Atînayîyên ev belavok girtin, ji bo baz bidin alîkarîya Lakedaîmonîyan û bi temamê hêza xwe ve mil bidin ber wan ketin rê. Tam wê derketina rê, Yûnanîyên mewzîyên pêşberî wan girtibûn û terefdarê Hikumdarê Mezin êrîş kirin, êdî nikarîbûn bazdin alîkarîya yên din, dijminê li hemberî wan pirtik ji wan dibir. Wî wextî Lakedaîmonî û Tegeayên bi serê xwe man, li hemberî Mardonîos û artêşa bi pêş diket, ji bo hazirîya şerê bi wan re, qurbanek serjê kirin; yên yekem, bi peyadeyên sivik re 50.000 bûn, yê duyemin jî 3.000. (Ji ber ku Tegeayî yek gavê ji Lakedaîmonîyan veneqetîyabûn.) Qurbanan nîşanên baş nedan û bi rastî gelek esker li wir ketin, hê zêdeyî wan jî birîndar bûn; Persên ku mertalên ji şaxên dara bîya qufikan hatibûn çêkirin li pêşîya wan weke dîwarê kelehan disekinîn, bêhesab tîr dibarandin. Wî wextî, Paûsanîasê ku dît Spartayî tên perçiqandin û îlah xwe kerr dikin, çavên xwe zîvirand ser Heraîona Platîayan û ji xwedawendê re dua kir, hêvî û lava kir ku hêvîyên wî vala dernexe.

[62] Hêj duayên xwe temam nekiribû ku, Tegeayên ji mewzîyên xwe derketin avêtin ser barbaran û duayê Paûsanîas çawa temam bûn, Lakedaîmonîyên qurban jê dikirin, nîşanên bextewerîyê dîtin. Wextê bedelê lihêvîmayînê dîtin, ew jî ber bi Persîyan ve meşîyan, Persîyan kevanên xwe berdan û dest avêtin riman. Pêşî li dora dîwarê ji mertalan pêk hatibû şer çêbû; piştî ev parastin hat şikandin, heta ba perestgeha Demeter şerekî bi lez çêbû; şer dirêj kêşa; di dawîyê de sing bi sing şer kirin, barbaran rimên

Yûnanan ên dirêj bi destê xwe digirtin û dişkandin; Persî jî bêtirs bûn, di mêrxasîyê de qet paşve nediman. Lê dema ku di destê wan de rim tunebe, di pîşeya şer de hê xeşîm diman, bi dijminê xwe re ne wekhev bûn; gelek caran bi tena serê xwe diketin nav şer, hinek caran jî bi grubên deh kesî -yan hîn kêmtir yan jî hê zêdetir- berhev dibûn û xwe davêtin ser Spartayîyên ku dijminê xwe bi şûran diqedandin.

[63] Di navenda[314] yekîneke taybet ya ji hezar Persîyan pêk hatibû û ji kesên herî mêrxas hatibûn hilbijartin, di noqteya Mardonîosê li ser hespekî boz şer dikir, gelek ji nêzîk ve li Yûnanîyan şidandibûn û ew xistibûn tehlîkeyê de. Heta dest nedan Mardonîos Persîyan baş li ber xwe dan û gelek canên Lakedaîmonîyan telef bûn. Lê ji dema Mardonîos hat kuştin şûnve û yekîneyên saxlem yên dora wî girtibûn têkçûn, yên paşve mayî belav bûn û teslîmî Lakedaîmonîyan bûn; techîzat û girêdana cih nedabû çekê parastinê, rê ji felaketa wan re vekir: Bi singa vekirî derketibûn hemberî hoplîtîyên giran techîzatkirî.

[64] Kehaneta ji bo Spartayîyan dabûn li vir pêk hatibû[315] û toleya Leonîdas ji Mardonîos hat wergirtin. Serkeftina herî sipehî ya ku em zanin jî Paûsanîasê kurê Kleombrotosê kurê Anaxandridas qezenc kir. Min bav û kalên wî yên din di beşa Leonîdas de nivîsandibû, ji ber ku bav û kalên wan yek e. Mardonîos, bi destê Arîmnestosê hemwelatîyê herî giring yê Spartayî mir, ew jî piştî şerê Medan, dema li hemberî temamê Messanîayên bi Spartayîyan re şer dikirin, li Stenyklerosê bi 300 kesan şer dikir, tev wan 300 kesan ew jî mirîye.

[65] Persên li Plataîayê ji alîyê Lakedaîmonîyan ve hatin raqewirandin, ber bi baregehên xwe û tabyayên biçûk yên li ser erdê Thebaîyan hatibûn damezirandin, bi awayekî bêserûber belav bûbûn. Her çend li rexê dehlên pîroz yên Demeterê şer dikirin, yek Persî neketîye vê saheya pîroz û li wir nemirîye, ev zelal e, lê li derveyî erdên pîroz kom bi kom ketine, ev bûyer min gelekî ecêbmayî hişt. Û -heke di warê îlahan de tiştekî bê texmînkirin hebe- ez wisan texmîn dikim ku, yên seraya Eleûsîsê şewitandine nêzîkî abîdeya xwe nekirine, ew bi xwe ye.

314 Binêrin li kêtaba 7an, beşa 40î û pirtûka 8an beşa 113an.

315 Ji bo kehaneta dabûn Spartayîyan li pirtûka 8an, beşa 114an binêre.

[66] Belê, bûyerên sereke yên vî şerî ev in.[316] Artabazosê kurê Pharnakes, jixwe ne razî bû dema hikumdar fermandarîya mezin da Mardonîos û ji bo Mardonîos ji şer poşman bike çi ji destan hatîye kirîye, lê bi ser neketîye. Ji metoda Mardonîos ya tetbîq kirîye gelek nerehet bûye. Ji ber wê wî jî wiha kirîye: Dema ku dîtîye şer dest pê dike, ji bo baş zanîbû wê rewş bigehe ku, talîmatên pêwist dan yekîneyên bin destê xwe; fermandarîya hêzeke giring a nêzîkî 40.000 kesan dikir. Emir li eskerên bi temamî di bin destê wî de bûn kir ku ew bi xwe ber bi ku ve biçe, gerek ew jî pê re hevaheng bin û bi eynî surʿetê bimeşin û ket serî. Ev talîmat da wan û wekî ku wan dibir şer, rêya saheya şer da pêşîya xwe; her ber bi pêş ve diçûn, belavbûnên yekem yên di sefên Persan de dest pê kir dît. Wî wextî dev ji meşa merasimê berda, ku wekî ketîye pêşbirkê baz da, çiqas ji destan dihat bi lez baz dida û ne ber bi tabyaya darîn yan jî sûrên Thebaîyê, bi meşeke zehmet ji bo gihiştina Hellespontosê, ber bi îstîqameta Phokîsê.

[67] Ev bask bi vî awayî ber bi wê îstîqametê ve paş ve kêşîya. Niyeta Yûnanîyên nav sefên hikumdar de kifş bû ne baş bû. Tenê Boîotîayî demeke dirêj li hemberî Atînayîyan li ber xwe dan. Ji ber ku ev Thebaîyên han bi Medan re hevalbendî çêkiribûn, hişkîyeke yeman dikirin nav şer, vekirî dilîstin. Ewqas ku, ji nav wan 300 kes, yên herî mêrxas û esîl, di destê Atînayîyan de can dan. Dema ku baz dan jî ne bi Persan re çûn eynî cihî, xwe avêtin Thebaîyê. Girseya hevalbendên din yên ji bo bi dijmin re şer bikin qet xwe nelivandibûn, di hêla eskerî de tu qîmetek nedabûn nîşan jî têk çûbûn.

[68] Di vî şerî de temamê van insanan, hê berî bi dijmin re şer bike, heke tenê ji bo dîtin Persî baz didin ketin derdê canê xwe rast be, li gor min şerkerên enîya barbaran yên serkeftî tenê Persî ne, ev tiştekî zelal e. Ji derveyî siwarîyan û bi taybetî siwarîyên Boîotîayê, hemî belav bûne, alîkarîya van a mezin gihiştîye yên baz dane, dijmin bernedane, rêya bazdanê parastine. Yûnanîyan jî wekî dijmin têk birine, li dû eskerên Xerxes ketine û ev peyketin bûye qirkirinek.

[69] Di esnayê di sefên dijmin de herkes ketîye derdê canê xwe Yûnanîyên din, yanî yên li rexê perestgeha Hereyê berhev bûbûn û yên beşdarî şer

316 Şerê Plateîayê di Tebaxa sala 479an ya B.Z. de ye.

nebûbûn, xebera destpêkirina şer û serkeftina yekîneyên Paûsanîas wergirtine. Li ser vê xeberê bi awayekî ne bi rêkûpik, hinek li dora Korînthosîyan berhev bûyî, di qiraxên çiyan re, piştre di ser giran re derbas bûne, raste rast di rêya vedibe perestgeha Demeter re, hinek jî bi Megarayan û Phlîosîyan re rêya deştê ya herî kurtebir girtine û meşîyane. Dema evên duyemîn nêzîkî dijmin bûne, siwarîyên Thebaîyê wan ji dûr ve dîtine bêserûber meşîyane, wî wextî di bin fermandarîya Asopodorosê kurê Tîmandros de, hespên xwe ajotin ser wan. Di vî şerî de şessed kes ji wan ketin, yên din jî dan pêşîya xwe û avêtin ser Kîthaîronê. Bi vî awayî ew bêserketin mirin.

[70] Persên berê xwe dan kelehên ji daran hatine çêkirin û qelebalixa ji barbaran paşve mayî, berî Lakedaîmonîyên peya bigihijin, derketin ser dîwaran, çiqas ji destê wan hat dest bi saxlemkirina wê kirin. Lakedamonîyên herikîn vêde bi şid xwe dan ser vir û şerekî giran çêbû; berî Atînayî bên dijmin xwe baş diparast, heta li hemberî Lakedaîmonîyên di êrîşa kelehan de xeşîm, bi awayekî zelal serdest bûn. Lê piştî Atînayî gihiştin êrîş du qat çelengtir bû û direj kêşa; di dawîyê de bi saya cesaret û rikoyîya Atînayîyan, şeqek vekirin û di dîwar re derbas bûn û Yûnanî wekî pêlan ji vê şeqê ketin hindur. Pêşî Tegeayî ketibûn hindur; yên çadira Mardonîos talan kirin ew in. Bi taybetî alifên hespên wan ên gelek xweşik yên ji serî heta binî ji paxir çêkirî birin. Ev alif pêşkêşî perestgeha Aleaya Atînayê kirin, qismê din yê xenîmetê di navbera xwe de parve kirin. Piştî dîwar hat xerakirin êdî barbaran nema karîbûn parastina xe bikin; kes ji wan hizra destavêtina çek nekir; di cihekî ku bi deh hezaran kes li ser hev kom bûbûn, wekî dînan li wan hatibû. Yûnanîyan wisan şûr hejandin ku ji artêşeke 300 hezar kesî -lazim e 40 hezar kesên Artabazos revandin ji vê bê xistin- tenê 3 hezar jê mane. Di şer de ji Lakedaîmonîyên Spartayî tev li ser hev 91, ji Tegeayîyan 16 û ji Atînayîyan jî 52 esker wenda kiribûn.

[71] Di enîya barbaran de yên herî zêde li ber çav ketine, di peyadeyan de Persî, siwarîyan de Sakayî, wekî ferd jî Mardonîos bûn; di enîya Yûnanan de Tegeayî û Atînayîyan mêrxasî nîşan dane, lê şerkerên herî baş Lakedaîmonî ev derbas kirine. Di eslê xwe de ji bo ku hemîyan dijminê li hemberî xwe mexlûb kirine, ez vê xalê incex li Lakedaîmonîyên di hemî pêşbirkên zor de şer kirine û yên hemberî xwe têk birine dinêrim û derdixim ronahîyê. Bêşik lehengê rojê, li gor qeneeta min, Arîstodemosê ku ji 300 eskerên

Thermopylaîyê tenê ew sax mabû û ji wê rojê şûn ve bi awayê li ser enîya wî lekeya namûsê, bi rûreşî jiya bû.[317] Di mêrxasîyê de yên piştî wî tên, ji Spartayîyan Poseîdonîos, Phîlokyon û Amompharetos bûn. Lê di civînekê de, dema ku minaqeşeya ji nav wan kîjan hê zêdetir mêrxas e dikin, Spartayîyên li wir bûn bal kêşabûn ser vê xalê ku, mêrxasîya Arîstodemos ya dema wekî dînan ji sefan xwe avêt pêş, ji ber daxwaza mirineke ber bi çav bû da ku lekeya li ser enîya xwe paqij bike, lê Poseîdonîos bêyî li mirinê bigere mêrxasî daye nîşan, ji ber vê ferqê wan ew hê bilindtir girtine. Lê belkî di axaftina wan ya bi vî awayî de tesîra hesûdîyê jî çêbûbe. Hemî kesên min navên wan hijmartin di nav qurbanên vî şerî de layîqî rêzeke taybet hatine dîtin; lê Arîstodemosê ku min behsa wî kir, ku xwestîye qisûra xwe bi mirinê bide paqijkirin, layîqî tu rêzê nehatîye dîtin.

[72] Yên li Plataîayê herî zêde nav qezenc kirine ev bûne; ji ber ku Kallîkrates di meydana şer de nehatîye kuştin. Ew jî di nav beşdarên artêşê de bû; di nav Yûnanîyan de kesê herî sipehî yê heyamê bû; hem jî ez ne tenê di nav Lakedaîmonîyan de dibêjim, di nav temamê Hellenîyan de. Dema Paûsanîas qurban jê dikir, ew jî di nav sefê de bêlivîn sekinîbû, ji nişkê ve tîrek li zikê wî ket; dema şer dest pê kir ew li rexekî di nav êş û azaran de can dida, Arîmnestosê Plataîyî behs dike, ew ne li ber mirina xwe ya di oxira Yûnanê de dikeve, ew li ber dikeve ku bêyî şer bike û ji bo bikaribe di bîranînan de bijî serkeftinekê nîşan bide dimre.

[73] Bi taybetî ji Atînayîyan yên ketine ber çav, Sophanesê kurê Eûtykhîdes tê nîşandan ku, ew ji navçeya Dekeleîayê bû û li gor Atînayî behs dikin, ew yek ji wan Dekeleîayan bû ku ji bo nevîyên xwe karekî pir bikêrhatî kiribû. Gelek demên berê, wextê ku kurên Tyndareos li Helenê digerîyan[318] bi artêşeke bi hêz ketine Attîkayê û li demosê rê lı koça bi komî vekiribûn, ji ber ku nizanîbûn Helen li ku hatîye ragirtin; li ser vê li gor Atînayîyan Dekeleîayan, -li gor Dekeleîayan jî Dekeleos bi xwe- ji bo wan xizmeteke mezin kirine: Dekeleos ku ji bêedebîya Theseûs a revandina keçikê hêrs bûye, li milekî din jî tirsîyaye ji ber vê wê temamê Attîkayê zerarê bibîne,

317 Ji bo Arîstodemos binêrin li kêtaba 7an, beşa 229, 231ê.

318 Behsa revandina Helenê ji alîyê Theseûs ve dike, ku ji Spartayê birîye Attikayê û li navçeya Aphîdnaîyê de ragirtîye.

ji Tyndareosîyan re her tişt îzah kirîye, ew birine Aphîdnaîyê bi alîkarîya kesekî xwecih yê navê wî Tîtakos bû. Di miqabilî vê xizmeta wan de îro jî Dekeleîayî li Spartayê bacê nadin û di protokolê de ji mafê dora pêşîyê sûd werdigirin; heta çendîn sal berî van bûyerên em behs dikin, di vî şerê dawîyê de yê di navbera Atînayîyan û Peloponesîyan de derket jî, Lakedaîmonîyan seranserê Attîkayê maliştin, lê dest nedan Dekeleîayê.

[74] Sophanesê di nav Atînayîyan de rûmeta mêrxasîyê wergirt ji van Demosan e. Çîrokek li ser tê gotin ku, bi du awayan tê neqilkirin: Li gor ya yekê, wî lengereke hesinî bi zincîreke sifir bi qayîşa şûr ya li ser milê xwe ve girêdaye ya bi ser zirxên xwe de li xwe dikir; çi wextê dijmin dimeşîya ser, ji bo ku dijmin wî ji cihê wî neleqînin, lenger di erdê de dikuta; dema ku dijmin dest bi bazdanê dikir pêşî lenger dikir ser milê xwe, piştre dest bi peyketinê dikir. Neqla yekem wiha ye; li gor ya duyem, ku qet bi ya yekem li hev nake, ev ne lengereke hesinî ya keştiyê ku bi zirhê ve daliqandî bûye, tenê tilsimeke li ser mertal neqişkirî hebû û ew digirt pêşberî wan derbeyên dihatin ser.

[75] Vî Sophanesî ji ber tiştekî din jî nav û dengî qezenc kiribû; di esnayê Atînayîyan Aîgîna kirin bin dorpêçê, Eurybatesê Argosî yê yekemînê pentathlonê kişandîye pêşbirkxwestinê û di şerê yeke-yekî de ew kuştîye. Ew bi xwe jî dema ku bi Leagrosê kurê Glaûkon re strategosê Atînayîyan bû, bi mêrxasî şer kirîye û mirîye; li Datonê[319] dema ji bo kana zêr bi Edonîsîyan re şer kirîye mirîye.

[76] Jinek bi lingên xwe hat, saheya şer Plataîayê ya bi mirîyên barbaran xitimîbû, teslîmî Yûnanîyan bû; cêrîya Pharandatesê kurê Teaspîsê Persî bû; dema ku seh kirîye Persî têkçûne û Yûnanî biserketine, ew bi xwe û yên pê re kincên xwe û xişrên xwe yên herî xweşik li xwe kirine û siwarî erebeyê bûne, hatine ba Lakedaîmonîyan; di orteya eskerên hê bêhna xwînê ji wan dihat peya bû, dît ku herkes guhê xwe dide emrên Paûsanîas, ji bo ku di pêşîyê de navê fermandarê dijmin û welatê wî gelek caran seh kiribû, fêhm kir ku ev ew kes e, xwe avêt ber pêyan û jê re wiha got: "Hikumdarê Spartayê, vê girtîya hatîye ji te hêvî û lavayê dike nehêle bibe kole. Ez deyndarê te me ji bo mirina

319 Daton, bajarekî Trakyayê ye.

van kesên hurmeta wan ne ji melekan re û ne jî ji îlahan re heye. Welatê min Kos e; ez keça Hegetorîdesê kurê Antagoras im. Ez ji Kosê bi zorê revandin, ez bûm malê Persan." Paûsanîas bersiv da û got: "Jinik, heke bi rastî mêvana min a Kosî, tu keça Hegetorîdes î, êdî bila ji tiştekî tirsa te çênebe, ji ber ku ji nav yên li wê herêmê rûdinin, yê herî ez jê hez dikim ew e." Piştî ev gotin, jinik emanetî ephorosîyan kir û piştre, ew li ser daxwaza wê şandin Aîgînayê.

[77] Tam piştî vê jinikê Mantîneîayî hatin, êdî her tişt temam bûbû. Dema ku hîn bûn piştî şer hatine gelek xemgîn bûn; gotin ku me heq kiriye em cezekî bistînin. Dema ku seh kirine yekîneya Artabazos baz daye, xwestine heta Thessalîayê li pey wan bikevin; lê Lakedaîmonîyan izin nedane ku bikevin pey wan. Çûn welatê xwe û fermandarê xwe yê artêşê şandin sirgûnê. Piştî Mantîneîayan dora Elîsîyan bû; wekî Mantîneîayan ew jî di nav xemê de vegerîyabûn, dema ku vegerîyan welatê xwe wan jî fermandarê xwe sirgûn kirin. Tiştên ji bo Mantîneîayan û Elîsîyan bên gotin ev e.

[78] Li Plataîayê, di baregeha Aîgînayan de, kesekî navê wî Lamponê kurê Pytheas yê hemwelatîyekî giravê yê naskirî hebû. Ew hat ba Paûsanîas û ji wî re pêşniyazeke gelek xerab kir. Jê re pir bi hewes got: "Kurê Kleombrotos, te biserketineke her wext nayê qezenckirin bi dest xist û îlahan Yûnanistan ji serê kendalekî xelas kirin, taca xezîneke serkeftinê ya heta niha min qet seh nekirîye ku tu Yûnanîyekî qezenc kirîye, danî serê te. Niha ev karê te biser xistîye nêvcî nehêle ku, navûdengê te hêj jî bilind be û di pêşerojê de êdî barbar êrîşî ser Yûnanistanê nede ber çavê xwe. Dema ku Leonîdas li Thermopylaîyê mir, Mardonîos û Xerxes serê wî jê kirin û gewdeyê wî li sing xistin. Ji qisasê re qisas, tu jî eynî tiştî li Mardonîos bike, ku temamê Spartayê, temamê Yûnanistanê te bikin taca serê xwe. Mardonîos li sing bixe û tola mamê xwe Leonîdas hilde."

[79] Hizir dikir ku bi van gotinan wê bikeve çavê Paûsanîas. Lê Paûsanîas wiha bersiva wî da: "Biyanîyê Aîgînayî, ez daxwaz û hêvîyên te fêhm dikim; lê ev tişt ji rêya rûmetê dûr in. Piştî min navê xwe, welatê xwe û îşên min kirine evqas bilind kirin, ji bo hê zêde ji min hez bikin, pêşniyaza te ya şerê bi laşekî re, tu dixwazî ez leke bînim ser navê xwe, welatê xwe û karên min kirine. Tiştên wiha ne layîqî Yûnanîyan, yên barbara ne û ji ber van yekan em loma ji wan dikin. Ji bo ez dilê wan bi xwe xweş bikim, ez nikarim daxwaza Aîganayî û yên wekî

wan difikirin, pêk bînim. Hem bi gotinên xwe û hem jî di kirinên xwe de bi rêzgirtina qanûnên îlahî dilxweşkirina Spartayîyan têra min dike. Heyfa Leonîdas ya tu ji min re dibêjî bistîne, hatîye sitendin û ev girên laşan a tu dibînî, li hemberî canê wî ye. Li hemberî canê tevan yên li Thermopylaîyê serê wan hatin jêkirin e. Em bên te, careke din ji bo gotinên wiha newe ba min, pêşniyazên wiha neke û ji bo ku min tu ceza nekir jî ji min re dua bike."

[80] Mirovê Aîgînayî wiha hat raqewirandin. Paûsanîas bi dellalan da bangkirin ku kesek destê xwe nede xenîmetan û emir da hîlotan temamê xezîneyên Persan berhev bikin. Li baregehê gerîyan, çadirên ji zêr û zîvan tijî dîtin, nivînên bi zêr û zîvan neqişkirî, cûrû cûre kraterosên zêrîn, tas, qedeh, di erebeyan de çewalên tijî ji taximên metbexê yên ji zêr û zîvîn. Mirî tazî kirin, bazind û kolyeyên wan, şûrên sîperên wan zêrîn û cil û bergên wan yên biriqandî jî bi ser de. Hîlotan gelek ji wan dizîn û firotin Aîgînayan; hê gelek zêdetir jî hebûn, bi qasî ku wê neyên veşartin. Ez difikirm ku Aîgînayan ji hilotîyan zêr bi fiyeta paxirê sitendin.

[81] Piştî temamê van xezîneyan anîn ba hev, pêşî ji dehan yekê wê ji perestgeha Delphoîyê re veqetandin, bi vî pereyî sêpêya zêrîn ya tam li rexê kevirê pêşkêşgehê ya li ser marê bronzî yê sêserî bilind dibe hat pêşkêşkirin; bi payê perestgeha Olympîayê peykerê Zeûs yê bejna wê deh enîşk hat çêkirin û şandin, ji bo perestgeha Îsthmosê jî cardin ji bronzê, peykereke Poseîdaon yê bejna wê heft enîşk hat çêkirin, piştî ev pay hatin veqetandin yên mayî hatin parvekirin û payê her miletekî, bi pîvana ku heq kirine, ji cêrîyên Persîyan, ji zêr û zîvan, her cûre eşyayên bi qîmet hinek tişt para wan ketin. Di belgeyan de noteke ku kîjan diyariyên taybet pêşkêşî wan kesên li Plataîayê di şer de herî zêde xwe diyar kiribûn, nehatîye nivîsandin, ez bawer dikim ku dilê wan jî hatîye xweşkirin; ji bo Paûsanîas ji her cûre eşyayan, jin, hesp, talant, deve û yên din, ji her yekê deh lib hatine veqetandin.

[82] Yek jî ev tê gotin: Paûsanîas, dema ku Xerxes ji Yûnanistanê baz da giranîyên ji Mardonîos re hiştine, li wan gelek tiştên ku Mardonîos di pey xwe de kişandîye, li taximên zêr û zîvîn û perdeyên dîwaran yên rengîn nêrîye û nêrîye û emir li kedkar û aşpêjên Persî kirîye ku wekî sifreya ji Mardonîos re amade kirine, ji wî re jî sifrekê amade bikin. Emir bi cih anîne û Paûsanîas li sifre, nivîn û balgehên bi zêr û zîvî hatine xemilandin,

taximên sifreyê yên bi zêr û zîv û maseyan nêrîye; li wan xwarinên enfes yên li ber hatine raxistin şaş maye û ji xizmetkarên xwe jî, ji bo xweşîyê, emir kirîye ku sifrekê Sparta amade bikin. Ferqa di navbera herdu sifreyan de gelek mezin bûye. Wî wextî Paûsanîas dest bi ken kirîye, kirîye ku bangî fermandarên Yûnanî bikin, piştî tev berhev bûne, bi tilîya xwe herdu sifre cihê cihê daye nîşan û gotîye: "Hemwelatîyên Yûnanî, min hûn berhev kirin ji bo ez dînîtîya Medên nîşanê we bidim ku dikarin herroj xwarinên wiha bixwin, lê çav berdane xwarina me ya tisî ya reben û heta vir hatine," Dibêjin ku Paûsanîas ji fermandarên Yûnanî re ev gotin gotîne.

[83] Piştî demeke dirêj di ser van bûyeran re derbas bû jî, gelek Plataîayî sandoqên tijî zêr, zîv û tiştên biqîmet yên din dîtine. Û piştre jî ev hatîye dîtin: Piştî ku goşt riziyan û jê ketin, Plataîayî hestî berhevî ser hev dikirin; di vê navê re qoqekî tu bihevvekirin tê de tune dîtin, ji yek hestîyî çêbûbû; yek jî bi perçeya wê ya jorê re hestîyekî çeneyê derxistin meydanê ku, diranên wî bi hev ve kelîya bû, diranên biçûk û yên kûrsî jî wekî perçekî di cihê xwe de sekinî bûn; ji bilî vê hestîyên kesekî bejna wî pênc enîşk hat dîtin.

[84] Roja din ya şer, laşê Mardonîos wenda bû; Gelo kê revandibû? Ez bi zelalî nikarim tiştekî bêjim, lê min ji gelek kesan û di gelek welatan de seh kirîye ku Mardonîos hatîye veşartin û heta ez rastî gelek kesan hatim ku dibêjin, yê ev xêr kirîye ji Artontesê kurê Mardonîos xelat jî wergirtîye; bi rastî ez hîn nebûm ku kê laşê Mardonîos revandîye û veşartîye. Heta kesên navekî wekî Dîonysophanesê Ephesosî veşartîye dibêjin jî hene.

[85] Wî yan kesekî din, bi vî awayî Mardonîos bûye xwedîyê gorekê. Em bên eskerên Yûnanî, piştî xenîmetên Plataîayê hatin parvekirin, her miletekî mirîyên xwe cihê cihê veşartin. Lakedaîmonîyan sê gor kolan; di yekê de farmendar veşartin; Poseîdonîos, Amompharetos, Phîlokyon û Kallîkrates di nav wan de bûn; ev bi vî awayî hatibûn veqetandin; di gora duduyan de Spartayîyên din hebûn; di ya sisiyan de hîlotî. Awayê veşartina wan bi vî awayî bû. Tegeayan bê hilbijartina laşan, kirin gorên cihê cihê de; Atînayî tevde kirin cihekî; Megarayî û Phlîosî qurbanên siwarî vedişartin. Gorên van miletan bi mirîyan tijî bûbûn; lê li Plataîayê gorên miletên din jî hene ku, bi qasî ez hîn bûm ev, ji bo beşdarî şer nebûn fedî kirine, di pêş de ji bo şermezar nebin gorên derewîn çêkirine; nimûneya vê jî, li wir abîdeke bi navê Abîdeya Aî-

gînayîyan heye ku, tê gotin, deh sal piştî wê li ser ricaya Aîgînayîyan, ji alîyê mêvanê wan yê resmî Kleadesê kurê Aûtodîkos yê Plataîayî ve hatîye çêkirin.

PIŞTÎ PLATAÎAYÊ

[86] Piştî mirîyên şerê Plataîayê hatin veşartin, Yûnanîyan meclis damezirandin û bêsekin biryar girtin ku bimeşin ser Tebaîyê, yên terefdarên Meda ne û herî pêşî yên di vê rêyê de xwe gelekî daye pêş, Tîmagenîdes û Attagînos ji wan bixwazin. Wê ji wan re bigotina ku heke hûn nedin, heya em vî bajarî nestînin û xera nekin em naçin. Piştî ev biryar stendin, piştî roja dehan a şer çûn, Thebaî dorpêç kirin û ew zilam xwestin. Li ser qebûlnekirina Thebaîyan, erdê wan talan û wêran kirin û dest bi êrîşa ser dîwarên kelehê kirin.

[87] Navbir nedidan xerakirana derûdoran, ji bo wê, roja bîstan Tîmagenîdes ji Tebaîyan re wiha got: "Gelî Thebaîyan, madem Yûnanîyan biryar dane heta Thebaîyê xera nekin, yan jî hûn me nedin wê dorpêçê ranekin, ne rast e ku erdê Boîotîayê li ser me hê zêde zerarê bibîne; heke yên dixwazin tenê pere be û em mahneyek bin, em kaseya dewletê vekin û çi dixwazin bidin wan -ji ber ku ne tenê me, wekî dewlet me tevda Med destek kirin. Na heke bi rastî bajar ji bo me bi dest bixin dorpêç kirine, em bi xwe em ê li çareya serê xwe binêrin." Ev gotin gelek rast û gelek erênî hatin pêşwazîkirin; Thebaîyî di cih de yek şandin û dan diyarkirin ku em amade ne hemwelatîyên xwe teslîmî Paûsanîas bikin.

[88] Thebaîyan li ser vê xalê di navbera xwe de li hev kirin, Attagînos bi xef ji bajêr baz da; zarokên wî teslîmî Paûsanîas kirin, wî ew ji temamê tawanan dûr girtin, da diyarkirin ku berpirsîyarîya bavekî yê bi alîkarya Medan tawanbar e wê li zarokên wî neyên barkirin. Hemwelatîyên din ên Thebaîyîyan ew teslîm kirin, hizir dikirin ku wê mafê xwe yê parastinê bikar bînin û ji vî karî bi bertîl rizgar bibin. Lê piştî Paûsanîas Ew bi dest xistin, yên di hişê wan re derbas dibû fêhm kir, rê da temamê hevalbendan û ew şandin Korînthosê û li wir dan kuştin.

[89] Yên li Plataîayê û Thebaîyê qewimîn ev bûn. Artabazosê kurê Pharnakes qederekî ji Plataîayê dûr ketibû. Dema ku gihişt Thessalîayê, Thessalîayan şahîyek jê re çêkirin û di derbarê qismê artêşa din de jê agahdarî xwestin, ji ber ku tiştekî li ser bûyerên Plataîayê nizanîbûn. Artabazos neket

nav safîya ku ji wan re rastîyê bêje, yan na dibû ku ew û artêşa wî bi mirinê re rûbirî bimaya. (Ji ber ku çi miletê ku hîn bibûya çi qewimîne dikarîbûn êrîşî wî bikin.) Ji ber wê li hemberî Phokîsîyan jî dengê xwe birrîbû; ji Thessalîayîyan re wiha gotibû: "Gelî Thessalîayî hûn dibînin, bêyî kêlîyekê wenda bikim ez ber bi Trakyayê ve dimeşim; ez bi yekîneyên bi xwe re ji bo wezîfekê ji artêşê veqetîyam; wê Mardonîos jî îro yan sibe bê, ew jî bi artêşa xwe ve di pey min de tê. Wî baş pêşwazî bikin û tiştên ji destê we tê jê re texsîr nekin; piştre hûn poşman nabin." Piştî ev gotin eskerên xwe berhev kirin û ket rê, di ser Thessalîayê û Makedonîayê re ber bi Trakyayê ve meşîya û wekî got lez dikir, di kurtebiran re diçû. Hat Bîzansê, lê qederek baş ji eskerên xwe di rê de hiştibû, qismek ji alîyê Trakîyan ve hatibûn şikandin, qismek jî ji alîyê birçîtî û westîyanê hatibûn şikandin. Yên mabûn ji Bîzansê derbasî Asyayê kir. Paşvekêşîya Artabazos wiha çêbû.

ŞERÊ MYKALEYÊ

[90] Eynî roja Persî li Plataîayê têkçûn, li Mykaleyê li Îonîayê jî têk çûbûn. Yûnanîyên bi Leotykhîdasê Lakedaîmonî re hatibûn Delosê, ku li vir lenger avêtibûn û sekinîbûn, ji Samosê wekî qasid Lamponê kurê Thrasykles, Athenagorasê kurê Arkhestradides û Hegesîstratosê kurê Arîstagoras hatibûn. Samosîyan, ew ji Persan û Theomestorê kurê Androdamasê hikumranê wan yê zilamê Persîyan dihat zanîn û ji ber wê bêrûmet dihat dîtin, bi dizî şandibûn. Dema ku qasid derketin ba strategosîyan, Hegesîstratos pir dirêj û bi nazikî axivî: "Ji bo Îonîayî ji Persan veqetin, tenê hûn hinekî bên xuyakirin bes e; barbar qet li hêvîya we jî namînin." Heke bisekinin jî Yûnanî xenîmeteke wiha careke din nikarîbûn bi dest bixin. Piştî wê navê îlahên mişterek bi bîr dianî, hewl dida wan han bide ji bo kesên ji xwîna Yûnanan ji koletîyê rizgar bikin û barbaran paşve bavêjin bixebitin. Û ev serkeftin ji wan re xwe bi xwe dihat; keştîyên barbaran di deryayê de ne zexim bûn, wekî esker jî ne bi qasî Yûnanîyan bûn. Heke di van pêşniyazên wî de kemînek tê xizirkirin, qasid amade ne di keştîya wan de wekî rehîne bimînin.

[91] Di nav hewlên bi rikoyî yên biyanî yê Samosî, Leotykhidas navê wî jê pirsî, belkî dixwest oxirekê biceribîne, belkî jî tilîya îlahan tê de hebû û her xwe bi xwe pirs kiribû, jê re got: "Biyanîyê Samosî, navê te çi ye?" -Sa-

mosî bersiv da û got "Hegesîstratos". Li ser vê firset nedayê gotinê dirêj bike, Leotykhîdas got "Ez bi oxir hesêb dikim, biyanîyê Samosî,(425) niha tu û hevalên te yên li vir in, berî ji vir biçin, hûn ê sûnd bixwin ku ji vir şûn ve Samosî bi can û mal wê bi me re bin."

[92] Di cih de dev ji gotinê berda û dest bi kar kir; Samosîyan misogerîya dihat xwestin dan, bi Yûnanîyan re li ser hevalbendîyê sûnd xwarin. Piştî ev merasim temam bû derketin rê, tenê Hegesîstratob ma, ji ber ku Leotykhîdasê navê wî bi oxir hesêb kirin, dixwest ew bi Yûnanîyan re derkeve rê. Yûnanî ew roj li hêvîyê man; roja din qurban jêkirin û daxwaza şensê baş kirin; Deîphonosê kurê Eûenîos yê hemwelatîyê Appolonîayê yê Kendava Îonîayê, li ser hesabê wan li fehla qurbanê dinerî. -Tiştekî wiha hatibû serê bavê wî Eûenîos:

[93] Di vî bajarê Appollonîayê de kerîyên nezrî Rojê kiribûn hebûn; bi roj piştî ji Çiyayê Lakmonê dadiketin û di erdê Apolonîayê re derbas dibûn, li rexê Kendava Orikosê, li seranserê çemê tevlî deryayê dibû diçêrîyan; bi şev hemwelatîyên ji nav herî kesên dewlemend û yên herî esîl yên ji bo salekê dihatin hilbijartin nobedarîya wan dikirin. Ji ber ku Apollonîayan, bawerî bi kehanetekê kiribûn, ji van kerîyan re bêsînor rêz nîşan didan; ew di şikevteke hinekî dûrî bajêr de diman û Eûenîosê ji alîyê hemwelatîyan ve hatibû hilbjartin jî nobedarîya wan dikir. Şevekê di nobetê de di xewre çû, gur ketin şikeftê, nêzîkî 60 pezan xeniqandin. Dema ku hay ji felaketê bû devê xwe girt û tiştek ji kesekî re negot; niyeta wî temamkirina kêmasîyan bû. Lê nikarîbû ji Apollonîayan rewşê veşêre; ew derxistin dadgehê ew mehkûm kirin ku wî ji çavên wî mehrûm bikin, ji ber ku ew li ser postê xwe razayî bû. Û çavên Eûenîos hatin derxistin; lê tam di pey re kerîyên wan êdî bi qasî berê nedizan û erdê wan nema wekî berê bi ber bû. Ji bo fêhimkirina felaketa serê xwe, ku serî li kahînên Dodonayê û Delphoîyê dabûn, ji wan re gotibûn ku Eûenîosê ku li ber kerîyê pîroz bû, bi neheqî çavê wî kor kirine, ji ber ku dan xuyakirin gur ji alîyê ew îlahên hûn niha bi wan dişêwirin ve hatibûn şandin- û heta berdelê ku ew bixwe bixwaze hûn nedin Eûenîos û dilê wî neyê xweşkirin, wê îlah dev ji tolewergirtina wî bernedin û piştî Eûenîos vê kefaretê bistîne, îlah jî ya ji alîyê gelek kesan ve zêde bextewer bê hesêbkirin wê dîyarîyekê bidênê.

[94] Kehaneta ku dabûn Apollonîayan ev bû; wan ev veşartin û kar hewaleyê hemwelatîyên bajarên xwe kirin. Van hemwelatîyan ev wezîfe wiha bi

cih kirin: Eûenîos li ser kursiyekî dîtin, nêzîkî wî bûn, li kêleka wî rûniştin û dest bi axaftinê kirin, piştî qasekî ji vir û wir axifîn, gotin anîn ser felaketa hatîye serî, gotin; heke Apollonîayî bixwazin di bedelê tiştên anîn serê te tiştekî biden te, tê tiştekî çawa bixwaze? Ji bo hayê wî ji kehanetê tunebû, got, filan zevîyan -li vir navê du hemwelatîyên ku xwedîyê erdê herî sipehî yên Apollonîayê bûn digot- û ji bilî vê, filan xanîyî -li gor wî yê herî xweşik yê bajêr- bidin wî, ev bedel wê tiştên pê kirine bidin jibîrkirin û ev têrê dike. Wî çawa ev gotin, ew hemwelatîyên li rexê wî rûniştibûn, bêsekin gotin ji devan birîn û ev bersiv dan wî: "Baş e Eûenîos, wê Apollonîayî di bedêla wî tawanê li hemberî te kirine, yên tu dixwaze bidin te; emrê kahînan ev e." Eûenîos ku rewş fêhm kir hêrs bû, pê hesîya ku leyzekê tînin serî; Apollonîayan cihê xwestibû di cih de sitendin û teslîmî wî kirin. Tam piştre, jê re şiyana zanîna xeberên ji xeybê hat bexşandin û nav û deng ê ket.

[**95**] Deîphonosê kurê vî Eûenîos, Korînthosîyan ew anîne artêşa Yûnanan û li wir dest bi kahîntîyê kirîye. Lê min seh kirîye ku di rastîya xwe de ew ne kurê Eûenîos bû, navê wî dizîye, di saya vî navî de li Yûnanistanê hatîye naskirin.

[**96**] Piştî fehla Yûnanîyan baş derket, ji Delosê derketin û ber bi Samosê ve ketin rê. Dema ku gihiştin cihekî jê re Kalamoî tê gotin yê li qiraxê Samosê, li vir li pêşberî perestgeha Hereyê lenger avêtin û dest bi hazirîya şer kirin; di vê navê re Persên ku xebera wê ew bên ser wan wergirtin, lenger rakirin û ji bilî Fenîkeyên ji ser xwe dehf kiribûn, temamê wan ber bi alîyê bejahîyê ve çûbûn. Ji ber ku berî wê meclîseke şer damezirandibûn û ji bo xwe têrî şer bikin bi hêz nedîtibûn, biryar dabûn ku nekevin şer; ji ber wê, ji bo xwe bavêjin artêşa bejahîyê ya li Mykaleyê li hêvîyê bûn, ber bi bejahîyê ve dikişîyan; Xerxes ji yekîneyên mayî 60 hezar kes veqetandibû û parastina Îonîayê dabû wan û Tîgranesê di hêla bejin û bala û sipehîbûnê de di nav Persîyan de yekemîn bû, danîbû ser wan. Ew artêşa ku hêza deryayî dixwest xwe bavêje balê ev bû. Wê li wir keştî bikşandina bejahîyê û dora wê, hem ji bo parastina keştîyan û hem jî ji bo wan biparêzin, wê bi tabyekê dorpêç bikirina.

[**97**] Ev biryar stendibûn û babirkên xwe vekiribûn. Dema hatin ba perestgeha Eûmenîdîyan,[320] ku ber bi îstîqameta Skolopoeîsa Mykaleyê û çemê

320 Eûmenîdî: Navekî din yê Erînysîyan, îlahên tolewergirtinê.

Gaîsonê ve ye - dema ku Phîlîstosê kurê Pasîkles, bi Neîleûsê kurê Kodros re hat û Mîletos damezirand, li vir ew peresgeha Demetera Eleûsîs çêkirbelê ez dibêjim, dema ku hatin vir keştî kişandin bejahîyê, darên fêkî yê li dorê jê kirin û vekişîyan pişt dîwarên ji kevir û daran çêkirî yê bi singên saxlem hatine daçikandin dorpêçkirî. Temamê van hazirîyan, dorpêçek digirtin ber çav û çêdikirin. Yek jî biserketinê, ji ber ku herdu jî hesêb dikirin.

[98] Dema Yûnanî hîn bûn ku barbar ber bi bejahîyê ve kişyane, fikirîn ku wan ew ji destê xwe berdane û xemgîn bûn; pêşî nizanîn wê çi bikin, gelo paşve vekişin biçin yan heta Hellespontosê biçin? Di dawîyê de dev ji van herdu fikaran jî berdan û biryar dan ku ber bi bejahîyên Asyayê ve ba bidin babirkên xwe. Wekî wê şer çêbibe hazirî kirin, ji bo esker derxînin bejahîyê mêrdewan çêkirin û temamê pêwistîyên din bi dest xistin; ber bi Mykaleyê ve ketin rê. Piştî vebûn deryayê rastî tu keştîyan nehatin û nêzîkî baregeha dijmin bûn; keştî di bejahîyê de li pişt dîwarên saxlem bûn û li ser sêlewanê yekîneyên zêde rêz bûbûn. Li ser vê Leotykhîdas, bi kadirgaya xwe bi qasî karîbe xwe nêzîkî bejahîyê kir û ber bi qiraxê ve çû, kir ku çawîşek bangî Îonîayan bike û wiha got:

"Gelî Îonîayan, ji nav we kî dengê min seh dike baş guhê xwe bidin gotinên min; jixwe Persî zimanê min fêhm nakin. Dema me dest bi şer kir, pêşî azadîyê, piştre jî parolaya me Hereyê bifikirin. Yên ev gotinên min seh kirin bila ji yên seh nekirin re bêjin."

Wekî daxuyanîya Themîstokles li Artemîsîonê; ev jî bi eynî sebebê dikare bê vegotin: Yan wê barbar van gotinan fêhm nekin, belkî Îonîayî bibin terefdarê Yûnanîyan, yan jî çi dibêje wê barbar fêhm bikin û bawerî bi Îonîayan nekin.

[99] Piştî van gotinên Leotykhîdas, Yûnanan keştîyên xwe kişandin qiraxan û di pergala şer de sef girtin. Persan hazirîya Yûnanîyan dîtibûn û tiştên ji Îonîayan re hatin gotin seh kirin, pêşî ji Samosîyên ku ditirsîyan bibin terefdarê Yûnanîyan dest pê kirin, çekên wan ji wan stendin. Ji ber ku ew hêsîrên Atînayî yên keştîyên barbaran ew anîbûn, -ku ew li Attîkayê mabûn û ketibûn destê eskerên Xerxes- vana ew rizgar kiribûn û pêwîstîyên rê jî dabûn wan û paşde şandibûn Atînayê; azadkirina 500 kesên dijminê Xerxes bêguman têra şikjêkirinê dikir. Piştî wê got "Kesek bi qasî we van deran

nizane," Mîletosî jî bi vê mahneya parastina rêyên vedibin girên Mykaleyê dehf kirin, bi rastî ya dixwestin dûrxistina wan ji baregehê bû. Persan ev tedbîr li hemberî Îonîayan girtin, yên ku guman dikirin dema fersend hebe wê xiyanetê li wan bikin. Di vê navberê de, wan jî mertalên xwe berhev dikirin da ku tabya damezrînin.

[100] Yûnanîyên hazirîyên xwe temam kirin, avêtin ser barbaran. Tam wê dest bi êrîşê bikirina di temamê baregehê de gotinek belav bû, di heman demê de li qiraxa deryayê kopalê kerûxekî hatîye dîtin, pêlên li qiraxan didan û li vir disekinîn anîne û li ser sêlewanê hiştine.[321] Li gor gotegotên belav bûn, Yûnanî li Boîotîayê şer kirine û artêşa Mardonîos têk birine. Bi rastî dema ku îlahan îstîqamet dan bûyeran, gelek emare derdikevin orteyê ku ew tevlî kar bûne, vê carê jî wiha bûye. Çend saet berî serkeftina li Mykaleyê, gihiştîye Yûnanîyên li qiraxan sef girtibûn, ji artêşê re hisa bawerîyeke nû û biçûkdîtina tehlîkeyê anîbû.

[101] Belê, va tesadufa îro ya duyem: Herdu şer jî li nêzîkî perestgeha Demetera îlaha Eleûsîsê bûbûn. Li Plataîayê, wekî min di pêşîyê de got, şer tam li rexê perestgeha Demeter çêbûbû, li Mykaleyê jî eynî dibû. Ji bilî vê dema ku xebera Yûnanîyên Paûsanîasê li Plataîayê dijmin şikandine hat Mykaleyê, ev bûyer êdî çêbûbû û temam bûbû. Ji ber ku şerê Plataîayê serê sibehê bû, şerê Mykaleyê jî piştî nîvroyê. Piştre dema ku bûyer bi hûrgilî hatin lêkolînkirin, bi zelalî hatîye fêhmkirin ku ev herdu serkeftin eynî rojê eynî mehê bûye. Berî ev xeber bê wergirtin Yûnanîyên li Mykaleyê, ji xwe zêdetir melhezeya Yûnanistanê dikirin û diricifîn; ditirsîyan ku li ber Mardonîos serî deyne. Lê dema ku ev gotin li baregehê belav bû, bi hêzeke nû û dileke polayî avêtin ser dijmin. Bi vî awayî Yûnanî û barbaran bi zanîna, qedera giravan û Hellespontosê girêdayî vî şerî ye, diketin nav pevçûnê.

[102] Atînayî û yên li teniştên wan, hema bêje nîvê enîya şer, li pêşberî dijmin li sêlevaneke nizim û rast de dimeşîyan, lê rêya ku Lakedaîmonî û hevalbendên li ba wan dabûn ber xwe, di berpaleke ku bi coka lehîyê hatibû kolan derbas dibû. Bi vî awayî Lakedaîmonî, ji bo ji piştê ve dakevin baregeha dijmin dimeşîyan, şerkerên baskên din nêzîkahî li dijmin kiribûn. Di midetê muhafezeya ji mer-

321 Kopalê kerûxîyan bikar dianîn, kopalê ji Hermes yê qasidê Zeûs hatîye wergirtin.

talan hatibû çêkirin li ser pêyan ma, Persîyan li ber xwe dan û Atînayîyan tu pêşketin bi dest nexistin. Lê yekîneyên Atînayê û hevalbendên li ba wan cih girtibûn, ji bo rûmeta serkeftinê bi xwe qezenc bikin û bi destê Lakedaîmonîyan ve bernedin, dema ku li seranserê sefan hevdû ji bo şerekî zehmet han dan, kar guherî. Mertal wergerandin, bi hev re pêş ketin û avêtin ser Persîyan. Ew li hemberî êrîşê sekinîn û midetekê li ber xwe jî dan, lê di dawîyê de ber bi kozikên xwe ve baz dan. Atînayî, Korînthosî, Sîkyonî û Troîzenî (eskerên di vî baskî de ev bûn) ji pey wan veneqetîyan û bi wan re ketin nav kelehê; piştî dîwar derbas kirin barbaran dev ji berxwedanê berdan; yên ji derveyî Persan tevde baz dan. Ew çend qemç mabûn jî, lê li hemberî Yûnanîyên daketin asêgehên wan şer dikirin. Du fermandarên Persî baz dabûn xelas bûbûn û duduyên din jî miribûn. Artayntes û Îthamîtres, du amîral baz dabûn, Mardontes û fermandarê yekîneyên bejahîyê Tîgranes çek di dest de miribû.

[103] Dema ku Lakedaîmonî û yên din hatin, Persîyan hê şer dikirin, hatina wan lêdana kulma dawîyê bû. Ji Yûnanîyan jî yên ketibûn gelek bûn, herî zêde jî Sîkyonî û di vê navê re fermandarê wan Perîlaos. Samosîyên li baregaha Medan bûn û çekên wan ji wan hatibûn wergirtin, dema ku dîtibûn ji serî ve rewş di lehê yên êrîş dikin de pêş ve diçe, ji bo lez bidin serkeftina Yûnanîyan çi ji destê wan hat kirin û Îonîayên din yên ew wek mînak ji xwe re girtin jî, ji milê Persan veqetîyan û êrîşî ser barbaran kirin.

[104] Mîletosîyan emir ji Persîyan wergirtibûn ku bihurê çiyayan bigrin, rêya paşvekêşîyê têxin bin ewlehîyê de û dema şer, -bi rastî wekî dibe- berevajî vegere, li girên Çiyayê Mykaleyê yên difikirîn xwe lê ragirin, rê nîşanê wan bidin. Sedema ku Persan ev wezîfe dane Miletan jî ew bû ku hem vî karî misoger bikin û hem bi mayîna wan a li baregehê pêşîya metirsiya ku li dijî wan derkevin bigirin. Lê Mîletosîyan tam eksê ew wezîfeya dabûn wan kirin; ji yên bazdayî re rêya derdikeve îstîqameta alîyê dijmin nîşan dan, di dawîyê de wan jî bi hemû hêzên xwe ve derbeyek avêtin Persîyan. Bi vî awayî cara duyem Îonîayî desthilata Persan ji ser xwe rakirin.

[105] Di vî şerî de ji nav Yûnanîyan herî zêde Atînayîyan, ji nav wan jî Hermolykosê kurê Eûthoînos yê ji bo pêlevanîya pankrasê hatibû perwerdekirin, herî zêde fêda wan çêbûne. Ev Hermolykos piştre di şerekî navbera Atîna û Karystos de derket, di erdê Karystosê de, di esnayê şerekî li Kyrnosê

de mirîye û li pozekî bilind yê navê wê Geraîstos hatîye veşartin. Piştî Atînayîyan, Korînthosî, Sîkyonî û Troîzenîyan xwe nîşan dane.

[106] Yûnanî hem di şer de, hem dema ku baz dane, piştî qismê mezin yê dijmin şikandine, pêşî çi tiştên di nav keştîyan de hene kişandin qiraxên deryayê, piştre agir berdan keştîyan û asêgeh şewitandin; gelek xenîmetên biqîmet bi dest xistibûn; piştî keştî û asêgeh şewitandin, vebûn deryayê. Dema gihiştin Samosê, Yûnanîyan li ser koça temamê miletên Îonî, wê wan li kîjan beşê Yûnanîstanê yên di bin destê wan de bi cih bikin û Îonîayê ji barbaran re bihêlin, nîqaş kirin; ji ber ku zanîbûn îmkana ku hertim li ber Îonîayê nobedarîyê bikin tunebû û ger nobedarî nehatiba kirin, îmkana hêvîya rizgarbûna Îonaîyan li hemberî êrîşîn dijber tunebû. Fermandarên Peloponezî ji bo meseleyê hel bikin pêşniyazeke wiha kirin: Bila Yûnanîyên terefdarîya Medan kirine, ji bajarên qiraxan yên di destê wan de ye bên raqewirandin û wekî welat bidin Îonîayan; lê Atînayîyan, fikra valakirina Îonîayê û helwêsta Peloponezîyan li hemberî kolonîyên xwe bi xwe, gelek xerab dîtin; li hemberî vê seknê Peloponezîyan israr nekirin. Di bin van şert û mercan de biryar dan ku Samosê, Khîos, Lesbosê û giravên din ên di sefên Yûnanîyan de bigrin nav yekîtîyê û sûnd bixwin ku bi vê peymanê bi doza Yûnanê ve bi benikên zexim girêdayî ne. Piştî ev saxlem kirin, Yûnanî ji bo keştîyên pirê xera bikin derketin rê, ji ber ku difikirîn hê herdu alî bi hev ve girêdayî ne.

[107] Û ber bi Hellespontosê ve ketin rê. Em bên wan qemçek barbarên ji bo di şer de canê xwe rizgar bikin li girên Çiyayê Mykaleyê berhev bûbûn, wan rêya Sardesê dabûn ber xwe. Dema ku gihiştin wir, Masîstesê kurê Daryûs bi rê de ev nûçevanê felaketê dîtin; dest pê kir xeber ji fermandar Artayntes re dan, çi hat devê wî hijmartin, di nav gelek gotinan de, wiha jî got; ji ber ku artêşa xwe bi rêk û pêk bi rê ve nebirîye û dahatûya hikumdar avêtîye tehlîkeyê, îşkenceya herî mezin heq kirîye û ferqa wî ji jinekê tune. Di nav Persan de ferqa bi jinê re tuneyî, heqareta herî mezin e. Generalê li hemberî van gotinan ji hêrsa xwe dîn bû, ji bo Masîstes bikuje dest avêt şûrê xwe. Lê di vê hînê de kesekî tam li pişt Artayntes bû, Kseînagorasê kurê Praxîlaos, dît ku kirî êrîş bike bi newqa fermandar girt ew avêt erdê û eskerên parastinê yên Masîstes di cih de dora keyayê xwe girtin. Kseînagoras bi vê şêla xwe tenê ne ya Masîstens, ji bo birayê wî xelas kirîye, ji Xerxes jî tişt hêvî dikirin; Hi-

kumdarê Mezin, wî ji bo van xizmetên wî, tayînî walîtîya temamê Kîlîkîayê kir. Di hatina yên neserketî heta Sardesê, tiştekî ku hêjayî nivîsandinê be neqewimî. Hikumdar hê li Sardesê bû; ew têkçûna wî ya di deryayê de, bi lez û bez paşvehatina wî, vegera ji Atînayê, ji niha ve dûr ketibûn.

ENTRÎKAYÊN DI SERAYA PERSAN DE

[108] Ew li Sardesê bû û dilê wî zêde bi ser jina Masîstes ve çûbû. Lê xeberên şandibûn tev bêtesîr mabûn, ji bo xatirê birayê xwe serî li zorê jî nedida. Jixwe jinikê jî bawerî bi vê dikir, zanîbû wê li hemberî wê zor neyê bikaranîn. Xerxesê ku tiştek ji destan nedihat, keça Masîstes a ji vê jinê bi kurê xwe Daryûs re zewicand, difikirî ku wê bi benekî wiha jinikê hê rehettir bi dest bixista. Piştî merasima erêkirinê hat çêkirin vegerîya Sûsayê. Daryûs û jinên wî yên ciwan girtin seraya xwe û jina Masîstes û xwesteka zêde ya li hemberî wê ji bîr kir, keça Masîstes, Artaynteya jina Daryûs kir cihê wê û vê carê gihişt mirazê xwe.

[109] Bi wextê re ev hemî derketine holê, lêbinêrin çawa: Amestrîsa jina Xerxes ji bo wî qapûteke fireh hûnandibû, rengên wê yên jîndar tiştekî wisan bû ku mirov ji nerîna wê têr nedibû; qapût da mêrê xwe. Kêfa wî jê re hat, li xwe kir û çû cem Artaynteyê; wê rojê bi qasî ji qapûtê xwe kêfxweş bûbû ji wê jî ewqas kêfxweş mabû. Di bedêla wê de, got, "Tu çi ji min dixwazî bixwaze." Wê xwesteka wê emir hesêb bikira. Pêwist bû ji ber vê jinê felaketek hilweşîya ser tevaya xanedana hikumdar. Ji Xerxes re got "Ez ji çi hez dikim bixwazim, bi rastî tê bidî?" Dil wî de wê tiştekî gelek cihê bixwaze, sûnd xwar ku wê bide. Jinika ji vê sûndê cesaret wergirt, qapûtê li ser xwest. Xerxes ji bo wê poşman bike çi ji destan hat kir, Amestrîs jixwe şik dikir, niha wê ev şik rast derketa; bajar danê, girên ji zêran dayê, artêş dayê.(Bi vî awayî artêş dan tam bi Persîyan dikeve.) Jinikê yek ji wan nexwest; di dawîyê de mecbûr ma qapût bide. Jinika bi diyarîyeke wiha pozê wê bilind bû, li xwe kir û dest bi qaanîyê kir.

[110] Amestrîs xeber wergirt; fêhm kiribû çi diqewime; lê ji jinikê hêrs nebû, dêya wê sûcdar didît û digot "Ev dolab hemû ji bin serê wê derdikevin". Ji bo jina Masîstes bide kuştin li hêvîya firsetan ma. Ma li hêvîya roja

şahîya hikumdarîyê ya ku mêrê wê Xerxes bidaya.(Ev şahî salê carekê ji bo pîrozkirina rojbûna hikumdar dihat çêkirin; Persî ji vê re "tykta" dibêjin ku, dikare weke "şahîya bêhempa" bê wergerandin ser Yûnanîyê, tenê di vê rojê de bêhn li serê hikumdar tê reşandin û Persî diyarîyan belav dikin.) Belê Amestrîs, li hêvîya vê rojê bû û ji Xerxes xwest ku jina Masîstes teslîmî wê bike. Xerxes razî nebû jinbiraya xwe teslîmî wê bike, ev weke tiştekî gelekî bi êş û neheq didît, bi ser hala de qebeheteke jinikê di vî îşî de tunebû, -ji ber ku manaya vê daxwazê fêhm kiribû.

[111] Lê jinik ji daxwaza xwe venedigerîya, piştre ji ber mecbûrîyeta îtaetî adetê bike -ji ber ku adet, piştî ahenga hikumdar dest pê bike, izin nedida vegerandina daxwazekê- û bêyî ku qet bixwaze, îşaretek da ku nîşan dide wî destûr daye qurbanê radestî wê bikin; izna çi bixwaze dikare pê bike da û bang li birayê xwe kir, jê ra got: "Masîstes, tu kurê Daryûs î; tu birayê min î; tu berîya her tiştî kesekî mêrxas î. Niha, ew jina di bin banê te de ye berde, ez ê di cihê wê de keça xwe bi xwe bidim te; wê bigre bibe seraya xwe û em ser ew jina te ya niha, wê jî ji xwe dûr bixe, ji ber ku ev zewac ne bi dilê min e." Masîstes şaş mabû, bi vî awayî bersiv dayê: "Hikumdarê me, tu çiqas tiştên bêfêde dibêjî! Ya lawên niha gihiştine salên xwe yên xortînîyê, keçên ku yek jê te ji kurê xwe re weke jin hilbijartîye daye min, ji bilî vê tam jina bi dilê min, niha tu dixwazî ez wê bavêjim û bi keça te re bizewicim? Hikumdarê Mezin, bêguman ji ber ku tu keça xwe layîqî min dibîne, tu rûmetê didî min, lê ne ez vê dikarim bikim û ne jî ya din. Em bên te, hewl nede tu îradeya xwe bi zorê bi min bide qebûlkirin. Ji bo keça xwe jî yekî ji min ne nizimtir hilbijêre; dest ji min jî berde, ez bi jina xwe re bijîm." Bersiva Masîstes wiha bû; Xerxes hêrs bû û wiha got: "Masîstes, wê ji vê qezenca te ev be, êdî tu nikarî bi keça min re bizewicî; lê wê jina te jî demeke dirêj di mala te de nemîne. Ev jî wê te hîn bike ku tiştê tê dayîn tu qebûl bike!" Li ser van gotinan Masîstes ev bersiva kurt da û vekişîya: "Ezbenî hê te canê min ji min nestendîye."

[112] Dema ku Xerxes bi birayê xwe re diaxift, Amestrîs ji bo jina Masîstes bibin perçe bikin eskerên parêzvan ên Xerxes hatibûn: Memik, poz, guh, lêv û zimanê wê da birîn avêt ber kuçikan, bi awayekî neyê naskirin şand mala wê.

[113] Hê haya Masîstes ji teştekî tunebû, lê di hindurê xwe de nerehetîyek his dikir; baz da seraya xwe; jina wî wekî ku wehşek ew perçe kiribû; di cih

de zarokên xwe berhev kir û axift û ber bi Baktrîanê ve ket rê, kurên xwe û qismek ji mirovên xwe jî girtibûn ba xwe. Wê bikra li vê satrapê serî bê hildan û çi xerabîya ji destê wî bihata wê bi hikumdar bikira. Ez bawer im wê bikira jî, heke bigihişta ba Baktrîanî û Sakayîyan; ji ber ku Baktrîanîyan gelekî jê hez dikirin, satrapê wir bû. Lê Xerxes xeber wergirt, artêşek kir pey, di rê de gihiştinê û ew, kurên wî û yên pê re kuştin.

BÛYERA SESTOSÊ

[114] Belê evîna Xerxes û mirina Masîstes wiha çêbûn. Yûnanîyên ji Mykaleyê ber bi Hellespontosê ve derketin rê, ji ber bayê ters, pêşî li Lektonê mecbûr man lenger bavêjin; piştre hatin Abydosê û pir di cihê xwe de nedîtin, -ku sebebê herî kêm giring a rêwîtîya wan a dirêj ne ev bû- pir hatibûn xerakirin. Leotykhîdasî û Peloponezî difikirîn ku ber bi Yûnanistanê ve ba bidin babirkên xwe; lê Atînayî û strategosên wan dixwestin li Ksanthîpposê bimînin û êrîşî Khersonesosê bikin. Peloponezî vegerîyan çûn; Atînayî ji Abydosê rabûn derbasî Khersonesosê bûn û Sestos dorpêç kirin.

[115] Sestos, bajarê herêmê yê keleha wê herî saxlem bû; dema ku xeber hat wergirtin ku Yûnanî li Hellespontosê hatine dîtin, gelek kesên li derûdorê rûdiniştin xwe avêtin wir û Oîobazosê Pers jî melzemeyên di çêkirina pirê de dabû kişandin, ji bajarê Kardîayê hat û xwe li vir girt. Baregeh, ji yekîneyên giring yên ji Aîoyên xwecih, Persan û hevalbendan pêk dihat.

[116] Artayktesê walîyê Xerxes li ser herêmê bû. Ew kesekî ji xwe razî û zalim bû. Dema ku hikumdar dimeşîya bi ser Atînayê de, netirsîya ji xapandina wî jî, li Elaîûsê xezîneya Protesîlaosê kurê Îphîkles dizîbû.[322] Li Elaîûsa Khersonesê, li cihekî kifşe gumbeta Protesîlaos heye; tê de gelek tiştên bi qîmet hene, zêr, zîv, kupayên bronzî, qumaş û pêşkêşîyên din yên Artayktes bi izna hikumdar talan kiribûn. Wî Xerxes bi vî awayî xapandibû, jê re gotibû: "Ezbenî, li vir malek fermandarekî Yûnanî yê ji bo li hemberî te derketibû seferê û cezayê xwe bi canê xwe dayî heye. Vî xanîyî bide min, ku di dahatî

322 Protesîlaosê hikumdarê Phylakeyîyan, ji bo beşdarî şerê Troyayê bibe hatîye û dema ku derketîye bejahîyê hatîye kuştin. (Îlyada, beşa duyem)

de kesek nikaribe çav berde axa te." Xerxes rehet bawerî bi van gotinan kiribû, ji ber ku dema "xanîyê yekî heye" gotibû, nizanîbû ku çi di hişê wî re derbas dibe. Sefer vekirina Protesîlaos ya li hemberî Hikumdarê Mezin jî ev bû: Persî Asyayê malê xwe dihesibînin û wekî milkê hikumdaran yên ji bav derbasî kurî dibe radigirin. Piştî vê diyarîya layîqî hikumdaran wergirt, xezîne ji Elaîûsê birîye Sestosê, erdê pîroz çandîye û hilanîye û di her çûna xwe ya gumbetê de bi xwe re jinik birine û bêrêzî kirîye. Dorpêça Yûnanîyan ew bêhazirî zep kirîbû; qet nehatibû bîra wî ku Yûnanî wê eskera bikşînin bejahîyê. Yûnanî avêtibûn ser kesekî hema bêje ji tiştekî şik nekiribû.

[117] Dawîya payîzê hatibû, Yûnanîyan hê dorpêç didomandin; di nav yekîneyên ji welat dûr ketibûn nerehetî dest pê kiribû, girtina bajêr jî ne diyar bû; wan serî li fermandaran dan ku dixwazin vegerin; bersiva nabe wergirtin, heta keleh nekeve yan jî ji Meclisa Xelkê ya Atînayê emrê vegerê neyê, nedibû vegerin. Eskeran jî serî li ber qedera xwe tewandin.
[118] Yên di bin dorpêçê de bûn, di nav wan de birçîtî hatibû kerteka dawîyê, heta qayîşên livînên xwe jî kelandibûn û xwaribûn. Lê ev xwarin jî nema. Şevekê Persî, bi Artayktes û Oîobazos ve, di cihekî ku nobedarên dijmin firk e, ji bajêr dûr dîwar derbas kirin û bi dizî baz dan. Dema ku bû sibe, Khersonesosîyan ji serê bircan rewş gihandin Yûnanîyan û derî vekirin; qismeke mezin a Atînayîyan ketin pey Persîyan, yên mayî ketin bajêr.
[119] Oîobazos baz dabû Trakyayê; Thrakîyên Apsînthî ew girtin û li gor adetên xwe yê millî, ji bo Pleîstorosê îlahekî wan yê xwecih serê wî birîn û kirin qurban. Yên pê re bi awayekî din kuştin. Em bên gruba Artayktes ya herî dawîyê ji Sestosê derketibûn, ew jî li hinekî nêzîkî Aîgos-Potamosê hatin girtin û qederekê li ber xwe dan; qismek esker mirin; yên din hatin girtin. Yûnanîyan hêsîr girê dan, birin Sestosê; Artayktes û kurê wî yê zincîr kiribûn jî di nav wan de bûn.

[120] Li Khersonesosê tê gotin ku, nobedarekî li ber wan, dema ku masîyê bi xwê pehtîye rastî mûcîzeyekê hatîye: Masîyan di nav teweyê de, wekî masîyê nû hatibin girtin dest bi livê û xwe hilavêtinê kirine. Nobedar li dora tifikê berhev bûne, bi mereq lê nêrîne; Artayktesê mûcîze dîtîye bangî aşpêş kirîye û jê re gotîye: "Biyanîyê Atînayî, bila ev mûcîze te netirsîne; ev ne ji bo te ye, ji bo min çêbû; ji ber ku Protesîlaosê Elaîûsî, her çend mirîye û hatîye mûm-

yakirin, dixwaze bide xuyakirin ku bi saya îlahan mirovê xerabî pê kirîye bê ceza nahêle. Niha ez jî ji bo rizgarîyê, amade me van deynim ser kevirê nezrê: Di miqabilî xezîneya wî yên min ji perestgeha wî wergirtibûn, ez ê sed talantî bidim vî îlahî û ji bo kirîna canê xwe û yê kurê xwe jî ez ê 200 talantî bidim Atînayîyan." Van gotinan, Ksanthîpposê strategos nerm nekirin; ji ber ku Elaîûsîyên dixwestin toleya Protesîlaos werbigirin, ji bo wî bikuje hêvî û lava dikirin; jixwe strategos jî wisan difikirî. Birin qiraxa deryayê, cihê Xerxes pira bi keştîya çêkiribû, li gor hinekan li ser girê bajarê Madytosê, li wir li çarmîxê xistin û ji wir li kuştina kurê xwe ya bi keviran nêrî.

[121] Edaletê cihê xwe girt û Yûnanî ber bi welatê xwe ve ketin rê; di nav xenîmetên dewlemend ên girtibûn de, ew werîsên pira ji keştîyan girê dabûn jî hebûn, ev ji bo di perestgehan de daliqînin dibirin. Ew sal tiştekî din neqewimî.

[122] Artayktesê ku Yûnanîyan ew li çarmîxê xistibû, ji nevîyên Artambares bû ku, tê gotin yê Persî qanix kirin ku daxwaznamekê di vê manayê de pêşkêşî Kîros bikin ev kes e: "Madem ku Zeûs, Astyages anî xwarê, desthilat ji Persan re û ji nav insanan jî ji te re, ji Kîros re pêşkêş kir; madem axa di destê me de stewr û kevirî ye, wî wextî em welatê xwe biguherin, em biçin li ser axên bi bereket bi cih bibin. Li dora me gelek cihên wiha hene, li cihên dûr jî yên wiha hene, em yek ji wan bigrin, hebûna me çend zêde be wê gotinên me jî ewqas zêde bên qebûlkirin. Tiştekî wiha bi vî hikumdarî-miletî dikeve. Em vê îro ku gelek insan û temamê Asyayê di bin desthilata me de ye dikarin bikin, firseteke wiha êdî wê kengî bikeve destê me?" Kîros lê guhdarî kir, zêde guhê xwe nedayê, ji wan re got, hûn çawa dixwazin wisan bikin. Lê dema ku ji daxwazên wan re got erê, şîret li wan kir û got, xwe hînî rewşa ku hûn ne wekî kesên hikum dikin, wek kesên li wan hikum tê kirin bikin û ji wan re got: "Ji ber ku axa ne hişk be, insanên ji enerjîyê mehrum tîne dinyê. Ji axekê hem berhemeke baş, hem şerkerekî hêja nagihije." Persîyan ev gotinê qebûl kirine û ji balê bi hizrên gelek cûda veqetîyane û wan jî di cihê li deştan çandinîyê bikin û koletîyê hildin, li ser axeke stewr xwedîtîya împaratorîyekê bikin, baştir dîtine.

DI DÎROKA HERODOTOS DE PÎVAN

PÎVANÊN DIRÊJAHÎYÊ
Stad, Stadîon: 600 pêy, stada Atînayê 177,6 metro ye.
Pê: 0,296 metro
Enîşk: Pêyek û nîv, 0,444 metro
Qulaç: Şeş pê yan jî 14 enîşk, 1,776 metro
Plethron: Sed pê, 29,6 metro
Tilî: Ji şazdehan yekê pê, 0,0185 metro
Palma: Çar palma pêyek e, şeş palma enîşkek e.
Skenes: Pîvana Misrî ye, 60 stad e, yanî skenesek 10 kîlometro û 656 metro ye.
Parasang: Pîvaneke Persî ye, 30 stad e, yanî 5 kîlometro û 328 metro ye.

PÎVANÊN HECIMÊ
Katule: 0,27 lître
Amphora: 19,44 lître

JI BO MADEYÊN REQALAV
Khoînîx: 1,08 lître
Medîmnos: 51,84 lître

PÎVANÊN GIRANÎYÊ Û PERE
Talant: Piştî Solon li Atînayê di kirîn û firotinê de 36,39 kîlogram bû. Wekî giranîya madenê ya girêdayî pereyê 25,92 kîlogram hatîye hesêbkirin.
Mana: Ji şêstan yekê talantê.

WEKÎ CIHETÊN TERMÊN COXRAFYAYÊ
Boreas: Bayê bakur
Notos: Bayê başûr
Eûros: Bayê rojhilat
Zephyros: Bayê rojava

Ev pirtûk derdora du hezar û pêncsed sal berî niha ji alîyê Herodotosê Karyayî ve hatîye nivîsandin û cara ewil e wergera wê ya Kurdî-Kurmancî tê çapkirin. Hin rexneyên biçûk hebin jî, ev berhemeke bêhempa ye. Herodotos li gelek welat û bajarên cîhanê geryaye, gelek tişt, cih û war dîtine, li gelek kesan guhdar kirîye û tevde li ber me raxistine. Ew ji Anatolyayê heta Rojhilata Nêzîk, ji Misirê heta Hîndîstanê, ji Bakurê Afrîkayê heta Efxenistanê, ji serî heta dawîyê li welatê Med û Farisan hemû agahiyên kevn û nû berhev dike û kevneşopî, bazirganî, siyaset, erdnîgarî û çanda wê tomar dike. Li gor şertê wê heyamê ev serkeftinên mezin in.

Pirtûk herî zêde behsa pêşîyên Kurdan, welatê wan û derdorê dike, di pirtûkê de beşên bi serê xwe yê di derbarê Medan de hene, Med bav û kalen Kurdan in. Em karin bêjin ku ji bilî nivîsên mîxî û yê ser keviran, çavkanîya herî kevn ya nivîskî ya dîroka bapîrên Kurdan û derdora wan ev pirtûk e. Heke ev xebat di dest me de tuneba, di fêmkirina dîrok û sosyolojîya wan deman de em ê gelekî qels bimana. Xebata Herodotos ji neh pirtûkan pêk tê, di hin çavkanîyan de derbas dibe ku di sedsala 2yemîn ya B. Z. de, zanayên Îskenderîye xebat kirine neh pirtûk û navê neh perîyên îlhamê li wan kirine. Di dinyayê de yek ji pirtûka herî navdar e, wergerî gelek zimanan bûye, ji gelek berheman re bûye bingeh...

ISBN: 978-625-99331-2-2